


# PARASTINA GELEKÎ

## Abdullah Öcalan

WEŞANÊN PAJK'ê

Li ser wergerê

Ocalan a bi navê Parastina Gelekî di nav du meh û nîvan de wergerand zaravayê Kurmancî. Ez bi taybet dema wergerê destnîşan dikim ji bo ku were fêmkirin pir bi lez hatiye kirin. Ji lewra jî Xwendevanên hêja! Min ev berhema serokê gelê Kurd Abdullah gengaze gelek kêmasî û qusûrê xwe hebin. Hêvîdarim xwendevan li rewşa min serwext bibin û min bi bexşînin. Xusûsek din heye, pêwîste ez rave bikim. Serokê gelê Kurd Abdullah Ocalan di hevdîtinê de ji parêzerên xwe re diyarkiribû ku ew naxwaze kes bi gotinek wî jî bilîze ji bilî sererastkirina gramerî. Min jî ev nazikiya wî di wergerê de li ber çav girt û hewl da ji nivîsa orjîn veneqetim. Min hevok bi hevok tercume kir. Eger ji ber fikar û nîgeraniyên naverokê nebûyana belkî minê karîbûya hînê zêdetir li gorî têgihîştina zimana Kurdî hevok bihûna. Ez dizanim ev pirtûkê di warê zanistî, siyasî, civakî û rêxistinî de pir were guftûgokirin. Di zaravayê Kurmancî de gelek têgînên siyasî rûneniştine, qasî ku ji dest hat min hewl daye rave bikim an jî termên giştî bi kar bînim. Min hewl neda ez her tiştî bikim Kurdî, min hewl da bidim fêmkirin. Hevalê me Abdulkerîm Aydin (Diyar) tevî karê xwe yê rojane bi fedekariyeke mezin; bi nûra çavan ev berhem di ber çavan re derbas kir û hin kêmasiyên wê sererast kir.

Rêşad Sorgul

# Naverok

*Li ser wergerê*
*Parastina Gelekî*

***Beşa Yekemîn : Rastiya civakî û ferd***

*A - Civaka xwezayî*
*B - Civaka dewletparêz a hiyerarşîk - Derketina civaka kole*
*C - Civaka dewletparêz - Çêbûna civaka kole*
*D - Civaka dewletparêz a feodal - Civaka koletiyê ya stewiyayî*
*E - Civak û dewleta kapîtalîst - Krîza şaristaniyê*

***Beşa Duyemîn : Civaka ekolojîk demokratîk***

*A - Di civakê de cewherê dîrokî yê nirxên komînî û demokratî*
*B - Ji bo civaka ekolojîk û demokratîk ramaneke pêşnûmeyê (proje)*
*1 - Ji bo derketina ji krîzê sîstema demokrasiyê*
*2 - Azadkirina cinsiyetparêziya civakî*
*3 - Veger li ekolojiya civakî*

***Beşa Sêyemîn : Di şaristaniya Rojhilata Navîn de kaos û çareseriyên muhtemel***

***Destpêk***
*A - Têgihîştina rast a li Rojhilata Navîn - Pirsgirêk çiye û çawa pêşket*
*B - Li Rojhilita Navîn rewşa rojane û bûyerên muhtemel*

***Beşa Çaremîn :***

*Di kaosa Rojhilata Navîn de rastiya Kurd, pirsa  Kurd*

***Destpêk***

*Di civaka Kurd de hin xetên cihêwaz*
*1 - Têgînên Kurd, Kurdistanê û ji bo dîroka wê pêşnûmeyeke kurt*
*2 - Li ser Kurdistanê têkoşîn, şer û teror*
*3 - Li ser çanda Kurdistanêpolîtîkayên asîmîlasyonê yên bi darê zorê*
*4 - Li Kurdistanê etnîsîte, çînîbûyîn û netewîbûyîn*
*5 - Li Kurdistanê îdeolojiya fermî û şêwazê îqtîdarê*
*6 - Li Kurdistanê hayilbûna Kurdan li xwe ûkurteçîroka berxwedanê*

***Beşa Pêncemîn :***
***Tevgera PKK'ê rexne-rexne lixwegirtin û jinûve avabûn***

*A - Ji bo dîrokçeya kin a PKK'ê pêşnûmeya nirxandinê*
*1 - Yekemîn Pêngava PKK'bûyînê*
*2 - Duyemîn Pêngava PKK'bûyînê*
*3 - Derbarê PKK'ê de hin nirxandin*
*B - Li ser navê PKK'ê rexne-rexne lixwegirtin*
*C - Di PKK'ê de pirsgirêkên jinûve avabûnê - Di Komara Tirkiyê de Reform û Veguherîna Civakî*
*D- Di PKK'ê de wezîfeyên jinûve avakirinê û pêvajoya KOMA GEL*

**_Beşa Şeşemîn :**

*Di doza Abdullah Ocalan de rola DMME û YE*

***Beşa Heftemîn :***

*Nasnameyeke dixwaze rast were bi navkirin*

***Xulase (kurtayî-cewher)***

***Ferhengok***

## Parastina Gelekî

Reva ji rastiya civakî, ji texmînan jî wêdetir zehmet e. Bi taybetî, eger mirov bi nijad û kokê, bi civakê ve girêdayî be, ev rastî hê wisa ye. Pêşbirka pêvajoya civakîbûnê bi dayikê re, li derdora heft salî dest pê kir û bi gotina gelêrî heta heftê salî wer diçe. Bi awayekî ilmî û zanistî jî hatiye tespîtkirin ku dayik hêza bingehîn a civakîbûnê ye. Gunehê min bi xwe yê yekemîn ew bû ku min ev mafê dayikî bi guman dît û min pir di temenekî piçûk de biryara civakîbûna xwe da. Li gorî tespîtên dawî yên ilmî, di gerdûna me ya bîst mîlyar salî de civaka mirov bi awayekî taybet afirandiye, minê curet û cesaret bikira bê efendî û dayik bijiyama û ev mijareke bi serê xwe hêjayî lêkolînê ye. Eger min guh bida hişyariyên diya xwe û hewldanên wê yên fetisandinê li ber çav bigirta belkî rê li serhatiyên min ên trajîk venebûna. Lê belê dayika min, semboleke dawî ya bermahiya xwedawendên hezar salan bû ku hem diqediya û hem jî bermahiyeke neçar bû. Ez bi wê zaroktiya xwe hem ji vê sembolê netirsiyam û hem jî min hewceyî bi hezkirina wê nedît ji bo ez xwe azad his bikim. Lê min dizanîbû şertê jiyana min bi parastina namûs û şerefa wê dibe, min ev yek jî ti car ji bîr nekir. Minê şerefa wê biparasta, lê bi awayekî min çawa rast dizanîbû. Piştî ku min ev ders ji xwe re derxist, êdî dayika min ji bo min tinebû. Ew bermahiya xwedawendan li bala min nebû û min hîç meraq nedikir ji bo min çi his dike. Veqetîneke zalimane bû, lê rastiyek bû. Ez nizanim kehanetên wê bûn yan jî nifirên wê bûn, gotinên wê di kêliyên giran ên trajîk de timî bi bîr dihatin. Gotinên wê rastiyên mezin bûn, hozanekî hêja jî nikarîbû tespîtên wer bikirana. Rastiyek wê ya mezin jî ev bû; `Tu bi hevalên xwe pir ewle yî, lê tê tenê bimînî.` Lê rastiya min jî hebû, minê bi hevalên xwe re civakîbûn ava bikira.

Çîroka min a jiyanê bi vî awayî dest pê dike. Eger diya min bixwesta jî jiyaneke wê ya bida min nebû. Ji mêj ve hatibû belavkirin. Ew li qulpek an jî misteke jiyanê digeriya, bi xwe ji dest revandibû, lê ji bo bide min dixwest. Her çenda çîroka bavo cuda be jî ji ya wê dûr nebû. Min rastiya malbata xwe, her tim weke bermahiya klanek xwe ferz dike, lê ji hêzketî, belavbûyî û mîrateyeke ti îdîaya xwe nîne, dît. Civaka gund û civaka dewletê ya fermî a bi dibistana seretayî ket jiyana min, ti car dilê min lê germ nebû. Jixwe min pir tişt jî fêm nekiribûn. Ya xuya dikir ew bû ku min zanîngeha ilmê siyasî ku dihat naskirin û kevin bû, heta sinifa

dawî, bi serketineke mezin xwendibû. Encam ew bû, qabîliyeta hînbûnê derbeke xedar a mirinê xwaribû. Paşê min dibistana şoreşê hilbijart ku ew jî mîna kevirê aşekî bêrehim bû, jiyan dihêra. Eger ji destpêkê ve, ez li gorî daxwaz û arzûya xwe çûbûma çiyê, belkî min karîbûya rê neda serhatî û bûyerên trajîk, lê fikara min a ji bo xilaskirina hevalan û afirandinê keys û firsend neda. Dema min xwe avêt ber deriyê nûnerê dawî yê şaristaniyê Ewrûpayê -hem deriyê rojhilat û hem jî rojava- min xwe rûtûtazî di nav hesabên kar û sermayê yên wek bûzê de dît. Di vê qonaxê de êdî ti hêzê ez rêve nedibirim. Belkî bayekî min jî nebû ez bi ber bikevim. Jixwe hebûya jî pir bala min nedikişand. Di vê pêvajoyê de hin hevalên min xwe şewitandin. Gelek xortên egîd û keçên xama amade bûn her tiştê xwe feda bikin. Dilsozî û girêdaneke bêhemta nîşan dan. Lê van qehremanî û fedekariyan ji dijwarkirina tenêbûna min zêdetir ti encam nedidan.

Efendî û giregirên hemû parzemînan destên xwe dan hevdu û bi gotina wan, ez bi komployekê zevt kirim û dema radestî girava Îmraliyê kirim, efsaneyek ku xwe nû dikir hat bîra min. Ew jî ev bû; xwedayê Yewnan Zeûs ji nîvxwedayan Prometeûs bi zinarên çiyayê Kafkasan ve girê da û cegera wî bi qertelan da xwarin. Çawa Prometeûs ji bo azadiya mirovatiyê agir ji xwedayan dizî û cegera wî ya bi qertelan dan xwarin xwe nû dikir. Efsane weke ku di şexsê min de bi cih were xwe nû dikir û dibû rastî.

Dibe ku were pirsîn û fikirîn, çi têkilî di navbera kurteçîroka jiyana min û parêznameya Desteya Giştî ya DMME de heye. Ez bi vê parêznameyê dixwazim vê têkiliyê eşkere bikim. Yek ji hedefên min ên girîng ew e; ez dixwazim bi rêya vê parêznameyê îspat bikim ku têkiliya sermaye-kar ji sihirbazê herî baş sihirbaztir û ji xweda-hukumdarê herî zalim bêrehimtir e. Ti sedsal, mîna sedsala 20. bêrehim û xwînrij derbas nebûye. Ez zarokê vê sedsalê bûm û divê ez vê sedsalê ji hev derbixînim.

Lê belê, bi giraniya îdeolojîk a şaristaniya rojava, mij û morana pêk hatî, analîzkirina rastiyê bi awayekî were fêmkirin zehmet dike. Xilasbûna ji tor û tevna sihirbaz ew çend hêsan nîne. Vê dekûdolaba dawî wê bi hebûna navê wê Tirk e jî bide wendakirin. Belkî jî mirovatiyeke çor û gemarî ya hîç neyê jiyîn li dawiyê were hiştin.

Wê demê eger DMME hêza wê ya mehkemekirinê heye û ji bo ez wê ciddî bigirim, hêja ye û watedar e ku ez parêznameyekê amade bikim. Rojhilata Navîn di van 200 salên dawiyê de di nav çerxa kontrol a şaristaniya Ewrûpayê de ye. Di roja me ya îro de bûyerên

diqewimin û yên xuya dikin tam kaos e, û trajediyên rojane ne. Heta îro her tim efendiyan mehkeme kirin. Timî biryarên yekalî wergirtin. Ya xuya dike ew e, ku wezna dadê û huqûqê di destê wan de ye, diwezînin û belav dikin. Ya rastîn di berdêla nirx û karê de ceza hatiye dayîn.

Neheqî û şerên bêrehim ên sedsala 20. berhemên şaristaniya Ewrûpayê bûn. Ewrûpayê li dijî vê, Yekîtiya Ewrûpayê û hêza wê ya dadgeriyê PMME û DMME ava kir. Lewra, eger naxwaze şeklî bimîne divê rast tespît bike ku di şexsê min de çi tê mehkemekirin. Ji serî ve, hewceye baş were zanîn ku li ser sînorê mafên ferdî qenciyek, ji niha ve berdêla xwe, divê tecrîdeke şidandî ya gihîştiye heft salan nebe. Helwestek bi vî rengî wê hem ji bo şexsê min û hem jî ji bo gelê ez nûneriya wî dikim bibe cezayekî rastîn. Ezê di parêznameya xwe de vî cezayî bixim lêpirsînê. Pir eşkere xuya dike, ez ne bi huqûqê fermî û ne jî bi mantiqê parastina urfî li ser mijarê radiwestim. Ez neçar im bi vî awayî nêzî dabaşê bibim. Bi bandora Ewrûpayê trajediyeke gelan heye, ez dixwazim vê yekê hinekî rave bikim û pir kêm be jî ez dixwazim di çareseriyê de keda min hebe, belkî bi vî awayî ez karibim bersivekê bidim bûyerên diqewimin. Bi taybetî, ez bi vê parêznameyê naxwazim rê li ber trajediyên nû vekim ku li ber teqînê ne. Lewra min hewce dît, ez li ser dîroka civakî, Rojhilata Navîn û rastiya Kurd rawestim. Di pêvajoya nû de tevgera PKK'ê divê wek aktorekî nû ciddî were dîtin û eger pirsgirêka Kurd were çareserkirin wê li Rojhilata Navîn li pey hev pêşketinê bibin, bi dersên ji dîroka nêz hatine girtin, şîroveyeke bi rexne li xwegirtinê pir girîng e.

Trajediya modern xemilandî ya cureyekî Îsraîl-Ereb hîmê wê di sala 1917 de bi projeya wê demê ya Rojhilata Navîn peymana "Says-Pîko" hat danîn. Saziyên din ên siyasî ku hatibûn damezrandin, wek amûrên çareseriyê fikirîbûn. Li gorî xuya dikir, texmîn nekiribûn bi vê peymanê bûyerên giran ên roja me ya îro derkevin holê. Ya rastîn, xwestibûn cîlayeke 'modern' li kevneşopiya civaka dewleta despotîk bidin. Ev cîla di roja me ya îro de parçe parçe hildiweşe. Di dawiyê de kevneşopiya dewleteke zêde neçar derdikeve holê ku ew jî bermahiyê despotên pûç ên kevneşopiya etnîsîte-eşîra herî kêm 5000 salî ye. Bi hilweşîna cîlayê re eşkere xuya dikir, çep-rast, netewperest-îslamî, xwedêgiravî rewşenbîr û bizavên polîtîk jî cudahiyeke xwe ya zêde ji vê rastiya civakî nebûn. Di krîza giştî ya civaka kapîtalîst de pêngaveke mezin di warê globalîzbûnê de pêk tê, ji vê bûyerê para Rojhilata Navîn "kaos" dikeve. Demên kaosê

taybetiyên xwe yên xweser hene. Wexta qanûnên saziyên berê ava kirine ji hev dikevin û di şûna wan de yên nû serî didin, kaos vê "navber-neqeba" krîtîk û nazik îfade dike. Hewldanên hêzên jiyanê, encamên vê "navbera" afirîner diyar dikin. Di lîteraturê de ji van hewldanan re tê gotin; têkoşîna îdeolojîk, polîtîk û exlaqî.

Kurd timî di nav krîzan de bi barê kevneşopiyeke zalimane, bi hisa çanda komkujiyên li ser stûyê xwe dikeve vê pêvajoya kaosê. Eger bi berpirsiyariyeke mezin û helwestên erênî rê nîşanî wan neyê dayîn, bi hêsanî dikarin bibin hêmanekî şer ê ji trejadiya Ereb-İsraîl wêdetir. Di bin destê dewleta despotîk de kokimî û parçe parçe hatine kirin. Ev taybetiyên wan yên civakî deriyên wan li her cure bandorên der ve vedike. Jixwe li rêvebirineke bi vî awayî wek çarenûs û paradîgmeyeke nayê guhertin serwext dibe. Lê belê, hêza hegemon a serkêşê globalîzmê DYE, bi projeya xwe ya nû a Rojhilata Navîn, Kurdan wek hêmanekî bingehîn dixe rojeva xwe û bi vî awayî pêvajo naziktir dibe. DYE bi polîtîkayeke çor a ceribandinê, li civaka Rojhilata Navîn serê her gavê rê li ber trajediyên nû vedike û bi vî awayî, bi zanebûn an jî bi nezanî rojeveke dawiya wê nediyar, weke ku li ser herêmê ferz kiribe xuya dike. YE vê pêvajoyê li gorî berjewendiyên xwe yên hesabên kar û bi aqil ji dawiyê ve dişopîne. Dewleta despotîk hîn nebûye, yan jî kevneşopiyek wê nîne, Kurdan wek rastiyekê qebûl bike û mîna dost nêzîk bibe. Polîtîkayekê tenê hîn bû ye, ew jî ev e ku "serê xwe rakir lê bide bipelixîne." Tevî vê yekê, kevneşopiya xayîn û hevkar a Kurd "malbatî" ku heta qirikê ketiye, timî kar didin ber. Ev "Kurdayetî" bi qasî ku bi hêsayî dikare bi têgihîştina dewleta destpotîk a herêmî re hevkariyê bike, di heman demê de bi efendiyên emperyal ên nû re jî dikare bêpîvan her cure hevkariyê bike. Jixwe kurdayetiya din kirine malbatokên parçe parçe, heta dawiyê hatiye guvaştin, dor lê hatiye girtin, ji cehaletê jî wêdetir, hem mejiyê wî û hem jî hebûna wî li komkujiyê rast hatiye. Hay jê nîne, "çawa ew dikare bibe ew." Ji vê objeya Kurd, her cure armanc dikarin di nav vê kaosa Rojhilata Navîn de sûd werbigirin. Ev Kurd, gengaz e, bi awayekî hovane û gengaz e bi awayekî herî bedew di avakirina Rojhilata Navîn de were bi karanîn. Eger Kurd bersiva pirsa "Kurdekî çawa?" bi cewherê demokratîkbûnê bidin, bêguman, wê karibin di derketina kaosê de bibin ji hêzên pêşeng ên serketî. Ne tenê ji bo xwe, wê karibin dawî li bêşensiya hemû gelên herêmê yên bextê wan û çarenûsa wan serberjêr diçe, bînin. Her weha wê karibin dawî li encamên xwînrij ên kevneşopiya şaristaniya zalimane ya 5000 salî bînin. Wê karibin

koka efendiyên şaristaniya di destpêkê de rê li ber vekirin û bi çavkorî jê re xizmet kirin, biqedînin û rê li ber serdema nifşên azad ên gelan vekin. Naxwe li herêmê pêngavên efendiyên emperyal wê pêş de biçin û eger Kurd bi ser nekevin wê mîna hêzeke ku "bikuje û were kuştin" ji Îsraîl-Filîstînê cudatir nebin xwediyê rolekê û wê li gelemperiya herêmê nikaribin xwe ji vê ristê xilas bikin. Bûyerên niha diqewimin, mîna çirîskên şerê mezin xuya dikin. Em dema li lîstika dewletên Îsraîl-Filîstînê temaşe dikin, hewce nake mirov bibe kahîn ji bo siberoja "dewleta Kurd" texmîn bike. Pêwîst e, mirov wek pîvan, cudahiya di navbera şîdeta ji bo dewletbûnê û parastina rewa ya çekdarî de baş bibîne.

Şêwaz û awayekî çareseriyê yê "bi rêbazên demokratîk û aştiyane" ku xwe nespêre dewletê û kaoseke demdirêj, pir girîng e. Ji bo avakirina saziyên afirîner û watedar hewceye pir zêde mejî were xebitandin û yeqîn dikim ku xebatên bi vî rengî, bi kêfxweşî werin kirin ji hewldanên pîroz in. Min bi awayekî rastîn rexne lixwegirtin û di encamê de ders derxistin û ez ji bo êşên mezin ên bi berpirsiyariya PKK derketine sivik bikim, ezê di vê parêznameyê de hewl bidim rêya alternatîf a çareseriyê rohnî bikim.

Pêvajoya mehkemekirina Îmraliyê her çend di bin şert û mercên ne baş de pêk hat jî, ez rast dibînim ku min ev pêvajo wek zemînê bangawazî û lêgerîna aştiyeke demokratîk bi kar aniye. Ji bo veguherînê ev pêvajo qonaxeke hêja bû. Di vê pêvajoyê de wek pîvan ji bo ez dest ji lêgerîna civaka dewlet û hîyarerşîk berdim, hem pir ponijîm û hem jî hewldanên min çêbûn. Di demên zehmet de ders têne girtin û ez yeqîn dikim ku min jî ev ders girt. Dîsa di vê pêvajoyê de min hem bi awayekî hişk û çor li ber xwe neda û hem jî min bi awayekî bêşeref xwe berneda, ez li dijî van herdu awayan derketim. Ji bo veguherîna Tirkiyê, xweparastina min a li vir, gelek bi kêr hatiye û saziya siyasî ya bi navê AKPê pir bi zanebûn sûd jê wergirtiye. Tevî hemû hewldanên min, hêzên çepgir ên diviya demokratîk bibin, min nekarî bi heman rengî wan jî ji vê yekê sûdmend bikim, bêguman ev xisareke mezin bû. Ne çepgiran û ne jî rastgiran demokrasî guftûgo kirin, bêguman ên bi ser biketana jî ew bûn.

Armanca bingehîn a parêznameya min a DMME ew bû; ez şaristaniyên Rojhilata Navîn û Ewrûpayê rûbirû bikim û li hemberî bûyerên muhtemel biqewimin, bi taybetî Kurdan, bi giştî xelkên herêmê bikim xwediyê alternatîfeke demokratîk. Di vê çarçoveyê de PKK hatibû vekişandin nav sînorên Başûrê Kurdistanê. Dagirkeriya

DYE jî rastiya vê helwestê eşkere kiriye. Helwest û nêzîkbûnên ji bo Rojhilata Navîn ku li tevahiya dunyayê têne guftûgokirin, di vê parêznameyê de bi awayekî berfireh hatine danîn. Her roja derbas dibe girîngiya van helwest û nêzîkbûnên hatine desntîşankirin hê baştir eşkere dibin. Di vê parêznameyê de ne dijminahiyeke hişk û çor a şaristaniya Ewrûpayê tê kirin û ne jî helwesteke teslîmwarî ya tê zanîn, heye. Min helwesteke xweser, afirîner û sentezkar bi nazenînî nîşan da.

Min di parêznameya xwe de ku ji Dadgeha Atînayê re pêşkêş kir, pir eşkere nîşan da ka divê mirov mesleyê çawa bigire dest û min bi hostayî nîşan da ku olîgarşiyan gel xistine çi rewşê. Min eşkere li ber çavan raxist ka çawa hewce ye careke din, ji aliyê gelan ve li mesele û pirsgirêkên dîrokî were nerîn.

Ez bi vê parêznameya xwe ya dawî yên beriya wê temam dikim. Ez di vê parêznameyê de destpêkirina pêvajoya guftûgokirina tevlîbûna siyasî û huqûqî ya Asya Piçûk bi YE re li ber çavan digirim. Di serketina pêvajoyê de wê pirsgirêka Kurd rola sereke bilîze. Pîvanên siyasî, demokratîk û mafê mirovan, mumkîne wek pîvanên bingehîn ên çareseriya pirsgirêkê werin dîtin. Lê belê biryara dewlet û hukûmeta Tirkiyê di şûna ji dil bê dîtin, mîna neçariyekê hatiye fêmkirin. Ev helwest, tevî ku tirsa kevneşop a Tirkiyê ji rojava nîşan dide, wê Tirkiyê hewl bide fêm bike. Helwesteke ji dil û azad, wendakirinê bide aliyekî, wê pir mezin bide qezenckirin. Ji damezrandina Komarê ve lîstika bi qerta Kurd a bi Mûsil-Kerkûkê dest pê kir, divê êdî were terikandin. Ji lewra, şoreşên komarê xilikî man, olîgarşî ji rastiyan dûr ket û di roja me ya îro de jî tenê rengê xwe diguhere. Ji bo em bikevin rêya çareseriyê, ji bo yekparebûn û demokratîkbûneke rastîn, hewce ye bi girîngî li ser komara demokratîk û senteza welatiyê azad ê Kurd were rawestîn. Jixwe alternatîfa şaristaniya Rojava ya mafê mirovan û demokrasiyê jî wê ji vê helwestê pêve şens nede helwesteke din.

Wexta pîvanên huqûqa pozîtîf li ber çav werin girtin, ez pir îhtimalê nadim ku bi awayekî ji dil li ser mafên min were rawestîn. Jixwe zemînê aborî-polîtîk ê binê dozê û rastiya mezin a komployê, pir zêde di ser hêza huqûqê re ye. Her weha huqûq bi xwe jî ji bo demeke dirêj siyaseta bi ser sazî û rêzikan e, zêdetir tiştekî din jî nîne. Ev nuqte ji bo DMME jî wisa ye. Lê belê dîsa jî bi karanîna mafê xweparastinê wezîfeyeke huqûqî, siyasî û exlaqî ye. Ev şerê min ê xweparastinê ku şeş sal e dewam dike, yeqîn dikim ku di warê wate û avakirinê de ji xweparastinên min ên berê yên îdeolojîk-

polîtîk pir pêşdetir e. Kesên dikarin hinekî din li ser navê mirinê mehkeme bikin divê zanibin xwe jî mehkeme bikin. Kesên hinekî din biparêzin divê zanibin xwe jî biparêzin. Kesên azadiya hinekî din dixwazin divê zanibin xwe jî azad bikin. Bi vî awayî belkî zarokên me yên hîç mafê wan ê azad ji dayikbûnê nebû êdî karibin bigihîjin vî mafê xwe.

**BEŞA YEKEMÎN**
**Rastiya civakî û ferd**

Ez wek ferdekî bi serê xwe tenê di nav şertên tecrîdê de mehkûmiyetê dijîm, li aliyê din, parastina xwe ya huqûqî dewam dikim. Ez ketim sala şeşan. Hêsan nîne, mirov di dîrokê de dozeke din mîna vê demdirêj û ji aliyê siyasî ve giran bibîne. Hînê jî diyar nîne wê heta kengî dewam bike. Lê belê hê jî bi israr doz wek serlêdana ferdekî tê nirxandin û ji aliyê civakî û siyasî dûr tê girtin. Pir eşkere, ev helwesta DMME kêmaniyeke mezin e û bi xwe re rê li ber mehkemekirineke adil nebe, vedike. Doza min bi nazenînî di çarçoveya DMME de hat qebûl kirin, lê ji hemû aliyê siyasî û civakî dûr hat girtin. Eşkere ye, hewceyî bi vê helwestê dîtin ji bo aliyekî girîng ê rastiyê veşêrin. Ev bi xwe jî mijareke bingehîn e, divê ez rave bikim. Ferd ji civakê qut dike û dibêje; "ez te dikim xwedî maf" bi vî awayî mehkeme dike. Ev helwest cewherê şaristaniya Ewrûpayê pêk tîne. Hema hema ez bi tevahî di parêznameya xwe ya yekemîn de li ser vê rastiyê rawestiyam. Ezê tekrar û dubare nekim. Lê ez dîsa jî hewce dibînim bi kurtî bînim ziman.

Şertê hebûna cinsê mirov civat e. Ji cinsê prîmat (famîlya herî nêzîkî mirov) yê beriya xwe veqetiyaye û bi civatê bûye mirov. Ev tespît a herî nêzî rastiyê ye, ji aliyê Ilmê Civakî ve tê qebûlkirin. Ferdê bi tenê û jiyana bi civat, çiqas ji hev bêne kirin bila bêne kirin, bi teorîk îspat a wê zehmet e. Ji ber ku ferdê bi serê xwe nîne. Dibe ku ferdê civaka wî hilweşiyayî hebe, lê hîç nebe ew ferd bi bîranînên civaka xwe ya hilweşiyayî li ser piyan dimîne. Ew bi wan bîranînan jî ji bo kêliyekê dibe civakî. Cinsê mirov, bi temamî hêza xwe bi asta têkiliya xwe ya bi civatê re bi dest dixe. Hejar û qelsxistina ferd, şêwazê herî hov ê kolekirinê, tenê hiştin, tecrîd û îzolekirinê ye. Keriyên koleyan, gundiyên serf, karkerên li bajaran dîsa jî civat in. Car caran îsyan dikin û hebûna xwe bi bîr dixînin. Li aliyekî din, tenêtî dijwar hîn dike. Di dîrokê de pêvajoya sulûk û înzîwayê ya hemû zana û peyxemberên navdar vê rastiyê nîşan didin.

Ferdiyet heta tu bibêjî têgîneke bi nakok e. Aliyekî rûyê wê li dijî civakê heye wek xeleka zincîrê ya jê bibe û serbest bikeve. Em ji rêzik û pîvanên civakê yên ne bi zorê re dibêjin exlaq. Ferdiyet zorê dide vî exlaqî. Ya rastîn di şaristaniya Ewrûpayê de ferdiyet bi qelskirina vî exlaqî pêş dikeve. Di şaristaniya Rojhilat de serdestiya civakê li pêş e, lê di civata şaristaniya rojava de ferd li pêş tê. Ji ravekirin û bi navkirina ferd a bi vî awayî du encamên cuda têne bi destxistin. Ferdê serdest û mijok derdikeve tebeqa împaratoriyê, ferdê mehkûm û tê mijandin jî koletiyeke dijwar dijî. Pir xweber û tesaduf nîne, ji koletiya dijwar a sîstema kapîtalîzmê ku li gelemperiya civakê belav kiriye, di sedsala 20. de rûyekî hovane derdikeve holê. Pergal û sîstema ew çend bi efendiyan tê meşandin ku ji nirxên xwe yên bingehîn bûye, ji hêrsa xwe ya kar û qezencê, dikare her hovîtî û dînîtiyê bike.

Tenêtiya ez dijîm, bi giştî têkiliya xwe bi vê sîstema mehkûmiyet û tecrîdê re heye. Civata te, gelê te; eger ji "xwebûnê" hatibe derxistin, ev tê wê wateyê hê tu ji dayikê dibî tu bi tenêtiyeke qels têyî mehkûmkirin. Tu çendîn ji xwe dûr bikevî ew çend tu bi civateke din re dibî yek, lê wê demê jî tu êdî tu nînî. Yan tê tenêbûneke dijwar, yan jî tê xwe radestî rastiyeke din bikî. Feq û dafika Kurd ketinê û min berê behs kiribû jî ev mentiqê dualî bi xwe ye. Wek ji te re bibêjî; ji mirinan mirinê biecibîne. Di roja me ya îro de cudabûn û parvekirina "bi yê din re" pir tê guftûgokirin. Helwesteke rast e, ji bo dewlemendiya civatê li ser hîmê dilxwaziyê cudabûnên werin afirandin bi yê din re werin parvekirin. Lê belê polîtîka homojenkirin û afirandina yek tîp mirov a sîstemê tiştekî din e. Ew qirkirin e. Ew ji holê rakirina nijad û qewman e. Asîmîlasyon e. Tu êdî tu nînî. Li ser rastiya Kurd polîtîka tê ceribandin jî ev cure ye. Çavkaniya wê jî biyo-îqtîdara sedsala 19. û 20. ya nijadperest û faşîzm e. Her cure têgihîştina desthilatiya total e. Armanca wê afirandina nijad û netewekî xurt e, û pê re êrîş û şer tên. Bêguman reh û kokên wê dadikevin heta serdema avakirina destpêkê ya civaka hiyarerşîk, lê bi sîstembûn û belavbûna wê wek polîtîka dewletê xweserî sedsala 20. ne.

Her du şerên mezin ên cîhanê û gelek pevçûnên herêmî, şaristaniya Rojava bi taybetî di bin normên YE de neçarî yekîtiyê kirin. Rewşa Ewrûpayê di roja me ya îro de li hemberî mirovatiyê awayekî rexne lixwegirtinê ye. Ferdekî ji xeleka xwe qutbûyî û desthilatiya dewletê ya berovajî nirxên moralê mezin dibe, xirabiya

nekin nîn e. Hela li pişt vê yekê hêrsa kar û qezencê ya sermayê hebe.

Di bin van şertan de mehkemekirina min, em komployê jî bidin aliyekî, dibe sedema cezayekî giran, ji ber ku min civakeke îdeaya xwe wendakirî kiriye xwedî xwestek û li dijî sîstema bi pey hêrsa hêza qezenc û karê ketiye kiriye xwedî çalakî û tevger. Ev tê ferzkirin û kengî were gotin ka civaka min, ka çanda min, ka zimanê min, ka azadiya min, ev hemû dibin cihêkarî û îxaneta bi welêt re. Di şaristaniya Osmaniyan de gunehekî wer nebû. Di sîstema qewmên Tirk de bi giştî cureyekî welê yê guneh nîne. Ev guneh, vedîtin û îcada rejîmên faşîst, nijadperestên şaristaniya Ewrûpayê û rejîmên din ên desthilatiya total in, di sedsala 20. de derbasî sîstema dewleta Tirk bûne. Ji vê yekê jî her aliyê cîhanê para xwe girtiye.

Eger gunehekî min hebe, ew jî ewe ku min jî hinek ji mîkrobên çanda şer û desthilatiyê wergirtine. Wexta ji bo azadiyê, desthilatiya dewletê û şer mîna fermaneke Quranê bi bawermendî hat fêm kirin, ezê jî tevlî lîstikê bibûma. Hema hema her kesê li ser navê bindestan rabû û têkoşiya, nekarî xwe ji vê nexweşiyê xilas bike. Li ser vî hîmî, ez ne tenê li hemberî sîstema serdest, her wiha ez li hemberî Têkoşîna Azadiyê ya min her tiştê xwe ji bo wê danî holê jî gunehkar im. Ezê di vê mijarê de rexne lixwegirtinê ne tenê bi teoriyê, ezê di pratîka esîl a tenêbûna xwe de heta dawiyê bimeşînim. Lê sîstema ku civak û gelek bi zorê û hîleyan ji xwebûnê derxistiye, wê çawa xwe bide efûkirin. Eger mehkemekirinê adil bibe, divê li îdeayên her du aliyan jî were guhdarîkirin û li gorî wê biryar were dayîn. Mehkemekirineke têkiliya xwe ji zanistê qutbûyî ti car nikare adil bibe. Eşkere ye, Ilmê Civakî wê sîleha min a bi tenê be, ezê serî lê bidim. Ez bi qasî ku xwe pê rohnî bikim, ezê karibim li ser rêya rast bimeşim ku ev jî yek ji şert e, ji bo mirov bi şeref û rûmet bibe.

Sîstemeke ev çend bandor li civakê kiribe, wê hilweşandin û texrîbatên wê yên xwezayê neyên ji bîrkirin. Helwesteke femînîst û ekolojîk wê karibe me bigihîne jiyana civakî ya xwezayî. Yek ji mijarên sereke divê baş were ravekirin, alternatîfa polîtîk a gelan demokrasî ye. Ev ji bo destnîşankirina çareseriyê girîng e. Globalîzm, piyasa serbest a mal ku wek fetîşîzmekê pêşkêş dike, mîna alternatîfê bi tenê dixemilîne û datîne pêşiya me, ya rastîn bi vê yekê, dizek û desteserkerê berê ye. Emê jî bi vê zanebûnê, alternatîfa xwe ya demokratîk û ekolojîk hê jî rave bikin û ala jiyana xwe ya nû li ba bikin. Emê bi vê yekê, îdealên wekhevî û azadiyê yên di dîrokê de zêdetir rojane bi cih bînin û bijîn, di heman demê de emê îspat

bikin ku hewldanên di vî warî de têk neçûne. Çawa ku di xwezayê de ti tişt tine nabe, ti nirx û buhayên ji bo civakê jî tine nabin û naçin.

Di parêznameyê de ez ji nû ve li ser rastiya civakîbûyînê rawestiyam, ev yek bi ponijandina min a felsefî ve têkildar e. Felsefe wek Ilmekî Civakî divê mîna pêvajoya zayînê rola xwe îro jî bilîze. Li dijî ilmê bûye desthilatdar vegera li felsefeyê şert e ji bo civaka azad derkeve. Demokrasiyek xwe nespêre felsefeyê, bi hêsanî dikare ji rastiya xwe dûr bikeve û di destê demogogan de bibe amûrekî zalimane ji bo rêvebirina gelan. Di dîrokê de bêhejmar mînakên vê rastiyê hene. Ji bo pêşî li vê were girtin, divê aliyek etîk û aliyek jî zanist têkoşîna siyasî were meşandin. Bi vê berpirsiyariyê, em dikarin ji krîza sîstemê bikevin meşa jiyanê ya xwe dispêre azadî û wekheviyê û dîsa bi vî awayî em dikarin jiyana li ser hîmê wekhevî û azadiyê biafirînin.

**A- Civaka xwezayî**

Têkiliya di navbera xweza û civakê de yek ji mijarên sereke ye, Ilmê Civakî li ser zêde disekine. Tevî ku bandora hawîrdorê ya li ser civakê eşkere ye jî wek mijar hê nû dikeve ber destê felsefê û lêkolînên zanistî. Piştî ku sîstema civakî bandora wê ya di asta felaketê de li ser hawîrdorê derket holê, bal kişiya ser vê mijarê. Dema li ser çavkaniya pirsgirêkê were rawestîn, wê sîstema civakî ya serdest ku bi awayekî xeter ketiye dijberê xwezayê, wê derkeve pêşiya me. Mirov çendîn li hemberî xwezaya hawîrdora xwe xerîb ketiye û biyanî bûye, nakokiyên wî yên civakî û şer zêde bûne. Ev di çavkaniya nakokiyên hundurîn ên civakê de ku bi hezarê salan dewam kirine, eşkere xuya dike û ji aliyê zanistî ve jî ev yek her roja diçe zelal dibe. Di roja me ya îro de sir û şîfreya serdestiya li ser xwezayê ew e ku hemû çavkaniya zevt bike û bêeman bimije. Behsa hovîtiyên xwezayê têne kirin, ji sedî sed rast nînin. Însanê li dijî cins û cûreyê xwe hov bûye, li dijî xwezayê jî bi awayekî xeter hov bûye, ev yek jî bi pirsgirêkên hawîrdorê eşkere li ber çavan e. Ti cins û cureyî bi qasî mirov heywan û nebat tine nekirine. Eger mirov bi vî awayî û lezê karê tinekirinê dewam bike, li dawiyê wê mirovekî bûye dînazor û nifşê wî diqede bimîne. Eger bi vî awayî mirov bi lez zêde bibin û teknolojiyê xirab û hilweşînkar bixebitîne û pêşî lê neyê girtin, di demek pir kin de wê jiyana mirov bigihîje qonaxekê ku êdî nemeşe. Tevî vê rastiyê, şerê di nava civakê de zêde dibin, awayên herî xeter ên rêveberiyên polîtîk, zêdebûna bêkariyê, dûrketina civakê ji nirxên moralê û mirovatiyeke robotwarî wê bibe dînazor. Heta qonaxên pêşketina civakê rast neyên destnîşankirin, wê şerên

kevneşopî yên netew, çîn û medeniyetan, bi awayekî rast û teorîk neyên ravekirin û çareseriyê neyên dîtin. Eger sosyolojî bi qasî "dîn" jî nikaribe bersiva pirsgirêkên îro bide, divê hemû sazî û dezgehên zanistî bikevin lêpirsînê. Eger zanist ev çend pêş ketiye çima ev dînîtî û hovîtî? Tê zanîn, bîlanço û encamên xwînrij ên sedsala 20. eger em rûbirû bikin, qat bi qat ji tevahiya dîroka mirovatiyê zêdetir e. Lewra em dikarin bibêjin di avahiya zanistê de kêmanî û çewtiyên ciddî hene. Dibe ku çewtî di tespîtên zanistê de nebin, di bi karanîn û rêvebirina wê de be, lê ev jî zanyaran, zanistê û saziyên wê ji berpirsiyariyê xilas nake. Bêguman ev der hûrûkûr cihê guftûgokirina vê mijarê nîne. Bi bîr û baweriya min, rewşa zanyar û saziyên heyî, hem ji aliyê exlaq û hem jî ji aliyê baweriyê ve, ji rewşa rahîbên li bindestê melîkên destpêkê yên Misir û Mezopotamyayê paşdetir e û bêberpirsiyarî ye. Olên li ser kevneşopiya Îbrahîmî û peyxemberên wan ên li dijî nifşên Fîrewin û Nemrûdan serî rakirin, ji aliyê exlaq û baweriyê ve di pêşketina mirovatiyê de roleke bi kêr lîstin. Ev rol aliyê erênî yê kevneşopiya rehîban e. Ilimdarên di bin fermana desthilatdariyê de timî amûrên qirkirinê didin desthilatdaran û herî dawî jî atom li nava serê mirov xistin. Eger welê be, di têkiliya zanist û desthilatdariyê de çewtiyeke xeternak heye. Em dikarin zanistê wek berhemekî herî hêja yê civakê bibînin, lê bi sedema ku ew çend rê li ber felaketan vekiriye, em nikarin rave û şîrove bikin. Lewra em nikarin saziyên zanistê û zanyaran bi vî awayî qebûl bikin û heta li wan biborin. Em heta vê nakokiya pêştir rave nekin, lêpirsîna me ya sosyolojî û hemû zanistên din jî tê fêmkirin. Em eger tespît nekin, ka sîstemê lîstika mezin di ku de lîst, çewtiya bingehîn di ku de da kirin û siberoj û bergiya mirovatiyê çawa xist pêvajoyeke nediyar, em çiqas teorî û pratîka rizgarî, wekhevî û azadiyê bikin di encamê de emê dîsa bibin karkerekî sîstema civaka serdest.

Di parêznameya xwe de îdîayeke min a girîng ew e; ezê vê nakokiya sereke ya di bingehê şaristaniya Ewrûpayê de nîşan bidim ka çawa rol lîstiye. Ev nakokiya sîstemê heta baş neyê ravekirin wê çewtiyên din ên xeternak destnîşankirina wan kêm bimîne. Sîstema Rojava xwe ji sîstemên din hemûyan dikare bi hostayî veşêre û vedize. Sîstema herî zêde dikare bi propagandayê zêhniyet û moralê belovajî bike. Bihêlin nûneriya wê ya serdema herî azad, hîç zehmet nîne em îspat bikin, nûneriya serdema koletiya hemdem dike. Lewma min hewce dît, ez rengên civakan li gorî xwe bihûnim. Min li gorî xwe serî li şêwaz û awayekî watedar ê ravekirinê da.

Meqseda min ji civaka xweza ev e; cins û cureyê mirov piştî ku ji prîmatan qut bû, komên mirovan sîstemek meşandin heta civaka hiyarerşîk. Pêvajoya piştî prîmatan dest pê dike û heta civaka hiyarerşîk dewam dike, civaka xwezayî ye. Ev sîstem a komên mirov e. Bi gelemperî ev komên mirovan ên ji 20-30 kesî wek klan têne bi navkirin û bi sedema alav û amûrên ji keviran bi kar anîne jî wek serdema mirovatiyê ya Paleolotîk û Neolotîk jî tê bi navkirin. Ev komên mirovan di xwezayê de nêçîrê dikin, gîha û pincaran berhev dikin û çi hazir dibînin xwe pê xwedî dikin. Bi gotineke din, debara xwe bi hebûnên amade yên xwezayê dikin. Hinekî mîna cinsên heywanan ên dişibin wan xwe xwedî dikin. Lewra em nikarin behsa pirsgirêkeke civakî bikin. Klana me, wê timî lêkolîn bike; dema bibîne wê yan berhev bike, yan jî nêçîrê bike. Her ku alet û amûran vedibîne, agir keşif dike, berhemên wan zêde dibe û wek cins pêş dikeve û bi lez ji prîmatan dûr dikeve. Rêzik û pîvanên beridandin û tekamulê pêşketinê diyar dike.

Mijareke din a derbarê civaka xwezayî de were pirsîn, şêwazê îfade û zêhniyetê ye. Mirov di kîjan qonaxa zihnî de şekil wergirtiye, mijarek e, hê jî girîngiya xwe dewam dike. Bi vê ve girêdayî, divê pêştir mirov cih bide zêhniyetê, yan jî avakirin û amûran? Bersiva vê pirsê girîng e. Tevahiya dîrokê, di binê lêgerîna felsefeyên meteryalîst û îdealîst de ev mantiqê dualî heye. Sînorê herî dawî yê zanist gihîştiyê "kûantûm" û "Kozmos" dîtinên gelek balkêş ji me re pêşkêş dikin. Kûantûm wek pirtikên jêr atomê û pêlên fîzîkî qadên nipî nû li me vedikin. Bi vî awayî tespîtên cuda têne kirin, ji hiskirinê heta tercîhên azad, di heman demê de bûyîna du tiştên cuda, ji ber xwezaya mirov, pîvana mirov nikare ti car xwe ji nediyarbûnê xilas bike. Têgihîştina maddeyên bêruh û hişk bi temamî li aliyekî din têne hîştin. Berovajî gerdûneke heta dawiyê zindî û azad derdikeve pêşberî me. Di vê nuqteyê de sirra bingehîn bi taybetî di mirov de dijî. Em behsa îdealîzmê û subjektîvîzmê nakin. Em nakevin guftûgoyên felsefî yên têne zanîn. Em serwext dibin ku li gerdûnê ev çend cihêrengî li sînorê kûantûmê diqewimin.

Em dibînin, êdî ji pirtikên atomê jî wêdetir, di gerdûna pirtik-pêlan de bûyerên diqewimin, bi taybetî "zindîtî" her cureyê hebûnê pêk tîne. Em dema behsa pêderxistin û hiskirina kûantûmê dikin ev vê rastiyê destnîşan dikin. Bêguman ev çend cihêrengiya xwezayê bi mejiyekî mezin û tercîheke azad dibe. Ji maddeyeke bêruh û hişk çawa ev qas nebat, çîçek, ruhber û mejiyê însan zêde dibe. Her çend tê gotin, metabolîzma ruhber ji molekulan pêk tê jî, em heta bûyerên

ji molekulan, atom û pirtikên atomê, sîstema pirtik-pêlan wêdetir rave nekin, gengaz xuya nake ku em karibin cûrbecûrî û cihêrengiya xwezayê rave bikin. Bi heman awayî em dikarin kozmosê jî analîz bikin. Li ser sînorê dawî yê gerdûnê (eger hebe) bûyerên diqewimin dişibin bûyerên di kûantûmê de pêk tên. Di vir de têgihîştina gerdûneke zindî derdikeve pêşiya me. Gelo gerdûn bi xwe, nabe ku bi zêhn û maddeya xwe hebûneke zindî be? Di kozmolojiyê de ev pirsek e, her ku diçe zêdetir tê guftûgokirin.

Ji bo mirovê di navbera kûantûm û kozmosê de radiweste em dibêjin "mîkro kozmos". Axir tu dixwazî her du gerdûnan; kûantûm û kozmosê fêm bikî, li mirov serwext bibe û ji hev derbixe! Ya rastîn mirov navika hemû pêhesîna ye. Çiqas agahî û zanebûnên me hene berhemên mirov in. Ji kaûntûmê heta kozmosê di hemû qadan de agahiyên me mirov pêş de birine. Ya divê em lêbikolin pêvajoya pêhesîna mirov e. Ev bi maneyek din, dîroka tekamul û beridandina gerdûna me ya 20 mîlyar salî ye ku temenê wê bi qasî hatiye pîvan. Bi rastî mirov kozmosekî mîkro ye. Ji ber ku di wî de sîstema kûantûmê dimeşe. Em ji pirtikên jêr atomê û pêlan heta molekulên DNA yên pêşketî, beridandina dîroka maddeyê dibînin. Her wiha ji qonaxa herî jêr a nebat û heywanan heta qonaxa pêşketina mirov, hemû pêvajoyên pêşketinên dîrokî mumkîne werin dîtin. Bi awayekî ilmî baş hatiye dîtin ku genê mirov di hemû qonaxên biyolojîk de xwe dubare dike û mezin dibe. Qonaxên pişt re bi civak û beridandinê temam dibe. Bi beridandina civakê re jî zanistê digihîne qonaxa îro. Lewra hukmekî ilmê ye, ku dibêje; mirov xulase û kurtasiyeke gerdûnê ye. Eger em şîroveya xwe ya li ser mirov berfireh bikin, em dikarin îdeaya hin faraziye û hîpotezan bikin. Eger di hemû materyalên mirov pêk anîne de zindîtî, pêhesîn û taybetiyên azadiyê nebûna, wek encama van hemû taybetiyan însan jî wê li cem pêhesîn, zindîtî û azadiyê pêş neketa. Ji tiştekî neyî, tiştekî nû dernakeve. Ev têgihîştina me ya maddeyên bêcan pûç dike. Bêguman organîzasyonek mîna cureyê însan û civak nebe, hebûnek xwedî agahî pêş nakeve. Lê belê di vê organîzasyon û civakê de meteryalên rol dilîzin, xwedî taybetiyên agahî, pêhesîn, watedarî û azadiyê nebin, agahî û zanebûnê jî nikaribin pêk werin û ev dabaşeke tê fêmkirin. Di cewherê xwe de eger tiştek nebe, çima were afirandin? Li gorî vê nirxandinê, ne bi bandorên sivik ên ji xwezaya der ve û ne jî mirov bi awayekî Descarteswarî dibe xwedî agahî, van herdu şîroveyan jî piştrast nake. Fikir û dîtina nêzî rastiyê ew e, ku taybetiyên di gerdûna kûantûm û kozmosê de diqewimin di mirov de

jî têne jiyîn. Bêguman ev gerdûn di çarçoveya rêzik û pîvanên xwe yên xweser de dimeşe. Gerdûn di mirov de têne ziman. Encama ji vê tê derxistin ew e ku eger mirov baş were analîzkirin wê gerdûn jî baş bê fêmkirin. Di felsefeyê de hukmê "xwe bizanibe" vê rastiyê îfade dike. Xwezanebûn bingehê hemû zanebûnan e. Lewra zanebûnên bêyî xwe bizanibe werin bidestxistin ji rê derketin û fikirsabitbûnê zêdetir tiştek nîne. Ji ber vê yekê, tevger û saziyên xwenizan ên di civaka mirov de derketine, bûne xwedî roleke serhişk û belovajî. Mirov dema nebe xwediyê agahî û zanebûna xwe, li derveyî vê zanebûnê hemû sîstemên civakî yên têne avakirin dibin sedemên nakokiyên anormal û bûyerên xwînrij, karektera wan a mijok jî bi sedema vê agahiya serhişk û sabit e. Eger welê be, wê demê pêvajoya pêşketina xwezayî ya civaka mirov tê qebûlkirin û wexta em dibêjin; ev yek jî divê bi agahiya mirov bi xwe be, em qanûna bingehîn a gerdûnî yanî qanûna civakî destnîşan dikin.

Li ser hîmê vê feraziyê, emê karibin çi li ser agahiya mirovê civaka xwezayî û agahiyên wî yên derbarê xwe de bibêjin? Mirovê civaka xwezayî klanê ku endamê wê ye, herî kêm wek hemû endamên din ên klanê bi pîvana parastin û hebandinê ya "bêyî wê nabe" girêdayî ye. Her endamê klan û qebîleyê ji yê din jiyaneke cihê û payeberz nafikire. Jiyaneke li derveyî klanê jî nafikire. Dikare nêçîrê bike û heta dikare mirovxuriyê bike. Lê ev hemû ji bo klan û qebîleyê tên kirin. Pîvana di nav klanê de "yan hemû yan hîç" e. Agahiyên derbarê civakê de hemû van taybetiyên klanan destnîşan dikin. Hebûn û şexsiyetek in. Hukum û şexsiyeta ferdan li derveyî klanê nayê fikirîn. Girîngiya klanê di bingehê destpêk û bûyîna şêwaza mirov de heye. Civakeke ku tê de çîn, hîyarerşî, mêtingerî û serhevrebûn nîne. Bi mîlyonan sal meşiyaye. Ji vê mirov dikare encameke wiha derbixe; cinsê mirov wek civak têkiliyên xwe demeke dirêj bêyî serdestiyê bi pîvana piştgiriyê rê ve biriye. Xwezayê wek "dayikek" di himbêza wê de mezin bûye, di mejiyê xwe de bi cih dike. Di nav xwe û xwezayê de tevdebûn pîvaneke bingehîn e.

Sembola têgihîştina li klanê totem e. Dibe ku totem yekemîn têgîna mucered û ne berçav a sîstemekê be. Ev nîzam ku wek dînê totem jî tê nirxandin pîrozbûna destpêkê û sîstema tabûyan ava dike. Klan xwe bi sembola totem pîroz dike. Bi vê rê, cara pêşîn têgîna exlaq jî dikeve jiyana mirov. Pir baş serwext e, eger koma klanê nebe jiyan dewam nake, wê demê hebûnên civakî pîroz in, divê wek nirxên mezin bêne sembolîzekirin û stû ji wan re were xwarkirin.

Baweriya dînî jî hêza xwe ji vê çavkaniyê werdigire. Bi vî awayî dîn dibe yekemîn forma têgihîştina civakî. Ew û exlaq hevdu temam dikin. Ji zanebûn û têgihîştinê ber bi baweriyeke hişk ve diçe. Têgihîştina civakê êdî bi forma dîn dimeşe. Dîn bi vê taybetiya xwe, dibe hafiza bingehîn a civakê, çavkaniya exlaq û kevneşopiyeke bi bingeh. Civaka klanê, bi pratîka xwe çendîn zanebûn û têgihîştinê pêş de dibe vê yekê hemû bi totem yanî bi qabîliyeta xwe ve girê dide. Wek sembol totem û di rastiyê de jî koma mirovan her diçe serketinê bi dest dixîne û pê re pîrozkirina serketinan tê. Pîrozkirin qûtsiyetê û qûtsiyet jî dibe hêza civakê. Pîrozbûna bi hêza civakê pêk hatiye zêdetir xwe eşkere bi sêhr û efsûnkariyê nîşan dide. Asta têgihîştinê dikare xwe bi efsûnkariyê bixe pratîkê. Sihirbazî jî dayika zanistê ye. Jin bi sedema timî li xwezayê temaşe dike, zayînê nas dike, jiyanê dibîne û ev yek wê dike zana û hozana civakê. Ji ber vê rastiyê ye, sihirbaz û efsûnkar bi piranî jin in. Bi sedema xebat û tevgera xwe di civaka xweza de çi diqewime, çi dibe, herî baş jin fêm dike. Ji vê serdemê, li ser hemû berhemên hatine verotin û niqirandin şopên jinan hene. Klan yekîtiyek e, li dora jina dayik pêk tê. Zarokanîna jinê, nertina wê li zarokan û bi sedema nebatan baş berhev dike, ew dikare baş xwedî jî bike. Zarok tenê dayikê nas dike, hînê mêr wek milk li ser jinê xwediyê tesîrekê nîne. Nedihat zanîn jin ji kîjan mêrî ducanî dibe, lê dihat zanîn zarok ji kîjan jinê dibe. Ev mecbûriyeta xwezayî, hêza civakîbûna xwe dispêre jinê jî nîşan dide. Peyvên di vê serdemê de bûne têgîn bi piranî mê ne, û ev jî vê rastiyê îspat dikin. Di vê serdemê de şervanî û serdestiya mêr, paşê bi nêçîra heywanên xurt derdikeve pêş. Mêr bi taybetiyên xwe yên bedenî û fizîkî diçe dûr nêçîrê û neçar dimîne klanê ji xeteran biparêze. Ev rolên mêr ên diyarker nînin, sedemên tepisok mayîna wî jî rave dikin. Di nav klanê de têkiliyên taybet hê pêş neketine. Berhevkirina nebatan û nêçîr a her kesî ye. Zarok ên hemû qebîlê ne. Ne mêr û ne jî jin hê taybet nebûne. Ji ber van taybetiyên bingehîn ji civakê re tê gotin civaka seretayî ya komînî.

Wek encam em dikarin bibêjin; forma klanê û awayê wê; zemînê pêşketina têgînên bawerî û zanebûna bingehîn in, di heman demê de bîr û hafiza seretayî û derketina civakê ye. Di klan û qebîleyê de civakeke têkûz a xwe spartiye hêza jinê û hawîrdora xwezayî heye. Mirovatî hebûna xwe bêyî mêtingerî û zordestiyê, bi piştgiriya hevdu dimeşîne. Bi gotineke din mirovatî ji van nirxên bingehîn pêk tê. Ev tecrubeyên civakî yên bi mîlyonan sal ajotine ji dest neçûne, jixwe fikirandineke berovajî tewş û beradayî ye. Di xwezayê de weke ku ti

tişt wenda nabe, di şêwazê hebûna civakê de ev rastî hêza xwe hê zêdetir dewam dike.

Yek ji dabaşeke girîng ku zanistê tespît kiriye; pêşketinên pişt re dibin ên beriya xwe jî di hundurê xwe de dihewîn in. Rast nîne ku tê gotin; dijber hevdu tine dikin û bi vî awayî pêş dikevin. Li gorî rêzika diyalektîkê tez û antî-tez di sentezê de hebûna xwe di nav dewlemendiyeke mezintir de dewam dikin. Hemû tekamul û beridandin vê rêzikê piştrast dikin.

Pêşketina nirxên serdema klanê di nav sentezên nû de dewam dikin. Eger îro jî têgînên wekhevî û azadiyê wek du têgînên bingehîn werin naskirin, ev yek bi saya jiyana serdema klaniyê ye. Wekhevî û azadî bêyî bibe têgîneke mirov lê serwext bibe, bi awayekî xwezayî di şêwaza jiyana klan de veşartiye. Ev têgînên bi dizî di bîr û hafiza mirovan de dijîn, dema bêne wendakirin, wê dîsa bi derbên xurt xwe wek pîvanên bingehîn ên civaka pêşketî ferz bikin. Wexta civak ber bi saziya dewlet û hiyarerşîk ve biberide û biçe, azadî û wekheviyê bi dijwarî van saziyan bişopîn in. Ya rastîn a dişopîne di cewherê xwe de civaka klanê bi xwe ye.

**B - Civaka dewletparêz a hiyarerşîk**

**Derketina civaka kole**

Li gorî pîvanên esas têne qebûlkirin, dabeşkirina demên civaka mirov bi awayên cûrbecûr mumkîn dibe. Eger awayên zêhniyetê yên bingehîn pîvan werin qebûlkirin, dabeşkirineke girîng wiha tê kirin; serdema mîtolojîk, metafizîk û ilmên pozîtîf. Eger pîvanên çînî esas werin qebûlkirin dabeşkirinê wiha bê kirin; komîntiya seretayî, koletî, feodal, kapîtalîzm û sosyalîzm, pêvajoya pişt re jî gelek caran wek dabeşekî hatiye nirxandin. Di dîrokê de dabeşkirin li gorî medeniyetên çandê yên bingehîn jî pirî caran hatiye kirin.

Lê belê pîvana ji bo dabeşkirinê ya ez dixwazim esas bipejirînim, aliyê xwe yê felsefî-ilmî girantir e. Tevgera giştî ya gerdûnê wek prensîb esas qebûl dike. Felsefeya ku Hegel bi piranî bi kar aniye û kiriye bingehê felsefeya xwe; tez, antî-tez û sentez, eger wek bingehê sîsteman baş were bi karanîn, wê pêvajoyê zelaltir bibin. Hemû hebûnên di gerdûnê de bi awayekî dualî ne, û bi aliyekî nakok re dikarin tevbigerin û bilebitin. Ev liv û lebat mekanîk nîne. Tevgereke afirîner e, di cewher de guhertin û pircurebûnê pêk tîne. Mînak; mumkîne gerdûn bi dualîteyeke hebûn-tinebûnê were destpêkirin. Dema hebûn û tinebûn têne hemberî hevdu tiştekî nû ava dibe. Ew jî tevger bi xwe ye. Hebûn bêyî tinebûnê nikare tevbigere. Di cewherê xwe de hebûn bi berxwedana xwe ya li dijî tinebûnê

heye. Dema hebûn tinebûnê, tinebûn jî hewl dide hebûnê biqedîne, di encamê de aliyê sêyemîn derdikeve holê, bi awayekî wek sentez gerdûna pêk tê derdikeve holê. Helwestek din mîna vê, dualîtiya pirtik-pêlan e. Pirtik û pêl nikarin bi serê xwe hebin, tenê têkiliya di navbera herduyan de tevgerê pêk tîn in û bi awayekî hebûnê sentez dikin.

Dîsa hemrengî û pirrengî jî dualîteyên heman encaman didin. Hemrengî tenê dikare bi pirrengîniyê hebûna xwe îspat bike. Pirengînî nebe, bi awayekî hemrengî tine dibe. Em nêzî kîjan hebûnê bibin, emê li heman rewşê rast bên. Mînakek din a hê dikare me serwext bike, dualîtiya bican û bêcaniyê ye. Ji bilî gerdûna giştî ya bi can, li cîhana me ya pêşketina tevgerê dewlemend dibe, ji maddeyeke cuda û cihêreng xwe bi xwe bi metabolîzmayê hildiberîne û dikare atmosfereke bi can biafirîne. Rastiya pêşketina gerdûnê ya sînor nas nake hê jî ji aliyê zanistê ve tam ji hev nehatiye derxistin û ev çipkirineke awarte temsîl dike. Îzah û ravekirina bicanbûn û zindîtiyê wê bibe yek ji mijarên bingehîn ê zanistê. Nexşeya genan û mijara kopîkirinê nayê maneya çareserkirina vê rastiyê. Dîsa rêza molekulan a rê li ber bicanbûn û zindîtiyê vedike jî bi serê xwe nikare vê rastiyê rave bike. Bêguman ji bo zindîbûnê rewşa der ve ya (atmosfer-hîdrosfer) û nîzama molekulan hewce ye. Lê ev tenê hîmên zindîtî û bicanbûnê ne. Ev nîzama maddî ye. Ya girîngtir ew e ku têkiliya maddî bi rastiya bicanbûn -zindîtî - û manayê re çî ye. Materyalîzma hişk şaşiya xwe ya herî girîng ew bû ku zindîtî û mane bi rêza maddî re yek tişt dihesiband. Fîzîka kûantûm jî vê hemrengiyê hildiweşîne. Şêwazekî mîna pêhesînê neçar tê qebûlkirin. Di nav ruhberan de rewşa mejiyê mirov jî hê bi awayekî seyr balê dikişîne. Mirov dikare, însan wek xwezaya herî baş a dikare xwe bifikire bi nav bike. Ya girîngtir, xweza çima hewce dibîne xwe bifikire? Qabîliyeta maddeyê ya fikirandinê çavkaniyê xwe yê bingehîn heta ku xwe dirêj dike? Wexta em van pirsan dikin, mebesta me afirandina pirsgirêkeke nû ya ji bo lêgerîna xwedayekî nîne. Zêdetir, têgînên gerdûnê, hebûnê û xwezayê bi îzah û ravekirinên ji çavdêriyên me yên seresere wêdetir, hewceyî bi analîzeke baş dibînin. Em bi têgihîştineke (paradigma) gerdûnê ya di hilbirandineke dewlemend, pirreng û pêşketinê de sînor nas nake, rûbirû ne. Têgihîştinên mirovatiyê li ser gerdûnê di serdemên cuda de bi xwe re helwestên cuda yên jiyanê derxistin holê, mînak; paradigamayên zanista pozîtîf, metafizîk û mîtolojiyê, têgihîştin û helwestên cuda yên jiyanê derdixin pêşberî me. Di mîtolojiyê de her

tişt xwedayekî xwe heye. Di metafizîkê de sedema liva destpêkê yanî têgihîştina li xwedê heye. Ilmê pozîtîf jî bi meteryalîzmeke hişk hewl dide her tiştî rave bike. Li ser xeteke rast û bi pirsên zêde "çima" felsefeyek tê deribandin û pêşxistin. Eger helwesta cîhana heywanan jî bihata zanîn wê rewşê balkêştir bûya. Gelo teyr û teba bi hiseke çawa li cîhana der ve dinerin. Wek gel dibêje; "mîna ga li trênê dinere" şibandineke seyr e. Gelo nerîna keviran û çivîkan çawa ye. Bêguman helwestek wan jî heye. Bi tevahî xweza helwestek e. Hem jî helwestek e, bêsînor tevdigere.

Ez vê ravekirin û îzaha bi têgînan ji bo vê dikim; rewşa mirov û hebûna wî jî rastî û qewmîneke berçav e. Eger em bi giştî biçin sûbjektîvîzmekê, em karin bibêjin; wê ji destpêkê heta dawiyê wek qewmîn û rastiyekê hebûna xwe dewam bike. Di vê qonaxê de pirsa derdikeve pêşberî me ev e; emê tez, antî-tez û senteza vê qewmîn û bûyerê çawa deynin. Eger em mirov û civaka wî wek hebûneke xwediyê hêza herî watedar bi nav bikin, dualîtiya ji bo vê qewmînê û destnîşankirina senteza wê ya dawî, wê me bigihîne têgînek herî ilmî. Eger em mirov in, û bi mirov re eleqeder dibin, wê demê diyalektîka vê hebûnê (diyalektîk=guftûgoya dualî) çawa dimeşe û ber kîjan sentezên muhtemel ve diçe, yan jî vediguhere. Ilmên civakî di destpêkê de û beriya her tiştî divê van têgînan analîz bike û ji hev derîne. Di nav pêkhatina giştî ya gerdûnê de mirov hebûneke balkêş e, û heta têgînên bingehîn neyên analîzkirin, mirov nikare bigihîje ilmekî rastîn ê civakî. Ya ku divê were kirin, mirov xwe di cîhana qewmîn û bûyerên bêhejmar de nefetisîne. Yek ji sedemên bingehîn tevlîheviya ilmên civakî jî ev rastî ye.

Rastiya civakê ya ji serdemên mîtolojîk dest pê kir, bi dînên yek xwedayî û felsefeya metafizîk hê tevlîhev bû, ket rewşek aloz; bi ilmên pozîtîf jî bi temamî bû girêkeke kor. Lewra teorî, feraziye û têgînên heyî ji ravekirina bûyerên diqewimin zêdetir bi şaşî û çewtiyan hatine dagirtin. Di serdestbûna serdemeke mêtinger û xwînrij a mirovatiyê mîna kapîtalîzm de roleke diyarker a van îzah û ravekirinên çewt heye. Eger mirovatî cewherê bingehîn ê hebûna xwe civatê rast analîz neke, xuya ye encam dînozortî ye. Piştî her du şerên mezin ên cîhanê, civakzanan hewl dan xwe nû bikin. Di encamê de pir kêm tespîtên rast kirin, hewldanên wan pir piçûk man. Ekolên bi îdeal ên mîna Marksîzmê jî tevî hin analîzên bi sînor ê tevlî tespîtên mijara gotinê kirin, bi taybetî, cîhana bindest û mêtingehan a li ser navê wan tevdigeriyan bi têgihîştina siyaset û

dogmayên nû ve girê dan û nekarîn xwe ji rola yêdekbûna sîstema civaka serdest xilas bikin. Ya rastîn nekarîn îdeala xwe pêk bînin.

Di qada civakzaniyê de gelek ekolên din jî nekarîne bi qasî komên dîn û felsefeyên serdema destpêkê û navîn roleke serketî bilîzin. Ev yek ji helwestên wan ên li hemberî bûyerên diqewimin baş tê fêmkirin. Di şerên gihîştin asta qirkirinê, hêrsa kar a nehat gemkirin û tarûmarkirina ekolojiyê de para sereke û mezin a ilmê civakî û saziyên wê ne. Ilmê Civakî û saziyên wê, bi awayekî bi ti serdemê re neyê rûbirûkirin, ketiye xizmeta şer û desthilatdariya siyasî, lewra di nav vê rewşê de berpirsiyarê sereke ye. Ilmê Civakî û saziyên wê, bi sedema nekarîne şer û desthilatiyên siyasî rawestînin û hêrsa qezencê ya bêsînor gem bikin, îflas kirine, her weha îxaneta wan a li hemberî mirovatiyê jî îspat dibe. Lewra ji bo çareserkirina pirsgirêkên bingehîn ên mirovatiyê, têgihîştineke têr û nû ya ilmên civakî û avahiyên wê, neçare mîna xebateke hêja û sereke di rojevê de cih bigire. Eger bi vî awayî bibe, çalakî û rêxistinî dikare li ser hîmekî rastîn qad û cih bibîne.

Têgihîştina li ilmê civakî ya em dixwazin pêş de bixînin pêwîste di vê çarçoveyê de nêzîkatî lê bê kirin. Feraziye û têgînên bingehîn ên li ser vê xetê, divê wek ceribandinan bêne pejirandin. Hewldanên di vî warî de dikarin zêde bibin, derfetên çareseriyê biafirînin û bibin sazî. Ceribandina me ya pêkanîna têgînên giştî jî divê li ser vî esasî bêne fêmkirin.

Me di beşê berê de rave kiribû ku mirovatî di destpêkê de komên pêşîn ê em karin wek "civata xwezayî" bi nav bikin, pêk tînin. Dîsa me têgihîştina (paradigma) xwe ya gerdûnê eşkere kir. Rêxistiniya civakî ya bi şêwazê klan di zeman û mekan de belav dibe, berfireh û cûrbecûr dibe, ev yek di xwezaya vê şêwazê de heye. Civata li dora jina dayik mezin dibe û nasnameya xwe xurt dike, li gorî agahiyên di dest de hene di nav vê civakê de nerehetiya mêr dest pê dike. Jin-dayik zarok li dora wê zêde dibin û ji bo alîkariya wê bike rû dide hin mêran û ev yek jî rê li ber çavnebarî û hêrsa mêrên din vedike. Ya girîngtir jin-dayik nîzamê malbatiyê pêş de dibe. Di vê nîzamê de xwarin, lixwekirin, alav û amûrên din tîne cem hevdu. Jin bi çavdêrî û rola xwe di sihir-efsûnkariyê de zana dibe. Di vê nîzama malbatî û kedîkirinê de çiqas zarok û mêrên dost (xizm) li dora xwe bide hevdu, ew çend dibe jineke bi hêz. Bi vî awayî rewşeke ayînî ya jinê ku pêşî lê nayê girtin, pêş dikeve. Li gorî belgeyên di dest de, nîzamekî berfireh ê dînî yê xwedawendan, di ziman de nîşaneyên mêbûnê, verotin û niqrandinên li ser asaran, hêza jin-dayikê pir

eşkere nîşan didin. Bi awayekî xweza, piraniya mêran dûrî vê nîzamê ne. Jin-dayik kesên bêkêr dibîne û piranî yextiyaran li derveyî vê nîzamê dihêle.

Di destpêkê de ev nakokiya piçûk her ku diçe mezin dibe. Bi pêşketina nêçîrê, hêza mêr a şer derdikeve pêş û bi vê re zanebûna mêr jî zêde dibe. Pîr û yextiyarên li der ve jî têne hîştin li ser vî hîmî, ber bi îdeolojiyeke serwer a mêran ve diçin. Bi taybetî dînê "şamanîzm" vê rastiyê bi awayekî balkêş nîşanî me dide. Şaman zêdetir protîpa rahîbên mêr temsîl dikin. Li dijî jinan bi awayekî sîstematîk tevdigerin û dixwazin nîzama malê pêş bixînin. Dema jin xwediyê nîzama malbatî û kedîkirinê ye, mêr nîvkovî li bin holikan dihewe. Bi şamanîzmê mêr dikare nîzamekî dijber ê malbatê ava bike. Pîremêrên bi ezmûn ên li der ve hatine hîştin û şaman li hev dikin. Ev hevgirtina her du aliyan pêşketineke girîng e. Hin xortan jî digirin nava xwe û bi serweriya îdolojîk hukum li wan dikin. Bi vî awayî di nav komê de rewşa xwe bi hêz dikin. Bi hêzbûna mêr her ku diçe bi qîmet dibe. Hem nêçîrê dike, hem jî klanê li dijî xeterên ji der ve werin diparêze. Di vî karî de taybetiyên eskerî kuştin û birîndarkirin hene. Ev destpêka çanda şer e. Dema behsa man û nemanê tê kirin, neçare her kes bi otorîte û hîyarerşiyê ve girêdayî be. Kesê herî bi qabîliyet, gotin û otorîteya wî jî payeberz dibe. Li dijî çanda jin-dayikê, serweriya çandeke din, dest pê dike, pêş dikeve. Ev pêşketina hiyarerşî û otorîtê beriya civaka bi çîn, di dîrokê de destpêka qonax û werçerxeke girîng e. Naverok û rengê xwe ji çanda jin-dayikê cuda ye. Di çanda jin-dayikê de bi piranî berhevkirina gîhayan û paşê zîraet, xebateke hewceyî bi şer nabîne. Lê nêçîr ku bi piranî bi destê mêran hatiye kirin, çandeke otorîter û dijwar a şer e. Di encamê de otorîteya bavikanî rehên xwe berdidin.

Di civaka bavikanî de otorîterî û hiyarerşî esas e. Têgîna hîyarerşîk dema bi otorîteya pîroz a şaman re dibe yek, mînaka pêşîn a têgihîştina rêveberiya otorîter xwe watedar dike. Ev saziya otorîteyê wê li ser civakê mezin bibe û piştî ku çînîyatî di nav civakê de pêş dikeve, êdî dibe otorîteya dewletê. Otorîteya hiyarerşîk zêdetir şexsî ye, hê nebûye sazî, lewra bi qasî sazîbûna dewletê di nav civakê de xwediyê serdestiyê nîne. Meşa bi vê otorîteyê re nîv bi nîv li gorî dilxwaziyê ye. Girêdan û dilsozî bi berjewendiyên civakê têne destnîşankirin. Lê vê pêvajoya ku dest pê kiriye wê dewletê bizê û biwelide. Civaka Komînî ya Seretayî wê demeke dirêj li dijî vê pêvajoyê li ber xwe bide. Yên berhem di destê xwe de digirin û hiltînin, eger bi endamên komê re par ve bikin, rêz û hurmet, girêdan

û dilsozî ji otorîteya wan re tê nîşandan. Berhem hilanîn wek gunehekî mezin tê dîtin. Kesê herî baş ew kes e ku berhemên xwe parve dike. Di civata qebîleyan de hê jî têgihîştina "comerdî-camêrtî" ji vê kevneşopiya xurt a dîrokê tê. Cejin û roşan wek merasîmên roja parvekirina van berhemên zêde dest pê kirine. Kom, ji destpêkê ve, hilanîna berheman wek xeterek li dijî xwe dibîne û dijderketina li vê yekê, wek têgihîştineke hîmî ya dînî û exlaqî dipejirîne. Pir zehmet nîne, mirov şopên vê kevneşopiyê bi awayekî xurt di hemû doktrînên dînî û exlaqî de bibîne. Eger hîyarerşî bikêr be û bi camêriya xwe tiştekî bide, ji aliyê civakê ve hatiye erêkirin. Hiyarerşiyeke bi vî rengî jî roleke erênî û bi kêr lîstiye. Hiyarerşiya jin-dayikê ya bi vî rengî hê jî di nav hemû civakan de cihê rêzê û otorîteyê dibîne. Ev yek di heman demê de bingehê dîrokî yê têgîna "dayikê" ye. Ji ber ku dayik di şert û mercên herî zehmet de dizê û xwedî dike. Di vî warî de jî xwediyê rola sereke ye. Bêguman, hiyarerşî, otorîte û çanda li ser vî hîmî pêk bê, wê girêdan û dilsoziyeke mezin bibîne. Têgîna "dayikê" ji ber vê yekê, heta îro wek bingehê hebûna civakê bi hêz hatiye û wekî din îzaha vê rastiyê nîne. Weke ku yeqîn tê kirin, hurmet û rêza ji dayikê re bi sedema taybetiya wê ya zayînê nîne. Hewce ye dayik, wek rastiya civakî ya herî girîng û têgîna "dayika xwedawend" were fêmkirin. Deriyên wê li rastiya dewletê girtî ne û hemû taybetiyên ku rê nadin dewletê di himbêza xwe de dihewîne. Di çarçoveya vê nirxandinê de wê rast be ku em civaka xwezayî, wek teza destpêka hebûna mirov bi nav bikin. Mirovatiyê bi vê tezê hebûna xwe daye destpêkirin, beriya wê jiyaneke heywanî ye. Piştî wê jî li ser hîmê dijberiyê, civaka hiyarerşîk û dewletê pêş ketiye. Jixwe karekterê antî-tez ê vê serdemê, ji paşvexistin û tepisandina civaka xwezayî tê. Wek tez civaka xwezayî; sîstemeke civakî ye, di hemû warên jiyana mirov de xwediyê roleke sereke ye, û heta dawiya serdema neolotîk (li derdora 4000 BZ) bi tesîr rol lîstiye. Bi awayekî tepisokî heta îro di hemû çaviyên civakê de hebûna xwe dewam dike. Têgînên bingehîn ên civakî jî bi xwe re tîne. Malbat, qebîle, dayik, biratî, azadî, wekhevî, hevaltî, camêrî, piştgirî, cejin, lewendî, qûtsiyet û hwd. gelek rastî û têgîn ji vê sîstema civakî mane. Li dijî vê yekê, civaka dewlet û hîyarerşîk a herî zêde ev sîstem paş xistiye, taybetiyên xwe yên zordest jî ji vê digire. Rewşa xwe ya antî-tez ji vê taybetiyê digire. Ev her du sîstemên civakî di zikhev de dimeşin, ev li gorî qanûnên bingehîn ên diyalektîkê li cih in.

Di vir de nuqteyek ku divê em ji bîr nekin ew e; li gorî têgihîştina me ya diyalektîk, tez û antî-tez hevdu tine nakin, hevdu

paşve dixînin û dipesînin. Kengî sîstemên civakî, wek di hemû xwezayê de bibin tez û antî-tez wê hevdu bi hev re bimeşînin û hilgirin. Bêguman têkoşîna di navbera wan de wê rê li ber pêşketinê veke. Ti car tez di rewşa xwe ya berê de namîne, lê antî-tez jî wek qadirekî mutleq ti car pêşiyê xwe naxwe. Xwe pê xwedî dike û pêş de dibe.

Di vê nuqteyê de hewce ye em hinekî din diyalektîkê rave bikin. Di dema Marksîzma dogmatîk de tez û antî-tez di civakê de wek du tiştên hevdu tine dikin hat şîrovekirin. Şîroveyeke bi vî awayî, yek ji şaşiyên bingehîn ên teorîk bû. Di serî de ilmê biyolojiyê di hemû ilman de tê dîtin ku di pêşketin û veguherîna hemû rastiyan de alî hevdu xwedî dikin. Hevdu tinekirin rewşên îstîsnayî ne. Dîtina serdest ev e; tez û antî-tez, hevdu xwedî dikin. Ji bo îfadekirina vê rastiyê mînaka dualî a zarok û dê ye. Zarok bi dayikê re di nava nakokiyê de mezin dibe. Lê em nikarin bibêjin; zarok dayikê tine dike, heye ku em karin bibêjin; hevdu xwedî dikin ji bo nifş dewam bikin. Mînakek din mişk û mar e. Di vir de weznek di navbera pir zêdebûna mişkan û kêm çêbûna maran de heye. Eger mar nebûya, belkî mişkan ji dînozoran wêdetir her der xira bikirana. Her roja derbas dibe çêtir tê fêmkirin ku hebûnên li xwezayê bêmane nînin û hemû di nav ekolojiyê de xwedî cihekî watedar in. Lê dîsa jî têgînên "sînorên mutleq", "nuqteya herî jor" herî kêm li beşekî dema sînorkirî wek têgîn dikarin bêne qebûlkirin. Qanûnên bingehîn ên xwezayê pevgirêdayî û di zikhev de pêş dikevin, êdî hemû ilim jî bi van taybetiyan dihesin.

Wexta min sîstemên civakî nirxandin, guhertinek ez dixwazim bikim di mijara tesadufiyet û mecbûriyetê de ye. Ev her du têgîn bingehê wan qanûnên yezdanî ne. Di sîstema ramanê ya rojava de ev têgîn bi "çimayetiyek" dijwar û bi xeteke dûz a bênavber pêş ketiye û wek min di serî de hewl dabû rave bikim, bi pêşketinên di fizîka kûantûm û kozmosê de hukmê xwe wenda kiriye. Di pêşketina diyalektîkî de ji bo her rastiyê "neqeba kaosê" xwe nîşan dide. Statuya guhertinan vê neqeb-navberê ferz dike. Ev yek jî dide nîşan ku bêyî rawestan li ser xeteke pan a pêşketinê bi muceredkirina zêhnî helwesteke metafizîk îfade dike. Dibe ku her tim mumkîn nebe bi derketina ji neqebê pêşketineke dûz a xetê dest pê bike. Ji ber ku gelek bandor û têkiliyên di wê neqebê de dikarin rê li ber gelek û piralî bûyeran vekin.

Di civakên mirov de ji van neqeban re "herêma krîzê" tê gotin. Ji krîzê pêşketineke çawa ya civakî wê derbikive, asta têkoşîna hêzên

di bin bandora vê krîzê de dimînin, wê encamê diyar bikin. Ev encam bi qasî pêşketin dibe, ew çend mumkîne paşketin jî bibe. Jixwe têgînên paşketin û pêşketinê jî îzafîne. Her tim pêşketin li gorî hîpoteza gerdûnê jî nîne. Eger ev prensîb rast bûya wê demê wê îdeatiyeke metafizîkê bihata pejirandin. Li gorî prensîba pêkhatina gerdûnê, em nikarin behsa rastiyên mutleq bikin. Xweza bi mutleqiyetan pêş nakeve. Mutleqiyet neguherînê û wekxwebûnê îfade dike. Jixwe şêwazê hebûna me îspat dike ku tiştên wisa rast nînin. Di çarçoveya neqeba kaosê ya qanûnên xwezayê de pêşketina ber bi mirov ve pir nerm pêk hatiye, vê yekê mirov dikare bi qanûnên ilmên fizîk, kîmya û biyolojiyê bibîne. Di civaka mirov de jî qanûn têra xwe xwediyê karektereke nerm in. Maneya vê jî ev e; neqebên qanûnan pirr in, û zêde ne. Ji bo vê yekê rê didin derketin û pêşketina qanûnên nû. Bi vê ve girêdayî; ji ber ku asta azadiyê ya mirov pêş ketiye, di civaka mirov de pirrengînî û pircelebî derdikeve holê. Nermbûyîn azadiyê, azadî jî pirrengî û pircelebiyê tîne. Bi vê maneyê, mirov mûcîzeyeke xwezayê ye ku herî zêde dikare qanûnên xwe deyne. Lewra civaka mirov bi heman dewlemendiyê, pirr û zêde dikare qanûnên sîstema xwe pêk bîne.

Bi van faraziyeyên bingehîn, dixwazim vê nuqteyê îspat bikim; civaka xwezayî neçar nebû ber bi civaka dewlet û hîyarerşîk ve pêş bikeve, ev qanûneke rast nîne. Dibe ku meylek bi vî rengî hebe. Jixwe meyl mecbûr nîne heta dawiyê û bêrawestan biçe. Di beşê pêş de ezê car caran rave bikim ku tespîta Marksîst a wek "hebûna civaka çînî ji bo pêşketinê mecbûrî bû" li ser navê bindest û mêtingehan, yek ji şaşiyên mezin e. Bi vê tespîtê, sosyalîzm pêşin radestî serdestiya çînî tê kirin. Ji ber vê şaşiyê, marksîzm di dîroka xwe ya 150 salî de bû yedekê kapîtalîzmê. Eger dewlet, çîn û zor ji bo pêşketina civakan wek qonaxên mecbûrî bêne dîtin, wê demê berxwedana civaka xwezayî ya digihîje îro piçûk tê dîtin û heta tine tê hesibandin. Bi destê xwe dîrokê mîna xelatekê dide destê serdestan. Eger hebûna çînan wek çarenûs were qebûlkirin, bêyî hay jê hebe, dikare we bike destikê îdeologên çînên serdest. Ji vî alî ve, li ser navê bindest û mêtingehan roleke xeter dilîze. Dîrok weke ku di bin dagirkerî û êrîşên îdeolojîk û polîtîk ên bi vî awayî de hatiye hîştin.

Hiyarerşî û çînayetî karîbûn pêş bikevin. Lê ev pêşketin ji mecbûriyetê nebû, bi destê hêzên ku dewlet û hîyarerşî ava kirîn, bi xapandin û zordariya wan hat kirin. Li dijî wan, hêzên bingehîn ên civaka xwezayî her tim li ber xwe dan, her tim hatin berbendkirin û

di qad û neqebên herî teng de hatin asêkirin. Hin qad û neqeb bi temamî li wan hatin girtin. Sîstema serdest bi polîtîka û propagandayeke bingehîn karîbûye bide xuyakirin ku hemû civak ji dewlet û hîyarerşiyê pêk tê. Ev lîstika bi navê çarenûs û qederê, navnîşana wê metafizîk e. Hema hema dîn, mezheb, felsefe û ekolên ilmî yên neketibin vê lîstikê nînin. Ev yek jî koka wê diçe hezar salan berê ku îdeolojiya rahîb û qiral-xwedayan bi zora mezin a dewletê, bi propaganda û polîtîkayan li ser mejî û beden hukum kirin. Yê xwestiye ji vê lîstikê re mîtolojî, yê xwestiye felsefe û ew jî nebe jê re gotiye ekola ilmî. Encam; rewşa îro ya îdeolojiyên bûne dewlet û ilmên qaşo bêqusûr. Çiqas li ser para Marksîzmê ya di vî warî de were rawestîn li cih e. Ezê hewl bidim, van lîstikan kite bi kite û yên para wan tê de hene eşkere bikim.

Destpêkê nîzama malbatî ya jin-dayikê bû qurbana civaka hiyarerşîk. Di nav sîstem û civakê de ji beşên herî zordestî lê tê kirin, belkî di serî de jin tê. Ev pêvajoya ku beriya dîrokê hatiye jiyîn, di nav ilmên civakî de cih nagire, ev yek ji ber nirxên bi cihbûyî yên civaka serwer a mêr e. Jin hêdî hêdî tê kişandin nav civaka hîyarerşîk û taybetiyên xwe yên xurt ên civakî wenda dike. Ev di civakê de dij-şoreşeke bingehîn e. Em wexta li malbateke xizan a kedkar jî temaşe bikin û rewşa jinê hûr bikolin, emê bi awayekî balkêş û seyr, vê zordestî û xapandinê bi berfirehî bibînin. Bi sedemên pir piçûk û sivik, jin bi sedema namûs û evînê têne kuştin, ev mînak bi xwe jî nîşaneyeke piçûk e, eşkere dike ku bûyerên diqewimin çawa di bin serweriya mêr de ne. Eger ev pêvajo bi cudahiyên biyolojîk ên di navbera jin û mêr de bêne ravekirin, wê ev yekê şaşiyeke bingehîn be. Di têkiliyên civakî de rol û qanûnên biyolojîk derbas nabin. Pir zêde, mirov dikare ji ber taybetiyên nêr û mêbûnê têkiliyan binirxîne ku mijareke bi vî rengî ji bo hemû cinsan gengaz e. Ya rastîn, çanda jin-dayikê bi sedemên civakî ketiye bin tehekumê. Îdeolojî û zordariya tê meşandin bi tevahî ji ber vê yekê ye. Ravekirina mijarê bi ajoyên cinsî û derûnî, beropaşkirineke xeternak e.

Zilamê xurt ê bi nêçîrê bûye xwediyê hêzê li dora xwe komekê bi rêxistin dike û piştî ku li vê hêza xwe hayil dibe û dide qebûlkirin, berê xwe dide nîzama malbatî ya jin-dayikê û hêdî hêdî digire bin kontrola xwe. Ev pêvajo heta damezrandina yekemîn dewletên sîte dewam dike. Em ravekirina herî şahane ya vê mijarê di dema dewlet bajarên Sumeran de dibînin. Nivîsên li ser kevalan, vê rastiyê bi awayekî balkêş û zimanekî helbestwarî tînin ziman. Destana xwedawenda bajarê órûkê Înanna ku pêvajoya dewlet bajarên Sumer

da destpêkirin, pir balkêş e. Ev destan pêvajoya bîranîneke pir dijwar tîne ziman. Di destanê de çanda dayikanî û bavikanî, vê pêvajoyê hê di weznekê de ne. Xwedawenda órûkê Înanna diçe qesra xweda Enkî û ji wê derê 104 "me" yên xwe bi rêbazên cuda bi dest dixe û direvîne órûkê. Ev beşa destanê roleke kilît ji bo îzah û ravekirinê dilîze. Mebest ji "me"yan vedîtinên bingehîn ên şaristaniyê ne. Înanna bi israr tîne ziman ku vedîtin ên xwedawend-dayikê ne û di van vedîtinan de ti rola xweda Enkî tine, bi zordarî û qurnaziyan jê dizîne. Hemû hewldana Înanna ew e, vê çanda xwedawend-dayikê ji nû ve bi dest bixe. Li gorî texmînan ev destan BZ di salên 3000 de hatiye gotin. Di vê serdemê de hê hêza jin-dayikê bi hêza çanda bavikanî re di weznekê de ye. Ji vir û pêve, ev çand, ewqas li bêrehmiyekê rast tê, paşê xwe li navenda şaristaniya wê demê (New Yorka îro) Nîppûrê li kerxaneyek bi navê "mûsaqatîn" dît. Rahîbên Sumeran ji xwe re di zîgûratê de harem çêkirin û ji bo gel jî kerxane ava kirin. Bi destana Enûma Enîş ya BZ di salên 2000 de hatiye nivîsandin, em hîn dibin ku xwedawend Dîamat êdî pîrebokeke xeternak e û jina divê were parçe parçekirin temsîl dike. Gotinên dijwar û bêrehim ên di destanê de mehkûmiyetê îfade dikin. Pêvajoya pişt re, dînên yek xwedayî û sîstema civaka bûrjûwayê tê. Sîstema civaka bûrjûwaziyê jinê bi xemil û xêz dike, dixe qefesê û derî li ser digire. Di sîstemên civakî û dîrokî de li ser statuya jinê ewqas bombardûmaneke propagandayê ya îdeolojîk tê kirin êdî mejiyê jinê bi xwe jî ji vê yekê re dibêje çarenûs û bi cihanîna pêdiviyan jî wek hewcebûneke vê qederê dibîne. Dînên yek xwedayî vê yekê wek fermana xwedê dibînin. Felsefeya Yewnan jinê wek sedemê qelsiyê nîşan dide. Wek barekî bêkêr, wek zeviya mêr ku tê ajotin û hêjayî her cure helwestên piçûkxistinê tê dîtin.

Statuya jinê ya ku bi sîstema hiyarerşîk dest pê kir heta neyê analîzkirin û ji hev neyê derxistin, ne dewlet û ne jî civaka çînî ku xwe dispêrên sîstema hiyarerşiyê, wê werin fêmkirin. Ji lewra mirov nikare ji yek mijarên bingehîn a xwe tê de xapandiye xilas bike. Jin, ne wek cinsekê, wek mirov ji civaka xwezayî tê veqetandin û bi koletiyeke berfireh tê mehkûmkirin. Hemû koletiyên din jî bi koletiya jinê ve girêdayî pêş dikevin. Lewma heta koletiya jinê ji hev neyê derxistin û neyê fêmkirin, wê koletiyên din jî ji hev neyên derxistin û neyên fêmkirin. Heta dawî li koletiya jinê neyê anîn, wê koletiyên din jî bi dawî nebin. Jina zana ya civaka xwezayî çanda xwedawenda dayik bi hezarê salan jiyaye. Nirx û buhaya ku her tim hatiye mezinkirin çanda xwedawenda dayik e. Eger wisa be; çandeke

berfireh û demdirêj a civakê çawa hat tepisandin û îro bû bilbileke bi xemil û xêz a qefesê. Mêr dikarin li ser vê bilbilê dîn bibin, lê ew dîl û êsîr e. Heta dawî li vê dîlketina demdirêj û kûr neyê, ti sîstemên civakî nikarin behsa wekhevî û azadiyê bikin. Hukmê ku dibêje; asta jinê ya wekhevî û azadiyê, asta civakê ya di vî warî de destnîşan dike, rast e. Balkêş e, hê dîroka jinê bi rêkûpêk nehatiye nivisîn. Di ti ilmên civakî de cihê jinê rast nehatiye danîn. Yê ku herî dibêje; ez ji jinê re bi hurmet im jî, vê yekê bi qasî ku bi kêra arzû û xwestekên wî were, wek hukmekî qebûl dike. Îro jî jin, ji bilî aliyê xwe yê cinsî wek dosteke mirov ji aliyê ti mêrî ve nehatiye pejirandin. Ji bo peydakirina mêrekî ji vê qonaxê derbasbûyî û yan jî afirandina mêrekî bi vî awayî, gaveke bingehîn e, bi aliyê azadiyê ve hatiye avêtin. Ezê vê mijarê hê jî analîz bikim û hewl bidim hê zêdetir hûrûkûr li ser rawestim.

Di civaka hiyarerşîk de mijareke din heye divê em bi girîngî li ser rawestin. Ew jî ev e; pîremêrên bi ezmûn û tecrûbe ciwanan bi xwe ve girê didin û li ser wan bi awayekî zordariyê dikin. Di lîteraturê de ji vê rastiyê re dibêjin; jerontokrasî. Tecrûbe mirovê yextiyar û pîr dike xwedî hêz, lê li aliyê din bi pîrbûnê re mirov qels û hejar dibe. Bi van sedeman, pîr mecbûr dimînin ciwanan bixin xizmeta xwe. Ji bo vê yekê bidin kirin jî bi mejiyê ciwanan dilîzin. Hemû tevgera ciwanan dixin bin destê xwe. Civaka bavikanî ji vê rastiyê hêzeke mezin digire. Hêz û bedena wan weke dixwazin bi kar tînin. Ev hewcehîştina ciwanan heta îro jî zêdetir dewam dike. Serdestiya îdeolojî û tecrûbeyê bi hêsanî nayê şikandin. Xwestina ciwanan a azadiyê jî bingehê wê ji vê rastiya dîrokî tê. Ji zanyarên berê heta ilimdarên îro û saziyên wan, agahiyên wek stratejîk û nazik bi nav kirine ji ciwanan vedizîne. Agahiyên didin, zêdetir ji bo tevizandin û hewcehîştina ciwan e. Yan jî dema agahiyê didinê amûran nadinê, wek taktîkekî neguher ê rêveberiyê timî serî lê digerînin. Sîstemên zordarî û polîtîk ên propagandayê, îdeolojî û taktîk ên li ser jinê têne meşandin, hemû ji bo ciwanan jî têne ceribandin. Xwesteka ciwanan a azadiyê, ne ku ji temenê wan tê, ji vê rewşa zordar a civakê tê. Gotinên mîna; xeşîm, beredayî, serxweş û hwd. ji bo piçûkxistina ciwanan hatine bi kar anîn. Naxwe ti têkiliya wê bi rastiyê re nînin. Dîsa ji bo hêza ciwan berê xwe nede sîstemê û nîzama serdest zirarê nebîne, ciwan bi seksê re tê lebikandin, bi dogmayên çor, jiber û hişk ve tê girêdan. Ciwantiyeke ber bi azadiyê ve ketibe rê, zehmete pêşî lê were girtin. Li serê sîsteman bela herî mezin ciwan in. Di tevahiya dîrokê de bi navê

perwerdê ciwantî kirine qurban û tiştên ku aqil jê nagire û xeyal nayên kirin, bi sera de anîne. Di pêşketina civaka hîyarerşîk de piştî jinê, vê rewşa ciwanan roleke diyarker lîstiye. Sîstema ku ciwan xistin bin destê xwe heta dawiyê ji xwe piştrast e. Pişt re sîstemên civaka dewletparêz hatin û hemûyan bi heman awayî kirinên xwe li ser ciwanan ferz kirin. Ciwantiyeke mejiyê xwe hatibe tevizandin û şuştin, mumkîne her kar pê bê kirin. Şer jî di navê de, her karê zehmet dikare bike. Li rêza pêş her kar û xebata zehmet pê tê kirin. Bi kurtî; mirov bi pîrbûnê re qels dibe, lê bi tecrûbeyan dibe xwedî hêz. Mirovên pîr bi hêza xwe ya tecrûbeyê qelsiya xwe ya ji pîrbûnê ji holê radike, ji bo vê yekê jî hêza ciwanan dixin xizmeta xwe. Ev rastiya ku xwe di sîstema bavikanî de bi rêkûpêk kiriye heta îro dewam dike. Divê ez careke din destnîşan bikim ku ciwan hêzeke fizîkî îfade nakin, ew rastiyeke civakê ne. Çawa jintî mijareke fizîkî nîne, rastiyeke civakê ye, ciwantî jî bi heman rengî ye. Yek ji wezîfeyên bingehîn ê ilmên civakî ew e ku divê dakeve çavkaniya van mijaran û rastiyên hatine beropaşkirin û belovajîkirin sererast bike. Di vê çarçoveyê de divê em li ser mijara zarok û sêlekan jî rawest in. Jixwe sîstemek ku jin û ciwan kirin bin destê xwe, yekser nebe jî wê zarok û gedeyan jî bigire bin kontrola xwe. Pir girîng e ku mirov, helwestên belovajî yên civaka dewletparêz û hiyarerşîk li dijî zarok eşkere bike. Zarok ji ber rewşa dayikê mumkîn nabe li ser hîmên rast perwerdê bibîne, lewra ev yek tevahiya bergî û paşeroja civakî dixe nav derewê û belovajî dike. Ji bo zarokan sîstemeke zordar û derewker a perwerdê tê avakirin. Sîstem, bi pir awayên cihêreng hewl dide ku zarok hê di dergûşê de hewce bike. Gotina; "heft salî çibe, bibe heftê salî jî wê ew be." (kurmê şîrî heta pîrî) vê rastiyê îfade dike. Himbêza jiyana azad a civaka xweza ji zarokan re timî wek xeyalekê tê hîştin, û destûr nayê dayîn ku zarok ti car van xeyalan bijîn. Yek ji wezîfeyên esîl ew e ku mirov zarokan bi van xeyalên xwezayê bitamijîne.

Pêwîste carek din were destnîşankirin ku serdestiya sîstema bavikanî mecbûriyet nebû. Her wiha derketina vê sîstemê qanûneke xweber a saf jî nîne. Ji ber ku di pêkhatina dewletbûn û dabeşbûna civakê de qonaxa bingehîn teşkîl dike, divê hûrûkûr li ser were rawestîn. Têkiliyên li derdora jin-dayikê saz dibin, ji têkiliyên hêz û otorîteyê wêdetir bi piştgiriyeke organîk pêk tên û ev şêwazê têkiliyê li gorî cewherê civaka xwezayî ne. Ev şêwazê têkiliyan çep û çewt nîne. Rê nade otorîteya dewletê. Ji ber ku têkilî bi awayekî organîk pêk tên, hewceyî bi derew û zordariyê nîne. Ev nuqte eşkere dike ka

çima dînê şamanîzmê bi giranî dînê mêran bûye. Wexta mirov ji nêz ve li şamanîzmê dinere, bi hêsanî dibîne ku pîşeyek e, tê de ji aliyê hêzê ve xwenîşandan û xapandineke xurt heye. Ji bo li ser civaka xwezayî ya nişmî, bi qurnazî otorîte were danîn, bi nazenînî hêz û mîtolojî tê amadekirin. Şaman êdî ber bi rahîbbûn û oldarbûnê ve diçe. Têkiliyên bi pêşiyên pîr û bavpîran re dikevin pêvajoya îttîfaqê. Ji bo serdestiyeke tam hewceyî nêçîrvanên xurt in. Koma herî zêde bi hêz û nêçîrvaniya xwe bawer, hêdî hêdî rengê yekemîn saziya eskerî digire. Di destê van sê beşan de her diçe nirx û qabîliyet kom dibin. Dora jin-dayikê bi qurnazî tê valakirin. Nîzama malbatî ya jin-dayikê her ku diçe dikeve bin kontrolê. Jina berê ku li ser mêr xwedî gotin û bi tesîr bû, hêdî hêdî dikeve bin otorîteya nû. Otorîteya herî bi hêz a yekemîn li ser jinê hat avakirin û ev yek tesaduf nîne. Jin hêz û berdevka civaka organîk e. Heta ew li dawiyê neyê hîştin sîstema bavikanî nikare bi ser bikeve. Ji wê jî wêdetir saziya dewletê nayê avakirin. Lewra li dawîhîştina hêza jin-dayikê qonaxeke stratejîk e. Li gorî agahiyên bi dest ketine û mîtolojiya Sumeran; ev pêvajo pir dijwar û çetîn derbas dibe. Di dînên yek xwedayî de fîgûrê jinê Lîlît-Hawa taybetiyên pêvajoyê bi awayekî balkêş nîşan didin. Lîlît jina serî natewîne, Hawa jî jina teslîmbûyî û çîzkirî îfade dike. Jixwe tê îddîakirin ku jin ji parsûyê mêr hatiye afirandin û ev yek jî pîvana hewcebûn û girêdana jinê ya bi mêr ve eşkere dike. Li aliyê din, di şexsê Lîlît de dijûnên wek lanet, pîrasêr, pîrebok, hevala şeytên û bêbextî yên li jinê hatine kirin, şîdeta xwe li hev rakişandina jin û mêr îspat dike. Bawerî, raman û çanda hezar salan eşkere dike. Eger têkçûna jinê ya civakî baş neyê analîzkirin û ji hev neyê derxistin, wê taybetiyên bingehîn ên çanda civaka serdest a mêran jî rast neyên destnîşankirin. Dibe ku li ser damezrandina civaka mêtiyê hîç neyê fikirandin jî, lê heta damezrandina civakî ya mêr neyê fêmkirin, wê saziya dewletê jî neyê analîzkirin û ji hev neyê derxistin. Bi dewletê ve girêdayî, wê çanda "şer" û "îqtîdarê" rast neyên bi navkirin. Em li ser mijarê hûrûkûr radiwestin, ji ber ku pişt re di encama hemû çînîtiyên civakî de kesayet-xwedayên xeternak, her cure sînor, mêtingeh û canstendinên bûne, divê bêne zelalkirin. Eger mirov, bi paradigmaya çavekî pîroz li laneta mirovatiyê -desthilatadariya siyasî, dewlet- binere, wê wextê di zêhniyeta mirovatiyê de wê dij-şoreşa herî qirêj pêk were. Jixwe ya bûye jî ev e, û wek hêmanê pêşketineke mecbûrî hatiye nirxandin -marksîzm jî di navê de- û wisa têgihîştin dij-şoreşeke herî xeter e. Eger dîrok di vê çarçoveyê de li serad û moxila rexnekirinê neyê xistin, her şoreşa

were kirin, wê di demeke kin de bibe dij-şoreş û wê nikaribe xwe ji vê yekê xilas bike.

Pêşî, civaka xwezayî ya cîhana jinê, dûre ya ciwan û zarokan hat hilweşandin. Li ser civakeke nû ya hîyarerşîk bi zordarî û derewê (mîtolojîk) hat avakirin. Bi vê pêvajoyê re di zikhev de dij-şoreşên bingehîn qewimîn. Xweza hat tarûmarkirin û her ku çû mirov li dijî xwezayê rawestiya. Feraziya, bêyî şer û nêçîrê civak nikare bijî, rast nîne. Cureyên heywanan ên bi goşt debara xwe nakin, ji yên bi goşt debara xwe dikin, hezar caran zêdetir in. Pir hindik cureyên heywanan xwe bi goşt xwedî dikin. Wexta mirov hûrûkûr li xwezayê temaşe bike, ji bo debar û jiyanê, pel, pincar û nebatekî dewlemend heye. Heywan encamê pêşketina nebatan e, yanî heywan ji nebatan e. Ev yek li gorî rêzetêkiliya diyalektîk e. Ji ber ku heywanê destpêkê heywanekî din nîne ku bixwe, lewra bi nebatan xwe xwedî kiriye. Mirov dikare goştxwarinê wek ji rê derketinê bibîne. Eger hemû heywanan hevdu bixwarana wê wextê ti cureyê heywanan nediman. Jixwe ev, dijberî rêzika tekamul û beridandinê ye. Di meylên bingehîn ên xwezayê de her tim ji rêderketin dibe. Eger em ji rêderketinê bikin hîmê bingehîn, ev ji bo kîjan cure û cinsî dibe bila bibe, wê ew cure û cinsê qir bibe. Em vê rastiyê bi awayekî balkêş di bi hevremayîna hemcinsan de dibînin. Eger her kes bi hemcinsê xwe re bijî yanî têkiliyeke homoseks deyne, wê xweber dawî li koka mirov bê. Ev îzah û ravekirina kurt jî pir baş, ji rêderketina civakî ya li ser hîmê çanda şer û nêçîrvaniyê, li ber çavan radixîne. Ne tenê ji aliyê maddî ve, çanda kuştinê, ji aliyê manewî ve jî encamên xwe girantir in. Eger komekê, kuştina heywanan û hemcinsê xwe kiribe şêwazekî jiyanê û vê mecbûr bibîne -ji bilî parastina neçar- wê êdî her cure makîne, amûr û saziyên şer wek xebateke bingehîn bimeşîne. Wek saziya bingehîn dewlet, wexta xwe ji şer re amade bike, wê tîr û kevan, bivir û her cure amûrê şer were vedîtin û pêşxistin. Civaka bavikanî ya ku ji civaka dayikanî ya xwezayî derket, di dîrokê de ji rêderketina herî xeter bû û cewherê şêwazê mijokî û kuştinên xeter ên di dîrokê de ye, ku heta roja me ya îro tê. Ev rewş, ne qeder û ne jî mecbûriyet e, tam ji rêderketin e. Dişibe melîkiyeta şer, dîsa dişibe diyalektîka mişk û mar. Ji niha ve, ji teoriyên dewletê re teoriyên "mişk-mar" were gotin, nirxandineke nêzî rastiyê ye. Paşnavê gelek zarokan şêr e, gelek kes xweziya xwe bi şêrbûnê tînin. Ez dipirsim; "ji bo kê bixwe!"

Di van rojan de ez bi agahîgirtineke kêm hîn dibim ku rêze filmên "efendiyê hungulîskê-vegera qiral" deh xelatên Oscarê

wergirtine. Bi kurtî di film de hungulîsk îqtîdarê temsîl dike û divê were tinekirin. Tam jî filmekî cîhana faraziye ku Emerîka çêke. Dibe ku maskeya îqtîdarê dikeve û ji niha ve tedbîrên pêşî têne stendin, an jî ji bo hin zêdegaviyên globalîzmê qonaxeke mejî tevizandinê ye. Pêvajoya pêkanîna paradigmayên nû ne, divê amadekariyên wan hebin. Zîrek in. Ji ber ku rûyê rastîn ê îqtîdara klasîk eşkere bibe wê ti hêza xwe nemîne û ew jî vê yekê baş dizanin. Hêzên serdest ên ku cîhanê rêve dibin, wek pêdiviyeke sereke ya xwedabûnê -divê haya wan ji her tiştî hebe, di Quranê de behsa nêzîkbûna xwedê bi mirov re tê kirin û gotina "qasî mûyekî nêzîk e" tê bi karanîn- divê karê xwe bêqusûr bikin, pêş de bixin.

Çanda şer û nêçîrvaniyê, qonaxa dawî ya bigihîjê rêxistinbûneke eskerî ye. Rêxistinbûneke eskerî, çendîn civaka etnîk û xwezayî belav bike, wê pêş de biçe. Rêxistinbûna li dora jin-dayikê, nifş, gen, têkiliyên pêşî yên xizimtiyê pêş de dibe, rêxistinbûna eskerî jî ji mêrên xurt ên ku ji vê têkiliyê qut bûne pêk tê. Eşkere ye, êdî ti şêwaza civakî ya xweza nikare li dijî vê hêzê raweste. Di têkiliyên civakî de êdî zor -ji vê re têkiliya medenî jî tê gotin - heye. Xwediyê hêza zorê diyarker in. Bi vî awayî rê li ber mulkiyeta taybet jî vedibe. Ji lewra tê fêmkirin çima di bingehê mulkiyetê de zor heye. Bi zorê zevtkirin û ji bo xwedîbûna milk xwînrijandin, hisa "ezîtî"yê zêde xurt dike. Bi bandor û hukumkirina ser têkiliyan zor pêş de diçe û tê bi karanîn. Hukumkirin bi xwe re xwedîderketinê tîne. Di naveroka hukumkirinê de xwedîderketin têkiliyeke diyalektîk e. Di hemû nîzamên mulkî de xwedîderketin esas e. Di vê pêvajoyê de êdî komel, jin, zarok, ciwan, qadên nebat lê têne berhevkirin û qadên nêçîr lê têne kirin, mulk têne dîtin. Mêrê bi hêz, bi hemû heybeta xwe gaveke pêşîn diavêje, êdî ji qiral-xwedabûna wî re hindik maye. Şaman-rahîb ji bo amadekirina mîtolojiya vê pêvajoyê li ser kar e. Ya divê were kirin ew e ku ev pêşketina muhteşem bi hostayî di mejiyê mirovê hukum lêkirî de were bi cihkirin. Şerê meşrûiyet û rewabûnê, herî kêm bi qasî zora hişk hewldan û huner dixwaze. Divê di mejiyê mirov de bawerî wisa were bi cihkirin, wek qanûneke mutleq fêm bike. Li gorî hemû agahiyên sosyolojîk, têgîna "xwedayê hukumdar" di vê pêvajoyê de derdikeve. Di baweriya "totem" de ku bi civaka xwezayî re hebû, hukumkirin nebû. Totem wek sembola klan tabû ye, pîroz e. Jiyana klanê çawa be têgînên sembolîzekirinê jî bi heman rengîn e. Bi rêxistinkirina jiyanê û rêzikên wê, girêdaneke xurt heye û bêyî wan jiyan nayê fikirîn. Lewra, totem wek nîşaneya mezin a hebûnê, dest nayê dayîn û pîroz e. Jê re hurmet tê kirin, jê re

rêz tê girtin. Totem ji heywan, nebat û eşyayên herî bi kêr tê hilbijartin. Di xwezayê de ka çi can û jiyanê dide klanê, wê jê were bawerkirin û wek sembol bê pejirandin. Bi vî awayî, dînê civaka xwezayî, bi xwezayê re di zikhev de ye. Ne ji bo tirsandinê ye, ji bo bi hêzkirinê ye. Dîn şexsiyet û hêzê dide.

Di civaka nû de totem li dawiyê dimîne û serdema xwedê tê. Xwedayê nû wê totem veşêre û binixumîne. Ewê ji xwedayê nû re li serê çiyan, li binê behran û li ezman cihekî bigerin. Bi vê serdestiya wî tê destîşankirin. Çewa dişibe çîna nû ya efendiyan! Di Tewrat, Încîl û Quranê de navekî xwedê "Reb" e, bi maneya efendî ye. Çîna nû xwe dike xweda û derdikeve ser dika dîrokê. Yek ji navên din ên xwedê ku herî tê zanîn, "El", "Elohîm" e, bi maneya mezinahî û bilindahiyê ye, bavpîr û şêxê ji nav qebîleyan hiltê mizgîn dike. Bi derketina sîstema bavikanî, derketina xwedayên nû jî di hemû pirtûkên pîroz de bi awayekî balkêş tê ziman. Di Îlyada Homeros de, di Ramayana Hîndiyan de, di Kalavela Fîniyan de ev rastî her wisa ye. Eger civaka nû di mejiyê mirov de rewatiyê nebîne, şensê xwe yê jiyînê pir zehmet e. Rêveberî çi beşê civakê yê rê ve dibe nedabe bawerkirin, nikare demeke dirêj bimeşîne. Rola zorê di rêvebirinê de ji bo kêliyekê ye, lê bawerî mayînde ye. Mînaka dîrokî Sumer ku di vî warî de yekemîn nivîsa resen a bi dest ketiye, hûrlêkolîna wê gelekî balkêşe. Di Sumeran de afirandina xwedê harîqa ye. Bi taybetî hilweşîna dayik-xwedawend û di şûnê de rabûn û serweriya bavik-xweda cewherê hemû destanan e. Destan ji serî heta dawî bi têkoşîna Înanna û Enkî, Mardûk û Dîamat tijîne. Pişt re ev hemû destanên dawerivîne nav pirtûkên pîroz, hûrlêkolîna wan a sosyolojîk agahiyên mezin pêşkêşî me dikin. Bê sedem dîrokê ji serdema Sumeran nadin destpêkirin. Eger mirov, dînan, destanên wêjeyî, huqûq, demokrasî û dewletê li gorî tabletên Sumeran analîz bike, belkî jî dikare rêya sereke ya herî nêzî rastiyê ji bo sosyolojiyê destnîşan bike.

Ev dij-şoreşa zêhniyeta bavikanî, belkî jî di dîrokê de hewldana herî mezin a belovajîkirin û ji rêderxistinê ye. Di mejiyê civak û mirov de wer rehên xwe berdane, em hê jî nikarin bostekê ji bandora wê derkevin. Rahîbên Sumeran hê jî hukum li me dikin. Saziyên dewletê yên vedîtin û xwedayên wek îfadeya meşrûiyetê li hev anîn bi awayekî me rêve dibin nahêlin em çavên xwe vekin; li ser dîtinên me yên bingehîn û paradîgmayên me hukum dikin. Gotina Albert Einstein a wek "Hêza kevneşopî û hînbûnê, ji parçekirina atomê zehmetir e." zêdetir wek ji bo van têkiliyan hatiye gotin. Wek vê

gotinê îşaret pê kiriye; ma ne hê jî li welatê şaristaniyê, cihê dergûşa dewletê û qesrên pîroz ên rahîbên Sumeran zîgûratan, li navbera Dîcle-Firatê, li Iraqê, ji wexta wan vedîtinan û vir ve, mêtingerî û şerên hîç deng ji wan qut nebû û li ti pîvana mirovatiyê nayên, hê dewam dikin. Ji lewra civaka bavikanî û dewletbûyîn ji bo mirovatiyê ne xêr, berovajî bela herî mezin e. Ev amûrên nû, wê carna mîna gulaka agir û carnan jî mîna gulaka berfê mezin bibin, hawîrdora xwe xira bikin û pîroza pîrozan cîhana me wê bikin êdî lê jiyan nebe. Ehda Qedîm derketina dewletê dişibîne cinawirekî bi navê Levîathan. Aliyekî Pirtûka Pîroz rastiya mezin tespît kiriye. Serîderketina bi Levîathan re timî wek fikareke bingehîn tê destnîşankirin û dibêje; eger ev cinawir neyê kontrolkirin wê "her kesî bixwe."

Ev çanda civakî ku min xwest bi awayekî şematîk nîşan bidim, em dikarin bingehê wê yê dîrokî û cografîk, herî baş li qûntara rêze çiyayên Zagros-Toros û deştên wan bibînin. Em têra xwe şop û bermahiyên civaka xwezayî ya di navenda wê de jin-dayik hebû, di dawiya serdema qeşayî de BZ ji salên 20.000 û pêve dibînin. Em li ser peykeran, di nîzama malbatê, ristin, tevin û destar de timî şopên jinê xuya dikin. Nîşaneyên mêtiyê di karektera ziman de, bi sedema xwedayên destpêkê xwedawend bûn, şopên berçav ên civaka xwezayî ya xwe dispêre dayikê ne.

BZ di salên 4000 de pêşketina otorîteya bavikanî xuya dike. Di civaka nû de hebûna ekserî bi hêz bû ye, zêde zêde şerên qebîleyan hene, şopên qirkirin û stû li hevxwarkirinê têra xwe xuya dikin. Hebûna eşîran, nîşaneyek e, ka ev serdem çiqas dijwar derbas bûye. Civaka bavikanî li wir belav dibe, bi xwe re çînbûna civakê û dewletbûnê tîne. Di dîrokê de yekemîn dewletên sîte BZ di salên 3000 de ava dibin. Mînaka herî berçav sîteya órûk e. Destana Gilgamêş di cehwerê xwe de destana avabûna sîteya órûkê ye. Dikare were gotin; şoreşa herî mezin a dîrokê, li derdora çanda vê sîteyê pêk hatiye. Hûnandina çîroka Înanna-Enkî, xwelihevrakişandina civaka bavikanî û civaka jin-dayikê bi zimanekî helbestwarî yê nazenîn îfade dike. Serdema qehremaniyê ku mînakên wê di her civakê de têne dîtin, di destana Gilgamêş de mînaka wê ya şahane û yekemîn orjînê berçav e. Em yekemîn şerê bajarî û barbaran li vir dibînin. Jin hê jî dûrî têkçûnê ye. Lê mêrê xurt, bi hebûna xwe ya eskerî hêdî hêdî civakê hînî serdestiya xwe dike. Bi hûnandin û tevna xwe ya îdeolojîk, bi saziyên dînî û yekemîn xanedanî û qesrên xwe, civaka şaristan û medenî şeveqê diavêje.

**C- Civaka dewletparêz**

**Avabûna civaka kole**

Civaka hiyarerşîk, xeleka navbera civaka xwezayî û civaka dewletparêz e, ku xwe dispêre çînan. Yek ji taybetiyên berçav ên serdemê ew e ku otorîte û hebûna eskerî bi şexs sînorkirî ye. Otorîte bi sazîbûnê re vediguhere. Dewlet bi sazîbûnê re dibe otorîteyeke temen dirêj. Di dîrokê de dewlet belkî jî saziya herî xetere û hînê jî hebûnek e, rastiya wê ya herî kêm tê fêmkirin. Ev yek bi sedema naveroka çanda wê û ji temsîlkirina wê ya berjewendiyên cihêreng û pir celeb e. Her tiştê derbarê dewletê de hatiye gotin û hatiye nivîsandin, tenê dewlet esrarengîntir kiriye û ji bo neyê fêmkirin xizmet kiriye. Mirov çiqas dewletê tenê wek amûrekî zorê bibîne şaş e, ew çend mirov dewletê wek otorîteyekê pîroz bike, têgîn jî xizmetek e ji bo veşartina rastiyê. Analîzên li ser dewletê, yek ji wan mijaran e ku sosyolojî hê ji bînî derneketiye û çareser nekiriye. Eger mijara dewletê bi awayekî berfireh neyê çareserkirin, wê ti nêzîkbûnê ji bo pirsgirêkan û mijarên civakî negihîjin çareseriyê. Di vê analîz û tehlîlê de qenaetek min jî ew e, ku ezê nîşan bidim, yek ji şaşiya sereke ya şoreşgerekî mîna Lenîn di analîzkirina wî ya dewletê de bû.

Ji bo rastiya dewletê baş were fêmkirin, nuqteyên di vê analîzê de hatine destnîşankirin pir bi sînor û kêm in, divê hinekî din werin dewlemendkirin. Mînaka Sumeran, bi sedema orjîn e û wek belgeyên nivîskî gihîştine me, divê em li ber çavan bigirin. Wexta fikir û saziya dewletê were bi navkirin, divê wek tiştekî geh ava dibe geh hildiweşe û di şûnê de ya nû ava dibe neyê nirxandin. Hewcey e têgihîştinên bi vî rengî werin terikandin. Dîsa, şaş e, ku mirov dewletê li gorî civakan û heta li gorî dûrbûna cihûwaran binirxîne û behsa gelek dewletan bike. Dibe ku mirov dewletê, wek civakeke di nava civakê de, weke di nav civaka yekemîn de civaka duyemîn, bi gotineke din civaka li jorê civaka jêr bi nav bike. Nêzîkbûn û helwesteke duyemîn a dibe ku bi kêr were ev e; mirov dikare dewletê wek têgîn û sazî di nav civakê de yan jî li ser civaka jêr, wek rastiyeke daîmî û parçebûnê dike, bibîne. Helwestek din a temamker; ya rast ew e ku mirov dewletê ne wek her otorîteyê, wek otorîteyeke eskerî-siyasî binirxîne. Gelek ilimdar, fîlozof û oldaran têgîna dewletê rave kirine, lê ji ber ku di çarçoveya bawerî û berjewendiyên xwe de li dabaşê nertine, nirxandinên wan ji objektîvîzmê gelek dûr in. Her weha timî girîngî dane aliyekî dewletê. Wexta zirar daye wan, karîbûne bi carekê lanetê lê bînin û bikevin nav

sûbjektîvîzmeke mezin û bi tevahî hebûna rastiyê bidin aliyekî. Şoreşger jî, wexta dewlet xira dike, pir xirab û dema ava dike jî baş dibînin, yanî rê li helwesteke exlaqî ya sûdmend vekiriye. Dewlet amûrekî wisa yê civakî ye; kesê bi xwe sazûmankar û berpirsiyarê wê nebe, kesê fîlozofê wê nebe, bi cezbeya desthilatiyê bi pey bikeve û bixwaze bibe xwediyê wê, wan kesan di xwe re derbas dike, yan wan dike xweda, yan jî îmha dike. Taybetiyên bi vî rengî timî nîşan dide.

Wexta dewlet tê bi navkirin, bi piranî gotinên wek qiraliyet, cumhûriyet, demokrasî, monarşî, olîgarşî, dîktatorî, despotî, koletî, feodaltî, kapîtalîst, netewî, unîter, federal û hwd. têne bi karanîn. Ev gotin têgihîştina li cewherê dewletê zehmetir dikin.

Helwestên Rahîbên Sumeran dema ber bi avakirina saziyên mîna dewletê ve diçin, ji bo em dewletê fêm bikin, agahiyên herî durust pêşkêş dikin. Berê perestgeha bi navê zîgûratê ava dikin, wê ber bi asîmanan ve bilind dikin, qatê jor ji xweda û qatê jêr jî ji ebdên wî re têne veqetandin. Beşên navberê jî ji nûnerên çîna navîn re vedikin. Xanî û zeviyên li hawîrdorê bi ser perestgehê ve ne. Teknolojiya xwe ya hilberandinê dixin beşekî perestgehê. Hesabên berhemên bi bereket baş têne kirin. Eşkere ye ku ev destpêka avakirina civakeke nû ye. Di vê civaka nû de hin aliyên civaka xwezayî û hin aliyên civaka hiyarerşîk xuya dikin. Hem ji van civakan û hem jî tiştên bi kêra avakirina civaka nû werin bi kar tînin, parçeyên bêkêr û dibin asteng diavêjin. Tam mîna muhendîsên civakeke pîroz dixebitin. Di destpêka avakirinê de her kes razî ye. Mîna cejin û roşan be. Çerxa mezin hatiye danîn. Mîna bi ava Dîcle-Firatê were gerandin, di dîrokê de yekem car herî zêde berhem tê stendin. Ma ji mirovatiyê re ji vê mezintir cejin dibe? Xwedayetiya herî mezin, ev nebe, ma çî ye?

Bêguman ev avakirina mezin, hêza xwe ji damezrandina şahane ya li qûntarê çiyayên Zagro-Toros digire ku li wir civaka xwezayî ya neolotîk ava bû. Civaka jin-dayikê, li qûntara van çiyan di nava hezarê salan de çandeke mezin afirand. Amûrên hilberandinê bi kar anîn, nebat berhev kirin, çandinî kirin, heywan kedî kirin û xwedî kirin. Huner û hostahiya rahîban jî ew bû ku karîbûn ji vê jiyanê civakeke jor biafirînin û bi teknîka avdaniyê ji tejaneya Dîcle-Firatê hatin û berhemekî zêde bi dest bixin. Vedîtina balkêş a dîrokî di cewherê xwe de wisa pêk tê. Di pêvajoyên paşê de li avahiyê, qatên nû têne zêde kirin yan jî li ser hîmên nû lêkirina dîwaran dubare dibe.

Mekan û cihê vê civaka jor bajar e. Ji vî cihî re ku civaka şareza, sivîl û medenî jî tê gotin, bi qasî bandora xwe ya li ser mejiyê mirov, di şêwazê hilberîna maddî de jî guhertinên mezin ên şoreşgerane dike. Ya rastîn, li gorî civaka xwezayî, bingehekî mezin ji dij-şoreşê re pêk tîne. Zêhniyeta dewlet-bajêr jî hê nehatiye çareserkirin. Sîstematîka mejî, nivîs, gelek pîşe û huner pêş de birine, lê bihayê çi û di berdêla çi de? Gelo şoreşa bajêr bû, yan jî dij-şoreş bû, ev hukum hê jî girîng in, û hêja ye, mirov hûrûkûr li ser bifikire. Divê neyê ji bîrkirin, di serî de dînên mezin ên yek xwedayî, gelek derketin û pêngavên dîrokî, li dijî vê avabûnê hatine pêşxistin. Cendereya nifşê mirov xistinê ji cennetê zêdetir dişibe cehennemê. Ya rastîn, bi mînakên gihîştine heta roja me ya îro, eşkere ye, ji hindikî re cennet û bi giranî ji piraniyê re jiyana cehennemê aniye. Civaka dewlet-bajêr, ji her alî ve, di naveroka xwe de bangawaziyê ji bo hakîmiyet, mulkiyet û zordariyê dike. Hînkirina mirovê civaka xweza ji bo vê jiyanê hêsan nebûye. Ji aliyekî ve, bi xwedayên xeternak hukum li mejiyê mirovên bajêr tê kirin û ji aliyê din ve jî ev sîstem bi pîvaneke jêneger, jinê mîna amûrekî ji rêderxistinê -fahîşetiya destpêkê- pêşkêş dike. Tevî kontrola rojane, ebdiyet bi van saziyan mumkîn û gengaz dibe. Her du sazî jî taybetiyên xwe yên efyonker û tevizandinê hene.

Zêhniyeta avakirin û hilberandinê ya li dora vê civaka orjînal a dewlet-bajêr pêk hat, di pêvajoyên paşê de, di hemû waran de timî hat xurtkirin. Li Sumeran derketiye û wenda nebûye. Ya mîna xelekan heta roja me ya îro hatiye, avahî û zêhniyeta wê ye. Mînakên li sîteyên Misir, Hîtît û Yewnan, versiyonên hinekî cuda yên orjînal in. Bi belgeyên dîrokî jî her ku diçe ispat dibe ku van her sê navendan jî wek xelekên li pey hev, orjîna Sumer esas girtine. Piştî van her sê xelekan, bi ser wan ve Çîn, Hînd û Roma zêde dibin. Bi vî awayî gerdûnî dibe. Ji ber ku armanca me nivîsandina dîrokê nîne, emê li ser van pêvajoyan ranewestin. Ya em dixwazin ispat bikin; tenêbûna dewletê û daîmiyeta wê ye. Bi maneya hebûnê dewlet tenê ye, ji aliyê demê ve, hebûnek her tim di dewletê de xurt e. Mirov nikare ji xwedubarekirin û tekraran re bibêje; saziya dewletê, helwestek bi vî awayî mijarê çareser nake. Tekrar tekrar çareserkirina heman cewherî maneyê pêş de nabe. Tenê dubare dike.

Em wexta ji nêz ve, mînaka Sumerê hûr bikolin, emê bibînin ji destpêkê ve di civaka dewletparêz de du fonksiyon di zikhevdu de dimeşin. Ya yekemîn wek otorîte û zordarî dewlet, ya duyemîn jî wek nîzama hilberandinê ya gelemperiyê ya hemû sîteyê xwedî dike

dewlet. Ev her du fonksiyonên dewletê, wek du nakokiyên bingehîn timî mirov bi xwe re lebikandine. Ne pê re dibe, ne jî bêyî wê dibe. Mîna amûrekî zordariyê, saziyek e, xwe lê ragirtin zehmet e. Lê wek amûrekî hilberandin û ewlekariya gelemperiyê, saziyek e, dest jê nayê kirin. Di vir de pirsa li cih a were kirin ev e; gelo ji destpêkê ve ji bo hilberandin û ewlekariya gelemperiyê - berjewendiyê hevpar ên civakê - hewceyî bi zordarî û otorîteyê heye, gelo hilberandin û ewlekariya gelemperiyê ya civakê bêyî dewletê nabe? Eger bêyî dewletê dibe, wê wextê wek amûrekî zorê hewceyî bi dewletê nîne. Jixwe tevahiya mijarê di vê nuqteyê de ye, wek dewlet bi hinek narkotîka xistibe nav xwarineke xweş, dibe amûrê berjewendiyeke mezin û werdigere saziyekê. Hostatiya nîzama dewleta rahîban jî di vê nuqteyê de ye, vê cudahiya me bal kişand ser, pir baş karîbûne veşêrin û bi vî awayî rê li ber çêbûna beşeke mijok û kurtêlxur vekirine. Teorîsyenekî anarşîst wek Bakûnîn ku dewlet mîna "xerabiyek" mutleq dîtiye, dîsa jî dewlet wek xirabûneke mecbûrî û hewceyî pê heye pejirandiye. Marksîzmê jî wek qonaxeke hewceyî pê heye nirxandiye, lê ezê di analîzên paşê de bi berfirehî nîşan bidim ku wek amûrekî zor û zordariyê ji bo pêşketinê hewceyî pê nîne û dîsa xirabiyeke mecbûrî jî nîne. Ji serî ve bûye bela, hîç hewce nebû û pêwîst jî nîne, pişt re tam dibe komeke cerdevan û çeteyeke şêlandinê. Ji vî alî ve, diviyabû dewlet ji roja destpêkê ve wek rîşeke civakî bihata tecrîd û teşhîrkirin û bihata avêtin. Ev a rast bû. Divê dewlet wek amûrekî hilberandin û ewlekariya hevpar a civakê neyê nirxandin, ne ku bi awayekî klasîk dewlet, bi awayekî civakî wek amûrekî were bi navkirin rastir e. Emê di beşê pêş de bi berfirehî li ser vê avabûna civakî rawestin û her weha emê ji vê bi navkirina civakî re jî "demokrasî" bibêjin. Ev nav li cih e, û rastir e.

Prototîpa demokrasiyê, mirov dikare di hîyarerşiya kêrhatî ya civaka xwezayî de bibîne. Di vê komê de ku xwe naspêre hilanîn û mulkiyetê, ji bo ewlekarî û rêveberiya hevbeş jin-dayik û pîremêrê-xwedîtecrûbe, hêmanên bingehîn in, hewceyî bi wan heye û bi kêr hatine. Endamên komê bi awayekî xweza ji wan re bi hurmet in. Lê eger ev rewş were bi karanîn, li ser rêz û hurmeta tê nîşandan otorîte, bi kêrhatin bibe berjewendî, amûrê zorê yê hewceyî pê nîne, wê derkeve holê. Amûrê zorê xwe bi rêbazên hilberandina kolektîf û ewlekariya hevpar vedişêre, ev yek di cewherê hemû sîstemên zordar û mêtinger de heye. Sazî û avahiya herî bêyom a hatiye vedîtin ev e. Ev vedîtineke welê ye; paşê pêre hemû awayên koletiyê, formên dînî

û mîtolojiyên xeternak, talan û qirkirinên sîstematîk, şewitandin û hilweşandinê, tên.

Marksîzm dema derketina vê pêvajoyê rave dike, ji himbêza civakeke paşve mayî derketina civakeke pêş destnîşan dike û di vê bûyerê de rola pîrikiyê dide "zorê." Ev nirxandina ji aliyê me hemûyan ve tê parvekirin û pejirandin, hemû têgihîştinên me yên dewlet-şoreş, demokrasî û kirinên me yên çalakî-rêxistinê ji binî ve seqet dike. Vê hevokê wek rexne lixwegirtinê hûn dikarin binirxînin û bawer dikim heta niha di vê çarçoveyê de ti ekola wekhevî û azadiyê nekarî vê rexneyê li xwe bigire û vê helwestê li dawiyê bihêle. Her ekol, tevgera siyasî, dewlet û terîqeta li ser navê gelan û bindestan hat avakirin, bi sedema vê têgihîştina seqet nekarîn pêşî li encamên berovajî bigirin.

Kevneşopiya dewletê wek amûrekî zordariyê, ji şibandina wê ya Leviathan jî wê were fêmkirin, cinawirek e ku ji xwînmijî û mêtingeriyê têr nabe. Her hucre û şanika wî bi xwînê dijî. Emê di gelek mînakan de jî bibînin, ev cinawir, kesên wek xwediyê wî xuya dikin jî di navê de hebûnên xwe yên herî bi nirx jî bêyî teredut îmha dike, qurban dide, mîna gundorekî di ser hemû kevneşopiyên exlaqî yên civakê re derbas dibe. Sultanekî Osmanî li ser navê "silameta dewletê" di şevekê de 17 birayên xwe dixeniqîne û ew baş dizane li gorî pîvana amûra xwedîtiyê lê dike, tevgeriyaye. Di dîroka Romayê hemûyî de, di dîroka Îranê de, amûrê zorê bi awayekî kêfî tê bi karanîn û dîroka dewletên wan bi hovîtiyên bêhejmar tijîne û bi awayekî îdeolojîk kamûflekirina van kiryarên xwe jî wezîfe dizanin.

Saziyên civakî û zêhniyeta dewletê rengê dayê, pir girîng e, bi awayekî hûrûkûr werin kolan. Dûrketin û xerîbketina zêhniyetê ji xwezayê, çînayetiyên dûrî aqilan, gelek rêxistinên taybet, hemû saziyên eskerî, vedîtin û îcadên vî amûrê zorê ne. Ji çanda pîrozkirina xenîmet û talanê bigirin, bi tevahî piçûkdîtina xebatê, ji têgihîştina xwedayekî her tim çi dixwaze ferman dike heta utobyayên cennet û cehennemên sexte, cîhaneke kurtêlxuran a sultan, keyser, şah, raca û împaratorên heta erşê xwedê hatine bilindkirin. Bi hezaran sal e, li ser navê van pîrozî û mezinbûnên nava xwe pûç di cihokan re xwîn herikî.

Ha bi cihkirina şoreşgeriyê di naveroka amûrê zorê de, ha rol dayîna şoreşgeriyê ji bo şêr, ti ferqa xwe nîne. Wexta em dewletê bi nav dikin û dinirxînin, divê em bandora wê ya li ser reng û dirûvgirtina civakê înkar nekin, naxwe emê bikevin anarşîzmê. Dewlet bi her du aliyê xwe jî rastiyek e û her tim di gotina dawî de

diyarker bûye. Eger em van aliyê wê jî destnîşan nekin wê bi navkirina me pir kêm bimîne. Ya divê em bikin ev be; em aliyê hewce û aliyên ne hewce yên desthilatdariya dewletê ji hev bikin. Pêwîst e, em ne wek zora mecbûr a xirab, ne jî wek hebûneke mezin a pîroz nêzîk bibin. Şaşiyên mirov ên herî mezin di nav kêliyekê de dikin, ji nêz ve bi van helwestên yekalî têkildar in.

Em wexta dibêjin, yek ji taybetiyên bingehîn ê dewletê ew e ku her wek xwe maye, bêguman diyar e, em naxwazin bibêjin, di awa û şêwazê wê de guhertin nebûye. Berovajî, wek xwe mayîna cewher, neçar dihêle ku dirûv û awa biguherin. Ev yek wek pîvana diyalektîkê ji bo her bûyer û rastiyê derbas dibe. Em dewletê herî demdirêj û bi awayekî kûr, dikarin di civaka koletiyê de bibînin û çavdêriya li vê serdemê, wê agahiyên me dewlemendtir bike.

Em dewletên koledar bi awayên wan ên herî saf di civaka Sumer û Misir de dibînin. Forma dewleta koledar a Sumer û Misir, di pêşketina zêhniyeta civakî, şêwazên sazîbûna aborî û sosyal de guhertinên bingehîn kirine. Cîhana zêhniyeta civaka xwezayî, xwe dispêre têgihîştina xwezeyeke zindî û ruhber. Her hebûna di xwezayê de xwedî ruh tê qebûlkirin. Ruh wek sedemên zindîbûnê dihatin zanîn. Di têgihîştina dînên totemîk de hê têgihîştina xwedayekî ji der ve hukum bike pêş neketiye. Bi nazenînî hewl tê dayîn, ji bo bi ruhên di xwezayê de yanî bi hêzên wê re li hev were kirin. Ji ber ku rewşeke berovajî maneya wê mirin e. Wexta têgihîştin ev bû, hewceyî bi lihevkirineke awarte heye. Li gorî pîvana bingehîn a ekolojiyê, em bi jiyanê re rûbirû ne. Ji bo jiyana civakî bi hêzên xwezayê re neyê dijberî hevdu, hewldaneke girîng heye. Wexta exlaq û dînê xwe pêş de dibin, prensîba bingehîn a lihevkirina bi xwezayê û hawîdorê re li ber çav digirin. Ev prensîba jiyanê, ew çend di mejî û zêhnan de bi cih dibe, wek kevneşopiyeke exlaq û dîn li ser seran tê girtin. Ya esas, ev prensîbeke herikînê ya jiyana xwezayî ye, di nav civaka mirov de bi cih bûye. Ti hebûn nikare hawîrdora xwe li ber çav negire. Ji rêderketinên demkin, bi herikînê re bi şert û mercên der ve û hundur ên nû re tevî pêvajoyê dibin. Naxwe bi tevahî li derveyî sîstemê dimînin, hebûna xwe wenda dikin. Girîngiya prensîba ekolojiyê di civaka mirov de ji vê taybetiya bingehîn a xwezayê tê.

Bi avabûna civaka dewletparêz a koledar re, ji vê pirensîbê qutbûn û ji rêderketineke ciddî bû. Têkiliyeke xurt a pirsgirêka hawîrdor û ekolojîk bi pêkhatina vê civakê û destpêka şaristaniyê re heye. Şaristaniya civaka çînî, civakek e, bi xwezayê re li hev nake.

Sedema bingehîn a vê rastiyê ew e ku civaka nû, bi paradîgma û cîhana zêhnî ya koledar a bi dij-şoreşekê re eleqer e. Di civaka xweza de hemû endamên komê di tevahiya jiyanê de bi awayekî organîk cih digirin. Her kes ji dil û durust parçeyekî civakê ye. His û baweriyên wan hevpar in. Têgînên xapandin û derewê hîç pêş neketine. Weke ku bi xwezayê re bi zimanê zarokan bipeyivin. Li gorî qanûnên civakê yên kirine dîn û exlaq, hukumkirina li xwezayê û xirab bi karanîn, gunehekî herî mezin -tabû- û xirabî ye. Di civaka dewletparêz a koledar de ev têgihîştina bingehîn a exlaqî û dînî hatiye beropaşkirin. Ji bo meşrûiyeta civakî bi qasî zorê hewceyî bi derewê jî tê dîtin. Ji ber ku sîstema koledariyê bi tenê bi zorê nayê meşandin. Eger hûn civakê bi baweriyên xurt û bingehîn ve girê nedin, hûn nikarin sîstemê rê ve bibin.

Ev vedîtinên bingehîn ên îdeolojîk ên rahîbên Sumer û Misriyan ku tevahiya dîrokê û hê jî bandora xwe dewam dikin, di vê qonaxa dîrokê de derdikevin. Bi têgînên nû afirandin, şêwaza fikrê ya bi riya mîtolojiyê hûnandin û ev yek kirin hîmekî bingehîn ji bo meşrûiyeta sîstemê. Taybetiya bingehîn a van mîtolojiyan -mîtolojî, bi zimanê Yewnanî çîvanok û efsane - ew bû ku cîhana xwedayan a nû derxistibûn ser bûyerên xwezayê. Xwedayên destpêkê En, Enlîl û Ra, cîhana efendiyan - Reban - pir bi hostayî mezin dikin û vedişêrin. Hukumdariya çîna koledar a ava dibe bi xwedabûnê re di zikhev de mezin dibe. Efendiyên nû, çawa bêyî bixebitin bi hukumdariyeke bêhemta li ser text û di qesran de xwediyê jiyanê ne, her weha nîşaneyên wan ên xwedayî ku hatine hûnandin û biriqandin jî, di ser hemû hêzên xwezayê re ne. Hakîmiyeta civakî siya xwe daye ser hakîmiyeta xwezayî. Li ser dînê ruhberiyê yê xwezayê, dînê xwedayan ên ferman dikin, hatiye ferzkirin. Li cihê ku pêvajoyên xwezayî bi ruhan werin ravekirin, bi xwedayan tê ravekirin, ev yek di zêhniyetê de dibe guhertineke bingehîn.

Bawer dikim tê fêmkirin, ka çima ji vê pêvajoyê re ne şoreş, dij-şoreş tê gotin. Ji ber ku di dîrokê de pêvajoya herî xeter û neyênî daye destpêkirin. Pir girîng e, em hinekî din, hûrûkûr li ser mijar û dabaşê rawestin. Têgihîştina xwezaya zindî, li derdorên ilmî yên îro, yek ji mijarên sereke ye, herî zêde tê guftûgokirin. Wexta me fîzîka kûantûmê rave kiribû, em bi kurtî li ser vê yekê rawestiyabûn. Ya rastîn, mîna ku di civaka xwezayî de nebe jî, her hebûna xwezayî qanûnek xwe ya tevgerê û asta xwe ya manayê heye. Ev têgihîştin yek ji dîtinên herî şoreşger, tê qebûlkirin. Sûbjektîfa hebûna bûye maddî rê ve dibe enerjî ye. Enerjî maddeyeke rastî nîne; bi gotineke

din ruhê maddeyê ye. Her roja diçe, bi cureyên cihêreng ên enerjiyê di xwezayê de pencereyên pir nû têne vekirin. Wexta tê gotin; wê paşerojê bibe ya fizîka kûantûm a "nanoteknolojî" ev pêşketin tê destnîşankirin. Di encamê de bi awayekî cuda be jî şêwazê civaka destpêkê bi herikîna xwezayî re lihevkirî, bi têgihîştineke rast, jiyana ekolojîk esas digire. Mirovatî ji ber ku ji vê prensîbê qut bû û dûr ket, îro pirsgirêka hawîrdorê gihîştiye asteke xeter û tehlûke. Di bingehê qutbûn û dûrketinê de jî zêhniyeta şaristaniya civaka çînî û şêwazê hilberandina wê, heye.

Bi vê mijarê ve, nuqteya duyemîn a girîng, qutbûna têkiliya di navbera mejiyê hisî û mejiyê analîtîk de ye. Vê qutbûnê rê li ber xeter û cudahiyeke mezin vekiriye. Mejiyê hisî bi hemû ruhberan re heye. Bi gotineke din, di hemû pêvajoyên xwezayî de rewşa xweser a sûbjektê, rewşa mejî ye. Mejiyê hisî di pêvajoya xwezayî ya tekamulbûna ber bi cinsê mirov de hêdî hêdî ber bi mejiyê analîtîk ve diçe. Di mejiyê analîtîk de hilbijartin bi lez e, lewra qabîliyeta wê ya guhertinê xurt e. Lê di heman demê de aliyê wê yê ji rêderketinê jî ew çend xurt e. Mejiyê hisî, tevî ku basît e, bi xweseriyeke ajoyên hundurîn zelal e. Yanî tê maneya veguherîna refleksên bi şert, bi refleksên bêşert.

Ji bo hînbûnê ajo rêbazeke basît in, lê bi îstiqrar in. Berhemê tecrubeyên bi sed hezar salan e. Lewma bi hêsayî naxapin. Taybetiyek wan a din jî ew e ku bi jiyanê re têra xwe têkildar in. Li hemberî şertên der ve û hundur ên jiyanê eleqeder dikin an jî gef dikin, yekser reaksiyon nîşan didin. Lê ev aliyê wan, bi lez pêşî li rola wan a mejiyê analîtîk digire. Dîsa jî ji bo jiyanê mejiyê esas mejiyê hisî ye. Şîrove nake, dide jiyîn. Şîrove çiqas pêş dikeve, ji rêderketin jî ew çend zêde dibe. Mejiyê analîtîk bi şîroveyê, rêyên nû dide ber mejiyê hisî û şikil dide tevgera wî. Ev yek zêdetir ji bo cureyê mirov ê pêşketî wisa ye. Jixwe şêwazê jiyana civakî ya cureyê însan bi asta pêşketina mejiyê analîtîk re têkildar e. Yê bi awayekî lezgîn civakê pêş de dibe mejiyê analîtîk e. Lê ji ber ku ji hisan bêpar e, wexta serbest dimîne, xeter e. Bi taybetî, mejiyê analîtîk piştî ku hînî çanda şer û desthilatiyê dibe, pir xeternak dibe. Mejiyê analîtîk ê em qalê dikin di şerên îmhayê yên serdeman de bi awayekî balkêş xwe nîşan daye. Ji ber ku wek makîneyekê dixebite, ji hisên mîna êşê, tirsê û hezkirinê bêpar e. Bi sedema sempatî û empatiyê nas nake, taybetiya xwe ya îmhaker bi awayekî pir xeternak ferz dike. Berovajî vê yekê, dema bi mejiyê hisî re lihevkirî

bixebite, ji bo pêkhatina civakên herî têkûz ên xwedî qabîliyeta analîzeke payeber, roleke diyarker dilîze.

Di serdema civaka dewletparêz a koledar de ev her du mejî ji hevdu veqetiyane. Belkî jî di asta herî jor de, ji mejiyê hisî yê li ser civaka xwezayî serwer bû veqetîneke mezin dibe, û di şûnê de mejiyê çînek li ser hunerê mêtingerî û zordariyê diponije, yekem car derdikeve pêş me. Ev bûyerek e, wê bi xwe re encamên xeternak bîne. Berhemê pir zêde yê koledariyê ku li ser berhemê zêde yê civaka neolotîk pêk hat, ji bo avabûna vê çînê bû zemînê maddî. Tenê bi rêvebirina hilberandinê dest datîne ser piraniya berheman. Piştî vê yekê, dor tê avakirina zêhniyeta van berheman biparêze. Di encama lêgerînê de xwedayên mîtolojiya nû yên ferman dikin derdikevin ser dika dîrokê. Pêvajoyeke xurt a mejiyê analîtîk dest pê dike. Mijarên herî zêde ev mejî li ser sekiniye, dîtina rêzikan ji bo rêvebirina ebdan e. Di heman demê de ev rêzik wek fermana xwedayên namirin nîşan dane. Ji ber ku ev mijar di dîroka mirovatiyê de cihekî girîng digire, ev dibe sedema meznahiya rahîbên Sumer û Misrê. Mejiyên wan ên ji civak û jiyana xwezayî qut bûyî, sîstemeke mezin a mîtolojîk a hunandî afirandiye. Ji bo ebdan pê bidin bawerkirin, sîstema dibistanên efsûnkar, perestgeh û peyker ava kirine. Di şûna dînên ruhparêz ên civaka xwezayî de ku zirara wan nebûn, dînên xweda yên ferman dikin afirandin û stû tewandin daîmî kirin. Ketin cîhana tirsê, belovajîkirin û anîn ziman ka çima hewce ye ji xwedayan bitirsin û wexta guh bidin xwedayan wê çawa bêne xelatkirin. Ev xebat bi nazenînî û hostatî kirin. Yekem car utopyayên naveroka xwe cennet û cehennem vedîtin. Ya esas, ji çîna efendiyên nû re sîstema îdeolojîk tê avakirin ji bo bi wan re were lihevkirin. Şêwazê fikrê mîtolojîk e, ev yek li gorî demê li cih e. Ya rastîn, dînê zindîtiyê (anîmîzm) wekhevî û azadîxwaz e. Dînê nû yê bi giranî mîtolojîk e, dînê çînekê ye, wekhevî tê de nîne, dînê koletiyê ye. Ji sedî sed stûxwarkirinê ji xwedayan re - efendiyan - ferman dike.

Ev zêhniyet di dîroka mirovatiyê de dij-şoreşek e, û pêngava herî mezin a mejiyê analîtîk e, ya pêşketina mejiyê çînekê ye. Êdî dîrok, wêje, huner, huqûq û polîtîka, ji nû ve bi mejiyê vê çînê tê hûnandin. Em vê rewşê bi awayekî herî xurt û orjîn di mîtolojiyên Sumer û Misriyan de dibînin. Îdeolojiya çîna mêtinger a serwer êdî ketiye ser rêya civaka jor û civaka dewletparêz. Gavên li ser vê rê, wê li ser navê hemû civakê werin avêtin. Îdeolojiya jin-dayikê ya ji civaka xwezayî mayî wê were mêtin, naveroka wê were pûçkirin,

asîmîlekirin û wê bixînin xizmeta nîzama xweda-mêran. Mîna ku çawa jin xistin xizmeta - destpêka fahîşetiya taybet û giştî - mêran. Hemû endamên civaka xwezayî yên azad-wekhev, wê bibin endamê çîna ebdiyetê. Destaneke Sumeran dibêje; mirov ji "gûyê" xwedayan hatine afirandin. Dîsa yekem car destanên Sumeran dibêjin; jin ji parsûyê mêran hatiye afirandin. Bi rastî, mîtolojiya Sumeran serketineke wer awarte ye, bandoreke mezin dike li mîtolojiyên piştî xwe tên û heta dibe yekemîn çavkaniya dînên yek xwedayî, wêje û huqûqê. Di destanê de taybetiya Gilgamêş bi heman awayî dadiwerive nav hemû destanên cîhanê.

Ji ber ku bi awayekî berfireh analîzkirina zêhniyeta Sumeran mijara me nîne, bi kurtî em dikarin bibêjin; dîrok yanî şaristanî, ji bo dest pê bike, ne tenê zordarî, mejiyê analîtîk jî dibe çavkaniyeke bingehîn. Paşê divê em rehên fikra metafizîkê jî di vî mejiyî de bibînin. Kulmeke efendî netenê li jor li qesrên mîna cennetê rûniştîne û rojên xwe derbas dikin, her weha hîmê efsane û cîhana utopyayên timî serî li mirovatiyê bigerînin, datînin. Derewa mezin a civakî ku pêk tînin, di mejiyê hemû mirovatiyê de reh ber dide û saziyên wê têne avakirin. Ev yek bi her cure mîtolojî, destan, perestgeh û dibistanan tê kirin.

Di dîrokê de veguherîna herî bingehîn a zêhniyetê di civaka Sumeran de wek dij-şoreşekê pêk tê û di serî de civaka Rojhilata Navîn, paradigmaya mirovatiyê - nertina me ya bingehîn li gerdûn û xwezayê - ji binî ve guhertiye. Têgihîştina civaka xweza, gerdûn û xwezaya zindî, rengîn e, û hilberîner e. Xwezayê wek behok û zalim nabîne. Mîna dayikekê dibîne. Di zimanê Sumeran de gotina "Amargî" tê maneya azadiyê û di heman demê de tê maneya vegera li dayikê. Ev gotin bi xwe jî zêhniyeta dij-şoreşê pir baş li ber çavan radixîne. Li gorî nertina mîtolojiya nû, gerdûn û xweza bi xwedayên hukumker û cezaker tijî ne. Xweda ku - ya rastîn despotên mêtinger û zordar in - bilind kirine derveyî sînorên xwezayê û her ku diçe xwe vedişêrin, wek xweza zuha kiribin. Têgihîştina xwezayê û maddeyeke mirî pêş de dibin. Tevî ebdên ji gûyê xwedayan hatine afirandin, her diçe hemû ruhberan piçûk dibînin, piçûk dixînin. Ev paradigma her ku çû rehên xwe kûr berdan. Sedema bingehîn e ku mejiyê civaka îro ya Rojhilata Navîn tevizand û kir ku bi ser xwe ve neyê. Ewrûpayê bi reformekirina Xiristiyaniyê û şoreşa Kopernîk karîbû vê paradîgmayê hilweşîne. Dehayekî Ronesansê mîna Giordano Brûno, bi sedema ku têgihîştina xwezaya zindî parast, bi saxî hat şewitandin. Ev paradigma ji ber ku danewerivî civakên

welatên Çîn û Japonyayê, pir zû dikarin bi pêşketinên erênî re li hev bikin. Di vê yekê de, têgihîştina wan a gerdûna zindî roleke bingehîn dilîze. Di şaristaniya Roma-Grek de jî bi sedema şêwazê fikra felsefîk, mîtolojiyên Sumer-Misirê li dawî hîştin û di şûnê de hûnandina diyalektîka metafîzîk esas girtin, heman pêşketin bûn.

Çarçove û têgîna dewletê di malzaroka perestgehên rahîban de pêk hat, lê yên dewlet kirin sazî û xwediyê hêza desthilatiyê, şefê eskerî û meclîsa rûsipiyên civaka hiyarerşîk in. Desthilatdariya dewletê, di navbera van sê aliyan de piştî têkilî û nakokiyên dûrûdirêj diyar dibe. Di destpêkê de qral-rahîp serdest in, paşê her ku diçe ev sazî cihê xwe ji meclîsa rûsipiyan re - demokrasiya seretayî - dihêle, pişt re serdestiya şefê eskerî pêş dikeve ku ew xwediyê hêzê yê dawî û diyarker e. Ev pêvajo di destana Gilgamêş de bi zimanekî helbestî û mîtolojîkî hatiye îfadekirin. Gilgamêş bi xwe qehreman û şefê eskerî temsîl dike. Rahîb e û rabîhên berê yên xwediyê hêzê pir tepisokî bûne. Enkîdo wek mînaka yekemîn esker ji barbarên li derveyî etnîsîtê hatiye anîn, derdikeve pêşberî me. Rêxistiniyeke li derveyî xizmtiyê pêş de diçe.

Bandora hêzê ya efsûnkar, hem yekem car rê li ber stû tewandinê vedike, hem jî dibe sedem xwediyên berhemê zêde xwe wek qral-xwedayan nîşan bidin. Pêvajoya ku egoya mirov xwe herî mezin îlan bike, dest pê dike. Êdî xweza û civak wek berhemekî qral-xwedayan tê nîşandan. Hemû mîtolojî beriya her tiştî cih didin vê vegotinê. Ji van çavkaniyan paşê wê dawerive pirtûkên pîroz. Bi vî awayî wê desthilatiya dewletê bêserûbinî bibe. Têgihîştina dewletê ya hê jî wek slogan tê bi karanîn "Ebed-medet dewlet" ji vê derê tê. Eger dewlet pêş neketa, bi taybetî bi mîtolojiyê nehata xemilandin, wê ji sazî û rêxistineke basît a cerdevanan wêdetir negihîşta ti qonaxê. Ji ber ku îqtîdara dewletê ji bo wê demê gelek hatina wê ya karê hebû, xwe wek saziyeke awarte ya xwedayî li ser hemû mejiyan ferz kiriye. Bi vê maneyê dibe ku wek rêxistineke desteserkirinê jî bê fêmkirin. Di vê nuqteyê de hêza îdeolojiyê derdikeve pêşberî me. Îdeolojî dibe sedem ku ev rêxistina desteserker, wek saziyeke pîroz a fermana xwedê were naskirin. Eger îqtîdara dewletê çiqas were mezinkirin û xemilandin, divê em fêm bikin ku li wir şêlandineke mezin û berjewendiyên veşartî hene. Qral-xweda ku ji vê rastiyê hayedar in, xwe kirine sazî. Qesrên bi heybet, hebûneke eskerî ya ji kesên bi hêz pêk hatî, îstixbareteke baş, haremeke balkêş, xanedaniyeke navdar, şecereya nîşan dide ka ji koka kîjan xwedayî ne, wezîrên her tim pesnê wan didin û ebdên stûxwar ji bo vê

sazîbûnê ji wan hêmana ne, bêyî wan nabe. Qebrên piramît bi xwe, ji bo dunyayeke mayînde qesr in. Kinc, hêzeran û mor ji aksesûwarên wan in, timî ji xwe kêm nedikirin. Ji hemû endamên civakê re ya dima jî ev bû; diviyabû ebd timî ji van saziyên xwedayên mezin re serî bitewînin û şikir bikin. Di pirtûkên pîroz de gelek sifatên xwedê hene, piraniya van têgînan sifatên qral-xwedayên destpêkê yên Sumer û Misriyan e. Beşek ji wan jî versiyonên dubare ne, yan hatine guhertin.

Bi mirina wan re - ya rastirîn çûna wan a dunya din - hemû berdestiyên wan bi awayekî zindî dihatin defnkirin. Ji ber ku berdestiyên qral beşek ji bedena wî dihatin hesibandin. Ya rastîn tevî bedena qral defnkirina wan, ji bo xizmetê li dunya din ji qral re bikin hewce bûn. Zurriyeta wan a li dunyayê jî dimîne wê hebûna wan dewam bike. Têgîna "bêmiriniyê" jî hinekî wisa derdikeve. Bi vê mînakê, bi awayekî balkêş xuya dike ku wexta mejiyê analîtîk ji rastiyê qut dibe, çawa civakê vediguherîne. Ji bo avakirina piramîdekê bi tenê, divê bi sed hezaran kole bi mirina xwe bixebitin. Desthilatiya dewletê ya tê avakirin, dibe erdhej û zordariyeke mayînde li ser serê mirov. Di ferhenga mirovatiyê de êdî têgînên zilm, mehşer û xelaskar hêdî hêdî bi cih dibin. Şexsiyeta peyxemberan wek şervanên azadiyê di van şert û mercan de reng digire. Peyxemberê wek xelaskarên vê felaketê derkevin pêş, çavkanî dîsa civaka Sumer e.

Bi civaka xwezayî re beşekî wenda dike jin in. Mîtolojiya Sumer mîna lawikên şînê yên jina wenda kiriye. Di kulta Înanna de hem şopên berê yên serdema civaka jin-dayikê hene, hem jî têkoşîneke mezin li dijî civaka serweriya wê mêr dike, heye. Sîteyên destpêkê bi giranî ji aliyê jinan ve têne avakirin, lê paşê hemû cihê xwe ji mêran re dihêlin. Di serê saziyan de ya ku jin xistiye, dîsa perestgeh tên. Di destpêkê de perestgehên di bin rêveberiya jinan de yên li ser navê xwedawend-dayik Înannayê, yek bi yek têne dagîrkirin û dikin kerxane. Nîzama malbatî ya li dora jin-dayikê ya civaka xwezayî, saziyeke cuda ye. Xwediyê jinê tineye, di heman demê de jin bi xwe, kîjan mêr û zarokî bixwaze dikare rê ve bibe. Bi awayekî klasîk saziya pîrekî û zilamtiyê pêş neketiye. Li ser hîmê saziya dewletê, piştî ku civaka mêrê serwer pêk hat, malbata bavikanî ya bi rêveberiya mêr, belav bû. Saziya malbatê naveroka wê diguhere, rengê xwe yê destpêkê digire û heta îro dewam dike. Xwediyê jinê mêr e, her weha zarok jî yê wî ne. Jin her ku diçe ji hêzê tê xistin û

dikeve pozîsyona mal û milk. Malbat di cewherê xwe de dibe qefesek.

Qasî malbata di bin rêveberiya mêr de ti koletiyeke daîmî û kûr nehatiye dîtin. Ev tespîtek e, hemû sosyologên navdar li ser hemfikir in. Ji bo mirov asta koletiyê ya civakê analîz bike, ji sedî sed divê mirov asta koletiyê ya jinê bi awayekî berfireh çareser bike. Jin ne tenê ji aliyê mejî û kiryaran ve hewce hatiye kirin, di heman demê de hemû hisên wê, tevgerên wê yên bedenî, nîzama dengê wê, lixwekirin û vexwarina wê jî bi koletiyê re têkildar hatiye kirin. Xelek bi poz, guh, zend û lingên wê ve hatine kirin. Ev sembolên zincîra koletiyê ne. Di serdema navîn de kembera bakîretiyê jî bi jinê ve tê kirin. Têgihîştineke yekalî ya namûs û exlaq tê pejirandin. Ji aliyê îdeolojîk ve jinê tine dikin. Hemû nirx û buha ji destên wê têne girtin û wê dixin rewşa mal û milk. Bi qelen û next tê wezinandin.

Koletiya jinê ku çavkaniya wê civaka Sumeran e, mijarek e, hê dest pê nehatiye kirin. Hewcebûna bi civaka hiyarerşîk dest pê kir, di perestgehên rahîban re hat derbaskirin û xistin holika mêr, bi vî awayî bi statuya herî giran bi dawî kirin. Ji wê demê û vir ve, statuya ku pêş de birine ev e. Mijara bingehîn a wêje, exlaq û perwerdeyê her jin bû û dianîn ziman ku jinek bi hemû his û tevgerên xwe çawa dikare ji mêrê xwe re xizmetê bike. Koleyê mêr bi berhemê zêde yê bi dest dixistî û hêza xwe ya milan, statuya xwe destnîşan dikir. Koletiyeke naveroka wê aborî bû zêdetir derdiket pêş. Lê jinê bi hemû beden, ruh û fikra wê dikin kole. Eger hûn mêrekî kole serbest bikin dikare bibe mirovekî azad, lê hûn jinekê serbest bikin, wê biçe koletiyeke hê xirabtir. Ev rastî bi xwe, koletiyeke kûr nîşan dide. Çavdêrekî baş dema li jinê temaşe bike, bi hêsanî dikare bibîne, jin çawa bi her awayî li gorî daxwazên mêr hatiye hûnandin û reng dayînê. Ji dengê wê heta meşa wê, ji nertina wê heta rûniştina wê, wek bibêje; "ez hatim qedandin" Li ser koletiya jinê analîz nehatine kirin, yek ji sedemên bingehîn ê vê rastiyê, çilekiya mêr û ruhê wî yê tatmînkar ê dîktator e. Prototîpa qral-xwedayên di civakê de, efendiyê jinê mêrê li malê ye. Ew ne tenê zilamek e, ew xweda-mêr e. Ev taybetiya mêr bêyî ku biguhere, bandora wê heta roja me ya îro hatiye.

Civaka dewletparêz a koledar di warê ekonomîk de rengê fabrîkeyeke mezin lê dixe. Ji fabrîkeyên hemdem, ji aliyê xwedî û teknîkê cuda dibe. Kole mîna keriyan têne xebitandin. Li nav zeviyan, li kanên keviran û di avakirina xaniyan de têne xebitandin. Ev yek ji berhemên serdema Arkaîk mane pir baş tê fêmkirin. Kole ji

heywanan dijwartir têne rêvebirin. Kole heywaneke tê xebitandin. Milk tê dîtin. Tenê amûrekî hilberandinê ye. Kole li derveyî huqûqê ne. Mîna eşyayek ku hisê wê nebin. Di mijara koleyan de qonaxa mejiyê analîtîk ê mêran gihîştiyê pir zêde balkêş e.

Di civaka dewletparêz a koledar de saziya mulkiyetê jî gava destpêkê têkûz diavêje. Cewherê sîstemê ew e ku civaka jor, civaka jêr bi her awayî dike milk. Xweda-qral û alîkarên xwe xwediyê her tiştîne. Xwedîtî encameke xweza ya serdestiyê ye. Egoya mirov eger derfetên pêşketinê bibîne, taybetiyên wê yên sînor nenas hene. Di serdema avakirina sîstemê de ji ber ku bandorên bi sînor bikin nîne, rê li ber kulta xweda-qral vedibe. Nîzama mulkiyetê ya civaka xwezayî nas nedikir, ji mulkiyeta dewletê dest pê kir dawerivî malê û her saziyê. Di her kesî de hisa mulkiyetê afirand. Mulkiyet hîmê dewletê tê hesibandin û tê pîrozkirin. Ji vir û pêve ya were kirin ev e; wê hemû dunyayê bikin milk. Sînorên dewletan, zevî û erdên xanedanan, sînorên welatan, bi awayên cihêreng sînorên mulkiyetê heta îro wek dayîneke xwedê kirin fitreta mirov. Ya rastîn, mulkiyet wek çavkaniya kurtêlxuriyê dizekî ye. Saziya herî zêde piştgiriya kollektîf a civakê xira dike. Lê ji bo xwedîkirina civaka jor jî saziyeke bingehîn e, dest jê nabe.

Me hewl dabû, em destnîşan bikin ku civaka ekolojîk xweber civaka xwezayî ye. Piştî ku civaka dewletparêz bi berfirehî û kûrahî mezin dibe, civaka ekolojîk gav bi gav bi paş ve tê xistin û ev jî wek yek ji nakokiyeke bingehîn a civakî tê heta îro. Nakokiya civakê ya hundurîn çendîn mezin bû ye, nakokiya wê ya bi atmosfera der ve re jî ew çend zêde bûye. Tehekuma li mirov bi xwe re tehekuma li xwezayê tîne. Eşkere ye ku sîstemeke dilê wê bi mirov neşewite, dikare her cure xirabiyê bi xwezayê bike. Jixwe hakîmiyet û fetîh wek du rastiyên bijare di exlaqê çîna serdest de cih girtine. Hukumkirina li xwezayê, bi qasî hukumkirina li mirov wek heq û helwesteke bi şeref tê dîtin. Zindîtiya xweza û pîrozkirina wê ya civaka xwezayî tine hatiye hesibandin. Mîna dijminekî fetîhker. Wexta ev têgîn li ser zêhniyet û tevgera civaka dewletparêz serdest bûn, êdî ji felaketên mezin ên hawîrdorê re ku di roja me ya îro de bûne xetereke ciddî, rê heta dawiyê vebûye.

Nirxandinên me yên ji bo bi navkirina civaka dewletparêz a di qonaxa damezrandinê de divê têrê kiribe. Mijara balê dikişîne ev e; çima ne koledar, çima em têgîna civaka dewletparêz a koledar bi kar tînin, dibe ku ev pirs were kirin. Ez wer bawer dikim ku wexta em

dewletê wek civaka jor qebûl bikin, bi kar anîna vê têgînê hê berçav e, û wê ji armanca me re xizmetê bike. Dewlet nebe em nikarn koletiyê bifikirin. Şertê bingehîn erka dewletê ye. Dewlet saziyeke mucered nîne, ji ber ku rêxistinbûneke hevpar a kesên serdestiya amûrên mêtingerî û zordariyê kirine destê xwe. Xizmetên giştî yên ewlekariyê ku ji bo her kesî hewce ne, û xizmetên din ên ji bo gelemperiyê, dibin perdeyek ji bo vê rêxistinbûna behsa wê tê kirin veşêre û li ber çavê civakê rewa bibe. Yek ji sedemên din a jê re tê gotin civaka dewletparêz ev e; formên civakî yên feodal û kapîtalîst jî xwe dispêrin heman dewletê û hebûna pêşketina xwe pê dewam dikin. Saziyên hevpar ên komên mêtinger û zordar, rêxistinbûnên bi navê dewletê ne. Ji bo mêtingerî û zordariyê ti sazî bi qasî dewletê bi tesîr û bi bereket nebûye.

Formên orjînal ên civaka dewletparêz ên koledar, zêdetir mînakên wê Sumer û Misr e, wek xeleka duyemîn, mînakên Hind, Çîn û Hîtît dubare ne. Saziyên cewherê xwe heman tişt, bi guhertina rengê xwe timî xwe ji nû ve ava dikin. Bi awayekî taybetîtir mînakên Îran, Grek-Romayê di warê zêhniyetê de dibin sedema veguherînin girîng. Li ser rêya exlaqê azad û awayê fikra felsefîk gavên girîng pêş de hatine avêtin. Di saziyên koletiyê de pir nebe jî ber bi başbûn û nermbûnê ve gav hatine avêtin. Sîstemê BZ di navbera 1000-300 de rengê xwe yê klasîk wergirtiye. Serdema xwe ya stewiyayî û gihîştî BZ di navbera 2000-1000 de jiyaye. BZ 3000-2000 damezrandina seretayî ya serdema arkaîk e.

Bêguman mirovatiyê di serdema koletiyê de ku weke şaristaniya çînî û û sîstema bingehî ya civakê bû, pêşketina xwe dewam kiriye. Sîstema koledar her tiştî diyar nake. Şoreşa bajêr em nikarin wek berhemê koledariyê bibînin. Bêyî dewlet û koletiyê jî bajar dikarin pêş de biçin. Em gelek bajarên nebûne dewlet dibînin. Xetayeke mezin e, mirov nivîs, matematîk, ilmên cihêreng û pîşe, avakirin û şaxên huner ên bi bajarbûnê re pêşketine, wek encameke sîstema koletiyê bibîne. Di vî warî de Marksîzm jî di navê de, gelek ekolên ramanê, koletî mîna qeraseyekî pêşketinê nirxandine û bi vî awayî şaşiyeke bingehîn kirine. Ya rastîn îspat dikin ku huner û ilîm ji desthilatdariyê qut nebûne. Ji nirx û buhayên dewletê herî zêde xistine bin kontrola xwe di serî de huner û ilîm tên. Hem ji bo rê li pêşiya pêşketinên azad bigire û hem jî ji bo berjewendiyên xwe bi kar bîne, bi aweyekî dijwar hewceyî bi kontrolkirina huner û ilmê dibîne. Sîstema koledariyê, bihêlin pêş xistibe, berovajî dîrok nîşan dide ku huner û ilîm asteng kiriye. Keşf û vedîtinên di navbera salên

BZ 6000-4000 de ku wê demê dewleta koledar nîne, mirov dikare bi serdema navbera salên PZ 1600-1900 re qiyas bike. Tiştên di 5000 salên navberê de pêk hatine gelekî kêm in. Wek tê zanîn, zanist di salên navbera 1600-1900 de bi giranî berhemên ferdî ne. Dewletê wek her carê tiştê kiriye tenê ev zanist kirine bin destê xwe.

Di pêkhatina bajaran de rola ramana analîtîk gelekî heye. Herçî civaka koledar e, ev şêwazê ramanê di çarçoveya berjwendiyên çînî de belovajî kiriye. Naxwe koledariyê ramana analîtîk pêş de nebiriye. Ya sîstema koledariyê kirî ev e; bi şêwaza vê ramanê cîhaneke mezin a derewan afirandiye û mîna kabûsê berdaye ser mejiyê mirovan. Eger pêşketina çanda hevpar a mirovatiyê huner û zanist bi forma koledariyê û civakên din ên çînî ve were girêdan, heye ku bi rastiya îqtîdar-zane û serweriya dewletê ya li ser zanist û huner were ravekirin. Nirxandinên bi vî rengî li ser navê tevger û îdeolojiya wekhevî û azadiyê, eger nezanîn nebe, bêyî hay ji xwe hebe girêdana bi bloka desthlatdar ve îfade dike. Marksîzm-Lenînîzm jî bin, ev hukum naguhere. Marksîzm-Lenînîzmê nekarîn xwe tam ji bloka îqtîdar-zane rizgar bikin û ev jî yek ji sedemên bingehîn bû ku rê li ber hilweşîna sosyalîzma reel vekir ku ezê di beşên pêş de, hewl bidim vê mijarê bi awayekî berfireh rave bikim.

Forma civaka koledar a dewletê PZ di navbera salên 250-500 de ketiye krîzê û wek formeke jorê wê, bi serdestiya civaka feodal bi encam dibe. Di hilweşîna vê sîstemê de êrîşên ji der ve yên komên "barbar" ên xwediyê taybetiyên civaka xwezayî, di hundur de rizîn û têkoşîna Xirîstiyaniyê xwediyê bandoreke diyarker in. Lê di vir de ya ji holê radibe ne dewlet e, forma wê ya koledar e. Dewlet hê xwe bi hêz dike û digihîne forma feodalîzmê.

**D- Civaka devletparêz a feodal**

**Civaka koletiyê ya stewiyayî**

Pir girîng e ku mirov di dîrokê de dewletê wek zêhniyet û herikîna saziyan bibîne. Naxwe ku mirov dewletê, wek car ava dibe û car xira dibe, saziyek ji aliyê çîn û koman ve tê damezrandin û yan jî bi rengekî dînî û netewî tê avakirin bibîne, wê ev yekê me ji nêzîktirkirina rastiyê wêdetir, bixe nav nertineke mijgîr û qetqetokî. Eger mirov dewletê wek saziyeke daîmî û têgîneke bingehîn a civakê binirxîne û wek "gulokeke berfê, gulokeke agir" ya her ku diçe mezin dibe, carnan dora xwe dişewitîne û carnan jî dicemidîne bibîne, bawer dikim wê ji bo hînkirinê bi kêr be. Dewlet, ji roja ku pêk hatiye û heta îro mezin bûye, rengên cuda wergirtine. Lê ji aliyê

cewher û naveroka xwe ve neguheriye û navber nedaye meşa xwe. Ev rastiyeke welê ye, em nikarin behsa bêhndayînek wê ya du saniyan bikin. Eger navber û bêhnê bide, wê bikeve pêvajoya tinebûnê. Ev rewş dişibe veqetîna ruh ji bedenê. Yek saniye be jî wexta ruh ji beden derket, ew beden êdî nikare hebûna xwe dewam bike. Piştî saniyeyeke din em nikarin bang li ruh bikin û bixin hundurê beden. Dewlet jî hebûnek wisa zindî ye. Pirbûna reng û şêwazên wê jî em dikarin bişibînin cureyên famîleyan. Ji heman famîlya heywan û nebatan gelek cureyên din dikarin bi hecmên cuda zêde bibin. Lê taybetiyên wan yên bingehîn wek xwe dimînin. Eger mirov behsa cureyên wê yên baş û xirab jî bike, li dijî heman şêwazê ravekirinê nîne. Wexta Lenîn digot; "Li dijî dewleta bûrjûwa, dewleta proleter" bawer dikir ku tarîfeke rast û durust kiriye. Lê ya rastîn, wek formeke civakî, forma dewletê ya "proleter" nabe. Ji Spartakus vir ve, gelek kesî ceriband, lê hemû tewş bûn. Ceribandina Sowyetê bi xwe jî, tevî ku ji sê paran parek cîhanê zevt dikir, nekarî xwe ji hevdeketinê xilas bike. Emê sedemên vê yekê di beşê pêwendîdar de bi firehî rave bikin. Lê divê baş were zanîn, forma dewletê, şêwazekî jiyanê yê zordar û mêtingeran e. Wisa hatiye avakirin. Çînayetî û komên li mêtingerî û zordariyê rast werin, formên wan yên azadî û wekheviyê nabin. Cewherê wê vê yekê qebûl nake, şêwazê wê jî li gorî wekhevî û azadiyê nîne.

Guloka me ya agir û berfê ji Sumeran ve gindirî û her çû mezin bû. Gelek agahî îspat dikin ku mînakên Başûrê Emerîka û Çînê jî bi havênê vê modelê hilatine. Bêguman bi şert û mercên derdora xwe jî mezin bûne. Lê wek fikir û sazî, bi giranî çavkanî dewleta rahîb a Sumeran e. Dîsa sererast an jî ne sererast ji modela yezdanî re jî bûye çavkanî û ev bi giştî wek tespîteke zanistî tê pejirandin. Lêkolîna vê pêvajoyê, bi agahiyên ilmî, karê dîrokzana ye. Ya divê ku em bikin ev e; em cewherê mijarê zevt bikin, ruhê wê rast bixwînin û eşkere bikin. Modela koletiya seretayî ya dewletê ku ji Sumer û Misrê destpêkir, bi Hitît, Medya, Îran, Hînd, Çîn, Grek, Roma, Aztek û hê di astên jêr de, li zeman û mekanên cuda derket holê, mîna famîlyayekê mezin û pir bû û bi qonaxa forma feodaliyê stewiya û heta vê qonaxê, hewl daye biçizire û dawerive nav her şane û hucreya civaka xwezayî, gelek qad ji xwe re vekirine û karîbûye stûtewandin û mêtingeriyê bike hunerekî muhteşem. Di bin navê "hunerê polîtîka û eskeriyê" de bi awayekî sîstematîk, hunerê her cure kuştin, mêtingerî û zordariyê hatiye afirandin. Ji bo vî hunerê xwe rewa bike, serî li hunerên bingehîn mîtolojî, destan, beşek ji

naveroka pirtûkên pîroz, peyker, resim û muzîkê daye. Bêguman derketina van huneran bi destê çîna koledar nîne. Lê ya rastîn, baş tê zanîn, ji bo van huneran bixin xizmeta xwe meharet û hostatiyeke mezin nîşan dane. Hunerê wan ev bû; karîbûn zêhniyeta mirov ji binî ve veguherînin. Ev yek jî, bi amûrên maddî û manewî yên ku mirovatiyê bi keda hezarê salan afirandibûn, kirin. Sîstema koledar aliyê wê yê afirîner nebû, berovajî ji rê derxist û belovajî kir. Di vî warî de dubare bibe jî divê em balê bikişînin ser şîroveyên şaş ên di warê azadî û wekheviyê de ku ev yekê her tim bibe wezîfeyek ji bo em erkên xwe yên azadî û wekheviyê bi cih bînin.

Ka em bi kurtî careke din çavekî li saziya dewletê bigerînin ku heta em digihîjin qonaxa dewletê ya feodal. Qral-xwedayên Sumer û Misriyan, wexta dimirin, xizmetkarên jin û mêr, ji bo li wê dunya din jî ji wan re xizmetê bikin, bi saxî tevî xwe defin dikirin. Ji bo avakirina her qebreke xwe bi sed hezaran kes di asta mirinê de xebitandin. Ji bo zumreyeke piçûk kesên li hawîrdora îqtîdarê quncikek ji cennetê ava kirin û bi kesên din re danûstendineke ji kerî û heywanan wêdetir kirin. Klan, qebîle û saziyên din ên civakî yên li dijî koletiyê derketin, li siyaseta îmhayê qewimandin. Ji serê mirovan qesir û birc ava kirin, û ev yek wek karekî bi şan û şeref dîtin. Di nav civaka mirov de yekem car kuştina sîstematîk wek hunerekî xwezayî vedîtin. Bi awayekî serketî karîbûn jinê bixin qefesê. Hemû xeyalên xwezayî yên zarokan berbend kirin. Li ser navê azadiyê, mirov neçar kirin, li çolan, çiyan û di kûrahiya daristanan de bijîn. Ne tenê keda koleyan, her weha hemû bedana wan kirin amûrekî hilberandinê. Ji mejiyê analîtîk, li ser hîmê derewan mîtolojiyeke muhteşem pêk anîn. Wek mêtingerî û zordariya efendiyan têrê nekiribe, rahîban jî cîhana manewî ya xwedayan a zordestî û mêtingeriyê kirin îbadet û weke baweriyeke bingehîn di mejiyê mirovan de bi cih kirin. Ferz kirin ku exlaq û huner, timî pesnê wan bide û wan xweşik bide xuyakirin. Di şûna têgihîştina hawîrdora xweza û têgihîştina civaka mirov a gerdûna zindî de, têgihîştina mirov bi xwedayên li ezman û li bin erdê yên ceza û bêruh dikin, tijî kirin. Ji bo kulmeke efendiyan xela û tinebûn nebû, lê komên din timî di nav birçîbûn û nexweşiyê de digevizîn. Di şahiyên xwe de jî lîstikên tê de mirov dihatin kuştin esas digirtin.

Em vê tabloyê hê jî dikarin dewlemendtir bikin. Lê hinavê dewleta koledar bi vî awayî hatibû tijîkirin, ev bi hemû bermayî û bîranînan di hişê me de ye û li ber çavên me ne. Ji mezinê heta piçûkê, bê îstîsna, hemû cureyên dewletê yên di neqebên demê de

hatine avakirin, tabloya me destnîşan kir, pêdiviyên wê bi cih anîne û heta lê zêde kirine, ev yek jî ji erk û wezîfeyên hunerê eskerî û polîtîk hesibandine. Eger em tenê kirinên împaratoriya Bîzans û Romayê rêz bikin, tabloya hovane ya derbikeve holê û zehmetiyên aqil û wijdanê ti mirovê asayî ranake bi bîr bixîne, wê rastî hinekî din baş were fêmkirin. Wexta Pirtûka Pîroz rastiya dewleta koledar wek "Levîathan" bi nav kiriye, pir bi hostayî li hedefê xistiye.

Analîzkirina jihevketina forma civaka vê dewletê pêdiviyek mijara me nîne. Lê dîsa jî em dikarin bibêjin; qebîleyên wek "barbar" têne bi navkirin û taybetiyên civaka xwezayî di xwe de dihewînin, berxwedan û êrîşên wan ev civak ji hêzê xistiye. Wek navendên şaristaniyên koledariyê; li rojhilat Çîn, Hînd û Îran, li rojava împaratoriyên Roma; li bakur Germen, Hûn û Îskît, li rojava di serî de Ereb û Berberî, êrîş û berxwedanên gelek qebîle û qewmên bi navên cuda, kirin ku êdî nikarîbûn hebûna xwe dewam bikin. Di lîteraturiya koledariyê de ji van koman re "barbar" têne gotin, naxwe di cewherê xwe de ev kom herî zêde nêzî azadî û wekheviyê ne. Lewra ya rast ev e; ev kom wek hêzên şoreşger ên dikarin rê li ber pêşketinan vebikin, werin bi navkirin. Serekên qewm û qebîleyan dilê xwe dibijandin efendiyan, girîng e mirov serekan û girseyê ji hev bike. Di hundur de jî di serî de Xiristiyanî, Manîzm û Îslamê, bi giranî ekolên dînî yên bûbûn hêviya xizan û azadîxwazan, binê civaka koledar kolan û kirin ku nikaribe dewam bike. Her çend zehmet e em bibêjin ev ekolên dînî bi zanebûn xwe dispartin azadî-wekheviyê jî, dîsa di cewherê wan de xwesteka xilasbûna ji koletiyê eşkere xuya dike. Di nav vê ekolê de xilasî û xelasker têgînên berçav in. Navekî din ê Hz. Îsa "Mesîh-xilaskar" e. Manî bi xwe hawariyekî pir rengîn û aştîxwaz e. Gotina Îslamiyetê tê maneya "teslîmbûna aştiyê" Daxwazên bingehîn ên dibin sedema jihevketina sîstemê xilasî û aştî ye. Şêwazê formulekirina daxwazan dînî ye, ev yek ji zêhniyeta wê demê ye. Lewra mirov dikare fêm bike, ka çima bi sînor rê li ber rizgarî û aştiyê vedikin.

Ev feslsefe, mezheb û ekolên gnostîk ku li ber siya împaratoriyê mezin bûn, bêguman hem ji aliyê zêhniyet, hem jî ji aliyê eskerî û polîtîk ve ketine bin bandora sîstemê. Wê careke din koletiya klasîk ava nekin. Ji ber ku bi şîdet lanet lê anîne û baş wê nas dikin. Lê nizanin wê di şûnê de çi û çawa ava bikin. Jixwe gelek kesayetên ku sîstema koletiyê di asta huner de pejirandibûn, wê bi hêsayî karibin siyaseten van dînan qebûl bikin û ji bo daxwaziyên xwe bikin zemînekî rewa. Ji lewra Konstantînê Mezin PZ di sala 312 de

Xirîstiyaniyê qebûl dike, pêre dikeve Romayê, xwe împarator îlan dike û paytexta wê dibe Stenbola îro. Di sala 325an de jî Xirîstiyaniyê wek dînî fermî îlan dike. Yên bi qasî sêsed salî li dijî sîstema koledar şer kirin, bi sîstema koledar a dînî re li hev kirin. Manî bi xwe wê bikeve bin dawa duyemîn împaratorê mezin ê xanedaniya Sasaniyan Şahpûr. Hz. Mûhammed ku hê zêdetir radîkal e, wê karibe bi teolojiya Cihû û Xirîstiyaniyê li ser mîrateya împaratoriya Bîzans û Persan hîmê sîstema xwe deyne. Gişê wan, wê bi zanebûn li dijî sîstema koledariya klasîk têbikoşin û wê karibin vê sîstemê li dawiyê bihêlin. Lê qalibên ku bi giştî dikevinê, qalibên dewleta rahîbên Sumeran vedîtibûn. Lê wê van qaliban hinekî din nerm bikin, ji bo mirovatî karibe xwe li wan rabigire. Naxwe hîç nayê hişê wan bi şertên nû civaka xwezayî nû bikin, heta wê vê sîstemê ji sîstema koledariyê zêdetir bi "pûtperestiyê" mehkûm bikin. Rastiya dewletê ya nû ku bi van aliyên xwe derdikeve pêşiya me, eşkere xuya dike ku dewleta kevin e reng guhertiye. Komên barbar ên hê nêzî civaka xwezabûn, bi saya şefên xwe yên zû de bi sîstema koledariyê şerefdar bûne, ewê jî bi formeke nû ya dewletê razî bibin. Ev pêvajoya ku di dîroka mirovatiyê de serûbinbûneke mezin îfade dike, PZ di navbera sedsalên 5. û 6. de diqewime. Pêvajoyeke din mîna vê, BZ di navbera sedsalên 6. û 5. de li dijî koledariya klasîk diqewime. Di vê pêvajoyê de dîn û ekolên felsefîk û exlaqî yên Sokrates, Zerduşt, Konfuçyûs û Bûda hene. Di encamê de sîstemên civakî yên Grek, Roma, Hînd û Çînê formên hê pêşketî afirandin.

Marksîzm ji bo pêşketinên dîrokî yên bi vî rengî, rola diyarker dide amûrên hilberandinê û têkiliyên di navbera wan de û roleke duyemîn dide şerê zêhniyetê. Dîsa giraniyê nade têkoşîna komên olî û etnîsîteyê. Wek şîroveya dogmatîk a rêbaza diyalektîkê, bi vî awayî mirov nikare bi tevahî li dîrokê serwext bibe. Mirov heta tevgerên mezin ên siyasî û zêhnî yên civakê nebîne, şîroveyeke di çarçoveya sînorên aboriyê de wê kêm bimîne. Eger maneya tevgerên mezin ên koman neyê dîtin û wek hêza veguherînê teknîk û hilberandin were bilêvkirin, dibe ku bêyî hay jê hebe di çarçoveya dewletê de asê bimîne. Eger tevgerên mezin ên etnîsîteyan - rastiya qebîle, eşîr û qewman - ji hev neyê derxistin û dîrok were şîrovekirin, heye ku hem di warê rêbazê, hem naverokê de şaşiyên mezin bêne kirin. Şîroveyên dîrokê bi rêbazên Marksîst bi sedema vê rastiyê sûdmend nînin û rê li ber şaşiyên girîng vedikin. Em, ji bo ku îdealîzma pesnê civaka jor a kevneşop dide li dawiyê bihêlin, hewce

nîne em berovajî, dîrokê bi nerîneke teng a çînî û aborî analîz bikin. Yanî pêwîst nîne em meteryalîzmeke hişk wek rêbaz bi kar bînin.

Pirsgirêkeke din a civakî dîrokî ku divê were zelalkirin ev e; gelo wexta em dibêjin; "dema buhurî li dawiyê ma" em çi fêm dikin? Li gorî qanûna pêşketinê ya bi veguherîna xwezayê û di biyolojiyê de bi tekamuliyet îspat bûye ku rastiyek berê, hebûna xwe di ya piştî xwe de dewam dike. Mînak, wexta atomeke hîdrojenê dibe cot werdigere helyûmê, lê hîdrojen hebûna xwe di nav helyûmê de dewam dike. Eger atoma helyûmê were parçekirin, hîdrojen ji nû ve derdikeve holê. Lê ev veguherîn ji bo helyûmê cuda ye û dibe rastiyeke din. Di biyolijiyê de suwarbûna xelekan li hevdu pêvajoyeke bi heman rengî ye. Ya berê di ya piştî xwe de veşartiye. Di civakê de jî guhertinên bi vî rengî hene. Civaka jor, civaka jêr di hinavê xwe de hildigire, lê berovajiyê wê rast nîne. Civaka jêr, civaka jor di hinavê xwe de hilnagire. Ji ber ku rastiyeke nû nîne. Ji lewra, di encama êrîşên der ve û hundur de li sîstema koledariyê hatin kirin, civaka feodal bi barê nû yê hilgirtî, reng da xwe. Di hinavê xwe de gelek nirxên sîstema koledar dihewîne. Bi awayên berê najîn, di encama sentezekê de bi nirxên nû û bi formên nû dijîn. Ji holê ranebûne, bi reng û awayên xwe yên guhertî dijîn. Jixwe sîstema koledar a Romayê bi xwîna teze ya barbaran û Xirîstiyanan karîbû di xwe de hêza nûbûnê bibîne. Ji bo mirov di nav diyalektîka dogmatîk de nefetise û bûyerên dîrokî rast şîrove bike, divê mirov vê rêbazê bi kar bîne.

Li dijî civaka xwezayî, sîstema civaka feodal jî veguherîna zêhnî kûrtir dike. Bi rêya mejiyê analîtîk gavên mezin diavêje. Şêwazê fikrê hem ê felsefî, hem jî yê dînî, zêhniyeta civaka serdest a nû pêk tîne. Her du awayên fikrê jî li ser hêmanên civaka berê yên vediguherin, serdestiyê bi dest dixin. Wek civaka Sumer çawa nirxên civaka neolotîk ji bo sîstema xwe ya nû sentez kir, civaka feodal jî hem ji hundurê sîstema berê û hem jî ji derveyî wê, nirxên çînên bindest û nirxên manewî yên etnîsîteya li ber xwe dida sentez kiriye. Di vê pêvajoyê de herikîna pratîkê diyarker e. Bi gotineke din, pratîk dibe hêzeke ku hebûnê dide demê. Dem êdî pratîk pêk hatiye. Zêhniyet taybetiyên xwe yên mîtolojîk bi têgînên felsefî û dînî nû dike. Hêza împaratoriyê ya mezin dibe, di şûna pir-xwedayên qels û bêhêz de, ber bi xwedayekî mezin ê ku gerdûnê temsîl dike ve diberide. Bûyerên di jiyana maddî de diqewimin di zêhniyetê de jî bersiva xwe dibînin. Yek ya din xurt dike. Di vê pêvajoyê de pirxweda cihê xwe ji xwedayekî bi tenê re dihêlin. Pratîka dewletê

ya hezar salan êdî têgîna qral-xwedê rizandiye. Bi taybetî senteza Rojava-Rojhilat a bi Îskender destpêkir, bi vê maneyê qonaxeke girîng e. Îskenderê bi zêhniyeta Arîsto mezin bûbû, bi tevahî li fikra qral-xwedê hayil bûbû. Îskender bi xwe, bi derdora xwe û bûyernivîsên xwe dida hiskirin ku fikra qral-xwedê li hev çêkiriye. Tevî vê yekê, ji bo otorîteya xwe biparêze, ew jî dewam dike, vê fikrê bi kar tîne û xwedabûyîna xwe dide îlankirin. Xwedabûna xwe bi darê zorê, bi Atîna ya li ber xwe dide, dide erêkirin. Di serdema împaratorên Roma de kulta qral-xwedê êdî di dema xwe ya dawî de ye. Wexta împarator dimirin, digotin; "derket qatê xwedê", bi vê yekê jî eşkere dibû ku êdî hêdî hêdî ev kult li dawiyê dima.

Eqîdeya xwedê ya teslîs - kur, bav, ruhê pîroz - a Hz. Îsa di dîrokê de bû sedema çelqîn û germoleyên mezin. Şoreşa zêhniyetê ya bi Îsa destpêkir pêşketineke mezin e. Pêvajoya derbasbûnê ya di navbera qral-xweda û însan-qralan de pêk tîne. Qralan heta wê rojê xwe wek xwedê nîşan dabûn û Hz. Îsa jî di bin vê bandorê de dilê xwe bijandibû qraliyeta Qudsê, lewra xwedê nebe jî wek kurê xwedê tevdigere. Ya rastîn, têgîna kurê xwedê ya di pirtûka pîroz de xwediyê maneyeke kûr a sosyolojîk e. Di şûna xwedê de kurê xwedê pêşketineke nû ye. Ruhê pîroz jî tê maneya zurriyeta xwedê.

Hz. Îsa ku di nav zêhniyeta demê de derket, ya esas hewl dide tevgereke reformê biceribîne. Lewra hem di dînê Cihûyan de, hem di kulta Romayê de rê li ber cihêrengbûnê vedike. Ji ber ku hewldana Îsa li gorî demê xwedî taybetiyên şoreşgerane bû, hem qraliyeta Yahûda, hem bi hevkariya waliyê Romayê, ew li çarmîxê xistin. Girseyên mezin ên bêkar û xizanan ku wê demê pir bûne, oldar û karmendên dewletê yên asta jêr, eleqeyê nîşanî Îsa didin. Jixwe Hz. Îsa di nav rojekê de dernakeve. Bi terîqeta wê demê ya girîng "Esseniyan" re di nav têkiliyê de ye. Dîsa ji Hz. Yehya ku wek peyxember tê zikirkirin, xelîfetiyê werdigire. Berî ku Îsa li çarmîxê were xistin, serê Yehya tê jêkirin. Di vê demê de girseya bêkar û xizan her mezin dibe. Bi kurtî, sîstema koledar di nav krîzeke mezin de ye. Şoreşa zêhniyetê ya bi awayê Xirîstiyanî, encama beridandin û tekamula sedsalan e. Bi awayekî, dişibe tevgerên serdema nêz ên Marksîst, Sosyal Demokrat û Sosyalîstan. Xirîstiyanî li ser rêya Romayê dimeşe û wek siya wê tevdigere, belav dibe. Mirov dikare, vê tevgerê di dîrokê de wek yekemîn partiya xizanan a herî mezin jî bibîne. Ne etnîsîte, humanîzm esas wergirtiye. Bi vî aliyê xwe, li pey kozmopolîtîzma Romayê çûye. Îdîaya wan a berxwedanê ya herî girîng li dijî împaratorê Romayê ev bû; digotin, "împarator nikare

bibe xwedê." Xwedayê bav û kurê wî Hz. Îsa heye. Di vê hevokê de ya esas ew e ku zêhniyeta împaratoriya Romayê ji hev were derxistin. Şerê dînî xuya dike, di esasê xwe de şerekî siyasî ye. Di serî de şagirtên -hewariyên - Îsa, bi fedekariya gelek ezîz û ezîzeyan, rahîb û rahîbeyan, zêhniyeta manewî ya Romayê tê fetihkirin. Bi Konstantîna mezin fetha siyasî temam dibe. Xirîstiyanî, êdî îdeolojiya fermî ya dewleta nû, ya Bîzansê ye. Ji serî heta dawiyê şerekî dijwar ê mezhebbûyînê jiyaye. Ev hevrikî heta îro jî dewam dike. Di cewherê dabaşê de şerê berjewendiyên çîn û etnîkên cuda heye.

Tê destnîşankirin ku Xirîstiyanî wek mezhebekî Mûseviyetê pêş ketiye, Mûseviyet jî ji kevneşopiya peyxemberiya serhildêr a li dijî qral-xwedayên Sumer û Misriyan tê ku ew jî çavkaniya xwe kevneşopiya peyxember Îbrahîm e, bi Hz. Mûsa gav diavêje, piştî xelekên mezin ên mîna Dawûd û Îşa wek tê gotin bi Hz. Îsa dewam dike û teolojî bi vî rengî têra xwe li ser vê mijarê radiwest e. Mezhebekî dawî yê vê kevneşopiyê jî wê bibe Îslam.

Tevgerên peyxembertiyê, tevî ku aliyê wan ê zêhniyetê li pêştir e, aliyê wan ê civakî siyasî jî xurt e. Qral-xwedayên arkaîk li dijî koletiyê li sîstemeke nermtir û mirov karibin xwe lê rabigirin, digeriyan. Pir zêde ketine bin tesîra mîtolojiyên Sumer û Misriyan. Lê têgihîştina xwedê û hûnandina mîtolojiyan, bi tesîra demê re wek moda wan derbas bûye, nirxandine. Dibînin ku koletiya arkaîk bi rengê heyî nabe dewam bike û mirov nikarin xwe lê rabigirin. Her weha armanc heye derfet û îmkan werin amadekirin ji bo bazirgan û pîşesaz karibin ber xwe bibînin û bi aweyekî xweser çînayetiya xwe pêş de bibin. Ji bo vê yekê jî, pêdiviya xwe ya îdeolojîk ji mîtolojiyên berê tedarik dikin. Ji ber ku ji tebeqeyên jêr ên bajêr tên, di nav civaka xwezayî ya derveyî bajêr de cih nabînin. Dişibin bûrjûwaziya piçûk a roja me ya îro. Ji ber şert û mercên jê tên, bi awayekî xwezayî xwediyê îdeolojiyeke serbixwe nînin. Dibe ku îdeolojiyeke wan a pevzeliqandî hebe. Zêhniyeta wan wek ji aweyekî îdeolojiya çîna navîn be. Îdeolojiyeke hem ji tebeqeya jor, hem ji tebeqeya jêr girtine. Karîbûne têgînên azadî û wekheviyê yên komên etnîk ên çîna jêr û têgînên rêveberiyê yên çîna jor a rêveber bi hev bikin û kevneşopiya zihniyeta xwe, çandeke cihêreng biafirînin.

Versiyona kevneşopiyê Îslam, hê zêdetir cih dide mejiyê analîtîk. Ji îddîaya qral-xwedê bi tevahî qut bûye. Hz. Îsa ne wek kurê xwedê, wek peyxemberekî, qasidekî xwedê rave dike. Cudahiya di navbera Însan û xwedê de pir bi hostayî tê destnîşnakirin. Îdîaya

bingehîn a pirtûka pîroz Quranê ew e ku têgihîştina xwedê gerdûnî ye. Xwedê pir mucered tê teswîrkirin. Weke ku enerjiya gerdûnê tê fêmkirin. Aliyê vê têgînê yê zêde derdikeve pêş, têkiliya wê ya bi rastiya civakê re ye. Di navbera dewleta navendî ya muccered dibe û xwedayê mucered ê tenê de têkiliyeke xurt heye. Bi pêşketina têgîna "El" têgîna "Ellah" têra xwe xurt bûye. Ya esas, teolojiya Sumer gihîştiye qonaxa xwe ya dawî. Çîroka xwedayan a wek hebûnên mîtolojîk dest pê kir, bi Ellahê ku her gotina wî fermana mutleq e bi dawî dibe. Wexta mirov bi vî awayî li gotina Hz. Mûhammed a "peyxemberê dawî" binere, tê fêmkirin. Mîtolojiya Sumeran hundurê wê wer tê pûçkirin, êdî wê ji bo dînên nû neyê bi karanîn. Metafîzîka serdemê wê were pêşdebirin. Ji ber pratîka zêde ya civakê, xweza pirtir tê naskirin û dest pê dike, pêvajoyên xwezayî bi awayekî ilmî têne tarîfkirin. Lewra zêhniyeta sîstema feodal êdî digihîje wê qonaxê ku bibêje; "karê dunyayê cudane, karê dînî cudane." Ji bo zêhniyeta mirovatiyê têgînên "qasidên xwedê yên li rûyî zemîn û siya xwedê ya li rûyî zemîn" xweştir tê. Zehmet e, mirov bawer bikin însan dibe xwedê. Hemû dînên pêşketî encama gihîştinê ew e ku xweda nabe mirov û mirov jî nabe xwedê. Êdî xwezayê bi têgînên yezdanî neyê ravekirin, ewê bi têgînên eqlî bê tarîfkirin. Jiyana dunyewî û uxrewî wê bi tevahî ji hev werin cihêkirin. Lê belê dîsa jî têgihîştineke xurt a xwedayekî ku bersiva emelên qenc û xirab dide, hemû tevgerên mirov kontrol dike, heye. Ya esas, saziya dewletê ya navendî dibe û têgîna xwedayê mucered zêde zêde dikevin zikhevdu.

Hegel, di sedsala 19. de wexta digot; "dewlet cismê xweda yê li rûyê zemîn e" pir eşkere bal dikişand ser vê rastiyê. Di navbera dewleta navendî ya xwe ji qralên şexsî qut û muceredkirî û têgihîştina yek xwedayê navendî yê xwe ji pir xwedayan qut û muceredkirî de têkiliyeke xurt heye. Li gorî vê yekê, çi Xirîstiyanî, çi Îslam teoriyeke dewleta navendî pêş de dibin. Ji lewra, Hz. Mûhammed hê sax bû dewleta Îslamê û teoriya dewleta xwedê ya papatiyê pêk hatin.

Zêhniyeta feodal di gelek mijaran de têgînên xwe yê nû kirîn û dogmayên wê bi mîtolojiya berê, felsefe û exlaqê Zerduşt û Yewnan di nav hev de ne. Ji her sêyan jî bijartine û bi hev kirine. Ji taswîrên cennet-cehennemê heta têgihîştina li gerdûnê, ji kiryarên qenc-xirab heta hûnandina teswîrên cin-melekan, gelek awayên îbadetê û rêzikên huqûqê çavkaniyên wê yên bingehîn mîtolojiya Sumer, felsefeya Grek û exlaqê Zerduşt ê azadiyê ye. Ev zêhniyet, PZ ji sedsala 4. heta sedsala 15. roleke sereke ya îdeolojîk dilîze. Li qadên

bingehîn ên şaristaniyê serdestiya xwe dewam dike. Di serî de Ewrûpa li hemû parzemînan belav dibe. Lê di sedsala 15. de bi destpêkirina Ronesansê re pêvajoya şoreşeke nû ya zêhniyetê dest pê dike û êdî zêhniyeta feodal dikeve pêvajoya paşveketinê. Lê mirov nikare bibêje; ev zêhniyeta serdema navîn bi tevahî li dawiyê hatiye hîştin. Di serî de Rojhilata Navîn, li gelek deveran bi pir rengên cuda, ji bo hebûna xwe dewam bike, hewl dide.

Civaka dewletparêz a feodal di warê sazîbûna eskerî û siyasî de jî ketiye qonaxeke gihîştî û stewiyayî. Dewlet heta dawiyê ji xwe piştrast e. Li rûyê zemîn hebûna xwedê ya herî pîroz e. Eskerên wê cengawerên xwedê ne. Maskeya pîrozbûnê pir baş li rûyê wê rûniştiye. Hêza yekemîn polîtîk, ya duyemîn nûnerê dînî, ya sêyemîn esker, ya çaremîn jî burokrasî ye. Saziyên bingehîn ên dewletê cihê xwe baş girtine. Xanedan tên û derbas dibin, lê ji sazîbûna dewletê ti tişt kêm nabe. Ya esas ne xanedan, sazî ne. Ji bo kesan jî heman tişt derbas dibe. Rûyê zemîn, dîsa wek milkekî xwedê yê ji hukumdaran re bexişandiye tê dîtin. Yên ebd divê bi vê razî bin û heta şikir bikin. Mora pîrozbûnê li şeran hatiye xistin. Şer li ser navê nîzama yezdanî têne kirin. Tevî ku bi navê azadî û wekheviyê radibin û bang li hemû mirovatiyê dikin, xenîmet û xûkîgirtin saziyên binehîn ên mêtingeriyê ne. Bi vî aliyê xwe, koletiya klasîk dewam dike. Artêşên wê zêdetir bi rêkûpêk û bi awayekî domdar bibin dihatin amadekirin. Ji saziya şervanên berdest, ji zû ve artêş hatiye damezrandin. Sîstemên Pers, Helen û romayê esas hatine girtin û artêşên herî mezin û xurt hatine amadekirin. Suwar û şûr sembolên artêşa vê serdemê ne. Saziya şovalyetiyê bi hemû heybeta xwe di vê serdemê de dijî.

Burokrasî gihîştiye sazîbûnê. Statuya karmend û wezîran hatiye destnîşankirin. Eskerî û îlmiye ji hev hatine kirin. Bac stendin li ser hîmên têkûz hatiye danîn. Saziya ragihandin û îstixbaratê baş belav bûye.

Şer şêweyekî hilberandin û debarê tê dîtin. Sefer û fetîh çavkaniyên karê ne. Zevtkirina erdên nû, tê maneya berhemekî nû yê zêde. Dewleta herî xurt, dewleta herî baş şer dike û zevt dike. Debara bi xwîn û mêtingeriyê sînor nas nake. Şerê li ser navê xwedê êdî tenê dikare bi zevtkirina hemû dunyayê bi dawî bibe. Ev jî tê maneya, cîhadeke bê dawî û gerdûnî. Sîstema dewletparêz êdî ji vê zêdetir nikare pêş de biçe û ji vê zêdetir nikare bistewe. Êdî gihîştiye qonaxa dawî ya mezinbûnê. Yanî saziyên dewletê di nav pêvajoya dîrokî de

gihîştine qonaxa stewînê. Pêvajoyeke piştî vê, dibe ku êdî rewşa krîzê be.

Di jiyana civakî de ebdiyet wek rewşek xwezayî ya xwedê dabe tê hesibandin. Gotina ebdiyetê kes dema ji dayika xwe dibe pê re heye, ne tişteke ku pişt re digire. Mirov ebd tê dinê û dimire. Ji bilî ebdiyetê şêweyekî din ê jiyanê nayê fikirîn. Xwedayekî bi tenê heye û ebdên wî hene. Melek û peyxemberên di navberê de jî qasid in, fermanan tînin. Eger em van tespîtan bi zimanê sosyolojîk bibêjin; xwedê otorîteya mucered a dewletê ya bûyî sazî temsîl dike. Melek artêşa karmendan, peyxember û melekên sereke wezîran û burokrasiya jor sembolîze dikin. Civak bi sîstemeke sembolan a xeternak tê birêvebirin. Di navbera rêveberiya sembolan û rêveberiya xuya dike de, têkiliyeke xurt heye. Heta têkiliya di navbera rêveberiya sembol û rêveberiya berçav de ji hev neyê derxistin, em bi awayekî durust nikarin li civakê serwext bibin. Eger em dixwazin li rêveberiya berçav a civakê serwext bibin, divê em perdeya li ser panteonê - sîstema xwedê - rakin. Wê demê, wê baş were dîtin ku bi hezar salan di bin navê qûtsiyetê de rûyê kirêt û zalim ên mêtinger û zordaran hatiye veşartin.

Ebdiyeta civakî tenê rastiyeke çînî nîne. Ji bilî despotan - ku ew jî di destê sîstemê de dîl in - her kes, hemû tebeke û çînên civakî pê ve hatine girêdan. Ji sîstema koledariyê kûrtir, nîzamekî stûxwarkirinê ya veşartî heye. Çendîn nerm dike ew çend jî sîstem kûr dibe. Paradigmaya bingehîn a civakê, sîstemeke ebdiyetê ya pêşî û paşê wê nîne. Ev nîzamê ji ezel heta ebed - ev her du têgîn zêdetir ên serdema dewleta stewiyayî ne - wek heyî dewam bike. Cihê guherîn û îmtîhanê dunya din e. Lewra dijderketina sîstemê ne tenê emelî, her weha rûhî û fikrî jî gunekî herî mezin e. Ebdiyeta mezin, ji bo kesê bizanibe îtaet bike fazîlet û payeberziyeke mezin bû. Kesên afirîner ên di civaka xwezayî û serdema hiyarereşîk a erênî ya serdema qehremaniyê de ji civakê re baş xizmet dikirin, di serdema ebdiyetê de li hemberî xwedê - efendiyan - wek kesên herî xeter, gunehkar û wek kesayetên şeytanî yên divê werin cezakirin, têne lanetkirin. Têgîna şeytaniyê ji bo koma mirovên ebdiyetê red dikin hatiye bi kar anîn. Ev têgîna ku koka wê ji Rojhilata Navîn e, ji bo komên mirovan ên bi sîstemê re nabin yek, tê bi kar anîn. Ji ber vê yekê ye, ji komên Kurdan re yên ku ji kevneşopiya civaka xweza qut nebûne dibêjin; "şeytanperest". Ev beşê Kurdan ê şeytan dihebîne û pîroz dike watedar e.

Li gorî sîstema ebdiyetê ya di serdema xwe ya stewiyayî de dunya cihekî wisa ye her kêlî dibe ku guneh lê bibe. Lewra reveke mezin ji jiyanê heye. Çiqas xwesteka te ya jiyanê hebe, tu ew çend dikevî guneh. Jiyana herî baş ew e ku tu bi her tiştê xwe ji mirinê re xwe amade bikî. Xwediyê vê helwestê xwezayê wek miriyekî ku divê mirov nêzîk lê nebe dibîne û yekser afirandinê bêîmkan dike. Ji bo ebdan xwezaya zindî nayê fikirîn. Ya rastîn di derketina vê sîstematîkê de şopên zordarî û mêtingeriyeke xeter hene. Eger îro jî civaka Rojhilata Navîn nikare bi ser xwe ve were, sedemê bingehîn ê rûhî, ev helwest e, em behsa wê dikin. Li aliyê din, ji bo efendiyan, li ser rûyê zemîn, cîhaneke rengîn a ji cennetê ne kêm heye. Ew û xwedayên xwe - Reb - yên bi heman navî - têgînên rêveberiyê - gelekî xweşhal û razî, jiyana xwe mîna "çîrokên hezar şevan" dijîn. Çîrokên hezar û şevekî, sîstema dewleta stewiyayî ya serdema navîn, bi awayekî mîtolojîk îfade dike.

Di rewşa jinê ya qefesê de tenê di warê deng û xemlê de hin pêşketin hene. Di asteke dûrî aqilan de koletî kûr bûye, û veşartî ye. Jina serdema navîn, ji aliyê civaka cinsiyetparêz ve cara duyemîn di warê çandê de tê şikandin. Em şikestina yekemîn a jinê di warê çandî de, di qonaxa derketina dewleta koledar de, di rewşa xwedawend Înanna-Îştar, şikestina çandî ya sîstema stewiyayî di warê jinê de mînaka wê, xuşka Mûsa Mariam û di mînaka dayika Hz. Îsa Meryem, jina Hz. Mûhammed Eyşe de bi awayekî balkêş dibînin. Êdî ti şopên xwedawendiyê nemane, her weha cihê jinê yê tê fikirîn nêzî şeytên e. Nerazîbûneke wê ya herî piçûk dikare wê bike şeytan. Her kêlî dibe ku ruhê xwe bifiroşe şeytên. Dikare mêr ji rê derbixîne. Rewşa wê ya pîrasêr û sihêrbazî şewitandina wê ferz dike. Zarokên keçik bi saxî têne binaxkirin; bi awayekî cinsî mêran ji rê derdixîne; girseyeke mezin bi keviran jinê dikuje. Bi vî awayî çandeke kuştinê pêk tê. Di civakê de koletiya herî kûr a bi hezarê salan e daweriviye heta roja me ya îro. Êdî wer giran bûye ji binî derketin zehmet bûye. Eger em dixwazin asta koletiyê ya sîstemê fêm bikin, divê em mijara jinê analîz bikin. Qulp, xelek, qelen, xemil û xêzên bi jinê ve hatine kirin çanda koletiyê îfade dikin. Mîna ku zimanê wê hatibe jêkirin bêhiş û mejî hatiye kirin. Bûye dayikeke zûha ya mîna zeviyekî ku mêr kengî bixwazin dajon. Êdî ew di civakê de kirdar nîne, tenê eşyayek e. Ji xwedawendiya civaka xwezayî ti eser û nîşane nemaye. Ji jina rêveber a zana ya ciwan û zarokan, ji jina mêr li dorê dizîzikîn ti nîşane nemaye.

Rewşa zarok û ciwanan jî zêdetir dişibe ya jinê. Nîzama giştî ya ebdiyetê, zarokê xwezayî yê hînê nabe heft salî zevt dike. Ciwanê nû digihîje, ji aliyê sîstemê ve bi rêbazên perwerdê yên awarte, kesayeteke mîna berxikan diafirîne. Hemû tevgerên wî ji berê ve têne destnîşankirin. Bi gotinan be jî nikare azadiyê bifikire.

Em dikarin bibêjin di vê serdemê de civak bi tevahî ji aliyê rûhî û fikrî ve hatiye pûçkirin. Tenê dengê civaka jor a bi "Elllah, nal û şûran" dike gurîn û xumîn heye. Hemû destan li ser dramatîkeke zevtkirin û kuştinê hatine avakirin. Belkî ev tablo hinekî zêde hat mezinkirin, lê rastiya rûhî ya serdemê bi awayekî guncaw îfade dike. Di şûna koletiya arkaîk de sîstema koletiya klasîk rûniştiye. Civak û dewleta temsîl dike, di asta jor de serdema xwe ya stewiyayî dijî. Ji bo sîstemê hemû sazî û têgîn hatine avakirin. Mizgeft, dêr û hawra, her roj bi naqoz û azanan, pîrozbûna sîstemê îlan dikin. Ji vir û pêve dewleta pêş de bikeve dewleta kapîtalîst e. Her çend dewleta kapîtalîst bi hêz xuya bike jî, di cewherê xwe de wê qonaxa dawî ya civak dikeve krîza giştî îfade bike. Wek tê zanîn di serdemên herî bi heybet de pêvajo ya ji hevdeketinê bi krîzokan e. Ev qanûna giştî ya xwezayê ji bo pêvajoyên civakî jî têra xwe tê qebûlkirin.

Hin têgînên din ên serdema navîn wek serftî, gund û bajêr, me zêde bi kar neanîn. Ji ber ku encam û rêbaza bi navê "analîza çînan" tê zanîn me dubare nekir. Bêguman bi vê rêbazê jî mirov dikare gelek rastiyan eşkere bike. Serf, gundî, bazirgan, bajarî, pîşesaz, kesên bi huner û ilim re mijûl dibin, mirov dikare van beşên civakê wek têgîn bi kar bîne. Ax wek amûrê hilberandinê û têkiliyên mulkiyetê yên li ser axê pêk tên, hewce ye bi huqûqa pêş dikeve, bi firehî were nirxandin. Ax amûrekî girîng ê hilberandinê ye, şer û pevçûn li ser axê bûne, lewra divê bi girîngî were destnîşankirin ku çîna navîn hêzê bi dest dixe û dikare di pêşketina civakî de roleke esasî bilîze. Lê ji ber ku armanca me tarîfkirina giştî ya dewletê ye, em tenê li ser xetên sereke û beşên tabloyê eleqeder dikin, rawestiyan.

Sîstema dewleta koledar a serdema navîn, sedemên bingehîn ên rê li ber jihevketina wê vekirin, sedemên hundurîn bûn. Ji bo jihevketina wê, hewceyî ne bi êrîşên nû yên etnîk, ne jî hewceyî bi dînên nû yên hundurîn hebû. Ji bo jihevketinê têra xwe potansiyelên hundurîn stewiyabûn. Asta jor a etnîsîteyê ku di nav sînorên dewletê de hatibûn hewandin, beşê navîn ê bûrjûwaziya nû mezin dibû, beşên serhildêr ên qewmên cuda û mezhebên dînî ku hêzên bingehîn bûn, wê li dijî monarşiya wek dewleta mutleq dihat fikirîn, serî rakin.

Tevgera etnîsîteyê ya bi daxwaza dewleta netewî rabû, bi daxwaza sînorên netewî ya bûrjûwaziya bazirgan û çîna navîn a bajêr re li hev kirin. Vê yekê bi xwe re qonaxeke dîrokî ya veguherînê anî û rê li ber derketina dewletên netewî û civaka kapîtalîzmê vekir. Ev pêvajoya PZ di sedsala 15. de destpêkir û heta roja me ya îro hat, wek dewlet, qonaxa dawî ya civaka jor temsîl dike. Bi zêhniyet û asta xwe ya teknîkê, wê karibe hûr bikole. Êdî ji bo civakê şêwazê dewletê - herî kêm wek şêweyê klasîk û arkaîk - hewce nabîne û wek kelemên sazîbûnê dibîne.

**E- Civak û dewleta kapîtalîst**

**Krîza şaristaniyê**

Wexta Lenîn digot; "Di demên giştî yên krîzan de meseleya bingehîn dewlet û şoreş e" mafdar bû. Ji wî tarîfeke rast a dewlet û civakê dihat xwestin. Di sedsala 20. de hemû beşên bindest û mêtingeh wek peyxemberekî jê bawer kiribûn. Di fikir û tevgera xwe de durust bû. Bi qabîliyet bû. Pir jî nêzîkî tarîfeke rast bûbû. Lê Lenîn jî dewlet wek hebûneke bi sihir nirxand û rave nebûna wê dewam kir; bi vî awayî yê hat xapandin Lenîn û ya xapand dewlet bû. Ji bo hemû peyxember, zana, fîlozof û ilîmdarên roja me ya îro dewlet wek "dualîtiya kûantûmê" ye. Dualîtî ev e; tu cihê rastiyê bizanibî dema wê nizanibî, tu dema wê bizanibî cihê wê nizanibî." Hin fîlozof ji vê rewşê re dibêjin; "prensîba nediyariyê". Wek hestiyariya pêşketî "zanîn" dibe ku bibe pîvanek. Ez jî ji vê bawer dikim û dizanim; di dema zanebûnê de tu pêk tê. Yanî ji ber ku zanebûn û pêkhatin di heman demê de dibin, tevî ku min serê xwe li ser êşand, min ji nîvzanebûnê re çareyek nedît. Lê ji xwe ev dualîtiyeke di nav sînorên gerdûna makro û mîkro de cereyan dike. Di pêkhatinên herî harîqa yên gerdûnê de xwe didin hiskirin.

Ez bawer nakim ku dewlet rastiyeke harîqa ye. Wek Engels bi awayekî dahiyane pê hesiyaye; "dewlet" roja wê were, wê wek alavê dolaban were avêtin ser sergovê dîrokê û wê ji alavên muzeyê zêdetir nebe tiştekî din. Bê şensiya mezin ew e ku ji ber ku kes xwediyê wê yê rastîn nas nake, bi sedema cewherê wê kes nizane li ku û çawa hatiye avakirin û dema tu dibî xwedî bi tevahî dikeve rengekî din, têgihîştina li rastiya dewletê zehmet dibe. Bi vî awayî wek "dualîtiya kûantûm" dîmenekî nîşan dide.

Em kapîtalîzmê dijîn. Hêza motor a kapîtalîzmê DYE jî di çarçoveyeke globalîst de xwe ji şerekî piçûkkirina dewletê paş ve nagire. Di filmê "efendiyê hungulîskê" de ku me berê behs kiribû, di wir de wexta hungulîsk tê wendakirin rexne li îqtîdarên zêde werimî

tê kirin ku bi sedema bûne kelem û asteng. Lê di heman demê de wek dewletê dîsa jî xwe li dunyayê ba dide. Wê demê; pirsgirêk bi hemû giraniya xwe di asta jor a civakê de dewam dike. Dewletên diviyabû her yek ji wan mîna walîtiyekê bûbûna, xuya ye baş hatine analîzkirin. Hukûmeta di warê dewletê de reforman nafikire hema hema nîne. Ya seyr ew e ku her reform ji zêdekirina krîzê zêdetir ti encamê nade. Maceraya herî dawî ya Rojhilata Navîn armanca wê "Projeya Rojhilata Navîn a Mezin" e. Di rojeva hemû dunyayê de ye; gelo di destwerdana li Rojhilata Navîn de pêşketin an jî paşketin, çareserî yan jî çaresernebûneke kûr heye? Tam bi vê yekê dernaxînin.

Li gorî baweriya min, di bingehê hemû tespît û rewşên nediyar de newêrekiya me ya ji bo tarîfkirina dewletê heye. Sosyologên diviyabû ev tarîf bikirana rewşa wan ji ya rahîbên Sumeran ên tevgerên stêrkan dişopandin û li çarenûsa mirovan dinertin, pêşdetir nîne. Encama şer û şîdeta hovîtiya sedsala 20an ji ya di tevahiya dîrokê de qat bi qat zêdetir e, lê tevî vê yekê, dikarin rûnên derewan li ser rêxistin û kesayetên qaşo terorîst in - ya rastîn ew jî berhemên sîstemê ne - li hev bînin. Mirov dibêje qey karê wan nîne ji bo şîdeta bi rêxistinkirî dewlet neyê fêmkirin, dixebitin. Ravekirina wan a herî dilpak ev e; fîl bi mûyên wî tarîf dikin. Bi navê rêbaz û metodê, rastiya yekpare ji hev parçe parçe dikin û wer tînin serê rastiyê êdî nayê naskirin.

Ya sosret û seyr ev e; tarîfeke ne rast wek bûye bela serê dewletê jî. Dewleta carnan xwe vedişêre, carnan xwe balkêş dike, pirî caran ditirsîne û ceza dike, wisa kiriye ku neyê naskirin. Ev dewleta nayê naskirin bûye bingehê hemû tengavî û krîzên civakî. Li her goşe û guhera dunyayê tengaviyên bi vî rengî têne dîtin. Bûyerên rojane li Mezopotamya Jêrîn diqewimin ku ji bo derketina dewletê dergûşî kiriye, wek ji demên buhurî yên lanetkirî tolê hilîne. Mîna marê dirêj ê bi dûva xwe ve bide. Bi zimanê Pirtûka Pîroz, weke ku Levîathan li cihê derketiye, şerê xwe bi xwe re dimeşîne û bi xwe bi dûva xwe ve dide û dawî li xwe tîne.

Wek derketina her sîstema civakî ya mêtinger û zordar, derketina kapîtalîzmê jî bêdewlet nebû. Dogmatîzma sîstema feodal bi rengekî dînî bû. Ya koledariya arkaîk jî mîtolojîk bû. Di yekê de xwedê bi xwe di şexsê xanedan û qral de berçav bûbû, di ya din de jî xwedê di şexsê dewletê de hebûna veşartî bû û qral ew temsîl dikir. Serdemên zêhniyetê yên mirovatiyê wer hewce dikir.

Di zêhniyeta dînê Îslamê de PZ di dawiya sedsala 12. de ilim û felsefe li hemberî dogmatîzmê çîz dikin. Deriyên îçtîhadê bi awayekî fermî têne girtin û qalibên dogmatîzmê torên xwe yên cehaletê li zêhniyeta hemû civaka Rojhilata Navîn ba dide. Ewrûpa jî PZ ji sedsala 12'an pêve, bi mîrateya ji Grek û Roma wergirt, hîmê şoreşeke zêhnî ya dîrokî danî. Xiristiyaniyê tevî aliyên xwe yên zordar, wê meraqa ji bo hînbûn û zanebûnê jî sor bikira. Ji bo Xîrîstiyaniyê wê bi qasî ummeta Îslamê zehmet nebûya, bermahî û bîranînên zindî yên civaka xwezayî şîrove bike û dogmatîzmê li dawiyê bihêle. Bîranînên teze yên civaka xwezayî, çawa ku demekê li hemberî împaratoriya Romayê çîz nekirin, wê li dijî dogmatîzma Xirîstiyaniyê jî çîz nekira û wê Xirîstiyaniyê karîbûya xwe ji têgihîştina maddeya mirî bigîhanda têgihîştina xwezaya zindî. Gelek teorî derbarê serketina kapîtalîzmê ya li Ewrûpa Rojava de hene, lê li gorî baweriya min sedema bingehîn ew e ku dogmatîzm bi qasî li Rojhilata Navîn li Ewrûpa Rojava reh bernedane û ji bo vê firsend nehatiye dayîn. Engîzîsyonan sê beş ceza kirin; ev heretîkî (rêderketiyên mezheban), sîmyager (pêşengên zanistê) û pîrênsêr (bermahiyên jinên zanan) bûn. Hebûna her sê beşan jî dij-jehra dogmatîzmê bû. Ji nav arî û xweliya hezarên hatin şewitandin, wê zêhniyeta Ronesansê hilbihata.

Di vê pêvajoyê de ku şoreşên herî mezin ên zêhnî pêk hatin, derketina civaka kapîtalîst qeder nebû, lê ji sedî sed armanc ne kapîtalîzm bû. Lê çawa bû, ji van şoreşan sûd wergirt û karîbû xwe bike sîstem?

Di navbera sîstemên civakî û şoreşên zêhnî yên dîrokê de têkiliyên mutleq û danîna xeteke rast, ji şêwazekî fikir û baweriyê ye, hewce ye bi girîngî li ser were rawestîn. Ev têgihîştina "Lewhî-Mehfûz" ya di Pirtûka Pîroz de, xwe dawerivandiye nav fikrê zanist. Gotina gel a "li enî-çareya te çi hatibe nivîsandin wê were serê te" dide nîşan ku ev şêwazê baweriyê ka çiqas belav bûye. Em di analîzên xwe de nuqteya bi nazenînî hewl didin destnîşan bikin; têkiliya vê têgihîştinê bi têgihîştina rêveberiya îradeya dewletparêz a hiyarerşîk e. Nîzama "fermanê" wek qanûnên îlahî bi civakê dide qebûlkirin. Divê wek pêşnûmeya qanûn û rêveberiyê were fikirîn. Kevneşopiyeke hezarê salan, ji vê "serdema zêrîn" destpêkir bi "mehşer" û "cennet-cehennemê" bi xetekê bi dawî bû û modeleke pêşketinê derxist holê. Fikra qederê jî ji vê têgihîştinê ye. Di cîhana îslamê de ev guftûgoyeke gurr e, di navbera alîgirên Mutezîle û Lewhî-Mehfuz de pêk hatiye. Ev têgihîştina ku hewceyî bi guftûgoya

azad nabîne û tercîhên pir ên îradeya azad nas nake, kokên wê hê kevin diçin. Diçin serdemên mîtolojîk ku di wê demê de dihat bawerkirin hemû bûyer ji aliyê xwedayên jorxwezayê ve têne afirandin û rêvebirin. Paşê ev têgihîştin bi felsefeya îdealîzmê dewam dike. Şêweyê wê yê li şaristaniya Ewrûpayê destpêkir û bi Ronesansê heta îro dewam dike, têgihîştineke pêşketinê ya dûz e. Di pêvajoya rohnîbûnê de baweriya xurt bi "pêşketinê", di Marksîzm de baweriya bi "mecbûriyet e çûyîn ber bi komînîzmê ve" xwe dispêrin van şêwazê dogmatîk ên fikirê.

Rastiyên jêratom, yanî fizîka kûantûmê ispast dike ku hêza vê şêwazê fikir şikandiye. Li gorî vê yekê; pêşketinên xwezayî û civakî, ne li ser xeteke dûz û bêrawestan in, di neqeba kaosê de, li cîhana jêratoman, ji bo azadiyê tercîhên pir ên hilbijartinê û pêşketinê hene. Ev şêwaz di cîhana ramanê de wek yek ji şoreşên mezintir ên fikirê derdikeve pêşberî me. Ya rastîn, bêyî fizîka jêratom jî em dikarin bi riyên hûnandin û pêhesînê jî xwe bigihînin van şêwazê fikrê. Eger di cîhana hemû bûyer û rastiyan de cih ji tercîha azad re neyê naskirin, emê nikaribin pirrengîniya xweza-gerdûna bêserûbinî rave bikin. Pirrengînî hewceyî bi azadiyê dibîne. Lewra têgihîştina ku pêşketinan li ser xeteke dûz dibîne, wê tercîha hilbijartinê tengav bike.

Em ji bo bi awayekî afirîner pêvajoya ji sedsala 15. û pêve bi lez bû û bi serketina kapîtalîzmê bi encam bû, binirxînin serî li vê şêwaza fikrê ya felsefî û zanist didin. Bi kurtî, dibûya ku serketina kapîtalîzmê nebûya çarenûs. Sedemên serketina kapîtalîzmê divê hînê nêzî rastiyê werin nirxandin. Marksîzma ku bandor li me jî kir, kapîtalîzm û şêweyên civakên çînî yên beriya wê wek "xeteke pêşketina dîrokê ya mecbûrî" îlan kir û bêyî haya wê jê hebe, berovajî hêvî û baweriyên xwe, alîkariyeke mezin bi kapîtalîzmê re kir ku ya herî zêde li dij şer dikir. Di vê parêznameyê de cewherê fikra ez tînim ziman ev e; "Marksîzm jî di navê de, şêweyên bingehîn ên fikirê bi prensîba mecbûriyetê bawer in, lê ya rastîn di sîstemên civakan de prensîbeke mecbûriyetê nîne." Li ser prensîba "pêşketina mecbûrî" ya ji bo şêweyên civaka jor û dewletê, şopên propagandaya fermî ya hezarê salan heye. Têgihîştina berê ya çarenûsê, bi navê "qanûnên civakê yên mecbûrî" bi eyarekî zanistê lêkirî, têne dewamkirin.

Hêzên veguherînê yên civakî ku cuda dixebitin; mirov nikare wan tenê wek avahiyên jor û jêr rave bike. Veguherîn di bin gelek bandorên tevlîhev de pêk tên. Bi taybetî, şîroveya dogmatîk a

diyalektîka meteryalîzm ku bandor li ser beşekî mezin rewşenbîrên îro kiriye, bi jihevketina sosyalîzma reel jî ispat bû, rast derneketiye û kesên hêviyên xwe pê girêdabûn, çongşikestî kirine.

Li şûna ku sîstemên civakê yên dîrokî bi qanûnên mecbûrî werin ravekirin, bi şêwazên têkoşînê yên serdeman, ên exlaqî, polîtîk û îdeolojîk werin analîzkirin wê zêdetir bi kêr be. Qanûn di rastiya civakê û ferdê wê de hem pir nerm e, hem zû vediguhere. Qanûnên hişk ên di rastiya fizîk, kîmya û biyolojiyê de têne dîtin, tenê di nav sînorên fizîk, kîmya û biyolojiyê de derbas dibin. Yê mayî jî mejiyê mirov û rastiya civakê temam dike. Ji ber van sedeman, pêwîst e mirov û civak bi têgihîştinên qederwarî ve neyên girêdan û girîng e, derfet û şensê azadiyê jê re were naskirin. Çi hukmên pêşin û çi jî hukmên ku encama wan qederwarî ne, hêzên afirîner ên azad berbend dikin. Wexta mijar bibe sosyolojî, pêwîst e her dem û li her deverê neyê ji bîr kirin, piraniya tiştên têne gotin, sîstemên civakî yên serdest anîne ziman û di nav hezarê salan de li gorî demê û cih kirasekî cuda li wan hatiye kirin û di roja me ya îro de jî bi maskeya zanistê heman rolê dilîzin.

Di vê çarçoveyê de em dikarin têkiliya şoreşa zêhniyeta Ronesansê ya ji sedsala 15 û pêve bi lez û kûr bûye, bi civaka kapîtalîst re binirxînin ku bawer dikim wê bi kêr be. Di derketina Ronesansê de du taybetiyên civaka Ewrûpa Rojava bi tesîr bûne. Bîranînên teze yên civaka xwezayî û qelsbûna çanda dewletê, ji bo ramana azad derfet û îmkan amade kirine. Dogmayên hişk ên Xirîstiyaniyê nekarîn pêşî li van şert û mercan bigirin. Di encama Seferên Xaçperestan de çanda agahiyê ya ji Rojhilata Navîn hatî û çanda Roma-Grekê wexta bi van şert û mercan re dest dan hevdu, dogmatîzma Xirîstiyaniyê ket pêvajoya li dawî mayînê. Pêvajoya mezhebbûnê ya Xirîstiyaniyê di sedsala 13. de jî hem encamê van bûyeran û hem jî wek sedemê wan rolekê dilîze. Mezhebên Domînîken û Fransîsken pêşketinên balkêş in. Di vê demê de, di Îslamê de jî mezhebên bi heman rengî -Mûtezîle, Îşraqiyûn- hatine tepisandin.

Di van pêşketinan de keşfên cografîk û çavdêriyên nû yên li cîhanê, alîkariyeke girîng dikin. Ev pêşketinên dualî, yanî qelsbûna çanda dewletê û bîranînên civaka xwezayî tevî mîrasa erênî ya Îslam û Xirîstiyaniyê - Mûseviyet çandeke kokê hê bi tesîr e - , çanda Grek-Roma û sentezên keşfên cografîk zêhniyeta Ronesansê pêk tînin. Em dikarin Ronesansê di dîroka mirovatiyê de wek sêyemîn hêza mezin têgihîştinê binirxînin. Têgihîştina yekemîn, BZ di salên

4000 de li kevanê hundurîn ên çiyayê Zagro-Torosê zêhniyeta neolotîk a gihîştî asta herî payeberz e. Ji bo mirovatî derbasî şaristaniyê bibe, em dibînin di vê qonaxê de hemû amûrên teknîkî pêk hatine. Teker, tevin, aletên cotajotinê, gundên mezin, zimanên cihê, komên etnîk, destanên qehremaniyê û hwd. Ev hemû li dora hêza hilberîner a jin-dayikê harîqayan diafirînin. Ya rastîn, dînê xwedawendiyê mezinbûna zêhniyetê ye, hilberandina jinê tê pîrozkirin. Hemû vedîtinên ji vê serdemê mane, vê heqîqetê piştrast dikin. "Star" ku hê jî tê maneya stêrkê, di ziman û çanda afirîner a serdemê Aryanî de tê maneya xwedawenda jin. Di zimanê wê herêmê Kurdî de îro jî bi maneya xwedê "ya Star" tê gotin û ev yek mezinbûn û hêza baweriyê îfade dike. Ev afirandineke ew çend kevin e jî dîsa di hemû zimanên Aryenî de hebûna xwe bi şêweyên cihêreng be jî dewam dike. Mirov dikare bibêje; cenneta yekemîn li vê kevana erdê hat afirandin. Mirovatî di warê jiyana civakî û hilberandinê de mora xwe li gelek pêngavên yekemîn dixîne. Amûr û qalibên muzîkê yên wê serdemê, hê jî bi awayekî tesîrê li me dikin, dil û hinavên me dihejînin, diricifînin û xwe li ruhê me ba didin. Ev çand ji vir xwe berdide jêr Dîcle-Frat, Nîlê û li geliyên Pencabê belav dibe, paşê jî rê li ber şaristaniya Sumer û Misriyan vedike. Lêkolînên hatine kirin, didin nîşan ku vê çandê, serdemên şaritaniyê bi awayekî zincîrwarî dane destpêkirin.

Duyemîn serdema zêhniyeta mezin BZ di navbera salên 600-300 de li her du peravên derya Ege'yê pêk hatiye. Ev qonaxeke mezin e, li dijî mîtolojiya koledar. Felsefe û ilim gaveke girîng diavêjin. Ji vê re "sedsala hîkmetan" jî tê gotin. Ewrûpaya Rojava ya wê demê, esas, Anatoliya Rojava ye. Pêlên şaristaniya Rojhilat holanên xwe li peravên Egeyê dixînin. Rola ku Xirîstiyaniyê li Ewrûpayê lîst, şaristaniyên yekbûyî yên Hîtît, Med, Misir û Girît li Ege'yê lîstin. Li vir, ji ber ku çanda kevneşopiya dewletê bi kok nebû, hebûneke xurt a çanda civaka xwezayê, cografyayeke bedew a hilberîner, hebûna girav û deryayeke harîqa, hêmanên bingehîn in, ji bo derketina vê zêhniyetê. Bi qasî ku em ji bermahiyên Troyayê fêm dikin, di warê aboriyê de jî bêguman bazirganiya mezin a Rojhilat-Rojava jî tesîreke girîng dike.

Di hîmê Ronesansa Ewrûpa Rojava de beriya her tiştî ev her du Ronesans radizên. Em heta Ronesansa li qûntarên Toros-Zagrosê fêm nekin, em Ronesansa li peravên Egeyê û heta em wê jî fêm nekin em ya li Ewrûpayê nikarin fêm bikin. Eger em hê zêde pê de dakevin, şoreşa Aryen a neolotîk, çand û zimanê wê yê BZ di salên

5000-4000 de ku li heman kevanê pêk hat, ji Çînê heta Ewrûpayê, ji Efrîka Bakur heta Kafkasan ku belav nebe, em nikarin civakên neolotîk ên li van herêman û şaristaniyên piştî wan werin, fêm bikin. Ji bo mirov şoreşên mezin ên zîhnî, dînî û avabûnên civakan fêm bike, serwextbûna li herikîna bûyerên dîrokê yên zincîrwarî gelek girîng e. Ez van nuqteyan ji bo vê yekê destnîşan dikim; her Ewrûpiyek û neviyên wan, dema şaristanî tê gotin, Grek-Roma û Ronesans tê hişê wan. Ya din jî Xirîstiyanî. Lê ya rastîn; pêşketinên li van qadan, her yek ji wan qonaxeke çemê pîroz e ku bi hezarê salan diherike, li binê kendalên şaristaniyan dixe vedike, hawîrdor û tejaneya xwe fireh dike, pêşî li xwe vedike û yê li ber xwe mezin dike.

Taybetiyên herî girîng ên zêhniyeta Ronesansê ev in; ruhê mirov ê ku serdema navîn vemirandibû, ji nû ve can pê xist; li vê dunya ku têra xwe bi xirabiyan tijî bû ye, li xwezayê vedigere, ji dogmayan vediqete û bi hişê mirov ewle dibe. Dewletê, zanebûn ji serdema rahîbên Sumeran ve girtibû bin destê xwe û ev yek kiribû yek ji amûrên xurtbûnê. Dewletê, ne tenê berhemê zêde û amûrên pêşketî yên hilberandinê, her weha agahiya sûdemend û xwediyên vê zanebûnê jî, tavil kiribû saziya xwe. Destûrê nade, zanista nû ku ji bo pêşketinê derfet û cihên azad bibîne. Cih û qada zanista azad, dihat maneya civakeke nû. Jixwe ji şan û erkê dewleta koledar e, sazî û avabûnên bi vî rengî xeter bibîne û êrîş bibe ser wan ji bo tine bike.

Di vê serdemê de dêr Engîzîsyonê dixe rojevê û ev yek maneya xwe heye. Ferdê ji nû ve ruh pê dikeve azad dibe. Kesên wek ji rêderketiyên mezheban hatin mehkemekirin, li dijî dogmatîzma dîn azad difikirîn. Jinên wek pîrênsêr dihatin bi navkirin, bi sedema nasnameya wan ya ku Xirîstiyan nebûbû, dihatin mehkemekirin. Kesên Sîmyager jî ji heyî cudatir li agahiyan digeriyan. Her sê ekol jî di wê astê de ne ku dikarin kun û qulekê di dogmatîzmê de vebikin. Ekolên hunerê jiyanê bi hemû bedewiya wê nîşan didin û bi vî awayî têgihîştina ku xwezayê mirî dibîne li dawiyê tê hîştin. Resim, muzîk, mîmarî û wêje, ji nû ve reng didin hem naverok, hem dirûvê ferd. Ferdekî ruh û mejiyekî nû pê dikeve, dibe mirovekî ku êdî di qalibê xwe de hilnayê. Bi ferdekî vî rengî ne tenê cografya, wê xweza jî were fetihkirin, an jî qezenckirin.

Serdem di heman demê de hûnandina utupyayên nû sor dike. Êdî di kincên kevin de hilnayê. Lê ji ber ku şert û mercên maddî dest nadin tenê utopyayên xwedî sîstem têne avakirin. Kes naxwaze li

wexma atmosfera dunya berê vegere. Deriyê dunya nû jî tam nizanin wê çawa vebikin.

Ev lêgerînê zorê bide lêgerînên ilim û felsefeyên nû. Çendîn ji dunya berê qutbûn dibe, ew çend deriyên dunya nû vedibin. Cusomus ji dîn derbasî felsefeyê dibe, Kopernîk çirkînî bi deriyê şoreşa zanistê dixe. Descartes bi helwesta xwe ya di warê madde-ruh de, bêyî xwedê tevlî meseleyê bike, hîmê şoreşa xwe ya felsefî datîne. Galîleo Galîleî pîvan xistin nav zanistê û ji pêvajoya şoreşa zincîwarî re alîkariya herî xurt kir. Bi tespîta Newtonê, gerdûn bêyî xweda, bi serê xwe, bi pîvan û rêzikên xwe, dikare hêza liv û tevgerê nîşan bide. Di navbera sedsalên 15. û 17. de şoreşa felsefî, ilmî û hunerî tam kok berdaye. Tevî çerxa engîzîsyonê ya rawestînê nas nake, bi Protestaniyê wê derbeke din li dogmatîzma hişk a dêrê were xistin. Dînê di warê baweriya ferdî de bigihîje serbestiyê. Veqetîna ji dêrê, di cewherê xwe de veqetîna ji desthilatiya dewletê ye. Dêra Katolîk hem bi xwe dewlet e, hem jî zirxekî mezin e ku xwe li dewleta feodal badaye. Dêreke bêyî dewlet nayê fikirîn. Ya esas, dêr li ser navê dewletê şer dike.

Bi şoreşa zêhniyetê re ferd azad dibe û ebdîtiya ji bo dewletê ji hev de dikeve. Wek mezhebên cuda jî bibe ya pêk tê û hildiweşe, rewabûna dewleta feodal e. Pêşketinên di sedsala 18. de bingehê girseyî yê Ronesansê fireh dike. Şoreşa zêhniyetê, ji ruh, hêvî û fikra kulmeke mirov derketiye, êdî bûye xwediyê zemînekî mezin ê girseyî. Mîna dînekî nû - Xirîstiyanî, Îslamiyetî - bûye xwediyê girseya xwe. Hebûna girseyeke ev çend azad, li her welatên Ewrûpa Rojava, hem ji bo dewleta dêra Katolîk û hem jî ji bo dewletên qraliyetê, xetereke mezin bû. Êdî dêr nikare bi engîzîsyonê di heqê vê girseyê de were der. Şer xwe ferz dike. Sedsal, Gul û şerê Sî Salan îfadeya vê rastiyê ne. Dêra Katolîk û rejîmên qraliyetê, wê li hemberî neteweyên Ewrûpayê yên hişyar dibin, têk biçin. Bi şoreşa Îngilîzan a di sala 1640 de, ya Emerîkayê di 1776 de, ya Fransayê di 1789 de, serdema serketinê ya mezheb û dewletên netewî dest pê dike.

Girîng e, û hewce ye, em tarîfên xwe yên şoreşan ji nû ve di ber çavan re derbas bikin ji bo em pêvajoyên krîzan li gorî meyla demokratîk çareser bikin. Şoreşên Ewrûpayê, bi giştî wek "şoreşên bûrjûwaziyê" nirxandin, helwesteke çînî ya teng a Marksîzmê ye, bi navê "em proleteriyê bikin" wek xelatek ji bûrjûwaziyê re hatibe pêşkêşkirin. Bêguman di vê yekê de pareke mezin a şîroveya dogmatîk a diyalektîka meteryalîzmê jî heye. Vê yekê, eger em wek têgihîştina dîrokî ya "Lewhî-Mehfûzê" û wek baweriyeke qederwarî

ya bûyeran ku li ser xeteke dûz pêk tên dibîne, qebûl bikin, emê hê zêdetir karibin nêzî rastiya berçav bibin. Ev dogmatîzma ku ez bi xwe jî zêde di bin bandora wê de mam, heta li dawiyê neyê hîştin, emê nikaribin naveroka dewlemend a rastiya awarte analîz bikin.

Di ti pirtûka çînî ya kapîtalîzmê de, ne li ser şoreşa Fransî, ne jî li ser a Îngilîz-Emerîka, fikir, teorî û bernameyek nehatiye nivîsandin. Kesên di van şoreşan de rol lîstine xwe wek nûnerên çîna bûrjûwazî îlan nekirine. Girseyên beşdarî van şoreşan bûyîn, bi piranî xizan bûn û daxwazên xwe yên ji bo wekhevî û azadiyê derdixistin pêş. Eger îdîa were kirin ku tevgerên berê yên Ronesans, Reformasyon û Ronahîbûnê bûrjûwaziyê esas digirin, wê ev bibe îddîyake nepixandî. Wexta çîna bûrjûwaziyê mezin dibû -hemû hewldana wê - ji hilanîna sermayê ya xwe dispêre kar û qezencê, zêdetir tiştek nedifikirî. Bêguman bûrjûwaziyê baş dizanîbû ji bo bigihêje kar û qezencê divê bikeve ser rêya dewletê. Ji bo bandorê li îqtîdarê bike û wê bi dest bixe, ket nav hewldanê. Lê di destê wê de ne teorî û ne jî pratîkeke ceribandî hebû. Hoy û şertên berçav ên di bingehê şoreşan de encamên tekamuliyeteke dûrûdirêj ên dîrokê bûn. Mîna hebûnên sûbjektîf difikirin û aktîvîstên siyasî jî bernameyeke wan ya şoreşê nîne, heta partiya wan jî tine. Ew meyl in. Hin dewlemendan ew dihebandin, piraniya wan jî karektera wan feodalbû, zengînbû û têkiliya wan bi ilim û hunerê re hebû. Daxwazên wan ên bi giranî derdiketin pêş, hesreta ji bo dunyayeke humanîst, azad û wekhev bûn.

Utopyayên dihatin nivîsandin, hemû dijberê kapîtalîzmê bûn. Wê wextê çawa ji van hemû kesên xwediyê fikrê û mîlîtanan re bûrjûwa hat gotin û şoreşa wan bû şoreşa bûrjûwaziyê? Em dizanin di nav pêvajoyê de bûrjûwazî, wek çîneke nû û wek her çîna bixwaze serdest bibe kir û karîbû îqtîdarê yan bi temamî yan jî beşekî jê bi dest bixe. Divê em zanibin, hemû hêzên dewletparêz û hîyarerşîk li ser pişta hunera bi navê "polîtîka" hezar car bûne îqtîdar û ketine, lê ev amûrê ku ji bo desteserkirin û mêtîngeriyê pir bi kêr e, dîsa jî hebûna xwe bê rawestîn dewam kiriye û hêza herî dawî ya mezin jî dibe, wê ji yên berê cuda tevnegere. Şoreş hemû berhemên gelan in. Hêzên dewletparêz û hîyarerşîk jî car caran tevlî çalakiyên gelan dibin. Bi taybetî di rojên serketina şoreşan de pir zîrek û jêhatî ne. Ji bo bi karanîna daxwazên bindestan hosta ne. Di hemû şoreşan de çi bi ser ketibin û çi jî bi ser neketibin, hewldanên bi vî rengî her hene. Mînak; wexta Hz. Îsa çalakiya xwe difikirî, bêguman ji bo împaratoriya Bîzans were avakirin nedifikirî. Di cewherê xwe de li

dijî kulta împaratoriyê bû. Lê di dawiyê de tevgera wî rê li ber împaratoriyeke dekûdolaban a dewletê vekir. Hz. Mûhammed bi fikir û çalakiya xwe arîstokrasiya Mekkeyê serberjêr kir û hem di avakirina împaratoriyê de -Emewî - nekarîbû xwe neke destik ku di encamê de împaratoriyê ehl-î beyta wî jî îmha kir. Ti kes nikare îddîa bike ku Hz. Mûhammed avakirina împaratoriyeke feodal plan kiribû. Bi sedan mînak hene werin nîşandan. Wê wextê mirov dikare bibêje; "Ti şoreşa gel tê de bi serketine nîne." Ezê li ser vê mijarê di beşên pêş de hûrûkûr rawestim, lê hewce ye ez eşkere bikim ku divê ev rastî pir cuda were analîzkirin. Emê bibêjin; ne hewldanên gelan têk çûne û ne jî pirsgirêka îqtîdarê hatiye çareserkirin. Armanca bingehîn a vê parêznameyê ew e ku vê girêka kor veke. Derseke girîng a divê were girtin ev e; kunkirin û qulkirina îdeolojiya serdest ji bo civakê zirxekî herî xurt e.

Taybetiyên herî giştî yên şoreşa Ewrûpayê ku bi daxwazên wek "azadî, biratî, wekheviyê" hatin ziman û daxwazên li dijî serdestî û mêtingeriyê yên ji roja ku hiyarerşî hat sazkirin û vir ve, di cewherê xwe de heman daxwaz in. Desthilatdariya dewletê çawa mîna xelekên zincîrê pêş ketiye, li dijî vê yekê tevgerên gelan jî bi awayekî xweser di nava dîrokê de pêş ketine. Du hebûnên diyalektîkî timî bi hev re di nav têkilî û nakokiyê de ne û bi vê re bandorê li hevdu dikin. Eger em vê pêşketina mantiqa dualî ya diyalektîka civakê di nav pêvajoyên dîrokê yên rewşên xweser û giştî de nebînin, pir zehmet e ku em bi nirxandinên gulover ên feraziye, li pêvajoyên bingehîn ên veguherînên civakî û pêvajoyên şoreşan têbigihîjin.

Civaka kapîtalîst û netew ku du formên bingehîn ên xweserî şaristaniya Ewrûpayê ne, tevî ku bi hev re di nav têkiliyê de ne, hevdu neçar û mecbûrî nakin. Awayê civaka kapîtalîst û pêkhatina netew xwedî mantiqên cuda ne. Her du jî di serdemekê de pêk hatine, lê ev yek nîşan nade ku her du xwedî yek mantiqî ne. Bûrjûwazî xwe wek hêza pêşeng a netew nîşan dide û ev yek ji nêzîk ve bi armancên wê yên îdeolojîk, polîtîk û aborî ve têkildar e. Ev têkilî di warê îdeolojiyê de "netewparêziyê", di warê aborî û polîtîk de jî "lîberalîzmê" tîne. Ji bo bandorê li dewlet û gel bike, ev her du têgîn du çek in, peyda nabin. Ev her du têgîn hûnandî-fîktîf in, û her du jî amûrên propagandayê ne. Em baş dizanin, bûrjûwazî herî zêde bi van amûran bû desthilatdar û hebûna xwe dewam dike. Di tevgerên Ronesans, Reformasyon û Rohnîbûnê de ku Ewrûpa kirin Ewrûpa, rola van amûrên sloganê bi sînor e. Em wexta ber bi sedsala 19. û 20. ve diçin, ev her du têgîn agir bi erdê dixînin. Têgînên

bindest û mêtingehan "proleterya, komînîzm" jî bi heman şêweyî wê werin bi karanîn. Li gorî cehwerê xwe, wê di hunerê îqtîdarê de heman serketinê bi dest nexin.

Ez bi nazenînî dixwazim vê bibêjim; şoreş, di veguherîna civakan de kêliyên girîng ên şikestin û ji nû ve avakirinê ne. Em bi mantiqê çep û rast ên di sedsalên 19. û 20. de nikarin wan bi awayekî rastîn fêm bikin. Hê jî gelek girîng e ku ev tevgerên li ser navê mirovatiyê bi fedekariyên mezin hatine kirin, rast werin ravekirin. Ji bo Şoreşa Sowyetê fedekariyeke mezin a bi mîlyonan kesî, jihevketin û encamên wê, wexta li ber çav werin girtin, xuya dibe ku çiqas hewceyî heye ku ji nû ve were tarîfkirin. Piştî ku bi navê modernîzmê di van dused salên dawî de bi qasî deryayê êş, xwîn û şîdet pêk hat, bi taybetî ji ber hovîtiya şerê cîhanê yê duyemîn, amûrên kamûflaja îqtîdar, îdeolojî û şîdetê pir kêm ketin rojeva guftûgoyê.

Pêwîst e, di vê çarçoveyê de rastiya bûrjûwaziyê ku formê bingehîn ê çîna kapîtalîzmê ye, were fêmkirin. Em wexta dibêjin çîna nû ya mêtinger û zordest, em tiştekî xweser bi lêv nakin, ji ber ku em taybetiyeke hemû çînên desthilatar destnîşan dikin. Xweseriya çîna bûrjûwaziyê ev e; li dijî civakîbûnê ferdiyet derxist pêş; mejiyê analîtîk di asta herî jor de bi kar anî; û bi vî awayî, heta niha ya ti hêza îqtîdarê nekarîbû bike, exlaqê xwe li civakê ba dabû vereşand û ev serketina wê ye. Civaka xwezayî jî di destpêka jihevketina xwe de hilanîna berheman eger wê pê zirar bigihîşta civakê bi dijwarî qebûl nedikir. Berhem û nirxên kom dibûn, kê pir belav bikira jê re ew çend hurmet dihat kirin. Ferq dikirin ku nirx û berhem bikevin ser hevdu çiqas xeter e. Piştî ku dewlet û civaka hiyarerşîk hat avakirin, berhem û nirx hatin hilanîn û komkirin. Jixwe ev yek bi hêza desthilatdariya taybet mumkîn dibû. Ketina serhevdu ya berheman, hem ev hêz da avakirin û hem jî pêvajoya avakirina sîstema li dora vê hêzê da destpêkirin. Mantiqê reaksiyona zincîrwarî wisa pêk hat. Yên herî zêde berhem hilanîn û xistin serhevdu, di heman demê de bûn xwediyê îqtîdara herî zêde. Eger em hê ji nêz ve lê binerin, emê bibînin ku hilanîna berheman şêweyekî diziya ji civakê ye. Ji ber ku nabe mirov civakê bênirx bifikire, lewra ev rastî wisa ye. Pêhesîna civaka xwezayî rast bû, û bi vê pêhesînê re prensîba bingehîn a exlaqî jî destnîşan kiribû. Eger wisa ye, wê wextê diyarkerê hemû nirxan civak e, û bêyî riza wê -ji bilî berjewendiyên wê - kes û kom nikarin bibin xwediyê nirx û berhemên hilanînê.

Ya rastîn, di hemû şeran de talan û xenîmet tên dîtin; encamê vê têgihîştinê civaka çînî ya bêesil e. Xwediyên îqtîdarê, ji bo hevdu ji hêzê de bixînin, wek prensîb, hewldanê hevdu ji nirxên berhevkirî û hatine hilanîn, bikin. Di warê çavkaniya bingehîn a hêzê de xwe naxapînin. Prototîpa çînayetiya bûrjûwaziyê pîşesaz û bazirgan tevî ku di her şaristaniyê de hene jî wek xeter hatine dîtin û tim hatine kontrolkirin. Kontrola li ser wan dewamî bû û tim û tim jî dihatin talankirin. Hêza dewletê ya feodal û koledar ku xwe dispartin mulkiyeta axê, ji bilî serf û koleyan, bi guman li pêkhatina kategoriyeke sêyemîn nertine û kontrola xwe kêm nekirine. Dîroka şaristaniyê ji bilî çîna ebd, pêkhatineke din li dijî xwezayê didît. Di vê sîstemê de ku heta şaristaniya xwe spartiye rastiya çîna bûrjûwaziyê dewam kir, nertineke li dunyayê û exlaqekî rûniştî heye. Şer û îqtîdar, pîvanên wan ên pir bingehîn hene. Mêzînên di nava wan de hatine avakirin, dikarin bi hezarê salan dewam bikin. Ji bo rêvebirina civakê tevî ku zor û huqûq hene jî bi kapasîteyeke bi sînor têne bi karanîn. Hîmê bingehîn ê civakê li ser piyan digire exlaq e. Tevî ku hêza îqtîdarê exlaq her paşve avêt jî, karîbû vê taybetiya xwe biparêze. Di vê yekê de rewşa hindikayî ya desthilatdariyê li hemberî civakê zemînekî kêrhatî pêşkêş dikir.

Bi derketina çîna bûrjûwaziyê ev mêzîna mezin têkçû. Ev çîn hem ji aliyê hêza îqtîdarê ve û hem jî ji aliyê hêza mêtingeriyê ve wer xwedî hecmekî mezin e ku civak nikare rabike. Ji bo mêtingerî û îqtîdara xwe bimeşîne, hewce dibîne ku hemû civakê bi kar bîne. Lewra Marksîzmê bi awayekî mafdar, ew wek çîna dawî ya mêtinger û xwedî îqtîdar îlan kiribû. Ji bo ew wek çîn pêş bikeve divê timî civakê belav bike. Ji lewra, diviyabû di serî de exlaqê ku civak pê hatibû hûnandin û pê dihat parastin, ji binî ve têk bibira. Bi gotineke din diviyabû perdeya heyayê biçiranda. Exlaqê ku di bingeha wî de hisa azadî û wekheviya civaka xwezayî heye, heta neyê çirandin û avêtin, civaka kapîtalîst pêk nayê. Marks di Manîfestoya Komînîzmê de bi awayekî balkêş vê rastiyê wiha tîne ziman; "Bûrjûwaziyê çi bermahiyên berê hebûn, hemû maliştin têk birin." Bêguman ev nirxandineke rast bû. Ev kiryara bûrjûwaziyê çalakiyeke şoreşger nebû, berovajî çalakiyeke hilweşîner û li dijî civakê bû. Eger tevgerekê civak xistibe asta ku nikaribe xwe biparêze, ew tevger nabe şoreşger, bibe bibe dibe tevgereke li dijî mirovatiyê. Hêza mêtingerî û îqtîdarê ya di destê bûrjûwaziyê de, nexweşiya kansêrê ye, daweriviye sînga civakê. Ji bo mirov têkiliya nexweşiya kansêrê, AIDS û hwd. nexweşiyên belav dibin, bi kansêra civakî re tespît

bike, hewce nîne mirov bibe zanyar. Hobbes, di şert û mercên derketina kapîtalîzmê de wexta hewcebûna bi îqtîdarê (dewletê) rave dike wiha dibêje; "ji bo pêş were girtin, mirov nebin kurmê hevdu." Em vê tespîtê berovajî qebûl bikin rast e. Kapîtalîzm ji bo îqtîdara xwe damezrîne mirov dike kurmê mirov. Di rastiya modernîzmê de mirov ne tenê bûne kurmê hevdu, bûne kurmê hemû xwezayê. Yên li pey qezenca herî zêde û berhevkirinê baz bidin û li hêza îtîdarê ya çavsor dike bibin xwedî, gelo ev çînê, ji bo bi karanînê di nav xweza û civakê de, wê çi bihêle û çi neke?

Eger em têgînên, kar, ked, parvekirin, emperyalîzm û şer ku herî zêde Maksîzmê analîz kirine, di vê çarçoveyê de rola wan a di nav kapîtalîzmê de fêm bikin, wê bi kêr û hînker be. Di pirtûkên pîroz de behs tê kirin ku wê bi nêzîkbûna mehşerê re "deccalê were", ev biwêj bi rastiya vê çînê re gelekî li hev dike. Ti sîstema civakî ya serdest di vê astê de li dijî hîmên bingehîn ên civakê û li hawîrdora xwe ya xweza, nebûye xwediyê êrîşê û nebûye hêza xirakirinê. Rastiya çîna bûrjûvaziyê, ji netewiyetê çûye netewparêziya nijadperest û faşîzmê; ji xwesteka serdestbûna li xwezayê ber bi felaketa ekolojîk ve çûye; bi hêrseke mezin a kar ber bi betaliyeke berfireh ketiye û gihîştiye wê qonaxê ku êdî wê xwe bi xwe bixwe. Her roja derbas dibe taybetiyên xwe yên cewherî wenda dike. Dijşoreşa li hemberî wê proleterya nake, ew bi xwe dike. Ev dema nû ya civakî, dide nîşan ku wê ev rastiya çînî dewam neke û eger ji hev de bikeve, wê karibe li ser hîmên xwe ji nû ve ava bibe.

Ji ber ku me parêznameya xwe di çarçoveya tezê de destnîşan kiriye, di wê pozîsyonê de nîne pêvajoya; kapîtalîzmê sîstemên beriya xwe çawa tev li xwe kirin, çawa bû dewlet, çawa ilim û huner bi îqtîdarê ve girê da, çawa bû emperyalîst, çawa bê mêzîn pêşket, çawa şer kir û hê gelek pêvajoyên din bigire dest û li qelemê bide. Her yek ji van mijar û pêvajoyên ji bo pirtûkekê dabaş in; ya girîng em li ser mantiqê wan rawestin.

Em tarîfa xwe ya li ser çînê dikarin hê di astên cuda de dewam bikin. Ji ber ku karîbû, sosyalîzma reel ji hev de bixîne, tevgerên rizgariya netewî û dewletên wan bixe hêza xwe ya yedek û bi kar anîna wê ya sosyal demokratan, fonksiyoneke girîng e. Dîsa, ji teknolojî û zanistê heta civaka mirov ji mijara herî bêkêr bi hejmaran ji xwe re kar kir; karîbû çalakiyên spor û hunerê di asta narkotîkê de bi kar bîne; proleterya û rewşenbîrên wê ji dijberiya xwe derxist û kir ku ji bo kar li ber bigerin; li ser navê pîrozbûnê çi hebû hemû pûç

kirin, ew rûyê xweş û geş ê dunya Ronesansê kir rûyekî sar ê robotan. Ev meharet û rastiyên çîna nû ya serdest e.

Kapîtalîzmê li rengê îqtîdarê nûbûn zêde kirin û sazîbûneke kûr ava kir. Li şûna îqtîdara bi kes ve hatiye girêdan, îqtîdara kes, partî û heta civak pê hatiye girêdan kir sîstem. Kir ku îqtîdar xuya neke; yanî îqtîdar kir rastiyek mucered. Di vê yekê de îdeolojî, polîtîka û ekonomî xwedî fonksiyoneke mezin in. Bi netewparêziya ji têgîna netew zêde kiriye, hemû netew daye bawerkirin ku îqtîdar a her kesî ye. Ya rastîn, ti car îqtîdar nabe ya netew. Di her demê de û li her cihî, komên etnîk, xanedan û beşê hindikayî yê netewan xwediyê rastîn ê îqtîdarê ne. Lê sîstemeke welê tê afirandin; her ferd heta bindestê herî jêr, neçar e bi awayekî xwe bike xwedî îqtîdar. Di malbateke li qatê herî jêr de zilamê herî xizan li hemberî pîreka xwe, bi hêsayî dikare xwe di rola "împaratorê piçûk" de bibîne. Pîrek jî bi awayekî zincîrwarî dikare li hemberî zarokê xwe heman rolê bilîze. Lê zarok? Ew jî mezin bibin, ji lîstika vê sîstemê zêdetir dikarin çi bikin? Hûnandina îqtîdarê bi awayekî zincîrwarî yek ji taybetiyên sîstemê ye.

Partî jî wek ferdan li gorî îqtîdarê hatine sazkirin. Fonksiyona bingehîn ew e ku dewletê dibe civakê, civakê jî dibe dewletê. Civak bi xwe bûye ya dewletê. Dewlet wek xwedayê herî xuya nake daweriviye civakê û her şaneya wê. Zêhniyeta îqtîdarê ya îdeolojiyê diafirîne belkî jî bi awayekî herî mezin pêşî li derewkeriyê vedike. Fonksiyona hunera polîtîk ew e ku wek di civatê de tê gotin, xwe wek xwediyê dewletê dibîne û bawer dike ku divê jê re xizmetê bike. Ev jî di cewherê xwe de demagojiya polîtîk a herî pêşketî ye. Weke ku tê zanîn, polîtîka amûrê îqtîdarbûnê nîne; amûrek e ku îqtîdarê diparêze, belav û daîmî dike. Bi taybetî rola polîtîkayê li hemberî demokrasiyê wisa ye. Zehmet e mirov behsa rastiyekê bike ku bi qasî hunerê polîtîk, demokrasiyê înkar dike. Ji serdema Atînayê heta niha baş tê zanîn ku polîtîka înkara demokrasiyê ye. Ekonomî jî ji her demê zêdetir bi îqtîdarê re hevgirtî ye. Rêveberiya ekonomiyê, polîtîk-ekonomiyek e. Em di serdemeke welê de ne, ti kom û ferd nîn in ku bi çeka ekonomiyê neyên îmanê. Yek ji slogana balkêş a vê serdemê ev e; ti nirx û hêz nîne ku pere nikaribe bîne xwarê.

Em dikarin tarîfa xwe ya ku me derbarê cewherê îqtîdarê de kir, derbarê netew-dewlet de hê zêdetir pêş de bixînin. Dewlet netew formeke hemdem e, ji serdemên berê, ji navlêkirina dewletên rahîb, dînî û xanedanan maye. Di cewherê xwe de morên cihêreng in, li îqtîdarê hatine xistin. Di qonaxa pêşketînê ya kapîtalîzmê de erdekî

bi sînorên kevneşop û li ser zimanekî hevpar, ji bo kar û berhevkirina qezencê, cografyayek bû, bi dest nediket. Di şûna têgihîştina welatê pîroz de, têgihîştina kara zêde û berhevkirina qezencê, esas e. Bi vî awayî, meydanê li hevrikên xwe digire û sermaya berhevkirî misoger dike. Ev yek jî ji bo xurtkirina îqtîdarê peyda nedibû. Netewparêzî di encama van şert û mercên maddî de derketiye. Ji ber ku bi laîsîzmê - dunyevîbûnê - têgihîştina dînî paş ve dikeve hewceyî bi hûnandina îdeolojiyeke nû çêdibe. Îdeolojiya netewparêz bi sedema têkiliya xwe ya bi rastiya netew re zû pêş dikeve. Netewparêziya divê di cewherê xwe de weke awayekî pêşketî ya hisa etnîk - eşîr - were fikirîn, dibe baweriyek şûna dîn û hisa hevpar a etnîk digire. Wexta ku di hundur de li dijî hebûnên îdeolojîk ên wek mezheb, etnîk, dîn û hwd. û ji der ve jî li dijî hebûnên mîna zordestî û mêtingerî hat destpêkirin, netewparêziyê kirasê têgihîştina nijada jor li xwe kir. Wextekî têgihîştina dînê herî mezin hebû, vê têgihîştinê êdî şûna xwe ji têgihîştina netew-nijadê herî mezin re dihîşt. Zêhniyeta ilmî ya civak rohnî kiribû, dîsa bi netewparêziya mîna dîn hat tarîkirin. Di sedsalên 19. û 20. de ku bi têgihîştina netewparêziyê tijî bûn, li ser navê şerên pîroz, civak bi awayekî rewa ji bo her cure şîdet û şerî rakirin ser piyan. Çewa sedsalên 17. û 18. sedsalên derketina netewan bûn, sedsalên 19. û 20. jî bûn sedsalên netewparêziyê ku herî zêde rabû pêdarê û şekê. Îqtîdara dewletê di serdema netewparêziyê de bi şerê cîhanê yê duyemîn derket asta herî jor û bi hilweşîna rê li ber vekir, krîza giştî û dawî ya kapîtalîzmê da destpêkirin. Hat fêmkirin ku mirovatiyê nikaribe bi netewparêziyê re bimeşe. Sîstem zû ket pêvajoya tengavbûnê û ev yek nayê wê maneyê ku sîstemê hêza xwe wenda kiriye, berovajî ev dikare wê hê zêdetir bêrêzik û çavsor bike.

Serhildanên 1968an, rexneyeke berfireh li sîstemê bû. Bi vî awayî îspat bû ku dixwaze sosyalîzma reel be, dixwaze bi awayekî faşîzm be, kapîtalîzma gihîştiye têgihîştina otorîteya total êdî nikare dewam bike. Dewam nekirin û nekarîn, dihat maneya krîzê. Ya mirovatî jî dijî ev e. Ev pêvajoya ku em dikarin jê re bibêjin kaos jî ji pêvajoya Ronesansê cuda ye. Ronesans derketina ji krîza civaka feodal bû, lê ya kapîtalîzm di salên 1970 de ketiyê pêvajoya kaosê ye. Reng û hêza têkoşîna were meşandin, wê cudabûn û nûbûnên nû destnîşan bike. Ya divê bala mirov lê be, guhertina ku ev pêvajo di nertina - paradigma - mirov a bingehîn a li dunyayê de dike. Di nava civakê de wê nertinek li cîhanê belav bibe; hemû nirxên exlaqî têk diçin, hemû têgihîştinên netewparêz dema xwe tijî dikin; encamên

kavilkirina ekolojiyê, bûyîna mîna robotan, dunyayeke grî, bêzewq, bêhêvî, bêbawerî û bêarmancî, stres, hêrs, nefret, şîdet, ajoyên cinsî yên sînor derbaskirî, tenê mayîna ferdî, bêqîmetiya di civakê de, mantiqê têkiliyan bi tevahî li ser berjewendiyê, ji wefayê bêpar mayîn, li hemberî humanîzmê bêeleqeyî, xweperestiyeke dijwar, her ku biçe jiyanê maneya xwe ya pîroz wenda bike û hwd. wê psîkolojiya serdest a krîzê û atmosfera civakê pêk bîne. Lêgerînên bi kok û bi esas, tenê dikarin di atmosferên bi vî rengî de derkevin. Atmosfera tengaviyê vê yekê ferz dike.

Sîstema zordest a emperyalîst û netew-çînî ya desthilatdariya kapîtalîst di dîrokê de yekem car gihîşt wê mezinbûnê ku karibe xwe bigihîne hemû dunyayê. Cihekî ku nehatibe dagirkirin nemaye. Di dawiya sedsala 19. de ev rastî pêk hatiye. Tehekuma li ser hîmê netewî, çînî, etnîk, dînî, cinsî û di dîrokê de asîmîlasyon û heta qirkirin digihîje asta herî bilind. Di vê serdemê de êdî mirov kurmê mirov e. Em wexta wek împaratoriyê qebûl bikin, DYE gihîştiye qonaxa dawîn. Em di serdema dawîn a împaratoriyê de ne. Li gorî teoriyê, ev rêveberî, desthilatdariya dewletê ji bajarekî, ji welatekî, ji sînorê netewekî derbas dike, di şexsê kesekî de bi cih dibe û her tim belav dibe, paşê rawestîn, paşketin û bi hilweşînê cereyan dike. Eger di civakê de bi cih bibe, bandoreke zincîrwarî dike. Her desthilatdariya nû, neçar tê hîştin li ser şopên a berê bibe împaratoriyet. BZ di salên 2350 de - li gorî dîroka nivîskî - ev zincîrwariya dîrokî ya di dema Sumeran de bi sulaleya Aqadan dest pê kir, îro di dewleta DYE de bi sulaleya Bush dewam dike. Aliyê seyr ê dabaşê ew e ku li cihê derketina împaratoriya yekemîn, împaratoriya dawî di şer de ye. Wê wextê em dikarin prensîba nebatan bifikirin û bibêjin; her nebat li ser koka xwe hişk dibe.

Di rastiya împaratoriyê de cihê dewletên tam serbixwe, netew û têgihîştina civakê nîne. Ya rastirîn, serxwebûn dikare were îdealîzekirin. Lê bûyereke nadîde ye, ji bo bi cih anînê. Li gorî realîteya qebûlê dibîne, di çarçoveya împaratoriya serdest de hewcebûn û pêve girêdan dibe. Dibe ku asta hewcebûn û pêvegirêdanê biguhere, lê rastiya serdest naguhere. Di împaratoriyê de ku li derdora 4350 sal e, li ser civakan bi bandor e, sererast an jî ne sererast ji muttefîkên bi împaratoriyê ve girêdayî heta dewletên bêqîmet ên dûvikên serweriyê, hûrik mezin gelek komên xwedî îqtîdar di nav sînorên heyî de pêvegirêdayî û hewce ne. Di serdema dewlet netewa - ya rastîn di nav netew de hindikayiyek - xwe herî serbixwe dibîne ev rastî hê li cih e. Serxwebûna tam a ji hêza

hegemon, lîstik û îddîayeke netewparêzan e ji bo bandorê li civakê bikin. Dema hêza hegemonîk tê gotin; zêhniyeta herî xurt, îqtîdar, tevî hebûna civakî û aborî hebûneke xurt a eskerî û xwediyê zanist û teknîka mezin tê îfadekirin. Hebûna DYE li gorî vê tarîfê li cih e, lewra ew îro yekemîn hêza hegemonîk e. Lê ji hemû krîza sîstemê, şêwazê rêvebirina wê û encamên wê, alî û berpirsiyarê sereke ye.

Eger mirov taybetiyên civakî yên sîstemê di warê jinê de analîz bike, wê gelekî bi kêr û hînker be. Nuqteyeke divê ez ji serî ve bibêjim ev e; çi rastiyek civakî dibe bila bibe, bi tenê serê xwe nabe aliyê wê yê siyasî, civakî, ekonomîk, çandî û hwd. bi veqetîna ji mijarên din were lêkolînkirin, divê mirov ji hewldanên bi vî rengî dûr bisekine. Di nav yekparebûna dîrokê de civaka ku xwe her tim pêk tîne, sîstemên avahiyên wê yên jor û jêr mîna parçeyên saetekê bi hev re dixebitin. Zanyarên Rojavayî di warê veqetandina parçeyan de nexweş in, û bi sedema ji vê yekparebûnê dûr disekinin rastiyê wenda dikin. Ji bo bi awayekî ilmî rastî were fêmkirin, ev rêbaz hewce ye, û pir girîng e yekparebûn li ber çav were girtin.

Divê jin wek kurtasiya sîstemê were dîtin û wisa were analîzkirin. Civaka kapîtalîst çawa lûtke û dewama civakên berê yên mêtinger e, jin jî bandora koletiyê ya van hemû sîsteman li asta herî jor dijî. Eger em heta jina di cendereya mêtingerî û zordestiya civaka dewletparêz û hiyarerşîk a herî kevin û dijwar de derbasbûye û şêweyek danê fêm nekin, em nikarin civakê rast rave û tarîf bikin. Ji bo koletiya etnîk, netew û çînî rast were fêmkirin, hewce ye jin rast were tarîfkirin. Tevî ku tîr di çuwal de hilnedihat jî, sosyolojiyê di dawiya çaryeka sedsala 20. de hindik be jî li ser mijara jinê hewlda hin lêkolînan bike. Tevgera Femînîst, karîbûye hawîrdorê, şer, texrîbên xeternak ên îqtîdarê, dîrok û karektera cinsiyetparêz a serdest, bide fikirandin. Ev nuqte bi xwe jî, di serî de ilmên civakî yên diviyabû objektîf bin, karektera cinsiyetparêz a hemû ilman nîşan dide. Ilim cinsiyetparêz e.

Ezê bi awayekî pozîtîf şîrovekirina jinê ji beşên pêş re bihêlim û niha em li koletiya kevneşop a kapîtalîzmê û çi bi xwe re aniye, binerin. Divê em di serî de bibêjin, li gorî cewherê sîstema kapîtalîzmê ters e, û nabe ku azadiyê bîne. Îddîaya dibêje; "bi sedema kapîtalîzmê kevneşopî têk birine, zincîrên dora jinê qetandine," xapandin û belovajîkirineke mezin e.

Têkiliya sîstemên tehekumkar bi azadiyê re ev e; difikirin ka wê hê çawa bi awayekî çor û rêbazên qurnaz dewam bikin. Jina herî zêde li ser navê wê destanên evînê hatine hûnandin û jina koletiyeke

çor li ser hatiye ferzkirin, heman tişt in. Jin mîna çivîka kanarya di qefesê de - mala di bin destê mêr de - tê girtin. Çawa çivîk wexta tê berdan li paş xwe nanere difire û diçe, eger jin hinek zana bibe û cihekî wê lê azad bibe nas bike, mal, qesir, dewlemendî, hêz û kesê nerevê nîne. Potansiyela wê heye ji hemûyan jî bireve. Bi qasî jinê ti hebûn bi girtinê - tinekirin û tepisandina şertên sûbjektîf û objektîf ên pêşketinê - nehatiye mehkûmkirin. Eger hemû analîzên civakî cihê xwe nabînin, plan û bernameyên wan nameşin û bûyerên li derveyî mirovatiyê diqewimin, ev hemû têkiliya wan bi asta koletiya jinê re hene. Ji lewra heta çareseriya jinê, azadî û wekheviya wê nebe, ti pirsgirêka civakê ji binî ve çareser nabe û wekhev-azadiya wê pêk nayê.

Bi sîstema kapîtalîzmê re rengê jinê yê derketiye holê, eger mirov mîna mal bibîne, dikare me hînê nêzî rastiyê bike. Em dizanin, di serdema koletiya klasîk de herî zêde jin li bazaran dihat kirrîn û firotin. Ev rewş di serdema koletiya feodal de jî bi navê cariyetiyê dewam kiriye. Ya li vir tê firotin bi tevahî jin e. Qelen û kara siyasî ya ji vê meseleyê, aliyekî din ê mijarê ye, xwe dawerivandiye heta nava malê. Di kapîtalîzmê de mîna qesabekî (goştfiroş) gewdeyê wê parçe parçe ji hev tê veqetandin û ji bo her parçeyekî buhayek hatiye destnîşankirin. Ji porê wê heta paniya wê, ji sînga wê heta qorika wê, ji navika wê heta berzika wê, ji nav milên wê heta çongên wê, ji nava wê heta çîpên wê, ji çavên wê heta lêvên wê, ji hinarokên rûyê wê û heta parçeyên stûyê wê, ti cih û parçeyê wê nemaye buha lê nehatibe birrîn. Pir mixabin nehatiye pirsîn, gelo ruhê wê heye yan na, eger heye, nehatiye hişê wan bibêjin ew çiqasî dike. Jixwe ji aliyê mejî ve ji berê de "kêm aqil" e. Li malên taybet û kerxaneyan amûrek e ku zewqê dide. Makîneya zarok anînê ye. Karê herî zehmet zarokanîn ji kedê nayê hesibandin. Dîsa yek ji karê herî zehmet zarok mezinkirin, heqdesta wê nîne. Li hemû saziyên girîng ên wek ekonomî, civakî, siyasî û saziyên eskerî cihê wê ji bo bibe numûne heye. Amûrekî reklaman e jê nayê gerîn. Di nav afirîneran de ya herî zêde wek malekî cinsî li pazaran tê firotin e. Ya herî zêde jê re dijûn têne dayîn û tê lêdan e. Di çîroka evînê de ya herî zêde tê xapandin ew e. Li her tiştê wê dest tê werdan. Nasnameyeke ji bo bi jintî bipeyive ya herî zêde bi deng û rengê wê hatiye lîstin. Mirovek e, bi mirovatî hevaltî pê re nayê kirin. Jin ew kes e ku li ba mêrê herî ji xwe re bibêje ez mêrim, ji hisa êrîşê xilas nabe. Jin êdî malek e, her mêr xwe li ser wek împarator dibîne.

Em hê jî dikarin tarîfa xwe dewlemendtir bikin. Lê aliyê seyr ê meselê, mêrê civaka serdest çawa yeqîn dike ku wê bi nasnameyeke ev çend bi taybetiyên neyênî hatibe xemilandin re bi awayekî asayî bijî. Xuya ye, mîna koleyeke pir hêmin û milahîm tê hesibandin. Ya rastîn ji bo mêrekî bi şeref, jiyaneke hevpar bi nasnameyekê re ku ev çend taybetiyên neyînî hatiye xemilandin pir zehmet e, û piçûk ketin e. Her çend Eflatûn bi sedema xwestiye jin li derveyî dewletê û civakê bimîne, hatibe rexnekirin jî, di helwesta wî de van taybetiyên neyînî yên jinê bi tesîr in. Ev helwest li cem gelek fîlozofan heye û divê mirov rast bixwîne. Mînak, Nietzche jî destnîşan dike ku jiyan bi van taybetiyan re wê ji sedî sed mirov xira bike. Baş e, tevî vê yekê çima di civakê de mêr ew çend bi ser jinê de miriye? Ji ber ku ev civak hatine xistin. Ji ber ku ev mêr hatine xistin. Ev ji taybetiya koletiyê ye, ya dikare derbasî yên din bibe. Koleyeke ev çend bi kêr û miroveke hînî koletiyê bûye, bêguman wê hevpar û şîrekek be, her kesê lê bigere. Jina piçûk hatiye xistin, civaka piçûk hatiye xistin bi xwe ye, mêrê piçûk hatiye xistin. Serê por pê ve nîne, wê şehê wî jî wisa be. Bi kurtî, heta rastiya jinê baş neyê zelalkirin, jinîtiya zana ya azad a şaristaniya çînî û dayik-jinîtiya azad a civaka xwezayî xwe negihînin hevdu, wê hevala jiyana hevpar a di weznekê de neyê afirandin. Her weha heta mêrtî ji nû ve neyê pêkanîn wê bihevrebûnê nebe.

Em di warê civakî de dikarin pêkanîn û şêwazê rêvebirina kapîtalîzmê di gelek rastiyan de bibînin, bi taybetî di warê mêr, malbat, kar, karmendî, perwerde, tendurustî, huqûq û gelek qadan de çav bidêrên. Eger em malbatê bi kurtî tarîf bikin, em dikarin wiha bibêjin; saziya bingehîn a civaka dewletparêz û hiyarerşîk, hucre û molekula herî piçûk a sîstemê ye. Împaratorê herî jor siya wî ya di nav malê de "împaratorê piçûk" e. Malbat dezgehek e ku koletiya civakê xwe lê nîşan dide. Koletiya di nav malbatê de bingehê koletiya civakî misoger dike. Weke ku sîstem her roj, her saet di nav malbatê de ji nû ve tê afirandin. Lewra barê herî giran jî malbat radike. Malbat kerê hêmin û milahîm ê civaka dewletparêz û hîyarerşîk e. Timî dikarî lê suwar bibî û xwe pê bibî her devera dixwazî. Sîstema kapîtalîzmê ya li gelemperiyê belav dibe, bi awayekî balkêş xwe di malbatê de îrtîsam dike û ev yek ji têkiliya xurt a di navbera her du rastiyan de tê.

Pir hewce nîne mirov bibêje ekonomiya kapîtalîzmê, ji ber ku kapîtalîzm bi xwe cewherê aboriyê ye. Lewra sîstemek e, ji bo bi kar anîn, hevrikiyeke hov û kara zêde her tiştî li ber çav digire. Tiştekî

civakê nehîştiye nekiribe mal û meta. Civaka bibe mal, maneya wê ew e ku wê ji dest jî were derxistin. Civakek ku bi vî rengî temenê xwe tijî kiriye nîzamek e, hewce tê dîtin dawî lê were anîn.

Sîstem ji bo bi huner û zanistê temenê xwe dirêj bike, di nav hewldanake awarte de ye. Berovajî texmînan, ev hewldan ji bo pêşdebirina zanist û huner (teknîk jî di navê de) nîne. Bi hêza pêşketî ya huner û zanistê dixwaze rewşa xwe ya qediyayî dewam bike. Ev rewş nexweşekî bi bîra mirov tîne ku di kêliyên dawî yên jiyanê de ji bo were xilaskirin, hemû derfet û îmkan têne bi karanîn. Zanist û huner, di van pêvajoyên sîsteman de ji bo pêkhatina sîstemên hê baş û di nav kaosê de ji bo jinûve avakirinê, rolên diyarker dilîzin.

Ji ber ku sîstema dawî ya tehekumkar e, kapîtalîzm cihê wê di dîrokê de heye. Sîstema ku ji civaka hiyarerşîk çaviyên wê xetimîbûn, ji atmosfera azadiyê ya Ronesansê rê li ber vekir sûd wergirt, bû hêza sereke û pê re hemû potansiyel jî derket holê. Hem ji aliyê şêwe û hem jî ji aliyê naverokê ve zêde şensê wê ya pêşketinê xuya nake. Ti devera civak û xwezayê nemaye ku bi kar neaniye. Yên hatine kirin jî ji hejmaran wêdetir tiştek nînin. Balkêş e civak çawa xwe li ewqas pêlîstinê dikare rabigire, xuya ye ji kirin û şîdeta karîbû atomê biteqîne pêk tê. Ti sîstem ev çend bi şîdet û şer di zikhev de nebû ye. Civak û ferd mîna li hespê rodeo suwar bûbin, tevdigerin. Pêşketin nîne, tenê ketin û rabûn heye. Wexta şert û mercên civaka serdest a heyî li dawiyê neyên hîştin, pêşî li lêgerînên nû, hevî, ber xwe dîtin û qabîliyetên ferd jî tê girtin. Welatîbûna dewletê ya sîstemê ji aliyê mana û avabûnê ve di pêvajoya jihevketinê de ye.

Ji aliyê şêweyê ve, ji bo kapîtalîzma bi pêşengiya DYE li dawiyê were hîştin, li vê dunya me, ne erd û ne jî civakên nû nemane. Ji ber texrîbatên mezin ên sîstemê, Ewrûpa di pêvajoya rexne lixwegirtinê de ye. Hewce ye heta dawiyê jî wisa biçe. Ji bo Emerîka Latînî jî bibe duyemîn DYE, ne şertên civakî û ne jî yên dîrokî hene. Çarenûsa wan heta dawiyê bi Emerîkayê ve girêdayî ye. Efrîka hê ji dawiyê di heman rewşê de ye. Peravên rojava yên okyanûsê, Çîn û Japonya herî zêde dikarin ji bo dewama sîstemê alîkariya DYE bikin. Ji bo kapîtalîzmeke nû ya afirîner, ne îddîa û ne jî derfet hene. Tenê dikarin baş bi cih bînin. Rûsya, Sowyetê, stratejîkî têkçûn qebûl kiriye û pêşketin bi alîkariyên DYE wek polîtîka pejirandiye.

Li dawiyê Rojhilata Navîn a bi bela dimîne. Xweber nîne, Rojhilata Navîn ji aliyê çandî û cografik ve bûye bela serê sîstemê. Hucre û şaneyên kok ên civakê li vê derê ne. Koka kesên şaristanî

dane destpêkirin û dewamkirin li vê derê ne. Îlah hemû li vir in. Dûr nêz kurê li mala bavo vegere, hesabên malê wê ji nû ve werin kirin. Ev rola li gorî mîsyona DYE êdî bi Projeya Rojhilata Navîn a Mezin ketiye qonaxa bi cihanînê. Têkilî û nakokiyên ku wê her biçin zêde bibin, wê diyar bikin ka ji kaosê wê çi derbikeve. Ji niha ve ya mirov dikare bibêje ev e; bi bûyerên li Rojhilata Navîn wê sîstemê ji dawiyê ve ji hev bibe. Ji wê ya girîng ew e ku ji hevbûn çareseriyeke rast e. Nuqteyên nakokiyê lê bişkên, ew qadin ku kaosê herî zêde li wir bibe. Ev qad bi piranî ji bo nûbûnê, rola dergûşê û malzarokiyê dilîzin. Gelo şaristaniya berê ya li ser bermahiyên perestgehên rahîbên Sumeran welidîbû, vê carê qebra wê tê amadekirin?

---

## BEŞA DUYEMÎN

### Civaka demokratîk ekolojîk

A - Di civakê de cewherê dîrokî yê nirxên komînî û demokratîk

Yek ji kêmasiyên bingehîn ê sosyolojiyê ev e; civakên bi ser dewletê û avahiya hiyarerşîk ên di tevahiya xwezaya dîrokê de diviyabû bi mantiqekî dualî yê diyalektîkê bijîn, nekarî aliyê wan yê din yanî partnerê wan nîşan bide. Mîna ku dîrok bêyî nakokî, tenê li ser xeta sîstemên civakî yên serdest meşiyaye û dimeşe. Çawa ku di her rastiya xwezayî de tê dîtin, nirxên civaka xwezayî di tevahiya dîrokê de wek dijberên civaka dewletparêz û hiyarerşîk rol lîstine û pêş ketine. Bi wan xwe xwedî dike, mezin dike, pêş dikeve û şaxên cihêreng berdide. Divê mirov hêza civaka xwezayî piçûk nebîne. Ev civak di rola hucreya kok û bingeh de ye. Çawa ku ji hucreya kok hemû hucreyên din ên pê ve zêde dibin, ji civaka xwezayî jî sazî û lebatên pêve derdikevin. Dîsa çawa ji van şaxan organ û sîstem zêde dibin, ji saziyên seretayî yên civaka xwezayî jî - saziyên seretayî yên hiyarerşîk - organên din ên pêşketî û sîstemên civakê derdikevin. Mumkîn e civaka xwezayî were tepisandin, were paşvexistin û tengavkirin, lê ti car nayê tinekirin. Ji ber ku wê demê ji civakbûnê tê derketin. Kêmasiyeke mezin e, sosyolojiyê nekariyê vê tespîtê bike. Ji ber ku civakên xwezayî di nava mîlyonan salan de pêk hatine, dikarin dewletê û hiyarerşiyê xwedî bikin. Naxwe diyalektîka dualî çawa dikare bibe? Eger mirov civakan bi amûrên aboriyê, yan jî nertinên teng ên çînî analîz bike, wê wextê hê di serî de hêmanên bingehîn ên rastiyê li der ve hatine hîştin. Ev xetaya mezin, şaşî û xwe xapandin, hatiye kirin. Jixwe helwesteke xwedî îddîa mîna Marksîzmê ku civaka xwezayî ya jê re digotin komînî wek civakeke

hezar salan berê temenê xwe tijî kirî û qediyayî hesiband, ev têgihîştina neyînî hê jî sor kir.

Civaka xwezayî ti car neqediya. Tevî ku dijberên xwe xwedî kir xilas nebû. Karîbû her tim xwe dewam bike. Wek sparteya serf, kole û etnîsîteyan, li dawî hiştina çînayetiya karkeran û wek zemînê civaka nû ya bilind dibe, wek civaka koçber a li daristan û çolan, wek malbata dayikê û gundiyê azad, tevî hemû ziraran, civaka xwezayî wek exlaqê zindî yê civakê ti car kêm nebû. Berovajî texmînan, motora pêşdebirinê ya civakê, ne têkoşîna çînî ya teng e, berxwedana mezin a nirxên civaka komînî ye. Mirov têkoşîna çînî înkar bike rast nîne. Ew tenê yek ji dînamîkên dîrokî ye. Ya rola sereke lîstiye, her koçerê gerok ê daristanan, çiyan û çolan bû. Wek form a jiyaye tevgera etnîsîteyê - eşîr, gel qebîle - ye. Ew hêz e ku etnîsîteyê karîbû bi hezarê salan, li dijî hemû êrîşên bêrehim û zehmetiyên xwezayî li ber xwe bide. Destan, ziman, nişmîtî, nirxên resen ên mirovatiyê û çanda berxwedanê, exlaqên wê ne.

Yek ji pirsgirêka herî zêde tê guftûgokirin ev e; gelo ji krîza kapîtalîzmê kîjan sîstemê derbikevin. Piştî şerê cîhanê yê yekemîn jî krîz derket. Şoreşa Bolşevîkan pir ji nêz ve eleqeya wê bi analîza Lenîn a di vî warî de heye. Şerê cîhanê yê duyemîn dida nîşan ku krîz neqediyaye û karekterê krîzê yê domdar îfade dikir. Kapîtalîzm bi ser xwe ve hat û xwe da ser hevdu. Bi duyemîn şoreşa mezin a zanist-teknîkê pir mezin xwe pêş ve çip kir. Ev çipkirinên wê yên demkurt nekarîbû pêşî bigire ji bo derza krîzê şax nede. Piştî salên 1970'yî, tevî jihevketina Sowyetê krîz sivik nebû, berovajî girantir bû. Bi awayekî berçav îspat bûye ku avabûna Sowyetê barê sîstemê sivik kiriye.

Di vê pêvajoyê de ji bo çareserkirina krîzê, ji nû ve, dijberên sîstemê û şîroveyên xwe yên neolîberal ketin rojevê. Gelo Neolîberalîzm karîkaturekî dema buhurî ye? Yan jî bi navê "globalîzmê" wek îddîa dike nûbûneke rast e? Tevî ku ev guftûgo hê jî bi lez dewam dike, piştî krîza sosyalîzma reel, alterneftîfa gelan xwe hê zêdetir ferz kir. Tengezariya sîstemê ya di navbera DYE, YE û Japonyayê de, şerê bakur-başûr û aliyên civakê yên zêde tûj dibûn, ber bi ku ve dibirin? Ekolên mîna hawîrdor, femînîzm û çandî, wek aktorên nû diketin pêvajoyê. Ji bo çareseriyê saziyên sivîl û mafên mirovan qîmeta xwe hê zêde dibûn. Baskê çep ji bo xwe nû bike her hewl dida. Li aliyekî guftûgoyên Klûba Dewlemendan a Davosê û li aliyê din guftûgoyên Klûba Feqîran a Porto-Allegre dunyayeke çawa pêşkêş dikirin? Ji ber ku guftûgo seresere û kûr nebûn, tenê

dikarîbûn karê rojê bimeşînin. Pêşbîniya teorîk û sîstematîk li cem her du aliyan jî kêm bû. Tevgera bi bername û bi plan bi sînor bû. Bi kurtî, ji bo alîgirên azadî-wekheviyê ji krîzê serketî derbikevin, ne agahî û ne jî sazûmankariyê têr xuya dikir. Dîroka hemdem, li ser navê gelan û kedkaran di serî de şoreşên di salên 1848, 1871, 1917 de jiya, lê ev şoreş û gelek pêlên din ên şoreşê di nav deryayên lîberalîzmê de xeniqîn û eger ji bo careke din di deryayên bi navê neolîberalîzmê de nexeniqin, divê vê carê xetayên berê neyên dubarekirin. Hewce ye, formên serketî ji bo hêza agahiya rast û jinûve avakirina civakê werin dîtin. Bi taybetî, li Rojhilata Navîn ku her roja derbas dibe nakokî zêde dibin, krîz û hovîtî têne jiyîn, divê alternatîfa gelan maneya xwe bibîne û rengê avakirinê zelal bibe. Ji pêngava nû ya DYE ya bi krîza 11 Îlonê tê bi navkirin û rengekî xwe yê kûr ê komployî hebû, diviyabû alternatîfa gelan jî amade bibûya. Diviyabû ew çend alternatîfên xwe hebûna, careke din xwe nexapandana, careke din nebûna pîneyên sîstemê. Dîrok nefspiçûk, dilnizm, lê ciddî ye, bersivan dixwaze tê de xapandin nebe. Deriyên xwe li dubareyên bêhêvî û alternatîfên ceribandî, baş asê kirine.

Di vê parêznameya xwe de ez demeke dirêj li bersiva van pirsan geriyam ku vê yekê wek wezîfeyeke xwe ya girîng dizanim. Li aliyekî pirsgirêkên giran ên gelê Kurd li benda çareseriyên karibin pêk werin hene û li aliyê din jî pirsgirêkên Tevgera PKKê ya ji bo çareserkirina van pirsgirêkan rabûbû, hene. Ji bo çareseriyereke serketî, diviyabû ez maneya hêzê û amûrên avakirinê peyda bikim. Ez vê berpirsiyariyê li cem xwe dibînim û lê hayil im ku divê ez di şexsê gelê me de ji netew wêdetir li ser navê alternatîfa hemû gelan tevbigerim. Lewra ji têgihişîtina berê ya teng a "welatparêzî û enternasyonalîzmê" wêdetir, min têgihîştineke humanîzm û xwezagerdûnê kir hîmê nertin û helwestên xwe. Bi vê armancê, ramanên li ser civaka ekolojîk û demokratîk ji bo nirxandin û guftûgoyê hatin pêşkêşkirin.

Beriya her tiştî, pirsa di serî de divê em bersiva wê bidin ev e; divê çarçoveya me ya teorîk çi be? Eger teorî nebe, dikare encamên çawa bibin? Teoriyên kêm û şaş dikarin me bibin ku? Taybetiyên teoriyeke bêqusûr û li gorî armancê divê çi be?

Tevî ku gotineke moda ye, lê di cewherê xwe de rast e, em di serdema "civaka agahiyê" de dijîn. Bi vê gotinê mebest ev e; bêyî agahiya hewceyî pê heye, bihêlin çareserkirina veguherîna civakî ya pirsgirêkên xwe yên berfireh ên avakirin û maneyê hene, çareserkirina pirsgirêkên pir sivik û rêvebirina wan zehmet e. Jixwe

hewldana rêvebirin û çareserkirina pirsgirêkan bi şêwazê berê, bi piranî encama wê têkçûn e. Serketineke xwe spartibe şensê jî dereng zû rîska xwe heye, xwediyê bibe têkçûnê. Meş û jiyana wer hatiye û wer diçe, tê maneya ku jiyana rastîn her ku diçe maneya xwe wenda dike. Jiyana rastîn ne tenê meş e, meşa bi lez e.

Ji lewra, eger civakên di krîzê de, bi perspektîfeke teorîk a tam û li gorî armancê neyên rohnîkirin û ber bi hedefê ve neyên rêvebirin, îhtîmaleke xurt e, hewldanên bingehîn ên ji bo veguherînê têk biçin û heta berovajî encaman bidin. Di demên bi vî rengî yên dîrokê de em li ponijandin û ramanên mezin şahidiyê dikin ku ev yek ji taybetiya bûyerên diqewimin tê. Berî û piştî pêkhatina sîstemên nû û derketina şaristaniyan, em li ekolên mezin ên raman û baweriyê bi heman sedeman şahidiyê dikin.

Ji ber ku Marksizm-Lenînîzm mora xwe li kevneşopiya muxalif a sedsala 20. xist, hewce dike em tim li ser rawestin. Em heta şaşiya vê têgihîştina ku herî zêde bandor li me kir, nebînin, em nikarin gav biavêjin. Ji bo şaşiya wê bihata fêmkirin, hewce nebû di ser re 70 sal derbas bibûya.

Ez têgihîştina xwe ya sîstemê ku hewl didim wek civaka ekolojîk û demokraktîk bikim têgîn, li derveyî sînorê îqtîdara dewletê pêk tînim û wek cewherê helwesta xwe ya teorîk datînim holê. Ne tenê li derveyî têgihîştina îqtîdara sîstema kapîtalîst, li derveyî hemû civakên dewletparêz ên klasîk û îqtîdara dewletan, lêgerîna min li çaresereyî, cewherê perspektîfa teoriya min e. Berovajî texmînan, ev helwesta min utopîk nîne, helwesteke teorîk e, heta dawiyê bi rastiya civakî ve girêdayiye û wek destketiyeke girîng a têkoşîna xwe dibînim. Ji bo ez xwe bigihînim hêza teorîk, tevî ku bingehê min ê şexsî û civakî rola wan hene jî, rola esasî ev e; ez li civaka dîrokî di nav avabûna wê ya sîstematîk de serwext dibim. Di binê serwextî û têgihîştina min de jî taybetiyên têkoşîna min û berpirsiyariya min heye. Di pêkhatina ekolên ramanê û dînên mezin de cihê zindan, îxanet, êş, sulûk û înzîwayên bi dehê salan nayê nîqaşkirin. Di avabûna vê ramanê de nirxên civaka xwezayî, etnîsîte, şerê hebûnê yê xizanan jî cihê wan ê mezin hene. Em nikarin dîrokê wek bûyerên li dora îqtîdara siyasî bibînin û ev nikare bibe bingehê me yê dîrokî. Lê eger ji bo sîstem yekpare were fêmkirin û ji bo ders jê were girtin, dibe qîmetek wê hebe.

Dîroka divê em esas bigirin, ya kesên dijberên civaka çînî û hiyarerşîk in. Hemû dîrokên siyasî yên fermî, yan hîç behs nakin, yan jî wek komên anarşîstan, girseyên bêhîkmet û ji bo armanên xwe

wek keriyên werin bi karanîn dîtine. Ev dîrok, bi qasî ku zuha, mucered û îdealîst e, ew çend jî têgihîştineke hisî ya zalîmane ye. Dîroka me dikare ji civaka xwezayî dest pê bike û bi her cure raman û çalakiya etnîstîte, çîn û mehkûmên cinsiyetparêz ên li dijî îqtîdara siyasî û hiyarerşîk maneyê bibîne.

Piştî ku me bingehê dîrokî yê teoriya xwe destnîşankir, aliyekî din ê girîng ev e; hewce ye, hêza zanebûnê di nav civakê de bigihîje asta herî bilind. Eger em têgihîştina xwe ya rast a dîrokê, bi asta bilind a zanebûnê re negihînin hevdu, em tam nikarin hêza xwe ya têgihîştinê ji bo paşerojê û şêwazê xwe yê avakirinê diyar bikin. Eger teoriyek, ji hemû kapasîteya zanebûnê ya sîstemê wêdetir nebe xwedî têgihîştin, ne tenê kêm be, wê di nav têgihîştina teoriyên dijber de jî bihele û divê em vê yekê wek bingehê rastiya têkoşîna îdeolojîk fêm bikin.

Eger çarçoveya teorîk ya derbarê sîstema civaka ekolojîk û demokratîk de wisa were danîn, ev dibe gava yekemîn. Em hundurê wê çiqasî tijî bikin û bi cih bînin, sîstema pêş de bikeve, wê ew çend bibe sîstemeke azad û wekhev. Em dikarin bibêjin; sîstemek bi vî awayî pêş bikeve, ne sîstema hiyarerşîk û dewletparêz a klasîk e, ne jî sîstema koletiyê ye ku tê mêtin, eciqandin û têk diçe. Sîstemeke exlaqî ye; bi xwazayê re têkiliyeke diyalektîkî ya dikare dewam bike daniye, di hundurê xwe de cih nade tehekumê û berjwendiyên hevpar yekser bi demokrasiyê diyar dike.

Di pêkhatina civaka komîn de gotina "komîn" ji şêwe zêdetir ji bo cewherê dabaşê ye. Ev yek îspat dike ku civak bi şêweyekî komînî dikare hebûna xwe dewam bike. Wexta civak ji rengê xwe yê komîn derkeve, di heman demê de ji civakbûnê derdikeve. Her pêşketina li dijî nirxên komîn, bi xwe re hin nirxên wê jî dibe. Ji lewra ya rast ev e; mirov jiyana komîn wek bingehê jiyanê bibîne. Mirov bêyî şêwazê vê jiyanê nikare hebûna xwe dewam bike. Em vê rastiyê, ji bo ev şaşî werin fêmkirin bi israr destnîşan dikin. Li gorî gotina şaristaniyê yên civakê mezin dikin, nirxên îqtîdar û hiyarerşiyê ne. Yên mayî jî keriyên pez in. Mirov dikare bibêje; ev têgihîştin bi qasî ku kevn e ew çend jî yekemîn derewa mezin û sîstematîk e, hiş û zêhniyeta mirov zêde mijûl û dagir kiriye. Çendîn karîbûye mirovan bi vê derewê bide bawerkirin, pêvajoya li dijî xwe jî rewa kiriye. Ev îdeayeke wer mezin e, di roja me ya îro de jî hema hema kes nemaye pê nexapiyabe. Tevî ku nîzama komînî şêwazê hebûna jiyanê ye, nirxên jiyanê bilind û mezin dikin, ji bo hêza îqtîdar û hiyarerşiyê hatine hesibandin, ev di serê nakokiyan de tê,

divê were çareserkirin. Ev gotina ku dîroka civakî belovajî dike, di serî de dîrok, wêje û polîtîka, têgihîştineke bingehîn a hemû sazî û avahiyên jor e. Di dawiyê de şêwazê rastin ê ji bo hebûna civakê, dibe tiştekî bê zar û ziman.

Sosyolojî heta ku ji civaka seretayî re bibêje "civaka hoveber" hemû tespîtên wê nikarin xwe ji şaşiyê xilas bikin. Divê em dîsa li şibandina hucreya kok vegerin. Li gorî hemû hucreyên cihêreng dibin û şax didin, hucreya dike dibe ku hoveber be. Lê ev hovbertî ne bi maneya paşve mayînê ye, bi maneya esas, prensîb û seretayîbûnê ye. Heta bi vî rengî li nirxên civaka komîn neyê nertin, analîzên hemû saziyên din bê kok in, bi serê xwe wê nebin xwediyê maneyeke ciddî û wê wer bêne dîtin.

Eger em dixwazin di têkoşîna civakî de gavên me lihevkirî bêne avêtin, divê beriya her tiştî em bi rêz û rastîn li şêwazê hebûna civakê binerin. Civakparêzên herî radîkal û hemdem, ne tenê di analîzên xwe de, her weha di pratîka xwe de jî ji komînîtiyê reviyane. Eger were gotin; "ew taybet e, fikra wî komîn e" ev xapandineke mezin e. Ev encamê civaka kapîtalîzmê ye ku ji exlaq bêpar hîştiye. Hema bêje heta dawiya sedsala 20. jî mijarên etnîsîte-qebîle-eşîr-gel li derveyî sînorên sosyolojiyê bûn. Eger bi qasî îqtîdara sîyasî, qîmeta etnîsîteyê neyê dîtin, manedana pirsgirêkên civakî û çareseriya wan mumkîn nîne. Formê cewhera komînî herî zêde bi etnîsîteyê îfadeya xwe dibîne. Eger hûn etnîsîteyê ji holê rabikin wê ji civakê paşve çi bimîne? Marksîzm jî di navê de hemû ekolên ramanê yên hemdem, heta doh jî etnîsîste wek formeke arkaîk û bêkêr dinirxandin. Cewherê komînê hê zêde nêzî paşve mayînê nîşan didan. Ferdiyet çiqas derketa pêş, li nirxên civakê serdest bibûya ew çend girîng û bi şeref dihat hesibandin. Wexta ez dibêjim; rahîb ji sosyologan xwedî roleke neyînîtir in, ez mijareke girîng destnîşan dikim. Rahîb wek kesekî serwext ê pêşengê civakê, wek bawer dike û difikire ji bo civakê bi civakê re dijî. Rastbûna agahî û zanebûna wî şertê bingehîn nîne. Girêdana bi komîntiya civakê ve şertê esas e. "Sosyolog" jî agahî û zanebûna wî çi dibe bila bibe, komîntiya civakê esas nagire. Mîna elemanekî teknîkî nêzîk dibe. Jixwe felaket jî wisa dest pê dike. Bi giştî hemû zanyar, bi taybetî sosyolog, eger pîrozbûna komîntiya civakê nas nekin û heta bi mirina xwe pê ve girêdayî nebin, wê nikaribin xwe xilas bikin ji bo ji wan re neyê gotin; "çîna bêexlaqên mezin." Eger bi komîntiya civakî ve girêdayî bimana, wê ne şer û îqtîdar, ne mijokî û bi karanînê

bigihîşta asta îro. Em bombeya atomê bi kîjan civakbûyînê dikarin rave bikin?

Qonaxa pêşketinê ya herî nazik a civaka komîn e, wexta ber bi rengê hiyarerşîk ve diçe. Tecrûbeyên civakî yên zêde bûne rê li ber xurtbûna maneyê, ji vir jî ziman û ber sembolîzekirinê pêvajoyek heye. Dînê totem di vê pêvajoyê de pîroz dibe. Ji ber ku civak bi dîn yekemîn nasnameya xwe bi dest dixe girîng e. Ev rewş, têgihîştin û serwextbûna seretayî îfade dike. Pîrozbûna serwextbûnê bi vî rengî ji jiyana civakî bi xwe tê. Piştî ku veqetîn ji jiyana heywanî ya prîmat bû, cudahiya mezin a manedanê destpêkir. Cudahiya nû balkêş e. Taybetiyên yekemînbûnê di himbêza xwe de hildigire. Pratîka civakî di hemû gavên girîng de rê li ber pêşketinên bi heyecan vedike. Ev rewş serwextbûna zêde dibe îfade dike. Serwextbûn û têgihîştinê bi lêv dike, tîne ziman, bi nav û tarîf dike û pêre pêvajoya sembolîzekirinê dest pê dike. Pêvajoya têgihîştin û serwextbûnê ji bo pratîk û hilberandinê roleke xwe ya girîng heye. Bêyî têgihîştin mayîna li ser piyan zehmet dibe. Kalîteya jiyana tênegihîştî yekser tê dîtin. Kalîte û pêşketina naveroktijî bi cudabûna serwextbûnê re bi hev re dimeşin. Dîn hemû girîng bûn û pîrozbûna xwe di vê qonaxa nazik a jiyanê de werdigire û ji serî ve di nava xwe de nakokiyekê dihewîne. Ji ber ku civakîbûyîna seretayî, serwextbûn û nasnameyê îfade dike, jiyan bêyî civakîbûyînê zehmet e. Li aliyê din, ji ber ku pîrozbûnê, tabûtiyê - dest pê nekirin, dest nedan, qadên heram - û gelek rêzikan bi xwe re tîne, ji bo paşerojê muhafezekar e. Li serwextbûn û têgihîştinên nû girtiye. Bi vê taybetiya xwe pêşketinê berbend dike. Ji vê yekê, hê ji serî ve, pêvajoya pir dînan xwe ferz dike. Pir dîn û pir xweda, cudahiya di navbera têgihîştinan de îfade dikin. Erênî ye. Di destpêka dîn de her tişt bi ruhan - anîmîzm - dihat ravekirin, ev encameke nertina xwezayî ya pradigma civakî bû. Erênî ye. Pişt re her ku çû, ruhê mezin û ji wir jî derbasî pêvajoya xwedatiyê bû, ev yek ponijandina civakê ya ji bo bidestxistina nasname û xweseriyê îfade dike. Di vê pêvajoyê de nasname û xweserî sembolîze dibin. Di destpêkê de xweda civak bi xwe ye.

Çîroka Hz. Îbrahîm derbarê xwedê de balkêş e. Wek tê zanîn, Hz. Îbrahîm bi serî rakirina li dijî panteona - koma xwedayan - qral-xwedayên Nemrûd-Babîl, Asûr û şikandina pûtan, di dîrokê de ji yek şoreşên girîng ê zêhniyetê re pêşengî kir. Lê qebîleya Îbranî - gotina Îbranî di pêvajoya Misrê de ji "mirovên tozgirtî" re wek leqebekê tê bi karanîn - ya jê re pêşengî dikir rojekê jî nikare bê xweda bimîne. Ev xweda nabe totemên destpêkê. Ji ber ku li dijî pûtan şoreşek

hatiye destpêkirin. Lê afirandin û destnîşankirina forma nû jî zehmet e. Dewlemendî û xurtiyeke manayê tê xwestin. Bi kurtî, guhertineke radîkal a dînî hewce dike. Bêguman wê bikeve bin tesîra sîstema xwedayî û dînî ya wê demê. Lê bi awayekî dijwar, hem mecbûrî û hem jî hewceyî bi azadiya ew di xwe de digire heye. Di pêvajoya sulûk û înzîwayê ya kevneşopiya sîstema peyxemberan de armanc; xwe gîhandina serwextbûnê ye. Lê ev bi ponijandineke taybet dibe. Ji fikrên nû yên di zîhnê de hişyar dibin, têgîn û şêweyên wê re îlham û wehî tê gotin. Wehî dengekî mucered ê xwedê ye. Muceredî, ji nîzama paşve mayî ya pûtan, nîzameke hê pêşketî ya serwextbûnê îfade dike. Hz. Îbrahîm ku ev pêvajo jiya, bingehê dînê xwe danî. Bi îhtîmaleke mezin, wexta pirsgirêkên jiyanê ew tengav kirine ketiye sulûkê û bersiva wî dengê kevneşopiyê daye. Îbrahîm dibêje; "Tu kî yî?" Xwediyê deng bersiv dide; "Ez Yah-weh im." Maneya wê ev e; "Ew e" îşaret bi xwediyê deng dike. Aliyê balkêş di zimanê Kurdî de ev gotin nêzî; "va ew" e. Li gorî lêkolînên di warê koka Îbranî de hatine kirin, zimanê Îbranî gelekî di bin bandora Aryenî de maye ku bingehê zimanê Kurdî ye. Îbrahîm li Ruhayê li navenda derketina kevneşopiya peyxemberan derket û eger em vê rewşa wî li ber çav bigirin, emê koka meselê hê baş fêm bikin. Li herêmê çanda Samî û Aryen gelekî têkel bûye. Lewra tevlîhevbûna Samî-Aryen daweriviye nav çanda dînê nû. Wek tê zanîn, Yah-weh pişt re dibe Yahova, ew jî di dawiyê de dibe Yahûdî. Îsrael û Ellah jî encamên dawerivîna vê çanda Semîtîk in.

Sedema em li ser vê babetê rawestiyan ev e; ji bo em pêşketina di civaka komîn de bi mînakeke baş dizanin, çêtir fêm bikin. Em di derbasbûna mijarê de dixwazin helwestekê di babeta "Ellah" de jî nîşan bidin. Di bingehê vê têgînê de ku bi sedsalan e mejî û dilan mijûl dike, gotina Samî "El" heye. "El" fîgurekî xwedayî ye. Bi îhtîmaleke mezin BZ di salên 2000 de ji milê Samiyan Kenaniyan ve ev gotin çêbûye. Qebîleyên Kenaniyan, wexta li nîvçol û nîvdeştan koçeriyê dikin, hê zêdetir nêzî têgihîştina xwedayekî mucered in. Di jiyana komên koçeran de çem, çiya û zevî pir tinene ji bo hukum bikin. Xweza yeknesak û monoton e. Erd û ezman wek valatiyeke bê serûber in. Di vê rewşê de qebîle, wek hebûna bi tenê ye. Em werin rewşa hiyarerşîk. Di qebîleyê de saziya şêxtiyê pêş dikeve. Şêx rûsipiyekî zana yê qebîlê ye. Beriya avabûna saziya peyxembertiyê ye. Bi awayekî Samî şaman e. Pêşiyên peyxemberan e. Wexta otorîteya wî zêde dibe, hurmet jê re tê kirin û pîroz dibe. Wek ku mejiyê qebîlê be. Çendîn, hurmet û pîrozbûna wî ya zêde dibe dibin

têgin ew çend rewşeke dînî derdikeve holê. Wexta ji totemiya qebîleyê ber bi qonaxa xwedayê mucered ve diçe, têgîna "mezinbûn-bilindbûn" pêş dikeve. Berdêla vê gotinê "El" e. Di Erebiya îro de jî nêzî gotina "ela" ya bi maneya bilindbûnê ye. Qebîleya Îbraniyan wexta li diyarên Kenan - Filîstîn-Îsraîla îro - cîwar dibe, dikeve bin bandora çanda xwecîh û herêmê. Ji xweda "Yahova" ku berê hatibû pêşxistin, ber bi hemtayê wî yê ji koka "El" têgîna "Elohîm" ve diçin. Bi demê re ji Elohîm jî ber bi têgîna Ellah ve diçin. Bi pêşketina civakê re, bi xurtbûn û dewlemendbûna wê re, bi zêdebûna cihêrengî û nakokiyan re, têgîna Ellah jî ji sadebûnê Elê, ji mezinbûnê, di wexta Hz. Mûhammed de bi awayekî tevlîhev û girîftî ber bi bilindbûnê ve çû. Nod û neh sifatê wî çêbûn. Zehmet e mirov modeleke sosyolojî mîna vê bibîne ku karîbûye bi awayekî balkêş taybetiyên girîng ên pîroz ên saziyên civakî û têgînan, welê manîdar bike.

Em çend gotinên din jî li vê babetê zêde bikin; Ellahê me wek fîgurê hafiza pêşketinê ya civakê destnîşan kir, ne înkara wî, ne jî nirxandineke çor li ser wî rast nîne. Berovajî, ji vê têgînê, bi taybetî ji pêşketina qebîleya Îbranî, ji rêzikên civakî heta yên fizîk, kîmya û biyolojiyê di ilmê îro de hêza maneyê bi dest xistiye. Ji wir, mirov hûrûkûr xwe gîhandiye Kozmos û Kûantûmê. Mirovatî hatiye ber gen û hucreya zindî çareser bike. Ji lewra, analîzkirineke rast a derbarê Ellah de pîvaneke rastîn a xwedayî ye. Em vê pîvanê pir eşkere destnîşan dikin, ji bo were fêmkirin ku dîn divê çawa were şîrovekirin. Bi analîzên sosyolojîk ên rast, di roja me ya îro de pîrozbûneke rastîn dibe. Naxwe, bi awayekî jiber, zuha û pûç, qîrkirina girseyên gel bi gotina Ellah, pûtperestiyek a ji serdemên berê xetertir e û înkarkirina Ellah e. Di rastiya me ya civakî de jî jiberkirin mîna "pûtperestiya mucered" cih girtiye, divê ev were lanetkirin û li dawiyê were hîştin.

Sosyolojiya dîn ji destnîşankirina rastiya civakî dûr e. Divê têkiliya Epîstemolojiyê (zanista zanînê) baş bi civakîbûnê re were danîn û analîzkirin.

Rewşa heyî ya sosyolojiyê, mirov neçar dihêle ku mijarên herî sivik jî çareser bike.

Em bi israr destnîşan dikin ku heta cewherê civaka xwezayî neyê çareserkirin, wê bûyerên piştî wê jî rast neyên nirxandin. Eger çawa atomeke hîdrojenê - bi yek proton û elektronî - neyê çareserkirin wê çareserkirina ti elementî mumkîn nebe, her weha heta civaka kok civaka komîn neyê fêmkirin, em nikarin manê bidin cihêrengiya

rastiya civakê, wê tarîfeke kêm be, ji lewra wê zanisteke civakê ya şaş derkeve holê. Dikare were gotin; mîtolojî û teolojiyê têgihîştineke civakê ya fantastîk li pey xwe hîştin, lê sosyolojiyeke mîna boxçikeke pînekirî jî tenê hişê mirovan tevlîhev dike. Ev jî dibe sedem îqtîdar serê xwe bigire biçe û hê hov bibe. Ji ber ku tu komîntiyê ji hev dernexînî, tu nikarî îqtîdarê çareser bikî. Zemînê îqtîdara dewletê û hiyarerşî li ser mezin bûye, komîntî ye. Hiyarerşî wek têgîn tê maneya rêberiya pîroz; rûsipiyê zana dibe xwediyê otorîteyê. Di qonaxa derketinê de fonksiyana wê erênî ye. Rê nîşandana ciwanan, meşandin û rêvebirina klan-qebîleyê, qonaxeke pêşketinê ya li pêş e. Rûsipiyê zana jî di vê qonaxê de bi rola pê radibe dikare tengasiyên bi pîrbûnê re derdikevin hinekî sivik bike. Ya bi kêra wî jî tê ev e. Ji ciwanên li dora wî kom dibin ên bi qabîliyet ferq dikin ku ew dikarin bi tecrûbeyên rûsipî pêş bikevin û bi serbikevin. Wek yekemîn mînaka şîrovekariya dînî Şaman jî dikare bibe muttefîkekî nêz. Di warê dînî de Şaman her ku çû ket rola berdevkiyê ku ev jî nîşane şaman dibe rahîb. Hostatiya ciwanan a di warê nêçîrê de wan li dora şefekî kom dike û wan dike mîna prototîpekî jêreskerî. Hevgirtina Rahîb-Şef-Rûsipî hiyarerşiya mezin dibe îfade dike. Hînê wê negîhandina sazîbûna dewletê. Têkilî şexîne. Hêza li dora malbat-dayikê her diçe belav dibe.

Hêza afirîner a civaka komîn dayik, li dijî vê hevgirtina sê alî têkoşîneke mezin dide. Hemû bermahiyên dîrokî nîşan didin ku ev qonax pir dijwar derbas bûye. Civaka Neolotîk ya - BZ di salên 10.000 û 4000 de - bi serdema malbat-dayikê gihîşt asta herî berz, bi hevgirtina sê alî ya Rahîb-Şef-Rûsipî ku serdema bavikanî îfade dike, li dawiyê tê hîştin. Di mîtolojiya Sumer de Înanna-Enkî, Mardûk-Tîamat vê serdema beriya dîrokê sembolîze dikin. Şîroveyeke pir asayî vê rastiyê zelal dike. Înanna dayikeke xurt a beriya dîrokê sembolîze dike, bi israr behsa 104 amûrên şaristaniyê, têgîn û rêzikên "me" xwe dike. Tîne ziman ku xweda Enkî (yekemîn bavikê muceredkirî) nirxên xweser ên xwedawendan afirandine dizîne. Beşê herî bi heyecan ê destanê ev e; Înanna ji bajarê xwe órûkê diçe bajarê Enkî Erûdayê û bi hezar zehmetî "me"yên xwe direvîne. Ev têkoşîneke mezin nîşan dide. Di destana Babîlan de jî xwelihevrakişandina Mardûk-Tîamat zêdetir têkoşîna li ser otorîteyê îfade dike. Destguhertina bêrehim a dayikanî bi bavikanî, bi zimanekî mîtolojîk tê îfadekirin. Versiyona duyemîn û sêyemîn a van destanan, em di şaristaniya Misriyan de Îsîs-Osîrîs, di Grekan de Zeûs-Hera, û di Hîtît û órartûyan de heman versiyonan dibînin.

Agahiyên em ji mîtolojiyê hîn dibin, em dikarin ji dînan jî, bi taybetî jî dînên yek xwedayî jî hîn bibin. Ya Mûsa li kevneşopiya Hz. Îbrahîm zêde dike ew e, ku jinê ji sedî sed digire bin zevtûreptê. Di dema Hz. Îbrahîm de jin hê tam nehatiye piçûk xistin. Têkiliya di navbera Îbrahîm û Sara de hema hema di weznekê de ye. Di mînaka Mûsa-Marîam de kesa bi navê Marîam ku xuşka wî ye, bi têkçûneke dilêş hatiye mehkûmkirin. Hêza xwe ya dawî jî wenda dike. Li cem Hz. Dawûd û Silêman jî jin amûrekî yekalî yê zewqê ye. Ti otorîteya wê xuya nake. Jin di nav qraliyetan de amûrê zewq-kêfê ye, amûrek e, pê nifş dewam dikin. Her çiqas carnan şexsiyetên mîna Ester, Dalîla derbikevin jî, ew jî nikarin xwe xilas bikin ji bo neyên bi karanîn. Em di mînaka Hz. Îsa û Meryem de tenê gotinekê ji devê Meryemê nabihîsin. Tu dibêjî qey zimanê wê hatiye jêkirin. Ber bi roja me ya îro Xirîstiyanî di warê pêşketina jinê de gaveke mezin e. Di mînaka Hz. Mûhammed û Eyşe de trajediyek heye. Li hemberî otorîteya Îslamî ya feodal, Eyşe gazin û giliyekî mezin e. Dîrokzan radigihînin ku wiha gazin kiriye; "Ya Rebî! Li şûna ku te ezê bianiyama, te kevir bianiya çêtir bû." Di lîstika îqtîdarê de eger tu evîndara herî xoşewîst a peyxember jî bî, encam naguhere û tê gotin; ev nifir lixwekirin jî bi vê sedemê hatiye kirin.

Ya rastîn, hiyarerşiya civaka bavikanî, di şerê xwe de ku bi hêza dayikanî re kir, hêzeke mezin bi dest xist û pir eşkere mirov dikare vê yekê di civakên etnîste de jî bibîne. Piştî vê têkçûnê di forma jinê ya civakî de şikestinên mezin xuya dikin. Jina ku berê dikarîbû hilbijêre, êdî wek mal ew dihat hilbijartin. Ji wê jina mêr li dora xwe bi rêxistin dikir û ji bo otorîteya xwe ji dest dernexîne demeke dirêj li ber xwe da, jineke îradeya xwe wenda kirî, fîgurek û nasnameya jinê ya li hemberî daxwazên mêr razîbûyî zêdetir tiştek nemaye. Mînakeke din a nîşan dide ku ev pêvajo wisa hêsan derbas nebûye ev e; namzetên mêr ên qral ku bi xwedawend-dayikê re dizewicîn, di salvgera zewaca wan a pîroz de bi merasîmeke pîroz dihatin qurbankirin. Em di gelek civakan de li bîranîna van merasîman rast tên û ev semboleke nîşan dide, ji bo otorîteya xwe wenda neke, jinê çawa demeke dirêj li ber xwe daye. Merasîmên qurbankirinê bi awayekî sembolîze nîşan didin ku zilamê otorîteyê bidest dixe, çawa tê astengkirin. Di civaka Sumer de BZ di salên 2000 de em dibînin di şerê Tîamat-Mardûk de ev pêvajo bi têkçûna jinê bi dawî dibe. Di pêvajoya şaristaniyê de BZ piştî salên 2000, em mînakên bi vî rengî li ba hemû civakên koka wan Rojhilata Navînî ne, dibînin.

Civaka hiyarerşîk di destpêkê de her çend roleke erênî lîst jî, her biçe wê yan belav bibe, yan jî bibe dewlet. Di navbera dewletê û civaka komîn a seretayî de qonaxeke derbasbûnê ye. Lê hêza xwe ji civakîbûna xwe werdigire. Ev şêwazê otorîteyê, bi sedema demeke dirêj û vekirî meşiyaye, bi taybetî di nav komên etnîk de derketiye asta herî jor. Ya esas, stû li jin, ciwan, etnîsîte û endamên din tewandî, civaka hiyarerşîk-bavikanî ye. Ya girîng jî şêwazê rêvebirina vê otorîteyê ye. Otorîte ne bi qanûnan bi exlaq tê rêvebirin. Exlaq ew hêza rêzikan e, ya ku divê civak guh bidiyê. Ev hêz bi darê zorê nayê meşandin, ji bo hebûna civakê dewam bike her kes bi dilê xwe tevlî dibe. Cudahiya wê ji dîn, di şûna pîrozbûnê de bi pêdivî û hewcebûnên dunyevî dimeşe. Bêguman dîn jî dunyevî ye, lê aliyê têgînan ên bi efsûn û herî kevinbûna wan, perdeyeke pîrozbûnê bi wan de dike. Hînê mucered e, û bi merasîman dimeşe. Karûbarê rojane û rêzikên hewceyî bi wan hene, exlaq e. Tevî ku di zikhev de ne, exlaq timî karê dunyayê sererast dike û rêve dibe. Dîn jî hewl dide bersivan ji têgihîştina bawerî û dunyayên din re bibîne. Dîn teoriya civaka seretayî ye, exlaq jî dibe pratîka wê.

Ji bo rêvebirina civakê, ev her du sazî heta qonaxa dewletbûnê qîm dikin. Em dikarin ji vê serdemê re bibêjin, serdema civak bi tore, kevneşopî û baweriyan hat rêvebirin. Di civakê de hê jî ya herî xurt ne şexsî, taybetiya komîntiyê ye. Ji bo girêdana bi komîntiyê ve, divê kes herî zêde li gorî rêzêkên komînê yên exlaqî û dînî bimeşe. Eger li gorî wê nemeşe û guh nede, ev di civakê de tê maneya alozî û arîşeyê. Ev jî ji hevbelavbûn û îmha ye. Ji lewra dîn û exlaq di vê serdemê de bawerî û kiryarên xurt in. Kesê guh nede dîn û exlaq, ew xirabiya herî mezin bi civaka heyî dike. Zehmet e civak xwe li vê yekê rabigire, neçar e bi cezayê herî giran bersivê bide. Yan diavêje derveyî civakê, yan jî digire perwerdeyeke hişk. Ya girîng ew e ku taybetiya xwe ya komîn wenda neke. Di dînan de hê jî tê dîtin, bi cihneanîna hin rêzik û îbadetan gunehekî mezin e û ev hêza komîntiyê nîşan dide. Têkiliyên komîniyê taybetiya xwedayetiyê destnîşan dikin.

Di roja me ya îro de, tevî ku nirxandineke şaş li ser dîn tê kirin, pir zêde li ser tê sekinîn. Ev jî bi sedema dîn wek meseleyeke şexsî tê dîtin. Lê ya rastî dîn meseleyeke şexsî nîne, yekemîn rastiya civakê ye, bûye têgîn, exlaq û şêwazê rêvebirinê. Hiyarerşîzm, bi maneya rêveberiya pîroz vê rastiyê îfade dike.

Şerê civaka komîn bi hiyarerşiyê re her tim heye. Piştî ku nirxên maddî û manewî ji nû ve li civakê vegeriyan, ji bo hê zêde werin

înhîsarkirin (monopol-tekel) şaxên nû li rêzikên dîn û exlaq dikevin. Di rastiya dînî de ku nirxên civaka bavikanî nîşan dide, ber bi têgihîştina yek xwedayê mucered ve gav têne avêtin, otorîteya civaka xwezayî ya dayikanî jî bi têgihîştina pir xwedawendan li ber xwe dide. Di nîzama malbat-dayikê de ked, hilberandin û ji bo xwedîkirina her kesî dayîn pîvaneke bingehîn bû. Exlaqê bavikanî bi rewakirina hilandin û danaserhev rêya mulkiyetê vekir, lê exlaqê civaka komîn hilandin û danaserhevê şerm û wek çavkaniya xirabiyan dibîne. Lewma belavkirina wan teşwîq dike. Koka têgîna "comerdî-camêriyê" jî di vê rastiyê de razayî ye. Li dijî mulkiyeta taybet, hewl dide mulkiyeta kolektîf biparêze. Di civakê de her diçe lihevkirin xira dibe û tengezarî zêde dibe. Çareserkirina vê nakokiyê ya di vegera li nirxên berê de dibîne, yan jî di zêdekirina hêza xwe ya der ve û hundur de dibîne. Bi vî awayî bingehê civakê yê şîdet û şerê xwe dispêre mijokî û zordariyê pêk tê.

Komên hiyarerşiyê yên li dora nirxên maddî û manewî mezin dibin, ji bo ji hev belav nebin bi çavnebarî, timî otorîteyê pîroz dikin û ji bo mafdariya mulkiyetê nîşan bidin, dikevin nav hewldanan. Komên hê piçûk û belavbûyî, zehmet e karibin li dijî vê hêzê li ber xwe bidin. Lê klan û qebîleyên bindest, wê karibin bi koçeriya xwe ya domdar hebûna xwe ya azad biparêzin. Koçer ne tenê ji bo nêçîr û berhevkirina pel û pincaran, zêdetir ji bo parastina nirxên komîn bi meşeke dîrokî daketine çolan, derketine çiyan û xwe berdane zikê daristanên kûr. Ev meş ku timî di hinav û dilê xwe de evîna azadiyê werdigire, yek ji liv û tevgera girîng a dîrokê ye. Hewcebûna bi parastinê, klan û qebîleyê neçar dihêle ji bo bibe eşîr. Eşîrî tenê mezinbûneke biyolojîk îfade nake. Li dijî hîyarerşiyê awayekî formasyona berxwedanê ye. Di qonaxa destpêkê de otorîte di nav eşîrê de erênî ye, ji aliyê exlaqî ve jî bi destanan û muzîkê pesnê vê otorîteyê tê dayîn. Serekê eşîrê ji bo hebûn û azadiya eşîrê sembol e. Di şexsê wî de şeref, ewlekarî û zêhniyeta eşîrê tê temsîlkirin.

Ev pêvajoya bi nakok qonaxa bigihîjê, wek saziya otorîte û zora mayînde, dewlet e. Derketina dewletê di dîroka civakan de duyemîn qonaxa mezin e. Di hilberandin, jiyana civakî, îqtîdar û zêhniyetê de guhertinên bingehîn dike. Ji ber ku şerê bê nîzam ê qebîle û eşîran, mulkiyet û berhemên hilanî binpê dike, wek tedbîr saziya otorîteyê ya xwe dispêre hêzê tê avakirin. Ji şaman rahîb, ji rûsipî qral, ji şef jî fermandar derketiye. Di her sê rastiyan de jî kes demî, lê sazî herdem in. Bi cihbûna li ser axê ku ji gundan derbas bûye, gihîştiye qonaxa bajarbûnê. Di destpêka civaka gundan de jiyana komîn serdest e.

Gund bingehê jiyana civaka Neolotîk e. BZ di navbera salên 11.000-3000 de ji bo şoreşa di warê zeviyan de cihekî pîroz e. Ji bo demeke dirêj bihevrebûna civaka komîn û civaka hiyarerşiyê jî temsîl dike. Axatî û begtî hê tineye. Malbat-dayik hê jî mîna peykerekî şerefê ye. Ji ber ku nirxên derbarê malbatê de hemû berhemên mejiyê wê ne. Bi heywanên ku kedî kirine û bi nebatên ku danine, jiyaneke mûcîzewarî ya bêhemta pêşkêş dike. Di vê serdemê de bi hezaran vedîtin û îcad, berhemên jin-dayikê ne. "Serdema vedîtinên jinê ye" ku ew mûcîdeke serdemê ye, navê wê nediyar e. Komên hiyarerşîk ên bi hêz dibin û qurnaz in, çav ber didin van vedîtin û berhemên dewlemend, desteser dikin û ji bo rewşa xwe mayînde bikin, dewletê ava dikin. Ji vê serdema gundîtiyê ya li ser hezaran tilên li qûntara Zagros-Torosê, li deştên ava Dîcle, Firat, Nîl û Pencabê av didin bajar hatin avakirin û pêre rê li ber nîzama dewletê (polîs) vebû.

Di avakirina gund û bajaran de, di civakê de li duyemîn parçebûna girîng, koçerî-bicihbûyîn zêde dibe. Parçebûna hiyarerşîk ji jor ber jêr ve ye, ya koçerî-bicihbûyî jî berwar e. Sîstemên civakî yên dîrokî êdî bi nakokiyên parçebûnê derxistin holê, reng digirin.

Şoreşa zêhniyetê ya bi gund destpêkir û bi bajêr kûr bû, pêşî xwe di çanda baweriyê ya dînî de nîşan da. Nîzama xwedayan, bi israr hewl dide, xwe bi temamî ji nîzama mirov û xwezayê veqetîne. Sifet û rengên nû li xwedayan têne kirin ku wek temendirêjiya wan, jiyana wan a li ezmanan, carnan xwe vedikişînin binê erdê; mirovan nagirin nav xwe; kêfa wan bixwaze mirovan ceza dikin. Ev taybetî li cem xwedayên mîtolojîk ên Sumeran hê pir cureyên xwe çêdibin. Ji xwedayên ku bajaran diparêzin heta yên çem, çandinî, derya, çiya, ezman û xwedayên binerdê, panteoneke - kadroyên xweda - dewlemend pêk tê. Ev nîzama têgînan bi hêzên xwezayî re di zikhev de têne kirin û hêza çînî ya ku mezin dibe, îfade dike. Ev forma dînî û nîv-mîtolojîk ku armanca wê pîrozkirin û mayîndekirina wan hêzên ku rûyê zemîn di nav xwe de parve kirine, ji bo nîzama nû ya hatiye avakirin rewa bibe, girîng e. Formên bingehîn ên exlaqî û baweriyê yên civaka komîn hildiweşin û yên nû di şûnê de hê xurtir û mayînde têne avakirin. Ev cudabûn, herî zêde di dema derbasbûna ji nîzama dînî ya xwedawendiyê ber bi nîzama dînî ya xwedatiyê ve xwe nîşan dide. Girîngiya Înanna-Enkî, Mardûk-Tîamat jî di vir de radizê.

Ti mîtolojî bi qasî mîtolojiya Sumeran nikare cudabûna çînî û pêkhatina dewletê, bi zimanekî saf, resen û helbestwarî bigihîne hêza maneyê. Em bi vegotineke harîqa re rûbirû ne. Mirov dikare hemû "yekemîn" sazî, têgînên civakî, aborî, siyasî û wêjeyî di civaka

Sumeran de bibîne. Dikare were gotin; ev resentî ya reng daye avabûna sazî û têgînên bingehîn ên civakê, di serê pêşketinên dîrokî de tê. Ji lewra analîzên li ser civaka Sumeran karekterekî wê yê gerdûnî heye.

Bi awayekî texmînî; pêkhatina bajar û dewletê li qûntara çiyayên Zagro-Torosê wek dewama şoreşa cotkarî-gund pêş ketiye. Beşê hiyarerşiyê yê bi giranî rahîb bûn, amûr û têgînên teorîk û pratîk ê vê şoreşa di dîroka mirovatiyê de herî demdirêj û berfireh bû, bi xwe re birin Mezopotamya Jêr. Bi îhtimalek mezin, di serî de hemû heywanên pêdivî bi wan hene, numûneyên tov û darên mêwan, amûrên çandinî û çinînê, xanî avakirinê, tevin, ragihandin û hwd. teknîka amade bi xwe re birine. Ji ber ku li cihekî mîna çolê îmkanên avdaniyê nînin nikarin van amûran bi dest bixin. Li gorî belgeyên bi dest ketine, çanda bi komên hatine herêmê nexşeya rê pir eşkere destnîşan dike. Ev koçberiyên BZ li derdora 6000-5000 bûne BZ ji 4000 salî û pêve karîbûne gundên şêniyên wan pênc hezar kes ava bikin. Sîteya dîrokî ya navdar órûk ku avakera wê xwedawend Înanna ye, BZ di salên 3200 de wek dewletekê mirovatiyê bi şeref dike. Bajarê órûkê wek xelateke xwedawend-dayikekê, bi yekemîn şoreşa bajêr numûneyeke nivîskî bi destana Gilgamêş bi awayekî mafdar bê mirin dibe. Gotina Gilgamêş ji aliyê etîmolojîk ve wek gelek gotinên din ên Sumerî koka wê Aryenî ye. Di Kurdiya îro de jî "Gil" di maneya "Gir" mezin de ye. Gamêş bi maneya gayê mezin Camûs e. Di çanda herêmî de hê jî ji bo mêrên xurt û bi hêz tê gotin; "mîna gamêşekî ye." Bi vî awayî em dikarin bibêjin, Gilgamêş mêrê xurt, mezin û bi hêz îfade dike. Jixwe tarîfa Gilgamêş a di destanê de jî bi awayekî, vê ravekirinê piştrast dike. Di nexşeya rê ya çandan de mirov dikare nirxên dîrokî bişopîne û ev rêbaz baş dikare hîn bike.

Çîroka di destana Gilgamêş de qraliyetê yanî çîroka derketina dewletê ye. Ji ber ku destana yekemîn e, çavkaniyeke bingehîn e, mînak tê dîtin. Dikare were gotin; ji Îlyadaya Homeros û Aîneîsa Vergîlîûs heta Komedya Îlahî ya qral Arthur a di Destana Dante de hemû berhemên dîrokî li ser vê şopê çûn e. Kî dizane, belkî jî yekemîn şoreşa mezin a di warê cotkariyê de jî gelek destanên xwe yê navdar hebûn, nehatin nivîsandin. Li ser şopê, mirov li vegotinên wan ên nivîskî di Sumer, Hîtît û Îyonan de rast tê. Dîsa em dikarin wan di amûr û qalibên muzîkê de ku heta îro hatine, his bikin. Di beşekî mezin ji wan de çanda eşîriyê xuya dike. Nirxên eşîrên îro hê jî dijîn û şopên ji Sumeran mane, bi awayekî balkêş dişibin hevdu.

Me ev gera piçûk a di nav dîrokê de ji bo em sîstema xwe ya nû ya civakî nas bikin, kir. Em civaka dewletparêz di nav dîrokê de jî dişopînin. Em dibînin; li dora kulta perestgehên mezin, hem saziya dewletê, hem jî bajar di zikhev de pêk tên. Marksîzm jî destnîşan dike ku dîn saziya li jor ava bû ye, lê paşê wek avahiya jêr nîzama aboriyê nîşan daye. Ji bo vê tarîfê em dikarin Sumeran mînak bidin. Perestgeh hem cihê hilberandina têgînên xwedayî ne, (qatê jor ê zîgûratê xwedayî, qatê jêr jî ji bo hilberandinên însanî ne) hem jî navenda hilberandinê ya aboriyê ne. Qatê jor Panteon e. Qatê jêr bi amûrên hilberandinê û berhemên hilandî tijî ne. Qatên navberê jî bi xebatkaran tijî dibin. Em nikarin perestgehê wek mizgeft û dêrên îro bibînin. Zîgûrat di dema derketinê de wek navendên afirandina zêhniyet û hilberandina maddî rolê dilîzin. Agahiyên di dest de van tespîtan pir eşkere piştrast dikin. Em ji bîr nekin, yê perestgeh ava kiriye rahîb e. Ev rastî bi xwe jî nîşan dide ku bi qasî dewlet û bajaran, di bingehê şoreşa avabûna jêr a hilberandinê de zêhniyet li pêşiyê tê. Perestgeh, saziyek e, zêhniyetê esas dibîne. Di zimanê Helenî de ji zêhniyeta perestgehê re teorî tê gotin. Di Helenî de teorî bi maneya "nertina xwedayî" - paradigmaya bingehîn - tê. Perestgeh zîgûratên Sumerî, bi awayekî balkêş hem wek navendên siyasî-teorîk, hem jî wek navendên aborî-teknîk, prototîpa bajarên ku wê pişt re pêş bikevin, di himbêza xwe de hildigire.

Zîgûrat tovê bajar û dewletê ne. Li wir berjewendiyên civaka hiyarerşîk di serê rahîb de sentez dibin û ji bo pêşketinên hê berfireh, modeleke teorîk tê pêkanîn û bi amûrên pratîk ên amade têne bi cihanîn. Ji perestgehekê bajarek, ji bajarekî şaristaniyek, ji şaristaniyekê dewletek, ji dewletekê împaratoriyek, ji împaratoriyekê jî dunyayek çêdibe. Ma ji vê mezintir mûcîze dibe? Bê sedem ji van erdan re nehatiye gotin diyarê mûcîzeyan. Dîrok jî dinivisîne qralên yekemîn ê Sumeran koka wan rahîb in. Di sîstema me ya hûnandî de jixwe wekî din nabe. Potansiyela qral-rahîb, dewlet çiqas xwe bi sazî dike û burokrasiya xwe pêş de dibe, bi sînor dibe. Polîtîka, yanî pirsgirêkên rêveberiyê yê bajarê ku mezin dibe, derdikevin pêş. Ji rengê pîroz ê dewletê, pêşketin ber bi aliyê sekuler-dunyevî ve diçin. Rahîb zêdetir bi karê toerîk re mijûl dibe, lê hêmanên polîtîk zêdetir bi pratîkê re dilebikin. Ev rewşa bi awayekî dijwar di zikhev de dimeşe, her diçe siyasetvanan derdixîne pêş. Bajêrê mezin dibe, siyasetvanê ku mezin dibe îfade dike. Gaveke pişt vê yekê jî ewlekariya bajêr tê û di vê qonaxê de jî rola fermandar derdikeve pêş. Bi vî awayî qraliyet xwe bi sê çavkaniyan xwedî dike. Her sê

çavkanî jî xwedatiyê esas dibînin. Ji wê rojê ve ya pêş dikeve, tenê pirbûn û cihêrengbûna vê modelê ye. Hucreya kok a dewletê perestgeh e. Pişt re hucreyên nû, şax, organ û sîstem in. Mîna mirov.

Eger em gotinên xwe bidin ser hevdu, em dikarin bibêjin; ev hemû pêkhatin û avabûn, avabûna jor dewletê îfade dikin. Di mîtolojiyê de dewlet wek saziyekê tê şibandina textekî zêrîn. Li ser vî textî, qralên mîna xwedayên namirin çarmêrkî rûdinên û bi awayekî ku ji vê jiyanê careke din qut nebin, nifş û zurriyetên xwe - çîn - ji mirovan vediqetînin. Ji ber ku rêveberiyê bi awayekî xanedanî dimeşînin, nifş û zuriyetên xwe nemir îlan dikin. Bi vî awayî, wek xwedayên bê mirin, qral li serê dîrokê li quncikê cihê xwe digirin. Ya herî balkêş, em ji vê parçebûna civakî, dikarin hemû nîşaneyên serdemên din bibînin. Di serî de wêje, dînên yek xwedayî, huner, polîtîka wek rawestgehên rê yên pêkhatinên resen derdikevin ser dîrokê. Em wexta çavkaniya dewletê baş bikolin û lêkolîn bikin, emê baş fêm bikin ka çima dewlet neçar bêrawestan, bêrehim û zêde jiyaye.

Di sîstema nû ya civaka dîrokî de dijberiya bi civaka komîn re, xwe wek civaka jor pêk tîne. Cudahî û kûrbûna navberê mezin kiriye. Ji aliyê mijara me ve, pirsa girîng ev e; ma mecbûr bû ev pêkhatin bibûya? Gelek teoriyên civakî, derketina civaka çînî wek şertê pêşketinê dihesibînin. Em bi bersivên hê nêz dikarin li hêzên pêşketinê binerin û analîz bikin. Li dora perestgehê avdanî pêş ketiye û berhem êdî dikare mirov hê zêde bi xwe ve girê bide. Derfet û îmkan çêdibin ji bo bi hezaran mirov baş bixebitin û karibin berhem bidin. Erxên mezin ên avdaniyê, mezinbûna erd û zeviyan, amûrên ji hesin û tûnc, keştiyên çem û erxan, îmkanê bazirganî û hilberandineke mezin didin. Wexta ev hemû faktor têne cem hevdu bajar ava dibe. Rêveberiya rahîban di destpêkê de nêzî komînîzma seretayî ye. Em bi vê dikarin bibêjin mecbûr nebû ji bajêr dewlet derbiketa. Dewletê bi serdestiya polîtîk û eskerî pêk bihata. Sedema vê yekê jî ev e; bi mezinbûna bajêr re tevî zehmetiyên rêveberiyê, hem qebîle û komên li çiyan, parastina bajêr, dikin pirsgirêkeke girîng a ewlekariyê. Ji bo civakekê ewlekarî û rêveberî bêyî dewletê nabe? Gelek bajar xwe bi xwe diparêzin - bi taybetî mînak Atîna - ne bi dewletê, bi xebatên serketî ya rêveberiyeke demokratîk karîbûn bajêr biparêzin. Di qonaxa destpêkê ya civaka Sumeran de ev model heye. Meclîseke ji berpirsiyarên qebîleyan pêkhatî, rêveberiyê pêk tîne, û wexta hewce dibînin ji ciwanên bajêr komên parastinê

dadimezrînin. Li gorî pêdiviya wezîfeyê fermandarek tê hilbijartin. Em vê pêşketinê di civaka Atînayê de hê berçav û sîstematîk dibînin.

Eger wisa be, rast nîne, derketina dewletê wek mecbûriyetê di hîmê dîrokê de were bi cihkirin. Eger em tarîf bikin ku dewlet wek amûrekî zordarî û rêveberiyê ji bo desteserkirina berhemê zêde hatiye bi karanîn, rastir e. Dewlet wexta vê yekê dike jî xizmetên ji bo gelemperiyê û ewlekariya giştî jî wek kamûflajê û sedemê xwe mezinkirinê bi kar tîne. Xizmetên ji bo gelemperiyê - feydeyên hevpar ên civakê - û ewlekariya giştî, meclîsa demokratîk a bajêr jî dikare bi cih bîne. Eger wisa be, wê wextê bi karanîna vê îmkanê, ji mecbûriyetê wêdetir, mirov wek desteserkirin û dij-şoreşê binirxîne, hê tespîteke li cih e. Xizmetên gelemperiyê û ewlekariya giştî ya bajêr li cihê bi demokrasiyê tedarik bibe, hêza bahaneyan diafirîne û xwe ferz dike, mirov wê wek hêzeke ji destpêka dîrokê muhafezekar û zordar bi nav bike, rast e. Di roja me ya îro de jî hêza ewlekariyê û siyasetvanan ji hewcebûnê wêdetir, ji ber taybetiyên xwe yên pasîf tenê taybetiyên despotîk bi dest dixin. Pêwîst e, ev hêz wek barekî zêde yê li ser nirxan were dîtin. Di destpêka lîstikê de jî ya diqewimî bi cewherî pir cuda nebû.

Lê tevahiya dîrokê ya ku mezin bû, ne hêza rêveberiya demokratîk, hêza rêveberiya despotîk bû. Her gava dewlet wek hêzeke despotîk pêş de bir, bihêlin ew wek pêşketineke mecbûrî be, di dîrokê de bû cewherê pêşketinên belovajî, muhafezekar û paşverû. Eger manedaneke teng be jî, mirov dikare şer û îqtîdarê wek daxwaza bingehîn a vê kevneşopiya di nav dewletê de xwe kamûfle kiriye bibîne û wan wek îrade û aqilê wê destnîşan bike. Ev helwesteke têra xwe girîng e. Dîsa di çarçoveya vê manedanê de divê mirov hunerê eskerî û polîtîk ji rêveberiya giştî û rastiya ewlekariyê veqetîne. Kesê hêza wî ya pratîkî û zanistî ya pêhesîne hebe, xwe nagire wê vê cudabûnê bibîne. Di analîzkirina dewletê de bi sedema ev cudabûn nehatiye kirin encamên wê pir neyînî bûne. Divê di helwesta me ya bingehîn de, em rêveberiya demokratîk û rêveberiya despotîk - ya kêfî ferdî - hem di warê teorîk de, hem di warê pratîk de ji hev bikin.

Di sîstemên civaka dewletdar û hiyarerşîk de xwe li hev rakişandina hebûna demokratîk û zumreya şer-îqtîdarê bingehê polîtîk ê rastiyê ye. Di navbera hebûnên demokratîk ên xwe dispêrin şêwazê - komîntiyê - hebûna civakê û koma şer-îqtîdarê de ku kirasê dewlet û hiyarerşiyê li xwe kiriye, timî têkoşînek heye. Bi vî awayî em dikarin bibêjin; motora dîrokê têkoşîna teng a çînî nîne. Şêwazê

demos (gel) yê ji bo hebûnê li ber xwe dide ku di navê de têkoşîna teng a çînî jî heye, û zumreya şer-îqtîdarê ya li dijî vê şêwazê, têdikoşin. Ya esas, civak xwe dispêrin van her du hêzan û dijîn. Bi asta şerê di navbera van herdu hêzan de zêhniyet, otorîte, nîzama civakî û amûrên aboriyê diyar dibin. Bi asta şer ve girêdayî, di dîrokê de piranî sê xetên di zikhevdu de derdikevin pêşberî me. Xeta yekemîn, rewşa serketina tam a zumreya şer-îqtîdarê ye. Fatihên ku serketinên xwe yên eskerî wek bûyerên dîrokî pêşkêş dikirin, ya ferz dikirin nîzama kolekirinê bû. Ji bilî zumreya şer-îqtîdarê, divê her kes û her tişt mîna hêza qanûnê di bin fermana wan de be. Cih ji muxalefet û îttîrazê re nîne. Di mejiyê xwe de jî kes nikare dijberiyê bike û bifikire. Wek tê ferzkirin tê bixebitî, bifikirî û bimirî! Lûtkeyê nîzamekî serdest ê bêyî alternatîf esas e. Bi taybetî kirinên împaratoriyê, faşîzmê û her cure totalîterîzmê di vê mînakê de cih dibînin. Monarşîzma qraliyetê jî vê sîstemê dike hedef. Di vê dîrokê de yek ji sîstemên herî zêde heye.

Di xeta duyemîn de jî berovajî sîstema me behskirî, gel heye. Nîzamê civaka gel - komên ji klan, qebîle û eşîran pêkhatî û ziman, çanda wan nêzî hevdu - li dijî olîgarşiya şer-îqtîdarê ya perdeya dewlet û hiyarerşiyê, nîzama jiyana azad e. Şêwazê gel ê têkoşer û têkneçûyî îfade dike. Her cure etnîsîteya li çol, çiya û daristanan li dijî êrîşan têkoşiyane û her cure komên dînî, felsefî yên xwe ne spartina olîgarşiyê, nûnerê vê şêwaza jiyana civakî ne. Jiyana etnîsîteyê aliyê wê yê bedenî li pêş e û bi mejiyê hisî tevdigere. Tevî jiyana komên dînî û felsefî yên têkoşer in û zêdetir bi mejiyê analîtîk tevdigerin, hêza bingehîn a jiyana civakî ya azad û wekhev e. Herikîna azadiyê ya dîrokî, encamê vê şêwaza jiyanê ya têkoşer e. Di civakê de têgînên girîng ên wek ramana afirîner, şeref, dad, mirovatî, exlaq, xweşikbûn û evîn, zêdetir bi vê şêwaza jiyanê re têkildar in.

Xeta sêyemîn a sîstemên civakê, rewşa bi "aştî, aramiyê" tê bi navkirin. Di vê xetê de her du hêz di navbera xwe de mêzîneke di astên cuda de pêk tînin. Her tim şer, pevçûn û tengezarî dikare hebûna civakê bixe xeterê. Ji lewra her du alî jî dikarin şerê ku her tim dewam dikin li gorî berjewendiyên xwe nebînin. Di navbera xwe de hewl didin bi hin konsensusan - lihevkirin - bigihîjin peymaneke "aştî û aramiyê." Ev xet her çend li gorî dilê her du aliyan jî nebe, li gorî şert û mercan lihevkirin û îttîfaq neçar e bibe. Heta şerekî din, rewş bi vî rengî tê meşandin. Ev nîzama jê re tê gotin; "şer û aramî"; ya rastîn rewşeke nîvşer e, di navbera hêza şer-îqtîdarê û hêza gel a têkneçûyî de ye.

Eger mirov ji mêzîna di navbera aştî û şer de bibêje; rewşa nîvşer rastir e. Xeteke çaremîn a şer û aştî tê de nebe, eger şert û mercên ku herdu alî afirandine ji holê rabe wê pêk were. Yan civakeke komîn a ev şert û merc hîç ne jiyabe, yan jî civakeke komîn a civaka xwezayî li dawiyê hiştîbe û nîzama şer-aştiyê hîç hewce pê nedîtibe û stewiyabe dikare aştiyeke mayînde bijî. Ya esas, di civakên bi vî rengî de cihê têgînên aştî û şer jî nîne. Nîzamên tê de şer û aştî nebe, fikir û têgînên wan jî nabin. Di dîrokê de wexta sîstemên civakî yên dewletparêz û hiyarerşîk hene, ev her sê xet jî bê mêzîn hene. Ji van sê xetan ti xet bi serê xwe nikare bibe sîstemeke dîrokî ya xwedî fonksiyon. Jixwe wê wextê dîrok nabe. Xeta "serweriya mutleq" û xeta "azadî û wekheviya mutleq" du seriyên ji rastiyê dûr in. Mirov zêdetir dikare wek du têgînên îdealîstî bifikire. Wek mêzîna di xwezayê de, di mêzîna civakê de jî du seriyên mutleq ji hev dûr ti car tam nikarin cih bibînin. Têgîna mutleqiyetê di cewherê xwezayê de tenê wek têgînekê ji bo mekan û demeke kurt, dibe ku were qebûlkirin, berovajî nîzamê gerdûnî nikare bimeşe. Em wexta bifikirin têgînên mêzîn û sîmetriyê nînin, divê bi herikîna yekalî dawî li hebûna gerdûnê bihata. Eger dawîhatineke bi vî rengî nebûye, wê wextê em dikarin bibêjin; mutleqiyet tenê wek têgînekê di fikrê de heye û di gerdûna rastiyan de cihê wê nîne. Mantiqê dualî yê diyalektîk di rewşeke nêzî mêzînê de bi herikîneke dewlemend û carnan jî kêm, di civakê de dibe ziman û mantiqê sîstema gerdûnî.

Tevlîhevî û dewama sîstemên civakî, di nav gelek civakên curbecur de bi xeta nîv şer-aştî bi awayekî "aştî û aramiyê" ye. Hemû hêzên gel û şer-îqtîdarê ji bo vê rewşê li gorî berjewendiyên xwe bikin û rewşa xwe ya zîhnî, siyasî, civakî, aborî, huqûqî û hunerî pêş de bibin, wê timî di nav têkoşîneke îdeolojîk-pratîk de bin. Şer rewşa herî krîtîk û dijwar a vê pêvajoyê ye. Ya esas, hêza şer-îqtîdarê şer ferz dike. Ji ber ku sedemê hebûna wî, hebûnên di destê gel de ne û bi vê rêbirrê dikare wan desteser bike. Çîn-gel jî ji bo bijîn, neçarin şerê berxwedanê li dijî van talanker û zordaran bikin. Pir hindik ji bo parastina xwe bersivê didin. Şer alternatîfa gelan nîne, ji bo hebûn, şeref û asta jiyana xwe ya azad biparêzin mecbûriyetek e.

Eger mirov di sîstemên dîrokî de bi vê çarçoveyê çav li rewşa demokrasiyê bigerîne, wê bi kêrhatî û hînker be. Têgihîştina dîrokê heta roja me ya îro bi paradigmaya zumreya şer-îqtîdarê li hev hatiye sererastkirin. Ji seferên komkujiyê re yên ji bo xenîmet û talanê hatin kirin, bi hêsayî qulpa şerên pîroz bi wan ve hat kirin. Têgihîştina xwedê ya şer ferman dike pêş de birin. Ji bo şer şêwazên vegotinê

yên herî balkêş peyda kirin. Heta roja me ya îro jî bi şeran her tişt tê heqkirin. Bi kurtî, ya bi şer bi dest tê xistin, heq e. Di binê heq û huqûq de şer hat bi cihkirin û ev têgihîştin şêwazê hebûnê yê dewletên serdest bûn. Wek mantiqekî giştî têgihîştina "heqê te bi qasî tu şer bikî heye" mîna rêbazekê cih dît. Ev zêhniyeta wek biqîre û bibêje; yê li heq digere divê zanibe şer bike, cewherê felsefeya şer e. Ev zêhniyet di hemû ekolên dîn, felsefe û huner de hatiye mezinkirin û heta ji bo çalakiya kulmeke desteserkar sifatê "çalakiya herî pîroz" hatiye bi karanîn. Navê qehremanî û pîrozbûnê li vê çalakiya xesipkar û desteserkar hatiye kirin. Bi vî awayî şerên ku hatin mezinkirin û wek têgihîştina serdest dan pejirandin, ji bo hemû pirsgirêkên civakî jî mîna amûrê çareseriyê hat dîtin. Weke ku bêyî şer rêyên din ên çareseriyê mumkîn nînin bi cih werin anîn û eger bi cih werin jî weke ku meqbûl neyên dîtin di têgihîştina civakê de bi cih kirine. Encam, amûrên çareseriyê yê herî pîroz şîdet e. Heta ev têgihîştina dîrokî neyê hilweşandin, ne rastiya civakî bi awayekî rastîn tê nirxandin, ne jî lêgerîna li çareseriyên pirsgirêkên civakê bêyî şer mumkîn dibe. Îdeolojiyên herî aştiyane jî nekarîn xwe ji şer bikin û ev yek hêza vê zêhniyetê nîşan dide. Dînên mezin ên timî doza aştiyê kirine, tevgerên çînî û netewî yên hemdem jî bi şêwazê zumreyên şer-îqtîdarê meşiyan û ev jî îspateke din a vê rastiyê ye.

Ji bo serîderxistina bi zêhniyeta şer-îqtîdarê hewce ye gel xwe bigihînin helwesteke demokratîk. Ez bi vê têgînê behsa têgihîştina "diran bi diran", yan jî "bi zimanê fêm dikin emê bersivê bidin", nakim. Pozîsyona demokratîk, her çend di hundurê sîstema xwe de şîdetê bihewîne jî, ya esas di şerê li dijî zêhniyeta serdest de çandek e, hîn dibe ku dikare xwe bi xwe hîn bibe û bi cih bîne. Ez behsa têgihîştinekê dikim ku ji şerê parastin û berxwedanê wêdetir e. Bi vê, ez behsa jiyanekê dikim ku di bingehê wê de bi navend dewletê ve têkiliya wê nîne. Çavên li destê dewletê, bi hêsanî dikevin şewka (derzî) zumreya şer-îqtîdarê. Belkî kurtêlekî bidin, ew jî ji bo nêçîrê ye. Eger mirov gelan di warê dewletê de rohnî bike, gava yekemîne li nav zeviyê demokrasiyê hatiye avêtin. Gavên pişt re werin avêtin; rêxistinbûneke demokratîk a berfireh û çalakiyên sivîl in. Şerên parastinê yên demokratîk, eger di vê çarçoveyê de mecbûrî bibin, dikevin rojevê. Şer ku bêyî gavên yekemîn were kirin, weke di dîrokê de mînakên wê gelek hatine dîtin, kes nikare xwe xilas bike ku nebe destik û aletê şerê xesipkar.

Yek ji armancên bingehîn ê analîza me, di nav dîrokê de pêvajoya pêşketina hebûna demokratîk e. Têkoşîneke demokratîkbûnê ya rast, bi têgihîştineke dîrokê ya rast mumkîn e.

Hebûna civakî ya heta mînaka Sumer, me hewl da tarîf bikin. Me gotibû bi hiyarerşî, çîn, bajar û rastiya dewletê ya di zikhev de dikeve rengê karektereke bi nakok. Ev ji aboriyê heta zêhniyetê, bi hemû şaxên xwe civakeke cuda ye. Zumreyeke bi rengê dewletê, timî bi şer û şîdetê nîzamê pêş de dibe. Desteserkirina dewlemendiyên hundur û der ve wek hunerekî polîtîk hîn bûye. Her weha zêhniyeta wê ya şer pîroz dike heye û hewl dide bi afirêneriya wêjeyê - mîtolojî - hemû beşên civakê bide bawerkirin ku ev sîstem ji ezel heta ebed a xwedê ye. Li dijî vê sîstemê ku BZ di navbera salên 4000-2000 de bi hemû safîtiya xwe meşiya, em dengên dijber û berxwedanan dibînin. Di destpêkê de meclîsa bajaran a ji giregiran pêkhatî di helwesteke demokratîk de israr kirine. Li dijî zumreya rahîb-qral-esker ji helwesta xwe ya demokratîk bi hêsayî negeriyane. Sîstemeke nîv dewlet-demokrasî têkel, demeke dirêj bi hev re meşandine. Di nava pêvajoyê de çi ji derve, - di destana Gilgamêş de alîkarê wî yê herî nêz Enkîdo bi rêya jinê tê bidestxistin. Ev mînaka yekemîn a sîxuriya jinê ye - çi ji hundur, gelek kesên ji qebîleyan qutbûyîn, an jî hatin qutkirin, di nav jiyana bajêr a dewlemendtir de, di nav rêveberiyê de wek karmend, an wek esker, yan jî wek kole hatine xebitandin. Ev pêşketin, mêzîna dewlet-demokrasiyê bi zirara meclîsa bajêr, xira dike. Bi pêşketina vê pêvajoyê re tasfiye dibin. Pêşketinên bi vî rengî, hema hema di pêkhatina gelek dewletên nû de têne dîtin.

Têkoşîna hundurîn bi têkçûna hêzên demokratîk bi encam bûye. Tevî vê yekê, di hundurê dewletê de mêzîna qebîleyê ti car nayê tasfiyekirin; wê bi awayên cihêreng hebûna xwe dewam bike. Tevî vê, sîstema civaka dewletdar dikeve bin zordariyeke mezin. Li dijî bi cihbûyîyan tevgera koçberan dest pê dike. Di lîteratura Roma-Helen de ji van tevgeran re "barbar" tê gotin. Ev tevgerên pir behsa wan hatiye kirin, gelek girîng e mirov bi diyalektîkeke yekpare li wan binere. Civaka bajêr a bi cihbûyî, bi keda koleyan û bi zexta bazirganiya bêmêzîn a ji der ve timî dewlemend dibe. Nakokiyê bi xwe diafirîne. Mîna emperyalîzma îro û kategoriya welatên paş ve hatine hîştin. Ya bi awayekî barbar êrîş dike ne koçer, bajar e. Heyf û mixabin, bi sedema bajar li ser afirandina nîzama têgînên me serdest e, xwe "medenî, pêşketî" û yên li derveyî xwe jî karîbûye wek hovên "barbar û dikin qîreqîr" bide nîşan û helwestên xwe rewa bike. Mirov

dikare, tevgera mezin a koçberan li dijî bajêr, bişibîne tevgera demokratîk a netewî di roja me ya îro de diqewime. Ji ber ku forma civaka koçberan qonaxên cûrbecûr ên etnîsîteyê ye, tevgerên afirandine jî di cewherê xwe de berxwedanên demokratîk û têkoşînên ji bo man û nemanê ne. Ya din, divê mirov baş lêkolîn bike, ka kî êrîşê dibe ser kê. Dewleta bajêr - pişt re împaratoriyet - a xwediyê amûrên hêza mezin a mijokî û zordariyê, ji ber ku neçar e timî mezin û belav bibe, bi awayekî berçav êrîşker e. Di vê rewşê de jî xweparastin û berxwedan para etnîsîteyê dikeve. Bi maneyeke din, mirov dikare, li dijî koletiyê wek pêvajoya yekemîn tevgera azadiyê bibîne.

Civaka Sumeran, belkî ji roja hatî damezrandin û pêve - jixwe sazûmankarên wê jî bi heman rê hatibûn - ji bakur û rojhilat, li êrîşên qebîleyên çiyayî yên bi koka xwe Aryen, ji başûr û rojava jî li êrîşên qebîleyên çolê yên Semîtîk bi eslê xwe Amorît - paşê Ereb - rast hatine. Di vê pêvajoyê de li dora bajaran beden û bircên mezin hatin avakirin. Êrîş û li dij rawestîna êrîşan, bê navber bi sedsalan ajot. Ji vê dualîtiya diyalektîk a dîrokî ya herî mezin û yekemîn, şaristaniyên mezin û etnîsîteya xurtbûyî derketin. Ev dualîteya balkêş a hê jî li ser erdên derketî di rastiya Iraqê de dewam dike. Em dibînin, BZ di salên 10.000 de bi şoreşa di warê cotkariyê de û di civaka wê de bi cihêbûna yekemîn ziman û komên etnîkî reng girtiye. BZ ber bi salên 4000 ve, em dibînin etnîsîte qalik digire, çanda xwe ya xweser û zimanê xwe yê cihê nîşan dide. Em dikarin texmîn bikin ku tevgera etnîsîteyê beriya şoreşa bajêr, ji bo erdên hê bi bereket, maden û kanên keviran şer dikir. Li qûntara çiyayên Zagros-Torosê çanda koma Aryen heye, li Erebîstanê jî - wê demê hê bi bereket e - çanda koma Semîtîkan heye. Ev her du çand li sînorê çol û çiyê digihîjin hevdu û sîstemên têkel pêk tînin. Ji bo vê çanda têkel, mirov dikare Sumeran, Îbraniyan û Hîksosan mînak nîşan bide. Ereb û Kurdan wek komên gel ên çanda Semîtîk û Aryen heta roja me ya îro hebûna xwe dewam kirine. Gelek komên din ên çandî ku pişt re hatine, di nav van herdu komên navendî de heliyane. Li Iraqê îro hê jî hêzên di nav têkilî û nakokiyên Kurd û Ereb de ne, belkî jî wek serdema yekemîn damezrandina dewletê ya Sumeran, hewl didin dewleteke bi çanda herdu sîsteman ava bikin.

Sumerî, komên Semîtîk ên ji bo başûr û rojava hatine û komên Aryenî yên ji bakur û rojhilat hatine baş nas dikin. Em hebûna van her du koman di mîtolojî û wêjeyê de li pirî cihan dibînin. Em, yekser jî nebe, dikarin çanda van koman nas bikin. Heta pêvajoya

dagirkirina Babîlê BZ di salên 330 de ji aliyê Îskenderê Mezin ve, şaristaniya bajêr a Sumer di navbera her du koman de belav dibe. Ev pêvajo welê derbas dibe. Mirov dikare bibêje; dîrok bi pêşketineke diyalektîkî ya di navbera bicihbûyan û koçeran de pêk tê. Berhemên têne afirandin ji Okyanûsa Etlasê heta Okyanûsa Mezin, ji Çola Mezin heta keviyên Sibîryayê, pêl bi pêl belav dibin. Şaristaniya bajêr çendîn ber bi der ve diçe, ew çend jî civaka koçer li hundur vedigere. Ji lewra nêzîkbûna li dîrokê ya bicihbûyên bajêr derbarê koçeran de pir kêmasiyên wê hene. Ji ber ku koçer piçûk dîtine. Di pêvajoya şaristaniya bi cihbûyî de dewlet çiqas pêş de diçe, helwesta demokratîk jî ew çend xurt dibe.

Emê di beşên pêş de jî bi berfirehî li ser rawestin, lê pir girîng e têkiliya di navbera dewlet û demokrasiyê de rast were fêmkirin. Demokrasî nebûye dewlet, şêwazekî rêvebirinê ye, gel xwe bi xwe dimeşîne û li dijî dewletbûnê ye. Bi dewletê re têkildar e, lê bi vê têkiliyê nahele, nikare xwe înkar bike. Yek ji pirsgirêka nazik a siyasî, destnîşankirina sînorê di navbera dewlet û demokrasiyê de ye. Hewce ye, mirov nuqteya navberê - aştî û aramî - ya dewlet lê demokrasiyê û demokrasî jî dewletê red nake baş rave bike. Ji herduyan yek a din înkar bike şer e. Ji lewra, gelek têgihîştinên hemdem ên demokrasiyê wek dûvik û perdeya dewletê dibînin, nirxandineke şaş dikin û li pey belovajîkirinê ne.

Wê çaxê, eger pirs were kirin, ka demokrasî li ku ye, bersiv ev e; etnîsîte ji bo taybetiyên xwe yên komîn li dijî dewletê û şaristaniyê biparêze, li ber xwe daye. Demokrasî di vê berxwedan û helwestê de ye. Ji ber ku sosyolog di nav çanda bajêr de hezar carî pijiyane nekarîbûne vê rastiyê tespît bikin. Ji texmînan wêdetir, zanyar xwediyê bûrjûwaziya hemdem in. Mîna girêdana bi pirtûka pîroz, bi nirxên bajêr ve girêdayîne.

Şêwazê hebûnê yê etnîsîteyê, eger wenda nekiribe, em dikarin wek nîv-demokrasiyê bi nav bikin. Pêwîst e, em sifetê "seretayî" jî li vê rastiyê zêde bikin. Etnîsîte demokrasiya seretayî ye. Di hundur de girêdana bi nirxên komîn, li der ve jî berxwedana li dijî dewletên tehekumkar, li ser komên gel, têkiliyên azad, wekhev û demokratîk ferz dike. Eger ev karektera têkiliyan nebe ti maneya berxwedanê namîne. Wexta li Rojhilata Navîn demokratîkbûn tê bi navkirin, şaşiyeke mezin tê kirin. Weke ku etnîsîte li pêşiya demokrasiyê asteng be. Demokrasiya Rojava ya xwe dispêre ferd bi serê xwe tenê nikare tarîfê diyar bike. Te, demokrasî ha spartiye dewletê, ha te spartiye ferd, şaşiyeke mezin e. Di civakê de kom û ferdên azad,

erkekî demokrasiya piranîparêz û pluralîst e. Têgihîştina kom û ferdên dişibin hevdu, ji bo demokrasiyê ne hewce ye, ne jî misoger e. Di demokrasiyê de cudahî têne parastin û bi wan, rê li ber xwegîhandinên nû vedibe. Ev cihêwazî û taybetiyeke bingehîn a demokrasiyê ye.

Eger demokrasî bi rastî bi cih were anîn, mirov dikare etnîsîteyê wek cihêwaziyeke demokrasiyê binirxîne. Rêveberiya dewletê, eger li ser hîmê pîvanên xwe bi pey nêçîra dengan bikeve û vê yekê wek pêşbaziyeke demokrasiyê bizanibe, sîstema derbikeve holê demagojî ye. Pir girîng e, dewlemendiya etnîkî wek şens û derfetên demokrasiyê werin dîtin. Ev yekê ji ferdê azad zêdetir xizmetê ji demokrasiyê re bike.

Gelan, çanda berxwedanê ya hezarsalan dawerivandine hundurên xwe û niha karê siyasetvanên demokratîk e, ji bo îro vê çandê bigihînin pîvanên demokrasiya hemdem. Ya şaş ew e ku potansiyela demokrasiya civaka Rojhilata Navîn asteng were dîtin.

Ji ber ku hêza şer-îqtîdarê di nava dewletê de hêza sereke ye, di destpêkê de xwe wek qral-xwedê û împarator berçav dike. Ev hêz her ku mezin dibe, demos yanî gel giraniya xwe wenda dike. Di civaka Sumeran de Sargonê bi koka xwe Amorît, wek împaratorê yekemîn di nav rûpelên dîrokê de cihê xwe digire. Bi kêfxweşî û çavbirçîtiyeke mezin, hukmê xwe heta hundurê qadên çiyayî dide meşandin. Di bêdengiya mirinê de wek sembola hewcebûnê ye. Ev pêvajoya ku BZ di salên 1350 de destpêkir, rê li ber hemû împartoriyên ku pişt re werin, vekir. Her a nû sînorên a berê berfirehtir kirin. Eger Gilgamêş destpêka qralan e, Sargon jî bavê împaratoran e. Eger wisa be, em dikarin her helwesta li dijî vê pêvajoyê dijberê nîzama komîn, wek destketiyên demokratîk binirxînin. Komên etnîk li dijî hemû zehmetiyan, xwe li nexweşî, birçîbûn û êrîşan ragirtine, karîbûne li çolan, çiyan, kûrahiya daristanan bijîn û ev serketin li ser navê mirovatiyê, destketiyên mezin ên demokrasiyê ne. Eger ev berxwedan nebûya, kê dikarîbû, dewlemendiya çandê û piranîparêzî li ser piyan bigirta? Eger ev peykerên hezar salan ên berxwedanê nebûna, wê hunerê gelan çawa bihata afirandin? Me yê çawa karîbûya bi hezaran amûrên hilberandinê, saziyên civakî, şeref, daxwaza azadiyê û piştgiriya mirov bi hevdu re pêk bianiya?

Wexta em ji xanedaniya Akadan derbasî xanedaniyên bi koka xwe Babîl û Asûran dibin, hêza împaratoriyê hê jî zêde dibe. Her împaratoriya tê, wek bixwaze rekorê bişkîne, asta stûtewandinê

bilindtir dike. Bi şeref û serbilindî qala beden û bircên ji serê mirovan avak kirine, dikin. Li dijî van hemû seferên îmha û kuştinê, em kêlî û dema komên gelan li çiya, çol û kûrahiya daristanan derbas kirine li ser navê dîroka demokrasiyê nenivisînin emê li ser navê kê binivsînin, yan jî em hîç behs nekin û tine bihesibînin? Dîrok bi vî rengî dikare manîdar bibe? Eger manîdar jî bibe, wê bikaribe ji zordarî û desteserkariyê zêdetir tiştek bibe? Eger em bala xwe bidinê û fêm bikin, berxwedana eşîrekê çiqasî bûye mijara destanekê, emê nirxên koçer û etnîsîteyê yên demokratîk baştir fêm bikin. Li gorî ferdê dilxwede azad ê ku kapîtalîzmê nava wî pûç kiriye, eger însanê etnîsîteyê rast were nirxandin, wê qat bi qat karibe hêza demokrasiyê pêk bîne. Potansiyela demokratîk a rastîn a civakên Rojhilat e. Civaka Rojava ya ku heta dawiyê çanda şer-îqtîdarê daweriviye navê, potansiyela wê ya demokratîk pir bi sînor e. Demokrasiya heyî, bi hezar şert û bendî ve hatiye girêdan û demokrasiyek e ku dewleta bi giranî çîna bûrjûwazî ye, dinixumîne. Bi sedema şêwazên jiyanê û teoriyên lihevçêkirî yên dibin sedem em civakên xwe piçûk bibînin, em potansiyela demokrasiyê ya her mirovê ji gelên xwe, nikarin bibînin.

Gelê me bi xwe yê Aryenî, gelê orjîn Hûrî, bi gotina Sumeriyan Kûrtî - Kûr=çiya, tî daçeka aîdiyet - wek "xelkê çiyê" dinirxîne. Ji derketina dewleta Sumeran ve her li ber xwe didin. Gotî, Kassît û Naîrî navên din in ku lê hatine kirin. Nîv dewletên órartû û Medya li dijî împaratoriya Asûriyan berxwedanên herî bi şeref ên dîrokê meşandin. Di encama şerên sêsed salî de têkbirina vê împaratoriya bêrehim, gelê Asûr jî di nav de, li ser navê hemû gelan wek cejin û roşanekê di dîrokê de şop hîşt. Eger ev berxwedan li ser navê çanda demokrasiyê neyê nivîsandin wê li ser navê çi were nivîsandin? Navê Medya'yê ku di efsaneya Thesseusê Atînî de derbas dibe, bîranîna vê berxwedanê ye. Demokrasiya Atînayê ku di dîrokê de pir pesnê wê tê dayîn, bîla sedem behsa Medya bêşens nake. Wexta Atînî di nav demokrasiyê de dijîn, têkiliyên nêzîk ên bi Medan re wek misogeriyeke bingehîn dibînin. Di Dîroka Heredot de mijara herî li ser tê sekinîn Med in.

Divê em pir eşkere bibêjin; Medan kevneşopiya mezin a berxwedana gelên Rojhilata Navîn bir Atînayê, lê belê belkî lê hayil nabin, Medan di dîrokê de alîkariya herî mezin li demokrasiyê kirin. Îskenderê Mezin bîla sedem bi gelên Medya re têkiliyên mervantiyê danayne. Cihê vê yekê di dîroka Helen de baş dizane û mînak digire. Îskender împaratorek e. Di ser şaristaniya Rojhilat re mîna gundor

derbas bûye. Lê dikeve bin tesîra çanda vê deverê û dizane bi serbilindî pê bijî. Çanda Rojava-Rojhilat bi sentezekê digihîne Xirîstiyaniyê û Xirîstiyanî jî digihîne şaristaniya Rojava. Xuya ye, di cihokên împaratoriyê re tenê xizmeta hêza şer-îqtîdarê nayê kirin. Çanda berxwedanê ya gelan jî di van cihokan re diherike yan jî diçizire. Dîroka gelan a demokrasiyê dinivsîne.

Împaratoriya Romayê, belkî jî ya ku çanda şer-îqtîdarê ya herî zêde xurt kir, împaratorên herî çavsor jê derketine. Li dijî mirovatiyê şêwazê herî hovane yên kuştinê - çarmîxkirin û avêtina mirovan ber şêran - sîstematîze kirin. Baş e, yê li dijî vê hêzê tevgera mezin a mirovatî û xizanan da destpêkirin, çanda demokratîk a Rojhilat nebû? Hz. Îsa bi xwe li ser kevneşopiya peyxemberan xeleka destpêkê ya ji sifrê nade destpêkirin? Tevgera Xirîstiyaniyê ya li ser dînê Hz. Îsa nebûya wê rewşa çanda Rojava û demokrasiya wê çi bûbûya? Wê çaxê divê em nirxandina kevneşopiya peyxemberan ji aliyê demokrasiyê ve di ser guhê xwe re navêjin.

Civaka koçber a li dijî hêza şer-îqtîdarê wek hêzeke ji der ve rola hêza parastin û êrîşê dibîne, hêza em dikarin wek kevneşopiya rahîb û peyxemberiyê bi nav bikin, zêdetir wek hêzeke hundurîn, ji bo lêgerîna berxwedanê ya xizanan rola cihokê dilîze. Ev tevgerek e, aliyê wê yê çînî xurtir e. Ev tevgera ku çavkaniya wê Rojhilata Navîn e, tê texmînkirin ku wek gelek vedîtin û derketinên seretayî, ew jî ji civaka Sumeran derketiye. Peyxemberê yekemîn Hz. Adem û cenneta jê ku hat derxistin, şopên wan di nav çanda Sumer de têne dîtin. Mirov dikare texmîn bike ku Adem û jina wî Hawa, bi sedema tam bi sîstema koletiyê re li hev nekirine, ji cennetê - ji jiyana jor a civaka dewletê - hatine qewirandin. Belkî jî vegotineke nîv-mîtolojîk a derbarê azadiya ferd de be. Nakokiyên wan ên bi sîstemê re eşkere xuya dikin û bi qewirandinê re rê li ber sulaleyeke têkoşer vedikin. Rewşa wan nêzî ya erbabê pîşesaz û cotkarên azad xuya dike.

Em dikarin bibêjin; ev kevneşopî bingehê wê yê çînî beşê navîn ê civaka bajêr e û kole nînin. Ji ber ku duyemîn peyxemberê mezin Nûh, vê yekê bi pîşesaziya xwe ya keştiyê îspat dike. Nûh ji bo Tofanê keştiyê pir baş amade dike û ev yek jî hêza pêşesaziyê nîşan dide. Xweda Enkî dibêje; "Tofan tê, keştiya xwe baş amade bike ji bo jiyana nû bide destpêkirin", vê yekê ji xwedayên din vedidize û ev yek karektera çînî hê eşkere dike. Têkiliyên di navbera rêveber û beşên din ên pîşesazên girîng de asayî û xweza ye. Çîroka Tofanê wek a Adem bi îhtîmaleke mezin li dijî nerazîbûnên rêveberan koçberiyeke piştî îsyanê îfade dike. Tê gotin; keştiya Nûh li çiyayê

Cûdî sekiniye. Gotina Cûdî di zimanê Kurdî de bi maneya "Cî dî" ye. Ev yek jî me dide fikirîn ku wek gelek caran li Mezopotamya Jêr hatiye dîtin, bi îhtîmalke mezin, ji ber sedemên cûrbecûr koçberiyek ber bi bakur ve pêk hatiye.

Sîstemên bajarên Sumeriyan BZ di salên 2000 de li keviyên Dîcle-Firata Jor têne avakirin. Yek ji van navendên girîng órfa ye. órfa jî wek bajarên Sumer órûk û órê hatiye bi navkirin. Tê maneya cîwarê li ser girekî. Çi órfa û çi jî deverên nêzî wê - wek Harranê - mîna navendên kevneşopiya peyxemberiyê ne. Wer tê fêmkirin ku kesên ji bajarên Dîcle-Frata Jêr bêzar dibin, îsyan dikin, yên li dad û azadiyê digerin berê xwe didin navenda órfa'yê. Di dîrokê de gelek navendên çandê yên bi vî rengî hene. Navendên mîna Babîl, Îskenderiye û Antakya pişt re derketine holê. Di serdema kapîtalîzmê de navend Parîs û London e, ber bi roja me ya îro New York e. Li gorî texmînan, îhtîmaleke xurt e ku órfa BZ bi salên 2000 re dest pê dike, dibe navenda rohnîbûnê. Perestgeha yekemîn a li Dîbeklîtepe ku BZ di salên 11.000 de hatiye avakirin, li devereke nêzî órfayê ye. Kevneşopiya niha jî ku serdest e, li gorî rêza dîrokê li cih e. Dîsa BZ di salên 300 de ji çanda Helenîstîk û Sabîînan re, BZ di salên 100 de ji Xirîstiyaniyê re rola navendê dilîze. Di serî de Hz. Eyyûp û Îdrîs ku hê jî bermahiyên dînên wan li órfayê hene, bajêr gelek peyxember di dergûşa xwe de mezin kirine. Ji lewra gotina "bajarê peyxemberan" rast e.

Hz. Îbrahîm ku texmîn tê kirin, BZ di salên 1700 de jiyaye, ji bo mijar hinekî din were rohnîkirin çîroka wî girîng e. Îbrahîm li dijî Nemrûd - qral-xwedayên Asûr-Babîlan - pûtên di panteonê de dişikîne û bi vî awayî şoreşeke zêhnî dide destpêkirin. Di berdêla vê yekê de cezayekî mîna avêtina nava agir li ber çav digire û ev jî rewşa wî ya li ser kevneşopiyeke dîrokî ya serhildêr îfade dike. Di encama vê tevgera xwe de neçar dimîne wek duyemîn koçberiya mezin berê xwe dide diyarên Kenanê, yanî welatên îro yê Lubnan û Îsraîlê. Li diyarê Kenanê piştî jiyaneke zehmet, li kevneşopiya peyxemberiyê gavên girîng zêde dike. Diwêre û dikare îdrak bike ku hîmê têgihîştina dînê yek xwedayê mucered deyne. Hz. Eyyûbê beriya Hz. Îbrahîm jî di çanda berxwedanê ya dîrokî de fîgurekî balkêş e. Hz. Eyyûp yekem car li dijî Nemrûd gotineke were maneya "hûn mirovan diêşînin" bi kar tîne. Ev dijberiyeke dîrokî ye. Ev helwest li dijî qral-xwedayan yekemîn e û gaveke bi cesaret e. Di berdêla vê helwesta xwe de li zindanê dirize. Kurm dikevin bedena

wî. Tevî vê yekê, mîna tîmsalê sebrê li ber xwe dide. Ev helwesta wî rê li ber peyxembertiya wî vedike.

Em wexta cihê şoreşa dînê yek xwedayî di şaristaniya me ya îro de li ber çav bigirin, girîngiya şîrovekirineke rast derbarê kevneşopiya Hz. Îbrahîm de wê were fêmkirin. Taybetiyeke din a Îbrahîm, karîbûye çanda Aryen û Semîtîk têkel bike û bigihîne îfadeyeke nû. Ji ber ku Hz. Îbrahîm di her du atmosferan de jî maye, em dikarin vê taybetiya wî ya têkel mîna sentezekê şîrove bikin. Sentezeke mîna ya Rojhilata-Rojava ye, rê li ber afirêneriyê vedike. Sêyemîn taybetiya girîng a kulta Îbrahîm; hem li dijî sîstema Sûmer - Nemrûd - û hem jî li dijî sîstema Misir - Fîrewn-xweda-qral - wek qasidê xwedê, yekemîn otorîteya mirov temsîl dike. Di demekê de ku koletî pir zêde heye û di dîrokê de lêgerîna azadiyê dest pê kiriye, pêngava Hz. Îbrahîm alternatîfeke mezin e. Ji bo ji lêgerîna bingehîn a mirovatiyê re bibe bersiv, wê di dîrokê de tevgera herî mezin a civakî çirkîniyê bi derî bixîne. Her çiqas komên etnîk ji der ve li dijî her du sîstemên koledar berxwedaneke mezin nîşan didin jî, di hundur de berxwedaneke karekterê wê civakî, xwediyê taybetiyên çareserî û ji hev kirinê ye.

Serî rakirina li dijî kulta qral-xweda û baweriya ku dibêje mirov nikare bibe xweda, şoreşeke mezin a civakî ye. Sîstema koledariyê ji stûna xwe ya herî mezin a îdeolojîk derbê dixwe. Eger qral-xweda wek însan êdî werin dîtin, ev tê wê maneyê ku derzeke mezin li mîtolojiya Sumer û Misriyan ketiye. Ev yek jî bi dînê yek xwedayî "tewhîdê" dest pê dike. Tesaduf nîne ku bi israr xelek bi Adem tê destpêkirin. Ev ispat dike ku kevneşopî bi kok e, û zincîrwarî ye. Peyxember jî rawestgehên dîrokî yên vê kevneşopiyê ne. Mîna peyxemberên lîberalîzm û Marksîzmê.

Di kevneşopiyê de fîgurekî din ê rêyeke nû vekir Hz. Mûsa ye. Mûsa şecereya wî ya heta xwe digihîne Îbrahîmê BZ di salên 1300 de jiyaye, hatiye çêkirin û li Misrê ji îsyanekê re pêşengiyê dike. Mûsa bi vê pêşengiyê re pêngava xwe dide destpêkirin. Tevî ku çanda Misrê nas dike, qebîleya Îbraniyan a wek koleyan bi Fîrewnan ve girêdayî bi kar tîne û cesaret dike îsyanekê bide destpêkirin. Ev yek dide nîşan ku li ser hîmê civakî û azadiyê, ew kesayetekî pêşeng e. Bi qebîleya Îbranî re têkiliya wî ya mervantî û xizimtiyê heye. Dînê qebîleyê ji yê Misriyan cuda ye. Her çend tê gotin; Mûsa ketiye bin bandora yek nîv-xwedayê fîrewn, Akhenaton wek xwedayê mezin îlan kiriye jî, ya esas kevneşopiya dînê Hz. Îbrahîm bingeh dibîne. Di Pirtûka Pîroz de qala meşa meşhûr a li çola Sîna'yê, tesîra

çiyayê volkanîk, helwesta li dijî pûtperestiyê û vegotinên "Deh Ferman" tê kirin. Mûsa di şexsê qebîleya Îbranî de şerê mezin ji bo derketina dînê nû dimeşîne. Ev şerê îdeolojîk, wê qebîleya Îbraniyan ji belavbûnê xilas bike û wan bigihîne "erdên pîroz" yên ji wan re soz hatibû dayîn. Ev hişkbûna îdeolojîk di dîroka Îbraniyan de yek ji gavên mezin e. Çanda dînî ya Îbranî di roja me ya îro de jî heman gavan diavêje û bi awayekî balkêş dibe mînakê ku hindikayî çawa dikare bandorê li ser piraniyê bike.

Tevgera peyxembertiyê tenê malê Îbraniyan nîne. Bi nêzîkbûna Hz. Îsa ya Aramiyan û ji Ereban Hz. Muhammed, kevneşopiya peyxemberiyê dibe gerdûnî.

Bi kurtî; tevgera peyxembertiyê wek kevneşopiyeke civakî ji hundur ve li dijî hêza şer-îqtîdarê pêş dikeve û bi giştî di dîroka mirovatiyê de, bi taybetî jî di sîstema civaka dîrokî ya Rojhilata Navîn de nêzî helwesteke demokratîk e. Em wextê aliyê xizaniyê jî li mijarê zêde bikin, di dîrokê de wek tevgerek "sosyal demokratan" temsîl dike. Mirov dikare di navbera bingehê wan ên çînî - çîna navîn; pîşesaz, bazirgan, cotkarên serbest, qebîle - û yên sosyal demokratên îro de têkiliyekê deyne û bişibîne hevdu. Em vê şibandinê dikarin hinekî din jî pêş de bibin. Sosyal demokrat her çiqas hinekî sîstemê nerm bikin jî nikarin xwe ji yedekbûna wê xilas bikin, sosyal demokratiya peyxemberan jî zû dereng wê nikarebe xwe ji entegrebûna bi sîstema civaka çînî ya rûniştî û ji damezrandina modelekî mîna wê xilas bike. Li dijî koledariya hişk a serdema seretayî, rê li ber sîstema feodalîzma serdema navîn vekirin. Bêguman ew bi zanebûn li vê sîstema feodal negeriyabûn û rêya wan jî nebû. Wan aştî û edalet ji bo hemû mirovatiyê dixwestin. Lê belê, hêza mezin a veguherînê ya sîstemên serdest, dewletên xwedê yên peyxemberan jî ji sîstema heyî cuda nake.

Vegotina teolojiyê - îlahiyat - ya di warê ravekirina sosyolojîk de xizan e, tevî ku di destê xwe de kulliyateke mezin - koleksiyona berheman - heye, saziya peyxembertiyê ya herî zêde bandor li dîroka mirovatiyê kiriye, nikare rastiya wê ya civakî eşkere bike. Tevî ku bi ziman û zêhniyeta wê demê tê îfadekirin bêzarker e. Eger bi zimanê îro neyê tercumekirin, wê tenê bibe vegotineke jiber a mirov korfêm dike. Saziya peyxembertiyê ya li dijî koledariya antîk a Sumer û Misriyan, li ser hîmê edalet, azadiyên ferdî û civakî xwe ava dikir. Ji lewra bi awayekî rast ravekirin û tarîfkirina vê saziyê pir girîng e. Di bin perdeya dîn de ku zêhniyeta wê demê ya gelan e, têkoşîneke mezin a civakî dimeşînin. Peyxembertî yekemîn saziya mezin a

civakî ya pêşengtî û rêbertiyê ye. Raman û têgînên wê demê têne bi karanîn sentez dikin û gav diavêjin qonaxeke nû û bi vî awayî nubûwetê - peyambertiyê - bi dest dixin. Çendîn ji mîtolojiya koledar û dînê fermî qut dibin, ew çend jî dibin xwediyê roleke civakî ya azadîxwaz. Lê bêguman wek di her serdemê de pirî caran hatiye dîtin, bi qasî veqetînên radîkal ew çend jî lihevkirina wan jî bi sîstemê re mumkîn dibe.

Ya ji dîroka sosyolojîk a dîn tê payîn; divê her peyxemberî - yên girîng - di serî de ji aliyê îqtîdar, civakî, aborî û zêhniyeta serdemê, wan di nav rewşa wan a çandî de analîz bike. Behs û vegotina dîrokê li ser vî hîmî dikarin hevdu temam bikin. Divê dîrok nebe çîrokên qehremenî û hukumdaran; - talankeriya xenîmetan - hewce ye dîrok aliyê xwe yê civakî, gelêrî û etnîkî bi awayekî rastîn were nivîsandin. Bi vî awayî, wê guftûgoyên di roja me ya îro de ku li ser laîsîzm têne meşandin, maneyek wan hebe. Pêwîst e, mirov baş fêm bike, bi sed hezaran kadro û xezîneyeke mezin ji bo çi û ji çi re hatiye veqetandin.

Di împaratoroya Romayê de mîna pêvajoyên em behs dikin, dimeşin. Ji derketina wê û pêve (BZ 50-0) di hundur de ekolên dînî yên civakî û ji der ve jî tevgerên koçeran ên etnîk, bi awayekî dîrokê heta wê rojê nedîtî, bi dijwarî dor li hêza şer-îqtîdarê girtin. Xirîstiyantî ji çaxa derket û heta dema pêşketinê, ji her alî ve, herî kêm bi qasî Romayê xwedî karektereke gerdûnîbû û partiyek bû, ji xizanan - qebîle, malbat hwd. yekîtiyên nijadî - pêk dihat. Rengekî wê yê civakî heye û yekemîn partiya xizanan a gerdûnî ye. Hêza herî mezin a şer-îqtîdarê ya wê demê Romayê, çawa hemû zumreya xwe seferber kiriye, Xirîstiyantiyê jî li ser heman şopê tevgera xizanan seferber kir. Di serdema kapîtalîzmê de jî çînayetiyek bi heman rengî pêk tê. Saziyên zordar û mijok ên dewletê û xwe bi rêxistinkirina kedkaran, dewama vê dualîteya diyalektîkî ne.

Her du ekol jî li dijî Romayê xwediyê dîroka berxwedaneke demdirêj in. Her du ekol jî bi şîdetê hatine tepisandin. Dîroka Romayê ji çîrokên împaratoran tenê pêk nayê. Divê mirov nertineke bi vî rengî li dîrokê, wek belovajîkirina dîrokzanên fermî binirxîne. Hêza şer-îqtîdarê ya wek guloka agir û guloka berfê ku ketiye serhevdu, çendîn xulaseyek dîroka zordar û mijokiyê ye, ekolên dînî, koçeriya civakî û etnîk jî, ew çend xulaseyeke komîntiyê ne. Dîroka gelan, bi awayekî rastîn di warê civakî û etnîk de wek hewce dike nehatiye nivîsandin. Ji ber ku dîrok bi destê çîna serdest, an jî karektera wê hatiye nivîsandin, rastiya civakê û hêmanên wê yên

bingehîn ji nedîtî ve hatine û berovajî kirine. Destûr nehatiye dayîn ku dîrok bi awayekî rastîn were nivîsandin û anormal hatiye belovajîkirin. Bi vê rê xwestine zîhnê mirov êsîr bigirin. Civakên ku ji têgihîştin û serwextbûna dîrokê qut bibin, heye ku ji pêvajoyên nasname wendakirin û bêmanebûnê xetertir pêvajoyan bibînin, di nav derfet û îmkanên neyînîtir de bijîn. Civakên ku hîn bûn di nav van şert û mercan de bijîn, êdî hêsan dibe her bar lê were kirin. Di vî warî de kevneşopiya dînên yek xwedayî girîng e. Dînên yek xwedayî mîna hafizeya rastiya civakê bin, li dijî hukumdariya herdem, peyxembertiya herdem wek alternatîfekê xuya dike. Xirîstiyantî bi saziya pîskoposiyê mîna xwe gîhandibe kevneşopiya împaratoriyên Romayê. Pêşketineke bi heman rengî ji bo pêşengiya etnîsîteyê jî mumkîne were qebûlkirin. Ji ber ku dilê xwe dibijînin împaratoran û xweziya xwe bi wan tînin, her du ekol jî yan bi sîstemê re li hev dikin, an jî bi temamî di nav de dihelin û carnan jî dikarin xwe di asta jor a civakê de saz bikin û bi vî awayî rê li ber veguherînên nû vebikin.

Eger em dîroka etnîsîteyê bi kurtî destnîşan bikin, em dikarin bi derketina çanda cotkariyê û sazîbûna wê ya BZ di navbera salên 15.000-10.000 de bidin destpêkirin.

Li gorî hemû agahiyên arkeolojîk û etîmolojîk, etnîsîte yekem car di vê dîrokê de li rêze çiyayên Zagros-Torosê li kevanên hundurîn rengê xwe digire. Şoreşa di warê cotkariyê de tê kirin, ji bo etnîsîteyê şertê hebûnê ye. Naxwe etnîsîte nikare ji klantiyê derbas bibe. Civaka klan jî ti demê nekariye ji komeke malbatê ya berfireh wêdetir biçe. Teknolojiya hilberandinê vî sînorî diyar dike. Lewra ji hin dengên derdixin zêdetir, nikarin xwe bigihînin zimanan. Dîroka zimanên em dizanin BZ di salên 20.000 de tê destpêkirin. Dîsa li heman cografyayê hin sedemên din rol dilîzin. Piştî ku ziman pêk tê, hilberandin zêde dibe û ev yek jî civakê derdixîne qonaxeke jor. Arkeologên navdar mîna Gordon Childe û Vanîlor hemfikir in ku seretayî koma zimanê Aryen li vî kevanê çiyê pêk tên. Komên seretayî yên serdema komîn ku xwediyê şoreşa cotkariyê ne, koma zimanê Aryen pêk anîn. Mirov herî gotinên kevin ên di warê cotkariyê de dikare li cem qewmên di nav vê koma ziman de cih digirin bibîne. Di serdemên seretayî de etnîsîte di şûna belavbûneke fizîkî de bi awayekî çandî li parzemînan belav bûye, ev dîtineke hevbeş e, qebûlê dibîne. Heta li gorî rastiyeke din a qebûlê dibîne, BZ di salên 11.000 de ji Asyayê bi rêya Çermesoran di bendava Berîng re derbasî Emerîkayê dibe.

Heta pêkhatina şaristaniya Sumeran - BZ li derdora 3500 - navenda çandê ya vê etnîsîteyê qûntara çiyayên li derdora Dîce-Firatê ne. Bermahî û xirbeyên ji vê demê mane û gelek nîşaneyên vê serdemê, em dikarin bi hêsayî di çanda îro ya gelêrî de bibînin. Bi taybetî BZ salên di navbera 6000-4000 de ji bo etnîsîte bibe mayînde û xwedî nasname, serdemeke girîng e. Di vê serdemê de ku bi ya Kalkolîtîk re dibe yek, hemû vedîtin û îcadên bingehîn ên dibin destpêkirina dîrokê - şaristaniyê - hene. Hunerên bingehîn, dîn û saziyên hiyarerşiyê pêk hatine. Koma herî kevin a Aryeniyan Hûrrî - ór: cihê girik, xelkê welatên bilind - di navenda hilatina çandê de bû ku îro wek pêşiyên herî kevnare yên Kurdan têne naskirin. Li herêmê heman xelk BZ di salên 6000 de bi awayekî çalak xwediyê jiyanekê ye. Di qonaxa avabûnê de ev xelk bi Sumeran re hem xizm e, hem jî cîran e. Li gorî rêzê Gûtî, Kassît, Lorî, Naîrî û navê Med ji aliyê çavkaniyên Sumer-Asûran ve li komên xwediyê heman çandê hatine kirin.

Pêlên çanda Aryenan BZ di salên 9000 de li Anatoliyayê, di salên 6000 de li Kafkasan, li Efrîka Bakur û Îranê û BZ di navbera salên 5000-4000 de li Çîn, Sibîrya Başûr û heta hundurê Ewrûpayê belav dibin. Di vê demê de çanda cotkariyê li gelemperiya dunyayê belav dibe. Koçberên Aryenî beşek ji wan BZ di navbera salên 3000-2000 de li giravên parzemînan, Hindîstan, Îngilîstan, Yewnanîstan, Îtalya, nîvgirava Îberîk û heta Bakurê Ewrûpayê çûne. Tê texmînkirin ku li gorî pêşketinan BZ di salên 2000 de diçin herêmên bi dijberiya şaristaniya Sumeran pêşketine û li Hindistan, Îran, Anatolî û Misrê beşdarî van pêvajoyan dibin. Serdemeke gelek bi liv û tevger e. Şaristaniya Sumeran mîna DYE îro ji bo çiqas koçber û komên gundan hene, navendeke balkêş e. Bi tevgerên mezin ên koçberiyê BZ di salên 2000 de etnîsîte bi awayekî berfireh belav dibe. Di encama vê belavbûnê de hîmên şaristaniyên li Çîn, Hînd, Hellas, Anatolî û Îranê têne danîn. Bi awayekî li ser şopa Sumeran piştî bajarbûnê - dewlet - li Mezopotamyayê pêngava duyemîn tê avêtin. Tevî vê yekê, bajarên şaristaniyê di nav derya koçberan de mîna giravokan e. Ya esas, yên di nav çalakiyê de koçber in. Sêyemîn pêngava mezin a koçberan BZ ber bi salên 1000 dest pê dike. Koçberên ji Ewrûpayê herikîn Kafkasan, ji Asya Navîn herikîn qadên şaristaniya başûr, di demên destpêkê de cihê şaristanî û nîzamên beg-xanedanan wergirtin. Li Yewnanistanê Dor, li Anatoliyayê Frîgyayî, li Îtalyayê Etrusk û li guhên Zagros-Torosê digihîjin hevdu Medî, komên etnîk ên vê pêngavêne têne naskirin.

Ev komên behsa wan tê kirin, BZ di salên 1000 de di pêşketina şaristaniya navbera dewleta Romayê de roleke mezin dilîzin. Şaristaniyên Grek, Frîg, órartû, Med û Etrusk pêngavên girîng in ku ev komên etnîk ava kirine.

Tevgera etnîsîteyê bi awayê rêxistinê qonaxa hiyarerşîk derbas nake. Di vî sînorî de eger ji hev de nekeve, wê bi pirsgirêka dewletbûnê re rûbirû bimîne. Komên di van qonaxan re serketî derbas bibin, modelên dewletê yên di dema Sumeran de pêk anîne. Bi piranî dibin modelek texlît a şaristaniya pêre di nav têkiliyê de ne. Jixwe avahiya hiyarerşîk potansiyela xwe nîne rê li ber avabûneke din vebike. Di vê rewşê de çîn derdikevin holê. Beşek ji tebeqeya jêr di rewşa xwe ya berê de li çolûberan dimînin, yên berê xwe didin bajêr jî yan dibin kole, esker, an jî di nav tebeqeyên bi cihbûyî de cihê xwe digirin û civaka çînî temam dikin. Etnîsîte ji bo civaka çînî timî xwîna teze ye. Gundîtî ji bo kapîtalîzmê çi be, etnîsîte jî ji bo şaristaniyên berê heman fonksiyonê bi cih tîne. Eger em bi giştî bişibînin roja me ya îro; li dijî belavbûna kapîtalîzmê berxwedana netewî û pişt re jî avabûna dewletên netewî çi be, di şaristaniyên berê de jî berxwedana etnîk û begîtiyan û dewletbûna ku xwe dispêre zemînê etnîk jî heman tişt e.

Tevgerên peyxembertî-dîntiyê ku em wek cureyekî têkoşîna çînî ya serdemên seretayî rave dikin, çavkaniyên xwe di serdema stewîna şaristaniyan de dibînin. Koka wan bajarî ne. Mora çîna navîn li ser heye. Karîbûne cesaret bikin û nîşan bidin ku sîstemên seretayî yên koledar li dijî aqil in. Rexnegirên destpêkê ne, yekemîn serhildêrên civakî ne. Mîna ku ketibin bin tesîra kevneşopiya şêxtî û Şamanîzma berê ya di saziyên qraliyetê de, cih negirtin. Ji ber têgihîştina wan a dîn-xwedayê muccered û dijberiya wan a pûtan, mirov dikare vê rewşê wek cihêbûna zêhniyetê binirxîne. Îdîaya wan a herî mezin, dibêjin; mirov-qral nabin xweda. Bi îdeatiya qral-xwedê mirovan bawer nekiriye û ev yek têkoşîn û nakokiya di navbera çîna rêveber û xelkê bajêr de nîşan dide. Civaka bajêr piştî ku li cudahiya di navbera yaseyatî û ruhparêziyê de hayil dibe, yan jî serwext dibe, baweriya bi qral-xwedayan diheje. Cihêbûn û cudabûna zêhniyetê di nav bajêr de bi leztir dibe. Rewşa bajêr ji bo lêgerîn, têgîn û ramanên nû, derfet û îmkan dide. Agahiyên zêde dibin û afirandina têgînan bi awayekî mucered, piştî qonaxekê îdeolojiya fermî - mîtolojiyên ji wan bawer tê kirin - li dawiyê dihêle. Bi lêgerîna îdeolojiyên nû serdema îdealîzma peyxemberan dest pê dike.

Li gorî texmînan ev pêvajoya BZ di salên 3000 destpêkir heta bi Hz. Îbrahîm zêdetir li bajarên metrepol ên Sumeran destpêkir. Piştî nekarî bihewe, xwe li jor, li herêmên bilind, li cihên hinekî azad girtin. Ez bawer dikim ku em ji serdema Adem heta Îdrîs û heta pêvajoya Eyûp re bibêjin pêvajoya peyxembertiyê ya beriya órfayê, rastir e. Her weha em dikarin îdîa bikin ku BZ di navbera salên 2000 û 1000 de órfayê roleke navendî lîstiye. Di vê serdemê de bi îhtîmaleke mezin kevneşopiya peyxembertiyê baş rûniştiye. Hîmê wê yê sazîbûnê xurt bûye. Di serî de Hz. Îbrahîm gelek peyxemberan dişîne herêmên hawîrdorê. Gelek çîrok vê texmînê piştrast dikin. Wek hîpoteza duyemîn, em dikarin îdîa bikin ku BZ ji salên 1000 û pêve heta hilweşîna Romayê, Quds wek duyemîn navenda peyxembertiyê derdikeve pêş. Di Pirtûka Pîroz de lîsteyeke dirêj a peyxemberên vê pêvajoyê heye. Di serî de Saûl, Dawûd û Silêman vegotineke xurt û dewlemend a li ser peyxemberan heye. Mirov van vegotinên balkêş ên Pirtûka Pîroz dikare wek xweziyên ji bo qraltiyê û pîvanên exlaq binirxîne. Pir bi xurtî civakîbûn tê destnîşankirin. Di cewherê xwe de bang li qebîleya Îbranî dike ji bo ji pûtan dûr bisekine û bi Rebê xwe ve girêdayî be. Ev bangawazî vegotineke dînî ye qebîleya Îbranî ji belavbûnê xilas dike û dibe sedem wek qraliyetê ava bibe. Mîtolojiyên Sumeran çawa çîrokên qral-xwedayan bin, Pirtûka Pîroz jî çîrokeke dînî ye, ji qebîlê pêkhatina qraltiyê tîne ziman. Zêhniyet û wêjeya wê demê ya serdest, zimanekî pîroz ê pirtûkê ferz dike. Pir girîng e, mirov karibe di bin tîrbûna şêweyê mijarê de cewherê wê bibîne. Jixwe armanca dawî ya Îsa ew bû ku li Qudsê wek "qîza Sîon" bi nav dikir, bûbûya qral. Ji bo vê yekê jî jiyana xwe ji dest daye.

Sêyemîn û serdema dawîn a peyxembertiyê, di navbera salên BZ 0 û PZ 632 de, ji dayikbûna Hz. Îsa û heta wefata Hz. Mûhammed dewam dike. Qebîleya Îbraniyan piştî vê serdemê bi Safarînan - nivîskaran - dikeve pêvajoya katiban, Xirîstiyanî jî bi hawariyan, paşê jî bi papaz û pîskoposan li nav gelên din belav dibe.

Lîteratura peyxembertiyê - di serî de Încîl - tercumeyî Grekî û Latînî hatin kirin û vê yekê bandoreke bingehîn li ser zêhniyeta şaristaniya Rojava kir û rê li ber veguherîneke bi kok vekir. Di têkoşîna li dijî nîv-xweda împaratorên Helen û Roma de îdeayên xwedatiyê ji dest wan tê stendin. PZ di sala 312 de Konstantînê Mezin Xirîstiyanî qebûl kir û paşê jî wek dînê fermî îlan kir. Ev yek gava dawî ya pêvajoyeke dîrokî bû. Bi vî awayî, her çend ji cewherê xwe gelek tişt wenda kiribe jî îdeaya peyxemberan a "mirov nabe

xweda" bi ser dikeve. Jixwe milê peyxembertiya bi navê Îslam û pêşengiya Hz. Mûhammed hê ji destpêkê ve, mîsyona xwe ya wek siya xwedê û qasidê wî yê li rûyî zemîn îlan dike. Baweriya teslîsê ya Hz. Îsa Bav-Kur-Ruhê Pîroz red dike û bi hukmê ayetan wehî dike ku mirov tenê dikare bibe ebdê xwedê. Lê têgihîştina ebdê xwedê, dîsa jî li vir tesîra çanda qral-xwedayan nîşan dide. Di şûna qral-xwedayan de "Ellah" tê bi cihkirin. Ev mînak, şerê dirêj ê di warê zêhnî de bi awayekî balkêş îfade dike. Her weha îspat dike ku şerê mirovan li dijî qral-xwedayan bi hezarsalan dimeşe û destnîşan dike ku xelasiya ji koletiyeke şidandî hêsan nîne.

Jixwe serdema qral-xwedayan di dawiya împaratoriya Roma de li dawiyê tê hîştin, bi Hz. Mûhammed re ev serdem bi tevahî diqede. Îdeaya bingehîn a peyxemberan ew bû ku mirov nikarin xwe xweda îlan bikin. Ev xal bi tenê, ya mîna bernameya partiyekê, wexta bi cih hat, êdî mane nema peyxembertî hebûna xwe dewam bike. Jê pêve, şop, sî û çîrok in.

Berhema sereke ya dînên yek xwedayî yên Rojhilata Navîn dewleta feodal a serdema navîn e. Li gorî koletiya klasîk, koletiya nermkirî koletiya "serf", bi gotineke din koletiya pêşketî. Di koletiyê de gaveke pêşketin heye. Di koletiya ne serf de jî pêşketin heye. Sultan - hêza îqtîdar-şer - wek siya xwedê tê hesibandin. Mîna dewama kulta qral-xwedê lê tê fikirîn.

Her du tevger jî di dîroka mirovatiyê de ji aliyê taybetiyên komîn û helwesta demokratîk ve, divê piçûk neyên dîtin û wek gavên ber bi azadî û edaletê ve hatine avêtin, bêne nirxandin.

Li dijî koledariyên klasîk û seretayî, kevneşopiyeke berxwedanê ya hezar salan, destketiyên wê yên mezin di warê zêhniyet, polîtîka, civakî û aborî de hene. Her çend dîroka nivîskî van destketiyan bi taybetî veneqetîne û destnîşan neke jî, ji wan guman nayê kirin. Çanda mirovatiyê zêdetir bi cihokên van her du berxwedanan hatiye avdan. Ji hemû hunerên sereke re bûn mijar û dabaş. Peykerên perestgehan bi hemû heybeta xwe gihîştine heta roja me ya îro. Eger ji exlaq kirtik jî mabin, dîsa bi saya vê kevneşopiyê ye. Destanên ti car namirin, çîrokên ezîz û ewliyan, helwestên mezin ên mirovatiyê nîşan didin. Dîsa li ser rêya vê kevneşopiyê ye ku mirov xwe bi dehsalan dixe silûk û înzîwayê; di zindanan de dirize; li çarmîxê tê xistin; bi gezeke nan, zeytûn, hebek tirî û xurmeyê xwe terbiye dike; êşa mirovan his dike; qîmet û buhaya herî mezin dide zanebûnê. Ev kevneşopiye, qîmetê dide jiyana komîn û ferdiyetê red dike, nîzama dêran, agahiyên destketî û li pêşketina pîşesaz û hunerê bi çavekî

dibistanê dinere û hêja dibîne. Dîsa ev cihokên resen û esîl ku zumreya îqtîdar-şer ji kuştin û mirinê zêdetir şensekî din nedida mirovatiyê, mirov li ser aştiyê fikirandin; şerefa mirov parastin; alîkarî esas dîtin; bal kişandin ser biratiyê û deriyên xwe li gerdûnê vekirin. Civaka çînî neanîne, lê bi piranî nekarîne xwe xilas bikin ji bo di nav sîstema civakî ya serdest de nehelin. Ew bi xwe jî carnan bi qasî efendiyên xwe yên berê bûne hiyarerşîk û dewletparêz. Lê eger hin nirxên mirovatiyê, dîsa jî heta roja me ya îro mane, para van tevgeran tê de heye û hewce ye mirov heqê wan bide. Eger alîkariya van her du kevneşopiyan neyê fikirîn, di roja me ya îro de helwesta demokratîk, azadî-wekhevî, lêgerîna li hawîrdoreke xwezayî, mafê mirovan û nasnameya çandî nabe werin ravekirin. Ji bo demokrasiyê, herî hindik bi qasî ferdiyeta hemdem, xizmetên di qada gelemperiyê de jî girîng in, û eger zemînê qada gelemperiyê wek mîrateya van her du tevgeran were qebûlkirin, wê bandora erênî ya vê kevneşopiyê hê rastir û çareserker were fêmkirin.

Di çarçoveya vegotina me de ku me pêşnûmeya komîntiyê û helwesta demokratîk nîşan da, em dikarin civaka împaratoriya Romayê baş fêm bikin. Roma jî wek hemû pêşiyên xwe, bi tevgerên civakî-komîn ên nava xwe, bi hatina komên etnîk ji bakur, bi tevgera êrîş-parastinê ya komên nêzî civaka xwezayî di dawiya çend sed salan de ji hev de ket. Roma ji hev de ket û paşê parçeyekî wê di dawiya sedsala 4. PZ de hilweşiya, bi sedema têkiliya ne-yekser a di navbera etnîk û komîntiya dînî de serketin muşterek e. Tevlîhev be jî serketin a nîzama komîn û gelan e. Bêguman zêhniyeta dewletparêz û kulta wê hilneweşiya. Her çend guloka berfê parçe parçe bibe jî, bêyî ku bihele hebûna xwe li gelek qadan ji nû ve pêk tîne. Em careke din dibînin ku hêza îqtîdar-şer demeke dirêj nikare parçebûyî bimîne. Mîna xelekên zincîrê wê li xelekên xwe xelekan zêde bike û bi vî awayî dewam bike. Li rojhilat Bîzans, li erdên bakîr û beyar ên Ewrûpayê Frank, Şarlman û împaratoriya Roma ya pîroz bi formên nû wê hebûnên xwe dewam bikin.

Ya rastîn, yên Roma hilweşandin, qebîleyên Germen bûn ku ji alî çandî ve koka wan Aryenî bûn. Hûnên ku ji Asya Navîn hatin, bi dehê salan ev sîstem hejandin. Bêyî hêza etnîsîteyê, ji hêzxistina Romayê û bêkêrkirina makîneya şer a mezin, nabe. Hilweşîna xemgîn a şaristaniya Romayê di encama êrîşên barbaran de, nabe bibe zimanê civakzanên demokratîk û nabe bibe zimanê rastiyê. Em wexta zincîra împaratoran bînin ber çavên xwe, emê hêza xeternak a

îqtîdar-şer baştir fêm bikin. Barbaran - di cewherê xwe de hêzên gel ên azadîxwaz - ev hêz hilweşandin û ev yek ji gavên mezin ên azadiyê ye, hatiye avêtin. Ji lewra ti îtîraz nikare pêşî li me bigire ku em vê rastiyê wer fêm nekin.

Di rastiya jihevketina Romayê de careke din piştrast bû ku dîrok bi şerê di navbera kesên şer-şîdetê, wek çavkaniya moralê ya siyaset, civakî û aboriyê nîşan didin û navbera kesên di helwesta demokratîk, jiyana azadîxwaz û komîn de israr dikin û li ber xwe didin, diyar dibe. Eger neyê ji bîrkirin ku di bin nîzamê "aştî û aramiyê" de timî ev şer heye, wê rastiya civakê hê baş were fêmkirin.

Nexşeya dîrokî ya me hewl da xêz bikin û wêneyê wê li ber çavan rabixînin, berî em bikevin serdema navîn a Ewrûpayê ya di navbera sedsalên 5.-15. PZ de, wê bi kêr were. Erê, li pişt serdema navîn a Ewrûpayê ev dîrok heye. Bêyî vê dîrokê, Ewrûpa ne afirandina şaristaniyê, divê baş were zanîn ku nikare "sifirê" jî hîn bibe. Piştî ku di serdema kurkketina feodalîzmê de pir demeke dirêj razayî ma, bi hemû hêza xwe hewl da bizanibe û zêhniyeteke nû bi dest bixe. Bêyî vê dîrokê kes nikare van gişî xeyal jî bike. Ewrûpa pişt re bi rastî berê xwe dide zanist û dîrokê û hêza pê hewceye jî werdigire. Bi van her du hêzên mezin, rêbaza zanîn û dîroka rast di şaristaniyê de qonaxeke mezin a hêja diafirîne.

Alîkarî û keda Xirîstiyaniyê ji bo serdema navîn kêm û bi sînor e. Bi engîzîsyonê hewl daye ku gavên nû werin avêtin asteng bike. Xirîstiyanî hewl dide pêşî li cihokên erênî - Heretîk (mezheb), pîrênsêr (bermahiyên jinên azad), sîmyager (pêşengên zanistê) yên ji berê ve tên bigire û wan bi agir bişewitîne. Lê tevî meyla wê jiyana xwezayî ya xwe dispêre etnîsîteya teze û bi sedema bi Protestaniyê îradeya wê tê şikandin, îrade û zêhniyeta wê vedibe û xurtir dibe. Bi Protestaniyê muhafezekariya hişk a dîn de li dawiyê tê hîştin û rê li ber netewîbûyîna ku xwe dispêre etnîsîteyê, vedibe.

Ti delîl û belge nînin ku nîşan bidin ev pêşketina mezin a dîrokî pêşketineke bi plan a kapîtalîzmê ye. Ya esas, gelek belge û delîl di dest de hene, hewcebûna bi pêşketina şaristaniya demokratîk nîşan didin.

Di dîroka şaristaniyê de, tevî ku sîstema feodal a serdema navîn, dogmatîzma koletiya serdema seretayî bi sînor kir, lê di heman demê de guhert û dewam kir. Şûna qral-xwedayan siya xwedê cih girt û ev formguhertina dogmatîzma hukumdariyê ye. Cewher tê parastin. Hêza îqtîdar-şer li herêmên berfireh ên Ewrûpa û Asyayê belav bûne û li hêza xwe hêz zêde kirine. Di dewsa împaratoriya Pers û Romaya

westiyayî de xwîna teze Ereb-Îslam, Cermen-Katolîk Xirîstiyan û sîstema Slav-Ortodoks Xirîstiyan hatin avakirin. Pir bi derengî heman sîstem ji aliyê Tirk-Îslam, Moxol-Îslam ve hatine dewamkirin. Di vî şêweyê nû yê împaratoriyan de ya girîng ew e ku hêmanên çandî yên nû wek xwîna teze digirin bunye û nav avabûna xwe. Her çend li ser şopa Roma-Persan dilê xwe bijandine wan û bûne xwediyê hêzê jî, zêhniyet û îmana xurt a Îslam û Xirîstiyaniyê, sotemeniya şer-îqtîdarê hewce pê dibîne tedarik dike û ew çend dewlemend e, dikarin hebûna xwe demeke dirêj pê dewam bikin. Ji aliyê din ve, hêzên hiyarerşîk ên Moxol, Tirk, Cermen û Ereban ku hînî jiyana herî demdirêj û xurt a koçberiyê bûne, ji qewmên di bin destê xwe de digirin, kengî dixwazin dikarin eskerên bawermend berhev bikin. Jiyana bajêr a rehet û dewlemend cazîb û balkêş bû, ji bo karibe li herêmên qewmên nû belav bibe.

Ya rastîn; zemînê jêr etnîsîteyê û beşên xizan ên Xirîstiyanî û Îslamê yên rizgarî dixwestin û li dora keşîşxane û terîqetan kom bûbûn, li dunya û jiyanên nû digeriyan. Ji îstîsmar û zordariya dewlet û hiyarerşiyê nefret dikirin. Ji ber vê jî tevlî tevgera mezin bûbûn. Ji bo bendewariyên wan şîroveya herî rast ev e; derdorên terîqet, keşîşxaneyê wek sentezeke jiyana berê ya komîn a xwezayî demokrasiyeke gerdûnî ya humanîst bû. Di her du dînan de jî yên wek Hz. Mewlena ku em jê re dikarin bibêjin dil û zîhnê serdemê, gelek bûn û bi kurtî wiha digotin: "Tu ji heftê û du milletan bî jî were. Ji berê ve çi gunehên te hebin jî were." Ev helwesta ku me bi kurtî destnîşan kir, heta tu bibêjî di naveroka wê de demokratîzmeke gerdûnî heye. Ekola gerdûnî û demokrasiya serdema navîn tîne ziman.

Eger mirov bi vî awayî nêzî ekolên tesawif û keşîşxaneyên wê demê bibe, wê zêdetir pêşî li têgihîştinê vebe. Ji ber ku tebeqeya jor a dîn û etnîsîteyê dibin hêza dewletê, beşên jêr ên xizan li dora keşîşxane - di Îslamê de berdêla wê terîqet - û dergehên li zemînekî berfireh belav bûbûn wek hêzekê bi nîzamê komîn dijiyan. Ev di warê çînî de veqetîn û cihêbûneke maneya wê kûr bû. Bi gotineke din, wek di navbera hêzên şer-îqtîdarê yên xweserî serdema navîn - tevî beşên hevkar ên xwe dispêrinê - û gelê komîn-demokratîk de veqetîn û têkoşîn e. Di cîhana Îslamê de nakokiya Batinî-Sunnî û di Xirîstiyaniyê de nakokiya Katolîk-Heretîk vê rastiyê nîşan didin. Em di nav qewman de jî heman veqetîn û parçebûnan dibînin. Mînakên wek Selçûkî-Osmanî-Tirkmen, Ereb xelîfe-xaricî hene. Ev nakokiya çînî û şerê di nav heman qewman de îfade dike. Hin ji tevgerên

xizanan bi asteke pir li pêş karîn siyasî bibin. Karmatî, Haşhaşî, Fatimî û Elewî nerazîbûn û cihêbûna beşên xizan ên gel bi awayekî çînî îfade dikin, di heman demê de mînakên seretayî yên demokrasiya serdema navîn in. Lê belê têgihîştina hukumdariyê ya li ser sîstema civakî serdest e, rê nade ku ev tevger di warê demokrasiyê de pêştir ve gav biavêjin. Bi zordariya ji der ve û di hundur de jî bi sedema dûrketina ji rastiya xwe, pir zû tasfiye bûn û bandora wan nema. Li Ewrûpa û Asya Navîn çanda saziyên mîna keşîşxaneyan bandoreke mayînde kirin û karîbûn demeke dirêj bijîn. Keşîşxaneyan di hilberandina zanist û teknîka wê de roleke girîng lîstin. Hêza cewherî ya jiyan û zanistê bûn. Di serdema navîn de derketina zanîngeh û medreseyan, ji nêz ve têkiliya wan bi xebatên keşîşxane û dergehan ve hene.

Komên şer-îqtîdarê pevçûnên mezin li ber çav girtin û di encamê de karîbûn bibin hêza serdest a sîstemê. Di vê yekê de hêza kevneşopî ya dewletê, sazî û zêhniyeta wê diyarker e. Ji bo firsendê nede saziyên nîvdemokratîk yên di şêwazê rêvebirin û rêxistiniyê de amatur in, têra xwe bi qabîliyet e. Ya girîngtir, ji serdestiya wan wêdetir, ev beşê dîrokê bi hevdu gevizandin û gewixandinê dimeşe.

Bi propagandayeke zêde "siya Ellah, sultantiya mezin" didin qebûlkirin û ev fîgurekî nû yê dewletê ye ku ji serî heta dawiyê dekûdolab, zordarî û talanek bi hezar makyajî hatiye hûnandin. Hêza îqtîdar-şer a me şibandibû guloka berf û agir, Îslam jî û Xirîstiyanî jî ji Roma û Persan werdigirin û di serdema navîn a feodal de kirasê dînî li xwe dike û xwe mayînde dike. Berovajî îdîayên wê, zordarî û talana împaratoriyên Roma û Persan li dawiyê dihêle. Li beramberî vê yekê, tevgerên terîqet-mezheb û keşîşxaneyan, etnîsîteya xizan a li jêr û dawî hiştî, tevî îxanetên hiyarerşiyan li wan kirî, ji texmînan jî wêdetir demokratîk in, rastiya gel û ruhê civaka komîn temsîl dikin. Ji bo em roja me ya îro baş fêm bikin, bi qasî serdemên berê divê em rastiya serdema navîn jî ne bi berçavkên hespan ên serweran û dilên teneke, divê di çarçoveya van tarîfan de fêm bikin û pê bihesin. Ev ji bo têgihîştin û ruhê azadiyê pir girîng e. Kesên di ruh û têgihîştina xwe de dîrokê rast nejîn, nikarin îdîaya azadî û wekheviyê bikin û nikarin bibin demokrat.

Şaristaniya Serdema Navîn a Ewrûpayê PZ ji sedsalên 13. û 14. pêve ji civakên Rojhilat çi mîrateya erênî hebe werdigire - di vê de rola keşîşxaneyan diyarker e - û bi afirîneriya tezebûna xwe, bi lez zemînê Ronesansê amade dike. Girîng e, mirov ji nêz ve fêm bike, feodalîzm çima bi awayekî klasîk demdirêj najo. Civaka çînî bi

koledariya Serdema Seretayî dema xwe ya herî dirêj BZ 4000-PZ 500 de jiya û potansiyela xwe bi giranî derxist holê. Çi jê hatibû kiribû. Çînayetiya feodal di vê pêvajoyê de pir kêm bi kêr hatiye û ev yek ji qelsbûna potansiyela wê ye. Di wê rewşê de nîne ku bi kêra sîstema civakê were. Jixwe hem armanca tevgerên dînî û hem jî armanca tevgerîn etnîk ew bû ku vê sîstemê li dawiyê bihêlin. Hiyarerşiyan dilê xwe bijandibûn împaratoriyan, lê ew armanca bingehîn nebû. Bi awayekî, şoreşa qewmî ya etnîsîteyê û şoreşa dînî ya civakî, îstîsmar kiribûn û xwe gîhandibûn hêza nû ya îqtîdar-şer. Pir beriya şoreşa Fransayê li ser ala girseyên xizan "aştî, biratî û wekhevî" nivîsandîbû. Di bin hukumdariyên hezarsalan ên xwedayî de wê ev hemû biqewiyana. Utopyayên mehşer û cennetê ebedî bibûna. Hiyarerşiya li ser kevneşopiya demdirêj a hunerê dekûdolab û zordariyê bibûya hosta, bi xapandin û tepisandinê çawa bixwesta wê bikira.

Li Ewrûpa Rojava ev pêvajo zêde dirêj nekir û di vê yekê de rola keşîşxaneyan a rohnîkirinê - di Îslamê de ev hêz bi giranî di bin bandora seltenatê de ma - û ruhê civaka xweza yê teze yê etnîsîteyê - bi taybetî di Germenan de - rolên girîng dilîzin. Van her du hêzan, wek di hemû qonaxên dîrokê de azadiya têgihîştin û îradeyê dewam dikirin. Ala azadî û zanistê li erdên bi bereket ên Ewrûpa Rojava bi meraq û heyecaneke mezin li ba dikirin. Ne kopiyê împaratoriya Romayê qral û prensên serdema navîn, ne jî engîzîsyonên dêra fermî yên bûbûn mîna ruhên wan, dikarîbûn pêşî li wan bigirtana. Ji bo em şaristaniya îro ya Rojava hîn bibin, hewce ye û pir girîng e, em bi hurmet û berpirsiyarî nêzî vê serdema afirîner bibin ku tê de mirovên xwediyê ruhên azad û fikrên mezin hebûn. Nirxên hatine afirandin, herî kêm bi qasî yên şoreşa neolîtîk-gund-cotkariyê û şoreşa şaristanî-bajêr watedar in. Li Rojhilat têgihîştin û ruhê me yê azad ên vedimirin, diçilmisin li vir dewam dikin. Azadî û têgihîştina di destên mirovên Ewrûpî de tê mezinkirin, ruhê me ye, ku civaka xweza û têgihîştina me jê re pêşengî kir û û hezarê salan ew hilgirt. Ji me re xerîb nîne, ew rastiyek e, ya me ye.

Tevgera Ronesansê - jinûve hilatin - ku bi sedsala 15. re hat destpêkirin, ya rastîn bav û diya wê Rojhilatîn e û zarokê dawî yê sulaleyeke hezaran salî ye. Rast nîne, mirov wê wek zarokê Adem û Hawaya Ewrûpayê bibîne. Belkî jî zarokê surgûn û nefî yê Rojhilat e. Eşkere ye, Ronesans dewama bûyerên bi lez ên sedsala 13. û 14. e. Li ser zemînê kopya Romayê qraliyet û qesrên pîskoposan mezin nebûn, li keşîşxaneyên li çolteran û zanîngehên li bajaran mezin bû.

Di vê mezinbûnê de ne hêza siyasî-eskerî û ne jî hêza aborî ya bazirgan-feodalan diyarker bûn. Keşîşxaneyên li çolteran û zanîngehên li bajaran bi keda xwe li ser piyan diman û gel debara wan dikir, destek dida wan û hêviyên xwe bi wan girê dabûn. Ew ji bo mezinkirina azadî û têgihîştinê cîwarên serbixwe yên xebatê bûn. Ezê vê nuqteyê bi girîngî destnîşan bikim; rêya sereke ya diçû Ronesansê di qesrên dêr û qralan re derbas nedibû, di dibistanên komîn ên gel re derbas dibû. Ne rêya çîna feodal û ne jî rêya bûrjûwaziya li naverastê nebû.

Eger em di herikîna çemê şaristaniyê de cih û dema wê destnîşan bikin, ya kêrhatî û ya bi me bide hînkirin, dîsa çavkanî Sumer in. Ya rast em li serê kaniyê vegerin. Sîteyên li órûk û órê BZ di 3.500-2.500 de pêk hatin pêl bi pêl li Nîppûr û Babîlê, wek navend Nînowa ber bi bakurê Dîcle-Firatê ve belav dibin. Demên li dora van navenda pêk tên wiha ne; Nîppûr BZ 2.500-2000, Babîl 2000-1.300 (dema kevin û navîn), Asûr BZ 1.300-600, dema dawî ya Babîlan evin; BZ 600-300. Ji derveyî Mezopotamyayê jî şaristaniyên yekser ketine bin bandora Sumeran Hîtîtên li Anatolê BZ 1.700-1.200, li Medyayê BZ 900-550, li Persiyayê BZ 550-300. Em şaristaniya Roma û Greka klasîk dikarin bi ser duyemîn şoreşa mezin a zêhniyetê binirxînin. Ev demên şaristaniyan ji ramana mîtolojîk derbasî ramana felsefî dibin. Piştî ku nûnerê dawî yê herî mezin ê Rojhilat li Rojava Troya dikeve, ev pêşketin dest pê dikin. Hellas û Etrûskiyan nekarîn xwe bigihînin pêşketineke xweser. Li ser xeta kevneşopiyê wek hêzên karîbûne belav bibin mane. Şaristaniyên Îtalya û Grek ên BZ di salên 1000 de dest pê kirin, bi pêşketina ramana felsefî BZ di salên 500 de karîbûn derbasî şaristaniyeke xweser bibin. Ya rastîn, demeke dirêj li ser şopên şaristaniya Misir û Sumeran xwe xwedî dikin, bi hêzên ji bakur jî tên dibin yek û bi bandora taybetiyên cografîk jî dikarin bigihîjin qonaxeke xweser. Pêşketinên li nîvgirava Îtalya û Grekê, dewama pêşketina şaristaniya Hîtît a li Anatoliyayê ye. Em wexta li van pêşketinan alîkariya Misir û Fenîkeyên li Rojhilatê Derya Spî jî zêde bikin, wê hêmanên pêşketina xweser hê baş werin fêmkirin. Xeleka Roma-Grek a BZ li derdora salên 1000 û PZ 500, hê zêde fireh dibe û li peravên Ewrûpa-Atlasê radiweste. Şertên cografîk û demeke cuda ji bo sêyemîn versiyona mezin zemîn amade dike. Çemê me yê şaristaniyê, wexta digihîje peravên Ewrûpa Rojava dikeve çaxeke xwe ya bi bereket. Ya BZ di salên 1.500 de dest pê dike, sêyemîn şoreşa şaristaniya mezin e. Em wexta Ronesansê bi zincîra şaristaniya dunyayê ve girê bidin, rastiyeke vê herikînê ye.

Tarîfa herî rast a ji bo Ronesansê ew e ku wek şoreşek zêhniyetê were bi navkirin. Şoreş di çend waran de bi kok e. Ya yekemîn; ferdê bi navê ramana dîn û xwedayetiyê tine bûbû ji nû ve ji dayikê dibe. Teolojiya Xirîstiyaniyê PZ di salên 1.250 de bi senteza Arîsto di dema skolastîk de digihîje lûtkeyê. Mirov dikare wek rewşa herî pêşketî ya metafizîkê jî binirxîne. Mîna ku însan hatibe ji bîrkirin. Nikare bibe pêlîstokeke xwedê jî ew çend di jiyanê de tine ye. Li ser navê dîn civakîbûn li sînorê dawiyê ye. Lê ev rastî têkiliya wê bi pratîk û jiyana berçav ve hîç nebû û xûya mirov a xweza wê nekarîbûya demeke dirêj xwe rabigirta. hewldanên Heretîzm - mezhebên ji rê derketî - pîrasêrtî - jina civaka xwezayî ya nebûye xirîstiyan - û Sîmyageriyê - yên ji elementên xwezayê zêr çêdikin; lêgerîna ilmî - li dijî dogmatîzma Xirîstiyaniyê berxwedaneke xweser a zêhniyetê temsîl dikin. Engîzîsyon dixwaze rê li ber pêşketinan bigire ji bo ferdê azad dernekeve. Mînaka herî balkêş a ji dogmatîzma Xirîstiyaniyê qut bûye û xwe li fikra xweza ya azad girtiye, Gîordano Brûno ye. Brûno'yê tam dilê wî ketiye xwezayê cudahiyê naxe navbera xwedê û xwezayê. Fena ku bi têgihîştina xwezaya - gerdûna - zindî serxweş be. Ew çend heyranê fonksiyonên serbixwe yên xwezayê bû ku di encamê de pêşengê Ronesansê yê kela dilê wî rabûbû, li Romayê PZ di sala 1.600 de hat şewitandin. Bi awayekî hêjayî bîranînê Spartakus û Saînt Paul be.

Kengî mirov bi çavekî ji dogmatîzmê qutbûyî li xwezayê temaşe kir, rêbaza ilmî pêş ket. Mejiyê mirov ê bi rêbaza metafizîkê hûnandî ji rastiya xwezayî dûr ketiye. Piştî ku zîhnê mirov rêbaza xwe guhert û karîbû bigihîje rêbaza ilmî, ji nû ve li xwezayê vedigere. Roger, Fancis Bacon û Galîleo Galîleî ku mirov dikare wan wek peyxemberên rêbaza ilmî jî bi nav bike, bi çavdêrî, ceribandin û pîvanê deriyên pêşketina ilmê heta dawiyê vekirine. Zêhniyeta ilmî ya her ku çû pêş ket, bi rêbazê ji nêz ve eleqeder e. Helwesta felsefîk li hemberî xwezayê hêviyê îfade dike û bi rêbazê jî ev hêvî werdigerin rastiyê. Pêşbînî û feraziyeyên felsefî, qad û rastiyên ilmî rohnî dikin, çavdêrî, ceribandin û pîvan jî îspata ilmî bi cih tînin. Bêyî pîvan û ceribandinê, bi feraziyeyên felsefî mumkîn nîne ji xwezayê sûd were girtin. Her bûyera li pîvan û ceribandinê neyê xistin, nayê fêmkirin ku wê encamek çawa bide. Di cîhana Îslamî de her çend di vî warî de hin gav hatibin avêtin jî ji ber ku xwe nespartin rêbazeke sîstematîk, pir kêm keda wan di zanîna ilmî de heye. Şaristaniya Rojava ku hîmê wê yên bingehîn zanîna ilmî ye, kengî pirsgirêkên bingehîn ên rêbazê çareser kirin, pir zû ket

pêvajoya pêşketinê. Piştî ku pirsgirêka rêbazê hat çareserkirin rê li ber şoreşa ilmî vebû. Lêgerînên bi rêbazên ilmî yên bi Ronesansê re dest pê kirin, di pêşketina ekolên nû yên felsefê de jî rol lîstin. Têkilî û nêzîkbûna hevdu ya felsefe û ilmê, bi qasî bi kêra pêşketina pêvajoyeke ilmî hat, her weha rê li ber felsefeyên nû vekir ku têkiliya wan bi ilmê re dihat danîn.

Ev şêwazê pêhesîn û ramanê ku em dikarin wek qutbûna ji xwedê û bingehê Ronesansê bi nav bikin, guhertina herî mezin a paradigmayê ye. Şoreşa zêhniyetê ya pêk hatiye ji rêzê nîne. Ev ji cureyê şoreşan a herî zehmet e. Destketî û serketina herî mezin a şaristaniya Rojava ev e; xwe ji dogmatîzma dînî xilas dike û bi hêza xwe ya cewherî his dike, difikire û maneyê dide jiyanê. Xwezaya rengîn, zindî ya bi her tiştê xwe heyecanê dide, di hinavên xwe de ji bo hêviyên mezin soz dide. Mirov piştî hezaran sal, bi destketiyeke mezin a zanînê li xwezayê vedigere û ev yek çavkaniyê hemû pêşketina ne.

Duyemîn guhertina mezin, reformên di dîn de hatine kirin. Li dijî dogmatîzma Xirîstiyaniyê ya berovajî têgihîştina civaka xwezayî bû, nerazîbûn jî bi awayekî asayî dijwar bûn. Kevneşopiyên civaka xweza ya Germenan, bi sedema nû dîn naskiribûn, bû sedem ku reformên dînî bi vê çandê bibin. Ya rastîn, Protestanî şîroveya Xirîstiyaniyê ya gelê Germen e. Dogmatîzmê hê nerm dike; astengiyên li pêşiya kar radike; deriyan li ilmê vedike; revîzyon û reformasyonê temsîl dike. Mîna nerazîbûneke li dijî seltenetiya dîn be. Fena derbeke mezin be, li muhafezekariya dîn ketibe ya rê nade azadî û xweseriya gelan; dînê pir siyasî bibe û li pêşiya pêşketinên pratîk bibe asteng. Bi awayekî teolojîk şoreşa di warê zêhnî de nîşan dide. Bi hilweşîna qalibên dogmatîk re fikra felsefîk pir bi lez dikeve pêvajoya pêşketinê. Li Anatolya Rojava BZ di salên 600 de çawa ku ramana mîtolojîk li dawiyê hat hîştin û rê li ber felsefeya dîrokî vebû, li herêma Ewrûpa Rojava jî piştî ku dogmatîzma dînî li dawiyê hat hîştin, serdema felsefeya pêşketî dest pê dike. Di şoreşa zêhniyetê de qada herî pêşketî felsefe, bi Spînoza û Descartes mîna peyxemberên xwe bibîne geş dibe.

Sêyemîn pêşketina ku bi Ronesansê re destpêkir, şêweyê jiyanê bû ku di navendê de mirov cih digire. Têgihîştina "divê mirov bi her tiştê xwe bibe yê xwedê" formeke cuda ya koletiyê bû. Wek forma ramana mîtolojîk a ji kulta qral-xwedê daweriviye nav dînên yek xwedayî, ferd mîna tine kiribe ji jiyanê qut kiriye. Ev kole bi her tiştê xwe amûrekî efendiyê xwe ye. Ji ber ku ferd li ser navê nasnameya

xwedê û efendiyê xwe ew çend ji dest çû ye, jiyaneke ferd a hebe jî nîne. Xwedê yê wî nîne, ew yê xwedê ye. Eger em tercume bikin; mirovatî pir bi dijwarî hewce bûye, bi hiyarerşiya dîn a bûye dewlet. Li gorî dilê çînên serwer, koletiyeke veşartî ya bi vî awayî di her dînî de heye. Ronesansê hurmeta ji bo mirov geş kir û ev yek li gorî tarîfa wê ya wek, civak ji bo jiyana ferd watedar bike heye. Kengî hebûna civakî aliyê ferdî tine dike, li wir koletî bi cih dibe. Ya di sosyalîzma Sowyetê de pêk hatî û ya di sosyalîzma dewleta rahîb a Sumeran de pêk hatî, di cehwerê xwe de heman tişt e. Li ser navê çi dibe bila bibe wexta ferd hat helandin, jê re koletî tê gotin. Di klan û serdema seretayî ya pir xwedayî de û di dînên totem de jî têgînan ji fîgurên civakê rengê xwe werdigirtin hêz didan ferd. Têgihîştina dînî ya serdema navîn, ji ber ku ferd tine kir di warê civakîbûnê de jî ji rêderketineke ciddî îfade dike.

Ji ber ku humanîzm, ferdiyet û reformasyonê mirov kişandine navenda jiyanê, li dijî ji rêderketina civakî bûne dijberiyeke mezin. Ronesans bi vî aliyê xwe, di dîrokê de yek ji qonaxên bingehîn ên zêhniyetê ye. Afirêneriya mirov ji bo xwezabûna wî gava herî girîng a hewce ye. Ev rê û zemînek e ku civaka ekolojîkê karibe xwe bispêrê. Lê piştî ku zêhniyeta kapîtalîzmê serdestiya xwe pêş de bir, mirov ji ferdiyetê derbasî ferdparêziyê bû. Tevî ku hemû destketî paşve hatin girtin, di dîrokê de rê li ber ji rê derketina herî mezin a ekolojîk hat vekirin. Çavkaniya felaketa ekolojîk zêhniyeta Ronesansê nîne, bi kapîtalîzmê ji rê hatiye derxistin. Tevî ku cewherê wê hatiye pûçkirin ji heyîna civakî jî hatiye qutkirin. Dogmatîzma dînî û mîtolojîk bi navê xwedê civak çêkiriye û rastî belovajî kiriye. Kapîtalîzmê jî li gorî dilê ferdparêziyê civakîbûn tine kiriye û bi ferdparêziyê civakîbûneke ji rê derketî pêk aniye. Em wexta li ser yek ji pirsgirêkên bingehîn ên roja me ya îro ji rê derxistina ekolojiyê binirxînin, emê hînê hûrûkûr bi mijarê dakevin.

Serdema Ronesansê ya xwediyê destketiyeke li derdora sêsed salan, ya esas, şêwazê fikirandinê yê şaristaniya Rojava derxistiye holê. Zîhnê mirov ê ji civak û xwezayê hatiye qutkirin, ji nû ve bi rêyeke ilmî û felsefî ya kûr ve girê dide û ji bo şaristaniya nû derî heta dawiyê vekiriye. Bi vê pêşketinê ve girêdayî, pirsgirêkeke rêbazê heye ku divê li ser were rawestin. Bi taybetî di têgihîştina dîrokê ya Marksîst de bi şîroveke zêde materyalîst ev çewtiya mezin hatiye kirin û formên civakî bi xeteke dûz hatine tarîfkirin. Pêşketina kapîtalîzmê wek damezrandineke mecbûrî dinirxîne û belkî jî xizmeta ku ti îdeologê kapîtalîst nekarîbû bi navê kaptalîzmê bike, li

ser navê antîkapîtalîzmê dike. Dibe ku nakok xuya bike, lê belê em dema vedigerin li paş xwe dinerin, em baş fêm dikin ku ti îdeologê kapîtalîzmê bi qasî materyalîstên hişk ên Marksîst ji sîstemê re xizmet nekirine.

Tevî ku Ronesans di dîrokê de wek şoreşa herî girîng a zêhniyetê tê nirxandin jî, pirsa girîng ew e ku Ronesans bi kîjan sîstema civakî ve têkildar e. Têgihîştinên dîrokî yên klasîk Ronesansê wek amadekarê sîstema zêhniyeta civaka kapîtalîst dinirxînin. Têgihîştina dîrokî ya Marksîst jî derketina vê sîstemê wek fermaneke îlahî dihesibîne. Ev dîtin bi xwe hemû encamên jiyana hewceyî kapîtalîzmê ne.

Kombûn an jî ketina serhevdu ya sermayê di her serdema dîrokê de pir hindik heye. Ji Sumeran û vir ve, bi taybetî bi pêşketina bazirganiyê em kombûna serwet û sermayê timî dibînin. Di warê aboriyê de dewlemend pir bûne. Di vî warî de Cihû di dîrokê de navdar in. Lê tevî vê yekê jî nekarîne bibin sîstema serdest. Hem koma jor a dewletê û hem komên komîn ên jêr, komkirina hilberandinê xeter dîtine û bi guman lê nertine. Her tim îhtimal dane ku wê ji xirabiyên mezin re pîrikiyê bike. Ji ber ku tirsiyane exlaqê civakê têk bibe û perdeya şermê biçirîne. Hêza şer-îqtîdarê her çend li ser civakê hukumraniya xwe dewam bike jî newêre exlaqê civakî bidirrîne. Rastiya civakî ya hiyarerşî li ser dibe sazî, pêwîst e hebûna wê jî biparêz e. Eger bi fizîkî jî tine bike, vê yekê bi rêya exlaq dike. Eger civakek ji kevneşopiyên xwe yên bingehîn ên exlaqî were kirin, ew civak tazî hatiye hîştin, bêparastine û deriyên wê ji her cure xeterê re vekirî ne. Eger sermaya kapîtalîst bû sermaye, ev yek bi exlaq û analîzkirina wê ya civakê ve ji nêz eleqeder e. Ev li derveyî vîna wê jî wisa ye. Bêyî çareserkirina civakîbûnê ji kapîtalê sîstem nabe û wexta ber bi sîstembûnê ve diçe pir texrîbkar dibe.

Marks û Engels vê pêvajoyê di Manîfestoya Komînîst de pir bi uslûbeke balkêş tînin ziman. Hinekî jî matmayî bûne. Wexta rola şoreşgertiyê jî didin kapîtalîzmê, bi israr tînin ziman ku divê berî gavekê texrîbkarî û bêînsafiya wê li dawiyê were hîştin. Kapîtalîzm ji her sîstema civakî nîne. Ew cureyekî sîstema civakê ya bi kansêr e. Pir girîng e, mirov bi giştî şaristaniya civaka çînî û bi taybet jî şaristaniya kapîtalîst wek civakîbûneke nexweş hûr bikole. Wexta mirov ji dayikê dibe nexweşiya kanserê pê re nayê. Piştî ku beden ji hevdu dikeve û li dijî vîrusan qabîliyeta xwe ya hînbûnê wenda dike, nexweşiya kanserê derdikeve holê. Di rastiya civakî de jî ya diqewime dişibe vê mînakê. Civaka di nav sîstemên şaristaniyan de

westiyayî û sermayê xwe çizirandiye nav hemû hucreyên wê bi nexweşiya kanserê dikeve. Li gorî cureyê wê, hindik an jî pir, dikare bandoreke dijwar bike. Eger em şerê sedsala 20. tenê çareser bikin, wê ji gelek aliyan ve rastiyê eşkere bibe. Reqabet û hevrikiya zêde, kar, kara zêde, bê kar hîştin, feqîrî, birçîtî, nijadperestî, netewparêzî, faşîzm, totalîtarîzm, hunerê demagojiyê, texrîbkirina ekolojiyê, fînansa zêde, kesên ji dewletê dewlemendtir, bombeya atomê, çekên kîmyewî û biyolojîk, ferdparêztiya sînor derbaskirî, mirov dikare van hemû nuqteyên destnîşankirî wek cureyên kanserê yên sîstema kapîtalîzmê bifikire.

Me ev kurtetarîfa kapîtalîzmê kir ji bo têkiliya wê bi Ronesansê re rast fêm bikin. Tarîfa Ronesansê - bi awayê giştî tê qebûlkirin - wiha ye; wek cewher xwezayê, civakê û ferd ji her cure dogmayê dûr digire û di asta arzûyê de hezkirin û têgihîştina li wan esas dibîne. Li pîrozbûna ferd û xwezayê vedigere. Ev ferd jî ferdê kapîtalîst nîne; bi hukmekî hevbeş ev ferd bi zanebûna xwezayê, huner û felsefeyê tijî ye, ji şer xwe dûr digire, li civakeke azad, wekhev û xweza digere. Utopyayên Ronesansê kapîtalîst nînin, komînî ne. Ti lêkolîn nîne bi me bide bawerkirin ku sîstema nû ya civakî kapîtalîst e. Li keşîşxaneyan jiyaneke komîn heye. Li bajarên nû ava dibin ruhê serdest alîgirê demokrasiyê ye. Zanyar, kesên bi felsefe û wêjeyê re mijûl dibin, kesên bi huner re mijûl dibin hemû mirovên kedkar in bi zorê debara xwe dikin. Kesên sermayê kom dikin û didin serhevdu pir kêm in, bi taybetî beşek ji ber faîzê li nefreta civakê rast tê. Arîstokrasiya feodal û çînên gel ên wek netewekî nû derdikevin holê, heta bi şoreşa pîşesaziyê, bi awayekî têkel sîstema civakî pêk tînin.

Ev nirxandina kurt jî pir eşkere nîşan dide ku heta sedsala 19. sîstema civaka kapîtalîst li naverastê xuya nake. Ji lewra, Ronesans wek qonaxa pêşek a kapîtalîzmê nirxandin û wek pêvajoya wê ya zêhniyetê dîtin, çewtiyeke xeternak e. Ya rastîn, "neqebeke kaosê" ye, serê wê dikare ber bi her cure bûyerê ve biçe. Sîstema feodal ji hev belav bûye, ji hev de ketiye, lê civaka nû derneketiye, pêvajoyeke navber û neqebê ye, êşên li ber zayînê hene. Ji vê neqebê, hem feodalîzma xwe xurt kirî jî dikare derbikeve, hem jî sîstemeke ferdparêz a kapîtalîst jî dikare derkeve, her weha dikare pêşketin ber bi civakeke azad-wekhev û demokratîk ve jî biçin. Bi tevahî li gorî qabîliyetên polîtîk û têgihîştina şervanên sîstemê, bi awayekî teorîk derketina gelek sîsteman mumkîn e. Jixwe heta dawiya şoreşa Fransayê, alîgirên civaka wekhev-azadîxwaz û civaka kapîtalîst di heman weznê de bi hev re têkoşiyan. Şoreşa Îngilîz a di

sala 1640 de bi giranî taybetiyên xwe demokratîk in. Em di vê şoreşê de li ser wekhevî û azadiyê li têgihîştinên kollektîf û şexsî yên xurt rast tên. Ji şoreşeke bûrjûwaziyan zêdetir şoreşeke gel e. Di sedsala 16. de komînarên bajêr ên Spanyayê karektera wan demokrat in. Şoreşa Emerîkayê jî pir eşkere azadîxwaz û demokratîk e. Di şoreşa Fransayê ya sala 1789 de komînîst jî di navê de gelek reng hene. Bi kurtî, di pêvajoya Ronesansê de ji derketina kaosa civakî, meyla civaka demokratîk û azad-wekhev, herî kêm bi qasî meyla ferdparêz a kapîtalîst şensê wê heye. Kapîtalîzm tevî şoreşa pîşesaziyê, bi şerê civakî dikare bi ser bikeve. Kapîtalîzm bi şoreşa pîşesaziyê re di sedsala 19. de li her qadê serdestiya xwe îlan dike. Em dibînin di dawiya sedsala 19. û destpêka sedsala 20. de sîstema kapîtalîst bi awayekî hişkeber yekem car belavbûna xwe ya li tevahiya dunyayê temam dike. Têkoşîna ji bo civakeke demokratîk û ji bo hê zêdetir wekhevî û azadiyê, bi têkçûna şoreşên 1848-1871 şensê xwe yê bibin sîstema civakî ya serdest wenda kirin.

Em ji bo tarîfa pêvajoyê temam bikin, divê em li ser mijara dewletên netewî û netew bi sîstema civakî ya nû derdikeve di zikhev de binirxînin.

Pêwîste mirov baş bizanibe, rastiya civakan a netewî yekser berhemekî kapîtalîzmê nîne. Di vê mijarê de îdeatiyeke mîna kapîtalîzm netew diafirîne şaşiyeke ciddî ye. Di vê şaşî û çewtiyê de para Marksîzmê jî heye. Di civakan de pêvajoya klan, qebîle, eşîr, netewiyet û netew li gorî diyalektîkeke xweser pêk hatiye. Wek berhemekî civaka çînî dernakevin holê. Kapîtalîzm nebe jî netew dibe. Di şêwegirtina netewan de ziman, çand, dîrok û hêza siyasî zêdetir roleke diyarker dilîze. Netew di civakên demokratîk û azad-wekhev de dikarin hê têkûz pêş de biçin. Em li Ewrûpa Rojava piştî sedsala 12. dibînin ku netew reng û şêwe digirin.

Di dawiya sedsala 18. de bi serketina bûrjûwaziyê diyar dibe ku wê ji sîsteman kîjanê di nav netewan de serdest bibe. Serketina kapîtalîzmê di nava netew de, di heman demê de bi xwe re di şûna dîn de netewparêziyê wek îdeolojiya serdest bi cih dike. Hem di hundur de bazarê pêş de dibe û hem jî deriyên bazarê ber bi der ve vedike û ev her du rewş jî ji nêz ve bi netewparêziyeke xurt eleqeder in. Ev taybetiya netewparêziya xurt derî li netew-dewletê vedike. Netew-dewlet piştî ku perdeya îdeolojîk a dînî bi laîsîzmê li dawiyê dihêle pêş dikeve. Di cewherê xwe de têgînek wek dewleta netew ji kokê ve şaş e. Eger mirov behsa netewîbûyîna civakê, yekparebûna netewî bike hindek rastiyê nîşan dide, lê belê netewîbûyîna dewletê

hukmekî îdeolojîk e; realîteya civakê nîne. Ji ber ku civak hemû nikare bibe xwediyê dewletê. Dewlet her tim di bin ferman û xizmeta hindikayiyeke netewî de ye. Ya dewlet dike; - di mijara dîn de jî heman tişt kiribû - rastiya netewî werdigerîne rastiyeke îdeolojîk û bi vî awayî jê re hîmên meşrûbûnê pêk tîne. Hemû netewparêziyên sedsala 19. û 20. têkiliya wan bi vê îdeaya meşrûbûna civakî ve hene. Li dijî der ve di sorkirina êrîşan de û li hundur di veşartina nakokiyên çînî de netewparêzî roleke mezin dilîze. Divê mirov netewparêziyê wek sîleha îdeolojîk a dewleta kapîtalîst fêm bike. Eger wer bê fêmkirin, girîng e ku mirov li demên netewparêzî lê belav dibe rast serwext bibe.

Netewparêzî di heman demê de navendîtiya di nava dewletê de jî xurt dike. Li dijî avabûnên hê federal û demokratîk, netewparêziya dewletê ber bi avabûnên navendî-unîter ve diçe. Ji vir jî derbasî têgihîştina dewleta totalîter û faşîst dibe. Nexweşiya civakî ya dibe hîsterî, bi sîstema kapîtalîst re ya berê xwe dide şêweyên dewletê yên faşîst û totalîter, bi hev re dimeşin. Encam; întîhara kapîtalîzmê ye. Em di vê çarçoveyê de dikarin şerê cîhanê yê yekemîn û duyemîn wek çalakiyên întîharê yên sîstemê binirxînin. Ji ber ku netewparêzî zêde hatibû bi karanîn. Kapîtalîzm ku bi xwe krîza şaristaniyê ye, bi giştî û bi kûrahî dikeve krîza mezin yanî dikeve pêvajoya kaosê.

Wexta bi perspektîfeke teorîk a yekpare û berfireh li sîstema civaka kapîtalîst were nertin, wê were dîtin ku tevahiya hêmanên herî îstîsmarker ketine nava civaka mirov. Em îstîsmarê wiha dikarin binirxînin; firsend û keysê bibîne di wê kêliyê de her tiştî li gorî berjewendiyên xwe diqelibîne. Firsendbaziyê mîna huner dizane û pêş de dibe. Hedefa wî ya yekemîn nirxên maddî ne. Lê bi qasî ku ewê ji pêşketina maddî re xizmetê bike, dikare berê xwe bide nirxên ku em karin ji wan re manewî bibêjin, wek fikir, bawerî û hunerê. Felsefeya wê ya bingehîn e, çi hebûnên civakî hebin ji wan li benda karê ye. Çi nirxên civaka komîn bin, çi nirxên hiyarerşîk-dewletê bin, di warê îstîsmarkirinê de wan ji hev cihê nake. Ji ber vê taybetiya wê, em dişibînin kurmik, an jî vîrusa kanserê ya ketiye bedena mirov. Lewra teşbîha "kurmê darê ji darê ye" bi bîr dixîne. Em dîsa bi zimanê teşbîhê bibêjin; gur heta nekeve nava hemû kerî, vîrûs xwe li hemû bedenê negerîne û kurmik bi qasî ku darê neqelibîne nekeritîne, mumkîne di bin kontrolê de werin girtin û rastiyên behsa wan tê kirin hebûna xwe dewam bikin. Wexta kapîtalîzm dibe sîstema serdest îhtîmal heye bi gelek aliyên din ve bişemite - ev di xwezaya wê de heye - ji lewra kapîtalîzm di qonaxa

herî xeter de tê hesibandin. Ya jê re totalîterîzm û faşîzm jî tê gotin ev e. Di vê rewşê de civak timî di nav atmosfera şer de ye. Şer ne tenê wek yê yekemîn û duyemîn ê cîhanê di asteke global û fermî de bi awayekî eskerî pêk tên, ya herî xeternak di nav hemû sazî û têkiliyên civakê de şer pêk tê û mantiqê jê re tê gotin; "mirov kurmê mirov e" dest pê dike. Şer heta di navbera jin û mêran de, zarok û li hemû hawîrdora xwezayê belav dibe. Bombeya atomê îfadeyeke sembolîk a vê rastiyê ye. Di nav civakê hemû de hêdî hêdî di zik xwe de, lê timî bombebaraneke atomî pêk tê.

Em wexta li pêvajoya globalîzm û dewleta netewî dinerin, rewş berçavtir e. Rastiya netewî zêde tê sorkirin heta dewlet bi timî tê zevtkirin û ferdê berê hêz bi dest xistibû, dikeve pêvajoya "morîbûnê." Humanzîm û ferdê ku bi Ronesansê re mezin bûbûn, êdî dikevin pêvajoyeke serberjêr. Weke ku bibin hedefa êrîşê bi ser wan de diçin. Ev rastî bi tena serê xwe cudahiya di navbera nirxên Ronesansê û kapîtalîzmê de nîşan dide. Dema kapîtalîzm mezin dibe ferd piçûk dibe. Hûmanîzm dibe têgîneke hundurê wê pûç û bi navê globalîzmê li hemberî şerên çavsor ên çend şîrketan, dibe têgînek ku jê were fedîkirin. Ji bilî dewleta netewî, divê hemû saziyên din werin helandin û dagirkirin. Bi vî awayî prensîba "ti nirx ji netew-dewletê mezintir nîne" tê li bakirin û di encamê de dewlet zirxekî pîrozbûnê li xwe dike ku ti çax û serdemê de nekarî vê yekê bi dest bixe. Her tişt ji bo dewleta millî! Ya rastîn, di bin perdeya dewleta millî de yan jî bi qurnaziyê her tişt ji bo kapîtalîst e. Dewlet, bi taybetî jî dewleta netewî, wisa bi awayekî rêbirr ji bo kar û kara zêde xwedî sihrekê ye, netewparêzî wek îdeolojiya netew-dewlet, di astekê de ku ti mîtolojî, felsefe, têgihîştina dînî û baweriyê xwe negîhandibê, kiriye ekoleke bawerî û îmanê. Mîna hemû çav û dilên pêwendîdar kor bike. Ji bilî fîgurên rastiya millî yên hatine nepixandin ti nirx û buha manîdar nînin. Pîrozbûn tenê di nirxên nepixandî yên millî de veşartî ne. Li hemberî vê, mîna ku ferd bikin endamê terîqetên serdema navîn, hewl didin bi "terîqeta dewletê" ve girê bidin.

Têgîna welatî, rastiyek e, divê baş were analîzkirin. Ya rastîn, di serdema navîn û seretayî de, di şûna têkiliya ferd-dewlet û kole-serf de hatiye bi karanîn. Bi awayekî bûrjûwazî - dewlet - li têkiliya koletiyê vedigere. Welatîbûna ji bo dewletê, bi şêweyekî din koleyê hemdem ji bo sîstemê tê amadekirin. Ev tê wê maneyê ku ferd ji bo çîna bûrjûwaziyê hatiye asta bi kêr were. Di serî de eskerî û bacdayîn ji bo gelek mijaran dibe berpirsiyar. Bi vî awayî, hêza ku dewlet û

çîna serdest pêdiviya wan pê heye amade dibe. Zarokanîn ji bo bûrjûwaziyê kirine karekî bêmesref. Di gotinê de her çend behsa mafên aborî, civakî, siyasî û çandî werin kirin jî di cewherê xwe de ev maf bi giranî yên çîna serdest in.

Kapîtalîzm wexta dest biavêje zanist û hunerê hê encamên xeternak bi xwe re tîne. Bi giştî zanist û huner kirine amûrekî îqtîdara dewletê. Bi kapîtalîzmê re karê îqtîdar-zanînê, bi hêza şoreşê gihîştiye asteke nehatiye dîtin. Kapîtalîzm piştî ku zanist û hunerê digire bin destê xwe, hêza serwerî û kedxwariyê digihîje asteke xeternak. Çawa dixwaze ferd rêve dibe û dikarin jê sûd werbigirin. Ne tenê zêhniyeta ferd, paradigmayên wî yên bingehîn li gorî dunya xwe ya taybet vediguherîne her weha ferd dike xwediyê "berçavkên hespan û dilekî ji tenekê." Bi van çav û dilî mirov dibin korfêm, sûdperest, egoîst, xemsar, zalim, bêhis, hişk û hebûnên robotwarî. Dunya şên û geş a Ronesansê cihê xwe ji dunyayeke mat û mirî, bêruh û pîrozbûna xwe têkçûyî, heyecan û meraqa xwe ya kûr nemayî, mirûzekî tirş û bêzarbûyî re dihêle. Beşên civakê yên kedkar û bi heqdesta xwe dixebitin kirine mîna mirîşkên hêkan dikin. Tenê maneyeke jiyanê maye, ew jî hêkkirine û bi êm - heqdest - tê hînkirin. Tîpa eko-însan her tiştê xwe li ser ziktêrkirinê dihûne û difikire. Ya hê xeternak; di dîrokê de sîstem yekem car bûye qabîleyetek ku mirovan bêkar dihêle. Ji bo karkerê erzan artêşa bêkaran mezin dike û hazir di destê xwe de digire. Têkiliya bûrjûwa-karker tê asteke welê ku karkerê di destpêkê de asî bû, dibe mîna berxikê û ji serfê serdema navîn zêdetir hewceyî efendiyê xwe dibe. Karker êdî ew kes nîne ku li ser navê wî şoreş têne kirin, li hemberî bêkariya zêde û heqdesta hindik, mîna koleyan li pey patronê xwe ye. Di vê rewşê de karker bi serê xwe nirx û buhayek nîne, amûrekî patron û saziyê ye. Ew çi bin, ew jî ew e.

Ji beşên civakê yên hê di rewşeke xeternak de dijîn, rewşa zarok, jin û yextiyaran dikeve rewşeke bêrehimtir. Jin ji damezrîna hiyarerşiyê vir ve, bi sedema çavbirçîtî û xemsariya mêr ku di bin hêza wî ya çor de nalenala wê ye, bi sîstema kapîtalîst qatekî din bi zincîran tê girêdan. Hebûna herî zêde mêr li ser derewan dike jin e. Tê gotin; li ser mijara cinsî yek ji kesê herî zêde ku xebatên berfireh kirine Freud li ber mirinê gotiye; "jin yanî çi?" Ev rewşeke asayî nîne. Ev rewşeke xeternak e, îdeolojiya serwer a mêr ew afirandiye. Mêrê serwer ê naxwaze jinê nas bike, ji bo ser li vê rewşa xwe bigire, serî li yek ji sîlehên xwe yên girîng wêjeya eşqê dide. Ji bo mêrê serwer eşq yanî veşartina derewê, bêhurmetiya nuxumandî,

korfêmî, ajoyên hundurîn ên kor ku timî dibin xwediyê meydanê. Jinê jî tîne wê astê ku bi hêsayî bi vê rewşê bixape. Bêguman ev bi tepisandina jinê ya di dawiyê de neçar ketiye eleqeder e. Jin, ew çend ji şertên maddî û manewî yên jiyanê hatiye qutkirin, her gotinên mêr ên rezîlane û êrîşên wî, bi belengaziyekê mîna mafê wî yê herî xweza qebûl dike.

Min bi xwe wek şexs ti car fêm nekiriye û mat bûme ku jin di bin vê "statuyê" de çawa li xwe datîne bijî. Lê divê ez li xwe mikur werim ku pê hesiyame, wexta heywan ji bo serjêkirinê dibin ber qesab, heywan ferq dikin ku wê werin serjêkirin, lewra jî dilerizin û diricifin. Rewşa jinê ya li hemberî mêr her tim vê lerzînê bi bîra min dixîne. Heta jin li ber nelerize, mêr rehet nake. Yek ji hoyê serweriyê ev e. Qesab carekê serjê dike, ew tevahiya temenê wê serjê dike. Rastiya divê were eşkerekirin ev e. Veşartina vê rastiyê bi stranên evînê helwesteke rezîlane ye. Li ser navê şaristaniyê têgîn û hebûnên herî bênirx derbarê evînê de ne. Mêr ti carî nekarî, nexwest bikaribe bi awayekî xwezayî û asayî nêzî jinê bibe. Ez bi xwe mêrekî xwediyê vê helwestê bibînim ezê wî wek qehremanan binirxînim. Pirsgirêk nefsekiyên piçûk û cudahiya cinsî nîne. Ji ber ku hiyarerşiya dewletdar di dema tebeqebûnê de jin di tebeqa herî jêr de bi cih kir. Jin ji ber van taybetiyên statuya xwe yek ji pirsgirêka kûr a civakî ye. Sosyolojî bi sînor be û dereng be jî bi sedema kapîtalîzm ketiye pêvajoya krîzê, eleqe nîşanî pirsgirêkê dide.

Di pêvajoyê de ku her tişt eşkere dibe, mumkîn e mijara jinê xwe bi her alî ve bide der. Zordestî û mijokeriya sîstema kapîtalîst li mijara jinê zêde kir, divê bi awayekî berfireh were fêmkirin. Jin wekî ku goya metayeke herî bi nirx e. Ti sîstemê ewqas hewl nedaye ku jinê bike meta. Di serdemên navîn û seretayî de cariyetiya jinê, koletiya wê wek beşek ji koletiya giştî ya wê demê ye û ev yek ji aliyê sîstemê ve pir girîng nîne. Di wê demê de koletiyeke tenê xweser ji bo jinê nîne. Harem hene mêr tê de ne. Mêrên hatine xesandin jî hene. Kurên bi wan re bidin û bistînin jî hene. Cudahiya herî mezin a di têgihîştina cinsî ya sîstemê de kapîtalîzm dike. Kapîtalîzm wer dike ku organekî wê nahêle neke meta. Vê yekê jî bi gotina wan li ser navê wêje, roman û bi hunerê dikin. Lê belê fonksiyona vî karî ev e; ji bo di rakirina barê sîstemê de ku mirov nikarin xwe lê rabigirin, para jinê zêde bike. Ji bo her xebatekê heqdestek heye, lê ji karê herî zehmet zarokanînê re, ji zarok mezinkirinê re, ji her cure xebatên malê re heqdestek nîne. Koletiya

seksê ya ji bo mêr jî bê heqdest e. Jin bi qasî heqdesta li kerxanê, li xaneya taybet nirx û qîmetê nabîne.

Tiştên wek namûsa zewacê û şerefê têne bi navkirin ku hemû qehra "împaratorê piçûk e" divê jin bikişîne. Çawa împaratorê mezin mulkê dewletê wek şerefa xwe dizane, tiştek pê were sedema şer qebûl dike, împaratorê piçûk jî jinê wek malê xwe dibîne; wexta tiştek pê were, dike meseleya namûsê û heta sedema şer qebûl dike. Ya herî balkêş, ruhê jinê bi tevahî hatiye pûçkirin, tenê şiklê wê yê jintiyê hatiye hîştin û kirine "çivîka qefesê" ya bi xemil û xêz. Bi nîzama deng û makyajê, jin ji nasnameya wê, ji jina xwezayî dûr hatiye xistin, bi giranî pê hatiye înkarkirin û kiriye ku şexsiyeta wê bikuje. Bi awayekî taybet, jin bi rêya jintiyê tê bêşexsiyetkirin. Ev yek vedîtina mêr e û li ser jinê ferz dike. Wek mîna wî be, divê jin li gorî dilê wî rawest e. Wexta wisa nebe jî pir bi hêsanî jinê gunehbar dike. Jin mîna amûrê reklam û teşhîrê tê bi karanîn û sîstem bi xwe ji vê yekê berpirsiyar e. Ev yek jî wek cewher û xwezaya jinê tê hesibandin. Bi kapîtalîzmê re şerefa jinê ketiye nuqteya herî jêr. Ya bi nasnameya jinê re ketiye nuqteya jêr, di heman demê de nirxên civaka komîn in. Mentiqê sîstemê hem hewceyî vê yekê ye, hem jî di vî warî de gelek bi qabîliyet e.

Cinsê jinê ku bi pornoyê ji her cure pîrozbûnê hatiye kirin, kapîtalîzmê ew daxistiye asta prîmatên destpêkê. Di tevahiya dîroka şaristaniyê de jin di civakê de hat tinekirin. Di vê yekê de bi qasî para pêşketinên çînî û hiyarereşîk, ewqas jî para civaka mêrên serwer a mêr ew mezin kiriye heye. Dîsa jinê bandora xwe çiqas di civakê de wenda kiriye, ew çend jî ji nirxên komîn dûr ketiye. Xwezaya jinê hê nêzî nirxên civaka komîn in. Ji ber ku mejiyê wê li hemberî bûyerên xwezayê hişyar in û rast tevdigerin. Mejiyê hisî li cem jinê li pêş e. Mejiyê analîtîk ji ber ku bûyeran li hev dihûne, bi jiyanê re têkiliyên wê kêm in. Pêşketina mejiyê analîtîk ê mêr, di nav civakê de karektera wî ya hîlekar û zordest jî destnîşan dike.

Giraniya sîstemê ya li ser cîhana zarokan rewşa giştî nîşan dide. Zarokên di cîhana xeyalan de dijîn, ji binî ve berovajî hesabên sar ên sîstemê ne. Zarok û kapîtalîzm bi hev nakin. Yextiyar mîna zarokên pîrbûyî ne. Rûsipî û zanayê berê yê hurmet didît, ji bo kapîtalîzma hildibere, barekî giran e, hebûneke bê kêr e. Zarok mumkîne bêne mezinkirin û bi kêr werin. Lê yextiyar wê ji ber ku bimirin ti qîmeta wan nîne. Di şexsê yextiyar û pîr de civak ji pîrozbûn û mezinahiyê tê kirin. Wexta yextiyar li mala pîran tê danîn, bi qasî zalimtiya sîstemê, bêmanebûna wê û rûyê wê yê kirêt bi hemû aliyê xwe ve

eşkere dibe. Pirsgirêka yextiyaran bi xwe jî pir bi hêsanî dikare ispat bike ku ev sîstem ji bo civakê hewce nake. Di vî warî de têra xwe îşaretên pirsê hene.

Tevî ku mirovên li metrepolên kapîtalîzmê ji her tiştî têr bûne, mirovê hawîrdorê ji her alî ve di nav tinebûn û birçîbûnê de ne. Taybetiya sîstemê ya kara zêde, diyalektîka di navbera mirovê qelew û qels ê hema bêje hestiyên wî xuya dikin de pir berçav dike. Potansiyela nakokiyên di hinavên civakê de ji bo pêşketinê hema bêje nemaye. Yan zêde xwe dubarekirin û yan jî jihevketina hin saziyên sîstemê, mayîndebûna krîzê destnîşan dikin û ketina nav kaosê ji sedî sed îspat dikin. Wek di hemû bûyerên zincîrwarî yên xwezayê de xuya dike, dem hatiye xeleka zincîrê qut bibe. Pîvan û hukmên berê maneya xwe wenda dikin. Sazî ji ber ku fonksiyona wan namînin bê mane ne. Dem hatiye ku qanûnên nû û saziyên ferz dikin werin avakirin.

Pirsgirêka ekolojiya civakî bi şaristaniyê dest pê dike. Civaka xwezayî bi aliyekî xwe civaka ekolojîk e. Eger hêza civakê ji hundur ve were birrîn, wê têkiliya wê ya bi xwezayê re jî qut bibe û heta ji hundur ve bi awayekî awarte birrîn nebe, pirsgirêka ekolojîk jî nabe. Ya anormal, watedariya di hemû pêvaoyên xwezayî de, bi civaka şaristaniyê re maneya xwe wenda dikin. Mîna ku zarok ji pêsîra dayikê hatibe kirin. Meznahiya mejiyê hisî hêdî hêdî wenda dibe. Mejiyê analîtîk ê tim ji zimanê xweza û wijdan dûr dikeve, bi cîhana xwe ya li hev dihûne, her ku diçe nakokiyên xwe bi hawîrdorê re mezin dike. Tayê jiyanê bi xwezayê re tenik dibe. Şûnê, fikrên mucered û xweda digirin. Xwezaya afirîner cihê xwe ji xwedayê afirîner re dihêle. Xwezaya divê wek şefqeta dayikê were fêmkirin, mora zalim li piştê tê xistin. Êdî ji bo mirov qehremanî ye ku çiqas karibe bi ser xwezaya bê zar û ziman de biçe. Heywan û nebat bi awayekî bê mêzîn hatin îmhakirin; ax, av û hewaya xwezayê hat gemarîkirin; civaka mirov ev yek wek mafekî xwe yê bingehîn hîn bû. Xwezaya hawîrdorê êdî mirî ye, mîna qadeke jiyanê ya dembuhurî tê korkirin. Xweza ya hêviya bêsînor a xwezaya zindî ye, êdî kor e; bêhurmet e; ji lod û gidîşeke maddeyên çor zêdetir tiştek nîne.

Ev têgihîştina xwezayê bi Ronesasnsê hat hilweşandin, lê di nava civaka sîstema kapîtalîst de heta dawiyê li kedxwarî û îstîsmarê vekiriye. Sîstema kapîtalîzmê dixwaze fetihkirina mirovatiyê bi fetha xwezayê temam bike. Bi her awayî îstîsmarkirina xwezayê heq dizane û vê yekê wek qabîliyetekê dihesibîne. Şoreşa pîşesaziyê û di

encama paşê de sîgortaya xwezaya hawîrdorê avêtiye. Baş hatiye fêmkirin ku ya bêaqil ne xweza, sîstem bi xwe ye. Lê êdî dereng e. Hawîrdor timî îşaretên SOS dide. Dike qîrîn, hawar û dibêje; ez êdî nikarim sîstema civakî ya heyî rabikim. Wexta mirov ji vî alî ve binere, ya xuya dike, wek ku sîstem ketibe neqeba kaosê; û heta guftûgoya ekolojîk neke, mane û avabûna civaka ekolojîk analîz neke, şensê wê nîne ji kaosê derbikeve.

Wexta sîstemên civakî têne nirxandin, yek ji têgihîştinên ku divê mirov nekeviyê, guloverkirina tarîfan e. Mînak, dema kapîtalîzm were tarîfkirin, divê ne wek her tiştê civakê, ne jî wek civakê bi xwe were dîtin. Encamên bi vî rengî heta dawiyê şaş in. Ji ber ku ti sîstema serdest nikare temamê civakê pêk bîne. Ev li dijî dualîteya diyalektîkî ye. Bêyî dijberê xwe pêş bixîne, pêşketinên yekalî, helwestên îdealîst û rastiyek in ku cihê xwe nîn in. Berovajî texmînan, li derveyî sîstemên serdest qadên berfireh ên civakî peyda dibin. Li vir bermahiyên sîstema kevin, dijberên sîstema serdest û alternatîfên siberojê di zikhev de dihewin. Civak di nav liv û lebatek zindî de ye; hê zêde bi pêşdebirina huqûq û rewabûnê, veguherînê domdar dike. Ji ber ku têgihîştinê hêsan dike, mirov dikare sîsteman şematîk bike. Lê eger di şûna hemû rastiyan de were dîtin, xeter heye bibe sedema helwestên dogmatîk. Ji lewra divê mirov şematîzekirinê bi rengê rastiyê yê tevlîhev re yek nebîne.

Nirxandina derbarê kapîtalîzmê de jî şematîzekirin e. Lewma gelek nuqte hene wê ji yekparebûna mijarê dûr bimînin. Hin alî dibe ku zêde hatibin mezinkirin jî. Ji ber vê sedemê em zêde li ser tarîfê rawestiyan. Ji bo nirxandin objektîf bibe, girîng e mirov di nirxandina pêşketina pêvajoya sîsteman de bala xwe baş bidiyê da ku ne pir alî kêm bimînin, ne jî hin alî zêde werin mezinkirin. Ne bi awayekî qederwarî modela pêşketinê rast e, ne jî encam wek mecbûriyetekê bêne dîtin û pêşbîniya dema ayende bi awayekî kehanetwarî were kirin, rast e. Navberên huqûq û rewabûnên civakî kin in. Mumkîn e hêza manedanê were pêşdebirin û pêve girêdayî avabûnên nû pêk bîne. Dîsa jî bêyî serî li şêwazekî qederwarî û kehanetê were dayîn, divê mirov sîsteman bi hêzên wan ên cewherî bibîne û maneyê bi awayekî berçav bi dest bixe, ku ev jî ji bo bidestistina agahiyê awantejeke ilmî ye. Lê belê felsefe û mîtolojî jî dikarin di dewlemendekirina maneyê de alîkariyê bikin. Pir eşkere ye, emê nikaribin rastiyeke mîna civakê ku tekamula xwezayê hemûyî di hundurê xwe de hildigire, bi qanûna fizîkê tarîf bikin. Ji

ber ku em bi xwe jî parçeyek ji vê rastiyê ne, emê nikaribin ji gelek tiştên nediyar birevin û ev rastî bi fizîka kûantûmê hatiye ispatkirin.

Ji neqeba Ronesansê tenê nirxên çûn sîstema kapîtalîzmê nehatin girtin. Ji amûrên wê yên gelek dewlemend bûn, ji bo avakirina civakên kollektîf, peydakirina hêza maneyê ya hewce bû jî yek ji îhtîmalan bû. Utupyagerên destpêkê Campanella, Thomas Moore, Francis Bacon, hînê paşê Fourier, Robert Owen û Proudhon gelek sîstemên civaka komîn difikirin û heta hewl didin cih bi cih bi rêk bixin. Dîsa di dema rohnîbûnê de gelek fîlozof derdikevin û li ser taybetiyên civaka nû diponijin. Şoreşên destpêkê timî berê wan li aliyê çep bû û timî aliyekî wan ê neqediyayî hebû. Sîstema kapîtalîst bi rewşa xwe ya rûniştî pêşnûmeya ti kesekî xwediyê fikrê nîne. Mufekîrên ciddî, utopyayên civakî yên li pey diçûn, hemû karektera wan kollektîf bûn. Roleke diyarker ji bo exlaq tê naskirin. Tevî vê yekê, di serketina kapîtalîzmê de hêza kulta dewletê, giraniya heyî ya arîstokrasiya berê, pêşketîbûna çîna bûrjûwaziya nû ji dijberên xwe û hin sedemên din ên objektîf bi tesîr bûn. Kesên doza civaka nû dikirin, bi sedema hê gelek şopên civaka serdest a berê li ser wan hebûn, bi karanîna wan tê fêmkirin. Eger bernameya avakirin û hêza ramanê ya karibe hêza îqtîdar-dewletê derbas bike tinebe, her şerê bi îqtîdarê re were kirin, wê bibe lîstika quncik zevtkirinê ya "li şûna te ez" û ji vê jî zêdetir wê maneya wê nebe. Li pey xenîmetê çûyîn ku bingehekî wê yê dîrokî heye, serwetên mezin ên bi keşfên cografîk hatin bi destxistin, bi keşfên ilmî ji manîfakturiyê derbasbûna şoreşa pîşesaziyê, ji şoreşa siyasî hilperikîna ber bi îqtîdarê, ji dewletparêztiya merkantîlîst li navenda hêza netew-dewletê bi cih bûn, ev faktorên bingehîn sermaye û kara di cewherê sîstemê de kom bûne ji serdestiya sîstemê re dibin. Di sedsala 19. de sermaya bi şoreşa pîşesaziyê sîstematîze bû, bendewariyên utopyageran pûç kir. Ji lewra li dijî wê, hewceyî bi teoriyeke têkûz û têkoşîneke xurt a siyasî hebû. Di vê qonaxê de peyxembertiya Karl Marks û Friedrich Engels derdikeve pêş.

Di sîstema şaristaniyan de kapîtalîzmê ji sedî sed serketina xwe di sedsala 19. de îlan kir û em dikarin karekterîze bikin ku pêre ramana dijber jî xwe bi awayekî sîstematîk pêş de bir û ket nav çalakiyên siyasî. Di bingehê her du tevgeran de jî Ronesans, Rohnîbûn û şoreşa pîşesaziyê heye. Têgihîştina dînî serdestiya xwe wenda kiriye, têgihîştina laîsîzmê cihê wê zevt kiriye. Şoreşa zanistî û ekolên hunerî yên hemdem, ji bo van pêşketinan perspektîf û pîvanê bidin xwedî qabîliyet in.

Di nav ramanên dijberê sîstemê de jî ya ku herî zû pêş ket Marksîzm bû. Karl Marks û Friedrich Engels fikir û ramanên beriya xwe yên muxalif wek ekolên "sosyalîstên utopîk" bi nav kirin û destnîşankirin ku di vê yekê de serdest nebûna kapîtalîzmê di warê hilberandinê de rola bingehîn lîstiye. Sîstema fikra wan bi determînîzmeke aborî ya hişk ve girêdayî bû û bi vê yekê ji her kesî cuda kirin. Sîstema ramanê ya diyalektîk a Hegel esas dîtin, lê îdîa kirin ku wan ew ji serberjêrçûnê xilas kirine û ew rast li ser lingên wî danîne. Polîtîka aborî ya Îngilîz û sosyalîzma utopîk a Fransî wek çavkaniyên xwe yên din destnîşan dikin. Di vir de ya para Elmanya jî dikeve îlhama felsefîk e. Bêguman e, li gorî dema xwe sentezeke xurt kirine. Di demekê de ku civakeke bi sîstem li hemberî wan diçe serketinê, ew jî li dijî wê, muxalefeteke sîstematîk bi rêxistin dikin. Ya rastîn, ev hewldaneke mezin a hisa berpirsiyarî û pêşbîniyê ye. Berhema yekemîn a van hewldanan "Manîfestoya Komînîst" e. Mîna bernameya partiyekê be, hatiye amadekirin. Jixwe di demeke kin de wek bernameya komînîstiyê (partiya wê) tê îlankirin. K. Marks û F. Engels ji bo cihêbûna xwe ji sosyalîstên din bidin nîşan, xwe wek "sosyalîstên zanistî" bi nav dikin.

Pir eşkere ye, li gorî dema xwe, yê ku kapîtalîzm herî baş tarîfkirin ew bûn. Berhema sereke ya K. Marks "Das Kapîtal" mumkîn e mirov wê weke tarîfeke mezin a kapîtalîzmê bibîne. F. Engels di berhema xwe ya "kokên dewletê, mulkiyeta taybet û malbatê" de analîza dîrokî ya civakê bi awayekî berfireh kiriye û hewl dane sîstemên ramanê temam bikin.

Encamên sosyalîzma koka wê Marksîst e, ji salên li derdora 1850 û heta îro, kêmasiyên analîzkirina sîstemê, tevî şaşiyên wê rastiyên wê jî têra xwe eşkere kirine. Em ji bo analîzên sîstemên civakî baş nas bikin, rûbirûkirina bi mînakên wan ên dîrokî re dibe ku bi kêr were. Manîfestoya yekemîn a em ji çavkaniyên nivîskî hîn bûne "Deh Ferman" in. Derketina Hz. Mûsa ya ji koletiya seretayî ya Misrê formule dike. Bi qasî ku ji mezhebê fîrewn Akhenaton ê yek xweda - xwedayê rojê - îlhamê werdigire, ewqas dikeve bin bandora dînê pêşiyên xwe yên "Yah-weh" Cihû. Bi 10 Fermanan dixwaze nîzamekî bide civakê, yanî qebîleya Îbraniyan. Ev manîfestoya tê texmînkirin ku BZ di salên 1.300 de hatiye eşkerekirin, bandora wê heta roja me ya îro tê zanîn. Beşê yekemîn ê Pirtûka Pîroz Ehdî-Atîk, kulliyateke li ser Deh Fermanan hatiye berfirehkirin. Ehdî-Atîk di nava xwe de vediqete gelek beşan û bi manîfestoyên peyxemberên demên krîtîk, bi awayekî yekpare digihîje heta Hz. Îsa.

Em wek duyemîn manîfestoya mezin dikarin Încîlê qebûl bikin. Încîl danezanek e ku li dijî Romaya koledar, li ser navê feqîrên bindest û bêkaran hatiye weşandin an jî hatiye pêşxistin. Belkî jî li ser navê çînên bindest yekemîn gav e. Bi giştî li ser navê Xirîstiyaniyê rê li ber encamên girîng vekir û bi qasî ku di dîrokê de îro jî bi bandor e. Bi qasî kevneşopiya peyxemberan xwediyê kevneşopiya "ezîz û ezîzeyan" e. Mîna ewliyayên Îslamê, hê pir ders hene mirov ji van ezîz û ezîzeyan hîn bibe.

Sêyemîn manîfestoya mezin a dîrokî Quran e. Hz. Mûhammed tevî çavdêriyên xwe yên derbarê qebîle û eşîrên Ereban de, şîroveyên xwe yên li ser Tewratê - Ehdî Atîk - û Încîlê digihîne hevdu û dike mîna danezaneke "şertan" ya civaka feodal a serdema navîn. Ewrûpayê xwe li gorî Încîlê bi rêkûpêk dikir, Rojhilata Navîn jî xwe bi Quranê. Her çend ev bi awayekî dînî hatibin hûnandin jî, ya rast ew e ku mirov van mînakan wek manîfestoyên çareseriyê yên civakê bibîne.

Pirsa mirov derbarê Das Kapîtalê de bike ev e; kapîtalîzm xira kir an jî hê xurtir kir. Heman pirsê em dikarin ji bo manîfestoyên sîstemên din jî bikin. Ji bo em mijarê zelal bikin, divê em hîmê pêvajoya diyalektîk tez, antîtez û sentezê baş bidin fêmkirin. Weke min di serî de jî diyar kiribû, di gerdûnê de taybetiya dualîstîk, parvekirina yekê li duduyan e. Di têkiliya madde-enerjiyê de yekîtî (1) weke ku îspat bûye. Formula E=mc2 têra xwe rê nîşan dide. Enerjî wek hêmanê maddeyê dilivîne û vediguherîne xuya dike. Mirov dikare wek cewherê hê serbestbûyî jî tarîf bike. Di rewşa rohniyê ya bi lez de parçeyê maddeya jê qutbûyî "foton", di cewherê xwe de enerjiya ji maddeyê qutbûyî ye. Wexta madde hemû dibe foton werdigere rohniyê. Radyoaktîftî vê pêvajoyê îfade dike. Lê dîsa jî dualîteya madde-enerjiyê rastiyek e. Di cewher de hemrengî pêşî li dualîtebûnê nagire. Ya wek sir maye ev e; yek (1) çima û çawa ber bi dualîteyê ve diçe. Meyla "dualîteyê" çî ye û çawa pêk tê? Îhtimaleke mezin e, reng û şêwe dide hemû tevger û cihêrengiya di nava atomê de diqewime. Li gorî lêkolînên dawiyê, bi awayekî dûr aqilan, pir bi lez û piçûk avabûnên parçeyan û avabûnên wan pêvajoya atomîze bûnê diyar dikin û bi vî awayî tê fêmkirin ku molekulên atoman, pêkanînên molekulan, element û pêkanînên cuda derdixînin holê. Îhtimal heye di vê de rewşên manyetîk ên cuda jî rolê dilîzin.

Em vê pêvajoya di xwezayê de dikarin li civakê jî biceribînin. Her çend huqûq û qanûnên civakê cuda bin jî di heman sîstemê de

tevdigerin. Em bi awayekî berfireh dizanin veguherîna sîstemên civakî jî ji "yekê", ji klanekê zêde bûne. Em dizanin, ji klanê civaka hiyarerşîk, ji wê jî civaka dewletdar û heta kapîtalîzmê awayên cihêreng pêk hatin.

Di diyalektîkê de divê mirov têgîna dijberan rast fêm bike. Ji dualiyan yek a din tine nake, xwe bi aliyê din bar dike, hê ber bi jor ve diçe û vediguherîne şêweyekî din. Eger em wer şîrove bikin, wê îmkanê me zêde bibin ku em rastiyan baştir fêm bikin. Lê di vê mijarê de nuqteyeke din a girîng ew e ku veguherîna dibe li ser xeteke dûz û rasterast pêk nayê. Veguherîna dijberan bi şêweyê axb=ab nîne. Ev formula mantiqê klasîk dikare ji bo neqeb û parçeyekî kin ê demê were qebûlkirin. Di cîhana bûyeran de veguherîn zêdetir bi çiv in; helezonwarîne; bi şax in; carnan hêdî û carnan bi lez in; ji ezelî-ebediyê wêdetir, di kêliyan de taybetiyên xwe yên ebedî hene. Her weha mirov dikare qebûl bike ji xetên dûz heta guloveriyê bi neqebên kaosê taybetiyên diguherin hene.

Wê wextê, eger dijberiyek li beramberî kapîtalîzmê derket û ji bo avakirina civaka nû yanî sosyalîzmê, xeta wê tinekirina kapîtalîzmê be, ev tenê dibe feraziyeyeke mucered. Rastî bi xwe pir cuda ye, pêkhatinên wê jî pir cuda diqewimin. Sîstema sereke dikare dijberê xwe bihelîne, bike mêtingeh; dikare bike hevpar; bi hêzeke pir hindik dikare li ser rêya tekamulê veguhere. Dikare bi tundî bişikê û bibe amûrê sîstemeke nû.

Em ji bo bûyerên li ser xeta Marksîst qewimîne, dikarin bibêjin, di warê teorî û pratîkê de jî di nav kapîtalîzmê de heliyane. Ji sê milan ve helandin pêk hatiye. Demokrasiya sosyal, sosyalîzma reel û rizgariya netewî. Em nikarin bibêjin, kapîtalîzm jî di van sê milan an jî rastiyan de hîç neguherî. Bêguman guherînên girîng bûn. Guherînên gelek lîberal bûn. Lê sîstemê bi saya van guhertinan karîbû hê jî temenê xwe dirêj bike. Em nikarin vê yekê bi dij-şoreşê rave bikin. Mijar hê jî kûrtir e. Bi taybetiyên bingehîn ên sosyalîzma hatibû qebûlkirin têkildar e.

Di bingehê xetayan an jî çewtiyan de cihêkirina kapîtalîst-karker heye. Cihêkirina kapîtalîst-karker, di cewherê xwe de ji cihêbûna kole-efendî ya li xanên Romayê cuda nîne. Mirov dikare bişibîne têkiliya navbera serf-axa jî. Wexta mirov di nava malbatekê - bavikanî - de şêweyê rêxistiniya mêr û hêmanên xwe dispêrê li ber çav bigire û şêweyê rêxistiniya jina pêve girêdayî li ber çavan bigire, ji serî ve diyar e wê di encama şer de kê bi ser bikeve. Eger em rewşên îstîsnayî bidin aliyekî, di encama şerekî serketiyê wê eşkere

de bêguman wê li hemberî jina di encama şer de perîşanbûyî, mêrê hê bi hêztir bibe. Jin hê zêdetir bûye ya mêr. Nakokî dîsa heye. Lê bi qasî veguheriye, di nav sîstema mêr-serwer de gaveke din heliyaye. Em mînakê dikarin ji bo gelemperiya civakê bi kar bînin. Di civaka şaristaniya çînî de û heta beriya wê di civaka hiyarerşîk de ku jin bi hezar ta û benî ve bi serweriya mêr ve hatiye girêdan. Eger bi teorî û pratîkekê ji jinê xilasî û rizgarî hêvîkirin ji xeyalê wêdetir, ji "lêdan û girêdanê" zêdetir tiştekî din nîne. Ji kêliya ku jinê pîrekbûn qebûl kir û pêve êdî neçarî wendakirinê bûye. Berxika li bin kêra qesab çiqasî xwe bitengijîne dikare xilas bibe? Şensê jiyanê yê berxê girêdayî însaf û berjewendiyên qesab e. Dikare ji bo şîr û hîriyê jî xwedî bike û dikare serjê jî bike.

Berovajî texmînan, karker li dijî kapîtalîst di nav cureyekî nakokiyê yê antagonîst de nîne. Em wexta li kapîtalîzma roja me ya îro temaşe dikin, karkerekî karê xwe û mûçeyekî xwe yê baş hebe, ji tebeqeya ser a civakê tê hesibandin. Yên derba mezin ji sîstemê dixwin artêşa mezin a bêkaran, gelên mêtingeh, komên dînî û etnîk, piranî jin, dîsa rewşa zarok û ciwanan, yextiyarî û pîrbûn, nakokiyên hundur ê sîstema eko-hawîrdor, di civaka kapîtalîst de nakokiyên di nav tora qademeyên berjewendiyan de, gund-bajêr, bajarên mezin-piçûk, îqtîdar-zanist, exlaq-sîstem, esker-siyaset hwd. û bi sedan nakokî navenda sîstemê diyar dikin. Bêyî ku ev bûyer li ber çav werin girtin, teoriyeke şoreş-guherînê ya xwe bispêre karkerekî cihêwaz ê sîstem dikare wî bi hêsayî rêve bibe, şensê wî hîç nîne; ev yek bi têgihîştineke xurt a civakê dikare were dîtin.

Helwesta Marksîst hînê kêmasiyên wê yên bingehîn hene. Nekarîbûye şaristaniyê bi tevahî analîz bike. Engels xwe ceribandiye lê pir bi sînor maye. Nakokiya bingehîn a di navbera civaka çînî û civaka kollektîf a xwezayî de wek li dawiyê hatiye hîştin û şêweyekî paşve mayî dihesibîne. Lê tarîfa me ya berfireh a dîrokî jî nîşan da ku di navbera helwesta demokratîk a komîn û helwesta dewletparêz a hiyarerşîk de têkoşîneke timî û berfireh heye. Nirxên komîn-demokratîk, bihêlin paşvemayîn û tinebûna wan, berovajî, di pêkhatina hemû sîsteman de rola "dînamîk" dilîzin. Di navê de sîstema kapîtalîzmê jî hûn dikarin bihesibînin. Di derketin, pêşketin û krîza jihevketina sîstema kapîtalîzmê de nakokiya herî fonksiyonel derbarê nirxên komîn-demokratîk de ye. Sîstem dikare karker, gundî hwd. gelek beşên civakê di nava xwe de bigire û rêve bibe. Heta dikare bike hevkarekî xwe yê baş. Dikare bi sorkirina ferdparêziyê bike ku rêveberiya wê xuya neke. Lê civak ji civakbûna xwe

dernakeve. Ji ber ku civak bi awayekî bingehîn komîn û demokratîk e. Ji ber vê yekê ye, kapîtalîzm ferdparêziyê li dijî civakê radike pêdarê. Ajoyên hundurîn radike serhildanê. Civaka mirov berovajî ber bi civaka prîmat - meymûnkirina civakê - ve dadigerîne. Çendîn civak li ber xwe bide û di dawiyê de bi tevahî ji hev de bikeve, ji bo derkeve holê şensê yê nû çêdibe. Projeyên veguherînê yên civakî, eger di serî de vî aliyê bingehîn ê nakokiyan li ber çav bigirin, dikarin şensê serketinê bi dest bixin.

Bi vê mijarê ve girêdayî, eger tora exlaqî ya ku kapîtalîzmê bi awayekî sîstematîk hilweşand esas neyê dîtin, ti nakokî bi awayekî teknîkî şensê wê yê çareseriyê nabe. Eger exlaqê civakî nebe, tenê bi rêbazên huqûq, siyaset, huner û aboriyê, îmkan nabe civakek were rêvebirin û guhertin. Exlaq şêweyekî hebûnê ye; civak xwe bi destê xwe ava dike. Ez behsa exlaqê teng ê kevneşopiyê nakim; ez behsa dil û wijdanê civakê dikim ku xwe pê rêve dibe. Civaka wijdanê xwe wendakirî qediyaye. Balkêş e, sîstema ku herî zêde exlaq ji kûrahiyê ve, texrîb kiriye kapîtalîzm e. Ji ber ku sîstema dawî ye, texrîbkirina wê ya wijdanê civakê, tê fêmkirin. Sîstema potansiyela xwe ya zordestî û kedxwariyê qedandibe, wê wextê exlaq jî bi awayekî sîstematîk texrîb kiriye. Ji lewra li dijî kapîtalîzmê têkoşîneke mecbûrî ya etîk - exlaqê bi zanebûn - û hewldan hewce ye. Têkoşîneke bêyî etîk were meşandin ji destpêkê ve hatiye wendakirin.

Di Marksîzmê de kesayet bi tevahî di nav nirxên jiyanê yên kapîtalîzmê de dijî. Bajarîbûn zêdetir li pêş e. Şêwazê kurtejiyaneke serwer a bajêr bi hezar ben û tayî bi sîstema kapîtalîst ve girê dide. Divê mirov baş bizanibe, Marks bi xwe jî bi hezar bend û tayî di nava sîstemê de bû. Di Îslam û Xirîstiyaniyê de ewqas kesên ji sîstemê qut dibûn û bi dehan salan li keşîşxane, dergah û hucreyan diketin sulûk û înzîwayê jî tesîreke pir bi sînor kirine. Piraniya têkoşerên Marksîst haya wan ji vî awayê exlaqî nîne. Bawer dikin ku wê bi vê yan jî wê versiyona kapîtalîzmê re bijîn û bi şerê teorîk-pratîk bigihîjin encamê.

Di teoriya Marksîst de, tezên derbarê şoreşa siyasî û pêvajoya piştî wê de bi awayekî pir xeternak karektereke dewletparêz û hiyarerşîk heye. Têgînên şer, dîktatoriya proleterya, dewletparêzî hema hema hatine pîrozkirin. Tê zanîn, dewlet-îqtîdar, şer-artêş berhemên şaristaniya civaka çînî ne, û bi awayekî mutleq ji bo jiyana serwer û kedxwaran amûr in; dest ji wan nabe. Eger ev amûr ji bo proleteryayê werin pêşkêşkirin, wê wextê hê ji destpêkê ve biryar

hatiye dayîn, wê xwe bişibîne wan. Jixwe di dema sosyalîzma reel de ev amûr pir baş hatin bi karanîn. Serketin pêk hat. Lê piştî 70 salan hat fêmkirin ku şêweyê kapîtalîzmê yê herî talanker - kapîtalîzma Ewrûpa Rojava weke ku li cem wê bi heft avên paqêj hatibe şuştin - hatiye avakirin. Şêweyekî herî totalîter û antî-demokraîk ê kapîtalîzmê hatiye damezrandin. Di bin vê rastiyê de têgihîştina dewletê radizê. Dewleta Engels digot; "divê hêdî hêdî piçûk bibe" bi sosyalîzma reel gihîşt qonaxa herî xurt. Di vir de lêgerîna li niyeta xirab an jî helwesteke dij-şoreşê bê mane ye. Amûrên bi kar tîne - eger dewlet ji sedî sed zevtkiri be jî - wê nabe sosyalîzmê, wê dibe kapîtalîzmê. Sosyalîzm amûrên sosyalîst dixwaze. Ew jî ev in; demokrasî, tevgera hawîrdorê, tevgera jinê, mafê mirovan û mekanîzmayên xweser ên civakê ji bo xwe biparêze.

Em di vir de mijarên wek partî, sendîka, aştî, tevgerên bereyî yên rizgariya netewî, polîtîka û gelek tiştên din ku di rastiya civakê de wek hêmanên nîzamê fermî yê li dawiyê nehatine hîştin, dikarin wek mînakên serneketinê nîşan bidin. Wexta di çarçoveyeke giştî ya felsefî û stratejîk de bi çavekî ekolojîk-demokratîk li van amûran neyê nertin, di encamê de çiqas amûrên têkoşînê werin bi karanîn jî wê di dawiyê de bi sîstemê ve were girêdan.

Rexneyeke din a li Marksîzmê were kirin, derbarê konjonkturê de ye. Kapîtalîzma di dema Marks de li qonaxa stewînê ye. Marks û Engels jî bi vê sedemê kapîtalîzmê wek mecbûriyetekê dibînin. Kapîtalîzmê mîna bûldozereke pêşiya sosyalîzmê veke, dinirxînin. Eger em hinekî din bi firehî bînin ziman; pêşketina şaristaniyan, civaka çînî ferz dibînin û ji bo damezrandina sîstema, îdealîze kirine, îman bi hewcebûna vê qonaxê anîne. Me berê jî anîbû ziman ku divê ev wek şaşiyeke bingehîn were nirxandin. Çîn û rêveberî wek dewletê, hemû sazî û dezgehên wê bêkêr in, û hewceyî pê nîne. Ne tenê hewceyî pê nîne, li pêşiya civakê asteng û muhafezekar in. Bêyî dewletê jî xizmet û ewlekariya civakê mumkîn e pêk were. Di serî de dewleta kapîtalîzmê, serweriya zêde ya li der ve û hundur, burokrasiyê mezin dikin û gelek saziyên din ên mîna dewleta civakî, li pêşiya demokrasî û hawîrdorê asteng in. Ji aliyê exlaqî ve jî divê saziyên mîna şer-artêş - ji bilî parastina demokratîk a mecbûrî - werin redkirin. Marks bi xwe wexta dibêje; "me teoriya şerê çînî ji dîrokzanên Fransî wergirt", ya rastîn taybetiya ku amûrê bi kar tîne, bi awayekî xwezayî werdigire. Şêwazê şer ên çînên serwer yekser wek sazî qebûl dike. Di têgîna dîktatoriya proleterya de jî rewş

heman tişt e. Zirarê nabîne ku kiryarên dîktatorî yên di dîrokê de weke bûne bigire.

Di dema Lenîn û Stanlîn de dîktatorî timî dibe rewşa dewletê. Demokrasî bêyî ku bikeve pratîkê, tê înkarkirin. Lê wexta Lenîn digot; "Sosyalîzm bêyî demokrasiyê nabe" hê zêdetir nêzî rastiyê bû. Di pêvajoyên pêş de polîtîka û şêwazê çînên serdest zêdetir li navendê rûdinin. Dewlet-partî dibin heman tişt. Partî li der ve û li hundur bi temamî dibe saziyeke antî-demokratîk. Polîtîkayên şer û aştiyê yên di nava sîstemê de êdî tenê dibin cihokên avê ji bo aşê kapîtalîzmê bigerînin. Lê belê ev xeta û şaşiyên bingehîn ên em dikarin hejmara wan zêde bikin, heftê sal jî derbas bibe, ji encama xwe ya xweza wêdetir, ji hilberandina kapîtalîzmê û xurtkirna wê pêve nikarin rê li ber guhertinên bingehîn vebikin.

Lê bêguman Marksîzm dîsa jî di têkoşîna azadî-wekheviyê de ceribandineke mezin û dîrokî ye. Di têkoşîna civakî de alîkarî û kedeke dewlemend e. Giraniya çîn û aboriyê biriye ilmê civakî. Bûrjûwazî neçar kiriye ku di mijarên rizgariya netewî, mafê mirovan û dewleta civakî de nermtir bibe. Ji ber helwesta teng a taktîkî li demokrasiyê dinere, azadiya jin û ekolojiyê nikare ji kapîtalîzmê cihê bibîne. Bi sedema ku paradigmaya wê ya bingehîn a jiyanê di qalibên bûrjûwaziyê de dimîne, pir bi hêsayî bi ser sîstemê ve dibe. Têkoşînên rizgariya netewî û tevgerên sosyal demokrat ku bi bandora sosyalîzma reel û îlhama Marksîzmê bi ser ketin, wek versiyonên sosyalîst ên hê qels, jixwe hîç ji kapîtalîzmê qut nebûn. Beşên di nava wan de hê zêdetir alîgirê pêşketina kapîtalîzmê ne. Ji bo girseya xwe dispartinê jî jiyaneke nû nedixwestin; hewl didan ji jiyana heyî wan sûdwar bikin. Pirsgirêka parvekirin û pêşdeketinê, bi temamî bi huqûqa sîstemê re têkildar e. Ya rastîn, mirov bi çavên mezhebên mezin ên kapîtalîzmê li sosyalîzma reel, sosyal demokrasî, rizgariya netewî, lîberalîzm û muhafezekariyê binere, bawer dikim wê hê rastir be. Mezhebên ji Îslam, Xirîstiyanî û Cihûtiyê derketine çiqas ji çavkaniya cuda ne, mezhebên ji kapîtalîzmê derketine jî ew çend ji kapîtalîzma kok cuda ne. Ya rastîn, cudabûna di navbera mezheb û kokê de bi qasî cudabûna di navbera cureyên famîlyayekê de ye. Di nava kapîtalîzmê de ekolên mîna anarşîzmê û dîn ku bi awayekî tengkirî hebûna xwe dewam dikin, ji marjînalbûnê zêdetir tiştekî îfade nakin.

Piştî şerê cîhanê yê duyemîn hewaya serketinê ya "antîfaşîstan" zêde dewam nekir. Tevgerên ciwanan û perspektîfên şoreşger ên

1968an di paradigmayê de rê li ber guhertinên girîng vekirin. Li dijî sîstemê bi tevahî nefret çêbû. Hatibû fêmkirin ku wê sosyalîzma reel, rizgariyên netewî û sosyal demokrasiyê bersiv nedin bendewarî û hêviyan. Dunya ku soza wê hatibû dayîn, ji ya berê baştir nebû. Mirov dikare bibêje; gelek ekolên entelektuel ên ji salên 1970 û şoreşa 1848 bi Marksîzmê ve girêdayî piştî ku hêza xwe wenda kirin, di serî de çepîtiya nû, ekolojî, tevgera jinê pêvajoya hevdu naskirinê ya bi gelek ekolan re destpêkir. Piştî ku baweriya bi Kapîtalîzmê û ewqas jî bi sosyalîzma reel şikiya, di salên 1950 de bi duyemîn şoreşa mezin a zanistê û pêşketinên di warê çandê de, femînîzm, ekolojî û etnolojiyê gavên mezin avêtin.

Jihevketina sosyalîzma reel di sala 1989 de weke dihat texmînkirin li gorî berjewendiyên kapîtalîzmê nebû. Ev dihat wê maneyê ku yek ji xelekên bingehîn ê sîstemê qut dibe û jê dikeve. Sîstema ku bi şerê sar girseyên xwe li ser piyan digirt, bi dewletên sosyalîzma reel û rizgariya netewî jî serî li gelan digerand, hilweşiyabû. Li gelemperiya dunyayê, li hemberî civakên dewletparêz sarbûnek çêbû û yeqîneke xurt pêk hat ku wê ev civakên dewletparêzê nikaribin çareseriyê bînin. Netewparêziyê û dewletên netewî bi giranî qabîliyetên xwe yên sergerandinê wenda kirin. Li welatên pêşketî yên kapîtalîst jî ji bilî demeke kin dewletên di warê civakî de xweşhal jî bandora xwe wenda kirin. Sîstem ji her alî ve ket qonaxeke nû. Wexta mirov li dîroka kapîtalîzmê dinere, Ronesans yek ji sîstemên civakîbû, karîbû bi rêkûpêk ji neqeba kaosê derbikeve. Bi hostayî ji şoreşên siyasî sûd wergirt. Bi şoreşa pîşesaziyê gihîşt lûtkeyê stewînê. Bû yekemîn sîstem, belavbûna xwe ya li tevahiya dunyayê temam kir. Di dawiya sedsala 19. û serê sedsala 20. de bi krîzên kûr re rûbirû ma û wê hewl bihata dayîn ji bo bi şerên cîhanî çareserî bûbûya. Ya rastîn krîza kapîtalîzmê tevahiya sedsalê tijî kir. Şerê cîhanê yê yekemîn û duyemîn, navbera wan, beriya wan û paşiya wan nîşan didin ku sîstem tenê dikare xwe bi şer li ser piyan bigire. Piştî ku sosyalîzma reel û versiyonên wê dijberî - cemserî - zêde kirin, şer ji rengê germ derbasî şerê sar bû. Jihevketina 1989an ev îmkan jî ji destan girt û sîstem weke ku xwe di valahiyekê de bibîne, mat sekinî. Aliyekî ku êrîş bibe ser nedidît. Hewce bû dijminên nû biafiranda. Di dawiyê de wê ev yek di Rojhilata Navîn a koka wê îslamî de bidîta.

Di termînolojiya dema nû de êdî têgînên "globalîzm" û împaratoriya DYE hene. Globalîzm tê maneya belavbûna sîsteman û ti aliyekî wê yê nû nîne. Ji klanên seretayî û heta îro hemû sîstem

globalîst in. Her sîstema bi ser bikeve, pir hindik şensê xwe yê belavbûnê heye.

Împaratorî têgîneke kevin e. Piştî ku dewletên sîte zêde bûn û dewlet jî bû dewleta hemû sîteyan, ji bo derketina împaratoriyê şert û merc amade dibin. Her ku sîte zêde dibûn berfirehbûna împaratoriyê jî xwe ferz dikir. Şêwaz û qadên berçav ên împaratoriyê derdikevin holê. Kevneşopiya împaratoriyê ya Sargon bi dagirkirina Aqad a sîte bajarên Sumeran her çû pêş de ket. Împaratoriya koledar a Romayê heta wê rojê împaratoriya herî xurt û berfireh a dunayayê nas kiribû. Osmanî û Bîzansa feodal a di şûna wê de hatin damezrandin kevneşopî dawam kirin. Li Çîn û Hîndê jî împaratoriyên bi heman rengî hatin damezrandin. Hînê di qonaxa damezrandina kapîtalîzmê de Portoxalan, paşê Spaniyan û dûv re jî împaratoriya Îngilîsatanê ya roj lê naçe ava, kevneşopî heta dawiya şerê cîhanê yê duyemîn birin. Piştî şer tengezariya di navbera împaratoriya dualî ya DYE û Sowyeta Rûsya de bi hilweşîna Sowyetê ya di sala 1989an de, bû yekalî. Li pêşiya kapîtalîzma Romayê êdî ti asteng nemabû.

Karekterekî împaratoriyan heye; ji unîter û navendîbûnê zêdetir bi awayekî eyaletan par ve dibe. Ji ber ku gelek kevneşopiyên dewletên berê qebûl dike, zêdetir şêweyekî sist ê federasyonê timî li piştir xuya dike. Ji der ve çiqas hêzê bixe bin serweriya xwe, di hundur de jî ew çend rewşa dewlet, eyalet û walîtiyên hewce jî zêde dibe. Belavbûn û berfirehbûneke di asta global de bibe, wê kevneşopî zêde bibe û xwe dubare bike.

Împaratoriya DYE jî di dema xwe de li hundur û der ve bi heman astengan re rûbirû dimîne. Nuqteyek heye divê baş were zanîn, DYE ji sifirê împaratoriyê ava nake. Kevneşopiya bi hezarsalan dewam dike. Neçar e dewam bike jî. Sîstema dewletên dunyayê bêyî împaratoriyê nabin. Hebûna dewletên ji hev serbixwe feraziye ye. Di heqîqetê de nîne. Ya heyî, dewlet hewceyî hevdu ne. Di nav sîstemê de ji yê herî xurt heta yê herî qels hewceyî hevdu ne û hin ji wan jî dibin împaratorî. Di nav wan de yê herî sîstema xwe xurt wek împaratoriya mezin dibe xwedî gotin. Ev kevneşopî ye DYE ji împaratoriyên dawî Sowyeta Rûsya û Îngilîstanê wergirtiye. Li ser cografyayeke berfireh bi sedan ziman, çand, avabûnên siyasî û aboriyê dihewîne û bi gelek awayên berfireh û kûr serweriya xwe berfireh dike. Sermaya zêde û kara sîstemê ya kombûyî wê timî vê pêvajoyê dehf bide. Mêzîna karê bi berfirehbûn û belavbûnê re têkildar e. Wexta têkiliyên gelek hêzan xira bibin têkilî tengezar

dibin. Ji ber pîvana "yê herî xurt" ev tengezarî rê li ber qutbekî - cemser - din venake. Ev li dijî mantiqê sîstemê ye.

Împaratoriya DYE û globalîzm, piştî salên 1990 di vê çarçoveyê de li mêzînekê digerin. "Kaosa sîstemê" ya kapîtalîzm dijî, dide xuyakirin ku krîzê bi awayên berê li dawiyê neyê hîştin. Ji lewra globalîzma demê wê di nav krîzê de derbas bibe. Hêmanên krîzê zêde dikin tevî ku ji berê ve mane, xuya ye wê şîdeta krîzê zêde bikin. Tevî hemû tedbîran, ji ber qanûna kar a hindik dibe, ji qirêjbûna hawîrdorê, ji ber bacan mesrefên zêde dibin, mesrefên ji ber kiryarên dewleta sosyal zêde dibin û muxalefeta demokratîk, wê rêjeya danaserhev a sermayê teng bibe. Cudabûna di navbera têgînên der ve û hundur de wê pir kêm bibe. Globalîzmê neçar bihêle ku mîna dewleteke bi tenê tevbigere. Di qonaxeke bi vî rengî de wê sîstem û muttefîkên xwe têkiliyên xwe ji nû ve sererast bikin. Dewlet-netewên di qonaxa derketin û stewînê ya kapîtalîzmê de derketin û hindek taybetiyên wan ên serxwebûnê hebûn, êdî dibin asteng. Ji ber ku dibe hêza herî mezin û ji ber kareketera aborî ya globalîzmê êdî derdê netew-dewlet û netewparêziyê nakişîne.

Bi taybetî dewletên komar ên li ser rêya kevneşopiya şoreşa Franseyê, wê hê tengav bibin. Ewê li ber xwe bidin û bibin mînaka muhafezekariyê. Çavkaniya nakokiya DYE û YE ev rastî ye. Demokrasî û komartiya Ewrûpayê di mijara serxwebûna kevin de çavnebar e. Dîsa kolonyalîzma xwe ya berê bi bîr dixîne. Ji bîr nake ku kapîtalîzm Kabeya wê ye. Lewra tengezariya di navbera DYE û YE de, ji dil e. Tevî ku Pasîfîk Çîn û Japonya wek sêyemîn qada kapîtalîzmê lê hêşîn bibe tê fikirîn û potansiyela wê hebe jî dikarin qismî serxwebûna xwe biparêzin. Yên di vê komê de cih digirin, di warê texlîtkirina yek û têkel sîsteman de hosta ne. Welatên mîna Rûsya û Brezîlyayê jî wê qîma xwe bi serxwebûneke qismî bînin. Mantiqê hêzê yê sîstemê vê yekê ferz dike. Welatên mîna Tirkiyê di navberê de mane wê hê zêdetir tengav bibin.

Koma dewletên wek serserî û asî têne bi navkirin û nakevin bin zevtûreptê jî wê bi hêza sîstemê ya eskerî, aborî û çandî bînin îmanê. Rojhilata Navîn ku li hemberî sîstemê dûrî helandinê ye, - kevneşopiya wê ya xurt a şaristaniyê, îslamiyet, pirsgirêkên giran ên aboriyê - helwesta wê bi temamî rewşeke asî îfade dike. "Komînîzma" dema şerê sar êdî cihê xwe ji "otorîterîzma kesk" ya Rojhilata Navîn re hîştiye. Avahiyên otorîter û muhafezekar ên di bin perdeya Îslamê de neçar in parçe bibin. Lobiya Cihû - qebîleya Îbranî - ya di hêza dunyayê de neçare xewna xwe ya hezarsalan

Îsraîlê û hesabên xwe bi cih bîne. Mantiqê sîstemê yê heyî êdî bi vî awayî nikare Rojhilata Navîn hilgire. Bi êrîşên li dijî Bircên Cêwî yên di 11 Îlona sala 2002an de ku tevlîhev û komplowarî bû, pêvajoyeke nû ne tenê ji bo Rojhilata Navîn destpêkir, sîstem bi dînamîkên nû yê wê çarenûsa wê biguherîne re rûbirû hîşt. Di dergûşa derketina şaristaniyê de kevin û nû rûbirû dibin, ya rastîn, ev rûbirûbûn bi suprîzên şêweyê nû yê şaristaniyê diyar bike, tijî ye.

B- Ji bo civaka ekolojîk û demokratîk pêşnûmeyek (proje)

Sîstema civaka dunyayê, piştî sosyalîzma reel di sala 1989an de bi sedemên bunyewî ji hevdu ket, ji bo guhertinê ket neqeba kaosê. Di navbera krîzên berê yên sîstema kapîtalîst û krîza em wek neqeba kaosê bi nav dikin de, cudahiyên karekterîstîk hene. Di civakan de guhertinên bingehîn di encama krîzên asayî de nabin, bi krîzên karektera wan kaos in, pêk tên. Di krîzên normal de şensê sîstemê heye, xwe restore - li ser heman hîman xwe ji nû ve avakirin - bike û hebûna xwe dewam bike. Jixwe di pêvajoya krîza yekemîn û duyemîn de, sîstema kapîtalîst karîbû xwe piştî şer restore bike û hê bi xurtî bimeşe. Yek ji sedemên objektîf ê kapîtalîzmê ku karîbû sosyalîzma reel di nava xwe de bihelîne, bi karekterê krîzê ve girêdayî ye. Her çend helwesta Marksîst-Lenînîst a nekarîbûn xwe tam ji nirxên civaka serdest a çînî xilas bikin sedemeke girîng be jî, krîzên sîstema sosyalîzma reel xwe spartibûyê di wê karekterê de bûn ku bi hewldanên xweser li dawiyê dihatin hîştin. Sedema objektîf a ji hevdexistin pêk anî, eger di vê karekterê de nebûya, hema bêje ev çend teslîmiyeteke xirab pêk nedihat. Heta li bendê ma sîstema serdest wê xilas bike. Ya sosret jî welatên sereke yên kapîtalîst pêşî li rizîneke xirab girtin.

Ev rastî bi xwe jî bandora sosyalîzma reel ji bo li dawî hîştina krîza sîstemê û ketina wê ya kaosê, bi awayekî balkêş rave dike. Eger kapîtalîzm di encama şoreşên sala 1848an de wek mezheb parve nebûya, belkî jî zêdetir biketa kaosê. Bi taybetî sedsala 20. bi sê mezheban li dawiyê hîşt. Sosyalîzma reel, sosyal demokrasî û rizgariya netewî. Van her sê mezheban herî kêm sîstem sed sal bi derengî, xistin pêvajoya kaosê. Eger kapîtalîzm neguheriya û dewam bikira, wê di destpêka sedsala 20. de biketa neqeba kaosê ya karektera wê ya veguherînê heye. Li ser serê mirovatiyê şerê mezin û xeternak - atom jî di navê de - hatin meşandin, cinawirên mîna mêtingerî, netewparêzî, faşîzm û totalîtarîzm hatin afirandin û li dijî wan jî rola çareseriyê dan rizgariya netewî, sosyalîzma reel û

demokrasiya sosyal. Divê ev hemû wek manewrayên dîrokî, polîtîk û eskerî werin fêmkirin.

Neqeba kaosê di cîhana bûyeran de tevlîheviya hewce ya guhertinan a mîna şêweyên nû, cure û avahiyan îfade dike. Di bûyerekê de aliyên nakok êdî nikarin bi hev re têkiliyê û pêkhatina heyî dewam bikin. Şêwe nikare cewher biparêze; qîm nake, teng e, texrîbkar e. Di vê rewşê de hin hilweşîn dibin, hercûmerc - kaos - derdikeve. Cewher xwe ji şêweyê xilas kiriye. Lê belê hê şêwe û rengê xwe yê nû wernegirtiye. Şêwe û şiklê berê yê parçebûyî ji bo şiklê nû tenê wek amûrekî tê bi karanîn. Ya esas, di vê neqebê de mîna ku prensîbeke gerdûnî fonksiyonel e. Parçeyên avaker ên gerdûnê di kaosê de bi guhertinên pir bi lez reng û şiklên nû werdigirin. Eger nîzamê nû yê parçeyan zevt dike di asteke berz de be, dikare şiklekî mayînde bigire. Li dora avahiya mayînde jî wê sîstemeke nû pêk were.

Em rewşê bi bûyerên basît ên di cîhana maddî de rave bikin. Molekula $H_2O$ şêwe û şiklek e. Ji vî şiklî re "av" tê gotin. Yek ji elementê di avê de molekulê hîdrojenê ($H_2$) wexta bi atoma oksîjenê re dibe yek, şiklê avê pêk tê. Di navbera nîzama pirtikên jêratom ên her du elementan û molekula avê de têkiliyeke timî bandor-reaksiyon a diherike rewşa ronbûnê pêk tîne. Rewşa parçebûnê jî destpêka kaosê ye. Wexta hemû atomên H û O serbest bêne berdan û mînak, elementên wek karbon û sulfur bikevin navbera wan, piştî demeke kurt reaksonîk gelek pêkhatiyên nû derbikevin holê. Ev pêkhatineke nû ye. Di şûna avê de wê gelek gazên bi jehr û ron pêk werin. ( $CO$, $CO_2$, asît-baz.)

Ev pîvana pêkhatinê ku gerdûnî ye, ji bo civakan jî pîvaneke li cih e. Wexta avahî û pêkhatinên kevin belav bibin, yê nû xwe ferz dikin. Lê ji hev belavbûn û tevlîhevî bi serê xwe pêkhatin nîne. Ew mîna ku hevîr be yan jî tiştekî mîna şorbê be. Divê were stran û şikil bigire. Em mînakekî jî ji civakê bidin; zêhniyeta feodal û sîstema wê di dawiya sedsala 15. de ji hev belav bûbû. Çînên nû yên cûrbecûr, barbar û pêkhatinên feodal ên beriya Xirîstiyaniyê ketibûn nava sîstemê. Piştî ku feodalîzm ji hev belav bû, gelek awayên burokratîk ên kapîtalîst û demokratîk derketin.

Di salên 1990 de bi sîstema kapîtalîst re dijber ji hev belav bûn. Di vî warî de têra xwe belge hene. Yek ji îşaretên yekemîn, sermaya globalîzebûyî zêdetir bala xwe da ser qada fînansê. Sîstema fînans ev e; pere peran tîne. Yanî mîna qumarê ye. Ji lewra tenê dikare ji hev belav bike. Fînansa kapîtal avahiyên bi cihbûyî mîna pemboyê tê

veçirandin diavêje. Saziyên netewî ji dewletan heta îdeolojiyan, ji aboriyê heta huner nikarin bi îradeya xwe ya cewherî li ser piyan bimînin. Lê çendîn hêz globalîze dibe û împaratoriya DYE li gelemperiya dunyayê bê manebûna mêzîn û avahiyên berê ji aliyê xwe ve nîşan bide, li gelek deverên dunyayê û dewletên netew krîzê derbikevin, darbeyê bibin û rê li ber şerên xwînrij ên etnîk û dînî vebibe. Ev rastî bi sîstemê re têkildar e, û xwedî nîşaneyên kaosê ye.

Sîstem dike nake nikare di nava xwe de tengezariyê çareser bike. Di serî de DYE-YE, DYE-Japonya-Çîn, YE-Japonya-Çîn di nava xwe de timî di nav rewşeke tengezar û bê mêzîn de ne. Nakokiya wek Bakur-Başûr tê zanîn, yanî cihêbûna yê herî zengîn û yê herî feqîr dewam dike. Gel her diçe zêde ji saziyên dewletê qut dibin. Dewleta bi hezar salan wek qral-xwedê, xwedê-siya wî û xwedê bi xwe (li cem Hegel dewleta bûrjûwa) her ku cewherê wê were fêmkirin ku di çavkaniya xwe de şîdet-zordestî û kedxwariyê vedişêre, wê roj bi roj zêdetir tenê were hîştin û îzolekirin. Mîna gotina; "yadê binere qral tazî ye" êdî gel jî mîna zarokê dewletê tazî dibînin. Ev destpêka kaoseke girîng e.

Yek ji mijarên girîng, pirbûna bêkarî û betaliyê ye. Her ku sîstem dewam bike wê bêkarî jî hebe. Sîstem bi xwe bêkariyê zêde dike. Di ti sîstema civakan de şênî û nufûs evqas bêkar nehatiye hîştin. Ji lewra yek ji mijara kaosê baş rave dike bêkarî ye. Li kîjan deverê bêkarî zêde hebe, lê wê derê ew çend kaoseke mezin heye. Bêkarî tevî ku gelek aliyên wê yên neyînî hene, di cewherê xwe de, civatê ji civakîbûnê derdixîne. Bi gotineke din civak îflas dike.

Ji aliyê din ve, bi teknîka pêşketî berhemên ji daxwazê zêdetir têne pêşkêşkirin, nayêne bi karanîn. Pirsgirêk ne tinebûn e, berovajî ye. Li aliyekî, şêniyekî mezin bi tinebûneke dijwar re rûbirû ye, li aliyê din jî, hebûneke bi qasî çiyan ya ji daxwazê wêdetir ketiye serhevdu heye. Ji vê balkêştir nîşaneyên kaosê peyda nabin. Dîsa bajarên mîna kanser û rîşê mezin dibin hene. Bi awayekî sosyolojîk ev rîşa civakî ya ti têkiliya wê bi bajarbûnê re nîne, mînakên girîng in ji bo mezinbûna bajaran. Bajar, hem her ku diçin dibin gund û hem jî li derveyî maneya xwe mezin dibin û ji bajarbûnê derdikevin. Li bajaran kaos hê zêde heye. Civak bi tevahî dibe meta. Ti nirx nameya nebe mijara bazarê. Dîrok, pîrozî, çand, xweza û her tişt dibe meta. Ev rastî jî kanserbûna civakî ye û dibe kaosê.

Di encama hemû kaosên din de qirêjbûn û gemarbûna hawîrdorê derdikeve holê. Ev yek jî dide xuyakirin kaosê dor li hawîrdorê jî girtiye. Qulbûna tebeqeya ozonê, qirêjbûna av û hewayê, qirbûna

cureyên ruhberan sembolên vê rastiyê ne. Têkiliya di navbera xweza û civakê de ku rastiyeke bingehîn a ekolojîk e, berkendal dibe. Eger ev rewş ji serê kendal neyê zîvirandin wê di encamê de civakê bibe dînazor. Pirbûna mirov û şêniyan divê wek encama giştî ya pêkhatina nakok a sîstemê were dîtin. Polîtîka şêniyan a kapîtalîzmê xwe dispêre ser pîvana; "mirov çiqas bêqîmet bibe wê ewçend zêde bibe." Heta ku kapîtalîzm hebe wê pirsgirêka pirbûna şêniyan mezintir bibe. Yek ji taybetiyên sereke yên kaosê mezin dikin pirbûna şêniyan e.

Civakên li aliyê din ên qutba dijber a sîstemê jî di heman rewşa tevlîhev û jihevdeketî de ne. Di serî de malbat, di dîroka xwe de pêvajoya herî dijwar a ji hev belavbûnê dijî. Zewacên heyî, nêzî nêviyê wan xira dibin û têkiliyên cinsî yên bê kontrol ên ne exlaqî jî pir zêde dibin. Hema hema tê qebûlkirin ku "zewaca pîroz" bi dawî bûye. Zarok, pîr, têkiliyên bav û dayikan, wek encamên vê ji hev belavbûnê qurban têne hesibandin û ji aliyê civakî ve dikevin rewşeke bê mane û xirab. Zordestî û îstîsmara herî kevin a li ser jinê jî her ku derdikeve holê, pirsgirêka jinê dibe tam krîzeke mezin. Jin her ku xwe nas dike, bi sedema piçûk hatiye xistin bi hêrs radibe û dibe yek ji hebûna bi tesîr a kaosê gurr dike. Ji hev vebûn û verşîna pirsgirêka jinê, wê ji hev vebûna civakê û ji hevbûna civakê jî wê ji hevbûn û verşîna sîstemê bi xwe re bîne.

Rewşa pir hindik a exlaqê civakî jî ji bo bê exlaqiya giştî nîşane ye. Saziya exlaq a hatiye qedandin rê li ber ferdparêzî û texrîbkirina nirxên civakê vedike. Li cem kapîtalîzmê bi exlaqbûn û safikbûn yek tişt e. Civakeke bingehê xwe yê exlaqî yanî wîjdanê xwe ji dest dabe, kaosê îfade dike. Wekî din nayê tarîfkirin. Pirsigirêkên civakî yên dewlet dixwaze û hewl dide bi polîtîkayên sosyal pêşî li wan bigire, bi sedema hindikbûna çavkaniyan û bi sedema rengê avabûna giştî ya kapîtalîzmê çareserî nayê dîtin, pirsgirêk hê jî mezintir dibin. Karekî bi tenê yê kêrhatî ê dewletê "xizmetên gelemperiyê" jî ji aliyê cewherî ve maneya xwe wenda dike. Ji bo civakê "ewlekariya giştî" jî di heman xeterê de ye. Ji ber ku kapîtalîzmê mirov hemû kirine kurmê hevdu, pirsgirêkeke giştî ya ewlekariyê heye. Ewlekarî û emna civakî êdî bi sedema hêmanên ji derve, eşqiya, yan jî bi êrîşên huqûqê wek guneh destnîşankirine, xira nabe; di serî de bêkarî û birçîtî, pirsgirêkên bingehîn ên ewlekariyê yên sîstem rê li ber vedike ewlekariya civakê dixe xeterê. Ji ber ku li aliyekî perwerde, tendurustî û lêçûneke zêde, li aliyê din jî bi sedema hejmara şêniyan pir zû zêde dibe, çareserî nayê dîtin. Di serî de kanser, AIDS û stres,

gelek nexweşiyên kaoswarî pir zêde dibin. Di serî de hawîrdor, xanî, tendurustî, perwerde, kar û ewlekarî, civak di dîroka xwe de yekem car ev çend ji hêmanên jiyanê yên dest ji wan nabe qut dibe û nikare çareseriyê bibîne. Yanî hayil dibe ku dikeve cendereya kaosê. Ev pêvajoyek e, wer bi lez diçe serî li mirov digere.

Di pêvajoyên bi vî rengî de di sîstemên civakên dîrokî de, mekanîzmayên wek huner û zanist-teknîkê rol dilîzin. Lê belê ji ber ku huner û zanist-teknîk zêde ketine bin destê îqtîdarê rola ji wan tê xwestin nikarin bilîzin. Piştgirtina hevdu ya komîn çendîn ji hevdu bikeve xweparastina kevneşop qels dibe û di şûnê de şîdeta ferdî û şîdeta çeteyan derdikeve pêş. Li dijî terora îqtîdarê, terora qebîle û eşîran geş dibe. Hêza îqtîdar-şer a di hinavê dewletê de çendîn tazî xuya bike, ew çend jî parastina rewa ya civakê pêş dikeve. Heta pîvanên giştî yên wekheviyê yên dewletê bi cih neyên anîn, heta ambargoya li ser mafê mirovan û helwestên dijberî demokrasiyê dewam bikin, neçar, wê hêzên parastinê yên gelan pêk werin û wê ev yekê rewşê bixe şîdeta li beramberî hevdu. Li şûna ku ji krîzê derxîne wê zêdetir şîdetê dijwar bike. Wexta netewparêziya dewletê tê sorkirin, netewparêziya etnîk jî pêş dikeve. Yek ji cihokên şîdetê jî ev e.

Çalakiyên saziyî yên wek spor û huner ku di nermkirin û fêmkirina têkilî û nakokiyan de kêrhatî ne, berovajî rola xwe mîna amûrên narkotîk û tevizandinê rolekê dilîzin û dibin sedem rewşeke sexte derbikeve holê. Heman rolê li dîn, mezheb û terîqetan jî bar dikin û ji bo civak rastiyan nebîne, ji bilî "dunyayên wêdetir" cemaetên muhafezekar pêk tînin û li pêşiya çareseriya rastîn astengan datînin. Spor, huner û dîn ji naveroka xwe ya dîrokî, civakî hatine dûrxistin û dikin ku mirov bi berçavka hespan û dilekî teneke, bi awayekî xemsar li bûyeran binere. Bi afirandina paradigmayeke xeyalî û sexte çaresernebûn wek çarenûsekê li ser civakê tê ferzkirin. Ev berxwedana li dijî kaosê berovajî encamê dide û kaosê hê jî kûrtir dike.

Di pêvajoyên bi vî rengî de ji bo rohnîkirin û jinûve avakirinê divê herî zêde zanist û teknîk ji bo çareseriyê derfetan pêşkêş bike û rê nîşan bide. Lê belê ji ber ku zêde ketiye bin destê îqtîdarê hêviya ji bo çareseriya civakî nîşan nade. Di rewşek wisa de ye ku fîl bi mûyî wî tê tarîfkirin, mişk bi fîl tê pelixandin. Derfet û îmkanên mezin ên çareseriyê ji bo şerên bê mane û sîlehan, ji bo tenê armanca kar û qezencên bersiva pêdiviyên bingehîn ên civakê nade, bi kar tînin û bi

vî awayî rê li ber rewşeke neyênî vedikin. Ango ji pêşketina kaosê re bi kar tînin.

Em tarîfa xwe ya kaosê ku sîstem hemû civakê tevlî dike û rê li ber vedike, em dikarin hê jî berfireh bikin. Lê ji bo bersiv bide armanca me, ev tarîf jî bi serê xwe têrê dike. Em heta rewşa kaosê nedin fêmkirin, emê weke ku di nîzamekî normal ê jiyanê de ne, bifikirin û tevbigerin; emê nikaribin xwe ji çewtiyên bingehîn xilas bikin, ji lewra emê di şûna çareseriyê de dubare bikevin rewşa ku çareser nake. Di vê demê de pêdiviya bi hewldanên entelektuel ji her demê zêdetir qat bi qat hewceyî heye. Bi taybetî li şûna ku bûyer bi avahiyên berê yên zanistê - dîn, zanîngeh - were fêmkirin û ev rê li ber têgihîştineke şaş vebike, qîmeta hewldanên entelektuel ên mirov rohnî dikin zêde dibe. Dîn û zanista bi ser îqtîdarê ve ji bo naverastê belovajî nîşan bidin û paradîgmayên sexte pêşkêş bikin; gelekî bi tesîr dibin. Em di van deman de rola dij-şoreşê ya dîn, zanist, spor û hunerê pir eşkere dibînin. Ji lewra pêdivî bi avahiyên zanist û zanista - dibistan û akademiyên ilmê civakî - paradîgmayên ilmî pêşkêş bike û projeyên rastîn ên civakê naxapînin, têra xwe zêde dibe. Beriya her tiştî divê têkoşîn di qada entelektuelî de yan di qada zêhniyetê de bi ser bikeve. Di vê pêvajoyê de şoreşa zêhnî bi awayekî diyarker girîng dibe.

Şerê zêhniyetê divê tevî nirxên moralê bibe. Eger moral û exlaq bi zêhniyetê neyên qezenckirin, encamê bi guman û ji bo demekê be. Wexta rastiya sîstemê ya bi awayekî pir dijwar bêexlaqiyê dike, li ber çav were girtin, divê ji bo civakê tevgerên exlaqî û etîk ên têr û hewce, kesayet û sazî temsîla xwe bibînin. Eger kaos li rewşeke ji exlaq û etîkê bûyî rast were, îhtimal heye di encamê de ferd û civak werin daqurtandin. Divê exlaq kevneşopiya civakî li ber çav bigire û pêre lihevkirî etîka nû bi ser civakê bike. Li dijî amûr û saziyên siyasetê ku di pêvajoya kaosê de sîstema serdest wan weke amûrên demagojiyê bi kar tîne, pir girînge, civak xwe ji nû ve bi rêkûpêk bike û bibe xwediyê amûr û polîtîkayên hewce. Saziyên polîtîk ên di pêkhatina civaka ekolojîk û demokratîk de wê rol bilîzin, wek partî, hilbijartin, meclîs û pirsgirêka rêveberiyên herêmî, divê ji aliyê naverok û şêweyê ve, amûrên çareseriyê bibînin. Rêxistiniya polîtîk û çalakî, divê têkiliya xwe bi hawîrdora civakê û komînên demokratîk re têra xwe û baş hebe. Li dijî pêvajoya kaosê, hewce ye ev helwestên giştî bi awayekî berçav li pêş werin danîn. Ji ber ku, derketina gelan û sîstemê ji kaosê mumkîne bi awayekî bi çiv û gelek alternatîfan bibe. Destwerdanên piçûk jî dikarin rê li ber encamên

girîng vebikin. Derketina ji kaosê dibe ku di demeke pir kin û dirêj de - ji deh salan kêm, ji 50 salî ne zêdetir - bibe.

Eger em di vê çarçoveyê de li ser çareseriyên muhtemel ên aliyan rawestin; wê derketina ji krîz-kaosê bi têkoşîna di navbera alternatîfên hêzên sîstema DYE serkêşiya wan dike û alternatîfên gelan de diyar bibe. Krîzê xweber hilweşîna sîsteman û avakirina yên nû bi xwe re neyne. Jixwe, hilweşîn an jî jihevketin têgînên îzafî ne. Di lîteratura sosyalîzma berê de nirxandinên wek "kapîatalîzma geber dibe", "emperyalîzma piling a ji kaxizê", "careke din nikare ji buhranê derbikeve" ji propagandayê wêdetir ti maneya wê nîne. Dîsa jî nirxandinên wek "neçar e sîstemên pêşketîtir bibin" bi îmanê hatine kirin. Ji ber ku bi hêsayî mumkîn e paşketin jî bibe. Kapîtalîzm bi xwe jî çiqasa pêşketiye mijareke hînê pir bi nîqaş e. Hêzên sîstema serdest li gorî hêzên gel zanatirin û ji alî artêş-îqtîdarê û tecrûbeyê ve xwedî ezmûn û amûr in. Di destên wan de serwetên mezin hene. Di warê avakirina sîstemên nû, tepeserkirina sîstemên dijber de, eger nebû kirrîna wî û ew jî nebû îmkanên xwe yên lihevkirinê zêde ne.

Nuqteyeke din a divê were zelalkirin, rexnekirina kapîtalîzmê nayê wê maneyê ku bi tevahî tê reşkirin û xirab tê nîşandan. Her ferdê kapîtalîst mîna diranên şeh wek hev nînin. Sîstema kapîtalîst dikare bi gelek awayan gav biavêje. Yekemîn; dikare xwe restore bike. Jixwe piştî şerê yekemîn û duyemîn ê cîhanê ev kiriye. Piştî gelek şerên li hin welatan ev restorasyon pêk aniye. Ya duyemîn; dikare mezhebên xwe yên berê nû bike û gav biavêje. Sosyal demokratî-muhafezekariyê weke gelek caran hatiye ceribandin, dûrûdirêj bide meşandin. Sîstem xwediyê guhertineke mezin a bi çiv û fitlok e. Di pêşdebirina modelan de xwedî tecrube ye. Ya sêyemîn; dema ku bibîne wê pir mezin wenda bike, dikare wek rêya navîn bi hêza dijber re li hev bike. Ya çaremîn, ew bi xwe li şûna ku her tiştî wenda bike, dikare guhertinên mezin li cih bibîne. Sîstemên serdest di tevahiya dîrokê de wexta bi krîzan re rûbirû bûne gelek guhertinên behskirî ceribandine. Têgihîştina berê ya digot; "sîstem hişk e, ket krîzê sax dernakeve" pir zêde rastiyê îfade nake. Têgihîştinên bi vî rengî çendîn mîna çepgir xuya bikin jî di eslê xwe de rastgir in. Ji ber ku mîna li bendê be, sîstem bi xwe hilweşe û li ser sifra hazir rûnê. Mêweya herî stewiyayî û amade, heta ji guliyê xwe neyê kirin nayê xwarin. Ya herî xirab jî, wexta mîna li bendêye sîstem xira nebe û ji hev de nekeve, vê carê ji bawerî û ramanên xwe dikevin gumanê. Lê nafikire û nabêje; heye ku tarîfa sîstemê şaş hatibe kirin. Bi awayekî

pêşbîn û dûrbîn nikare guhertin û veguherînên sîstemê bibîne.

Pir eşkere xuya ye, DYE dixwaze vê krîzê îdare bike. Ji bo birîneke xedar tê de venebe, hay ji berpirsiyariyên xwe heye. Di vî warî de nirxandinên wek; dixwaze împaratoriyê belav bike, nirxandinên kêm in. Bêguman sîstem hemû nîşaneyên hilweşîna Romayê li pêş çavan radixin. Eşkere ye, hêza bi tenê ya împaratoriya sîstemê hewceyî bi hin hêzên din dibîne. Di sala 1990 de piştî jihevketina Sowyetê hema bêje belavbûn bi awayekî xweber bû. Ev yek, ne ku ji ber xurtbûna wê, ji ber ku sîstemê valatî qebûl nedikir pêk hat. Pir bi girîngî destnîşan dikim ku împaratorî vedîtineke DYE nîne, di tevahiya sîsteman de bi şiklê dawî yê wergirtiye li DYE rast hatiye. Îngilîzan radestî wê kiriye. Ne ku DYE ew peyda kir, wê DYE dît. Belkî jî li dunyayê DYE hêza herî bi hêsanî bûye împaratorî. Ev malovaniya bêdil û neçar a împaratoriyê, wê derketina ji krîzê hêsan neke, wê berovajî bibe sedem ku sîstem di krîzê de bist bibe.

Li deverên belav dibe kaosên wan kûr in. Iraq û Afganistanê tenê krîzên lê zêde bikin diyar in. Dewletên Yekbûyî yên Emerîkaya salên 2000 bi awayekî cewherî wek hêza herî nêzî împaratoriyê neçare şêwe û rengekî nû bidê. Naxwe ev li gorî rastiya şer-îqtîdarê nabe. Bi hêza eskerî, aborî û zanebûnê ya teng nikare xwe vekişîne. Wezîfeya wê ya yekemîn di nav krîzê de rêvebirina sîstemê ye. Maneya vê yekê ev e; divê bi hêzên mîna YE, Japonya, Çîn û Rûsyayê re têkiliyên nêz deyne û tengezariyan bêyî şer rêve bibe. Mîna şerê yekemîn û duyemîn ê cîhanê pêwîste bi hêzên di nava sîstemê de şer neke. Dîsa divê şerekî mîna yê Wîetnamê bi awayekî yekser jî nebe; divê bi yek ji van hêzan re neke. Berovajî, divê ji bo parvekirina barê giştî yê sîstemê serî li wan bide û hewl bide wan bike alîkar. Krîzên di warê fînans û bazirganiyê de derdikevin bi rêya hevkariyê çareser bike. Ji bo vê yekê jî divê saziyên wek IMF, Bankeya Cîhanê, Rêxistina Bazirganiyê ya Cîhanê û organîzasyonên herêmî bi kar bîne. Li Emerîka Latînî û Efrîkayê dest ji helwestên xwe yên krîza kûr bikin, berde û destûr nede veqetînên radîkal. Li welatên wek Kuba, Venezûella, Haîtî, Lîberya û hwd. hêzên muhtemel ên dijber derbikevin, divê kontrol bike û eger derfetên hewce amade bibin wan hilweşîne.

Ji aliyê jeopolîtîk ve, ji bo Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê, herêma herî krîtîk Rojhilata Navîn a berfireh e. Ji bo vê devera mezin Emerîka bi projeyeke mezin mîna sîstema emperyalîst duyemîn

Planê Marshall amade dike. Ev hewldana jê re Projeya Rojhilata Navîn a Mezin tê gotin, ji bo sîstem bêyî derbeke mezin bixwe ji krîzê derbikeve, hewce xuya dike. Heta herêm ji aliyê çavkaniyên bingehîn ên enerjiyê, rastiya dînî û aliyê sosyokultur ve bi ser sîstemê ve neyê kirin, DYE bikeve rewşekê hîç rehet nebe. Hêzên di pozîsyona împartoriyê de ne, nikarin li hemberî van rewşan bêdeng bimînin. Ev du sed sal e hewl tê dayîn herêm bi mêtingertiya kapîtalîst û nîv mêtingeriyê ve were rêvebirin. Xwe spartin dewletên despotîk û bi wan bêhna gelan çikandin. Lê nekarîn herêmê bi wan bi ser kapîtalîzmê ve bikin. Nakokiya stratejîk a Ereb-Îsraîliyan hînê kûrtir bû. Îslama radîkal li afirînerê xwe DYE vegeriya. Modelên dewlet-netew ên di nav sînorên bi cedwelan xêzkirî de, bi rewşeke statukoparêz a paşverû, pêşketin kilît kirin. Netewparêzî, dîndarî û dewletparêziyê, bi awayekî li dunyayê nehatiye dîtin, bû zirxek li ser civakên Rojhilata Navîn û ew bênefes hîştin. Ji lewra fikra projeyeke nû, hewce ye. Ya girîng, ev projeyê çawa û kîjan hêzê bi cih bînin? Wê kîjan sîstema siyasî-aborî bikin hîmê bingehîn? Xelk û gelên li herêmê wê bersivek çawa bidinê?

Ji aliyê jeopolîtîk ve, nakokî û mijara sereke ya Neteweyên Yekbûyî û NATO ya sîstema bi pêşengiya DYE ev e. Di şûna komînîzm û faşîzma demê de, hedef "Îslama tund", "faşîzma Îslamî" ye. Hêzên sîstemê û yên bi ser wan ve, ji "globalîzma" ku DYE pêşengiya wê dike ne razî ne. Bi taybetî, komarên Ewrûpayê û demokrasiyên wê, her roj nerazîbûna xwe zêde dikin. Bi nazikî hewl didin ji bo YE ya netew-dewlet û di ser netew-dewlet re nedin pelixandin. Di bin mertalê YE de mafên mirovan û demokrasiya bûrjûwayê hewl didin ceribandineke alternatîf bikin. Dixwazin bi DYE re mêzînekê ava bikin û ev polîtîkaya bingehîn e ku li ber çav digirin. Rûsya, Çîn, Japonya, Brezîlya jî di nav heman hewldanan de ne. Bi giştî li hemberî meyla împaratoriyê ya DYE dewlet-netew saziya herî zêde tengav dibe. Ya rastîn, ev dewletên piçûk û navîn ku diviyabû ji zû ve bûbûna dewletên eyalet, berxwedana wan tewş e; mîna li dijî şîpê bazkan biavêjin. Ev dewlet, divê li hewcebûn û girêdana xwe ya bi sîstemê re mikur werin û dest ji pozbilindiya xwe ya netewparêziyê berdin; li gorî pîvanên globalîzmê tevbigerin. Jixwe alternatîfeke din nîne. Wer xuya ye derfet û îmkanên derve û hundur nemane ku mîna duyemîn Sowyetê fortên xwe bikin û serxwebûna xwe ya bi sînor dewam bikin. Xeyalên berê yên şoreşê êdî li dijî sîstemê "pêşverûtiyê" îfade nakin. Berovajî muhafezekariyê temsîl dikin. Ya xuya ye, wê pêşverûyên rizgariya

netewî, burokrasiya muhafezekarê zêde bi kêr neyên. Jixwe vê yekê, ne sîstem, ne DYE, ne jî gelên li tebeqa jêr, êdî danaqurtînin. Olîgarşî û despotên netewî yên xwe spartibûn mêzîna DYE û Sowyetê çax û dema wan qediya.

Tevî ku kapasîteya sîstemê heye zanist û teknolojiyê hînê pêş de bibe, şert û mercên civakî dibin astengên ciddî. Ji ber ku amûrên têne pêşkêşkirin ji daxwazê derbas dikin, zanist û teknolojî di warê afirandin û nûbûnê de bê fonksiyon tê hîştin. Lê zanist û teknolojî dikarin ji bo çareserkirina pirsgirêkên girseyên mezin ên gel roleke mezin bilîzin. Ev jî tenê bi civakeke ekolojîk û demokratîk mumkîn e.

Sîstema bi pêşengiya DYE di 25-50 salên pêş me de, muhtemele ji mezinbûn û pêşketinê wêdetir paş bikeve. Hemû nîşane didin xuyakirin ku wê hewl bide xwe li ser piyan bigire û hebûna xwe dewam bike. Sîstem hebûna xwe ya heyî wexta bixwaze dewam bike jî wê vê yekê ne bi mezinbûnê, bi piçûkbûnê pêk bîne. Ji bo vê jî wê hebûna xwe ya leşkerî ya li dijî Yekîtiya Sowyetê û tevgerên rizgariya netewî mezin kiribû, hê piçûktir bike. Wê pêvajoya artêşên piçûk û teknîk dest pê bike.

Her çiqas hedef, teror, navendên narkotîkê, nukleerên dewletên serserî û çekên biyolojîk û kîmyewî têne nîşandan jî, hedefa rastîn bûyerên li Rojhilata Navîn e, ku rîsk heye sîstem bi wan bişkê. Ji texmînan wêdetir, bi îhtîmaleke xurt, bûyer ji rengê Îslamiya radîkal, emperyalîzm û destpotîzmê wêdetir, nêzî sîstema komîn a demokratîk be. Eger Rojhilata Navîn bi rejîmên destpotîk, netewparêz, dînî û dewletparêz neyê kontrolkirin, dikare di derketina ji kaosê de ji avahiyên çareserker ên mînak re pêşengiyê bike. Tevgerên civakî yên li Afganistan û Iraqê dest pê kirin, berê li Îsraîl û Filîstînê bi kûrahî jî wê li Kurdistanê dewam bikin, neçarin mînakên çareserker bibînin. Naxwe wê di xurtkirina kaosê de rol bilîzin. Ji lewra di serî de hêza eskerî ya sîstemê NATO, hêzên koalisyonê yên li Iraqê û hemû Neteweyên Yekbûyî wê li ser vî zemînê jeopolîtîk li çareseriyê bigerin.

Xwezaya nakokiyên li herêmê ji rêbazên eskerî zêdetir ên aborî û demokratîk ferz dikin. Hindik destwerdanên eskerî, zêdetir desteka aborî û demokratîk, eger Rojhilata Navîn ji kaosa di navê de derxîne, wê li derdora pêncî salên li pêş me, modela nû ya cîhanê jî diyar bibe. Cewherê vê modelê wê "artêş û dewletên piçûkbûyî, sîstemeke demokratîk û aboriyeke mezin be." Dewletên mîna kewara mesrefan, heta neyên piçûkkirin, îhtimala derketina sîstemê ji krîzê xuya nake.

Sîstema bi pêşengiya DYE mîna ku bi bernameyeke hevpar bixwaze netew-dewletên ji sedsala 19. mane li dawiyê bihêle, rêveberiyên herêmî yên gelemperiyê pêş de bibe, aboriya şîrketan a pir-netew li ser xeta civaka zanîn û agahiyê pêk bîne. Yekîtiyên despotîk ên herêmî û berfireh mîna YE jî dikarin bikevin rojevê. Bi pêşbîniyeke dûr a teorîk, mumkîne li gelemperiya cîhanê şer nebin, yekîtiyên global bikevin pêşiya yekîtiyên herêmî. Mumkîne şûna şîrket, netew, îdeolojî û dewletên ji sedsala 19. mane, nîv-dewlet, saziyên siyasî yên nîv-demokratîk, yekîtiyên aborî yên di ser netewan re, komên çandî yên herêmî, zêhniyeta felsefî civakî ya ku exlaqê li pêş dibînin û tevger cih bigirin.

Dunya ku sîstema kapîtalîst heta dawiya sedsala 19. hema bêje bi îradeyeke yekalî rêvebir, di sedsala 20. de şerên mezin derbas kirin. Yek ji encamên girîng ê şeran ev bû; bêyî gelan dunya nayê rêvebirin. Her çend gelan nekarîne sîstemên xwe bi xwe damezrînin jî hatine wê astê li dijî îqtîdarên dewletan û polîtîkayên wan, îradeya xwe ya demokratîk ferz bikin. Heye ku li derdora nîv-sedsal an jî çaryekê sedsala li pêşiya me li gorî daxwazên gelan ên demokratîk bimeşin. Dîsa heye ku di vê pêvajoyê de li jiyana xwe ya cewherî û çanda xwe ya mîna xezîneyên ku wenda kirine, vegerin. Veqetandina gelan ji rastiya wan, ji qirkirina fizîkî, aborî û talanê zêdetir encamên xwe yên giran hene.

Eger em gotinên xwe bidin serhevdu; heye ku di dema li pêşiya me de dawî li pêvajoya yekalî ya îradeya kapîtalîzmê were; netewparêziya gelan a bi şer û şovenîzmê barkirî li dawiyê bimîne, aştî xwe ferz bike, gel xwe bigihînin çand û rastiya xwe ya herêmî. Dîsa di çarçoveya vê îhtîmalê de, heye ku ev tena serê xwe nebe, bi sîstema serdest a dewleta navendî, lê bi avahiyên hatine piçûkkirin bi prensîban bi awayekî hevpar were meşandin. Şaristaniya me, di şûna serdestiya çand, etnîk, cins û çîn de, dikare ber bi "şaristaniya demokratîk a global" ve biçe; ku pêre gelê nirxên xwe yên komîn ên demokratîk nas bikin, deriyê li azadiya cins vebin; zordariya etnîk-netewî li dawiyê bimîne û piştgiriya çandan esas be.

**1- Ji bo derketina ji krîzê sîstema demokrasiyê**

Di sîstema civakî ya dunyayê de hemû hêzên civakî yên li derveyî dewletan em dikarin wek "gel" bikin têgîn û ji bo derketina ji kaosê dibe ku gelek çiv, fitlok û alternatîfên wan jî hebin. Ne tenê rêyek derketinê, li gorî dînamîzma hêzên di nav proje û pratîkê de cih digirin, muhtemele cûrbecûr rêyên çareseriyê diyar bibin.

Wexta em gelên cîhanê tarîf dikin, divê em hinekî din jî rave bikin. Gelek kategorî hene li derveyî dewletê mane, yan jî ji ber berjewendiyan li der ve hatine hîştin. Çarçoveya wan li gorî dewlet û deman diguhere. Pêwîste gel wek têgîneke dînamîk - bi lez diguhere - were fêmkirin. Komên li dora dewletê ji bo berjewendiyên xwe yên maddî û manewî - zanîn û aborî - hatine cem hev, em dikarin wan wek civaka jor an jî olîgarşî, bi gotineke hînê gelêrî "dewletdar" bi nav bikin. Li beramberî vê, komên din ên yek ji seriyên dualî yên diyalektîkê - çînên bindest, komên etnîk, çandî, dînî û cinsî yên di bin zordariyê de - em dikarin wek gel bi nav bikin. Li gorî guhertinên di naverokê de, komên di çarçoveya gel de jî zêde, yan kêm dibin. Dibe ku rengê zordarî û îstîsmara lê rast tê jî biguhere. Zordestiya çînî, netewî, etnîk, çandî, nijadî, dînî, fikrî û cinsparêz ji komkujiyê heta destdirêjiyê dikare xwe bi gelek awayan nîşan bide. Îstîsmar jî heman aliyê wê hene. Maddî, manewî, asîmîlasyonîst, înkarker, talan, dizekiya qanûnî, yan jî ne qanûnî, bi zorê û bi xapandinê, mirov dikare gelek şêweyên wê kedxwariyê destnîşan bike. Di tevahiya dîrokê de ev kategorî sîstem ji sîstemê guherîne û heta roja me ya îro beridîne, rê li ber derketina komên hînê tevlîhev vekirine û tekamul kirine.

Krîza li dunyayê ya bi tevgerên ciwanan ên sala 1968 dest pê kir, bi jihevketina sosyalîzma reel a Sowyetê sala 1989 bi lez bû, bi êrîşên li Bircên Cêwî yên 11 Îlona sala 2001 kûrtir bû, bi eşkere bandoreke mezin li gelan kir. Di 20 Adara sala 2003 de bi dagirkirina Iraqê re tevlîheviya li dunyayê gihîştiye astekê ku em dikarin bibêjin dîrokî ye. Ev tevlîhevî bi navberên kin, guhertina cih û reng dewam dike. Nakokiyên hundurîn ên sîstemê agirê xwe yê dipijiqîne derdorê, êdî gelan disotîne. Birçîtî, bêkarî, pirsgirêkên perwerde, hawîrdor û tendurustiyê ku roj bi roj giran dibin û gel di nav wan de digevizin, dikeve rojeva her beşê civakê. Me hewl da, em potansiyela çareseriyê ya hêzên serdest ên sîstemê rave bikin. Me hewl da em nîşan bidin, bi awayekî cewherî, bi serê xwe xwedî derfetên çareseriyê - li gorî sedsala 19. - nînin û ya wek çareserî jî ferz dikin, ji girankirina rewşa kaosê zêdetir tiştek nîne. Yanî me diyar kir ku çavkaniyên krîzê nabin çavkaniyên çareseriyê. Eger li ser hîmekî rast biguherin, dikarin wek aliyê lihevkirinê fonksiyonel bibin.

Gel di dîrokê de çawa hatine, wê welê jî çareseriya xwe pêş de bibin. Çand, kevneşopî û dîrokî, çi were gotin bila were gotin her komeke gel dîrokeke wê heye. Komên gelan ên ji civaka klan ve şekil werdigirin, di tevahiya dîrokê de li hemberî avahiyên jeokultur

û polîtîk bi refleksên hebûnê hewl dane şêwe û şekil bi dest bixin. Ev helwesta me hewl da di beşên berê de bi kurtî rave bikin, rengê wê komîn û demokratîk e. Em nikarin li wî ferdê ku kapîtalîzmê pûç kiriye û wergerandiye prîmatan binerin û helwesta komîn û demokratîk ji nedîtî ve werin. Bi awayekî herî kevin be jî, ferd rojekê bêyî asta civaka komîn nikare bi serê xwe bijî. Her çend her cure operasyonên ji bo înkara civakê, mejiyan bişon û girîngiya vê rastiyê bidin wendakirin jî rastiya bingehîn a civakê naguhere. Çi ferdiyeta ku bi rastiya civaka xwe ve girêdayî nebe, zêde şensê wê yê jiyanê nîne. Rastiya gelan heta ji her alî ve neyê eşkerekirin, hesabên derketina ji kaosa rojane cihê xwe nabînin. Ez bi girîngî destnîşan dikim; eger sîstema kapîtalîst di sedsala 20. de - bi taybetî avahiya dewletê - sê mezheb li xwe zêde nekirana - sosyal demokrasî, sosyalîzma reel û rizgariya netewî - û xwe nesparta wan, belkî krîza roja me ya îro jî nedîta. Taybetiya her sê mezheban jî ev e; hêvî dan gelan û bi vî awayî bûn desthilatdar. Tam ji 150 salî vir ve - ji şoreşên sala 1848an - xwe dubare dikin; emê berê dewletê zevt bikin û paşê heqê her kesî bidinê! Mîna ku dewlet çavkaniya dewlemendiyeke jiyanê ya biserûber û bernameyeke hêviyan be. Partî têne damezrandin û şer têne meşandin. Eger bi ser bikevin, paşê nirxên civakê yên wek îmkanên dewletê têne bi navkirin, li alîgirê xwe parve dikin û heta dor tê girseyên mezin ê gel tiştek namîne. Dîsa ker a berê û kurtan ê berê ye. Eger bi ser nekeve şer dewam dike.

Ev mezhebên hemdem jî her gava diavêtin, li ser navê gel pîroz dikirin. Di tevahiya sedsala 20. de gel li ser piyan bû. Lê belê ji ber ku paradigmaya sîstema serdest li dawiyê nehat hîştin, ew fedekariyên mezin, qehremanî, êş û bextewerî nikarîn xwe xilas bikin ku nekevin hîmê sîstemê. Em wexta daketin kûrahiya dîrokê me heman rewş dîsa dîtin.

Eger dîrok ji bo em dersê jê bigirin girîng e, divê em ji bo derketina ji krîz-kaosa li pêşiya me, çareseriyeke bi kok û bi prensîb li gorî berjewendiyên gelan bibînin û pêk bînin. Ji vê wezîfeyê manîdatir ti wezîfe nîne û ji vê hewldanê pîroztir xebat nîne. Ez yeqîn dikim ku bi sedema nuqteya esas, helwesta demokratîk û komîn ji nedîtî ve tê; wendakirin heye. Çiqas analîzên civakî bêne kirin bila werin kirin, li gorî taktîk û stratejiyê rêxistin werin avakirin û çalakî werin lidarxistin û heta serketin jî were bi destxistin, qonaxa dawî hevalbendiyeke xirab bi sîstemê re ye. Şoreşgerê mahir ê

sedsala 20. Lenîn, wexta digot; "Ji bilî demokrasiyê rêya biçe sosyalîzmê nîne" rastiya bingehîn destnîşan dikir. Lê belê ew bi xwe jî, wexta bi nexweşiya îqtîdarê ket, yeqîn kir ku dikare rêbirr - bêyî tecrûbeyeke demokrasiyekê - biçe sosyalîzmê. Bawer nakim ku difikirî, îqtîdara xwe spartiyê wê piştî 70 salî wî bibe ber destê kapîtalîzma talanker û şêlanker. Destketiyên mezin ên Sowyetê - bi mîlyonan mirov li ser vê rê fedekariyên mezin kirin û şehîd ketin, bi hezaran rewşenbîrên hêja hatin fedakirin - ji ber nexweşiya îqtîdarê bûn cihokên avê yên aşê sîstema li dij şer dikirin.

Ji vê ezmûna mezin a sedsala 20. - Şoreşa Mezin a Cotmehê - dersa were girtin ev e; li dijî kapîtalîzmê ji bo çareseriyên bi pîvan û mayînde, divê helwestên gelan karibin xwe bikin sîstemeke demokratîk. Demokrasî û demokratîkbûyîn jî heta ji nexweşiya dewletbûnê neyê xilaskirin sîstema demokratîk nayê avakirin.

Ji bo em şêwazê xwe yê çareseriyê baş nas bikin, em dîsa li dîrokê vegerin. Em ji cihê herî kevin dest pê bikin. Gelên wek barbar dihatin bi navkirin, împaratoriya dawî ya koledar Romayê ji hev xistin. Ev gelên behsa wan tê kirin li derveyî dewletê bûn û bi awayekî komîn dijîn. Ew makîneya xeternak a koletiyê ew gel ji hev xistibûn. Ew hêz heta dawiyê komîn û demokratîk bûn. Lê şefên wan ew bi bermahiyên îqtîdarê xapandin. Ewrûpayeke dibûya ber bi demokratîkbûnê ve biçûya, ber bi dewletok û dewletên despot feodal ve birin. Heman tevger li her qada koletî li dawiyê hat hîştin, derketin holê. Ewrûpa bi Ronesansê ji feodalîzmê derdiket û li her alî giravokên demokrasiyê û bajar derdiketin naverastê. Demokrasiya bajaran pêş diket. Ewrûpayeke demokratîk êdî di rojeva dîrokê de bû. Şoreşa Fransa (1789), berê jî ya Îngilîzan (1640), şoreşên Emerîkayê (1776), li Spanya û gelek welatên Ewrûpayê di sedsala 16. de komînar jî dengekî xurt ê demokrasiyê bûn. Lê belê ew amûrê dîrokî hêza şer-îqtîdarê ya çavsor û hîlekar, çi kevin çi nû, ji bo sîstema zordest xebitî. Hin kes kirin alîgirê xwe û hin kes jî pelixandin. Hêzên saf ên demokratîk di çerx û gerîneka xwe ya dîrokî de daqurtand. Vê hêza şer-îqtîdarê mîna rîş û kanserê bi şerên sedsala 19. û 20. xwe xwedî kir û rejîmên li derveyî mirovatiyê, rejîmên faşîst, nijadperest û totalîterîzm kir belayeke mezin û di dawiyê de rê li ber vê kaosa mezin a di dîroka me de vekir û bi xwe jî ket vê kaosê.

Kevneşopiyên demokratîk gerdûnî ne. Ew jî mîna xelekên zincîrekê ne. Me bi zeman û mekanên herî kevin ên tenha ve girê didin. Em bi tenê nînin. Dîrok û dever ji her sîstemê zêdetir, bi

demokrasiyê re ne ku divê yên me bin. Wezîfeya sereke ya li pêşiya me; divê em têkçûna zanînê ya di nava pêvajoyê de pêk hatiye, tedarik bikin, amûrê polîtîk ê rast hilbijêrin û li exlaqê civakî vegerin. Ev hemû qal û behs derbarê "zanînê" de ne. Amûrê polîtîk yek ji wan mijaran e ku divê em zêde li ser bisekinin. Bi kurtî jê re dibêjin; demokrasiya dewleta wê nîne. Yanî em nakevin xeflet û xetaya mahir Lenîn a dewletdarî û heta demokrasiya dîktatoriyê. Ev helwesteke bêotorîteyî ya anarşîst û bê nîzamî nîne. Ev helwesteke manîdar e, her kes bi dilê xwe erê dike, otorîte û nîzama gelê rohnîbûyî ye. Demokrasiya gelan e; di nav burokrasiyê de nefetisiye; her sal karmendên xwe hildibijêre û wek hildibijêre, paşve jî digire.

Ku em demokrasiya navdar a Atînayê bi bîra xwe neynin, em nikarin derbas bibin. Li aliyekî Spartay bi qraliyet û Atînaya bi demokrasî li nîvgirava Grek ji bo serdestiyê şer dikin; li aliyê din jî Romaya wê demê, dixwaze dagirkeriya împaratoriya Med û Persan rawestîne. Sîteya piçûçik a Atînayê ev her du dijminên xwe jî BZ di tevahiya sedsala 5. de bi sîleya xwe demokrasiyê têkbir. Ev serketin bêyî serî li artêşên nîzamî, mayînde û dewletê bide, bi fermandarên salane yên ji bo wezîfeyê hatibûn hilbijartin û bi milîsên dildar bi dest xist. Demokrasiya dimeşandin jî demokrasiya gel nebû, demokrasiya çîna koledar bû. Dîsa jî mora Atînayê li serdemeke manîdar li sedsala 5. ya BZ ket. Gelan bi demokrasiyê li hemû nîzamên zordestiyê û dijminên xwe yên mezin xistibûn. Serdema xwe ya herî xweş bi demokrasiyê afirandibûn. Eger demokrasiya Emerîkiyan nebûya, wê nikarîbûya bi împaratoriya roj lê naçe ava Îngilîstanê serî derketa. Eger demokrasiya gelan a Îngilîzan jî nebûya, wê nikarîbûya nifşên çavsor ê qral Norman bixista xwar û sîstemeke demokratîk a Îngilîz biafiranda. Eger "demos"a mezin a Fransiyan nebûya, wê nikarîbûya şoreşên mezin û rejîmên komarê yên li cîhanê navdar û mînak damezranda. Ji lewra demokrasî dibe rejîma herî bi xêrûber. Rejîma siyasî çiqas demokratîk be, ew çend jî aborî xweş dibe û aştiya civakî jî dibe temamkerê heman rastiyê. Baş tê zanîn; wexta demokrasî cewherê xwe wenda bike û di destê demagogan de bibe amûrê nêçîra gelan, berê rejîm û paşê jî xweşhaliya ku pêk hatiye, hildiweşe. Piştî wê jî muhafezekarî, faşîzm, şer û hilweşandin tê. Eger ilmên civakî hinekî durust tevbigeriyana, wê bidîtana ku piraniya zêde ya dîrok û civakan bi saya helwesta demokratîk hene. Wexta ev helwest nebe dîrok radiweste. Yan jî dikeve qonaxa em jê re dibêjin bi lanet.

Nuqteyeke din a bingehîn, ji ber ku bi ser mijara me ve ye û hewce ye were rohnîkirin, emê balê bikişînin ser. Ew jî demokrasiya çînî ye, ku ne pir watedar e, ne jî tê xwestin. Li gorî têgihîştina ilmê civakî yê serdest, berê "kole" pişt re "serft" û herî dawî jî "karker, proleter" wek encamên herikîneke dîrokî ya pêşî lê nayê girtin pêk hatine. Mîna ku bêyî van rastiyan em nikarin bigihîjin sosyalîzmê, azadî û wekheviyê. Eger wisa bûya, diviyabû em bibêjin; "bijî koletî, bijî serftî-gundîtî, bijî karker." Şoreşgeriya çînî, yanî demokrasiya çînî - pişt re dîktatorî - ye. Baş hatiye fêmkirin ku ev formulasyon ji serî heta binî ji teoriya koletiyê re xizmetê dike. Di demokrasiya gelan de cih ji koleyan, serfan, karkeran re nîne! Çawa ku ji koletî, serftî û karkertiyê re nîne. Demokrasiya gelan a rastîn, karker, serf û koleyê sîstemên kapîtalîst, feodal û koledar qebûl nakin, red dikin. Pîrozkirin û teqdîskirina kom û çînên bindest nexweşiyeke berê ye. Demokrasî nikarin vê nexweşiyê rakin. Navê wê li ser e, demokrasî li cihekî hebe, li wir zordestî û kedxwarî nîne. Mîna keriyên pez rêvebirin nîne. Di demokrasiyan de rêvebirin nîne. Xwe bi xwe rêvebirin heye. Di bin serweriyê de mayîn nîne; serwerê xwe bi xwe ye. Sîstemên tehekumkar dikarin koletiyê, serftiyê û karkertiyê wek saziyekê xurt bikin, lê belê sîstemên demokratîk wexta pêş bikevin koletî, serftî û karkertî diqede. Mirovê dîsa bixebitin. Lê ewê efendiyê karê xwe be, wê wek endamekî komîna xwe bixebite. Komîntî û demokrasî mîna neynûk û goşt bi hevdu ve ne. Demokrasiya em dikin armanca xwe, tarîfa wê û dîroka xwe dispêrê welê ye. Demokrasiyên çînî îqtîdarê dixwazin. Her îqtîdarek jî dewletekê dixwaze û her dewlet jî demokrasiyê red û mandel dike. Demokrasiyên çînî di cewherê xwe de demokrasî nînin, îqtîdara dewletê ne. Ezmûn û ceribandina Sowyet, Çîn û Kubayê vê yekê pir eşkere îspat dikin. Çiqas dewlet hebe, ew çend demokrasî hindik dibe, yan jî çiqas demokrasî, ew çend dewlet piçûk dibe. Divê mirov vê rastiyê wek rêzikeke zêrîn hîn bibe.

Têkiliya di navbera azadî, wekhevî û demokasiyê de heta dawiyê tê fêmkirin. Ev alternatîfên hevdu nînin. Demokrasî çiqas pêş bikeve, azadiyê jî ew çend pêş bikevin. Çendîn azadî jî pêş bikeve wê wekheviyê bibe. Demokrasî cîwarekî bi xêrûber e, azadî û wekhevî lê hêşîn dibin. Demokrasiya xwe li azadî û wekheviyê ranegire ew çînî ye. Tenê çînek, komek û zumreyeke cihêwaz dikarin ji azadî û wekheviyê sûd werbigirin. Ji yên din re jî tenê rêvebirin û koletî dimîne. Ji ber ku di demokrasiyê de xwe rêvebirin hîmê bingehîn e, wekhevî û azadî jî giştî ye. Ji lewra azadî û wekheviyeke berfireh a

di demokrasiya gelan de, dibe demokrasiyek ne ya dewletê û ne jî ya îqtîdarê. Demokrasî nayê maneya înkara dewletê, lê perdeya xemlê ya dewletê jî nîne. Bi hilweşandina dewletê demokrasî xwestin xwe xapandin e. Ya rast, divê dewlet - dewleta wê di demeke dirêj de vemire- û demokrasî bi prensîbeke yekpare werin meşandin.

Em di serdem û çaxa demokrasiyên bê sînor de najîn. Di roja me ya îro de erk a dewletên serdest e, ji lewra hewceye demokrasiyek ku bibe pêk were, bi prensîb bi hêza dewletê re li hev bike. Şaristaniya Ewrûpayê kêm û dereng be jî ev dersa xwe baş fêm kiriye û hewl dide dewlet û demokrasiyê di zikhev de bimeşîne. Piştî şerên mezin, hêza bêserûbinî ya çareseriyê ya demokrasiyê û karektera şer a îqtîdarê dîtiye. Alîgiriya îqtîdarê dikare ji bo zumreyekê hêz û berjewendiyan bi dest bixîne, lê di encamê de ji bo welat, netew û gelan felaketan amade dike. Ewrûpiyan bêyî netew-dewlet guhê xwe zêde nedidan demokrasiyê. Lê serhatiya wan a faşîzmê nîşan da ku ew bêyî demokrasiyê nikarin netew-dewletê jî biparêzin. Têgihîştina, em berê netew-dewletê têkûz bikin paşê dorê were demokrasiyê, sebeba hemû felaketên faşîzm û totalîtarîzmê ye. Ewrûpayê kengî bi YE re berê got; mafê mirovan û demokrasî, wê wextê deriyên wê li aştiyeke mayînde û jiyaneke bextewer vebû. Modela YE jî ev e. Ev hêza bi sihêr a dunyayê ber bi Ewrûpayê ve dikişîne, çendîn Ewrûpa wê li dunyayê belav bike wê karibe ji gunehên xwe yên dema buhurî xilas bibe. Wê wextê mîna di hemû şaristaniyan de, cewherên erênî wê bibin nirxên hevbeş ên hemû gelan.

Lê dîsa jî em ji bîr nekin, di bingehê şaristaniya Ewrûpayê de çîneke bûrjûwaziyê ya bi tecrûbe heye, bi hesab û berjewendiyên xwe yên qurnaz û sar serweriya xwe bi giranî dimeşîne. Wek arîstokratên hemdem, wê ji jiyana li serê demokrasiyê bi hêsanî danekevin. Lê demokrasiyê bizanibe û bikaribe - dewletan wan hêdî hêdî vemirîne - bêyî seriyan jê bike, wan ji textên wan daxîne. Bi serê xwe tenê nikare vê yekê bike. Eger li dunyayê demokrasî pêş bikeve wê Ewrûpayê bi awayekî erênî bibe dunyayî, dunya jî çendîn demokratîk bibe wê bibe Ewrûpayî. Xuya ye dîrokê di derketina ji kaosa rojane de li vê serhatiyê şahidiyê bike. Li dunyayê, bêyî demokrasiyên teze, mîna demên berê îhtimal xuya nake, bi şîrket, şerên DYE, demokrasî û huqûqa Ewrûpayê karibin ji kaosê derbikevin.

Pêwîst e mirov di warê civakî de bi nazikî li ser naveroka têgîna demokrasiyê rawest e. Di nava têgînê de cihêkariyên wek çîn, cîns, etnîk, dînî, entelektuel, pîşeyî û hwd. nayên kirin. Tevlîbûneke ferdî

û komî jî dibe. Ji bo demokratiyê welatîbûna ferd esas nîne, tevlîbûna zemînên komî jî nayê astengkirin. Hêza komî û ferdî serdestiyê nade. Ne îdeaya hêzê ya ferdan li hemberî hevdu, ne jî ya koman, maneya wê nîne. Prensîba wê li ber çav were girtin ev e; divê bi kêrhatina ji bo gelemperiyê - di her mijarê de berjewendiyên giştî û hevpar ên civakê - û însiyatîfa ferdî li dijî hevdu nebin asteng. Pêwîst e ferdiyet û gelemperî di nuqteya optîmal de bigihîjin hevdu. Di cewherê xwe de bi ferdiyata komînê xwedî dike, li ser hîmên wê pêkanîna ferdê afîrener, bi însiyatîf û li hev e. Eger giranî li ser taybetiya komînê be jî îhtimal heye ber bi demokrasiya totalîtarîzmê ve biçe. Li beramberî vê, eger her tişt ji bo ferdiyetê mubah were dîtin, ev jî dikare rê li ber anarşîzmê veke û aliyê din dikare ferd li dijî civakê bike xwediyê hêzeke zêde. Di encamê de her du meyl jî dikarin li ser civakê rê li ber dîktatorî, rêvebirina kêfî û rizînê vekin. Demokrasî hewceyî bi kesên zana, ji dil û kesên bi coş ji bo berjewendiyên civakî û bexteweriya ferdan hewl didin, heye. Ji partiyan wêdetir, eger demokratên ku gel di warê demokrasiyê de perwerde dikin, zindî û geş digirin, ji bo hişyar bin sor dikin, nebin, demokrasî tenê bi prensîb û saziyan nayê meşandin. Demokrasî wek hebûneke dînamîk, mîna nebatekê timî hewceyî bi avdaniyê (perwerdê) dibîne. Eger ji aliyê kurên xwe yên evîndar ve neyê avdan wê hişk bibe, birize û dikare bibe destik ji bo bûyerên antîdemokratîk.

Ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî - di serî de aştî - , amûrê herî bi tesîr, bêyî li ser nîqaş bibe, demokrasî ye. Hêza xwe ji parastinên rewa yên mecbûrî û şer nagire, hêza xwe ji qabîliyeta xwe ya îqnayê werdigire. Her tim dikare tiştên di şer de werin wendakirin û tiştên bi îqnayê werin bi destxistin rûbirû bike û ji bo berjewendiyên gelan çareseriyên herî baş pêk bîne. Guftûgoyên rastîn û wêrek dikarin pirsgirêkan rohnî bikin. Pirsgirêkên hatibin rohnîkirin jî bi tevlîbûneke berfireh a aliyan dikare bikeve ser rêya lihevkirin û çareseriyê. Ti sîstem bi bi qasî demokrasiyê nikare guftûgo bike, rastiyan derbixîne holê û serketinê bi dest bixe. Meydan û qada pêşketina huner û zanistê jî demokrasî ye. Demokrasiya li Atînayê ji bo pêşketina felsefeyê jî rewşeke herî baş amade kir. Bêyî demokrasiya Atînayê Arîsto, Eflatûn û Sokrates nînin. Eger di dema Ronesansê de demokrasiya li bajaran nebûya şoreşên huner û zanistê jî wê pêk nehatana.

Gel kevneşopiyên xwe yên dewlemend ên çandî herî baş dikarin bi demokrasiyê bidin jiyîn. Çand ne tenê rabirdûya gelekî ye, şêweyê

cewherê hebûna wî ye. Eger tu gelekî ji çanda wî bikî, tu ne tenê wî ji şêwe û şikil dikî, her weha tu wî ji ruhê wî yê bûye sedema hebûna wî jî dikî. Ji lewra demokrasî sîstemeke baş a polîtîk e, ji bo gelek karibe tevî çanda xwe wekhev û azad bijî. Pirsgirêkên dînî, etnîk û netewî yên ji ber zordariya netewî dibin, şensa wan heye di nav demokrasiyê de pirsgirêkên xwe çareser bikin û çanda xwe bijîn. Li welat û deverên demokrasiya rastîn tê meşandin, hewceyî bi ti cureyê zordestiyê nîne û ne jî şens tê dayîn wek amûrekî berjewendiyê jî were bi karanîn. Di şûna netewparêziya serdest-bindest de demokrasiyeke yekpare cih digire.

Demokrasî di warê aboriyê de jî alîkariyeke ne piçûk dikin. Eger di civakê de demokrasî bimeşe, nirxên aborî ne di bin destê rêveberiyekê de kom dibin û ne jî tênê talankirin û heta li ber destê ferdê bê kêr jî nayê hîştin. Demokrasî, kara bi hirsa zêde, tembeliya sazî û ferdan, bêberpirsiyarî û musrîftiyê erê nake. Di vî warî de jî mêzîna optîmal bi awayekî herî baş tê danîn. Mêzîna aboriya taybet û ya gelemperiyê zû dereng wê bigihîje nuqteya optîmal. Bi gelek lêkolînan, têkiliya di navbera pêşketina aborî û demokrasiyê de îspat bûye. Bi qasî hilberandineke bi ber parvekirineke adil, bi qasî sermaye razandineke li cih lêkolînên hewce di demokrasiyê de cihê xwe dibînin. Ji bo hilberandin bersiva daxwazên rastîn ên gel bide, hewceyî heye mêzîna di navbera xwestin û hilberandinê de baş bê danîn. Bi vî awayî şens heye, piyasa civakî were damezrandin. Di şûna hevrikiyên têkbir de ruhê pêşbaziyê cih digire. Ji sedemên bingehîn ên krîzan, bê mêzînbûna xwestin-pêşkêşkirin, buha, enflasyon hwd. lîstikên di warê fînansê de divê dakevin asta herî jêr û ji bo çareseriyê hêza xwe nîşan bide. Ji bo bêkartiya sîstematîk wê çareseriyeke bingehîn bibîne.

Di têkoşîna civakî ya demokratîk de divê em hînê bi awayekî taybet nêzî kategoriya ciwanan bibin. Wexta ciwan civakî dibin, bi dafik û xefkên mezin re rûbirû dibin. Ji aliyekî ve civaka kevneşopî ya bavikanî ew xistiye bin bandora xwe û ji aliyê din ve jî bandora îdeolojiya nîzama fermî. Ciwan bi dînamîzma xwe ji nûbûnê re vekiriye, lê li hember bûyerên diqewimin hînê xeşîm e. Di bin bandora civaka pîran de hînê nizane çi rol û kiras lê hatiye birrîn. Li hember hezar hîleyên civaka kapîtalîs ên mirov ji rê derdixînin nikare hilma xwe bigire. Ev rastî hemû didin nîşan ku li derveyî van hemû dafikan, perwerdeyeke li gorî cewhera ciwan ferz e. Perwerdeya ciwanan sebir û xebateke mezin dixwaze. Di berdêla vê de ciwan bi dînamîzm û zîrekiya xwe amadeye destanan bide

nivîsandin. Wexta baş li armanc û rêbazê serwext bibe kar nîne tê de bi ser nekeve. Dema armanc û rêbazê wek hîmê bingehîn ê disîplîna jiyanê bibîne û seferber bibe, sebir û înada xwe kêm neke, dikare alîkariyeke mezin li dozên dîrokî bike.

Di tevgera ciwanan a demokratîk de, pêngaveke bi kadroyên pêşeng ên xwediyê van taybetiyan ji bo serketina têkoşîna civakî ya demokratîk a giştî garantî ye. Tevgereke civakî ya dînamîzma xwe ya ciwanan nebe, şensê wê yê serketinê pir bi sînor e. Di her qonaxa dîrokî de tecrûbeya pîran û dînamîzma ciwanan xwe daye hiskirin. Yên di navbera herduyan de têkiliyeke xurt danîne, şensê wan ên serketinê zêdetir bûye. Ji bo ciwanên îro xeyalên manîdar û mezin, bi derketina sîstemê ji krîzê mumkîn dibe. Ciwantiyeke xeyalên wê nebin, nikare xwe ji rizîn û wendakirina hemû jiyanê xilas bike. Ji bo ciwan karibe gav biavêje, şert e rewşa kaotîk a vê krîza dawî ya sîstema kapîtalîzmê fêm bike. Tevî vê yekê, eger nirxên civakî yên ekolojîk, azadiya cins û demokratîk di xwe de bimehîne wê karibe şensê sereketineke dîrokî zevt bike û ji aliyê din ve, eger xwe rast ava bike wê karibe di avakirina civaka bêrîkirî de bibe xwediyê roleke rastîn. Her tişt bi pêngava civakî û dîrokî ya ciwanan a rast û durust ji nû ve bidin destpêkirin, wê diyar bibe.

Şêweyên rêxistin û çalakiyan ên demokrasiyê herî hindik bi qasî tarîfên wê yên cewherî girîng in. Di tarîfa cewherî de armanc baş hat rohnîkirin. Her weha şêweyê çalakî û rêxistinê wek amûrên bêyî wan nabin, divê rast werin tarîfkirin. Eger heta armanc û amûr baş li hev neyên anîn û mêzîn di navbera wan de baş neyê danîn, di demokrasiyê de gavavêtin zehmet e. Demokrasiyên xwe tenê dispêrên armanc û amûran dişibin seqetekî bi yek lingî. Gelo bi yek lingî heta ku û bi çi hêzê mirov dikare biçe?

Wek şêweyê bingehîn ê rêxistinbûneke demokratîk, dibe ku di asta jor de kongreyek hebe û li jêr wê, komîn, kooperatîf, rêxistinên civakî yên sivîl, saziyên mafê mirovan û rêxistinên belediyan cih bigirin. Li gorî mijarê û berfirehbûnê, pêdivî bi gelek rêxistiniyan heye. Demokrasî civakên herî bi rêxistin dixwaze. Rêxistin ji bo daxwazên civakê bînin ziman bêyî wan nabe. Civaka xwe bi rêxistin neke nikare demokratîk bibe. Pêwîst e di warê siyasî, civakî, aborî, çandî û hemû qadan de rêxistinên li gorî xwe biafirînin. Partî wek rêxistinên siyasî yên bingehîn dest ji wan nabe. Rêxistinên civakî yên sivîl ji bo qada civakî şêweyê sereke yê rêxistinbûnê ne. Di warê maf û huqûqî de saziyên mafê mirovan, baro û weqif girîng in. Rêxistinbûna di warê aborî de jî bi kooperatîf, komên xebatê û gelek

xebatên ji bo gelemperiyê mîna ragihandin, bazirganî, malî û pîşesaziyê dibin. Pirsgirêkên saziyên tendurustî û perwerdeyê yek ji qadên ku herî hewceyî bi çareseriyê hene. Ji bo perwerdeya giştî ya gel bi rêxistinkirina huner û sporê jî qadeke xebatê ye, dest jê nabe. Li gundan muxtariyet - keyatî - û civata rûsipiyan ji amûrekî dewletê wêdetir divê wek amûrekî demokratîk were bi rêxistinkirin. Ji bo her gundî "maleke çandê ya gel" şert e. Li bajaran jî bi heman awayî rêxistinên komîn divê di nav girseyên gel de maneya xwe bibînin. Dîsa civata bajaran saziyek e, dest jê nabe. Di navbera bajaran de yekîtiyên belediyan di asta herêmî de manîdar in. Ev hemû sazî û rêxistin divê xwe li saziya herî bilind a biryarê Kongra Gel temsîl bikin. Kongreyên Gel modelekî rêxistinî ne, ji bo çareseriya pirsgirêkên bingehîn ên gelan dest jê nabe. Bêyî Kongreyên Gel nabe em behsa demokrasiyê bikin.

Divê mirov Kongreyên Gel, ne alternatîfên dewletê, ne jî wek saziyên bi ser dewletê ve bibîne. Dewleta gel nîne û nabe hedefek wê hebe ji bo şûna dewletê bigire. Dewlet wek pirî caran em li ser sekinîn, rêxistineke kevin û bingehîn a li jorê civakê ye. Bi awayekî demokratîk pêk nayê. Li ser rêya kevneşopiyê û bi wezîfedarkirinê dimeşe. Civaka jor dikare di nava xwe de demokrasiyê pêk bîne. Ji vê re, mirov dikare bibêje; demokrasiya çîna jor. Ev demokrasî rastiya dewletê dinuxumîne û vedişêre. Di piraniya modelên komarê yên Rojavayî de demokrasiyên bi vî rengî dewletê esas dibînin. Berê dewlet paşê demokrasî; bêyî dewletê nikarin demokrasiyê bifikirin. Di demokrasiya gel de îqtîdar-dewlet hedef nîne. Demokrasiya dewletbûnê ji xwe re bike hedef bi destê xwe dawî li xwe aniye. Di pêvajoya damezrandina dewletên hemdem ên Ewrûpayê, DYE û Sowyeta Rûsyayê de demokrasiyên demkurt pêk hatine. Lê wexta bûne dewlet, demokrasiyên dema damezrînê hînê nebûne sîstem bêqîmet kirine. Di dîrokê de bi piranî rewşa qewimî ev e. Civaka jor her tim ji demokrasiyê tirsiyaye.

Ji bo krîza roja me ya îro li dawiyê were hîştin, nabe ku sîstem li dijî îradeya gelan be. Ji ber ku tevlîbûna gel ji bo çareseriyê şert e. Bi tevlîbûnê re gel demokratîk dibe. Ev jî bêyî nîzama kongreyê nameşe. Civaka dewletdar a kapîtalîst di sedsala 19. û 20. de belkî dikarîbû otorîteya xwe bi kongreyên gel re par ve neke. Lê dewletên îro di krîzê de, bêyî gelan û bêyî însiyatîfê bidin wan ji bo çareseriyê nikarin gavekê pêş de biavêjin. Şert û mercên giran ên krîzê, tevlîbûneke berfireh a saziyên gel ferz dike. Ji lewra di sedsala 19. û 20. de tevlîbûna gelan maneyek wê ya bi sînor hebû. Lê di şertên îro

de tevlîbûneke gelan dikare bi kongreyên gel maneya xwe bibîne. Kongre bi van taybetiyên xwe ne partî ne, ne jî nîv dewlet in. Her du jî nîn in, saziyên fonksiyonel ên gel in ku di şertên dîrokî de derketine. Piştî mezhebên kapîtalîzmê - sosyalîzma reel, sosyal demokrasî û rizgariya netewî - gel hînê ji dewletê dûr çûn û ketin pêvajoya kongreyê. Bi tevahî dewlet nayê redkirin, lê wek berê jî nayê qebûlkirin. Ji lewra di çarçoveya prensîbên diyarkirî de, ji bo derketina ji krîzê dikarin di çareseriyê de bi hev re cih bigirin. Dewlet her diçin piçûktir dibin û modelên nû yên dewletan derdikevin. Ev yek jî hewcebûna bi modela kongreyê dide nîşan.

Dîsa li welatên ku pirsgirêkên giran ên netewî hene, dibe ku modelên kongreyê mîna amûrekî tampon roleke girîng bilîze. Ji bo gelek kom û cemaetên din, dibe ku di asta jêr de hewceyî bi kongreyan hebe. Ji ber taybetiya kongreyan a ku her cure partî, dîtin û baweriyê li bin banê xwe tîne cem hevdu, xuya ye, bêyî wan demokrasî nameşe. Wek encam, mirov dikare bibêje; kongre çareseriya xwe mîna alternatîfekî dewletê danayne, berovajî pirsgirêkên giran ên dewlet bi serê xwe nikare ji heq were der, di modelên çareserkirinê de li cihê dikarin li hev bikin diçin çareseriyê.

Bi qasî piraniya rêxistinan, demokrasiya navxweyî ya rêxistinê jî bi qasî pîvanên giştî yên demokratîk girîng e. Rêveberî û pêkhatina demokratîk a rêxistinan esas e. Gelên rêxistinên wan ên demokratîk nebin, demokrasiya wan jî nabe. Divê di bin kontrola gel de be, timî bi hilbijartinê - herî kêm salê carekê - demokrasiya rêxistinê were nûkirin û ev bi giştî ji bo demokrasiyan garantiyeke têkûz e.

Mirov heta li şêwazên çalakiyên demokrasiyê serwext nebe, pir zehmet e, mirov wan bi cih bîne. Demokrasiya bê çalakî wek mirovê bêdeng e. Çalakî zimanê demokrasiyê ye. Her tevgera gel, her xebata gel çalakî ye. Ji awayekî basît ber bi awayekî tevlîhev; wextê şert gihîştin divê rêzeke çalakî wek xwepêşandan, civîn, meş, hilbijartin, mîtîng, protesto, grev û hwd. heta berxwedanên yasayî û serhildan di dem û cihê xwe de werin kirin; ev nebin demokrasî nabe. Bi taybetî wexta daxwazên gel ji nedîtî ve werin, armanc, pîvan û gelek saziyên demokrasiyê werin texrîbkirin, çalakî amûrên mecbûrî yên çareseriyê ne. Rêxistin û gel ku nikaribin bikevin nav çalakiyê, nikarin demokratîk bibin. Ya rastîn, rêxistin û gel ku nikaribin qabîliyeta xwe ya çalakbûnê nîşan bidin, mirine. Çalakî bi rêxistinan dikarin bibin, naxwe çalakiyên bê rêxistin, tewş in û diyare bi ser nakevin. Gel çiqas bi rêxistin bibin, ew çend jî wê çalak bibin. Divê mirov timî çalakiyan wek berxwedan û protesto nebîne. Çalakiyên civakî

yên sivîl piraniya wan erênî û çêker in. Têgihîştina çalakiyên pozîtîf esas in.

Şer û serhildanên gel kengî dikarin bikevin rojevê? Ev çalakiyên bingehîn ên pirî caran têne îstîsmarkirin û li dijî berjewendiyên gelan têne bi karanîn, divê bersiveke rast ji bo şêwaz û awayê wan were dayîn û wî wextî di dîroka gelan de dikarin bi serketin di fitil û dagerînên girîng de rol bilîzin. Şer û serhildan, eger hemû awayên din ên çalakiyan encam nedin û pirsgirêkên bingehîn kûr bibin, maneya wan heye. Bi taybetî, wexta hêzên şer-îqtîdarê ji bilî zorê ti rêya din a çareseriyê nehêle, gelê jî di şûna li bin bandora koletiyeke piçûkketî de bijîn divê karibin ji bo şer û serhildanê xwediyê hêzê bin. Wexta qanûn bi awayekî wekhev neyên bi cihanîn; eleqe ji rola çareseriyê ya demokrasiyê re neyê nîşandan; hemû çalakiyên aştiyane werin pûçkirin; dibe ku şer û serhildan xwe ferz bikin. Ev her du sînor dikarin bersiva hewce bidin; eger dewlet maneya pêwîstî pê heye nede çareseriya demokratîk, bi berpirsiyarî şens nîşan nede û di destê gel de jî wekî din amûrekî zorê pê bike nemîne, wek li cem piraniya gelan hatiye dîtin, serhildanên hindik, pir xwînrij, an jî dem kin û demdirêj dikevin rojevê.

Armanca her şer û serhildanê cihêbûn û veqetîn nîne; berovajî, ji bo rê li ber yekparebûneke demokratîk veke. Şerên rizgariya netewî û serhildanên bi armanca veqetînê ku berê dihatin kirin, dema wan derbas bû. Rizgariya netewî û serhildanên ku bi armanca damezrandina dewletê dihatin kirin, di dawiyê de bûn yek ji dûvikê kapîtalîzmê. Vê yekê ti pirsgirêka gelan çareser nekiriye, berovajî dikare hînê giran bike. Xuya ye, em nikarin bibêjin pirsgirêkên gelê Ereb ê xwedî 22 dewlet kêm bûne, hînê girantir bûne. Ji lewra em dikarin şer û serhildanên dema nû wiha rave bikin; armanca serhildan û şerê dema nû wê dewlet nebe; wê ji aliyê şêwe û cehwer demokrasiyê baş bixebitîne. Em rola wan a bingehîn wer dikarin destnîşan bikin. Eger cihêbûn û veqetîn xwe ferz bikin, mirov dikare manîdar bibîne. Dilê gelan her tim li aliyê yekparebûna demokratîk e. Li her du aliyan, netewparêzên dijwar çiqasa veqetîn û şîdetê ferz bikin jî di van şertan de divê gel jî herî kêm şîdetê û yekparebûna demokratîk bixwazin. Wexta dem nehatibe û şert nestewiyabin, serhildan û şer çiqas xeter bin, dema ji wan pê ve rê nemîne û serî li wan neyê dayîn jî ew çend bêşerefî ye û mirin e.

Di demokrasiyan de pirsgirêkeke din a di warê çalakiyan de parastina rewa ye. Di parastina rewa de divê tevger çawa bibe? Parastina rewa tenê di rewşên dagirkeriyê de manîdar dibe. Gava li

ser gelekî dagirkerî, mêtingerî, yan jî cûreyekî din sîstema zordest were damezrandin, wê wextê dagirkerî heye. Çawa ku hêzeke biyanî dikare bi serê xwe dagir bike, her weha dikare carnan nîv bi nîv bi hêzên xwecîh jî bike. Hedef dawîanîna li dagirkeriyê û damezrandina demokrasiyê ye. Eger hêza dagirker biyanî be, ji parastina rewa re demokratîk netewî were gotin rastir e. Dîsa di van şertan de mercên şer û serhildanê derketine holê. Lê car din şerê rizgariya netewî yê klasîk esas nayê dîtin. Her çend aliyê wê yê netewî hebe jî, bi sedema taybetiyên serdemê şerekî parastinê ji bo yekparebûneke demokratîk a berfireh durustir e. Şer û serhildanên bi vî rengî hem li bajaran, hem jî li çiyan an yek an jî bi hevdu re têne meşandin. Li gelek welatên Asya, Efrîka û Emerîkayê hemû şêweyên wan hatine ceribandin. Li şûna ku armanc dewlet be, li gorî taybetiyên serdemê yên çareseriya rojane, armanc wek demokratîk were destnîşankirin, li cih e. Her çend taybetiya wê ya netewî hebe jî, bi sedema li jor dagirker û hevkarên xwe bi hev re tevdigerin, ya rast ew e; gel jî bi awayekî yekpare di bin sîwana demokrasiyê de li yek bereyî şer bidin meşandin. Di rewşên bi vî rengî de divê şêwe û awayên din ên çalakiyên aştiyane jî heta dawiyê werin ceribandin. Hedefa sereke ya bi rêxistinkirin û rêvebirina parastina rewa jî ev e; divê demokratîkbûna gel destek bike, pêş de bibe û rêxistina gel a demokratîk biparêze. Wexta klîkên şer û zordestan hedef digire, divê hebûna muxatebên çareseriya demokratîk jî ji bîr neke. Rast nîne, hemû dewletê û netewa pê ve bike dijberê xwe, ev stratejiyeke rast nîne. Dîsa rast nîne wek taktîk her biyanî, mirovê netewê dagirker û saziyên wê mîna hedef were nîşandan. Wexta hedefên xwe destnîşan kirin, divê hedef teng bin, lê karibe jê encamê bigire, derfetên çareseriya demokratîk ên gel zêde bike û hebûna wî biparêze. Eger tevgera parastina rewa û rêxistiniya wê heta hêzên ji çaresernebûn û dagirkeriyê berpirsiyar îqna bikin ku şerê bi awayekî neheq dikin nayê meşandin û wan bikişînin rêya çareseriya demokratîk, divê têkoşîna xwe bi dijwarî bikin û dibe ku ev bibe yek ji amûrê bingehîn ê derketina ji krîzê.

Li derveyî rewşên awarte di şert û mercên asayî de divê pirsgirêka gelan a xweparastinê ji nedîtî ve neyê. Di nav şertên krîzê de li derveyî ewlekariya giştî, parastina xwe bi xwe hê jî girîng dibe. Pîvanên ewlekariyê yên klasîk ên îqtîdara dewletê ji gelek aliyan ve nikarin bersiva ewlekariya gel bidin. Ji ber ku îqtîdara dewletê dikeve destê hêzên dîktator û olîgarşîk, ewlekariya bi sînor a huqûqê jî ji holê radibe. Mîna ku dewlet were dabeşkirin. Gelek çete û

mafyayên xwe digihînin seriyekî navenda dewletê, derdikevin holê. Li ser gel teroreke dijwar dimeşînin. Di rêjeya guneh û sûc de sînor namîne. Di lêgerîn û lêpirsîna heq de serî li hêzên duyemîn têne dayîn. Huqûq êdî dibe mîna metayê. Hêzên ewlekariyê yên dewletê bi xwe dibin pirsgirêka ewlekariyê. Di pêvajoyên krîzan de li gelek welatan û di roja me ya îro de jî li hemberî pirsgirêkên ewlekariyê yên bi vî rengî, parastina xwe bi xwe hewcebûneke elzem e. Ji sedî sed divê hêzên xweparastinê bêne damezrandin.

Hêzên parastina gel ji dijberiya dewletê, yan jî alternatîfbûna hêzên wê wêdetir, bersiv dide hewcebûna bi ewlekariyê ya dewlet pêk neyne, tê de kêm dimîne û heta rewşa dewletê ya bi xwe dibe sedemê bê ewlebûnê. Yekîneyên parastina gel, ne artêşa rizgariya netewî ye, ne jî yekîneyên klasîk ên gerîlla ne. Ji ber ku gerîllayên rizgariya gel û artêşa rizgariya netewî bi giranî hedefa wê dewlet û îqtîdara wê ne. Dixwazin pirsgirêka îqtîdarê çareser bikin. Yekîneyên parastina gel nabe ku hedefek wê ya taybet ji bo damezrandina dewletekê û hedefa wê ya îqtîdarê - ji bilî mecbûriyetên objektîf - hebe. Mirov wezîfeyên wan ên bingehîn weha dikare destnîşan bike; wexta mafên gel ên qanûnî û destûrî hatin binpêkirin û dadgeriyê wezîfeya xwe nekir, wê mafên gel biparêzin; hewldanên demokratîkbûnê misoger bikin; dijberî êrîşan pêşengiya berxwedanê bikin; wê hebûna hawîrdor û çandî biparêzin.

Yekîneyên parastina gel li bajaran û reşahiyê dikarin bi awayekî guncaw xwe bi rêxistin bikin. Bi awayekî din mirov dikare ji wan re bibêje milîsên parastina gel. Wezîfeyên hêzên asayîşa herêmî bi cih neynin, ew dikarin tê de rol bilîzin. Ji ber ku şertên krîzê avahiyên civakî timî ji hev de dixîne û naverast tevlîhev dibe, xweparastina gelan û xwerêvebirina wan dibe yek ji mijarên sereke yên girîng. Ji bo derketina ji krîzê wexta li rêyên demokratîk hat gerîn, di vê pêvajoyê de ji bo bê ewlebûna zêde dibe li dawiyê were hîştin, hêzên parastina gel dikarin rol bilîzin.

**2- Azadkirina cinsiyetparêziya civakî**

Tevî ku cewherê demokratîkbûyînê ye, yek ji rastiya ku divê em bi serê xwe li ser rawestin mijara jinê ye û nîzama nakokî û têkiliyên li hawîrdorê ye. Ilmên civakî çiqas kêm û dereng li ser mijarên komîn û demokratîk rawestiyane, ew çend jî û heta jê zêdetir dûrî mijara jinê mane. Mîna ku bûyerên li dora jinê û serhatiyên wê pir pêdiviyên xwezayî be û ev têgihîştin xwe di hemû zanistan de nîşan dide û di helwestên siyasî û exlaqî de wek pêşferaziyeyekê tê qebûlkirin. Ya herî mirov xemgîn dike, jin bi xwe jî hîn bûye vê

paradigmayê xwezayî bibîne. Çewa ku statuyên bi hezarê salan li ser gelan hatine ferzkirin û pîrozkirin xwezayî têne dîtin, çend qat zêdetir li hemû zêhniyet û tevgera jinê jî mîna hatibe kolan û niqirandin. Çendîn gelan dikin jin, jin jî dibin gel. Wexta Hîtler dibêje; "Gel mîna jinê ne" vê rastiyê destnîşan dike. Em dema hûrûkûr nêzî mijara jinê bibin, emê bibînin ji cinsekî biyolojîk wêdetir wek nijad, çîn û netewekî pê re hatiye danûstendin. Lê wek nijad, nifş û yan jî netewê herî zêde hatiye pelixandin. Divê mirov baş zanibe, ti nifş, çîn, an jî netew mîna jinê li koletiyeke sîstematîk nehatiye qewimandin.

Dîroka koletiya jinê hînê nehatiye nivîsandin. Dîroka wê ya azadiyê jî li benda nivîsînê ye. Dîroka jinê ya di tariyê de hatiye hîştin, bi qasî koletiya jinê ya kûr, ji nêz ve têkiliya wê bi îqtîdara dewletparêz û hiyarerşiya di civakê de bilind bû, heye. Piştî ku jin hînî koletiyê hat kirin, di civakê de hiyarerşî hat damezrandin û di nav beşên din ên civakê de rê li ber koletiyê hat vekirin. Kolebûna mêran piştî koletiya jinê tê. Koletiya cins cudahiyên wê ji koletiya çîn û netewan heye. Koletiya cins tevî zordestiyeke hişk û nermik bi derewên hisbarkirî tê rewakirin. Cudahiya biyolojîk wek sedemek ji bo koletiya wê tê bi karanîn. Hemû karên dike bi gotina "karên pîrekî" sivik têne dîtin. Ketina jinê ya nav gelemperiya civakê ji aliyê dînî û exlaqî ve wek şerm tê qebûlkirin. Her ku diçe ji çalakiyên girîng ên civakî dûr tê xistin. Xebatên siyasî, civakî û aborî çendîn ketin destê hêza serdest mêran, qelsî û lawaziya jinê mîna saziyekê cih digire. "Cinsê qels" mîna baweriyekê tê parvekirin.

Piştî ku hemû derfetên maddî û manewî ketin destê mêr, êdî jin dibe ku li destê wî binere; carnan lavahiyan dike li ber digere; carnan hemû şerefa xwe binpê dike serî li ber çarenûsa xwe ditewîne û pirî caran jî dixeyide û xwe bi bêdengiyeke mezin dinixumîne. Bi gotineke din mirov jê re dikare bibêje miriya dijî. Em bi çend teşbîhan dikarin rastiyê hê berçav bikin. Teşbîha me ya yekemîn, çivîka di qefesê de ye. Çivîk carnan mîna kanaryayê bi xemil û xêz tê kirin, carnan mîna bilbil deng xweş tê kirin. Her kes li gorî xwe dişibîne çivîkekê. Pirî caran jê re çivîka serçe tê gotin. Teşbîheke din, mîna pisîkek ku timî dike miyaw miyaw û li binê bîreke bêbinî hatibe hîştin. Bi kurtêlan xwe xwedî dike û li ber destê xwediyê xwe baş kedî dibe. Dibe ku teşbîhên me hinekî çor bin, lê ji bo em bi awayekî ilmî kûrbûna vê koletiyê bibînin, hewceyî bi hewldanên wêjeyî û piralî hene. Civakeke mezin cinsparêz hatiye afirandin. Helwesta rastîn a çor û hişk di vir de ye; mêr bi awayekî yekalî dest

diavêje jinê û ev yek mîna qehremaniyekê tê pêşkêşkirin. Mêr heta dawiyê bi vê kêfxweş dibe û serbilind e, jin jî bi kevirkuştinê heta hepiskirina di kerxanê de û heta careke din nikaribe derkeve nava civakê bi gelek helwestên bêrehim re rûbirû dimîne. Dîsa eger bi awayekî çor rave bikim, mêr bi penîsê xwe heta dawiyê serbilind e, lê jin ji ber yê xwe fedî dike. Cudahiyên pir basît ên bedenî li dijî jinê hatine bi karanîn. Jintî bi xwe bûye hebûnek jê were fedîkirin. Hisa evînê goya pîroz e, mêr bi awayekî yekalî û çavsor li ser jinê ferz dike. Zarokên keçik her tim bêqîmet û heqîr hatine dîtin.

Pirsa divê were kirin ev e; gelo çima ev çend koletiyeke kûr? Bersiva wê ji sedî sed bi rastiya îqtîdarê ve girêdayî ye. Îqtîdar bi awayekî xwezayî koletiyê dixwaze. Eger sîstema îqtîdarê di destê mêr de be, ne tenê beşek ji cureyê mirov, divê tevahiya cins li gorî îqtîdarê reng bigire. Xwediyên îqtîdarê çawa sînorên dewletê mîna yê xaneyê dibînin û her kirinê di navê de ji xwe re heq û rewa dibînin, îqtîdara mêr a di nav sînorên malê de ku mîkro modela dewletê ye, ji bo xwe her kirinê - hewce bibîne mirin jî di navê de - heq û rewa dibîne. Jina malê jî ew çend milk û malekî kevin û kûr e, bi hiseke bê sînor a mulkiyetê dibêje; "pîreka min e." Jin - li ser navê zewacê jî - nikare îdîayeke piçûk a heq jî li ser mêr bike. Lê mêr bê sînor dikare li ser jinê û zarokan doza heq bike. Divê mirov dîsa li çavkaniya mulkiyetê di nava malê de bigere û di tasarufa li ser jinê de bibîne. Di çavkaniya mulkiyetê de jina kolekirî heye. Koletî û mulkiyeta li ser jinê hatiye danîn pêl bi pêl li tevahiya civakê tê belavkirin. Bi vî awayî her his û ramana koledar û mulkparêz di tevger û zêhniyeta ferd û civakê de tê bi cihkirin. Di vê çarçoveyê de civak tê wê astê ku li gorî avahiyên dewletparêz û her cure hiyarerşîk, amade bibe. Ev jî tê wê maneyê ku her cure avahiyên ji wan re şaristaniya çînî tê gotin bi awayekî hêsa û rewa dikarin hebûna xwe dewam bikin. Ji lewra ya tenê wenda dike jin nîne. Ji bilî kulm û misteke dewletparêz û hiyarerşîk, hemû civak wenda dike.

Ji bo jinê demên krîzê yên taybet pir girîng nînin. Jixwe jin timî di nav krîzê de ye. Wexta jin were gotin, yanî nasnameya bi krîz tê îfadekirin. Roja me ya îro di kaosa sîstema kapîtalîst de jina tenê hêvî dide, hindik be jî rastiya wê hatiye rohnîkirin. Femînîzm kêm be jî rastiya jinê di dawiya çaryeka sedsalê de eşkere kiriye. Di kaosê de, bi rohnîkirinê şensê guhertinê yê her rastiyê heye, lewma her gava ber bi azadiyê ve were avêtin dikare rê li ber pêşketinên hêja veke. Ji krîza roja me ya îro, azadiya jinê dikare bi serketinê derkeve.

Azadiya jinê, divê li gorî tarîfa xwe, çarçoveyeke rast bibîne. Azadî û wekheviya giştî ya civakî dibe ku yekser ji bo jinê nebe azadî û wekhevî. Hewldan û rêxistiniyeke xweser şert e. Tevgera giştî ya demokratîkbûyînê dikare ji bo jinê derfet û îmkanan bide, lê xweber demokrasiyê nayne. Divê jin bi xwe, ji bo armancên demokratîk û rêxistiniyê hewl bide. Beriya her tiştî hewceyî bi tarîfeke azadiyê heye ji bo bersivê bide koletiya bi jinê hatiye daqurtandin. Sîstema kapîtalîst ew çend vîzyoneke mezin û cîhaneke faraziyan xistiye şûna rastiyê, çalakiyeke herî zêde jinê piçûk bixîne (mînak pornografî) bi azadiyê re heman tişt û wekhev dibîne.

Her çend di hewldan û xebatên femînîstan de nuqteyên girîng hebin jî, hê nikarin ji mejiyê demokrasiyên ku navenda wan Rojava ne, derbas bikin. Şêweyê jiyanê yê di bingeh de kapîtalîzm heye baş fêm nekirine. Lewra nikarin li dawiyê jî bihêlin. Rewş, têgihîştina şoreşa sosyalîzmê ya Lenîn bi bîr dixîne. Tevî ew çend hewldan û gelek destketiyan, Lenînîzmê nekarî xwe xilas bike ji bo li baskê çepê nebe alîkarekî baş ê kapîtalîzmê. Heman tişt dibe ku bi serê femînîzmê de jî were. Ji ber ku bingehekî xurt ê rêxistinî nîne, felsefeya xwe pêş de nebiriye û zehmetiyên mîlîtaniya jinê, îdîaya wê qels û lawaz dike. Dibe ku nikaribe "sosyalîzma reel" a jinê jî pêk bîne. Lê ji bo balê bikişîne ser pirsgirêka jinê gavavêtineke ciddî ye.

Bêguman, wek her cureyekî cins xwezayek jinê jî heye. Ji civakîbûyînê jî wêdetir her roja diçe biyolojî îspat dike ku jin wek cinsekî biyolojîk jî hebûneke navendî û çavkanî ye. Bi kurtî bedena jinê ya mêr jî di hundurê xwe de dihewîne, lê ya mêr a jinê di hundurê xwe de nahewîne. Berovajî pirtûkên pîroz, ne ku jin ji mêr, mêr ji jinê zêde bûye. Kromozonên jinê ji yên mêr pirtir in. Xwînbûyîna jinê ya serê mehan ku jê re wek kêmasî û şermekê tê hesibandin, têkiliyeke wê ya nazik bi xwezayê re heye. Xwîn herikîna ji malzarokê, divê wek herikîneke jiyana xwezayî ya hê neqediyaye were fêmkirin. Damara sereke ya jiyanê hînê neqediyaye û dewama wê, divê wek îradeya jinê were fêmkirin. Mijarên mîna nexweşiyên jinê têne bi navkirin, ya rastîn nîşaneyên jiyanê ne. Ji ber ku jin navenda jiyanê temsîl dike. Pirsgirêkên tevlîhev ên jiyanê di malzaroka jinê, zikê wê de diqewin. Zarokê ji wê dibe û navika pê ve mîna xeleka dawî ya jiyanê be. Li hemberî vê rastiyê mêr wek parçeyek an jî laqekî jinê xuya dike. Yek ji îspatên vê rastiyê, hisa hesûdî û çavnebariya zêde ya mêran e. Jin zêde ji xwe piştrast disekine, lê mêr di cihê xwe de ranaweste, nahewe. Mîna belayekê li dora jinê digere, natebite. Ev hemû çavdêrî nîşan didin ku bedena

jinê hêlîna qelsiyan nîne, berovajî navenda hebûnê ye. Ji lewra divê jin xwe ji navlêkirinên çanda mêrên serdest ên mîna "nexweş, kêm" tavilê xilas bike û red bike. Pêwîst e berovajiyê wê nîşanî mêr bide. Jixwe em wexta dibêjin; divê jin ji bedena xwe piştrast be, em vê rastiyê destnîşan dikin.

Di encamê de ev pêkhatina fizîkî ya jinê mejiyê hisî li cem xurtir dike. Mejiyê hisî ew mejiye ji jiyanê qut nabe. Empatî û sempatiyê bi awayekî xurt di xwe de dihewîne. Wexta li cem jinê mejiyê analîtîk pêş bikeve jî bi hebûna mejiyê xwe yê hisî bi jiyanê ve hê girêdayî ye, giran e, xwedî wê qabîliyetê ye, texrîbkar nîne. Mêr qasî jinê ji jiyanê fêm nake. Jin bi xwe jiyan e (Di zimanê Kurdî de ku ji koma zimanê Aryen e, jîn bi maneya jiyanê ye), qabîliyetek e; di her warê jiyanê de ji durûtiyê dûr e, nişmî ye û zelal e. Ev qabîliyeta jinê xurt e. Em vê yekê ji jiyana xwe ya şexsî jî baş dizanin.

Sifetên mîna fahîşe, fenbaz, çilvir, dejenereker û hwd. bi awayekî bêrehim ji aliyê mêr ve lê hatine kirin. Ti jin wexta di hal û rewşa xwe de be, hewceyî bi fenbazî û fahîşetiyê nabîne. Bedena wê, hebûna wê ya biyolojîk li gorî vê yekê nîne. Afirînerê rastîn ê fenbazî û fahîşetiyê mêr e. Em baş dizanin, di dîrokê de yekemîn kerxaneya tê zanîn, BZ di salên 2500 de li paytexta Sumerê Nûppûrê bi navê "mûsaqatîn" ji aliyê îqtîdara mêran ve hat vekirin. Tevî vê yekê, bêyî ku fedî bike, mîna fahîşetî afirîneriyeke jinê be, timî di rojevê de digire. Berhem û gunehkariya bi xwe afirandiye, dixe stûyê jinê û bi têgihîştineke namûsê ya sexte ti lanet, lêdan û kuştinê ji ser serê jinê kêm nake. Piştî vê tarîfa me li yên berê zêde kir, em wek encam dikarin bibêjin; divê jin beriya her tiştî li dijî êrîşên îdeolojîk ên mêran baş rawest e. Li dijî îdeolojiya serdest a mêran, divê bi îdeolojiya azadiyê ya jinê, femînîzm û çavkaniya wê kapîtalîzmê li dawiyê bihele, xwe bi sîleh bike û têkoşînê bimeşîne. Divê li dijî zêhniyeta îqtîdarparêz a mêrê serwer, zêhniyeta xwezayî ya jina azadîxwaz xurt bike û bizanibe di qada îdeolojîk de bi ser bikeve. Divê neyê ji bîrkirin, teslîmiyeta jintiyê ya kevneşopî fizîkî nîne civakî ye. Ji koletiya pê dane vexwarin tê. Ji lewra divê beriya her tiştî di qada îdeolojîk de his û ramanên teslîmbûyî têk bibe.

Azadiya Jinê, wexta bikeve qada polîtîk, divê baş bizanibe wê bi şerekî çetîn û dijwar re rûbirû bimîne. Heta di qada polîtîk de hînî bi destxistin û qezencê nebe, ti destketî mayînde nabin. Serketina di warê polîtîk de nayê wê maneyê ku jin dibe dewlet. Berovajî, têkoşîna li dijî avahiyên dewletparêz û hiyarerşîk, hewce dike ku

avahiyên siyasî yên hedefa wan civaka okolojîk azadiya cins, demokrasî ne pêk bîne. Hiyarerşî û dewletparêztî herî zêde bi xwezaya jinê re li hev nakin. Ji lewra, tevgera azadiya jinê divê ji pêkhatiyên antî-hiyarerşîk û avahiyên li derveyî dewletê re rola pêşeng bilîze. Eger bizanibe di qada polîtîk de bi ser bikeve, wê di heman qadê de koletiyê jî hilweşîne. Ji bo têkoşîna di vê qadê de divê rêxistinên jinê yên demokratîk û têkoşîna wê berfireh be. Her cure civaka sivîl, mafê mirovan, rêveberiyên herêmî yên demokratîk ji bo xwebirêxistinkirinê qadên têkoşînê ne. Mîna di sosyalîzmê de, rêya diçe wekhevî û azadiya jinê di têkoşîneke serketî ya demokratîk û berfireh re derbas dibe. Tevgera jinê ya demokrasiyê bi dest nexîne, nikare azadî û wekheviyê bi dest bixe.

Di warê civakî de ji aliyê azadiyê ve pirsgirêka herî girîng rastiya malbat û zewacê ye. Ev mijar mîna bîreke bêbinî ye. Ev saziyên em behsa wan dikin, ji bo jinê bi zêhniyeta civaka heyî ji qefesekê derbasî qefeseke din dibe, hem jî ciwantiya xwe ya xama jî neçar radestî zêhniyeteke serjêker û qesab dike. Divê mirov malbatê wek siya civaka jor - civaka îqtîdarê - a di nav gel de bibîne û wek saziya sîxur û ajan binirxîne. Nûneriya îqtîdara di nav civakê de mêr di nav malbatê de dike. Ya rastîn wexta jin dizewice dibe kole. Mirov saziyeke din nikare bifikire ku bi qasî zewacê jinê dike kole. Koletiyên herî dijwar bi vê saziyê dest pê dikin û di nava malbatê de rehên xwe berdidin. Em bi giştî behsa bihevrebûnên hevaltî û jiyana hevpar nakin. Ev mijarek e, li gorî têgihîştina wekhevî û azadiya her kesî dikare bibe xwediyê maneyekê. Em behsa malbat û zewaca klasîk a bi cihbûyî dikin. Ev rewşa em behs dikin, ji sedî sed jinê dike mulk, di warê siyasî, zîhnî, civakî û aborî de paş ve dixîne û dike ku careke din jin bi hêsanî bi ser xwe ve neyê. Eger hîmên jiyana hevpar a li ser wekheviya cins, azadî û demokrasiyê di lêpirsîneke radîkal re neyên derbaskirin, ji ber tengasiyên ajoyî, ferdî û têgihîştinên kevneşopî yên malbatê zewac û têkilî bibin, dibe ku li ser rêya jiyana azad weke ji rêderketinê roleke xeter bilîzin. Hewceyî bi van têkiliyan nîne, ya girîng divê mirov qadên polîtîk, zêhnî û demokratîk çareser bike, azadiya cinsiyetê tam pêk bîne û li gorî vê yekê îradeya jiyana hevpar bi cih bîne.

Di roja me ya îro de mijara herî zêde mîna benîştan tê cûtin eşq e û ew jî di dîroka xwe de ti car evqas rezîl nebûbû û ji cewher û naveroka xwe dûr neketibû. Di ti serdema dîrokê de eşq evqas neket ber pê û lingan. Ji eşqên kêliyekê bigirin ji têkiliyên herî xeter û bê xwê re eşq tê gotin. Jixwe ti têkilî ji van çêtir nikare têgihîştina

jiyana kapîtalîzmê nîşan bide. Ya rastîn, eşqên serdema me, mikurhatinên pir eşkere ne, û nîşan didin; zêhniyeta ku sîstema serdest li ser civak û mirov ferz dike li qadên herî pîroz ketiye çi rewşê. Yek ji wezîfeyên zehmet ên şoreşgeriyê ji nû ve geşkirina eşqê ye. Eşq kedeke mezin, rohnîbûna zêhniyetê û hezkirina mirovatiyê dixwaze. Yek ji şertên girîng ên eşqê; divê tu li sînorê zanyariya serdemê bî. Şertê duyemîn; divê tu li dijî çavsoriya sîstemê xwedî helwesteke mezin bî. Ya sêyemîn; divê tu xwedî exlaqekî wisa bî bizanibî bêyî azadiyê mirov nikare li rûyê hevdu binerin. Ya çaremîn; divê ajoyên cinsî li gorî pêdiviyên sê nuqteyên me destnîşankirî xwe rabigire. Yanî ku tu negihîjî zanyariya ajoyên cinsî, exlaqê azadiyê û bi pêdiviyên têkoşîna eskerî-polîtîk ve girê nedî, her gava were avêtin înkara eşqê ye. Kesên bi qasî çivîkekê azad derfetên wan ên hêlîn danînê nebin, nikarin behsa evînê, têkiliyê û zewacê bikin. Ya rastîn, eger behs bikin, wê wextê xwe radestî koletiya nîzama civakî ya serdest kirine û diyare qîmeta nirxên serberziyê yên têkoşîna azadiyê nizanin.

Eger wexta behsa rastiya eşqa serdema me were kirin, ji eşqa Leyla û Mecnûn zêdetir, ji gelek ehlên tesawifê jî wêdetir, bi nazikiya zanyaran, kesên ji bo derketina ji kaosa civakî ya îro û rê li ber vekirina azadiyê, bi egîdî, fedekarî û serketinê xwe îspat bikin hene û bi qezenckirina van kesayetan eşq dibe.

Pirsgirêkên jinê yên aboriyê, wekheviya civakî, beriya her tiştî bi çareserkirina îqtîdara polîtîk û bi serketina demokratîkbûnê dikarin bersivên xwe bibînin. Pir eşkere ye, heta siyaset bi awayekî demokratîk neyê meşandin, di azadiyê de pêşketin nebe, wekheviyeke hişk a huqûqî zêde maneya wê nîne.

Ya rast, divê mirov helwest û nêzîkbûna ji bo jinê wek şoreşa çandî bigire dest û li ser rawest e. Niyet çiqas baş dibe bila bibe, hewldan û xebat çiqas werin kirin bila werin kirin, bi sedema çanda heyî û ji ber nakokiyên di nava rastiyê bi xwe de çareseriyeke azadiyane nabe. Nasnameya azadiyane ya herî radîkal, bi helwesta ji bo jinê, yan jî bi awayekî giştî bi serwextbûna li nîzamê têkiliyên jin-mêr û li dawî hîştina wan mumkîn dibe. Divê her kes baş bizanbe, li ser navê kevneşopiyan, sergirtin û nuxumandina jinê, li ser navê hemdemiyê jî bi pornografîkirina jinê, bi qasî serê derziyê pêşketin nabe. Bi qasî têgihîştina li koletiyê, hewceyî bi têgihîştina li azadiyê jî heye. Bi vê serwextbûnê re divê mirov xwe bigihîne îradeyê. Kesên di azadiya jinê de, yanî di xwe azadkirinê de qonaxan derbas nekin, nikarin di ti warê azadiya civakî û siyasî de rê li ber veguherîn

û çareseriyê vekin. Çi hewldana azadiyê ya dualîteya mêrê serwerkole jin, li dawiyê nehêle, nikare nasnameyeke rastîn a azadiyê bi dest bixîne û divê mirov vê yekê jî wek pîvaneke bingehîn a azadiyê binirxîne. Heta têkiliya mulkiyet û îqtîdarê ya li ser jinê neyê hilweşandin, kes nikare têkiliya azad a mêr-jinan pêk bîne.

Di vê sedsala me de wê îradeya jinê ya azad xurt bibe. Şaş nîne mirov vê nirxandinê bike. Belkî jî pêwîst e mirov li ser saziyên mayînde yên sedsalan dewam bikin ji bo jinê bifikirin. Dibe ku hewceyî bi Partiyên Jina Azad hebin. Destnîşankirina pîvanên polîtîk û meşandina îdeolojiya bingehîn a azadiyê, her weha pratîk û kontrol hem sedema hebûn, hem jî wezîfeya bingehîn a van partiya ne.

Bi taybetî ji bo girseyên jinan, Malên Starê yên li bajaran avakirina wan dihat fikirîn, divê wek qadên azadiyê werin pêkanîn. Bi awayekî herî guncaw û li cih pêkanîna Parkên Çanda Jina Azad girîng in. Malbatên nikaribin keçikên xwe perwerde bikin û ji ber dibistanên nîzama serdest a rewşa wan tê zanîn, zarokên keçik û jin dikarin li Parkên Çanda Jina Azad perwerde bibin, hilberînin û di beşên xizmetê de cih bigirin. Parkên behsa wan tê kirin, dikarin rola perestgehên hemdem bilîzin.

Tê gotin bêyî jinê jiyan nabe, lê bi jina heyî re jî jiyan nabe. Têkiliyeke jin-mêran a heta qirikê di koletiyê de çûbe xwarê, xuya ye wê kes pir zêde bixîne û bist bike. Ji lewra di kaosa dawîn a sîstema kapîtalîst de hêza mezin a ji eşqê tê hêvîkirin divê li dora jinê were afirandin û pê gav were avêtin. Bawer dikim, divê ev yek ji karên pîroz û bi şeref ên qehremanên rastîn be ku dilê xwe dane eşqê û serê xwe danînê ser vê rê!

**3- Veger li ekolojiya civakî**

Bi krîza sîstema civakî re krîza ekolojîk jî kûr dibe. Em dikarin di destpêka şaristaniyê de li kokên vê krîzê bigerin û ev rêyeke rast e. Bi zêdebûna serdestiya di nav civakê de xerîbketina mirov ji bo mirov jî zêde bû û pêre mirov bi xwezayê re jî xerîb ket. Her du di zikhev de pêk hatin. Civak di cewherê xwe de rastiyeke ekolojîk e. Mebest ji ekolojiyê; xwezaya biyolojîk û fizîkî ye ku di pêkhatinê de civak xwe dispêrê. Têkiliya di navbera pêkhatina fizîkî û pêkhatina biyolojîk a dunyayê de roj bi roj rohnîtir dibe. Yek ji qada zanist tê de serketî ye, ev qad e. Bi awayekî ilmî analîz tê kirin ku jiyanê di nav avê de dest pê kiriye, ji wir derbasî bejahî û reşahiyê bûye. Cureyên nebat û heywanên destpêkê bi awayekî sînor jê re gengaz nabe were danîn, cihêreng dibin û pêş dikevin. Hawîrdora biyolojîk û fizîkî ya cureyê mirov dikare rabigire, li gorî van pêşketinan tê

ravekirin. Yek ji faraziyeyên tê kirin, cureyê mirov bi giştî di cîhana ruhberan de û bi taybetî jî di cîhana heywanan de xeleka dawî ya tekamul û beridandinê ye. Ders û encama em dikarin jê vê bigirin ev e; cureyê mirov nikare sererast bijî. Eger li gorî xelekên tekamul û beridandinê tevbigere dikare hebûna xwe dewam bike. Eger mafên tekamul û beridandinê yên xwe dispêrinê xira bike, dikare bi tevahî hebûna xwe ya biyolojîk ji holê rake û bibe sedem ku cureyê mirov nikaribe hebûna xwe dewam bike. Yekparebûna tekamulê ya di nav xwezayê de ji texmînan wêdetir, bi awayekî ilmî tespît bûye ku xwe dispêre têkiliya beramber a cureyan. Eger têkiliya beramber a di navbera cure û celeban de qut bibe, wê ji xelekên tekamulê jî veqetînên mezin bibin û ev yekê jî pirsgirêka dewam û îdameya gelek cureyan derbixîne holê.

Li hemberî vê rastiya ilmî, eger pirsgirêka ku şaristaniyê afirandiye neyê çareserkirin û tedbîr neyê wergirtin, ji zû ve çirkînî bi deriyê cehennemê ketiye. Ji ber ku şaristanî xwe dispêre zordarî û cehaletê, - ya rastîn derewkariya mecbûrî - rê li ber pirsgirêkê vedike. Wexta hiyarerşî û dewlet pêk tên, ji bo hebûna xwe mayînde bikin, tenê xwe naspêrin zordariyê, ji bo çîroka rastiyê veşêrin jî serî li durûtî û derewê didin. Serdestiya îqtîdarê, serdestiya zêhniyetê jî ferz dike. Eger zêhniyet jî hebûneke li derveyî rastiyê karibe bide qebûlkirin dikare hebûna îqtîdarê misoger bike. Aliyê îqtîdarê yê darê zorê her tim aliyê îqtîdarê yê hêza nerm zêhniyetê li ser piyan digire û serwer dike. Ev aliyê zêhniyetê bi xwe re mirov li hemberî xwezayê xerîb dixîne yan jî ji bo xerîbketinê bingeh amade dike. Heta ku têkilî û tayê bi civaka komîn re were înkarkirin û di şûna wê de hêzên dewletê û hiyarerşiyê yên ji rêderketî esas bêne dîtin, wê di zêhniyetê de ta û têkiliya bi xwezayê re were ji bîr kirin. Her mezinbûna şaristaniyê ya li ser vî zemînê xwe spartiyê, wê hê zêdetir bibe sedema veqetîna ji xwezayê û wê bi xirakirina hawîrdorê xwe nîşan bide. Çavên hêzên şaristaniyê wê êdî mecbûriyetên xwezayê nebînin. Ji ber ku tebeqa jêr a wan xwedî dike her tiştî ji wan re amade pêşkêş dike.

Utopyayên cennet-xwedayetiyê yên di pirtûkên pîroz de wek hêzên destpêkê yên şaristaniyê mîtolojiyên Sumeran, li ser vê rastiyê, li hev anîn. Wek qalibên zêhniyetê yên bingehîn li zêhniyeta mirovê di serdema zarokatiyê de hatiye kolan. Cennet-xweda, hebûnên muccered ên xwezayê ne. Bi awayekî hînê rastir, di şûna xwezaya rastîn de cîhanên sexte ne ku hêzên îqtîdarê li hev hûnane. Cewherê wê jî ev e; "ewê dibin xwedê li cennetê bijîn." Versiyona duyemîn;

"Siltanên siya xwedê, mîna di cennetê de bijîn." Versiyona sêyemîn; "mirovê kedxwar mîna di cennetê de bijî." Ev qalibên zêhniyetê ku wek fermanên îlahî li ser civakê hatin ferzkirin, "dayika xwezayê" dan ji bîrkirin. Hê zêdegaviyê dikin û bi gotinên ferazî yên wek "xwezaya hov, xwezaya kor, xwezaya divê stû lê were tewandin" civakê hînê zêdetir li hemberî xwezayê xerîb dixînin. Hêza îqtîdarê ya bi van derew û zordariya xwe jiyaneke antî-xwezayê ferz dike, bingehê pirsgirêkên ekolojîk e. Çendîn rola xwezayê di jiyanê de hat înkarkirin û di şûna wê de fîgurên qelp ên dînî û afirîneran hat bi cihkirin, xweza jî hêdî hêdî wergeriya "hêzeke kor." Vê zêhniyetê ku heta roja me îro jî bandora xwe kiriye, yek ji sedemên bingehîn e, nehîştiye zanist pêş bikeve. Eger hêzên xwezayê objektîf werin tarîfkirin zanist dikare pêş bikeve. Sîstemeke baweriyê ya her tiştî bi cin, perî û xweda ve girê bide, wê ti car nikaribe mane bide hûnan û tevneke mîna xwezayê. Ewê bi israr destnîşan bikin ku hemû xwezaya biyolojîk û fizîkî ji aliyê têgîneke mucered xwedê ve hatiye afirandin û bi vî awayî xwe ji zanistê vedizin.

Me pir baş dît, yekemîn tebeqeya mêtinger ji bo hebûna xwe rewa bike zêhniyeta xwedayê mucered diafirîne. Tehlûkeya vê zêhniyetê tenê ew nîne ku mirovan wek ebd-kole bi xwe ve girê dide, her wisa ji rastiyê qut dike. Têkilî û tayê zîhna mirov ê bi xwezayê re dibirre, xerîb û biyanî dike. Xwezaya dayik şûna xwe ji xwezaya zalim re dihêle. Hem jî ji aliyê zalimên rastîn ve. Wexta mirov di nava dîrokê de çav li rawestgeh û qonaxên vê zêhniyetê digerîne, mirov vedilîze û matmayî dibe. Di dema împaratoriya Romayê de mirov û heywanên dirinde berdidan hev. Ev berhemê vê zêhniyetê bûn. Eleqeya bi cîhana hemû nebat û heywanan re qut dike, dunyayê reş û tarî dike. Ev rewş têkiliya wê bi kiryarên zalimane yê hêza îqtîdarê re heye. Ya rastîn, berdana hevdu ya mirov û heywanên dirinde, xerîbxistina ji xwezayê sembolîze dike. Di serdema feodalîzmê de dunya xaneke ku divê berî gavekê were terikandin. Heta cihekî bi qirêj e, mirov dixîne guneh û bi xwe ve girê dide. Li hemberî meznahiya xwedê ma çi qîmeta xwezayê heye. Berê gavekê terikandina xweza û dunyayê bûye hedefek bawermendwarî. Lê li tebeqa jor jiyan bi awayekî cennetwarî bi hezar reng û tamên xwe dewam dike. Em wexta dibêjin ji rêderketina zêhniyetê, em vê falsîfîkasyonê (belovajîkirinê) destnîşan dikin. Di bingehê paşvemayîna civakên Rojhilata Navîn de ev zêhniyeta ji rêderketî ya hezar salan radizê.

Tayê zêhniyeta mirov ê ji xwezayê qutbûyî di cewherê xwe de bi Ronesansê ji nû ve pê ve hat kirin. Ronesansê şoreşa zêhniyetê li ser zindîbûn, hilberîn û pîrozbûna xwezayê pêş de bir. 'Çi heye di xwezayê de heye' kir hîmê baweriya xwe. Bedewî û xweşikbûna xwezayê bi huner baş nîşan da. Bi helwesteke zanistî çirkînî bi deriyê sînorên xwezayê xist. Bi tevahî naskirina mirov wek wezîfeyên huner û zanistê hesiband. Vê guhertina di zêhniyetê de serdema nû afirand. Berovajî yeqîn û texmînan, civaka kapîtalîst encameke xwezayî ya vê pêvajoyê nîne. Kapîtalîzmê ev pêvajo ji rê derxist û paş ve xist. Rêbazên ku mêtingeriya mirov pêş de biribûn tevî îstîsmara xwezayê meşandin. Serdestiya li mirov bi serdestiya li xwezayê gihîşt hevdu. Êrîşa herî dijwar li dijî xwezayê da destpêkirin. Bêyî li ti pîrozbûn, zindîbûn û mêzîna xwezayê bifikire, îstîsmarkirina wê wek wezîfeyeke şoreşgerane fêm kir. Pîrozbûn ku her çend berê belovajî bû jî, bi tevahî di zêhniyetan de kor kir. Bêyî ku bibe xwediyê çi tirs û fikarê, her cure bi karanîna li ser xwezayê ji xwe re heq û maf qebûl kir.

Di encamê de krîza civakî û ya hawîrdorê xwe gîhandin hevdu. Cewherê sîstemê çawa krîza civakî gîhand neqeba kaosê, felaketên hawîrdor jî dijîn, dest pê kirin îşaretên SOS didin. Bajarên mîna kanserê mezin dibin, hewaya qirêj dibe, tebeqeya ozonê ya qulbûyî, qonax bi qonax kêmbûna cureyên nebat û heywanan, talankirina daristanan, gemarbûna çeman, li her deverê bilindbûna girikên sergo û gelaşê, kêmbûna avên nişmî, pirbûna bê kontrol a şêniyan, êdî xweza jî tevî kaosê rakir serhildanê. Ji ber hêrsa kar fikir nayê kirin ku wê ev dunya me karibe çiqas bajar, mirov, fabrîke, maşînên ragihandinê, maddeyên sentetîk, hewa û ava qirêj rake. Ev bûyerên neyênî çarenûs nînin. Ji ber ku di destê îqtîdarê de zanist û teknîk bê mêzîn tê xebitandin, em bi vê encamê re rûbirû ne. Bêguman em nikarin ji pêvajoyê zanist û teknîkê berpirsiyar bibînin. Jixwe zanist û teknîk bi serê xwe jî nikarin rol bilîzin. Li gorî taybetiyên hêzên sîstema civakê dikarin rola xwe bi cih bînin. Dikarin xwezayê hilweşînin û dikarin xwezayê bedew jî bikin. Pirsgirêk bi tevahî civakî ye. Di navbera asta zanist-teknîkê û standartê jiyana piraniya mirovan de nakokiyek heye. Ji ber berjewendiyên hindikayiyek li ser zanist û teknîkê serdest in, em bi vê rewşê re rûbirû dimînin. Di sîstema civaka xwezayî û demokratîk de rola zanist û teknîkê bilîze ekolojîk e.

Ekolojî bi xwe jî ilmek e. Zanisteke têkiliya civakê bi hawîrdorê re lêkolîn dike. Tevî ku ilmekî nû ye, her ku diçe bi hemû ilman re di

zikhev de ji bo li dawî hiştina nakokiya civakê bi xwezayê re wê roleke pêşeng bilîze. Têgihîştin û serwextbûna li hawîrdorê her çend bi sînor bi pêş de diçe jî wê bi ekolojiyê re bibe pêngaveke mezin a şoreşê. Di civaka seretayî ya komîn de têkiliya xwezayê bi civakê re mîna têkiliya zarok bi dayikê re ye. Civak xwezayê zindî dibîne. Mîna pîvaneke bingehîn a dînî, ji bo li dijî wê nebe, guneh li hemberî wê neke tevdigere. Dînê xwezayê, dînê civaka seretayî ya komîn e. Di pêkhatina civakê de nakokî û anormaltiyeke xwezayî nîne. Felsefe bi xwe, mirov wek "xwezaya li xwe hayil dibe" rave dike. Mirov di cewherê xwe de parçeyê herî pêşketî yê xwezayê ye.

Sîstema civakî ye ku ev parçeyê xwezayê yê herî pêşketî bi xwezayê re dixe nav rewşke bi nakok. Bi vî awayî jî anormaltî û dijbertiya bi xwezayê re ya sîstema civakî eşkere dibe. Ev sîstem, mirovê ku bi xwezayê re bi coş û şahiyeke cejin û roşanan - jixwe cejin û roşan rojên bi bereket ên yekîtiya bi xwezayê re îfade dikin - bûye yek, dike bela serê xwezayê, wê wextê ev rastî ispat dike ku sîstema civakî çiqas bûye bela.

Yekparebûna bi xwezaya hawîrdorê re ne tenê di warê aborî û civakî de ye. Ji aliyê felsefîk ve jî xweza hewes û arzûyek e, divê mirov lê serwext bibe. Ya rastîn ev danûstendineke beramberî hevdu ye. Xweza her dibe mirov, meraqa xwe ya mezin û hêza xwe ya afirandinê ispat dike. Mirov jî her ku li xwezayê - balkêş e, Sumerî azadiyê (amargî) wek vegera li dayikê (xwezayê) fêm dikin - serwext dibe li xwe hayil dibe. Di navbera herduyan de têkiliya aşiq û maşûq heye. Ev macerayeke mezin a eşqê ye. Xirakirin, veqetandin bi gotineke dînî belkî jî gunehê herî mezin e. Ji lewra, ji wê hêjatir hêzeke maneyê nayê afirandin. Ji ber ku bi mijarê ve ye, dabaşa xwîndîtina jinê xwe careke din di vir de dide hiskirin. Xwîn herikîna ji malzaroka jinê hem dûrketina wê ya ji xwezayê û hem jî hatina wê ya ji xwezayê îşaret dike. Bi vî awayî aliyê balkêş ê şîroveya me ya di vî warî de xwe li vir dide hiskirin. Xwezabûna jinê bi hatina wê ya ji xwezayê re têkildar e. Balkêşiya wê ya esrarengîn jî bi vê rastiyê manîdar dibe.

Çi sîstema civakê ya mirov bi xwezayê re negihîne hevdu, aliyê wê exlaqî û rasyonel ê were parastin nîne. Sîstema herî zêde mirov bi xwezaya hawîrdorê dixe nakokiyê bi vê sedemê ji aliyê exlaqî û rasyonelîteyê ve li dawiyê tê hîştin. Ji vê tarîfa me ya kin jî baş tê fêmkirin ku têkiliya di navbera felaketa hawîrdorê û kaosa sîstema kapîtalîzmê de diyalektîk e. Lê nakokiyên bingehîn ên bi xwezayê re dikarin bi sîstemê gav bidin avêtin. Ji ber karektera nakokiyê wê

tevgerên hawîrdorparêz bi serê xwe tenê nikaribin çareseriyê pêk bînin. Ji aliyê din ve, civakeke ekolojîk veguherîneke exlaqî jî ferz dike. Kapîtalîzm antî-exlaqiyetê dikare bi helwesteke ekolojîk li dawiyê bihêle. Têkiliya exlaq-wijdan rûhiyeteke empatîk û sempatîk divê. Ev jî bi amadekariyeke baş a ekolojîk manîdar dibe. Ekolojî dostanî ye bi xwezayê re, baweriya bi dînê xwezayî ye. Bi vî awayî, xwe gîhandina hevdu ya civakeke organîk a xwezayê û têgihîştineke hişyar îfade dike.

Pirsgirêkên pratîk ên jiyana ekolojîk têra xwe rojane ne. Ji bo rawestandina felaketên xwezaya hawîrdorê, pêwîst e gelek saziyên ku ji bo vê yekê hatine damezrandin hînê zêdetir werin xurtkirin û wisa bikin ku bibin mîna parçeyekî civaka demokratîk. Dîsa piştgiriya bi tevgerên jinê yên azadîxwaz û femînîst ji wezîfeyên pratîk ên li pêş in. Yek ji xebatên bingehîn ên demokratîk, divê têgihîştin û rêxistiniya di warê hawîrdorê de were xurtkirin. Wextekê çawa ji bo têgihîştina li çîn û netew kampanya dihatin lidarxistin, niha jî hewce ye, em ji bo têgihîştina li hawîrdor û demokrasiyê kampanyayan li dar bixin. Ji mafên heywanan bigirin heta parastina daristanan, divê em xwezayê ji nû ve şên bikin û vê yekê bikin parçeyekî ji çalakiyên civakê. Kesê-a berpirsiyariya xwe ya biyolojîk nebe, berpirsiyariya xwe ya civakî jî seqet e. Berpirsiyariyeke rastîn û manîdar ew e ku karibe têkiliya di navbera herduyan de bibîne. Di pêvajoyên pêş de divê xwezaya rût bigihîje daristanên mezin û bi nebatên cûrbecûr bixemile û heywan tê de belav bibin. Ji bo vê pêwîst e têkoşîneke mezin were meşandin û divê bimeşe. Mîna ku ji bo daristanan û şênbûnê şens were dayîn. Xuya ye, ji niha ve wê slogana "welatparêziya mezin avakirina daristanan û dardanîne" bibe yek ji sloganên hêja. Baş tê fêmkirin ku kesa-ê ji heywanan hez neke û nikaribe biparêze wê nikaribe ji mirovan hez bike û biparêze. Çendîn were fêmkirin ku heywan û nebat emanetî mirov in, wê qîmet û buhaya mirov jî qatekî din zêde bibe.

Têgihîştineke civakî ya ji serwextbûna li ekolojiyê bêpar, mîna di rastiya sosyalîzma reel de jî hat dîtin, nikare xwe ji rizîn û jihevketinê xilas bike. Têgihîştina ekolojîk têgihîştineke bingehîn a îdeolojîk e. Mîna pireke di navbera exlaq û felsefeyê de ye. Polîtîka rizgarker a ji krîza hemdem, eger ekolojîk bibe, dikare bigihîne sîstemazîkirineke civakî. Mîna di pirsgirêka azadiya jinê de, di çareserkirina pirsgirêkên ekolojîk de jî têgihîştina îqtîdara dewletparêz a bavikanî di bin jiyaneke derengketî û şaşiyan de, xwediyê roleke bingehîn e. Çendîn femînîzm û ekolojî pêş bikeve,

hemû mêzînên sîstema dewletparêz a bavikanî xira dibin. Têkoşîneke rastîn a sosyalîzm û demokrasiyê çendîn di armancên xwe de azadiya jinê û rizgarkirina hawîrdorê hebe, dikare bibe yekpare û gelemperiyê himbêz bike. Jixwe têkoşîneke ev çend yekpare û gelemperî himbêz kiribe dikare bibe yek ji şêweyên manîdar ji bo derketina ji kaosa di rojevê de cih digire.

Globalîzma sîstema kapîtalîzmê, bi sedema sîstema sosyalîst ji ber nakokiyên navxweyî di sala 1989an de têkçû, têra xwe ket sêyemîn pêvajoya mezin a krîz-kaosê. Sîstem bi pêşengiya DYE hewl dide bi "împaratoriya kaosê" îqtîdara xwe dewam bike. Împaratoriya kaosê ya DYE pêvajoyeke mîna ya jihevketina Romayê dijî. Tevî cihêwaziyên sîstema kapîtalîst ên divê werin zanîn. Welatên Yekîtiya Ewrûpayê ku xwe ji hegemonya DYE dûr digirin, bi hin argumanên bi sînor ên mafê mirovan û demokrasiyê li ber xwe didin û dixwazin komarên xwe yên li ser rêya kevneşopiyê û dewletên netewî biparêzin. Ji ber ku globalîzebûna kapîtalîzmê li pêşiya netew-dewletan asteng e, YE neçar dihêle ber bi yekîtiyeke di ser netewan re biçe. Li pasîfîkê, sêyemîn hêzeke global bi pêşengiya Japonya û Çînê gengaz xuya nake. Tevî van welatan Rûsya, Brezîlya û hwd. zêdetir wê netew-dewletên xwe biparêzin. Gelek welatên dunyayê, netew û komên dewletan ku piştî 1945an li gorî mêzîna DYE-Sowyetê pir bi zehmetî modelên xwe yên netew-dewlet li ser piyan digirtin, wê di çarçoveya împaratoriya kaosa DYE de zêdetir piçûk bibin; teng bibin; hinekî, yan jî bi temamî parçe bibin û ji nû ve ava bibin. Di serî de Rojhilata Navîn, Kafkas û Balkan, gelek herêm û dever vê pêvajoyê bi dijwarî dijîn.

Împaratoriya kaosê ku bi vî awayî em jê re dikarin bibêjin sêyemîn şerê globalîzmê, ne tenê bi rêbazên eskerî û aborî tê rêvebirin. Ji wê jî zêdetir û diyarker bi şîrketên aboriyê û saziyên medyayê yên global tê rêvebirin. Şîrketên medya û aboriyê yên di asta cîhanîbûnê de civakan di warê zik û mejî de birçî dihêlin û bi hêsanî dikarin berê wan bidin cihê dixwazinê û bi kar bînin. Bi serweriya xwe ya zanist-teknolojîk hewl didin sîstema civaka kapîtalîst xurtkirî ji kaosê derbixînin, an ew nebe bi zirareke kêm û ew jî nebe bi avakirineke jinûve xilas bikin. Di kaosê de rêvebirin, parastin û bi guhertineke qismî dewama sîstemê bi rêbaz û helwestên berê nabe. Eger mirov helwest, kiryar, taktîk û stratejiyên nû yên DYE daniye ber xwe, bi taybetiyên pêvajoya kaosê re binirxîne wê hînê rastir bibe.

Şêwazê komîn û demokratîk ku gelan di tevahiya dîrokê de nîşan dan, pêwîst e ji bo karibe ji kaosê derkeve xwe bi nûkirina taktîk û teoriyê xurt bike. Têgihîştina "çep" ya sosyalîzma reel a berê derxist holê û di dema nû de têgihîştina "çepa nû", "ekolojî" û tevegerên "femînîst", Civînên Porto Allegre di wê qabîliyet û têgihîştinê de nînin ku karibin kaosê li dawiyê bihêlin û derbas bikin. Tevî van tevgeran hewce ye li ser perspektîfeke teorîk a giştî ya globalîst wek "civakeke ekolojîk, demokratîk û azadiya cinsiyetê" guftûgo were kirin û her wisa li ser awayên taktîkên herêmî û şêwazên çareseriyê danûstendineke xurt bibe. Wexta ev were kirin, yek ji şertê sereke ew e ku divê ji teorî û helwestên taktîk ên "dewletê xira dike yan jî îqtîdarê zevt dike" re "xatir" bixwaze. Heta têgihîştinên di navenda wan de dewlet heye û şêwazên rizgarîxwaz neyên terikandin, çawa ku di mînaka sosyalîzma reel de hate dîtin, wê nikaribin xwe xilas bikin ji bo bi awayekî xirab nebin xizmetkarê kapîtalîzmê. Dîsa bi şêwazê berê yên welat, netew, çîn û dîn li ser hîmê têgînên mucered û gulover bi slogan û bernameya rizgariya dewlet, sosyalîzm, netew, welat û dîn serhildan û rakirina gelan ji bo şer wê nikaribe bersivê bide daxwazên rastîn ên gelan ji bo azadî û wekheviyê. Eger bersivê bide jî wê nikaribe xwe xilas bike ji bo di nav kapîtalîzmê de nehele û wê xurt neke.

Her tiştê di qonaxa nû ya kapîtalîzma global de, gel û komên gel pêk tînin, bi îrade û têgihîştin wê ji bo nasname û çanda xwe, li ser çareseriyên herêmî û ji netewiyetê wêdetir lê bikolin û bi asta çalakî û rêxistiniya wan diyar bibe. Wek şaxên bingehîn ên rêveberiyên herêmî ji tevgerên şaredariya demokratîk heta komînên kolan û gundan, ji kooperatîfan heta rêxistinên berfireh ên civakî yên sivîl, ji mafên mirovan heta mafê heywan û zarokan, ji azadiya jinê heta rêxistiniya pêşeng a ciwan û ekolojiyê, divê bi tevin û toreke berfireh rêxistiniya civakê ya demokratîk were kirin, ji bo civakên bi vî rengî yên demokratîk, wek koordînatorê rêveber, îdeolojîk û teorîk, partiyên siyasî yên demokratîk werin damezrandin. Bêyî partiyên demokratîk û pêşdebirina îttîfaqan, pêkanîna civakeke demokratîk tewş e. Navenda siyaset û civaka demokratîk, divê di asta jor de xwe bi "kongreyên gel" tacîdar bikin û ev yek ji bo her gelî wezîfeyeke bingehîn e. "Kongreyên gel" yên nabin alternatîfê dewletê û xwe radestî wê jî nakin, lê dema hewce bike bi pîvan pêre rûdinên, ji bo kaosa di rojevê de li dawiyê were hîştin, di serê saziyên demokratîk de tên. Kongreyên gel ji bo pêdiviyên civaka demokratîk sazî û

dezgehên ku di warê siyasî, xweparastin, qanûnî, civakî, exlaqî, aborî, zanistî û hunerî de hatine avakirin, dikare kontrol bike.

Sloganên bingehîn ên gelan mirov dikare weha rêz bike; welat û netewê azad, sosyalîzma bi awayekî berfireh demokrasî barkirî, - yanî têgihîştina wekheviyê ya ne wekhevan a ne huqûqî - azadî ji bo baweriyên dînî û kongreyên demokratîk ên ne dewlet.

Wexta îmkanên mezin ên di destê kapîtalîzma global de wek zanist, eskerî û aboriyê li ber çav werin girtin, divê her cure çalakiyên qanûnî, wexta qanûn bi cih nehatin anîn û rejîma zordar esas hat dîtin rêxistinkirina her cure serhildan û şerê gerîlla yên xweparastinê wek rêbazên dijber divê werin nirxandin.

Ji ber ku civaka kapîtalîst wexta pêk hatiye exlaq înkar kiriye, pêwîst e wexta civaka ekolojîk, demokratîk û azadîxwaziya cinsiyetê were avakirin, tevger bi teorîk-etîk û pratîk-exlaqê ve wek prensîb û helwesteke dest jê nabe girêdayî be.

Em wexta civaka kaosê li dawiyê bihêlin, hîmên zêhniyetê yên em xwe herî zêde bispêrinê wê huner û zanist be. Ji ber ku ji dibistanên seretayî heta zanîngehan bi perwerdeya fermî tê xwestin hawîrdor, civak û ferdê bi awa û cewher ê li pey dewlet û hiyarerşiyê diçe û xerîb ketiye were afirandin, divê ev dafikên hînkirinê û perwerdeyê li dawiyê werin hîştin, bi têgihîştineke - paradigma - nû ya hunerî û zanistê, mirov û civakê bi rastiya dîrokî bidin naskirin û bigihînin kêliya azad, bi şoreşa zêhniyetê vê yekê bipejirîne û bi cih bîne. Akademiyên zanistê yên nû û dibistanên bi vî rengî bi qasî ku hewceyî pê hebe li her deverê werin avakirin.

Li ser vî hîmî, li dijî împaratoriya kaosê ya kapîtalîzma global, divê em berê xwe bidin "şaristaniya demokratîk û global a gelan." Ev hem ji bo hurmeta ji kevneşopiya berxwedanê re, hem jî ji her demê zêdetir dikare me bibe dunyayeke demokratîk, azad û wekhev.

---

## BEŞA SÊYEMÎN

### Di şaristaniya Rojhilata Navîn de kaos û çareseriyên muhtemel

#### Destpêk

Li Rojhilata Navîn sêyemîn şerê cîhanê bi awayekî xweser pêk tê û ev rastiyek e. Lê ev şer ji aliyên xwe yên klasîk ên eskerî û siyasî wêdetir taybetiyên wê hene. Tê gotin ev şerê şaristaniyan e; ev tarîfeke rast e, lê naveroka vê tarîfê têra xwe nayê şîrovekirin. Aliyên civakî û dîrokî baş nayên ravekirin. Alî, rêbaz û armanc zelal nînin. Tevî ku pir behsa plan û projeyan tê kirin, şerekî herî bê plan ku

hema bêje bi xwe dimeşe heye. Em bi şerekî wisa re rûbirû ne, mîna ku armanca wî afirandina kaosê be.

Civak û dewletên Rojhilata Navîn bi awayekî rastîn gidîş û loda pirsgirêkan e. Ji dîroka herî qedîm, pirsgirêkên ketine serhevdu û hatine tepisandin, civak bê nefes hîştine. Rejimên ji aliyê kapîtalîstan li ser serê wan hatine danîn ji bo çareseriyê bibînin, bi xwe bûne çavkaniya pirsgirêkan. Ne bi xwe dikarin çareser bikin, ne jî dihêlin hêzên hundur û der ve çareseriyê pêk bînin. Kêmasiyeke pir mezin e, eger pirsgirêk tenê wek Îslamê were bi navkirin. Li herêmê zêhniyet hene ji dînên yek xwedayî jî wêdetir kokên wan digihîjin serdema neolîtîkê. Gelek rastiyên civakî û sîstem pêk hatine bi gotina netew nayên bi navkirin. Ne her eşîr, hema bibêje her malbat mîna dewletekê xwedî pirsgirêkên tevlîhev e. Newala di navbera mêr û jin de dîsa bi qasî newala di navbera dewlet û civakê de mezin e û ji hev re xerîb ketine. Mîna di efsaneyê de li binya Qûleya Babîlan kaoseke kor, kerr û lalan ên ji hevdu fêm nakin heye. Fena ku efsane dîsa li heman cihê, xwe bi ruh dibe. Li derdora hêza heftê welatî hewl didin. Lê alozî û tevlîhevî her roja diçe mezintir dibe. Şerê Cihû û Ereban ê ji serdema Fîrewnan ve mayî hînê jî bi heman lezê dewam dike. Operasyonên ji dema qralên Sumeran li dijî Kurtiyan (Kurdan) hînê bi heman dijwariyê dewam dikin.

Wê wextê divê em bersivên zelal bidin vê pirsê; li Rojhilata Navîn pirsgirêk çawa digihîjin vê rewşê?

Civaka Rojhilata Navîn, hucreya kok a civakan e. Hêza xwe jî ji vê taybetiyê werdigire. Teoriya hucreyên kok ji bo civakan jî dibe. Sîstema kapîtalîst ji çanda parzemîna Emerîkayê heta Pasîfîk-Avûstralya, ji wir jî heta Hînd, Çîn û Japonyayê; ji Efrîkyayê heta Rûsya-Başûrê Sibîrya belav dibe. Mîna ku di şerê şaristanî û çandan de bi ser ketibe. Lê belê li Rojhilata Navîn ji salên 1800 ve gelek hewldanên xwe bûn û hînê jî nekariye sîstemê zevt bike. Belkî jî pirsgirêkên mezin ên di şerên cîhanê de nehatine dîtin diqewimin, rewşên ji şerên asîmetrîk wêdetir jî hene. Eşkere ye, sedemê tengavbûna wan ji awayê hûnandina civakê ye. Qraliyet û feodalîzma şoreşa Fransî çareser kir û feodalîzm û Çartiya şoreşa Rûsyayê çareser kir mîna hevdu ne, bi avahiyên jor re mijûl bûn, ti têkiliya wan bi hûnandina civakî re nîne. Dîsa jî teşxîskirin û çareserkirina wan a van avahiyan pir bi zehmetî dibe. Jixwe ev şoreşên behsa wan tê kirin li avahiyên jor qewimîne û nekarîne xwe xilas bikin ku di asta herî nizim de bi kapîtalîzmê re negihîjin hevdu. Li ser civak û avahiyên jor ên Rojhilata Navîn jî modelên ferz kirine,

bihêlin pirsgirêkan çareser bikin, hînê kûrtir û girantir kirine. Di dawiyê de divê mirov şerê şaristaniyan baş fêm bike. Ya rastîn, çî ye ku şaristaniya Rojhilata Navîn ev çend têkoşer û di warê çareseriyê de neçar dihêle? Çima li deverên dunyayê yên têne zanîn bi destwerdana li şaristaniyan çareserî pêk tên, lê çima li şaristaniya Rojhilata Navîn heman rêbazên çareseriyê bi ser nakevin?

Bersiva pirsê di rastiya şaristaniya dayik û makeyê de radizê. Çawa ku dayik xwe naşibîne zarokê xwe û zarok neçar e li diya xwe biçe, ew jî erdên jê bûne nikarin bişibînin xwe; bi hin aliyan be jî neçar e ew bişibin şaristaniya dayik. Eger em dîsa li mînaka hucreya kok vegerin, em dikarin hemû rengên genetîk ê van hucreyên ji hucreya kok zêde bûne bibînin. Lê mirov nikare hemû rengên genetîk ên hucreya kok di hucreyên jê zêdebûyî de bibîne. Bêguman, eger mirov rastiyên civakî zêde bi rastiyên biyolojîk re rûbirû û qiyas bike, dikare mirov bibe şaşî û çewtiyên mezin. Lê dîsa jî ji bo mirov hin meylan rast bibîne rêbazeke pêşî veker e. Diyar e, divê şaristaniya sîstema kapîtalîst hînê bi awayekî kûr û xweser nêzî şaristaniya Rojhilata Navîn bibe.

Em wexta xwe li analîzkirina şaristaniya Rojhilata Navîn rakişînin, divê beriya her tiştî em li ser rengê avabûna zêhniyetê rawestin. Sê dînên mezin ên yek xwedayî di derketin û bi cihbûna zêhniyeta herêmê de xwediyê roleke bingehîn in. Di vî warî de gelek dabaş û mijarên bingehîn hene ji bo sosyolojiya dîn çareser bike. Ev hewldan û xebat divê bi wêje û şaxên din ên hunerê berçav bibe. Eger em nirxên serdema neolotîk ên li herêmê ku hînê jî bi bandor in ji hev nekin, di destnîşankirina nexşa rê de wê kêmasiyên mezin bibin. Ji aliyê din ve, li herêmê malbat, qebîle û mezheb ku wek malikên piçûk li bin qewm û dînên bi îqtîdarê re bûne yek, hebûna xwe dewam dikin. Qalibên zêhniyetê yên kapîtalîzmê li herêmê rê li ber wan vekirine, kengî bişikên wê manîdar bibin. Pêwîst e em li koka qalibên zêhniyetê di destpêka dîrokê de û heta beriya wê di serdema pir xwedeyan de, li cîhana mîtolojiyan, bi taybetî jî di mîtolojiya Sumeran de bigerin, naxwe zehmet e, mirov karibe zêhniyetên di nav hev de hatine hûnandin, fêm bike. Di rastiya îro ya Rojhilata Navîn de gotin û pratîk, têgîn û rastî, xeyal û heqîqet, dîn û jiyan, zanist û îdeolojî, felsefe û dîn, exlaq û qanûn zêde tevlîhev in, di nav hev de ne, xirabûyî û pûç in. Hema bêje hemû qalibên zêhniyetê yên mirovatiyê naskirine, tevî qirêjiya rê li ber vekirine, mîna gidîş û loda pirsgirêkan radiwestin. Çi zimanê kevin û çi jî zimanên nû, rewşa muhafezekar a zêhniyetan baş îfade dikin. Di van

sedsalên dawiyê de li ser têgînên welat, netew, dewlet û hwd. korfêmî, nezanî û xeşîmiyeke mezin heye. Di navbera hêmanên zêhniyeta hemdem û hêmanên zêhniyeta serdema navîn û arkaîk de zewaca herî bi şaîbe û qusûr pêk tê. Eger avahiyên zêhniyetê yên Rojhilata Navîn neyên bombekirin û di şûnê de bombebaraneke li ser avahiyên fizîkî - polîtîk, civakî, huqûqî, aborî - were kirin, wê mîna di roja me ya îro de ku em dibînin, di encamê de zêhniyeteke fermî yan jî ne fermî rê li ber teror, komkujî û kiryarên bi êş vebike.

Li Rojhilata Navîn avabûyîna îqtîdarê li gorî deverên din ên cîhanê cudatiyên xwe yên girîng hene. Rastiya îqtîdar û şer jî ji hûnandina zêhniyetê kêm tevlîhev nînin. Tevî ku şer û îqtîdar ji saziyên herî kevin ên herêmê ne, di navbera wan û jiyana aborî-civakî de qutbûneke mezin û paradoks bi cih bûye. Têkiliyên di navbera wan de ji hûrik heta mezin, ji nermik heta hişk, li her cure demagojî û zordestiyê vekirî ne. Rasyonalîte kara herî hindik e, maneyê dibîne. Şer û îqtîdar di sosyolojiyê de ji çareserbûnê dûr in, mîna di nav şaxên dînî, etnîk, aborî, çînî û siyasî de hatibin bi sînorkirin. Eger şer û îqtîdara ku ji têgîneke xwedayê mucered heta derbeke cobê hişk îfadeyên xwe hatibin daxistin, rast neyên analîzkirin, mirov nikare dîmenekî rastîn ê Rojhilata Navîn bi dest bixe.

Saziyên civakî û bi taybetî rastiya malbatê herî kêm bi qasî têgîna îqtîdarê tevlîhev e. Mêr û jinên Rojhilata Navînî ew çend tevlîhev in divê bi awayekî xweser werin analîzkirin. Eger analîzeke malbatê, jinê û mêrê serwer bi qalibên giştî yên sosyolojîk bêne kirin wê gelek bi kêmasî bibe. Aliyên herî hişk û tarî yên rastiya siyasî, îdeolojîk û exlaqî bi jin û mêr têne nîşandan. Nakokiyên di nava malbatê de ji yên di nava dewletê de kêmtir nîn in. Malbat ji saziyeke civakî wêdetir maneya wê heye, mîna "qulika tarî" ya civakan be. Em wexta mijara jinê digirin bin hûrbînê, gengaz dibe ku em drama hemû mirovatiyê bixwînin û bibînin.

Hem civatîbûna dîrokî, hem jî jeocivatîbûn ferz dike ku mirov bi tayekî xurt ê diyalektîkî nêzî herêmê bibe. Heta her parçeyekî zeman û mekan, her serdem û beşek ji dema dîrokê neyê analîzkirin, ne roja me ya îro, ne jî hemû nîzamên şaristaniyan tam têne fêmkirin. Ji dîroka nivîskî zêdetir dîroka nehatiye nivîsandin pir girîng e. Dîsa ji mekanên zêde navê wan hatine gotin zêdetir, çîroka mekanên nehatine ziman pir girîng in.

Eger mirov paşve mayîna aboriyê di nav van şaxên civakî de negire dest û li ser ranewest e, xuya ye, wê bi prensîbên hişk ên teoriyên bazirganiyê çareserkirinê pir watedar nebe.

Di sosyolojiyê de nexweşiyeke giştî heye, ew jî di çareserkirina pirsgirêkan de yekpare û gewde parçe parçe tê kirin. Çewtî û şaşiyên rêbazeke bi vî rengî, xuya ye, herî zêde wê xwe di xebatên li ser Rojhilata Navîn de nîşan bide. Aborî di serê van xebatan de tê. Eger di zik şer-îqtîdar, zêhniyet-civatîbûnê de nebe, analîzên di warê aboriyê de wê tenê nezaniyê xurtir bikin. Eşkere ye, bi qalibên analîzê yên şaristaniya Rojava, lêkolînên li ser Rojhilata Navîn di warê teorîk û pratîk de şaşiyên mezin di hundurê xwe de dihewînin. Kaosa di roja me ya îro de jî hinekî berhemê van helwest û nêzîkbûna ne.

Di roja me ya îro de yek ji mijara herî zêde ku her kes li ser disekine kaosa li Rojhilata Navîn e, ku êdî kes ji nedîtî ve nayê. Ya herî trajîk jî, ne yên îdîa dikin ku xwediyên esîl ên herêmê ne, ne jî yên îdîa dikin ku xwediyên nû yên herêmê ne, bi çareseriyeke nû nêzî herêmê dibin. Dibizdin. Eger rast nêzî herêmê bibin, wê tenê neyê wê maneyê ku devê Qutiya Pandora'yê vedibe, weke ku wê Keştiya Nûh xwe li serê çiyayê Cûdî deyne, maneyek wê hebe. Jiyana nifşekî nû - hem di warê însanî de, hem jî di warê ekolojîk de - belkî wê demê bipişkive. Jiyana heyî ji serî heta binî bi derew û zordestiyê hatiye nuxumandin. Her wisa bi helwestên çor ên îstîsmarker û despotîk ên hezarsalan tijî bûye ku bi her cure fahîşetiya koka xwe bi awayekî fermî diçe heta dewleta rahîb a Sumer a 5000 salî, çaviyên civakî xetimandine, tam mirî nebe jî pir dûrî jiyînê û jiyanê nefesê dide û distîne.

Împaratorên DYE wek Îskenderên hemdem, bi projeya dawî ya Rojhilata Navîn, gelo wê karibin rê li ber bûyerên bişibin Helenîzmê vekin? Dîsa mîna Îskender kirî, bi avahiya xweser a împaratorên Persan arîstokratên Kurdan re hevkariyê xurt bike û mîna tevgereke Helenîstîk wê DYE jî karibe bi hevkariyê bi rêveberên eyaleta Iraqê arîstokratên Kurd re bike?

Ya hînê jî girîngtir, qebîleyên Kurd ên Aryen ku wextê şeveqa dîrokê avêt û ji bo dergûşbûna şaristaniyê rol lîstin, wê dîsa karibin vê rola xwe bi cih bînin? Yanî wexta Rojhilata Navîn bikeve serdema şaristaniya demokratîk, wê karibin heman rolê bilîzin? Di dîrokê de qebîleyên Kurd bi piranî yan ji der ve, yan jî bi reaksiynan bandor li şaristaniyên hawîrdora xwe kirine. Li ser cografya xwe rê li ber hindik şaristaniyan vekirine. Zêdetir li dijî îstîla û dagirkeriyên ji

der ve hebûna xwe bi etnîsîteyê - eşîr, qebîle - parastine, yan jî ji bo vê yekê hevkarî kirine. Van taybetiyên xwe di roja me ya îro de jî diparêzin.

Ji aliyê din ve, li hemberî kapîtalîzma global a ketiye nav pêngaveke nû, wê berxwedan, xweparastin û hevkariyê bi motîfên kevin hêsan nebe. Her çend malbatên hevkar ên arîstokratîk ên kevneşopiyê bixwazin vê polîtîkayê dewam bikin jî êdî gelekî demokratîk - gelê serketinê - ê etnîsîte li dawiyê hîştiye, wê nekaribe di bin motîfên kevin de qîma xwe bîne. Ne jî ev, yan jî ew hêzê karibe wî kontrol bike. Kurdan wek gelekî nekarîne dewleteke klasîk ava bikin. Divê ev ne wek kêmasiyekê, lê divê wek şensekî were nirxandin. Nertineke bi vî rengî ji bo azadîxwazên civakê rastir e. Çiqas nirxên azadiyê yên civakî û azadîxwazên navend dewletê hene ku gelên xwe razî kirine? Hemû gelên Asya, Efrîka û Emerîka Latînî bûn dewletdar, gelo pirsgirêkên xwe çareser kirin? Berovajî, gelo pirsgirêk ji berê zêdetir û girantir nebûn?

Ya girîng, divê mirov helwesta bingehîn a gelan a dîrokî, nasnameya wan a komîn û demokratîk bigihîne derfetên teknîkî, zanista hemdem û bi sazîbûnê rake. Di roja me ya îro de ji bo gelên Rojhilata Navîn demokrasî ji nan, av û hewayê zêdetir hewce ye. Ji bilî demokrasiyê ti alternatîf ji bo gelan bextewer bike, xwedî qabîliyet nîne. Gelê Kurd ku di serê van gelan de tê, eger taybetiyên xwe yên civakî, zemanê dîrokî û cografya xwe ya heta dawiyê stratejîk bûye, ji bo şaristaniya demokratîk li Rojhilata Navîn seferber bike û bigihîne serketinê, wê tevî xwe qenciyeke mezin li cîran û mirovatiyê bike.

**A- Têgihîştineke rast li Rojhilata Navîn pirsigirêk çiye û çawa pêşket?**

1- Beriya çareseriyên faraziye, girîng e, em çareseriyên têgînî têra xwe rohnî bikin. Gelek têgîn hene civak di dîroka xwe de û di roja me ya îro de bi wan radibin û bi wan rûdinên. Em heta van têgînan rast tarîf nekin, wê hemû faraziyeyên bêne kirin qîmeta wan a rohnîkirinê pir kêm bin. Mînak, têgîna "Ellah", em heta vê têgînê bi awayekî sosyolojîk rave nekin, emê karibin kîjan serdema dîrokê û civakê tarîf bikin? Ewrûpî di derketina ji serdema navîn a feodalîzmê de, bîla sedem di asta zêhniyetê de herî zêde teolojî û theodîce guftûgo nekirin. Theo yanî Ellah ew çend nîqaş kirine ku di vê de hinek şopên zanist û felsefeyê zevt kirine. Bawerkirina bi Theo û pîrozkirin pir zêde bû. Ji lewra karîbûn bibêjin; eger em ev çend jê bawer dikin û pîroz dikin divê em maneya wî jî bizanibin. Karîbûn ji

bo guftûgokirinê cesaret bikin, dogmatîzmê hilweşînin û fikrên nû deynin holê. Di derketina ji serdema navîn de, di bingehê guftûgokirina fikrî de teolojî hebû. Ramanên ku li ser navê felsefe û zanistê li naverastê jî hene, pir bi awayekî şidandî bi teolojiyê ve girêdayî ne. Ya girîng, bi van guftûgoyan karîbûne ji bo felsefe û zanista rasyonel hin encaman bi dest bixin. Teologên Îslamê jî di encama guftûgoyan de şûna hin encaman bi dest bixin, dogma hînê pîrozkirine û bi vî awayî raman cemidandine. Îmamê Xezalî hînê di destpêka sedsala 12. de felsefeyê mehkûm dike, deriyê îçtîhadê jî baş teng dike û dibe sedem ku di tarîtiya serdema navîn de wenda bibe. Îro jî kes newêre guftûgoyek bi vî rengî bike. Ya rastîn, qabîliyetek bi vî rengî tine.

Jixwe, kûrahiya zêhniyeta civakên Rojhilata Navîn xwe dirêjî serdema mîtolojîk dikin. Berhemên wêjeyî û mîtolojiyên rahîbên Sumeran pir bi hostayî û afirênerî pêk anîn; her sê dînên yek xwedayî wek versiyonên pêşketî bi kar anîn. Em Hz. Îbrahîm wek damezrênerê dînê yek xwedayî - tewhîdê - dizanin. Lê ew bi xwe di nav qral xanedanên Babîlan - Nemrûtan - de mezin bûye û gihîştiye. Bîranînên wî li órfayê hê jî zindî ne. Tê zanîn bavê wî wexta li cem Nemrûd karmendek bû û nobedariya Pantheonê - koma peykerên xwedayan - dikir, di encama bandor-reoksiyonê de veguherîneke zêhniyetê jiyaye. Ê baş e, eger em Pantheona Nemrûd nizanibin emê li dînê Îbrahîm çawa serwext bibin? Profesorê îlahiyatê yê herî bi xwe bawer tenê dikare weha bibêje; "Îbrahîm bi bivir pût şikandine. Nemrûd hêrs bûye, gotiye kê şikand; wî jî gotiye pûtê mezin şikand. Nemrûd jî gotiye pûtê bê ruh çawa dikare bişkîne, wî jî gotiye ma pût xweda nîne." Bi vî awayî çîvanok dewam dike. Ev gotinên me anîn ziman, ji çîrokekê zêdetir ti qîmeta wan nînin. Em heta sparte û palpişta Panteona Nemrûd mîtolojiya Sumeran ji aliyê sosyolojîk ve analîz nekin, em nikarin şoreşgeriya dînî ya Hz. Îbrahîm tarîf bikin. Em heta wê tarîf nekin, em nikarin şoreşên dînî yên Hz. Mûsa, Hz. Îsa û Hz. Mûhammed fêm bikin. Li Rojhilata Navîn ew çend zanîngeh û beşên îlahiyatê, dibistanên îmam-xetîb, terîqet û saziyên diyanetê hene, yek ji wan nikare sosyolojiyeke îlahiyatê bike. Eger bikin wê sihêr xira bibe. Wê kumê bikeve û serê keçel xuya bike. Wê were dîtin ku di bingehê fikra yek xwedayî de du rastî radizên; wek îfadeya yekîtiya hêzên di xwezayê de qral û şefên hiyarerşîk di civakê de mezin dibin hene. Yanî têgihîştina civaka serdest û pê ve têgihîştina xwezaya serdest hingê wek îfadeyeke mezin têne pêşdebirin, xwe digihînin Ellahê 99 sifat û rengî. Tevî ku nîqaşeke bi

vî rengî hîç nehat kirin, îro Hîzbûllahê - Partiya Ellah - xwedê yekser siyasî kir û heta eskerî, lê dîsa jî li ezmanan li xwedê tê gerîn û bi vê, civak tê xapandin.

Îlahiyat li ser saziya peyxembertiyê jî bi awayekî dogmatîk radiwest e. Mîna ku ti têkiliya wê bi civakê re nebe, bi zimanekî mucered dinuxumîne. Di pêkhatina vê saziyê de li aliyekî kevneşopiya şaman-şêx, li aliyê din jî saziya wezîrtiyê ya hêza sereke ya li ber serê qraltiyê mezin dibe, bi tesîr in. Di pêşketina dewletê û hiyarerşiyê de pirsgirêk derdikevin. Di nav van pirsgirêkan de peyxembertî wek çareseriyê derdikeve holê. Ev pêşketineke bi siyasetê re têkildar e. Hem bingehekî wê yê girseyî û hem jî bingehekî wê yê çalakiyê heye. Di pêşketina pêşengiya siyasî û zanyariyê de xwediyê rolekê ye. Ya girîng, qûtsiyeta wî hebe jî divê mirov cihê wî di nav rastiya civakê de lêbikole.

Eger wisa were kirin, hin şexsiyetên dîrokî wê bi rastî werin fêmkirin. Wê dîrok bi xwe jî baş rohnî bibe. Ravekirineke dogmatîk bi hêsanî dikare her du aliyan jî di tarîtiyê de bihêle. Gelek têgînên din ên teolojiyê bi navê qûtsiyetê tarîtiyê çêdikin. Di vê çarçoveyê de têgîninên cennet û cehennemê balkêş in. Kokê van têgînan digihîjin heta mîtolojiya Sumeran. Têkiliya wan bi mezinbûna civaka çînî re eşkere ye. Nîzama çîna xebatkar pirî caran cehennemê - wek gotin îro li Lubnanê cihê Hinom; xirab, pîs, çemê genî - bi bîr dixîne, jiyana kesên hatina zêde jî desteser dikin, her ku diçe dibe mîna cennetê. Ji zêdekirina mînakan, ya girîng; em bi analîzên sosyolojîk mijarê zelal bikin.

Di fikra Rojhilata Navîn de hê jî cudabûna di navbera dîn û mîtolojiyê de nehatiye guftûgokirin. Jixwe mîtolojî bi xwe nayên şîrovekirin. Tê gotin çîrok in, çîvanok in, û li aliyekî têne hîştin. Lê ya rastîn, ev şêwazê fikrê bi hezarsalan mejiyê civakên em tê de dijîn, mijûl û dagir kir. Hîmê hezarsalan bû formê fikrê. Ji ber ku jiyana maddî ya civakan bi zimanekî helbestwarî anî ziman, bandor li ser hemû şêweyên wêje û dînên piştî xwe kir. Ti dîn û wêje nîne ku têgînên xwe ji mîtolojiyê wernegirtibe. Mîtolojî, çîrok û efsaneyên lihevçêkirî nînin; yên wer li mijarê binerin û mîtolojiyan bidin aliyekî, xwe ji çavkaniyeke dewlemend a çandê bê par dihêlin. Em heta mîtolojiyê wek fikra serdema mirovatiyê nebînin û qîmetekê nedinê, em nikarin analîzeke têkûz a dîn, wêje û hunerê bikin. Em nikarin mîtolojiyê ji nedîtî ve werin. Berovajî, hewce ye em wê geş û zindî bikin.

Mîtolojî di kîjan dem û forman de ji dînan re bûye çavkanî, bi serê xwe mijareke guftûgoyê ye. Wek tê gotin, kengî mîtolojî ji sedî sed bibe pîvana baweriyê wê demê dibe dîn. Di vê maneyê de mîtolojî tê qebûlkirin. Wexta mîtolojî bibe dîn rê li ber du rewşan vedike. Di mentiq de rê li ber fikra mutleq a camid vedike. Bi vî awayî fikra qanûnî pêş dikeve. Qanûna xwedê her diçe bi qanûna xwezayê re dibe yek. Li aliyê din, di civak û xwezayê de fikra tevgera diyalektîk hê ji dayik nabe, berdiavêje. Bi vî awayî rê li ber fikra îdealîst tê vekirin. Raman û fikir serê xwe digire û bi awayekî bê kontrol pêş dikeve. Fikra îdealîst a dikeve macerayeke bêserûbinî, zêhniyeta civakê qatekî din ji cîhana rastiyan dûr dixîne. Pêşketina fikra dînî, her ku diçe di huqûq, siyaset, aborî, exlaq, huner û gelek hîmên bingehîn de wek dogmayên hişk cih digire. Rengê qanûnî werdigire. Ya rastî, ji çîna dewletdar a mezin dibe, rêvebirineke xurt hêsan dike. Her pîvana dîn xwe digihîne hukmê qanûnê, bi vî awayî hem yasayî dibe, hem jî rewa dibe. Di serdema seretayî û navîn de ji ber ku dîn di rêvebirinê de gelek rêyên hêsanbûnê vekirin, ev çend hat mezinkirin.

Dîn îdeolojiyeke rêveberiyê ye, bi nazenînî hatiye hûnandin. Çîna serwer her tim li taybetiya mucered a dîn hayedar e. Bi tebeqeyên jêr ên civakê jî mîna heqîqet be dan bawerkirin. Ji bo dîn zêde sermaye razandin, bi perestgehan temsîl kirin û merasîmên dînî hemû ji nêz ve bi erka rêveberiya dewletê ve têkildar e. Ji lewra ji bo rûyê dîn ê rastîn neyê fêmkirin guftûgokirin li ser qedexe ye. Ji guftûgoyê wê du encam derkevin; mezinbûna qraliyetê û rewabûna xwezayî. Her du jî pir girîng in. Wê wextê bihata fêmkirin ka xweda-qral û siya xweda-sultan çawa hatine mezinkirin û bi vî awayî wê civakê ji têgihîştina xwedayekî ku ditirsîne û ceza dike bihata xilaskirin. Dîsa bi beşê derbarê xwezayê de wê rê li ber zanistê bihata vekirin. Wê pîvanên ku li cîhana ilmî bandorê dikin, wek fizîka kûantûm û kozmosê bihata fêmkirin. Ji ber ku Ewrûpayê di derketina ji serdema navîn de guftûgo û analîzên xurt li ser teolojiyê - îlahiyatê - kirin, serdestî bi dest xist. Bêguman pêşketina zêhnî bi tenê bi guftûgoyên li ser teolojî, theodîce'yê nabe. Lê ev jî nebe, deriyên zîhnê li fikra hemdem venabin. Eger di sedsala 12. 13. û 14. de guftûgoyên mezhebên Francisken û Domînîken nebûna Ronesans bi hêsanî pêş nediket.

Çîna ilmiye ya Rojhilata Navîn tam jî di sedsalên 12. 13. û 14. de deriyên xwe li guftûgoyê girt. Gûftogikirin û derketina ji dîn kirin yek. Bi vî awayî dogmatîzmeke hişk li ser civakê ferz kirin. Jixwe

kevneşopiya îqtîdarê jî ev meyl pir xwedî kir û di encamê de şaristaniya Rojhilata Navîn di dîrokê de yekem car pêşengî ji destê xwe revand û da destê Rojava. Sedsala 15. sedsala ji hev veqetîna mezin e. Di navbera Rojhilat û Rojava de newaleke kûr vedibe û di bingehê vê de jî nêzîkbûna cuda ya teolojiyê heye. Di sedsalên 9., 11., û 12. de ramana felsefîk gavên mezin pêş ve avêtine. Rojava tenê wergerê dike û bi vê rê agahiyan vediguhêzîne. Ji sedî sed serdestiya ramanê di destê Rojhilata Navîn de ye. Mezhebê Mûtezîle rasyonalîte kiriye bingehê xwe û li dijî dogmatîzmê şer daye destpêkirin. Îbnî Ruşd di sedsala 12. de fîlozofê herî mezin e. Pêşengên felsefeya tasawifê yên wek Hellacê Mansûr û Suhrewerdî di berdêla canê xwe de xwedî li ramana xwe derketine. Zordariyên dijwar bûn di dawiya sedsala 12. de rengê Rojhilata Navîn ê heta îro jî dewam kir, destnîşan dike.

Di qels mayîna wêjeyê de para dogmatîzma dînî hindik nîne. Wêjeyê karîbû bi çavkaniya mîtolojiyê ve girêdayî bimîne û rê li ber pêşketinên mezin veke. Lê heman qedexeyê, zeviyên wêjeyê jî zûha kirine. Qedexe û gunehan mirovatî ji çavkaniyên herî dewlemend bêpar hiştine. Ewrûpayê di van salan de dest pê kiriye, yekemîn berhemên xwe yên klasîk dane. Li Rojhilata Navîn wêje bûye qesîdeyên pesindayîna sultanan û bûye çîrokên wan ên nepixandî. Aliyê herî dilêş ê meseleyê, di roja me ya îro de jî Rojavahiyan dest avêtine rastiya mîtolojîk û dînî ya Rojhilata Navîn û dikin wêje. Hînê jî pirsgirêkeke mezin e, wê wêjeyê çawa were kirin.

Şoreşa zêhniyetê ya ku Ewrûpayê bi Ronesans, reformasyon û rohnîbûnê pêk anî, li civaka Rojhilata Navîn hînê neketiye rojevê. Veguhestinên bijare nayên maneya Ronesans, reform û rohnîbûnê û heta mirov dikare behsa pêvajoyeke berovajî bike. Ya rastîn, Îslama radîkal ne ku nûbûnê, muhafezekariyê xurt dike. Têgîna Îslama siyasî, ji bilî îqtîdara kevneşopiyê ti maneya wê ya dînî nîne. Eger Rojhilata Navîn di ser qonaxên zêhniyetê yên Rojava re baz bide, mumkîn nîne bikeve pêvajoya pêşdebirina zêhniyetê. Bi dîngirtinê, heta tenê bi zanistê û helwestên felsefeya pozîtîvîst veguherîna zêhniyetê nabe. Di bingehê paşve mayîna heyî ya Rûsya û Çînê de bandorên diyarker ên helwestên mezhebwarî yên "sosyalîzma reel" yên xwe naspêrin qonaxên ramana Rojavayê hene.

Ji bo saziyên ku bûne girêka kor, li dawiyê werin hîştin û jinûve avakirin bibe, şoreşa zêhniyetê şert e. Şoreşa zêhniyetê nayê wê maneyê ku mirov tenê fikra Rojava bi xwe ve dawerivîne û veguhezîne. Ji ber ku di vî warî de jî bûyerên bijare hene, tenê mîna

pîne hatibin kirin radiwestin. Jiberkirina ramana Rojava nikare afirîner bibe, berovajî wê stewr bike û heta dikare hin şoreşên muhtemel jî asteng bike. Li naverastê gelek rewşenbîrên ezbere hene, lê sosyologekî rastîn nîne. Li naverastê gelek mamosteyên zanîngehan hene ku em dikarin ji wan re bibêjin melleyên hemdem. Sofîzmeke ji sofîzma serdema klasîk zêde paşdetir heye. Tu bi çira û lampeyê bigerî, zehmet e, tu zanyar-fîlozofekî entelektuel bibînî. Bawerî bi vê pêdiviyê nîne. Amûrên îdeolojîk ên Rojava xirab hatine veguhestin. Çi netewparêzî, çi lîberalîzm û çi jî sosyalîzm, formên îdeolojiyên hemdem di zêhniyeta rewşenbîrên Rojhilata Navîn de ji roleke paşverû zêdetir ti rol nelîstine. Ji kiryarên heyî baş tê zanîn ku rastiya Rojhilata Navîn bi van şablonan nayê ravekirin û hînê zêdetir pê qirêj dibe.

Şoreşa zêhniyetê tevî bi karanîna formên Rojava, divê naverok bi rastiyên xwe yên cewherî were tijîkirin. Hemû avahiyên bingehîn ên civakî û dîrokî yên ku zemînê maneyê xwe dispêrinê, heta bi bombardûmaneke fikrî li dawiyê neyê hîştin, avahiyên nû yên hêza maneyê xwe bispêrinê pêk nayên. Avahiyên maneya wan jî nebin, ti qîmeta wan a civakî nînin û cihê wan nabe. Di fikrê de heta rastiya xwe ya civakî çareser neke, rastiya dînî, netewî û etnîk neyên rohnîkirin, pir zehmet e, tevî siyasetê, saziyên aborî û civakî jî werin rohnîkirin. Di fikra Rojavayî de pêşketinên di warê ekolên dîn, netewiyet û nijadperestiyê de bi hewldanên mezin hatine kirin. Paradigmaya jiyana nû di encama hewldanên bi vî rengî yên zehmet de serdest bûye.

Siyasetvan û rewşenbîrê Rojhilata Navîn mîna ku hewceyî bi têkoşîn û hewldaneke welê mezin nîne tevdigere û bawer dike ku wê bi ezberê û veguhestina teknîkê xwe bigihîne şoreşa zêhniyetê. Di encamê de newêre di şoreşa xwe ya zêhniyetê de gav biavêje, girêdan û hewcebûneke zîhnî, li hemberî kapîtalîzma global neçar û bê çareserî ye. Kaosa Rojhilata Navîn heta Ronesans, reformasyon û rohnîbûna xwe nejî nikare bibe ji bo gelan û wê nikarebe ji destpotîzma hezarsalan a bi cîla dused sal a Rojava hatiye makyajkirin xwe xilas bike.

2- Sazîbûna dewlet û hiyarerşiyê, yek ji rastiya civakê ya herî zêde zehmete analîza wê bê kirin. Ji bo tesîr li çanda Rojhilata Navîn bê kirin, divê zimanê çanda siyasî rast were çareserkirin. Bi mezinbûna dewlet û hiyarerşiyê re xanedantî, dîn, malbat û têkiliyên eşîrê yên têne hûnandin mîna ku sîstema civakî derdixîne derveyî

zeman û mekan. Vegotina mîtolojîk û dînî tevî vegotina çînî û etnîk dirûvê rastiya bûyeran hê jî belek û rengareng dike.

Herêma ji qonaxa neolîtîk a civaka komîn a seretayî re bûye navend, hê jî hafiza civakî ya kûr a vê serdemê dijî. Ji aliyê maddî ve jî reng û avahiyên neolîtîk hebûna xwe dewam dikin. Gundîtî heta doh jî çi cudahiya wê ji navendên neolotîk nebû. Sîstemên koledar û feodal jî nirxên çanda bi kok ên herêmê ne. Çanda Rojava ya li van çandan zêde bû, tenê rola cîlayê pêk anî. Ji lewra mirov li cîlayê binere û analîzên civakî bike, wê mirov gelek were xapandin.

Navekî din ê sîstema bavikanî hiyarerşî hema bêje çaviyê civakê yê neçizirîbe û danewerivîbe nîne. Belkî ji beriya dewletê bi hezarsalan hiyarerşiyê civak bi rê ve bir. Hêza baviktiyê li ti devera cîhanê qasî li Rojhilata Navîn xwe ba nedaye û nefes li jiyanê neçikandiye. Hê jî li ser nirxên dijîn, wek kesayeta mêr û jin, çanda etnîk, malbat û têgihîştina namûsê hêza baviktiyê diyarker e. Bajarên diviyabû çanda dijber biafiranda, şopên kûr ên jiyana çolter yanî baviktiyê hê jî li ser xwe hildigire. Di nav okyanûsa çolter û reşahiyê de mîna giravokan dimînin.

Dewlet li ser çanda hezar salan a bavikanî mezin dibe. Di pêkhatina wê de ji hêmanên çînî zêdetir, komên bavikanî yên xurtbûyî roleke bingehîn dilîzin. Di nav van koman de jî herî zêde fîgurê rûsipiyê zana derdikeve pêş. Pîrê xwedî tecrûbe yê qebîleyê belkî jî wek zanayekî otorîteya herî kevin e. Bi îhtimaleke pir mezin, piştî dayika zana û aqilmend a di şoreşa cotkariyê de rol lîst, rûsipiyê zana yê xwedî tecrûbe gav bi gav pêşket mîna şêx-şaman-peyxember statuyeke civakî bi dest xist. Di civakê de bi pêşketina çînayetiyê re ji bavikanî ber bi saziya dewletê ve pêşketin dibe û zana wê wextê tevî muttefîkên pê re xwe digihîne xanedaniyê û qraliyeta xwe dispêrê.

Bi îhtimaleke mezin, ji şaman, rahîb, ji ciwanên nêçîrvan mufrezeyên eskerî pêk hatine û xwe gîhandin meqamekî hînê jor. Rahîb îdeolojiya meqamê nû hûnand û mufrezeya eskerî jî her ku çû bû artêş. Ji bo herêmê, modelên bi vî rengî yên dewletê hînê rastir xuya dikin. Ti delîl di dest de nîne, berê li vê herêmê hebûna artêşeke amade ya koleyan nîşan bide. Koletî piştî ku saziya dewletê xurt dibe, pêş dikeve. Em di mînakên Sumer û Misrê de dibînin ku demeke dirêj berê rahîb û qebîle bi bandor in. Kolekirina mirovan bi hêsayî nebûye, bi têkoşînên pir dijwar di zikhev de hatiye meşandin. Di çanda Rojhilata Navîn de pêvajoya divê herî zêde were çareserkirin û şopandin, hînkirina civakê ya koletiyê ye. Wek

îdeolojiya rahîbên Sumer û Misrê girîngiya mîtolojiyê ji rola wê ya di dewletbûnê de tê. Çawa ku kapîtalîzmê têkoşîna ji bo îdeolojiyên netewparêz û lîberalîzmê meşandiye û forma dewleta kapîtalîst derxistiye holê, vegotina mîtolojîk jî forma koletiya serdema seretayî afirandiye. Eger hêza rewakirinê ya vegotina mîtolojîk li ser civakê nebûya, belkî ew xanedaniyên xwedê-qral pêk nehatana. Pêk bihatana jî belkî ew çend mayînde û bi kok nebûna.

Gotinên Nemrûd û Fîrewn di çanda Rojhilata Navîn de tam jî xwedê-qralan îfade dikin. Qral-xwedê afirandineke Rojhilata Navîn e. Ji şexsekî wêdetir çandek e, saziyek e. Hemû endamên din ên civakê li hemberî qral-xwedê mîna moriyên erzaq dibin, radiwestin. Cudahiya di navbera qral-xwedayan û rûyê din ê civakê de mezin dibe û berovajî dibe, di dawiyê de du nifş derdikevin holê; nifşên namirin ên qral-xwedayan û nifşên dimirin ên mirovan. Qabîleyet an jî qurnaziya mîtolojîk pir bi nazikî hewl daye tebeqeya jor a dewletê rêve dibe, ji mirovan nehesibîne. Wek sazî jiyana dewamî ya serdar û serdestên dewletê, yeqîn dikim ku di afirandina sifetê "bêmiriniyê" de roleke diyarker lîstiye. Têgîna bêmiriniyê ya di ramana xwedê de eşkere ye, ji saziya dewletê ya domdar tê. Beriya dewletbûnê ji bo qralan jî mirin tê fikirîn. Di serdema neolîtîk û îfadeyên temsîlî de ji bo xwedayan her sal rojên taybet ên bûyîn û mirinê hene. Bi destanên belavbûyî û îbadetan, merasîmên pîrozbahî û şînê pêk dihatin. Çi wextê saziya dewletê domdar bû, - şexis demborî, dewlet mayîn de - wê wextê jî xweda bê mirin bûn. Di vir de cihêwazkirina xanedan û nifşên qral-xwedayan roleke girîng dide. Ji mirovan nayên hesibandin û bê mirin in. Ev yek wan bi hêzeke awarte mezin dike û cihêwaz dike. Piştî ku çîna dewletdar kirin nifşekî xwedayên bê mirin, ji mirovên din re jî - hemû mirovên din ên civakê - tenê ebdiyet û stûxwarkirina ji xwedayan re ma.

Ev ebdiyet ji koletiya hewcedarî ya di dema Roma û Grek de hat dîtin, pir cuda ye. Mîna di navbera hewcebûna bi efendî û xwedê de cudabûneke hebe. Di girêdana bi xwedê de têkiliyeke xurt û yekpare ya bawerî û îbadetê heye. Di kevneşopiya rahîban de girêdana bi dewletê di şexsê qral-xwedayan de ew çend bi hostayî tê kirin ku artêşa kole-ebdan mîna moriyan piçûk dibin, bar hildigirin û xizmetê dikin. Di mîtolojiya Sumeran de mîna mirov ji gûyê xwedayan an jî gavek li pêş, ji axê (heriyê) hatibe afirandin tê nîşandan. Xweda mirov bi awayekî hûrûkûr diafirînin heta roja me ya îro tê. Jin bi qasî ku ji xwedayan neyê afirandin hatiye ji bîrkirin. Payeyek ji bo wê hatiye destnîşankirin ew jî; ji parsûyê zilam tê afirandin. Ev vegotin

girîng in, ji bo di derketina tebeqeya seretayî ya dewletê de nîzama mezin a îdeolojîk nîşan bide. Li ser parçekirina mirovan ew çend rawestiyan e; çendîn nifş derbasbûne jî piraniya civakê ne tenê xwedayetiya tebeqa dewletê erê dike, her wisa jê re îbadet dike û xebata herî zêde mîna fermaneke îlahî fêm dike. Kûrahiya îdeolojiyê ev çend pêş dikeve. Ya rastîn, sazîbûneke ku bingehê wê zordestî û derew e, mezin dikin, mirovan li ber ditewînin û rewşeke metafizîk û mucered fetîş - tiştê jê re perestinê - dikin.

Ev şaristaniya ku çavkaniya wê Rojhilata Navîn e, taybetiyên wê pêl bi pêl li dunyayê belav dibin. Nemaze taybetiyên neolîtîk ên hêja û dewlemend ên ji çanda herêmê ditepisîne û bi afirandina mîtolojiyeke ku karibe ji her bawerî û ramana paşverû re bibe zemîn di heman cihokan re di serî de li civakên herêmê, li piraniya civakên pêşketî belav dike. Ev tesîreke wer xurt e; bi nûnerê herî dawî û mezin ê felsefeya îdealîst Hegelî dide gotin ku "Dewlet bi gewdebûna xwedê ye." Ev tesîr hê jî dewam dike. Gelek gotinên rojane yên derbarê ebediyet û pîrozbûna deweletê de, çavkaniya wan ev sîstema kevin a ebdiyetê ye.

Di derbasbûna ji îdeolojiya dewletê ya koka wê mîtolojîk ber bi îdeolojiya dîn a yek xwedayî de ku xwe dispêre têgîna dewletê, guhertineke girîng heye. Nakokiya sereke ya sembolîk a Xirîstiyaniyê bi Romayê re ev e; dibêje împarator nabe xweda û Hz. Îsa-Mesîh kurê xwedê ye. Di cewherê xwe de ev vegotin ji bo hemû dînan dikare were qebûlkirin. Sedema hebûna peyxembertiyê ew e ku xwedê-qral têne redkirin û peyxemberan mîna qasidê xwedê didin qebûlkirin. Ji îdeolojiya qral-xwedayan veqetîneke xurt û bingehîn dibe. Em wexta dîtina xwedayî ya cîhanê ku di serdema seretayî û navîn de li ser zêhniyeta civakê serdest e, li ber çav bigirin, di warê zêhniyeta civakî de şoreşek qewimiye. Bi awayekî berçav revek ji kulta Fîrewn û Nemrûd yanî ji dewletê heye. Bi gotineke din hîcret e. Di serî de Hz. Îbrahîm, Mûsa, Îsa û Hz. Mûhamed di pratîka peyxemberiyê de heman meyil xuya dike. Ev çalakiyên bi qasî aliyê wan ê civakî divê aliyê wan ê siyasî were dîtin û mîna şoreşên ciddî yên wan deman werin qebûlkirin. Slogana wan a bingehîn a îdelolojîk weha ye; "mirov nabin xweda, lê dikarin bibin qasidê wî." Em hinekî din berçav bikin, divê çanda xweda-qralan were nermkirin û divê herî kêm bi beşekî civaka xwe re li hev werin. Bi vê yekê dixwazin kesekî despot - ê çi dixwaze dike - ê ji xwe re dibêje qral, dixwazin kiryarên wî bi sînor bikin.

Despotekî di qral-xwedêbûnê de israr dike lihevkirin li aliyekî, naxwaze dengê ebdê xwe jî bibihîse. Çîroka Hz. Eyûp di vî warî de gelekî balkêş û hînker e. Em wexta beşê Hz. Eyûp di Pirtûka Pîroz de hûrûkûr şîrove dikin, bi kurtî û cewherî îfadeya wê ev e; wek tê zanîn Hz. Eyûp her tiştê xwe wenda kiriye, di nav êş û keserên giran de li quncikekê - yan jî zîndanê - dinale û kurm ketine bedena wî. Xwedê-qral - yanî Nemrûdê li órfayê - nikare bifikire çima ebdên wî êşê dikişînin. Li gorî xwedê-qral ebdên wî mukelef in ku bê deng û hîç êşê nekişînin, jê re xizmetê bikin. Êş kişandin bi xwe jî guneh e. Di vê rewşê de çalakiya herî mezin a Hz. Eyûp ew e ku êşa xwe bi xwedê-qral - yanî dewletê - dide qebûlkirin. Yanî xwedê-qral yekem car fêm dike ku ebdekî wê êşê dikişîne. Ev "fêmkirin" bi xwe şoreş e. Ya rastîn di şexsê Eyûp de xizanî û êşa gel dikişîne, tê sembolîzekirin.

Wexta qebrên xweda-qralên Misir û Sumeran hatin vekirin, li cendek û termê hezaran mirovî rast hatin. Piraniya terman jî yên jina ne. Mirov dikare fêm bike ku wexta qral dimire hemû berdestiyên wî jî pê re têne veşartin û definkirin. Li gorî têgihîştina qraliyeta wê demê, canekî berdestiyên qral nîn e. Çawa bi mirina qral re dest û lingên wî dimirin, berdestiyên wî jî wisa ne; bi mirina qral re berdestî jî dimirin, an jî wer têne hesibandin. Bi giştî di rejîmên mutlaqiyet û yên mîna wê totalîter de, monarkên li serî û yên li pey wan, wek goşt û neynûkên bedenekî - yan jî mûyên bedena wî - têne hesibandin. Jiyaneke wan a cuda nayê qebûlkirin. Ev rêzik û pîvan hatibe nermkirin jî ev "rêzikeke zêrîne" dewlet ji welatiyên xwe dixwazin. Têgihîştina xwedê-qraliyet-ebd di cewherê xwe de hîç neguheriye û heta roja me ya îro hatiye. Lê hindek be jî di şaristaniya Rojava de guhertinek pêk hatiye.

Şoreşa Eyûp nîşan dide ku mirov êdî dikarin êş û keserên xwe bînin ziman û hewl bidin serê xwe rakin. Pîrozbûna wî jî ji vê tê. Divê mirov piçûk nebîne. Belkî jî di dîrokê de mirov yekem car nerazîbûna xwe li dijî dewletê tînin ziman. Bi vî awayî jî dibe yekemîn şoreş. Her çend em nizanibin dewlet çiqas nerm bûye jî kulta peyxembertiyê ya mîna lodekê BZ di salên 1000 de mezin dibe, di şexsê Hz. Dawût û Hz. Silêman de dewletên xwe yên yekemîn ava dikin. Dewlet avakirina Hz. Dawût gelek balkêş e. Çi seyr û ecêb e, wexta Dawûd dewletê ava dike di rola Filîstîniyên îro de ye. Li dijî begtiyên herêmê şer dike û bi vî awayî begtiya xwe dadimezirîne. Di pêvajoyekê de ku gelek dişibe îro, xwedê û qral êdî ji hev dibin. Her du jî du hebûnên cuda ne. Her çend ji qral re tê gotin siya xwedê jî,

ya rastîn qraliyeta nû mezin dibe, bi fîgur û têgîneke mucered bi xwedê tê îfadekirin.

Di dînên yek xwedayî de divê mirov mijara "Zîlûllah-siya xwedê" baş fêm bike. Guhertina di hêza dewletê de pir girîng e. Lê divê ji bala mirov nereve, di cewher de guhertin nîne. Qraliyet çendîn ber bi ezmanan ve diçe û tê bilindkirin, dikare fermanên xeternak bibarîne. Wek fîgurekî xuya nake û li ber çavên ebdê xwe wendabûyî, çi bixwaze dikare bi awayekî qurnaz û fisekî bike. Dikare bibêje, em li hemberî sultanê ku siya wî heye, tenê xwedê berpirsiyar in û bi vê yekê hînê jî bêberpirsiyar bibe. Nuqteyeke divê ji bala mirov neçe ev e; di navbera derketina xwedê ya ezmên û wek sazî muceredbûna dewletê de têkiliyeke zêde heye. Çendîn dewlet wek saziyeke mucered - ji kesan serbixwe - hebûna wê pêk tê, wek nîşaneya wê ya îdeolojîk têgihîştina xwedê hînê mucered dibe.

Ev têgihîştina bi Hz. Îbrahîm û Hz. Mûsa dibe kevneşopî, li cem Hz. Mûhammed hema bêje feraziya teorîk a bingehîn e, di Quranê de serdest e. Ya Hz. Mûhammed li Ellahê mezin zêde kir ev in; yekîtiya xwedê, nayê dîtin, lê ew dikare her derê bibîne, cihê negihîjê nîne; hem rehman e, hem jî ceza dike; ti car şirîkan qebûl nake û hwd. bi 99 sîfetan bi sîleh kir û gîhand kemalê. Di vir de nuqteya bala me dikişîne, saziya dewletê pir zêde mucered dibe. Çiqas dibe sazî, ew çend jî xwedayetiya mucered pêk tê. Peyxemberên beriya Hz. Îsa û Hz. Mûhammed zêdetir di şertên civaka koledar de rola muxalefetê meşandin û pir hindik karîbûn sîstema xwe ya siyasî damezrînin. Lê her du peyxemberên dawî ji derketina dewleta feodal re zemîn amade kirin. Ya rastîn, têkoşîna wan a mezin li gorî armancên wan nebe jî bi lihevkirineke berfireh li ser hîmê saziya dewleta feodal rûdinên. Dînên yek xwedayî li gorî çîna navîn e, ku pir berfireh bûye. Dînên xweda-qralan li gorî derketina dewleta koledar û sîstema bavikanî ne; xwedayetiya şexsî û pir xwedatî jî li gorî şertên neolîtîk ên qebîleyan û li gorî şertên çînên jêr bû.

Divê mirov ti car ji aqilê xwe dernexîne ku xwedayetî, nasnameya civaka pêş dikeve û îradeya kollektîf a mucered îfade dike. Eger wisa be, em dikarin têkiliya di navbera civak, siyaset û îlahiyatê de baş fêm bikin. Dewleta Rojhilata Navîn a di serdema navîn de çîna navîn jî digire nav xwe, di karektera wê ya despotîk de guhertinên ciddî têne dîtin. Navê qral ê nû sultan e, îqtîdar bi şexs tê temsîlkirin. Ji bilî xwedê ti îradeyeke din nîne sultan girê bide. Çîna ilmiye ya fermanên xwedê şîrove dike, jixwe kategoriyeke ji kapikulu ne. (Kapikulu - ebdê ber derî - ; di Osmaniyan de artêşa

yekser bi sultan ve) Ji bilî îradeya sultan tiştekî din wan temsîl nake. Civaka jor a dewletê, wek têgihîştin û exlaq li ser piraniya civakê xwe ferz dike. Dewleta li ser bajêr bi hukm e, li çolter û reşahiyê jî belav dibe. Dewleta serdema navîn hem di Îslamiyetê de, hem jî di Xirîstiyaniyê de dema xwe ya herî xurt jiya. Împaratoriyên Bîzans û Sasanî ku şêweyên riziyayî yên dawî yên koledariya serdema seretayî bûn, PZ di sedsala 6. û 7. de dikevin pêvajoyeke şemitînê ber bi feodalîzmê. Dewleta Îslamê belkî jî yek ji wan dewletan e ku gavên herî hişk û radîkal bi dewleta feodalîzmê dan avêtin. Mirov dikare wek qonaxeke nû di çanda Rojhilata Navîn de binirxîne. Dewleta Ereb-Îslamê temsîla xwe ya herî xurt di demên Emewî, Ebbasî û Selçûkiyên Tirk de dît. Ji rojhilat bi êrîşên Moxolan û ji Rojava bi êrîşên Xaçperestan bi giranî hêza wê dişkê. Piştî ku di salên 1250 de Xanedaniya Eyûbiyan belav dibe dikeve qonaxa rawestînê. Eger mirov Osmaniyan dewleteke nîv-Bîzans û nîv-Îslam bibîne rastir e. Taybetiyên feodal ên her du dewletan jî di Osmaniyan de gihîştine hevdu. Her du dewletan jî şêweyê herî tund ê despotîzmê pêk anîne. Her çend hewl dane pêşî li civaka feodal bigirin jî wek xwîneke teze bi Osmaniyan di çarçoveya lihevkirineke berfireh de mîna dewleta dawî ya Rojhilata Navîn dema xwe tijî dikin.

Li Çîn, Hînd û Ewrûpayê jî heman pêvajoyên dewleta feodal hene û ji demokrasiyê re xerîb in. Di vê serdemê de slogana gelan ev e; "Li vê dunyayê bexteweriya mezin, jiyaneke dûrî dewletê ye." Tevî ku dîn pir hewl daye dewlet û civakê li hev bîne jî xerîbketina her du aliyan li beramberî hevdu dewam kiriye. Etnîsîte û mezhebên ji rê derketî - li dijî fermiyetê - bûne xwediyê helwesta demokratîk û komîn. Ji bo vê yekê jî hemû zor û zehmetî li ber çav girtine, li çiyan, çolan, perestgehan û li dergahan hebûna xwe dewam kirine. Asîtî û serhildêriya li dijî dewletê, xweserî van civakan e û li cem wan berxwedan wek şêwazekî jiyanê heye.

Em dema hewl didin dewleta li Rojhilata Navîn tarîf bikin hedefa me ew e ku em rohniyê li îro bigirin. Di şaristaniya Rojava de tevî ku koka dewletê bi Rojhilata Navîn e jî di nav pêvajoyê de xwe vediqetîne. Veqetîna bi dewletên dema Atîna û Spartayê destpêkir, bi Helenîzmê xwe gîhand Romayê. Îdeaya wê ya xweda-qraltiyê gelekî qelsbûyî xwe dewam dike. Piştî ku Konstantînê Xirîstiyanî qebûl kir, ev veqetîn diseride û temam dibe. Îdîaya dewleta hezarsalan a xwedê, dewama çîroka mehşerê ya Rojhilata Navîn e. Li gorî forma Rojhilata Navîn ev hînê dunyewîtir e. Pîrozbûna dewletê baş nehatiye kûrkirin. Li dijî dewletê koçberiya qewman û derbên dijwar

ên li Romayê didin împaratoriyê hildiweşînin. Her weha împaratorî hurmeta xwe jî bi temamî ji dest dide. Qewmên Cermen ên dewletê hînê kêm nas dikin, ji bo rûyê dewletê yên dunyewî derkeve holê keda wan mezin e. Dewleta ji împaratoriya Romayê werdigirin, her çend dixwazin di serdema navîn de bi navê împaratoriya pîroz a Roma-Cermen ji nû ve geş bikin jî bi giranî wê ji zirxên monarşîk ên qralan û xwedayetiyê dikin. Çendîn rastiya dewletê tê fêmkirin, gel û netew di warê demokratîk û netewî de saziyên xwe pêk tînin. Şoreşên Îngilîz, Emerîka û Fransî taybetiya laîsîzm li dewletê bi xurtî ferz dikin. Sînorên bi Destûrê tên danîn, dewleta despotîk li nav zeviyê dîrokê vedişêre û dihêle.

Li Rojhilata Navîn di kevneşopiya dewletê de guhertinên bi vî rengî nabin, berovajî hînê muhafezekar dibe û paşve dikeve. Dewletên Îran û Osmaniyan li dijî dewletên Rojava bi parastinên xwe yên dawî hewl didin hebûna xwe hinekî din dewam bikin. Wexta dewleta Rojhilata Navîn belav dibe, mêtingeriya dewleta Rojava dûr e ku li herêmê bi cih bibe. Sedsalên 19. û 20. ji bo Rojhilata Navîn demên krîzê îfade dikin. Saziyên siyasî yên di van sedsalan de pêk tên ku em dikarin wek mêtîngeriyên nû û nîv-mêtingerî bi nav bikin, ji deverên dunyayê yên din taybetiyên wan ên cuda hene. Tarîfên kurt ên dîrokî van cudahiyan eşkere dikin. Nexasma têkiliya di navbera dewlet û civakê de bi dijwarî li dijî guhertinê radiwestiya û vê yekê jî derfet nedida derketina ji krîzê di demeke kurt de bibe. Ne şert hene formên dewleta kapîtalîst bimehîne, ne jî kevneşopiya wê zû belav dibe. Kevneşopiya civakî xwedî dînamîkên afirîner nîne ku karibe bersivê bide her du pêşketinan. Ya rastîn, hêza kevneşopiyê di bingehê civakî de mîna ji serdema neolîtîk ketibe bin erdê, bi hêsayî bi ser xwe ve nayê. Hewldanên tebeqeya jor ku ji hevkariyê wêdetir naçin, ne dikarin civakê çareser bikin, ne jî dikarin bibin malê civakê. Ji bo bikeve rêya pêşketinê ya şêwazê Rojava ne şêweyekî Emerîkî, ne jî şêweyekî pêşketinê mîna Pasîfîk Japonyayê pêk tê.

Di vir de asteng, ne tenê qalibên Îslamî ne. Bi awayekî yekpare hemû nirxên şaristaniyê li ber xwe didin. Ji nirxên civaka neolîtîk bigirin, nirxên koledariya Sumer û Misir, ji nirxên Îslamê bigirin heta nirxên dewlemend ên etnîk, germoleyek hukum dike. Şaristaniya Rojhilata Navîn ji bo veguherînê bi hêsayî tamandin û qelemkirinê qebûl nake; hinekî jî mîna dareke pîrbûyî ye, tamandinê ranake. Ji bo ya nû yan divê tu ya kevin bi tevahî bi qelibînî yan jî divê tu şêweyekî nû yê tamandinê bibînî. Her du jî nabin.

Ceribandina yekemîn a tamandinê di salên 1900 de Jontirk û Kemalîstên Tirkiyê xwestin bikin. Mîna sosyalîzma reel çawa nebû, tamandina Rojava ya di sosa netewparêziyê de baş hatiye kirin, tevî ku 80 sal di ser re derbas bûye cihê xwe negirtiye. Şahtiyên Îran û Afganistanê tevî ku rûyekî modernîst bi xwe ve kirin jî nekarîn xwe ji hilweşînê xilas bikin. Netewparêziya Ereb jî li ber ruh dide. Rewşa li Iraqê dijî, dide nîşan ku rakirina termê wê jî pir zehmet e. Netewparêziya Îsraîl a siyonîst di heman rewşê de ye û pirsgirêka Îsraîl û Filîstînê tam wergeriyaye hovîtiyê. Ji nû ve xwe bi Îslama radîkal girtin, li dijî pêngava mezin a global a kapîtalîzmê ji bêhêvîbûnê meylek întîharê û perpitandinê zêdetir ti maneya wê nîne. Nikare hêzeke cuda û çareseriyekê biafirîne.

Di têgînên hîmî de xulaseyeke dîrokê jî nîşan dide ku di bingehê pirsgirêkên Rojhilata Navîn de rastiya dewletê radizê. Şaristaniya Rojava, ji bo girêka kor dewleta koka wê Rojhilata Navîn e çareser bike, têkoşîneke mezin meşand. Ronesansê bi aliyekî xwe perdeya îdeolojîk a li ser dewletê rakir; bi şoreşa zêhniyetê jî zirxên dînî û mîtolojîk parçeparçe kir. Bi vî awayî rastî tazî kir û bû sedem bi hêsayî were dîtin. Bi Reformasyonê, destnedan û yekparebûna burokrasiyê û îdeolojiya xwedê-dewlet a ji aliyê heman dêrê ve dihat parastin, parçe kir. Selteneta tirsê ya li ser civakê rakir. Rê vekir ku her kes karibe bi awayekî azad pêdiviyên baweriya xwe pêk bîne û baweriya xwe bi nav bike. Li Rojhilata Navîn rewşek berovajî hebû. Mûtezîle û têgihîştinên wek wê hatin tasfiyekirin. Bi hilweşîna selteneta dîn re azadiya fikir û baweriyê bi lez bû. Pêvajoya rohnîbûnê bûyer berfireh kirin û gîhandin girseyên gel. Bi awayekî berçav her sê meylan jî zirxê destnedanê yê li hawîrdora dewletê parçe kirin û rê li ber hêza demokratîk a civakê vekirin. Şoreşên Îngilîz, Emerîkî û Fransî dewleta klasîk parçe kirin û rê vekirin ku dewlet di warê îdeolojîk û burokratîk de xwe nû bike. Bi destûrê û mafê mirovan sînorên dewletê teng kirin û însiyatîfa hêzên civakî xurt kirin. Bi vî awayî, pêşketinên mezin ên şaristaniyê di sedsalên 19. û 20. de pêk hatin.

Li Rojhilata Navîn ev pêvajoya bi sedsalan berovajî meşiya. Ji serî ve hêzên ku xwe wek zumreyeke îqtîdar-şer bi nav kirin, li ser navê dewletê wezîfeya ewlekariya giştî ya civakê û xizmetên gelemperiyê xirab bi kar anîn û bi hewldaneke xeternak serweriya xwe ferz kirin. Dewleta bi tevahî destpotîk bû, mîna geneyê bi pişta civakê ve zeliqî. Pêvajoya piştî sedsala 15. çîrokeke trajîk e. Di demekê de Rojava ji Magna Charta'yan ber bi destûra hemdem ve

hilkişiya, Rojhilata Navîn û hemû Rojhilat hezar cureyên despotîzmê vedîtin. Vegotina gel a wek "Li cem Osmaniyan dekûdolab pir in" ji vê demê ma ye. Dîsa vegotina "Li vê dunyayê bexteweriya herî mezin jiyaneke dûrî dewletê ye" heman rastiyê destnîşan dike. Civaka Rojhilata Navîn di destê dewleta Rojhilata Navîn de mîna nêçîreke guvaştî ma. Nikare xwe bilivîne; eger hindik be jî xwe bilivîne dûre tê rûçikandin. Dewlet ne bi qanûnan ne jî bi destûrê tê bi sînorkirin, ji lewra tam dibe dînozor.

Dewleta Rojhilata Navîn di hundur de li dijî civakê û li der ve jî li hemberî Rojava bi awayekî nicimandî hînê muhafezekar dibe, di sedsala 20. de xwe bi perdeya netewparêziyê dinixumîne û ev yek jî pirsgirêkan girantir dike. Bi netewparêziyê, bi hin reformên piçûk hindikayiyek bi desteka dewletê modern bû, lê li aliyê din muhafezekariya di nava civakê de, paşverûtî dûrî zeman û mekanê, zêhniyeteke westiyayî û nexweş afirand. Kevneşopiyê hemû pîrozbûna xwe ji dest da, modernbûnê jî tebeqeyeke ajan a objektîf li dora dewletê pêk anî. Dewleta Rojhilata Navîn bi temamî têk neçû. Bersiv da saziya ajantiyê ku ji karektera wê ev bersiv dihat hêvîkirin. Rojavayê ev ji bo berjewendiyên xwe yên demkin li cih dît û nehîşt nexweş têk biçe. Eger bihişta wê monarşiyên Îran û Osmaniyan hilweşiyana. Lê bi mêzînên xweser ew du sed salî li ser piyan hîştin. Sîstema kapîtalîst a li Rojava serwer dibû, ji bo "kapîtalîzma komprador" ya li gelemperiya cîhanê pêş de dibir, ev şêwazê ajantiyê ji bo bingehê aboriyê peyda nedibû. Lê bihêlin çareserkirina pirsgirêkên civakê, nexwestin bibînin. Mîna versiyoneke hemdem a xweda-qralan pêk hat. Hêza teknîk-eskerî ya ji Rojava hat stendin ji bo dewleta Rojhilata Navîn bû qulpek ji bo xwe pê bigire. Bi vê qulpê, bi hêsanî dikarîbû xwe li dijî civaka xwe li ser piyan bigire. Heta efendiyên wan jî piştgirî bidana, zehmet nebû zumreya şer-îqtîdarê temenê xwe dirêj bikira. Sîstema kapîtalîst heta bi mezhebên xwe yên yedek sosyalîzma reel, sosyal demokrasî û rizgariya netewî cîla bikira, dikarîbû xwe misogerkirî bihesibanda.

Ev pêvajoya qaşo wek reformê dihat hesibandin, di salên 1990 de bi têkçûna sosyalîzma reel re globalîzbûna kapîtalîst-emperyalîst bi lez bû û li hemberî krîz-kaosa giştî hûrik hûrik firidî xwarê. Împaratoriya kaosê ya bi pêşengiya DYE nikare bi van avahiyan bimeşe. Ev li dijî mentiqê sîstemê ye. Di wextekî de ku sîstemê, kar û ewlekarî kir hîmê xwe, dewleta Rojhilata Navîn di her du fonksiyonan de jî mîna bixe pêvajoya dinamêtkirinê. Ji ber ku mebest ji dewleta Rojhilata Navîn, dewleta bê ewlekarî û mesrefên

fuzûlî ne. Ji girseyên gel qut bû, bê ewlebûn û zêde mesrefên wê sînor derbas kirin. Dewlweta Rojhilata Navîn a mîna buxçikeke pînekirî û cîlakirî li hemberî daxwazên gelan ên ji serdema neolîtîk ketine serhevdu û ji jor kapîtalîzma global, zehmet e bibe bersiv.

3- Pirsgirêkeke din a herî hindik bi qasî dewletê giran bûye, zêhniyet û tevgera civakî ya ku li dora jin û malbatê pêk hatiye. Li jor dewlet, li jêr malbat, mîna dualîteyeke diyalektîk a cennet û cehennemê pêk tînin. Dewlet modela xwe ya mîkro di nav malbatê de pêk tîne, daxwazên malbata mezin jî dibe xwe wek makro dewletê bihûnin. Her malbata îdeal çareseriyê di dewletbûnê de dibîne. Siya despotê dewletê di nava malbatê de "despotê piçûk" "sermiyanê malê" mêr e. Despotê dewleta mezin, çiqas bi erk û wezîfe ye, dikare hewl bide bi awayekî kêfî rê bide ber cîhanê, sermiyanê piçûk jî di nava malbatê de li ser serê jin û çend zarokan bi heman karên nîzamiyeta mutleq tevdigere.

Em heta di şaristaniya Rojhilata Navîn de malbatê wek modeleke mîkro ya dewletê analîz nekin, wê tehlîleke civakî ya baş kêm bimîne. Eger îro li Rojhilata Navîn pirsgirêka jinê bi qasî ya dewletê giran bûbe, dîsa di binê vê de bi qasî dîrokeke dirêj a dewletê, koletiyeke jinê ya tevlîhev û dirêj radizê. Eger di nexşeyê de sêgoşeya Bermûda jin-malbat-mêr baş neyê destnîşankirin, her keştiya çareseriya civakî ya di ber re biçe wê daqurtîne. Di okyanûsa civakî ya sêgoşeya Bermûda de li Rojhilata Navîn dewleta mîkro malbat e. Wexta hiyarerşî û dewlet mezin dibin, ji sedî sed projeksiyonên xwe di nav malbatê de nîşan didin. Dewlet û hiyarerşiya di nava malbatê de xwe nebîne, şensê wê yê jiyanê xurt nîne û nikare hebûna xwe dewam bike. Di şaristaniya Rojhilata Navîn de ev dualîte pir bi hostayî tê hûnandin û ti car nayê îhmalkirin.

Divê mirov jinê wek cins, nifş û çîneke ku ji mêj ve hatiye dîlkirin bigire dest û hindik be jî di warê sosyolîk de analîz bike. Ji lewra bi kurtî be jî divê em kurtedîroka koletiya jinê bihûnin û li ser rawestin. Naxwe emê nikaribin baş li malbat û mêr yanî ji aliyekî din ve li dewlet û civakê serwext bibin. Ji ber ku me di beşê berê de hewl dabû jinê tarîf bikin, ezê dubare nekim. Lê dîsa jî em ji bîr nekin ku di hin nirxandinan de jin di nava civakê de ji aliyê biyolojîk ve wek cinseke kêm û bi qusûr tê dîtin, ev bi temamî îdeolojîk e, - hûnandineke fikrî ya mêrê serwere - divê ev nirxandin ji nedîtî ve neyê. Ji ber ku bi awayekî ilmî jî îspat bûye ku jin wek hebûneke biyolojîk û civakî hînê bi qabîliyet e.

Navenda çanda malbat-dayikê Rojhilata Navîn e. Li gorî agahiyên ilmî yên di dest de hene, ev çand BZ ji salên 1500'an pêve diberide û pêş dikeve. Li qûntarên hundur ên rêze çiyayên Toros-Zagros hebûna heywan û nebatan, ji bo kedîkirin û malbatê derfet û îmkan didin. Ax û bahewaya herêmê, celebên tene û hubûbat, heywanên mîna pez û bizinan di vê pêvajoyê de rol dilîzin.

Di jiyaneke bi cihbûyî de jin hînê bi hêsayî dikare zarokan bîne û mezin bike. Tevî jiyaneke bi cihbûyî, rewşeke baş a bahewayê, nebat û heywan, derfetên bingehîn ên jiyaneke malbatî diafirînin. Gelek darên mêwan û celebên nebatan ji bo xwarinê hene. Kedîkirina pezkoviyan û bizinê, bi xwe re hewcebûna bi hirî, şîr û goşt tedarik dike. Dar û nebatên bi ber têne danîn û ev yek hatinê qat bi qat zêde û dewlemend dike. Êdî heywan yekser nayên kuştin û serjêkirin, têne kedîkirin û xwedîkirin. Bi vî awayî ji şîr, hirî û goştê wan sûd tê wergirtin û bîra rojên tinebûn û xelayê tê kirin. Ji bo jin-dayik bi zarokên li dora xwe nîzameke malbatê deyne, di her du mijaran de jî xwedî tecrûbe ye. Derketina ji şikeftê, kedîkirina heywanan, danîna dar, pel û pincaran, avakirina xaniyan, dibe ku tiştekî sivik xuya bike, lê di dîrokê de bi qasî derketina mirov a heyvê gavavêtineke girîng û mezin e. Holikên têne danîn bi hêsayî gundan pêk tînin. Li gelek herêmên Kurdistana îro - li Amed Erxeniyê li Çayonu, li Batmanê li Çemê Xalan, li órfayê li Newala Çolê û li Gobeklîtepe, Bradostiyan, Hekkarî Max - BZ di salên 11.000 de pir bi xurtî bermahiyên vê çandê tên dîtin. Li ti devera dunyayê mîna vê çandê kevin a bi cihbûyî nayê dîtin. Li vê derê gelek fîgur û peykerên piçûk ê jinê hatine peydakirin. Ev yek jî xurtbûna çanda malbat-dayikê îfade dike. Her wisa mirov dikare di zimanên herêmî de daçekên mê jî mînak nîşan bide. Di roja me ya îro de jî jin hînê di heman waran de hosta ye, û ev yek mijarê piştrast dike.

Çavkaniyên Sumeran jî nîşan didin ku wexta yekemîn sîte bajêr tên avakirin jî ev çand bi tesîr e û hebûna xwe bi xurtî dewam dike. Mîtolojiya li dora xwedawend Înanna - xwedawenda órûkê - hatiye hûnandin gelek tiştan hîn dike. Nemaze li dijî hilkişîna mêr a serweriyê, berxwedana jinê, hezar qat li têkoşîna femînîstên îro ye. Jin bi xurtî li dijî xweda Enkî - di Sumeran de fîgurê mêr ê pederşahiyê temsîl dike - diqîre ku jin xwediyê çi şaristaniyê ye. Bi zimanekî helbestwarî destnîşan dike ku ew xwediyê 104 "me"yan e; Enkî bi hîleyan jê dizîne û divê wan paş ve bidiyê. Ev vegotina mîtolojîk ku diçe BZ 3.000 salan, rola jinê ya di şaristaniya Sumeran

de pir bi balkêşî nîşan dide. Her wisa Înanna wek kok bi xwedawenda çiyê Nînhûrsagê ve tê girêdan. Nînhûrsag ji aliyê etîmolojîk ve - Nîn=xwedawend, kur=çiya, sag=herêm - tê maneya xwedawenda herêma çiyayî. Li Mezopotamya Jêr dema çiya tê gotin Zagros û rêze çiyayên pêve tên hişê mirovan. Wê wextê ev nîşan dide ku çanda xwedawendiyê ji herêmên çiyayî daketiye xwarê.

BZ di navbera salên 4000 û 2000 de wek navenda şaristaniyê çanda jin-dayikê li Sumeran hînê bi tesîr e. Bi mêr re di heman weznê de ye. Di hemû belgeyên wê demê de ev giranî xwe nîşan dide. Perestgehên xwedawendan zêde hene. Li dora jinê hînê çandeke şermê û fediyê nehatiye deribandin. Nexasma seks wek karekî îlahî tê ziman. Ne şerm û fedî, ji çîroka herî erotîktir vegotinên wêjeyî hene. Her çalakî û tevgera di warê seksê de wek nirxandina jiyanê, mane û qîmeteke bedew dibîne. Seksîtiya jinê wek balkêşî û hurmeteke awarte maneyê dibîne. Di jiyana pişt re ya dij-şoreş de hînê jî bi ti awayî şerm li jinê nayê kirin. Timî pesnê bedena jinê tê dayîn. Merasîmên zewacê her çend hatibin belovajîkirin jî - çalakiya kirêtkirinê ya mêr - ji wê demê mane. Di destanên Memê Alan, Mem û Zîn û Derwêşê Evdî de ku li Kurdistanê hînê têne gotin, ev rewşa xurt a jinê tê îfadekirin. Mirov dikare yekemîn orjînên van destanan bigihîne BZ 4000 salan.

Di hûnandina mîtolojîk a Înanna de hem şivan-mêr û hem jî cotkar-mêr wek alîkaran xuya dikin. Şivan Dûmûzî - ev têgîn yekemîn orjîna mezinbûna mêr e - û cotkar Enkûmdî, li hemberî xwedawend Înanna'yê di warê hurmet û dilsoziyê de li ber hev didin. Ji bo bibin alîkarê wê yê sereke, ti tiştek namîne ku nakin. Pir bi eşkere Înanna hînê pêşengiyê dike. Mêr wek şivan û cotkar ji serweriyê hînê dûr e. Em di destaneke din a navdar a Sumeran de di Destana Babîlan (Ennûma Elîş) de dibînin ku rewş berovajî ye. Mêrê ku bi awayekî awarte hêz bi dest xistiye xweda Mardûk û dayika ji hêzketî Tîamat dualîteyeke dîrokî ne; pir tiştan hîn dikin. Jin-dayik, xwedawend-dayik bi awayekî xeternak tê reşkirin û kirasê şermê lê tê kirin. Ji bo jinê bêfazîlet, bêkêr û xeternak nîşan bidin, qalibên mîtolojîk pir bi dijwarî têne tengavkirin. Em dibînin BZ ji salên 2000'an pêve ev çand belav dibe. Di statuya civakî de li dijî jinê guhertineke mezin heye. Serweriya civaka bavikanî êdî di wê hêzê de ye ku dikare xwe bike destanwarî. Her tiştê derbarê mêr de tê mezinkirin û qehremankirin, her tiştê bi jinê ve eleqeder piçûk tê xistin, şerm lê tê kirin û tê bêqîmetkirin.

Di dîrokê de bi vî awayî yekem car di warê cinsî de şikestinek dibe ku bandoreke mezin li ser civakê dike. Em ji bo vê guhertina di warê jinê de li Rojhilata Navîn dikarin bibêjin yekemîn şikestina mezin a cinsî ya dij-şoreşê. Em dibêjin li dij şoreşê. Ji ber ku bandoreke erênî ji bo pêşketinê li civakê nake. Berovajî, serweriya hişk û tund a bavikanî li ser civakê ferz dike, jinê li der ve dihêle û dike jiyan xizan bimîne. Di şûna civaka cot deng de, rê li ber civaka fer a mêran vekirî ye. Li Rojhilata Navîn bi vê şikestinê re belkî jî gava yekemîn di warê serberjêr çûyînê de gava yekemîn tê avêtin. Encamên wê her ku çûne hînê reştir bûne. Êdî civakeke yekalî ya bi çanda mêraniyê pêk tê. Mejiyê jinê yê hisî ku demekê harîqa diafirandin û heta dawiyê însanî û geş bû, wenda dibe û di şûnê de mejiyê analîtîk ê radestî dogmatîzmê bûye; ji xwezayê qut bûye; şer mîna fazîletekê dihesibîne; ji xwîn rijandinê zewq digire; her danûstendina kêfî li ser mêrê kole û jinê heq dibîne; cih digire. Ev mejî yan jî celebê ramanê berovajî mejiyê jinê ye. Ji ber ku di navenda mejiyê jinê de xwezaya zindî û hilberandineke însanî heye.

Piştî ku di civakê de mejiyê analîtîk ê mêr dibe serwer, di afirandinê de paşketineke ciddî tê dîtin. BZ di navbera salên 6000-4000 de - serdema jin-dayikê - gelek vedîtin hene, lê BZ ji salên 2000 ve pir hejmareke hindik îcad û vedîtin xuya dikin. Li cem vê yekê, çanda şer-îqtîdarê têra xwe belav dibe, fetih mîna pîşeyekî mezin - pîşeyê qralan - tê hesibandin û amûrên bingehîn ê dewletan dibe fetih û zevtkirin. Bi kurtî li der ve hîştina jinê û hurmet nîşandana ji bo otorîteya mêrê fatîh û şerker bi hev re pêş ketine. Saziya dewletê mîna vedîtineke mêr dibe xwedî mane, şerên bi armanca talan û xenîmetê jî dibin mîna şêwazekî debar û hilberandinê. Di şûna bandora hilberandina jinê ya li ser civakê, bandora xenîmet û şerê mêran li ser civakê de cih digire. Di navbera êsîrketina jinê û çanda civaka şerker de têkiliyeke nêz heye. Şer hilnaberîne, desteser dike, talan dike. Her çend rola zorê di hin şertên xweser de - ji bo pêşî vekirina li azadiyê û dijderketina li dagirkerî û mêtingeriyê - ji bo pêşketina civakî diyarker be jî bi piranî rola wê neyînî ye, û hilweşînker e. Çanda şîdetê ya daweriviye hinavê civakê jî bi şeran xwe xwedî dike. Di navbera dewletan de şûrê şer, di nava malbatê de destê mêr tîmsala serweriyê ye. Hem civaka jor, hem jî civaka jêr di nav diranên şûr û dest de ne. Timî pesnê çanda tehekumê tê dayîn. Kesayetên herî mezin bi xwînrijandinên neheq serbilind dibin û wek fezîletekê dizanin. Nemaze qralên Babîl û Asûran bi serê mirovan beden avakirin û dîwar lêkirin ji şan û şerefê

dihesibînin. Terora dewletê û çanda şîdeta civakî ya di roja me ya îro de jî ku pir zêde heye, çavkaniya wê ev çand e, ku em destnîşan dikin.

Di dîroka dînên yek xwedayî de duyemîn şikestina mezin a çanda cinsî li dora jinê pêş dikeve. Şikestina di serdema mîtolojîk de vê carê wek qanûn dibe emrê xwedê. Kiryarên derbarê jinê de êdî bi fermanên pîroz ên xwedê ve tên girêdan. Fîgurê têkiliya di navbera Sara, Hacer û Hz. Îbrahîm de nîşan dide ku dînê nû serweriya mêr erê dike. Serweriya bavikanî baş bi cih dibe. Cariyetî dibe sazî. Zewaca bi pir jinan re tê erêkirin. Têkiliya hişk a Hz. Mûsa bi xuşka wî Marîam re dide nîşan ku para jinê ya di mîrasê de tê rakirin. Civaka Hz. Mûsa bi tevahî civakeke mêran e. Ji bo jinan ti wezîfe nayê dayîn. Jixwe şerê bi Marîam re jî bi vê sedemê ye. Vegotina "bila jin bi destê xwe yên di hevîr de têkilî karê mêran nebe" ji wê rojê ma ye.

BZ di dawî û beriya salên 1000 de em dibînin bi Qreliyeta Îbraniyan a Dawûd û Silêman re, êdî çanda haremtiyê berfireh dibe. Jinan ji hev re dikin xelat. Pêvajoyeke nû destpê dike ku tê de deng û hilma jinê nîne. Tesarufa li ser jinê ti cudahiya xwe ji ya li ser malekî nîne. Ev rewşa di dewleta dînê nû de xwe di nav malbatê de jî nîşan dide. Jina di bin serweriya çanda dewleta dînî û bavikanî de, mumkîn nîne behsa rola wê were kirin. Jina herî baş ew e, ya herî zêde bi mêrê xwe û bi serweriya bavikanî re li hev dike. Di reşkirina jinê de dîn jî tê bi karanîn. Beriya her tiştî, Ew (Hawa) Adem ji rê derdixîne û dibe sedem ji cennetê were qewirandin. Ji lewra ew yekemîn jina gunehkar e. Lîlîta serî ji xwedayê Adem re - fîgurê bavikantiyê - serî natewîne, şeytan esas dibîne - fîgurê mirov ê ebdiyetê red dike û serî tewandina (secdekirin) ji bo Adem qebûl nake - û pê re hevaltiyê dike. Reşkirina mîtolojîk mînak tê girtin û bi awayekî dînî dewam dike. Di serdema Sumeran de îdîaya jin ji parsûyê mêran hatiye afirandin di Pirtûka Pîroz de jî cih digire. Di nav peyxemberan de ku hejmara wan digihîje hezaran, yek jin tine. Cinsîtiya jinê wek guneh tê nirxandin; timî tê reşkirin; piçûk tê dîtin û bi vî awayî dibe mîna prensîbeke toreyî. Jina di civakên Sumer û Misriyan de xwedî cihekî payeberz bû, êdî objeyeke şermê, guneh û ji rê derxistinê ye.

Em tên serdema Hz. Îsa, fîgura Meryemê derdikeve pêşberî me. Her çend dayika xwedayê kur be jî ti têkiliya wê bi xwedatiyê re nîne. Di şûna xwedawend-dayikê de dayikeke bêdeng û timî çavşil maye. Ketina jinê dewam dike. Xweda - mêrê serwerî jinê - pifî Meryemê dike û Meryem jê ducanî dibe. Ev têgîn têra xwe nakok in.

Di xirîstiyaniyê de baweriya sê-alî ya Bav-Kur-Ruhê Pîroz di cewherê xwe de sentezeke dînên pir xwedayî û yek xwedayî îfade dike. Di vê serdemê de baweriyên genostîk - xwedêzan - û paganîstîk - pûtperest - bi awayekî zêde belavbûyî, têkiliya xwe bi Xirîstiyaniyê re heye; bi baweriya hişk a yek xwedayî ya Îbraniyan re têkoşîneke dijwar dikin. Di encamê de ev her sê meyl û ekol li hev dikin. Di dema Hz. Mûhammed de jî sê meylên bi vî rengî hene û wek dînekî bi encam dibe. Ya herî balkêş, Meryema diviyabû wek xwedawendekê bihata dîtin, mîna amûrekî Ruhê Pîroz xuya dike. Ev rastî pir eşkere nîşan dide ku xwedayetiyê tam rengê mêrtiyê wergirtiye. Di serdema Sumer û Misriyan de xweda û xwedawend hema hema wek hevdu ne. Di serdema Babîlan de jî hînê dengê xwedawenda dayik gurr derdikeve.

Ya bi Hz. Îsa û Meryem pêk tê ev e, jin êdî bi çavên şil pîrekeke bêdeng e, û dayikeke milahîm e. Ew êdî hîç behsa xwedayetiyê nake. Nexasma li mala xwe li ber zarokên - xwedayên kur - xwe yên kur e, ku êdî qîmetek wan heye. Ji kebanîbûna malê zêdetir ti rola wê di nava civakê de namîne. Qada gelemperiyê bi tevahî li jinê tê girtin. Di Xirîstiyaniyê de mijara ezîzeyan - jinên bakîre - rewşa jinê ya dixwaze xwe ji gunehên mezin xilas bike nîşan dide. Ango xwe vekişandina quncikê ye. Ev pêvajoya sulûk û xwe vekişandina quncikê bi sînor be jî rê li ber pêşketinên erênî vedike. Bi hindikî be jî ezîzetî xilasbûna ji têgînên cinsî û şermê îfade dike. Sedemên wê yên maddî û manewî xurt in, ji bo vê sulûkê ji cehennema li malê çêtir bibîne. Guman nîne ku piratîkeke dîrokî ye. Bi awayekî din mirov dikare bibêje di dîrokê de yekemîn partiya jinên xizan e. Pir bi melûlîbe jî çanda xwedawendan a li perestgehan di keşîşxaneyan de geş û zindî dike. Kiryarên ezîzeyan cihekî wan ê girîng di dîroka şaristaniya Ewrûpayê de heye. Zewaca bi yek jinê re bi giranî çavkaniya xwe piratîka ezîzeyan e. Her çend jin di şertên herî zor û zehmet de, wek bakîretiya xwe seksîtiya xwe çavkaniya xeterê hesibandibe jî dîsa di payeberzbûna jinê de roleke xwe ya girîng heye. Aliyê neyênî jî ew e ku di şaristaniya Ewrûpayê de wek nerazîbûnek li dij zewaca Katolîk - hîç bernedana jinê - heye ku rê li ber metabûna cinsî ya jinê vedike. Bêguman bi saya kapîtalîzma mezin dibe.

Statuya nû ya jin bi Îslamiyet û Hz. Mûhammed bi dest dixe, her çend ji çanda bavikanî ya qebîleyên çolê çêtir be jî di cewherê xwe de çanda Îbraniyan esas wergirtiye. Statuya jinê ya baş şiklê xwe girtî di dema Dawûd û Silêman de çi be, di dema Hz. Mûhammed de

jî heman tişt e. Dîsa pir zewacên bi armanca siyasî û jiyaneke tê de zêde bi cariye, rewa tê qebûlkirin. Her çend zewac bi çar jinan hatibe bi sînorkirin jî cewher naguhere. Têgihîştina dibêje; "Jin zeviyên we ne, hûn çawa bixwazin hûn dikarin bajon" baş nîşan dide ku jina bûye milk nimûne tê girtin. Têgihîştina Hz. Mûhammed li evînê jî balkêş e. Di temenê xwe yê pêncî salî de bi Eyşeya neh salî re evînê dijî û ev eleqeya wî ya zêde ji bo jinê eşkere dike. Timî pesnê jina xwe ya yekemîn Xetîceyê dide û ev jî qîmet dana wî ya jinê nîşan dide. Bi giştî li hemberî jinê bi hestiyarî tevdigere. Lê saziya heremtî û cariyetî ya li pey xwe dihêle ji aliyê tebeqeyên dewletê yên pişt re tên, pir xirab tên bi karanîn.

Hz. Eyşe, ji ber ku piştî wefata Hz. Mûhammed tevlî şerê îqtîdarê yê navbera xelîfeyan dibe wenda dike. Wê qîmeta jinê bi êşeke mezin hîn bibe û bibêje; "Ya Rebbî, li şûna ku te ez jin bianiyama dunyayê, te ez wek kevirekî bianiyama çêtir bû." Hînê di têkiliya Mûsa-Marîam de kişif dibe ku li îqtîdarê cih ji jinê re nîne. Li serdema navîn li Rojhilata Navîn a feodal di statuya jinê de ti pêşketineke erênî nîne. Qalibên dîrokî li ser kar in. Ji têkiliya eşqê ya di navbera Leyla û Mecnûn de tê sembolîzekirin, ti encameke bi xêr dernakeve. Di feodalîzmê de ji eşqê re cih nîne. Jinê li malbata di bin pêşbaziya dewleta bavikanî de pêvajoyeke pir bê şexsiyet dijî. Bi awayekî mutleq êsîrê daxwazên xwediyên îqtîdarê ye. Bi temamî dibe amûreke di xurtkirina îqtîdaran de rol dilîze. Bi giştî ji civakê tê muceredkirin. Di şert û mercên koçberiyê de hînê jî şopên jiyana komîn a seretayî hene û ev yek hurmetekê dide jinê. Lê jina di bajaran de tam koletiyeke kûr dijî.

Her ku diçe zehmet dibe, ji bo cihê jinê yê di bin tehekum û nîzama mulkiyetê de were tarîfkirin. Di roja me ya îro de jin wek encameke hezarê salan, mîna berateyekê dijî. Ji rê derxistina sîstema kapîtalîzmê hînê baş nehatiye dîtin. Jin li civaka Rojhilata Navîn objeyeke di navenda paşverûtiyê de cih digire. Mêrê Rojhilata Navîn ê têkçûyî hemû heyfa xwe ji jinê hiltîne. Li der ve çiqas heqaret lê werin kirin, bi zanebûn an jî xweber berdêla vê yekê hemûyî ji jinê distîne. Mêrê ku nikare civaka xwe biparêze û rêya çareseriyê nabîne, hemû hêrs û şîdeta xwe mîna dînekî di nav malê de li ser serê jinê û zarokan ditemirîne. Di bingehê bûyer û kuştinên "namûsê" de ev rastiya balkêş heye. Ya rastî, mêrê namûsa xwe di warê civakî de binpê kiriye, berovajî dizîvire û hêrsa xwe li ser serê jinê ditemirîne. Bi awayekî pir sivik, sembolîk, neçar û xwepêşadaneke namûsparêz doza xwe qaşo çareser dike. Mîna psîkoterapî bike tevdigere. Di binê

pirsgirêkê de dozeke civakî û dîrokî ya wendakirî radizê. Yek ji pirsgirêkên bingehîn ew e ku ji vî "mirî" re divê were gotin; ew heta bi vê doza dîrokî û civakî re rûbirû nebe û wezîfeyên dikevin ser milê wê bi cih neyne, wê ti car nikaribe xwe ji vê qirêja namûsê xilas bike. Namûsa rastîn bi bakîretiya azayê cinsî yê jinê nîne, bi parastina bakîretiya civakî û dîrokî dibe. Divê mirov vê rastiyê bide hînkirin û bi cih bîne.

Ez yeqîn dikim, bi vê vegotina me ya kurt a dîrokî hat fêmkirin ku li Rojhilata Navîn mezinbûna pirsgirêkên malbata îro, bi qasî pirsgirêkên di nava dewletê de girîng in. Zordestiya ji du milan ve tê, pirsgirêkê dijwartir dike. Şêwazê civaka dewletê û bavikanî ku ji mêj ve tên, û qalibên hemdem ên şaristaniya Rojava nabin sentezek, berovajî mijarê dikin girêkeke kor. Pirsgirêkên ku di nav dewletê de hatine afirandin û li hev hatine gerandin, di nav malbatê de hînê zêdetir germole bûne. Malbatên pirzewac û pirzarok ji aliyê aborî ve nikarin debara xwe bikin. Zarokên mezin dibin û şêniyên ciwanan ên zêde dibin, bê kar in û ev jî malbatê bê kêr dike. Malbata ku li gorî dewlet û aboriyê hatiye eyarkirin, ji her du aliyan ve jî nikare bimeşe û di heriyê de bist bûye; çikiyaye. Ne malbata şêwazê wê Rojavayî, ne jî malbata şêwazê wê Rojhilatî dikare bijî. Di van şert û mercan de malbat dejenere dibe. Tevî ku hemû benên civakî vedirşin jî malbat hînê jî li ber xwe dide. Ji ber ku di warê civakî de malbat sitara bi tenê ye. Ji sedî sed divê mirov malbatê piçûk nebîne. Rexneyên em dikin, malbatê ji kokê ve red nakin, em hewl didin ji nû ve mane bidinê û destnîşan dikin ku hewce ye ji nû ve bi awayekî têkûz were avakirin.

Ji pirsgirêka jinê girantir, divê mirov pirsgirêka mêr bixîne rojevê. Çareserkirina têgîna îqtîdar û serweriya mêr, ji koletiya jinê kêm girîngtir nîne. Belkî jî hinekî zehmet e. Yê xwe nêzî veguherînê nake, ne jin, zêdetir mêr e. Wexta dest ji fîgurê serwertiya mêrtiyê ber dide, dibe xwediyê hisa hukumdarekî mîna dewleta xwe wendakirî û wek têk çûbe li ser totikên xwe rûdinê. Ya rastîn, divê mirov nîşanî wî bide ku ev serweriya hundurê wê piçûk, wî ji azadiyê dike û wî dike muhafezekarekî temam.

Eger mirov pêşî bibêje pirsgirêka dewletê, paşê jî ya malbatê, ev helwesteke rast nîne. Pêwîst e, mirov van her du rastiyan bi tayekî diyalektîkî bi hev re bigire destê xwe û analîz bike. Sosyalîzma reel jî digot; em berê dewletê çareser bikin, paşê dorê were civakê, lê niha encam li ber çavan e. Pirsgirêkên bingehîn ên civakê nabe ku yek li pêşiya ya din were girtin û bi vî awayî were çareserkirin. Divê

di nav hevdu de bi awayekî yekpare, têkiliya yekê bi ya din re were danîn. Ya rast ew e ku wexta ber bi çareseriyê ve jî gav were avêtin heman rêbaz were şopandin. Çawa ku bêyî çareseriya zêhniyetê dewlet, bêyî dewletê malbat, bêyî jinê çareserkirina mêr kêm dimîne, bêyî ku berovajiyê wê were kirin, rêbazên çareseriyê kêm dimînin.

4- Di pirsgirêkbûyîna Rojhilata Navîn de hin rastiyên bingehîn hene, hewce ye werin tarîfkirin. Rastiyên mîna etnîsîte, netew, welat, şîdet, çîn, mulkiyet, aborî û hwd. hînê di asta têgînan de ji ravekirinê pir dûr in. Tarîfkirina rastiyan di asta têgînan de hînê ji zirxên îdeolojîk ên şovenîst nehatine kirin. Di çanda Rojhilata Navîn de rastiyên em behsa wan dikin hînê bi awayekî ilmî li gorî qîmeta xwe nehatine destnîşankirin. Yan bi çavên dînî, yan jî bi çavên netewparêziyên şovenîst li mijarê dinerin û li gorî xwe gelek encamên ku çareser nabin, derdixînin. Di rastiya civakîbûnê de nayê pirsîn çi giranî, qîmet, cih û têkilî di navbera etnîsîte, netew, welat, şîdet û mulkiyet-aboriyê de heye. Rastî dibe qurbana perspektîfa îdeolojîk. Polîtîka hînê jî bi perspektîfeke çavnebar û êrîşker bi ser meseleyê ve dihere. Ji bo helwesteke rasyonel, dadperwer û demokratîk şens nade. Wer his dikin ku wê helwesteke ilmî ya li derveyî îdolojîk-polîtîk dekûdolabên wan xira bike û rastiyan derbixîne naverastê. Li Rojhilata Navîn wezîfeyeke girîng a polîtîka û perwerdeyê ew e ku rastiyê di tariyê de bihêlin. Di vî warî de heta serketin nebe, hunerê îqtîdarê nayê kirin. Ji bo sihêr xira bibe divê her tişt eşkere û vekirî be.

Me di helwestên xwe de gelek giranî da ser etnîsîteyê - komên qewm, eşîr, qebîle, klan - û yekser nebe jî me hewl da em derketin, pêşketin û veguherîna wê nîşan bidin. Etnîsîte li Rojhilata Navîn wek berê xurt nebe jî hînê rastiyek e, bandora xwe dewam dike. Li herêmên çolter û çiyê xurt e. Li bajaran cihê xwe ji terîqet û cemaetên mîna xwe re hîştiye. Ji ber ku demokrasî û welatiyeke tam pêk nehatiye, hema hema hînê cemaet û etnîsîteya her kesî heye. Dewlet bi qasî malbatan hebûnên din ên etnîsîteyê li ber çav digire. Ji ber ku wexta hêza eşîran li ber çav negire zehmet e polîtîka bigihîjin serketinê. Bi sedema etnîsîte ne di nav çînayetiyê de, ne jî di nav netewîbûnê de dihele, rê li ber tevlîheviya civakî vedike. Lê di dîrokê de çanda nifşan a berxwedanê hildigirin. Ji lewra cihê etnîsîteyê têra xwe girîng e. Bi awayekî hişk redkirin, ne rast e, ne jî bi kêr e. Divê mirov tayên bi etnîsîteyê bi hostayî û rast analîz bike, ji meylên netewparêziya mîkro û siyasetên teng ên xwe disperên

etnîsîteyê veqetîne. Ya yekemîn çiqasa dikare bibe xwedî encamên rast, ya duyemîn jî ew çend dikare rê li ber encamên çewt veke.

Têgînên netew û netewparêzî, di civaka Rojhilata Navîn de ji çareseriyê zêdetir aliyê wan ên çareser nekirinê li pêş in. Di dema merkantîlîzmê de - kapîtalîzma bazirgan - ku qonaxa derketinê ya kapîtalîzmê ye, bi sedema pêdiviya bi bazara netewî, beriya sînorên zimanên kevin, berê netew û paşê jî netewparêzî hat afirandin û bi wan xwestin mijarê çareser bikin. Netew di çarçoveya sînorên ziman de têgihîştina ummetê - koma bi dînekî ve girêdayî - îfade dike. Di cewherê xwe de ji têgîneke sosyolojîk wêdetir têgîneke polîtîk e. Bi armancên polîtîk li ser tê sekinandin. Di çarçoveya sînorên hîn têkûz de bersivê dide daxwazên avakirina dewletê. Ji bo dewletan, netew ji bingeha wê ya etnîk zêdetir bingehê wê ya polîtîk girîng e. Di lêgerîna netewiyeteke saf de jî dîsa sedemên polîtîk diyarker in. Bêguman di bin van polîtîkayan de pirsgirêka bazarê diyarker e. Bazar û polîtîka malzaroka netew in. Ji aliyê sosyolojîk ve qîmeta wê bi qasî etnîsîteyê xurt nîne. Etnîsîte yek ji rastiyên xurt ên sosyolojîk e. Etnîsîte wek qewm mîna netew e. Cudahiya qewm ji netew ew e ku hînê aliyê wê yê bazar û polîtîkayê pêş neketiye. Li Rojhilata Navîn ji netew zêdetir xwe li netewparêziyê ba didin. Netewparêzî yan jî mîlliyetparêzî cihê hisên dînî yên qels dibin, dadigirin. Mîna ku dînekî sekuler - dunyewî - be. Amûra rewa ya bingehîn a dewletê ye. Bêyî dîn û mîlliyetparêziyê meşandina dewletan zehmet e. Jixwe dîn genê dewletê ye. Mîlliyetparêzî jî şêweya wê ya hemdem e.

Li gorî roja me ya îro, netew û netewparêzî ji bo çareseriya civakî qîmeta wê nîne. Berovajî, pirsgirêk di bin netew û mîlliyetparêziyê de têne nuxumandin û çareseriya wan tê zehmetkirin. Ya girîng, divê mirov van rastî û têgînên di tevahiya sedsala borî de jî cih negirtin wan li gorî rastiyên wan binirxîne û rave bike. Helwestên îdeolojîk û polîtîk ên tenê xwe dispêrin netew û netewparêziyê dikarin rê li ber gelek şaşiyan vekin. Rola netewparêziyên xwe gîhandin şovenîzmê di şerên sedsala 19. û 20. de li ber çavan e. Dîsa bi giştî netewparêziyên li Rojhilata Navîn û bi taybetî jî mîlliyetparêziya Ereb-Îsraîl a di polîtîkayê de tê bi karanîn, diyar e rê li ber çalakiyên çawa xwînrij, hêsrên çavan û êşên mezin vedike. Divê mirov di xebatên îdeolojîk û polîtîk de mîlliyetparêziyê hîç bi kar neyne û têgîna netew jî bi qasî ku bi kêra çareserkirina pirsgirêkên civakî were esas bibîne. Naxwe mîna li Ewrûpayê, wê li Rojhilata Navîn jî ji kûrkirina kaosê rê li ber ti encamê veneke. Jixwe

ji bo vê yekê, mirovên li Rojhilata Navîn têra xwe bi awayekî îdeolojîk bi pêşhukum tevdigerin.

Têgîna welat wek devera mirov lê bi cih dibin kevin e, lê wek sînorê netew-dewletê nû ye. Ji sînorên etnîk zêdetir sînorên siyasî esas dibîne. Li Rojhilata Navîn ji Ewrûpayê cudatir sînorên welatan, ne li gorî zimanan, li gorî sînorên dewletê hatine xêzkirin. Di vê çarçoveyê de welat dibe rastiyeke siyasî. Bi maneyeke hemdem her dewlet welatek e. Em bi helwesteke îdeolojîk û siyasî nikarin bi awayekî rast welat tarîf bikin. Dîsa li gorî zimanan xêzkirina sînorên welatan jî têrê nake. Eger bi awayekî çandî bibe, belkî hînê nêzî rastiyê be. Ji netewparêziya siyasî jî kevintir, cografyaya xelk di tevahiya dîrokê de li ser jiyane, mirov dikare wek welat bi nav bike. Mirov ji bo her xelkekî dikare behsa welatekî bike, lê welatê hevbeş ê gelan ê ketine zikhevdu jî hene.

Eger em Rojhilata Navîn yekpare bigirin destê xwe û hewl bidin mîna Ewrûpayê bi sînoran par ve bikin, wê zehmetiyên mezin derkevin pêşberî me. Yekparebûn û xweseriyên li herêmê têra xwe cih girtine. Têkiliyên civakî û aborî destnîşan kirine ka wê ji ku re, çi welat were gotin. Veqetandin û parçekirinên bi darê zorê yên siyasî, bi qasî nirxên di dîrokê de hatine afirandin xurt nînin. Sînorên siyasî yên welatan ku di dawiya yekemîn şerê cîhanê de hatin xêzkirin, têgîna welat belovajî kirin û bûn sedem ku pirsgirêka rastî ya welat derkeve holê. Rastiya siyasî ya yekpare ya Rojhilata Navîn nexşeya îro ya siyasî li cih nabîne. Dînamîkên siyasî yekparebûna qadên cuda yên cografîk ferz dikin. Rewşa heyî, şerekî navdewletî dixe rojevê û netewparêziyê sor dike. Mînak, Îsraîl, Filîstîn û Kurdistana Iraqê. Kevneşopiya împaratoriyê zêdetir nêzî federalîzmê ye. Ji împaratoriyên seretayî heta împaratoriya dawî Osmaniyan ku li herêmê rêve birin, siyaset û aborî rengê wê federatîf e. Federasyoneke li gorî herêmên berfireh ên otonom dişibin DYE ya îro. Pirsgirêka bingehîn a Rojhilata Navîn derbarê welat de ji ber ku nikare li rewşa federal a kevneşopiyê vegere û ji ber gelek parçebûnên netew-dewlet ên hewce nake û rastîn nînin, welê ye. Ev rewş heta li dawiyê neyê hîştin, xwe gîhandina têgihîştineke rast a welat û welatî zehmet xuya dike.

Di sîstemên civakan de rastiya çînî bi qasî ku tê texmînkirin xwedî maneyeke sosyolojîk nîne. Yên pir bi kûrahî bandorê li civakê dikin, tayên îdeolojîk, siyasî, etnîk û cemaetên din in. Di civakên dewletparêz û hîyarerşîk de çînayetî neçar e pêk were. Bêyî çînîbûnê hîyarerşî û dewlet pêk nayên. Lê ti hiyarerşî û dewlet, ji aliyê çîna

civakî ya ji xwe re kirine zemîn ji holê nayê rakirin. Çînîbûyîn û dewletbûyîn hevdu ferz dikin. Di navbera herduyan de dibe ku têkoşîneke dijwar bibe. Lê di encamê de neçarin li hev werin. Çîna li dewletê serdest û çîna mehkûm dualîteyeke diyalektîkî ne. Dewlet di navbera vê dualîteyê de statuyek û helwestek e. Yek ji wan nebe nikare li ser piyan bisekine. Eger çîn nebe dewlet jî nabe. Israra ji bo çînî israra ji bo dewletê ye. Ji lewra pesindayîna çîna bindest wê rojekê di encamê de bibe pesindayîna dewletê. Têgîna dewleta çîna karker şaş e. Eger tu bibêjî dewleta çînî ya karker yanî tu dibêjî ez bûrjûwaziya xwe bi xwe diafirînim. Ji bo vê yekê Sowyet îspateke balkêş e. Şêweyê herî rast ê têkoşîna çînî ew e ku mirov ji aliyê îdeolojîk û çînî ve çînayetiyê nejî. Yanî mirov dikare wek ferdekî azad, wek komeke etnîk, yan jî wek cemaetekê bijî. Li dawiyê ji dewletê tenê "ewlekariya giştî û xizmetên gelemperiyê" dimînin ku ji bo wê jî saziyeke koordînasyonê ya bi îradeya hevbeş a civakê were destnîşankirin, hewce ye.

Di şaristaniya Rojhilata Navîn de çînîbûyîneke saf di dema derketina şaristaniya Misir û Sumeran de bi rewşa xwe ya herî resen tê jiyîn. Di mîtolojiyê de wek xwedatiyê û afirandina ji heriyê maneyê dibîne. Ev veqetîn û cihêbûneke bingehîn e. Di dînên yek xwedayî de vê cihêbûn û veqetînê peyxemberan werguherandina ehlî "ehlîbeyt" û ummetê. Hz. Mûsa di nava qebîleyên Îbraniyan de erka "kahîntiyê" da yên herî nêzî xwe û bi vî awayî çînîbûneke xweser dide destpêkirin. Hz. Îsa zêdetir serhildana xwe li dijî çîna kahînan a xizanan dide destpêkirin. Xirîstiyantî pişt re li ser şopa împaratoriya Romayê çînîbûnekê pêk tîne. Asta herî jor a dêrê dewleta dînî ava dike û dikare di nava gel de jî çînîbûyîneke xweser di bin perdeya dîn de pêş de bixîne. Di Îslamiyetê de çînîbûyîn hînê bi awayekî cuda pêk hatiye. Bi rêya xelîfeyên ku kûrbûna wan a îdeolojîk nîne, bi bermahiyên dewleta Sasanî û Bîzansê radibin, wexta dewleta Îslamê pêk tînin, wek ummet bi komên mezin ên bawermendan jî hîmên dewleta Îslamê têne têkûzkirin. Ummet beşê civakê yê ji dewleta Îslamê tam bawer kiriye û jê re serî ditewîne îfade dike. Perdeya ummetê çînîbûyîna rastîn vedişêre, li hev tîne.

Nasnameya sosyal demokrat a dînên yek xwedayî di vir de derdikeve pêşberî me; li hev anîna çînan. Di cewherê xwe de Hz. Îsa şoreşgerekî radîkal ê çînî ye. Di Xirîstaiyaniyê de nexasma di dema dewletbûnê de Arîûsparêzî berxwedana çînî ya xizanan temsîl dike. Heman ekol di Îslamiyetê de pêk tê; wexta mezhebên Sûnnî dibin dewlet, mezhebê Elewî hem xizanan, hem jî komên gel ên bindest

temsîl dike. Li Rojhilata Navîn çîn bi awayekî tazî dernakevin holê. Timî kirasê etnîk, mezhebî û dînî lixwekirî derdikevin pêşberî me. Divê mirov çînîbûnê di kirasê îdeolojîk, etnîk û mezhebî de bibîne. Têkoşîna wan heman taybetiyan nîşan dide. Di têkoşîneke etnîk, dînî, mezhebî, yan jî çi cemaet û fikrî bibe, timî cewherê wê yê çînî heye. Em nêzî analîza civakî dibin, lewma divê em vê rastiyê timî li ber çav bigirin. Li Rojhilata Navîn a roja me ya îro, wexta çînayetî - mîna li Iraqê - li ser dewletê xwe li hev radikişînin, bi nakokî û têkiliyên di navbera Erebên Elewî-Şîa, mezhebên Sûnnî, etnîsîteya Kurd û cemaetên din ên hindikahiyan de pêk tên. Çînayetî di dewletê de û wek gel di welatiyan de di kûrahiyên îdeolojîk, dînî û etnîkî de pêk tê. Ji ber vê yekê partiyên çînî yên mîna yê Rojava zêde maneyên xwe nînin. Divê mirov ti car çînîbûyînê ji nedîtî ve neyê. Lê divê mirov wê baş bi awayekî rastîn berçav bike; zêde jî di mînakan de nexeniqîne; bi çînayetiyeke teng - mîna çîna karker û gundiyan - analîzê neke û gavên pratîk biavêje wê encam bide. Naxwe mîna di roja me ya îro de jî tê dîtin, wê çînayetî tenê çaresernebûnê kûr bike.

Partiyên rizgariya netewî, sosyal-demokrat û komînîstên klasîk, ji ber helwesta xwe ya modern derbarê çînî de nekarîbûn xwe ji têkçûnê xilas bikin. Partiyên netewparêz ên radîkal, sosyal demokrat û komînîst li Îran, Iraq, Tirkiyê, Misir û Sûriyê dikin nakin nikarin bi ser bikevin, berovajî hewldanên wan di têkoşîna îqtîdarê de li dijî ekolên - Şîa, Birayên Misilman, HAMAS, Hîzbûllah û hwd. - perdeya dînî baş bi kar tînin nikarin xwe ji têkçûnê xilas bikin û di vê yekê de ev helwestên wan yên hişk diyarker in.

Rastiya mulkiyetê tevî ku zêdetir di qonaxên pêşketina çînîbûyîna civakî de berçav dibe jî hê bi kûrahî di hisên nasname û aîdiyeta civakî de pêk tê. Eger mirov du cureyên mulkiyetê ji hev bike wê baştir bibe. Mulkiyeta kolektîf, mirov dikare weha tarîf bike; komeke organîk li ser pêdiviyeke hevpar îradeya tesarufê nîşan dide. Her ferdê di civakê de li ser wî tiştî xwediyê heman tesarufê ye. Ya rastî, ji ber vê taybetiya wê, mirov tam nikare jê re bibêje mulkiyet. Kolektîvîzm înkara mulkiyeta taybet e. Mulkiyeta taybet jî li dijî mulkiyeta kolektîf îradeya tesarufê ya ferd, yan jî koma ferdan îfade dike. Şaristaniya Rojhilata Navîn bi sedema ku çînîbûyîn herî zêde zû nas kiriye, pir demeke dirêj jî mulkiyetê dijî. Dewletbûyînê li hawîrdora xwe hem mulkiyeta taybet û hem jî mulkiyeta kollektîf pêk aniye û dûre xwe jî afirandiye. Yanî berê kesan, mulkiyeta

taybet, paşê yên dewletê pêk neanîne, di zikhevdu de bi dewletbûyînê re nîzameke mulkiyeta taybet-kollektîf pêk anîne. Tebeqeya jor çiqas dewletdar bûye, ew çend jî bûye xwediyê mulkiyetê. Dewlet, jixwe hemû hebûnên di nav sînorên xwe de mulk dizane. Dewlet bi xwe hevpariyeke mezin a mulkiyetê ye. Komeke mulkiyeta taybet e. Hînê li jêr û tebeqa navîn ji bo mulkiyeteke bi sînor destûrê dide. Lê timî hebûna van koman jî desteser dike. Ji vî alî ve, mulkiyeta taybet zêde pêş nakeve. Li derveyî dewletê pêşketina mulkiyeta taybet zêde misoger nîne. Ev yek jî rave dike ku çima mîna li Rojava, li Rojhilata Navîn mulkiyeta taybet pêş nakeve. Şêwazê pêkhatina dewletê rengê mulkiyetê jî diyar dike. Derdorên bûrjûwaziya arîstokrat hînê ji destpêkê ve statuya mulk a taybet a dewletê bi sînor dikin û ev yek jî derfet û îmkan dide saziya mulkiyeta taybet xurt bibe. Bi şaristaniya Rojava îspat bûye ku mulkiyeta taybet a ferdan ji ya dewletê zêdetir afirînere.

Mulkiyeta kolektîf di kûrahiya civakan de zêdetir li cem malbat, qebîle, mezheb û hwd. li cem komên cemaetan hebûna xwe dewam kiriye. Pir girîng e, em vê mulkiyeta kolektîf û mulkiyeta taybet-kolektîf a li cem dewletê tevlî hevdu nekin. Mulkiyeta herî zêde ji afirandinê dûr, paşverû û kurtêlxur a dewletê ye. Li Rojhilata Navîn yek ji sedemên bingehîn ên paşve mayîna aboriyê mulkiyeta dewletê ye. Dewleta mîna rîşekê mezin dibe û nîzama wê ya mulkiyetê, dike ku civak nikaribe nefesê bistîne. Jixwe pirî caran dewlet û mulkiyet heman tiştî îfade dikin. Mulk-melîk-malîkiyet. Eger em bi awayekî kategorîk hînê berfireh bikin, xwedê=xwediyê her tiştî, dewleta xwedê-qral=xwediyê her tiştî xwedê-qral, xwedê-qral=saziya dewletê, saziya dewletê=xwediyê her tiştî dewlet. Em wisa dikarin bigihîjin encamekê. Ev têkiliya di navbera dewlet û mulkiyetê de bi awayekî optîmal ji hev neyê derxistin, pêşketina civakî pir zehmet e. Dewleta bi tevahî derbê li têkiliyên têkûz ên civak û ferd dide û tesarûfê li ser dike, bi temamî mulkiyet e.

Têgîna ekonomiyê gerdûnî ye. Di cîhana hemû ruhberan de mîna metabolîzmayekê nîzameke danûstendinê heye û em jî dikarin bi giştî aboriyê welê bigihînin tarîfekê. Di cehwerê tevgera ekonomîk de metabolîzmayeke heye em dikarin weha bînin ziman; ji maddeya ne zindî maddeya zindîker bi dest dixe; vê jî bi kar tîne û dîsa werdiguherîne maddeyeke ne zindî. Civak jî ji bo pêkhatin û hebûna xwe dewam bike, diyar e nikare bêyî vê tevgerê bibe. Lê rastiyeke din jî ew e ku bêyî zindîbûnê - wek zêhniyet û ruh tê bi navkirin - aborî nabe. Ji lewra em giraniya xwe tenê bidin ser tiştekî dibe ku em

bigihîjin encamên şaş û çewt. Rêbaza herî rast ew e ku divê em zêhniyet û aboriyê di zikhev de - komên civakî yên navberê, dewlet û malbat, bi giştî rastiyên civakî û siyasî - analîz bikin. Eger em her yekê ji wan bi tena serê xwe analîz bikin, mîna ku em fîl bi mûyên wî tarîf bikin. Zêhniyet çiqas berhemdar be, bandora wê jî wê ew çend li ser aboriyê bi bereket be. Di serdema şoreşa neolîtîk de ku BZ di salên navbera 6000-4000 de pêk hat, zêhniyeta mirov yek ji serdemên xwe ya herî bi bereket - li keviyên hundur ên qûntara çiyayên Amanos-Toros-Zagrosê - jiya. Ekonomiya bi bereket a li peravên Ege'yê rê li ber derketina şaristaniya Girît, Grek û Romayê vekiriye. Têkiliya wê bi şoreşên zanist, felsefe û fikrî re heye. Zêhniyeta mezin a Ronesansê rê li ber aboriya Ewrûpayê vekiriye. Bandora beramberî hevdu tesîrê li hev dikin û hevdu xwedî dikin.

Pêşketina zêhniyetê di şaristaniya Rojhilata Navîn de serdemên aboriyê yên rê li ber vekiriye, diyar in. Tevî vê yekê di zêhniyetê de qutbûnek ji rastiyan, bi metafizîkê qutbûna ji fizîkê, pêşnûmeyên serî û dawiya wan nediyar, xilmaşî û hinêjîna li ser xeyalan, bereket û hatina ekonomîk şikandine. Metafizîka Rojhilata Navîn, - mîtolojîk, dînî û felsefî - çendîn ji rastiyan qut bûye û li têgînên mucered qewimiye, ew çend jî ekonomî paş ve ketiye. Ponijîn û kûrbûna li ser îlahiyatê, nemaze felsefeya ji rastiya heyî dûr dixîne û li hemberî wê pêş de nebirina fikra ilmî, di warê aborî de cihokan dixetimîne, rê li ber pêşketinê digire û dike ku civak di nav rêbazên neolîtîk ên hezarsalan berê de biçike û bimîne. Li Rohilata Navîn heta pêşketinên mîna Ronesans, reformasyon û rohnîbûnê pêk neyên, wê aboriyeke ku xwe bigihîne sazîbûnê û mayînde pêş nekeve. Çi bi destê dewletê dibe û çi jî bi destê ferdên taybet dibe, di bingehên perîşanî, xizanî û pêş de neçûna civakê de ev rastî hene. Herêma ku ji aliyê çavkaniyan gelekî dewlemend e, heta di warê zêhniyetê de şoreşeke bi kok neke, wê nikaribe şoreşa ekonomîk pêk bîne. Ji lewra çareserî ji bêkarî û xizaniyê re nayê dîtin. Eger li navenda çareseriya aborî ya Rojhilata Navîn şoreşa zêhniyet û demokrasiyê neyê bi cihkirin, hemû çareseriyên din tewş in. Hin gavên ku werin avêtin, wê tenê ji bo çareserkirinê bibin pîne. Eger têkiliya diyalektîk di navbera demokrasî, zêhniyet û ekonomiyê de esas were dîtin, gavavêtin ber bi çareseriyeke mayînde rêbazeke rast e.

Em wexta hin têgînan rave dikin, girîng e, em terîqet û xanedanên bi ser dewlet û dîn ve rohnî bikin. Em heta rola xanedan û terîqetan di şaristaniya Rojhilata Navîn de baş rohnî nekin, hewldanên ji bo ravekirinê wê kêm bimînin.

Xanedanî, malbat û bi awayê di nav dewletê de mezin dibin, rastiyeke pir balkêş e, di hinavên xwe de xusûsiyetên etnîk û mîtolojîk dînî dihewîne. Di mezinbûn û hilweşîna dewlet û malbatekê de xanedaniyekê her tim roleke girîng lîstiye. Dewletên bêyî xanedan pir kêm in. Di roja me ya îro de jî ev pîvan hînê hukmê wan dewam dike. Wek sedem, mirov dikare hêza malbata bavikanî nîşan bide. Dewlet genê bavikanî ye. Ji lewra malbata herî xurt a bavikanî dibe xanedaniya dewletê. Xanedan bi xwe dibe dewlet. Xanedanî saziyeke welê ye, mirov dikare berî hezarsalan wê bibîne. Di nav dewlet û civakê de şopên wê yên mezin hene. Mîna ku ji çîna serdest, komên etnîk û baweriyên dînî pêk hatibe. Aliyekî din ê xanedaniyê ew e ku bi rêya sulaleyê bandorê li demên dirêj dike. Dîsa bi zewacên di nava xanedaniyan de dikare li ser cografyayeke berfireh belav bibe. Ev taybetî nîşan didin ka çima xanedan beriya her tiştî di nav dewletê de hatine damezrandin. Ji ber ku xanedanî bi qasî ku di pêşketina civakê de rolek wan heye di pêşketina dewletê de jî xwedî rol e, lewma divê ji nedîtî ve neyê. Şaristaniya Rojhilata Navîn hinekî jî bi xanedaniyan diherike heta îro. Nemaze xanedaniyên dewletan di dîrokê de şopên girîng hîştine. Di şaristaniya Rojava de zêdetir xanedaniyên li derveyî dewletê giraniya xwe hene, lê li Rojhilat xanedaniyên bi ser dewletê ve li pêş in. Xanedanî di heman demê de dibistan in; modelekî civakî ne. Bûyerên girîng berê li xanedan û modelên wê pêk tên, paşê derbasî nava civakê dibin. Komên etnîk û heta netew tim û tim bi navên xanedanan têne naskirin. Bûyerên nadîde nîn in, ku xanedaniyan bi qasî netew û komên etnîk rol lîstine. Netew û etnîsîteyên herî xurt bi xanedaniyên ku di nava xwe de mezin kirine, navê wan tên hildan. Xanedaniyên Emewî, Ebbasî, Eyûbî, Selçûkî, Osmanî û Barmekî di heman demê de têne maneya netewên Ereb, Kurd û Fars.

Xanedaniya di roja me ya îro de jî hebûna xwe bi awayekî maddî û manewî dewam dike, pêwîst e mirov ne pir mezin bike, ne jî înkar bike. Divê mirov wek rastiyeke civakê bibîne û bikişîne ser zemînekî demokratîk. Ya girîng, divê mirov ne bibe heyranê xanedaniyê, ne jî çep nêzîk bibe, berovajî divê mirov bi awayekî erênî nêzîk bibe û çareser bike. Naxwe dikare rê li ber pirsgirêkên ciddî yên siyasî û civakî veke û krîzan kûr bike. Eger em balê bikişînin ser nexweşiya xanedaniyê ya Seddam Husên ku rê li ber trajediyekê vekir, wê mijarê baştir were fêmkirin.

Terîqet jî mîna xanedaniyê ye, lê zêdetir di warê dînî-mezhebî de pêk tê. Terîqet ji bo pîvanên giştî yên dîn li gorî zeman û mekanê bi

cih bînin, derketine holê. Ji ber ku rêxistiniya giştî ya dîn qels e, ev kêmasî bi terîqetan tedarik tê kirin. Dîn hînê zêdetir bi mezheb û terîqetan xwe bi awayekî berçav bi rêxistin dikin. Li her cihê dîn hebe, pir normal e, terîqet û mezheb hebin. Dîn xwe bi terîqetê hînê zêdetir bi rêxistin dike. Wexta welê dibe, serê terîqetê û kesayetên wê bi rêxistin dikin, dibin xwediyê rolên girîng. Li çi deverê valatî hebe li wir terîqetek heye. Nemaze cihên dewlet nikare wan têr bike li pey rêxistinên mîna terîqetan baz didin. Li cihê malbat teng be û dewlet nikaribe xwe bigihîniyê, eger di navberê de rêxistinên xurt ên civakî nebin, bi îhtîmaleke mezin wê terîqetê were avakirin. Mezheb kevneşopiyeke mîna terîqetê ye, lê berfirehtir e. Gelek terîqet hene, ji bo xwe ji dewletê biparêzin û sînorên teng ên malbatê derbas bikin, hewce dibînin nîv-veşartî bin. Hinek ji wan ji navikê bi dewletê ve girêdayî ne, lê hinek ji wan pir dijwar têkiliya bi dewletê re red dikin. Rojhilata Navîn mîna ku civaka terîqetan be. Bi taybetî li bajaran dema etnîsîte nebûye bersiv, malbat teng mane û li aliyê din dewletê xwe her tişt hesibandiye, terîqet ketine pêvajoyê û rolên girîng lîstine. Di serdema navîn de terîqetên veşartî yên mîna Batiniyan, esas, partiyên çînî yên xizanan bûn. Yek ji van terîqetên navdar a Hesan Sebah e, - 1100-1250 - di pozê wezîr û sultanên Selçûkiyan ên xanedan û mezhebê serdest re anî. Xaricî, Fatimî û Elewî heman kevneşopiyê temsîl dikin. Terîqet û cemaetên mîna wan, fena saziyên civakî yên sivîl ên Rojhilata Navîn bin.

Terîqet bi sedema ku ji valabûneke civakî derdikeve holê, divê bi awayekî objektîf were nirxandin. Ji ber ku saziyên nîv-civakî û nîv-siyasî ne, hem ji aliyê îqtîdarê û hem jî ji aliyê muxalefetê ve rola wan girîng e. Li cih û demên pêşketinên ilmî bi sînor bin, têgihîştina demokrasiyê pêş nekeve, rêxistinên bi vî rengî xwe ferz dikin. Ji bo li dawiyê werin hîştin, divê ilmê civakî û têkoşîna demokratîk werin pêşdebirin. Di roja me ya îro de terîqetên naveroka wan rizî ne mîna şîrketên menfîet û berjewendiyan dixebitin. Têkoşîna herî rast a bi van saziyên dejenerebûyî re, di nav xelkê de xebatên ilmî û demokrasiyê ne. Ji lewra hewce ye herî hindik bi qasî îmana terîqetparêzan ji zanistê bawer bikin, qîmet bidinê û ji bo demokrasiyê xebateke dewamî û xurt, bikin. Divê neyê ji bîrkirin ku komên cemaetwarî yên kokê xwe diçin hezar sal berî niha cihê wan di nav demokrasiyê de heye û bi helwesteke rast a demokratîk mumkîn e muhafezekariya wan were çareserkirin.

Hin partiyên siyasî û rêxistinên civakî yên sivîl jî bi awayekî giştî em dikarin wan wek terîqetên hemdem bibînin û ji bo wan jî

heman helwestê nîşan bidin. Wexta malbat, qebîle û têkiliyên baweriyê zêdetir bi awayekî giştî yê îdeolojîk bikevin nav hevdu, di roja me ya îro de girîntir dibe mirov hînê berfirehtir li rastiya civaka sivîl binere. Eger mirov hebûnên klasîk ên civaka sivîl û hebûnên hemdem bigihîne hevdu, dibe ku encamên bi kêr bidin. Saziyên civakî yên sivîl ên xwe nespêrin kevneşopî û rabirdûyê, îhtimal heye pirsgirêkên wan ên kok û esil çêbibin. Ji lewra îhtimal heye pir zû vemirin. Çi tevgera hunerî, civakî, siyasî û îdeolojîk a bi kevneşopiyê re têkiliyê daneyne, şensê wê yê serketinê nîne, nikare mayînde bibe û wê nikaribe xwe xilas bike ji bo nebe modeyeke dembuhurî. Nemaze çepgiran ji ber ku kevneşopî piçûk dîtin têkçûn. Divê mirov ji vê helwesta çepgiran a têk dibe ders werbigire û li ser bereyekî fireh bi kevneşopiyê re têkilî deyne; tevgerên civaka sivîl û demokratîk siyasî ava bike. Ev yek dikare di derketina ji krîzê de roleke çareserker û serketî bilîze.

5- Di Şaristaniya Rojhilata Navîn de Şîdet û Dîktatorî; tevî ku di çarçoveya dewletê de li ser hatiye rawestîn jî divê şêweyê îqtîdarê û şîdetê hûrûkûr were tarîfkirin. Bi giştî jî cewherê dewletê li her derê heman tişt e. Kevneşopiya li ser berhemê zêde û nirxê zêde hatiye avakirin temsîl dike. Şêwe û şiklê wê li gorî zeman û mekan diguhere. Di vê de şert û merc rol dilîzin. Di gelek şertên cuda û demên cihêwaz de şêweyên cuda yên dewletê derketine. Lê di dualîteya Rojava-Rojhilat de dîsa jî du ekol û meyl balê dikişînin. Li Rojava zêdetir şêweyên komarger û demokratîk têne dîtin, li Rojhilat jî şêweya bingehîn despotîzm e.

Komar hem di sîstemên koledar ên klasîk de, hem jî di hin dewletên sîte yên serdema navîn de li Ewrûpaya serdema nû pirî caran tê dîtin. Di navbera komar û despotîzmê de cudahiya bingehîn di warê huqûqî de ye. Her çend di her du şêweyan de jî tebeqeyên serdest ên koledar rol bilîzin jî, di komargeriyê de pîvanên bi têkoşîneke dijwar a civakî hatine destnîşankirin, hene. Avahiyeke dînamîk a civakî heye. Ew maf û huqûqên xwe dizanin. Eger hewce bibînin bi dijwarî huqûq û mafên xwe diparêzin. Komar civaka dînamîk temsîl dike. Di despotîzmê de rewş berovajî ye. Kesek çalakiya xwe ya kêfî wek pîvaneke yekalî li ser civakê ferz dike. Ya esas, ti cudahiya wê ji monarşiyê nîne. Cudabûn ew e ku di monarşiyê de xanedaniya hatiye destnîşankirin, bi rêzikên diyar wê kê bike monark, bi îfadeyên kevneşopiyê diyar dike. Rêzik û pîvanên rêveberiyê kevneşop in. Di rewşên kaosê de car caran rewşên awarte derdikevin holê. Wê wextê yan xanedan û yan jî yê berê rêzikên xwe

diguherîne û bi cihanîna hukmê xwe dewam dike. Lê despotîzm hukmê xwe ji cem xwe neqil dike. Pirî caran rêzikên kêfî datîne, diguherîne. Li Rojhilata Navîn monarşîzm hînê nêzî despotîzmê ye. Di cewherê xwe de fermanname fermanên despotîk in. Her çend wek qanûnê qîmetê bibînin jî wek berhemê têkoşîna civakî ti têkiliya wê bi huqûqê re nîne.

Dîktatorî hînê şêweyekî cuda ye; yan şertê pêşîn, yan jî prototîpa împaratoran e. Kesek an jî çend kesên ji aliyê tebeqeya jor ve bi erkên awarte ve hatine xemilandin, pêk tînin. Cudahiya wê ji despotiyê ew e ku hêza kontrolker a li hawîrdorê giraniya wê heye. Her tim derdorek hebû ye, dîktator hesab bidiyê. Tevî ku împaratorî rejîmeke mayînde ye, dîktatorî demborî ye. Di rewşên awarte de serî lê tê dayîn. Şêwegirtina dewletê ya Rojhilata Navîn tevî ku pir nêzî despotîzmê ye, her wisa gelek nêzî împaratorî û monarşîzmê ye. Mirov dikare bibêje; despotîzm, monarşîzm û împaratorî li serê (reîstî) dewleta Rojhilata Navîn gihîştine hevdu. Belkî jî nûneriya herî bi îrade û bi bandor li cem reîstiya dewleta Rojhilata Navîn pêk hatiye. Bi cehwerê dewletê re jî têkiliya wê heye. Kevneşopiya bi hêz a bavikantiyê, şêxtiyê, begtiyê û efendîtiyê li reîstiya dewletê digihîjin hevdu û wek hêzeke mezin ji nû ve xwe pêk tîne. Ji lewra, li Rojhilata Navîn pir kêm be jî zehmet e mirov şêweyên dewletê yên komarger û demokratîk bibîne. Dewlet weke ku bi cewherê xwe re tevbigere û mîna bixwaze hêza xwe îspat bike, xwe dixe yek reng û şêweyî. Her weha îmaja 'dewlet naguhere' û bêyî şêwe guhertinê ebedî mayînê wek qabîliyeteke siyasî û fazîlet dizane.

Têgihîştina li dewletê û xweda-qralan, ji ber ku bi sedsalan li mejiyê civakê hatiye kolan ji bo komargerî pêş nekeve bi tesîr bandor kiriye. Li dijî kevneşopiyê ye, ebd-însan tevlî karê xwedê-dewletê bibin. Tevlîbûna karê xwedê - dewletê - gunehekî pir mezin e. Di pirtûkên pîroz de pir tê gotin; "Tevlî karê xwedê nebin, ji xwedê hesab nayê xwestin, şîrkê bi xwedê re nekin" îfadeya dînî ya vê rastiyê ye; "Tevlî karê reîsê dewletê nebin, ji wî hesab nexwazin, nebin hevpar û şirîkê erkên wî." Tê îdîakirin ku Pirtûka Pîroz ji bo hukumdariyekê ji nav qebîleya Îbraniyan derbixîne, hatiye pêkanîn. Ev dîtinek e, para rastiyê tê de heye. Heta tê gotin Hz. Mûsa ji melîktiya Misrê tê. Hûnandina hukumraniya xwe bi Tewratê rave dike û ev yek jî tê fêmkirin. Dîsa Hz. Îsa wexta hewl da hukumraniya Qudsê - wî jê re digot "Qîza Sîon" - bixe destê xwe hat zevtkirin û girtin. Hz. Mûhammed gelek ayet û sunnetên bi maneya "Ji xwedê re şirîkan çênekin, tevlî karê xwedê nebin, xwedê wê ji me hemûyan

hesab bixwaze û hesab nade kesî" pir anîne ziman û bi zanebûn, an jî bi nezanî rê li ber reîstiyên dewletê yên serdema navîn wek sultantî, padîşahtî û mîrnîşîntiyan vekir. Quran bi vî aliyê xwe danezanek dewletê ye. Hem jî bi pêşbîniyeke awarte, mîna ku wê sedsalên pêş rê ve bibe şêweyekî rêveberiyê diyar dike û dide zanîn. Eger Quran li ser hîmê siyasetê were analîzkirin dikare gelek encamên hînker bide. Jixwe statuya ummetê ya di navbera girêdana bi xwedê û dewletê de pir eşkere û hînker e. Di serdema navîn de hemû danezanên dînî hem Îslam, hem Xirîstiyan û Çîn, hem jî Hînd û Rojhilata Dûr, ji bo dewletên nû yên derbikevin mîna daxuyaniyeke pêş hatine amadekirin. Li ser navê xwedê mizgîniya tê dayîn, nûçeya çîroka pêşketin û derketina dewleta serdema navîn e.

Li Rojhilata Navîn a îro, dûrkirina dewletê ji karektera despotîk wezîfeyeke zehmet û şert e. Her çend li naverastê hin dewletên komarger hebin jî zehmet e mirov bibêje taybetiyên xwe yên despotîk li dawiyê hîştine. Komargerî di nava çînan de konsensusekê dixwaze. Di dîrokê de li ti welatê Rojhilata Navîn dewleta destûrî û komar bi konsensuseke civakî nehatine destnîşankirin. Bêyî ku em li rewşa wan a pêşketî yan jî paşketî binerin, ji ber ew rejimên xwe dispêrin îradeya yek kesî ne, ti têkiliya wan bi komarê re nîne. Di komarê de ne kesek divê îradeya gelek kesên hemtayê hevdu li hev bikin û li hev bên. Di vê yekê de, qelsbûna çînên civakî, pêş nexistina îradeya siyasî, ebdîtiya kevneşopî ji bo dewletê, tinebûna kevneşopiya komargerî cihekî girîng digirin û rol dilîzin. Dewletên Rojhilata Navîn navên wan çi dibin bila bibin, cudahî di navbera wan de çiqas hebe bila hebe, divê mirov rast destnîşan bike û bizanibe ku taybetiyên dewleta despotîk li dawiyê nehîştine, ev tespît ji bo meşandina têkoşîna komargerî û siyaseta demokratîk girîng e.

Di şaristaniya Rojhilata Navîn de analîzkirina çanda şîdetê hînê jî girîngtir e. Mirov dikare bibêje; li civaka Rojhilata Navîn ti sazî û çavî nemane şîdet neketibiyê û diyar nekiribe. Bi awayekî giştî jî tê gotin di warê siyasî civakî û heta aborî de roleke diyarker a şîdetê heye. Tê destnîşankirin ku îqtîdar û şîdet cêwî ne. Lê li ti deverê bi qasî civaka Rojhilata Navîn hem li tebeqeya jor, hem jî li tebeqeya jêr roleke diyarker nalîze. Saziyeke bi tesîra şîdetê şekil negirtibe zehmet e mirov bibîne.

Ji bo tarîfkirina şîdetê, ez bê mane dibînim serî li tezên bîyolojîk û heta xwezayî bidim. Şîdet, koka wê ya civakî eşkere ye. Her weha têkiliya wê bi îqtîdara dewletê û çînîbûyîna xwe dispêre berhemê

zêde û nirxê zêde diyare. Di ilmê civakî de ev nuqteyên têne qebûlkirin wek dîtinên giştî têne parvekirin.

Derbarê mijara şîdetê de pir kêm tespît hatine kirin. Tevî ku di civakên îqtîdar naskirî de rola şîdetê diyarker e jî wek mijareke bêqîmet tê dîtin û wek mijareke îstîsnayî tê nirxandin. Şer îfadeya herî dijwar a şîdetê ye û behsa wê hovîtiya wê nayê kirin ku di ti civakên heywanan de nayê dîtin. Tenê çima hewceyî pê heye tê ziman. Şer tenê sedemek wê heye ew jî parastina wê ya mecbûrî, parastina hebûn û azadiya wê ye. Naxwe sedemên wek desteserkirina nirxên komkirî yên civakê, talankirin, serwerî, bi îqtîdara dewletê hukumkirina li civakê û li gorî wê ji bo berjewendiyên xwe şekildana civakê, nabin sedema şer. Tevî ku bersiv ev çend vekirî û eşkere ye, ji bo nuxumandina rastiyê ji hezar derî hezar tişt têne anîn û ezman tê pînekirin. Ti tişt bi qasî îqtîdar û şîdetê çavkaniyên wan şaş nehatine destîşankirin û veşartin. Mîtolojî, dîn, felsefe û herî dawiyê jî ilmê civakî ev rastî veşartine û ne anîne ziman ku şîdet bi awayekî li derveyî mirovatiyê di destê kurtêlxurên civakî yên mêtinger û tehekumkar de bûye çalakiyeke herî hovane.

Ev tarîfa ji bo giştî rast e, ji bo civaka Rojhilata Navîn rastir e. Vegotinên mîna "lêdan ji cennetê - girava serweran - hatiye", "şîdet ji hingiv şîrîntir e" çavkaniyên şîdetê baş rave dikin. Civak belovajî û bêhilm maye; di vê de para şîdetê diyarker e. Di hemû sîstemên civakên dewletdar û hiyarerşîk de bi şîdetê statu hatine avakirin û sazî bi zirxan hatine parastin. Ti saziya ku şîdetê negire bin baskê xwe, şensê wê yê jiyanê nîne.

Diyar e, di van şert û mercan de civaka azad û sivîlîzasyonê pêş nekeve. Fikir û raman jî kengî li moxilê têne xistin, têne qebûlkirin. Di rewşên bi vî rengî de fikra afirîner pêk nayê. Bi gotinên qalib ên qebûl dîtîne, karên dunyayê têne meşandin. Di serî de serekên dewlet û malbatê, baş dizanin ku otorîte û hêza wan bi saya şîdetê ye. Wexta dibêjin; "em nîzamê bidin cîhanê" mebesta wan amûrê cebir û zorê ye. Şîdeta çizirandine nav hemû çaviyên civakê cih ji hêza maneyê re nahêle. Ji lewra saziyên civakî bi şeklê xwe hene. Ji ber ku cih ji maneyê re nehatiye hîştin saziyên ji afirandinê dûr û tenê bi niçandinê dilivin, bêguman ji wan pêşketineke azad û saziyên afirîner nayên hêvîkirin.

Di civakê de mîna kevneşopiyekê her sazî xwe bi şîdetê xwedî dike. Li qatê herî jêr ê civakê malbat jixwe nikare hilmê û nefesê bistîne. Nemaze şîdet li ser jinê rewşa şer îfade dike. Hucreyeke jinê nîne ku ji ber şîdetê nelerize. Rewşa zarokan jî heman tişt e. Rêbaza

bingehîn a perwerdeyê şîdet e. Zarokê bi şîdetê hatibe terbiyekirin, bêguman wexta mezin bibe mirov dikare ji wî jî li benda heman tiştî be. Bi serweriya ku xwe dispêre şîdetê serbilind e, jê zewq digire û pê xweş e. Hisa bi hêzbûnê ya xwe dispêre îqtîdar û şîdetê diviyabû wek nexweşiyeke herî xeter a civakî bihata nirxandin, lê wek hisa herî mezin û bi kêf tê îlankirin. Rastiyek e, diviyabû lanet lê bihata kirin, lê wek fazîlet û mezinbûnekê tê destnîşankirin.

Saziyên civaka Rojhilata Navîn ên îro, bêyî îstîsna mirov nikare wan dûrî şîdetê bifikire. Ji şîdeta dewletê heta ya malbatê, ji şîdeta rêxistina şoreşger heta ya faşîstan, dîndaran, netewparêzan û heta her cure şîdetê ji bo çareseriya pirsgirêkan li ser kar e. Hewldanên ji bo diyalogê wek lafazaniyê têne nirxandin. Pir maneya hêza gotinê nîne. Lê şaristaniya Rojava bi berovajî vê rewşê dibe xwedî hêz. Beriya her tiştî bi hêza gotinê heta dawiyê diyalog, eger nebe wek çareya dawî serî li rêbaza şîdetê dide û ji ber vê yekê şensa wan a serketinê zêde ye. Rojava li gorî Rojhilat mijara şîdetê çareser kiriye û dersa xwe girtiye. Yekîtiya Ewrûpayê di vî warî de gelek bi baldarî û rexnegîr tevdigere. DYE jî wexta şîdetê bi kar tîne pir bi helwestên çareseriyane dimeşe. Rasterast şîdetê bi kar nayne. Baş dizane serketina wê bi hêza çareseriyê ye. Dîsa baş dizane serneketina wê jî ji analîzên şaş e. Dersên xwe baş girtine.

Ji bo mirov civaka Rojhilata Navîn ji şîdetê bike, hewceyî bi perwerdeyeke berfireh heye. Divê mirov ji hêza maneyê bawer bike, şîdetê tenê di wextên mecbûrî û şertên encamstendinê de ji bo serketinê bi kar bîne. Ne tenê şîdeta dijşoreşê, şîdeta şoreşê û şer, divê mirov çarçoveya şîdetê ya di her warî de baş binirxîne û wexta li dijî wê derkeve jî ji bo amadekirina şîdeta dijber û bi kar anîna wê hostatiyeke mezin nîşan bide. Civakeke bi hezarsalan bi kevneşopiya şîdetê hatiye pijandin li pêşiya me heye, em mîna wê vejînin radikin ser piyan di vê pêvajoyê de ji bilî rola pîriktiyê divê mirov bi şîdetê ewle nebe; divê mirov zêdetir cih bide hêza rêxistin, mane û diyalogê û divê ev yek wek rêbazeke çareserker a derketina ji kaosê were dîtin û bi cihanîn.

---

**B- Li Rojhilata Navîn rewşa rojane û bûyerên muhtemel**

Tarîfeke rast di navbera kevneşopiyên civakî û rojane de hînê jî ji bo ilmên civakî pirsgirêkeke ciddî ye. Eger em rastiya rojane ya dijîn, bi pêvajo û bûyerên kevneşopiyê ve girê nedin, em çiqas dikarin nas bikin? Kevneşopî li ser bûyerên rojane çiqas bi bandor e? Heta bersiva van pirsan neyê dayîn, nirxandineke rastîn derbarê

rewşa rojane û bûyerên muhtemel de zehmet e. Di vê rewşê de yên werin kirin wê bi kêmasî û çewtiyan tijî bin. Ji ber vê yekê ye, em wek rêbaz timî di navbera îro û dîrokê de têkiliyê datînin. Ez di vî warî de eger yeqîna xwe careke din bînim ziman ezê bibêjim; kevneşopî bi şîfre û bi sir be jî bi piranî di nav rojane de veşartî ye. Şert û kêliya rojane ji texmînan wêdetir hindik dikare daneyên kevneşopiyê bidin guhertin. Lê ji bo em cîhana bûyeran fêm bikin, divê em çend bûyerên bi şîfre çareser bikin. Jixwe em ji ber vê gelek tarîfên dîrokî dikin û dixwazin van şîfreyên di nav jiyana rojane de nuxumandî eşkere bikin.

Ez bi mînakekî baş dikarim îzah bikim: Bawer dikim ti kes ji durustbûna şoreşgeriya Lenîn - her kesê di sedsala 20. de ji aliyê îdeolojîk-siyasî ve eleqeder dibû - guman nake. Ez yeqîn nakim ku wexta Lenîn hem teorîk, hem jî pratîk bi îqtîdarê re mijûl dibû, şîfreyên wê çareser kiribin. Ji ber ku çareser jî nekir, bi sîstema ku damezrand herî zêde armancên xwe tasfiye kirin, pûç kirin. Ji lewra bi awayekî rast çareserkirina şîfreyan girîng e. Derbarê îqtîdarê de ji şoreşgerên roja me ya îro qat bi qat nirxandinên rast kirin û agahiyên em nikaribin bijimêrin di destê wan de hebûn. Belkî nekarîn îqtîdarê hilweşînin, lê xwe pê qirêj jî nekerin. Ma em dikarin van bê qîmet bibînin? Sosyalîzma Lenîn bi blokên îqtîdarê - yên ji dema Çartiya Rûsyayê mayî - ava kir tenê karîbû heftê salî xwe rabigire. Ew jî piştî ku ji sîstema dijberê xwe re xizmet kir - bi qasî hevrikekî mîna Seddam jî - bêyî ku li ber xwe bide ji hev de ket. Di dunyayekê de yekîtiya armanc û gotinê heye, bêyî agahdar bike, mîna bêbextiyê bike çû. Li gorî min, li şûna ku mirov sîstema Lenînîst di bin rexneyan de bifetisîne, divê tespît bike ku "şîfreya îqtîdarê ya pir bi kod" çareser nekiriye. Ev nirxandineke rastir e.

Hemû pêvajo, bûyer û rastiyên şoreşgerane yên wek qonaxên bi wesif têne destnîşankirin, eger şîfreyên kevneşopiyên wan rast neyên çareserkirin, wê baweriya xwegîhandina rastî, daxwaz û armancan bibe xwe xapandin. Hemû fikara min ew e ku pir kêmasî û çewtiyên xwe hebin jî, bêyî tarîfên min ên civakî û dîrokî wê pirsgirêkên roja me ya îro rast neyên tarîfkirin. Nexasma rabirdûya Rojhilata Navîn û felaketên di roja me ya îro de li herêmê diqewimin, girîngiya mijarê didin xuyakirin. Her kes hemfikir e ku teknolojiya herî dawî were bi karanîn, her cureyê şîdetê were ceribandin, bi hewldanên perwerde, siyasî, malî û aboriyê, wê nikaribin vê jiyanê ji hovîtiyê xilas bikin. Lê eşkere ye, divê hin gavên bi lez ên çareserkirinê werin avêtin. Ji ber vê yekê, hewldanên min ên ji bo çareserkirina kevneşopiyê bi

têgînên bingehîn pir girîng in, her çend li rexneyan vekirî bin. Ez pir bi xurtî yeqîn dikim ku heta kevneşopî neyê çareserkirin wê hewldanên rojane manîdar nebin û negihîjin encamên serketî.

Tam di vê nuqteyê de wexta ez Rojhilata Navîn û hemû paytextên wê tînim ber çavên xwe, lanetkirina Babîl a di Ehdî-Atîkê de tê bîra min. Dîsa lanetkirina hozanên Sumeran a Agadeyê û lanetkirina Xirîstiyanan a Romayê bi bîra mirov dikeve. Kî dikare îdîa bike ku Bexda, Quds, Mekke, Enqere, Stenbol, Kabîl, Tehran, Qahîre û Îslamabad Babîlên hemdem nînin? Bi rêbaz û têgihîştinên di ti pirtûkên hunerê şer û îqtîdarê de, nînin çawa gel xistin vê rewşê? Mirov dikare maneyekê bide rêbazên mirovxurên Efrîkayê, lê mirov heman maneyê nikare ji bo cinawirên despotîk ên Rojhilata Navîn bibîne ku gelên herêmê dane ber derbên îmhaya fizîkî û manewî. Zehmet e, mirov cografyayeke din mîna Rojhilata Navîn bibîne ku mirov ev çend bi rezîlî, xayînane û bêpîvan - li gorî xwe pir bi hostayî - lê têne kuştin.

Divê ez behsa pirsgirêkeke din a rêbazê bikim. Rahîbên hemdem ên Rojavayî - xebatkarên di warê wêje, felsefe, zanist û şaxên curbecur ên hunerê de - wexta behsa pêvajo û bûyerekê dikin, yekparebûna wê parçe dikin û welê lêdikolin. Wer bawer dikin ku heta mîna gewdeyekî parçe nekin, lêkolîn û lêgerîn nabe. Ev yek timî rahîbên Sumeran ên li ezmanan bi stêrkşinasiyê li rêbazên çareseriya çarenûsa mirovan digeriyan bi bîra min tîne. Li gorî min, yek çiqas ilmî û ya din jî çiqas mîtolojîk be, encam heman tişt e. Ez heta di wê baweriyê de me ku rahîbên me yên hemdem rezîltir in. Eger tu ew çend hosta û zanayî, çima tu maneyeke rast nadî îmhakirina mane û fizîka sedsala 20. ya ji hemû sedsalan mezintir? Çima tu çareseriyeke encamê bide, pêşkêş nakî? Pêvajo, bûyer û hebûnek bi awayekî yekpare neyê nirxandin, rast nayê tarîfkirin. Ji bo analîzê parçekirineke bê sînor, bi giranî rastiyê ji ber çavan dide wendakirin û astengiyan li pêşiya hînbûneke têkûz pêk tîne. Şêwazê pêkhatina mirovatiyê, neçar e cewherê xwe neguherîne û dewam bike.

Sîstema kapîtalîst a Rojava bi rêbazên parçekirin û guhertinê, şêwazê pêkhatinê xira kiriye. Ji ber vê yekê ye, sîstem a civaka krîzê ye. Felsefe, huner û zanist rewşa zêhniyeta mirov diyar dike. Zêhniyet û rûhiyet nayê parçekirin. Parçekirin dikuje. Li Rojava bi giranî mirov bi vî awayî têne kuştin û dixwazin vî şêwazî li gelemperiya cîhanê jî belav bikin. Aliyê herî girîng ê zanebûna mirov, vê yekparebûnê temsîl dike. Peyxembertî zanatiyeke pîroz bû ye. Hemû zehmetiya wan ji hêza wan a helwestê tê. Pêkhatineke

temsîlî û saziyeke civakî ya huner, felsefe û zanist danewerivandibe hinavên xwe rastiya xwe têk dibe. Ji ber ku xwedî têgihîştineke yekpare nîne, di encamê de dikare bi her awayî ji rê derkeve. Nezaniya herî xeter ew e ku bi zêhniyeteke yekalî - ya rastîn bi zêhniyeteke parçekirî - li pêvajo, bûyer û hebûnan dinere. Ji ber ku rastiyê dikuje. Nexweşiya serdem û sîstemê ev e. Mînak, nerîna bi ilmî tê wesifandin, divê wek şêweyê cehaletê yê herî vedizî were zanîn. Zanistiyeke mejiyê xwe yê hisî - zanistî di heman demê de mejiyê analîtîk ê bêkontrol e - ji dest daye, rûhiyeta wê nîne, deriyê wê ji her xeterê re vekirî ye. Mîna vegotineke kanserî be.

Pirsgirêk ew nîne ku tu pir bizanibî, ya girîng tu li gorî zanîna xwe karibî bijî. Eger zanebûn bi hemû aliyên xwe - zanist, felsefe, huner - wek zêhniyeta civakê yekpare were dewamkirin, ev cewherê hebûna civakî ye. Serdema me jî ev rastî hilweşandiye. Zanist ji ber vê pir hilweşînker e. Mînak, hilweşîneriya nukleerî îfadeyeke sembolîk a rastiyê ye. Mirov bombeya atomê li dijî xwe bi kar anî, ma ev çalakî ji ya mirovxuriyê hovtir nîne. Sosyolojî ku diviyabû vê parçebûnê asteng bike û yekparebûnê pêk bîne, berovajî ew bi xwe parçe dibe û dibe çavkaniyê rastîn ê xeterê. Di encamê de li gelemperiya cîhanê, li herêman şerên bêhejmar, her cure şîdet, netewparêzî û faşîstî ye. Ji lewra min di parêznameya xwe de zêhniyeteke dînî, mîtolojîk, felsefî, ilmî, bi wêjeyê di zikhev de bi aheng esas meşand. Parêznameyek derbarê cewherê mirov û gelan de jixwe li ser vî hîmî dibû. Parêznameyek çiqas karibe li hemberî paradigmaya şaristaniyê ya lê hatiye barkirin xwedî hêza ragirtin û çareseriyê be, hêz e.

1- Kokên Rojhilata Navîn ên xwe digihînin rewşa kaotîk rastiyek in. Bi dualîteya di navbera kokên şaristaniya hezarsalan û şaristaniya Ewrûpayê ya 200 salên dawî de, ne çareserî çaresernebûnê diafirîne. Şaristaniya Ewrûpayê sîstem ji bo hemû jeoçandan afirand ku karibin bi hev re bijîn, lê li jeoçanda Rojhilata Navîn bi ser neket. Pirsgirêk ji herêmîbûnê jî wêdetir tiştek e. Her çend pir were rexnekirin jî vegotina Huntîngton a "şerê şaristaniyan" bi hin aliyên xwe rast e. Şerê şaristaniyan heye. Lê ev, şerê şaristaniyan Îslam û Rojava nîne. Bûyer hînê berfirehtir û kûr e. Eger Îslam ji holê were rakirin jî wê hîmên şer hebûna xwe dewam bikin. Nemaze li Iraqê hemû xirabiyên ji Qutiya Pandora derketin nîşan didin ku hin tişt hînê di kûrahiyê de radizên. Analîzkarekî baş bala xwe bide bûyeran, wê bi hêsayî karibe bibîne û serwext bibe ku li çirava Iraqê ji çareseriyeke dîrokî heta ne ti encamê, mîna ku hemû fîgurên dîrokî û civakî bi awayekî hemdem

li ser navê çareseriyê derketine ser dikê. Tevî ku aliyên şer dikin, têne karîkaturîzekirin jî ew Seddam û Bush nînin; ew gelek sîstemên ketine zikhevdu. Sîstemên ji serdema Neolîtîk ve xwe pêk tînin û digihîjin heta îro bi rengên xwe yên cinsî, dînî û etnîk, hewl didin di împaratoriya kaosê ya bi pêşengiya DYE de ji xwe re yan cih bibînin, yan jî gavekê pêş de biavêjin.

Di şerên eskerî de mêzîn têne fêmkirin. Lê di şerê şaristaniyan de tespîta mêzînan bi xwe jî zehmet e. Naveroka şer tevlîhev e. Bi karanîna sîlehan bi sînor e. Bandorên diyarker ên bingehîn di hucreyên civakî, siyasî û zêhniyetê de diqewimin. Ev yek dikare bi sedsalan jî bajo û dewam bike. Ji restorasyonan bigirin heta guhertinên radîkal mumkîn e çareseriyên cuda pêk werin. Di hatina hemberî hevdu ya du sîsteman de divê faktura demê jî li ber çav were girtin. Her çend Rojhilata Navîn bi şaristaniya dawî ya Îslamîk li ber xwe bide jî ji sembolîkbûnê wêdetir nikare pêş de biçe. Îslamiyetê di navbera sedsalên 8.-12. de hilberandina xwe ya herî zêde kiriye. Yê paş ve mayî qalik e. Ji navê xwe yê berê wêdetir ti qîmeta wê nîne. Bi qasî ku neyê reformekirin li derveyî demê ma ye. Vejîna wê ya sî salên dawiyê jî qelp e. Ev vejîna wê ya li naverasta şaristaniya Rovaja, bi saya Rojava ye. Ti taybetî û xweseriya wê nîne. Li ser navê Îslamiyetê dijderketin tê wê maneyê ku ji serî ve têkçûn hatiye qebûlkirin. Afirandinên cewherî yên şaristaniya Ewrûpayê jî qelp û lihevçêkirîne, wê zêdetir pêş de nebin. Alîkariyên di warê aborî, siyasî û sosyalîteyê de ji çareseriyê zêdetir dixetimînin. Mîna şêwazê Îsraîlê mekanekî nabîne bikevê. Şêwazê Efrîkayê jî nabe. Çanda Efrîkayê dikare xwe bi xwe bigewixîne, lê tenê dikare hewl bide Ewrûpayê dawerivîne hivanên xwe. Aliyekî watedar an jî serketinê yê pevçûnê wê pir bi sînor bibe. Çîn, Hînd, Japonya û qadên Pasîfîk pir bi hostayî dikarin sîstemê veguhezînin û encamê bigirin. Ji ber ku çanda wan rê nade berxwedanê, zêdetir deriyên wan ji bo lihevkirinê vekirîne. Çanda Emerîka Latînî pênc sed sal e bi sîstemê re dijî, pir zehmet be jî dikarin afirîner bibin û bi ser bikevin. Çanda Rojhilata Navîn ji wan naşibe ti çandan. Ji rejîmên wan bigirin heta ferdiyeta wan, ji zêhniyeta wan bigirin heta avahiyên wan ên aborî yên nikarin dewam bikin, kaos di rojevê de ye.

Rewşa zêhniyeta Rojhilata Navîn îro tam germole û kêşmekêş e. Mîna şêwazê Rojava ji şoreşeke zêhnî pir dûr e. Pir seyr e, di nav şert û mercên xwe yên xweser de hewceyî bi Ronesans, reformasyon û rohnîbûnê nabîne. Lê li paş ve jî namîne ji bo bi karanîna berhemên wan ên herî bûne moda. Zêhniyeta qaşo ya xwe

dihesibîne, ji kokên wê yên dîrokî û pêşketina wê hîç xeberdar nîne û tiştekî fêm nake. Şîroveya dîrokê ji bo her komê ji pesindaneke hişkeber zêdetir ti maneya wê nîne. Li gorî zêhniyeta cemaetan dîrok, mirov pesnê xwe dide û yên dijber jî dijmin dihesibîne. Yê din, aliyê sêyemîn nîne. Hîç nafikire şîrove çiqasa objektîf e, yan jî çiqas sûbjektîf e. Di navbera qalibên zêhniyetê de tevî ku sentez nîne, hîn nebûye bi dualîteya tez-antîtezê bifikire. Paradigma wî nêzî reş û sipî ye. Di şûna têgihîştineke Ronesans û heta serdemên zindî yên neolîtîk û xwezayeke bi coş de, xwediyê dîtineke reşbîn, bêhêvî û xwezayeke qediyaye. Tevî ku di nertina wî ya civakê de utopya nîne, her weha ji kevneşopiya muhteşem a mîtolojîk, dînî û hêmanên zanebûnê jî bûye. Ne bi heyecan û hêvî nêzî pêş xwe û paş xwe dibe. Wextê wisa nebe jî afirandin nabe. Berhemên zêhniyetê yên felsefî, zanistî û hunerî zûha bûne. Zêde îdîaya wan nema ye. Atmosfereke rûhî heye ji dînkirinê wêdetir e û kêm nîne. Serbilindiya bi rabirdûyê û hêviya ji bo siberojê zû de têkçûye. Ji manedana jiyanê dûr e, ti çalakiyeke wî ya bi îdîa di jiyanê de nema ye. Daxwaza wî ya ji bo fêmkirinê sistok e. Bi hemû hêza xwe hewl dide roja tê de derbas bike. Di qada civakî ya berfireh de qabîleyeta wê nîne ji ehbabiyeke sûkî wêdetir têkiliyên xurt deyne. Hemû hêza wî ya partî û rêxistiniyê xwe dispêre eznavend im. Ji ber vê yekê jî pir fisek e, û nirxan têk dibe. Malbateke sembolîk stargeha wî ya dawî ye. Malbatiyeke maneya wê zû de qediyaye, di serê wan qadan de tê ku cihê herî jiyaneke paşverû ye. Hezkirineke wî ya xurt a însan û humanîzmê nîne. Tarîfa wî ya însan nîne ku jê hez bike. Netewparêziya wan a herî mezin bi berjewendîperestiyeke pir baş hatiye şidandin. Em bi kurtî dikarin bibêjin, ji cîhana zêhniyeta dîrokî ya Rojhilata Navîn pir tişt nema ye; xwe pir zêde ji bîrkirin, xwedîderketineke cahîlane, ji afirandinê bi tevahî bêpar, îluzyonên em nikarin bibêjin xeyal li dawiyê mane. Ji ber pozbilindiya xwe nikare zêhniyeta Ewrûpa û Rojhilata Dûr bi dest bixe. Jixwe hêza wî jî ji bo vê yekê tine ye.

Ev tarîfên zêhniyetê ku em hînê jî dikarin pêş de bibin, di kîjan bûyer û pêvajoyê de hebin bila hebin, encameke çareserî û rohnîbûnê nadin. Xetimandin di zêhniyetê de pêk hatiye. Wexta qalibên zêhniyetê yên wek netewparêzî, sosyalîzm û dîn bi vê zêhniyetê re dibin yek, taybetiyên xwe yên rastîn jî wenda dikin û dibin amûrên xetimandinê. Ev rewşa zêhniyetê di ti pirsgirêkê de nabe çareserî. Ji ber xwezaya wê, qabîliyet nîne bi zêhniyetên din re jî sentezê bike û lewma hînê paketên çareseriyê venebûne maneya xwe wenda kirine.

Ne dayîn û ne jî girtinê bi mane dike. Zêhniyeta li Ewrûpayê demekê ji "Dîntiyê re Pesin" rêz dikir jî nayê peydakirin. Di zêhniyeta Leyla û Mecnûn de qet nebe eşqeke çavê wê kor heye. Niha ji eşqeke çavê wê kor eser nemaye. Encam nîhîlîzm e, întîharkirin e. Di hebûna însan de qonaxa dawî ya mane lê namîne. Jê wêdetir her cure çavsorî û velîstin e. Jixwe wisa dibe jî. Li ser cografya ji Afganîstanê heta Fasê çavsorî û velîstinên dibin li kîjan devera cîhanê têne dîtin û heta çi wextê diqewimin? Eger rewşa li naverastê bi têgînên teng ên aborî, siyasî û eskerî bêne îzahkirin wê kêm bimîne. Nexweşî di zêhniyetê de ye. Gerek şerekî xurt ê maneyê were meşandin. Li Rojhilata Navîn wek pirî caran mînakên wan hatine dîtin hewceyî bi Mewlantî, Manîtî û Îşraqtiya hemdem heye. Di vir de jî terîqetiya sexte ew çend di warê zêhniyetê de nexweş e, eger li dawiyê neyê hîştin wê ti nirxên bi rûmet ên dîrokê nikaribin hêzê bidin. Zêhniyetên din ên serdemê ku bi xwe di nav krîzekê de ne, gelo wê karibin çi alîkariyê bikin? Tam ji ber van sedeman, divê mirov mane û girîngiya şerê zêhniyetê bizanibe û hewldanê di vî warî de wek wezîfeyeke rojane bibîne.

Eşkere ye, ji bo bi awayekî serketî zêhniyet rohnî bibe, wek şertên pêş hewceyî bi têgihîştineke giştî cewherî ya dîrokê, ilmên hemdem û xwegîhandina asoya felsefeyê heye. Rojhilata Navîn bêyî ku zanist û felsefeya Rojava dawerivîne hinavên xwe, nikare bi dîrokê re bigihîne hevdu û sentez bike. Ev karekî welê nîne bi Îslamtî, Bûdatiyê bimeşe. Ez di parêznameya xwe de, di asta pêşnûmeyê de be jî bi zêhniyeta Rojava re dikevim nav şerekî kor nîne. Min pir bi durustî û ji dil hewlda xwe bigihînimê. Ji bo min mumkîn xuya nake ez bi zêhniyeta Rojava têr bibim. Gelek lawazî û qelsiyên wê di warê moralê de hene. Lê zanebûneke wê ya zanistî ya awarte kûr heye. Ez herî zêde di vî warî de hesûdiya qabîliyeta serketina wan dikim. Ez ji bo vê yekê hurmet dikim. Tevî vê yekê, ez bawer dikim ku kêmanî û nexweşiyeke pir mezin çavkaniya xwe ji vê deverê werdigire. Ez di wê baweriyê de me, ji alî moral û etîk ji rahîbekî hemdem wêdetir xwedî nirxekî nînin. Ez yeqîn nakim ku vê lawazî û zeîfiya xwe ji holê rakin. Mirov dibizdînin, mîna ku xweza û civakê bixwin bê eman nêzîk dibin. Bi qasî zanebûnê diviyabû nirxên wê yên etîk jî biafirandana. Bê etîk hîştina sîstemê çawa li wîjdanê wan rûnişt, çawa di zîhna wan a rewşenbîr de bi cih bû? Kê û çawa ew bê tesîr kirin? Belkî jî ji zû ve îqtîdarê ew kirîne. Çîna ilim ji karkeran zêdetir xirab patronaj e, hewce ye. Sedemê bêhêvîbûna min ev e. Lê di dema Ronesansê de çi têkoşerên no û

jêhatîbûn. Em Gîordano Brûno çiqas dikarin bixin rewşa rojane? Em dîsa dikarin deng bidin Sokrates? Kes nikare îdîa bike ku ev zêhniyeta mezin ji dest hatiye dayîn. Divê ev zêhniyet ji dest neyên berdan û werin vejandin. Pêwîst e yên wek Mewlana, Xellacê Mansûr, Manî û Suhreverdî jî werin vejandin. Divê mirov ruhên peyxemberwarî û cewherên wan jî hemdem bike. Pêwîst e mirov wer bizanibe ku ew nemirine û bi temsîlên wan ên rastîn bide jiyîn. Ev xelek dikarin me nêzî zêhniyeta rojane bikin. Ez dikarim nirxên me yên nijadan cuda bikim. Lê vejandina yên xirab têkçûne wê tesîreke afirîner neke.

Ez lê hayil bûme, wexta mirov gelekî, gelê Kurd, di şexsê wî de hemû gelên Rojhilata Navîn biparêze, hêza herî mezin, hêza nû yan jî hêza veguherîner e. Ez baş fêm dikim ku mirov xwe biavêje vê hêzê yan jî wê hêzê, wê rewşa neçar wek heye dewam bike. Di vê çarçoveyê de ez serwext im ku her alîkariyê lawazî û qelsiyê xwedî bike û wê hêz nede. Wexta tu lavahiyê li ti meleka xilasker neke belkî tu karibî zîhna xwe pêş de bixînî. Tenê mayîn, eger tu karibî rabigirî û serî pê re derbixînî, dikare te bigihîne zêhniyetê ku pêdiviya serdemê ye. Sîstema dunyayê hemû, li ser zemîna Rojhilata Navîn giraniya xwe da ser min. Bi zanebûn, an jî xweber bû hîç girîng nîne. Lê eger NATO hêza herî mezin a eskerî ya sîstemê be, bi DYE, Îngilîstan û Îsraîlê re bi awayekî herî hîlekar û Yewnanistanê bi xwe di vê tenêbûna min a xeternak û mezin de bi zanebûn cih girtibin, ya divê ez jî bikim şerê moral û zîhîn ê herî mezin e. Şerekî wan jî karibe bi ser xwe ve bîne, belkî şerekî rastîn ê li Rojhilata Navîn hatiye destpêkirin dawiya wî bi serketinê bîne.

Li Rojhilata Navîn, îqtîdara dewletê hem pêşî li zêhniyetê girtiye, hem rê nade însiyatîfa sivîl a civakê. Bi vê karektera xwe tam kelem û asteng e. Tarîfa wê ya dîrokî roja me ya îro jî rohnî dike. Her çend hewl bide karektera xwe ya despotîk bi cîlayên hemdem netewparêzî, komargerî û sosyalîzmê veşêre jî dîsa pir naguhere. Sekin û hebûna wê ya du sed salên dawiyê ji hêza wê bi xwe nîne. Xwe li hev rakişandina navxweyî ya Rojava di vê yekê de roleke bingehîn dilîze. Di sedsala bîstan de jî di ceribandinên Sowyet û faşîzmê de li ser hesabên mêzînan hebûna xwe dewam kir. Ya esas, li dunyayê blokên îqtîdarê yên bingehîn ketine nav mêzînên herî şikestî. Gotina dewletên asî û serserî ji vê yekê tê. Piştî ku Sowyet ji hev de ket, di şûna şikestinê de îqtîdarên mîna çiyayên bûz ên li nava okyanûsê kil dibin cihê xwe ji hukûmetên blok re hîştin. Bi vê rewşa xwe xeter in. Di şeran de aliyê wenda dike û aliyê bi ser dikeve

dikarin li mêzîneke nû çareseriyê bibînin. Îqtîdara li Rojhilata Navîn mîna hunerekî îqtîdarê be, deriyên xwe li çareseriyê digire. Belkî jî vê yekê li ser navê berjewendiyên herî despotîk dike. Lê dîsa jî bi gotinên wek "ji bo berjewendiyên mezin ên netewî", "ji bo yekparebûn û yekîtiya welat û dewletê", "ji bo bexteweriya civakê" ser rastiyê dinuxumîne. Gel neçar bûye, welat xira bûye; civak û netew ji bexteweriyê dûr ketine; hîç xema wan nîne. Di siyasetê de rêbaza herî bi tesîr demagojî ye. Li ser navê demokrasiyê rêbazên herî hûrûkûr ên populîzmê pêş de birine. Bi derewên mezin veşartina karûbarên rastîn ên dewletê, wek hostatî û hunerekî polîtîk dizanin. Gel mîna gogapê ji vir diavêjin wî alî û vî alî; vê yekê jî wek rêveberiyeke bi bandor dihesibînin.

Ji bo pirsgirêkên girîng ên civakî, siyaset hunerê çareseriyê ye. Lê di rastiya Rojhilata Navîn de siyaset rojane bûye hostatiya xetimandin û astengkirinê. Di asta siyaseta muhafezekar de jî nîne. Faşîzm li gorî şert û mercên xwe wek çareserî tê. Li Rojhilata Navîn ji faşîzmê jî wêdetir mirov dikare behsa şêweyên kevin ên arkaîk bike. Bê şensî ew e, ku wê tam hilweşiyana, diviyabû hilweşiyana, hesabên li ser mêzînan bîla sedem du sed salî temenê wê dirêj kirin. Wexta li vê rastiyê teknolojiya hemdem a eskerî jî zêde bû, Levîathanekî rastîn derket holê.

Di bingehê dewletê de teokrasî heye. Di ti demê de ji vê yekê negeriyaye. Dewleta teokratîk ji şekil wêdetir di cewher de heye. Di vê saziyê de ku li dora perestgehên rahîban mezin bû, pêwîst e mirov karibe havênê cewherê wê yê îdeolojîk bibîne. Eger tu nikaribe bide bawerkirin, tu nikarî bi darê zorê bi hezaran kesî-ê demeke dirêj bixînî xizmeta perestgehê. Ji ber vê, hewce ye, dewlet pîroz û îlahî be. Çi mîtolojîk, çi jî baweriya dînî be, eger xwe nespêre zêhniyeta serdest û rewa nebe, avahiya dewletê têkûz û temendirêj nabe. Qebîleyên Îbraniyan ku di pêkhatina dînên yek xwedayî de roleke mezin lîstin, xwestin bibin otorîte. Tevî ku li her du aliyên wan dewletên mezin ên wek Misr û Sumeran radiwestiyan, yek ji fikara bingehîn a Ehdî Atîk - Pirtûka Pîroz - hewcebûna bi dewleteke cuda ye. Mîna hîmê îdeolojîk ê Qraliyeta Îbraniyan be. Nemaze di beşên Samûel-1 û Samûel-2 de mîna manîfestoya damezrandina - xweda dewlet - dewleta Yahûda be. Di bingehê împaratoriya Pers-Med de Zerduştî xwedî roleke diyarker e. Xirîstiyantî piştî Romayê li hemû dewletên Ewrûpayê genekî hevpar e. Dewleta Îslamê bi derketina xwe re dîn bi xwe ye. Hemû dewletên Îslamê yên serdema navîn, bibe nebe xwe dewletên dînî hesibandine. Îslama Şîa ya ket dewsa

Zerduştiyê hînê jî îdeolojiya fermî ya dewletê ye. Li hemû welatên Ereb dînê dewletê, îdeolojiya fermî Îslam e. Komara Tirkiyê ku xwe laîk îlan dike di Diyanetê de - îdeolojiya Îslamê ya sunnî fermî - xwediyê kadroyek herî berfireh e. Îslam dînê dewletê yê fermî ye. Pakîstan û Afganîstan dewletên fermî yên Îslamê ne. Îsraîl dewleteke dînî ye.

Ji bo dewletek laîk bibe, divê şoreşeke mezin a bi kok bike. Naxwe îdeaya dewleta laîk wê bibe utopîk an jî mirov dikare behsa dewletên dînî yên nuxumandî û vekirî bike. Kengî dewlet zelal bû xuya kir, ji saziyeke ewlekariya giştî bû saziyeke bi kêr, wê karibe xwe ji benên dînî yên xwe lê badane xilas bike û bigihîne rewşeke laîk.

Bi awayekî, di ti rejîmên hemdem de nehatiye dîtin, civakê dikin dewlet. Li dijî civakê dewlet çiqas were mezinkirin, ew çend jî xwe bi hêz dihesibîne. Hêza xwe, garantiya xwe di dewleta totalîter de dibîne. Ji dewletê sifetên kevneşop ên wek pîroz, dayik, bav nayên kêmkirin. "Kî ji dewletê bixwe" bûye gotineke klasîk. Dewlet berê ji gel didize, paşê mîna bide parsekan xwe wek welînîmet pêşkêş dike. Ji dizekê herî dizek bi tehlûke dibe. Bi rêya dewletê xirabiya neyê kirin nîne. Îro roj Levîathanê rastîn dewlet e. Em wexta wer dibêjin sedemên me pir in. Aliyê dilê mirov diêşîne ew e, ku ev dewlet ji bo gel deriyê xwarin, vexwarin û kar e. Ji dewleta ku her tiştî dadiqurtîne, xizmet û hêvî têne kirin.

Dewleta Rojhilata Navîn heta çareser nebe, ti pirsgirêka civakî û aborî çareser nabe. Ev dewleta em behsê dikin, ne mîna dewleta Rojava hestiyariyeke wê ya demokratîk heye, ne jî dikare wek dewleta faşîst vekirî be; çavkaniya hemû pirsgirêkan e. Şert e, ji nû ve were avakirin. Wek pirî caran tê ziman, çareseriya xwe dispêre "unîter, herêmî, federe" çareserî nînin. Divê dewlet ji bo çareseriyê berpirsiyariyê his bike. Pêwîst e, herî kêm di azadkirina ferd û demokratîzekirina civakê de ji astengbûnê were derxistin. Divê ne tenê piçûk bibe, divê fonksiyonel jî bibe. Ji bilî karên rastîn ên gelemperiyê û ewlekariya giştî ya rasyonel, divê ji hemû sazî û rêzikan were kirin. Heta dewlet li ser van hîman neyê reformekirin, gavên di warê çareseriyê de werin avêtin, bi sedema dewleta cangiran wê her pirsgirêkê hînê jî bixetime.

Em ji her demê zêdetir bi îqtîdareke dewletê ya dijwar re rûbirû ne. Emê mîna sosyal demokrat, rizgariya netewî û sosyalîzma reel ên di dîroka nêz de nekevin nexweşiya wan a dewletê; emê ne xira bikin a nû damezrînin, ne jî dewletê zevt bikin. Emê bi vî awayî xwe

nexapînin, emê wek wezîfeyeke bingehîn bi pîvaneke demokratîk derfetên çareserî û lihevkirinê biafirînin. Divê di hedefa hemû çalakiyên polîtîk de ev wezîfe hebe.

Li Rojhilata Navîn hemû hucreyên civakê di nav krîzeke dijwar de ne. Malbat, eşîr, bajar, gundî, bêkar, cemaetên dînî, rewşenbîr, tendurustî û di serî de perwerdeya girseyê saziyên civakî dema xwe ya herî nîhîlîst û bi krîz dijîn. Gewdeyê civakî yê bi îdeolojiya jor a serdest û îqtîdarê dor lê hatiye girtin û bi aboriyeke hîç têrê nake hatiye tengavkirin mîna nexweşê qelew-obez e. Jixwe ev obeztî ya rastîn mîna li DYE û YE nîne. Ev obeztî dişibe zarokê Efrîkî yê zikê wî bi pêş ve nepixiye. Di van hucre û saziyên civakî de mirovan fonksiyona xwe wenda kirine. Roleke watedar a saziyan nemaye. Bi serê xwe tenê, qahwexane û çayxane dikarin vê rastiyê bînin ziman. Saziyên diviyabû di sosyalîteya mirov de rol bilîstina bûne mîna dafikên nêçîrê. Sosyalîte û tendurustiya nîne hînê ber bi dejenerebûnê û krîzê ve dibe. Arabesk hunerek e, vê rastiyê nîşan dide. Hucreyên civakî yên ji der ve tên bi kalîte nînin. Li dijî êrîşan ti mekanîzmaya xweparastinê nehatiye pêşxistin. Ji bo vê yekê, xwe bi moral û zêhniyeta ku pêdivî pê heye amade nekiriye. Avahiyên civakî ji ber ku ji aliyê avahiyên siyasî ve têne diyarkirin, refleksên şoreşa civakî bi giranî kor bûne. Tevgereke civakî ya xweber ku xwe nespêre dewlet û siyaseta demagojîk, pir nadîde dibe. Sosyalîte ji bilî lêdana zirna dewletê bi kêr nayê; ji ber ku welê hatiye hînkirin. Prensîb ev e; "aborî tengav dike, dewlet dide peyivandin." Li ser hîmên berjewendiyên civakê, hewldanên çareserî û lêgerîna civaka sivîl pir bi sînor in.

Trajediya civakî ya bi bêrehmiya siyasî û neçariyê diyar dibe, herî zêde em dikarin di rastiya jinê de bibînin. Wek êsîra kevneşopiya hiyarerşî û dewleta pênc hezar salî, di roja me ya îro de ji jinbûnê zehmetir mirov nikare jiyanekê bifikire. Zehmetî ne tenê ji kevneşopiyê ye. Nirxên jinê yên şaristaniya Ewrûpayê afirandine herî kêm bi qasî kenveşopiyên dogmatîk texrîbkar in. Jin di navbera çanda ku gihîştiye pornoyê û çanda çarşefa reş de, matmayî sekinîye.

Jina Rojhilata Navînî ji dewletê jî kevintir fîgureke lihevçêkirî ye. Hemû fazîletên jinbûnê hatine berovajîkirin. Çi tişta wê ya hêjayî şanazî û parvekirinê hebe, di bin tehekuma qanûnên exlaqî de ye. Jina kevneşopiya dînî, ew ji ewbûnê derxistiye û kiriye mulkê herî hêja yê mêr, tenê wezîfeyeke wê ya girîng heye, ew jî bi awayekî mutleq divê li gorî daxwazên mêrê xwe biçe. Ji bo dewletê împarator çi be, bi giştî mêr û bi taybetî jî zilam ji bo jinê heman tişt e. Di

ferhenga mêrtiyê de gotinên wek "biryar bi jinê re girtin" şerm e. Ji bo jinê mezinbûneke exlaqî û fazîletek e, bêpîvan û bêsînor bi zilamê xwe ve girêdayî be. Nikare bi awayekî azad bîne ziman ku ew jî xwedî ruh û bedenekê ye. Ji aliyê hucreyên civakî, siyasî û aborî ve wer li der ve hatiye hîştin û qelskirin, bi çarçavan li mêrekî digere ji bo wek koleyan pê re dilsoz be. Ji mirin û kuştinê xirabtir lê hatiye kirin. Ji ber ku hemcinsên wê jî mîna wê ne, bi rastî yên wan fêm bikin û ji bo jiyaneke însanî hêvî bidin, hema bêje nînin. Ev dorgirtina çandî timî jinê neçarî teslîmiyetê dike. Her çiqas li ber xwe bide jî, eger întîharê nefikire, ji sedî sed dişikê. Pişt re hemû qulpên jintiyê yên piçûk dixînin bi xwe ve dike. Ji van qulpan li her devera xwe dixîne mîna îşaretan. Ya rastî jintî zenaet û pîşeyekî pir zehmet e. Pêvajoya bakîretiyê mîna li ser sifra gurên birçî derbas dibe, pêvajoya dayiktiyê bi anîna gelek zarokan bi êş û azarên bêhesab tijî dibe. Mezinkirina her zarokekî dibe mîna êşkenceyek rastîn. Her weha dunyayeke hêvî nade, xeyalên dayik ji bo zarokê xwe datîne timî hildiweşîne. æş li êşan zêde dibe. Statuya civakî ya jinê li Rojhilata Navîn di serê kiryarên zalimane de tê. Koletiya mîna ya gelan berê li ser jinê tê ceribandin.

Rastiya jinê bi giranî rastiya civakî destnîşan dike. Ev tespîteke rast e. Di civaka Rojhilata Navîn de jintî û mêrtiya zêde dualîteyeke diyalektîk e. Di şêwazê vê têkiliyê de taybetiyên li zilam vedigerin mêrtiyeke hundurê wê pûç e. Serweriya îqtîdar li ser mêr dike, mêr jî li ser jinê û ew jî li ser zarokan dike. Bi vî awayî serwerî ji jor heta jêr tê dawerivandin. Di vê mekanîzmayê de asta koletiya jinê rê li ber rewşeke neyînî vedike. Ji ber pozîsyona jinê ya di nav civakê de jin timî asta koletiyê ya civakê pêş de dibe. Bi vî awayî, civaka dibe mîna pîrekê, îqtîdara jor gem û qayişên wê dişidîne û bi hêsayî rêve dibe. Tevî ku jin li derveyî îradeya xwe zilma herî mezin dibîne, ji bo zilmeke hînê zêdetir li ser civakê tê bi kar anîn. Bi qasî têkiliyên ji der ve teslîmiyetê li ser Rojhilata Navîn ferz dikin, têkiliyên ji hundur ve jî jinê tengav dikin. Ji lewra tevgera xwe nespêre çalakiya azadiyê ya jinê şensê wê pir bi sînore ji bo karibe azadiyeke mayînde û cewherî bigihîne civakê. Bi vê sedemê, di serî de îqtîdarê, sosyalîzm, rizgariyên netewî û hwd. nekarîn bersivê bidin hesret û hêviyên her kes li bendê bû. Xebata azadiyê ya jinê, ji wekheviya cinsan jî wêdetir, cewherê xebateke giştî ya demokratîk, mafê mirovan, hawîrdor û wekheviya civakê îfade dike.

Gava yekemîn a divê di warê azadiya jinê de were avêtin ew e ku jin bibe xwediyê hêza çalakiya xwe û ji helwesta mulkiyetê ya li

ser, dûr bisekine. Eşqên moda yên bi hisên mulkiyetê tijî di himbêza xwe de gelek xeteran dihewînin. Di civaka kevneşop a dewlet û hiyarerşiyê de eşq xapandina herî mezin e. Gunehê tê kirin bi eşqê tê nuxumandin û veşartin. Destek ji bo azadiya jinê û hurmeta ji bo wê, beriya her tiştî bi mikur hatina li rastiyê û paşê jî ji bo ew rastî li dawiyê were hîştin, bi tevgereke ji dil û samîmî dibe. Kesê serweriya xwe ya mêrtiyê - navê wê çi dibe bila bibe - li ser jinê bijî ji wî nirxekî têkûz ê azadiyê nabe. Hewldanên ji bo xurtkirina jinê ji aliyê bedenî, derûnî û zêhnî ve, bawer dikim ji hewldanên herî hêja yên şoreşgerî ne. Jina ku di çanda Rojhilata Navîn de çaxekê ji çanda xwedawendên dayik re bû navend, hewceyî pê heye ji nû ve, bi nirxên civakî yên pêşketî re karibe biryarên serbixwe bide, bigihîje hêza tercîh û hilbijartinê. Alîkariya wê ya di vî warî de qehremaniyeke rastîn a azadiyê dixwaze.

Rastiya aboriyê di nav statuyên civakî, îqtîdar û zêhniyetê de cihê wê temamkirina yekparebûna civakî ye. Ekonomiya lîberal cihê wê di nav kevneşopî û aktualîteyê de nîne. Monopola herî mezin dewlet e û derfet dide ji bo ekonomiyê bi îqtîdarê re bimeşîne. Di şaristaniya Rojava de qismî be jî ekonomî îqtîdarê diyar dike, lê li Rojhilata Navîn ê ekonomiyê diyar dike îqtîdar e. Qanûnên xweser ên aboriyê ku behsa hebûna wan tê kirin, di jeoçanda herêmê de rola xwe nînin. Li aliyekî aboriya malbat û malbatên piçûk ên ji serdema neolîtîk mane, li aliyê din jî ekonomiya dewletê heye. Di navberê de bazirgan û esnafên hewceyî dewletê hene. Çîna navîn, şensê xwe bi sînor e, ji bo karibe bi hêza xwe ya ekonomîk bandorê li dewletê û polîtîkayên wê bike. Lê ji ber ku çavkaniyê rêveberiyê ye, dewlet bêyî wê nameşe. Eger dewleta li Rojhilata Navîn mîna modela Rojava ji nû ve were avakirin, wê bandora wê di ekonomiyê de bişkê. Ev rastiya di warê aboriyê de tevahiya dîrokê têgîna dewleta bazirgan rave dike. Gelek şer li ser rêyên bazirganiyê pêk hatine, wexta rêyên bazirganiyê hatine birrîn hilweşiyane û ev karekterê wê yê ekonomîk îfade dike. Dewleta Rojava pêşketina xwe bi komkirina sermayê û pîşesaziyê pêk tîne. Dewleta Rojhilat jî bi bazirganî, desteserkirin û kurtêlxuriyê xwe dimeşîne. Li şûna ku xwe bispêre sermaya komkirî û pîşesaziyê, nirxên berhev kirine ji bo meşandina dewletê bi kar tîne. Heta her tiştê civakê yê xwe dihesibîne; çavkaniyên binerd û sererd, welat, mirovên li ser erdê welat, wek mulkê xwe dibîne û hewl dide bifiroşe. Ev qurnaziyeke polîtîk a kevine. Dişibe şêwazê parvekirina dizekan.

Di çarçoveya van tarîfan de em dikarin bibêjin, eger ku statukoyên di civakê de heyîn çareser bibin, wê aboriya li Rojhilata Navîn pêş bikeve. Bi avahiyên dewleta heyî re mumkîn e xuya nake ku karibe bi ekonomiya global re bibe yek. Ekonomiya nîzama tam di rewşeke krîz-kaosê de ye, êdî bi rewşa xwe ya heyî nikare civaka ji hev de dikeve rawestîne. Jixwe ji bo rawestina vê jihevketinê, hewceyî bi rêbazên despot ên tund tê dîtin.

Sîstema Rojava bi van sedeman despotîzm demeke dirêj destek kir, nemaze ji bo pareke mezin ji dewlemendiyên petrolê bistîne û ji bo tevgerên sîstemê bixin zehmetiyê asteng bike. Lê di roja me ya îro de ev rêbaz ji karê zêdetir zirarê tîne. Girseyên gel gelek xizan kirine û hêza wan a daxwazê qels kiriye. Bi vî awayî sedemên hebûna xwe jî bê kêr kirine. Bûyerên li dora rejîma Iraqê diqewimin vê mekanîzmayê baş rave dikin. Kontrolkirina girseyên gel ên ji hêza daxwezê ketîn zehmet dibe û dewleta despotîk jî dikeve rewşekê ku li pêşiya sîstema global dibe asteng. Ji her du aliyan ve tengavbûn, bingehê maddî yê Projeya Rojhilata Navîn a Mezin e, ku ketiye rojevê.

Bi kurtî di Rojhilata Navîn a îro de statukoyên heyîn ketine rewşekê êdî nikarin dewam bikin. Ji polîtîkayên mêzînê yên Elmanya faşîst û Sowyeta Rûsyayê sûd wergirt û karîbû sedsalekî din temenê xwe dirêj bike. Hilweşîna her du sîsteman polîtîkayeke nû ya mêzînê bi sînor kiriye. Dualîteyên mîna DYE-YE, DYE-Çîn di wê astê de ne ku rê nedin lîstikên nû yê mêzînan. Di van demên dawiyê de bi heman sedeman piştgiriya Tirkiyê ku dixwaze serkêşiya wê bike, xwedî potansiyela pêşketinê nîne. Blokên îqtîdarê yên bi awayekî rastîn neyên qebûlkirin û bi ser sîstemê ve nebin, di dunya me ya îro de herêmeke bi qasî dînamîk e, wê xeterê jî derbixînin holê. Blokên îqtîdarê yên derfet nadin azadbûna ferd û demokratîkbûna civakê, wê ji aliyê sîstema global a serdest ve neyên qebûlkirin. Bloka ku DYE serkêşiya wê dike û serê împaratoriya kaosê DYE, mîna ketibe şerên cîhanê yê yekemîn û duyemîn, bi dagirkirina Iraq û Afganistanê bi awayekî şerê cîhanê yê sêyemîn dimeşînin. Wexta NATO ber û rê dide herêmê, hêzên girîng ên wek Rûsya, Çîn û Hîndîstan têne nutralîzekirin. Bi Projeya Rojhilata Navîn a Mezin, daxwaz, derketina ji kaosê û çareserî ye. Li hemberî vê yekê, gel jî dikarin alternatîfên xwe yên demokratîk û azad-wekhev bixin rojevê.

Eşkere ye, em di dema kaosê re derbas dibin. Di şerên cîhanê yê yekemîn û duyemîn de jî mîna vê, pêvajo qewimîbûn. Di şerê

yekemîn de Yekîtiya Sowyetê û di şerê duyemîn de jî Elmanya faşîst di derketina kaosê de rê li ber pêkhatina blokên îqtîdarê yên bê mêzîn vekirin. Hemû dewletên ku ji bermahiyên du împaratoriyên mezin - Osmanî û Îran - pêk hatin, ne dikarîn sîstema Sowyetê, ne jî dikarîn sîstema klasîk a Rojava qebûl bikin. Ji mêzînên hêzan ên di navbera sîsteman de karîbûn sûd werbigirin û heta salên 1990'î bên. Piştî ku Sowyet ji hev de ket, mêzînên têkçûn parçeyên îqtîdarê hînê serserî kirin. Bi sîstema global a serdest a nû re bi vî awayî nedimeşiya. Ji ber vê DYE bi koalîsyonekê ket herêmê. Rewşa krîzê ya parçeyî ya sîstemê tam di asta kaosê de ye. Li gorî şert û mercên xweser şibandina rewşê ya şerê cîhanê yê sêyemîn mirov nikare ji nedîtî ve were. Ya esas, koalîsyona hesabên di şerê cîhanê yê yekemîn û duyemîn de neqediyane pêk hatiye. Li gorî mantiqê globalîzmê nîne ji nû ve rejîmên despotîk bixîne rojevê. Sîstem ne blokên dewletan, neçar e guh bide girseyên gelan ên xwedî daxwaz in. Ev jî ji dewlemendiyan û demokrasiyê pardayînê hewce dike.

Gelo dibe ku emperyalîzm bikeve qonaxeke nû? Gelo slogana emperyalîzma demokratîk - li gorî pîvanên sîstemê - çiqas rastîn e? Alternatîfên din mumkîn in? Divê mirov ji têgînên Îslama nermik, modela Tirkiyê çi fêm bike? Modelên demokratîk ên Rojavayî çiqas dibe li herêmê bi cih werin anîn?

Tevî vê yekê, piçûk be jî demokrasiya civakî ya global a bi Porto Allegre deng vedide, gelo ji bo herêmê dibe ku were çi maneyê? Mirov dikare Federasyonbûyîna Demokratîk a Rojhilata Navîn wek utopyayeke rastîn bihûne? Federasyona Iraqê ya Demokratîk dibe ku bibe prototîpa vê yekê? Ji bo vê, di van demên dîrokê de gelek kar dikeve ser milê ilmê civakî û exlaqê. Sosyolojiyeke biwêre zanista xwe bi xwe biafirîne û ji bin destê zanîna îqtîdarê derketibe, di derketina ji kaosê û pêşkêşkirina çareseriyan de cihê wê girîng e. Ji bo civakeke hînê demokratîk, ekolojîk û azadiya cinsan dixwaze, beriya her tiştî hewceyî bi avakirineke nû ya sosyolojiyê heye. Ya em dikin jî ji bo vî karê bi heyecan û bi şeref, pêşnûmeyek e.

2- Eger bi rastî wê 11 Îlonê 2001 wek destpêkirina demeke nû were nirxandin, divê ev ne wek destpêkirina şerê cîhanê yê sêyemîn, piştî şerê sar wek qonaxeke stratejîk a şerê - em jê re bibêjin şerê postmodern - dest pê kir were nirxandin. Di vê de komployê çiqas rol lîst? Gelo provakasyoneke sîstema global bû? Li hemberî bûyerên objektîf diqewimin bersivên werin dayîn wê di asta detayan de bimînin. Gelek mutefekîr, derdor û hêzên siyasî gavavêtina DYE bêmane dîtin, li derveyî huqûqa navneteweyî nirxandin û li dijî etîkê

qebûl kirin. Nerazîbûnên xwe nîşan dan. Tevî hemû astengiyan hêza fermanbar a sîstemê pêngava xwe di asta stratejîk de nîşan da.

Li gorî analîzên me yên civakî û dîrokî ku me heta niha kirin, di vê kaosê de tevgera DYE wek împaratoriyeke rastîn dibîne. Hûn dikarin wê li derveyî exlaq û huqûqê bibînin, lê ev rastiyê naguherîne. Di vê demê de, di serî de netew-dewletên komarger ên YE gelek netew-dewlet di nav fikarên kûr de ne. Dibe ku di fikarên xwe de mafdar bin. Lê realîst û rastîn nînin. Împaratorbûyîn û globalîzebûyîna sîsteman ta ji dewleta Sargonê Akadî ve dewam dike. Bi sed xelekên lê zêdebûn, herî dawî Îngilîstan û Sowyetê hema bêje bêyî şer radestî DYE kirin û li cîhanê împaratorî kirin yekserî. Ma mirov dikare ji vê lome bike? Mirov dikare kûrbûna krîza sêyemîn pêngava global a kapîtalîzmê guftûgo bike. Mirov dikare taybetiyên kaotîk rêz bike. Ev hemû hewcebûna pêvajoyê bi şêwazeke rêveberiya împaratoriyê piştrast dikin. Bi israr tê destnîşankirin ku li her cihê şaristanî hebe, dewlet valatiyê nas nakin, siyaset ji valatiyê nexweş e. Ji lewra sîstemeke mîna DYE ku şoreşa herî dawî ya zanist û teknîkê daye pişta xwe, di vî warî de pêşengiya xwe daye qebûlkirin; hêzeke dêw a eskerî û aborî pêk aniye; wê pir bi awayekî xwezayî belavbûna xwe ya li cîhanê dewam bike. Xwezaya dewlet û siyasetê vê yekê ferz dike. Wexta mirov vê dibêje nayê wê maneyê ku ew mafdar e.

Eger dîsa mirov bibêje serdema netew-dewletan li dawiyê ma, nayê wê maneyê ku mirov emperyalîzma global erê dike. Rastiya siyasî, esker û aboriya global vê modelê êdî bi kêr nabîne û wek hejikên li lingên xwe geriyane dibîne. Netew-dewlet berovajî vegotina netewparêzan, dewleteke tam serxwebûna xwe pêk neaniye. Jixwe di cîhana bûyeran de têgîneke tam serbixwe nîne. Di nav kategoriya gerdûnî de hewcebûn û girêdana bi hevdu heye. Ti obje û kirdar nîne ku hewce û bi ya din ve girêdayî nebin. Netew-dewlet utopyayeke bûrjûwa-piçûk e, ji bo serxwebûnê bike tabû. Ne dewlet û ne jî netew serxwebûna wan pêk nehatiye. Her yek ji wan bi ya din bi taybetiyên cuda hewce û girêdayî ye. Ya Împaratoriya DYE ferz dike cureyekî hewcebûnê yê herî tenik e. Rêbazên mîna mêtingeriya tund, qirkirina etnîk û dîndariyeke paşverû esas nabîne. Ji mêtingeriya hemdem jî wêdetir şêweyên hewcebûnê yên postmodern diceribîne. Jixwe gelek netew-dewlet ji ber karektera xwe, hewcebûna bi DYE wek xelatgirtinekê dihesibînin. Netew-dewlet ji holê nayê rakirin, lê wek berê destûr nayê dayîn bi awayekî serserî tevbigere. Di dema globalîzma nû de wê netew-dewlet ji nû ve werin

bi cihkirin. Ji YE heta Çînê ev pêvajo dewam dike. Ev ji bo şerekî nû nayê kirin, ev ji bo şerê heyî bi dawî bibe û yan jî ji bo sîstem bikeve cihokeke sûdwar. Hewce bike wê carnan bi aboriyê, carnan bi rêyên leşkerî, rêveberiya sîstema kaosê ya rewşa wê heyî biparêze yan paşvemayîna wê rawestîne, yan jî bi saziyên hînê bi kêrtir rê ve bibe. Bi planên xwe yên alternatîf ên pê ji kaosê xurt derketiye realîze bike. Em wexta di vê çarçoveyê de nêzî rastiya Rojhilata Navîn bibin em dikarin bûyerên muhtemel biqewimin çawa bibînin?

Divê mirov baş bizanibe, DYE bi şoreşa zanist, şîroveya felsefîk û dînî ya li pişt xwe li dunya heyî dinere. Bi hezaran saziyên ramanê - thînk thank - dixebitîne, timî agahiyan ji nû ve diwezinîne. Bêyî bikeve dogmatîzmê, timî sererast dike, model, proje û planên xwe pêş de dibe. Dîsa pêşketinên dîrokî ji nedîtî ve nayê, bingehên dîrokî ji modelên xwe re dibîne û hewl dide welê maneyê bidê. Ev hemû ji bo têgihîştineke pir plan û proje ya xwedî gelek alternatîf derfetan didin.

Bi vegotineke rojane Projeya Rojhilata Navîn a Mezin; analîzên dema nêz ên emperyalîzmê dike û wexta hewl dide bi naveroka xwe pirsgirêkên rojane çareser bike piştî salên 1990 esas dibîne. Nîzama Fransa û Îngilîstanê piştî şerê cîhanê yê yekemîn avakirine kêm û çewt dibîne. Kiryarên xwe yên piştî şerê cîhanê yê duyemîn jî li ser navê ewlekarî û aramiyê bi sedema despotîzm xurt kiriye, bi rexnegîrî wek xeta dinirxîne. Gelê herêmê yê pir zêde xizan bûye ji bo sîstemê zirar û bi tehlûke dibîne. Ji lewra dixwazin ewlekarî, demokratîkbûyîn, azadiya ferdan û aboriyê di zikhev de pêş bixînin. Bi vê modelê dixwazin pirsgirêkên giranbûyî yên Ereb-Filîstîn, Kurd-Ereb, Tirk-Îranê û hem jî hucreyên civakî yên ku despotîzmê fetisandine, çareser bikin û ji bo rê li pêşiya bûyerên hînê mezintir bigirin dixwazin biceribînin. Mîna ku planê Ewrûpayeke nû û Planê Marshall ê Japonyayê ji bo herêmê tê pêk anîn. Eger herêm ji bo sîstemê pir girîng e - ku girîng e - û di pêvajoya kaosê re derbas dibe, proje û fikrên wê yên xwe dispêrên van armancan realîst in. Heta di vê yekê de dereng ma ye. Hemû gavên ji aliyê sîstemê ve têne avêtin, her ku diçe di çarçoveya planekî de cih digirin. Xebatên plan-projeyan zêde dibin.

Zehmetiya herî mezin li pêşiya projeyê ew e ku rewşa Rojhilata Navîn a naşibe Japonya û Ewrûpayeke hilweşiyayî. Li Rojhilata Navîn şoreşa pîşesazî û rohnîbûnê pêk nehat. Demokratîkbûyîn neket rojevê. Ji faşîzmê wêdetir heta netewparêzî, mezhebparêziya bi dîndariyê barkirî û sîstemên siyasî yên bi hucreyên despotîk ên etnîk

xira nebin, mîna Ewrûpa û Japonyayê xwe nûkirin mumkîn xuya nake. Rejîmên heyîn bi xwe timî krîzê diafirînin. Blokên dewletê yên herêmî ji bo hebûna xwe dewam bikin berdêl çi dibe bila bibe, pir qurnaz û pispor in. Yên bi navê muxalefeta sîstemê jî derketine holê di heman demê de lastîkê yedek ê despotîzmê ne. Hedefa bingehîn parastina dewletê ye. Bermahiyên têgihîştina dewlet-xwedê ji texmînan wêdetir jî xurt in. Nava dewleta heyî pûç e. Ti fonksiyona wê ya dîrokî nîne. Mîna ku di nav cemaetan de ya herî xurt be. Ew ferdan û ferd wê diafirînin. Muxalefeta ku xwe herî şoreşger dizane, ji rêvebirineke baş a dewletê wêdetir ti armanca wê nîne.

Ji aliyê din ve, herêm di warê dîrokî de xwedî karektereke federatîf e. Nikare ev çend netew-dewletan rabike. Hejmara dewletên heyîn bi xwe dikare pirsgirêkan biafirîne. Komên mîna mezheb, etnîk, terîqet û cureyên din ên cemaetan dewletê bi xwe ve girê didin û bi awayekî beramber hevdu xwedî dikin. Jixwe nuqteya çareser nabe ev avahî ye. Dewletên Rojava jî timî van avahiyan destek dikin. Eger proje, hedefên ku danîne pêşiya xwe, dixwaze pêk werin, divê beriya her tiştî van rejîman ji hesabê xwe derbixîne.

DYE ketiye rêyekê ku veger jê zehmet e. Piştî 11 Îlonê gavek wer avêt ku ji ketina wê ya şerê cîhanê yê yekemîn û duyemîn zêdetir dikare encamên giran bide. Encamên piştî şerê cîhanê yê yekemîn derketin, ew çend kûr nebûn bandorê li ser çarenûsa sîstemê bikin. Girîngiya DYE nîşan dabû. Di şer de têkbiçûya jî dikarîbû xwe vekişanda parzemînê xwe û hebûna xwe dewam bikira. Di şerê cîhanê yê duyemîn de sîstema Sowyetê derket hemberî wê, lê DYE karîbû dor li wê bigire. Her çend di hin şeran de çeper wenda kirin jî hêza xwe parast û pêş de bir. Di her du rewşan de jî bi dewletên modern re mijûl dibû. Heman çanda Xirîstiyaniyê par ve dikirin. Hêmanên şerê şaristaniyan gurr bike, bi sînor bûn. Her çend hêmanên kaosê xwe nîşan didan jî di wê astê de nebûn ku gefan li sîstemê bixwin. Em encamên van hêmanan bi bîra me bixînin li Rojhilata Navîn nabînin. Bi sîstemeke ji salên 1250 ve despotîk bûye, wê yan şer li ber çav bigire, yan jî wê xwe vekişîne. Şerê mîna yên li Iraq û Afganîstanê têrê nake. Heta blokên îqtîdarê yên li herêmê neyên şikandin, her gava were avêtin wê hînê têkçûnên mezin bi xwe re bîne. Taktîka xwe spartina dewleteke despotîk ji bo çareserkirina ya din pir bi kêr nayê. Di rewşên bi vî rengî de çanda Rojhilata Navîn xwedî qabîliyet e ku ji bo ji nû ve despotîzmê biafirîne. Eger hemû hilweşîne, wê pirsgirêka kontrolkirina gelan derkeve holê. Bûyerên li Iraqê diqewimin bi dersan tijî ne ku rewşê

baş rave dikin. Demeke dirêj rejîm destek kirin. Di encamê de pirsgirêkên hînê rewşê girantir bikin, derketin. Hilweşand, lê blokên îqtîdarê yên heman çandê xwedî bikin û avahiyan pêk bînin, hene. Îhtîmaleke zehmet e, bi ferdiyeta Rojava atmosfera çandî li dawiyê were hîştin. Eger blokên îqtîdarê werin parçekirin wê ev yekê jî pêngaveke şoreşgerane be. Jixwe nakokiya diyalektîkî ev e.

Ji lewra neçare NY û NATO bikevin pêvajoyê. Lê vê carê divê mîna li Afganîstan yan jî li Somalî seresere nebe. Ji ber şert û mercan divê mayînde û berfireh be. Girîngiya çareserkirina Rojhilata Navîn hînê hêdî hêdî derdikeve holê. Di dema jihevketina sîstema Sowyetê de zêdetir qat bi qat zehmetiyê derbikevin. Qalibên zêhniyetê yên heşt sed sal in timî muhafezekar û hişk bûne wê welê şikandina wan hêsan nebe û wê wek li deverê din ên cîhanê pêk neyê. Sosyalîteya ferd, cemaet û qebîleyên serbest bibin wê wek mayîna serserî li naverastê bigerin. Wê bi kîjan şoreşa zêhniyet û aboriyê ev blokên despotîk ên piçûk werin parçekirin û di şûna wan de zêhniyeta nû û avahiyên aboriyê werin danîn? Cudahiyên mezin ên di navbera ferdê Ewrûpa yê ku xwe spartiye kevneşopiyeke bi kok a Ronesans, reformasyon, ronahiyê û ferdê Rojhilata Navîn ê ravekirî de wê çawa û bi çi li dawiyê werin hîştin? Tevî ku çanda Ewrûpaya Rojhilat ji çanda Ewrûpaya giştî pir dûr nîne, welatên ji çanda sosyalîzma reel ku mirov gelek hemdem kiriye, derbasbûna wan a sîstema lîberal çaryekê sedsalekî wergirt. Di nava sîstemê de çareseriyek heye. Li Rojhilata Navîn çareseriya di nava sîstemê de îdeayeke cihê wê guftûgo ye. Eşkere ye, paşerojeke bi pirsgirêkan barkirî li pêş heye.

Bi serneketina koalîsyona bi pêşengiya DYE, wê hînê rê li ber pirsgirêkên stratejîk veke. Ewê di sînorên global de bibe derbek li DYE bikeve û wê împaratoriyê bikeve pêvajoya paşveketinê. Emerîkayeke li Rojhilata Navîn wenda bike, wê tevahiya Asya, Ewrûpa û Efrîkayê bixîne heman pêvajoyê. Wê Emerîka Başûr, Meksîka û Kanadayê jî wek berê nikaribe bigire û bibe duyemîn Rûsya. Di mêzîna hêzên heyî de DYE li gorî rastiya xwe ya îqtîdarê nikare vê rewşê qebûl bike. Ji lewra neçare bibe xwedî helwesteke stratejîk. Çiqas bi mesref be bila bibe, li gelemperiya dunyayê çiqas li nerazîbûnan rast were bila were, neçare bimîne û xwe bigihîne hin encamên çareserker.

Eger mirov pirsgirêkên ku wê sîstema kapîtalîst a Rojava di demeke dirêj, navîn û kin de neçar çareser bike bixîne rêzê, di dema kin de Afganîstan û Iraq hene. Federasyonên demokratîk îdea têne kirin. Li herêmê modelên nû yên welatan difikirin. Pêşnûmeyên

destûran ên li ser kaxizan têne amadekirin, Sîstema Federal a Demokratîk pêşniyar dikin. Eşkere helwestek e, ya nû û îdeal dixwaze. Her kes bi meraq li bendê ye, wê bi cihanînê çawa bibe. Eger çanda hejmareke zêde etnîk û komên dînî dihewîne bigihîje federalîzma demokratîk, wê ev yekê di şaristaniyê de bibe veguherîneke mezin. Mîna bandora şoreşên Rûs û Fransa li Rojhilata Navîn bibe. Restorasyona rejîmên despotîk ên kevin îhtîmaleke pir qels e. Di şertên împaratoriya kaosê de federalîzma demokratîk avahiyek e, wê bi zehmetiyan bimeşe. Hêzên ji vê re pêşengiyê bikin wê ji ku bêne dîtin? Hêzên ku xwazgîniyê îqtîdarê ne herî kêm bi qasî rejîmên berê xwedî taybetiyên despotîk in û xwediyê wê potansiyela zêhnî û fomasyona siyasî nînin ku karibin karektera etnîk û mezheban bigihînin sentezeke erênî. Ferdê azad û lîberal hînê di nav pêşketineke pir bi sînor de ye. Îdealîstên demokratîk û sosyalîst ewqas kêm in, hema bêje tine ne. Yên berê jî ew çend teng in, nikarin xwe bimeşînin. Zêdetir bawerî bi NY, NATO, YE û hêzên koalîsyonê heye. Federalîzma demokratîk a avahiyeke timî hewceyî der ve bûyî wê gelek bi nîqaş be.

Di dema navîn de pirsgirêkeke din a girîng têkiliyên Ereb-Îsraîl û Kurd-Ereb, Kurd-Îran û Kurd-Tirkiyê ne. Ev pirsgirêkên li ser hîmekî dîrokî pêk tên, bêguman bi hewldanên NY ya nû, NATO, Hêzên Koalîsyonê û hewldanên xweser ên YE wê ji bo çareseriyeke lezgîn bandorê bikin. Lê her du jî pirsgirêkên dijwar in. Bi qasî ku di kûrahiya şaristaniyê de razayîne, bi modernîzmê re jî têkiliyên xwe gelek bi nakok û tengezar in. Çareseriya pirsgirêka Ereb-Îsraîlê bi giranî bi xurtbûna demokratîkbûn û aştiya li herêmê dibe. Berovajî texmînan, eger were gotin bila berê pirsgirêka Îsraîl-Filîstînê çareser bibe, xeter heye ku çareserî pêncî salên din paş ve were xistin. Ji ber ku di bingehê pirsgirêkê de dewlet û civaka Ereb a demokratîk nebûyî heye. Demokratîkbûyîn di herduyan de wê şert û mercên aştiya Îsraîl-Filîstînê amade bike. Naxwe şerê Îsraîl-Filîstînê wê avahî û zêhniyeta muhafezekar a di dewlet û civaka Ereb de - yên ji pêşketina demokratîk, azadî û wekheviyê dûr - hîn xurtir bike. Mîna ku heta roja me ya îro xurt kiriye.

Pirsgirêka Kurd hînê tevlîhev û piralî ye. Bi avahiyên civak û dewletên Ereb, Îran û Tirkiyê re pirsgirêkên wê yên kûr hene. Ji mafên xwe yên herî sivik ên medenî nikarin sûd werbigirin. Jixwe tu nikarî mafê wan ên siyasî û aborî bixînî rojevê. Qirkirineke çandî dijîn. Zextên dawî yên DYE belkî hinekî bilivîne û rê li ber hin gavavêtinên bi sînor veke. Nexasma Kurdistana Federe ya Iraqê

deriyên xwe ji sorkirin û tevdanê re vekirî ye. Di bin bandora Hêzên Koalîsyonê, Neteweyên Yekbûyî û NATO de dibe ku hînê hilperike. Statuya Kurd a heyî bi îsyaneke mecbûrî re hemta ye. Eger neyê dewamkirin û bi helwesteke demokratîk a çareseriyê nêzîk nebin, mumkîne cografyayeke ji Îsraîl-Filîstîn xwînrijtir pêk were. Li cografyayeke asê şerekî bi girseyeke Kurd a 40-50 mîlyonî re wê pirsgirêkên li herêmê girantir bike. Wê bike ku herêmê ji her bûyerê re veke.

Çareseriya demdirêj; bi pêşdebirina aborî, demokratîk û mafê mirovan a civak û dewletên Îran, Pakîstan, Komarên Tirkî û Ereban mumkîn dibe. Blokên xurt ên berjewendîperest û muhefezekar heta di nav avahiyên civak û dewletê de hebin wê li ber xwe bidin. Lê mirov dikare biçe cem gel, alternatîfên çareserker pêşkêş bike û eger sîstema serdest zordestiya xwe kêm neke, wê wextê mumkîn dibe ku di nava sîstemê de veguherîneke bi sînor bibe.

Ji bo çareseriya dema nêz, navîn û dirêj hêzeke mezin a eskerî û aborî hewce ye. Ji bo Projeya Rojhilata Navîn bi cih were anîn, dibe ku operasyonên eskerî û aborî yên dewamî pêwîst bikin. Tevî vê yekê, azadiya jinê ya pir behs tê kirin û perwerdeya ferdên lîberal xwedî girîngiyekê ye ku dest jê nabe. Heta jin şiyar nebe û herî kêm azadiyê nejî, hemû hewldanên din mehkûmî têkçûnê ne. Azadiya ferdî ya bêyî cudahiya jin-mêr heta bi giştî pêk neyê anîn, di serî de jin azadiya hemû beşên civakê pêk nayê.

Di encamê de mirov dikare di derketina ji kaosa Rojhilata Navîn de sê senaryoyan destnîşan bike:

Yekemîn, yên hewl didin statuya kevin biparêzin. Welatên herêmê yên piştî şerê cîhanê yê yekemîn û duyemîn hatin avakirin, wê ji aliyê siyasî û aborî ve israr bikin modela netew-dewletê dewam bikin. Ji ber ku mêzîna Sowyet-DYE xira bû û DYE bi şêwazekî împaratoriyê berê xwe da herêmê, zehmet e ku modela netew-dewlet bi vê rewşa ya kevin bimeşe. Neçare di warê aborî, siyasî û çandî de xwe veguherîne. Avahiyên wê yên ji berê ve mane, mîna dewletparêz, netewparêz, siyaseta dînî û aborî bi her awayî li dijî pêngava nû ya globalîzmê asteng in. Serdema kapîtalîzma netewî ji zû ve li dawiyê ma û ji ber ku derfetên polîtîka mêzînê ya sedsala 20. gelek bi sînor bûne, pêwîste xwe ji nû ve bi ser sîstemê ve bikin. Dixwazin hinekî qîmeta xwe zêde bikin û xwe bi ser ve bikin. Wê vê yekê jî bi qulpên civakî, muhafezekar û netewparêz bi xwe ve bikin û bi cih bînin ji bo hinekî xwe li cem girseyên xwe şîrîn bikin û wek rêbazên reklamê yên medyatîk bi kar bînin. Ev hewldanên - em ji

wan re nikarin bibêjin pêşketin, - stewr û korfêm ku rojane têne dîtin, her çend wek polîtîka jî werin nîşandan, ya rastîn tam rêbazeke xapandin û demagojîk in. Komên mezhebparêz, dîndar û dewletparêzên kevneşop - pir girîng nîne komarger an jî qraltî ne - a dixwazin xilas bikin an jî bi dest bixin kurtêlên aborî û siyasî ne. Navendên kapîtalîst ên pêşeng - DYE, YE û Japonya, heta Çîn - ku bi îdîaya jinûve avakirina sîstemê li gorî pîvanên serdema zanistê radibin, pêwîste bi van avahiyên siyasî û aborî yên kurtêlxur re nemeşin. Divê ev fêm bikin ku kapîtalîzma komprador li dawiyê ma. Nemaze statukoya Tirkiye, Misr, Pakîstan û Îran dixwazin li ser piyan bihêlin, zehmete li hemberî giraniya sîstemê ya li herêmê li ber xwe bide. Derfet û îmkanên wan mîna berê nînin, ne di nava xwe de, ne jî bi îttîfaqên nû yên der ve hebûna xwe dewam bikin. Pir nezan jî bikin, neçar in di çarçoveya projeya mezin û pêşengiya DYE de bi ser sîstema nû ve bibin. Ji bilî vê alternatîfeke rasyonel xuya nake.

Senaryoya duyemîn, di bin giraniya DYE de jinûve avabûn e. Piştî şerê cîhanê yê yekemîn mîna kiryarên Fransa û Îngilîstanê tê plankirin. Li herêmê israra DYE her dewam bike û NATOyeke nû ya berfireh û pê ve girêdayî hebe û statukoyan wek hedef bide ber wê û bixwaze NY jî tevlî vê yekê bike, sanaryoya herî dibe realîst a duyemîn e. Eger em mînak bidin, piştî şerê cîhanê yê duyemîn di çaçroweya Projeya Marshall de Ewrûpa û Japonya ji nû ve hatin avakirin. Em dikarin cîranên wê Meksîka û Kanadayê jî li vê mînakê zêde bikin. Lê pir eşkere ye ku pêwîste Rojhilata Navîn ji mînakên berê pir cuda were pêşvexistin. Eger wê bi şêwazên berê neyên meşandin, divê êdî di serî de Misr dewletên wek Ereb têne bi navkirin, Îran, Afganîstan, Pakîstan, Tirkiye û dewletên Tirkî, divê dersên xwe yên jinûve avakirinê baş bixwînin.

Di aboriyê de lîberalîzm, di qada civakî de - bi taybetî jin - azadî û demokratîkbûna siyasetê di çarçoveya sîstemê de - demokrasiya bûrjûwaziyê - , hîmê mentiqê vê ji nû ve avabûnê ne. DYE wê Ewrûpa û Japonyayê bide pişt xwe, dîsa bi NY re tevgera xwe rewa bike, hewce bibîne wê çoyê NATOya nû nîşan bide û ji bo ev welat di demeke nêz, navîn û dirêj de veguherin, wê israr bike. Yên bibin asteng û kelem, wê bi hemû hêza eskerî, siyasî, aborî (IMF-Bankeya Cîhanê) û alternatîfên dîplomatîk ên di dest de bi kar bîne û van dewletan bîne rêzê. Di vê sanaryoyê de, wê sînorên siyasî zêde neguherin. Lê li Afganistan, Iraq, heta mîna li Gurcîstan û Balkanan tê dîtin, wê ji avahiyên burokratîk-navendî yên hişk, rêveberiyên herêmî yên xwe gîhandine federasyonan wê wek avahiyên siyasî û

demokratîk bêne tercîhkirin. Di warê aboriyê de wê aboriya dewletparêz ji hev were xistin, di şûna wê de taybetîkirina sermayê û aboriyeke xwe dispêre şîrketên têkel - pir netew - li pê were girtin. Ji bo xebatên çand û hunerê di çarçoveya ferdiyet û azadiya jinê de bibe wê sermaye were razandin û hêza medyayê jî di xizmeta vê avakirina nû de wê ji serî ve xwe pêk bîne. Iraq û Afganîstan dikarin bibin prototîpa vê sanaryoyê.

Lê aliyê herî qels ê vê sanaryoyê ew e ku bi îradeya sîstemekê meşandina wê pir zehmet e. Li aliyekî netew-dewletên berê yên statukoparêz, li aliyê din jî daxwazên muxalefeta civakî yên zêde dibin, dibe ku bi wê paş ve gav bidin avêtin. Ji ber ku sîstemê nikaribe bi îradeyeke yekalî bi ser xwe ve bike, wê zêdetir li pêkhatina avahiyên têkel vekirî be.

Sanaryoya sêyemîn jî wê di çarçoveya vê hewcebûnê de were pêşxistin. Bi şertê ew hêza sereke ya hegemon be, wê lihevkirinê li ser her du aliyan jî ferz bike. Di demên berê de me ji vê yekê re digot stûtewandin, lê di şertên me yên îro de wê navê vê yekê bibe lihevkirin. Dîsa wek berê, wê firsend ji netew-dewlet û aboriyên bê ber, musrîf re neyê naskirin, lê her wisa wê ji serhildan û têkoşînên rizgariya netewî yên demdirêj û berfireh ên gelan re jî keys neyê dayîn. Yan wê zû li hev werin an jî wê pir zû werin pelixandin. Wek îfadeyeke berçav a vê sanaryoyê mirov dikare welatên Ewrûpa Rojhilat û welatên berê yên Ewrûpa Rojava ji bo vê statuyê mînak nîşan bide. Yanî wê wek Meksîka û Kanadayê nebe, lê wê wek Tirkiye, Misr û Pakîstanê jî nemîne. Pêşketin wê zêdetir ber bi demokrasiya bûrjûwaziyê ve bibe. Dibe ku hêzên gel hînê zêdetir bi bandor bibin û hêzên netew-dewlet ên statukoparêz her ku biçe bê tesîr bibin. Dibe ku ceribandineke balkêş di navbera demokrasiya bingehê wê gel û demokrasiya bingehê wê bûrjûwazî de pêk were. Di derketina ji kaosê de divê mirov mêzîna hêzan û alternatîfên wan ji nedîtî ve neyê. Ya divê mirov ji bîr neke ew e ku li dijî hemû avahiyên sîstemê bi qasî berxwedaneke kor, divê lihevkirineke bêpîvan jî nebe. Gelek caran hatiye dîtin û ceribandin, wexta xwestiye bi tevahî bi dest bixe bi tevahî ji dest daye.

Gengaz e, di nava çaryeka sedsala pêş me de ev sanaryo bi awayekî têkel di nav hev de bi hê alternatîfên zêde ji bo çareserî û derketina ji kaosa Rojhilata Navîn werin pêşxistin. Lê ya girîngtir ew e ku sanaryo û utopya hêzên gel-kedkar ên xwedî zemînekî civakî ku xwe bi Civînên Porto-Allegre dane der, wê çawa werin pêşxistin. Dîrok ti car bi îradeya yekalî ya hêzên tehekumkar nehatiye

diyarkirin. Helwesta demokratîk a komîn a civakan bi awayekî mayînde dîrok destnîşan kiriye.

3- Em Rojhilata Navîn a îro dikarin bişibînin rewşa sedsala 4. a împaratoriya Romayê. Herêm ji bilî rojhilatê şetê Dîcleyê wek eyaletên Romayê ne. Xirîstiyanî pir zû belav dibe û ji hundur ve zevt dike. ærîşên barbaran - tevgerên netewî yên roja me ya îro - ên ji der ve dijwar dibin û hewl didin fetih bikin. Li hemberî vê rewşê bersiva sîstema împaratoriyê ew bû ku her du tevger jî xist nava xwe û di hinavên xwe de helandin. Romayê demeke dirêj di sedsalên 2. û 3. de bi êrîşên bêrehim çû ser tevgerên civakî û etnîk. Lê di dawiyê de bi polîtîka tawîzan a da tebeqeya jor a tevgerên etnîk û civakî, ew bi ser sîstemê ve kirin. Lê ev tamandin û qelemkirina pirsgirêkê bi xêr nebû. Hînê zêdetir rê li ber rizîn û nîşaneyên belavbûnê vekir. Împarator Julîana xwest paganîzma berê ji nû ve geş bike û bi xeyala ku bibe Îskenderê Duyemîn di pêngava xwe ya Îskenderwarî de li peravên Dîcleyê têkçû. Guman nîne ku serokê Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê G.W. Bush jî di çarçoveya kategoriyên heman baweriyên dîrokî de bi pêngava sêyemîn a Îskender radibe. Her çend paganîzm nebe jî, rastiyeke tê zanîn ku dixwaze mezhebekî têkel - Mûsevîtî, Xirîstiyantî û heta bi hin aliyê xwe Misilmantî - Evangelîzmê belav bike. Evangelîzm li dijî zanistê ku îro wek dînê sedsala me ye, di rola paganîzmê de ye. Piştî Julîana împaratoriya Romayê bi lez paş ve ket. Di demeke pir kin de bû du parçe. Mirina Julîan li derdora 365an e. Parçebûna Romayê jî PZ 395 e.

Di kategoriyên din de jî şibandineke balkêş heye. Dînê Xirîstiyantiyê yê wê demê ji sosyalîzma reel qat bi qat tevgera xizanan bû. Nîzamekî komîn bi berpirsiyariyeke mezin meşand. Keşîşxane saziyên rastîn ê komînîzmê bûn. Li dijî Romayê sêsed salî li ber xwe dan. PZ di salên 312 de bi Konstantînê mezin re li hev kirin û bi ser sîstemê ve bûn. Lê di serî de Arîûstî zemînê wê yê xizan têkoşîna xwe dewam kir. Koçberên barbar ên dişibiyan tevgerên rizgariya netewî yên roja me ya îro, nemaze êrîş û têkoşîna sedsalan a etnîsteyên koka wan Cermen û Hûn bûn, bi Romabûyîna tebeqeya jor, kirin ku bi lez bi ser sîstemê ve bibin. Împaratoriya Romayê bi vî awayî ji aliyekî ve mezin dibe û ji aliyekî din ve jî bi muttefîkên nû re xurt xuya dike. Ya rastîn di cewherê xwe de piçûk û belav dibe. Bûyerê her ku biçe vê pêvajoyê eşkere bikin. Roma çendîn ji nirxên Romabûyînê dûr ketiye û bersiv nedaye daxwazên gelan, ji hev de ketiye û parçe bûye.

Împaratoriya DYE ya îro di gelek waran de dişibe Romayê. Wê jî xwe gîhandiye asta împaratoriya cîhanê. Di împaratoriyê de gihîştiye lûtkeyê. Sêyemîn pêngava mezin a globalbûyînê wê digihîne û dike împaratoriya cîhanê. Roma wexta di împaratorbûyînê de gihîştibû lûtkeyê, ketibû pêvajoya rizîn, belavbûn û parçebûnê. DYE jî ku wek împaratoriya kaosê hebûna xwe dewam dike gelek îşaretên belavbûnê dide. Pir zêde hêza xwe li cîhanê belav kiriye. Wê ev yek bi xwe re parçebûnê bîne. Pir bi awayekî xweser vê parçebûnê bi YE re dijî. Mînaka herî nêzî vê rastiyê jî ew e ku sîstema kapîtalîzmê sosyalîzma reel - xirîstiyaniya demê - di nava xwe de heland. Salên 312 û 1990 pir bi awayekî balkêş dişibin hevdu. Xirîstiyaniya hemdem sosyalîzma reel a Sowyetê serkêşiya wê dikir piştî berxwedaneke demdirêj bi sîstema navendî re li hev kir - bi burokrasiya jor re - û bi vî awayî îxanet li xizanên xwe kir. Aliyekî din ê balkêş dişibe, ew e ku rejîmên rizgariya netewî yên bi împaratoriya DYE li hev kirin. - Cermen, Hûn û yên mîna wan - Her yek ji şefên rizgariya netewî, bûn walîtiyên eyaletan ên Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê.

Ev pêvajoya hemû parçebûn û helandinê, wexta digihîje salên 2000'î êdî hildikişe û xwe digihîne lûtkeyê. Ji kîjan alî ve dinerî binere, pêngava piştî 11 Îlonê ji bo belavbûnê nîne, pêngav ji bo pêşîgirtina li parçebûn, ji hev belavbûn û paşketinê ye. Divê mirov cudahiya di navbera herduyan de baş bibîne. Rast e, gelek aliyên dişibin hevdu hene, lê ev nayê wê maneyê ku wê bûyerên pişt re jî biqewimin mîna hevdu bibin. Ji ber ku DYE pir zêde pragmatîst e. Mîna ku di dîrokê de împaratoriyê bibe hilweşîne, dikare di berdêla polîtîka paşvegavêtinan de xwe bi awayekî nerm ji hilweşînê xilas bike. Pêwîste mirov vê îhtîmalê pir ciddî li ber çav bigire. Jixwe mezinbûna wê ya heta niha jî bi helwestên wê yên pragmatîst û lihevker re pir ji nêz têkildar e. Sîstema kapîtalîst bi hêza xwe ya eskerî, îstîxbaratî, aborî, çandî-medya, huner, reklam û zanist-teknîkê karî zextê û lihevkirinê di zikhev de bimeşîne û vê bi xwe re encamên serketî anîn. Ji bo gel û kedkar cara duyemîn mîna lihevkirina Xirîstiyantî û barbaran di nav sîstema serdest de nehelin, divê beriya her tiştî hêza komîn û zêhniyetê bigihînin hevdu û bi lihevkirineke bi pîvan, pêngava şaristaniya demokratîk nû bikin û li ser sîstemê ferz bikin.

Pêşketina dîrokî ya hêzên serdest çawa mîna xelekên zincîrekê yekpar û hevdu temam dikin, tevgera hêzên azadiyê jî bi heman şêwazê diyalektîkê pêş dikevin. Her çend her xelek şêweyê wê

cudabin jî di tevahiya serdeman de li sîstema azadiyê xelek bi xelek zêde dibin. Di vir de careke din derdikeve holê ku bi şêwe û şikil, rola parastin û veguhestinê dewam dike. Cewher jî taybetiyek wê ya dewlemendî û kûrkirinê heye. Xelek pir hindik veguhestina dewlemendiyê bi awayê şêwazên xwe pêk tînin. Bi zimanê civakê ji van xelekan re avahî û rêxistin têne gotin. Ji ber serdestî û tehekumê, hewcebûna bi azadiyê, giştî ye. Hewcebûna her gelî bi azadiyê û şêwaza wî, li gorî tehekuma li ser diguhere. Çi ferdî û çi jî civakî dibe, heta tehekumtî dewam bike, têkoşîna ji bo azadiyê û pêdiviya pê jî, wê dewam bike. Pêdiviya bi azadiyê ji bo pêşketinê şert e. Bi kuştin û qirkirina azadiyê tenê tinebûn dibe. Heta tinebûn jî nebe, azadiyê mîna nebatên tat û zinaran parçe dike û her bendê derbas dike, wê di cihoka xwe de biherike û neyê rawestandin.

Mirov pirsgirêka azadiyê ya gelên Rojhilata Navîn di çarçoveya kevneşopiya dîrokî de binirxîne, ji bo nîşandana yekparebûnê û xelekan girîng e. Têkoşîna azadiyê têkoşînek wê ya her tim dewam dike heye. Ya girîng ew e ku mirov karibe vê dema dîrokê di nav xweseriya wê de tespît bike. Hêzên tehekumkar karîbûn pirsgirêka azadiyê ya gelan û civakê ji nedîtî ve werin. Karîbûn ferd û civakan bidin bawerkirin ku pirsgirêkek wan a azadiyê nîne. Tenê dîrokek wan a pîroz û bi heybet heye ku gerdûniye û tijî qehremanî û xwedayên mutleq in. Dîroka civakê ya bi awayekî awarte dewlemende ji nedîtî ve tên û bi fîgurên ji maneyê dûr nîşan didin, lê dîroka xwe ya ji xwînê, hovîtiyê û îstîsmarê zêdetir tiştek nîne, wek meşeke xwedayî nîşan didin.

Yek ji sedemên têkçûn û wendakirina azadîxwazên civakî ew bû ku nekarîn bersiva vê vegotina dîrokê ya tehekumkaran bidin. Ji bo bi ser bikevin jî di serî de divê karibin qabîliyetê nîşan bidin ji bo dîroka xwe bidin jiyîn. Eger vê jî nikaribin bikin, divê wek helwesteke exlaqî kevneşopiya xwe ya dîroka azadiyê dewam bikin. Eger zext û zordestî nebe, kes nabêje ez azadiyê naxwazim.

Em van nirxandinan, ji bo li rewşa sekan a civaka Rojhilata Navîn serwext bibin û maneyekê bidin rastiya wê, dikin. Dîroka azadiya civakî ya Rojhilata Navîn heye, hem jî pir zêde û kûr e. Yek ji wezîfeyên pêşî yên têkoşînên azadiyê ew e ku dîroka azadiyê di nava mêjûya giştî de cihê û rohnî bikin. Gîha li ser koka xwe hêşîn dibin. Têkoşîna azadiyê ya îro jî dikare li ser kokên xwe yên azadiyê û kevneşopiyê hêşîn bibe. Ji ber ku me di beşên destpêkê yên nivîsê de ev mijar wek pêşnûmeyekê pêşkêş kir, emê dubare nekin.

Di nava sînorên împaratoriya hemdem a Romayê de hin hêzên eyaletan dor li me girtine û em di nav vê dorpêçanê de dijîn. Mîna ku di dîrokê de pirî caran hatiye dîtin, waliyên eyaletên îro - dewletên herêmê yên roja me - zalim dibin. Waliyê eyaleta Yahûda Pilatûs Hz. Îsa li çarmîxê xist. Ya esas, Hz. Îsa sembol e. Bi hezaran bûyerên bi vî rengî di nav Xirîstiyaniyê de mîna lehiyan radibin. Dîsa di dîrokê de isyana waliyan gelek caran tê dîtin. Carnan dikarin bi ser bikevin. Di nava demekê de yan bi xwe dibin împarator, yan islah dibin, yan jî di nav isyana xwe de dixeniqin. Ev, rastiyeke navxweyî ya sîstemê ye. Di maneya azadiya civakî de qîmetek wê nîne. Eger hebe jî yekser nîne. Divê mirov van berxwedanên eyaletan û tevgerên azadiya civakî tevlî hevdu neke. Eger li têgihîştina împaratoriya hemdem serwext nebe, li dijî wê şensa serketinê nîne û eger serketin jî bibe wê bi awayekî xweber pêk were ku ew jî ti qîmeta wê nîne. Eyaletên herêmê, ji ber kaosa diqewime ji nû ve tên avakirin.

Em timî behsa rastiya xweser a rewşa kaotîk dikin. Ji ber ku şensa mirov a afirandin û azadiyê herî zêde di navbera dema kaosê de heye. Di vê dema kin de herî zêde hewceyî bi hêza maneyê heye - ji aliyê bereya azadiyê ve - ku ew jî zanîn, dîrok û serwextbûna li serdemê ye. Bi giştî 5000 sal, hînê nêzîktir di van 200 û 60 salên dawî de di pêvajoya hegemonîk de - dema hegemonya kapîtalîst - di neqeba kaosê de teqiyaye. Divê hûrûkûr were nirxandin. Me sanaryoyên sereke yên împaratoriya bi pêşengiya DYE wek bersiv bide kaosê, rêz kirin. Me ev kir, ji bo ku em karibin sanaryoyeke rastîn a hêzên azadiya civakî xêz bikin. Di dema Romayê de Xirîstiyanên hundur û barbarên ji der ve êrîş dikirin, şêwazekî wê yê bersivê hebû. Lê wê vê carê bersiva hêzên civakî cuda be. Dikarin ji van mînakan ders bigirin, lê teqlîda wan nekin. Di roja me ya îro de em nikarin wek sosyalîzma reel û tevgerên rizgariya netewî bersivê bidin. Ji ber ku wexta ev bersiv jî bi serketin, nekarîn xwe ji çewtiyên bingehîn bikin û bi ser sîstemê ve nebin an jî jê kêm nemînin. Bersiva me, şêwazê wê zanîna me be.

Mebest ji şoreşa zêhniyetê, têgihîştina civakê li azadiyê û baweriya wê ye. Serwextbûn û têgihîştin tenê nayê maneya zanînê. Divê tu bizanebî çawa pêk jî bînî. Bawerî jî ew e ku divê tu ji ya zane yeqîn bikî û pêdiviyên wê bi cih bînî. Hêza bi cihanîn û biryarê îfade dike. Heta mirov zêhniyetên li ser civaka Rojhilata Navîn hatine ferzkirin baş nas neke, nizanibe çi li dawiyê were hîştin û çi jî mîras were girtin û dîsa heta qalibên zêhniyetê yên divê li dijî wan têkoşîn were meşandin baş neyên naskirin, têkoşîneke îdeolojîk a bi

qabîliyet û rast nayê meşandin. Ji bo em bibin xwediyê zêhniyeta hewce pê heye, divê bi helwesteke exlaqî û kedeke mezin, em bibin xwediyê baweriyeke xurt û têgihîştineke civakî. Kesên cîhana xwe ya zêhniyetê mezin nekin, nikarin demeke dirêj têkoşîna azadiyê bidin meşandin. Li cih û kêliya dejenerebûnê destpêkir, li wî cihî û kêliyê zêhniyet diqede û pûç dibe. Li Rojhilata Navîn a hemû zana û peyxemberan kiriye di cewherê xwe de şerê zêhniyetê ye. Zêhniyeta têkiliya wê bi exlaq re nebe bê qîmet e. Exlaq ew e ku li ser rêya têgihîştinê rohnî kiriye, tevî hemû kêmasî û astengiyan, hêza meş û têkoşînê ye. Israra civakê ya wijdanî ye. Wexta di navbera têgihîştin û exlaq de têkilî qut bibe, serserîtî û awaretî dest pê dike. Divê zêhniyeta me xwe bigihîne zêhniyeta dijber jî û xwe bi wê jî xwedî bike. Zêhniyeta hêza dewletê her tim xwe baş bi rêxistin dike. Divê piçûk neyê dîtin. Heta dor li vê zêhniyetê neyê girtin, hewldaneke serketî û çareserî pêş nakeve. Polîtîka û çalakiya - warê eskerî jî di nav de - ji exlaq û zêhniyetê qutbûyî her tim weke mayîneke serserî dikare di bin me de biteqe. Divê çalakî û polîtîkayên me her tim di çarçoveya rohnîbûna zêhniyeta me û helwesta me ya exlaqî de bimeşin. Naxwe emê nikaribin xwe xilas bikin ji bo em nebin amûrê polîtîkayên dijber. Eger şerên zêhniyetê di bin van sernavên sereke de bi serketî neyên meşandin, weke ku em pirî caran fikarên xwe tînin ziman, di warê polîtîk de pêngav û hewldan xeterên wan hene. Di dîrokê de hemû derd û çîlekeşên mezin ji bo dersê bidin mirovatiyê û ji bo pêşî li van xeteran bigirin, xwe demeke dirêj vedikişînin quncikekê (sulûk) û hewl didin xwe bigihînin hêza zêhnî.

Tevî ku DYE hêzeke împaratoriyê ye, bi gelek sazî û dezgehên fikrî, think-thank û zihnî re bîla sedem naxebite. Ji ezmûn û tecrûbeyên dîrokî baş dizane ku li qadên tevdigere çendîn xwedî zanîn û têgihîştin be wê ew çend li gorî xwe rast bimeşe. Li herêmê ji nû ve Îslam û terîqet geş dibin. Ya esas, ev daxwaza hin beşên civakê ji bo zêhniyetê dide xuyakirin.

Mirov heta terîqetan analîz neke û hînê bi giştî bandora Îslama ji nû ve geş dibe li ser civakê lêkolîn neke, nikare têkoşîneke rast a zêhniyetê bide meşandin. Heman tişt ji bo netewparêziyê jî wisa ye. Zêhniyeta netewparêz ku bi awayekî etnîsîteya hemdem e, heta cihê wê yê di civakê de, derketin û xwe bi rêxistinkirina wê baş neyê fêmkirin, li Rojhilata Navîn têkoşîneke pratîk û îdeolojîk a xurt nayê meşandin. Her wisa divê mirov li zêhniyeta hêzên etnîk wek malbat û qebîletiyê ku hînê jî hebûna xwe dewam dikin, baş serwext bibe û bersiv bide. Pêwîste ev zêhniyet hemû werin fêmkirin, dor li wan

were girtin û pêdiviya nirxên rastîn ên zêhniyetê yên kesên pêwendîdar jî werin tedarekkirin. Ev wezîfeyeke ji şerên pratîk qat bi qat zehmetir e, lê hewce û lezgîn e.

Li Rojhilata Navîn wexta mirov bikeve şerê zêhniyetê, divê mirov bizanebe wek Hz. Mûsa qebîleya Îbraniyan bide meşandin, wek Hz. Dawûd bi Golyat re şer bike, wek Hz. Îsa şagirtên xwe seferber bike û wek Hz. Mûhammed berê bawermendan bide ser kar. Dîsa divê mirov karibe bi heyecana Sokrates bibêje; "xwe bizanibe", bi coşa Perîkles "qîmetê bide demokrasiyê", bi zanista Arîsto bizanibe bibêje; "derî li Îskender veke." Li Rojhilata Navîn bi destxistina zêhniyetê tê wê maneyê ku mirov bi heyecana Ronesansê ber bi xwezayê ve baz dide; ji mirov hez dike; ji bo hînbûnê tî ye; bi reformasyonê dogmayan qul dike diçe; ji bo baweriya cewherî bi dest bixe, bi rohnîbûnê, zanistê, felsefe û hunerê digihîne gel, kom bi kom tevgera rewşenbîran ji bo azadiyê seferber dike.

Li Rojhilata Navîn eger mirov bimeşe bifikire, wexta bifikire jî bimeşe wê zêhniyetê manîdar bibe. Ew wextê her tiştê bi awayekî xweza zindî bibe, mîna serdema neolîtîk mirovê bi awayekî pîroz û coş nêzî her tiştî bibin û maneyê bidinê. Wê ramana mîtolojîk a serdemên şaristaniyê ku bi dersan tijî ye, dîsa pirtûkên hîkmetan yek bi yek li pêşiya me vebin. Wê wextê wê dîroka mirovatiyê, ew şaristanîbûna pîroz û xeternak, ya bi heyecan û mirov matmayî dikir, jiyan payeberz dikir û pir piçûk dixist, were xwendin. Maneya rastîn a ezmûnên ew peyxemberên mezin di pirtûkên pîroz de cihê xwe bibînin. Ji nû ve, wê çemên miçiqîne biherikin; kavilê bibin bajar; li til û deştan gundîtiya nişmî geş bibe. Ji yê zalim heta yê dewlemend, ji Nemrûd heta Qarûn, ji Eyûb heta Mezlûm, ji Ferhad heta Kemal nirxên reş û sipî derkevin holê. Şerê zêhniyetê ew e, ev hemû nirx werin ziman. Di mejî û dilê me de hêşîn bibin. Ew wextê ti hêz û pêdiviya rezîl a jiyanê, ji bo sergerandinê nikare bibe bahaneya me. Emê van hemûyan, bi têgihîştina xwe ya bi qasî deryayê, bi îradeya xwe ya mîna lehiyan bi coş çareser bikin û li dawiyê bihêlin. Ew wextê polîtîka yan jî eskerî emê bi dahiyane li ser wan rawestin û bi awayekî destanwarî bersivê bidin.

Li ser zeman û zemînê îro yê Rojhilata Navîn em nikarin bi helwestên netewparêzî, dîndarî, rastgirtî û çepgirtiyê bigihîjin hedefê. Bi vegotineke peyxemberwarî em nikarin xwe ji kufrê xilas bikin. Bi çepgirtiya nû, bi civakîbûna sivîl a xeşîm û tevgera jinê ya ji ked û dîrokê bêxeber jî mirov nagihîje ti qonaxê. Mirov bi van meşên bê îman û xwediyê van zêhniyetan, bi van bûrjûwaziyên piçûk

ên îflas kirine û tengavbûne tenê dikare biçe ger û geştê. Hela hela bi kesên kurtêlxur, kesên heyranê text û kursiyê re tu ne dikarî baweriyekê û ne jî fikrekê biparêze. Bi vî rengî zehmet e, bersiva gel û mirovên Rojhilata Navîn ên pir bi serê wan de hatine, bi hezaran derb xwarine, were dayîn.

Em wexta li ser rastiya civakî ya Rojhilata Navîn tevbigerin û bi vê zêhniyeta tarîfa wê hat kirin hundurê wê tijî bikin û bimeşin, ewê me bibe cihên dîrok lê hatiye veşartin, ewê me bigihîne dilê wê yê vemiriye û bigihîne rastiya wê ya li rohniyê digere. Wê wextê li nav zeviyên têkoşînê gavê bêne avêtin û hem jî gavên li gorî rastiya dîrok û evîndarên azadiyê. Wê ti kesê nikaribe rawestîne, eger were xapandin, li îxanetê biqewime jî, were kuştin, dîsa jî wê ji deverekê derkeve û ber bi hedefa xwe ve bimeşe. Wê wextê dîrokê bibe ya me, dilê hemû bi me re hilbiavêjin. Wê wextê rastiya civakî wê bibe xwedatiya afirîner a hebûna me. Gelên me wê bibin xwediyê azadiya bi hezarsalan e li hêviyê ne û mafê wan e.

Civaka Rojhilata Navîn di derketina ji kaosê de alternatîfa hilbijêr e, divê herêmî nebe; xwedî taybetiyekê be ku karibe ji bo pirsgirêkên azadiyê yên gerdûnî jî bibe bersiv. Li herêmê çarenûsa pêngava global tê xêzkirin. Ji ber ku serketina sîstema bi pêşengiya DYE û paşeroja hemû dunyayê destnîşan dikin ev rastî welê ye. Blokên îqtîdarê ji hêzên feodal ên sedsala 20. pêk anîn û bêyî veguherînin hebûna xwe dewam dikin ku îhtîmaleke zehmete veguherîna wan, ji lewra zemînê berfireh ê civakê di bin tehekumeke giran a kevneşopiyê de dijî neçare bikeve pêvajoyê. Ev yek ji bo hêzên kapîtalîst ên global ku dixwazin xwe ji nû ve ava bikin jî hewceyîyek e. Lê girseyên gel ên hişyar bibin, diyar nîne wê bi van daxwazan bêne bi sînorkirinan na. Rewş bi guman e. Diyar nîne wê ji Qutiya Pandorayê çi derbikeve. Hewldanên azadker û afirîner ên di neqeba kaosê de wê vê rewşa nediyar destnîşan bikin. Wê demeke veguherînê ya pratîk bibe ku di ti dema dîrokê de nehatibe dîtin. Mîna ku bajar werin avakirin, ji nû ve sazkirina civakê di rojeva dîrokê de ye. Di bingehê zehmetiyên Rojhilata Navîn de ev rastî radizê. Ji nû ve avakirina sîstema serdest û sazkirina hêzên azadiya civakê ya gelan, wê bibin têkoşîneke mezin bi nakokî û têkiliyên di zikhev de bimeşin.

Beriya em li ser blokên ku wê ji nû ve werin avakirin rawestin, divê em polîtîkayê li gorî xweseriya herêmê tarîf bikin. Wek rêveberiya pratîk a civakan dibe ku tarîfên polîtîkayê yên rojane û li gorî demê biguherin. Mînak, em dikarin polîtîka muhafezekar wek

polîtîka civakê di cih de dihêle û polîtîka pêngavê wek ya civakê pêş de dibe, tarîf bikin. Tarîfeke sêyemîn jî dikare derbarê naverokê de be. Eger bloka dewletê eleqeder bike, ew polîtîka dewletparêz e, eger girseyên gel ên li derveyî dewletê eleqeder bike, ew dibe polîtîka demokratîk. Guhertinên di asta herî jor de mirov dikare wek polîtîka bilind û eger qadên hînê bi sînor eleqeder bike, em dikarin wek polîtîkayeke teng an jî zemîn bi nav bikin. Nuqteya hevbeş a van hemû tarîfan ev e; ji hunerê guhertin, veguherîn û rêvebirina civakê re polîtîka tê gotin. Xebatên polîtîk karûbarên civakî ne. Eger hewldanên zêhniyetê, utopya, proje, plan û xebatên bernameyê bin, hewldanên polîtîk jî xebatên perwerdeyê, rêxistiniyê û çalakiyê ne. Divê mirov xebatên zêhniyetê û yên polîtîk tevlîhev neke, her weha divê mirov berovajiyê wê jî neke. Mirov dikare mîmartî, hostatî û karkertiyê di qada civakî de wek hunerekî nazenîntiyê dixwaze - hunerê polîtîk - bi nav bike. Ji bo mirov polîtîkayê bike divê xwe ji aliyê zêhnî ve amade kiribe û di warê pratîk de jî ji bo rêvebirina civakê amadekariya hewce ya ji bo guhertin û veguherînê kiribe, yanî qabîliyeta perwerde, rêxistinkirin û çalakiyê. Bê sedem ji polîtîkayê re nayê gotin; hunerê xwedayî. Wexta tê gotin; qral-xwedê, siya-xwedê sultan, rengê xwedê yê li rûyî zemîn dewlet, ya rastîn hunerê xwedayî tê destnîşankirin. Di analîzkirina dîn û mîtolojiyê de divê mirov sosyolojî yan jî ilmê civakî baş bixwîne.

DYE û şirîkên wê yên neqane li Rojhilata Navîn şêwazê eskerî-polîtîk pir dimeşînin. Lê divê mirov piratîka eskerî ji polîtîkayê cihê neke. Polîtîkayek li cihê têkoşîneke çekdarî û dijwar hebe, navê wê eskertî-şer e. Di vê rewşê de diyarkerê sereke şer e. Li cihê dengê çekan tê birrîn, polîtîka wek xebatek dewama artêşê derdikeve pêşiya me. Yanî di vir de berovajî formula Clausewitz bi cih tê. Ya şer diyar dike ne polîtîka, şer polîtîkayê diyar dike. Li Iraqê ev rastî pir eşkere xuya dike. Li Iraqê rêya polîtîkayê - polîtîka nû - şerê teknolojiya dawî ya DYE vedike. Jixwe di tevahiya dîroka Mezopotamyayê de li serê rêya polîtîkayê timî şer hebû. Şerê dawî vê rastiya dîrokî bi awayekî sadiqane nîşan dide. Wexta sura şer sist bibe yan jî bi temamî bikeve, wê xebatên polîtîk bi lez dibin. Ji lewra polîtîka beşê şer ê bêyî sîleh e. Xebatên perwerde, rêxistinî û çalakiyê yên bêyî şer, xebatên polîtîk in, xwe dispêrên zêhniyeta xwediyê şer. Di vê çarçoveyê de DYE û şirîkên wê, bi alîkariyeke xurt a eskerî di serî de li Iraq û Afganîstanê li gelemperiya Rojhilata Navîn li ser hîmê zêhniyeta 'Projeya Rojhilata Navîn a Mezin' polîtîkayê ji nû ve ava

dikin, rê ve dibin, diguherin û dewam dikin. Me ev xebatên wan di beşê berê de bi sê sanaryoyan bi kurtî anîbûn ziman.

Li dijî vê yekê, pir girînge ku em wezîfeyên hêzên azadîxwaz ên dijberên tehekumê zelal bikin. Wê wezîfeyên wan ên li ser hîmê parastina civakê û gel bi têkoşîneke polîtîk a çi cureyî were meşandin? Ji bo vê me tarîfa xwe ya zêhniyeta hewceyî pê heye, kir. Me tarîfa polîtîkayê jî kir.

Di dorê de polîtîka berçav û objektîf tê. Wezîfeya li rêza serî ew e ku bi helwesta demokratîk û civaka komîn a gelan ku bi navikê bi dewletê ve girêdayî nîn in, xebatên demokratîk werin meşandin, pêşdebirin û bi kalîtekirin. Divê wek prensîb ti car navenda wê bi dewletê re nebe. Nakokiyeke mezin e, azadiya civakî têkiliya navenda wê bi dewletê re hebe. Tenê hêzên tehekumkar dikarin wek navendeke dewletê bixebitin. Ji lewra hêzên civakî yên li ser hîmê azadiyê tevdigerin nabe bi hêzên tehekumkar re bikevin têkiliyê, berovajî wezîfeyek wan a bingehîn ew e ku li dijî van hêzan rawestin. Di vê çarçoveyê de li derveyî dewletê navenda wan demokrasî ye. Em tarîfa xwe ya demokrasiyê jî ji ya bûrjûwaziyê cihê dikin ku ew demokrasiyê wek perdeyek dewletê dibînin. Ji Atînayê heta yekemîn sîteyên Sumeran demokrasî nebû dewamek dewletê û ne jî dewlet bû ya wê. Ji ber ku li cihê yek dest pê dike ya din zelûl dibe, li cihê yek diqede ya din serketina xwe îlan dike. Divê mirov vê rastiyê baş ji hev bike. Demokrasiya ku DYE û şirîkên xwe jî ferz dikin, demokrasiya zumreyeke bûrjûwa-feodalane ku xwe dispêrin tevneke xurt a eskerî û îqtîdarê. Hêzên azadiya civakî, her çend xwedî hêzeke kêm a parastina civakê bin jî ew polîtîka demokratîk wek hîmê xebata xwe dizanin. Di nav xebatên polîtîka demokratîk de çalakî, rêxistinkirin û perwerdeya - polîtîk, huqûqî, xwepêşandanên bi armancên ekonomîk, mîtîng, protesto, serhildan û şer (şert mecbûr bikin) - kom û ferdên di bin tehekumê de hene. Ev xebat an wek xebatên rojane têne rêvebirin an jî wek xebatên guhertin û reformên normal têne kirin. Eger naveroka wan hînê tijî bibe, wê wextê dibe xebatên şoreşgerî. Xebatên demokrasî û îqtîdarê ya sîstema serdest çiqas pir bibin, ew çend bi xebatên demokrasiyê yên hêzên azadîxwaz re dikevin nav hevdu û carnan jî wê bêne dijberî hevdu.

Divê mirov nekeve şaşiyên şoreşên ku Ingilîz, Fransî û Rûsî ketin navê. Ew jî ev e; divê her du alî jî xebatên xwe yên demokratîk ji bo înkar û tinekirinê nemeşînin an jî di nav hev de nehelin û rê li ber felaketekê venekin. Divê pir bi nazenînî tevbigerin ji bo nekevin

şaşiyeke dîrokî - mirov dikare jê re bibêje rastiya îcbarî jî - û rê nedinê. Di navbera her du demokrasiyan de dibe ku têkilî û nakokî jî hebe. Her weha dibe ku di nav hev de jî bimeşin û dibe werin dijberî hevdu jî, lê ya divê bala mirov li ser be û nebe ew e ku bi meylên înkar in û tinekirinê helîn nebe û rê li ber yekrengbûnê venebe. Divê mirov pîvanên bihevrebûnê û lidijhevbûnê baş destnîşan bike. Di demokrasiyê de yekdengî û yekrengînî her tim xeter e. Piştî wê înkara demokratîk tê. Her kom çi li der ve û çi jî li hundur bi nazenînî nêzî alternatîfa xwe ya demokratîk bibe ew payeberzî û hostatiya demokratîk e. Berovajiyê wê jî polîtîka qralê fîlozof ê Eflatonîk ê mîtolojîk qral-xwedê ye; yanî palîtîka her cure faşîzm, totalîtarîzm, hiyarerşî, despotîzm û dîktatorî ye. Di encamê de antîdemokratîzma sîstemên tehekumkar e.

Demokrasiya li Rojhilata Navîn pêş bikeve bi îhtîmaleke mezin wê têkel be. Ewê hem daxwazên komên kedkar ên civakî, hem jî daxwazên bûrjûwa-feodal di zikhev de temsîl bike. ædî dem derbas bûye ku demokrasî tenê ya bûrjûwaziyê be. Jixwe ti car bi serê xwe bi awayekî xam nehatiye bi cihanîn. Ev tarîfên me nayên wê maneyê ku wê demokrasiya komên gel û demokrasiya bûrjûwaziyê her yek ji wan bi serê xwe bi cih neyê anîn. Her koma gel wê demokrasiyê xwe bi awayekî têr bijî û divê bijî. Çiqas demokrasiya xwe ya cewherî dawerivîne hundurê xwe wê karibe ew çend bi kom û çînên din re demokrasiyeke hevpar bi pîvan û tecrûbe bimeşîne, biguherîne, veguherîne.

Em di çarçoveya rohniya van analîzan de ji nêz ve li têkiliya di navbera demokrasî û rastiyên civakî yên Rojhila Navîn de binerin. Me dît ku têgîna demokratîzekirina dewletê têgîneke rast nîne. Ya rast ew e ku dewlet di mijara demokrasiyê de bi berpirsiyarî tevbigere. Tevgera bi berpirsiyarî tê wê maneyê ku zêhniyet, avahî û kiryarên demokrasiyê qebûl dike. Mirov dikare bibêje; ev rewş dikare hêz û mezinahiya dewletê bi sînor bike. Rast e. Jixwe hebûna demokrasiyê bi sînorkirin û piçûkirina dewletê ye. Li welatên demokrasî bi tesîr bi cih tê anîn, dewlet tenê ewlekariya giştî têkûz dike û bi heman awayî pêdiviyên hevpar ên gelemperiyê bi rêxistin dike. Ji lewra tarîfa dewletê di vê çarçoveyê de jî divê ji nû ve were kirin. Di demokrasiyê de dewletên klasîk ên tehekumkar nabin. Dewlet û demokrasî di vê çarçoveya bingehîn de tenê dikarin bi hev re bibin. Di şert û mercên serdema heyî de ne bi tevahî dewleta klasîk û ne jî bi tevahî derfetên rêveberiyê yên demokratîk hene. Em di vê çarçoveyê de dikarin bibêjin di vê serdemê de em ji dewletê

derbasî demokrasiyê dibin. Di serdemên derbasbûnê de bi piranî saziyên bingehîn ên rabirdû û dahatûyê bi hev re dimeşin. Mîna serdemên feodalîzm û kapîtalîzm di zikhev de meşiyan.

Li Rojhilata Navîn pêşketina demokrasiyê pir bi sînor e. Fikir û refleksên wê hînê baş hişyar nebûne. Tevî ku hêviyên xurt ên koman hene jî dewleta hezar salan a ceberût bi tepeserkirineke tund ev hesret û hêvî xistine xewê. Car caran ev hesret û hevî teqiyane, isyan kirine, lê dîsa jî karektera despotîk a dewletê bi awayekî bêrehim hemû xistine bin erdê. Lê rastiya vê serdemê bi vê avahiya dewletê re nakok e, lewra hesretên ji bo azadî, wekhevî û demokrasiyê hişyar dibin. Bûyer û pêşketinên di sedsala 20. de bi nîşaneyên vê rastiyê tijî bûn. Di sedsala 21. de ji bo bi cihanîna hesretên hezarsalan îhtimaleke xurt a pêşketinê xuya dike. Cografya vê pêvajoyê herî ji dawiyê ve dişopîne welatên Ereb in. Ji ber ku avahiya etnîk û dînî hewceyî dewletê hatiye kirin, tebeqeya jor a dewletê li ser hîmê berjewendiyên xurt hatiye danîn, hişyarkirin û livandina refleksan zehmet dibe. Hewceyî bi destwerdaneke ji der ve dibîne.

Ji ber ku heta niha Îsraîl di himbêza Ereban de pêş ket netewparêzî û dîndariya Ereban jî xurt kir, lê êdî rewşeke berovajî li ber derî ye. æddî hemû dunyayê jî baş fêm kir ku şerê Ereb-Îsraîlê yê kronîkbûyî bi netewparêzî û dîndariyê çareser nabe. Eger pêşengiyên netewparêz û dîndar li dawiyê werin hîştin û pêşengên demokratîk derbikevin holê wê ev rewşa heyî ya kilîtbûyî vebe. Di mînaka Qibrisê de jî hat dîtin, hem şertên der ve, hem jî yên hundur ji bo meyla çareseriya demokratîk derfet û îmkanên xurt didin. Ji bo vê yekê Projeya Rojhilata Navîn a Mezin bi planên berçav dikeve rojevê. Nexasma demokratîzekirina Erebîstana Suûdî û Misrê girîng tê dîtin. Welatên din ên piçûk ên Ereb mîna ku ji rewşa Iraqê ders wergirtibin neçar eleqeyê nîşanî demokrasiyê didin. Ji der ve raya giştî ya cîhanê, di hundur de hesretên demokratîk û komîn ên civakê ku bi hezarsalan hatine tepisandin û ji rê hatine derxistin, li ber hişyarbûnê ne. Dewletên Ereb ên despotîk demeke dirêj nikarin li hemberî van her du rastiyan li ber xwe bidin û rê li demokrasiyê venekin. Navên wan ên komar û melîkiyet di warê demokratîkbûnê de ti rola wan nîne. Her du jî meyla wan a despotîk xurt e. Ya girîng ew e ku ji bo demokrasiyê bi berpirsiyarî tevbigerin û rê bidin piçûkbûn û bi sînorkirina dewletê.

Ev dewletên bi ser sîstemên mêzîna kevneşopiyê piştî salên 1990 hebûna wan xurt bû. Li herêmê hebûna hegemonîk a DYE wê van dewletan ji bo bikevin statuya eyaletan tengav bike. Ji bo wek dewlet

bijîn, îhtîmaleke xurt e, berê xwe bidin demokrasî û pîvanên Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê. Blokên îqtîdarê yên xwe spartine DYE û berê jî xwe spartibûn Îngilîstanê, Fransayê û heta Osmaniyan, wê di demên pêş de nikaribin wek berê hebûna xwe dewam bikin. Jixwe zehmetiya Projeya Rojhilata Navîn a Mezin jî ji vê yekê ye. Avahiyên demokratîk di çarçoveya sînorên hin welatan de her çiqas xweser û taybetiyên wan hebin di heman demê de wê wekheviyê wan jî hebin. Mafê mirovan, rêxistinên civakî yên sivîl, hilbijartin, pir partîtî, di medyayê de cudabûn, xurtkirina parlementan û xurtkirina ferdiyetê wê wek pêşketinên hevpar bikevin rojevê. Em dikarin li bendê bin ku di destûr û qanûnan de guhertin bibin. Demokrasiya pêş bikeve, wê ne tam a bûrjûwa-feodal be, û wê ne jî ya gel be. Li hemberî dewletê dikare bi sînor, lê ji bo civakê çalakiyên berfireh pêk bîne.

Dîn û etnîsîte di pêvajoya demokratîkbûnê de neçarin biguherin. Dîn û etnîsîte dikarin bi rêxistinên civakî yên sivîl û siyasî yên hînê hemdem temsîl bibin. Eşîr û dîn ji awayekî klasîk wêdetir dikarin xwe di nav avahiyên siyasî û demokratîk de cih bigirin. Ne dewlet û demokrasiyek xwe dispêre dîn û etnîsîteyê û ne jî dewlet û demokrasiyek wan ji nedîtî ve tê şensê wan heye. Nemaze şêweyên çep û lîberal ên mîna li Ewrûpayê bi sedema dîn û etnîsîteyê rast analîz nakin û nikarin rast pê re têkiliyê deynin, di nav girseyê de cih nabînin. Lê ya rastîn, giraniya civakê bi van her du rastiyan hatiye hûnandin. Avahî û helwestên bi kok ên xwe dispêrin dîn û etnîsîteyê ku neyên pêşxistin, bi giştî di siyasetê de û bi taybetî jî di siyaseta demokratîk de şensê serketinê îhtîmalek pir hindik e. Lê belê dikare ji jor ve bi zexteke dijwar a şoreşger, yan jî bi zexteke dîktatorî ya dij-şoreşê pêk were. Lê mayîndebûn û dewama wê pir bi guman e. Divê mirov di vê çarçoveyê de nêzî terîqet û mezheban jî bibe. Em di her du rastiyan de jî dikarin nîzama serdemê navîn a mîna keşîşxaneyan bibînin. Mîna şêweyekî civakên sivîl ên serdema navîn e. Ev saziyên îro jî hebûna xwe dewam dikin ji bo mirov wan bigihîne demokasiyê xebat û hewldanên xweser hewce ne. Di şûna înkar û tepisandinê de, ya rast ew e ku mirov wan wek rastiyeke sosyolojîk qebûl bike û wan bi meyla azadiyê ve girê bide. Mafên jinê û azadiya wê jî di pêvajoya pêşketin û demokratîkbûnê de roleke girîng dilîze ku dest jê nabe. Emê vê mijarê hînê binirxînin.

Di qada Erebîstanê de Îsraîl û Sûriye wek du hêmanên stratejîk ji bo demokratîkbûnê pir girîng in. Demokrasiyek Îsraîlê ya têra xwe rûniştî heye. Ev ji bo Îsraîlê qelsî û lawazî nîne, berovajî hêmanekî

xurtbûnê ye. Pir zehmet e, em heman tiştî ji bo Sûriyê bibêjin. Sûriye li serê rêveqetîneke ciddî ye. Eger di warê demokratîkbûnê de gavêtinên reforman bi lez neke û pirsgirêkên xwe bi Îsralê re çareser neke, îhtîmal heye bibe Iraqa duyemîn. Ji bo rejîma li Sûriyê bêyî ku tengav bibe veguhere, dikare aştiya bi Îsraîlê re û gavên di warê demokratîkbûnê de rolên girîng bilîze. Hebûna rewşenbîrên xurt, mezheb û etnîsîteyên cuda, çînên xizan û navîn dikarin di demokrasiyeke hevpar de ji bo pêşketineke bi xêrûber pêvajoyekê bidin destpêkirin. Rola Kurdên li Sûriyê mîna yên li Iraqê nîne, ew dikarin ji bo veguherîneke demokratîk a lîberal derfet û îmkanê bidin. Helwesta bi berpirsiyar a dewletê wê vê yekê diyar bike. Li Bakurê Efrîkayê Berberî dikarin heman rolê bilîzin.

Iraq zêdetir ji bo Ereban û heta ji bo hemû Rojhilata Navîn namzet e ku bibe laboratûareke demokrasiyê. Ji ber ku hema hema hemû komên etnîk, dînî, mezhebî, siyasî û civakî di himbêza xwe de dihewîne û ev yek dikare wê bike laboratûar. DYE û şirîkên xwe, wê hewldanên xwe xurt bikin û ji binî ve jî wê hin komên etnîk, mezhebî û civakî alternatîfên xwe yên demokratîk pêş de bibin û bi vî awayî ev welatê ji aliyê demokrasiyê ve bibe xwedî cihekî stratejîk. Eger dîrokeke dewlemend û petrol rast were bi karanîn ji bo demokrasiyê wê firsendeke baş pêşkêş bike. Eger Kurd li Iraqê federalîzmeke demokratîk ferz bikin, wê ev yekê ji hebûna wan wêdetir li gelemperiya herêmê rê li ber encamên girîng veke. Federasyona Iraqê ya Demokratîk dikare xwe hînê zêdetir xurt bike û bibe prototîpa Federasyona Demokratîk a Rojhilata Navîn. Ji lewra pêşketinên di vî warî de pir girîng in. Çareseriyên li Iraqê dikarin li gelemperiya Rojhilata Navîn belav bibin.

Li Îranê demokratîkbûyîn rojane dikeve rojevê. Kevneşopiya xurt a dewleta klasîk êdî bi zehmetî bi serdemê re li hev dike. Li cem xelkê Îranê heyecan û hêviyên demokratîk zêde dibin. Piştî Iraqê federalîzma demokratîk dikare ji bo Îranê jî bikeve rojevê. Îran ji parçebûnê zêdetir xwezaya wê li gorî federalîzmê ye. Di kevneşopiya dewletê ya 2500 salî de hêmanên bişibin federalîzmê serdest in. Eger hêviyên gel ên zêde dibin bi federalîzmeke hemdem re bibin yek, Îran dikare li herêmê bibe federasyona demokratîk a herî xurt. Dikare bibe Rûsyayeke duyemîn. Li dijî zextên DYE yên zêde dibin, di şûna helwesteke Seddamwarî de gavavêtin ber bi federalîzmeke demokratîk dikare ji bo Îranê bibe alternatîfeke mayînde û rastîn. Wexta dîn pir zêde siyasî dibe bandoreke neyînî li ser demokratîzebûnê dike. Bandora îdeolojiya dînî dikare berovajî lê

vegere. Çanda Îranê li gorî demokratîkbûyînê ye. Kevneşopiyên wê yên dîrokî, ji Zerduşt heta Mazdek, ji Babek heta Hesen Sebah gelek kesayetên dîrokî ji çanda demokrasiyê re bingeh amade kirine.

Eger mîna di dema nêz de xwe ji nexweşiya ceribandina muxalefeteke pir rengîn xilas bike, dikare demokrasiyeke têkûz pêş bixîne. Teknolojiya ragihandinê dikare pêvajoyê bi lez bike. Eger rêveberî nermbûna hewce nîşan bide dikare demokratîkbûyînek mîna li Spanyayê li Îranê jî berçav bibe.

Rola dîn li Pakîstanê hînê neyînî ye. Dîndariya bi dijberiya eşîrtî û antî-Hîndîtiyê xwe xwedî dike mîna ku dewlet û civak êsîr girtibe. Lê eger DYE desteka xwe ya ji dîn re rawestîne û mîna ezmûna li Afganîstanê tevna dînî qels bike, dikare demokrasiyeke sekuler pêş de bixîne. Wekî din bi ti awayî nikare bi Hîndîstan, Îran û Afganîstanê re serî derbixîne. Modela Pakîstanê divê bi lez veguhere. Afganîstan jî ji bo Asya Navîn dikare wek Iraqê bibe prototîpek. Hêmana herî zêde dikare guhertinê li ser Asya Navîn ferz bike, wê ezmûna demokrasiyê ya li Afganîstanê be. Demokratîkbûna Komarên Tirkî hînê zêdetir nêzî Rûsyayê ne. Lê hawîrdora wan dikare rê li ber bûyerên xwesertir veke.

Avabûna polîtîk a Rojhilata Navîn, ji ber dewletan û zêhniyeta parçebûyî belkî pêşketinek mîna ya YE bi hêsanî nebe, lê zemînê dîrokî hevpartî û şirîkatiyê rasyonel dike. Konferansa Îslamî pir fonksiyonel nîne. Dikare Federasyona Demokratîk a Rojhilata Navîn îdealîze bike. DYE û şirîkên xwe demokratîkbûyînê li gorî berjewendiyên xwe dibînin û ev yek jî şensê pêşketinên di vî alî de zêde dike. Beriya salên 1990'î hêzên destek peyda dikirin hêzên antîdemokratîk û despotîk bûn, lê piştî vê mêjûyê rewş berovajî bûye. Eger serdem ber bi demokrasiyê ve bi rê bikeve, herêmê nikaribe demeke dirêj avahiyên rêveberiya dewletê yên li derveyî serdemê mane rabigire. Netew-dewletên di van 50-60 salên dawî de xwe spartibûn mêzîna di navbera Sowyet-DYE êdî modelên bê kêr in ku wê globalîzmê xwe li wan ranegire. Bi îhtimaleke mezin wê modelên nû yên dewletê bikevin rojevê. Bi qasî sîstemê guhdarî dikin wê komên gel ên li jêr jî guhdarî bikin û li gorî vê yekê wê bi berpirsiyarî nêzî demokasiyê bibin. Ev dewletê piçûk û sînorkirî bin. Bi sedema van hêmanan, wexta Rojhilata Navîn derbasî serdema şaristaniya demokratîk bibe wê karibe di veguherîna dunyayê de jî alîkariyên girîng bike.

Eşkere ye, ev pêşbîniyên me ji bo Rojhilata Navîn ji aliyê sîstema komîn û demokratîk a gelan, bersiveke îdeal ji bo demeke

nêz nade. Mîna utopyayên îdeal ên sosyalîzma demekê xuya nakin. Lê îdealên hînê rasyonel in. Ya girîng ew e ku kesên doza wekhevî û azadiya civakê dikin divê xwedî helwestên têkûz bin û serî li çareseriyên navend-dewlet nedin - ya esas çaresernebûnê - û çareseriyên xwe nekin qurban. Divê vê helwesta xwe ya bi pîvan û têkûz mîna sosyalîzma reel, rizgariya netewî û sosyal demokratan di berdêla tawîzan de neterikînin. Di demokrasiyê de ji bo azadî û wekheviyê rêya herî ewle israr e. Mîna Lenîn got, dereng be jî tenê bi vê helwestê yanî bi bêhneke fireh û xurt demokatîkbûyînê bibe.

Di şaristaniya Rojhilata Navîn de li navenda hemû çareseriyên pirsgirêkan pirsa jinê heye. Emê vê carê bûyerên dîrokî dubare nekin û ji bo dema pêş wê slogana me vê carê welê be; sêyemîn şikestina cinsî ya mezin li gorî mêr nebe. Heta di nava civakê de wekheviya cinsiyetê pêk neyê, ti daxwaza wekhevî û azadiyê wate û cih nabîne. Ji bo demokratîkbûyîneke mayînde û berfireh dîsa azadiya jinê hêmana bingehîn e. Ev sîstema jin kiriye mîna mal û mulkekî, neksa wê jî dîsa pirsgirêka jinê ye. Demekê dihat gotin çîna karker, îro divê şûna vê gotinê nifşê jinê cih bigire. Beriya çînayetiyê divê nifşê jinê were çareserkirin ku mirov karibe netewiyet û çînayetiyê jî baş fêm û çareser bike. Eger ji ser jinê his û îradeyên koleker ên mîna zilam, bav, evîndar, bira, dost û hwd. rabin wê azadiyeke rastîn a jinê mumkîn bibe. Evîna herî baş mulkiyetbûneke herî xeter e. Eger jin hemû berhemên serweriya mêr afirandine wek raman, dîn, zanist û qalibên hunerî hûrûkûr di moxila rexneyan re derbas neke, wê nasnameya jinê dernekeve holê. Beriya her tiştî divê jin bibe ya xwe, êdî nebe mulk. Jina bûye mal û mulk wê nehêle mêrekî baş û bi fazîlet jî çêbe. Bi jinek bi vî rengî re rabûn û rûniştin li pêşiya mêrê azad jî asteng e. Jinek ev çend piçûk hatibe xistin, berovajî maneya xwe mêrekî piçûk ketiye.

Tespîteke raste ku tê gotin; asta azadiya civakan, asta azadiya jinê diyar dike. Wexta em ji aliyê estetîkê ve jî li mijarê binerin, em dikarin bibêjin kesê azad nebe wê estetîka wan jî nebe. Ji lewra jiyaneke estetîk nebe, wê tenê di nav sînorên prîmatan de pêk were. Eger mirov wek mijareke hunerî li dabaşa jinê binere wê rastir be û girîng e. Divê mirov wê ne wek mal û mulk, ne jî wek karker-gundiyan bibîne. Pêwîste mirov jinê wek parçeyekî xwezayê herî hişyar û hestyar bibîne; lê hayil bibe hin pîroziyên wê hene, bi zimanê mêrê serwer pê re nepeyive, hewl bide bi zimanê jinê yê bi gelek siran barkirî wê fêm bike. Ev ji bo jiyaneke estetîk pir girîng e. Di jiyanê de pratîka herî xirab, serweriya mêr a li ser jinê hatiye

ferzkirin û xweperestiya wî ye. Ti helwest mîna ya mêr a li ser jina neçar hatiye hîştin, bêhurmet û çarenûswarî nîne. Li gorî min civak û mêrekî xurt, têgihîştî, hestyar, wekhevîxwaz û li azadiyê serwext, dikare bi pîvanên me destnîşankirîn û erkên wan, rabin û bizanibin. Civaka di koletiyê de pir çûye xwarê ew civak e, ku jina xwe piçûk xistiye. Civaka ji jiyanê jî fêm nake ew civak e, ku rasterast bi jinê re jiyan qebûl kiriye. Dîsa jiyana herî bê heyecan, xirab, tevizî û ji maneyê dûr, jiyana bi jina kole re ye.

Em wexta bi rohniya van tarîfan li civaka Rojhilata Navîn binerin, emê hînê baştir fêm bikin ka çima jiyaneke bê mane, zalim, krêt û bêhurmet dewam dike. Civakeke mêran a pir bi sivikî nêzî jinan dibe, wan ji estetîkê bêpar bihêle, mîna mal û tiştekî bêqîmet a divê xwe jê xilas bike bibîne, eşkere ye, ev civakê ji aştiyê bêpar û krêt bijî. Civakeke mêran a bi vî rengî nikare jiyaneke pîroz a civakî, meznahiya welat, fazîleta rastîn û têgihîştina xwezaya zindî biafirînin. Wexta nikarin biafirînin jî wek bahane tim û tim "jinê şeytan" nîşan didin. Jina jê re tê gotin kêm e, û şeytan e, ya rastîn dereweke herî rezîl a civaka mêrên têkçûyî ye. Eger li dijî îdeolojiya serwer a mêran, exlaq, hêza civakî û ferdan şerekî mezin neyê meşandin jiyana azad nayê bi destxistin; civakeke demokratîk a rastîn nayê afirandin. Ji lewra wek yeksaniyê sosyalîzm pêk nayê. Alternatîfa polîtîk a gelan ne tenê demokratîk e, her weha civaka demokratîk û azadiya cinsiyetê ye.

Têkoşîna azadiyê ya jinê divê bi awayekî berçav ji avakirina partiya xwe heta tevgera jinê ya girseyî, hemû rêxistinên xwe yên civakî di nav hemû avahiyên siyasî û demokratîk de xebatên xwe bimeşîne. Jin çendîn xwe ji destê serweriya mêr û civaka wî xilas bike û bi însiyatîfa xwe ya serbixwe tevbigere, ew çend wê bibe kesayeteke azad û bibe xwediyê nasnameyê. Sergirtineke pir zû koletiyeke herî zalimane ye. Hîç sernegirtin - aqilê xwe - helwesteke bi şeref e. Em ji çarşefê bigirin heta dolbendê û pornoyê kiryarên bi destê mêr li ser jinê têne ferzkirin, xirabiyek ew çend rezîl e, li ti netew û çînê nehatine kirin. Ji lewra destekdayîna ji bo hêrsa jinê, têgihîştina azadiya wê û tevgera wê, nirxeke mezin a hevaltî û mirovatiyê ye. Rojhilata Navîn bi kulta xwedawendiyê ya herî mezin û di heman demê de bi koletiya herî kûr a jinê, herêmeke ji aliyê şaristaniyê ve tê naskirin. Divê sêyemîn şikestina mezin a cinsî bike û li gorî jinê meşekê bide destpêkirin ku hêjayî dîroka wê be. Ketina mezin bi rabûna mezin dibe. Eger em li ser vî hîmî wek

bawermendên dînê xwedawendeke nû rabin, emê karibin xwe bigihînin dayiktiya pîroz û jintiya evînê.

Di civaka alternatîf a Rojhilata Navîn de wê aborî, çîn û sosyalîteyê çawa bibe, ez bi xwe van pirsan pir watedar nabînim. Mijarên hewce ew in ku me analîzên wan kirin. Ne ku naskirina bêkarî-bikarî û gundîtiyê şoreşgertî ye, berovajî nasnekirin şoreşgertî ye. Eger mirov van çînan wek ebdên axa û patronan bifikire, wê me hînê nêzî rastiyê bike. Azadî, çendîn karker û gundî di warê aborî de nebe jî di warê zêhnî û polîtîka demokratîk de pêş de bibe, wê pêk were. Mirov ji neçarî dibin karker û gundî. Eger azadî li dawî hîştina îcbariyetê ye, wê wextê tê karkertî û gundîtiyê li dawiyê bihêlî. Eger têkoşîna rastîn a çînî bi vê zêhniyet û şêwazê demokratîk were meşandin, wê wextê wek yeksaniyê sosyalîzmê pêk were û maneya xwe bibîne. Bêkartî berhemekî bêdemokratîkbûyînê ye. Civakek bizanibe demokratîk be, rê nade civakeke bêkar. Eger li cihekî bêkartî zêde be, wê wextê li wir ew çend bêdemokratîkbûyîn heye. Hebûna bêkartiyê bi giştî illet û nexweşiyeke şaristaniya çînî ye. Kom û mirovên bizanibin li dijî wê derbikevin ti car bê kar namînin. Eger ti kar jî neyê dîtin, weke karekî mezin, karê demokrasiyê heye, wê wextê karê herî mezin ji her kesî-ê re heye. Bibe demokratekî-e baş, bibe şervanekî-e azadiyê; tê bibînî, tê di temenê xwe de saetekê jî aware nebî, tê bê kar nemînî. Kom û gelên şerê demokrasiyê nedin, wê her tim aware, rêncber û bê kar bimînin. Eger rastî ev be, wê wextê em çendîn civakê û ferd perwerde bikin, bi rêxistin bikin û bixin nav têkoşîna demokrasiyê, emê ew çend di têkoşîna li dijî bêkartî, awaretî, serxweştî û tembeltiyê de bi ser bikevin.

Gelên Rojhilata Navîn heta ji bo demokrasiyê ranebin ser piyan, wê nikaribin xwe ji mîskîntiya sedsalan, tembeltî û bêkartiyê xilas bikin. Civakên bizanibin demokratîk bibin, wê bizanibin li welat, her cure çavkanî û dewlemendiyê, li ked û çanda xwe xwedî derkevin wê wextê tenê keda mirov a bi xêrûber dimîne. Ez dubare destnîşan dikim; tiralî û bêkartî ji bêdemokratîkbûyînê û ji hînbûna koletiyê ye. Eger tê xwestin dewlet, patron - her du jî çavkaniya bingehîn a bêkartî û her cure rezaletê ne - ji holê rabin, ev bi lavakirinê nabe, divê tu rêxistinên demokratîk û çalakiyan ferz bikî û bigihîjî encamê. Têkoşîneke rastîn a aborî ev çend bi çalakiyên demokratîk ve girêdayî ne. Rêyên din, lîstikek a sendîkatiya zer û ajantiya patron e; bi tawîzên erzan tevahiya temenê xwe wek gundî û karkarekî kole razî dibe. Civak û welatên zanîbûn bibin demokrat di dîrokê de -

Atîna - û di roja me ya îro de - Swêd û Îngilîstan - her tim bûn civakên dewlemend û serketî.

Dîroka Rojhilata Navîn di heman demê de dîroka mirina ekolojiyê ye. Ji ber ku şaristaniya civaka çînî ji xwezayê re xerîb ket, texrîbata mayînde ya hawîrdorê roj bi roj, meh bi meh, sal bi sal, sedsal bi sedsal, hezarsal bi hezarsal pêş ket. Hema hema hemû erd û daristanên wê wergeriyan çolê. Ew daristan û erd bûn ku ji bo mirovatiyê cihoka sereke ya avdanê bûn. Bi heywan û nebatên li ser axa xwe ji bo şaristaniyê rêyên bingehîn vekirin. Wexta mirov ebdîtî li ser mirov ferz kir, bivirê xwe yê bêrehm li xwezayê bilind kir. Qadên tefkîr û xeyala cennetê li cem mirovan hişyarkiribû wergerandin çolan. Wexta daristan neman dest avêt nebatan, wexta nebat jî neman, heywan û mirov jî neman. Birçî ma, tî ma, nema. Di encamê de erdên herî dewlemend xizan bûn û kir ku bibin erdên mirov ji ser koç bike. Erdên ku demekê ji çar aliyê cîhanê mirovan xwe lê digirt û dihatin, bûn erdên qelaç û çolter ên mirov jê birevin. Dîroka ekolojiyê jî mîna dîroka jinê nehatiye nivîsandin. Ji bo jina azad çawa hewce ye dîroka jinê bizanibe, divê ji bo civaka ekolojîk dîroka ekolojiyê were zanîn. Civakeke azadiya cinsiyetê û demokrasiyê bixwaze xwe nespêre serwextî û çalakiya hawîrdorê, nabe alternatîfeke rastîn a gelan.

Tevgereke azadiya cinsiyetê û demokrasiyê bixwaze, divê herî kêm li dijî tinekirina daristanan û erozyonê be, ji nû ve daran deyne û erozyonê rawestîne, naxwe wê ti cudahiya wê ji dunya tehekumkar a mêran nebe. Tevgera ekolojîk di avakirina civaka nû de ku em plan dikin, yek ji wan hîman e ku dest jê nabe. Ekolojî tenê ekonomî nîne. Zêhniyetek e, vegera li zêhniyeta xwezaya pîroz û zindî ye, ku hatiye wendakirin. Eger li cem me, têgihîştineke xwezayê ya bi me re dipeyive û me diafirîne nebe, têgihîştina xwezayek mîna axa reş, mirî û ji pîrozbûnê dûr, wê jiyaneke ji qîmetê ketî pêşkêşî me bike. Têgihîştina li hawîrdorê tenê av û hewa qirêj jî nîne. Divê mirov bi tevahî bi xwezayê re be, ji xwezayeke parsêl bi parsêl divê veger bi aliyê xwezayeke yekpare be. Bi vê jî mirov xwe digihîne civaka sosyalîst û demokratîk. Ev çend di zikhev de ne. Ev rêz û hurmet e, ji bo xeleka tekamul û berdidandinê ya ku mirov diafirîne.

Civaka xweza ya civaka komîn a seretayî xweber pêk anî, em dikarin bi saya zanist û teknolojiyê di roja me ya îro de hînê bi zanebûn biafirînin. Li hemberî pirsgirêkên xwîngîr ên Rojhilata Navîn belkî pirsgirêkên ekolojîk wek fantazî xuya bikin. Lê divê ji bîr neyê kirin, ev pirsgirêkên bêkartî, birçîtî û xwîngîr bi îxaneta li

ekolojiyê gihîşt vê astê. Çawa bêyî hekîmtiyê em nikarin behsa dermankirineke têkûz bikin, bêyî ekolojiyê jî em nikarin behsa civakeke bi sihet û tendurustiyê bikin. Ji lewra civaka azadiya cinsiyet û demokrasiyê dixwaze, nayê avakirin.

Civakên Rojhilata Navîn tevî gelên xwe hatine serê rê sekinîne. Meyla împaratoriyê û hêza hegemon DYE ji çareseriyê dûr e. Li dijî wê jî helwestên Wiyetnameke nû jî ji rastiyê dûr in. Tirkiyeke nû ya mîna salên 1920'î jî nabe. Di serî de hêzeke mêzînê mîna Sowyetê nîne, ya girîngtir ji ber ku emperyalîzm wek berê nîne, rizgarîxwaziyek wek Wiyetnamê, rizgarîxwaziyeke netewî ya Tirkiyê mîna berê nabe. Her dema dîrokî şert û hedefên wê, ango şerê wê yê rêxistinkirî cuda ne. Di roja me ya îro de helwesta herî manîdar li dijî DYE û şirîkên wê ew e ku hemû hêzên azadîxwaz ên civakê û gelan, bi bernameyeke azadîxwaz, ekolojîk, demokratîk û tevneke rêxistinê ya berfireh a karibe bi cih were anîn, bêne amadekirin. Belkî şerê herî kêm xwînrij, lê şerê herî bi zanebûn û encamgîr welê tê kirin.

Eger hewce bike, em dikarin bi prensîb li hev bikin, eger nebe, divê em demokratîkbûyîna xwe bi hêzên xwe yên parastinê li gund, bajar, çiya û çolan pêk bînin. Gelên xwe demokratîk nekin şensê wan ê serketinê nîne. Kengî gel bi awayekî giştî bi kongreya temsîla wan dike, bi her cure rêxistinên civakî yên sivîl, kooperatîf û komên xebatê yên komîn bikevin nav tevgerê, wê bibînin ti doza civakî nîne tê de bi ser nekevin. Di dema nû ya dîroka Rojhilata Navîn de kengî rabûna ser piyan a gelan li ser vî hîmî bû, ne tenê wê zextên mîna yên emperyalîzma berê pûç bikin, wê di heman demê de karibin ji lihevkirinên bi prensîb, aştiyane û demokratîk re pêşengiyê bikin. Rabûna ser piyan a li gorî dîroka şaristaniya xwe bi vî awayî dikarin pêk bînin.

Eger were pirsîn, ka rola şoreşgeran li ku ma, beriya her tiştî rastiyên ilmê civakî yê me sînorên wê destnîşankir divê zanibin xwe bigihînin. Bêyî ilmê civakî şoreşgertî yan jî veguherîna civakî, dikare bêyî hay jê hebe tevlî kuştin û xiyanetan bibe. Ji bo vê jî rêyek bi tenê heye, ew jî divê em ilmê xwe yê civakî ji destê hêzên îqtîdar-zanînê xilas bikin û ji nû ve pêk bînin; yanî divê em dibistanên xwe yên ilmê civakî û akademiyan ava bikin. Divê em zêhniyeta xwe ya li ser hîmê ilmê civakî bikin pişta polîtîkaya xwe. Belkî jî ji hemûyan girîngtir, divê em exlaqê civakî serwer û ferz bikin. Di polîtîka exlaqî de ya rast ew e ku mirov bi bawerî, sebir û îdîa heta dawiya rêya xêzkirî biçe. Divê mirov jê venegere, îxanet neke û ji bo van

hemûyan bahane nebîne. Exlaq ew e ku zanista bi zêhniyeta me hatiye stran divê bi cîhana me re kêlî bi kêlî li hev bike. Jiyanek timî bi serwextî û têgihîştin be. Eger wisa be, wexta polîtîkbûyîn, zanist û exlaq dest bidin hevdu, bi giştî mirovatî û bi taybetî jî parçeyekî wê yê jê nabe gelên me yên herêmê di xizmeta wan de emê bibînin dozek me ya civakî ya nayê çareserkirin nîne. Exlaqê me yê wek wijdanê civak û dîrokê, ji her demê zêdetir ji me meşandina polîtîkayê bi zanîn dixwaze û pê re guhertin û veguherîna civakî ya arzû û hêvî tê kirin ji bo bi cih were anîn ferman dike.

Bi kurtî li Rojhilata Navîn di ketina serdema şaristaniya demokratîk a gelan de sê alternatîfên sereke hene.

Yekemîn, statukoya heyî - nîzama rûniştî - wek heye dewam bike. Nîzama xwe spartibû mêzînên sîstemên sedsala 20. û hebûna xwe dewam dikir gihîşt dawiya rê. Piştî ku sosyalîzma reel ji hev de ket krîza aktuel hînê bi lez bû û rê vekir ku li dunyayê yekserî çêbibe û niha hewl tê dayîn ku ev rewş bi împaratoriya kaosê ya di bin hegemonya DYE de li dawiyê were hîştin. Sêyemîn pêngava mezin a globalîzmê li vê demê rast tê. Bi şoreşa zanist û teknolojîk, hilberîna li derveyî xwestekê ya wek gidîş û lodan mezin dibe li astengiya girseyên xizan dialiqe. Globalîzm heta vê nakokiyê çareser neke wê nikaribe bigihîje armanca xwe. Netew-dewleta statukoparêz wek astengiya bingehîn tê dîtin. Ev avahiyên statukoparêz wê li ser hîmê ferdiyet, lîberaltî û demokratîkbûyînê li dawiyê werin hîştin û ji nû ve werin avakirin.

Ev pêşketin û bûyer ji bo girseyên gelan hem aliyê xwe yê erênî û hem jî neyênî heye, dikare wek hêmanekî objektîf hişyarkirina demokratîk û tevgerê bi lez bike. Ji lewra hem hêza sîstema hegemonîk, hem jî di binî re hişyarbûna gelan û tevgera wan a zêde dibe, her ku biçe dikare statukoyê bike ku nikaribe dewam bike. Statuko hewl dide çareser nekirinê bike şêwazekî jiyanê. Wexta tengav dibe rûyê xwe makyaj dike û ji bo temenê xwe dirêj bike car caran serî li provakasyonan dide. Lê ev statuko êdî her ku diçe îzole dibe. Mîna berê desteka sîstemên DYE û Rûsyayê jî nabîne, ji lewra hêrs dibe û mîna di cihê xwe de patînaj bike, demê dikuje.

Gengaz nîne ku êdî demagojiyên berê yên sexte yên çepgirtî û rastgirtiyê bi kar bîne û bigihîje encamê. Wê mîna berê kontrola civak û dewletê, ne bi faşîzm û ne jî bi totalîtarîzmê destekê bibîne. Netew-dewleta statukoparêz her roja biçe wê desteka gelan wenda bike û ji hev de bikeve. Tebeqa jor jî wê bi hêza nû ya hegemonîk re bigihîjin hevdu, girseyên gel ên li jêr jî wê bi lêgerînên xwe yên

nîzama demokratîk vê alternatîfa îcbarî li der ve bihêlin. Li Rojhilata Navîn ev pêvajo rojane diqewime û her çend pirsgirêkên giran dibin, çareser neke jî mumkîn e wan ji rewşa astengbûnê derbixîne. Nemaze di serî de Misr hemû dewletên Ereb, Pakîstan, Tirkiye û Îran di navbera statuko û guhertinê de şaşomaşo radiwestin. Nikarin ji bo pêvajoya li pêş xwe biryareke têkûz bidin. Lê îhtîmaleke mezin e, ji jor ve bi Projeya Rojhilata Navîn a Mezin a DYE û ji jêr ve jî bi projeya civaka ekolojîk, demokratîk û azadîxwaziya cinsiyetê ya gelan, bikevin pêvajoya guherînê.

Alternatîfa duyemîn, nîzama demokratîk a têkel e. Zêdetir aliyê wê yê pratîk li pêş e, û bi sînor e. Ew serdem derbas bû, êdî emperyalîzm mîna berê bi îradeya xwe tenê nîzaman danamezrîne. Îhtimaleke qels û zehmet e, ku hêza nû ya hegemonîk DYE jî bi îradeya xwe tenê nîzamê deyne û bimeşîne. Tevî vê yekê, hin komên netewan ku di serdema nêz de nîzamên netew-dewlet ava kirin jî ji qabîliyeta çareseriyê dûr in, berovajî di hundur û der ve de bi xwe bûne çavkaniya pirsgirêkan. Di dema mêzîna navbera sîsteman de helwestên tam ên serbixwe her ku diçe zehmet dibin.

Serdem hewceyî hevdu dike. Ev hewcebûn yekalî nîne, beramber e. Sêyemîn pêngava mezin a globalîzmê jî vê pêvajoyê bi lez dike. Dema navnetewî şûna xwe ji sermaya navşîrketan re dihêle. Ji aliyê din ve, çandên herêmî pir geş dibin. Herêmtî dibe nirxa herî mezin. Em dikarin demê di bin van hêmanan de wek serdema herêmtî û globaltiyê bi nav bikin. Li gorî vê rastiyê sîstema siyasî jî wê ne demokrasiyên berê yên bûrjûwa yên netewî û faşîzm, ne jî sosyalîzma reel a netewan û totalîtarîzma rizgariyên netewî be. Gengaze her du nîzam di zikhev de bi demokrasiyên têkel ên baş pêk werin. Îttîfaqên demokratîk ên komên civakî yên di asta herîmî û netewî de wê bibin rêbazek li cih. Di şûna rêveberiyên dewletê û partiyên berê yên çepgir û rastgir de wê pir partî û rêveberiyên demokratîk ên bi tesîr cih bigirin. Bi vî awayî, komek qabîliyeta wê ya temsîlê zêdetir dikare ji nêz ve bi sîstema global re têkiliyê deyne, pirtir hîn dibe û berhemê zêde, tê mijîn.

Ev pêvajoya li gelemperiya cîhanê diqewime, ji bo Rojhilata Navîn zêdetir îhtimalek e. Ji ber ku hewce ye statukoyên kevin li dawiyê werin hîştin ev alternatîf aktuel dibe. Projeya Rojhilata Navîn a Mezin jî ji vê pêdiviya girîng e. Ji ber ku gelên Rojhilata Navîn di wê têgihîştinê de nînin ku karibin demokasiya xwe pêş de bibin, bi rêxistin bikin û ji ber îradeya wan a parçebûyî û rewşa wan a nû hişyar bûne zehmet dike ku karibin alternatîfeke demokratîk xurt

bikin. Ji lewra ji bo paşerojê utopya dihêlin. Tevî vê yekê, divê ji bo lihevkirineke bi prensîb demokrasiya xwe ya navxweyî baş û bi qabîleyet wek wezîfeyek dereng nayê xistin û dest jê nabe, pêş bixînin. Taybetiyên afirîner û azad ên neqeba kaosê girîngiya serdema borînê zêde dike û keysê dide gelan bi demokrasiyên têkel karibin bigihîjin rola sereke.

Alternatîfa me ya sêyemîn jî zêdetir ji bo paşerojê, wek utopyayeke gelan civaka demokratîk û ekeolojîk e: Pêştir cih dide exlaq û azadiya cinsiyetê, lê navend dewlet nîne. Ji ber ku aliyê wê yê utopyayê giran e, nayê wê maneyê, wê di roja me ya îro de ti car pêk neyê. Berovajî ji bo bi cihanîna vê dozê divê her dem û li her deverê wek wezîfeyeke rojane gav bi dilnizmî bêne avêtin. Dibe ku li gorî dem û cih ev xebat kêmtir û zêdetir bibe. Eger gel û komên curbecur ên azad demokrasiya xwe ya navxweyî pêş de bibin, azadiya cinsiyetê ya civakê pêk bînin, bersiva pêdiviyên civaka ekolojîk bidin û hînê jiyanê bibin, her roja derbas bibe wê me nêzî vê civakê û demokrasiyê bikin. Komên gel ên hîn bûne xwe bispêrin dewletê û rêve bibin, wê ti cara negihîjin azadî û wekheviya li bendê ne. Xwestina sosyalîzm û demokrasiya ji dewletê, di rastiyê de înkara demokrasî û sosyalîzmê ye. Di dîrokê de bi sedan carî ev rêbaz hatiye ceribandin û her tim di dawiyê de hêzên tehekumker û îstîsmarker xurt kirine. Li gorî demokrasiya bi ser dewletê ve nîne, divê komên gel parastina xwe bi xwe bikin. Milîsên parastina gel divê li her cihê hewce dike - li gund, bajar, çiya, çol - di serî de demokrasiya gel, divê bizanibin hemû nirxên wî ji zordestan, desteserkeran û dizekan biparêzin.

Mirov dikare aboriyek bi awayekî komîn, kooperatîf û komên din ên xebatê yên rê nadin metabûyînê, zirarê nedin tendurustiya gel û hawîrdorê pêş de bibe. Bêkartî ku ji aliyê nîzamên kedxwar ve tê afirandin, di civaka ekolojîk û demokratîk a gel de nabe pirsgirêk. Di vê civakê de li şûna huqûq exlaq rola serdest dilîze; bi perwerdeyeke afirîner daxwaza ji bo jiyênê li pêş e; di nav xwe de şer nas nake; têkiliyên bi dostayî, heval û hogirtiyê serdest in. Ev civaka bi wekhevî û yeksaniyê barkirî rêya herî raste dibe Sosyalîzmê. Eger nîzama etnîk a nêzî wekheviyê û civaka komîn a gelên Rojhilata Navîn demeke dirêj jiyîn bi derfetên zanist û teknolojiya îro re bigihîjin hevdu, jiyana bi civaka ekolojîk a azadiya cinsiyetê dixwaze û xwedî demokrasiyeke pêşketî wê bibe nirxeke herî bi şeref û wê watedar bibe.

BEŞA ÇAREMÎN

**Di kaosa Rojhilata Navîn de rastiya Kurd û pirsgirêka Kurd**
**Destpêk**

Nêzîkbûneke rast ji bo rastiya Kurd ji her demê zêdetir girîng bûye. Kaosa li Iraqê ji ber pirsgirêka Kurd e. Wek xala sereke ya rojeva cîhanê tê guftûgokirin ku wê ev kaosê çawa li dawiyê were hîştin. Di vî warî de texmîneke xurt jî nayê kirin. Hêza çareseriyê ya şaristaniya Rojava têrê nake. Careke din hewl tê dayîn mîna piştî şerên cîhanê bi projeyên mezin ên navnetewî çareserî were dîtin. Li herêmê diltepînî û qirqilandineke mezin heye. Ji rejîmên heyî, ti ji xwe piştrast nînin. Siberojê çi bi xwe re bîne diyar nîne. Ji aliyê din ve, rastiya jê re "teror" tê gotin, berovajî îdîayan zêde dibe. Terora rastîn jî çiye nayê gotin. Di nav kaosa bi mij û moran de bûyerên bêyom li naverastê digerin. Tevî hemû tiştî çav li hêviya şeveqa azadiyê ne.

Demeke nû dest pê dike ku tê de êdî Kurd wek berê nayên rêvebirin. Eger Kurd bixwazin jî wê nikaribin jiyana xwe ya kevin a bi lanet bi serdemê re dewam bikin. Tesîrên her roj ên ji der ve û hundur wê çareseriya di rastiya Kurd de bi lez bikin. Alî û awayê çareseriyê wê tempo û taybetiya hêzên li pratîkê destwerdin diyar bike. Mîna rola Îsraîlê di himbêza Ereban de lîst, fena ku Kurdê jî li gelemperiya Rojhilata Navîn bilîzin. Li Iraqê bi ferzkirina dewleteke federal a Kurd, wê li herêmê modela netew-dewlet a hişk navendî bihelîne. Li derveyî îradeya wan, dibe ku li gorî dîroka Rojhilata Navîn bi giştî meyleke federasyonbûyînê bi lez bikin. Ev pêvajo, gelo wê li ser hîmê şerê du netewparêzan an jî bi lihevkirinên demokratîk bigihîje çareseriyê? Ev du pirsên girîng bi hemû tezebûna xwe ketine rojevê.

Piştî sala 1990î ku DYE bi tena serê xwe li cîhanê bû hêza yek qutbî li Rojhilata Navîn yekem car bi awayekî mezin dest pê kir xwe ceriband. Projeya Rojhilata Navîn a Mezin her roj dixe lêpirsînê. Cihê Kurdan di nav projeyê de yek ji mijarên girîng e. Dibe ku têkiliyên Kurdan, DYE û Îsraîlê hînê zêdetir stratejîk bibin. Divê bandorên vê yekê li ser herêmê baş werin fêmkirin. Hêja ye ku mirov guftûgo bike, ka gelo, li herêmê ji bo Kurdan demeke tijî îxanet dest pê dike, yan jî li herêmê wê bibin stêrkeke bilind dibin. Têkiliyên Kurdan ên navxweyî, bi dewlet û cîranên wan re yekem car stratejiyên herêmî pir kûr eleqeder dike. Em ketine pêvajoyekê têra xwe li ser têkiliyên Kurd-Ereb, Kurd-Îran, Kurd-Tirk serî tê êşandin.

Li aliyê din, gelo partî û tevgerên Kurd ên berpirsiyar ji bo rastiya Kurd têra jinûve avakirinê, çalakî û fikrê dikin; gelo

helwestên netewparêz ên paşverû, sosyalîzma reel û lîberal dikarin bersivê bidin roja me ya îro; gelo çawa dikarin xwe ji aliyê îdeolojîk ve nû bikin û hêza zêhnî bi dest bixin? Pêşengiya Kurdistana Iraqê wexta gavên hemû Kurdan û heta hemû gelên herêmê, dewletên wê eleqeder dike diavêje têra xwe bi berpirsiyarî tevdigere? Gelo, dikare karektera xwe ya ferdî îstîsmarker û berjewendîxwaziya teng a kevneşopiyê li dawî bihêle? Ji bo rê li ber felaketeke nû venekin kî û çawa dikare kîjan tedbîran bigire? Bêguman ev pirs hînê jî girîngiya xwe diparêzin. Pirsgirêk û rêyên çareseriyê yên li her parçeyê Kurdistanê ji nû ve dikevin rojevê û divê çareseriya qabîliyeta wê ya bi cih anînê hebe were hilberandin. Ji bo êşên hewce nakin zêde nebin, xebatên bi tesîr ên demokratîk ên girseyî girîng dibin. Ji her demê zêdetir girîng e ku bi uslûbeke nû ya polîtîk îhtimalên çareseriyê bêne nirxandin. Divê ev şêwazên çareseriyê gefan li sînoran nekin. Li her parçeyê Kurdistanê lêgerînên çareseriyê yên paşve nayên xistin di rojevê de ne.

Di van sî salên dawiyê de wek hêza pêşeng PKK serhatiyên wê girîngiya xwe diparêzin. Pirsgirêkên çepgiriya dunyayê di salên 1968 û 1990'î de jiya, tîna xwe da PKKê. Xeta partiyê ya di navbera sosyalîzma reel û rizgariya netewî de ji ber zextên giran ên ji der ve û ji ber kêmasiyên mezin ên hundurîn yekcar nekarî potansiyela xeta xwe nîşan bide û bi rêxistin bike. Bi pratîkeke nîv-gerîllatî û nîv-serhildêrtî rê li ber wendahiyên bê mane vekir. Her ku çû pratîkên komên asî, çetewarî û aware nirxên bi hewldanên mezin hatibûn afirandin qedandin û tasfiyeyeke fiîlî ferz kirin. Tevî hemû hewldanan, piştî sala 1995 PKK ji cewherê xwe yê rastîn veqetiyabû. Ezmûnên KADEK û KONGRA-GEL ji aliyê guhertinên teorîk, stratejîk û taktîk ve dihat maneya jinûve avakirinê. Avahiya kadroyên kevin ji bin vê yekê nekarî rabe. Keslandiya di cewherê xwe de bi parçebûnên berçav bi der da. Bi navê xwedîderketina li mîrateya erênî Jinûve Avakirina PKK'ê wek gaveke li dijî tasfiyekariya çepgir û rastgir hat fikirîn. Di demekê de ku Kurdistan ji her alî ve dikeve pêvajoyeke nû, hewce ye hemû bûyer berfireh werin analîzkirin, pêdiviya bi rexne-rexne lixwegirtinê û hewceyî ji nû ve bi destnîşankirina erk û wezîfeyan heye.

**A- Di civaka Kurd de hin xusûsiyetên cihêwaz**

**1- Têgînên Kurd, Kurdistanê û ji bo dîroka wê pêşnûmeyeke kurt**

Em xwexta Kurdan û komên din ên hindikayiyan wek civak û Kurdistanê wek welat bi nav dikin, pê re hin zehmetî derdikevin

holê. Li cografya Rojhilata Navîn têgîna welat bi gelek awayên curbecur tê kirin. Eger em ji serdema navîn dest pê bikin, tarîfên welat ên li ser hîmê dînî zêdetir in; wek Diyarê Îslam, Diyarê Kuffar. Li gorî qewm û etnîsîteyê jî cihêbûn hatine kirin, lê sînorên wê zêde zelal nînin. Dema sînorên komeke etnîk û qewm were pirsîn, bersivên bêne dayîn zelal nînin. Bi giştî cihûwarên mayînê yên eşîr û qewman têne diyarkirin. Li gorî pêkhatineke siyasî nînin. Pêkhatinên siyasî zêdetir bingehê wan bajar in. Ji lewra cografya wan a lê bi bandor jî bajar e. Cihûwarên eşîran jî zivistan havîn diguherin. Sînorên mulk ên xanedaniyên xurt jî ji maneyeke siyasî dûr in. Lê bi giştî sînorên Ereb, Tirk, Kurd, Fars û qewmên hînê di asta jêr de li gorî çand û zimanên dipeyivin, têne destnîşankirin.

Di bingehê têgîna Kurdistanê de peyva 'Kur' radizê û ev peyv bi koka xwe Sumerî ye. Di zimanê Sumerî de Kur tê maneya çiya yan jî koh. Daçeka 'tî' jî aîdiyetê îfade dike. Bi vî awayî gotina Kurtî tê maneya qewmê çiyayî. Em BZ dikarin heta 3000 salan paş ve biçin. Em li wir dibînin hinek navên din jî hatine bi karanîn. BZ di salên 1000 de cîranên wan ên başûr Lûwiyan ji herêma Kurdistanê re bi maneya 'welatê gundan' peyva Gondwana bi kar anîne. Gond di zimanê Kurdî de hînê jî wek gund tê bi kar anîn. Di dema serdestiya Asûriyan de peyva Naîrî bi maneya xelkê çem dihat xebitandin û heta em dizanin di navbera Dîcle-Zê de Federasyona Naîrî hatiye avakirin. Ji beşê wê yê berfireh re peyva welatê Med, Madaîn, Maden hatiye bi karanîn. Di demên serdestiya Asûran de BZ di navbera salên 1300-1600 de em dibînin ev peyv û nav bi awayekî berfireh hatine bi karanîn. Em peyva Ûrartû jî dikarin bi heman analîzê bibêjin çavkaniya wê Sumerî ye. Ûr bi maneya girikê bilind e. Mirov dikare bibêje ku Ûrartû tê maneya cihê bilind, welatê bilind û welatê zozanan. Ji ber ku Sumer li Mezopotamya Jêr diman timî navên bilindahiyê îfade bikin li zozanê Kurdistanê kirine. Peyva Hûrî jî bi îhtimaleke mezin ji heman çavkaniyê tê. Tê maneya xelkê welatê bilind. Yanî dîsa bi maneya qewmê çiyê ye. Komagenes bi koka xwe bi navkirineke Helenî ye. Qraliyeta Komagene BZ li derdora 250 û PZ sala 100 li Semsûra îro jiyaye. Peyva 'kom' hînê jî ji bo komên nîv-koçer û cihûwarê wan bi maneya zom tê bi karanîn. Peyva 'gene' jî bi maneya nijad, qebîle û eşîretê tê. Komagene tê maneya diyarê eşîrên nîv-koçer.

Di serdema navîn de, di dema serdestiya sultanên Ereb de peyva 'Beled el-Ekrad' bi maneya herêma Kurdan tê bi karanîn. Sultanên Selçûkiyan ku bi Farisî dipeyivîn, bi maneya îro ji bo diyarê Kurdan,

peyva Kurdistanê bi awayekî fermî yekem car wek xwediyê dewletê bi kar anîn. Pişt re sultanên Osmaniyan, nemaze bi dema sultan Yawûz Selîm re peyva hukûmetên Kurdistanê û eyaletên Kurdistanê pir tê bi karanîn. Bi Qanûnnameya Eraziyan a di sala 1848 û 1867 de eyaletên Kurdistanê fermî têne avakirin. Di demên Meşrûtiyetê de mebûstiyên Kurdistanê têne tesîskirin. Mistefa Kemal di salên 1920 de gelek beyan û talîmatên naveroka wan Kurd û Kurdistan, dane. Polîtîka înkarê, bi awayekî fermî zêdetir piştî tepisandina serhildanan bi polîtîkayên asîmîlasyonê pêş ketiye. Bi maneya welatê Kurd û Kurdan Kurdistan, belkî jî wek welat û xelkê herî kevin ê dîrokê xwedî cihekî cihêwaze ji bo navê wê were hildan. Lê em wexta ber bi roja me ya îro ve tên, ji maneya siyasî wêdetir bi maneya jeoçand tê bi karanîn. Bi biryardana ji bo damezrandina dewleta federe ya Kurdistana Iraqê, êdî peyva Kurdistanê wê bi maneya siyasî jî pirî caran derkeve pêşiya me. Ya girîngtir, bi bûyerên siyasî yên PKK'ê rê li ber wan vekir, Kurdistan ji peyvekê wêdetir wek têgîneke siyasî û civakî di qada navnetewî û herêmî de bi awayekî berfireh hatiye naskirin.

Kurdistan bi awayekî stratejîk qadeke 450 hezar kîlometirkare di navbera Fars, Azerî, Ereb û Tirkên Anatoliyayê de zevt dike. Li Rojhilata Navîn cografyayeke bi daristan, bi çiya, bi deştên xêrûber, çem û çavkaniyên avê ye. Ji bo heywan xwedîkirinê mêrg û çîmenên wê pir in. Erd û zeviyên wê ji bo her cure mêwe, pel, pincar û zad li cih in. Di dîrokê de şoreşa herî mezin a neolîtîk şoreşa cotkariyê (BZ 11.000-4.000) li navenda vê cografyayê pêk hatiye. Çavkanî û rêbuhurka şaristaniyan e. Ev rewşa wê ya stratejîk, derfet daye ku Kurd xwe weke qewm biparêzin, lê di warê şaristaniyê de - bi sedema rêbuhurbûn û dagirkeriyê - bûye sedem paş ve bimîne.

Ravekirin û tarîfa civaka Kurd hînê hêsantir e. Gelê Kurd û heywan xwedîkirin, cotkarî û çiya heman tişt in. Bajarîtî weke têgîn ji Kurdan dûr e, belkî jî gundîtî di dîrokê de rastiyeke civakî ye ku pêşiyên Kurdan pêk anîne. Kurd çendîn gundî û koçer bin, ew çend jî ji bajartiyê dûr in. Komagene pir baş rave dike ku nîv-gundîtî û nîv-koçertî nîzama tevgerê û cihûwarê hezar salan ê Kurdan e. Bajarên wan jî zêdetir dagirkeran ava û tijî kirine. Lê ev nayê wê maneyê ku Kurdan bajar ava nekirine û nebûne xwediyên şaristaniyê. Di serî de dewletên Ûrartû, Med û Mîtanî, tê zanîn ku bûne xwediyê gelek bajar û şaristaniyan. Di serdema navîn de têra xwe bajar û hukûmetên eyaletan ava kirine. Lê ji ber ku dewlet û hukûmetên ku ava kirine, temen dirêj nebûne, bajar zêdetir bûne biryargehên hêzên

dagirker û ji civakên hawîrdorê pêk hatine. Di serdemên seretayî de Sumer, Asûr, Aramî, Pers û Helen bandora mora xwe li ser berhemên çandî û nivîskî dixînin. Lê di serdema navîn de ziman û çanda Farisî û Erebî şopên xwe hîştine. Gelek rewşenbîr, dewletdar û fermandarî bi vî ziman û çanda cîran rol lîstine. Tevî ku çand û zimanê Kurdî hîm û kokek wê ya kevnare heye jî bi sedema pir hindik bûye zimanê nivîsê û nebûye zimanê dewletê, nekariye belge li dawiya xwe bihêle û pêş bikeve. Dîsa jî çanda Kurdî bi rêyên cuda, bi hebûna xwe ya etnîk a dijî û berhemên dîrokî heta roja me ya îro tê.

Çand û zimanê Kurdî, bi îhtimaleke xurt ku - gelek arkeolog vê dîtinê parve dikin - , wek çand û zimanê yekemîn şoreşa neolîtîkê li qûntara çiyayên Zagros-Torosê daye destpêkirin, bi demê re bingehê hemû çand û zimanên koka wan Hînd-Ewrûpiye, pêk aniye. Tê texmînkirin ku BZ ji salên 9000'î pê ve ne bi fizîkî, lê bi awayekî çandî li cografya Hînd-Ewrûpayê belav bûye. Em pêkhatina wê bi xwe jî dikarin BZ 15.000-10.000 bibin. Bi îhtimaleke mezin, bi derketina ji çaremîn serdema qeşayî (BZ 20.000-15.000) wek ziman û çanda herî otoktan -xwecih- pêk hatiye. Etnîsîteya Kurd BZ di salên 6000 de êdî pir cihêwaz dike. Em li ser dika dîrokê yekem car wan bi navê Hûriyan (BZ 3000-2000) dibînin. Sumerî li ser daristan û madenên xwe, nifşên Hûriyan jî bi dewlemendiya xwe ya şaristaniyê bi hezar salan bi têkoşîneke êrîş-parastinê li ber hev dane. Ev diyalektîka dîrokî bi Babîl, Asûr, Hîtît, Îskît, Pers û Helenan re dewam dike. Belkî jî ti qewm û nifşan bi qasî Kurdan di êrîşên beramber ê koçer û bicihbûyan de cih negirtiye. Ji bo şaristaniya Sumeran bigihîje Hîtît, Lûwî, Îon û Persan, rola Hûrî û Medan diyarker e. Ji ber vê rastiyê ye, ku gelên behsa wan tê kirin, nêz dûr ji koma çand û zimanê Hînd-Ewrûpa ne.

Di Dîroka Heredot de pir eşkere tê dîtin ku ziman û çanda bandora xwe li Helenan kiriye çavkaniya wê Medî ne. Helenî BZ heta salên 900-400'î pir zêde di bin tesîra Mediyan de jiyane. Gelek hêmanên çandî yên maddî û manewî di vê serdemê de ji çavkaniyên Ûrartû-Med-Persan wergirtine û bi senteza xwe dewlemend kirine. Tê texmînkirin ku pêşiyên Kurdan Hûrî (BZ 2500-1500) dîsa Mîtaniyên bi koka xwe Hûrî (BZ 1500-1250), Naîrî (BZ 1200-900), Ûrartûyî (BZ 900-600), Medî (BZ 700-550) di van deman de bi konfederasyonê eşîran û qraliyetan jiyane. Civaka Kurd a di vê demê de hiyarerşîk e û derbasî dewletê dibe. Mirov çav didêre ku nîzamekî xurt ê bavikanî danîne. Ji ber ku di serdema neolîtîk a cotkariyê de

jin hînê fonksiyonel e, di civaka Kurd de giraniya jinê heye. Îhtimaleke xurt e, jinê ev hêza xwe ya ku demeke dirêj bi kar aniye, bingehê wê şoreşa cotkariyê ye. Hêmanên mêbûnê yên di ziman de û kulta xwedawend Starê belge ne ku vê heqîqetê piştrast dikin.

Zerduştî BZ di salên 700-550 de wek şoreşeke zêhniyeta Kurd pêş ket. Zêhniyeta Zerduşt xwe dispêre cotkariyê; ji heywan pir hez dike, li ser hîmê wekheviya jin û mêr e, wek têgihîştineke exlaqî ya azad e. Ev çandek e, hem bi cihoka Persan diherike Rojhilat, hem jî bi cihoka Helenan diherike şaristaniya Rojava û bandoreke xurt li wan dike. Li ser xeta çanda Rojava-Rojhilat ji hev dibe, bandoreke xurt li ser herduyan jî dike û di şikilgirtina şaristaniyê de herî kêm bi qasî Mûsevîtî û Îseviyetê rola çavkanîbûnê lîstiye. Şaristaniya Persan, ya rastîn şaristaniyeke ku Medan ava kiriye û şaristaniyeke Med-Persan e, tevî nifşên Persan dewam kiriye. Di Dîroka Heredot de ev rastî pir eşkere xuya dike. Ji serî heta dawî etnîka duyemîn e, şirîkê împaratoriyê ye. Di dema Sasaniyan de jî heman rewş dewam dike. Di hemû şaristaniyên Îranê de eger mirov rola Kurdan di rêza duyemîn de bibîne, wê helwesteke realîst be.

Pêşiyên Kurdan di serdema seretayî de nîzama baviktiyê pir xurt dijîn, lê cihêbûyîna çînayetiyê bi heman kûrahiyê nejiyane. Tevî ku hiyarerşiya wan xurt bû, cihêbûna çînan qels bû. Ev yek ji bandora eşîrtiya koçeriyê ya li çiyan e. Komên eşîr-qebîleyan wek komên xizman di nava xwe de keys û firsend nadin pêşketina koletiyê. Jixwe koletî zêdetir berhemeke bajaran e. Di civaka Kurd de hêmanên folklorîk zêdetir destanwarî ne. Ji ber ku destan bi giranî qehremaniyê tînin ziman, bi îhtimaleke mezin ji serdema hiyarerşiyê mane. Kokên awazên di destana Mem û Zîn, Memê Alan û Derwêşê Evdî de heta muzîka Sumeran diçin. Dîsa îhtimaleke mezin e, bi cihoka Sumeran ji nifşên Hûriyan BZ di salên 4000 de digihîje me û afirêneriyek wan e. Nîzama muzîk û lîstikên Kurdan, li Rojhilata Navîn çanda herî zêde gurr û xwedî nirxê hunerî ye. Mirov hebûna dîrokî ya Kurdan herî zêde dikare di muzîk û govendên wan de bibîne. Dîsa mirov bi heman awayî dikare biçavdêriya li sekna jinê, di kinc lixwekirin û şêwazê wê de, di tenikahiya rûniştin û rabûna wê de bibîne. Esaleta nifşên Kurd çavkaniya wan serdema seretayî ye. Xwezaya tund a çiyan, berxwedana li dijî dagirkeriyên domdar û bêrehim, dîrokeke demdirêj di pêkhatina vê esaletê de xwedî roleke bingehîn e.

Em fêm dikin ku di ketina serdema navîn de dema Helenê şop hîştine. BZ di salên 3000'î de Abgara navenda wan Ûrfa,

Komageneya navenda xwe Semsûr Samosat û melîkiyeta Palmîra ya li Sûriyê xwediyê heman taybetiyane û di bin tesîrên xurt ên Helenê de ne. Ya rastîn, di dîrokê de yekemîn mînakên herî delal ên senteza Rojhilat-Rojava pêk anîne. Ev şaristaniyên ku heta fetha Romayê dewam kirin - herî dawî ketina Palmîra BZ di 269 de ye - qonaxa herî girîng a pêşketina li herêmê temsîl dikin. Berhemên dîrokî yên li Palmîra, Nemrûd û Ûrfayê ji wê demê mane. Ev şaristanî têkiliyek wan a zêde bi Kurdan re heye. Di wê demê de em dibînin ku du ziman Aramî û Helenî wek hevrikên hevdu derdikevin pêş. Li hemberî van şaristaniyên serdest ên zêdetir bi bazirganiyê re mijûl dibin, Kurd jî zêdetir bi cotkarî û koçertiyê hawîrdora xwe ava dikin. Berhemê vê nîzama heta roja me ya îro dewam dike, hene. Xerîbtiya navendên bajêr û Kurdîtiya gund û koçertiyê mîna dualîteyeke diyalektîkî ne.

PZ di serê sedsala 3. de împaratoriya Sasanî derket holê û di nav wê de jî giraniya Kurdan neguherî. Zerduştî bingehê îdeolojîk bû, xwe spartibûnê. Nûbûna wê ew e, PZ di salên 210-276 de Manî dike peyxember. Ji hemû dînan Manî dixwaze sentezekê biafirîne û pê zêhniyeta bingehîn a împaratoriya Sasanî û Romayê bihûne û pê re aştî û Ronesansekê pêk bîne. Lê li xezeba rahîbên Zerduşt ên muhafezekar diqewime û tê kuştin. Dîsa jî wek xeteke xurt a zêhniyetê heta roja me ya îro şopa xwe hîştiye. Belavbûna Xirîstiyaniyê jî li vê demê rast tê. Nemaze di ser Ûrfa û Nisêbînê re - Nîzîbîs - wek navendên xurt ên Xirîstiyaniyê bandorê li ser Kurdan dike. Hin cih dibin Xirîstiyan, lê hebûna Zerduştiyê li cem Sasaniyan serketineke tam a Xirîstiyaniyê asteng dike.

Em dikarin texmîn bikin ku avahiyên feodalîzmê li cem Kurdan di dema Sasaniyan de (PZ 216-652) pêş ketine. Mirov dikare Manîtiyê wek Îslama zû hatiye, binirxîne. Manî bi xwe Hz. Muhammedê zû hatiye dunyayê ye. Lê bandora şerên dijwar ên di navbera împaratoriya Sasanî û Romayê de - nemaze li ser xeta Amed-Nisêbînê - bi salan dewam dike. Berovajî dema Helenîstîk civak rûyê pêşketina rehetiyê nabîne. Di navbera Xirîstiyantî û Zerduştiyê de hevrikiyek bûye. Nestûrîtî ekoloke Xirîstiyaniyê ye, di bin bandora Sasaniyan de wek hevrikek tevgeriyaye. Xirîstiyantî nasnameya Sûryantiyê werdigire. Bi vî awayî Asûrî di vê demê de têra xwe bi liv û lebat dibin. Nexasim gelek xebatên qîmeta wan ya arşîve heye, kirine. Di belavbûna Îsewiyetê de ji Grekan zêdetir rol lîstine. Gelek pîskopos perwerde kirine û gîhandine. Texmîn tê kirin ku wêjeyeke xurt pêş xistine. Li Ûrfa, Nisêbîn û Sêrtê akademiyên

pêşketî ava kirine. Di avakirina navenda zanistê ya Gundî Şahpûr a Sasaniyan de para wan berçav e. Zimanê Aramî wek zimanê hevpar bandora xwe dewam dike. Grekî ber bi Rojava qada Bîzansan ve diçe, Aramî li Rojhilat dibe zimanê serdest ê bazirganî, wêje û dîn.

Em dikarin texmîn bikin ku Kurd di vê demê de (PZ 250-650) kevneşopiyên xwe yên feodal pêş de birine û di vî warî de civakê xwe veguheriye. Pêşketina feodalîzmê cihêbûna di avahiya etnîk de jî nîşan dide. Di civaka Kurd de tayên feodaltiyê her ku diçe xurt dibin. Di serdema pêşketina şaristaniya feodalîzmê de şoreşa Îslamê dikeve rojevê. Ya esas, Îslamiyet têkiliyên tund ên koletiyê û tayên etnîk ên li pêşiya pêşketinê kelem in li ser hîmê bajarbûnê vediguherîne û nîzamekî hînê pêşketî, civaka feodal li ser bingehê şoreşa zêhniyetê û îdeolojîk ava dike. Ya li Ewrûpa, Hînd û Çînê bi tekamuliyet û beridandinê pêk tê, li vir bi rêya şoreşê diqewime. Îslamiyet di şaristaniya Rojhilata Navîn de şoreşa herî mezin e. Hema hema heta sedsala 12. di pêşketina civaka feodal de rola avakirina polîtîk û îdeolojîk dilîze.

Bi hilweşîna Sasaniyan re (PZ 650) Îslamiyet di nava Kurdan de jî bi lez belav dibe û arîstokrasiyeke feodal diafirîne. Hêzên dewletparêz û hîyarerşîk ên Kurd di bin bandora Erebkirineke xurt de vediguherin û di vê demê de dibin yek ji komên herî xurt a siyasî û civakî. Bi Xanedaniya Eyûbiyan a Kurd (PZ 1175-1250) xanedaniya herî xurt a siyasî li Rojhilata Navîn pêk hatiye. Di nava Kurdan de jî têra xwe bi tesîr bûn e. Li aliyê din, sultantiya Selçûkiyan a ji Ebbasiyan PZ di 1055 de împaratorî wergirt, bi Kurdan re jiyaye. Hînê jî mîna li Kerkûkê ev jiyana hevpar bêyî şer derbas bûye. Dewletên feodal ên bi koka xwe Kurd mîna Şeddadî, Kurên Buveyh û Merwanî (PZ 990-1090) pêşketine. Her weha gelek begtî û hukûmetên Kurd hatine avakirin. Kurên Şerefxan ên navenda wan Bedlîs bû, begtiya herî demdirêj ava kirine. Vê begtiyê heta dema sultan Qanûnî Silêman hebûna xwe dewam kiriye. Taybetiyên civaka feodal rê li ber veguherîneke girîng a zêhniyeta civaka Kurd vekirine. Şop û bermahiyên Zerduştiyê ji bilî li cem Zerdeştiyan - Yêzîdiyan - tine bûne. Bi îhtimaleke mezin ev guherîn di pêşketina hevkarên Kurd de xwedî roleke dijşoreşê ye.

Li bajarên dibin misilman, zimanê Erebî bi tesîr e, lê dîsa jî di çand û zimanê Kurdî de paşketin nîne. Yekemîn tomarkerê destanan bi awayekî nivîskî wek Ehmedê Xanî di vê demê de derketine holê. Çanda bi Îslamê nuxumandî, mîna li cem her koma etnîk hatiye dîtin, li cem Kurdan jî pir kûr rehên xwe berdane. Tevî vê yekê li Başûrê

Kurdistanê bi eşîrên Ereban re - nemaze bi Şemmeran re heta roja me ya îro - şer timî dewam kiriye. Destana Derwêşê Evdî destana van şeran e. Ev destanek e, şopên xurt ên çanda Kurd nîşan dide û di koka xwe ya Zerdeştiyê de israr dike. Tê texmînkirin ku di sedsala 18. de qewimiye. Di nav Îslamê de Zerdeştîtî mîna çandeke têkoşer û berxwedanê ye. Berxwedaneke resen û esîl a çanda Kurd e, li dijî biyanîbûn û xerîbketinê. Elewîtiya qels û xwe bi Îslamiyetê nuxumandiye û alîgiriya Hz. Elî dike, piştî Zerdeştiyê çanda Kurd a herî têkoşer e, mîna Şîatiya Kurd be. Li beramberî vê yekê, nemaze Kurdên Başûr ên nêzî deştê bi baweriya Îslamê ya Sunnî dibin xwedî karektereke hevkar û paşverû. Ev derdorên xwedî zêhniyeta bazirgan-feodal çanda nifşên xwe înkar dike, nûnerên vê zêhniyetê ku li herêmên nêzî Ûrfa, Mêrdîn û bajarê Sêrtê di nav îxaneteke super de ne. Pir bi awayekî seyr û ecêb, hevkar in û berjewendîperest in. Kurdên di bin bandora Îranê de hînê kêmtir xira bûne. Cewherê xwe yê netewî hînê bi awayekî otantîk diparêzin.

Di vê demê de têkiliyeke girîng di navbera dewlet û nifşên etnîk ên Tirk-Kurd de ne. Ji şer dûr in, bi bandor Bîzansan jî piştgiriya hevdu dikin û di nav têkiliyên dostane de ne. Xirîstiyantiya Ermenî û Suryaniyan jî di vê yekê de roleke girîng lîstine. Şerê Melazgirê yê 1071'ê di cewherê xwe de şereke ku xwe dispêre îttîfaqa Kurd-Tirkan. Eger sultan Alparslan xwe ne spartibûya Kurdan, mumkîn nebû bûbûya xwediyê serketinê. Di vê demê de eşîrên Tirkmenan ên di nav nifş û çanda Kurdî ya bi cihbûyî de, li asîmîlasyoneke girîng qewimîne. Vê pêvajoya heta dawiya sedsala 19. dewam kir, bi komarê re berovajî dageriya.

Kurdên bi tevahî dikevin bin bandora çanda feodal a serdema navîn, çendîn çînîbûyîna feodal dijîn ew çend di jiyana azad de paş ve dikevin. Koletiya feodal timî li dijî azadiya eşîrtiyê pêş ketiye û di xerîbketina zêhnî de qonaxeke girîng pêk tîne. Tevî gelek rewşenbîrên Îslamê yê Kurd gihîştine jî, ji ber meylên dewletê yên hevkar nekarîne bandoreke mayînde bikin. Di serê pesindar û hevkarên dewletê de Îdrîsê Bedlîsî tê. Li Çewlîkê di hilbijartinên herêmî yên herî dawî sala 2004'ê de komeke koka wan terîqeta Neqşîbendî - terîqeta Şêx Seîd - sloganeke pir balkêş qiriyane wek "Îdrîs-î Bedlîsî li vir e, Yawûz Selîm li ku ye?" Mirov dikare li bendê be ku serokwezîr Erdogan rola Yawûzekî duyemîn bilîze. Eger îxaneta Neqşîbendiyê bi tevahî li Kurdistanê neyê nirxandin şensê şoreşa rohnîbûnê nîne. Li beramberî vê, rohnîbûna Elewiyên bi koka xwe Kurd hînê erênî bûye. Em wexta bandora dînamîkên dîrokî li ser

mezheb û terîqetên îro lêkolîn bikin, em dikarin gelek tiştan hîn bibin û bigihîjin encaman. Ev derdor rohnîbûyîna komarê bi 'kemalîzmê' gunehbar dikin û bawer dikin ku wê bi vî awayî rûyê xwe yê kirêt di nav gelê Kurd de veşêrin. Heta paşverûtî û berjewendîperestiya nuxumandî ya gelek terîqetên bi koka xwe sunnî, neyên teşxîs û teşhîrkirin, wê welatparêzî û demokratiyeke têkûz a Kurd pêş nekeve.

Şaristaniya Îslamê ji sedsala 13. û pêve di hundur de bi girtina deriyên îçtîhadê, ji der ve bi êrîşên Moxolan û di bin seferên Xaçperestan de êdî bi ser xwe ve nehat û ket pêvajoya rawestîn û paşveçûnê. Heta sedsala 13. li ser navê şaristaniya Rojhilat alîkariya şaristaniya Ewrûpayê kiriye ku Ewrûpayê gavên xwe yekemîn diavêtin, pişt re ket pêvajoya rawestînê (PZ 1200-1500) û pêvajoya paşveçûnê (PZ 1500-1918) ji aliyê Osmaniyan ve bi zehmetî hatiye meşandin. Her çend dema Osmaniyan li dijî Rojava ya mezin dibû xweparastina dawî be jî sîstema wê ya ji aliyê îdeolojîk, polîtîk û aborî ve paşvemayî pêşî li serketina wê girt û nekarî hilweşîna wê asteng bike.

Çînên serdest ên Kurdan, bi giştî bi dema Yawûz re di nav împaratoriya Osmaniyan de bi otonomiyên xweser û berfireh destekdarên herî nêz bûn. Ev rewşa heta serê sedsala 19. dewam kir, ji sedsala 19. û pêve bi hatina herêmê ya mêtingeriya Rojava, xira bû. Di vê yekê de rêveberiya navendî ya qelsbûyî û polîtîka zêde bac û esker berhevkirinê jî roleke diyarker dilîze. Dostanî û piştgirî cihê xwe ji serhildanan re dihêle.

Ji sedsala 19. û pêve civak û dîroka Kurd dikeve qonaxeke nû. Têkiliyên ku bi Osmaniyan re xirabûne rê li ber serhildanan vedikin. Mîsyonerên Îngilîz û Fransî jî bandorê li dêrên Ermenî û Suryaniyan dikin ji bo cihêtîxwaziyê bikin û bi vê yekê rê li ber tevlîheviyekê vedikin. Têkiliyên di navbera Ermenî, Asûrî û Kurdan de jî xira dibin. Ji ber ku hem têkiliyên wan hemû di nava xwe de xira dibin û hemû têkiliyên wan bi rêveberiya Osmaniyan re têk diçin, ev dibe sedem di dîroka wan de rûpelekî bi keser û xemgîr vebe. Ev pêvajoya di sala 1918 de piştî şerê cîhanê yê yekemîn destpêkir, bi giranî ji aliyê çand û fizîkî ve bi tasfiyekirina Ermenî û Suryaniyan bi encam bû. Têkiliyên Kurd û Tirkan tevî ku pir zirar dîtin jî di asta yê Ermenî û Suryaniyan de qut nebûn. Ji lewra şerê rizgariya netewî yê di sala 1920 de bi hev re meşandine. Sêyemîn hevkarî û hevpariyeke mezin a stratejîk mîna bi Alparslan û Yawûz re pêk anîne. Dîrok pir baş şahid e ku eger mîna rola Kurdan a di serketina

Alparslan a 1071 de, ya di serketina Yawûz Selîm a 1514 de li dijî Sefewiyan û di serketina 1516 û 1517 de li dijî Memlûkiyên Misrê nebûya, qewmên Tirk wê nikarîbûna Anatolî fetih bikarana û wê împaratoriya Osmaniyan nekarîbûya li rojava û rojhilat belav bibûya.

Vê trenda dîrokî heta salên 1920 dewam kiriye. Sêyemîn hevpariya stratejîk karîbûye pêşî li belavbûna emperyalîst bigire û firsendê bide serketina şoreşa komarê. Lê ji ber ku tebeqeya jor a Kurd a feodal ku bi awayekî kevneşopî hînî hevkariyê bûye, bi sedema komarê şaş dinirxîne û pir bi hêsayî bi niyetên emperyalîzmê dixape, serî hildidin û ev yek jî dibe sebeb ku sazûmankarên komarê polîtîkayên xwe biguherînin. Kurd-Tirk bi hev re ji projeyên azadiyê dadigerin û ev yek di dîroka wan de dibe sedem pêvajoyeke pir neyînî bijîn. Bi vê têkçûna stratejiya têkiliyên Kurd-Tirk, înkarkirina Kurdan, paşvehîştina wan, asîmîlasyona bi darê zorê dest pê kiriye û kiriye ku bi tevahî Kurd li derveyî sîstemê werin hîştin. Çendîn bûne Tirk ew çend jî hatine qebûlkirin. Vê yekê polîtîka hînê kûr kirine. Di salên 1970 de li tevahiya dunyayê tevgereke rohnîbûnê hebû, polîtîkayên bi ser rastiya Kurd û Kurdistanê de mîna ewrekî reş tarî girt, rê li ber tevgereke nû ya rewşenbîr a Kurd vekir û pişt re di şexsê PKK'ê de pêvajoyeke berxwedanê ya eskerî û siyasî dest pê kir. Bi vê re, di têkiliyên Kurd-Tirkan de pir êş û şer bû, lê gav hatiye avêtin pêvajoyeke bi şeref.

**2- Li ser Kurdistanê têkoşîn, şer û teror**

Belkî jî rewşa jeoçand û stratejîk a Kurdistanê bûye sedem ku di dîrokê de bibe welatê herî zêde li ser têkoşîn were meşandin, teror - dijwariya ji bo mirovan bi tirsê rêve bibe - û şer were kirin. Piştî çaremîn serdema qeşayiyê (pleîstosen), çanda mezolotîk a li derdora 20 hezar sal berê, pişt re jî çanda neolîtîk (cotkarî û heywan kedîkirin) li herêma navendî ya pêşket - li derdora 12 hezar sal berê - tê texmînkirin herêma îro Kurdistan e. Me sedemên vê yekê di mijarên curbecur de diyar kirin. Ji ber ku bûye navenda çanda herî zêde ya serdema Mezolîtîk û Neolotîk lê pêş ketiye, ji her çar doran komên çanda seretayî dijîn - mirovên dema paleolîtîk - timî berê xwe didin vê herêmê. Piştî pel û pincar berhevkirinê, cotkarî dest pê dike, pê re berhem zêde dibe û heye ku ev yek bi xwe re şêniyên li herêmê zêde dike. Belgeyên dîrokî eşkere nîşan didin ku di van deman de li herêmê şênî pir bûne. Bi awayekî asayî, ev rewş dikare car caran rê li ber şerên li ser zeviyên bi bereket, heywan û nebatan, veke. Îhtimaleke xurt e, şerên bi vê şêwazê yên naveroka wan civakî û

aborî pêk hatibin. Dîsa belgeyên di dest de nîşan didin ku ji wê demê hin xirbeyên gundan mane.

Têra xwe mirov dide fikirandin ku di dîrokê de yekemîn têkoşîna ekonomîk û civakî ya berfireh, bi sedemên ravekirina wan mumkîn e, li ser Kurdistanê diqewimin. Bi qasî ku ji tevgerên şêniyan tê fêmkirin, ji başûr Erebîstana îro û ji Efrîka Bakur, ji rojhilat Îranê û hînê rojhilatê wê, ji bakur Kafkasan û rojavayê Anatolyayê komên curbecur berê xwe didin herêmê. Mîna ku îro çawa mirov berê xwe didin Ewrûpa û bakurê Emerîkayê, di dîrokê de yekem car refên mirovan ên bi armancên aborî û civakî berê xwe didan Kurdistana îro ku ji bo mirovatiyê li derdora tevahiya 15 hezar salan rola 'Welatê Rojê' bi cih anî. Bêguman eger welatek ev çend demeke dirêj rola welatê rojê bilîze, wê bibe sedem ku li ser, şerên mezin û xwelihevrakişandin bibin. Piştî ku çanda Neolîtîk a li derdora neh hezar sal berê baş tê pejirandin, tevgereke şêniyan a berovajî dibe. Li gorî agahiyên di dest de hene, em wexta diçin heft hezar sal berê, em dibînin çanda neolîtîk hem fizîkî - tevî mirovên xwe - hem jî çandî - tenê bandor - ji Okyanûsa Atlas heta peravên Çîn Pasîfîk, li bakur heta Sibîryayê, li başûr heta Bakurê Efrîkayê belav dibe. Bi vî awayî wek berê zêde kes berê xwe nade navenda cihê derketina çanda neolîtîkê.

Tê texmînkirin ku li derdora heft-pênc hezar sal (BZ 5000-3000) berê li ser Kurdistanê koma çand û zimanê Aryen reng werdigire, ji civaka klan û qebîleyê derbasî civaka eşîrtiyê dibe. Civata eşîrtiyê bi xwe re hînê zêde koma mirovan a baş hatiye bi rêxistinkirin û çalakiyê tîne. Civatên klan û qebîleyê zêdetir ji 20-50 kesî pêk tên, lê civaka eşîrtiyê bi sedan kesî organîze dike. Ev rewş nîşan dide ku eger pirsgirêkên aborî û civakî dijwar bibin, têkoşîna di nava komên eşîrê de jî dikare gurr bibe. Hin daneyên arkeolojîk ên ji vê serdemê mane - hin gundên bi tevahî hilweşiyayî - didin nîşan ku ev zêdetir ji ber pirsgirêkên navxweyî ne. Li ser çem û erdên bi bereket şênî zêde dibin û çavnebariya cîranan ji sedemên aborî yên şer in. Em dikarin texmîn bikin ku di encama van şeran de sînorê hin eşîran çêbûne. Di vê çarçoveyê de îhtimal heye ku em kokên herêmên eşîran bibin BZ 4000 salan. Çandiniyên hevpar ên mulkên eşîrane û sînorên zozanan ji hev têne kirin. Dîsa em dikarin texmîn bikin ku ziman û zaravayên xweser ên eşîran û çandeke curbecur pêş dikeve. Yekemîn livên govendê û awazên muzîkê, kulta perestinê reng werdigirin. Gelek peykerên vê serdemê yên fîgurên jinê ne, giraniya çanda malbat-

dayikê îfade dike. Em vê demê dikarin wek naverok civakî û têkoşîneke armancên wê aborî, tarîf bikin.

Dema BZ 3000-2330, derketin û temambûna şaristaniya Sumer a Mezopotamya Jêr îfade dike. Têkoşîn gihîştine asta şer. Di dîroka mirovatiyê de yekem car nirxên aborî bi hêzeke eskerî ya berê hatiye plankirin bi darê zorê têne desteserkirin û talankirin. Ev kevneşopî bi vî awayî di dîroka mirov de cih digire. Hêza şer-îqtîdarê di cewherê xwe de hêzeke talanê ye. Li pişt sifetên xwedayetî, pîroztî û qehremantiyê talan û desteserkirin veşartî ne.

Kurdistan yek ji çavkaniyên bingehîn ên derketina vê şaristaniyê ye. Yekemîn destana nivîskî ya hemû mirovatiyê û şaristaniya Sumer Destana Gilgamêş sefereke talanê ya bi ser Kurdistanê kiriye çîrok û çîvanok. Ji yekemîn qral û nîv-qehremanên bajarê Ûrûkê Gilgamêş bi rêya jina fahîşe ya sembola şaristaniya bajêr e, bi alîkariya barbarekî bi navê Enkîdo ji bo talanê berê xwe dide Kurdistanê. Ya esas, Enkîdo ji çiyê dadikeve bajêr bi hêza serdest re li dijî qewmê çiyê 'Kurtiyan' hevkariyê dike. Ew yekemîn mînaka hevkariyê temsîl dike. Ji bo dagirkirina welatê xwe pêşengiyê dike. Di berdêla vê yekê de li ser sifreya qral-dewlet hînî jiyana têr xwarin û jinan tê kirin. Biwêja "Kurd çi ji cejnê fêm dike, xulp xulp dew vedixwe" çavkaniya wê ji van deman e. Belkî Gilgamêş bi xwe jî ji qewmê çiyê be. Ji ber ku Gilgamêş tê maneya 'camûsê mezin', 'zilamê mîna gayekî'. Tesaduf nîne ku dîroka Kurdistanê bi van xayînan tijî ye. Sumerî pir zêde hewceyî bi keresteyên daristanan, kevirên verotinê û madenan hebû, ji lewra tim û tim berê seferên wan li bakur bûn. Ya rastîn, şerên îro em di krîza Iraqê de dibînin, mêjûya rabirdû pir bi kurtî û awayekî xulase nîşanî me didin.

Hêzên şaristaniyê yekem car tevlî pêvajoya talan, dagirkirin û îstilaya li ser Kurdistanê bûn û vê yekê rengê bûyeran guhert. Talana hêzên dewletbûyî li ser civakên etnîk ên klan, qebîle û eşîran dibin seferên kolekirinê. Têkoşînên di demên berê de ji bo xweparastinê, zevtkirina çeman û erdên bi bereket bû, lê di dema şaristaniyê de têkoşîn di serî de bi armanca kolekirin û talanê tê kirin. ædî mirov bi awayekî bi plan tê kuştin û êsîrkirin. Her weha heye ku hatina herêmê ya ji çar aliyan û birina çandê ya der ve dewam dikin. Berhemên arkeolojîk ên ji Hûriyan mane, şer û têkoşînên civakî rohnî dikin. Nîzamê wan ê parastinê, çîrokên wan yên qehremaniyê, hebûna têkoşîn û şeran îspat in. BZ di salên 2000 de timî ji Îran, Kafkasan, Anatolê û Erebîstanê komên dagirker êrîşî herêmê dikin. Bircên bajêr ên Sumeran û kelehên Hûriyan bi armanca parastinê

hatine lêkirin. Ji ber ku çiyayên bilind jî rola beden û kelehan dilîzin, pir bi awayekî xweza xwe avêtine bextên wan. Ji lewra mirov dikare bibêje çiya baregehên parastina etnîka Kurd in. Pêşiyên Kurdan li dijî dagirkerî, talan û xirabiyên ji çar aliyan ve bi ser wan de dihatin ji bo xwe biparêzin çiyayên li seranserî Kurdistanê ji xwe re mîna beden û kelehên xwezayî kirine mesken û cihê sitarê. Dûr nêz bi sedema vê rastiya dîrokî zêde nekarîn li deştan şaristaniyê pêş bixînin. Ji lewra çiya û Kurd heman tiştî îfade dikin.

Em BZ di demên 2000-1000 de dibînin li dagirkeriyên ser Kurdistanê hin hêmanên nû beşdar dibin. Qraliyeta Hîtît a li Anatoliya Navîn tê damezrandin û Îskîtên li Kafkasan ku wek barbar têne bi navkirin, hem li dijî şaristaniya Hûrî-Mîtanê, hem jî hînê li Başûr li dijî bajarên dewlemend ên Babîl û Asûran pêvajoyeke dagirkirinê didin destpêkirin. Dîsa jî yên herî tengav dibin komên ku pêşiyên Kurdan e. Ji ber ku berê tenê ji Başûr dewletên Sumer-Babîl-Asûr êrîş dikirin, lê li van êrîşan ji bakur êrîşên dewleta Hîtît û gelek komên şerûd ên barbar ên Îskîtan jî zêde dibin. Ji Îranê qebîleyên Pers û ji rojava jî komên etnîk ên Lûwiyan beşdarî van êrîşên tengavkirinê dibin. Ji ber ku Kurd û Kurdistan li qadeke dewlemendiyê diafirîne, hem jî derbasoka şaristaniyên nû têne avakirine, tam dualîteyekê teşkîl dike. Ji bo karibin bijîn hem li ber xwe didin, hem jî hevkariyê dikin. Berxwedan û hevkarî bi hev re pêş dikevin. Tebeqeya jor a hiyarerşîk timî serî li rêya hevkariyê dide, lê beşên li jêr timî li ber xwe didin û têdikoşin.

Begîtiyeke Kurd di belgeyên nivîskî de BZ di salên 1600 de (muhtemel li Elbîstana îro hatiye avakirin) weha bang li sazûmankarê yekemîn ê Hîtîtan prens Anîta dike; "Kuro rezîl, me tu mezin kirî, tu li wir kirî beg, ne ji bo tu keriyên xwe yên şer bînî ser sînorên me û her roj me bêzar bikî, hêjayî sozên xwe be." Em ji van gotinên nivîskî wer fêm dikin ku Qraliyeta Hîtît a di bin tesîra Hûriyan de pêk hatiye, êdî hêdî hêdî mezin dibe û ji bo qewmên Hûrî-Mîtanyan dibin xeter û tehlûke. Dîsa qralê navdar ê Hîtîtan Şûpîlûlîûmma ji qralê Mîtaniyan Matîwaza re welê dibêje (BZ li derdora 1300an): "Ez qîza xwe didim te, êdî tu kurê min tê hesibandin. Careke din isyan neke. Nerehetiyê çêneke. Li welatê xwe yê xweş li kêfa xwe binere. Ez li pişta te me." Tevî şerên di navbera wan de diqewimin, em dibînin çawa bi zewacên siyasî aştî û xizimtiyê datînin.

Di vê demê de hêza xeternak a Asûran derdikeve holê, ji lewra hewceyî bi hevgirtina Hîtît-Mîtaniyan çêdibe. Ya hînê balkêştir ew e

ku melîkeya navdar a Misrê Nefertîtî ji Mîtaniyan e. BZ li derdora salên 1500 demeke bi liv û lebat a dîrokê ye, em dibînin bi qasî peymanên siyasî û dîplomatîk şerên dijwar jî diqewimin. BZ di salên 1596 de Babîla navdar bi şirîkatiya Hîtît û Hûriyan tê dagirkirin. Şer û aştiya navdar a Kadeşê tê texmînkirin ku BZ li derdora 1280 pêk hatiye. Tê texmînkirin ku Hz. Îbrahîm ji Nemrûdê Ûrfayê di salên 1650, Mûsa jî ji Fîrewnê Misrê BZ di salên 1300 de reviyaye. Hemûrabiyê navdar BZ di 1750 de jiyaye. Di van deman de ku sedsalên şer û aştiyêne navend Kurdistan e. Kurdistan welatek e, şer ji ser kêm nabe.

Dema BZ li derdora 1000-330'î, ji bo şaristaniyên navenda wan Mezopotamya dibe qonaxeke mezin a dawî. Wek hêza diyarker a dîrokê împaratoriya Asûr li ser sahneyê ye. Di hevrikiya navbera Babîl-Nînowa de pêşengî dikeve destê Nînowayê. Asûrmar bi çavsoriya xwe ya li dijî cîranên xwe navdar dibe. Gotinên mîna "ji serê mirovan dîwar lêkirin, birc û beden avakirin" taybetî û navekî din ê împaratoriya Asûr in. Seferên şer ên herî bêrehim li nava Kurdistanê, li dijî Sûriye û Misrê têne kirin. Bandora xwe heta rojavayê Anatolyayê belav dikin. Di vê demê de Hîtît - BZ di salên 1200 de ji aliyê Frîgyayên bi koka xwe Trakyayî - têne belavkirin, di şûnê de li başûrê Torosê qraliyetên piçûk ên bajaran têne avakirin. Li Kurdistana îro li herêma Botanê berê konfederasyona Naîrî (bi maneya nehîr-şet e) - texmînî BZ di salên 1200-900 - û paşê bi belavbûna wê re dewleta Ûrartû (BZ 875-606) tê avakirin. Asûrî pir dijwar êrîşan dibin ser dewlet û begtiyên piştî Hîtîtan hatine avakirin. Di serî de fîgurên li ser keviran hatine verotin, gelek bermahî dîmenên şer zindî dikin. Di şeran de serjêkirin û hilkirina serê mirovan dibe pir rêbazeke normal. Dîsa ji sedemên herî girîng ên şeran, kereste, maden û zevtkirina rêyên bazirganiyê ne. Ûrartûyan karîbûne van êrîşan rawestînin. Xuya ye di xweparastin û bergiriyê de serketî bûne.

Di vê demê de hînê li rojhilat Med, li Kurdistana Îranê ya îro ji mînaka Ûrartûyan sûd werdigirin û hebûna xwe bi hêz dikin. Dizanin hewce ne ku hebûna xwe ya siyasî xurt bikin û ji bo vê yekê jî li dijî seferên Asûriyan ên rojhilat radiwestin û bi vî awayî pişta xwe qewî dikin. Ya rastîn, di dîrokê de 300 salên navdar ên berxwedan û amadekariyê, xurtbûna Ûrartûyan û dema wan îfade dike. Têkbirina Asûriyan, wek îro Iraqî DYE têk bibin. Ji lewra amadekariyên xurt û taktîkên nû hewce dikin. Di dawiyê de fermandarê Medan ê navdar Keyakser tevî muttefîkê xwe yê Babîlî Nabûkadnezar Nînowayê

hildiweşînin û dawî li hebûna wê tînin. Medên BZ di salên 612 de derketin ser dika dîrokê, karîbûn avahiyeke siyasî a nêzî împaratoriyê (texmînî BZ 715-550) li Ekbatanê - Hemedana îro - pêk bînin. Di vê pêkhatinê de xusûsiyet û taybetiyên Kurdayetiyê xurt in. Ji bakur êrîşên Îskîtan, ji başûr û rojhilat jî êrîşên qewmên xizim ên Persan bi hêzbûna wan asteng kir. Îxaneta fermandarê navdar Harpagos û hevkariya wî bi Persan re, bû sedem hêza îqtîdarê bikeve destê biraziyê Qralê Medan Kîros yanî destê hiyarerşiya qebîleyên Persan.

Împaratoriya Persan dewama Medan e. Mîna ku dewleteke hevpar be. Dîsa jî bi piranî navenda şer di bin dagirkeriya Îskît de Kurdistan e. Mirina Kîros bi xwe jî di şerekî li ser axa Kurdistanê de pêk tê. Bi sedema êrîşên barbar ên ji bakur tên, împaratorî wek herêmeke ewle ber bi Başûr-rojavayê Medyayê ve dişemite. Darîûs (Darayê Mezin; BZ 520-485) sefereke mezin dibe ser Îskîtan ji bo vê belayê ji kokê ve bi dawî bike. Seranserî Anatoliyayê ji du sed salî zêdetir (BZ 530-330) di destê Med-Persan de şekil werdigire. Li gorî rêzê hebûna siyasî ya Frîgya, Lîdya û Lîkyayê bi dawî dikin û li hemû peravên Egeyê bajarên têne damezrandin digirin bin destê xwe. Mirov dikare bibêje; Kurdistan (Medya) di vê demê de li ser rêya şaristaniyê digihîje jiyaneke bi aram. Bi sedema xurtbûna malbata bavikanî, tevna xurt a eşîrên medan, ew di nav artêşa Persan de jî dikir xwedî cihekî cihêwaz. Bi zevtkirina Misrê jî (BZ 525) navenda bingehîn a şaristaniyê dibe herêmên Med û Persan. Babîl bi statuyeke nîv-hewce paytextbûna xwe ya çandî ji bo şaristaniyê dewam dike.

Dîrok nîşan dide ku arîstokrasiya Helen û Makedon dibe xwedî arzûyekê, dixwaze Anatolyayê bi tevahî zevt bikin, dawî li tehlûkebûna Med-Persan bînin û bi vî awayî dest deynin ser dewlemendiya berê hîç nedîtine. Bi şev û rojan xeyala vê yekê datînin û guftûgoyên wê yên siyasî dimeşînin. Hemû hemfikir in ku di vî warî de serketin karekî mezin ê îlahî ye. Mutefekîrê mezin Arîsto (BZ 385-320) vê bîr û baweriyê dixe serê şagirtê xwe Îskenderê Mezin ku kurê qralê Makedonî Filîpos e. Bi îhtimaleke mezin, Arîsto xistiye serê Îskenderê Mezin ku ji bo mirovên Rojhilat mîna heywanan bibîne û bawer bike mîna moriyan pelixandin heq kirine. Îskender di vê hewayê de li ber destê mamosteyê xwe perwerde dibe û ji ber ku bavê wî tê kuştin di temenekî ciwan de şûna wî digire. Îskender di destpêkê de yekîtiya Helen pêk tîne û paşê nifşên Makedoniyan li dora xwe dicivîne û seferên xwe yên

Rojhilat ên pêvajoya dîrokê biguherine dide destpêkirin. Mîna Îskenderê Mezin bersiva Darîûsê Mezin dide. Wek tê zanîn, bi seferên xwe yên mîna brûskê, mirov mîna moriyan di bin pê xwe de pelixandin û ta Hindistanê çemê Ganjê çû. Cihekî zevt neke nahêle. Şerê wî yê herî navdar li Gavgemala (BZ 331) li derdora Hewlêra îro li Arbelayê diqewime. Împaratoriya Persan di nav şerê mezin de dikeve. Wexta vedigere paytexta çandê ya wê demê bajarê Babîlê, li gorî nav û dengê xwe xebatên xwe dewam dike. Wek sembola senteza Rojava-Rojhilat deh hezar şervanên Balkanî û deh hezar keçên esîlzade yên Med û Persan bi yek carê bi hev re dizewicîne. Keça qral Darûsê III. ku têk dibe ji xwe re dihêle. Hînê xwe amade dikir êrîşê bibe ser Komara Roma ya li rojava hildihat, ji kelmêşên çiravê mîkrop wergirt û bi nexweşiya tayê di temenekî pir ciwan de mir.

Li Kurdistanê şopên Îskender pir in. Navê Bedlîsê ji fermandarên wî Ballîs ma ye. Mirov dikare bibêje mîna gerîlla di çiyayên Zagrosê re derbas bûye. Dikare were gotin; Îskender di eskertiyê de nîv-xwedayek bû. Bi van seferan Kurdistan bi dualîteyeke nû re asê û tengav dibe. Kurdistan dibe navenda şerên navdar ên Rojhilat-Rojava. Li Îranê piştî Persan împaratoriya Partan a tê avakirin (BZ 250-216) û qraliyetên Helen ên piştî Îskender jî ava dibin, navenda şerê wan dîsa Kurdistan e. Qraliyetên Ermeniyan jî dikevin pêvajoyê. Mafê fetihkirinê wek bingehê gelan be her tim dest diguherîne. Peravên Dîcle-Firatê bi kelehan tijî dibe. Hemû bajar bi birc û kelehên xwe di rewşa parastinê de ne. Dîsa jî di dema qraliyetên Helen de qraliyeta Komagene (navend Samsat), Abgar (navend Ûrfa) û Palmîra (navend Palmyra) qîmeta wan zêde dibin. Berhemên neqane yên senteza Rojava-Rojhilat diafirînin. Dem ji aliyê zêhniyetê ve hem ji berê û hem jî ji paşê cuda ye. Mirov dikare wek demeke rohnî ya şaristaniyê binirxîne. Bandora Îran (Part) û Helen di zikhev de dimeşe. Danûstendina çandê bi qasî ya bazirganiyê geş û zindî ye.

Piştî Hz. Îsa şagirtên wî yên ji terora Romayê reviyan, rawestgehên wan ên yekemîn dîsa herêmên mîna deriyên Kurdistanê bajarên Antakya, Ûrfa û Nisêbînê ne. Mirov dikare bibêje, demek dest pê dike, terora dînî û siyasî digihîje qonaxeke nû. Împaratoriya Romayê herî dereng PZ di salên 50 de hemû Anatolya, Sûriye, Îsraîl û Lubnan zevt kiriye û peravên Firatê derbas kirine. Piştî ku Îsa li çarmîxê tê xistin, komên Xirîstiyaniyê ku nû derdikevin, xwe dispêrin berqefên çiyan, şikeft, stargehên binerdê û çolan. Dem û

jiyaneke nîv-veşartî dimeşe. Terora siyasî, belkî jî yekem car li ser bawermendên Xirîstiyaniyê tê ceribandin. Ji ber vê, çiyayên Kurdistanê dibin navendên yekemîn ên star û xweparastinê. Împaratoriya Romayê ya hemû qraliyetên Helen zevt kirine êdî xwe spartiye sînorên împaratoriya Part. Fermandarê navdar ê Romayê Crasûs wexta mirî tê zevtkirin (PZ di salên 50 de) Part û Ermen ji kêfa re cejnê dikin. Serê Crasûs bi rojan tê teşhîrkirin. Cih dîsa bajarê Kurdistanê Ktesîfon e.

Piştî sedsala 3. dora şer a împaratoriya Roma û Sasaniyan e. Di dîrokê de şerên herî dijwar dîsa di ser Kurdistanê re dibin, sînor geh Firat geh Dîcle ye. Bajarên mîna Amed û Nisêbînê gelek caran têne xirakirin û dest diguherin. Kurdistan timî tê parçekirin. Li cihekî welê, talan û şîdeta di hinavê şaristaniyê de timî vedirşe, wê çawa pêşketinê bibe. Li çiyê jiyan bi awayekî kom bi kom dewam dike, navendên bajaran jî biryargehên dagirkeriyê ne. Sînorê di navbera civaka etnîk û civaka eskerî de pir eşkere zelal dibe. Bazirganên di navbera herduyan de, di navbera dagirker û komên etnîk de dibin xelekeke navberê. Di sedsala 4. û 5. de ji ber şerê dewamî yê di navbera her du împaratoriyan de li herêmê pêvajoyeke tarî diqewime. Tenê xebatên propagandayê yên komên Xirîstiyan û Manî yên di bin tirsa terorê de çalakiyeke cîddî ya civakî ye. Mirov dikare hilweşîna Palmîra, Abgar û Komagene wek destpêka pêvajoya tarî binirxîne. ædî niqrîskên dawî yên koledariya klasîk diavêjin.

Xirîstiyantî mizgîniya dema nû dike û baweriyê dide ku wê bi qraliyeta îlahî piştî tarîbûnê rohnîbûnê were. Îdeolojiya rizgariyê hatiye çêkirin. Artêşa rizgariya civakî hatiye damezrandin. Her du împaratorî jî ji hundurê xwe ve hildiweşin. Ji der ve, bi êrîşên dijwar ên etnîsîteyê Roma berê parçe dibe û beşekî wê hildiweşe. Wek Romaya duyemîn împaratoriya Bîzans li pey Mezopotamyayê ye. Wexta li vê rewşê şerê di navbera mezhebên Xirîstiyantiyê de jî zêdebûn, mîna roja me ya îro cihêbûnek wek a Elewîtî û Sunnîtiyê pêk tê. Şerên mezhebî û dînî jî êdî tevlî şerên siyasî bûne. Têkoşîna civakî di bin navê dîn de tê meşandin, şerên etnîk jî rengên qewmî werdigirin. Papazên Suryaniyan, nameze yên Nestûriyan mîna şervanên zanîn û agahiyê ne. Bi şerên eskerî-siyasî re şerên mezhebî û dînî dimeşin. Pêvajo, bi çavrêbûn û bendewariya Mehdî, Mesîh û peyxemberên axir zeman derbas dibe.

Hz. Mûhammed di bêhnkirina demê de xwedî qabîliyet e. Baweriya wî pir zêde dibe ku pexmeberê çav li rêya wî ye û bendewariya wî tê kirin, dibe ku ew be. Ji nav qebîleyên Ereban ên

di nava xwe de şer dikin û di tariya cehaletê de ne, mîna rojê hiltê. Ji hatina Esr-î Seadetê re hindik maye. Sedsalên 6. û 7. sedsalên derketin û belavbûneke mezin ên Îslamê ne. Heq tê, batil têk diçe. Roj hiltê, tarîtî radibe. Artêşên Îslamê li pey hev diçin seferan û gelek deveran fetih dikin. Pir naçe xwe ji başûr dispêrin deriyên Kurdistanê. Şer êdî ne ji bo xanedan û qralan, ji bo dîn û Îslamê dikeve rojevê.

Fethên Îslamê piştî têkçûna li Qadisiyê di sala 642 de giraniya xwe da ser Kurdistanê. Bajarok bi bajarok pêvajoya Îslamîbûnê dest pê dike. Îranî bi mezhebê Şîa hewl didin cudabûna xwe biparêzin, Kurd jî di Zerdeştiyê de israr dikin û beşek jî pir lawaz bi Elewîtiyê hewl dide hebûna xwe ya etnîk dewam bikin. Ya rastîn, Kurdîtiya sunnî, Kurdîtiya teslîmbûyî û îxanet kiriye.

Peyva Îslamiyetê, her çend aştiyê bi ber guhê mirov bixîne jî, di bingehê wê de îdeolojiyeke netewî ya Ereb a şer e. Mîna globalîzma îro dixwaze li gelemperiya dunyayê global bibe. Cîhad îbadeta herî mezin e. Li ser rêya cîhadê (şer) her tiştê tu fetih bikî yê te ye. Yên têkçûyî tu dikarî bikî kole. Tu yekser dikarî dest deynî ser jinan. Wek şêwaza eskerî ya roja me ya îro qîma xwe tenê bi fethên eskerî nayne. Li ser ên fetih dike, di hemû warên civakî, ekonomîk û nirxên baweriyê de serdestî û kontrolê pêk tîne. Herî zêde di serweriya zêhnî de giraniya xwe nîşan dide. Wek îdeolojiya Îslama feodalîzmê bi îdîa ye hemû civaka Rojhilata Navîn ji nû ve bi serûber bike. Têgihîştina ummeteke xwedî yek bawerî û yekgirtî, li pey xwe hîmê civakî yê împaratoriya Îslamê amade dike. Îdeolojiya yek xwedayî ku bi hostatiyeke pir mezin hatiye afirandin, ya rastîn bingehê îdeolojiya sultantiya bi tenê otorîte ye. Îslamê li jor sultan û li jêr bawermend pir bi hostayî afirandine, belkî jî li dunyayê teoriya herî baş a feodalîzma navendî ye.

Etnîsîteya Ereb a ji serdema Sumeran bi ti awayî ji nîvgirava Erebîstanê derneketibû bi Îslamê di dîrokê de yek ji pêngavên mezin dike. Bi têkbirina Sasanî û Bîzansiyan tîna xwe ya hezar salan a ji bo îqtîdarê dişikîne. Medeniyeteke feodal a bi heybet ava dike. Emewî (PZ 650-750) û Ebbasî (PZ 750-1258) lûtkeya împaratoriya Ereb temsîl dikin. Pir bi xurtî li ser Kurdistanê belav dibin. Heta qûntara çiyayê Toros û Zagrosê diçin. Komkujiyên pir mezin pêk tên. Îskenderwarî û bi awayekî Heccac dimeşin. Dikarin heta Kafkas, Hîndîkûş, Pîrene û keviyên Stenbolê belav bibin. Em wexta PZ digihîjin salên 1000 Îslamiyet êdî gihîştiye lûtkeyê. Ya BZ di salên 1000 de qebîleyên Îbranî kirin, qebîleyên Ereb jî PZ di salên 1000 de

dikin. Ji qebîleyên Tirk-Oxizan li pey hev Selçûkî û Osmanî tên. Li ser navê Îslam û sunnîtiyê seferên herî mezin ên dawî, sultanên bi koka xwe Tirk dimeşînin. Di dema Selçûkî û Ebbasiyan de dîsa bi awayekî klasîk xeta şer di Kurdistanê re derbas dibe. Hêzên sultantiyê û Bîzansê beşekî mezin şerên xwe bi zevtkirin û paşvedayîna bajarên Kurdistanê dimeşînin. Îslamkirina Kurdistanê temam dibe. Sultanê Selçûkiyan Alparslan bi şerê Melazgirê yê di 1071 de hêzên Bîzansan ji Kurdistanê diavêje. Her çend di navbera Eyyûbî û begtiyên Tirkan de şer hebû jî, şaristaniya Îslamê dîsa jî pêş dikeve. Li bajarên mîna Ûrfa, Mêrdîn, Amed, Sêrt, Meletî û Elezîzê Îslam dikeve pêş. Çanda Îslamê hebûna Xirîstiyan, Suryanî û Ermeniyan dixîne rêza duyemîn.

Di sedsala 13. û 14. de êrîşên Xaçperest û Moxolan li herêmê rê li ber qirkirin û mirina mîna kuliyan vekir. Koçberî û xwe vekişandinan çiyan dewam dike. Herêm dîsa diçelqe û tevlîhev dibe. Xeta şer û parçebûna kevneşopiyê vê carê di navbera Sefewiyên navenda wan Îran û Osmaniyên navenda wan Anatol û Balkanan de pêk tê. Mîna ku dualîteya Bîzans û Sasaniyan xwe nû dike. Bi serketina li Çaldiranê ya Yawiz Selîm di 1514 de - bi beşê sunnî yê Kurdan re - , sînorê klasîk ê rojhilat herî li rojhilat tê xêzkirin. Hîmê parçekirina Kurdistanê ku heta roja me ya îro dewam dike, tê danîn. Her çend li keviyên sînoran ber bi hundur ve hin êrîş bêne kirin jî bi peymana Qesr-î Şîrîn a di sala 1639 de parçekirina Kurdistanê ya heta îro dewam bike di navbera hêza Anatolê û hêza Îranê de bi awayekî fermî tê xêzkirin û naskirin. Mezopotamya û piraniya Kurdan di nav sînorên împaratoriya Osmaniyan de man.

Di navbera Osmaniyan û hukûmet, begtiyên Kurd de mêzînek heta serê salên 1800 heye û ev li gorî demên berê rê li ber jiyaneke aram vedike. Şaristaniya Îslamê li ser sunnîtiyê pêş dikeve. Kurdên Elewî û Zerdeştî yên têkoşer bi awayekî nîv-serhildan neçar xwe vedikişînin serê çiyan, zozan û baniyan. Ji ber tirsa Yawiz Selîm a ji Sefewiyan di dema sedrezamtiya Kûyûcû Mûrad Paşa de çil hezar Elewî bi saxî dixin bîran û her weha darvekirina Pîr Sultan Ebdal, mînakên herî bêrehim ên vê terorê ne, ku şop hîştine. Hînê berê jî tevgera bi pêşengiya Şêx Bedreddîn hebû. Bi têgihîştineke komîn li nîzamekî digeriya, li komkujiyê qewimî û darvekirina Şêx ji mînakên girîng ê vê terorê ne. Li dijî zordarî û xizantiyê, li dijî eskertiya îcbarî û berhevkirina bacê bi darê zorê serhildana Celalî pêk hat. Pelixandina vê serhildanê jî dide nîşan ku arîstokrasiya

Îslamê çawa dikare pêla terorê dijwar bike. Terora Osmaniyan herî kêm bi qasî êrîşên ji der ve tên bêrehmin.

Tevî vê yekê, pirî caran welîehdên bira têne kuştin û sedrezam têne darvekirin, ev jî ji çalakiyên terorê ne. Di dema Osmaniyan de Îslam bi şîroveya fermî Sunnîtiyê teroreke dijwar û zêde dimeşîne. Li dijî Tirkmenên li çiyê jî timî seferên terorê pêk aniye.

Kurdistan ji serê salên 1800 heta hilweşîna împaratoriyê, bi giranî dema xwe bi serhildan û seferên tepisandinê derbas dike. Sedsala 19 bi tevahî sedsala serhildan û tepisandinê ye. Di vê sedsalê de Ermenî û Suryanî bi bandora mîsyonerên Îngilîz û Fransî navbera xwe bi împaratoriyê re xira dikin. Li ser vê yekê, hejmara seferên tepisandinê jî zêde dibin. Di dawiya sedsalê de û di destpêka sedsala 20. de ev xelkên kevnare yên dîrokê hema hema têne ber qedandinê. Netewparêziya kapîtalîzmê sor dike hêdî hêdî berhemên xwe yên bi jehrin, dide. Ji ber ku dînê Kurdan cuda bû û serhildanên wan berfireh bûn, li heman aqîbetê rast nehatin.

Şerê dîn û mezheban di serdema navîn de herî kêm bi qasî şer û pevçûnên di serdema seretayî de texrîbkar şopa xwe hîştin. Eşkere ye ku şaristaniya li Kurdistanê wê bi sedema van şer û pevçûnan pêş nekeve. Etnîsîteya hebûna xwe timî di berqefên çiyan de diparêze û biryargehên dagirkeran ên li navendên bajaran wê nikaribin di nav têkiliyeke diyalektîkî de bin. Her parçe di nav paşverûtî û îzolekirina xwe de hema bêje difetise. Eger rûyê Îslamê yê selam - aştiyê - hinekî were kolan, wê baş were dîtin ku di binî de hêza îstîsmarker û zordar a hezar salan heye. Sultan û bendeyên xwe bi her cure sifetên îlahî, rejîmeke kedxwar û zordar a bi ayet û hedîsan nuxumandî rêve birin. Eşqîyayê li çiyê rûyekî xwe yê hişk û vekirî heye, lê yê li bajêr bi cubbe, şaşik û dev nuxumandî heman zordarî û îstîsmarkariyê bi erêkirina îlahî dimeşîne. Cudahî ne di cewher de, di şekil de heye.

Li ser Kurdistanê têkoşînên civakî yên ji dema neolîtîkê bi xwe re şerên koletiyê anîn, bi serdema navîn a feodalîzmê re ev şer û teror hînê dijwartir bûn. Di vê çaçroweyê de tevî van hemû şer û teroran, pir hêja ye ku gelê Kurd heta îro karîbûye hebûna xwe biparêze. Bi qasî şaristaniyên pêşketî û bi hêz nebe jî têkoşerî û berxwedana etnîsîteyê tevî hemû qusûrên xwe, hêmana bingehîn e ku gelê Kurd di van pêvajoyên bêeman de gîhandiye îro.

Piştî belavbûna împaratoriya Osmanî Kurdistan hînê zêdetir parçe bû û ket nav şîdet û dijwariyê. Îngilîstan û Franse wek hêzên nû yên mêtinger û emperyalîst di nexşeya Rojhilata Navîn de li ser Kurdistanê sînorên Komara Tirkiyê, Şahtiya Îranê, monarşiya Iraqê û

serweriya rêveberiyên Sûreye-Franseyê xêz kirin. Ya rastîn, ev xet li ser Kurdistanê ferz kirin. Tebeqeya jor a Kurdên hevkar di bin rejîmên nû de berjewendiyên wan gelekî teng bûn, ji lewra bi hewesên berê yên otonomiyê û piranî bi tevdanê, serî rakirin, vê yekê jî bi xwe re teror dijwar kir. Serhildanê pêk hatin, ji xurtkirina daxwazên netewî û demokratîk dûr bûn. Ji ber ku feodalên Kurd ên hevkar rewşa xwe ya berê ya cihêwaz ji dest dabûn û ji van rejîmên nû para xwe dixwestin. Rejîmên nû yên ketibûn bin tesîra îdeolojiya netewparêz a xwe dispêre kapîtalîzmê bi fanatîzma dewleteke unîter, yek ziman û yek netew radibûn, ji vê yekê jî para Kurdan ji her demê zêdetir înkar, zordarî, di dema serhildanê de komkujî û asîmîlasyona bi zorê diket. Kurd bi van polîtîkayan di tariya serdema navîn de dihatin hîştin. Kurd tam xistibûn cendereyê. Mirov dikare bibêje; li dunyayê piştî Cihûyan di çarçoveya herêmî de herî zêde terora netewparêziya şoven, li ser etnîk û hebûna Kurd hatiye meşandin. Kurd ji ber ku ji aliyê xayînên xwe yên hevkar di nav paşverûtiya feodalîzmê de hatin terikandin û nekarîn maneyê jî bidin tevgerên demokratîk ên netewî yên hemdem, di sedsala 20. de rewşa Kurdan bû yek ji rûyên kirêt.

Tirkiyê li Kurdistana kir bin serweriya xwe, polîtîka bi fermî dimeşand jê re digot 'tevgera lehiyê.' Di ku re derbas bûbûya divê bipelixanda û ev yek wek polîtîkayeke 'baş' hatibû qebûlkirin. Di vê de êşa wendakirina împaratoriyê jî hebû. Hîç nebûya, divê parçeyên mayî ji sedî sed bihatana helandin. Qedexeya zimanê zikmakî bi awayekî li ti devera dunyayê û wek li cem ti rejimê nehatibe dîtin, rejima 12 Îlonê pêk anî. Li têkoşînên civakî yên hezarsalan, şerên mêtingerî, dagirkerî û îstîlayên bêrehim, perdeyeke reş hatibû zêdekirin ku bi ser hemû nirxên Kurdîtiyê ve hatibû kirin. Eger wêje û ilmê civakî li ser jiyana Kurdên di bin statuya Komara Tirkiyê de pir lêbokolin tenê dikarin xwe bigihînin hin rastiyan.

Şahtiya Pehlewî ya li Îranê wek xanedaniya împaratoriyekê mezin bû, kiryarên wê ji yên komara Tirkiyê cuda nebûn. Ji serhildana Simko Îsmaîl heta Komara Kurd a Mehabadê tevgera Kurd a xwe dubare kiriye, bi heman sedemên îdeolojîk û çînî li tasfiyekirinê qewimandine. Di dawiyê de rejîmeke terorê ya xwedî helwestên netewparêz ên faşîstî xweser li sedsala 20. ferz kirin. Li ser Kurdistana Iraq û Sûriyê, kiryarên Îngilîstan û Fransaya xwe spartibûn xanedanên hevkar ên Ereb, bi heman awayî rejîmên zordar û kedxwar ferz kirin.

Di sedsala 20. de ya bi serê hebûna Kurd anîn mînakê wê li ti deverê dunyayê nîne. Polîtîkayek dimeşandin, mîna ku Kurd heywanek be xistibin qefesê û kedî dikirin. Ji ber ku ti îşaret nebûn Kurdan ji mirovan dihesibînin. Polîtîkayên mêtingeriyê yên li Efrîkayê têne meşandin jî ji Kurdan re zêde hatibûn dîtin. Bi awayekî hemdem zordariya mêtingerî, netewî û etnîk bi şêwazên siyasî, ekonomîk, civakî, huqûqî û heta eskerî ji bo Kurdan zêde hatiye dîtin û li ser wan nehatiye meşandin. Tine dihesibîne (serokwezîrê bi navê R. T. Erdogan dibêje; "Eger tu xwe Kurd nehesibînî pirsgirêka Kurd nîne", ya rastî vî serokwezîrî rastiya dewleta veşartî-kûr baş ji ber kiriye û dipeyive) Têgihîştin ev e; "Tu xwe çendîn ji mezheb û netewê serdest bihesibînî û xwe tune bibînî, tê werî qebûlkirin", ya rastîn, ev yek ji şêwazên herî xeter ên faşîzmê ye. Cureyê terora li dijî Cihûyan eşkere û vekirî bû. Cureyê înkarê, veşartî û tarî ye. Terora li dijî Kurdan tê meşandin, li cihe em jê re bibêjin 'terora reş'.

Di dawiya sedsala 20. de û di serê sedsala 21. de herêm li bandora DYE baş vebû, pê re polîtîkayeke pir bi nakok û xeter li Kurdistanê tê meşandin. Li aliyekî federeya Kurd, li aliyê din jî tasfiyekirina PKK'ê û Kurdên li parçeyê mezin ê Tirkiyê, em şerê tê meşandin û encamên wî ti car nikarin bêyî DYE û YE bifikirin. Gengaz e ji lîstika Îsraîl-Filîstînê wêdetir li Kurdistan û cîranên wê werin lîstin. Li polîtîka têkoşîn, şer û terorê mirov dikare sifetê 'hovîtiyê' zêde bike. Di ti zeman û mekanê dîrokê de polîtîkayên ev çend hov li ser komên mirovan nehatine meşandin û mînakên wê nînin ev çend polîtîkayên hovane yên hatibin spartin şîdeteke ev qas vedizî û bi plan.

Divê ez tavilê bibêjim ku em nikarin polîtîkayên şer mîna berê bi vegotinên bi îmhakerî, înkar û mêtingeriya Tirk, Ereb û Fars rave bikin. Îzaheke bi vî rengî wê pir kêm bimîne û dikare me bigihîne encamên şaş. Rastî hînê dorfirehtir bi sîstemên civakî û dîrokî ve têkildar e. Bi heman awayî vegotinên wek 'ji kiryarên li Kurdistanê dewletên Tirk, Ereb û Fars berpirsiyar in' vegotinên pir mucered û gulover in. Ji îzahkirina rastiyê pir dûr in. Çawa ku tê bawerkirin li naverastê berjewendiyê dewlet û netewa Tirk, Ereb û Fars jî nîne. Netew-dewlet bi xwe sifet e; tarîfeke îdeolojîk e, rastî bi xwe nîne. Dewleta netewan nabe. Heta di maneyeke teng de dewleta çînan jî nabe. Dewlet herî kêm kevneşopiyeke pênc hezar salî ye. Mîna guloka agir-berfê gindiriye heta roja me ya îro hatiye. Parçeyî gelek beşan bûye; hin etnîsîteyan pir û hinekan jî hindik bi kar aniye, yên

bi kar anîne jî hemû etnîsîte nebûne, hin komên çînî û hiyarerşîk jê sûd wergirtine.

Belkî jî netew û etnîsîteya Tirk, Ereb û Fars jî bi qasî Kurdan ji dewletê kedxwarî û zordestî dîtine. æşên Tirkmenan kişandin, serhatiyên Bedewiyan, rastiya xulaman ji tiştên Kurdan dîtin kêmtir nînin. Eger em bibêjin kêm e emê xwe bixapînin. Jixwe pirsa kîjan Kurd jî pir girîng e. Berpirsiyarê mezin ê polîtîkayên şer feodalîteya Kurd e. Taximê beg, mîr, hecî û xoce ne. Eger serhildanên provakatîf û paşê teslîmiyeta wan a rezîlane ya ji armanc û hedefeke ciddî dûr li ser navê gelê Kurd ê kedkar û xizan nabûya, ti dewletparêz û netewparêzê Ereb, Kurd û Tirk nikarîbûn ev polîtîkayên heyîn îcad bikirana. Ji lewra eger Kurdê li hêmanekî neyênî yê stratejîk bigerin divê di nav xayînên xwe de bigerin û bibînin. Hem jî divê li her derê û li cihî, bi her armanc û rêbazê. Ji ber ku ev ji bo berjewendiyên xwe yên rezîlane, bi lîstikên trajediya Îsraîl-Filîstînê jî li dawiyê bihêlin, îqtîdaran û gelê Kurd tînin beramberî hevdu û xwe ji navberê vedikişînin. Di berdêla vê îxanetê de mal û mulkên xwe diparêzin. Heta li metrepol û li havîngehan bi cih dibin û wê lîstika bi lanet a hezarsalan dewam dikin.

Min hewl da polîtîkaya herî kêm temenê xwe pênc hezar salî - ji Gilgamêş û Enkîdo ve - ku xwe bi kirasê destanê veşartibe jî, rave bikim. Ez bawer dikim ku ji polîtîkayên blok ên îqtîdarê, ji sedî 99 ne dewlet, ne jî netewên Tirk, Ereb û Fars berjewendiyên wan ên rastîn hene. Berovajî berjewendiyan, dijminahî, rik û kînajotina bê mane, paşvemayîn, şîdet, bêsedem têkçûna çavkaniyan û di encamê de hemû rê li ber jiyaneke heq nehatiye kirin, vedikin. Bi vê jî zirarê didin xwe. Em ji bo vê zîzbûna li dora xwe ya xeternak, lîstika bi sihêr û sirrê eşkere bikin, divê wek çare em serî li ilmên civakî bidin. Lê ez behsa ilmekî civakî dikim ku îqtîdarê, avahiyên civakî û şerên rê li ber wan vekir û xwe spartê karibe çareser bike. Naxwe ilmekî civakî yê ji 'ilmê çarenûsê' yê rahîbên Sumeran dispartin tevgerên stêrkan xetertir encamên xwe hebin, wê bibe ilmekî civakî yê yekparebûnê nabîne, ruhşînas, jiyanê nabîne, rêz û humetê his nake. Bi kurtî wê bibe ilmekî beratê.

Di vê parêznameyê de alîkariya min a girîng ew e ku ez maskeya vê zanistê dixînim û bi vî awayî hinekî din nêzî rastiyê dikim. Zanista netewparêziyê çiye? Zanista dîndariyê çiye? Zanista sosyalîzmê çî ye? Zanista lîberaltiyê çî ye? Zanista muhafezekartiyê çiye? Belkî jî ji pûtperestiya serdema seretayî ya dema wê derbas bûye - ji paganîzmê - pûtperestiyeke paşverûtîtir e. Ji ber ku ew

pûtperestî zirarên wê bi sînor bû. Lê ev têgîna pûtperestiyê ya ser û binê wê diyar nîne, hed û hesabê zirarên wê hene? Bawermendên bi pirtûkeke pîroz ve girêdayîne jî - ev pirtûk ji hin aliyan ve min analîza wan a civakî kir - tevî ku bi hin nirxên yeqîn dikin dizanin ew çend dilsoz in, gelo çiqasî bi tespîtên têgîna pûtperest û berateyê ve girêdayî dimînin, jê li benda feydeyê ne? Ez diyar dikim ku ezê di beşên pêş de bi awayekî rexne lixwegirtinê nêzî van dabaşan bibim û li mijarê vedigerim.

Ez bi israr tînim ziman ku li Kurdistanê heta rastiya şer û îqtîdara xwe dispêre rast neyê çareserkirin, wê zirarê bide her kes, dewlet, komên civakî û siyasî yên bi pirsgirêka Kurd re mijûl dibin, tevlî dibin. Bi vê jî, belkî alî xwe ji nû ve di ber çavan re derbas bikin, ji şaşî, xeta û helwestên xeternak vegerin û eleqeyê nîşanî gelek helwestên însanî yên çareseriyê bidin. Eleqe nîşandana van helwestên çareseriyê ku mumkîn in pêk werin, rêbazeke watedar e. Her helwesta fanatîk - çi li ser navê serdestan, çi jî li ser navê bindestan, çi mêtinger çi jî yê tê mijandin - a netewparêz, dîndar û çepgir nabe çareserî, şerên sedsala 20. di berdêla êş û wendahiyên mezin de ev yek piştrast kirine.

Çawa ku wê ji pêşnûmeya me ya hişkûber a dîrokî jî were fêmkirin; mîna li Kurdistanê têkoşîn, şer, pevçûn û kiryarên terorê blokeke îqtîdarê ya xweser pêk tîne. Ev blokên îqtîdarê di hemû sîstemên sereke yên dîrokê de hebûna xwe bi hêza eskerî û şer dewam kirine û mîna hevîr hemû hucreyên civakê strane û şekil danê. Li naverastê civakeke Kurd û netewa wî ya bi dînamîkên cewherî û xweser pêk hatiye nîne. Ji Nûh Nebî - bi rastî jî welê ye - avahiyên îqtîdarê yên mayî û îfadeya wî ya bûne sazî bi zora kevneşopiyan tê diyarkirin. Car heye bûne mîtolojî, carnan jî çîvanok. Di demeke din de ji wan re dînê mezin hatiye gotin. Ber bi serdema me li ser navê netew û çînê netewparêziya me, wek sosyalîzma me li meşrûiyet û li rewabûnê geriyane. Ev amûrên zorê di civakê de ti tiştê bela xwe lê nexistibin, ti hucreyeke diyar nekiribin nehîştine. Ya esas, pirsgirêka Kurd ji şêwazê hebûna van rastiyan derdikeve holê. Rastiya Kurd bi xwe ji şêwazê pêkhatinê tam lod û gidîşeke pirsgirêkan e.

Aliyê herî dilêş û xeternak, vê rastiyê qabîliyeta xwe ya çareserkirina pirsgirêkan bi giranî wenda kiriye. Rastî û hebûn ji ber pirsgirêkan difetise. Divê mirov behsa şax û hucreyên civaka Kurd bike ku dişibin şaneyên kanserî. Tê gotin; "kurmê darê ji darê ye." Bi vî awayî, bi baran nasname û şexsên Kurd li naverastê radiwestin.

Em ji zimanên Kurd bigirin eger hebe heta partiya wî, em ji jina Kurd bigirin heta qaşo lîderê herî naskirî, ji gundiyê Kurd heta bajariyê wî, ji rewşenbîr heta meleyê wî, ji dîndar heta netewparêzê wî, ji welatparêz heta xayînê wî, ji dîplomat heta siyasetmedarê wî, çiqas neçar, sexte, qurnaz, xayîn, xeternak, baş, bedew û rast ên hakimê abc'ya kar nînin, hene? Pirsek e, bersiva wê ya texmînî jî zehmet e. Berpirsiyar kî ye? Parçeyên îqtîdarê yên heyî û ji dîrokê rengê xwe girtine ku bi rastîn nayê zanîn ji kê re, çawa û çiqasî xizmetê dikin, di encamê de rabirdû, tevnên zorê yên roja me ya îro û her cure şer û terora wan, dibe sedem li ser piyan bimînin. Ev in, yên civaka Kurd diyar dikin û wan ji rewşên heyîn dike berpirsiyar û neçar dihêle.

Lê dema berovajî li dijî van tevnên zorê serhildan bibe, yan jî bi rêbazên gerîlla têkoşîn were meşandin, hîn nebûye, lê wexta bibe, modela şer a ji Filîstîn-Îsraîlê wêdetir dixin rojevê. Li ser navê çi dibe bila bibe, alî dikarin bi modelek bi vî rengî çi pirsgirêkeke civakî bi awayekî hînê baş û bedew çareser bikin? Rast nîne agir bi agir were vemirandin. Ji lewra ya herî rast ew e ku klîkên îqtîdar-şer rêbazên xwe yên çareserkirina pirsgirêkên civakî biterikînin. Divê têkoşer û berxwedan jî tevnên xwe biterikînin. Divê mirov li cihekî din û bi awayekî din li rêbazê bigere.

Ji bo çareserkirina belovajiyên mezin ên di rastiya Kurd de, divê mirov ji tevnên şer - bi taybetî hêzên îqtîdarê û zora hakim di destê xwe de digirin - li benda rêbazên çareseriyê nebe. Eger aliyê din ji îdîaya xwe ya ezê bi zorê tiştekî bidim kirinê hatibe xwarê, şêwazê demokratîk ê aştiyane û çareseriya siyasî esas wergirtibe û jidilbûna xwe spartibe sedemên maqûl, divê hêza hakim jî tevna xwe ya eskerî ji rojevê derbixîne û divê bi heman rêbazan bersivê bide. Divê rêyên guftûgo û çareseriyê ji amûrên sivîl ên demokratîk ên diyalogê re werin hîştin û ev yek bi qasî ku însanî ye, li gorî berjewendiyên ekonomîk û piraniya civakê ye.

Min berhema bi navê 'Li Kurdistanê Rola Zorê' di sala 1982 de tomar kir. Min yeqîn kiribû ku min zor çareser kiriye. Lê di pratîka demên pêş de min dît ku di vê bawerî û jixwe piştrastiyê de pir kêmasî hene. Ez van rêzikan wek destpêkekê diyar dikim û ji nû ve li rola zorê ya li Kurdistanê vedigerim. Bi rastî ez vê carê jixwe piştrast im ku ez bi awayekî ilmî têra xwe ponijîme. Weke ku tê texmînkirin, - û li ser navê sosyalîzmê em bûn xwedî ezmûnekê - rêya çareseriyê di 'şîdeta pîroz' re derbas nabe, berovajî heta hewce neke ji bilî 'parastina rewa' divê li hemû cureyên zorê lanet were kirin û ez bi vî

awayî hewl didim berpirsiyariya çareseriyê di pirsgirêka Kurd û rastiya Kurd de nîşan bidim.

**3- Li ser çanda Kurdistanê polîtîkayên asîmîlasyonê yên bi darê zorê**

Yek ji polîtîkayên civakî yên blokên îqtîdar û şer herî zêde serî lê dane polîtîka asîmîlasyonê ye. Bi gotineke giştî asîmîlasyon helandin û pişavtina çandê ye. Blokên îqtîdarê û şer bi polîtîka asîmîlasyonê dixwazin komên ku di bin destê xwe de digirin, ji qabîliyeta berxwedanê bixînin û ji bo vê yekê jî amûrên di destê wan de distînin. Di serî de li ser zimanê herêmî ku zêhniyetê îfade dike, zimanê serdest tê ferzkirin. Bi rêya zimanê fermî, çand û zimanên herêmî têne bazkokirin û nikarin di jiyanê de rol bilîzin. Çand û zimanê serdest wek zimanê xwendin, siyaset û aboriyê ji bo kesê bi kar bîne bi qezenc e. Kesê çand û zimanê bindest jî bi kar tîne wenda dike. Di nav vê dualîteyê de zehmet dibe zimanê herêmî xwe li dijî zimanê îqtîdarê rabigire. Hela hela ev ziman nebibin ên nivîsê û zaravayê xwe yê sereke destnîşan nekiribin, wê dawiya van ziman û zaravayan tarî be. Asîmîlasyon ne tenê li ser ziman, her weha li ser hemû saziyên civakî yên îqtîdarê şekil dane wan, tê meşandin. Dîn û netewê serdest, di her astê de li gorî rastiya saziyê tê dawerivandin. Sazî heta di warê siyasî, civakî, aborî û heta zêhnî de bi awayekî fermî were naskirin û bi awayekî huqûqî were parastin, saziyên hindikayiyên din û yên têkçûyî xwe li gorî saziyên serdest an bi zorê yan jî bi dilê xwe li asîmîlasyonên diqewimin û di nav fermiyetê de cihê xwe digirin. Zordarî, aborî û berjewendiyên siyasî çiqas bikevin rojevê helandin jî ew çend zû dibe.

Li ser hebûna çanda Kurdistanê herî kêm bi qasî şer û terorê, asîmîlasyona bi darê zorê roleke texrîbkar lîstiye. Em dikarin heman rêbaza dîrokî pêk bînin û biçin heta serdemên seretayî. Eger em bibêjin çand û zimanê Sumerî ziman û çanda herî mezin a asîmîlasyonê bû, divê wek gotineke nepixandî neyê dîtin. Em vê yekê ji nîzama hevok û peyvên wê fêm dikin. Berê zimanê Sumerî û li gorî rêzê Hûrî, Mîtanî, Ûrartû, Medî û Persî, pişt re jî li gorî rêzê zimanê Babîlî û Asûrî çavkaniyên wan Aramî ne û paşê jî Aramî di serdemên seretayî de li Rojhilata Navîn zimanên asîmîlasyoneke mezin bûn. Mirov dikare vê rastiyê di kîtabeyên Hîtît, Ûrartû, Mîtanî, Med û Persan de bibîne. Mîna Îngilîziya îro, zimanê Aramî jî wek 'înteretnîsîte' ya wê demê zimanê hevpar ê ji hevdu fêmkirinê bû. Nexasim arîstokrasî û burokrsiya dewletê yek ji zimanekî zêde bi kar tîne zimanê Aramî ye. Zimanê herêmî tevî zimanê Aramî tê bi

karanîn. Mîna ku em îro jî dijîn, zimanê fermî yê îqtîdarê di danûstendinên fermî yên dewletê de esas tê dîtin û di wê demê de Aramî - hînê berê Aqadî û Sumerî - zimanê esasî ye, zimanên herêmî zêdetir di nava gel de ku kesên xwendin û nivîsandina wan nîne wek amûrekî ragihandina devkî bi kar tînin. Mirov vê rastiyê dikare di kîtabeyên Ûrartûyan de bibîne. Çawa ku piraniya rêveberên welatên bindest bi zimanê Îngilîzî û Fransî dipeyivin.

Di kîtabeyên Persan de cihê Aramî eşkere ye. Di wê demê de li hemû Rojhilata Navîn hem zimanê dîplomasiyê, hem jî zimanê bazirganiyê ye. Di hemû belgeyên pêwendîdar de tê dîtin ku asîmîlasyon di mîmariyê, rêveberiya dewletê, wêjeyê û huqûqê de roleke mezin lîstiye. Heta tê texmînkirin ku Îsa jî bi Aramî zanîbûye. Zimanê Suryanî ku şêweyekî netewî yê Aramiye amûrekî din ê asîmîlasyonê ye. Zimanê Îbranî hînê di qadeke bi sînor de bi bandor e, lê Helenîzm ji ber ku di rewşa dijber de belav dibe zimanê Helenîzmê li Rojhilata Navîn bi tesîr e. Mîna Îngilîzî û Fransiya îro, Helenî û Suryanî jî bi hev re di rikê de ne. Her du jî li Kurdistanê, nemaze li bajaran ji bo bi tesîr bibin têdikoşin. Ûrfa ji bo vê yekê mînakekî xweser e. Aramî çandeke kûr e, ku Ermenî, Suryanî, Erebî, Kurdî û herî dawî jî Tirkî jiyaye. Lê belê di heman demê de rê li ber asîmîlasyoneke dijwar û kozmopolîtîzmeke zêde vedike. Mirov ji rewşa îro ya Ûrfayê vê rastiyê baş dikare fêm bike.

Rola zimanê Sûryanî di çanda Kurdistanê de ji Erebiya paşê li pêştir e. Mirov dikare bibêje wek zimanê rohnîbûnê rol lîstiye. Ya esas, ji ber ku Suryanî li bajaran rûdinên ev encam derdikeve holê. Kurd wek xelkê Komagene zimanê devkî yê koçerî û gundîtiyê zaravayên Kurdî bi kar tînin. Çavkaniyên wan ên nivîskî bi sînor in. Lê nayê wê maneyê ku hîç nînin. Nemaze li paytexta Mîtaniyan Waşûkkaniyê (li ser sînorê îro yê Sûriye-Tirkiyê bajarê Serêkaniyê û Amûdê) gelek belgeyên nivîskî nîşan didin, BZ di salên 1500 de proto-Kurdî wek zimanê nivîsê hatiye bi karanîn.

Li Kurdistanê BZ di salên 300-250 de, di dema qraliyetên Helen de hebûna xelkê bi koka xwe Helen û nemaze giraniya wan a li bajaran nîşan dide ku zimanê Helenî demeke dirêj hatiye bi karanîn. Mîna rola zimanekî mêtingeriyê rol dilîze. Fena di roja me ya îro de bajarên Kurdistanê bi çand û zimanê biyanî dijîn û xelkê li derveyî bajaran jî bi çand û zimanê xwe yê herêmî dijîn.

Bi Îslamiyetê re zimanê derdikeve pêş zimanê Erebî ye. Erebî ku berê zimanê bedewiyan bû, bi bajarbûn û derketina Îslamiyetê re li Rojhilata Navîn bû zimanê herî bi prestîj, zimanê zanist û wêjeyê.

Erebî wek zimanê fermî yê îqtîdar û şer serdestiyeke mezin bi dest xist. Li hemberî zimanê qels ên bi koka xwe Efrîkî li hemû Bakurê Efrîka û heta başûrê Zagros-Torosan serdest bû. Çand û zanist jî bi Erebî tê kirin û tê jiyîn. Xwedî cihekî cihêwaz e. Yên zimanê Erebî bi kar tînin dikarin di nav burokrasiyê de cih bigirin. Dikarin di nav çîna ilimdaran de cih bigire û ilim bike. Ji lewra Erebî zimanê mezinbûn û berjewendiyane. Girîngiya wê ya heta îro jî deyndarê van rastiyên maddî ye. Piştî Erebî rola Farisî hînê bi sînor e. Ew jî, nexasim bi desthilatdariya Selçûkiyan li Îranê bû zimanê fermî û belav bû. Kengî Selçûkî Anatolyayê zevt dikin û dewleteke navenda wê Konya ava dikin jî zimanê fermî Farisî ye. Mewlana berhema xwe ya bi nav Mesnewî bi Farisî nivîsandiye. Zimanê Tirkî jî wek zimanê Kurdî wê demê xelkên li derveyî bajaran wek amûrê axaftina devkî û wêjeyê bi kar tînin.

Serdestiya Erebî li Kurdistanê bi tesîr bûye. Nemaze tebeqeya melle-seydayan zimanê Erebî wek zimanê îbadetê dibînin û ev yek dibe sedema bandoreke dijwar. Her weha xelkê li bajaran dilê xwe dibijînin şêwaza jiyana Ereban. Em ji kinc li xwe kirinê, şekil û şibût bigirin heta şecereya nifşan a xwe digihîne Ereban dibe moda. Di çîroka her xanedaniyê de qulpeke Erebî pir normal dibe. Serdestiya di warê perwerde, hîndekarî, moda, siyaset, dîplomasî, huner û zanistê de, li ser zimanekî mîna Farisî ku di warê dewletê de xwedî ezmûn bû jî bandor kir. Nîv bi nîv li dagirkeriya Erebî diqewime. Hemû Rojhilata Navîn nav û leqebên Erebî li xwe dikin. Ev serdestî heta pêşketina têgihîştina netew-dewletan û netewan bi awayekî dijwar dewam dike.

Bi belavbûna sîstema Kapîtalîst û şikilgirtina 'netew-dewlet' re, pêvajoya asîmîlasyona li ser çand û zimanê Kurdî hînê dijwar dibe. Li zordestiya Erebî û Farisî ya Tirkî jî zêde dibe. Di serdema seretayî û navîn de çand û zimanê Kurdî yê di nava etnîsîteyê de hebûna xwe parast, bi derfetên teknîk û zanistê yên zêde bûn, sê çand û zimanên serdest wek çand û zimanên fermî bi bandora xwe zimanê Kurdî baş pelixandin û helandin. Çand û zimanê Kurdî ku di serdema navîn de jî gelek berhemên wêjeyî (mîna Ehmedê Xanî, Mem û Zîn) dan, di bin zexta siyasî de her ku çû teng bû. Kurdîtî wek çand û ziman xistin rewşeke bi guman. Kirin mijara guneh û gunehkariyê. Her ku çû Kurdbûyîn krîmînalîze kirin. Bi piratîka herî dijwar a guneh-zindan a bûrjûwaziyê re rûbirû hat hîştin. Pirsgirêkên têkiliya xwe bi rastiya Kurd re hebûn di kategoriya gunehên xeter de hatin hesibandin. Her sê netew-dewlet jî - Tirk, Fars û netewa Ereb - ji

çand û zimanê dewletê wêdetir, li ser hemû hebûna wê helandin, dûrkirin û kampanyayeke bi çand û zimanê serdest ve girêdan bi dijwarî hat meşandin. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî Kurdî jî têde, hemû dibistanên perwerdê lê hatin qedexekirin. Lê yên derfet û îmkanên wî-ê hebûna dikarîbû li dibistanên netewê serdest modernîzm hîn bûbûya. Kurd û Kurdî di her warî de li derveyî modernîzmê hat hîştin. Çapkirina pirtûkan, rojname û muzîkeke herî normal a Kurdî wek 'Kurdîtî' hat hesibandin û di çarçoveya guneh de hat qebûlkirin. Lê wan bi xwe di zimanê xwe de netewparêziyeke Hîtler li dawiyê bihêlin, dikirin. Ji teoriyên wan ên 'netewê herî mezin' gav nedihat avêtin. 'Milletê Necîb' navê Ereban bû. Tirkîtî, rastiyeke bexteweriyê bû. Faristî esilzadebûna herî mezin a dîrokê bû. Hisên netewparêziyê yên kapîtalîzmê hişyar kirin, bûn xwedî tesîreke narkotîkê ku hemû rewşên paşverû binuxumîne.

Lê sêyemîn pêngava mezin a globalbûyîna kapîtalîzmê, mezinbûna lokaltiyê wek nirxekî, pêşketina teknolojiyê - radyo, TV - qedexeyên li ser ziman bêmane kirin. Xebatên li derveyî welat kirin ku hinekî Kurd û Kurdîtî cih bibînin û bi ser xwe ve werin. Bêguman di bingehê vê rastiyê de bandoreke diyarker a têkoşîna hemdem bû. Berxwedana demokratîk a netewî, bi xwe re nasnameya Kurd, ziman, çand û ji xwe piştrastî anî. Li dijî zora şer-îqtîdarê ya asîmîlasyon - bi darê zorê - afirand, ji berxwedana xweparastinê, ji nû ve derketina çand û zimanê netewî re pîriktî dikir.

**4- Li Kurdistanê etnîsîte, çînîbûyîn û netewîbûyîn**

Di şêweyê hebûna civakan de tarîfek di asta etnîk, çînî û netewî de ji bo dîtina mijarê bi awayekî yekpare girîng e. Civak di cewherê xwe de yek in. Cudabûn di şêwe û şikilgirtinê de derdikeve holê. Di serê van de taybetiyên etnîk, çînî û netewî tên. Kengî avahiyên mîna etnîsîte, klan û qebîle li dawiyê têne hîştin, cudahiya nijadan xwe eşkere dike û têgihîştina berjewendiyên koman pêk tê, rastî berçav dibe. Jiyana mirovan bi klanî û jê berfirehtir bi awayekî qebîleyî, demeke dirêj a demê di jiyana cureyê mirov de werdigire. Li cem komên timî gerok têgihîştina nijadê qels e. Ji bo rê li ber nijadê vebe hînê nakokî nestewiyane. Tê texmînkirin ku beriya serdema neolîtîk di serdema paleolîtîk de şêweyê jiyanê ji şêwazê klan wêdetir pêş neketiye. Ji bo qebîle bibin avahiyeke etnîk diviyabû bi tayê berjewendiyê bi hev ve bihatan girêdan li ser cihûwarekî xwe bi rêxistin bikira û xwe ji wir bihesibanda. Hilberandina hevpar û ziman, her ku diçe koman hînê nêzî hevdu dike û wan bi hev ve girê dide. ærîşên ji der ve û rewşên mîna xelayê hewcebûn û girîngiya bi

yekîtiyê eşkere dike. Rewşên di vî warî de hewcebûna bi rêveberî û parastinê zêde dike. Hiyarerşiya civakî û serdestiya cinsî nîzama bavikanî derdixe holê.

Ev pêşketin û bûyer hemû rengê nijad ê em jê re dibêjin etnîsîte zelal dike. Di nav dem û herêman de hemû destketiyên em jê re dibêjin çand cuda dibin û neçarî xweparastineke beramber û sentezan dibin. Ji ber ku nijad derdikevin pêş, di nav wan de rê li ber avabûna hiyarerşiyê vedibe. Ji vê jî etnîk an jî eşîrên federasyon ava dibin. Pêvajo bi lez ber bi konfederasyonê ve diçe û eger şertan dest bida û bi paşve çûyîn nebûya pêşketin ber bi dewletbûn û çînîbûyînê ve diçe. Di şêweyê hilberandina neolîtîk de pêvajoyên bi vî rengî bi hêsanî têne dîtin, hem jî bi rasyonalîteyeke maqûl têne texmînkirin. Ji bo pêşketin û avabûna eşîran serdema zêrîn dema neolîtîk e. Yekemîn şoreşa cotkariyê, kedîkirina heywanan û pêkhatina nîzama gundan bi nîzama eşîriyê re di zikhev de pêk tên. Nîzama bavikanî di qonaxên pêş ên vê serdemê de pêş dikeve. Gelek delîl û belgeyên xurt hene ku di destpêkê de nîzama malbat-dayikê giraniya wê heye. Pêvajoya bi malbat-dayikê dest pê dike, bi hiyarerşiyê re nîzama bavikanî digihîje dema xwe ya herî bi heybet.

Dînamîka çînîbûyînê tevî ku têkiliya xwe bi hiyarerşiyê re heye, ya esas, bi komên cihêwaz ên zumreyên eskerî pêk anîn destpêkir. Di nav vê komê de ji têkiliyên xizim û mervantiyê zêdetir hunerên ferdî diyarker in. Kesên qabîliyetên wan yên nêçîrvantî û parastinê xurt in bi pêşengiya zilamekî xurt dicivin û di demên destpêkê de ev yek cihêwazekî nehatiye dîtin, dide û diafirîne. Hukmê bi hêzê derdikeve holê. Kombûna di bin hukmê şefê xurt de, rê li ber têkiliyên ji yên eşîriyê wêdetir vedike. Ev têkiliyên nû çînîbûyînê îfade dike. Çîn dikare ji kesên ji eşîran reviyane, kesên nebûne eşîr hînê komên piçûk an jî pîşeyî pêk tê. Eşîret jî ji ber têkiliyên xizimtiyê li dijî çînîbûyînê li ber xwe dide. Zehmet e eşîrtî li çînîbûyînê biqeweme. Di xwezaya xwe de naxwaze têkiliyên çînî nas bike. Di cewherên eşîran de timî berxwedanek li dijî çînîbûyînê heye. Ji ber vê yekê ye, bi navê 'barbaran' timî gef li sîstemên koledar xwarine. Belavbûna çînîbûyînê bi hilberîna aborî re yekser bi hev re pêş dikevin. Çendîn keda kole bi qîmet dibe, çînîbûyîna li ser şêwazê koletiyê jî xurt dibe. Bi dewletbûyînê re ev pêvajo hînê bi lez dibe. Di bingehê xwe de dewlet, rêveberiya sîstema koledar a xwe bi rêxistinkirî ye. Tewş e, mirov cewherê wê di fikra îlahî, berjewendiyên netewî û ewlekariyê de bigere. Di çarçoveya vê maneyê de têkiliya di navbera dewlet û çînîbûyînê de eşkere ye.

Kengî eşîra make yan jî sereke parçe dibe, komên xwedî çand û zimanê hevpar ku em ji wan re dibêjin gel an jî 'qewm' derdikevin holê. Em wexta dibêjin gel an jî qewm, em komên civakî yên têkiliyeke sist di navbera wan de heye û xwe dispêrin ziman û çandeke hevpar, îşaret dikin. Di vê çarçoveyê de rast e ku mirov têkiliyê di navbera enîsîte=gel=qewm de deyne. Demên pêşketî yê serdema seretayî û yek ji îfadeyên sereke yên kategorîk ên civakî yê serdema navîn teşkîl dike. Wek yekîtiya komên nijad di derketina serdema navîn de roleke bingehîn dilîzin. Nifşên Cermen Romayê, nifşên Ereb Bîzans û Sasanî, nifşên Moxol û Tirk cîhana Îslamê îstîla kirin ku ev yek ji nêz ve bi taybetiyên qewmî ve têkildar e.

Di qewman de bi cihbûyîna li ser axê û jihevbûna çandan hînê bûyereke berçav e. Arîstokrasiya çîna serdest û gundîtiya serf e. Tevî ku bajarîtî di vê kategoriya giştî de cih digire, serxwebûneke qismî û kozmopolîtîzmê temsîl dike. Bajar hinekî jî ji tayên qewm û etnîsîteyan dûr maye, zêdetir têkiliyên çînî li pêş in û divê wek unîteyeke xweser were dîtin. Di feodalîzmê de çîna hakim û mehkûm ji heman etnîsîteyê ne û di navbera wan de biyanîbûn û ji hev re xerîbketin pir pêşketiye. Di sîstema koletiyê de pir nadîdeye ku efendî-kole ji yek eşîrê bin.

Netew û netewbûyîn bi têkiliya zêde ya qewmî re derdikeve holê. Yek ji şêweyê hebûna netewîbûyînê ew e, ku ji bo bazareke hevpar a berfireh derkeve holê, ekonomiya dora wê bi bendên feodalîzmê hatine lêkirin, xira dibe. Bazara hevpar her çend kapîtalîzmê bîne bîra mirov jî, rastiyek bi kapîtalîzmê re hemcewher nîne. Sîstemên civakî yên berî û piştî kapîtalîzmê jî dikarin bibin xwedî bazarên hevpar. Bazar kategoriyeke giştî ya pêşketina civakê ye. Di nîzamên sosyalîst de jî wê hebûna xwe dewam bike xwezayî ye û wê bi kêr be. Li dora bazarên pêşketî çand û zimanê hevpar, tayên netew pêş dikevin. Ya rastirîn, bi pêşketina çand û zimanê hevpar re bi tayê bingehîn ê netew re têkilî çêdibe. Li ser vî zemînî kapîtalîzm jî dikare pêş bikeve. Sîstemên ne kapîtalîst, nîzamên komîn, demokratîk û sosyalîst jî dikarin derkevin holê. Eger di nava netew de tehekumkariya çîna kapîtalîst hebe, wê wextê binavkirina netew bûrjûwa yan jî kapîtalîst dikare bibe xwedî mane. Lê di vir de rast nîne ku mirov kapîtalîzm û netew hemcewher bibîne. Eger tayên wê bi kedxwariyê re qels bin û têkiliyên wê yên komîn sereke bin, mirov dikare ji van netewan re bibêje netewên sosyalîst û demokratîk.

Di nava netewan de tevlîheviya tayên çîn, cins û etnîsîteyê zêde dibe. Tevî ku çînên bingehîn bûrjûwa û karker in, gelek tebeqe û çîna gundîtiyê xwe nû dike. Mirov dikare gelek qewm, çîn û cinsê bindest di nava netew de bibîne. Wê wextê têgînên cins, çîn û netewa serdest zelaltir bibin, wê zimanê fermî, cihêwaziyê netewî, etnîkên bindest û komên çandê pêk werin. Netew-dewlet her çend derketina dewletê ji nav hebûna netewî îfade dike jî zêdetir îşaretê bi têgîna mîlliyetparêziyê dike. Eger îdeolojiya dewletê milliyetparêzî be, ji ber milliyeta serdest jê re netew-dewlet tê gotin. Dewletên pir netew jî hene. Di vê rewşê de divê mirov di şûna têgîna netew-dewlet de tiştekî din bîne ziman. Yek ji aliyê xeter ê netewparêziyê ew e ku her netewekî bi dewletê, her dewletekê jî bi netewekî dinirxîne. Bêyî ku mirov kategoriyên netew û dewletê zêde tevlîhev bike, divê dewlet wek amûrekî rêxistiniya hevpar were nirxandin û ev yekê jî ji bo azadî-wekhevî û demokratîkbûyîna netewan jî hînê pirtir xizmetê bike.

Ji netew wêdetir, mirov senteza koma netewan li ser berjewendiyên havpar û nêz fêm bike rastir e. Eger mirov li ser sentezên netewan ên hevdu înkar nakin û hevdu dewlemend dikin biponije wê gelek mijarê çareser bike û rê li ber encamên bi xêrûber veke. Ne nîhîlîzma netew - înkarkirin - ne fanatîzma netew; berovajî senteza nirxên netewên cuda, dikare bibe rêyeke herî baş û rast ji bo xilasbûna tevlîheviya netewparêziyên roja me ya îro.

Di çarçoveya van têgînên bingehîn de em dikarin rastiya netew, çîn û etnîsîteyê hînê baş lêbikolin. Em dikarin Kurdistanê wek make û çavkaniya bingehîn a etnîsîsteyê binirxînin. Ji ber ku Kurdistan yek ji navendên herî kevin ê şoreşa neolîtîk e û hînê komên etnîk bi tesîr lê dijîn, dikare îzaha mirov rave bike. Civaka Kurd di dîrokê de mozaîkeke etnîk e, herî zêde kevin û pirtêkel e. Li herêmê, ji çûnûhatina ji bakur-başûr, rojhilat-rojava re bi hezarsalan navendî kiriye û di vê yekê de hilberîneriya şoreşa cotkariyê roleke bingehîn dilîze. Li Mezopotamya Jêr û li Misrê derfet û îmkan ji bo şaristaniyeke bingehê wê çînî zêdetir amade bû, lê li Mezopotamya Jor û hawîrdora wê jiyaneke etnîk hînê zêdetir dest dide. Şertên nîv-koçeriyê, parastin, têkiliyên deşt-çiyê, şertên demsalî ji bo jiyana etnîsîteyê peyda nedibûn. Jixwe şoreşa neolîtîk jî encamên van şert û mercan e. Zêdebûna hejmara şêniyan, pir zû rê li ber têkoşîna li ser cihûwar û qadên hilberandinê vedike. Ji lewra rêxistinbûyînên tîpa eşîrê dibin deverên bingehîn ên hilberandin, parastin û bicihbûnê.

Şêwazê dewletê yê rêxistinbûyînê, taybetiyên wê hene ku her kêlî ji ber êrîşên ji der ve hilweşe. Şert û merc ji bo dewletbûyînê zû xuya dikin. Eşîr, gundên hînê piçûktir û qebîle şensê wê yê jiyanê bi sînor in. Yan tevlî eşîreke bi tesîr bibe, yan koç bike, yan jî heta dawiyê li ber xwe bide, alternatîfên bi vî rengî hene. Kesên xwe diavêjin bextê şertên zehmet bi giranî komên têkoşer û çarçoveya wan teng e. Cihûwarên li deştê jî ji wan derdor û beşan e, ku herî zû dikevin bin bandora dewletê. Em wexta çav li eşîrên deştê û çiya didêrînin, em dibînin eşîrên li çiyê saf in, û tevlîhev nebûne; eşîrên li deştê dijîn asîmîlasyoneke pir dijwar derbas dikin. Ji ber vê yekê ye, cudahiyeke ciddî di navbera Kurdîtiya çiyê û deştê de heye.

Prototîpa koma zimanê Kurdî texmînî diçe 12.000 sal berê. Ji ber ku zimanê cotkarî û heywan xwedîkirinê ye, li ser nîzama jiyanên wek xwe û kokên wan jî bi tesîr dibe. Bi cudabûyînê re di derketina Hûriyan de roleke bingehîn dilîze. Komên zimanên Hînd-Ewrûpî xurt in, ji ber bingehê wan xwe dispêre şoreşa cotkariyê ya hezar sal berê. Eger bi vî rengî kokên ziman nebûna, wê li ser cografyayeke berfireh îzaha peyvan mumkîn nebûya.

Divê mirov belavbûna li Kurdistanê ne fizîkî, bi awayekî çandî bifikire. Texmînî 6000 sal berê rengê avabûna eşîrê xuya dike. Hin eşîrên Kurd ên li çiyê dimînin peyvên bi kar tînin li cem Hûriyan peyda dibin. Heta gelek peyvên di koma zimanê Hînd-Ewrûpayî de wek mûrd=mirin, jin=jiyan, ra=ro, star=stêrk û hwd. vê rastiyê nîşan didin. Wekheviya di navbera nîzamê xwedayî û mîtolojîk de jî balkêş e.

Rewşa derbasbûnê ya di navbera şaristaniyên Sumer-Hîtît de, hêmanekî din e, hebûna eşîrî ya proto Kurdan xurt dike. Ji ber ku dewletbûneke zû wê tasfiya wan hêsan bike, jiyaneke nîv-koçerî, yanî şêwazeke jiyanê ya mîna gerîlla tercîh dikin. Li hawîrdora wan çiqas dewlet ava dibin, ew çend hewce dibînin ku eşîra xwe xurt bikin. Li cem Kurdan eşîr nîv-gerîlla ye. Em wexta ji nêz ve li rêxistinbûyîna eşîrê dinerin, em dibînin erkê dayikê û azadî derdikevin pêş. Jin gelek bi tesîr û xweser e. Encama em dikarin ji vê derxînin ew e ku berxwedana eşîrê di asta nîv-gerîllatiyê de pêş ketiye. Em careke din dibînin ku asta azadiyê ya jinê di vir de jî asta azadiya civakê diyar dike. Hêz, jêhatîbûn û wêrekiya kevneşopî ya jina Kurd çavkaniyekî wê yê kevin ê dîrokî heye. Aliyê neyênî yê şêwazê jiyana eşîrî ew e, îmkanê wê kêmin ji bo wergere civakeke berfirehtir û pêşketîtir.

Civaka çînî bajêr pêk tîne. Bi bajêr re nivîs, huner û zanist hînê zû pêş dikeve. Damezrandina dewletê kapasîteya raman û çalakiyê pir zêde pêş de dibe. Bi hatin û bereketa ekonomîk re şêniyên zêde, dikarin bi hev re bijîn. Kurd ne ku bê qabîleyet bûn, berovajî ji ber ku bi qabîliyet bûn li welatê xwe di jiyana azad de israr kirin. Belkî jî vê yekê ew ji pêşxistina sîstema şaristaniya koledar kirine. Lê bi saya berxwedana azadiyê hebûna xwe parastine.

Eger em pîvanên pêşketinê wek azadî destnîşan bikin, belkî jî Kurd di dîrokê de gel û koma etnîk a herî pêşketiye. Di şaristaniyên navenda wan Mezopotamya de ku BZ heta salên 330 tên, statuya eşîrên Kurd li herêmê xwedî cihekî payberz e, xwedî taybetiyên welê ye, li têkiliyên pêre tê gerîn. Ji bo vê yekê, çavkaniya herî baş Dîroka Heredot e. Wexta Heredot tim û tim behsa Medan dike, îşaret bi hin meylan dike ku wê demê civaka pêşketî ya Grek bi hevkariya Medan gunehbar dikin. Kurdên wê demê Med van taybetiyên xwe deyndarê nasnameya xwe ya azad in.

Dînê Zerduşt ji aliyê exlaqê azad ve dînê herî xurt e. Di warê têkiliyên jin-mêran de nêzî sîstema wekhevî û azadiyê ye. Nîzameke wekheviyê ya îdeal salix dike. Jin û mêrtiyeke baş wek fazîleteke neqane dihesibîne. Qîmetê dide mezinkirina zarokan û rastî wek pîvana yekemîn a perwerdê ye. Pir girînge ku mirov derewan neke. Di nav dînan de yê herî zêde balê dikişîne ser parastina heywan û hawîrdorê. Di xurtbûna malbata Kurd de bandora Zerduştiyê eşkere ye. Hînê jî ev kevneşopiyên mîna yên Zerduştiyê li cem æzîdî û Elewiyên Kurd geş û zindî ne.

Çendîn dikevin bin bandora şaristaniyan, nîzamê wan ê eşîrê û exlaqên wan xira dibin. Piştî dagirkeriya Helenîzmê, bi senteza Rojava-Rojhilat li ser rêya şaristaniyê qonaxeke nû ya girîng pêk tê. Kîtabeyên li xirbe-bermahiyên Nemrûd ku peykerên qraliyeta Komagene'ne, vê rastiyê baş nîşan didin. Heta derketina Îslamiyetê çiya di jiyana civakî ya Kurd de rola xwe diparêze. Tevî vê yekê, mirov dikare texmîn bike ku berê di nav persan de paşê di nav împaratoriya Part û Sasaniyan de çîneke arîstokrat a Kurd cih çêkiriye. Arîstokrasiyeke ji etnîsîteyê qutbûyî jî bi serê xwe ji çînîbûnê dûr e. Belkî beriya persan ev qabîliyeta wê hebû. Lê piştî ku bi împaratoriyê re hevkarî kirin, dibe ku girêdaneke bende û ebd ji wan were hêvîkirin. Agahiyên di dest de vê taybetiya çîna arîstokrat nîşan didin. Etnîsîteya Kurd çiqas azad e, arîstokrasiya wê jî ew çend hebûn û tinebûna wê diyar nîne û hevkar e. Li ser vî hîmî çînîbûyîn belovajî ye û bi înkara nijadê re di zikhev de ye. Çîneke arîstokrat a

mîna Grek, Roma û Pers di civaka Kurd de dernakeve pêş. Zêdetir di nav arîstokrasiyên serdest de dilê xwe dibijîne wan û şikil werdigire. Vegotina 'ji qral hînê zêdetir qral e' ji bo hevkarên Kurd li cih e. Eger arîstokrasiyek mîna ya Roma, heta ya Sumer û Misrê çîneke dewletê derketibûya, bêguman wê pêşketinên civakî yên li Kurdistanê cuda bûna. Bajarên wan nînin. Bajarên hatine avakirin beden in. Em wexta li bajarên Helenan ava kirine dinerin cudabûneke mezin heye.

Di tevahiya van hemû deman de cudabûna di navbera gund û bajaran de li ser cudabûna di navbera civakê de jî bandorê dike. Ji serweriya Persan ve bajar rola navendên biyanî dilîzin, kom û koçerî jî ji çanda herêmî re xizmetê dikin. Ev rastî demeke dirêj wer dewam dike. Bajar berê mora Sumer û paşê jî li gorî rêzê mora Babîl, Asûr, Pers, Helen, Roma, Bîzans, Osmanî û herî dawî jî mora netew-dewletan dixwin. Li hemberî vê yekê gund û kom Kurdîtiyê hildigirin û temsîl dikin. Kurd ji kêfa xwe kom û gund nemane, dagirkerî û bajarên biyanîbûyî di vê yekê de roleke diyar dilîzin. Bajar ji bo Kurdan tê maneya xerîbbûyînê, koletiyê û hevkartiyê.

Bandora Îslamiyetê li ser etnîsîteya Kurd û arîstokrasiya wê piralî bûye. Beşên yekemîn stû xwar dikin, hevkarên etnîk û arîstokratên bajara ne. Teslîmiyet bi kok e. Rola wan a di çînîbûyîna serdema navîn de bingehê îxanetê ye ku digihîje heta roja me ya îro. Dikarin xwe ji Kurdîtiya li derveyî bajaran nehesibînin di nava komên îqtîdarê yên serdest de xwe bi rêxistin bikin.

Em wexta vê mijarê objektîf digirin dest û li ser radiwestin, em dikarin hînê baştir çareser bikin. Hawîrdor beriya hezar salan xwe bi rêxistin kiriye. Bajar bi tevahî xerîb in. Keys û firsend nayê dayîn ji bo bajarên xwe ava bikin. Mîna fatihekî ji çiyê danakevin. Ji zû ve hevkaran rê vekirine. Yên pişt re tenê dikarin wê rê bişopînin. Ji Sumerbûyînê em bigirin heta Helenbûyînê, Persbûyînê û Erebbûyînê di nav her nijada serdest de nikarîne xwe xilas bikin ji nehelînê. Tê fêmkirin ku etnîsîteyeke bi vî rengî bijî û li ser vî hîmî hiyarerşiya xwe wenda bike, wê nikaribe ziman û çanda xwe pêş de bibe.

Di serdema navîn de her çend hin xanedaniyên Kurd pêk hatine jî nekarîne bandora Erebî û Farisî li dawiyê bihêlin û xwe bigihînin qonaxa xanedaniyeke netewî. Xanedaniyên navdar ên Kurd Merwanî û Eyyûbî (PZ 990-1090, 1775-1250) di dema serweriya xwe de ji xanedaniyên Ereb pir cuda nebûne. Di warê Kurdî de xebat û hewldaneke ciddî nîşan nedane. Li ser xeta klasîk meşiyane. Ji ber ku gel Îslam bi rêya mezheb û terîqetan jiyaye di parastina cewherê Kurdî de roleke erênî lîstine. Feodalîzma serdema navîn tevî hemû

aliyên xwe yên neyînî nekarî taybetiya Kurdan a qewmî tine bike, berovajî bi sînor be jî Kurdan di warê siyasî, wêjeyî, entelektuelî û gelek pêşketinan de hebûna xwe nîşan dane. Mirov di vî warî de dikare Şerefname (1596) Mem û Zînê (di salên 1690î de) wek mînakên pêşketina taybetiyên qewmî yên Kurd nîşan bide.

Em yekem car dibînin ku kom ji eşîran vediqetin. Komên ji eşîran vediqetin ji wan re Kurmanc tê gotin û girseyek li derveyî eşîrê îfade dike. Bi hejîna nîzama eşîrê re û bi veqetînan re ev girse timî mezin dibe. Taxên li keviyên bajaran yekem car kurmanc pêk tînin. Em dibînin ku ev pêvajo di sedsala 19. de bi leztir dibe. Em dikarin bişibînin pêvajoya kapîtalîzmê ya karker pirkirinê. Kurmanc tam hemtayê Kurdîtiyê ye. Di navbera Kurdê eşîrê û Kurmanc de cudahî nîne. Eşîr bêyî hîyarerşî nabe, lê Kurmanc bi malbata xwe heye. Mîna karkerekî Kurd be. Çîneke karkeran e. Gotina koma karker vê rastiyê baş îfade dike.

Serf, Kurdê xulam bendeyê axa ye. Axatiya di serdema navîn de pêş ket di arîstokrasiya Kurd de xwedî cihekî xweser e. Karîbûye ji eşîrê serfan biafirîne. Axatî nemaze di dema Osmaniyan de pêş dikeve. Zêdetir li gund derfetê wê yên cotkariyê pêş ketine. Eger etnîsîte li gundekî cotkariyê bi cih bûye, hiyarerşî jî bi şêweyekî axatiyê xwe pêk tîne. Axa bi tundîtiya xwe tê naskirin. Ji serekê eşîrê cuda ye. Zêdetir bi darê zorê tevdigere. Serekê eşîrê jî bi têkiliyên xizimtiyê rê ve dibe. Saziya şêxtiyê wek kevneşopiyeke Ereb hatiye pejirandin. Saziyeke bi bandora dînî pêk hatiye. Tevî ku bingehekî wê yê ekonomîk heye, hînê zêdetir entelektueliya serdema navîn temsîl dike. Hinekî dişibe şefê terîqetê. Mirov dikare serekê eşîrê, axayê gund û şêxtiya dînî-terîqê wek çînên serdest ên serdema navîn ên Kurd bi nav bike. Di çînîbûyînê de hin pêşketin bûne.

Ji hevkariya Şerefxanî û Osmaniyan (Emîrê Bedlîsê Îdrîs-î Bedlîsî serokê wan ê fexriye) ev tebeqeya serdest sûd werdigire, lê piştî sedsala 19. berjewendiyên xwe wenda dikin pêvajoya serhildanê didin destpêkirin. Kengî daxwazên ji bo bacên giran û esker ên dewleta navendî ji statuya berê derbas dibin, tevahiya sedsala 19. bi serhildan û îsyanan derbas dibe. Lê van serhildanan nekarîne xwe bigihînin qonaxa netewparêziya Kurd, nekarîne xwe bigihînin netewparêziya Rojava û heta nikarîne xwe bigihînin qonaxa netewparêziya Ermenî û Suryaniyên li ber serê xwe. Têkçûna wan bandoreke neyînî li ser gel kiriye. Hiştiye ku asta azadiyê ya gel bikeve. Nekarîne qewmê Kurd bigihînin tevgereke netewî. Mirov nikare bibêje ku karîne rola kevneşopiyê li dawiyê hîştine.

Em dikarin vê pêvajoya serberjêrçûyî ji bo Kurdan bi serhildanên di sedsala 19. de bidin destpêkirin. Di dîrokê de yekem statuya Kurd tine dibe, ti roleke wê ya siyasî ya xweser namîne. Piştî şerê cîhanê yê yekemîn hilweşîna împaratoriya Osmaniyan hevkarên Kurd jî xistiye rewşeke tengav. Di destpêkê de fêm nakin ku şerê rizgariya netewî ji bo xilaskirina xelîfetiyê nîne, kengî fêm dikin ji bo avakirina komarê ye, hevkartiya xwe ya di destpêkê de werdigerînin serhildanan. Bi têkçûna xwe re rê li ber pêşketina statuyeke hevkar û înkarwarî vekirin. Çendîn taybetiyên xwe yên Kurdayetiyê wenda kirine di nava dewletan de mîna klîkeke ajan û sîxur tevgeriyane. Ji bo xwe wek komên hindikayiyan bidin qebûlkirin li ser navê netewê serdest bûne netewparêzin herî dijwar. Dîndariya wan û netewparêziya wan jî ji bo her gel û netewî tehlûke ye.

Netewbûyîna Kurd di cihokeke nakok û cuda re diherike. Li dora bazareke hevpar derfet û îmkanên pêşdebirina ziman û çanda xwe nedîtiye. Serhildan û tepisandinên dijwar ev şens ji holê rakiriye. Ji ber ku berxwedan hatin şikandin û tevgerên netewî yên hemdem nehatin afirandin, rê li ber netewbûyîneke asta wê pir li paş vekirin. Nekarîne xwe bikin tevger û partiyên netewî yên hemdem. Nekarîne di rohnîbûna Kurd de jî alîkariyeke bi kêr bikin. Tevî ku komar bi Tirkan re hat avakirin, ji ber lêgerînên wan yên kevin, ji ber nas nekirina wan ya komarê, vî şensî jî ji destên xwe direvînin û dikin ku serhildanên nû li dijî Kurdan bigihîjin encamê. Ji asîmîlasyona pişt re were meşandin, serî radizînin û di siyaseta netewê serdest de bi awayekî bêpîvan û xayînane dimeşin û di sedsala 20. de ku serdema rizgariyên netewî bû, kirin ku ji bo Kurdan sedsal bibe ya herî xirab. Di vê de xwedî rola bingehîn bûn. Çendîn netewiyeta xwe qirêj kirine, ew çend jî netew an jî netewên di navê de xwestine rol bilîzin, qirêjî kirine.

Pir muhtemel nîne ku netewîbûyîna Kurd li dora bazarekê û bi tevgerên netewî yên bûrjûwaziyê pêş bikeve. Di pêngava nû ya Rojhilata Navîn a DYE de diyar nîne ku wê Kurdên hevkar û netewiyeta bûrjûwaziyê di çi astê de bi kêr werin. Ji muttefîkekî bipîvan zêdetir, wek tevgerek heta dawiyê bi berjewendiyê xwe ve girêdayî xuya dikin.

Ji bilî van, li dawiyê şêwazê Kurmancî û xebatên civakî yên komîn ên demokratîk hene. Li dora civaka sivîl, komîn û demokratîk, dikare netewîbûyîneke Kurd a têkûz bi rêbazên hemdem pêk were. Divê ji tevgerên netewî yên navend dewlet cuda bin, ji bo demeke

dirêj li şûna xwe bispêre rêbazên şerekî rizgariya netewî, pêşî bi xebatên demokratîkbûyîn û civakeke sivîl a fonksiyonel, dikare şêwegirtineke netewî pêk bîne. Nemaze tevlîbûna jinê li ser hîmekî azad girîngiya wê pir zêde dike. Xebata were meşandin, divê xwe ji netewparêziyê kiribe, ji radîkalîzma dîn dûr xistibe, îfadeya azad a çanda herêmî be, azadiya cinsî ya civakê û parastina hawîrdorê bike, xebateke netewîbûyînê ya bi vî rengî, eger tê de rêbazên cihêxwazî û şîdetê nebin, wê karibe netewîbûyîneke demokrat pêk bîne. Ev rêbaz a herî têkûz e.

Netewbûyîna Kurd a bi vê rêbazê bimeşe, li cihekî mîna Rojhilata Navîn ku netewparêztî, mezhebtî, etnîk û dîndarî ketine qirika hevdu, dikare li herêmê bibe mînakekî payeberz ê çareseriyê. Nexasim di mînaka Îsraîl-Filîstînê de neçariyeke mezin a rêbaza netewparêziyê heye, ji lewra rêbazên nû şert in. Dem hatiye were fêmkirin ku pirsgirêk bi şîdet û cihêbûnê çareser nabin. Dîsa divê baş were fêmkirin ku bi terora dewletê rastiyên millî nayên tinekirin. Ya hînê girîngtir ew e ku divê baş were fêmkirin ku bi netew, etnîk, dîn û çandên cuda re jiyan nabe sedema fikar û wendakirinê, berovajî, dikare bibe rêya jiyaneke dewlemend û zindî. Ji bo çand û netewên cuda dewlet hewce nake, berovajî, demokrasiyeke tam pêdiviyek e ku dest jê nabe. Kengî ev baş hat fêmkirin, wê were dîtin ku pirsgirêkeke netewî ya neyê çareserkirin nîne.

Di roja me ya îro de netewîbûyîna Kurd her du rêbazan jî di zikhev de diceribîne. Ya yekemîn, sîstema Rojava destekê didê, hînê bernameya wê ya berçav nîne, tenê wek Dewleta Federe ya Kurd tê bi navkirin, xwediyên vê rê tebeqe serdest a Kurd a netewparêzên paşverû ya feodal-bûrjûwazîn e; ya duyemîn, hêza xwe ya cewherî esas dibîne, hedefa xwe afirandina neteweyekî azadîxwaz û demokratîk e, ev rê ya gelê Kurd ê kedkar e. Ya yekemîn paşverû ye, xwe dispêre berjewendiyê, tayên feodal, dîndar û eşîrtiyê bi kar tîne, ya duyemîn eşîrtiya teng li dawiyê hiştiye, xwe li ekolên dîndar û feodal ranagire, tayên demokratîk, wekhev û azadîxwaz esas dibîne. Ya yekemîn bi giranî di şert û mercên dagirkeriyê yên DYE de hewl dide li Kurdistana Iraqê pêşengiyê bike, ya duyemîn xwe dispêre hêza xwe ya cewherî û hewl dide di demokratîkbûyîna Tirkiyê de Kurdistanê ne wek çoyekî, lê wek destekekî bixe rola pêşengiyê. Ev her du rê yan jî her du rêbaz wê di dema pêş me de rola wan a çareseriyê li Rojhilata Navîn di pirsgirêkên demokratîk-netewî de ku wê girantir bibin, hînê baştir diyar bibin û girîngiya wan were fêmkirin. Li gorî giraniya van rêbazan wê diyar bibe ka Kurdistanê

bibe Îsraîl-Filîstîneke nû yan jî wê bibe welatê çareserî û aştiyê. Çendîn ji rêbazên etnîka teng, qewmiyetparêz, dînî û netewparêziyê dûr were sekinandin û îtîbar bi rêbazên eskerî neyê kirin, pirsgirêkên civakî yên pir tevlîhev ên li Kurdistanê wê çareseriya wan bi awayekî azad û wekhev bibe û ew çend jî rêya netewîbûyîneke demokratîk wê vebe.

**5- Li Kurdistanê îdeolojiya fermî û şêwazê wê yê îqtîdarê**

Eger çîrokên îqtîdar û îdeolojiyê bihata nivîsandin, diyare wê di rastiya civakî de gava herî girîng di teoriya hemdem de bihata avêtin. Pêwîste mirov baş bizanibe ku di sosyolojiyê de rastiya îqtîdar û îdeolojiyê nehatine çareserkirin. Îdeolojî wek hakîmiyet û fikirîna hevpar û rêvebirina îqtîdarê ku rola wan di şekildayîna hemû hucreyên civakê de baş neyê eşkerekirin, wê hemû analîzên siyasî, civakî û aborî, rê li ber cehaleteke nezanî ya herî xeter vekin. Eger mirov cudahiya di pêkanîna rêbaza zanistî ya li ser civakê û li ser dunya derveyî civakê de nebîne, wê pirsgirêka zanîn û kirinê jî hînê tevlîhev bibin. Xwenaskirina civakê jî di vê rastiyê re derbas dibe. Xusûsiyeta bingehîn a civakan, xwe tarîf kirine. Civakek nikaribe xwe tarîf bike, mirov nikare behsa hebûna wê civakê bike. Mirov ji vê re bibêje; civak bûye cenaze jî li cih e. Navekî din ê xwe tarîfkirinê jî îdeolojiya civakî ye. Mirov dikare îdeolojiyê wek pakêta fikrên hevpar a bûye îrade, tarîf bike. Navekî din ê vê yekê ew e ku exlaqê civakî ye. Fonksiyona bingehîn a exlaqê civakî ew e ku hebûna civakî ji sedî sed misoger bike. Hebûna civakî jî tenê bi xwedîderketina li xwe, yanî civak bibe xwedî hêza xwe ya îdeolojîk, dibe. Xelek bi vî awayî temam dibin.

Tevî ku îqtîdar bi îdeolojiyê bi tayekî xurt girêdayî ye, dîsa jî wek rastiyeke cuda nemaze di civakên tehekumkar de diyarker e. Îqtîdar bi xwe şîdeta di nav civakê de ya bûye sazî yanî amûreke ku şîdetê dinuxumîne. Ji lewra belkî nabe ku mirov îqtîdarê bi serê xwe tarîf bike. Eger mirov maskeyê tarîf bike, divê were zanîn wek amûrê nuxumandina çi tê bi kar anîn. Maske bi serê xwe nayên tarîfkirin. Şîdet kengî dijwar bû û teqiya tê fêmkirin. Wî wextî maske dikeve û tê fêmkirin ku ew bi serê xwe nebûye. Eger bibe jî temamkerekî şîdetê heye û hînê pir zelal wê were dîtin ku rûyekî xapînok ê şîdetê heye. Civakek şîdet wê diyar bike, rewşa wê ya asayî nîne, rewşa wê ya teqînê ye. Timî teqîn bi qasî di xwezayê de di civakê de jî rewşeke nadîde ye. Jixwe hevkariya mezin ya mejiyê hisî û analîtîk di wê qabîliyetê de ne, pêşî li teqînên civakî - şer, şoreş, dijşoreş, serhildan, pevçûn - bigirin. Wexta rewşên bi pirsgirêk derkevin ji sedî sed

çareseriyên bêyî teqîn mumkîn dibin. Yanî rast nîne were gotin ku ji bilî rêyên eskerî û şîdetê çareserî nîne.

Em ji bo îdeolojiya fermî û îqtîdara li Kurdistanê binirxînin, hewce bû em van tarîfên kurt bikin. Bi îdeolojiya fermî statuya îqtîdara dewletê li ser civakê ferz kiriye diparêze, rewa dike; ji bo îqtîdara dewletê ya yekalî bi civakê bide erêkirin û dewamkirin, afirandina zêhniyetê ye. Eger em mînak bidin, di Sumeran de mîtolojî, li cem Grekan felsefe, li Ewrûpaya hemdem zanist û di cîhana serdema navîn de jî dîn wek amûrekî îdeolojîk fonksiyonel bû. Kiryarên wê (wek îbadet û merasîmên dînî) di asteke talî de xwedî fonksiyon bûn. Qalibên bingehîn ên zêhniyetê diyarker bûn.

Li gorî îdeaya bingehîn a îdeolojiyên fermî li Kurdistanê, rastiyek bi navê Kurd nîne, eger hebe jî pir girîng nîne, girîng be jî eşkerekirina wê pir bi tehlûke ye. Ev zincîra îdeayan welê dewam dike. Ji bo vê jî ji hezar cihî bahaneyan tînin. Hin bahaneyên mîna qeşayê sar û hin jî mîna ava kelandî bi serê mirov de dikin. Îqtîdar û her tiştê pê ve heta qebûlê bibîne û were erêkirin van kiryaran wer dewam dikin. Bahaneya bingehîn a di bin vê kiryarê de jî ew e, Kurdistan ji zû ve hatiye fetihkirin û pê re hemû Kurd jî teslîm hatine girtin. Ya seyr ew e, haya Kurdan ji van ti îdeayan tine. Ereb, Tirk û Farisekî xwediyê îqtîdarê pir bi zimanekî fort û pesin dikare behs bike bi kîjan şerên serketî Kurd û Kurdistana di bin destê xwe de zevt kiriye û heta ji qala van qaşo çîrokên qehremanî û fethê jî pir zewq werdigire. Kurd jî - eger îdîa û rûyî wan heye ji bo bibêjin em hene - dikare devê wî ji hev çûyî van çîrokan guhdarî bike. Pir hindik qabîliyeta wê heye lê bipirse ku çi û kî hatiye fetihkirin. Rewşa wî ya heyî, di çarçoveya zêhniyeta civakî û tayê pêve de xilasbûna exlaqê nîşan dide.

Îdeolojiyên fermî bi sedsala ne bi awayên cuda heta roja me ya îro tên. Hem jî wek xelekên zincîrekê. Qutbûnê nas nakin. Eger em mijarê bi mînakan vekin; Ereb jixwe fethên Îslamê wek belgeyeke îlahî di destê xwe de mîna ispateke bingehîn digirin. Dibêjin; "me fetih kir, wê wextê yê me ye." Ji fetihkirina li ser navê xwedê mezintir ma heq heye? Îdea ev e, û hînê jî pir bi xurtî xwediyê vê îdeaya xwe ne. Faris gaveke din pêş de diçin û Kurdan qonaxeke li jêr xizmê xwe dihesibînin û heq di xwe de dibînin ku dest bidin ser her tiştên wan û heta ji xwe piştrast in ku Kurd jî vê yekê erê dikin. Ji lewra hewce nabînin dûrûdirêj sedeman rêz bikin. Mîna ku bibêjin; ma li hemberî îdeolojî û îqtîdarên mezin ên dewletan Kurdîtî jî dikare bibe îdeayek? Tirk jî heman sanaryoyan îdîa dikin. Bêyî ku lê

bipirsin îdîa dikin ku beriya hezar salan wek parçeyekî Anatolyayê fetih kirine. Wer ji wan tê ku fetihkirin mafekî mutleq dide wan û bi îdeayeke bi vî rengî ya xapînok ji xwe piştrast dipeyivin.

Ya esas, dibe ku fetha Balkanan, fetha Stenbolê watedar bibe. Lê eger tu bibêjî; Amed hîç nehatiye fetihkirin, ji dema Selçûkiyan ve bi siyaseteke hevpar tê meşandin û xeta bingehîn a dîrokê jî welê ye, wê vê yekê wek êrîşek li îdeolojiya fermî hatibe kirin yan jî wek binpêkrina mafê fethê binirxînin. Lê me baş danî holê ku Kurd ji panzdeh hezar salan ve li ser xakên dijî bû çand, bû welat, ji lewra ji hezar qat mafê fethê maf û îdeayên xurt ên Kurdan hene. Gelê Kurd herî kêm zivistan havîn çandiye; zevî vekirine; gund û bajar ava kirine; bi hezaran kul û keserê vî welatî kişandine; li ber xwe daye; miriye; bihost bihost nûra çavan rijandiye, welhasil bi her cure kedê bi şêweyekî gergef hebûna xwe ya civakî li ser vî welatî straye, çawa bi derbekê dibe welatê Ereb, Tirk û yan jî Eceman? Pir bi awayekî mafdar dikarin îdea bikin, belkî te bi sefereke neheq dagir kir, lê ez bi dayîna sedan nifşî her roj fetih dikim.

Îdeayeke din a îdeolojiyên fermî ew e ku têgînên Kurd û Kurdistanê girîng nînin, xeter in, heta dikarin bibin sedema teror û cihêxwaziyê. Herçî ji aliyê dîrokî ve têra xwe îspat bû ku têgînên Kurd û Kurdistanê hînê Ereb, Fars û Tirk li naverastê nebûn bi hezaran sal berê hebûn. Her weha bêqîmet jî nebû û hat destnîşankirin ku ji şaristaniyên bingehîn re çavkaniya sereke bû. Îdeaya dibêje dikare ji şîdet û cihêxwaztiyê re bibe çavkanî, berovajî îdîayê ispat dike. Helwesta mînaka dizekê rez ê xwedî diqewirîne cihêtîxwaz e. Erdên ku Kurdan bi hezaran sal keda xwe tê dane çima parçe û cihê bikin? Dîsa Kurd bi xwe têne kuştin, têne dagirkirin û ya rastîn ên ji der ve tên bi amûrên şîdetê dikevin hundur. Kurd çima şîdetê bi kar bînin? Xweparastina herî mecbûrî çima bibe şîdeta cihêtîxwaziyê?

Nuqteyên ku me formule kirin, îdeolojiyên fermî ev çend vekirî naynin ziman, lê îdeayên wan bi cewherî welê ne. Jixwe gotinên pêşiyên wan jî rastiyê rave dikin, çi dibêjin; "Alavere dalavere Kurd Mehmed biçe nobetê", "Kurd çi ji cejnê fêm dike, xul xul dew vedixwe." Îdeolojiyên fermî di çarçoveya van îdeayên xwe de dersên dîrok, ekonomîk, siyaset, wêje, huqûq, hunerên din, eskertî û heta wek zanista dîn û exlaqê li dibistanan dide û wek wezîfeyeke bingehîn dihesibîne. Bi vî awayî bawer dikin ku civak rewa dibe. Îdeolojî di vê nuqteyê de hewl dide ji komkujiyê wêdetir bibe xwedî fonksiyonekê. Ji hejarketin û têkçûna gelê civakekê sûd werdigire û

wî ji nedîtî ve tê, ev yek ne tenê binpêkirina mafekî ye, di cewherê xwe de înkar û xîlafketina bi hemû rastiyên zanistî, felsefî û dînî re ye. Yê înkar bike dikare tine jî bike.

Erk û wezîfeya vê nivîsê nîne ku dûrûdirêj guftûgo bike, di van pêvajoyan de dewletên Ereb, Tirk û Fars xwediyê çi îdîayan e. Tenê tarîfa fonksiyona îdeolojîk tê kirin. Wekî din pirsgirêka amûrên îdeolojiyê heye. Hînê berê bi xoceyên gerok, derwêş û seyîdan, paşê bi pirtûkan, ber bi roja me ya îro ve bi rojname, radyo û televîzyonan, bi mizgef û dibistanên fermî, ev îdeayên îdeolojîk ku mîna rastiyê nîşan didin, her roj hezar carî dubare dikin û hewl didin rewa bikin. Eger tezek ters were kirin, yekser dibe mijara gunehkariyeke mezin û tavilê digihînin hêzên ewlekariyê û saziyên dadgeriyê. Di vê mijarê de dadgeh pir zû biryarê didin, ceza dibirrin û bi awayekî dijwar bi cih tînin. Eger civakek, gelek ji rûmeta xwe ya herî bingehîn xweîfadekirinê hatibe kirin û ev çend li astengiyan hatibe qewimandin, çi hakim dibe û çi jî mehkûm be, ji wan mirov û civakan êdî çi xêr tê?

Pir eşkere ye, ku îdeolojiyên fermî rê li ber pirsgirêkên ciddî vedikin. Hewl didin cewherê îqtîdarê şîdetê rewa bikin û bi vî awayî serwer û mafdar nîşan bidin, vê yekê jî di afirandina statuyekê de bi kar tînin. Çi hakim û çi jî mehkûm dibe, hewl dide paradigmaya bingehîn a civakê bi nertineke yekalî serwer bike û bi vî awayî têgihîştina li rastiyê û helwestên têkûz asteng bike. Piştgirî û aştiyeke muhtemel a civakî ji cewherê wê dûr dixînin û pûç dikin. Berovajî, ji bo îdeayên dijber her kêlî karibin derkevin holê sedemên ciddî amade dikin, ji bo rewşeke bi pevçûn û şîdetê pêk were dest li ba dikin. Di dîrokê de her tim îdeayên îdeolojiyan ên li derveyî rastiyê ji bo şeran bahane afirandine û bi vî awayî pêşî li aştiyê girtine. Vê yekê jî bi xwe re timî rê li ber derketina îdeolojî û avahiyên nû yên dijber vekiriye û bi vî awayî civakê di nav rewşeke tengezar û bi pevçûn de dihêle.

Aştiyeke rastîn a di qada îdeolojîk de bi azadiya fikrê dibe. Ewrûpiyan piştî şerê sedsalan ên îdeolojîk li girîngiya fikra azad hayil bûn û ew kirin wek mafekî bingehîn. Fikra azad qelsî û çewtiyên di helwestên îdeolojîk de derdixîne holê û rê vedike hînê rastir û têkûz bibin. Bi vî awayî jî afirandin û hilberandina fikrê pêk tê. Li Kurdistanê rakirina dorgirtina îdeolojîk a li rastiya Kurd, ji bo îfadeya azad serbestkirina amûrên wek pirtûk, rojname, sînema, radyo û têlevîzyon ne tenê pêdiviyeke mafê mirovan û hewcebûna demokratîk e, ya esas, divê derfet û îmkan werin afirandin ji bo civak

karibe bi rastiyan bihese, karibe xwe bigihîne cîhana agahî û zanistê, yanî divê alîkarî were kirin ku civak bibe ya agahî û zanînê. Ji bo pirsgirêk bi awayekî rastîn werin çareserkirin û aştî bi awayekî herî rasyonel pêk were, şert e, civak bibe xwedî agahiyên rast. Di dunyayê de ya Ewrûpa kiriye nirxa bingehîn ew e ku ev rastî hêjayî civaka xwe dîtî ye.

Li Kurdistanê û li ser rastiya Kurd heta îdeolojiyên fermî yên heyî rewşa xwe dewam bikin, wê ji der ve ji bo her cure îstîsmarê deriyan vekirî bihêlin û wê bibin sedema rastîn a tehlûkeyê. Bûyerên li Iraqê diqewimin vê rastiyê pir baş îfade dikin. Yên qumbûra îdeolojiya fermî li pişta xwe kirine, wê li ser rêya hemdemiyê timî bihulkum in. Ji lewra berovajî îdeayan, îdeolojiyên fermî yên heyî rewşeke bi cihêtîxwazî û şîdetê timî avis pêk tînin û bi vî awayî jî dibin çavkaniya rastîn a xeterê li dijî yekparebûna dewletê. Ji ber vê yekê, dîrok gelek civak, dewlet û welatan nas dike ku bi van sedeman ketine şerên kor, parçe bûne û mezin têkçûne.

Em wexta hinekî din bi awayekî berçav li şêweyê pêkhatina îdeolojiya fermî ya li ser Kurdistanê bi tesîre dinerin, em dibînin dîndarî û netewparêzî serdest in. Li her çar parçeyên Kurdistanê Îslam wek îdeolojiyek dewletê fonksiyonel e. Her çend guftûgoyên laîsîzmê têne kirin jî li van hemû welatan Îslam roleke siyasî dilîze, divê baş were zanîn têkiliya di navbera ferd û xwedê de - di cewherê xwe de têkiliya di navbera dewlet, îqtîdar û ferd de - xapandin e. Hin welat, mînak, Îran vê yekê eşkere dike, lê yên din vê yekê nuxumandî dimeşînin. Li Tirkiyê saziya Diyanetê ji sed hezarî zêdetir kadroyên wê hene. Belkî jî li Îranê artêşeke welê ya dîn nîne. Dibistanên Îmam Xetîb nêzî dibistanên fermî ne. Tevî kûrsên quranê, enstîtu û fakulteyên îlahiyatê hejmara kadroyên wê digihîje nîv mîlyonê. Cîlaya laîsîzmê li ser perwerdeyê dixînin û bawer dikin ku bi vî awayî wê sekulerîmzê - dunyewîbûyînê - pêk bînin. Lê ya rastîn dikarin bi çareseriyên sosyolojîk û wêjeyê fikra dînî li dawiyê bihêlin û dunyewîbûyînê pêş de bibin. Li van welatan pir bi awayekî xirab dîndartî û zanistî têkelî hevdu bûne. Ev têkelî di zîhnê de fikrê kilît dike û li pêşiya ramana azad, pêşketina felsefeya wêjeya resen biafirîne dibe asteng. Ya rastîn ev welat baş nefikirîne wê bi îdeolojiya Îslamê karibin çi bikin. Di hesabên rojane yên îqtîdarê de wek amûrekî civak û jinê kontrol dike, bi kar tînin. Lê ji ber ku nikarin paradigmaya zanistî pêş de bibin, nikarin li xwe hayil jî bibin ku çiqas mezin wenda dikin.

Tevî vê yekê, zêhniyeta bi rêxistinbûyî terîqet û partîbûyîn wexta yekser xwe bi siyasetê dikin, rewşekê diafirînin êdî derketina ji navê zehmet dibe. Dîndarbûyîn an jî nebûyîn bi serê xwe zêde xwedî mane nîne. Wekî dîndarekî pir baş dikare di civakê de roleke girîng bilîze, yekî hîç ne dîndar ê laîsîst jî dikare heman rolê bilîze. Lê ji bo vê yekê analîza sosyolojîk a dîn şert e. Divê kevneşopiya dînî ti car piçûk neyê dîtin; bêhurmetî lê neyê kirin. Maneya temsîl dike, divê ji sedî sed were fêmkirin. Eger wer bibe, wek pênase û nasnameya civakê hêja ye. Eger na, wer neyê kirin, tenê bi merasîmên zuha, îbadet û duayên jiberkirî were meşandin, wê tenê di tevizandina mejî û hisan, bêtesîrkirin û pêşîgirtina zanînê de rolê bilîze. Nemaze wexta rêveberiya kêfî - despotîzm - tund dibe, ji ber van sedeman xwe li dîn digire. Bi dîn hewl didin îrade û têgihîştina civakê bitevizînin. Bi qasî li Îranê, li Iraq, Sûriye û Tirkiyê jî dîn li ser vî hîmî pir tê bi karanîn. Di polîtîka dîn a Ataturk de naverokeke sosyolojîk heye. Tercîha wî ya li aliyê zêhniyeta zanistî eşkere ye. Mirov nikare têkoşîna wî ya zêhniyetê ji nedîtî ve were. Lê ji ber ku pir bi kûrahî şîroveya kevneşopiya dînî nekarîne bikin, bi felsefeyê nekarîne dîn li dawiyê bihêlin û ji ber ku bi rêxistina Diyanetê xwestine kontrol bikin, li gorî demeke dirêj encamên bi xêr û kêr derneketine holê. Laîsîzmeke mîna Ewrûpayê nekarîne pêk bînin.

Dema piştî Ataturk, ji ber ku paradigmaya dînî bi armancên polîtîk tê bi karanîn rê li ber rewşên hînê dejenere vedike û desketiyên komarê yên di vî warî de jî têra xwe dimehînin. Di demên îqtîdara partiya DP û AP de siyasîkirina dîn eşkere hatiye kirin. Di derbayên leşkerî yên 12 Adarê û 12 Îlonê de bi navê senteza Tirk-Îslamê rengê îdeolojiya fermî danê. Ya rastîn, Tirkiya piştî salên 1980 mîna ketibe ser rêya Îranbûyînê. Herî dawî bi îqtîdara AKPê îdeolojiya Îslamê bi awayekî fermî bûye îqtîdar. Berovajî texmînan îqtîdara Îslama siyasî tercîhek nîne, di encama polîtîkaya dîn a dewletê de ku demeke dirêje dimeşîne, bûye. Hem jî ev yek bi şîroveya mezhebekî herî muhafezekar ê Îslamê bi rêya ekola Sunnî-Neqşîbendî hatiye kirin. Nakokiya wê bi Îslama Îranê re di cewher de nîne bi şekl e. Mezhebê Şîa yê aliyê wê yê civakî li pêş e, û şîroveya Sunnî-Neqşîbendî ya aliyê wê yê dewletparêz û muhafezekar li pêş e, di nav xwe li hev rakişandinê de ne.

DYE bi teoriya xwe ya 'kembera kesk' li dijî komînîzmê tevgera Îslamî meşand, di roja me ya îro de jî dixwaze vê tevgera xwe li dijî Îslama qaşo radîkal, bi navê 'Îslama nermik' dewam bike. Dixwaze vê projeya xwe di ser Tirkiyê re biceribîne, nexasim bi pêşengiya

Fettûllah Gulen li herêmê û li gelemperiya cîhanê bi projeyeke mezin a reformkirina Îslamê pêk bîne. Di analîza dawî de derket holê ku îdeolojiya Îslamî di warê civakî û siyasî de ji ber ku civakê ji vekirîbûnê dûr dixîne, xwedî roleke neyînî ye. Nikare bibe şîroveya rastîn a kevneşopiya civakî yan jî ji vê yekê dûr e.

Li ser Kurd û Kurdistanê bi giranî şêweyê Îslama siyasî terîqeta Sunnî-Neqşîbendî ye. Neqşîbendîtî dîrokek wê ya dirêj heye. Di pêşketina wê ya li Rojhilata Navîn de para şêxên Kurdan û serekên terîqetan pir e. Mîna ku xwestine bi Neqşîbenditiyê valatiya îdeolojîk tijî bikin. Piştî serhildanên began, tê dîtin ku pêşengiya îdeolojîk dikeve destên şêxên Neqşîbendiyan. Di sala 1878 de serhildana Nehrî, di sedsala 20. de di sala 1914 de Bedlîs-Mûtkî, di sala 1925 de Şêx Seîd, di sala 1930 de Şêx Ehmed Barzanî û di salên 1960 de tevgerên bi pêşengiya Barzanî û Talabanî, di motîfên wan ên îdeolojîk de Neqşîbendîtî eşkere xuya dike. Piştî salên 1980 di senteza Tirk-Îslam de jî Neqşîbendîtî eşkere xuya dike. Bi Tûrgût Ozal re Neqşîbendîtiyê di partiya ANAPê de pêngaveke girîng avêtiye. Di nav DP û AP berê de terîqet bi bandor in. Lê piştî 12 Îlonê di bin baskê dewletê de weqif, dibistan, komele, medya û saziyên mîna holdîngan ava kirine. Ji sedî sed diyar e ku li dijî îdeolojiya komarê ya kemalîst, dijşoreşeke îdeolojîk hatiye kirin. Lê model diyar nîne, bêdeng û veşartî meşandine. Ev mijara dijşoreşê hînê jî dabaşek di tarîtiyê de ye. Tevî ku têkiliyên xwe bi DYE re heye jî aliyên wê yên hundur eşkere derneketine holê.

Yek ji hêmanên sereke û kilît ê vê mijarê Fettûllah Xoce ye. Tê gotin Fetûllah Xoce ew kes e ku - ji damezrandina komarê heta sala 1960 yek ji pêşengên dema derbasbûnê ya Neqşîbendîtiyê ye - Seîdê Nûrsî li gorî rojane şîrove kiriye. Mirov dikare wî wek serokê terîqeta Evangelîst ê cîhana Îslamê ku bi DYE re di nav îttîfaqê de ye, bibîne. Ji ber ku Erbekan Xoce û Bulend Ecevît bi DYE û burokrasiyê re tam li hev nekirin, wek pêleke nû bi serokatiya R. T. Erdogan bi AKPê re ket pêvajoya bilindbûnê. Mirov dikare bibêje Neqşîbenditiyê di warê siyasî de serketinek bi dest xistiye. Di vê yekê de rola serokatiyên Kurd ên Neqşî jî girîng in. Di hilbijartinên sala 2002 û 2004 de eşkere hat dîtin ku ji mîrasxurên Şêx Seîd û Seîdê Nûrsî, Abdulmelîk Firat, Cuneyd Zapsû, Huseyîn Çelîk, Zekî Ergezen û gelek pêşengên Neqşî (Abdulmelîk Firat Serokê Partiya Azadî û Mafan HAK-PAR, Zapsû şêwirmendê R. T. Erdogan e, Huseyîn Çelîk jî Wezîrê Perwerdeya Mîllî ye) di nav dewletê û siyaseta fermî de cih girtin. Sekreterê YNKê Celal Talabanî û serokê

PDKê Mesûd Barzanî jî şêxên heman Neqşîbendîtiyê ne û kevneşopiya Neqşî ya li Tirkiyê destek dikin. Ji dema Ozal ve li dijî tevgera demokratîk û kedkar a Kurd bi dewletê re gelek operasyonên hevpar pêk anîne.

Neqşîbendîtiya Kurd nîv-veşartî dixebite, ji lewra rêxistinbûyînên wê yên li Ewrûpa, DYE û Rojhilata Navîn tam nayên zanîn. Lê divê mirov bizanibe bi qasî Şîa jî bi tesîr in. Têkiliyên xwe yên bi DYE re stratejîk in û di Projeya Rojhilata Navîn a Mezin de rola wan a siyasî û îdeolojîk nayê guftûgokirin. Îslama Nermik di esasê xwe de Îslama Neqşîbendîtiyê ye. Her roja derbas dibe hînê baş tê fêmkirin ku bi DYE re di nav îttîfaqê de heta Asya Navîn di çarçoveya bernameyekê de tevdigerin. Îslama nermik a xwe nûkirî wek alternatîfê netewparêziya Ereb a rejîma Baasî, netewparêziya Kemalîst a CHPê, mezhebparêziya Wehabî ya Erebîstana Suûdî, rêxistina Birayên Misilman ên Misrê û Hîzbûllaha Îranê derdikeve.

Duyemîn versiyona mezin a îdeolojiya fermî netewparêziya bûrjûwaziyê ye. Ev ekolên di sedsala 19. û 20. de îdeolojiyên guzîde û bê hemtabûn, tê zanîn, bûrjûwaziyê ew di hundur de li dijî karkeran û li der ve jî ji bo ekolên sosyalîst ji hêzê bixînin wek îdeolojiyeke dewletê bi hostayî hûnandin. Ev encameke xweza ya têgihîştina netew-dewlet e. Mîna ku dînekî hemdem be. Şêweyekî dawî yê etnîsîte (milletparêziya eşîran) gihîştiyê. Di sedsala 19. de li Ewrûpayê, di sedsala 20. de jî li welatên li derveyî Ewrûpayê roleke herî bi tesîr a îdeolojiya fermî lîstiye. Ji bo nakokiyên civakî bitevizîne, bûrjûwaziya nû ya derdikeve holê bigihîne dewletê, bazareke hevpar pêk bîne û di êrîş birina ser erdên netew û etnîsîteyên din de, roleke bi tesîr lîstiye.

Li Tirkiyê, bi dema Tanzîmatê re di salên 1840 de bi kesên mîna Namik Kemal re şêweyê proto yê netewparêziya Tirk dest pê dike, lê ew jî zêdetir ji bo împaratorî ji hev belav nebe tevdigere. Di rêbaza xwe de jî meşrûiyetparêz bû. Piştî salên 1876an li dijî selteneta Ebdulhemîd hînê tund bû û bi netewparêziya Jontirkan bi Cemiyeta Teraqî û Îttîhadê hem meşrûtiyet îlan kir, hem jî îqtîdara polîtîk bi tevahî kir bin kontrola xwe û hewldanên xwe yên ji bo ji hev belavnebûna împaratoriyetê dewam kir. Polîtîka Elmanya ya gavavêtina Rojhilata Navîn û Asya Navîn bi xwe re di netewparêziya Tirk de nijadperestî anî. Di encamê de Ermenî, Rom, Asûrî û beşek jî Kurd hatin tasfiyekirin.

Netewparêziya dema komarê bi têgihîştineke hişk a netew-dewlet xwe mîna zirxekî li civakê bada. Têgihîştina yek ziman, yek

netew û dewletê bi helwesteke nifşparêz kirin mîna dînekî. Li şûna şerîeta klasîk a paş ve avêtin, wek mezhebekî dînî yê nû û kultek hat afirandin. Di vê yekê de dagirkerî, îzolasyon û rejîmên xanedaniyan ên di sedsalên berê de bi tesîr bûn. Komara ket şûna xanedaniyê bandora netewparêziya Şoreşa Fransî hînê xurtir dikir û bi vê yekê hewl dida yekîtiyê pêk bîne. Tevî ku têgihîştina netewên bêyî cihêwazî û bêyî çîn armanceke payeberz bû jî amûrên wê nebû ji bo pêk were. Ji ber ku zêde mucered bû xeter hebû bikeve muhafezekariyeke îdeolojîk. Netewparêziyê mîsyona bincilkirina hemû kêmasiyên îqtîdaran da ser milê xwe. Dixwestin her tiştî bi slogana nepixandî ya 'Tirkîtiya mezin' bi civakê bidin daqurtandin.

Tevî netewparêziya Mistefa Kemal di esasê xwe de ji zanistê dûr nîne, ne maceraperest e û aliyê wê yê welatparêziyê giran e jî pir zû vî cewherê xwe wenda dike û di destê îqtîdarên siyasî de dibe amûrekî bingehîn ê tevizandina girseyan. Piştî salên 1980, bi têgihîştina Sunnî-Neqşî ya Îslamê re têkel kirin û hewl dan wek senteza Tirk-Îslamê pêşkêş bikin. Di vê de du rolên bingehîn dilîstin, yek jê netewparêziya tund a Tirkîtî - nijadperestiya MHPê - terbiye dikir û ya duyemîn a herî girîngtir jî dixwestin tevgera Kurd a pêngaveke mezin diavêt pêşî lê bigirin. Xwediyê kevneşopiya Neqşî tebeqeya jor a Kurd bi ser sîstemê ve dikirin û bi vî awayî pêşî lê digirtin ji bo tevlî tevgera berxwedanê ya Kurd nebe. Li der ve jî destek dan Neqşîbendîtiya Barzanî û Talabanî, bi vî awayî jî xwestin bereyekî li dijî PKKê pêk bînin. Di berdêla vê de ji îdeolojiya şoreşger a komarê gelek tawîz hatin dayîn. Encam li Tirkiyê îqtîdara AKPê û li Iraqê jî Dewleta Federe ya Kurd bû.

Tam îdeolojiya fermî neyê gotin jî hin ekolên îdeolojîk ên nêzî wê derketin holê. Lîberalîzm wek ekol û meylek bûrjûwaziyê zêde bandor li dewletê nekir. Ezmûnên sosyal demokrat jî xwedî heman aqûbetê ne. Îdeolojiyên çepgir her çend bibêjin ew li dijî îqtîdarê ne jî xwedî wê pêşbînî û têgihîştinê nînin ku karibin dewletparêziyê li dawiyê bihêlin. Van hemû îdeolojiyan bi têkiliyên xwe yên îqtîdarê re nîşan dan ku ew xwedî çi rolê ne, her weha karektera xwe ya rastîn jî eşkere kirin.

Divê mirov baş analîz bike ku wexta îdeolojî - avahiyên hevpar ên zêhniyeta civakê - ser îqtîdarê dinuxumîne, îqtîdar jî li ser hîmê şîdetê rastiya civakê dinuxumîne. Mirov heta sêgoşeya îdeolojî-îqtîdar-şîdetê çareser neke, pir zehmet e pirsgirêk û rastiyek civakî ji hev bike. Kedxwarî û zora li ser civakê heta bi mekanîzmayên îqtîdar û îdeolojîk neyên meşandin welê bi hêsanî bi cih nayê. Ji bo

kedxwarî û zor bimeşe divê şêwedanîna îdeolojîk û saziyên îqtîdarê - şêweyên rejîmên dewletê - bi hostayî werin pêşdebirin, jixwe ev yek "ji dema dewleta rahîb a Sumer" wezîfeya bingehîn a siyasî ye. Dualîteya gelo, îdeolojî îqtîdarê yan jî îqtîdar îdeolojiyê hildiberîne girêdayî têkiliyên kûr ên civakî ne. Wek xuya dike, hêsan nîne li ser civakê zor û îstîsmar were meşandin. Îdeolojî û polîtîka di van kêliyan de dikevin pêvajoyê. Kar û fonksiyona rastîn a îdeolojî û polîtîkayê ew e ku di civakê de hemû têkiliyên maddî û manewî yên mirov bi dilê xwe û demokratîk rêve nebin, berovajî li nerazîbûnê rast werin, bide meşandin.

Li Kurdistanê ev şêweyê polîtîka û îdeolojiyê yên bi awayekî fermî fonksiyonel in divê li ber çav werin girtin. Naxwe çareserkirina rastiya Kurd û çareserkirina pirsgirêka Kurd zehmet nebe jî ewê bike ku pirsgirêk tarî bibe û bikeve şêweyekî xwe guvaştî serhev. Me di pêşnûmeya xwe ya dîrokê de hewl dabû pêşketineke kurt a îqtîdaran û zorê nîşan bidin. Em wexta bi van agahiyan îqtîdarên rojane analîz dikin, em dibînin hemû rejîmên ku hene tenê bi mafekî çor ê fetih û xwe spartina fetîşîzmê - fetihperest, bi vê her tiştî rave dike û wer yeqîn dike - hebûna xwe tarîf dikin û diparêzin. Di cewherê meselê de rastî jî ew e ku demekê hin ji bavpîrên wan, hatine hebûnên bi navê Kurd û Kurdistanê bi darê zorê û şer zevt kirine. Ji wan rojan vê yekê ji bavpîrên xwe werdigirin û heta roja me ya îro ev heq digihîje wan. Hin kes dikarin bawer bikin ku şer û zor çavkaniyên hemû mafane û di vê çarçoveyê de mafê fethê pîroz bibînin û yeqîn bikin ku hemû mafan ji bo wan dibexşîne. Lê ji aliyê sosyolojîk ve ev ispat dike ku darê zorê, şer û îqtîdar çavkanîne. Dibe ku ev dîtineke realîst be. Lê belê îzah nake ku çavkaniya bi tenê ya mafan e. Ewrûpayê di vê çarçoveyê de gelek şerên xeternak meşandin. Di encamê de dît ku çavkaniya rewa û rêya rast demokrasî û mafên bingehîn ên mirov in. Her roja diçe ji mafên fetihê dûr dikeve, qada bi karanîna mafê mirovan û demokrasiyê pêş de dibe û li ser vî hîmî bi karanîna mafên ferdî û gelemperiyê hêjatir dibîne û vê yekê dike hîmê hemû qanûn û destûrên bingehîn.

Wexta em Rojhilata Navîn hemû bidin aliyekî û tenê li îqtîdarên dewletên li ser Kurdistanê statu bi dest xistine, binerin, hema ji dema yekemîn dagirker Sargon ve xwe fatihên mutleq ên van erdan dihesibînin û îdea dikin ku li derveyî îradeya wan kes nikare di bin çavan re li xîçekî jî binere. Kiryarên îqtîdarên li Kurdistanê, pir bi awayekî balkêş tarîfa îqtîdarên li ser hîmê şîdetê dikin. Kurd bi zimanê xwe nikare perwerdeyê bibîne, nikare teknolojiya

ragihandinê ya hemdem bi kar bîne. Nikare biryara xwe ya siyasî diyar bike. Nikare nîzamekî ekonomîk deyne. Nikare têkiliyên polîtîk ên der ve û hundur deyne. Nikare saziyên demokratîk û netewî ava bike. Ev rastî îspat dikin ku şîdet, mafê fetihkirinê, îqtîdar - her çawa dibe bûye - bi giştî saziyên gelemperiyê, civakî, ekonomîk û dezgehên entelektuelî diyar dikin. Edalet û dad vê yekê qebûl nekin jî avahiya zêhniyetê û saziyên îqtîdarê hîç guman nakin ku yê her tiştî diyar dike hêz e.

Em dema hinekî din mijarê berçav dikin, em dibînin ku îqtîdarên dewletan ên li Kurdistanê li ser vî erdî û gelî bêyî îradeyekê li dijî xwe bibînin û bêyî ku guman bikin, çawa xwestine - kuştin jî di navê de - reng danê û vê yekê wek wezîfeyeke netewî û îlahî qebûl dikin. Ew tenê dikarin biryarê bidin, wê çi çawa were mêtin, kê çi çawa hîn bibe, çiqas esker û bacê were berhevkirin, wê kê bikin xwedî kar, çi li kê qedexe bikin û kê gunehkar bikin. Dîsa îradeya fermî tenê dikare sazîbûyînên civakî, siyasî, aborî, zanist û hunerî diyar bike. Hêz û çînên îqtîdarê yên Tirk, Ereb û Fars ji aliyê teorîk ve jî li hemberî têgînên Kurd û Kurdistanê vekirî û bi hurmet nînin. Berovajî, krîmînalîzekirina van têgînan yek ji karê girîng ê dewletê dihesibînin. Vê yekê pir bi awayekî veşartî dikin û bi vê, qaşo girîngiya didin ewlekariya millî, nîşan didin. Ti car nafikirin ku Kurdan jî wek civak nas bikin û wek sujeya hin mafan qebûl bikin û bi vî awayî ewlekariyê pêk bînin. Yek ji wezîfeyên bingehîn ê artêşê ew e ku hebûna Kurd û Kurdistanê, pirsgirêka wan hûrûkûr lêdikole, hesabê tepisandina serhildanên muhtemel bibin, diponije, difikire wê cewherê wan ê berxwedanê çawa pûç bike û ji bo vê yekê bi şev û roj plan û projeyan amade dike. Dîsa yek ji wezîfeyên xwe yên bingehîn dizane ku tiştên difikire bi cih bide anîn û li ser vî hîmî saziyên din kontrol dike. Hukûmet, parlement û burokrasî karên artêşê yên di plana duyemîn de, hewl didin bi qanûn, biryarname û rêvebirnameyan temam bikin, xwe paş ve nagirin ji bo pirsgirêkê hînê mezintir nekin. Kengî pirsgirêka Kurd li der ve bihêlin, ji bîr nakin ku siyaset qada çareseriyê ye. Ti car guman nakin ku ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd rêya ewel û axir bi tenê rêbaza - divê serê mar hînê piçûke were eciqandin - şîdetê ye. Naxwe yeqîn dikin ku wê îqtîdara wan lekedar bibe. Ya esas, polîtîka kevneşopiyê ji bo wan bûye mîna reflekse kê. Mîna amîgoyên di maçeke fûtbolê de xweber radibin û diqîrin.

Partiyên siyasî û saziyên wek wan nîv-siyasî di vê mekanîzmayê de ji bo li gel propagandayê bikin, xwedî rol in. Dixwazin gel

daxwazên wan wek siyasetê qebûl bike û bi rêxistinkirinê jî car caran wek karekî fuzûlî yê tê bîra wan dihesibînin. Partiya herî baş, partiya herî baş dewletê temsîl dike. Hîç naynin hişê xwe ku partî ne ya dewletê, saziyeke îradeya civakê temsîl dike, ji lewra ji bo wan şeref e bibin partiya dewletê û partîbûyîna ji bo civakê jî wek germoleyek li dest û lingê wan geriyayî dibînin. Partî bi van taybetiyên xwe ferq nakin ku bûne mîna buroyên propagandaya dewletê. Vê yekê jî wek girêdan û dilsoziyê bi welat û dewletê re dizanin, pirsgirêkên civakî û aborî yên mîna gidîşan û lodan mezin dibin wan hîç eleqeder nake û pir normal dibînin, yan jî ji nedîtî ve hatina wan siyaset dihesibînin.

Saziyên civakî yên sivîl jî ku divê wek bi sînorkirina îqtîdara dewletê werin tarîfkirin, her dem dewletê esas digirin. Ew jî daxwazên civak û ferd di plana duyemîn de dihêlin. Em bi vê rewşê dibînin ku têgihîştina kevneşop a xweda-dewlet û dewleta pîroz hînê çiqas xurt e. Ji rêvebirina îqtîdarê ya bi vî şêweyî, ekonomî jî para xwe werdigire. Ekonomî dibe qadek welê, divê bi temamî xwe li gorî berjewendiyên îqtîdarê sererast bike. Qanûnên aboriyê, ma li cem zora îqtîdarê ciddî têne girtin? Birçîtî û bêkartî berhemên avahiya vê sîstemê ne û sûdwergirtina ji vê yekê jî wek polîtîkayeke bingehîn dizanin. Ji yên birçî û bêkar re pir tînin ziman ku çendîn bi îqtîdara dewletê û partiya wê ve werin girêdan wê qîmetê bibînin. Ekonomiyê ew çend bêrehim li ser Kurdan ferz dikin, pê didin hesandin ku divê Kurd pêdiviya xwe ya herî hewce ye bi girêdana îqtîdara dewletê tedarik bike.

Li Tirkiyê di hilbijartinên dawî yên belediyan de li cihên îhtîmal hebû welatparêzên demokrat ên Kurd bi ser bikevin, hemû partiyên dewletê û burokrasiya wê xwe kirin yek. Ev jî têrê nekir, li her bajarî bi trîloyanan pere rijandin û careke din Kurdê di rewşeke neçar de di berdêla dengan de hat kirrîn, qaşo bi vî awayî ewlekariya sîstemê tam misoger kirine. Bajarên Kurdan careke din fetih kirin. Bêyî ku kesî pê bihesînin û hem jî bi destê AKPê. Dîrok dinivîse, wexta Yavûz Selîm jî Bedlîsê digire bin destê xwe bi heqîban zêran dişîne. Dema li Çewlîkê dibêjin; "Îdrîs-î Bedlîsî - ajanê Osmaniyan ê Kurd - li vir e, Yawûz li ku ye? dixwazin vê kabûsa dîrokî ji nû ve vejînin. Li bereyê Rojhilat tiştekî biguhere nîne! Kiryarên welatên din hînê çortir in. Li Tirkiyê qet nebe hindik be jî mekanîzma piyaseyê dixebite.

'Sê S' senaet, spor û seks bi giştî parçeyekî mekanîzmaya îqtîdarê ne, jê nabin. Her Sê S ji ferd li dawiyê çi mabin hundurê wan

jî vala dike, pûç dike û şexis dike tort û dewijim divaêje aliyekî din. Bi giştî di hemû pirsgirêkên netewî û civakî de ev rêbazên têne bi karanîn di sedsala 20. de polîtîkayên guzîde bûn. Di encamê de rê li ber dunyayeke tijî şer, teror û faşîzmê vekir. Polîtîkayên herî zêde bi îdeaya ewlekariyê rabûn, dunyayeke ne ewle derxistin holê. Herî dawî serokê DYE Bush wiha got: "Polîtîkayên me li ser navê aramiyê rê li ber despotîzmê vekirin, ji terorê re atmosfer amade kirin. Rêya xilasbûna ji vê yekê demokrasî ye û emê wê esas bibînin." Serok Bush bi van gotinên xwe li polîtîkayên sedsala 20. mikur dihat. Bi vî awayî, di warê guhertina girîng a polîtîk de agahdar dikir.

Li pişt polîtîkayên dema nêz ên Tirkiyê piştî salên 1950 DYE heye. Li dijî hedefa stratejîk Yekîtiya Sowyetê destek da netewparêziyê - ji rêxistinbûyîna kontr-gerîlla re lampeya kesk vêxistin - û di salên 1970 de terora faşîst ferz kir. Di şûna netewparêziya demekê ya îttîhadperweran de ku Elmanan sor dikir, - di encamê de împaratorî ji hev belav bû - vê carê netewparêziya DYE destek dayê komar anî ber teqînê. Kurd tengavkirin ji bo isyanê bikin. Bi 12 Adarê û 12 Îlonê re bi polîtîkayên herî bêrehim muxalefeta civakî hat pelixandin û bi vê careke din ispat kirin ku ya esas diyarker şîdet e. Piştî salên 1980 Kurdistan seranser kirin qad û meydana şîdetê. Xwestin tevgera demokratîk a welatparêz bi îxanetkariya Kurd a klasîk û rêxistinbûyînên eskerî û nîv-eskerî yên ji her çînê, bibepelixînin. Li Îranê li ser navê Şoreşa Îslamî, Ereban bi netewparêziya Baasî heman rejîm meşandin. Komkujiyên mîna Helebçeyê, qewimîn. Li Kurdistanê bi hezaran gund hatin valakirin û bi deh hezaran bûyerên kuştinê dewam kirin. Di karektera rejîma heyî de guhertinek bi tenê nehat dîtin.

Huqûq di serê wan saziyan de hat ku bi cewherê dadgeriyê re çep ket. Bi sed hezaran mirov hatin krîmînalîzekirin, lêpirsîn, gunehbarkirin û mehkemekirin; di huqûqê de dadkirina herî seyr, dadkirina yekalî ya bêpirs û îfade hat kirin. Ya rastîn, huqûqê ji sedî sed pratîkeke faşîzmê meşand û rol lîst. Di nav saziyên îqtîdarê de ya herî zêde roleke neadil lîst huqûq bû. Kurdbûyîn, hela hela tu xwedî nasnameyeke Kurdê bi rûmet bî, ji bo tu werî gunehbarkirin bese û zêde ye. Kurd û Kurdistanîtî bi tevahî li derveyî huqûqê hatin îlankirin.

Polîtîkayên giştî li ber çav hatin girtin û ji rêxistinên civakî, huner, spor, birçîbûna seksî û seksê sûd hat wergirtin. Ji bo berxwedana Kurd û Kurdistanê were tepisandin mala giştî (kerxane)

û mala taybet jî nekarîn xwe xilas bikin ji bo di vê polîtîkayê de wek hucreyên bingehîn neyên bi karanîn.

Li Kurdistanê kiryarên îqtîdarê ev çend neyînî bi cih dihatin anîn, ji ber ku di cewherê wê de polîtîka şîdetê ya veşartî bêyî fonksiyon bûbû û ji tirsa wê îqtîdar welê tevdigeriya. Sîstem li ser zoreke bê sînor hatibû avakirin. Li derveyî hemû tarîfên hemdem dihat meşandin. Hedef ew bû ku hebûna Kurd û Kurdistanê li derveyî dîrok û civakê bihata hîştin. Ji bo vê yekê jî bê xem dîndartî û netewparêztiya xwe bi awayekî herî dijwar îlan dikirin.

Li Tirkiyê, îqtîdara fermî polîtîkaya wê ya bingehîn ew e ku berxwedana Kurd bi temamî 'terorîst' îlan bike û vê yekê jî bi hemû dunyayê bide qebûlkirin. Di serî de DYE, bi hemû dewletên pêwendîdar re di serî de aboriya Tirkiyê hemû nirxên eskerî û stratejîk di çarçoveya qebûlkikirina vê polîtîkayê de pêşkêşî piyasê hatine kirin. Ji bo PKK terorîst were îlankirin ti tawîza nede welatên YE nema. Buroyeke PKKê li ku hat vekirin heman polîtîkayan berê xwe dan wê deverê jî. Li gorî wan şerekî topyekûn welê dihat meşandin. Ewrûpa û gelek welatên din wexta hewce dîtin, gef kirin. Polîtîka ço û şerbetê bi hev re meşandin. Li ser Sûriyê bi şer gef hat xwarin û bi vî awayî Abdullah Ocalan hat derxistin. Ev peyketin û taqîba mezin bi Îmraliyê gihîşt qonaxekê.

Polîtîkayên Rojhilata Navîn û dunyayê yên DYE ku me di beşên berê de anîn ziman, ev polîtîkayên îqtîdarê yên li ser Kurdistanê ferz dike, bi hemû saziyên jêr û jor hejandin. Rastiya Kurdistana Federe bû sedem ku her tiştî ji nû ve di ber çavan re derbas bikin. Îran, Tirkiye û Sûriyê ji nû ve dest bi civînên sêalî kirin. Yekem car pir bi kûrahî his kirin ku wê statuyên îqtîdarê weke hîn bûne û heta îro hatine, nekaribin bimeşînin. Em şêweyê avakirin û kiryarên îqtîdarê li ser civak û ferdê Kurd ji pêş re dihêlin û em bala xwe didinê, ferdên netew-dewleta serdest jî wisa dor li wan hatiye girtin, ji hêz û qabîleyeta pêşniyarkirina çareseriyeke demokratîk û însanî dûr bûne. Dewletê ji wan re çi pêşkêş kir rahiştinê û xulxul vexwarine. Serxweş ketine. Cemaetên xwe çepgir dizanin û rêxistinên civaka sivîl jî bi têgihîştinek wek a bavikanî ji guhdarîkirina 'li gotina mezinê xwe' paş ve neman û pir ji nişkê ve refleks nîşan dan ku ya îqtîdar dike hewce ye. Di berdêlê de çi dîtin; têra xwe krîzên ekonomîk, deynên der ve û hundur ên roj bi roj zêde dibin, bêkartiyeke mîna lehiyê, qedandina polîtîkayê. Her weha Tirkiye, Îran û Sûriyê bûn welatên welê ku ji her demê zêdetir ji xwe piştrast

nebûn û wer bawer kirin ku bêyî desteka der ve nikarin li ser piyan bimînin. Ji lewra wek her demê hesabê şaş dîsa ji Bexdayê zîvirî.

Em mijarê digihînin encamê û girîng e, em xwe di xusûsekê de zelal bikin. Ew jî ew e ku divê mirov dewlet û îqtîdarê muqayese neke. Wek wê ji hemû analîzên me were fêmkirin, dewlet ji civaka hiyarerşîk ve wek civakeke xulase û cewher tê heta îro. Saziya herî jor a hebûna civakê, herî pêşketina mantiqê analîtîk, têkiliyên herî zêde bi hemû civakê re, li ser kevneşopî û berfirehbûnê, îfade dike. Bi piranî dewlet wek amûrekî kedxwarî û tehekuma çîneke teng tê tarîfkirin ku ev tarîf di nav xwe de pir kêmasiyên girîng û çewtiyan dihewîne. Tarîfên dewleta netewî yan jî etnîk tenê dikare qîmetek wê ya konjonkturel hebe. Ji tarîfkirina naveroka têgînê dûr e. Îqtîdar jî hêzên di nav vê kevneşpiyê de rûniştine îfade dike ku li gorî deman aliyê wan ê tehekumkar û îstîsmar derdikeve pêş. Bêguman dewletek bêyî îqtîdar nabe. Lê fikreke pir teng e ku mirov dewletê bi tevahî ji îqtîdarê pêkhatiye bibîne. Dîtinek bi vî rengî dikare bibe sedem ku mirov gelek rastî û têkiliyan jî tevlîhev bike.

Divê mirov kevneşopiya dewletê û îqtîdara ku li Kurdistanê li ser kar e, ji hev bike. Eger mirov vê cudahiyê karibe bike, ev serwextbûneke girîng e. Divê mirov cudahiya di navbera dijberiya dewletê û îqtîdarê de jî baş bibîne. Min di parêznameya xwe de xusûsa timî hewl daye rave bikim û esas bigirim, cewherê wê bi vê mijarê re têkildar e. Dewlet wek amûrê ewlekariya giştî - civakê hemû li ser li hev kiriye - û xizmeta gelemperiyê - dîsa mijarên kêrhatî yên hevpar ên civakê li ser hev kirî - divê were reformekirin û hewce ye hebûna xwe - piçûk, lê bi tesîr û fonksiyonel - di serdema şaristaniya demokratîk de biparêze. Li hemberî vê yekê, dewleta demî ku tarîfa wê hatiye kirin û di nirxandina me ya kurt de jî hat dîtin, îqtîdarên dewletê yên li Kurdistanê jî di navê de, bi gotineke mode yên şêlanker ên bistbûyî, yên kuştinên failê wan nediyar polîtîka dizanin, yên taybetiyên demokratîk, civakî û huqûqê formalîte dibînin, divê werin redkirin. Heta cudahiya di navbera her du tarîfan de baş neyê dîtin, zehmet e têkoşîneke têkûz a huqûqî, civakî û demokratîk were meşandin. Di nav tevgera Kurd de meylên ji bo dewleteke cuda têne rêvebirin hene, di çarçoveya tarîfên me yê dewletê de meylên ku dixwazin dewleteke demokratîk, civakî û huqûqî biafirînin hene û dîsa meyl ji bo civaka demokratîk û siyaseta demokratîk têdikoşe, heye. Pir girînge ku mirov cudahiya di navbera van meylan de baş bibîne û li gorî wê bibe xwedî teorî û pratîk.

**6- Li Kurdistanê hayjixwebûna Kurdan û xulaseyekî kin ê berxwedanê**

Tevî ku ev beşa bi giştî vê mijarê tarîf dike, emê hewl bidin bi xulase û encameke kurt temam bikin. Kengî gel li cudahiya xwe ya ji rejîmên qraliyetan hayil bûn, şoreşên siyasî yên Ewrûpayê dest pê kirin. Beriya her tiştî bi vê hayjixwebûnê gel ferq dikin ku dîroka wan ji ya qraltiyê cuda ye. Dîrokên berê, hemû yekpare li ser çîrokên pêkhatin û dewama împaratorî û qraliyetan bûn. Li Rojhilata Navîn ev têgihîştina dîrokê hînê jî xurtir e. Qral û împarator xwe yan xwedê, yan jî wek siya xwedê, her tiştê derbarê civakê de wek hêza mutleq dikarin diyar bikin. Hebûnek li derveyî wan û bedenek nayê fikirîn. Ferdên ebd in, tenê dikarin bi bedena wan, bi hebûna wan û bibin parçeyekî wan dikarin manîdar bibin. Mijarên mîna nasnameyeke cuda, mafê mirovan, hela hela demokrasî divê di fikrê de jî nebin û lanet li wan were kirin. Ji ber ku ev mijar li hemberî hebûna wan a pîroz rastiyên bi lanet îfade dikin.

Ev têgihîştin beriya Şoreşa Îngilîstanê di sala 1640 de û di serê sedsala 18. de ji aliyê hin rewşenbîr û dîrokzanên Îngilîz û Fransî ve hat guftûgokirin. Di encamê de ferq kirin ku nasnameya gel û netewekî cuda ji qraliyetê û dîsa dîrokeke gel û netewan ji ya qraliyetê cuda heye. Pişt re li ser navê mafên netewî daxwazên curbecur ên çînan derketin pêş. Her çînê xwe û netew yek tişt hesiband. Bi vî awayî li Ewrûpayê berê pêla mezin a netewan û paşê tevgerên çînî li pey hev rabûn.

Li Tirkiyê û Rojhilata Navîn gel û netew piştî Tenzîmatê di sala 1840 de bi tevgerên Osmaniyên Ciwan û Jon Tirkan li cudahiya xwe ya ji padîşahtiyê hayil bûn. Rewşenbîrên Meşrûtiyeta Yekemîn û Duyemîn cudahiya di navbera padîşahtî û netew de hêdî hêdî anîn ziman. Bi Komarê re netewa Tirk bi zimanekî pir radîkal hat îfadekirin. Her çend aliyên Ataturk ên bavikanî hebin jî di warê pêşdebirina têgihîştin û pratîka netew de ji Osmaniyan pir cuda gavên mezin avêtin. Pir zêde ketibû bin tesîra têgihîştina netewî ya Fransî. Dibû ku di şert û mercên dagirkeriyê de têgihîştina netewîbûyîneke radîkal pêş bikeve. Piştî rizgariyê, netewîbûyîna radîkal bi bandora konjonkturê jî ser li rastiya civakî girt. Ji lewra aliyê wê yê şoreşgerî bi sînor ma. Piştî salên 1950 netewparêzî têra xwe bi faşîzmê hat barkirin. Paşê bi salên 1980 re bi sentezkariya Tirk-Îslam bi têkilkirina têgihîştina netew û ummetê, nakokiyên çînî têra xwe xira kirin. Mirov dikare Neo-Îslamê berovajiyê vê meyla giştî bifikire.

Mîna van bûyeran, li Îran û qada Ereb jî qewimîn. Li xwe hayilbûyîn û berxwedan du rastî ne hevdu xwedî dikin. Di roja me ya îro de li xwe hayilbûyîn bi ekolojî, femînîzm û di warê çandên jêr de bi kûrahî dewam dike. Hayjixwebûn û li xwe hayilbûyîn ji nêz ve têkiliya wan bi azadiyê re heye. Heta cudahî neyê fêmkirin, yekparebûna mirovan dike kole û bandora wê ya ditevizîne li dawiyê nayê hîştin. Nasnameyên xwe dispêrin cudahiyan, rê li ber civakên azad û afirîner vedikin.

Kurd li Kurdistanê wek netew û gel pir dereng li hebûna xwe hayil bûye. Her çend serhildanên sedsala 19. hisa Kurdîtiyê hişyar kiriye jî, lê vê pêhesînê nekariye têgînên bingehîn padîşahtî û melîktiyê li dawiyê bihêle. Kurdîtiyeke cuda, Kurdîtiyeke qralparêz e. Nafikire ku ji têgihîştina sultantiya serdema navîn xwe veqetîne. Ji lewra ji sedsala 19. heta nîvê sedsala 20. têgihîştina Kurd li têgînên gel û netew ji hişyarbûn û li xwe hayilbûnê dûr e.

Ji nîvê sedsala 20. pêve, rewşenbîr di nava xwe de li ser rastiya Kurd dest bi guftûgoyê dikin. Ya esas, ev ekol di nav kevneşopiya çepgirên Tirkiyê de destpêkir. Şêxtî û eşîrtiya li Başûrê Kurdistanê di wê hêzê de nebû ku karibe meyla Kurdîtiya klasîk derbas bike. Têgihîştina Kurdan ew bû ku di şûna melîkê Tirk, Ereb û Fars de divê melîkekî Kurd hebe. Ji vê wêdetir ti kûrbûn û ponijandina wê nebû. Partiyên komînîst ên sosyalîzma reel û yên bûrjûwaziya piçûk û partiyên feodal xwediyê têgînên cuda yên netew û gelê Kurd nebûn. Qîma xwe bi hin nirxandinên taktîk anîn. Xebateke ciddî ya polîtîk û dîrokî nekirin. Kevneşopiya çepgir a Tirkiyê, nemaze pêngava wê ya piştî salên 1970 ji bo aktualîzekirina têgihîştina netew û gelê Kurd alîkariyeke girîng kiriye. Slogana Denîz Gezmîşan a ji bo azadî û biratiya gelên Kurd-Tirk li ber sêpêya dardakirinê xwedî girîngiyeke dîrokî bû. Di serî de Mahîr Çayan û Îbrahîm Kaypakkaya gavavêtinên gelek şoreşgeran ji bo biratiya gelan xwedî heman girîngiyê ne. Lê belê slogan bi serê xwe têra berxwedan û çalakiyê nake. Berxwedan bi serê xwe hewceyî bi qonaxeke nû dibîne.

Cudabûyîna gelê Kurd bi pêşketina du aliyan destpêkir: hem xwe ji têgihîştina netewî ya şoven a Tirk qetand, hem jî xwe ji netewparêziya paşverû ya Kurd kir ku ev di zikhev de pêk hatin. Derdorên bi maskeya çepgir a ji her aliyan ve tevdigeriyan û hegemonyayeke giran a îdeolojîk dikirin, şikandina wan li aliyekî, şikandina rewşa zextê ya serbest a hêzên tehekumkar ên bi îqtîdara dewletê re di nav hevkariyê de bûn li aliyekî din, xilasiya ji van hîç hêsan nabû. Tehekuma îdeolojîk û pratîk hem hêza entelektuel û hem

jî bi rêxistinbûyînê ferz dikir. Vê yekê jî pir bi lez rê li ber berxwedanê vedikir. Rewşa siyasî û qanûnî ji bo xebateke têkûz a zêhniyetê dest ne dida. Şêwazeke tevgerê ya mîna Hz. Mûhammed li Mekkê, Hz. Îsa li Qudsê, li Ronesansa Ewrûpayê mîna Galîleo Galîleî û Gîordano Brûno tevgerek dixwest.

Ez yek ji wan kesên ku di vê pêvajoyê re derbasbû me, eger bi awayekî çîrokî bînim ziman wê rastî hînê baştir were fêmkirin. Min hînê di dibistana seretayî de ferq kiribû ku cudabûyîna Kurd li serê mirov dibe bela. Tevî ku ez ji dibistana seretayî heta lîseyê di wê hêzê de nebûm ku xebatek zêhnî bikim, lê timî xwe wek qeydekê li lingê min digerand. Çendîn ez direviyam ew li pey min dihat. Lê bi îdeolojiya fermî ya li dibistanan hûrûkûr dihat hînkirin, min bi qasî serê derziyê jî agahiyek ji bo bersivê nedidît. Eger te Tirkîtî jî bi temamî qebûl bikira, kevneşopiya Kurd a kevnare, em ji malbatê bigirin heta her cihê tu biketayê li her devera herêmî ya diyar bû ku Kurd e, bang dikir û digot 'ez hem e.' Mirov bi di rûtiyeke mezin re rûbirû dibû. Eger tu ji kevneşopiyê qut bûyayî, tu ji beşekî mezin ê rastiyê qut dibûyî û ev jî revek xwe xapandinê bû, bi xwe re sextekarî dianî. Şexsiyet dihat dejenerekirin. Mirovê ji nasnameya xwe qut dibû, mîna pelê darê yê ji darê qut dibû, diket valatiyê. Tevî kes û şexsiyetê, civakê jî morala xwe wenda dikir. Her roja derbas dibû, di nava jiyanê de baş dihat dîtin, kesê ji kevneşopiyê, ji rabirdûyê qut bibe û civaka xwe înkar bike, dibe şexsek welê rê li ber patolojiyê - kesê bi nexweşî - vedike. Li aliyê din Tirkîtî - li Îran û qadên Ereb bi heman awayî - bêyî ku bi xwezayî were qebûlkirin, bi zimanekî me jê fêm nedikir mîna 'ayînên dînî' bi me didan ji berkirin.

Ha tu bi Erebiya fêm nakî bûyî misilman û ha jî bi merasîma hînkirinê ya fermî ya Tirkiyê, her du jî heman encamê didin. Duayên mirov fêm neke û jê re bibêje 'amîn', jixwe Kurd bi sedsalane bi navê Îslambûyînê di nav nezanî û cehaleteke mezin de hatin gevizandin û bi dînê hemdem ê Tirk kirinê re jî şexsiyeta wî bi xedarî hat xirakirin. Dibe ku mirov fêm bike kesek têgihîştî bibe misilman an jî bibe Tirk. Hewcedariyên civakî dikarin van bihevrebûyînan watedar bikin. Lê Tirkîtî û û Misilmantiya rojane wek îbadetan didin jiberkirin, ji sedî sed awarte ne û nabin mijara hîndekariyeke hemdem.

Min xwest ez wateyê bidim herduyan jî. Min hînê di dibistana seretayî de dilê xwe bijand Tirkiyê û min xwest ez bibim dîndarekî nû. Lê heta ku? Di salên 1970 de di nav atmosferên çepgir ên entelektuel de zêde guftûgo hebûn û di nav van nîqaşan de

'pirsgirêka Kurd' jî hebû. Di vê atmosferê de biryardariya min pêş ket. Xuya bû, Tirkîtiya xwe dabû ser min û dîndariyê li ber çepgiriyê zêde nikaribe li ber xwe bide. Hemsalên me yên ciwan, bêyî cudahiya Kurd-Tirk bikin, bi cesaret azadî û serxwebûna her du gelan diqêriyan û vê yekê jî wê rengê rastîn ê tercîha jiyana min diyar bikira. Wendakirina pêşengên her yek ji wan ji bo me qehremanek bû, êdî dikir ku ez mîna meseleyek namûsê nêzî dozê bibim û li ser rêya wê cih bigirim. Di vê pêvajoyê de ez li dijî her du zextan li 'Kurdbûyînê' xwedî derketim û vê yekê bi xwe re gavavêtineke dîrokî anî.

Di vê demê de xebatên xweser ên li ser rastiya Kurd bi derfetên pir bi sînor dihatin meşandin. Di dest de şîroveyên hisî yên aliyên wan ên netewparêziya paşverû xurt hebûn û şîroveya dogmatîk a sosyalîzma reel 'mafê her netewî heye çarenûsa xwe diyar bike' hebû ku her du ji rastiyê dûr bûn. Rastiya Kurd di nav guftûgoyên heye tine, mêtingehe yan na, hatibû asêkirin. Ne agahiyên dîrokî yên civakî, ne jî têra xwe belge hebûn, ne jî şîrovegerên kûr ên objektîf ên sosyolojiyê hebûn. Li cihekî tarî derbarê hawîrdorê de hukum dihat dayîn.

Ji aliyê din ve, rewşa siyasî timî tengezar dibû, polîtîka kevneşop a dewletê derbarê Kurdan de ji ber tirsê ew dikirin xwedî helwestên lezgîn. Aliyan bi lez dixwestin hin tiştan xilas bikin an jî ji binê hin tişan derbikevin. Lê agahî û şîroveyek pir bi sînor a derbarê serdemê de jî dide nîşan ku statukoya heyî ne qebûl dike, ne jî tê qebûlkirin. Statukoyê nefikirinadina reformê, tespîteke pir normal tavilê krîmînalîze dikir û dikir mijareke dadgeriyê. Ji bo xebateke legal hêvî bi qasî nebe hindik bû. Ji aliyê din ve, Kurdîti û çepgirtiya hatibû hînkirin berxwedaneke 'nebe nabe' ferz dikir. Wek berxwenedan û ji mirovtiyê derketin heman tişt bûn. Bi namûsbûneke rastîn, di bin her şert û mercî de xwedî derketina li dozê û parastina wê ferz dikir. Di vê rewşê de bi komeke teng a ciwanan, komeke bi sînor a sempatîzanan dihat avakirin. Her çend li ser şerên rizgariya netewî pir ders dihatin dayîn û bawer dihat kirin ku wê bi rêbazên gerîlla destanê bêne nivîsandin jî dîsa şensê wê ji utopîkbûyînê wêdetir nebû. Eger bûbûya serçavan, eger nebûya xwedê kerîm bû; wê paşê bihata fikirîn.

Di vê qonaxê de dîsa hîcreta ji Mekkeyê, belavbûna şagirtên Îsa, çîle û êşa şervanên zanistê diket pêvajoyê. Teqîna gulleya yekemîn, protestoyên destpêkê li ber derî bûn. Koma bawermendan hema li ber şehîd dayîn û mehkûmên wê yên yekemîn bûn. Dîrokê weke di

gelek bûyerên civakî de pêvajoyeke trajîk ji bo rastiya Kurd jî dixist rojevê. Her tiştî trajedî ferz dikir. Dozê ji sedî sed canfedayên xwe dixwestin. Bi gotineke din, li gorî yên dijber xwedayan qurban dixwestin.

Ev atmosfera cudabûyîna Kurd tê de derbas bû û pêş ket, hînê wêjeya wê nehatiye kirin û nivîsandin. Lê divê ji sedî sed were kirin û nivîsandin. Ya rastîn ev pêvajoyek e, divê bi hêza wêjeyê bibe roman, utopya, trajedî, dram, çîrok û heta sînema. Pêwîste bi awayekî berfireh were nirxandin. Mesele ev e; tovek tê reşandin. Wexta tê reşandin nayê zanîn ev tov pûçe yan na. Wê hêşîn bibe nebe nayê zanîn. Tenê hêvî tê kirin. Mîna ku were gotin; "hêvî nanê xizanan e, bixwe bi qasî dixwazî bixwe" bi vî awayî stûxwariyeke wek ya li ber çarenûsê stû dihat xwarkirin.

Di ser berxwedan û cudabûyîna Kurd a di serê salên 1970 re ji sî salî zêdetir wextek derbas bû. Rastiya derket holê, ne tenê derfetên çareseriyê û rohnîbûnê ji bo hebûna Kurd derketin holê. Ya esas, anormaltiyek Kurd û dewletên welatên cîran mîna êsîr girtibû hilweşand. Zexteke netewî ya hundurê wê vala û pûç derket. Baş îspat bû ku sîstemeke zincîrwarî ya her kesî girê dide, ya mehkûm mehkûm dike, mehkûm dike êsîrê hakim, şensa wê yê jiyanê nîne. Dersek din a hatiye wergitin ew e ku eger şeref û heysiyeta civakê neyê hilgirtin wê ti pêşketinê nebe. Şeref û heysiyeta civakê jî ew e ku mirov xwedî li xwe derdikeve, ji xwe piştrast dibe, hêza xwe zanîn û xwe pêşdebirinê ye. Civakên nebin xwediyê vê hêzê wê di nav hakiman de ti qîmetê îfade nekin. Ev jî derseke din e hatiye fêmkirin. Kesê xêra xwe li xwe nebe, nikare xêrê li kesek din bike. Kurdê ev çend neçar wê karibe çi xêrê li kîjan cîranê xwe bike? Eger bibe mêtingeh jî dikare qîmetekê îfade bike, yan jî rêya ji bo bibe qîmetekê dikare vekirî bihêle. Berî derketina rê, bi rastî pêşiya Kurd girtîbû. Ji daristaneke dirîkan rê lê girtibe zêdetir sextekarî lê dibûn.

Dikare were pirsîn; gelo hêja bû ji bo van çend dersan ewqas êş û keser bihatana kişandin? Bersiva herî baş a ji bo vê pirsê, ji bo kesan û civakan pirseke dijber e. Gelo civak û kes dikarin bêrûmet û şeref bijîn? Mabest û meram ew e ku di dîrok û hemdemiyê de nasnameya dest jê nabe û her kes nîşaneya azadiyê dihesibîne nebe, gelo qîmetek û maneyek jiyanê dibe? Kesên ev qîmet û mane wenda kirine, gelo, dikarin qîmetekê bidin kesên din?

Tirk, Ereb û Fars jî di nav de hemû tebeqeya jor a rêveberiyê, dema Kurdê neçar û qediyayî ji bo rewşa xwe li cih dibînin, xwe dixapînin. Eger di dîroka Tirkiyê de Kurd di dema herî krîtîk de bi

kêr hatibin, ew ji qîmeta Kurdan a wê demê tê. Eger qîmeta Kurdan wê wextê nebûya, ma Kurdan dikarîbûn tevlî Şerê Rizgariyê bûbûna? Wê wextê di navbera Kurd-Tirkan de zêde newalên kûr venebûbûn û hînê hêviyên ji bo paşerojê par ve dikirin.

Eger di roja me ya îro de şerek bibe, gelo Kurdê wek berê mil bidin milên Tirkan û şer bikin? Bersiva herî baş a vê pirsê Kurdên li Iraqê didin. Eger rejîma Iraqê Kurd wek bira li cem xwe girtibûna, ma wê biketa vê rewşa trajîk?

Wer tê fêmkirin ku têkiliya di navbera Kurd-Tirk de - yanî Fars û Ereb jî - nemaze tevahiya sedsala 20. rewşeke herî anormal derbas kiriye. Dîrok dinivsîne ku di nav sultanên Osmaniyan de ji bo çareserkirina pirsgirêkan kesî mîna Sultan Yawiz Selîm şîdet bi kar neaniye. Ew bi xwe jî wexta polîtîka Kurdan pêk tîne rûpelekî sipî dişîne û weha tê gotin; "Hûn çi dixwazin binivsînin di asta qanûnê de ye." Ji ber ku li bin rûpelê sipî mora Yawiz heye. Ev çîrok divê dersekê bide û tebeqeya rêveber a di şîdetê de israr dike û xemsar e tiştekî ji vê çîrokê fêm bike.

Ataturk ji aliyê tebeqeya jor a rêveber ve timî wek nirxekî tê îfadekirin. Lê Ataturk jî helwestek wê li hemberî pirsgirêkan heye. Ji sedî sed maneya civakî esas dibîne; eger hewce bibîne dipelixîne, na eger helwestek din hewce dike, dikare heta sibê ranezê, bifikire û di dawiyê de çi pêwîst be dike. Kes nikare guman bike ku ew serokekî welê nebû. Lê wî ti carî pirsgirêkek bi vî rengî welatê wî, dewleta wî tengav bike, deyndar bike û di tehlûkê de dihêle nedihîşt. Jixwe ew dibêje; "Azadî karektera min e." Kesekî xwedî vê nasnameyê eşkereye li ser navê rizgarkirinê dewletê bi terîqetan re par ve nake. Netewparêziyeke çiqas mezin a Tirkîtiyê hebûya jî wê hewl bida Kurdan fêm bike. Li gorî karektera azad wê ji rewşê re çareyek bidîta. Mirov dikare ji vê guman bike? Beriya isyanan gelek caran behsa vê îhtîmalê nekiriye? Wexta bi ser isyanan de çûye jî armanca wî astengkirina Kurdîtî û azadiyê nebûye. Berovajî, wek wî jî baş dizanîbû; di encamê de yê Kurdîtî û azadî jî birin lîstikên emperyalîzmê nebûn? Wê ev rastiyê hînê çiqas bêne veşartin û ji bo rê li ber berxwedaneke din a Kurdan veke, wê bi israr hînê çiqasî provakatîf bibin?

Di berxwedana 1970 de bandora dogmatîzmê pir giran hebû. Ji lewra çalakiya bi xwezayî pêk bihata jî para xwe ji encamê werdigirt. Partîbûyîn, avakirina enî û bereyekî, eskertî û xebatên din ji nêz ve di bin vê zêhniyetê de şekil werdigirtin. Tevî hemû xebatên ji dil û durust, xwe xilaskirina ji destê dogmatîzma mora xwe li hemû

demên civakê xistiye, ji tevgereke xam a wê demê hêvî nedihat kirin. Bi qasî ku ji sosyalîzm, rizgariya netewî û gerîllatiyê hatibû fêmkirin bi cih dihat anîn, lê wexta dihat firidandin û kolan rastiyê bi xwe sînorên xwe destnîşan dikirin. Ne ku jiyanê li gorî teoriyê, teoriyê xwe li gorî jiyanê vedigerand. Bûyerên bi heman rengî ji bo sîstema zextê ya netewî jî têne qebûlkirin. Sîstem jî bawer dike ku helwesta dogmatîk baş lêkolaye û xwe ji bo rewşeke muhtemel amade kiriye.

Dema pêş me, bi dersên ji sî salê zêdetir tê nirxandin. Ne tenê dersên berxwedanê, veguherîna li dunyayê jî di çarçoveya heman nirxandinê de tê kirin. Rastiya Kurd a li Kurdistanê jî pêşketinên girîng jiyaye û hînê dijî. Lê ya esas, pirsgirêk hînê jî di rewşa kaotîk de ye. Bi qasî li gelemperiya Rojhilata Navîn li Kurdistanê jî gengaz e rêbazên çareseriya siyasî û eskerî - alî dikarin biceribînin - pêş bikevin. Di vê rawestgeha dîrokî de wek derseke mezin, ji bo çareseriyên demokratîk aştî esas hat dîtin û terikandina şîdetê bi awayekî berambar, bi israr hat ferzkirin. Lê eger vê carê jî guh nedin heman israrê û di rêya eskerî de bi înad û rik bimeşin, ji bo derketina ji rastiya kaosa dîrokî û civakî wê berxwedana aktîf a eskerî hewce bike û vê carê berxwedana aktîf a eskerî wê xwe bixîne rojevê.

Di salên 1970 de rêveqetînên eskerî û siyasî nebûn. Berxwedan mîna çarenûsê bû. Lê min di vê parêznameya xwe de hewl da ispat bikim ku ji bo salên 2000 wê heman tiştê neyê gotin. Ji bo her du rê baş werin dîtin, divê pirsgirêkên muhtemel ên pêşketina çareseriyên eskerî û siyasî bêne dîtin. Ji bo ji nêz ve hayilbûna li derfet û îmkanan, divê bûyerên mîna bahozê yên sî salên dawiyê qewimîne ji hemû aliyan ve werin nirxandin. Di nirxandinek bi vî rengî de wê sûd û feyde hebe.

## BEŞA PÊNCAN

## Tevgera PKK'ê, rexne-rexne lixwegirtin û jinûve avabûn

### A- Ji bo dîrokçeya kin a PKK'ê pêşnûmeya nirxandinê

#### 1- Yekemîn Pêngava PKKyîbûyînê

Di 31. salvegera hîmdanîna pêngava PKK'ê de hewce bi nirxandineke berfireh, rexne-rexne lixwegirtin û jinûve avakirinê heye û ev yek pirsgirêkeke dijwar û bi cih anîna wê wezîfeyeke bingehîn e.

Komek li ser hîmê nerazîbûnê rabû ku hînê amator jî nebû, di Nîsana sala 1973 de li peravên Bendava Çûbûk a Enqerê geh li şipiya û geh jî rûniştî guftûgo dikirin û bawer dikirin ku eger wek komeke cuda ya Kurdistanê tevbigerin rast e, sedema vê yekê jî yekem car wek sirrekê dianîn ziman û digotin Kurdistan welatekî

mêtingeh ê klasîk e. Ev koma piçûk a ji şeş kesan pêk dihat, bi eşkerekirina vê sirrê dest bi karê xwe kir. Şêwazê berê yê yek bi yek eşkerekirina rastiyan wergeriya şêwazê pêkanîna civakê û mirov dikare vê yekê wek yekemîn destpêkê binirxîne. Ev şêwaz taybetiyek wê hebû ber bi rêxistinbûyînê ve dibir. Kom di salên 1974, 75 û 76 de li bin banê ADYOD (Komeleya Hîndekariya Bilind a Demokratîk a Enqerê ) hat pêşxistin. Min di Adara sala 1977 de ji Enqerê berê xwe da Kurdistanê û li Agirî, Bazîd, Qers-Dîgor, Dêrsim, Çewlîk, Elezîz, Amed, Ûrfa û Dîlokê geriyam û rêzeke civîn lidarxistin. Bi vê gerê û civînan me koma xwe bar kir welat. Ez dîsa paşê vegeriyam Enqerê û şehadeta Hakî Karer li Dîlokê - piştî civînê bi sê rojan - em hîç li bendê nebûn û em şok kirin. Me bi avakirina partîbûyînê bersiva vê şehadetê da. Di dawiya heman salê de min li Dîlokê pêşnûmeya bernameyê amade kir. Ber bi havîna sala 1978, ez bi zewaceke bela û îxanetên hundurîn barkirî firiyam navenda Kurdistanê Amedê ku ev bajar li îxanetên mezin hatibû qewimandin. Di 27 Mijdarê de li gundê Fîsê koma me ya amator a ji 22 kesan soza partîbûyînê da. Piştî ku hat fêmkirin, wê bi navê partîbûyînê li bajaran xebatê neyê meşandin, em hem li ser alternatîfbûyîna çiyê û Rojhilata Navîn rawestiyan û di dawiyê de mîna duyemîn Hîcreta Hz. Îbrahîm, me di 1 Tîrmeha sala 1979 de ji Ûrfayê berê xwe da Sûriyê û ji wir jî ji bo lêgerîna azadiyê me berê xwe da welatê kevin ê Kenan.

Divê em ji nêz ve binerin, pêvajoya li nêzî deh salan a heta 15 Tebaxa sala 1984, ka di çi rewşa îdeolojîk û polîtîk re derbas bûye.

Salên 1970 di dîroka sîstema kapîtalîzmê de destpêka pêvajoya şikestineke girîng bû. Sîstem ji şerê cîhanê yê duyemîn bi ser xwe ve hatî derketiye, pêşengiya DYE zelal bûye, Ewrûpa ji nû ve rabûye ser piyan, Japonya wek dêwê Rojhilata Dûr hişyar bûye. Sîstema Sosyalîzma Reel ber bi lûtkeyê ve hildikişe, tevgerên rizgariya netewî di çaxa xwe ya herî bi hêz de ne. Tam di vê nuqteyê de tevgera ciwanên 1968'ê şoreşeke nû ya zêhniyetê didan destpêkirin.

Sîstemeke civakî-dîrokî ya ev çend seridiye û gihîştiye lûtkeyê dibe ku seyr were dîtin ka çawa dikeve pêvajoyeke kaotîk. Lê eger em bînin bîra xwe emê bizanibin piştî seridînê gaveke din serberjêrî ye û bi giştî jî tê qebûlkirin ku di rewşek welê de êdî pêvajoyeke kaosê dest pê dike. Îro jî wexta mirov vedigere û li paş xwe vedinere, em dibînin di bin vê rastiyê de hêmanên bingehîn tevgerên sed û pêncî sal ên sosyalîzma reel, rizgariya netewî û sosyal demokrasî yên navend-dewlet in ku lewra sozên dan girseyên gel nekarîn bi cih

bînin. Careke din dualîteya, gelo, Xirîstiyantiyê Roma fetih kir an jî berovajiyê wê rast e, derket holê. Belkî jî para rastiyê di her du aliyan de jî heye. Xirîstiyantiyê wexta bi kulta împaratoriyê re sentez kir feodalîzma Serdema Navîn derket holê. Wekhevîxwaz û aştiyane nebe jî mirov dikare bibêje sîstemeke nû ya civakî derket. Lê dîsa rastiyeke eşkere bû, wekhevî û azadîxwaziya di cewherê xwe de bi giranî ji dest dabû.

Ekolên sosyalîst, sosyal demokrat û rizgariya netewî di demekê de ku em dikarin jê re bibêjin qonaxa hov a sîstema kapîtalîst derketin holê, bi ser sîstemê ve bûn. Ji wê derketibûn. Bêguman rast nîne mirov bibêje bi temamî wek ekolên yedek ên sîstemê dihatin amadekirin. Lê em îro bi hêsayî dikarin bibêjin; derdekî wan nebû ji bo şêwazê jiyanê û rasyonalîteya sîstemê bi tevahî li dawiyê bihêlin, eger hebe jî ji gotinê derbas nekir. Îdeolojiyên azadîxwaz û wekhevîxwaz kokên wan naçin civaka hiyarerşîk û çînî. Ew ji nav hêviyên demokratîk û komîn hiltên. Lê em dikarin gelek mînakan ji dîrokê nîşan bidin ku bi zorê yan jî di berdêla tawîzan de ji aliyê hiyarerşî û çînî ve hatine dejenerekirin û cewherê xwe wenda kirine. Em dema jihevketina welatên sosyalîzma reel, piştî rizgariya netewî tengasiyên dewlet ketinê û muhafezekariya hukûmetên sosyal demokratan, nîşan didin ku pir cudahiya wan ji yên din nemaye û ji lewra di vê qonaxê de em bi hêsayî dikarin bibêjin wan ji mezhebbûyîna sîstemê wêdetir gav neavêtine. Sîstem nikare ji van mezheban sûd werbigire û tengavbûna salên 1970 jî ji nêz ve bi vê rastiyê ve têkildar e. Tevgera ciwanên 1968 jî di cewherê xwe de vê rastiyê îfade dike. Encamên hêvîkirine nebûne. Her sê ekol jî tevî ku bûne desthilatdar, nekarîne sozên dane bi cih bînin. Burokrasî û çîneke nû ya kapîtalîzmê derxistin holê. Ji gelek aliyan ve ji kapîtalîzma klasîk paşve mayîtir bûn. Krîzên rê li ber vekirin, tinebûna wekhevî û azadiyê kir ku sîstema rexne dikirin ji nû ve lê were gerîn.

Ev rastî ji bo rewabûna dewleta kapîtalîst jî xetereke ciddî bû. Wê êdî ji qabîleyetên xwe yên pê bandor li ser girseyan dikir, bibûya. Muxalefetên gel wê êdî li pey ekolên bi ser dewletê ve nînin, biçûna. Şoreşgeriya 1968 her çend kêmasiyên wê hebûn jî rê li ber vê yekê vekiribû. Em ji çepgiriya nû bigirin heta femînîzm, tevgera ekolojîk û ekolên çandî yên herêmî li bereyekî fireh şêwazê muxalefeteke nû li dijî dewletê pêş ket. Yek ji hêmanên sereke yê sîstem bir kaosê ev bû. Ji aliyê din ve, pirsgirêkên hawîrdorê yên zêde dibûn, di encama polîtîkaya tawîzan de heqdestên zêde dibûn û

ji ber girseyên mezin ên xizanan daxwaz ji bo hilberandinê nedibû û vê yekê jî rê li ber lêçûn û hilberandineke zêde vedikir. Nakokiyên hundur ên sîstemê di çarçoveya DYE-YE-Japonya de zêde bûbû. Piştî salên 1980, neolîberalîzm wek çareyekê ji bo vê tengavbûna kaotîk hatibû fikirîn. Di salên 1990 de jihevketina Sowyetê ji bo sîstemê nebû serketin, berovajî, bû hêmanekî krîzê xurt bike. 'Pêngava global' a nû ya neolîberalîzmê di van şertan de ket rojevê. Di bin bombardûmana giran a medya monopol de hewl dan paradigmayên sexte biafirînin. Ji bo hedefeke nû ji sîstemê re were destnîşankirin, avakirina teoriyên nû hat bilezkirin. Di şûna komînîzmê de 'şerê şaristaniyan' teoriya li rewacê bû. Nexasim li ser cografya bi navê Îslamê rejîmên hatibûn avakirin bi berjewendiyên sîstemê re li hev nedikirin û ev yek zêde derdiket pêş.

Di serê salên 1970 de ku li dunyayê bûyerên bi vî rengî diqewimîn, li Tirkiyê jî çepgirî û di çarçoveya pirsgirêka netewî ya Kurd de Tevgera Kurdî, pir zêde nekarîbûn çepgiriya klasîk û meyla netewparêziyê li dawiyê bihêlin. Pir ji dawiyê ve li pey dunyayê diçûn. Çepgiriya Tirkiyê bi cihokên Sowyet, Çîn, Albanya û komînîzma Ewrûpayê tîna xwe dişikand. Çepgiriya Kurd ku tevgereke piçûk a rewşenbîran bû, di navbera netewparêziya Kurd a paşverû û çepgiriya Tirk de ji aliyê nav li xwe danînê, dudil û tevlîhev bû. Di vê demê de ez bi xwe şexsî bi her du meylan re jî eleqeder bûm. Min hewl da ez bibim sempatîzan. Tevî ku sempatîzaniya min a ji bo THKP-C û Dev-Genc'ê li pêş bû, bala min diçû ser rêxistinên bi pirsgirêka Kurd re mijûl dibûn. Vegotina pêşengên THKO Denîz Gezmîşan a li ber sêpêya darvekirinê ji bo biratiya azad a Kurd-Tirk peyamek bû, diviyabû timî pê ve dilsozî û girêdan hebûya. Tevî vê yekê, ez di sala 1970 de li Stenbolê bûbûm endamê DDKO'yê. Dema sura firtûneya 12 Adarê rabû, di nav rewşeke tevlîhev a rêxistinê de her an û gav dibû ku ez derkevim derveyî qanûnê. Jixwe di Adara sala 1972 de piştî şehadeta Mahîr Çayanan, ez di çalakiyeke boykotkirina SBF de ketim zindanê û piştî heft mehan ji ber tinebûna şahid hatim berdan. Ez wexta ji zindanê derketim, ez gihîştim wê baweriyê ku rêxistiniyên heyî hêviyê nadin û ya rast ew e ku rêxistiniyeke nû were ava kirin.

Di Buhara sala 1973 de me li Enqerê biryardariyek ji bo rêxistinbûyîneke serbixwe nîşan da û ev yek ji derfet û îmkanan wêdetir di aliyê maneyê de girîng bû. Me ne meyla netewparêziya Kurd a paşverû, ne jî meyla sosyal-şoven (di cewherê xwe de meyla netewparêziya çepgir a Tirk) qebûl dikir, me bi şîroveyeke xweser a

dîrok û rojane wek 'Şoreşgerên Kurdistanê' gavavêtin rast didît. Ev guhertin di warê xetê de bû û roj bi roj girîngiya wê derdiket holê. Me hewl dida, ji bo em di warê îdeolojîk de, ne di bin meylên netewê serdest ê tehekumkar de, ne jî di bin meylên netewparêzên Kurd ên paşverû yên hevkar ku bi ser netew-îqtîdarên tehekumkar ve ne, bêne helandin, vê yekê însiyatîf û nasnameyeke azad dida me. Ez bawer dikim ku ev tercîh rast bû. Di hinavên Kurdan de ew taybetî hebûn ku çendîn xebatên xwe bimeşîne, karibe gelên din jî bigihîne serwextî û têgihîştina azadiyê. Ji bo em nekevin bin bandora netewparêziya serdest û bindestan, wek hedef nasnameya gelê azad li cih bû û ev yek di heman demê de li gorî dem û cih garantiyek bû, ji bo em nekevin rêşaşiya sosyalîzmê, rizgariya netewî û sosyal demokratan ku ew li gelemperiya dunyayê ketin rewşa mezhebên kapîtalîzmê. Tevî ku ev yek ji bo pêşdebirina zêhniyetê jî li cih bû, her weha taybetiyên wê hebûn ji bo rê li ber siyaseteke demokratîk veke. Pir zêde destnîşankirina rizgariya netewî dikarîbû bûbûya sedema ji rê derketinekê. Di vê de şîroveya dogmatîk a 'netew dikarin çarenûsa xwe diyar bikin' bi tesîr bû. Ji bo her netewekî dewletek, wek şîroveyeke rast a bi tenê ya vê prensîbê dihat fêmkirin. Vê rewşê çavkaniya xwe ji têgihîştina îqtîdarê ya sosyalîzma reel jî werdigirt, afirîneriya xetê asteng dikir. Lê îlana PKKê ya di sala 1978 de pêşî li vê ji rê derketinê girt. Di şûna ku em bibûna tevgereke xweser a rizgariya netewî ya Efrîka, xeta me ya xwe spart azadiya gel rewş xurtir kir. Pêşketin li gorî veguherînên çepgir ên li dunyayê - pir bi serwextî nebûya jî - li cih bû. Xetek welê bû, di hinav û himbêza xwe de şensê wê yê paşeroj û siberojê hebû.

Xeta îdeolojîk, tevî ku kûr û zelal jî nebû, ji ber ku ji pêşketinê re vekirîbû, ji rê derketinên mezin û mayînde asteng dikir. Me bi israr dianî ziman ku sosyalîzma me 'sosyalîzma ilmî ye' em dikarin vê yekê bi eleqeya ilmê civakî rave bikin. Li hemberî îhtîmala nexweşiya hişkbûna îdeolojîk a rê nade dîtina rastiyê, ji bo tedbîrgirtinê hewl hat dayîn. Lê tevî ku ilmê civakî di nav pirsgirêkên giran de bû, eleqeya nû ya ji bo çand, ekolojî û pirsgirêka jinê, dîsa jî girîngiya xetê îspat dike. Xetê dikarîbû xwe ji tevlîheviya sosyolojiyê bikira û bi vî awayî dikarîbû îdealên azadî û wekheviyê geş û pêşeng bikira. Herî kêm, texrîbatên krîza sosyalîzm û ilmê civakî bi xetê hatin bi sînorkirin. Xetên din ên çepgir ên Tirkiyê ji ber ku nekarîn vê qabîliyetê nîşan bidin û di navbera karektereke pûç û lîberalîzmeke ferdî de çûn û hatin, nekarîn xwe ji marjînalbûyînê

xilas bikin. Ji ber ku xwe xistin rewşa hucreyên piçûk ên mezhebbûyînê, hînê ji serî ve şensa xwe ya polîtîkbûyînê jî wenda kirin. Komikên bi navê çepgirên Kurd jî di pêvajoyeke hînê melûltir re derbas bûn.

Şensê polîtîkbûyîna xeta PKKê ji nêz ve bi taybetiyên wê yên îdeolojîk ve têkildar e. Ji lewra gelê bibe zemînê wê pir zû dikare xwe bigihînê û ev vê rastiyê ispat dike. Eger ew jî biketa nexweşiyek çînî yan jî netewetiyeke teng, ewê jî wek mînakên din nekarîbûya ji marjînalbûyînê xilas bûbûya. Baş tê zanîn polîtîkbûyîneke kûr heye. Divê mirov vê yekê bi pirsgirêka kadrobûyînê ve girê bide. Kadro ji ber rengwergirtina xwe ya heyî di rewşa astengbûyînê de bû. Pirsgirêka kadro heta nehata çareserkirin ku di hilweşîna sosyalîzma reel de yek ji hêmanên bingehîn bû, hemû tespîtên siyasî yên bihata kirin û hemû rêxistinbûyîn wê nikarîbûna xwe ji bêkêriyê xilas bikira. Bi qasî xeta polîtîk, modela wê ya rêxistinê jî ji bo pêşketinê li cih bû. Di maneya xweparastinê de parastina rewa ya çekdarî li gorî demê dibû ku bihata parastin. Lê ji ber ku kadroyên ev yek bixwestan nebûn, ev timî dibû sedem ku xet qelsiyan nîşan bide. Pirsgirêkên ku mirov dikare ji wan re bibêje krîza rêxistinî, hat xwestin li dawiyê werin hîştin. Hin pêşketinên bi sînor bûn, ya rastîn ev ji girseyîbûyîna tevgerê bû. Ji bo xet rê li ber pêşketinên hînê mezintir veke profesyonetltiyê xwe ferz dikir.

Di xeta polîtîk a PKKê de mijara herî girîng a divê were rohnîkirin dabaşa dewletê ye. Gelo di xeta polîtîk a PKKê de avakirina dewletek cuda hebû, yan na. Tevî ku slogana Kurdistana Serbixwe pir dihat bi karanîn jî, pir zehmet e ku mirov bibêje ev dihat maneya avakirina dewleteke serbixwe. Ez wek şexsekî herî nêzî mijarê, nikarim bibêjim; bi giştî dewlet û bi taybetî jî têgîna dewletê ya Kurdistanê me bi kûrahî guftûgo kiriye û em fikirîne. Her çend meyleke utopîkbû jî ji aliyê realîstî ve aktualîzekirinê zêde bal nedikişand. Ez di wê bîr û baweriyê de me, ev yek ji xwestin û nexwestinê wêdetir di aliyê wê yê çareseriyê de zelalî nebû. Pir zelal nebû, bi dewletbûnê re çareserî dibû, yan na. Baş dihat zanîn ku ev mijar di teoriyê de bi nîqaş e. Pirsa; gelo sosyalîzma demokratîk, an jî dîktatoriya proleteryayê, timî di hişan de dibû sedema tevlîheviyê. Dewletên li gelemperiya dunyayê jî dihatin dîtin ku pirsgirêkên gelan û kedkaran çareser nakin. Ev dîtin jî bi bandor bû. Van hemû nuqteyan bal dikişand ser hewcebûn û ponijandina li ser dewleteke cuda, lê di heman demê de vê yekê bi xwe re dida hiskirin ku wê pirsgirêkên kes nikaribe ji binî derbikeve rû bidin. Her weha tevî

zehmetiyên avakirina dewleteke Kurdî li Tirkiye û Rojhilata Navîn, pirsgirêkên nû yên bi xwe re bianîna jî dihatin zanîn û vê yekê mijar hînê naziktir dikir. Wek encam, di şûna dewletê de têgîna niştimana dayik Kurdistan hat tercîhkirin ku çendîn statuya wê tam zelal nebû. Ji slogana bingehîn 'Kurdistana Sosyalîst, Demokratîk û Serbixwe' tê fêmkirin ku tercîheke vekirî ji bo dewletê nîne. Mirov dikarîbû texmîn bikara ku wê slogana rastîn û şoreşgerane bi awayekî berçav Kurdistana Azad bûya. Eger mirov Şoreşgerên Kurdistanê=Alîgirên Kurdistana Azad tercume bike hînê şîroveyeke rast e. Girîngiya vê pirsgirêkê wê hînê paşê derketa holê. Nemaze dewleta 'Kurdistana Federe' ya di serê salên 1990 de hat îlankirin û di berxwedana PKKê de îlankirina 'herêmên azad' di mijara îqtîdara dewletê de dida fikirandin.

Ji ber ku pirsgirêka dewletê di îdeolojiya sosyalîst de jî tam nehatibû çareserkirin şîlo hînê zêde dibû. Lê di giranbûna mijarê de - her netew mafê xwe yê çarenûsê heye - fikra ji bo her netewî dewletek rola bingehîn dilîst. Dema dewlet jî dihat gotin zor û şer diket rojevê. Şer wek pêdiviyek parastina rewa nebû, ji bo armancên polîtîk bi giştî şer mubah dihat dîtin, ev jî bi serê xwe mijareke girîng a pirsgirêkê ye. Wek fikreke stratejîk dihat qebûlkirin ku eger şer nebe, hem jî şerekî demdirêj, netew nikarin rizgar bibin, netew jî rizgar nebin çîn nikarin rizgar bibin. Pirsgirêkên îqtîdar û şer ku di tevahiya dîroka têkoşîna azadiyê de pêşî ji rê derketinên mezin re vekirin, her ku biçûya wê di rojeva PKKê de cih bigirtana.

Di vê pêvajoyê de dewlet bi ser me de hat, lê jixwe di vê demê de bi giştî bi ser Kurdîtî û çepgiriyê ve diçû. Wek parçeyekî vê êrîşê bi ser me de jî dihat. Jixwe rewşeke statuya cuda bixwaze nebû. Fikir nedihat kirin ku ev tevger bibe navendeke berxwedanê ya xweser û demdirêj. Hemû nîşaneyan bi serê tîrên xwe hatina darbeyeke leşkerî îşaret dikirin. Du helwest hebûn bihatana nîşandan: Yan derketina serê çiyê, yan jî derketina derveyî welat, xwe vekişandina Rojhilata Navîn. Ya esas, bi ser her du helwestan de jî hatin. Di dawiya sala 1979 de tevger xwedî derfet û îmkan bû ji bo di her du cihan re bihereke bêyî ku wendahî bide. Xwe vekişandin û herikandina di van cihokan re pir hêdî dimeşiya. Ji bilî hin girtinên bêşens ên mîna Mazlûm Dogan û Mehmed Xêrî Dûrmûş wendahiyeke ciddî nebû. Tevger çêbûbû, partî hatibû îlankirin û bûbû xwedî statu ji bo karibe hebûna xwe demeke dirêj bide meşandin. Ji lewra darbeya 12 Îlonê bi pêşbîniyeke mezin hat pêşwazîkirin û darbeya eskerî ya sala 1980 hînê nebûyî, hemû pêdiviyên hewce bi cih hatin anîn. Mayîna li

derveyî welat ji bo demeke dirêj nedihat fikirîn. Hin kadroyê bihatana perwerdekirin û bi şerekî demdirêj ê gerîlla wê heta rizgariyê şer bihata meşandin; ev wek 'qanûna şoreşê' dihat şîrovekirin. Bawerî hebû ku wê her tiştê li gorî hatiye plankirin bimeşe.

Piştî salên 1980 wek hatibû plankirin çend komên hatin perwerdekirin ji bo welat hatin şandin. Hinek xebatên siyasî yên bereyî - Eniya Berxwedana Yekbûyî Li Dijî Faşîzmê - hatin kirin. Ji ber ku kar û xebat wek dihat xwestin nedimeşiya, hewceyî bi hin karên teorîk derdiket holê. Bi vê armancê ji sala 1981'ê û pêve analîzên 'Li Kurdistanê Pirsgirêka Kesayetiyê, Taybetiyên Milîtanên Şoreşger û Jiyana Partiyê' tavilê li pey wan 'Li Kurdistanê Rola Zorê' û 'Li Ser Rêxistinbûyînê' li kasetan hatin qeytkirin û wek pirtûk hatin çapkirin. Bi Konferansa Yekemîn a PKK'ê (1981) û Kongreya Duyemîn (1982) xebatên bingehîn û mayînde ji bo qada welat hatin kirin. Şerê Îsraîl-Filîstînê di sala 1982 de ev pêvajo bi leztir kir.

Ya esas, bi Şoreşa Îranê re li Rojhilat û Başûrê Kurdistanê ji bo rêvebirina xebat û baregehan şert û mercên baş derketibûn holê. Ne ku nehat fikirîn. Li wê deverê heval Mehmed Karasungur hebû ku ji şerê li Siwêregê xwedî tecrûbe bû. Dikarîbû ya hewce jî bikira, lê di Gulana sala 1983 de bû qurbanê durustî û amatoriya xwe û şehîd ketina wî bêşensiyeke ciddî bû. Ji bo cihê wî yê vala bûbû tijî bikin, di sala 1982 de Dûran Kalkan û Alî Haydar Kaytan hatin şandin. Ji wan hatibû xwestin ku xetê li Başûr rêve bibin û bidin rûniştandin. Beriya vê jî di sala 1980 de bi pêşengiya Kemal Pîr û Mahsûm Korkmaz zevtkirina xeteke berxwedanê ya ji Botanê heta Dêrsimê hatibû xwestin û ji bo vê yekê jî bi giştî xwedî perspektîf bûn. Girtina bêşens a Kemal Pîr - Tîrmeh 1980 - wendahiyeke ciddî bû. Yên esas gavavêtin ji wan dihat xwestin Dûran Kalkan ew bûn ku di warê lîstina bi xetê de yekem car rê li ber fikaran vedikirin. Bi qasî ku tê bîra min, min wiha digot; "Li Rojhilata Navîn tiştên bûne mirov dubare bike, wek mirov kerê xwe boyax bike û careke din bifiroşe." Gavavêtinên bendewariya wan dihat kirin, nebûn. Li Zindana Amedê Ferhad Kurtayan xwe şewitandin û Kemal Pîr, Mazlum Dogan û M. Xêrî Dûrmûş ketin rojiya mirinê û wexta me şehadetên wan bihîstin, rewşa me ya berpirsiyariyê û fikarên me wergeriyan hêrsê. Bi vê armancê me yekem car di Çileyê sala 1984 de bi hin kadroyên navendî re civîn pêk anî û me di civînê de rewşa hin hevalan bi destnîşankirina navên wan - di serî de Dûran Kalkan û Cemîl Bayik - pir bi tundî rexne kir.

**2- Duyemîn pêngava PKK'yîbûyînê**

Di vê qonaxê de tevgerê yan bûbûya tevgereke penaber, an bûbûya tevgereke rizgariya netewî ya hemdem, yan jî bûbûya tevgera azadiyê ya gel. Tevger welê hatibû serê rêveqetînekê. Tevgera Azadiyê nekarîbû demeke dirêj bêdeng bima, ji ber ku berpirsiyariya wê ya dîrokî giran bû. Nemaze şehîdên zîndanê û rewşa êşkenceker ji sedî sed ferz dikir ku hin tişt werin kirin. Naxwe dûr nebû ku tevger bi îxanetê bihata morkirin. Pêngava 15'ê Tebaxa sala 1984'ê di bin van fikarên giran de bi kêmasî û derengmayî mumkîn bû were pêşwazîkirin. Di dema Turgût Ozal de ku nû bûbû serokwezîr, helwesta dewletê dîsa li gorî giraniya hewce dikir nebû. Zêhniyeta dewletê ya hêzên gerîlla wek 'kulmeke serserî didît' ji bo nêzîkbûnên siyasî hêvî nedidan. Bi awayekî bêsînor bawerî bi hêza eskerî ya klasîk hebû û bawer dihat kirin ku wê di demeke nêz de gerîlla bipelixînin. Propaganda bi qerepereyeke pûç dihat kirin. Heta sala 1984'ê ti serketin nebû. Pêşî li şerê gerîlla vekirî bû. Lê astengiyên hundur ê behsa wan hat kirin, tevger giran dikirin û li vê jî, vê carê PDK zêde bû. Lewra gavavêtinên mezin ên hêvî dihatin kirin bi ti awayî pêk nedihatin. Reaksiyona gel li cih bû. Ya li naverastê nebû, kadroyên rastîn ên fermandêr ên rêxistiniyê bikin û tevgerê rêve bibin, nebûn. Ji serî heta dawiyê pirsgirêka ku mora xwe li bûyeran xist, ev rastî bû.

Rexneyên Kemal Pîr û Mahsûm Korkmaz derbarê têkoşîna leşkerî de li cih bûn. Belkî jî van her du hevalên hêja dikarîbûn pêdiviyên hewce bi cih bi anîna. Wendakirina Kemal Pîr di sala 1982 de, Mahsûm Korkmaz di sala 1986 de bû derbeke mezin ku ji bo şer li gorî pîvanan nemeşe. Pişt re bi awayekî qismî xwe vekişandin û III. Kongreya PKK'ê ya di sala 1986 de tam bû xebatek pêşdebirina krîzê. Ne ku derfet û îmkan kêm bûn, têgihîştinek hebû li ser derfet û îmkanên bi zehmetî hatibûn afirandin, radiza û bi tesîr bû. Helwestên provakatîf ên Kesîreyê hêrsa mirovan heta dawiyê radikir. Dîsa tevî hemû kêmasiyan di sala 1987 de ji bo gavavêtinekê perspektîfeke berfireh û derfetên heyîn hatibûn amadekirin. Lê belê çetebûyîna di hundur de ya têra xwe li hinavê tevgerê rûniştibû û hema bêje êdî bi zanebûn tevdigeriya wexta bi bêberpirsiyariya kadroyên navendî re gihîşt hevdu, xebatên bi fedekariyeke awarte ya hejmareke zêde ya mirovan hatibû amadekirin, bêber û pasîf dikir.

Li hemberî van rewşan ku ravekirina wan zehmet e, serokatî di rewşeke dijwar de bû. Barên giran ên gav bi gav li serokatiyê dihatin kirin û pirsgirêkên giştî dikir ku serokatî analîzên berfireh bike û

hewceyî bi xurtkirin û kûrkirina perwerdeyê derdiket holê. Tevî ku berpirsiyarî pir giran bûn jî bi awayekî serketî dihatin bi cihanîn. Hema hema ji bo rûmeta şoreşgerî ya her kadroyê namzet desteka hewce ji sedî sed dihat dayîn û bi awayekî serketî jê re dihat pêşkêşkirin. Diviyabû ew jî bi hurmet tevbigeriyana û bi hurmet alîkarî bidana, lê di şûnê de diketin nav hewayek îqtîdara hundurîn û hemû xebat bi jehrî dikirin. Çeteya Çaran ku ji Şahîn Balîç, Şemdîn Sakik, Kor Cemal û Hogir pêk dihat, bi awayekî fermî kuştina kadroyan dabûn destpêkirin. Nayê zanîn çiqas kadro kuştin, digotin "di şer de hat kuştin" û bi vî awayî gelek kadroyên hêja kuştin. Mirina - tarî - gelek hevalên hêja hînê jî sirra xwe diparêze. Gelek mirov, jin û zarokên diviyabû nebûna hedef, kuştina wan dewam dikir. Li naverastê însiyatîfa navendî nemabû. Hînê jî baş nayê zanîn ku ji dûr ve ez çiqas rast dihatim agahdarkirin.

Di 25 Çileya sala 1990 de hevalê min ê zaroktiyê Hesen Bîndal ji ber çavên min birin û bi awayekî herî rezîlane û xeternak gotin "di manewrayê de hat kuştin" ez hînê nû hişyar dibûm û li meseleyê divarqilîm. Di nava tevgerê de kuştinên rezîlane û ravekirina wan zehmet bi navê welatparêziyeke mezin û baweriyên sosyalîzmê dihatin kirin û vê yekê êdî rê li ber xemsariyê vekiribû. Di vê navberê de bi îhtimaleke mezin li ser navê nêçîra ajanan gelek mirovên bêguneh jî hatine kuştin. Li gorî ku li cem min dikirin, di hundur de hînê bûyerên xeternak dikirin. Di sala 1991'ê de Talabanî li ser mijara PKKê bi Tirkiyê re li hev kir û tevî PDKê ku ji xwe berê hevkarî bi dewleta Tirk re dikir, li van îxanetan zêde bûn û di sala 1992 de bi du alternatîfên "yan teslîm, an jî îmha" bi ser tevgerê de meşiyan. Hemû qehremanî, xebatên mezin û destekdana gel ji bo derketina ji kirîzê têrê nekir. Kongreya di sala 1990 de û çend konferans, ji mîna nivîsên li ser avê wêdetir ti tişt îfade nekirin. Tevî van hemû bûyerên neyênî, analîzên kûr ên hemû bi belge, her sal perwerdekirina bi hezaran kadroyî û tevlîbûna gel a mîna artêşekê nehat astengkirin.

Li aliyê dewletê jî yekem car pêşketinên girîng dihatin dîtin. Tûrgût Ozal dest bi guftûgokirina pirsgirêkê kir, erênî nêzî agirbestê bû. Peyama Silêman Demirel a "em nasnameya Kurd nas dikin" tevî ku hêvî didan jî bi garantî nebûn. Eger Turgut Ozal di Buhara sala 1993 de nemirana - yan jî wek îdîa tê kirin nehata kuştin - û di nava tevgerê de Şemdîn Sakik wek nerazîbûn li dijî wendahiyên bêmane yên gerîlla sî û sê esker nekuştibûna, belkî jî agirbest bi aştiyeke mayînde bi encam bibûya. Lê çi rewşa navxweyî ya dewletê, çi jî

çeteyên di nav PKKê de însiyatîf bi dest xistin û çi jî îxanetên Barzanî û Talabanî pêşketina vê şensê asteng kirin. Rewş hînê tevlîhev bû û her tişt ji rê û usûlê derket. Di sala 1994, 1995, 1996, 97 û 98an de her du aliyan xwe bi rik û înad dubarekirin û vê yekê ew gelek peritand û hilhiland. Ji ber ku dengê di pêvajoya 28 Sibatê de cuda bû û bi baweriya wê dewletê di sala 1998 de bêeleqe nemîne pêvajoya agirbesta yekalî hat îlankirin, lê di encama zextên li ser Sûriyê de û neçar derketina me, ji bo çareseriyê rê neda rewşek erênî. Dewletê dest ji rewşa xwe ya êrîşên zêde berneda. Li gorî xwe firsend zevt kiribû û bi biryar bû ji sedî sed bi rêyên eskerî pirsgirêkê biqedîne. Bi maceraya Ewrûpayê û pêvajoya Îmraliyê ya tê zanîn em ketin demeke cuda. Ev rewş tê maneya duyemîn pêngava PKKyîbûyînê.

Em dikarin li ser pêvajoya panzdeh salan a di navbera 15 Tebaxa sala 1984'an û 15 Sibata sala 1999'ê de ku dibe em wek pêvajoya şerekî dijwariya wê kêm bi nav bikin, ji gelek aliyan ve û pir dorfireh binirxînin. Ev nirxandin dibe ku derbarê hunerê serokatî, siyasî û rêbaz-pratîkên eskerî de werin kirin û dîsa mumkîne ji aliyê şer û îqtîdarparêztiyê ve were kirin. Ev nirxandin dibe ku ji aliyê rastî û şaşiyan ve, her weha ji aliyê diviyabû çi nehata kirin û çi ji sedî sed bi ser bihata xistin, bêne kirin. Dîsa li gelemperiya dunyayê di salên 1990 de jihevketina Sowyetê, li DYE hatina Clinton, krîza Iraqê û pêngava global a nû, hewce bi analîzên kûr didît û dibû ku ev mijar jî bihatana nirxandin. Bi ser vê yekê ve, diviyabû çepgiriya kevin li dawiyê bihata hîştin, guftûgo bihata kirin ka wê çepgiriya nû çawa bibe û hewceyî hebû mijarên teorîk mîna utopya şoreşgeriyê ji nû ve bihata nirxandinê û dikarîbûn bihata kirin. Mirov dikarîbû kêmasî û şaşiya nirxandinên bihatana kirin bidîtana û temam bikirana.

3- Derbarê PKK'ê de hin nirxandin

Min hewl da, ez pêşnûmeyeke xulase û cewherî ya dîroka PKKê pêşkêş bikim. Hin nirxandin dibe ku mirov pir bidin hînkir in. Min berê vegotineke weha bi kar anîbû; "Ya tê çareserkirin ne kêlî dîrok e, ne kes civak e." Em wexta vê vegotinê li PKKê bipîvin wê hînê baştir were fêmkirin. Bi PKKê hem dîroka Kurd, hem jî civaka wî hat çareserkirin. Ev çi bi aliyên xwe yên erênî, çi jî bi yên neyînî welê ye. Hema tenê em bizanibin rast bixwînin û dersên baş bigirin.

PKKyîbûyîn mîladeke hemdem - hilatina Kurd - a Kurd e, min ti car ji vê yekê guman nekir. Lê min ti car texmîn nekiribû ku ferdên wek Kurd têne bi navkirin ji aliyekî ve û zêde bi nakok, bêmane û qelsin bin, ji aliyê din ve jî zêde dûz û pirxet, fedekar û egîd bin. Min

li ser kesayetiyê gelek analîz kirin, lê hînê jî ez nikarim bibêjim; min xwe gîhand Kurd û ew çareser kir. Ji ber ku ew ji xwe pir dûr hatiye xistin. Her çend bi şekil Kurdewarî xuya bike jî di cewherê xwe de bûye yê din. Li sînorên îxaneta xwe hayil jî nîne. Li ser wî ne qanûnên însanan, ne jî yê heywanan dimeşin. Mîna ku cureyê afirîneran ê sêyemîn be.

Di PKKyîbûyînê de rola bingehîn a min dixwest ez bilîzim, eşkere di warê zêhniyetê de bû. Lê belê ez wek ferd û wek çavkaniya jê hatibûm Kurd û civaka Kurd bi teoriyên heyîn çareser nedibû û her çend ji bo vê yekê min xwe pir ceriband jî min nikarîbû ji kêmasî û çewtiyan xilas bibim. Hînê di gavavêtina sala 1975 de min bi M. Xeyrî Dûrmûş re bi bangewaziyeke Zerduştwarî li ser emperyalîzm û mêtingeriyê dest bi beyankirina fikrên pêşnûmeyekê kir. Ew pêşnûmeya ku ez texmîn dikim hîn di dest de heye, ji girîngiya xwe hînê tiştek wenda nekiriye û welê radiweste. Niha jî weke ku heye mirov dikare bi kar bîne. Pêşnûmeyeke baş bû, ji fikrên mora xwe li şoreşgeriya demê xistibû pêk dihat; dikarîbû di şerê zêhniyetê yê Şoreşgerên Kurdistanê de alîkariyeke ciddî bike. Gerê min ên di çarçoveya vê pêşnûmeyê de balkêş bûn. Di Adara sala 1976 de min bi axaftina xwe ya li civîna Odeya Mîmarên Enqerê start da. Paşê min gera xwe bi Agirî, Bazîd, Qers-Dîgor, Dêrsim, Çewlik, Elezîz, Amed, Ûrfa, Dîlokê dewam kiribû û careke din min di meha Gulanê de li Enqerê bi dawî kiribû. Meşa min di 15 Gulanê de bi dawî bûbû û wek bersiva vê meşa min Hakî Karer di 18 Gulanê de ji aliyê komeke gumanbar bi navê 'Stêrka Sor' bi kompoloya Alaattîn Kapan hat şehîd xistin. Şehadeta Hakî Karer mîna aveke sar bi serê me de hatibû xwarê. Ev bûyerek welê bû rêveçûna dîrokê diguhert. Heye ku têkiliya koma gumanbar bi PDKê re jî, bi bermahiyên hin komên Tirkan û hin komên li ser navê dewletê radibûn re jî hebe. Ji lewra şerê me yê zêhniyetê pir bi lez berê xwe da komeke hedefên tevlîhev. Şerê me yê zêhniyetê pir zû ket wê xeterê ku bibe amûrê şerê maddî.

Dem li 1'ê Gulana Stenbolê ya li Mîtînga Karkeran a tê de bi komployekê 37 welatî hatin kuştin û sûîqesta li dijî Bulend Ecewîtî rast dihat. Di wê demê de dîmenekî xirab ê şerê navxweyî li Tirkiyê xuya dikir. Di wan şert û mercan de em gihîştin biryarê ku kom bi lez partîbûyînê pêk bîne. Wek erk û wezîfeyeke dilsoziyê bi bîranîna Hakî Karer re min di Payîza heman salê de li Dîlokê Pêşnûmeya Bernameyê amade kir. Ez car din vegeriyam Enqerê û dîsa ji wir bi zewaca seyr re di serê Havîna sala 1978 de bi balafirê firiyam Amedê. Rastir e ku mirov vê zewacê wek zêhniyeteke mezin, şerekî

polîtîk û hisî binirxîne. Kesayetiya Kesîre ya Elewî, Kurd û dewletbûyînê, şerê zêhniyetê yê ketibûm navê têra xwe sor dikir û tev dida. Wexta weke jin ket nav komê diviyabû pê gav bida avêtin û bi xwe re bida meşandin. Mîna aveke kûr û sekan bû, her ku ez pê de çûm min bandora wê ya bixeniqîne his kir. Du tiştê bihata kirin hebûn; yan ez bi tevahî jê dûr biketama, yan jî minê ew ji bandora wê ya xeniqandinê bikara. Dûrkirina wê ya ji komê rêyeke erzan bû û dihat maneya çîzkirin û teslîmbûyînê. Min zewac ji aliyekî ve ji bo selameta komê jê re pêşniyar kiribû û ji aliyê din ve jî min rast hewce pê dîtibû ku ya esas divê bi min re bikeve nav hesabdan û girtinê. Eşkere, ev têkiliyeke siyasî, hisî û zêhnî bû. Eger bûbûya sosyalîst gelek baş bû, îhtîmalek jî hebû wezîfedara dewletê derketa, wê wextê dor dora mejî bû û wê bihata dîtin kî kê bi kar tîne. Di vê mijarê de bi sînor be jî ez ji xwe piştrast bûm. Lê her çend şeklen be jî xurûr û heysiyeta min ranedikir ez jineke Kurd ji dewletê bihesibînim. Eger bûbûya jî min dikarîbû li ser jinekê bi dewletê re têkoşîn bida meşandin. Belkî vê têkoşînê her du alî nebirana şerekî giran, bibirana lihevkirin û aştiyê jî. Wisa hinek pêjna pêhesînê min hebûn.

Mijara elewîtiyê jî min bi sedema kevneşopiya xwe ya sunnîtiyê pir ciddî nedidît û yek ji sedemên sorkirin û tehrîkê nirxand. Ez difikirîm ku ezê bi vê rê alîkariya bihevrebûna Kurdên Sunnî û Elewî bikim. Di serhildana Dêrsimê de malbata wê di nav refên Kemalîstan de cih girtibû û hînê jî bi kevneşopên wê CHPiyên sosyal demokrat re dimeşiyan, min ev yek jî wek firsendekê dît. Sosyal demokratî dikarîbû bûbûya deriyekî li aştî û lihevkirinê vebibûya. Lê wê pişt re bihata fêmkirin ku sosyal demokratiya CHPê çawa cîlayeke dewletê ye, sosyal demokratî û çepgiriya Kesîre jî cîla heman karekterê bi der dida. Di vî şerê mezin ê zêhniyetê yê deh salan de bi Kurdîtî, Elewîtî û dewletparêziya çepgir a jinikê re lihev nehat kirin. Min helwesta rêxistinê ji bo kuştina wê rast nedît. Çi seyr e, bi alîkariya îstixbarata Yewnanistanê hat revandin ku heman îstîxbaratê bi awayekî rezîlane di revandina min de jî cih girt. Ji vê bûyera di sala 1987 de qewimî pêve, careke din xuya nekir.

Hin kesên rezîl ên di nava rêxistinê û li derveyî rêxistinê de ji ber vê têkiliyê bêbextiyên mezin li şexsê min kirin, guman û fesadî derbarê min de belav kirin. Ya rastîn, di jiyana min de vê têkiliyê sebir û hewldaneke awarte dixwest, belkî jî ji bo mirovê Kurd ê azad, nemaze di rengwergirtina jina azad de ev şerekî mezin ê zêhniyetê, şerekî azadî, welatparêzî û şerê evînê bû.

Pirsek divê were kirin ev e, gelo çiqas rast e mirov şerên zêhniyetê bi van sorkirin û tehrîkên polîtîk û heta şîdetê ve bike. Di xwezaya siyaseta tehekumkar de cihê pirsên bi vî rengî nînin. Nexweşiya siyasî ya bi vî rengî xuya bû me jî hêdî hêdî jê vedigirt û em bi şewba wê diketin.

Duyemîn pêngava min a mezin a zêhniyetê, nirxandina min a bi navê 'Manîfestoya Şoreşa Kurdistanê' bû. Min ev nirxandin bi xwe, bi destnivîskî di Tîrmeha sala 1978 de li Amedê kir. Ji bo hin tiştan rohnî bike û belkî jî seyr be divê ez bibêjim ku ev nirxandin di nav şerê belaya 'zewacê' de hat nivîsandin. Tê gotin, di wê demê de Mehmed Xêyrî Dûrmûş û Cemîl Bayik (hevalekî din jî dibe ku Kemal Pîr be) têne mala ez lê dimînim û wexta têkiliya me ya heyî dibînin pir hêrs dibin û dibêjin; "Ev jin çawa dikare bi serokê - ev sifet hînê hêdî hêdî çêdibe - me re welê bide û bistîne? Werin, bêyî haya vî hevalî jê hebe em wê wenda bikin û heval ji vê belayê xilas bikin." Kemal Pîr ku her tim meznahiya xwe dizanîbû, li hemberî vê helwestê jî têra xwe têgihîştiye. Dibêje; "Xuya ye tiştekî heval dizane heye, em tevlî vê rewşê nebin." Lê wexta li zindana Amedê di rojiya mirinê de ye, weke wesiyetekê dibêje; "Divê partî di vî warî de pir bi dîqet be û ji bîr neke." Manîfesto ya damezrandina partiyê ye ku îlankirina wê tê fikirîn. Rojnameya bi navê 'Serxwebûnê' ku weşandina wê hatibû plankirin, manînfesto wek yekemîn hejmara xwe belav kir. Em dema ji bo manîfestoyê vedigerin li pişt xwe dinerin, em dibînin lûtkeya civînên sala 1973, dîrektîfên 1975 û axaftinên 1977an e, û şêweyekî wan ê herî bi serhevhatî ne. Eşkere Manîfestoya Komînîst bi bîr dixîne. Ji naveroka wê diyar e, ne tenê gelê Kurd, hewl dide bang li hemû civakên Rojhilata Navîn bike. Naverok û uslûba wê ji netewparêztiyê wêdetir nêzî azadiya civakî ye. Netewîtiyeke bêyî azadî nayê qebûlkirin û azadiyeke rengê wê yê netewî jî nebe nayê fikirîn. Bi leza ji manîfestoyê dihat wergirtin êdî partîbûyîn şert bû. Tenê hin mijarên teknîkî mîna nav û wê bi kê dest pê bike hebûn ku ew jî ewqas girîng nebûn.

Li gorî wê demê avakirina partiyê bûbû meseleyek şerefê û heysiyetê. Li naverastê derfet û îmkanên yekser bibin bersiv nebûn. Lê di her gavavêtinê de bêşerefiyeke mezin li her deverê diyar dibû. Min li ku bineriya rezîlî û bêşerefiyê xwe dida hiskirin. Mîna ku her tişt li îxanetê hatibe qewimandin. Çiya-deşt, gund-bajar, dîrok-îro, ferd-civak, dewlet-welatî, jin-mêr, zarok-dêûbav, rê-rêwî bi kurtî her dualîte bi awayekî kor û xayînane dinerî. Ji sedî sed diviyabû hin tişt bihata kirin. Belkî jî partiyê maneyek bidiya van dualîteyan wê

karîbûya wan bixe rêya çareseriyê. Partiya hatibû avakirin di maneyeke teng de nebû û ji partiyê wêdetir şêwazekî nû yê jiyanê bû. Veguherîna nasnameyê dihat ferzkirin. Bi dîrok û welat re, bi hemdemiyê re lihevnekirin bi ti sedeman rave nedibû. Sedem û qelsiyên me çi dibûn bila bûbûna destwerdana li rewşa heyî şert bû. Di vê rewşê de partîbûyîn mîna çalakiyeke întîharî bû. Lê ev întîharek bi zanebûn a ferd nebû, ji bo jiyaneke bi şeref a bi qasî serê derziyê li dijî civakê nerazîbûn bû ku êdî jiyan tê de nedibû, ji lewra mîna çalakiyeke xilaskirina namûsê bû. Şêwazê partîbûyîna me bi awayekî xweser şêweyekî din ê çalakiya xilaskirina namûsê bû. Pir zehmet e, mirov vê çalakiyê bi berjewendiyên çînî û netewî, etnîk, dînî û malbatî yên diketin rojevê rave bike. Hêmana bingehîn ew bû ku hin mirovên ji gel bi zor û zehmetî xwe perwerde kiribûn û ev çalakiya wan bû, bawer dikim îzahek bi vî rengî hînê nêzî rastiyê ye. Eger mirov bişibîne Narodnîkên Rûsan ên di dîrokê de wê hînê baştir were fêmkirin. Em wexta li bandora wê dinerin, em dikarin bibêjin rola partiyê lîstiye. Ji bûyeran diyare bersiva pêdiviya bi şerefê û giştî daye.

Xebatên me yên zêhniyetê ku me di serê salên 1980 de da destpêkirin hinekî din nêzî çareserkirina têkiliyên siyasetê û zorê ye. Axaftinên di warê Li Kurdistanê Rola Zorê, Eniya Rizgariya Netewî, Li Ser Rêxistinbûyîn û Pirsgirêka Kesayetiyê de zêdetir ji bo çareserkirinê berçav bûn. Ji ezmûnên Îsraîl-Filîstînê û Rojhilata Navîn bi tesîr bibûn. Xebatên bi salan derbarê zêhniyetê de hatin meşandin bi zehmetî beşekî bi sînor ê ciwanan hişyar kirin. Piştî ku di warê eskerî-polîtîk de gav hatin avêtin, civak bi giştî û ji binî ve hejiya. Partîbûyîneke rastîn dikarîbû bi van gavavîtinan ruşta xwe ispat bikirana. Naxwe mîna bi nexweşiyeke zarokatiyê wê bimira. Piştî ku berxwedana li zindanê û xebatên li Rojhilata Navîn gihîştin hevdu êdî pêngava gerîlla xwe ferz dikir. Ti gava neyînî nikarîbû vê pêngavê asteng bikira. Dewletê jî bi awayekî topyekûn înkar û tepisandin dewam dikir. Her du rastiyan jî ji sedî sed hevdu nas nedikirin û di wê pozîsyonê de bûn, hevdu qebûl nedikirin. Tewş bû, mirov li zemînekî lihevkirinê bigeriya. Helwestên balkêş ên Kesîre û parêzer Huseyîn Yildirim ku di wê demê de derketin holê, ez paşê li ser wan fikirîm gelo, bi dewletê re ti têkiliya wan hebû? Lê peydakirin û dîtina delîlekî piçûk ê bihata vê maneyê, zehmet bû. Jixwe hewldaneke bi vî rengî jî cesaret dixwest. Paşê helwestên Mehmed Şener û Selîm Çurukkaya jî heman guman li cem min

çêkirin. Lê her çend helwest hebûn jî, hêza wan ji ajaniyeke asayî wêdetir nebû. Ji lewra ez nedifikirîm wan zêde ciddî bigirim.

Nirxandina bingehîn a derbarê 15 Tebaxa sala 1984 de li ser çima pêkhatina pêngavê nîne, li ser şêwe û bêçapiya wê ye. Helwesteke afirîner a eskerî nehat nîşandan. Ji gerîlla pêve şibiya her tiştî. Timî hat pirsîn çima xeteke gerîlla rûnenişt. Pêdiviyên herî kêm ê partîbûyînê di gerîlla de nehatin nîşandan. Ez yeqîn dikim ku di vê yekê de du hêmanan rol lîstin. Ya yekemîn, kesayetiya bi serwextî û bawerî beşdarî şerê zêhniyetê û xebatên wê yê pratîk nebû û înada min a ji bo ez van kesayetên lawaz bi hewldanên awarte li ser piyan bigirim. Dixwestin mîna çepgirên Tirk bi kufîna barûdekê yekcar xwe bigihînin encamê. Lê me dixwest em wan bigihînin astekê karibin bijîn û serketinê bi dest bixin. Di vê navberê de hin hêmanên zû derketin pêş, valatiya di warê fermandariyê de pir bi lez ferq kirin û ji bo cihgirtina di vê valatiyê de dereng neman. Ev meyla ku pişt re wek çeteya çaran hat bi navkirin pêdiviyên partîbûyînê û heta pêdiviyên herî kêm ê civakîbûyîn nas nedikirin. Ji eşqiyatiyê jî wêdetir, texrîbatên ajanekî provakator ê herî jêhatî bi zanebûn bike jî zêdetir, van hêmanan pêk anîn. Rewşeke welê derket holê ku mîna bandorên lawaz ên partiyê û eşqîyatiya herêmî bigihîjin hevdu. Vê rewşê heta dawiya duyemîn pêngava partîbûyînê ya hat pûçkirin dewam kir.

Yekemîn pêngava partîbûyînê hînê di qonaxa zêhniyetê de Kesîre, Şahîn Donmez û yên wekî wan hewldan bê kêr bikin, duyemîn pêngavê jî mîna ku di destê çetebûyînê de can bide diperpitî. Her pêngava ji bo li dawî hîştina vê rewşê dihat fikirîn li dîwarên tund ê çetekokan diqelibî û diheliya. Li vê yekê, ne kêmasiya me wek serokatiyê, ne jî êrîşên hevkaran û dewletê rê vekir. Ya realîst ew e ku mirov bibêje; bandora çetebûyînê texmîn nehat kirin û li gorî wê jî tedbîr nehatin stendin. Serketin ne ya serokatiyê, ne jî ya dewletê bû, serketin a çeteyan bû. Jixwe rewşa cerdevanên (parêzvanên gundan ên dewletê bi peran wezîfedar kirine) li cem dewletê û serekên çeteyan ku piranî îtîrafkarin, vê rastiyê baş rave dike. Ev sîleha dewletê pir dûvê wê girt, paşê bandora wê ya mîna bûmerangê derket holê. Êdî bûmerang li wê vedigeriya. Ev yekê di demên pêş de bihata fêmkirin. Çawa ku serekên çeteyên mezin ên eşîrên li Başûrê Kurdistanê di serê salên 1990 de wek dewleteke federe derketin pêşberî wan, li Bakur jî serekên hevkaran û cerdevanên gundan û terîqetan ji aliyê siyasî û

heta eskerî bi giraniyekê derketin pêşberî dewletê ku êdî bi hêsayî kes nikarîbû bi ser wan de biçûya.

Wek naverok saziya serokatiyê di vê demê de têra xwe rol lîstiye. Ji pirsgirêkên xetê yên eskerî, siyasî û îdeolojîk heta di perwerdeya bingehîn a kadro, têkiliyên bi girseyê re, lojîstîk û hewldanên bi sîlehkirinê de rola xwe lîstiye. Belkî jî di warê cihguhertinê de were rexnekirin. Lê wexta di vê de jî ji bo demeke dirêj tevgerek di nav ewlekariyê de li ber çav were girtin, rexne hêza xwe wenda dike. Tevî ku îmkan û derfet baş hatibûn amadekirin, serokatiya pratîk a xetê di warê eskerî û û siyasî de rola xwe nelîst û nuqteya divê pir li ser were sekinandin ev e. Ji bo serketinê her tişt di dest de hebû. Ji sîlehê heta peran, ji baregehan heta têkiliyên bi der ve re, ji têkiliyên gel heta bi dewletan re, ji her cure namzetên şer û kadro gelek endamên eskerî û kadro hatin perwerdekirin û eger derfet û îmkanên eskerî û siyasî di destê rêveberiyeke durust de bihata hûnandin dibû ku rêveçûna bûyeran pir cuda bibûya. Belkî me xwe negîhanda îqtîdareke dewletê. Jixwe di vî warî de armancek welê hatibû plankirin jî nebû. Tevî vê yekê pir bi hêsanî me dikarî xwe bigîhanda çareseriyeke demokratîk. Hem jî alî bêyî ku evqas wendahî bidana û êş bikişandana dikarîbûn bigihîştina vê encamê. Di negihîştina encamê de çetebûyîna di nav PKKê de û li der ve jî di nav dewletê de û di vê yekê de xwedî derneketina Navenda PKKê li berpirsiyarên xwe rol lîstine. Eşkere ye, PKK û dewlet jî bi ser neketine û berovajî pir tişt wenda kirine. Tevî vê yekê, tebeqeya jor a feodalên Kurd û hevkar mîna ku di tevahiya dîrokê de vê carê jî zanîbûne bi qurnazî û bincilkirî berjewendiyên xwe baş bimeşînin.

Lîdertiya kevneşopî ya eşîrtiya li Başûrê Kurdistanê di dema herî nazik a şerê Tirkiyê bi PKKê re di berdêla berjewendiyên xwe yên girîng de cesaretî îxaneta herî mezin kir. Ev îxanet wexta bi ya li zindanan û di nav şer de were rûbirûkirin, hînê zêdetir bi qurnazî, bi pîlan û veşartî hatiye meşandin û teşwîq kiriye ku Tirkiyê zêdetir xwe li polîtîkayên çeteyan ba bide. Şêweyên avahiyên siyasî yên Tirkiyê jixwe li gorî çetebûyînê ne, wexta tengavbûna artêşê jî li vê zêde bû, destpêka rêya îro diçe Dewleta Kurd a Federe vebû. Bêguman rêveberiya Tirkiyê li benda vê encamê nebû, wek têkiliyeke taktîkî dinirxand û bawer dikir ku bi tasfiyekirina PKKê re wê biqede. Her weha ji sînorên rastîn ên polîtîka DYE ya Iraqê bê xeber bû. Lîdertiya Kurd a hevkar di armancên xwe de hînê serwext û bi plan bû. Ev yek hem di têkiliyên xwe yên bi KT re û hem jî bi PKKê re bi hostatî pêk dianî. Di pratîkê de yên xwedî helwestên

sivik û seresere rêveberên fermandêr ên KT û PKKê bûn. Eger ev pêvajo dorfireh were nirxandin wê gelek rastiyan derbixîne holê. Nexasim di nava dewleta Tirk de rohnîkirina nakokî û têkiliyên di navbera têgihîştina dewleta çetekar û têgihîştina dewleta klasîk de pir girîng in. Ne tenê PKK, di nav dewletê de jî kîjan siyasetvan û saziyan zirarên rastîn dane, divê were zanîn. Her weha divê were zanîn ên ji rêzikên şoreşger ên komarê qutbûyî bi navê senteza Tirk-Îslamî çawa ber bi avakirineke din a dewletê ve çûn; di vê de rola şerê li Kurdistanê çi bû û bi rêya eşîrtiya Kurd, cerdevanî û derdorên terîqetan ên dîndar feodal çawa dijberiya Komarê kirin û çawa rê li ber bûyerên wek Dewleta Kurd a Federe vekirin, divê baş were fêmkirin.

Di gihîştina vê qonaxê de girîng e ku para bûyerên navdewletî jî baş werin dîtin. Bêyî van bûyeran, bi qewimînên di nav PKKê û KT de rewş nayê ravekirin. Di sala 1990 de jihevketina Sowyetê, lîdertiya Clinton û globalîzmê bandora wan sererast, an jî ne sererast li ser Rojhilata Navîn, Tirkiye û Kurdistanê bûne. Jihevketina Sowyetê biryardariya Sûriyê qels kiriye û rê li ber derketina tê zanîn vekiriye. Destekdayîna dîplomatîk lawaz bûye. Ji desteka berfireh a muhtemel bibe bêpar maye. Globalîzm, bi zexta guhertinê ya li ser Rojhilata Navîn dike, dibe sedem ku em neçar pêşiya xwe bibînin. Naxwe di serî de Iraq emê li gelek welatan rêveçûna bûyeran nikaribin texmîn bikin. Ewê bi paradigmaya kevin pêşiya xwe nedîtin û muhafezekariyê bibe. Her weha diviyabû texmîn bihata kirin ku bi hatina Clinton wê li hemberî herêmê taktîkên cuda bêne nîşandan. Eger polîtîkayên DYE li herêmê, Tirkiye û Kurdistanê bi kûrahî bihata fêmkirin, belkî jî rewşa piştî derketina ji Sûriyê neqewimîbûya. Nirxandinên seresere û derengmayî dibe sedem ku mirov di dema xwe de tevnegere û însiyatîfê ji destê xwe birevîne.

Ji ber ku di dema xwe de guhertinên teorîk-paradigmatîk nehatin kirin, di ketina rewşa heyî ya xetimandî de bi tesîr bû. Di çaryeka sedsala 20. de rewşa çepgiriyê, tevgerên çandî, femînîzm û gavavêtinên ekolojîk baş nehatin şopandin. Her weha girîngiya civaka sivîl û têkoşîna ji bo mafê mirovan bi kûrahî û têra xwe nehat fêmkirin. Taktîk û stratejî, rêxistinbûyîn û bernameya PKKê pir zêde di bin bandora ekolên rizgariya netewî û sosyalîzma reel de bû. Ji lewra guhertinên di kongreyan de dihatin kirin ji taktîkê wêdetir nedibûn. Di çarçoveya dunyayê de paradigmayên bingehîn neguherîbûn. Her çend analîzên hûrûkûr dihatin kirin jî ji ber tinebûna paradigmaya bingehîn, rê nedida guhertinên bi kok û ji binî

ve. Ji bo pêşketinên civakî nêzîkbûn hînê jî şematîk bû. Zêhniyeta dogmatîk di nertina li xweza û civakê bi tesîr bû. Zêhniyeta serdema navîn li dawiyê hatibû hîştin, lê şematîkbûyîna sosyalîzma reel jî di nêzîkbûna civak û xwezayê de rê li ber teoriyeke hilberîner venedikir. Helwesta qalibwarî di warê guhertin û veguherînê de li pêşiya dîtina dunya dewlemend a bûyeran perde çêdikir. Ya hînê girîngtir kesayeta zêde eskerî û polîtîk ji aliyekî pêve nikare bibîne. Aliyê hiyarerşîk li ser têkiliyan dihat ferzkirin. Nexweşiya îqtîdarê mîna şewbê pir bi lez belav dibû. Şoreş ji bo azadiya gelan bû, ji bo wekheviya wan bû, ji bo vê jî demokratîkbûyîn rawestgeheke îcbarî bû, lê ev di plana duyemîn de ma bû. Helwesta eskerî-polîtîk di hemû têkiliyan de diyarker bûbû. Tevgerên bi vî rengî di rewşên eskerî de dibe ku maneyek wan hebe, lê wexta ev tevger li ser hemû gel were nîşandan jixwe dibe yek ji nexweşiyên bingehîn a sosyalîzma reel.

Eleqe ji bo helwestên nû yên teorîk û guhertina paradigmayê jî nedihat nîşandan. Belkî jî tirs ji îhtimala çewtîbûna dîtinan û encamên wan hebû. Lê jihevketina Sowyetê jinûve nirxandina sosyalîzmê ferz dikir. Her çend ji bo pirsgirêkên hawîrdorê û jinê eleqe zêde bûbû jî kûrahiya hewce ya teorîk bi sînor bû. Helwesteke hîn rastir ji bo etnîsîteyê, şikandina ekolên çînên teng û ekonomîst, dibû ku rê ji bo perspektîfeke demokratîk û komîn a dewlemend vekira. Her çend di nav demê de eleqeyên pêwendîdar hatibin nîşandan jî ji bo rewşa xetimî li dawiyê bihêle xwedî kûrahî nebû. Ya rastîn PKKê bi paradigmaya sala 1970 hatibû xwe spartibû deriyê sala 2000. Her çiqas bi tevahî belav nebûbû jî fonksiyona xwe bi giranî wenda kiribû.

Di ti pêşketinên bûyeran de her tişt bi awayekî neyînî nayê nirxandin. Dîroka PKKê di heman demê de dîroka Kurd û Kurdistanê û dîroka guhertin û veguherînên mezin ên civaka wê bû. Mirov dikare bibêje; di çaryekê dawî yê sedsala 20. de mora PKKê li Kurdistanê hatiye xistin. Veguherînên wê yên zêhniyetê, serûbinkirina wê bûn malê dîrokê.

Tevî hemû texrîbatên mezin hebûna wê ya rêxistinî bi giranî dewam dike. Li hundurê welat û li der ve, li hemû parçeyên Kurdistanê potansiyela wê ya rêxistiniyê heye, ji bo vê jî zemîn, lojîstîk, îmkan, kadro, gelek kom, sazî û dezgehîn sivîl hene. Her weha li derveyî welat û metrepolên cîran bi mîlyonan girseyeke gel a sempatîzan heye. Li cem jinê rêxistinî û hişyarbûneke mezin heye. Mîna ku li dora jinê dunyayeke nû hiltê û ava dibe. Helwestên

paradigmatîk û teoriya nû, hêmanên wê yên bingehîn bi azadiya jinê dibin. Rewşa ciwanan jî ji ya jinê cuda nîne. Ciwantiya ji eleqe û germatiya xwe tiştek wenda nekiriye, şopgerekî bi biryar ê îdeala civaka azad e. Ciwantî divê slogana "Yan jiyaneke azad yan jî hîç" mîna alekê ti car ji destê xwe nexîne. Partîbûyîn bi tevahî têk neçûye. Bi tecrûbeya xwe ya mezin, bi hezaran kadroyên xwe, bi deh hezaran sempatîzan û bi sed hezaran girseya xwe, bi şêwe û cewherê li cih bibîne bi hêsayî dikare xwe ji nû ve ava bike. Hêzên gerîlla tevî wendahî û têgihîştina çetebûyînê ya hîç heq nekiribû, li navenda Kurdistanê û li hemû baregehên stratejîk tevî hezaran kesî hebûna xwe dewam dike. Kengî xwe ji nexweşiyên giran ên berê pak bike, bi tecrubeyên mezin ên bi dest xistine û bi bernameyeke rastir a polîtîk a hedef ji bo serketinê daniye ji her demê zêdetir amade ye. Tevî hemû dorgirtina li dijî xwe PKK li her quncika dunyayê çeperên xwe yên dostane û tevna xwe ya têkiliyan diparêze û dewam dike. Bi hezaran şehîdên wê yên qehreman li benda hevalên xwe ne ji bo karibin wan bi zêhniyet û pratîkeke rast temsîl bikin.

Bi kurtî û cewherî mirov dikare bibêje; mirov ti car ji hewldan û xebatên ji bo azadiyê poşman nabe. Tenê ji ber wendahiyên bêmane, rikeberiyeke çavê wê kor, wezîfeyên di dem û cihê xwe de pêk nehatine mirov dikare êşê bikişîne. Êş û keser jî ji bo kesên nirxê wê bizanibin her tim bûne mamosteyên baş. Vê carê jî wê ji mamosteyê herî baş dersên qencî, rastî û bedewtiyê bi ked û heq bihata hînbûn.

B- Li ser navê PKK'ê rexne-rexne lixwegirtin

Di dîrokê de zanyar û peyxember dibêjin, şerê herî mezin ê mirov bi nefsa xwe re dike. Zanyar Kalanos ku ji Hîndîstanê bi riza xwe tê cem Îskenderê Mezin beriya şahiyekê dixwaze xwe bişewitîne û tevî ku pir li ber didin ji çalakiya xwe nayê xwarê û li ser vê yekê Îskender weha dibêje; "Wî ji min mezintir gelek hevrikên xwe têkbirine." Îskender di dîrokê de şervanê herî mezin e. Ew bi xwe jî dizane şervantiya zanyaran ji ya wî mezintir xwedî mane ye. Hz. Mûhammed jî şerê di navbera artêşan de wek cîhada suxra=şerê piçûk bi nav dike û şerê mirov bi xwe re jî dike, bi maneya şerê zêhniyetê wek cîhada ekber=şerê mezin bi nav dike. Hz. Mûhammed jî van gotinan di heman maneyê de bi kar tîne. Rexne lixwegirtineke rastîn a veguherîner û têkûz ji bo ferd tê maneya şerekî mezin. Rexne lixwegirtin şerek e, mirov li dijî kêmasî, şaşî û lawaziyên xwe dide meşandin. Eger em bi îfadeyeke ilmî bibêjin; mejiyê analîtîk hewl dide şopên ajoyî (xerîzeyê) yên mejiyê hisî li dawiyê bihêle û mejiyê hisî bîne ser rêya mejiyê analîtîk, rast destnîşan kiriye. Jixwe

pêşketina mejî ya em behs dikin jî ev bi xwe ye. Cudahiya di navbera heywan û însên de jî bi pêşketina mejiyê analîtîk ê di şêwazê zanyariyê de pêk tê.

Bêguman em nikarin nasnameya Kurd ji nasnameyên civakên giştî yên mirovên din pir cuda bi nav bikin. Tarîfên giştî yên serdeman ji bo nasnameyên her komên civakan wekhevdu ne. Aliyên xweser wê hebin, lê wekî din bi giranî dişibin hevdu. Xweseriya nasnameya Kurd bi rengwergirtina dîrokî û civakî diyar dibe. Min giraniya parêznameya xwe ji bo vê tarîfa xweser veqetandiye. Tepisandineke dijwar, rengwergirtineke di bin bandora hêzên tehekumkar de bi piranî azadî û xweserî seqet kiriye. Ji marjînalbûnê zêdetir seqet e, şibiyaye tîpeke patolojîk (bi nexweşî) a civakê. Me bi analîzên kesayetiyê hewl da van taybetiyên patolojîk tespît bikin. Ji bo em kesayetiyê ji van taybetiyên nexweş bikin, me gelek perwerde û tedbîrên mezin pêş xistin. Di vê maneyê de PKK berovajî texmînan normalîzasyoneke rast a mirovê hemdem - ji bo Kurd bigihîje rewşa mirovê hemdem - îfade dike. Di vî warî de çiqas bi ser ket neket cihê guftûgoyê ye. Lê nayê înkarkirin ku yek ji maneyên naveroka wê ya civakî ev e.

Eger veguherîna di PKKê de pir bi êş be, hêmana bingehîn zemînê civakî ye ku dixwaze xwe bispêrê. Eger avahiya rêxistinê xwedî taybetiyên demokratîk be, ji zemînê civakî gelek hêman dikarin bikevin nav rêxistinê û li ser ferdê nû pêk tê, bandorê bikin û dibe ku wî bikin destikekî xwe. Di vê rewşê de eger bandorên civakê hîç nebin wê kesayetê bê xem bibe û rêxistinê ji civakê îzole bibe, yan jî rêxistin bibe nîşane û rûyekî civakê, wê wextê rêxistinê nexweş bibe û ti cudahiya xwe ji civakê nemîne. Ya bi mêzîn û tê xwestin jî ew e ku hêmanên ji zemînê civakî tên divê bi bandora rêxistinê ya şoreşger-veguherîner bêne sentezkirin û bi awayekî dewlemend bi avahiyeke jor bêne tacîdarkirin. Pêşketina diyalektîk a navbera rêxistina şoreşger û civaka dixwaze biguherîne di vê çarçoveyê de pêk tê.

Fikra rexnekirinê bi fonksiyona pêşketinê ya diyalektîk ve têkildar e. Li gorî şêwazê xebatê diyalektîk ê neçê derdixîne holê û jê dibe. Herikîna li gorî xwezayê û pêşketinê di cihoka wê de li cih û esas dibîne. Fikra xwerexnekirin û rexne lixwegirtinê jî kirdarê pêşketinê - yê-a aktîfbûnê pêk tîne - têkildar dike. Divê kirdar çawa be, li gorî armancê be û çawa bikeve pêvajoyê. Yanî şêwazê fikrê yê bi ser nakeve, pêşnûme, helwest û tevgerên li gorî pêşketina diyalektîkî nînin bi dawî dike û kirdar dikişîne raman û pratîka rast.

Pir zehmet e mirov bibêje, PKKê normalîzasyon pêk anî û tê de tam bi ser ket. Berovajî di nirxandinan de jî hat dîtin ku ne tenê ketiye nav şaşî û kêmasiyên girîng, li hundur û der ve bûye mijara îxanetên mezin. Eger rexne kiribin û rexne li xwe girtibin û encama li bendê bi dest nexistibin, wê wextê 'şerê nefsê' yê zanyaran îşaret pêkirine ji dil nehatiye kirin. Yan jî dîsa mîna zanyaran gotiye 'ji bo zewahîr, ya xuya dike bide rizgarkirin' bi zanebûn an jî bi nezanî hawîrdorên xwe xapandine. Ev jî kirdarê pêwendîdar hîn dixe zehmetiyê. Dixe rewşa gunehkar, durû, derewker û munafiq. Wê wextê ne tenê rexne-xwerexnekirin, rewşa guneh û li gorî wê tedbîr dikevin rojevê. Di nav van tedbîran de mikurhatin, teşhîr û tecrîd, xistina girtîgehê, şandina gelek kar û suxreyan mumkîn e pêk werin. Heta xwe gîhandina armancê wê helwestên sererastker dewam bikin. Eger rêxistin vê yekê neke wê bi cewherê xwe re li hev neke, ewê li armanc û pratîka xwe bêhurmetî bike. Eger hînê pêş de biçe wê bikeve nav îxanetê. Rewşa îxanetê jî ji bo kesekî-ê li hemberî civaka jê yan jî rêxistina jê, rewşa herî xirab û xeter e. Eger israra di îxanetê de bi revê bi dawî nebe, tê maneya şerekî eşkere, ew jî tê maneya mirin, yan jî kuştina fikrî û fizîkî.

Piştî ku me rastiya rexne-xwerexnekirinê welê tarîf kir, em dikarin li PKKê bipîvin û em dikarin bigihîjin hin encamên girîng ên dîrokî. Ji serî ve divê em bibêjin, rêxistin an jî kesên ji bo rexne-xwerexnekirineke têkûz cesaret kiribin, ne ku qelsiyê, berovajî, bi hêzbûnê îfade dikin. Rêxistin û kesên ji xwe piştrast nînin, ji rexne-xwerexnekirinê direvin. Ji bo wan rexne hilweşandine. Rexne lixwegirtin qedandine. Rexne-xwerexnekirin ji bo kesên ji xwe piştrast di çarçoveya armancan de serketinê îfade dike. Xwe ji kelemên li pêşiya serketinê asteng in dike, bi gavên xurt û ji xwe piştrast ber bi armancê ve diçe. Mijarên rexne-xwerexnekirinê yên min li ser navê PKKê pirî caran nirxandine û mijarên di plana duyemîn de heta hewce nebînim ezê behs nekim. Ji ber ku ez ravekirina mijarên bingehîn diyarker dibînim, ezê tenê giraniya xwe bidim ser çend dabaşan:

1- Beriya her tiştî divê mirov bi têgîna partiyê dest pê bike. Partiyên hemdem zêdetir di sedsala 19. û 20. de bi civaka kapîtalîst re derketin holê. Xwe dispêrên kategorî û çînên wê yên civakî. Di serî de wek çîn dualîteya bûrjûwa-karker esas dibînin. Di navberê de jî mirov dikare behsa gelek partiyên 'bûrjûwa piçûk' bike. Di armanca van hemû partiyan de xwe gîhandina dewletê hedefa bingehîn e. Çi bi rêbazên şoreşgerane be, çi jî bi rêya hilbijartinê be,

her partî xwe gîhandin û cih girtina di nav dewletê de - di serî de parlement û hukûmet - wek serketinê dinirxîne. Ev dewlet çi dewleteke avakirî be, çi jî dewleteke avakirina wê hedef hatibe danîn, ji bo hemûyan jî heman tişt e. Dewletbûyîn; wek mezinbûn, xwedîbûyîna li nîmet û motora pêşketinê tê dîtin. Her weha ev tarîf bêyî cudahî ji bo hemû çînan werê ye.

Dikare were gotin ku di armanca damezrandina PKKê de meyla dewletbûyînê heye. Pir eşkere nebe jî hemû hêviyên wê bi dewletbûyînê, yan jî li gorî xwe bi avakirina dewleteke nû ve girêdayî bûn û ev faraziyeke bingehîn bû. Li gorî analîza dawî, hemû xebat, aliyên îdeolojîk, polîtîk, eskerî, rêxistinî û propangadayî bi armanc û xwe gîhandina dewletê têne kirin. Her çend bi awayekî teorîk behsa civakeke komînîst a bê kedxwarî û çînî were kirin jî ji bo xwe gîhandina vê armancê jî demeke dirêj hebûna dewletê ya bi navê 'dîktatoriya proleterya' wek faraziyeke pêşin tê qebûlkirin. Ji lewra armanca dewletbûyînê çawa tevahiya sedsalê bûye hedefa hemû partiyan, wek hêmanekî sereke PKKê jî girê dide. Dîsa wek hemû partiyan PKK jî eleqeya xwe ya dewletê û xwesteka xwe gîhandina îrade û temsîla wê hebû û ev mijareke înkara wê zehmet e. Lê ji bo vê armancê çiqas bi zanebûn û hostatî tevgeriya cihê guftûgoyê ye. Xwe gîhandin û negîhandina wê jî dikare were nirxandin. Dîsa di dualîteya dewletê ya proleter-bûrjûwa de mirov dikare binirxîne PKK hînê nêzî kîjanê bû yan jî nebû. Lê rast nîne ku mirov bibêje hîç niyeta PKKê ya navend dewletbûnê nebû. Her weha ji dewletbûyînê meram Kurd ku an jî neteweyekî din nîne, navê welatekî cewherê mijarê û rastiyê naguherîne. Ya girîng ew e, dewlet navendiyê esas dibîne, yan na. Ji ber ku bi îhtîmaleke mezin navend dibîne, dewletbûyîn mora xwe li hemû pratîk û armancên wê yên jêrîn dixîne û ji lewra pir normal e kesayetî, rêxistin û şêwazê xebatê jî di heman çarçoveyê de be. Ji ber ku navenda eleqeya teoriyê siyaset û dewlet e, mijara bingehîn a helwesta taktîk û stratejîk jî wê bi destxistina dewletê be û her weha di demeke kin, an jî dirêj de ji bo xwe gîhandina wê bi çeperkirina çînî, hilbijartina dost-mutefîkan, şêwazê çalakî û rêxistinê jî diyar bike. Hemû xebatên rojane, wê li gorî van hîmên taktîk, teorîk û stratejîk pêk werin.

Ji ber ku di sedsala 19. û 20. de hemû xebatên partî-enî di vê çarçoveyê de hatine kirin, ev faraziya me jî piştrast dikin. Pirsa bingehîn a were kirin ew e, ku şêwazê partîbûyînê yê bi vî rengî digihîje armanca xwe, yan na. Partiyên li ser navê her netew û çînî hatine damezrandin ji wan re hinek dewletbûyîn û têra xwe dema

îqtîdarê tê naskirin, ji lewra negihîştine armanca xwe. Ji bo tespîtkirina vê rastiyê hewceyî zêde bi delîlan nîne. Pir eşkere, sedsala 19. û 20. bûn sedsalên şer, zulm, bêedaletî û hilweşînê. Bombeya atomê li ser stûyê ben-î adem hat ferzkirin. Her cure asîmîlasyon, komkujî û zordestî hatiye ceribandin. Encam, di serê sala 2000 de şaristaniyeke bêdad, bi şer, ji azadiyê bêpar, neqebeke mezin di navbera xizan û dewlemendan de, qirêjiya hawîrdorê, cinsiyetparêziya civakî dewam kir. Partiyên proleterya yên ji bo armancên mezin hatin damezrandin herî kêm bi qasî partiyên bûrjûwa ji encaman berpirsiyar in. Tê zanîn, ezmûnên sosyalîzma reel ji ezmûnên bûrjûwaziya klasîk encamên paşvemayîtir derxistin holê. Di vê de jî pir bi awayekî xwezayî partiyên pêşeng ên komînîst berpirsiyar in.

Ji lewra partîbûyînên wek îrade navend dewlet bin, em nikarin wek sosyalîst bi nav bikin û li dijî îdeala wekhevî û azadiyê ye, pê re di nav nakokiyê de ye. Partiyên armanca dewletbûyînê li pêşiya xwe danîne, mirov nikare li bendê be, ew bigihîjin îdeala wekhevî û azadiyê. Berovajî, ji pratîkên pêkhatî diyar e, ku navber û neqeb hînê zêdetir fireh bûye. Ji bo mirov vê nakokiyê çareser bike, divê mirov ji îradeyek navend dewlet bigere. Yanî dewlet=bêazadîbûyîn e, dewlet=wekhevnebûne. Di çarçoveya vê tarîfê de wek prensîb divê partîbûyînek navend-dewlet li dawiyê were hîştin. Li ser navê dewletê damezrandina partiyê, yan jî ji bo dewletbûyînê damezrandina partiyê divê wek şaşiyeke bingehîn were dîtin, bi awayekî ji dil rexne lixwegirtin bibe û helwesta rast ew e ku ji partîbûyînên bi vî rengî dest were kişandin. Hem dewletbûyîn, hem jî îdeala azadî û wekheviyê bi hev re nameşin. Divê yek a din li dawiyê bihêle. Em bala xwe bidinê; ez behsa xirakirin û serûbinkirinê nakim. Têgîna 'li dawî hiştinê' li cem Engels hînê di dawiya sedsala 19. de bi têgîna 'vemirandina dewletê' ve girêdayî ye. Dewlet ji bo sosyalîzmê gulokeke agir e divê hêdî hêdî were vemirandin. Min ji vê re 'teoriya guloka berfê guloka agir' gotibû. Ev guloka berfê ya bi hezarsalan gindiriye û mîna aşîtê mezin bûye, wek sosyalîzmê yeksanî û azadiyê nayne, berovajî kesên xistine bin tehekuma xwe hînê zêdetir wekhev nekirine û azadiya wan kêm kiriye. Dewlet wek kevneşopiya civaka çînî û hiyarerşîk a berê, nabe ku wek amûrekî bidestxistina azadî û wekheviyê were hilbijartin.

Sosyalîzm û ji bo her cure îdeala wekhevî û azadiyê, tercîhkirina dewletê xetayeke mezin e. Em dema xwe ber kûrahî û binê dîrokê didin, em xetayên mezin dibînin. Xirîstiyantî bi xwe jî, piştî ku bi

qasî sê sed salî bi împaratoriya Romayê re şer kir û bû dewlet, ji îdealên wekhevî û azadiyê yên xizanan dûr ket. Ew bi xwe bû împaratoriyeke civakî ya çînî. Gelên koçber ên xwedî pozîsyona demokratîk û komîn, piştî ku bûn dewlet, pir bi lez ji statuya xwe ya azadî û wekheviyê dûr ketin. Civakên koçer ên Tirk, Ereb û Cermenên Mezin, wexta tebeqeya wan a jor bûye dewlet, avahiyên xwe yên berê yên komîn û demokratîk hêdî hêdî ji dest dane. Di dîrokê de bêhejmar mînakên welê yên bi vê şêwazê azadî û wekhevî ji dest derxistine, tijî ne. Eger were pirsîn wê wextê çima tercîha dewletê xurtir derdikeve, emê wek bersiv bibêjin; mijar bi cewherê wê yê îqtîdarê ve girêdayî ye.

2- Wê wextê divê em îqtîdarê çareser bikin. Îqtîdar çî ye? Îqtîdar saziya dewletê ya îcrayê ye. Dewleta demî ye. Li gorî demê bi tebeqe û çînan, etnîsîte, dîn û bi tebeqeyên jor ên qewman hundurê dewletê tê dagirtin. Çînên nû, etnîsîte, xanedan, mezheb û kategoriyên mîna netew ên komên rêxistinkirî di saziyên dewletê de serdest dibin. Têkilî, rêxistinî û çalakiyên van kategoriyan wek hêza tehekum û kedxwariyê derdikeve holê û ev yek dewletê destnîşan dike. Dewlet mîna ku îdeolojiyên dewletparêz îdîa dikin, ne xweda ye, ne jî siya wî, ne dayika pîroz ne jî bavê pîroz e, ne xweda-qral ne jî bi awayekî herî mezin tezahura aqil e. Di dîrokê de ji civakên çînî û hiyarerşîk ên seretayî ve hin kom bi derew û zorê berhemên zêde û berhemên din ên civakê yên bi hezar zehmetî diafirînin desteser dikin û navê vê çalakiyê dewlet e. Rêzik û saziyên ev xebat tê de têne kirin dewletê temsîl dikin. Ha îqtîdar jî çalakiya wan koman e, ku di çarçoveya van rêzik û saziyan de bi ya xwe dikin û fonksiyonel dibin.

Ji ber ku me di beşa civakan de tarîfa îqtîdarê bi dirêjî kiriye, emê di vir de kin bibirrin. Bi awayekî cewherî îqtîdar balkêş e, bi sedema ku xwedî awantaj e ji bo ji berhemên serhevdayî yên civakê sûd werbigire. Xwediyê îqtîdarê, xwediyê dewlemendiyên komkirî, xwediyê sazî û rêzikên wan dewlemendiyan zêde dike, xwediyê hêz û rêveberiya wê îfade dike. Bi gotinên xemilî û xweş, dibêje; ezê ji we re azadî û wekheviyê bînim, ezê we pêş de bibim. Bi zanebûn, an jî nezanî xwe, hawîrdora xwe û zemînê civaka xwe dispêrê dixapîne û serî lê digerîne. Îqtîdar ne dikarin şoreşê bikin û ne jî dikarin guhertinê pêk bînin. Bi îqtîdaran nirx û berhem têne desteserkirin û parvekirin. Her weha îqtîdar ne cihê hilberandinê, cihê qedandinê ye. Çi bi rêya bacê be, çi jî bi darê zorê be, ji civakê digire li ehlê xwe belav dike. Hilberandin û sermaye razandinên wê jî yanî talankikirina ekonomiya dewletê ye, ev jî ji bo wan rêyek e, ji bo

berhem û nirxan bi dest bixin; jê wêdetir jî tiştek nîne. Dikare were gotin ku kedkarekî mîna Lenîn siyasetvanê çînan çawa ev rastî nedît? Ji bo vê îzahên berfireh hewce dikin. Lê em pir bi kurtî bibêjin ku paradigmaya sedûpêncî sal a dîroka sosyalîzmê li ser hatina îqtîdarê hatibû avakirin. Ya Lenîn jî kir ew bû ku vê paradigmayê birêbirrî pêk bîne û ji bo vê yekê jî rê û rêbazan rast destnîşan bike. Her çend wî bi xwe jî gotibû; "bi demokrasiya herî pêşketî sosyalîzm pêk tê" ew bi xwe û partiya wî jî ji bo xwe gîhandina sosyalîzmê dîktatoriya proleteryayê wek rêya kin û bingehîn a xeta taktîk dîtin. Di şertên emperyalîzmê de wek têgihîştineke bingehîn bawer kiribûn ku bêyî partî-îqtîdarê li ser piyan sekin nabe. Lê dîrokê piştî heftê sal derbas bibe jî di dawiyê de nîşan da ku ev dîtin rast nîne.

Ev rastî nîşan nade ku Lenînîzm û Marksîzm bi her tiştên xwe şaş bûn. Tenê şaşîtiya tezên wan ên partî-îqtîdarê nîşan dide û ispat dibe ku bi van rêbazan xwe gîhandina sosyalîzmê nabe. Bêguman rewşa Marks û Engels bi teorîsyeniyê bi sînor e, ji ber vê jî mirov nikare di warê dewlet û îqtîdarê de rewşa wan tam texmîn bike. Lê anîne ziman ku hewce heye dewletê li dijî bûrjûwaziyê ji bo demeke kin wek amûrekî tehekumê bi kar bînin. Anarşîstên ne dewletparêz jî hene. Gelek utopyager hene. Demokrasiyên ne dewletparêz jî li gelek dever û deman hatine ceribandin. Gelek dewletên sosyalîst rexne kirine û anîne ziman ku divê berî gavekê vemirin. Sowyeta Rûsyayê bi mînakên welê yên dîrokî tijî ne. Wek encam mirov dikare bibêje; ji bo rizgarî, azadî û wekheviyê dewlet û îqtîdara dewletê wek hedef bi karanîn nagihîne armancê, berovajî dûr dixîne. Bi rastî girêdana bi van armancan û serketina wan tê xwestin, wek amûrên bingehîn ên têkoşînê di şûna partî koalîsyonan de divê modelên cuda yên siyasî werin hûnandin û wek teorîk û dîtineke paradigmatîk werin amadekirin. Ev xwedî girîngiyeke dîrokî ye ku dest jê nabe. Eger partiyên nû bersiva vê pirsê rast bidin dibe ku maneyek wan hebe.

Pirseke derbarê îqtîdarê de were kirin ev e: îqtîdar hêza xwe ji ku werdigire, çawa dikare ev çend nîmetan desteser bike û li evqas nirxan hukum bike? Ev pirsê me bibin çavkaniya îqtîdarê û wê nîşanî me bidin ku çavkaniya îqtîdarê hêz e. Ew jî bi şer xwe dibîne. Divê mirov baş bizanibe hêz ne ku di dewletê de bi şer xwe dibîne. Dewlet û îqtîdar wek amûrên ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakê pêk nayên. Divê mirov karibe saziyên gelemperiyê yên pirsgirêkan çareser dikin û hêza îqtîdar û dewletê ya tehekum û îstîsmarê ji hev bike, naxwe emê bikevin nav tevlîheviyê. Di roja me ya îro de ti çalakiya civakî nîne ku dewlet neketibe navê. Heta dewlet çiziriye

nava malbatê. Qonaxa kapîtalîzma global gihîştiyê, dewletê hem wek amûrekî herî zêde bi kar tîne, hem jî kiriye amûrekî bê kêr û ne hewce. Eger dewlet ketibe rewşke bê kêr nayê wê maneyê ku qels bûye. Berovajî, wê dawa xwe hilde û eger hewce bibîne wê di berdêla tawîzan de bandora xwe dewam bike. Ev rewşa îqtîdara dewletê wek totalîtarîzm tê bi navkirin. Belkî wek berê totalîtarîzmeke faşîst û versiyona wê ya sosyalîzma reel li dawiyê hatine hîştin. Lê dîsa jî dewlet totalîter in. Di roja me ya îro de dewleta ne totalîter nîne. Ev rewş bi erkên kapîtalîzmê, krîza tê re derbas dibe û bi alternatîfên wê yên ketine pêvajoyê re têkildar e.

Bi kurtî û cewherî, hêza ku dewletê ji roja damezrandinê xwe spartiyê hînê wek şer dewam dike. Şer hîmê îqtîdarê ye. Bi îqtîdarbûyînê, civak bi çanda şer di her astê de tê strand, reng didinê û li statukoyekê tê ragirtin. Îqtîdara dewletê wek diyarkerên sereke yên wê ji nedîtî ve tên bi îdealên wekhevî û azadiyê re li hev nake. Bi kiryarên xwe ji van îdealan re xizmetê nake. Bi kiryarên ters û berovajî dixwaze fonksiyona xwe dewam bike. Ji lewra partiyên ev amûr ji xwe re kiribin hedef niyeta wan baş be jî wexta bigihîjin dewletê îdealên wan yên azadî û wekheviyê têk diçin.

3- Ji ber vê yekê, eger partiyên doza azadî û wekheviyê dikin dixwazin têkûz bin, divê şêwazê civak û siyaseta ne navend dewlet bikin bername. Alternatîfê dewletê demokrasî ye. Heta niha dewlet bi alternatîfên li derveyî demokrasiyê hatiye pêşwazîkirin û lewma ev hemû rê têkçûne. Yeqîn wek tê kirin, demokrasî şêwazeyekî dewleta kapîtalîst nîne. Her weha ji bilî demokrasiyê ti rejîm dewletê bi sînor nake, di nav huqûqê de nagire, teng û piçûk nake. Hilweşandina dewletekê nayê wê maneyê ku çanda dewletê li dawiyê hatiye hîştin. Piştî wê yekser, an yek nû tê damezrandin an jî valatî ji aliyê hinên din ve tê dagirtin. Tenê demokrasî bi dewletê re qadê par ve dike, wê bi sînor dike û ji bo civakê qada azadiyê fireh dike. Dikare berhemên dewlet desteser dike kêm bike û bi vî awayî wê hinekî din nêzî wekheviyê bike. Em dema demokrasiyê tarîf bikin, em dikarin bibêjin, xwe rêvebirina civaka li derveyî dewletê ye. Demokrasî rêveberiya ku ne dewlet e, hêza civakan a rêveberiyê ye. Ji texmînan wêdetir, ji dema civaka mirov pêk hatiye heta îro însan ji dewletê zêdetir demokrasî jiyaye. Belkî bi giştî wek welatekî û neteweyekî demokrasî pêk nehatiye, lê şêwazê hebûna civakê pozîsyona komîn û demokratîk bûye. Bêyî komîntî û refleksa demokratîk civak bi serê xwe tenê nikare bi dewletê bimeşe. Ji ber ku dewlet wexta mezin dibe li dijî komîntî û demokrasiyê hukum

dike. Zemînê dewlet li ser mezin dibe û dijî, komîntiya civakê - bihevrebûn - û helwesta wê ya demokratîk e. Di navbera herduyan de tayekî diyalektîk heye. Hindikayiya yekê piraniya ya din e. Tam demokrasî bêdewletbûyînê îfade dike. Tam serweriya dewletê jî tinebûna demokrasiyê ye. Di vir de encama ku em dikarin derxînin ev e; demokrasî û dewlet bi têkiliya di navbera xwe de hevdu hilnaweşînin, yek a din li dawiyê dihêle.

Dewletê, tenê dewlet dikare xira bike. Demokrasî dewletê xira nake; naxwe wek sosyalîzma reel wê rê li ber dewleteke nû veke. Bi vî awayî, fonksiyona bingehîn a demokrasiyê derdikeve holê. Dewletê bi sînor dike, milên dewletê yên mîna axtapotê diçirpîne û rê li ber derfet û îmkanên azadî û wekheviyê vedike. Belkî ber bi dawiyê dewlet bi temamî bê kêr bibe û vemire. Têgihîştina Engels û hinekî jî ya Lenîn welê ye, lê mirov nikare bibêje ev bi awayekî teorîk pêş de birine. Di dewletên bi demokrasî de jî bêguman di şêweyê dewletê de guhertinên girîng pêk tên. Her ku biçe ji bilî 'ewlekariya giştî' ya civakê û 'qada gelemperiyê' ya di xizmeta her kesî de ye, hemû sazî û rêzikên wê bêkêr dibin û neçar diterikîne. Nemaze li welatên YE dereng û hêdî be jî rastiya lê varqilîne ev e. Li van welatan dewlet û demokrasiyek tê meşandin, mîna ku li ser navê hemû mirovatiyê di mijara dewlet û demokrasiyê de rexne li xwe digire.

Bi vê nirxandina kurt, nuqteya me xwest em nîşan bidin ew e ku li gorî nertina me ya li dunyayê ji serî ve partîbûyîneke navend-dewlet şaşiyeke bingehîn bû. Dixwaze bila bigihîje dewletê û ava bike, dixwaze bila negihîje û ava neke, partiyên bi vî rengî nikarin armancên xwe yên wekhevî û azadiyê bi rêya dewletê pêk bînin. Heta ji vê rê negerin wê nikaribin bibin partiyên azadî û wekhevîxwaz. Bi kurtî ji bo partîbûyîneke demokratîk û sosyalîst divê di teorî, bername, stratejî û taktîkan de ji navend-dewletbûyînê veguherîn bibe û xwe nû bike. Hewceyî bi teoriyeke sosyalîst a demokratîk, bername, stratejî û taktîkên navend-dewlet nebin heye. Eger xwerexnekirin li ser van hîman bibe maneya wê heye. Naxwe li ser navê nûbûnê wê dîsa rewşên kevin werin dubarekirin. Rewşa partiyên rizgariya netewî, sosyal demokrasî û sosyalîzma reel vê heqîqetê pir eşkere piştrast dikin.

4- Eger PKK di vê çarçoveyê de bi awayekî berfireh xwe rexne bike û karibe bi cih bîne, jinûve avabûnê wê wextê maneyek wê hebe. Em wextê careke din li demên borî binerin, emê karibin bibînin ku di binê hemû kêmasî û çewtiyan de têgihîştina partiya

dewletparêz a klasîk heye. Dixwaze em Kurdistanê bi serê xwe, dixwaze hevpar û dixwaze wek dewleteke federatîf bifikirin, wexta dewletbûyîn wek esas hat qebûlkirin hemû xebat, hemû kadro, rêxistin, çalakî û taybetiya propagandayê jî wê li gorî vê yekê xwe bi rêkûpêk bike û diyar bibe. Kadroyên PKKê yên bi kevneşopiya dewleta kevin a dîrokî re rûbirû ne hînê ji ilmê siyasetê tiştekî fêm nekin û bikevin nav nakokiyên îqtîdarê, wekî gelek caran me di rexneyan de bi vegotina 'paşatî dane qereçî, berê bavê xwe dar ve kiriye' diyarkiribû, wê bikeve nav heman rewşê. Em niha baştir fêm dikin ku sosyalîzma Sowyetê çima piştî heftê salî dîsa li kapîtalîzma hov vegeriya. Ji ber ku bi demokrasiyê terbiye nebû. Pir bi lez û bez dewletparêztiyê di genên civakê de ruhê totalîtarîzmê çand. Wexta zext rabû paşvemayîna demên destpêkê ji nişkê ve serî rakir. Paşverûtiya demokratîk nebû û veşartî ma ya Çartiya Rûsyayê bû. Cîlaya dewleta kapîtalîst tenê karîbû heftê salî veşêre. Ji lewra nasnameyek mîna PKKê ya civaka li ber komkujiyê, eger kadroyên wê bibin xwedî hêz û tu wan bixînî nav nakokiyên siyaset û sîlehê, dikarin xwe wenda bikin û dikarin bibin mîna paşayê qereçî - pratîka Şemdîn Sakik bi vî awayî bû û bi vê gotinê min ew pir rexne kir - Divê mirov vê bizanibe û texmîn bike. Me kîjan sazî pêk dianî yan hîç hay ji xwe nedibû, yan jî dibû 'despotokek' û derdiket pêşberî me. Hêmana bingehîn a di bin vê yekê de radiza kêmbûna perwerdeya siyasî û ya herî girîngtir hîç nasnekirina demokrasiyê bû. Ji bo hînbûna sazîbûyîn, rêzik û usûla rêvebirina demokrasiyê hîç xwe nêzîk nake. Ji ber çanda kevneşopiyê reva ji demokratîkbûyînê dibe rêya jiyaneke erzan û hînbûyî. Şêwazê demokratîk, zanistiyê, têgihîştina li civakê, ilmê siyasetê û ezmûnên rêveberiya civakî dixwaze. Ev fazîlet jî bi hêsayî bi dest nayên xistin. Ji bo wan tecrûbe û perwerdeyeke zêde dixwaze.

Di partiyên din hemûyan de jî polîtburo û navend xwe bi hiyarerşiyê mezin dikin; bi hêsayî kes nagihîjiyê; kes nikare destê xwe bidiyê, ev yek encamê kevneşopiya dewletê ye. Dewletbûyîn bi otorîteyê dest pê dike. Divê tu pir tund û sar nêzî mirovan bibî. Di dîrokê de keyayê Medan Deîkos, dema konfederasyona Medan pêk tîne, yek ji karên destpêkê dike ew e ku têkiliyên berê yên însanî hemûyan dide aliyekî û bi kesî re hevdîtinan pêk nayne. Paytexta nû ya bi navê Ekbatanê ava dike, dora wê bi dîwarekî ji heft bircan digire. Rewşeke seyr û balkêş e. Ji bo tu bibî dewlet divê xwe piştperde bikî û maskeyekê li rûyê xwe bixî. Padîşahên Osmaniyan timî ji pişt perdeyê dinerîn. Bi kurtî, partiyên sosyalîst jî rêveberiyên

jor neçar man bikevin heman rê. Ji ber ku şertê dewletbûyînê ev e. Ez yek ji wan kesên ji serî ve di nav vê pratîkê de me, divê mikur werim ku mijara herî zêde ez xistim zehmetiyê ev e. Ez ti car hînî şêwazê dewletê û protokola wê nebûm. Ez di nav rengê xwe yê demokratîk û yê dewletdar de pir heyr mam. Mîna ku ez di navbera du çeman de bimînim. Wexta PKK mezin bû min lîstika îqtîdarê hînê baş fêm kir. Divê ez eşkere bibêjim ku ti car jê xweş nemam. Bi awayekî cewherî şerê min ê herî mezin di warê ez bibim zilamekî dewletê yan nabim de qewimî. Ber bi salên 1995'ê ve hewesên min gelek tengav bûbûn, ji ber ku min fêm kiribû ku ez roj bi roj ji armancên xwe dûr dikevim. Min ferq kir ku ez bibim dewlet jî yên li hemberî min piçûk dibûn. Mîna ku stû xwar bikin. Min dizanîbû ji dil nînin. Min texmîn dikir ku dema firsendê bibînin wê xeter bin. Ya ez tengav dikirim jî ev rastî bû. Hîç nedişibiya têkiliyên di îdeala min de bûn. Min yekem car yeqîn kir ku bi vê rêbazê serketin nabe û eger bibe jî wê negihîne armancên têne xwestin.

Piştî salên 1995'ê di PKKê de mijara dibû sedemê tengasiyan di cewherê wê de ev bû. Têkiliyên hemû sazî, kadro û avahiyên hatibûn damezrandin ji têgihîştina karmendiyeke şapînoz wêdetir tiştek nebû. Ji bo wan pirsgirêk nebû bibin xwediyê utopyayê, bibin xwediyê coş û heyecanê, her roja li pey tiştên nû bigerin û tiştên nû bi afirînin, li ser nirxên şoreşger ên bi zor û zehmetî hatibûn afirandin bûbûn xwediyê hewesa jiyaneke erzan. Yek ji nexweşiyên herî tehlûke ev bû. PKKeya şoreşger ji aliyekî ve di navê de çetebûyîn, - paşatiya qereçî - ji aliyekî din ve jî di navê de derketina karmendan, dihat maneya bi dawîbûna wê. Xebatên min ên mezin di dawiyê de mirovên cûce û bejinbost derxistibûn holê. Ya esas, ji bo ez vê rastiyê çareser bikim, min pir zêde hewl da. Analîzên min ên di salên 1990 de pirbûna van hewldanên min nîşan didin. Min sîleha rexnekirinê pir bi kar dianî. Lê ji ber ku sedemê nexweşiyê rast nedihat destnîşankirin, dermankirina wê jî nedibû. Ji lewra pir normal bû, kadroyên partiyek dewlet îdealîze dikir ji navendê ji jor heta jêr di şertên Kurdistanê de yên koka wan gundî bibin çeteyên herî hov û nîv-rewşenbîr jî bibin karmendên despotîk. Di xwezaya hedefê de ev pûçbûn û xirabûn hebû.

Ez dema dibêjim duyemîn pêngava PKKyîbûyînê hat pûçkirin, ez behsa vê rastiyê dikim. Ez behsa têkçûn, an jî têkneçûna di warê eskerî-teknîk de nakim. Ew mijarên talî ne. Eger seriyekî PKKê dewlet bûya jî wê biqediya; ji ber ku wê cewherê wê yê şoreşgerî bi dawî bibûna. Ewê neçar bimana bûbûna mîna PDK û YNKê. Di

navbera salên 1995-2000 de zehmet bû ez karibim van pirsgirêkan çareser bikim. Beriya salên 1995an rêveberiya PKKê, PKKeya utopyayê bû. Coş û baweriya wê xurt bû. Dema nêzî dawiya demê dibû his dikir ku di rêveçûna kar û xebatê de seqetiyek ciddî heye. Xwe dubarekirineke zêde pir dihat dîtin, lê me nizanîbû çare çî ye. Me tenê hewl dida çeperan tijî bikin û çeperên nû ava bikin. Em ketibûn rewşa 'zewahîriyê rizgar bikin' yanî bi şikil be jî kar bidin meşandin.

Ya esas, pêvajoya Îmraliyê di çareserkirina vê pirsgirêkê de rol lîstiye. Li vir, ez ji pratîka zêde ya rojane qut bûm û bi avantaja vê yekê, min karîbû xwezaya ilman yanî li realîteya civakî baş çav bidêrînim. Eger nexweşiya min a dogmatîzmê pir kûr bûya mîna li cem ji sedî 99 kadroyan tê dîtin minê çareseriya tê zanîn nikarîbûya pêk bianiya. Ji aliyê min ve, ne tenê Marksîzm, hemû utopyayên azadî û wekheviyê hatine çareserkirin. Dîsa rastiya demokrasî û dewletê jî hatiye çareserkirin. Di vê rewşê de min şîfreya têkiliyên şer û îqtîdarê jî çareser kirine.

Nexweşiya dewletbûyîn û îqtîdarbûyînê, nemaze li ser zemînê paş ve mayî yê civakî derdikeve holê û ferdên perwerdeyeke însanî ya zanistî nedîtibin ji wan tîpên xeter ên 'despotîk' diafirîne. Ji bo îqtîdara xwe tatmîn û têr bike çareserkirna pirsgirêka herî sivik jî bi sîlehê esas dibîne. Di hêmanên paşvemayî de ev pir eşkere xuya dike. Nexasim di dema çetebûyînê de pir tîpên hov derketin. Mîna mêşek xwe li ser çavên wan danîtibe, hevalên xwe yên herî hêja wexta ji wan bêzar dibûn bi qeleşî û bêbextî dikuştin û ev yek kiribûn fena şêwazekî fermandarî û pêşengtiyê. Rewşa herî xeternak ev bû. Heta ji hevalek bixwazin xilas bibin ji bo pêdiviyên herî sivik dişandin çalakiyeke îmhawarî û ev kiribûn rêbazek timî serî lê didan. Ev şêweyê dejenerebûyî pir dereng hat dîtin. Îqtîdarbûyîn û fermandarî bibûn ji mijarên balkêş. Bi çavsorî bi ser van meselan ve diçûn. Ji ber ku didîtin tiştên wek armanc hîn bûbûn bi rêbazên mîna îqtîdarbûyînê bi dest dixistin. Nexweşiya îqtîdara ezelî weke şewbê belav bûbû. Lîstika îqtîdarê bibû lîstika herî zêde kêfa wan jê re dihat û di vê lîstikê de li dijberî hevdu pir baş darbe dikirin û sabûn dixistin bin lingê hevdu. Aliyê PKKê yê herî bi tehlûke dejenere bû ev bû. Vê dejenerebûyînê pir bi awayekî neyînî tesîra xwe li gel kir. Mirovên mîna zêr giranbuha yên dilsoz dihatin qehirandin û bi kederkirin.

Di çalakiyan de tiştên diviyabû ti car nebûna kirin. Cudahiya jin û zarokan ji bîr kirin. Ta heywan jî telef kirin. Eşkere, ev li ser navê

mirovatiyê nedihatin qebûlkirin. Lê divê neyê ji bîrkirin ku di pratîka îqtîdaran de jî bi tevahî rakirina gund û bajaran ji nexşeyê û binaxkirina wan, nadîde ye. Karmendî jî nexweşiyeke kêm nebû. Di şerê man û nemanê de xwe spartina karyera karmendiyê yek ji şêwazê herî xirab ê qedandinê bû. Yên mayî jî bi ehbab çawişiyê, destê xwe ji ava sar di ya germ de nedikirin, qîma xwe bi yê heyî dianîn û bi kêmasiyan pêvajo dimeşandin. Demeke PKKyîbûyînê bi vî awayî diqediya. Eşkere, di çavkaniya van hemû neyîniyan de taybetiya bingehîn a dewletparêz a partîbûyînê radiza. Eger tu armancên xwe bikî wekhevîxwazî û azadîxwaziyê diyar bikî û wek amûrê bi cihanîna wan, dewletê destnîşan bikî, rewşên li pey hev biqewimin û ya rêxistin bikeve navê jî diyar dibe. Ji bo ev rewş li dawiyê werin hîştin, divê dest ji taybetiyên partiyê yên me behs kirî werin berdan. Partîbûyîna nû jî wê bi vê rastiyê pêk were.

5- Duyemîn şaşiya girîng a PKKê di warê tarîfa netew û şerê rizgariya netewî de ye. Me netewbûyîn û ji bo bicihanîna netewbûyînê jî şerê rizgariya netewî wek fermana Quranê qebûl kiribû. Ji ber ku hemû berhemên klasîk ên sosyalîzmê û mînakên şer ên hemdem ev yek li ser me ferz dikirin. Bêyî netewbûyînê ne azadî, ne jî wekhevî pêk dihat, heta mirovekî hemdem jî nedibû. Rêya vê yekê jî bi stratejiyeke sêalî - parastin, mêzîn û êrîş - bi şerê rizgariya netewî dibû. Ji bo vê yekê, mirov ketibûn rêyan, derketibûn çiyan, ketibûn zindanan, çûbûn gund û bajaran. Her gavavêtin û ketina deverekê ji bo vê yekê bûbû. Li Rojhilata Navîn dogmatîzm hema bêje ketiye genê mirovan. Wexta em bi vê dogmatîzmê nêzî mijarê bûn, êdî diviyabû em şerekî rizgariya netewî bidin destpêkirin. Ji bo em bibûna netewekî bi rûmet wekî din rêyek li pêşiya me nebû. Şer êdî bûbû têgînek pîroz. Di vê rê de şer êdî ji cîhada Îslamê girîngtir bû. Eşkere, nexweşiya dogmatîzmê weke di gelek bûyerên din de xwe di vê helwestê de jî dubare kiribû.

Em wexta şer wek rastiyekê analîz dikin, ya rastîn nexweşiyeke divê bi civaka mirov nekeve. Ji bilî xwe parastina îcbarî divê ti cureyê şer mubah neyê dîtin. Di cewherê şer de zordarî û desteserkirin heye. Çiqas maske jî li rûyê şer were xistin, di xwezaya şer de dizî, tehekum û talan heye. Bi fethan bawer dike ku dibe xwedî maf û heq. Bi van taybetî û xusûsiyetan şaş nîne ku mirov şer wek felaket û xirabiya herî mezin bi nav bike. Baş bi kûrahî nehatibû fêmkirin, şer tenê di parastina hebûnê de, di parastina rûmet û azadiyê de û ji bo pêkanîna vê yekê ti rê nemînin maneyê îfade dike. Şerê rizgariya netewî yê em lê serwext bibûn her tişt ji nû ve fetih

dikir. Pir bi hêsayî dikarîbû parastina rewa derbas bike. Dikarîbû bibe tolhildan û bibe zevtkirina beramberî hev. Ji van aliyan hîç fikar nedihat kirin. Eger li ser şerê parastina rewa bihata rawestîn, teorî, stratejî û taktîkên wê ji şerên din bihata kirin, bêguman mumkîn dibû ku ev çend şaşî, êş û wendahî nebûna. Hemû hêvî bi şerê rizgariya netewî yê diviyabû bi serkeve hatibûn girêdan û bi awayekî objektîf di vê rewşê de fikarên mezin hebûn.

Wexta mirov, rewşa dunya heyî, bi cihkirina hêzan, bi rêxistinkirin û xusûsên mîna lojîstîkê li ber çav digire, şerekî rizgariya netewî yê bi çavsorî şensê wê bi tesadufan ve girêdayî ye. Heta ev rastî hemû neyên dîtin, wê pratîka şerê dijwariya xwe kêm ê ji panzdeh salan zêdetir ku ji sala 1995an pêve xwe dubare kir, neyê fêmkirin. Mirov nikare bibêje ev şer ti encama xwe nebû. Lê ji ber ku wek rêya bi tenê ya çareseriyê hat dîtin, pê re gelek êş û wendahiyên pêk hatin, rê neda ji hewldanên din sûd were girtin. Stratejiya sêalî jî tam mînakeke dogmatîzmê bû. Jixwe şerekî parastinê tam li gorî cografya Kurdistanê û li gorî têkiliyên bi gel re bi baregeh û taktîkên li cih bihatana pêşxistin, ji sedî sed wê nehîşta dewlet bigihîje armanca xwe û wê karîbûya bigîhanda çareseriyeke demokratîk a têkûz. Li gorî têgihîştina min a şexsî, kadroyên fermandar ên di hundur de xwedî qabîleyeteke bi vî rengî bûn. Baweriya min di vî warî de hebû û ez timî li benda vê yekê mam. Min destekeke mezin da. Min fedekariyên nadîde nîşan dan. Lê heman nexweşiya îqtîdarê di vê qadê de jî bi awayekî xeter derketibû holê. Heta çetetî wer hov û dejenere bûbû, hevalên xwe yên herî hêja tasfiye dikir. Di navê de provakatorên bi zanebûn û îxaneta bi hevkariyê hebû nebû ew çend jî diyarker nebû. Ji ber ku şer bi giştî hunerekî qirêj e û bi taybetî jî rizgariya netewî bi awayekî dogmatîk dihat nirxandin, encamên bi vi rengî derdiketin. Bi sedema ku her cure netewparêzî, şîdeta kor, meylên cihêxwaztiyê pêş diketin, tehlûke hebû ku kaosa civakê zêde bibûya.

Eger tarîfa netew nehatibûya fetîşekirin, wek şêwazê civakeke sist û rastiyekê bihata tarîfkirin, ya hewce jî wek komeke netewî ya azad, wekhev û demokratîk bihata zanîn û esas bihata dîtin wê hînê encamên bi berpirsiyarî pêk bihatana. Ji bo netewekî îdealên yekbûyînê û dewletê, îdealên herî baş, bedew û rast nînin. Dîsa ya girîng ew nîne ku li bin banê dewletekê ye, yan li bin banê dewletekê nîne, ya girîng demokratîk e, yan na. Rêya diçe vê rastiyê bi her rê û rêbazê şer nîne, eger hebe şerekî manîdar ê parastinê, xebatên civakê yên demokratîk, her cure rêxistin û piştgiriyê ji vê yekê re xizmetê

bikin. Bi vî awayî dibû ku netewparêziya netewê serdest û bindest nebe, rê li ber şîdeta zêde û cihêtîxwaziyê venebe, wekhevî û azadî pêş bikeve. Lê helwesta dogmatîk a 'her netew çarenûsa xwe diyar dike' nedihîşt alternatîfên dewlemend ên çareseriyê bihatana dîtin. Bi vî awayî pêşî li demokratîkbûyîna Tirkiyê jî venedibû. Netewparêziya olîgarşîk bi awayekî xeternak hat sorkirin û heta dawiyê bi destxistina kurtêlên siyasî û aborî wek siyaset hat hesibandin. Eger di siyaseta bihata meşandin de bihata gotin, Kurd li welatekî hevpar wek komeke netewî ya azad di bin heman banê dewletê de bi netew-dewleta giştî ya Tirkiyê re wek hêmanekî jê nabe û stratejîk ji bo yekparebûna welêt heye û heta çalakiyan ji vê yekê re xizmet bikirana, encamê ji bo aliyan çareserî bûna. Rêyên welê dewlemend û çareserker nehatin fikirîn. Wek me di serî de jî got ev yek bi têgihîştina şer a ji bo partîbûyîn-îqtîdarbûyîn-dewletbûyîn-netewebûyînê ji nêz ve têkildar e.

Piştî ku dogmatîzm li dawiyê hat hîştin, min ji dewlet, îqtîdar, şer, netew û netew-dewlet re tarîfên realîst anîn. Vê yekê bi xwe re, eger hewce be, ji şerekî berfireh ê parastina rewa re û ji bo civakeke vekirî ya demokratîk a xwe bispêre partîbûyîneke nû, rêya çareseriyê vekir. Ev helwest tenê veguherîneke stratejîk û taktîk nîne. Li pişt wê dîtineke paradîgmatîk û teorîk a xwe dispêre fikreke zanistî ya bi kok heye, her weha ramaneke siyasî ya dewlemend û şêwazê partîbûyînê heye. Di vê de nexweşiya dewletparêziyê ya sed û pêncî salî mora xwe li sosyalîzmê xistibû, li dawiyê tê hîştin; têgihîştina netew a bûrjûwaziyê tê terikandin; şêwazê civakîbûyînê yê komîn û demokratîk wek di tevahiya dîrokê de esas tê dîtin; îdeala wekhevî û azadiyê bi van guhertinên bingehîn ve tê girêdan. Li ser vî hîmî rexne-xwerexnekirina li ser navê PKKê pir bi awayekî xwezayî pirsgirêka jinûve avabûnê dixe rojevê. Jinûve partîbûyîn, parastina rewa û wek rêxistiniya bingehîn a gel kongrebûyîn ku xwe dispêrin xulaseyekî kin ê rewşa rojane, wek wezîfe û pirsgirêkên divê bi lez werin çareserkirin, li pêşiya me radiwestin.

C- Di PKK'ê de pirsgirêkên jinûve avabûnê

Me destnîşan kiribû ku di serê 2000 de PKK bi giranî ji ber sedemên hundurîn xetimiye û eger bi vê avahiya xwe ya heyî dewam bike wê ne çareseriyê, neçariyê biafirîne û lewma me rast dît ku mîrateya xwe bi nav û avahiyeke nû dewam bike. Di parêznameyan de rewşa nû tê nirxandin, şîroveya dîrok û serdemê tê kirin, me bi van nirxandin û şîroveyan hewl da naverok û şêweyê avahiyên muhtemel werin damezrandin rohnî bikin. Bi vê têgihîştinê berê

KADEK û paşê jî ezmûna KONGRA-GEL pêk hat. Li gorî agahiyên bi sînor ên me di girtîgehê de wergirtin, rexne lixwegirtin ji dil hatine kirin û ji bo vê yekê jî me damezrandina avahiyên nû li cih dîtibû. Di vê navberê de agirbesta yekalî ya ji sala 1998an ve em hewl didin dewam bikin, ji bo manîdar û mayînde bibe di pêvajoya Îmraliyê de em bi berpirsiyarî tevgeriyan. Sererast nebe jî wek dewama lêpirsînan me bi hin diyalog û name danûstendinan ji bo berpirsiyarî bi cih werin anîn hin pêşniyar kirin. Heta pêvajoya 11 Îlonê jî me hewl da em hêvîdar bin. Lê pêngava nû ya 'antî-terorîzm' a DYE, bawer dikim ji aliyê rêveberên KT ve weke firsend hat dîtin û bû sedem bibin xwedî helwesteke îmhawarî. Bi vî awayî pêvajoya diyaloga ne sererast jî bi dawî bû.

Di vê navberê de li Tirkiyê di Mijdara sala 2002 de hilbijartin ketin rojevê. Beriya ku em rêya nû ya Tevgerê destnîşan bikin, me li cih dît ku em li benda encamên hilbijartinê bimînin. Min ji hukûmeta AKPê re ku şensê wê bû bi tenê bibe îqtîdar, ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd bi rêyên diyalogê bibe, min name ji serokwezîrê nû re şand. Me yê li gorî bersivê rê û aliyê xwe diyar bikira. Herî kêm minê bersiveke zelal bida bendewariyên avahiya rêxistinê ku ji min dikirin. Tevî ku me gelek caran pêvajo dirêj kir jî bersiv nehat dayîn. Herî dawî min dema deklarasyona 'lihevkirina demokratîk û aştiyane' ku min îlan kiribû, di 1'ê Îlona sala 2003'an de bi dawî kir. Êdî KADEKê rêya xwe bi xwe diyar bikira. Wek pêngav wan bi xwe 1'ê Mijdara sala 2003'an nîşan dabûn. Di vê navberê de min rast nedît Tevger wek KNK (Kongreya Netewî ya Kurdistanê) û KADEK du serîbe û di şûna vê de min pêşniyar kir ku her du wek KONGRA-GEL di bin banekî de bibin yek û min li cih dît ku bi navê KONGRA-GEL îlana damezrandina xwe bikin. Hat qebûlkirin. Di dawiya sala 2003'ê de bi kongreyekê avabûna xwe ya bi vî rengî îlan kirin. Lê di şûna pêngava nû de nûçe belavbûn ku avahiya rêxistinê bûye du parçe.

Eşkere, ez li benda bûyereke bi vî rengî nebûm. Ji ber ku ez avahiya rêxistinê û kadroyan berê nas dikim, min zehmetî ne kişand ez rewşa wan şîrove bikim. Ji damezrandina fermî ya PKKê ve kadroyên navendî ji pêşketin û nûbûna ji wan dihat xwestin dûr bûn. Di şertên herî zehmet de me ji bo pêşketina wan desteka xwe ya teorîk û pratîk kêm nekir. Bi pêvajoya perwerdê ya Rojhilata Navîn, bi derfet û îmkanên nû, em li bendêbûn bi tecrûbeyên bi dest xistine gav biavêjin, lê dîsa anîn kar li niyetên xwe yên ne zelal gerandin. Hem derengxistina wan a pêngavên mîna 15 Tebaxa 84'ê hem jî ji

awayê em difikirîn wêdetir bi cih anîna wan, timî nerehetiya min zêde kir. Ji sala 1981'ê ve bi gelek konferans, kongre û civînên perwerdê û axaftinên hînker min hewl da berê wan bidim erk û pêdiviyên pratîkê. Min rexneyên tund li wan kirin. Lê wan zêdetir hewl dan min bikişînin şêwazê xwe. Di helwestên xwe de ku min di beşên berê de nirxandibûn, bi israr dewam kirin. Vê helwestê tasfiya PKKê bi xwe re anî ku wek bi kurtî min anî ziman.

Ji şêwazê wan ê parçebûnê diyar bû ku di rexne lixwegirtina serê 2000 de ji dil nebûne. Bi hevketinek hîç li gorî dîrok, civak, hevaltî, şehîd, exlaq û bûyerên girîng ê siyasî nebû, bi bêberpirsiyarî ji tasfiyekariyê jî wêdetir kirêt - zimanê min nagere ez bibêjim xayînane - wek pêngaveke nû li ser rojeva gel û şervanan ferz kirin. Bi qasî ku ev bûyera di dawiya sala 2003 û serê sala 2004 de çapemeniyê nîşan da - ji ber çi sedemane nizanim lê parêzerên min di dema xwe de ji min re îzah nekirin - bi awayekî kirêt û ji min bê xeber hat sorkirin û belavkirin. Di vê navberê de divê ez destnîşan bikim ku demên dirêj têkiliyên min qut bûn. Ya ez dijiyam, di nav tecrîdeke berfireh de tecrîdkirin bû. Li gorî encama min ji hin agahiyên pir bi sînor bi dest dixistin, li dijî kesayeta min hin hesabên pir kûr dihatin kirin. Di bingehê hesaban de ev heye; li ser bûyeran hêza min a kontrolê nemaye, bi awayekî sax derketina min zehmet e, ji lewra min li gorî xwe li der ve dibînin - belkî jî bi niyeta xwe ya baş! - di bin navê tedbîrê de ya çetetiyê di gerîlla de kir vê carê wan - zimanê min nagere bibêjim alî - li ser zemînê girse, îdeolojîk, eskerî û hemû siyasetê xwestine temam bikin.

Ez di wê rewşê de nînim ku statu û niyeta rastîn a hevalên beşdarî vê pêvajoyê bûne bizanibim. Ez vê yekê pir girîng jî nabînim. Ya ji min re eşkere ye, van hevalan xwe di ser xeta dîrokî, civakî, îdeolojîk, siyasî, rêxistinî û çalakiyê de dîtine. Ji dil ne beşdarî avahiyên rêxistinî yên berê û ne jî yên nû bûne û hêza îrade û entelektuel ya hewce nîşan nedane. Bi eşq û evîn beşdarî doza pîroz a gel a wekhevî û azadiyê nebûne. Yan xwe bi tevahî berdane û bi awayekî objektîf têkçûn qebûl kirine, yan jî heta dawiyê xwe kirine navendê û hewl dane hemû bûyeran bi helwestên xwe yên şexsî ve girê bidin û bikin qurban. Ji derfetên tevgerê sûd wergirtine û kesayetiya xwe xwedî kirine. Ya girîngtir, qîmeta rastîn a hewldanên min ên di nav sînorên Tirkiyê de yan jî li Rojhilata Navîn û herî dawî jî li Îmraliyê baş fêm nekirine û li gorî wê nebûne xwedî helwest. Bi kêra hevaltiyeke rastîn nehatin. Fêm nekirine ku partîbûyîn ew e ku

mirov bi fedekarî xebatan dimeşîne. Dunya rastîn a fikir, rêxistin û siyasetê nas nekirine. Qîmeta jin û azadiya jinê nekarîne teqdîr bikin.

Hestiyariya min a awarte herî dawî wek qelsî hesibandin û xwe bi vî awayî danîn holê, ma wekî din îzaheke vê yekê heye? Bi helwesta herî dawî nîşan dan ku ji partîtiyê jî wêdetir xwe dirêjî hewldanên demokratîkbûyînê jî kirine, ma êdî mumkîn bû mirov îsyan neke? Potansiyela me ya gel wek li her deverê li Tirkiyê jî li binê ji sedî deh nîne, lê tevî vê yekê bi helwesta xwe vê rêjeyê timî ji sedî pênc bi erdê re kaş dikin, ev yek ji rêjeyê wêdetir bi xusûsiyeta helwestan ve girêdayî ye. Ev yek îspat dike ku hîç naxwazin demokratîkbûyînê fêm bikin. Tevî şer û partîbûyînê naxwazin fêm bikin. Her weha fêm nakin ku gelê bi hezar ked û xwedanê hatiye komkirin, bi zextên ji der ve û sedemên pûç dixine rewşekê dest ji dozê berdin. Şêwaza wan a di hilbijartinên dawî ya belediyan de provakatorekî her baş jî nekarîbû nîşan bida. Xuya ye 'despotokî' têra xwe di şexsiyeta wan de cih girtiye. Piştre min fêm kir ku pêdiviyên me yên huqûqî şeş sal in dane aliyekî û ji alîkariyên me yên demokratîzekirina gel jî hin bêşeref nerehet bûne.

Li dijî Osman Ocalan hewldana min a mehkemekirin û yek du cild rexne têne zanîn. Bi têgihîştina ku wê zirarê bide doza gel heta wefat jî kir min rojekê bi telefonê li xatirê diya xwe nepirsî. Yanî tê zanîn di mijara malbatiyê de di nava Kurdan de yê ji min naziktir tevdigere nîne. Lê tevî vê yekê, de wer ji xwe re binere, ez jî di navê de di van demên dawiyê de tam operasyoneke reşkirinê dane destpêkirin. Jixwe ev ji tevgereke normal wêdetir helwesteke gelek maneyên wê hene. Dewlet bi xwe jî maf nabîne hin helwestan nîşan bide û ji kirina hin helwestan xwe dûr digire. Tevî vê yekê helwesta hin kesên rezîl nayê fêm kirin. Çend endamên nexweş ên malbatê mane û hatiye dîtin ku li dijî wan hin helwest hatine nîşandan ku têne maneya terorê. Min fêm nekir ku bi vê yekê dixwazin çi bikin. Eger dixwazin bi hêz bibin, têkiliya wê ya bi me re diyar e. Lê ya rastîn me ne ku serokatî hêjayî wan nedît, berovajî me serok nebûyîn hêjayî wan nedît. Baş e, dixwazin tola çi hilînin? Ji wê însanê çi dixwestin û çi bi dest nexistin?

Di nav vê tevgerê de dibe ku ehmeq, rezîl, komploker, xayîn û provakator hebin. Çawa ku di navê de yên egîd, zana, bi şeref, durust û yên ji dil girêdayî hene. Lê ev şêweyê herî dawî derket, min tam fêm nekir. Ez dişibînim çetetiya siyasî. Eger bi wan tenê bi sînor bibûya temam. Lê eger xwe dirêjî mijarên îdeolojîk, siyasî û eskerî bike wê rê li ber encamên herî xeter veke. Ew çend ehmeq in, nikarin

fêm bikin ji Ebû Cehîl hînê cahiltir in. Mirov çawa dikare nêzî nirxeke xwe ya her tiştê wan şeref û rûmeta wan xwedî dike, bibe? Ez naxwazim van xusûsan bi nav bikim û dirêj bikim. Rewşa herî dawî ya derketiye holê ji hizîp, ji rê derketin û ji revê wêdetir tiştek e. Divê em li ser hin rewşên din rawestin. Osman pir dixin rojevê - teşhîr - bi vî awayî rewşa rastîn bincil dikin. Li gorî min Osman di wê rolê de ye ku mîna kera hatibe ajotin nav qada mayinkirî. Ya kirî, xwe bi awayekî pir xirab da bi karanîn. Ez xwe nagirim û ezê bibêjim; Cemîl û Dûran'an timî mirovên bêkêr dan revandin, gelek kesên durust an întîhar kirin an revîn, yan jî li fermanê guhdarî nekirin hatin girtin û cezakirin. Wê ev rewş çawa werin îzahkirin? Timî parçe bike, bide revandin, bide kuştin, wê heta ku biçe? Hin navên destnîşankirne, ez naxwazim nav û kirinên wan bînim ziman. Ma nizanin rê li ber çi vekirine?

Ez niyeta van her sê hevalan û fedekariyên wan ên li gorî wan guftûgo nakim. Lê wê bi wijdan fêm nekin ku kirinên wan li ser navê bi hezaran nirx û rûmetî rê li ber çi vedikin? Li hemberî van rewşan wê pîvanên siyaset û rêxistinê karibin xwe rabigirin? Eger bi qasî serê derziyê pirsgirêka wan a şer û têkoşînê heye, wê karibin vê yekê rakin? Ez di vir de li para berpirsiyariyê hîç nagerim. Di siyasetê de tiştê jê re aqil tê gotin van rewşan dernaxîne holê. Bûyera em jê re dibêjin serokatî bi pêşbîniyeke awarte, ne ku van şêwazan biqîre, bizanibe wan dernexîne holê. Ma dibe ku encama sozdanê ev be? Yên timî di warê siyasî, rêxistinî û çalakiyan de xwe rexne bikin dikarin rê li ber van rewşan vekin? Ez di vir de li bersiva pirsa kî çiqas mafdar e nagerim. Eger mirovek provakator, rezîl û neqediyayî be, bi helwesta xwe rê nade bûyerên bi vî rengî; ne dibe destik, ne jî firsendê dide. Tevgera me, gelê me û nirxên me yên em li ser navê wan têdikoşin ti carî hêjayî van rewşan nebûn û li ser navê wan ezê ti carî firsendê nedim vê yekê. Wek pêdiviyeke soza min daye dîrok, gel û hevalên xwe ez vê yekê careke din bi bîra heval, hogir, dost, dijmin û her kesî dixînim.

Li hemberî van bûyeran a ji min tê xwestin ew e ku ez di nav şertên ku tê de me, xwe vekişînim xetên sînorê xwe. Ev xet çine? Ezê li hemberî xeta hevalên bîst salan, şêwazekî partîbûyîn, şer û girseyê bimeşînin, ezê sînorê xwe yê partîbûyîn, rêxistin, çalakî û girsebûyînê destnîşan bikim. Kes nikare ji yekî mîna min bixwaze ku ez teslîmî wan bibim. Ya dewlet nikare cesaret bike, ew çawa dikarin cesaret bikin? Ew jî divê herî hindik zanibin bi qasî dewletê ciddî bibin. Eger min dijmin jî bibînin divê vê ciddiyetê nîşan bidin. Jixwe

eger weke îdîa dikin heval in û dixwazin bibin heval, êdî piştî vî temenî divê xwedî hêz bin ji bo pêdiviyên herî hindik ên hevaltiyê nîşan bidin. Ez ji can û dil amade me, wan weke meylekê di nav rastiya kongreya me de qebûl bikim. Eger ew jî çinekî ji dil in, divê herî kêm hêjayî wezîfeyên kongreyê bin û ji sedî sed pêk bînin. Piraniya beşekî hişyarbûyî yê gelê me, heta nefesa dawî ji min li benda hin tişta ne. Eger ji bo vê yekê alîkariyê nekin, ez ji wan dixwazim bila nebin asteng.

Wek encam, yên xwe wek aliyekî dibînin dikarin wek meylekê xwe bi rêxistin bikin û ji vê yekê re hurmeta min heye. Di mijarên îdeolojîk, siyasî, eskerî, civakî û jiyanê de dikarin bînin ziman û bibin xwedî pratîk. Heta dikarin bibin partî. Lê wek erkekî vê yekê, divê guh bidin disîplîna Kongreyê. Pêwîste nekevin nav helwestên li derveyî îradeya Kongreyê û ji bo vê yekê disîplîna hewce bijîn û xwedî li wezîfeyên xwe derkevin. Bêguman ezê jî weke pêdiviyeke berpirsiyariya xwe li ser rêya xwe bimeşim û ji bo vê yekê mafê min heye. Yek ji erkê sereke ye, ji bo mirov bi rûmet bibe, wezîfe û mafên azadiya raman û îradeyê bexşî min kirine, bi cih bînim. Ezê vî mafê xwe - li ser hîmên fikrî ku min demeke dirêje ew stewandine - li ser hîmê jinûve avakirinê weke wezîfeya bingehîn bizanibim. Meylên heyî kengî xwe baş nas kirin, belkî jî şert û mercên yekbûyînê ji nû ve çêbûn, rêya herî rast wê ji nû ve avakirin be. Di vê rewşê de ku bi hezaran şehadet li ser navê min bûne, bi mîlyonan li ser piya ne û bi hezaran heval bendewariyên wan hene, ez bawer dikim ku helwesta herî rast ev e.

Tika û rica min ji hevalan ew e ku li hemberî pirsgirêkan nekevin nav rewşeke hisî ya ne li cih, berovajî wek min di destpêkê de jî got ne tenê bi zanyarî, bi kesayeteke rêxistinî, siyasî û eskerî bizanibin hêjayî gelê xwe û însaniyetê bin. Ti tişt dereng nîne. Tenê em karibin li wezîfeyên dîrokî yên kêliyê xwedî derkevin. Helwesta di rastiyên mezin de ya xwedî serketin û yekîtî, her tim ji helwestên şikestî û ji helwestên piçûk ên hezar kesî yên destketiyên wan tesadufî ne, gelek bi qîmetir e. Çetekarên kevin jî di navê de ji rewşa wan a ketine navê, ez ji wan zêdetir li ber rewşa wan dikevim û xemgîn dibim. Rastiya me ya civakî her çend taybetiyên xwe yên bi lanet ferz bike jî bawerî û ewlebûna bi însan esas e. Eger bi rastî hevalên min ên xwe li ber şertên zehmet ragirtine, xwe nas dikin û ji xwe re bi hurmet in, em nikarin bifikirin ku wê nebin xwediyê şêwazê siyasî, rêxistinî û çalakiyê. Ez ji bo demên dirêj serketinên

mezin ji wan re dixwazim û dibêjim di rêya rast de wê timî alîkariya me ji wan re hebe.

1- Ji bo jinûve avakirina PKKê me di beşên berê de hewl dabû helwesta dîrokî, civakî û teorîk a xwe bispêrê, eşkere kiribû. Me hin taybetiyên sîstema civaka kapîtalîzmê ku di serdema me de serdest e di şertên dunya, herêm û welatê me de nirxand. Me hewl da em bi kurtî bînin ziman ka di zik van de pêşketina civakî ya demokratîk û di nav perspektîfa dîrokî de rêveçûneke çawa kiriye. Me bi israr destnîşankir ku projeyên azadî û wekheviyê di nav pêşketina dîrokî de mîna xelekên zincîrekê werin dîtin. Dîsa me hewl da em nîşan bidin ku îdealên azadî û wekheviyê çawa ji rê hatine derxistin, naveroka wan hatiye pûçkirin û bi ser nîzamên tehekumkar û îstîsmarker ve hatine kirin. Me xwest, em rastiya şaristaniya Rojhilata Navîn û rewşa di roja me ya îro de bi heman paradigmayan nîşan bidin. Pirsgirêk û rastiya Kurd me di nav van çarçoveyan de da rûniştandin û bi awayekî teorîk nirxand ka divê çawa nêzî çareseriyê bê kirin. Me pêşketin û avabûna Tevgera PKKê nirxand û me nîşan da ka bi sedemên hundurîn çawa xetimiye û me hewcebûna nûbûnê bi rexne û xwerexnekirinê eşkere kir. Her weha me ekolên teorîk û siyasî yên rojane hin aliyên wan ên nû wek tevgerên ekolojîk, çandî û femînîst nirxandin. Me bi israr diyar kir ku eger ji nû ve avabûn van hemû pêşketinan di hundurê xwe de bihewîne wê bibe xwedî mane.

Ji lewra ji bo jinûve avabûna PKKê di çarçoveya van hemû mijarên me yên farazî de bikeve rojevê divê di destpêkê de li gorî rastiya welat, herêm û dunyayê rewş were tespîtkirin. Bêyî ku em beşên pêwendîdar ên me nirxandibûn ji nû ve dubare bikin, pir bi kurtî be jî em bi xulaseyekî di navbera mijaran de têkiliyê deynin. Kapîtalîzma dunyayê ya DYE serkêşiya wê dike wek di sedsala 19. de îmkanên wê nînin berê xwe bide mêtingehên nû, ne jî wek di sedsala 20. de şert hene parvekirinê bi şeran bike. Şert û mercên nû yên globalîzmê naşibin ên berê. Eger bişibin jî cudahiyên wê yên xweser hene. Şoreşa zanist-teknîkê îmkanekî cuda yê karê dide destê sîstema kapîtalîst. Ew berhevkirina karê jî bi rêya şîrketên jor-netew in ku bi globalîzmê derketine holê. Şîrketên jor-netew hêzên hukumran ên nû yên dunyayê ne ku rastiya siyasî li gorî xwe amade dikin û çarçoveya huqûqî pêk tînin. Kara herî mezin bi rêya van şîrketan mumkîn dibe, bi dest bixin. Şêwazên netew-dewlet ên li pêşiya vê dibin asteng têne guhertin, avahiyên siyasî yên nabin

asteng derdixin pêş û bi vî awayî di rewşên kaotîk de jî dikarin kareke mezin bi dest bixin.

Bi pêşengiya DYE sîstem di serê salên 2000 de pir zêde bi Rojhilata Navîn re têkildar bû û di binê vê yekê de ev rastî radiza. Herêm bi avahiyên xwe yên heyîn ên zîhnî, aborî, eskerî û siyasî li pêşiya sîstemê astengê herî mezin e. Di serî de tinebûna azadiya jinê, aboriya feqîriyê zêde dike, bêkarî, avahiya siyasî ya despotîk, Îslama ku tund dibe, pirsgirêka Kurd, petrol û şerê Îsraîl-Filîstînê, gelek pirsgirêkên din herêmê wek neksa sîstemê dihêle. Sîstema hukumran nikare xwe li vê rewşê rabigire. Rastiya siyasî ya hêzên siyasî yên Rojhilata Navîn naxwazin fêm bikin ev e. Ev hêz wer bawer dikin ku wê bi mentiqê siyaseta klasîk û teoriyên netew-dewletê hebûna xwe dewam bikin. Hêza emperyal a sîstemê DYE neçare pêdiviyên wezîfeya xwe bi cih bîne. Hêzên din jî ji bo zewahirî - şeklî - muxalefeta nîşanî gelên xwe didin xapandin e. Ew ji bo ku hinekî din parê bistînin van xwepêşandanan dikin. Di dema nêz a li pêş me de hemû hêz û saziyên sereke yên sîstemê wê koalîsyona xwe xurt bikin û giraniya xwe bidin ser herêmê. NY, NATO, YE û tevgera G-8'an wê koordînasyona xwe hêdî hêdî li herêmê bide rûniştandin. Li hin cih û deman wê wek Iraq û Afganistanê tevgerên eskerî werin meşandin, li hin welatan wê gef were xwarin, hin welatê jî bi çeka ekonomîk bixin zextê ji bo bi sîstemê re yekpare bibin. Li ser avahiyên siyasî û welatên bikevin rewşa dijber wê ambargoyê were berfirehkirin ku wan bibin îflasê û bi vî awayî hewl bidin encamê bigirin. Li ser ekonomiyên bêber wê ji nû ve gelek proje werin ferzkirin ji bo reforme bikin û bi zorê be jî wan ber bi lîberalîzmê ve bibin. Bi awayekî texmînî wê herêmê di nava çaryek sedsalî de bi sîstemê re bikeve nav entegrasyoneke bi ber. Bi tevahî nikare xwe jê qut bike, ji ber ku bingehê wê yê ekonomîk, eskerî, zanistî û teknîkî nîne. Demeke dirêj nikarin wek dewletên asî jî bimînin. Li jor sîstema serdest, li jêr jî girseyên gel demeke dirêj nikarin van avahiyên siyasî û ekonomîk ên bê ber hilbigirin. Di serî de jin, ferd neçar in di warê azadbûyînê de gav biavêjin.

Sîstem bi xwe, wê di nav avahiyên xwe yên mentiqî û saziyî de bi vî awayî tevbigere, lê ya esas, civakê bi xwe, hêzên gel wê çawa tevbigerin? Ya herî girîng, ev pirs e. Gelên herêmê neçar nînin sîstemê wek wê qebûl bikin. Êdî wek berê ne mîna yedekê netew-dewletan, wê di çarçoveya armancên xwe yên cewherî yên demokratîk, azadî û wekheviyê de li çareseriyê bigere. Li hemberî hewldanên sîstemê yên demokratîkbûyîneke bi sînor, mafên mirovan

ên gelan ên ne navend-dewlet, tevgerên çandî, femînîst û ekolojîk ên bi ser saziyên civakî yên sivîl ve ku di hinavên hewldanên demokratîkbûyînê de hene, herî hindik bi qasî globalîzma sîstemê bi awayekî jor-netew maneya wan heye. Ji ber ku me di beşên berê de li ser herêmê û dunyayê nirxandin kiribûn, emê li vir dubare nekin û tenê qîma xwe bi vê xulaseyê bînin. Lê emê hînê bi awayekî berfireh nêzî rastiya Tirkiyê û Kurdistanê bibin.

Di çareseriya pirsgirêka Kurd de rola kilît di têkiliyên Kurd-Tirk de ne. Potansiyela Kurdên Iraq, Îran û Sûriyê bi sînor e ku karibin bi serê xwe biçin çareseriyeke mayînde. Zêdetir mîna hêzeke yedek in. Qonaxên pirsgirêka Kurd li Iraqê vê rastiyê ispat dike. Rastiya îro ya Dewleta Kurd a Federe ji bo PKK li gelemperiya dunyayê 'terorîst' were îlankirin bi hewldanên KT, DYE û hevkarên wan derketiye holê. Eger KT destûr neda wê bihata dîtin ku çareseriyeke bi vî rengî nedibû. Di encama vê yekê de jî Iraq di nava kaosê de ye. Texmîn nayê kirin wê çawa bi dawî bibe. Dîsa bi vê ve girêdayî, nayê zanîn wê pêkhatina Kurdistana Federe ya xwedî taybetiyên feodal-bûrjûwa ji bo demeke dirêj çawa bimeşe û nemaze bandorên wê yên li ser Îran, Tirkiye û Sûriyê nayên texmînkirin. Rîsk û tirs heye, şêwazê Îsraîl-Filîstînê li tevahiya herêmê hem were belavkirin, hem jî xurtkirin. Eger di çarçoveya sîstema kapîtalîst de wek îdeolojiyeke muştaq netewparêziya Kurd pêş bikeve, her tim potansiyel heye ku netewparêziya Ereb, Fars û Tirkan jî zêdegaviyê bike û pirsgirêkên li herêmê kilît bike. Li hemberî vê yekê jî modeleke çareseriyê li derveyî netewparêziyê dikare bikeve rojevê. Li gorî vê modelê, di çarçoveya sînorên siyasî de statuya Kurd tê naskirin û di hundur de ji dil bi çanda xwe û bi demokratîkbûyînê girêdayî ye. Ji ber ku ev şêwazê çareseriyê hem bi aştiyê pêk tê û hem jî potansiyela wê heye di nav yekparebûna dewlet û netew de pêk bê, hînê nêzîktirî rastiya dîrokî û civakî ye. Pêwîst e mirov karibe stûnên çareseriyê yên van her du şêwazan jî baş nîşan bide, ev yekê bibe alîkar ku em karibin bûyerên muhtemel ên dema pêş bibînin.

2- Têkiliyên Kurd û Tirkan di dîrokê de, me neçar dikin ku em realîst nêzî têkiliya Komara Tirkiyê bi rastiya Kurd û Tirkan re û Projeya Rojhilata Navîn a DYE ji nû ve dipijîne û dixe rojevê, bibin. Ji lewra aliyê dîrokî yê têkiliyên Kurd û Tirkan girîng dibe. Êdî pir baş hatiye fêmkirin ku polîtîkayên înkarwarî yên dema nêz îşaretên tehlûkê didin. Ji bo trajediyeke Kurd-Tirk mîna Filîstînê neqewime, ji niha û pêve pêwîst e em di çarçoveya perspektîfeke civakî ya dîrokî de bi helwesteke demokratîk a afirîner binerin. Lê belê di van

demên dawiyê de tevî hin gotinên demokratîk, pratîka înkarê ji çepgiran heta rastgiran sîstema hemû dewlet û civakê di cewherê xwe de - ne bi gotinê tenê - girê dide û ev yek dîsa rê li ber rewşeke bi fikar û bi şer avisbûyî vedike. Em li gorî tecrûbeya xwe dibêjin, ji bo fikarên heyîn bi awayekî mirov jê piştrast be rabin û ji bo rê li ber çareseriyeke soza wê hatiye dayîn veke, pir girîng e ku em raman û pêşniyarên xwe pêşkêş bikin.

Dîrok xwedî gelek belge û îspat e, komên qewmên Sibîrya Başûr ku proto Tirk jî di nav wan de ne, BZ di salên 9000-7000 de ji aliyekî ve diçin başûr, yanî Çîn, Kore, Japonya, Moxolîstan, Asya Navîn û hînê daketine aliyê rojava, beşekî din jî bi rêya Bendava Berîng a di navbera parzemînê Asya-Emerîka de derbasî parzemîna Emerîkayê bûne. Çi taybetiyên nijadî û çi jî yên etîmolojîk bi xurtî van tespîtan destnîşan dikin. Dîsa di heman demê de şoreşa neolîtîk - şoreşa gund û cotkariyê - a li sîstema Zagros-Toros pêk tê, ber peravên Okyanûsa Mezin û keviyên Çînê ve diçe. Tê texmînkirin ku hilberîneriya şoreşa neolîtîk qewmên behsa wan tê kirin xistine nav tevgerê. Demeke dirêj bi vê sîstema nû re hejmara şêniyan jî zêde dibe û bi vê ve girêdayî maneya koçberiyê heye. BZ di salên 2000 de şaristaniya yekemîn a tê zanîn li Çînê derdikeve holê. Di avakirina şaristaniya van qewman de Çemê Zer jî rola Nîl, Dîcle-Firat û Pencabê dilîze. Bi îhtimaleke mezin, piştî ku li dora Çemê Zer şaristanî pêş dikeve, êdî timî li êrîşên qewmên hawîrdorê jî rast tê.

Jixwe çavkaniyên Çînî di yekemîn belgeyên xwe yên nivîskî de BZ di salên 200 de ji qewmên hawîrdorê behsa êrîşên Ûygûriyan dikin. Bi giştî tê qebûlkirin ku Ûygûrî Proto Tirk in. Di dîroka fermî ya Tirk de jî kronolojiyeke bi Mete Xan BZ di salên 209 de dest pê dike heye. Em di gelek belgeyên dîrokî de dikarin bişopînin ku Proto Tirk hem ber bi başûr bi aliyê Çînê, Afganistan û Hîndîstanê, hem jî ber bi rojava aliyê Qazakistana îro û ji wir jî ber bi Ewrûpayê ve koçberî û tevgereke mezin dane destpêkirin. Cihê herî lê zêde bûne Kirgizistan, Qazekîstan, Tirkmenîstan û herêma Çîn Ûygur a îro ye. PZ di sedsala 4. de ber bi Ewrûpayê ve êrîşên mezin ên Hûnan dest pê dikin. Êrîşên li dijî Çîniyan bi ser nakevin berê xwe diguherîn. Li hemberî vê belavbûna li bakurê Derya Reş û Xezerê, li başûrê Xezer û Gola Aralê û ta Afganistanê di belavbûna wan de zêdebûn xuya dike. Bi zêdebûna şêniyan û zuhabûna çolberiyê koçberî jî zêde dibe. PZ di sedsala 6. de êdî sînorên Îranê nikarin xwe li koçberiyê rabigirin. Tengavbûna van sînoran ta serdema împaratoriya Persan dewam dike. Çîrokên Efrasiyap û Tûran ta ji vê demê man e.

Îslamiyet PZ di sedsala 7. de xwe spart sînorên Asya Navîn û vê yekê di dîroka Tirkan de demeke nû vekir. Dewleta Goktirkan a berê hatibû avakirin û dewleta Ûygûran a paşê hat avakirin, ji ber ku konfederasyon bûn, em dikarin texmîn bikin ku tecrûbeyeke wan a dewleta navendî nîne. Ta wê demê dewleta navendî rastiyeke li Asya Navîn demeke dirêj nehatiye jiyîn. Ezmûnên konfederasyonan ên bi bandora Çîn û Hîndîstanê pêk dihatin timî temenê wan bi qasî nifşek û du nifşan bû. Herî dawî împaratoriya Cîhanê ya Moxol jî nekarî vê rastiyê li dawiyê bihêle.

Tirk Îslamniyetê ji sedemên dînê zêdetir, bi armancên siyasî qebûl dikin. Eger Îslamiyetê qebûl nekin derfet û îmkanên koçberiyê xuya nakin. Di sedsala 9. de bi Îslambûyînê re yekemîn avahiyên siyasî bi lez derketin holê. Piştî begtiya Qerexaniyan yekemîn begtiya Selçûkiyan a li Mervê yekemîn ezmûna dewletê ya arîstokrasiya qebîleyên Tirk e.

Serketina Dandanakan a di 1040 de, di kevneşopiya dewletê ya Îranê de rê li ber xanedaniya Selçûkiyan vedike. Xelîfeyê Îslamê yê li Bexdayê di 1055 de Selçûk Beg wek sultan îlan dike û bi vî awayî sînorên xanedaniyê ji Derya Spî ta Afganistanê fireh dike. Di nav qewmên Tirk de yekem car di vê demê de li ser hîmên feodalîzmê cihêbûneke çînî pêk hatiye. Beşê arîstokrat ê dewletdar wek gelek begîtiyan li Rojhilata Navîn belav dibe û beşê xizan Tirkmen jî bi serê xwe di asta jêr de wek qewmên koçber bi şêwazê begîtiyan hebûna xwe dewam dikin. Tirkên di navbera sedsala 10.-15. de li Rojhilata Navîn bi cih bûn, hejmara şêniyên wan zêde bû û pê re bajarbûyîn û çînîbûyîn tevî dewletbûyînê di zikhev de pêş ketin. Piştî serdariya Selçûkiyan a li derdora sedsalekê di şûna wan de atabegî û begtî hatin damezrandin. Ji van begtiyan ên li Anatolê xwe kirin yek û navend Konya, Dewleta Selçûkiyên Anatolyayê ava kirin. Bi vî awayî, li Anatolyayê yekemîn dewleta Îslamî tê damezrandin.

Piştî demeke li derdora du sed salî (1076-1308) hînê li rojava Begtiya Osmaniyan li ser hîmê împaratoriya Bîzansan mezin bû. Ev begtî paşê bû navenda herî mezin a feodal û bi împaratoriya Xanedaniya Osmaniyên Tirk bi encam bû. Ev împaratorî di serdema pêşketin û mezinbûna kapîtalîzmê de li dijî Rojava ketiye rewşa parastina Rojhilat. Sedsalên 19. û 20. dibin sedsalên pêşketina netewiyeta bûrjûwaziya Tirk; di 1840 de Tanzîmat, di 1876 de Meşrûiyeta Yekemîn, di 1908 de Meşrûiyeta Duyemîn û ji bin xirbeyên şerê cîhanê yê yekemîn di sala 1920 de bi rizgariya netewî dibe dewlet û dema netew-dewlet a Tirk dest pê dike. Di dema

komarê de Tirk li Anatolyayê weke netewekî mayînde şekil werdigirin û di vê qonaxa dîrokî de ji sîstema civaka feodal ber bi sîstema civaka kapîtalîst werdigerin. Serhatiya Tirkan a li derdora hezar salî li Rojhilata Navîn komzîka wê Anatolya bû û li vir bûn dewlet. Dîsa bi dewletbûyînê re wergeriya netewa Tirkiyê û di van hemûyan de têkiliyên wan ên bi Kurdan re roleke stratejîk lîstine.

Mirov dikare têkiliyên Kurd-Tirkan di dîrokê de bibe ta vegotina efsanewî ya Zerduşt-Tûran. Seferên împaratoriya Pers-Medan bi ser bajarên Proto Tirkan - Îskîtan - aliyekî efsanewî daye têkiliyan. Di dema Part û Sasaniyan de qebîleyên Tirk nemaze li Îranê li bakur-rojhilatê eyaleta Xoresanê komzîka wan pêk tê û bi qebîleyên Kurd ên bi sedemên cuda li wir bi cih bûne re dikevin têkiliyê. Têkiliya bingehîn di dema serweriya sultanên Selçûkiyên Mezin de pêk tê. Li Iraq, Azerbegcan, Ermenîstan û Mezopotamya îro, qebîleyên Kurd û Tirk di navbera sedsalên 10. û 15. de bi têkilî û nakokiyên tevlîhev di nav hev de dijîn. Piştî Selçûkiyên Mezin, dewleta Akkoyînî û Karakoyînî û di serî de Artukogullerî û Atabegên Mûsilê gelek begtiyên Kurd û Tirkan bi hev re bûn. Di vê de dînê hevpar Îslam, li dijî wan dewletên Ermenî û Bîzans ên Xirîstiyan û paşê seferên Xaçperestan roleke stratejîk lîstine.

Gotina Kurdistanê jî Sultanê herî dawî yê Selçûkiyên Mezin Sultan Sencar - 1155 - wek yekîneya rêveberiyê bi kar aniye. Dîrok hemfikir e ku Sultan Alparslan dema herî dawî rêya Anatolyayê di sala 1071'ê de bi serketina Melazgirê vekir, duyemîn hêza mezin li cem cih girt Kurd bûn. Baş tê zanîn, Alparslan di wê demê de (15 Gulana 1071) diçe Ferqînê paytexta dewleta Kurd a Merwaniyan û ji wir bi xwe re hêzeke amade ya ji 10.000 kesî û ew qas jî hêza ji eşîran dibe. Maneya vê yekê ev e; eger desteka avahiyên siyasî yên Kurd nebûna, hebûna Tirkan li Anatoliyayê nedibû. Eger bibûya jî ji rîsk û xeterê xilas nedibû. Divê mirov xusûsekê baş bizanibe. Civakek li ser çi mêzînan hatibe damezrandin, demeke dirêj wê li ser wê mêzînê hebûna xwe dewam bike. Eger ji wê mêzînê bibe heta mêzîneke din bibîne wê hebûna wê bikeve bin rîsk û xetereke mezin.

Divê mirov têkiliyên Kurd û Tirkan ji vê dîrokê pêve bi du aliyan binirxîne rastire. Aliyê yekemîn ên siyasî yên bi dewletê re ne. Têkilî û nakokiyên begtiyên Tirk û Kurdan îfade dike. Dema yekemîn a van nakokî û têkiliyan ta 1050 ya hilweşîna Selçûkiyên Anatolyayê dewam dike.

Aliyê duyemîn ê di qada civakî û çandî de ye. Di vê demê de qebîle ketine nav hevdu û asîmîlasyoneke xwezayî dimeşe. Zêdetir

qebîleyên Tirk di nav çand û sosyalîteya Kurd de asîmîlasyoneke xweza dijîn. Di warê çandî û aştiyane de demeke dewlemend e. Hînê jî dewam dike. Bi komara Tirkiyê re bi zora siyasî ya tund a netewparêziya Tirk di nav netewa Tirk de dema asîmîlasyoneke tund dest pê kiriye. Kurd di vê demê de bi bandorên siyasî, civakî, ekonomîk, eskerî, perwerdeyî û hûnerî bi helandineke mezin a civakî re rûbirû hatine hîştin.

Dema duyemîn, wexta Împaratoriya Osmanî berê xwe dide rojhilat di dema Sultan Yawiz Selîm de wek dema têkiliyeke siyasî û stratejîk piştî sedsala 16. dest pê dike. Yawiz ji bo bi împaratoriya Sefewî ya li Îranê û dewleta Memlûk a li Misrê serî derxîne ji sedî sed hewceyî bi hêza begtiyên Kurd heye ku wê demê xwedî roleke stratejîk in. Dîrok dinivisîne ji bo vê îttîfaqê pêk bîne bi heqîban zêr û kaxizên sened ên li binî mor hene, şandine. Bi 24 begtiyên Kurdan re cuda cuda îttîfaqê dike. Yawiz tercîh dike ku ew di nav xwe de wek begtiyabegan bibin yek. Lê ji ber ku nakokiyên navxweyî dest û îmkan nadin, ew bi xwe begekîbegan li navend Amedê wezîfedar dike. Bi saya vê têkiliyê û tevlîbûna hemû began, berê di sala 1514 de li Wan-Çaldiranê Sefewî, di sala 1516 de li Sûriyê li bakurê Helebê Mercîdabik û di sala 1517 de li Misr Rîdaniyê bi serketina li dijî Memlûkiyan împaratoriya herî mezin a Rojhilata Navîn ava dike. Bêyî vê têkiliya stratejîk, ne têkbirina dewletên Îran û Misrê, nikare ji Anatolya Navîn wêdetir gavekê biavêje. Berovajî eger Îran û Misrê bi begtiyên Kurdan re li hev bikirana û bibûna yek wê vê têkiliyê dawî li Dewleta Osmanî bianiya. Jixwe têkiliyek bi vî rengî ya Sultanê Tirkmenan a Tîmûr hînê berê di sala 1402 de bi Şerê Enqerê bibû sedema hilweşîna Dewleta Osmanî.

Têkiliyên Kurdan bi sultanên Osmaniyan re ta serê sedsala 19. timî bi awayekî cihêwaz dewam kiriye. Begtiyên Kurdan gelek sîstemên cihêwaz ên hukûmet, begtî û senceqên ji bavan derbasî kuran dibin jiyîne. Ev sîstem ji ti welatiyên din re nehatibû bexşandin. Di karên xwe yên hundurîn de tam xwedî otonomiyekê ye. Her weha di warê çand, ziman û hunerê de li ti pêşbirriyê rast nayê û ta di warê ramanê de jî xwedî heman cihêwaziyê ye. Çand û zimanê Kurdî gelek berhemên xwe yên wêjeyî di vê demê de dane. Mînakek Destana Mem û Zînê ye. Serdestiya Kurdan a çandî û civakî dewam dike. Tenê dema Sultan dixwaze, ew jî bi dil û îradeya xwe, jê re xelatan dişînin û diçin seferan. Begên Kurd ên Sunnî têkiliyên wan bi sultanan re baş in. Îro jî gelek begtiyên têkiliya wan bi dewletê re baş in ji wan begtiyên berê ne, û bi piranî di nav

nîzama terîqeta Neqşî de cih digirin. Li hemberî vê yekê, berê Kurdên Elewî li Dewleta Sefewî ya xwedî Mezhebê Şîa ya li Îranê ye. Ji ber vê sedemê û zêdetir bi sedema bi azadiya xwe girêdayînê, timî hedef bûn. Di dema Yawiz de Qûyûcû Mûrad Paşa çil hezar Elewî xistin bîran, ya esas bi vê yekê niyet ew bû ku dixwestin xetereke stratejîk ji binî ve bidin aliyekî an jî ji holê rakin.

Ji serê sedsala 19. pêve di têkiliyên Kurd-Tirkan de demeke nû dest pê dike. Osmaniyên li hemberî Rojava tengav dibin hînê zêdetir hewceyî bac û eskeran dibin û bi vê sedemê bi dijwarî berê xwe didin Kurdan. Di encamê de pêvajoyeke xwînrij a îsyanan dest pê dike. Ev serhildan bi pêşengiya begên Kurdan ên xwedî otonomiyên berfireh dest pê dikin. Pêvajoya di sala 1806 de li Silêmaniyê bi begtiya Baban dest pê kir, di sala 1878 de vê carê bi pêşengiya şêxan dewam kir. Berxwedanên vê pêvajoyê di sala 1925 de bi Şêx Seîd û di sala 1937 de bi pêşengiya Seyîd Riza bi têkçûnê bi dawî bû. Hemû Kurd bi hev re beşdarî serhildanan nabin. Berxwedan di asta çeperan de dest pê dike, lê ti car nikarin xwe bigihînin asta netewî. Avahiya feodal li dijî vê yekê asteng e. Eger alîkariya Îngilîzan bi dewletan re nebûya, serhildan yek Bedirxan Beg (1843), yek Mehmûd Berzencî (1923) dikarîbûn bigihîjtana serketinê. Di roja me ya îro de Barzanî û Talabanî du lîderên dawîne bi koka xwe ya şêx û serekê eşîrtiyê temsîla vê xetê dikin. Ji ber ku têra xwe di veguherîna bûrjûwaziyê re derbas bûne û desteka stratejîk a welatên Rojava ew ber bi şensekî dawî yê tijî xeter ve ajotine.

Di vê dema dirêj a siyasî de mantiqê têkiliyên Kurd-Tirk ji bo şêwazê îttîfaqeke stratejîk li cih e. Hewcebûnê beramber ê her du aliyan jî vê îttîfaqa stratejîk ferz dike. Eger ji van têkiliyan dagerin, her du aliyê jî bi awayekî stratejîk têk biçin. Wexta Osmanî di Stenbol û Anatolyayê de asê bûn, begtiyên Kurdan rewşa wan a otonom a hebû, bi giranî wendakirin û ji hêzeke siyasî û civakî derketin. Îttîfaqa stratejîk xwe dispêre hîmekî têkûz ê dîrokî û civakî.

Di têkiliyên çandî û civakî de bidin aliyekî qedexekirinê, di roja me ya îro de bi awayekî xeyal nayê kirin rewşeke serbestiyê heye. Jixwe bi darê zorê helandina etnîsîteyan encameke polîtîkayên biyo-îqtîdar ên kapîtalîzmê ne. Di ew rejîmên feodal de ku em wan naecibînin, asîmîlasyona çandê bi awayekî etîkî nayê fikirîn. Di têgihîştina însanî de pêkanînek welê nîne. Di hemû organîzasyonên siyasî yên serdema navîn de ev welê ye. Helandin û îmhakirina ziman û çandên gelan kirineke li derveyî exlaqî ya sîstemên kapîtalîst e. Tinebûna etîka kapîtalîzmê rê li ber vê yekê vedike. Tirk

berî ku bibin kapîtalîst bi vê sedemê dest bi ziman, dîn û jiyana çandî ya kesî nekirine. Kengî ber bayê îdeolojiya netewparêziyê ya kapîtalîzmê ketin, wê wextê polîtîkayên helandinê yên bi darê zorê û qurnazî dest pê kirin. Jixwe di dîrokê de asîmîlasyona xwezayî bi senteza beramber a çandan rê li ber dewlemendiyê vekiriye. Ji vî alî ve, yanî ji alî rêzgirtina ji ziman, dîn û hebûna çandan, Împaratoriya Osmaniyan ji dewletên îro yên Ereb, Fars û netewparêzên Tirk rejîmeke gelek pêşketîtir, azad û aliyê xwe yê însanî li pêş îfade dike. Di her warî de kapîtalîzm ji Serdema Navîn çêtir û azadker nîne, welê hesibandin belovajîkirin û xetayeke mezin e. Kapîtalîzm bi vî aliyê xwe barbarîzma modern îfade dike.

Li Tirkiyê pêvajoyên kapîtalîstbûyîn û bûrjûwazîbûyînê mirov dikare di nav çend deman de lêkolîn bike. Feodalîzma Navendî ya Osmanî di dîrokê de belkî jî beriya kapîtalîzmê şaristaniya herî mezin temsîl dikir. Li dijî kapîtalîstbûyînê taybetiyên rejîma herî berxwedaner îfade dikir. Li Rojhilata Navîn pêşketina kapîtalîst çend sed sal paşve xistiye. Di encama vê yekê de, Rojhilata Navîn tam nabe mêtingeh, nasnameya Îslamî tê parastin û pirsgirêkên modernîzmê yên her ku diçe giran dibin û heta roja me ya îro tên, paşve nayên xistin û ber çareser nebûnê ve hildikişin.

Bûrjûwazîbûyîna Rûm, Ermenî û Suryanî bi sedema nasnameya xwe ya Xirîstiyantiyê pir zû li netewparêziyê vebûn, lê ji ber bêmêzîniya mezin a di navbera hêzan de neçar pêvajoya tasfiyê jiyîn. Meyla komkirina sermayê û bidestxistina karê ya kapîtalîzmê berpirsiyarê esas ê vê pêvajoyê ye. Kapîtalîstbûyîna zû ya hindikayiyan, zû rê li ber şer û tasfiyekirina wan vekiriye.

Kapîtalîstbûyîna esas a xwe dispêre dewletparêziyê Partiya Îttîhad û Teraqî da destpêkirinê. Partî, berê bi nasnameya xwe ya Panîslamîst hewl dide hemû welatiyan di vî warî de veguherîne, lê ji ber ku netewparêzî di nav hemû qewmên îslamî de zû belav bû di vê yekê de bi ser neket û bû sedem ku parçebûna împaratoriyê hînê bi lez bibe.

Em dikarin dema kapîtalîstbûyîna Komara Tirkiyê ya li ser bermahiyên Împaratoriyê ava bû, di sê qonaxan de binirxînin. Di qonaxa yekemîn de avahiyên jor ên kapîtalîzmê û zêhniyeta wê esas tê dîtin. M. Kemal Ataturk ji Şoreşa Fransî sûd wergirt, komar û her cure saziyên wê damezrandin û vê hewldana wî ya esas xwe dispart zêhniyeta Rojava. Ya esas, pir dereng ketibe jî, hewl hatiye dayîn bi rêbazên şoreşgerane lê bi zirxekî teng ê millî pêvajoya Ronesans, reformasyon û ronahîbûnê were pêk anîn. Pêşketina di nav çend sed

salan de li Ewrûpayê pêk hat, pir bi lez xwestin bi zirxekî teng ê netewparêziyê pêk bînin. Her çend vê hewldanê rê li ber pêşketinên girîng vekir jî lê nekarî bûrjûwaziyeke şoreşger biafirîne. Zêdetir di nava dewletê de burokrasiyeke kapîtalîst a têr tevdigere û qonaxa yekemîn pêk anîn. Ta salên 1950 kapîtalîzma dewletê ya burokratîk û kolektîf pêş ket, ji vê tarîxê û pêve wexta di nav mêzîna Rojhilat-Rojava de Rojava tercîh kir, qonaxeke bi giranî kapîtalîzma taybet bi xwe re anî û neçar da jiyîn.

Dema DP'ê dema bi lezbûna kapîtalîzma taybet e. Di serî de li bajarên mezin mîna Stenbol, Îzmîr, Edene li çend bajarên mezin kapîtalîzma taybet a yekdest pêş ket û bi derbeya sala 1960 xwestin wê rawestînin. Ya esas, darbe berhemê nakokiya navbera kapîtalîzma dewletê û kapîtalîzma taybet e. Ji qonaxa kapîtalîzma dewletparêz a otorîter derbasbûna qonaxa kapîtalîzma taybet a olîgarşîk her çend bi êş û pevçûn be jî bi lez bûye. Di dema DP'ê de piranî nûnerên kapîtalîzma cotkarî û bazirganiyê beşdarî olîgarşiyê bûn, lê di dema AP'ê de (1960-1980) beşên pîşesaziyê giraniya xwe nîşan dan. Di dema navbera salên 1980-2000 de bi piranî bi hukûmetên giraniya ANAP'ê tê de hebûn, beşên sermaya malî têra xwe hêz bi dest xistin. Di nav dewletê de jî para artêşê zêde bûye. Beşên sivîl giraniya xwe ya berê ji dest dane. Tebeqeya jor a Kurd ku di pêvajoya destpêkê ya komarê de hatibûn tepisandin, di navbera salên 1950-2000 de bi hin beşên cuda re jî bibin hewl dane cihê xwe di nav olîgarşiyê de bigirin û biparêzin. Kesên herî zêde girêdana xwe bi îdeolojiya dewletê re nîşan dane cihêwaziyeke taybet ji wan re hatiye naskirin.

Netewparêzî mora xwe li îdeolojiya van her du qonaxan jî dixîne. Piştî salên 1950 sentezkariya Tirk-Îslam, komzîkên faşîst şoven û Îslamtiya bi şêwazê terîqetan her ku diçe di nava dewletê de dibin xwedî giranî. Netewparêziya di dema M. Kemal Ataturk û Îsmet Înonî de zêdetir bi çanda Rojava xwe xwedî dike, lê piştî salên 1950 bi sedema polîtîkayên antî-komînîst ên DYE bi îdeolojiyên netewperest, faşîst û dînî yên paşverû xwe xwedî kiriye. Tebeqeya jor a Kurd bi navbeynkariya ji asîmîlasyon û înkarkirineke dijwar re dike, dikare hebûna xwe dewam bike.

Di van deman de rewşa tebeqeyên gel ên li derveyî kapîtalîzma taybet û dewletê man, ji qederwariya kevneşopî wêdetir tiştek nîne. Pêngaveke demokratîk pêşve nehatiye xistin. Gavavêtinên çepgir ên klasîk hînê xwe di nav gel de nîşan nedane hatine tepisandin. Piştî serhildanên Kurd dejenereya çandî ya gelê Kurd bi lez bûye û hema

bêje ew êdî ew nîne. Ji rengê xwe hatiye derxistin. Nerazîbûna giştî ya vê pêvajoyê Tevgera PKKê îfade kiriye. Eger mirov PKKê tenê wek tevgereke Kurd bibîne wê nirxandineke kêm be. Ya esas, wek nerazîbûnek li dijî hemû hêzên îdeolojîk, siyasî û dewletparêz ên li ser çar parçeyên Kurdistan û Tirkiyê pêş ketiye.

Li Tirkiyê, em qonaxa sêyemîn a kapîtalîzmê dikarin di bin navê kategoriya bingehîn a 'Kapîtalîzma Anatolê' û pêşketina sermaya navîn-KOBI'yan de wek qonaxekê binirxînin. Em dikarin ji vê re bibêjin şoreşa kapîtalîzma Anatolyayê jî, ji ber ku nifşê sêyemîn kapîtalîstbûyîneke Tirk e. Nifşê yekemîn kapîtalîzmeke Tirk a kolektîf û buroratîk bû, nifşê duyemîn jî kapîtalîzma taybet a yekdestî bû û herî dawî jî sîstem bi nifşê kapîtalîzma Tirk a Anatolyayê temam dibe. Ji bo patrontiya sereke ya kapîtalîzma Anatolyayê AKP namzet e. Her çiqas sermaya Anatolyayê di dema DP, AP û ANAP-RP'ê de pêş ketibe jî AKP hewl dide wek tevgereke siyasî ya serbixwe xwe xwediyê rastîn ê navenda siyasî konsolîde û temen dirêj bike. Her weha hewl dide beşê Kurdan ê bûrjûwazî bûye bigire nava xwe.

Di dema Komara Tirkiyê de têkiliyên Kurd-Tirkan dikevin dema xwe ya herî krîtîk. Li ser zemînê zêhniyetê di şûna îdeolojiya kevneşopî ya Îslamê de têkiliyên netewparêzî rûdinên. Netewparêziya Tirk ji der ve ve bi du çavkaniyan xwe xwedî dike: Ya yekemîn, agahiyên civakî û dîrokî yên rewşenbîrên Tirk ên Kazan di ser Ewrûpayê re bi destxistibûn. Ev rewşenbîrên Tirk di bin zexta Çartiya Rûs de bûn. Bi vî awayî karîbûn hebûna dîrokeke Tirk li derveyî xanedaniyên Osmanî bi rêkûpêk pêşkêş bikin. Ya duyemîn, hewldanên Împaratoriya Elman a di mêtingehkirinê de dereng maye. Împaratoriya Elman li rojhilatê xwe ji bo li Asya Navîn belav bibe xwestiye û hewl daye komên Tirkan hem bikişîne ramanên Panîslamîst, hem jî bikişîne ramanên Pantirkîst. Bi her du cureyên îdeolojîk bawer dike ku li dijî Çartiya Rûsyayê serî rakirinên Îslamîst û Tirkîtiyê destek bike wê karibe firsenda belavbûnê bibîne. Doktrîna navdar a Elmanan Ostpolîtîk - polîtîka Rojhilat - destek û hewldanên bi vî rengî ferz dike. Ji salên 1880 ve, Elmanya di şûna Îngilîstan û Fransayê de timî li ser Împaratoriya Osmanî bandora xwe pêş dixîne, ji şerê cîhanê yê yekemîn têkçûyî derdikeve û Împaratoriya Osmanî jî bi xwe re dibe hilweşînê.

Netewparêziya Firqeya Îttîhad û Teraqîperwer xwedî kareketereke nijadperest e ku çavkaniya wê Tirkên li der ve û Elman in. Ji ber ku xwe bi netewparêziya Elman xwedî dike dibe xwediyê

vê karekterê. Dîrokzanên Elman di wê demê de li pey nijadeke safî ne. Netewparêziya Îttîhadxwaz li gorî xeta belavbûnê ya Elmanan hewl dide hemû cîhana Tirkîtiyê li bin ala netewparêziya nijadperest kom bike. Ji ber ku ev helwest ji rastiya civakî û dîrokî qut e, Împaratoriya Osmanî êşa vê helwestê bi dijwarî dikişîne. Tevî vê yekê, netewparêziya tevgera bi pêşengiya Mistefa Kemal ku Komara Tirkiyê bi şerê rizgariya netewî li ser xirbeyên împarartoriyê ava kir, cuda bû. Mistefa Kemal xwe dispêre şaristaniyên çandî yên Anatolyayê, bi çanda ji Sumeran ta Hîtîtan netewparêziyeke çandî dike yan jî mirov dikare bibêje welatperweriya Anatolyayê dike. Mistefa Kemal bi xwe jî li vê netewparêziya xwe ya cuda hayedar e. Bi israr gelek caran jê re pêşniyar hatiye kirin ku navê komara nû hatiye damezrandin bibe 'Komara Tirk' lê wî ev pêşniyar red kiriye bi navkirina wek Tirkiye - yanî ne di çarçoveya nijad de di çarçoveya welat de - li cih dîtiye. Xwediyê wê têgihîştinê ye ku her nijad, qebîle û netewparêzî yan jî hînê rastir her welatperwerî dikare bi xoşewîstî di nav de cih bigire. Mumkîn nîne mirov ji vê netewparêzî yan jî welatperweriyê re nijadperest bibêje.

Lê hin rewşenbîrên dewama Îttîhadxwazan vegotina xwe ya nijadperest wê dewam bikirana. Nemaze di netewparêztiya Nihal Atsiz de kesên ji Cihûtiyê vegeriyane û gelek kesên ji nijadên din hatine dewşirmekirin pir bi awayekî seyr û rastîn têne destnîşankirin. Kesên ji eslê xwe vegerîne û kesên dewşirme, hem di dema Osmanî de, hem jî di dema Komarê de wek komên herî xeter ên Tirkîtî û dewletê xira dikin, têne bi navkirin. Ev têgihîştin di sala 1948 de wek Partiya Millet û di sala 1960 de wek Partiya Tevgera Netewparêz xwe digihîne heta îro. Netewparêziya Anatolyayê jî berê di nav Firqeya Gel a Komarger de hişk e, piştî salên 1960 bi vegotineke sosyal demokrat tiştekî di cewherê xwe de naguherîne û venaguhere tê heta îro. Îdeolojiya netewparêz di hemû partiyên din de yên çi çepgir, rastgir û Îslamî timî bi rêjeyekê hebû û dewam kir, dike. Li Tirkiyê her çend kapîtalîzm pêş ket, rastiyek e, ku netewparêzî ji dewletê derbasî civakê jî bû û di nav civakê de jî wek zêhniyeteke bingehîn kûr bû û pêş ket. Di bavikantiya Tirk de şûna xanedaniyê digire.

Netewparêztiya Tirk bi vî aliyê xwe bi xusûsiyetên baviktiyê pêş ketiye. Paşvemayîna wê di warê kapîtalîzmê de li ser vê yekê bi tesîr e. Lê îdeolojiya Îslamê jî bi tevahî nehatiye terikandin. Di dema komarê de Diyanet di asta wezaretê de heye û nemaze aqîdeya Îslamê ya sunnî kontrol dike û hewl dide kontrola civakê jî bi giranî

bi vê şêwaza goya laîst, dewam bike. Laîsîzm di vir de wek rastiyeke sosyolojîk nîne, mîna parçeyeke îdeolojiya fermî ya dewletê xwedî fonksiyon e. Fena ku bi kontrol dîn bi modernîzmê re li hev bînin. Di dema komarê de şêweyên din ên îdeolojîk zêde pêş neketine, yên dewletparêz (Di Komara Tirkiyê de heta îro hemû partiyên rastgir-çepgir dewletparêz in), lîberal, ekolên sosyalîst, terîqetên Îslamî yên veşartî û nîv-veşartî dixebitin têne temsîlkirin. Ji bo zemînê îdeolojîk ê komarê bi awayekî zanistî be, her çend Mistefa Kemal Ataturk bi xwe pir hewl dabe jî serketineke pir bi sînor bi dest xistiye. Gelek vegotinên kapîtalîst ên çepgir-rastgir û kevneşopiyên feodal ên Îslamî ku ilmîbûna wan bi guman e, di nav hev de zemînekî şolî afirandine.

Damezrandina eskerî û siyasî ya komarê di hundur û der ve de xwe dispêre mêzînên balkêş. Pêşengtiya Mistefa Kemal Paşa ji bo şerê rizgariya netewî bibe serketinê ji zemînê germ ê Şoreşa Bolşevîk a di sala 1917 de yekem car di dîrokê de li dijî kapîtalîzmê pêk hat destek wergirt. Her weha li dijî gefa jiholêrakirin û parçekirinê ya dewletên hevpeyman ku Ingilîstanê serkêşiya wan dikir, girseyên gelê Kurd û Tirk li dora stratejiya Mîsaqê Millî gîhandin hevdu. Hem di warê herêmî û netewî de tevgera rizgariya netewî organîze kir û di bin vê mêzîna eskerî û siyasî de serketin bi dest xist. Pêşengtiya Mistefa Kemal Seltenet û Xîlafetê bi dawî dike û modela Komara Fransî rehber dibîne, ya esas şoreşeke siyasî ya ciddî pêk tîne. Hilweşandina avahiyeke dînî û xanedanî ya kokên wê diçin hezarsalan û di şûnê de îlankirina komarekê pratîkeke şoreşgerî ya ciddî ye.

Rotaya Komarê ya salên 1920-1945'ê li ser mêzîna şer a di navbera sîstema kapîtalîst û sosyalîst de pêş dikeve. Mêzîn piştî salên 1945'ê giraniya xwe ber bi aliyê kapîtalîzma bi pêşengiya DYE nîşan dide. Di vê çarçoveyê de Komara Tirkiyê jî li cem van pêşketinan helwesta xwe diyar dike û berê ji aliyê eskerî ve di nav NATO'yê de û paşê jî di warê ekonomîk, civakî û siyasî de hewl dide bi ser sîstemê ve bibe. Ev pêvajo bi DP'ê re bi lez dibe, bûyerên siyasî yên komargeriya otorîter ber bi komara olîgarşîk ve dibin, di aboriyê de bi pîşesazî û kapîtalîzma malî re dibin yek. Piştî salên 1980'yî li gelemperiya dunyayê bi pêngava nû ya global a lîberal, dûrketina ji modela netew-dewlet û bi serbûna der ve re xwe digihîne qonaxeke nû. Piştî jihevketina Sowyetê, sîstema kapîtalîst a dunyayê ku bi pêşengiya DYE ye, êdî têra xwe dikeve rewşa kaotîk. Di warê eskerî, ekonomîk, siyasî, medyatîk û çandî de hema hema bi ser sîstemê ve

bûye, xuya dike. Tirkiya ku di nava NATO de li dijî Sowyetê rola baskekî lîst, di Projeya Rojhilata Navîn a Mezin de wek welatekî bereyî wê ji nû ve bi hîmên nakokiyên xwe yên dîrokî û civakî re rûbirû bibe - li gorî teoriya şerê şaristaniyan - wê nakokî û têkiliyên xwe nû bike û hewl dide bi avahiyeke nû ji nav vê rewşa kaotîk derkeve.

Têkiliyên Kurd-Tirkan li gorî bûyerên di dema Komarê de em dikarin veqetînin sê deman. Dema yekemîn, ji şerê rizgariya netewî heta sala 1940'î dewam dike. Di dema ketina pêvajoya rizgariya netewî de gewdeyê bingehîn ê civaka Kurd bi têgihîştina ummeta klasîk girêdana xwe ya bi çanda dewletê re dewam dikin. Li dijî dagirkeriya Ingilîz û Fransî ya li başûr bi refklekseke hevpar radiwestin. Berxwedana Mereş, Dîlok û Ûrfayê mînakekî xweser ê berxwedaneke hevpar ê Kurd-Tirkan e. Kevneşopiya dîrokî tê dewamkirin. Şîrîkatî û hevpariya dînî û qewmî heye. Ji serê şerê rizgariyê heta dawiyê îdeolojiya netewparêz eşkere hatiye ziman. Biratiya Îslamtiyê ya bi ser têgihîştina ummetê hînê roleke berçav dilîze. Jixwe Meclîsa Mezin a Komara Tirkiyê MMKT a di sala 1920 de hat avakirin, wek meclîseke hevpar a her du gelan tê qebûlkirin. Parlementerên Kurd bi awayekî fermî wek 'mebûsê Kurdistanê' têne bi navkirin. Di navbera her du gelan de ji nakokiya qewmî re cih nîne. Heta serhildana Kurd a Koçgirî ya di wê demê de qewimî, hewl didin bi heman espriya biratiyê biqedînin.

Rola Kurdan a stratejîk di damezrandin û îlana komarê de herî hindik bi qasî rola wan a stratejîk di serketina Melazgirê ya sala 1701'ê de, serketina Çaldiranê di sala 1514'an de û serketina Mercîdabik a di sala 1516'an de diyarker e. Di vê de para helwestên taktîk û stratejîk ên Mistefa Kemal Paşa diyarker in. Paşa bi nirxandina pir vekirî dibêje; "cihêbûna Kurd-Tirkan, hela hela dijbertiya her du aliyan bi hev re wê dawî li wan bîne." Bi vê nirxandinê sedema tevgera bi hev re ya her du aliyan destnîşan dike. Ji bilî hin tevdan û sorkirinên bi sînor, Kurd bi awayekî erênî bersiva vê bangawaziyê didin. Hem wek gel, hem jî wek beşên arîstokrasiya jor. Di sala 1925'ê de hin hêman di xirabûn û neyînîbûna rewşê de rol dilîzin. Ya yekemîn, tê fêmkirin ku komarê di çarçoveya netewparêziya Tirk de pêş bikeve, ummet yanî xelîfetî û seltenetê careke din paşve venegerin. Ya duyemîn, tebeqeya hevkar a Kurd rewşa xwe ya cihêwaz a berê ji dest dide û her roja diçe eşkere dibe ku wê di nav netew-dewleta Tirk de weke Kurd cih ji wan re neyê dayîn. Ya sêyemîn, çi pirsgirêka Kerkûk-Mûsilê ya Ingilîzan, çi jî

derbarê seltenet û xelîfetiyê de bandora tevdanê ya îdîayên xanedaniya Osmaniyan. Di serhildanan de Cemiyeta Tealî ya Kurd ku hin rewşenbîrên Kurd damezrandibûn, rola wê heye. Ji dawiya sedsala 19. pêve, netewparêztiya paşverû ya Kurd pêk hat û piştî Meşrûiyeta Duyemîn gelek komele û rojname damezrandin û li pey hin reformên Kurd beziyan.

Serhildanên Kurdan bi awayekî objektîf di navbera bermahiyên têgihîştina feodal a ummetê û netewparêziya Tirk a xwedî versiyona komarê de dikarin mîna dewamek serhildanên hundur - serhildanên Aznavûr û Yozgatê - werin fêmkirin. Fena şerê di navbera Osmantî û Komargeriyê de xwe bi şêweyekî li ser Kurdan nîşan dabe. Nêzî salên 1940'î dewam kirine. Em serhildanên di vê demê de jî dikarin veqetînin sê deman. Ya yekemîn, serhildana Şêx Seîd e, di sala 1925'ê de li derdora Hênê-Gencê dest pê kir. Bi şerê mewzî û çeperan ta sala 1928'ê dewam kir. Di bin bandoreke xurt a têgihîştina ummetê ya Osmaniyên dema nêz de ye. Bandora terîqeta Neqşî ya sunnî eşkere ye. Cihêwaziyên di dema Osmaniyan de ji dest çûne û di serhildanê de bandora vê yekê jî heye. Di armanc û hedefa wan de ji Kurdistanê wêdetir, daxwaza ji bo paşve anîna seltenet û xelîfetiya Osmaniyan xurtir xuya dike. Meyla ji bo dewleta dînî eşkere ye. Cemiyeta Azadiyê (1924) ya rewşenbîrên Kurd bi pêşengiya Xalid Cibrî ava kirin bi sedema serokatiya wan tê girtin pêşengtî nikare rola xwe bilîze. Bandora Ingilîzan sererast nîne. Helwestek Ingilîzan a şantajwarî li dijî Kemalîstan heye ku mîna bibêjin; "Eger hûn Mûsil-Kerkûkê bernedin, emê jî destekê bidin serhildana Kurdan." Vê yekê jî di xirabûn û neyînîbûyîna têkiliyên Kurd-Tirkan de roleke bingehîn lîstiye. Herçî Mistefa Kemal Ataturk di serê sala 1924'ê de li Konferansa Çapemeniyê ya Îzmîtê tîne ziman ku ew pirsgirêka Kurdan a azadiyê qebûl dikin û ji bo çareseriyê xwediyê lêgerînê ne.

Serhildan, helwestên muhtemel ên çareseriyê bi tevahî ji holê radikin. Meyla asîmîlasyon û tam tasfiyê derdikeve pêş. Mistefa Kemal di serhildanan de gefeke ciddî his dike ku xelîfe, Îngilîstan û hêzên ummetxwaz ên hundur ji bo komarê ji holê rakin di nav hewldanên hevpar de ne. Yek ji sedeman ev e, ku ew çend bi şîdet bi ser isyanan ve diçe. Ji pirsgirêkeke Kurd zêdetir, wek hewldanên ji bo hilweşandina komarê û di şûna wê de avakirina selteneta emperyalîzm û hevkaran dibîne. Serhildanên pişt re têne kirin hemû di heman çarçoveyê de têne nirxandin û heta wek fobiyekê bi heman bandorê ta roja me ya îro tê. Ev şikestineke bingehîn e, ji bo komar di dîroka xwe de bi awayekî neyînî nêzî Kurdan bibe. Lê herçî Kurd

bûn ku di damezrandina komarê de xwediyê rola hêmanê bingehîn bûn. Bandora şikestineke ev çend mezin rê li ber zordestiyeke anormal vekir ku ji nêz ve pêwendiya wê bi tehlûke û gefa me behskirî re heye. Bi vî awayî têgihîştina li gef û tehlûkeyê dibe sedem ku berê gavekê hilmê li Kurdan biçikînin. Bihêlin heq xwestin û li maf gerînê nahêlin were bilêvkirin û vê bêdengkirin û tepisandinê dikin mîna xeteke polîtîk. Bandora Ingilîzan, yanî provekekirina wê ya her du aliyan roleke pir texrîbkar û hilweşîner lîstiye. Dewletên mezin ên din ên Rojava jî di tasfiya gelên Ermenî û Asûrî de bi heman bandorê xwedî roleke diyarker in. Eger tev nedana, wê ev felaketê bi serê van gelan ve nehatana.

Serhildana di dema duyemîn de serhildana Agirî ye, ku ji sala 1928'ê heta 1932'ê bi pêşengiya Îhsan Nûrî Paşa dewam kiriye. Tevî ku ew jî xwe dispêre heman sedeman, lê ev serhildan hînê zêdetir xwedî rengekî netewparêz e. Bandora îdeolojîk a Cemiyeta Hoybûnê ku ji aliyê rewşenbîrên Kurd û Ermenî ve di sala 1928'ê de hevpar hatibû damezrandin, li ser vê serhildanê heye. Ji herêmtiyê wêdetir neçû. Di dema sêyemîn de serhildana Dêrsimê heye. Ya esas, Dêrsim heta wê demê timî herêmeke azad bû. Otorîteya navendî ya komarê li dijî xwe weke hebûnek wê dawiya wê bîne, dibîne. Hûrik mezin li herêmê timî isyan hene. Wek serhildana dawî di navbera salên 1937-1938'ê de digihîje asta herî bilind. Bandora wê heta roja me ya îro dewam kiriye. Herêm xwediyê kevneşopiya Kurd Elewî ye. Bi serhildana Şêx Seîd a Neqşî Sunnî re nebûne yek. Ev rewş di nav Kurdan de parçebûneke bingehîn e. Bandorek mîna ya Îngilîzan a di sala 1925'ê de Frensiyan jî ji sala 1936'ê ve ji ber meseleya Xetayê nîşan dan e. Ji bo serhildana Dêrsimê bi awayekî şedît were pelixandin ev bandora Frensiyan para xwe heye.

Mistefa Kemal û Îsmet Paşa derbarê serhildanan de serwext in ku mijar bi pelixandinê çareser nabe. Nexasim Îsmet Paşa di bîranînên xwe de nivîsiye ku wan di mijara dardakirinan de zêdegavî kirine. Lê hayil bûne ku ji bo komarê birîneke xedar vebûye. Ji lewra di şûna çareseriyê de sernuxumandina mijarê tercîh kirine. Jixwe nayê fikirîn ku netewparêziya netew-dewlet a serdest ku li gelemperiya dunyayê li rewacê ye, çareseriyeke din pêşkêş bike. Dema êşên wendahiyên Împaratoriyê jî li vê zêde dibe, daqurtandina Kurd û Kurdistanê wek alternatîfa bi tenê li naverastê dimîne. Ev helwest yek ji hêmanên bingehîn e, ku dibe sedem dawiyê li împaratoriyê jî bîne. Îngilîstanê bi çareseriyên lîberal ê pêş de birin, bandora xwe ya li ser dunyayê heta roja me ya îro dewam kir. Mirov

dikare serhildanan û tenkîla wan - tepisandina wan - wek du çewtiyên mezin û çalakiyên dîrokî yên ji ber avahiyên îdeolojîk û çînî hevdu proveke û dehf dane, binirxîne. Bêguman di vê de bandora avahiya sîstema kapîtalîst a netewparêziyê, faşîzmê û mêtingeriyê diafirîne esas e.

Di têkiliyên Kurd-Tirkan de dema duyemîn, dema bêdengiya mezin a di navbera salên 1940-70'yî de ye. Di şertên tund ê şerê cîhanê yê duyemîn de derketina tevgerekê zehmet bû. Di dema desthilatdariya DP'ê de bûyer û pêşketineke cuda derdikeve holê. Desthilatdariya DP'ê dema eşrafan ji nû ve derdixîne qatê dewletê, giregirên Kurdan jî ji bîr nake. Ji bo nerazîbûna zêde ya li dijî CHP'ê bi rêxistin bike pêşengên Kurd ên feodal, eşîrî û dînî derfeteke mezin pêşkêş dikin. DP'ê ji bo afirandin û pêşdebirina olîgarşiyê ev potansiyel kiriye hêzeke girîng. Tebeqeya jor a Kurd ku ji Kurdîtiyê hatiye kirin, ji cihê xwe yê di nava dewletê de razî ye. Xilasbûna ji belaya Kurdîtiyê û bûyîna Tirkparêzek baş, li gorî karektera wan a dîrokî ye. Ji bo hilgirtin û barkirina ziman û çanda Kurdî ti car mîna numûne û hempayên xwe rol nelîstine. Ji Sumeran ve jiyana bi ziman û çanda hêzên serdest tu dibêjî qey di genên wan de cih girtine. Rola wan a di serhildanan de jî ji pargirtina bi şantajê wêdetir ti maneya wê nîne. Di vê demê de ji bilî çend rewşenbîran pêve ti bandora Kurd nîne. Tenê bandora serhildana Kurd a li Kurdistana Iraqê bi awayekî nesererast heye. Dîsa bandora çend radyoyên bi zimanê Kurdî ji der ve weşanê dikin heye. Eger ev jî nebûna, wê pir zehmet bibûya ji bo Kurd li hebûna xwe hayil bibûna. Li aliyê din, dewlet polîtîkayeke asîmîlasyonê ya dijwar bi slogana "Welatî, bi Tirkî bipeyive" di asta gefxwarinê de dimeşîne. Mumkîn nîne pirtûk, rojname û kovareke bi tenê ya Kurdî were weşandin. Hewl didin bi vî awayî ser pirsgirêkê bigirin, ji ber ku bawer dikin wê ev yekê çareser bike. Ji hemû aliyan ve eşkerekirina rûyê rastîn ê van polîtîkayan têra xwe wê hîn bike û roleke rohnîkirinê bilîze. Ev polîtîkayê di salên 1970'î de lê vegerin.

Dema sêyemîn, bi tevgera ciwanan a sala 1968'ê dest pê kir û demek e, hînê jî dewam dike. Tevgera ciwanan a 1968'ê zêdetir bi cihokên çepgiriya Tirkiyê li ser ciwanên Kurd bi tesîr bûye. Di vê demê de ku şîroveyên Marksîst ên derbarê pirsgirêka netewî de gelek têne guftûgokirin, ciwan û rewşenbîrên Kurd ber bi salên 1970'yî berê tevgera DDKO afirandin, paşê dabeşî hin fraksiyonan bûn û xwestin bi tesîr bibin. Ji têkoşîna tund a îdeolojîk a di navbera salên 1970-80'yî de PKK bi xurtî derket û bi Pêngava 15 Tebaxê ya di sala

1984'ê de da destpêkirin, mora xwe li pêvajoyê - li gelemperiya Kurdistanê - xist. Di dîrokê de yekem car, tevgera azadiya Kurd li ser hîmê perspektîfa polîtîk û îdeolojîk a Kurdên kedkar - tevî pirsgirêkên girîng ên rê li ber vekir û pêşdebirina çareseriyên wan - heta roja me ya îro bi bandor tê meşandin.

Di Komara Tirkiyê de reform û veguherîna civakî

Em bi kurtî li ser têkiliyên Kurd-Tirk ên di dema komarê de rawestiyan. Ev dema me bi kurtî anî ziman, sedemên bingehîn yên xwe li hundur girtin û xetimîna dewlet û civakê destnîşan dike. Dewlet ji alî ewlekariyê ve li hemû pirsgirêkên civakî dinere. Hêja ye, û wê bi kêr were ku em di bin sernavê 'Tirk û dewlet' de nîşan bidin ka heta îro ev rewş çawa hatine. Ji dema Tirk ji Asya Navîn derketine baş dizanin ku tenê dikarin xwe bi şer biparêzin. Jixwe di navbera xwe de jî timî şerekî qebîleyan meşandine. Her gava ber bi Rojhilata Navîn ve diavêjin diyar e bêyî li dost û dijminekî rast neyên û şer nekin, ne dikarin pêş de û ne jî dikarin paşde vegerin. Her bûyer qanûnên şer diyar dikin. Bêyî şer dewama hebûnê muhtemel xuya nake. Ji ber ku Rojhilata Navîn ji Sumeran ve yek ji wan deveran e ku bi şer û îqtîdarê hatiye meşandin. Ji bo serdestiya li ser her bostek axê pêdivî bi şer û îqtîdarê heye. Dema qebîleyên Tirk nû têne herêmê, ev qanûn hînê jî bi dijwarî dimeşe. Belavbûna bi şer a Selçûkiyan ji awayê berê yên qebîleyên civakî yên koçber ên teng cudatir e. Bi Selçûkiyan re qebîleyên Tirk êdî bi awayekî dewletbûyî pêş de diçin. Ev pêş de çûyîna wan wek ponijîneke siyasî û eskerî ji bajarê Mervê heta Keleha Zîgetvar a Macaristanê wer dewam dike. Paşve gavavêtina wan jî bihost bi bihost bi şer bûye. Ji dorgirtina duyemîn li Wîyanayê heta şerê Balkanan ê Duyemîn di xwe vekişandinê de timî qanûnên şer li dar bûn. Tirk ne tenê civaka xwe ya hundur, her weha komên di bin destên xwe de jî bi otorîteya eskerî rê ve dibin. Hêza siyasî pêş neketiye. Sultan bi xwe di warê eskerî de di pozîsyona împarator de ye. Bi fermanên rojane civak û dewletê rê ve dibe.

Di dema komarê de eskeriye pêşengtiya sereke dike. Çawa ku komar bi şer hat avakirin, pişt re hemû sazîbûyînên bingehîn ên civakî û siyasî di bin kontrola nêz a eskeriyê de hatin damezrandin. Ev yek dibe ku li cem welat, qewm û netewekî din cudatir be, lê di têkiliyên Tirk û dewletê de ev rastî xwedî roleke serdest e. Wek qewm û netew dewletparêzî mîna ku di genên Tirkan de hatibe neqişandin cih girtiye. Dewletparêzî ne tenê ji bo çînên dewletê her tişt e, ji bo her beşê civakê jî bêyî dewletê nabe. Çawa bê Xwedê

nabe, bê dewlet jî nabe. Dewlet çiqas bi hêz û dijwar be, ew çend jî xwe di nav ewlehî û starê de his dikin. Qelsî û hilweşîna dewletê ji bo wan tê maneya îmha û mirinê. Rast e, helwesteke nepixandî ye, lê sedemên civakî dîrokî ev yek ferz kirine. Desthilatdariyê di nava xwe de bi dest naxin, ji destê yên din vedigirin, lewra çûyîna desthilatdariyê jî wê destên din ve bibe. Bi vê sedemê her cure mirin û îmha dikare pişt re were. Mirov vê têkiliyê ji bo Tirkan dikare wek rastiyeke dîrokî ya diyalektîkî destnîşan bike û bi van sedeman jî tê fêmkirin.

Komar hem li ser vê çandê hatiye damezrandin, hem jî bi sedema li dijî 'heft duwelan' şer kiriye û hatiye avakirin, ji bo xwe û civakê mijara ewlekariyê timî di rêza pêşîn de dîtiye. Li cem civakên Rojava rewş pir cuda pêş dikeve. Gelek koman hebûna xwe ne ku bi şer, bi helwesta xwe ya li dij bloka şer-îqtîdarê pêş de birine. Timî hewl dane bloka şer-îqtîdarê dorteng bikin. Ev çand hînê bi hêsayî rê li ber demokrasî û civaka sivîl vedike. Li rêza pêş cih dide mafê mirovan. Lê dîsa jî di têkiliyên civakî de kevneşopiya îqtîdarê û şer diyarker in. Cudabûn di warê têgihîştina felsefî û zêdebûnê de ye. Li cem Tirkan dewlet hem pir zêde heye û hem jî bi şîroveyên herî pîroz ên dînî û felsefî dijî. Ji lewra her tevgera were maneya bi sînorkirina dewletê wek civaka sivîl, mafê mirovan û heta huqûqê gerdûnî û rêzikên siyasetê mîna gefên li dijî ewlekariya dewletê têne fêmkirin. Di cewher de hînê jî bi demokrasiyê bawer nînin, ditirsin dewletê qels bike û hilweşîne. Ji sala 1945'ê ve lîstika demokrasiyê ya bi du partiyên olîgarşîk ve tê meşandin, hewl dane tam di bin koordîneyekê de rê ve bibin. Demokrasî li pêşiya dewletê mîna feq û xefikekê tê dîtin. Lewra kontroleke şidandî ti car nayê kêmkirin.

Nertina civakî ya bi çavekî navend-dewlet xwe di her saziyê de dide hiskirin. Tê qebûlkirin ku rêya hemû pêşketin û mezinbûnê di dewletê re derbas dibe, nemaze di eskeriyê re derbas dibe. Xebata di saziyên dewletê de hem şeref e, hem jî di warê bidestxistina jiyaneke misoger de jî peyda nabe. Civakek ev çend navend-dewlet eşkere ye, wê ji xwe piştrast nebe û nikaribe afirîner be. Civaka li ser navê dewletê mîna xwe ji bîr bike û ji xwe re fazîletê nas neke, wê nikaribe saziyên siyaseta afirîner, hêza ekonomîk, huqûq û civaka sivîl pêş de bibe. Li cem Tirkan ev helwesta dewletê herî xirab bandora xwe di pêvajoya krîzan de nîşan dide. Dema dewlet dikeve krîzê, ji ber ku alternatîfeke din a hêza çareseriyê nakeve rojevê krîz wek felaketekê tê nirxandin û wek kêliyeke man û nemanê tê hesibandin. Jixwe bêyî ku di her tiştî de çav li destê dewletê bin, divê

dewlet li sînorekî were sekinandin ji bo nebe bar û ev hem ji bo dewletê, hem jî ji bo civakê pîvana bingehîn a hemdemiyê ye. Ewrûpayê têgihîştina xwe ya dewletê di vê çarçoveyê de sererast kiriye û statuyeke bi kêr zevt kiriye.

Pirsgirêka partiyên siyasî û dewletê hînê seyr e û divê wek mijarek bi serê xwe were nirxandin. Bêyî îstîsna hemû partiyên siyasî bi zanebûn, an jî bi awayekî objektîf navend-dewletbûyînê esas digirin. Civak jî wek partiyan di rêza pêş de cih dide dewletê û bi vê yekê hînê ji serî ve fonksiyona xwe ji dest dide. Partiyên siyasî di serê wan saziyan de tên ku daxwazên civakê bi dewletê re dixin mêzînekê, timî civakê esas dibînin, civakê serwext û bi rêxistin dikin, lê li şûna ku van wezîfeyên xwe bikin timî li bendê ne dewlet şoreşê bike, yan li bendêne dewlet alîkariya polîtîk bide, yan jî zêdetir dewletê wek deriyekî kurtêlan dibînin. Ji ber van helwestan, saziyên demokrasî ji wan nabe, hînê ji destpêkê ve dikevin rewşeke antî-demokratîk û mîna ku partiyan bike duyemîn dewlet. Ev dewleta duyemîn jî dibe siya dewletê. Fena ku dewletekê têrê nekiribe, her partiyek dibe modelê dewletekê. Her kes xwe dixe şûna zilamtiya dewletê. Ji lewra xwe û hawîrdora xwe bi nîmetên dewletê xwedî dike û ev yek jî rêveçûna dewletê giran dike û zirara wê jî zêde dike. Li ti welatî mîna li Tirkiyê kevneşopiyeke xurt a 'partiyên dewletê' nîne. Eger hebe jî ev çend kûr û belavbûyî cih negirtine. Ji ber ku dewletê dixin navenda xwe, ev partî nikarin siyasetê bikin, nikarin polîtîkayên ekonomîk pêş de bibin; nikarin demokrasiyê pêş de bibin û mezin bikin, nikarin bibin xwedî qabîleyet ku herî kêm bi qasî dewletê amûrekî çareseriyê pêşkêş bikin. Ji lewra hem ji bo dewletê, hem jî ji bo civakê fonksiyona xwe wenda dikin. Ji ber ku gel jî li vê rewşa wan hayil bûye, di hilbijartinan de her partiya dixwaze dewletê xilas bike di sendoqê de dixeniqîne û bi vî awayî bê kêrbûyîna wan ispat dike.

Bi vî awayî partî nabin amûrên çareseriya krîzan, berovajî, bi xwe krîzan diafirînin. Nexasim piştî şerê cîhanê yê duyemîn, yek ji sedemên pêş neketina partiyan di pîvanên hemdem de ew e, ku partî di bin kontrola navendî de hatin hîştin. Her weha bûye sedem ku timî çavê civakê jî li destê dewletê be û çanda demokrasiyê pêş nekeve. Di roja me ya îro de ji bilî kêm caran - dema li muxalefetê ne - partî timî bûne dewletparêz û vê yekê jî bi xwe re krîzên aborî û siyasî yên îro anîne. Partiya sazûmankar a komarê CHP îro sedemê bingehîn ê tengbûna siyasî û pêş neketina muxalefetê ye. Ev rewş bi taybetî ji ber polîtîkayên wan ên dewletparêz e, ku bi dilê xwe li dijî PKKê û

berê jî li dijî tevgerên çepgir ên şoreşger, meşandine. Li şûna ku ji bo pirsgirêkan çareseriyê biafirînin, tercîh kirine ku bibin milê dewletê yê propaganda û ajîtasyonê. Vê yekê jî hem ew û hem jî dewlet bêyî çareserî hîştine û bûye sedem ku pirsgirêk mîna gidîş û lodan mezin bibin.

Li cem Tirkan ev şêwazê rêveçûn û pêkhatina dewletê zêdetir xwe di rastiya Kurd û pirsgirêka wî de nîşan dide. Rastiya Kurd û pirsgirêka wî, ji bo fêmkirina dewletê di serê wan nîşaneyên veşertî û eşkere de tên. Dewlet ji nîşandana cudahiya xwe heta pirsgirêkê Kurdan tam pirsgirêkeke ewlekariyê dibîne. Ji lewra yan Kurdan tine dihesibîne, yan jî daxwazek wan a herî piçûk wek tehlûke û gefeke xeternak a divê yekser were pelixandin, fêm dike.

Di bin vê helwesta dewletê de neçariya îdeolojiya netewparêziyê radizê. Eger netewparêzî wek nexweşiyekê lê negeriya, wê bi vî awayî li rastiya Kurd neneriya. Çawa ku di dîrokê de jî hat dîtin meyla yekîtiyeke nêzî hevdu xurtir e. Nêzîkbûna Kurdan ji bo dewletê bi qasî ya Tirkan nebe jî li dijî tehlûke û gefên der ve dewletê wek amûrekî hevpar dibîne. Me ev helwesta Kurdan di dema Osmanî û damezrandina Komarê de dît. Têgihîştina netewparêziyê ya xwe dispêre yek dîrok, yek ziman, yek netew û yek dewletê, bi bandora serhildanan re jî para Kurdan asîmîlasyon û pêşavtinên bi darê zorê ketine û Kurd li derveyî pêşketinên siyasî, civakî û aborî yên sîstemê hîştine. Êdî Kurdê di her warî de çavkaniya tehlûkê werin dîtin. Kurdê herî baş, Kurdê mirî ye. Eger çareserî ji sedî sed li gorî dilê Tirkan be jî dîsa Kurd nikarin xwe ji vê gefê xilas bikin. Livandineke herî piçûk a Kurdan, daxwazên wan ên civakî û siyasî wek 'cihêtîxwaziyê' têne morkirin. Di vê helwestê de ne zanistî, hemdemî û heta ne jî serdema navîn heye. Ji ber ku netewparêzî cudahiyeke piçûk jî yan sedema gefxwarin an jî daqurtandinê dihesibîne, naxwe tiştekî din nîne. Ji lewra li derveyî têkoşînek bi hemû amûrên çandî, civakî, aborî, siyasî û eskerî çareyek din nafikire.

Di dema Tevgera Azadiyê ya Kurd a bi pêşengiya PKKê de ev polîtîka hem ji aliyê dewletê ve, hem jî ji aliyê civakê ve, çi siyaseta çepgir çi ya rastgir wek armanceke pîroz qebûl kiribû. Di her tiştî de bi navê yekparebûn û yekîtiya netewî rabûn û her daxwaza aliyê din a bi awayekî demokratîk bi cihêtîxwaziyê hat morkirin. Ev jî kêm nebû, li vê polîtîka 'terorîst' jî hat zêdekirin. Di çaryeka dawî ya sedsala 20. de hemû derfetên dewletê ji bo PKK terorîst were îlankirin di siyaseta der ve de hat serfkirin. Encam, kaos û krîza ji

salên 1990'î ve bû. Seferberiyeke topyekûn hat îlankirin. Huqûq bi erdê re kirin yek. Ekonomî ket çirava deynan û tê de bist bû. Siyaset tenê bû amûrekî polîtîkayên ewlekariyê. Cerdevanî û terîqet ji nû ve xistin rojevê û di nava Kurdan de eşîrtî û terîketparêzî xurt kirin. Li başûr destek dan komên Kurd ên netewparêzên paşverû û heta gihîştin Dewleta Kurd a Federe. Deriyên dewletê ji şêxên Neqşî yên Kurd re hatin vekirin. Saziyên bingehîn ên komarê radestî dijberên komarê hatin kirin. Mirov nikare ji vê re serketina 'Pîrûs' jî bibêje, ev îflasa polîtîka kor a netewparêziyê ye. Bi Projeya Rojhilata Navîn a Mezin a DYE dîsa vegeriyan serî: Yan tê bi Kurd re bimeşî, yan jî tê werî rawestandin! Di şerên nû yên dunya hemdem de jixwe wekî din tu nikarî bimeşî.

Di vê nuqteyê de bêyî ku bahane bêne nîşandan, divê 'reformên ji bo komarê' werin kirin, naxwe ne pêşketin, mumkîn nîne avahiyên heyî jî bêne parastin. Ezmûnên di van sal du salên dawî de ev rastî baş nîşan dane. Xwedêgiravî dewlet gelek reforman dike. Lê ji ber ku dest nade make û dayika reforman hemû yên têne kirin, nikarin xwe ji bê qîmetbûyînê xilas bikin. Ji ber ku pirsgirêka bingehîn a wan dixetimîne li naverastê radiweste. Ya esas, civaka li ber gavavêtineke mezin e, bi sedema pirsgirêka Kurd di nava xwe de asê bûye û nikare ji tengbûnê xilas bibe û neçar tê hîştin timî xwe bispêre aliyê rast û bi vî awayî xwe ji veguherîneke dîrokî dike. Dîsa partiyên navend-dewlet bi sedema vê pirsgirêkê timî tasfiye dibin û di şûna ku bibin amûrên demokratîkbûyînê, berovajî, dibin astengên li pêşiya vê yekê. Xetimîna di komar û civakê de êdî gihîştiye wê astê ku xwe spartiye zêhniyeta ferd û zarokan. Nayê fêmkirin ku muhafezekariya rastgir neçar nîne bibe çarenûsa şoreşgeriya komarê. Polîtîkayek di dema Mistefa Kemal Ataturk de ku li gorî şertên xwe dibe xwedî hin sedem be, dike mîna tabûyek nayê guhertin û niha jî wendahî û êşên wê têne kişandin. Encamên bê polîtîkbûyîn û serokatiyê hêrsa hemû civakê derxistiye asta herî bilind. Eşkere, eger demokratîkbûyîneke rastîn tê xwestin, ji bo di dewletê de reform û di civakê de veguherîn wek qonaxeke dîrokî bibin xwedî mane, divê baş were fêmkirin ku ev hemû bi azadiya yek ji hêmanên bingehîn ê komarê Kurdan dibe.

Dîrok carek din, li gorî demên berê yên stratejîk hewceyî bi gavavêtinek ber bi yekîtiya azad a Kurd û Tirk dibîne. Ji bo rewşa kaotîk a Rojhilata Navîn li dawiyê bimîne, modela her rastîn bi yekîtiya azad a Kurd û Tirkan dibe. Çareseriyên koalîsyona global ên DYE serkêşiya wan dike, îhtimaleke xurt heye rê li ber derketina

pirsgirêkên nû vekin. Rewşa Ereban ji çareseriyê zêdetir nêzî afirandina neçareseriyê ye. Statukoya ekonomîk û siyasî ya heyî ji xurtkirina nakokiyan wêdetir ti encamê nade. Di demeke nêz de xuya nake ku polîtîkayên bi Îsraîlê ve hatine kirin li dawiyê werin hîştin. Îran bi xwe, pirsgirêkên wê bi sîstema serdest a dunyayê re hene. Îhtîmaleke xurt e, krîza bi Îranê re mezin bibe.

Li dawiyê Tirkiyê dimîne. Tirkiyê di rastiya Kurd de li dora xwe dizîzike. Heta xwe ji vê yekê xilas neke, wê timî bi krîzan re rûbirû bimîne. Di encamê de wê polîtîka DYE ya xwe dispêre Kurdan xurt bibe û wê ji afirandina Îsraîl-Filîstîniyên nû dûr nesekine. Hemû dîrok, dîroka nêz û rewşa rojane nîşan didin ku alternatîfa herî nêzî veguherîna demokratîk a herêmê wê bi avakirina sîstematîka têkiliyên Kurd-Tirk a ji bo çareseriyeke demokratîk bibe. Eger ev alternatîfa çareseriyê bi têgihîştineke sosyolojîk zanistî were lêkolîn, wê were dîtin ku ji bo yekîtiya dewlet û yekparebûna netewa Tirkiyê tehlûke nîne, berovajî, wê alîkariyeke xurt bike. Ji bo vê jî, pêwîste têgihîştina Tirkiyek li cudahiyan wek dewlemendî dinere û ji netewparêziya şoven dûrketî hebe, divê dewlet ji nepixandineke bêmane were xilaskirin û bi 'xizmeta gelemperiyê û ewlekariya giştî' were bi sînorkirin û 'reformek komarê' ya xwedî argumanên bingehîn ên wek azadiya cinsî ya civakî û têgihîştinek xwe spartiye civakeke demokratîk û siyasî ya di navê de civaka ekolojîk jî heye - veguherîna civakê - qebûlê bibîne. Tevî veguherîna zêhnî ya li van sê qadên bingehîn, îhtîmaleke xurt e, reformên siyasî û veguherîna civakî ji bo derketina ji kaosa li Rojhilata Navîn rêya herî rast û çareseriya wê ya exlaqî bide.

Wek encam em dikarin bibêjin; pêvajoya veguherîn û reforman a li pêşiya Komara Tirkiyê û civaka wê ku xwe dispêre pirsgirêka Kurd, wê hewl were dayîn bi têkoşîna nakokî û têkiliyên di navbera sê meyl û rêyan de bi awayekî mayînde diyar bibe. Kîjan meyl û rê mayînde û sereke bibe wê bi têkoşîna aliyan a aqil, exlaq û polîtîk (perwerde, rêxistinî û çalakî) diyar bibe.

a) Rê û meyla yekemîn, paradigma û pratîkên netewparêz in. Statukoparêz in. Di dema nêz de hînê jî hebûn û bandora xwe bi dijwarî dewam dikin. Xwe li hundur girtin, cihêtîkarî û şîdet pratîk û paradigmaya wan a netewparêziyê ye. Ev meyl li aliyê Tirk bi netewparêziyeke bi nijadperestiyê barkirî, bi awayekî tund dewletparêz e, di nav civakê de bêyî li rastgir û çepgir bipirse bi muhafezekariyeke muteasib hebûna xwe dewam dike. Dewlet û netew heta wek civak, ew çend xwedî helwesteke şîzofrenîk e, - timî

bi pêhesîneke paronayak - wer bawer dike ku kelaha dawî ya Tirkîtiyê têk diçe, dîn û îman ji dest dihere. Di nav bîst û çar saetên rojê de 'propagandaya Tirkîtiyê ji Tirk re' wek wezîfeyeke bingehîn dizane. Erkên Îslamiyetê jî îhmal nake; wer bawer dike ku wê ev zêhniyetê rewşê xilas bike. Dema dor were xwe ji Ataturktiyê jî nake û pê ve dizeliqe. Lê rastiya Ataturktiyê di serê projeyên guhertinên girîng ên sedsala 20. de tê. Bêyî ku maneyê bide cewherê Ataturktiyê, pûtperestkirina mijarê li gorî hesabên wan tê. Nemaze di serî de bi mijarên wek hemdemî, jin, zanist û komargeriyê re di nav rewşeke nakok de ye, lê tevî vê jî îstîsmarkirinê wek rêbazeke xurt dewam dike. Hem li saziyên fermî yên dewletê, hem jî di nav civakê de bi awayekî zêde Ataturktiyek ne di cewher de di gotinê de heye.

Nexasim ev meyl ku li cem du partiyên siyasî di kevneşopiya CHP û DP'ê de li du bazkan têra xwe muhafezekar bû, bi mezinbûna Tevgera Azadiya Kurd piştî salên 1990'î wergeriya dûvikekî siyasî yên çalakiyên kontrgerîlla. Hewl da gelek êrîşên li derveyî huqûqê maske bike. Ji bîr kirin ku li ser navê civakê siyasetê bikin û xwedêgiravî rizgarkirina dewletê wek wezîfeyeke bingehîn danîn pêşiya xwe. Di encamê de dewleteke kûr (veşartî) û civakeke bi krîz derket holê. Ew bi xwe jî û di serî de CHP, DYP û MHP bi van krîzan re di dîrokê de tinebûn. Derdorên sermayedar ku ev rewş hînê bi awayekî realîst nirxandin, bi AKPê re pêvajoyeke nû dan destpêkirinê. Di encamê de ji aliyê DYE ve ku pir pê ewle bûn, bi awayekî stratejîk hatin terikandin û bi çarenûsa xwe rûbirû bûn. DYE wek pêşdeçûyîneke faşîst piştî salên 1950 timî destek da vê meylê. Di nav vê meylê de hem AP, hem MHP û hem jî gelek saziyên antîkomînîst hebûn. Lê piştî salên 1980'yî, pêngava global a nû, dewletparêzî û tundîtiya vê meylê dît û berê, beşek paşê jî bi temamî desteka xwe ji wan vekişand û dû re destek da ANAPê, piştî salên 2000'î jî destek da AKPê û bi vî awayî helwesta xwe teze kir. Ji bilî van, beşên îqtîdarê yên herî dewletparêz û bloka herî muhafezekar a Komarê ma. Ev beş di dewlet û civakê de li dijî reforman e, û mirov dikare wan weke 'muhafezekarên komarê' bi nav bike. Bi gotina mode ya van demên dawiyê ji wan re îttîfaqa 'Sêva Sor' jî tê gotin. Vê beşê, komara şoreşger kir blokeke dijberî gel, netewparêz şoven û dewleteke kapîtalîst a muhafezekar. Bi vî awayî em ji dema komara otorîter a Ataturk ber bi îqtîdareke du blok û ji wir jî gihîştin dawiya komara olîgarşîk.

Di polîtîkaya Kurd de vê meylê timî înakar kir, ser nuxumand, bi tevahî Kurd li derveyî sîstemê hîştin û dema serê xwe rakirin timî

pelixandin. Dîsa wek polîtîkayeke bingehîn a vê meylê, beşekî hevkarên kevneşopî yên bi Kurdîtiya xwe re îxanet kirine mîna amûrekî kontrolê li ser gel hîştine. Li dijî Tevgera Azadiya Kurd a PKKê xwest pêş bixîne vê sîstemê bi hemû çepgirî û rastgiriya xwe yekpare tevgeriya. Di polîtîka der ve û hundur de yekgotin û yekdeng wek 'polîtîka pîroz' qebûl kirin. Huqûq, ekonomî, siyaset, huner û spor bi ruhekî eskerî yê seferberiyê bi kar anîn. Civak bi tevahî wergeriya blokeke netewparêz û êrîşker. Di têkiliyên Kurd-Tirkan de demek, rêyek û meyleke nehatiye dîtin, afirandin. Ya esas, ti têkiliya vê yekê bi wê Ataturktiya pir behs dikirin re jî nîne. Di polîtîka Kurd a Mistefa Kemal Ataturk de rewşa antîemperyalîst diyarker e. Ji bilî antîemperyalîzmê ti belge nînin dijminahiya wî li dijî Kurdîtiya azad nîşan bidin. Belkî rola Kurdan a di destê emperyalîzmê de wê komarê hilweşînin, xelîfetî û sultantiyê paş ve bînin hinekî nepixandibe. Lê kes nikare înkar bike ku cewherê polîtîka wî ne ev e.

Kesên xwe komarger, netewparêz şoven û muhafezekar dihesibînin, hemû polîtîkayên wan berovajî helwestên Ataturk in. Ji bo li dijî têkoşîna azadiya Kurd destekê bibînin û pê doza Kurd bipelixînin, di serî de DYE û welatên YE Tirkiye bi her awayî hewce kirin. Li ser hîmê dijberiya PKKê di warê eskerî, ekonomîk, dîplomatîk û polîtîk de Tirkiye têra xwe hewce kirin. Herî dawî jî DYE û Îsraîlê bi hêmanên Kurd ên feodal û netewparêzên paşverû re ji bo pêkhatina Dewleta Kurdistan a Federe rola pîriktiyê bi rêveberên Tirkiyê dan kirin. Di nav dewletê de ji bo xwe bi rêxistin bikin derfetekî mezin ji terîqetparêzan re hat dayîn. Pir eşkere ye, ev hemû bûyer antî-Kemalîst in.

b) Rê û meyla duyemîn, ji ya yekemîn veqetiyaye û derketiye holê. Mirov dikare jê re bibêje rêya bûrjûwa lîberal a lawaz. Gavavêtina xwe ya esas piştî salên 1980'yî bi pêngava globalîzmbûyîna kapîtalîst re kir. Ezmûna ANAPê ya Tûrgût Ozal serkêşiya wê dikir, versiyona destpêkê ya vê meylê ye. Li dijî statukoya ku mirov dikare wê bi kurtî wek kapîtalîzma dewletê, netewparêziya zêdegav û xwe li hundur digire bi nav bike, wek rê û meyleke nû ya deriyên xwe li der ve vedike, lîberal û ji cudahiyan re xweşbîn e. Hedefa wê ew e, bi ser meyla global a jor-netewan bibe. DP û AP'ê li dawiyê dihêle, lê tevgera xwe wek versiyonek wan a hemdem esas dibîne. Antî-olîgarşîk nîne. Hînê dû re ji bo xwe bi tevahî li demokrasiyê veke. Lê ji komargerên muhafezekar û statukoparêz zêdetir xwedî çareserî ye. Li nêzîkbûneke hemdem ji bo

pirsgirêkan vekirî ye. Tevî ku ev meyl a pîşesazên kapîtalîzma Tirk e, di wê qabîliyetê de ye, beşên din jî di para hevbeş de bigihîne hevdu. TUSÎAD di serê wan beşan de tê ku berdevkekî ciddî yê vê meylê ye. AKP ji bo bibe versiyona duyemîn a vê meylê li ser rê ye. Ji aliyê DYE, YE û Japonyayê destekê dibîne. Lê her çend di xeta wan de jî be, ji destpêkirineke ciddî ya reforma dewletê û projeya veguherîna civakê dûr in. Ji navendên girîng ên dewletê neqsa xwe kort dikin û nikarin saziyên burokratîk derbas bikin. Îhtîmal heye AKP bi qasî Ozal bi tesîr bibe, lê ji teqeziyê dûr e. Cesaret û amadekariya Tûrgût Ozal di R. T. Erdogan de pir xuya nake. Îhtîmaleke dûr nîne, Erdogan teslîmî burokrasiyê bibe. Nemaze di pirsgirêka Kurd de ketina maskeya wî îhtimlake xurt e. Demeke dirêj nikare bi dizî gulaşê û pehlewaniyê bike.

Polîtîka Kurd a vê meylê li çareseriyeke qismî vekiriye. Nexasim Tûrgût Ozal di dîroka komarê de bi helwesteke lîberal xwest hin gavan biavêje. Vê yekê jî dawiya wî anî. Rewşa kaosê ya Tirkiyê piştî mirina wî ketê bi vê nakokiyê re pêwendîdar e. Ev pêvajoya demdirêj a jê re tê gotin şerê Komargerên Yekemîn û Duyemîn, bi pêvajoya Îmraliyê ya Abdullah Ocalan ket qonaxeke nû. Krîz hînê kûr bû. Helwestên înkarwarî yên klasîk ên polîtîkayên hukûmeta DSP-ANAP-MHP a bi pêşengiya B. Ecevît hemû civak rakir ser piyan. Ji pêvajoya agirbestê sûd nehat wergirtin. Hat fêmkirin ku ji serwextbûna pêvajoyê dûr in. Di sendoqa hilbijartinan de hatin xeniqandin û bi vî awayî bûn sedem ku derbeke din li statukoparêziyê bikeve.

Di şûna wan de AKP bû desthilatdar. Lê ti îşaretên polîtîka Kurd a AKPê xuya nakin. Her çend dixwaze bi DYE re li hev bike jî, bi serê xwe di wê hêzê de nîne ku polîtîkayê biafirîne û rê ve bibe. Hemû hêviya wê ew e, DYE bi ser PKK-KOMA GEL ve bimeşe. Bi gelek hevkarên Kurd ên bi wan re biratiya heman terîqetê (Neqşî) par ve dikin, hem bi giraniya wan a li Başûrê Kurdistanê di nav Dewleta Federe de, hem jî yên li Bakur di nav KT de giraniyek wan heye, dikarin di bin sîwana DYE de biçin çareseriyekê. Her ku diçe xuya dike, nîv bi dizî û bi mantiqekî takkiyewarî dixwazin gavan biavêjin. Dibe ku ji ber nazikbûyîna zêde ya pirsgirêka Kurd û hem ji ber hêzên şoreşger ên gelê Kurd û hem jî ji ber saziyên muhafezekar ên dewletparêz bi awayekî dizî bi aborî, civakî û şêweyekî dînî tevbigerin. Di hilbijartnên herêmî yên dawî de vê îttîfaqa veşartî (Talabanî û Barzanî eşekere ji bo destekdana AKPê bang kirin) hinekî xwe eşkere kir. Bi meylek bi vî awayî maskekirî û veşartî

pirsgirêka Kurd nayê çareserkirin û îhtîmaleke xurt e, her kêlî rê li ber şîdet û teqînê veke.

Ev meyla ku ji aliyê DYE û YE ve bi dîplomasî û maddiyateke xurt destekê dibîne, aliyê wê yê herî tehlûke ew e ku hewl dide modela Kurdistana Federe ya li Bakurê Iraqê bi sorkirina netewparêzên Kurd ên paşverû li ser Sûriye, Îran û Tirkiyê jî ferz bike. Mîna ku PKK terorîst îlan kirin wê KOMA GEL jî terorîst îlan bikin û hewl bidin qaşo Tirkiyê nerm û aş bikin. Di vî warî de garangiyê didinê. Ya esas, ev helwest tehlûkeyê du qat mezintir dike. Di vê rewşê de wê netewparêziya paşverû xurt bibe, ji aliyê din ve jî wê KOMA GEL ji nakokiyên heyîn bi zêdeyî sûd werbigire û gavan biavêje. Encamê berberiyek bi şêweyê duyemîn Îsraîl-Filîstînê li Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyê bibe ku ji vê pir tirs heye. Li her du aliyan jî xurtbûna potansiyela meylên netewparêz pêşketina bûyerên bi vî rengî gengaz dike.

c) Rê û meyla sêyemîn navend civak e, di bin sîwana demokrasiya hevpar a gelan de xwe dispêre lêgerîna wekhevî û azadiyê. Wek nasnameya jor têgîna netewa Tirkiyê, têgihîştina netew a nijadperest şoven dişikîne û dikare bibe para hevbeş a hemû çandan. Di şûna têgîna netew a binyad nijad de têgîna netew a binyad welat li gelek welatên dunyayê heye. Di serî de DYE, Swîsre, Îngilîstan, piraniya netewan xwedî pirziman û pirçandin û tevî vê yekê di bin banê yek netew-dewletê de dikarin bigihîjin hevdu û bibin yek. Eger zimanek pir tê bi karanîn pirsgirêk nîne ew bibe zimanê fermî. Lê divê hemû zimanên din jî ji aliyê perwerde, hînbûn û bi karanînê neyên astengkirin. Ev li hemû dunyayê şêweyekî hemdem û pir heye.

Di hîmê reforma dewletê de divê dewlet ji îdeolojîkbûyînê were derxistin û bibe amûrekî servîs û teknîkê. Têgihîştina fetihkar û xelaskar a dîrokî li pêşiya afirînerî û bi xwe ewlebûna civakan asteng e. Dibe sedem ku mirov her tiştî çawa ji Xwedê lava dike, wer ji dewletê bixwaze. Ji bo reformeke bi kok di warê dewletê de were kirin, divê dewlet ji bilî ewlekariya giştî ya der ve û hundur û xizmetên ji bo gelemperiyê têne kirin, dest û hebûna xwe ji her qadê vekişîne.

Li Tirkiyê dewlet zêde nepixandî ye û heta ji civakê gelek paşdetir û xwedî roleke muhefezekar e. Her kes ji dewletê ji bo her karî çareseriyê dixwaze. Lê bi reformeke dewletê ya bi kok dikare ev muhafezekariya di warê burokratîk û civakî de li dawiyê were hîştin. Hin ji xusûsên reformê dixwazin ev in; divê dewlet cudatiyê nexe

navbera welatiyan, pêwîste welatî hebûna xwe ya çandî ya bi peymanên navnetewî hatine misogerkirin bi awayekî azad bijîn; hewce ye dewlet xwe nespêre beşekî yan jî etnîkekê; dîsa her weha divê cudatiya dîn û mezheban neke. Şertekî bingehîn e ku divê reform bi destûra bingehîn werin misogerkirin. Di qanûnan de guhertinên hewce û qanûnên nû divê ji heman armancê re xizmetê bikin.

Ji bo veguherîna civakî, wekhevkirin û azadkirina helwestên cinsiyetparêz ên civakî têrê dikin. Li dijî kiryar û têgihîştinên jinê wek mulk dibîne tedbîrên bi tesîr hewce ne. Ji bo azadiya jinê malên çandê yên hewce - ne malên starê - pêwîst e bi projeyeke berfireh werin pêşxistin.

Divê mirov dev ji guftûgoyên sexte yên mîna sergirtinê (dolbendê) berde. Wekî din mijara civaka ekolojîk her roja diçe giraniya xwe dide hiskirin. Civaka azad eger ekolojîk bibe mumkîn e. Di bin rohniya agahiyên dawî yên zanistê de divê civaka li gorî ekolojiyê, bigihînin asteke destûrî. Di civakeke azad de cih ji bêkariyê, sermaye nerazandinê û xizaniyê re nîne. Divê mirov aboriyeke xwedîkirina civakê bi sihet û bi qûtê xwezayî esas dibîne, li pêş bigire. Di şûna ekonomiya karê esas dibîne de divê mirov ekonomiyeke rê dide jiyaneke hemdem û metakirinê kêm dike, bingeh bigire.

Ev rê û meyla tê de veguherîna civakî û reforma dewletê heye ku min xetên wê yên sereke eşkere kirin, ji nêz ve têkiliya wan bi çareseriya pirsgirêka Kurd re heye. Eger ev meyl xwe di pirsgirêka Kurd de nîşan bide, ev qebûlkirina çareseriyeke demokratîk û aştiyê ye. Ji bo aştiyê beriya her tiştî agirbesteke du alî hewce ye. Ji bo çareseriyeke demokratîk mirov divê behsa du îhtimalan bike; şêwazê çareseriyê yê yekemîn, bi demokratîkbûyîna Tirkiyê re di zikhev de pêk tê. Ji bo vê, reforma dewletê ya me hewl da bi kurtî bînin ziman pêwîst e. Divê astengiyên eşkere û veşartî yên li pêşiya xwedemokratîzekirina Kurdan werin rakirin û hewce ye, qanûn jî di vî warî de ji kelem û astengbûnê werin derxistin. Hînê jî destûr nayê dayîn civînên bi Kurdî werin kirin ku ev yek jî hêza astengiyê ya qanûnan nîşan dide. Bi awayekî berçav astengiyên hînê cîddî hene. Nexasim divê dest ji têgihîştina kadrokirinê ya xwe dispêre hevkarên kevneşopiya înkarê ya kesayetên bi eslê xwe Kurd, Ereb, Asûrî, Ermenî, Rûmelî û Kafkasî were berdan. Ev şêwazê kadrokirinê mîna ku Yenîçerîtiyeke hemdem e, bi vê têgihîştina kadroyên dewşirme û

ji eslê xwe zîvirîne kesên ji rencberên ji axa zêdetir axa derdixîne holê û netewparêziyeke nijadperest sor dike. Her weha di binî re jî çavên xwe li netewparêziya hindikayiyan digire. Welatparêziyeke rastîn, yekîtiya demokratîk û azad a gelan xira dike. Di hilweşîna Osmaniyan de û di dejenerebûyîna Komarê de jî para van kesayetan divê piçûk neyê dîtin. Çareseriyeke demokratîk bi van kadroyan nameşe. Kadroyên xwedî nasnameya terîketê jî bi demokratîkbûyînê nakevin. Terîqetparêzî demokrasiyê bi kar tîne, lê tevlî fazîletên wê nabe. Ji bo gelên Kurd û Tirk li platformeke hevpar a demokratîk bigihîjin hevdu hewceyî bi hin sererastkirinan heye. Divê hindikayî werin parastin.

Rêya duyemîn a çareseriya demokratîk ew e ku Kurd bi xwe demokrasiya xwe ava bikin. Eger rêya yekemîn xetimandî be, divê bi awayekî xwezayî rêzik û saziyên xwe yên demokratîzekirinê pêk bînin. Di hilbijartinên dawî yên şaredarî û parlementeran de carek din hat dîtin, tevî ku Kurdan parlementerên xwe hilbijartin bi amûrên zorê yên dewletê û qanûnên antîdemokratîk bend û astengiyên hatin danîn rê neda ku encamên hilbijartinan bi cih werin anîn û ji wan re rêz were nîşan dan. Eger di demên pêş de astengiyên bi vî rengî dewam bikin, wê ezmûnên demokratîk ên Kurdan zêde bibin. Pêvajoya bi KOMA GEL dest pê dike wê her ku biçe bi laş û gewde bibe. Eger KOMA GEL xwe wek amûrekî koordînasyona jor û rêveberiyên xwe yên herêmî bi rêkûpêk bike, wê karibe bibe cewherê demokratîkbûyîna Kurd. Ev tevgera demokratîk naşibe Parlementa Kurd a Federe. Federalîzm têgihîştina dewleta feodal-bûrjûwayê esas dibîne. KOMA GEL wek prensîb li dijî dewletparêziyê ye. Demokratîkbûyîn û dewletbûyîn di nav dijberiyekê de ne. Di înstiyatîfa KOMA GEL de wê sazî û dezgehên demokratîk federatîf nebin, wê Kurdistana demokratîk pêk bînin. Kurdistana demokratîk li dijî yekparebûna welat û dewletên Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyê nîne. Tenê ji wan ji bo yekparebûnê derfetên lihevkirineke demokratîk dixwaze. Ji lewra Kurdistanake demokratîk, Tirkiye, Sûriye, Îran û Iraqeke demokratîk e. Em tenê dikarin bi vê modelê pêşî bi hevketina li ser hîmên netewparêziyê bigirin. Em bi vê dikarin pêşî li Îsraîl û Filîstînên nû bigirin. Ji bilî vê, her du rêyên din tepisandin û înkar e, li dijî vê jî serhildan û şer e. Di vî warî de dîrok têra xwe dersên mirov jê hîn bibe pêşkêş dike.

Tevî ku li Tirkiyê ji bo çareseriyeke demokratîk û demokratîkbûyînê deng bilind dibin, hînê di rojeva siyasî de rûneniştiye. Jixwe hemû welatên Ewrûpayê heta gelek welatên Asya,

Efrîka û Emerîkayê modela demokratîk di pirsgirêkên çand û gelan de pir pêk anîne. Dunya jî her bi vî alî ve diçe. Mînaka herî dawî çareseriya li Qibrisê ye. Pirsgirêka bi salan kangren bûye bi demokrasiyeke hevpar a du aliyan diçe çareseriyê. Ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd bi awayekî demokratîk dikare têra xwe hîn bike. Modelên Belçîka, Swîsre, Îskoçya, Îrlanda û Baskê jî dikarin di çareseriyê de bi kêr werin.

Pêwîst e rêveberiya Tirk fêm bike ku wê êdî nikaribin bi şêwazê berê Kurdan rêve bibin. Eger Iraqeke duyemîn naxwazin divê bi awayekî ciddî li ser mijara aştî û çareseriya demokratîk rawestin. Divê mirov baş bizanibe çareseriyeke bi vî rengî li dijî helwesta azadîxwaz a Mistefa Kemal Ataturk nîne. Eger îdîa were kirin ku Ataturk li dijî welatîbûyîna azad a Kurd e, dijminê saziyên hevpar an jî saziyên cuda yên demokratîk e û ev yek wek dijminatiya Kemalîzmê li dijî Kurd were nirxandin, wê ev yekê were maneya ketina xefik û dafika netewparêziyê. Kurdistaneke azad û demokratîk ji bo yekparebûneke mayînde ya dewlet û welatê Tirkiyê biratî û garantiyeke rastîn e. Mîna di dîrokê de îro jî palpişteke stratejîk e. Kurd û Kurdistanek ku hatiye înkarkirin, tê wê maneyê ku timî pirsgirêk û serhildan e û dibe tehlûke ji bo destwerdanên ji der ve. Her weha KT û civak hemû derfetên maddî û manewî diqedînin û ber bi krîzan ve kaş dibin. Li Rojhilata Navîn, Ewrûpa û dunyayê nav û hêza xwe wenda dike. Eger welê ye, wê wextê divê ji kaosa Rojhilata Navîn gavavêtineke demokratîkbûyînê ya hevpar a Kurd-Tirk herî hindik bi qasî gavavêtinên stratejîk ên di dîrokê de xwedî mane ye. Ji bo mirov vê yekê nebîne û bi cih neyne, divê yan mirov dijminê gel be, yan jî xayînê welat be. Hemû bûyer û pêşketinên li dunya, herêm, Tirkiye û Kurdîstanê çareseriyeke aştiyane û demokratîk ferz dikin.

Bi pêvajoya kapîtalîzma nû re ku bi salên 2000'î re bi lez bû, dixwaze bi DYE û YE re têkiliyên xwe derxîne ast û qonaxa herî jor. Mîna dema DPê hewce dibîne neçar pêngaveke demokrasiyê ya şeklî bike. Hem ji bo YE û hem jî li dijî artêşê pêdiviya wê bi vî zirxî heye. Ji bo xeteke demokratîk a têkûz, mumkîn xuya nake bibe xwediyê amadekarî û destketiyan. Îdeolojiya Îslamî wek 'Demokrat Muhafezekariyê' pêşkêş dike ku vê yekê ew ji takiyyeya berê bi tevahî nekiriye. Di encama pêvajoya têkoşîna tund a li hundur û li der ve de ji şikestin û birrînên vebûne sûd wergirtiye û di nav dewletê de bûye xwediyê cihekî têkûz. Dibe ku di pêvajoya pêş de giraniya xwe ya civakî û siyasî zelal bike û cihê xwe yê rastîn bibîne.

Li hemberî vê pêngava dawî ya kapîtalîzmê divê hemû xelkê Tirkiyê û nemaze hewceye gelê Kurd pir bi berpirsiyarî tevbigerin û bifikirin. Ji ber ku di her du qonaxan de timî wenda kir, dibe ku di vê qonaxa sêyemîn de qet nebe nêvî bi nêvî pêvajoyeke bi ser bikeve pêk bîne, hem jî li dijî xizanî û bêkartiya wek lehiyê radibe rêya bi tenê ya çareserî û rizgariyê ye, serî lê bide.

Rojeva bingehîn a gelê Tirkiyê ew e ku helwesta xwe ya demokratîk bi rêxistin bike û ji bo bike tevgereke çalak bi ser bikeve. Ji ber ku ekolên çepgir ên netewparêz û sosyalîstên reel (TKP hwd.) di her sê qonaxan de jî bi sedema nekarîn xwe xilas bikin ji bo nebin tevgerên navend-dewlet, bi awayekî objektîf ji xurtkirna pêvajoya kapîtalîzmê wêdetir ti rol nelîstin. Lê rastiye, mîrateyeke xurt a wekhevî û azadîxwaziyê heye. Pirsgirêk ew e ku ev mîrate bibe tevgereke girseyî ya xwe dispêre demokrasiyeke têkûz, azadî û wekheviyê. Tevgera demokratîk a Kurd ku rabûye ser piyan, di wê rewşê de ye, alîkariya herî mezin bike. Ya esas a hewce ew e, divê hemû komên çepgir ên Tirkiyê xwe ji navend-dewletbûnê xilas bikin, xwe bigihînin demokratîzekirineke têkûz û li ser vî hîmî yekîtiyê pêk bînin.

Herî dawî ji aliyê pênc koman ve (SHP, DEHAP, EMEP, SDP û ODP) 'Yekîtiya Hêzên Demokratîk' hat avakirin. Her çend rêya berê xwe dabûnê rast bû jî, ji ber ku nekarîn xwe ji naverok û formasyona neyînî ya mîrateya kevin xilas bikin û dîsa nekarîn xwe ji kokê ve ji burokrasî û îdeolojiya dewletparêz qut bikin, bi ser neketin. Ya hewceyî pê heye ew e, li ser hîmê vê rê navend civak e, divê ji binî ve xwe ji brukrasiyê qut bike, rêxistineke bibe ban a li ser hîmê girseyên gel (di serî de bêkar û xizan, nemaze kesên li keviyên bajaran û gundan) û di zemînê wê de jî tevgerên ekolojîk û femînîst, mafê mirovan û civaka sivîl hebe, dikare ji bo meşê gav biavêje. Ev meşa ku bi dînamîzma tevgera demokratîk a gelê Kurd li dijî îqtîdara olîgarşîk a bi kapîtalîzma Anatolyayê temam bûye, dikare ji bo hêviyên wekhevî, azadî û demokrasiyê yên gelên me bibe bersiveke rastîn û wan bibe serketinê.

D- Di PKK'ê de erkên jinûve avakirinê û dema KOMA GEL

Helwestên ji bo jinûve avakirinê, rexne-xwerexnekirin û nirxandinên me derbarê PKKê de kirin, hem me hişyar dikin û hem jî derbarê wezîfeyan de me rohnî dikin. Nirxandinên me yên derbarê çareseriya demokratîk de ji bo em mijara KOMA GEL baş fêm bikin derfet û îmkan dide.

1- Em dema li ser navê PKKê ji nû ve diçin avabûnê, divê em baş bizanibin û li ber çav bigirin ku çima avahiya kevin bê fonksiyon ma. Me avahiya kevin di sê nuqteyên bingehîn de rexne kir. Yekemîn, têgîna partiyê bû ku weke dewameke dewletê û amûrekî ji bo xwe gîhandina wê hatiye dîtin. Partiyek navend-dewlet bi awayekî diyalektîkî di warê şêwe û cewher de bi azadî û wekheviyê re di nav nakokiyê de ye. PKKê jî xwe ji vê têgihîştinê tam xilas nekiribû. Mijara duyemîn a xwe rexne kirinê nertina li îqtîdarê bû. Partiyek li gorî bibe îqtîdar şekil wergirtibe wê demokratîkbûyîna civakî timî paş ve bixîne û nehêle demokrasiyê bi cih bîne. Li gorî vê yekê, kadroyên gihîştî di şûna xwe bispirên gel de yan wê bi xwe bibin otorîte yan jî wê xwe bidin otorîteyên din. Ji bo jiyana timî balkêş a xwe dispêre kurtêlên îqtîdarê ye. Me destnîşan kiribû ku vê helwestê sê ekolên girîng ên şoreşger çawa kirine mezhebên kapîtalîzmê. Ekola sosyalîzma reel, sosyal demokrasî û rizgariya netewî ji ber ku di şûna demokrasiyê de îqtîdar bingeh dîtin, berê dejenere bûn paşê jî nekarîn xwe xilas bikin ji bo nebin yedekê sîstema kapîtalîzmê. Rexneya sêyemîn di mijara şer de hatibû kirin. Bêyî ku xwezaya şer were naskirin, çi cure dibe bila bibe, wek amûrekî pîroz hatibû dîtin. Lê şer ji bilî parastinên mecbûrî cinayet û kuştin bû. Di dîrokê de di hîmê hemû desthilatdariyên kedxwar de şer hebûn. Sazîbûyîn û rêzikên civakî li gorî şer bûn. Ji lewra di şer de serketin bingehê hemû mafan bû. Eşkere bû ku ev têgihîştin jî demokratîk û sosyalîst nebû. Eger welê be, divê partiyek sosyalîst navend-dewlet nebe, armanca wê îqtîdar nebe û hêmana diyarker a di hîmê hemûyan de heye li gorî şer nebe. Me bi vê girîngiyê anîbû ziman ku di avakirina ji nû ve de careke din xwe bi awayekî nû tarîfkirin wê rê nede çewtî û xetayên girîng.

Di vê rewşê de wê tarîfa partiya me van rexne lixwegirtinan esas bibîne. Ji me re tarîfek hewce ye ku navend-dewlet nebe, ji bo veguherîna nû ya civakî jî şer û îqtîdarê negire navenda xwe. Di bingehê sîstema civaka çînî ya dawî kapîtalîzmê de şer û îqtîdar hebû, ji lewra partiyek bixwaze kapîtalîzmê li dawiyê bihêle divê şer û îqtîdarê nexe hîmê civakê. Ev jî bi hebûna civaka komîn û bi helwesta demokratîk a wergere civakeke demokratîk, azad û wekhev dibe. Em dema van hêmanan li ber çav bigirin, tarîfa partiya me êdî zelal dibe; bernameya partiya me wê veguherîna civakê ber demokrasî, azadî û wekheviyê esas bibîne û ji bo vê jî ewê bi rêxistineke avaker a tevgera civakî hewl bide hemû beşên civakê yên di vê bernameyê de berjewendiyên wan hene - hawîrdorparêz,

femînîst, çandî - bi stratejiyeke hevpar bîne cem hevdu û di serî de rêxistinên civakî yên sivîl wê bi rêxistiniyeke berfireh û şêweyên çalakiyan û bi taktîkeke parastina rewa îhmal nake, tevbigere.

Di çarçoveya naveroka tarîfa partiya me de emê bi nertina bingehîn navekî li teoriya xwe bikin. Li ser vî hîmî wek berê em dikarin jê re bibêjin 'sosyalîzma zanistî. Yan jî em dikarin bibêjin 'sosyalîzma demokratîk.' Ji ber ku sosyalîzma demokratîk sê hêmanên hevpar ên polîtîkayê îfade dike. Ew jî ev in, bi awayekî berfireh ilmê civakî felsefe ye, têgihîştina civakê li azadiyê exlaq e, û hêza ji bo veguherînê îrade ye. Ya girîng nav nîne, tarîfkirina naverokê ye. Partî bêyî teorî nabe, çawa beden bêyî zêhniyetê nabe partî jî bêyî teorî nabin. Teorî bi qasî ku bi gelemperî pêşketina zanistê di asta herî jor de digire nava xwe, divê polîtîkayê wek îradeya veguherîna civakê û exlaqê fêm bike û mîna hunerekî di hundurê xwe de bihewîne. Zêhniyeta partiyê divê ilmê civakî, exlaq û polîtîkayê timî bi hev re ji bo veguherîna civakê bi kar bîne ku heta bike rastiyek bi xwe bimeşe û heta di bin sîstema kapîtalîzmê de bijî ev yek hewce ye.

Zêhniyeta hêza partiyê ya maneyê ye. Zêhniyeta partiyê divê li ilmê civakî pir baş serwext bibe. Ilmê civakî ku hemû pêşketinên zanistî digire nava xwe û di nava ilman de yê herî dawî bi nav dike, hêza rohnîkirinê ye, ji bo civaka veguherîna wê tê xwestin. Rastiya civakî ya berê bi ekolên felsefî, dînî û mîtolojîk dihat îzahkirin, piştî meşa xwe ya dirêj bi sînor be jî nêzî îzaheke zanistî-civakî bûye. Bi awayekî ilmî serwextbûna li civakê hêzeke mezin dide. Di vê çarçoveyê de bi sînor be jî serwextbûna li sosyolojiyê aliyê herî xurt ê veguherîna civakî ye. Lê ev jî têr nake. Divê mirov vê nuqteyê baş bizanibe ku di dîroka mirovatiyê de hemû xebatên mîtolojîk, dînî, felsefî û zanistî li gorî analîza dawî çavkaniyên wê civak in û ji bo rastiya civakê, ji bo rohnîkirina pirsgirêk û çareseriyên wê û ji bo bi cih anîna pêdiviyên wê hatine avakirin. Ji bilî civakê hebûneke din a wan nîne. Bêyî serwextbûna li civakê, mirov tam ne dikare li ferd, ne jî li eşya û xwezayê têbigihîje. Di bingehê felaketên însanwarî yên bi serê civakê de hatine - şer û îqtîdar, dewlet - cehalet û zordarî heye. Eger em çendîn li civakê serwext bibin em dikarin van saziyên zordarî û cehaletê li dawiyê bihêlin. Tevî ku şer, îqtîdar û dewlet berhemên ji rêderketî yên mejiyê analîtîk in, ji bo li dawiyê werin hîştin dîsa divê mejiyê analîtîk û mejiyê hisî dest bidin hevdu. Kesên bi meseleyên dewlet, îqtîdar û şer re mijûl dibin - tevî vê aştî - divê pêşî têgîna civakê ji sedî sed têr û kamil bikin.

Divê exlaq jî bibe parçeyekî zêhniyeta partiyê yê jê nabe. Ya esas, exlaq azadiya civakê ye ku bûye kevneşopî. Di tehlîla dawî de serwextbûne. Civaka exlaqê wê qediyabe azadiya wê jî nîne. Civaka bêexlaq civaka qediyaye. Eger welê be, divê ji bo veguherîna civakê exlaq esas were dîtin û wek prensîbeke sereke divê mirov xwe ji exlaq neke. Ekolên civakî yên cih nedin exlaq nikarin mayînde bibin. Kesên biryara wan ji bo veguherîna civakê heye, divê ti carî pêwendiya xwe bi exlaqê azadiyê re wenda nekin.

Pêwendiya zêhniyetê bi îradeya polîtîk re bi çalakbûyînê re têkildar e. Têgihîştin, bi exlaqbûyîn, kengî bigihîjin çalakiyê qîmeta wan heye û dibin hêza çareseriyê. Zanist û exlaqê bêyî polîtîka bi xapandinê tijî ye. Ji sedî sed li ser navê hêzên tehekumkar ên serwer xwe firotine û radest kirine. Bi îqtîdar-zanînê, dibe parçeyek ji exlaqê fermî. Ji ber ku vê têkiliyê diavêjin pişt guhê xwe, gelek zanyar û helwestên ilmî bêtesîr in, heta li dijî armancên xwe û li dijî civakê dibin xwedî rol. Di serdema me de tenê bi exlaq, zanist an jî polîtîkayê re têkildarî dibe helwesteke xeter timî derî li hemû felaketan vekirî dihêle. Belkî jî di roja me ya îro de yek ji tiştê ku herî hewce helwesteke vê qutbûnê ji holê rabike, ev yek jî bi xwegîhandina zêhniyeta tam a partiyê dibe.

Di çarçoveya vê maneyê de tarîfa me ya zêhniyeta partiyê xwedî girîngiyeke mezin e. Em heta vê şêwazê zêhniyetê esas nebînin û neynin asta bi cih anînê, em nikarin xwe xilas bikin ji bo em nekevin rewşa sosyalîzma reel, sosyal demokrat û rizgariya netewî û ji bo em nebin hêza yedek a sîstemê. Ji lewra dema em diçin jinûve avakirinê, em pêşî girîngiyê didin zêhniyetê. Ji vî alî ve, partî di warê zêhniyetê de çiqas bi hêz be, bernameya wê jî ew çend dikare bi stratejî û taktîkên nêzî rastiyê pêk bîne. Naxwe di gavavêtine de jî wê neçar wenda bike, paş ve biçe û heta piştî şoreşên serketî avahiyên hatine damezrandin wê nikaribe pêşî li hilweşînê bêne girtin. Mînaka Sosyalîzma Sowyetê di vî warî de xwedî gelek ders e. Mesele netenê bi hevrebûna pratîk û toeriyê ye. Pirsa girîng ew e ku em partiyê bi zêhniyeteke çawa û teoriya naveroka xwe çî ye, dimeşînin. Teorî û zêhniyeta partiyê naveroka wê zelal û li gorî armancê nehatibe bi navkirin di encamê de wê di pratîkê de rê li ber bûyerên çewt veke. Ji lewra divê yekîtiya teorî-pratîkê têkûz were deribandin û hûnandin.

Eger têkûziya teorîk xwe di bernameyê de nîşan bide dikare watedar bibe. Ji bo partiyekê bername pîvanên bingehîn ên veguherîna civakî îfade dike. Komeke nikaribe bernameyê amade bike, yan jî amade bike û nikaribe di xwe de dawerivîne, zehmete jê

re partî were gotin. Partî wek peyv jî maneya wê beşekî teng û parçeyekî îfade dike. Çîrokek wê ya dûrûdirêj heye. Mirov dikare di civakê de ji yekemîn koma bi tecrûbe re ya rê nîşan daye bibêje partî. Yekemîn koma serdest a hiyarerşiyê jî partî ye. Dema dewlet ava dibe, klîka rêveber di heman demê de wek koma îdeolojîk û pratîkê bi rêxistin dike, partiya tehekumkar îfade dike. Civaka jêr hem bi zêhin û hem jî bi rêya suxreyan bi xwe ve girê didin û wan bê partî dihêlin. Ya esas, baweriyên totemîk ên qebîleyan têne maneya partiyên wan. Li gorî destpêkê kevneşopiyên civakê partiyê îfade dikin. Bi qasî ku tê zanîn, di dîrokê de qebîleya Hz. Îbrahîm hem li dijî Babîl, Nemrûdên Asûriyan, hem jî li dijî Fîrewnên Misrê ji bo xizanan yekemîn partiya gel a ciddî temsîl dike. Ev partî hem serhildêr û hem jî gelparêz e. Mirov dikare jê re bibêje partiya gel a serhildêr. Hz. Îsa jî yekem car qebîleya Cihûyan parçe dike û tevgera partiyê ya beşê xizan dide destpêkirin, an jî partiya berê ya xizanan (Essenî) derdixîne hînê qonaxek li pêş. Xirîstiyantiyê bi qasî sê sed salan wek partiya xizanan li dijî Împaratoriya Romayê şer kir. Hz. Mûhammed li dijî eşrafên Mekkeyê bi komeke piçûk a xizanan dest bi serhildanê kiribû. Di nav Îslamiyetê de mirov dikare Xaricî, Karmatî û Elewiyan wek tevgerên partiyên mîna hêmanên proleter ên beşên xizan temsîl dikin, binirxîne.

Mezhebên serdema navîn jî partî ne. Li gorî rewşa çînî û zêhniyetê beşekî ji civakê temsîl dikin. Nîzama partiyên kapîtalîst tê zanîn. Ev hemû tevgerên kevneşopî, tevahiya dîrokê rêxistin û baweriyên wan di qîmeta bername û rêxistinê de ne. Bername ji wan aqîdeyên civakê pêk tê ku bi awayekî zelal li ser tê lihevkirin, pê ve girêdan û dilsozî heye û qîmeta wê ya bi cihanînê gengaz e. Yanî ew nirxên bawerî û ramanên e, bûne pîvan. Kesên bi pîvanên xwe girêdayî, dizanin û dikarin wan di jiyanê de bi cih bînin. Bê pîvanî û bê bername mayîn, di heman demê de tê maneya bê hedefbûyînê, mîna ku bi ber her bayî bikeve bi ber hirs û lawaziyên xwe bikeve. Ji lewra kesên bi hewldanên mezin xwe spartibin zêhniyeteke teorîk, exlaqî û polîtîk û bi awayekî berçav xwe bi pîvanên wê yên veguherînê bernameyê ve girê dabin di partîbûyênê de gaveke herî girîng avêtine têne hesêb. Kesên van her du gavan nikaribin biavêjin partîbûyîna wan seqet e yan jî ji sempatîzaniyê wêdetir naçe. Partîbûyîn karekî ciddî ye. Belkî jî bi dehan sal ponijandineke hundurîn, terbiyekirina nefsê, fazîlet û qabîliyetekê dixwaze. Mînak em di dîroka dîn û mezheban de li ezîz û ezîzeyên çil salî xwe di şikeftekê de terbiye kirine rast tên. Em di her sê dînên mezin û

Bûdatiyê de pir li mînakên bi vî awayî rast tên. Divê bi vî awayî ji zihniyeta partî û bernameya wê re nêzîkbûneke dîrokî hebe.

Di dîroka PKKê de jî abîdeyên mezin yên zêhniyetê û dilsoziya bi pîvanan hene. Hakî, Mazlûm, Kemal, Mehmed Xêyrî, Ferhad, Mahsûm, Taylan Ozgur, Berzan Ozturk, Zîlan, Berîtan, Bermal û hînê gelek ji wan ku ezê nikaribim navên wan binivsînim, numûneyên bêpayan ên hevalên karîbûne bibin endamên mezin ên partiyê ne. Ev hemû bi qasî pirtûkek werin xwendin xwedî mane ne. Tevî vê yekê, em li gelek xayîn, bêbext, dejenere, sistok, sefîl, perîşan, korfêm û xemsaran rast tên. Her weha kesên mîna hemalan dixebitin û ji zêhniyeta mezin û bernameyê bêpar jî têra xwe zêde ne.

Bername ji wan dîtin û pîvanên nayên guhertin û nûkirin pêk nayên. Ji ber ku guhertin her tim heye, di pêvajoyên demî yên girîng de guhertina bernameyan helwesteke rast e. Ya divê neyê guhertin ew e ku hewldanên ji bo pêdiviyên bingehîn ên civakê û ji bo wan lêgerîna çareseriyê, geş û zindîgirtina hêza partiyê ye. Her weha divê mirov heta niqrîska dawî bizanibe bi van bawerî û hewldanan re bijî û bi serkeve.

Em wexta di PKKê de bernameyê biguherin girîng e, ku em vê çarçoveyê bi bîr bînin û li ber çav bigirin. Wek hinek texmîn dikin, ji nû ve avakirin ne tasfiyekarî ye û ne jî tê wê maneyê ku em xwe dadixin asta komeleyeke sivik û erzan.

Me di gelek beşên parêznameyê de bal kişand ser hêzên bingehîn ên teoriya me (theoria = tê maneya dîtina xwedayî. Ji quncika li dunyayê tê nertin an jî wek paradigma tê bi navkirin) ku di jinûve avakirina PKKê de wê li zêhniyeta me hukum bikin. Em derbarê gerdûnê, xweza, fizîk, kîmya, biyolojî, mirov û civaka wî de gihîştin fikrên sîstematîk ku ev teoriya me pêk tîne. Me tim û tim jî bal kişand ser taybetiyên wê. Ji Kozmosê ta kûantûmê, ji pêkhatina destpêkê ya gerdûnê ta pêkhatina ramana mirov, herî hindik me di asta tarîfê de helwestên xwe yên teorîk zelal kirin. Di şûna dubarekirinê de eger hewce be emê di mijarên pêwendîdar de bînin ziman. Yanî em timî bi awayekî teorîk tevdigerin. Yên teorîk nebin wer bi hêsayî nikarin ji Tevgera Partiyê re pêşengiyê bikin. Em teoriyê çiqas bi hêz bikin, emê di warê pratîk de jî çareseriyê pêş de bibin. Emê di avakirinê de bi ser bikevin.

Hewce ye, em hînê li ser bernameyê rawestin. Em dewam bikin. Di serdema me de bernameyên partiyan wek hatiye hînbûn, ji çar beşên sereke pêk tên; beşê siyasî, civakî, aborî û mafên ferdî. Di alî siyasî de pirsgirêkên rejîm û dewletê bêne hûrkolandin û di şûnê de

sererastkirinên siyasî yên werin danîn wê di asta pîvanan de werin destnîşankirin. Ji analîzên me yên heta niha wek tê fêmkirin, me hewl da, helwestên xwe yên di warê partîbûyîna nû ya li ser zemînê Tirkiyê û Kurdistanê de analîz bikin. Di warê dewlet û siyasetê de me helwesteke sosyolojîk pêş de bir. Me bal kişand ser taybetiyên antî-demokratîk û olîgarşîk ên dewletê. Demokrasî bi awayekî devkî tê ziman, lê di warê cewherî de gav nehatine avêtin. Di pirsgirêka Kurd de ev xusûs ispat dibe. Qada siyasî ji demokratîkbûyînê dûr e. Nemaze hemû partî di qada siyasî de wek milê dewletê yê ajîtasyon û propagandayê dixebitin. Tevî ku daxwaz û hêviyên civakê ji bo demokratîkbûyînê pir xurt in jî, ji ber bandora giran a kevneşopiya dewletparêz civak nikare xwe ber bi civaka sivîl, mafê mirovan, hawîrdor û azadiya jinê ve demokratîze bike. Tevî hewldanên xwenûkirinê yên artêşê, bandora wê ya kevneşop hînê jî ew çend xurt e, li ser sîstema siyasî diyarker e.

Ji lewra, divê em bernameyê wer amade bikin ku demokrasiya dewletê ya ji gotinê wêdetir naçe di qada siyasî de neçarî reforman bikin. Di bernameya berê ya PKKê de dewlet bi tevahî dihat redkirin. Yanî armanc bi tevahî rakirina hebûna dewletê bû. Di şûna wê de jî tevî ku pir tiştekî welê zelal nebû, avahiyên mîna dewleta Kurd dihatin fikirîn. Ev yek ne ku bi cih anîna wê zehmet e, wek pîvan di dîtina me de dewletparêztî nîne. Lewra dîtinek me ya wek "bila dewleta Tirk rabe, di şûnê de dewleta Kurd bibe" nîne. Em helwestek welê çor jî rast nabînin. Xusûsa duyemîn ew e ku dibêje; "bila dewlet hîç nebe." Ev dîtin jî realîst nîne, zêdetir nîhîlîzm û anarşîzma berê bi bîra mirov dixîne. Her weha dewleta Kurd û Tirk nabe. Wek kevneşopiyeke giran a dîrokî timî berjewendiyên hindikayiyekê li pêş girtiye. Xizmeta wê ya ji bo gelemperiyê gelek teng û formatîk e. Lê ji ber ku xizmeta gelemperiyê û ewlekariya giştî di roja me ya îro de jî ji wan mijaran nînin ku werin îhmalkirin, em têgihîştina xwe ya dewleta li Tirkiye û Kurdistanê bi cihbûyî ji nû ve şîrove dikin. Ji aliyê ilmî ve jî rast nîne ku mirov bixwaze dewlet yekser ji holê rabe, lê di heman demê de rast nîne ku mirov qebûl bike dewlet bi awayê heye dewam bike. Bi awayekî klasîk hebûna dewletê û nemaze kiryarên îqtîdarê yên despotîk ên heyîn ku çiqas bi dewletê re hemcewher bêne kirin jî rast nînin. Ya rast ew e ku mirov li ser otorîteyeke giştî ya gelemperiyê li hev bike ku bersivê bide xizmetên gelemperiyê û ewlekariya giştî. Lê ev saziya siyasî ya wek otorîte hatiye piçûkkirin bi xwe dewlet nîne. Eger mirov vê saziyê wek komarê bi nav bike li gorî naverokê dibe ku li cih be. Tê maneya

rêveberiya gel, yanî bi demokrasiyê re tarîfeke hemta ye. Lê ji ber ku bi hilbijartina gelemperiyê nayê destnîşankirin û wezîfedarkirinê esas dibîne, bi demokrasiyê re nabe dîtineke hemta. Mirov dikare wê wek dewleta ji bo demokrasiyê hişyar û wê qebûl dike binirxîne. Ev tarîfeke rastir e. Komara Tirkiyê ya bi vî rengî were tarîfkirin ji aliyê Kurdan ve wê welatiyê azad û qanûnîbûyînê (Destûra Bingehîn jî têde) îfade dike yan jî divê îfade bike. Eger Kurd qanûnî bibin, tê wê maneyê ku bi qanûnê nasnameya wan bi giştî were qebûlkirin, an jî bi taybetî were pejirandin. Ji bo Kurd komarê wek çand û gel nas bikin, divê komar jî hebûna wan a çandî û mafên wan ên siyasî nas bike. Hevdu naskirin bi awayekî beramber û misogeriyên qanûnî dibe.

Ji bo komara Tirkiyê, bi giştî ji bo hemû Tirkiyê û bi taybetî jî ji ber rewşa wan a giran ji bo Kurdan hewceyî bi helwesteke Ronesanswarî û reformê heye. Her çend hin sererastkirinên qanûnî û destûrî têne kirin jî zehmet e ji wan re reform werin gotin. Nexasim heta helwesta ne ji dil be û înkar li dijî pirsgirêka Kurd dewam bike lihevkirineke destûrî zehmet e. PKK di vê demê de ku xwe ji nû ve ava dike, ji ber ku xwe ji Kurdistanê berpirsiyar dibîne, di vê qada çar dewletdar de lihevkirina demokrasî û desthilatdariya dewletê mijara herî girîng dibîne. Eger ev dewlet - Dewleta Kurd a Federe jî di navê de - dixwazin hebûna xwe li Kurdistanê dewam bikin, pîvan ew e, ku xizmeta gelemperiyê û ewlekariya giştî ya ne li dijî gel bimeşînin. Nûnerên gelê Kurd ji bo van pîvanan bi rayedarên dewletê re destnîşan bikin û li ser li hev bikin, wezîfedar in. Kiryarên dewletê yên yekalî û bêsînor, eger bi riza gel nebin nayên qebûlkirin. Eger zor were ferzkirin, wê mafê gel ê berxwedanê derkeve holê. Ji lewra, wek otorîteya gelemperiya giştî dewlet û wek îradeya demokratîk wezîfedarên gel divê li hev bikin.

Em vê xala herî girîng a bernameyê bi kurtî wer dikarin bînin ziman: "Li Kurdistanê rêveberiya demokratîk a gel bi xwe + wek otorîteya gelemperiya giştî dewlet" Kurdistaneke bi vî rengî statuya wê hatiye diyarkirin, hem nêzî demokrasiyê, hem nêzî azadiyê û hem jî nêzî wekheviyê dibe. Eger demokrasiyek bi tevahî bê dewlet were xwestin, ew di nav rastiya dîrokî de dibe xwe xapandin û dibe maceraperestî. Dewleteke sînorên wê hatine destnîşankirin û piçûkkirin hewceyî pê heye û divê li ser li hev were kirin. Jixwe em bi israr tînin ziman ku bi awayekî klasîk ji vê otorîteyê re, nabe dewlet were gotin, mirov wê wek saziyeke giştî ya civakî ya hînê hemdem û di şêwe û cewherê xwe de bi demokrasiyê ve girêdayî bi

nav bike rastir e. Li aliyê din, demokrasî ji bo Kurdistanê tê wê maneyê ku hem ji bo herêmî û hem jî ji bo giştî di serî de ji bo pêdiviyên xwe yên ekonomîk, siyasî û civakî, ji bo hemû pêdiviyên xwe yên civakî yên hevbeş bibe bersiv, bi navber nûnerên xwe hildibijêre û kontrol dike. Demokrasî dewletê eleqeder nake. Karên gel bi xwe ne. Dewlet tenê dikare ji îradeya wî ya demokratîk re rêz bigire. Eger xizmetek hewceyî pê hebe bi cih tîne. Bi kurtî di dema pêş me de divê wek xaleke bingehîn a bernameyê û formulekê "Demokrasî + wek otorîteya gelemperiya giştî dewleta Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyê" baş werin tarîfkirin û li ser were sekinandin. Dema em dibêjin wek xalek bernameyê, em behsa yek xalê nakin. Eger hewce bike, mirov dikare dabeşî sê-pênc xalan bike.

Demokratîzekirina Kurdistanê ji pirsgirêkeke qanûnî wêdetir projeyeke berfireh a civakî ye. Li dijî beşên destnîşankirina gel a çarenûs û nasnameyê înkarê dikin, wê di warê aborî, civakî û siyasî de destekê bidin beşên civakê yên li derveyî wan ji bo karibin bibin xwedî îrade, bibin xwedî sazî, rêveberî û kontrolê. Ev pêvajoyek e timî dimeşe. Hilbijartin tenê yek ji wan amûran e serî lê tê dayîn ji bo ev îrade were hilbijartin. Ya esas, rêxistinbûyîna fonksiyonel a gel û çalakiyên wî divê. Ev pêvajoyeke ji komînên herêmî yên gund û bajaran, meclîsên bajaran û belediyan heta kongreya gel a giştî pêvajoyeke demokratîk e. Jiyaneke siyasî ya dînamîk îfade dike. Li gorî şert û mercan dikare bi gelên cîran re bi awayekî hevpar bi demokrasiyê xwe bi rêxistin bike, eger ji bo vê derfet neyê dayîn dikare sîstema xwe ya demokratîk pêk bîne.

Demokratîzekirina siyasetê, di qada siyasî de wezîfeyeke girîng e. Siyaseta demokratîk partiyên demokratîk dixwaze. Heta partiyên siyasî û saziyên bi ser wan ve navend-dewlet bibin û daxwazên wan civakî nebin, mirov nikare behsa demokratîzekirina jiyana siyasî bike. Li Tirkiyê partiyên siyasî wek milekî propagandaya dewletê û dema li ser dewletê jî rûdinên ji amûrê kurtêl belavkirinê wêdetir ti maneyê îfade nakin. Di derbasbûna partiyên navend pirsgirêkên civakî de li gorî wê pêkanîna statuyê parçeyekî girîng ji reformên siyasî ye. Li ser navê Kurdistanê damezrandina partiyan hînê jî qedexe ye. Ji bilî partiya dewletê şens zêde ji ti partiyan re nayê naskirin. Eşkere ye, divê ev statu were guhertin. Li ser navê Kurdistanê damezrandina partî û koalîsyonan bi cewherê demokratîkbûyînê re têkildar e. Divê tenê serî li amûrê şîdet û cihêtîxwaziyê nedin.

Li Kurdistanê têgihîştina li civak û siyaseta demokratîk û hewldanên ji bo veguherînê xwedî maneyeke girîng in. Nemaze karektera despotîk a rastiya polîtîk, têgihîştin û bi cih anîna pîvanên demokratîk dike mijareke bi qasî av û hewayê girîng. Ne tenê polîtîkayên navend rastgir, piraniya polîtîkayên çepgir jî karektera wan navend-dewlet, despotîk û kurtêlxur in. Ev taybetiyên bingehîn pir baş eşkere dikin ka çima gelên Rojhilata Navîn ji siyasetê nefret dikin. Piştî ku rola li dewletê hatiye barkirin bibe xapandin û tepisandin, êdî neçar civak li derveyî siyasetê dimîne, ya rastîn dibe objeyek siyaseta polîtîkayên tehekumkar. Rêbaza herî baş ji bo li dawî hîştina vê xerîbketina li hemberî polîtîkayê, bi hunerê siyaseta çarçove û armanca wê civaka demokratîk, dibe. Heta polîtîka demokratîk ji aliyê teorîk û pratîk ve esas neyê dîtin, hemû hewldanên ji bo komên civakî wê nikaribin xwe ji xapandinê xilas bikin. Di vir de zêde maneya niyeta baş nîne. Divê mirov cudahî û têkiliya di navbera dilsoziya platonîk a gel û hunerê polîtîka demokratîk de baş bibîne.

Ya esas, ez bi vê parêznameyê dixwazim li Kurdistanê pêşî li siyaseta demokratîk vekim. Em bi pîvanên gerdûnî yên demokratîk dikarin çanda stûtewîn û tewandinê ya li saziyan û li ser ferdan bi tesîr e li dawiyê bihêlin. Di van demên dawiyê de ev çand li ser mîrateya PKKê bi kiryarên antî-demokratîk bi tesîr bû. Di vê hilbijartina dawiyê de serketina dihat xwestin DEHAPê bi dest nexist. Di hîmê vê rastiyê de pirsgirêkên kadro, rêveberî û şêwazên xebatê hene. Ji bo çareserkirina van pirsgirêkan teorî û pratîka demokratîk nehatiye bi karanîn. Jixwe li parçeyên din ên Kurdistanê polîtîka despotîk hînê serwer e. Di demên pêş de ji bo Kurdistaneke azad beriya her tiştî ya hewce ew e ku li gorî xweseriya berçav a civakî-siyasî ya her parçeyî avahiyên siyasî yên navenda siyaset û civaka demokratîk werin avakirin. Saziyên civakî yên sivîl, komele û partiyên heyî jî divê li ser vî hîmî werin veguherandin. Pêwîste em bi hemû hêza xwe bawer bikin, bizanibin û bikaribin pêşî li dema siyaseta demokratîk vekin, xebat ji vê hêjatir nabe.

Ji lewra wezîfeya me pêşîn, em li her çar parçeyên Kurdistanê û komên Kurdan ên li bajarên metropol ên cîran, li ser hindikahiyên li derveyî bajaran, di serî de li Ewrûpayê û li derveyî welat li her deverê, divê şêwazê xebat û rêxistina demokratîk di her çalakiyê de were meşandin. Di nav van şêwazê xebat û rêxistinê de divê dost û hindikahiyên li ser Kurdistanê jî cih bigirin û ji bo vê yekê nermahiya pêdivî pê heye were nîşandan. Divê rêxistiniya girseya

xwe û çalakiya xwe di ser her tiştî re bigire. Divê demokrasiya xwe bi rêxistin bike û bi cih bîne. Her çend divê li gorî qanûnên demokratîk ên heyî tevbigere jî di şert û mercên qanûnên demokratîk tine de, divê bizanibe têkoşîn û jiyana xwe li gorî rêvebername, destûrname û rêzikên demokratîk bi rêkûpêk bike. Divê bi kongreyên herêmî yên salê carekê rêveberiyên hemû saziyên (ji komîna herêmî heta KONGRA GEL) xwe yên demokratîk li gorî rêjeya serketin û çareseriyê ji nû ve hilbijêre. Divê bi rêbazên li cih sîstema xwe ya namzet û hilbijartinan amade bike. Divê rêveberek ji du deman zêdetir neyê hilbijartin û tenê bi şertê projeyên wê yên nû hebin dikare ji du deman zêdetir ji nû ve namzetiya xwe deyne.

Di serî de gelê me yê li Ewrûpayê, divê hemû gelê me yê li parçeyan û metropolan bi demokrasî û rêbazên xwe yên li cih, namzetên herî serketî yên saziyên xwe (ji komînên herêmî ta yên KONGRA GEL) hilbijêre, bi rêkûpêk jê rapor bixwaze û li ser vî hîmî kontrol bike. Eger dewlet ji demokrasiya xwe re rêz bigirin divê bi wan re li hev bikin, na eger berovajî bibe, divê bi rêbazên li cih, berxwedana xwe ya demokratîk heta dawiyê bimeşînin. Ji bo gelê me rêya herî li cih a azadî û wekheviyê demokrasiya wî bi xwe ye, pêwîste li vê yekê baş serwext bibe û heta serketinê bibe.

Di qada siyasî de hewceyî bi medya azad jî heye. Bêyî medya azad, dewlet di warê demokratîkbûyînê de nerm nabe û qada siyasî demokratîze nabe. Li Kurdistanê, ne wek mafekî ferdî, belkî wek mafekî gelemperiyê divê medya ji nû ve were sererastkirin. Di vê medyayê de pêwîst e ji bo ziman cihêwazî hebe.

Tê zanîn, saziyên feodal li pêşiya demokrasiyê asteng in. Terîqetparêzî, eşîrtî, şêxtî û axatiya bermahiyên serdema navîn in, divê bi rêbazên guncaw ên demokratîk ji bo veguherînê bêne tengavkirin. Ev saziyên li pêşiya exlaqê azad dibin asteng, mejî ditevizînin û rê li ber kurtêlxuriyê vedikin, herî kêm bi qasî saziyên dewletê yên klasîk demokrasiyê asteng dikin. Mirov dikare van hemû xusûsan weke xalên li cih ji bo qada siyasî fena rêzikên bernameyê bifikire. Divê mirov sererastkirina xalên li cih û helwestên teorîk ên ji bo qada siyasî di vê çarçoveyê de pêş de bixîne. Ev yek ji aliyê rastiya sîstema serdest û rastiya gel realîst e, û şensê wê yê bi cihhatinê jî heye.

Cewherê bernameyê di warê qada civakî de erkên çareserî û pirsgirêkên li pêşiya malbat, jin, tendurustî, perwerde, exlaq, dîn û çalakiyên hunerî pêk tîne. Tevî ku qada civakî bi awayekî ji qada siyasî û ekonomîk nebe, têkiliya wê heye jî, ji bo rê li ber hêsanbûnê

veke mirov dikare weke beşekî cuda sererast bike. Ya esas, diviyabû wek qada sereke bihata nirxandin, lê ji ber tehekuma di qada siyasî de û ji ber îstîsmara di qada ekonomîk de qada civakî di nav tengavbûneke mezin de ye. Hema bûye gewdeyekî welê bi nexweşiyê ketiye. Divê yek ji fonksiyonên bingehîn ên bernameyê ew be ku qada civakî were xurtkirin û parastin. Pêwîst e giranî ji aliyê ekonomîk û siyasî derbasî aliyê qada civakî bibe.

Sîstemên dewletan ji bo kontrolkirina civakan pirî caran derfetên aborî ji destên wan distînin û ji bo civakê dîsa bi xwe ve girê bidin hindik hindik didin, divê dest ji vê rê û rêbazê were berdan. Divê neyê ji bîrkirin ku ji bo bilindbûyîna asta azadiya civakê ev nuqteyeke bingehîn e. Ji lewra pêwîst e ev rêbaza bi aboriyê civakê terbiye dike were terikandin. Ev rêbaza zêde zêde li ser civaka Kurd hatiye ceribandin, gelê me tam kiriye rewşa parsekan. Beriya her tiştî divê ev daf û xefik ji qada civakî were rakirin. Li ser çavkaniyên aborî ne heqê dewletê divê yê civakê were qebûlkirin.

Di saziya malbatê de jin, zarok û mêr hêmanên sîstemê yên herî zêde xetimîne. Sîstemê malbat kiriye mîna sergovekî û hemû nakokiyên sîstemê di vê saziyê de xeniqandine. Zewac, zilam-pîrek û zarokan hînê nekarîne têkiliyên sîstema feodal li dawiyê bihêlin. Bi têkiliyên bêînsaf ên kapîtalîzmê dor li wan hatine girtin, tam jiyaneke zindaniyan dijîn. Tevî ku li Kurdistanê malbat pîroz tê dîtin jî, nemaze ji ber tinebûna astek wê ya azadbûyînê, tinebûna derfetên aborî, pirsgirêkên tendurustî û perwerdê, malbat tam di cendereyekê de asê kiriye. Rewşa jin û zarok ketinê tam felaket e. Ya esas, kuştinên bi sedema namûsê têne kirin, semboleke rewşa jiyanê ya bi giştî ketiyê, nîşan dide. Namûsa civakê ya hatiye qedandin, di pozê jinê re tînin. Zilamtiya îflaskirî hêrsa vê yekê ji jinê distîne. Di şert û mercên heyîn de malbat bi demokratîkbûyîna giştî ya civakê dikare bikeve rêya çareseriyê. Mafê weşan û perwerdeya bi zimanê zikmakî qismî be jî dikare pêşî li xirabûna nasnameyê bigire. Destekdaneke taybet a aborî dikare ji bo demekê malbatên xizan xilas bike.

Li Kurdistanê li derveyî dewletê û beşekî bi sînor ê hevkar mirovatiyeke din heye ku kes ne dikare behsa wan bike û ne jî binivsîne. Eger pirsgirêka wekhevî, azadî û nasnameyê yên din neyê çareserkirin, em nikarin bibêjin civak ji şerekî herî qirêj hatiye kirin. Di civaka Kurd de, di malbata wî de, di pîrek, zilam û zarokên Kurd de şerekî yekalî yê trajîk diqewime. Divê bername bi awayekî xweser nêzî mijarê bibe û ji bo çareseriyên afirîner hedefê li pêşiya xwe deyne.

Divê perwerde hem di warê fermî de, hem jî di warê zimanê zikmakî de azad were hîştin. Eger dewlet alîkariyê jî neke, divê saziyên perwerdê yên gel ên di warê çand û ziman de bi derfet û îmkanên xwe ava bike, asteng neke. Wezîfeya tendurustiyê wek xizmeteke gelemperiyê divê ji aliyê dewletê û civaka sivîl ve karibe were meşandin. Ji bo civak bi tevgerên hunerî yên azad karibe xwe xwedî bike divê derfetên azadiyê werin dayîn. Heta civak bi exlaq nebe di kar de serketin nabe. Ji bo exlaqekî azad jî serwextbûna civakê şert e. Ji lewra divê bi awayekî berfireh pêşî li serwextbûna civakê neyê girtin. Civaka azad, civaka bi exlaq e. Ev rastiya di zikhev de divê xwe di hemû xebatan de nîşan bide. Divê cihê dîn ê di jiyana civakê de were guftûgokirin, ji kelem û astenbûyînê were derxistin û ji ber ku kevneşopiya herî kevin û wijdanê civakê ye, divê di reformek hewce de were derbaskirin û bi felsefe û zanista hemdem bi civakê re li hev were anîn. Bi xwe gîhandina zimanekî hevpar ê dîn, felsefe, zanist û heta mîtolojiyê, dikare ferd ji tengavbûna îro ketiyê derkeve. Dîn hînê zêdetir dikare di exlaqê nû yê azad de rol bilîze, zanist jî dikare li gorî xwe têkiliya wî bi civakê re ji nû ve şîrove bike û wek erkekî ji civakê re pêşkêş bike. Divê em baş fêm bikin ku peyxemberan di cewherê xwe de ev rol bi cih anîne. Dîn di ti demê de bi qasî îro bêyî fonksiyon û dejenere nehatiye kirin. Divê armanca bingehîn a reforma dînî ew be ku dîn ji nû ve bigihîne fonksiyonê.

Divê tespîta herî bingehîn a bernameyê di warê qada civakî de ew be ku giraniya xwe ya wenda kiriye ji nû ve pê bide bi destxistin. Hindikayiyeke kêm a dewletê û aboriyê di destê xwe de digire, divê dest ji helwestên xwe yên şêlanker û mijok ên li ser civaka bi hezar salan bi êş û hewldanan tê, berde, hurmet û rêza pêdivî pê heye dîsa lê vêgerîne û vê yekê wek polîtîkayeke bingehîn a civakî qebûl bike. Divê bername civakê hem ji hindikayiya li serê dewletê û hem jî talankariya ferd, dizekî û êrîşên wan biparêze û vê yekê weke wezîfeyeke bingehîn a di qada civakî de fêm bike. Asta azadiya jinê, asta azadiya civakê, asta azadiya civakê jî asta giştî ya demokratîk û asta dewleta civakî ya ji bo demokrasiyê, nazik destnîşan dike.

Azadiya jinê divê wek xaleke cuda ya bernameyê were amadekirin. Ji ber ku ev mijar navendî ye hewceyî bi vê yekê heye. Analîzên ku me derbarê pirsgirêka jinê de kirin, didin xuyakirin ku pirsgirêk nuqteya nîrengê bingehîn ê veguherîna civakê ye. Eger yek ji nuqteya sosyalîzma reel tê de wendakir pirsgirêka îqtîdar û şer be, ya duyemîn jî pirsgirêka jinê ye. Jin û îqtîdar du rastî ne bi hev re

nakok in. Jin yekemîn çîn, cins û netew e hatiye pelixandin. Heta azadî û wekheviya wê di nav pêşketina dîrokî û civakî de neyê nirxandin û teoriya wê neyê danîn, wê pratîkek wê ya têkûz jî nebe.

Li ser jina di civaka Kurd de, şopên ji dema neolîtîkê mane hînê jî bandora xwe dewam dikin. Tevî vê yekê, qehra hemû pêvajoyên şarastaniyan kişandiye. Karekterek wê ya berxwedanê heye. Eşekere ye, li îxaneta serdemê qewimiye. Wexta ev tayebetî bi hewldanên gerdûnî yên femînîzmê re bigihîjin hevdu, partiyeke cuda ya jinê dikare di têkoşîna demokratîkbûyîn, wekhevî û azadiya civakî de roleke mezin bilîze. PAJK li gorî vê rolê hatiye damezrandin. Her çend nikaribe bi hêsayî xwe ji têgihîştina mêrtiya serdest xilas bike jî di azadiyê de israr wer girîng e ku dest jê nabe. Ya herî baş ew e ku ji bo azadkirina cîhana jinê, jin bi xwe mejiyê xwe yê hisî û mejiyê analîtîk bi hev re bixebitîne û pêk bîne. Divê jin mîtolojî, felsefe, dîn û zanistê ji nû ve li gor xwe di ber çavan re derbas bike, bi mejiyê xwe yê xweser û azad şîrove bike û bixe pratîkê. Eger mirov bi mejiyê jinê nêzî teorî û pratîkê bibe dikare bigihîje dunyayek nêzî xwazayê, aştiyane, azadîxwaz û wekhevîxwaz a bi jiyaneke bedewî barkirî.

Li Kurdistanê, pêşketin û israra di PAJKê de dikare bigihîne fazîletên xwedawendan, paqijiya periyan û bedewiya Afrodîtê. Sentezeke welê ya jinê, çandeke mêr a çareser neke, hêzeke jiyanê ya nikaribe ber bi xwe ve bikişîne û çalakiyeke nikaribe bide meşandin, nîne. Heta fazîleteke jinê - li dijî çanda koletiyê ya di tevahiya dîrokê de hatiye ferzkirin û li dijî zilamtiya despotîk - ya di hempayê pîrozbûna xwendawendên mîtolojîk û dîrokî de pêş nekeve, di jiyanê de esalet, azadî û wekhevî nabe. Eger ev nirx neyên bi destxistin, wê jiyanê timî ji destçûyî be.

Divê bername di vê çarçoveyê de pirsgirêka jinê xal bi xal sererast bike.

Pêwîst e, helwesta bernameyê di qada ekonomîk de ji ekonomiya metakirin û karê, derbasbûna ekonomiya xwe dispêre parvekirin û li gorî nirxê, bi kar anîn be. Ekonomiya hêrsa karê rakiriye pêdarê ne tenê civak, xweza jî texrîb kiriye. Em her ku diçe ber bi hawîrdoreke jiyan lê nebe dişemitin. Eger polîtîka ekonomiya bûrjûwaziyê neyê rawestandin cihê bigihîjê wê dojeha rastîn be. Ji ber ku bûrjûwazî li pey kara herî zêde ye, nemaze derketina pêş a derdorên fînansê yên dixwazin tenê bi peran bilîzin û karê bi dest bixin, globalbûyînê bi aliyê wê yê herî xirab bi mirovatiyê dide jiyîn. Di ti dema dîrokê de ti çîneke civakî ev çend nekariye karê bike û

nirxan bi dest bixe. Yek ji sedemê sereke yê dejenerebûna civakê, asta fînansê ya ekonomî gihîştiyê. Bazirganî û pîşesaziya fînans diherikîne, timî rê li ber metakirinê vedike û ji ber ku gelek şêweyên wê yên hewce nakin û pir karê tînin, pêşkêşî civakê dike. Hem hebûneke civak nikare bikire û biqedîne, hem jî mirovatiyeke din a ketiye nav tinebûn û xizaniyeke xeternak diafirîne. Mirovatî hînê zêdetir nikare bi vê polîtîka ekonomîk bijî. Rola bingehîn a sosyalîzmê li vir derdikeve pêşiya me. Ew hêdî hêdî ji civaka meta ber bi civaka hilberînê li gorî pêdiviyan dike diçe, ji hilberîna karê esas dibîne ber bi hilberîna parvekirinê esas dibîne, dihere. Polîtîka sosyalîzmê ya ekonomiyê ev e. Divê bername prensîba xwe ya ekonomiyê bispêre vê polîtîkayê. Wexta ev polîtîka ekonomîk were bi cihanîn, wê bêkarî, di nav hebûnê de xizanî, tevî hilberîna zêde birçîbûn û ji bo karê texrîba hawîrdorê nebe çarenûs.

Civaka ekolojîk di cewherê xwe de civaka sosyalîst e. Civaka tehekumkar a bi şaristaniyê re ji xwezayê û hawîrdorê qut bû xerîb ket, kengî derbasî civaka sosyalîst bibe mêzîna ekolojîk û civak dikare watedar bibe. Di bin sîstema kapîtalîst de rizgarkirina hawîrdorê xapandin e. Bi awayekî nehatiye dîtin ê mêzîna ekolojîk xira dike sîstem bi xwe ye. Çendîn sîstem bêtesîr bibe û sîstema civaka sosyalîst pêş bikeve, wê pirsgirêka hawîrdorê ji binî ve were çareserkirin. Ev nayê wê maneyê ku wê ji niha ve ji bo hawîrdorê tiştek neyê kirin. Berovajî, ji bo hînê aktîfkirina têkoşîna hawîrdorê divê bi têkoşîna giştî ya veguherîna civakî di zikhev de werin meşandin.

Bername bi taybetî divê bide zanîn ku bi bêkartiyê buhabûn, bi xizantiyê birçîbûn, bi texrîbkirina hawîrdorê metabûyîneke zêde û bi hilberîneke zêde mehrûmbûna ji qîmetê berhemên sîstema kapîtalîst in û çarenûs nîne, bi ekonomiya sosyalîst dikarin nebin pirsgirêk. Ev yek divê di bernameyê de bi xurtî were ziman û bi xalan tê de were bi cihkirin.

Mijareke din a divê bi taybetî di bernameyê de were bi cihkirin ew e ku pirsgirêka tercîhê ya di warê qîmeta metabûyîna mal û bi karanîna wî de ye. Metabûyîna malan ber bi rejîma karê ve dibe û di serî de xebat-bêkartî bi xwe re xizantî-dewlemendî, hebûn-tinebûn, luks-qirêjî, serdest-bendest, mêtinger-mêtingeh, hakim-mehkûm, cinsê serdest-bendest û cudatiyên din pêş dixîne. Berovajî nirxê bi karanînê yê malan rê li ber van dualîteyan venake. Bûyerên di karekterê civaka sosyalîst de biqewimin. Mînak em li her deverê darên meşe deynin. Qîmeta meta ya dara meşe zêde nîne. Lê ji bo bi

karanînê qîmeteke wê ya mezin heye. Darên berû bi qîmet in. Êzingên wan baş in, siya wan xweş e. Ji bo pirsgirêka hawîrdorê çareyeke baş e. Mirov dikare Rojhilata Navîn a qûtûrût bike daristan û ev ekolojiyeke mukemel e. Ya girîng, dikare derfet û îmkanê kar bide her kesî. Mirovê bê perwerde yê ti karê wî nebe dikare li meşeyan mêze bike û bigihîne. Bi pêşdebirina vî karî dunyayê jî xilas bibe.

Têkiliya bernameyê bi eneternasyonalîzmê jî ji aliyê herêm û dunyayê ve were destnîşankirin. Rewşa Kurdistanê ya berçav bi dîrok, cografya û gelên Rojhilata Navîn re mîna goşt û hestî di nav hev de dijî. Ji lewra qebûl nekirina netewparêziyê watedar e. Di têkilî û nakokiyên Îsraîl-Filîstînê de netewparêzî esas e, lewma bingehê hemû felaket û çareser nebûnan e. Piştî ku li netewparêziyê ya dînî jî zêde dibe, felaket hînê mezintir dibe. Lê eger derfetên çareseriyeke demokratîk esas bihatana dîtin, xuya ye wê ji îro kêmtir êşê bihatana kişandin û wê ji nîzamê îro çêtir nîzamekê bihata danîn. Eşkere ispat bûye ku helwestên zêde dewletparêz, netewparêz, ne ku çareserî, polîtîkayên xeternak in. Li Kurdistanê jî eger heman ekolên netewparêz dewletparêz serdest bibin, wê ne yek, wê çar Îsraîl-Filîstînê derkevin holê. Ji vê, encamek divê em derxînin heye. Her weha di dema nêz de pirsgirêkên Ermenî-Osmanî, Kurd-Komar, Ereb-Osmanî, Kurd-Iraq û di roja me ya îro de encamên pirsgirêka li Çeçenistan, Qerebax, Kosova û Qibrisê rê li ber vekirine, xuya ne. Ji bo rê li ber bûyerên xeternak venebin, rêya herî baş ew e ku di pirsgirêka Kurd de îmha, înkar û sernuxumandin nebe û bêyî ku bixîne rewşa parsekiyê, bi reformeke demokratîkbûyînê û aştiyeke ji dil û têkûz biwêribe gav werin avêtin. Formula giştî ya ji bo vê yekê me di rastiya Tirkiyê de analîz kiribû û bi hevpariya di xizmetên gelemperiyê û ewlekariya giştî de wek 'dewlet + li Kurdistanê demokrasî' formule kiribû. Em dikarin vê formulê li tevahiya Rojhilata Navîn bibirrin. Bi awayekî berçav em dikarin bibêjin; 'demokratîkbûyîna li Rojhilata Navîn + nazikbûna dewletê ji bo demokrasiyê = ji bo Kurdistanê azadî ye.' Kurdistana azad hînê zêde Kurdistaneke demokratîk e. Mirov dikare li gelemperiya dunyayê bi civînên Porto Allegre demokrasiyên herêmî bi platformên jornetewan bigihîne Kongreya Demokrasiyê ya Global a gelên cîhanê, yên navend-dewlet nînin. Wek encam, em dikarin ji bo dema pêş Kurdistana demokratîk > Federasyona Rojhilata Navîn a Demokratîk > Kongreya Demokrasiyê ya Global wek sloganeke surnatîonal bi kar bînin.

Mafên ferdî divê wek mafên mirovan karibin di bernameyê de cih bigirin. Pêwîst e mafên ferd ên raman, gotin û azadiya îradeyê di bin her şert û mercî de werin parastin. Ti dewlet, welat û civak ji bo berjewendiyên xwe nikare ferd ji azadiya raman, gotin û îradeyê bêpar bike. Divê xwegîhandina nuqteya optîmal a di navbera civakîbûyîn û ferdiyetê de armanceke bingehîn be. Azadiyeke civakî ya di azadiya ferd re derbas nebe û azadiyeke ferd a di azadiya civakî re derbas nebe, di dawiya dawî de neçar in wenda bikin. Mafên mirovan ên bingehîn bêyî ku êrîş bibe ser mafê civakbûyînê û bizanibe bêyî wê nabe, divê zêde ferdî, li derveyî civakê nebe û nekeve nav meylên zêde bêberpirsiyarî, naxwe watedar nabe.

Ne ku wek berê piştgiriyeke navnetewî, divê helwesteke jornetewan were nîşandan. Divê ne international be, pêwîst e supernational (jornetew, ji netew wêdetir) be. Divê mirov xwe bigihînin têkiliyek ji dîn, netew û çînan derbaskirî. Li ser van hîman dikare hem piştgiriya humanîzmê û hem jî ya kedê watedar bibe.

Di bernameyê de divê têkiliya di navbera demokrasî û sosyalîzmê de pir eşkere were destnîşankirin. Sosyalîzm bi giştî bi gotina wekheviyê tê tarîfkirin; rêya wê jî di kollektîfkirina mulkiyetê de derbas dibe û bi vê têgihîştinê bû yek tişt. Têkiliya wê bi azadî û demokrasiyê re nekarî were danîn. Wer hat ziman ku hat gotin; têkilî tê danîn çawa tê danîn û bi kîjan sîsteman tê danîn girîng nîne. Ji ber vê yekê, di encamê de wek kapîtalîzma dewletê dejenere bû. Hem pêşketinên ezmûnî, hem jî yên teorîk baş nîşan dane ku heta azadî neyên jiyîn û demokrasî bi cih neyê anîn, wê xwe gîhandina sosyalîzmê jî nebe. Sosyalîzm bi destê dewletê nayê avakirin. Ta ji Sumeran bi destê dewletê gelek gavên kollektîfkirinê hatine avêtin. Tevgerên herî berfireh ên sosyalîzasyonê dewletan kirine. Di vê rewşê de divê em dewletê wek saziya herî mezin a sosyalîst bibînin. Ezmûna Sowyetê dewama heman meyla dîrokê ye. Ji lewra ya rast ew e ku mirov ji tevgerên wekhevî û xizmetên gelemperiyê yên bi destê dewletê re bibêje; sîstema patronaj durustir e. Di şûna efendî, axayek û kapîtalîstekî de wek nasnameyeke hevbeş a hemûyan di cewher de heman rolê dilîze. Eger demokrasî herî hindik dewlet e û bi pêşketina demokratîk wekhevî tê bi destxistin, wê wextê mirov dikare behsa xwegîhandina sosyalîzma rastîn bike. Divê mirov ji bîr neke ku bêyî azadiyê ev yek nabe. Kengî wekhevî wek bêtehekumiyê bi azadiyê re bibe yek, mirov dikare wan wek soyalîzmê bike têgîn. Wekheviya bi darê zorê nabe sosyalîzm. Ji lewra civaka bi kirinên

demokratîk ên berfireh xwe gîhandibe azadiyê û bibe wekhev, sosyalîst e.

Wek encam, ramana pêşnûmeyê ya bernameyê û sîstema teorîk a xwe dispêrê bi xetên sereke hat destnîşankirin. Têgihîştineke bernameyê ya ji tesîrên dewletparêz û netewparêz hatiye kirin û veguherîneke civakî ya ber bi demokrasî, azadî û wekheviyê ve esas hatiye dîtin. Tevî ku bernameyeke lîberal nîne, roleke rastîn ji bo însiyatîfa ferdî nas dike. Di bernameyê de, di şûna îqtîdarê de otorîteya demokratîk, di şûna kontrolkirina civakî de azadî, di şûna piyasa lîberal a xwe dispêre meta û karê de parvekirin û li gorî qîmetê hilberandin, ferd û civakê li nuqteyeke optîmal digihîne hevdu û vê yekê wek xeteke bingehîn destnîşan dike. Eşkere ye, ev raman wek pêşnûmeyekê hatine pêşniyarkirin ji bo li ser were guftûgokirin, guhertin û zêdekirin.

2- Di jinûve avakirina PKKê de cewher ji aliyê bernameyê ve tê diyarkirin û şêwe jî ji aliyê rêxistinbûyînê. Teorî çawa bernameyê diyar dike, bername jî wisa rêxistinbûyînê diyar dike. Rêxistin mîna hestiyên bedena mirov in. Beden çawa bêyî hestî dibe lopeke goşt, partiyek bêyî rêxistin jî wê nikaribe xwe rizgar bike ji bo nebe tevgerek bêvîn ya hundurê xwe pûç. Çawa ku tenê du atomên hîdrojen û oksîjenê molekuleke avê pêk tînin, rêxistinbûyîneke kadro ya guncaw jî dibe hîm û bingehekî civak li ser were mezinkirin. Ji lewra durustire mirov mijara rêxistinbûyînê wek rêxistinbûyîna kadro û rêxistinbûyîna girseyê li ser du beşên bingehîn bigire dest.

a- Tevahiya dîrokê saziyên mîna partiyan timî xwedî kadroyên bi vîn û bawerî bûn. Gelek sazî û dezgehên bê kadro nekarîne xwe xilas bikin ji bo di kûrahiya dîrokê de wenda nebin. Wexta doz û partî ji aliyê kadroyên xurt ve hatibin temsîlkirin wê ciddî bêne dîtin. Wek me gelek caran aniye ziman, kadro ew mîllîtanê-a ku zêhniyeta partiyê û esasên bernameyê herî baş dawerivandiye hinavê xwe û wek lehiyek bi coş dizane di pratîkê de biherike, îfade dike. Ji ekîba sazûmankar a veguherînê ye. Divê karibe têkiliya di navbera teorî û pratîkê de baş deyne, rêxistinbûyîna girseyê bigihîne çalakiyan û karibe xwedî qabîliyeta rê û ber bidê. Dîsa ew nasname ye ku dikare exlaqê civakî û afirêneriya polîtîkayê di asta hunermendekî-ê de di şexsê xwe de bigihîne hevdu. Li gorî vê tarîfê, dema em li dîroka PKKê û jinûve rêxistinbûyîna wê binerin, em gelek hêmanên erênî û neyênî di nav hev de dibînin. Eger PKK îro jî hînê heye, ev di serî de bi saya kadroyên wê yên esîl û mîna abîdeyeke mirovatiyê bû. Her weha eger negihîştibe serketineke tam jî ev yek dîsa ji ber kadroyên

wê yên nekarîn xwe ji pirsgirêkên giran xilas bikin. Hem serketin û hem jî bi serneketin ji kadro ye. Di şexsê kadroyan de gulokeke mezin a nakokiyên civakî hatiye vereşandin. Çendîn ev nakokî hatine vereşandin hin pê ketine û hin jî pê bi hêz bûne. Trajediyeke kadro ya qehremanî û îxanetê timî di zikhev de meşiyaye. Tevî hemû hewldanên me yên perwerde û pratîzekirinê, me kir nekir me nekarî em xwe bigihînin kadroyên xetê bidin meşandin. Xetimînên di pêvajoyên PKKyîbûyînê de ji ber van kêmasiyên kadroyan bûn. Di pêvajoya pêş me ya jinûve avakirinê de dîsa pirsgirêka bingehîn wê hewldana ji bo kadroyên xurt be.

Eger bernameya partiyê baş bi cih were anîn dibe ku ev pirsgirêk çareser bibe. Naxwe wê xetimandinên nû bibin. Kadro karekî evîn û arzûyê ye. Kadro bi awayekî bê sînor ji armancên xwe bawer dike, bi biryar e û xwe ji bo rohnîbûnê radixîne. Kesên xwediyê van taybetiyan nebin, timî bi hewes û daxwaza kariyerê pêş girtine û rê li ber rewşên neyênî vekirine. Kadrobûyîn ji heweseke wêdetir, pêşbêniyeke teorîk, bi kûrahî dilsoziya bi bernameyê re û mirovê bi arzû avahiya partiyê ava bike dixwaze. Di dema nû de wexta ber bi rêxistinkirina kadroyan gav were avêtin, bêguman divê ev taybetî esas bêne dîtin. Her rêxistinbûyîna ciddî ya civakî, siyasî û ekonomîk dixwaze bi heman têgihîştina kadro bibe xwediyê hunerê pêşengiyê. Di serketina xwe de dixwaze para vê yekê bibîne.

Me di beşên berê de diyar kiribû ku em wexta digihîjin biryara jinûve avakirina PKKê, em pirsgirêkên giran ên deman pêş esas dibînin. Me wexta hevalên herî hêja şehîd dan û yên mayî jî bi awayekî fedekarane xebitîn, gelek hêmanên firsendok, karyerîst û çetekar nirxên heyî kotin û keritandin. Rastiya civakî mîna ku di nav partiyê de derfetên jiyanê dîtibe. Tevî ku em di kêliya herî krîtîk a dîrokî re derbas dibin, hin hêman bêyî fedî bikin ji daxwazên xwe yên ferdî û hewesên xwe yên îqtîdarê daneketin û ev kes ti car kêm nebûn. Dîsa tevî ku gelek kar hebûn, bi qasî karkerekî normal jî yên nexebitîn û li derveyî hilberînê jiyan kêm nebûn. Bi têgihîştina 'silav li sofreya hazir' xwestin çeperan bigirin. Li ser mîrateya partiyê xwestin pirsgirêkeke îqtîdarê biafirînin. Helwesteke zarokane ye, lê xeter e.

Dema me li ser navê partiyê hin sererastkirin bi cih anîn, bi berpirsiyarî fêm nekirin ku me hewldanên bi vî rengî di berdêla rewşên me bixin xeterê de ji bo parastina kadroyan kirine. Lê me bi serwextî û têgihîştina trajediyên li pêş xwe, hewl da hevaltiyê bikin. Me ew pir rexne kirin û bi vî awayî dawetî wezîfeyê kirin. Me gelek

caran ew hişyar kirin, ji bo bîranîna bi hezaran hevalên şehîd û ji bo hêviyên gelê me yê di bin pirsgirêkên giran de dijî, hêja bibin, naxwe dîrokê ti car li wan nebore. Lê tevî vê yekê, me kir û nekir nekarîn xwe bigihînên şêwazê afirîner ê serketinê. Ya herî neyînî jî lîstika îqtîdartiyê bû ku bi pêvajoya Îmraliyê re li ser mîrateya partiyê, ketin navê.

Li aliyekî hevalên me yên xwe dişewitandin û gelê me yê xwedî êş, li aliyê din jî komên îqtîdarê yên bi cewher û şêweyê xwe hêjayî kevneşopiyên me nedibûn, nakokiyeke mezin bûn. Wê helwestek rast bûya ku me ev li ser zemînekî jinûve partîbûyînê çareser bikira. Li ser vî hîmî wexta mirov nêzî pirsgirêka kadro bibe, bêguman hesabên mêzînê yên îqtîdarê nayên kirin. Herçî bi kesên xwe kirine komik re bi rica û tikayê nedihat gotin ku werin em bibin partî, ji lewra ya rast ew bû, me têgihîştina xwe ya programatîk û teorîk danîtina holê û bi kesên xwedî baweriyeke mezin û serwextbûneke cihêwaz re li mîrateya xwe xwedî derketana û ji nû ve şêwe bidana cewherê xwe.

Pir baş tê zanîn ku di nav mîrateya me de ji aliyê hejmar û naverokê ve têra xwe namzetên kadro hene ji bo tevlî partiyê bibin. Me wezîfe zanî, ji bo ev bi dilê xwe werin cem hevdu û di nav îrade û fikreke azad de bikevin ser rêya partîbûyînê. Me bi Komîteya Amadekar a jinûve avakirinê ku ji duwanzdeh kesan pêk dihat, hewl da gavekê biavêjin pêş. Pirsgirêk ji wî cureyî nîne bi wezîfedarkirinên bi lez çareser bibe. Jixwe hîç nabe yên di dema borî de werin dubarekirin. Hewceyî bi kadroyên hosta heye, ji bo zirarên dema buhurî ji holê rakin, paşerojê bi dest bixin, bandora kêlî dixwaze nîşan bidin û ti bahaneyan wek sedem dernexînin pêş. Piştî ezmûneke serketî ya bi van namzetên kadro yên xwedî taybetî re, mirov dikare wek endamên esîl bi wan re bixebite. Kesên ketine rewşa alîgir û grûb, piştî nirxandineke bi kok, rexne-xwerexnekirin û hewldaneke pratîk dikare di heqê wan de bigihîje encamekê. Divê baş were fêmkirin ku bi hesabên kevin hatina cem hev û partîbûyînê nebe. Di vir de ne niyeta baş, pîvan diyarker in. Lê hemû têkilî ji van koman nayên qutkirin. Di bin banê KONGRA GEL de wê xebatên xwe dewam bikin. Bi vî awayî wê were ispatkirin ku partiyeke demokratîk wê beriya her tiştî demokrasiyê di nava xwe de bi cih bîne.

Ji bo rêxistiniya kadro bawer nakim ku hejmareke zêde hewce û bi kêr bibe. Ez yeqîn dikim ku hejmareke bi qasî 300-500 kadro wê

têrê bikin ji bo bernameyê bidin meşandin, girseyên gel seferber bikin û di her warî de bibin hêza temsîlê.

Li şûna ku kadro bi şemayên mekanîk werin bi rêxistinkirin, normal e ku tercîheke fonksiyonel a rêxistinî were kirin. Tenê ji bo tijîkirina qad û cihên wezîfê divê kadro neyên erkdarkirin, berovajî, mirov dikare qadro li cihê serketinê bi dest bixe, wezîfedar bike. Kadro û pîvanên wan ên li benda serketinê pîvan in. Wexta hewce bike yek û wexta hewce bike bi dehan kesî temsîl dibin û dikarin komîteyan ava bikin. Lê ji ber ku kollektîvîzm taybetiyeke hewce ye, temsîlên cot her tim têne tercîhkirin. Di şûna mil, polîtburo û komîteyên navendî yên klasîk de, fonksiyoneliya behsa wê tê kirin hînê li cih e. Divê mirov zêde guh nede pirsgirêkên şekil û şêwazê, pêwîst e çareseriyên li gorî cewherê bêne tercîhkirin. Eger kadro qabîleyeta çareseriyê di xwe de bibîne dikare pêşniyarê bi xwe bike û li cih e, yan jî bi tayînkirinê jî dibe. Lê bi zorê li cih nîne.

Di mehên pêş me de ji bo qadên neçar pêdiviya wan heye dikarin têra xwe kadro wezîfedar bikin. Di nav demên ji şeş mehan derbas nekin de li derdora sed kadroyî bi rêxistinkirin bi hêsayî mumkîn e. Eger hewce bike, mirov hînê jî dikare pir an jî hindiktir wezîfedar bike. Divê însiyatîfa ferdî û kolektîvîzm di zikhev de were bi karanîn. Di şêwazê xebatê de lez, di ber çavan re derbaskirin û ji bo xwe gîhandina encamê hewldan ji wan xusûsa ne têne zanîn. Bi qasî hakîmiyeta li ser bername û teoriyê, şêwazê xebatê û tempo jî pêwîst in. Ji ber mora 'terorîst' a tê zanîn, xebateke xweser a afirîner li cem hemû girse, yekîneyên parastinê, xebatên li qadên legal û îllegalê hewce dike. Divê uslûp û şêwazê jiyanê li hawîrdorê bibe hêza coşî û kişandina mirovan. Uslûba mirovan dûr dixîne û dide revandin, herî hindik bi qasî provakasyonê xeter e.

Em bi kurtî û xulase dikarin bibêjin, bi polîtîka kadro û bi herî kêm rêxistinkirina wî, çûyîna bi ser kar û pratîkê ve helwesteke rast e. Bi qasî xebata bi dilxwazî, xebata bi disîplîn a di asta mînakbûyînê de esas e. Di nav mîrateya qehremaniyan de û bi gelekî ku rabûye ser piyan re û ji bo azadiyê tî ye, tê meşîn. Piştî tecrûbeyeke mezin û pratîkeke baş hatî analîzkirin, çûyîna ser kar bi qasî heyecanê dide, divê li dijî serneketinê jî bibe xwedî helwesteke xwe ranagire û di xebatê de afirandinê wek şert ferz bike. Serketina di wezîfeyan de bi qasî sozên hatine dayîn, pîvaneke têkûze ji bo cewherê rastîn ê kesayetê derkeve holê.

Pirsgirêkek bi rêxistinkirina kakilî ya partiyê re têkildar, mijara destûrnameyê ye. Şemaya giştî tê zanîn. Bi awayekî bi rêkûpêk

kongre, dikare di kongreyan de serokekî hilbijartî yê kongreyê, navend an jî meclîsa partiyê, desteyeke rêveber a navendê ji nava xwe hilbijartî, sekreterya giştî û alîkarên wê, desteyên navendî, ber bi jêr ve komîteyên komîn ên herêmî û xwecihî û komikên jêr, rêxistiniyên bask ên girseyî û dikare rêxistiniyên seksiyon (dikare li gorî parçe û welatan be) û beşên din bigire nava xwe. Ez di wê rewşê de nînim ku li dij an jî ji bo vê modelê nirxandinê bikim. Lê em ji ezmûnan dizanin, ji mêj ve ev ji bo dewletbûyînê wek şêwazekî hatiye bi karanîn, otorîteriya xwe hînê pêş de dibe û aliyê xwe yê demokratîk zêde bi kar nayne. Em nikarin bibêjin ev modelê hema vê encamê bide. Ya diyarker bername û teorî ne, eger were zanîn ku destûrname bi serê xwe amûrek nîne, di bi cih anîna bernameyê de amûrekî xebitandinê ye û eger ev wer bê xebitandin wê bi hêsayî bigihîne demokratîkbûyînê. Ev jî xusûseke bi cewherê kadroyan têkildar e. Teorî, bername, kadro, destûrname û xebitandin yekpare ne.

Li gorî rastiya Kurdistanê dibe ku ji bo her parçeyî rêxistineke seksiyon hewce bike. Partiya her parçeyî dibe ku ne tam serbixwe û ne jî tam bi navendê ve girêdayî be. Dibe ku şêwazê seksiyonên nîvgirêdayî li cih bin. Ji bo saziyên navendî mirov dikare desteya weşan-çapemeniyê, desteya akademîk a huner û zanistê, desteya huqûq û disîplînê û hwd. mînak nîşan bide. Mirov dikare ji bo rêxistiniyên bask û şax ên girseyî, yekîneyên azad ên jinan, yekîtiya ciwanên demokratîk, sendîka, kooperatîf, koçber, cotkar, esnaf, karsaz û hwd. bifikire.

Di xebitandina desteyan de rêvebernameyên teng, însiyatîfa ferdî û kolektîvîzm ji bo karekî têkûz xusûsên hewce ne. Ji bo xebitandina rêzikên hundurîn mirov dikare di mijara destûrnameyê de li ser hin modelên din jî rawest e. Di vir de ji bo em balê bikişînin me xwest em hinek fikran wek pêşniyar beyan bikin.

Di polîtîkaya kadro de yek ji mijarên ku nêzîkbûneke xweser dixwaze, dabaşa PAJKê ye. Di vê mijarê de nirxandin û destnîşankirina çend xusûsan girîng dibînim. Ez bawer dikim ku divê kadroyên kakil ên PAJKê hebin. Pirsgirêka jinê ji texmînan wêdetir hînê zêde di hemû pirsgirêkên demokratîkbûyîn, azadî, wekhevî û heta ekolojiyê de xwedî roleke kilît e. Li gor ku emê nikaribin hemû jinan bi carekê ve azad bikin, divê em vê yekê beriya her tiştî bi kadroyên kakil bi cih bînin. Eger kadroyên kakil ên PAJKê xwe azad nekin wê çawa mêr û jinên pir bûne pirsgirêk, azad bikin? Di vê mijarê de gelek diyalog û hewldanên min ên ji bo çareseriyê têne

zanîn. Ez dikarim bibêjim ku di vî warî de ez hînê jî ponijîme û min yeqînên xwe gîhandine hevdu.

Di tevahiya dîroka şaristaniyê de wek yekemîn çîn, cins û netewa kole em bi rastiya jinê re rûbirû ne. Xistina jinê ya mala taybet û mala giştî (kerxane) ji şêwazên vê koletiyê ne. Çavkaniya zordestiyê biyolojîk nîne, sosyolojîk e. Saziya zilamtî-pîrektiyê bi şêwazên xwe yên di şaristaniyan de bi taybet li dijî jinê û bi giştî jî li dijî hemû civakê hatiye xebitandin. Li hundurê malê împaratorê siyasî figurê zilam e. Zilam li hemberî pîrekê timî rola despot dilîze. Ev yek ti têkiliya wê bi niyeta ferdî re nîne. Divê wek rewşek şaristaniyê were fêmkirin.

Dibe ku ya rast ew be, mirov azadiya jinê bi çanda malbat-dayikê (dayika xwedawend) ya piştî şoreşa cotkariyê gihîşt qonaxeke mezin, bide destpêkirin. Min ji lewra nertina sêalî ya li mîtolojiyê mîna Xwedawend-Melek-Afrodît wek tesewirekê hilbijart. Em heta îmaja sivik a pîrek-qîzê hilneweşînin, em nikarin xwe bigihînin meznahî, hurmet û bedewiya jinê. Pîvanên şaristaniyê çavkaniya wan zilam e û jin ji hemû pîvanên wê yên melek, bedewî û pîrozbûna xwedawendîtiyê xistine.

Her çend kevin û bi cihbûyî be jî têgihîştineke dijwar a namûsê di navbera we hemûyan de (çi mêr çi jin ferq nake) heye, lê têgihîştina min a estetîk a şoreşgerî bi çandek welê ya zilamtî û pîrektiyê nakeve.

Min hewl dabû ez têgihîştina xwe ya li mijara dayiktiyê jî rave bikim. Li gorî min jin hînê jî ji mêr zêdetir li hemberî xwezayê hişyar û nazik e. Mêr mîna şaxekî jinê be. Wek tê texmînkirin ew navend nîne. Agahiyên zanistî jî vê yekê piştrast dikin. Kedxwarî û zordestiya mezin a li ser jinê, di asteke dûrî aqilan de, wê kir ku rastiya xwe veşêre û xwe cuda nîşan bide. Gotina mêran mode ya li jinê hatiye kirin ev pêvajo bi vegotin, uslûp û şîrovekirinên dûrî aqilan ên dîn, felsefe û heta zanist û hunerê, gîhandiye qonaxeke din. Ev helwesteke welê zalimane û bê esil e, jin kiriye ku ji xusûsên hîç baweriya wê pê nîne jî stû tewandiye. Bila kes li bendê nebe, ez wek mêzînkarekî hêz û azadiyê tevlî vê lîstika şaristaniyê bibim û erê bikim. Kêfa min ji dunya xwedayên mêr re nayê û her weha min rûyê wan ê rastîn jî fêm kiriye. Divê baş were zanîn ezê beşdarî xwedatiya vê dunyayê nebim. Ev xwedatiyên bi dîn, polîtîka, huner û zanistê wek dewletê xwe nîşan didin, kengî werin çareserkirin ji bo min dibin cihê eleqeyê. Tevî ku ez xwedawendîtiya jinê seyr û balkêş dibînim jî ez lê hayilbûme ku bi cihanîna wê zehmet e û

egîdiyê dixwaze. Lê ji bo temenek hînê bi aştiyê, bedewiyê û berpirsiyariyê bijî, hêja ye xwe li ser rêya azadiya jinê bide, ji ber ku ez bawer dikim bêyî hêza wê diafirîne wê jiyana behsa wê tê kirin nebe. Berovajî, mêrantiyeke xwe spartiye koletiya jinê ta ji zarokatiyê û hînê jî ji bo min kirêt e. Bila kes li bendê nebe ku ez vê kirêtiyê erê bikim.

Yê mayî jî rastiya em wek eşq bi nav dikin dikare diyar bike. Xuya ye hêdî hêdî tê fêmkirin ku ez eşqê li ser polîtîka me ya kadroyên jin ferz dikim. Ev helwest ji aliyê cinsî wêdetir hewl hatiye dayîn bi têgîneke ciddî ya çandî, siyasî, azadî û wekheviyê di zikhev de were pêşxistin. Tarîfeke eşqê hewce dike ku jin ji çanda xwe ya koletiyê rizgar bibe, mêr jî ji çanda xwe ya serweriyê xilas bibe û di qada siyasî de li bin mêzînên demokratîk bi helwesteke azad û wekhev, bibe. Ev helwest, têkiliyeke seresere ya bi arzûyên cinsî yên mêrê serwer û jina kole ji sînoran derketî red dike. Têkiliyên xwedatiyê yên hewce di navbera jin û mêran de pêk werin ku bi giştî di şaristaniya çînî de û bi taybetî jî di sîstema kapîtalîst de zehmet in, divê bêne fêmkirin. Ji xwedatiyê mabest û qesda me ew e ku di çîroka gerdûnê ya bîst mîlyar salî de (li gorî agahiyên dawî yên zanistê), bi mejiyê hisî û analîtîk li xwe hayil bûne, hêza manedariyê ye ku heyecaneke mezin dide. Ya li hebûna xwe hayil dibe û divarqile xweza ye. Jin ji mêr zêdetir nêzî vê gerdûnîbûyînê ye. Agahiyên zanistî vê yekê nîşan dikin. Ez dema dibêjim jin gerdûnî û xwedawendî ye, ez vê yekê qesd dikim. Ev maneya xwe car caran di huner, siyaset, zanist û şoreşên dunyayê de dide hiskirin, kengî xwe di têkiliyên jin û mêran de nîşan bide, wê demê mirov dikare behsa xwedatiyê bike. Divê wisa be. Tevî ku dînan ev yek ferq kirine jî, lê ji ber nasnameya xwe ya îdeolojîk a bi giranî mêr e, jin li der ve hîştine û zirar dane wê xwedatiya îdîaya wê kirine. Em hewl didin vê xwedatiyê di navbera her du cinsan de bi mêzîn, awayekî demokratîk, azad û wekhev pêk bînin. Ji ber ku cihê berfirehkirina tarîfê ev xet û rêz nînin, ez vê xusûsê dibirrim.

Baş e, di roja me ya îro de têkiliya serdest bi vê tarîfê re li hev dike? Berovajî di dest de amûrên kujêr ên mîna bivirê Romayê û hînê dijwartir bi gotinên sexte yên evîndariyê beden û têkiliya jinê nayê kuştin? Ma mêr mîna beraz pêk nayne? Têkiliya mêr û jin a di roja me ya îro de ku dixwazin rewa bikin, belkî di serê yek ji şêweyên koletiya maskekirî de tê.

Kadroyên kakil ên PAJKê li derdora 300 xwedawend, melek, Efrît (ji Afrodît û perî tê) divê li gorî tarîf û têgînên behsa wan tê

kirin werin nirxandin. Xwedawend ew jin e ku li aliyê xwe yê gerdûnîbûnê serwextbûyî ye, di mêzîna hêzê ya demokratîk de zane rûnê û her weha dizane têkiliyên civakî li ser hîmê wekhevî û azadiyê bide meşandin. Li hemberî vê jinê, wê mêrê newêribe serweriyê bike, wê tenê hurmet û hezkirina xwe nîşan bide, bi darê zorê hezkirin û hela hela têkiliyeke cinsî wê nikaribe jê bixwaze. Lê kengî bi mêzîna hêza demokratîk xwe wekhev û azad kir, wê karibe bi heman pîvanan ji jinê hezkirin û hurmetê bixwaze û divê ev yek wek prensîba me ya bingehîn a exlaqî were fêmkirin. Kengî ev prensîba exlaqî bi cih were anîn, belkî jî ew rastiya em jê re dibêjin eşq biqewime. Wekî din her cure helwest bi eşqê re îxanet e. Wexta bi eşqê re jî îxanet were kirin, her cure afirandin û serketin bi cih nayê anîn. Di nav refên PKKê de eşqeke rastîn bi serketinê û qehremaniyeke xwe ispatkirî mumkîn dibe.

Baş e, em gelek revên jin û mêran dikarin çawa bi nav bikin? Eşkere ye, em dikarin wek xwe ipatkirina nasnameya Kurd a qediyayî binirxînin. Gelek hevalên me yên 40-50 salî hem têkiliyeke sivik a koletiyê najîn, hem jî li ser xeta eşqê nikarin bibin xwedî raman û pratîk. Bi rastî ev trajediyeke dilêş e. Heta trajedî û komedî di zikhev de ne. Hinek wek velîstibin. Hinek wek jin-mêr dema têne cem hev tatmîn dibin, hinek di xewnên xwe de... hinekan ji wan jî mijara zewacê wek mijareke sivik a siyasî ferz kirin. Hinek ji wan jî bi sedema ajoyên wan ên cinsî hatine gemkirin, li hemberî hemû wezîfeyên xwe yên şoreşgerî ketin nav protestoyeke objektîf. Bi kurtî bendewariyên xwe yên di nav sîstema der ve de ferz kirin. Ez van hevalan fêm dikim. Lê wek jin û mêr dema em di îmtîhanên herî dijwar ên jiyanê re derbas bûn, me sozên azadî û wekheviyê dan hevdu. Me sond xwar wê ev sozên me karibin li welatekî azad û di civakeke demokratîk de bi cih werin. Hûn nikarin înkar bikin ku min ji bo girêdana bi soz û biryardariya me, hemû hewldan nîşan nedane.

Ez şerê eşqê di çarçoveya van tarîfan de dikarim pêşniyar bikim. Divê mirov bi edaleta jinan ewle be. Bi giştî ji mêran guman tê kirin ku dema jin bê tedbîr be, her cure xirabiyê pê bike. Eşkere, di bin vê gumanê de zordestî û zordariya hezarsalan heye. Yeqînên min berovajî helwestên mêrê serdest diparêzin. Di xwezaya jinê de dad, azadî û wekhevî pir zêde diqewime. Ya rastîn, cewherê civakîbûyîna jinê xwe dispêre edalet, azadî û wekheviyê. Dîsa heta dawiyê aştiyane ye. Dizane ku jiyaneke watedar bi tevahî dikare li ser hîmê van têgînan pêş bikeve. Di têgîna xweşikî û bedewiyê de jî naziktir û serdest e. Alternatîfên xwe bi şer, zordarî û bêedaletiyê nake; ev li

dijî xwezaya wê ye, dîsa li dijî şêwazê wê yê civakîbûyînê ye. Ji bo ev xusûs hemû werin fêmkirin, divê derfet û îmkanên jinê yên azad hebin. Jin çiqasî karibe bi awayekî azad tevbigere, wê ew çend karibe tercîhên wekhev, adil û xweşik pêş bixîne. Ji lewra ji bo di civakê de têgînên bedewî, edalet û wekheviyê cih bibînin, azadiya jinê şert e.

Mêrekî ji xwe piştrast, divê ne ku li pêşiya şêwazeke welê ya azadiya jinê bibe asteng, berovajî, divê bizanibe hewce ye destek bidê. Li şûna ku bibêje jina min, bibêje jina divê azad bibe. Di vê rewşê de mirov dikare şertên rastiya eşqê diyar bike. Beriya her tiştî ji bo jin karibe mafê xwe yê hilbijartinê bi kar bîne, şertê yekemîn ew e ku divê di azadî û wekheviyê de bi mêr re bigihîje heman hêzê. Ji bo vê jî divê di civakê de demokratîkbûyîn tam pêk were û ev jî yek ji şertên pêş e. Şertê duyemîn ew e, pîvanên mêr bi hezar salan li dijî jinê bi dest xistine, divê di xwe de û di civaka serwer a mêr de li dawiyê bihêle û bi vî awayî qebûl bike ku bi jinê re xwedî yek hêz e. Eşkere ye ku di van şertan de têkoşîneke demokratîk azadî û wekheviyê were meşandin wê ferd hînê nêzî rastiya eşqê bike. Ji bo vê yekê jî beriya her tiştî divê eşqên nîzamên heyîn werin înkarkirin.

Egîdî û qehremaniyeke rastîn dikare di çarçoveya van tarîfan de maneyê bibîne. Mirov dikare ji meyl û eleqeyên eşqê yên kesên welê re rêz bigire. Mêr û qîzên me yên xwe bi egîdî avêtin nav agir, di heman demê de ji bo em li eşqê îxanet nekin hişyarî ne. Ew ji bo welat û gelê me, hem prensîbên eşqê yên pîroz û hem prensîbên guhdanê û bi cih anînê, hem jî qehremanên rastîn in. Em jî divê herî hindik hêza xwe ya hurmetê ji bo van qehremanan nîşan bidin. Ez dizanim ev pîvan pir zehmet in. Lê ji şewateke qijeqij û qîreqîr zehmetir çi heye! Eşq ew rastiya me ye ku herî zêde dikare bide şerkirin. Di nav PAJKê de kesên di vî warî de, dibe ku derkevin. Ji ber ku ez îşaretên vê yekê dibînim van nirxandinan dikim. Herî kêm divê em li pêşiya gavavêtinên welê mezin û kesên doza jiyaneke mezin dikin, nebin asteng. Bila xwe bixin guftûgoyê, perwerde bikin û ji dîroka bi lanet çipî dîroka azadiyê bikin. Bila pîvan û rêzikên jiyanê yên bi rêz, evîn û eşqê pêş ve bixînin. Bila her cure rêxistinî û pratîkên xwe bigihînin biryarê. Bila ji kongreyên xwe heta civînên xwe yên rojane nîzamên xwe damezrînin. Bila xwe bigihînin hêzeke rastîn a eşqê. Ma tiştekî din ji vê bi nirx û qîmetir heye? PAJKeke xwe gîhandibe vê hêzê, pirsgirêkeke nikaribe çareser bike û wezîfeyeke nikaribe bide meşandin, nîne.

Belkî yên di nava me de jî û gelek derdorên din, bibêjin di rastiya Kurd û Kurdistanê de têgihîştinên bi vî rengî yên eşqê nikarin biqewimin. Ez dibêjim tiştekî welê hêjayî dîroka gelê me nîne. Kevneşopiyên me yên destanan li gorî van tarîfa ne. Li ber serê me li Botanê, li çiyayên Sîpanê û Şengalê destanên Memê Alan, Mem û Zîn, Derwêşê Evdî hene û gelek nêzî xwedatiyê ne.

Dibe ku zehmet be, mirov destanên eşqê yên berê li gorî roja me ya îro pêk bîne. Jixwe min û hevalên me yên şehîd karkeriya rêya eşqê bi qehremanî pêk aniye. Eger kesên xwedêgiravî canê wan eşqê dixwazin qîmeta van hewldanan fêm nekiribin, yan kor in, yan fesad in, yan rezîl, yan jî xayîn in. Ji bo eşqê ma hînê ji me çi tê xwestin?

Di wezîfeyên şoreşgerî de tê ti serketinê bi dest nexînî û paşê jî bibêjî canê min têkiliyê dixwaze! Eşkere, kesên xwediyê vê helwestê heya rûyê wan çiriyaye û şerm nakin. Li Kurdistanê eşq naşibe bûyerên di filmên Hollywood û Yeşîlçamê de diqewimin. Bi qasî zanyariyê, serketinê xwedatî û xwedawendiyê dixwaze. Çivîk bi xwe jî li cihên dest pê nebûyî hêlîna xwe çêdikin. Li cihûwar û dilên heta qiriqê hatine dagirkirin, eşq dikare hêlînê çêke? Her hêza tu xwe biavêjê berê nizanim wê ji eşqa te çi bike. Serhatî û ezmûna min nîşan da ku bêyî îxanet li wezîfeyên şoreşgerî were kirin, jiyan bi jineke nîzamê re mumkîn nîne. Di nav refên me de dibe ku zewacên sivik bibin. Ezê vê yekê, weke koletiyê û daxwazek ji bo dewamkirina fizîkî, şîrove bikim. Ji bo ez ji van hevalan re nebêjim xayîn şert ew e ku di wezîfeyên şoreşgerî de performansa serketinê bi dest bixin. Naxwe eger ji bo têkiliyê wezîfeyên şoreşgerî bixin xizmetê, ya wê demê biqewime, îxanet e. Dîroka Kurdan bi giranî ji ber têkiliyên bi vî rengî di îxanetê de çikiyaye. Rexneyeke din jî ew e ku zewaca sivik di berdêla ji destdayîna eşqê de dibe. Ez hînê alîgirê şerê eşqê me. Temen û sînorê vê yekê tine. Wek min anî ziman, kî ku eşqê daxîne arzûyên cinsî wî-ê bi eşqê re îxanet kiriye. Di şertên têkoşîna me de ji bo eşqê di wezîfeyan de şertê serketinê hêvî, arzû, îrade, hêza têgihîştinê, lêgerîna li bedewiyê, cesaret, fedekarî û di şer û aştiyê de heta encameke bi şeref bawerî ye, ku hewceyî pê heye. Şerê ji bo aştî, azadî û welatparêziyeke bi şeref ku şerên ji bo eşqêne jî wê di rastiya PAJKê de ji bo serketinê hêza hewce bibîne; di kesayeta jina azad bibe de wê mêrê azad were afirandin.

b- Di rêxistiniyê de bi qasî partiyê belkî jî jê zêdetir saziyeke hewce Koma Gel (Kongra Gel), wek banê rêxistiniya bingehîn a gel Kongreya Gel di rastiya Kurdistanê de pêwîstî bi tarîfeke xweser dibîne. Eger em hewl bidin ji gelek aliyan ve tarîf bikin, kongreya

gel beriya her tiştî ji rastiya partiyê wêdetir xwediyê maneyeke cuda ye. Di partiyan de aliyê îdeolojîk li pêş e, lê kongre aliyê wê yê siyasî li pêş e. Nasnameya gelê hişyarbûyî, doza mafê xwe dike û di meşa azadiyê de, îfade dike. Her kesê ji bo gel demokrasiyê bixwaze, ji bo welat azadiyê bixwaze, îdeolojî, çîn, cinsiyet, milliyet, raman û baweriya wî-ê çi dibe bila bibe dikare di vê saziyê de cih bigire û bibe hevparê biryarê. Parlement nîne. Tevî ku bi awayekî klasîk saziyeke qanûnçêker nîne, ji bo gel karibe bibe xwediyê jiyaneke azad û wekhev her biryarê dide û kontrolê dike. Saziyek hem siyasî û hem jî qanûnî ye. Saziya herî mezin a gel e, ku navend dewlet nîne. Tevî ku saziyek dewletê nîne jî, saziyeke alternatîfê dewletê jî nîne. Di serê wan saziyan de tê ku ji bo çareseriya hemû pirsgirêkên di serdema me de pîvanên demokratîk esas dibîne. Pirsgirêkên ekonomîk, civakî, siyasî, huqûqî, ekolojîk, medyatîk û qadên xweparastinê ku dewlet di şûna ku çareser bike giran dike, saziya kongreya gel biryarên hewce dide, bi cih anîna wan kontrol dike, li hundur û der ve li ser navê gel muxatebê herî mezin e.

Pêwîst e mirov şertên dîrokî û siyasî yên Kongra Gel li Kurdistanê derxistine holê baş nas bike. Ji ber qelsiya netewparêziya bûrjûwaziyê û ji ber avahiya wê ya demokratîk nîne amûrên rêveberiyê tîpa kongreyê ji bo gel ferz dike, hebûna dewletên netewî yên zordest ku ji bo demokrasiyê nazik nînin, saziyên bi heman rengî ferz dikin. Dewleta gelan nabe. Lê wek saziya biryardanê ya demokratîk a gel kongre şert e. Hînê eşkere, eger ji bo pirsgirêka netewî ya li Kurdistanê dewleta millî ji bo gel nabe amûrê çareseriyê, li dawiyê amûrê çareseriyê yê herî guncaw rejîma kongreyê dimîne. Li gorî ku gelê di bin ti şert û mercî de jiyaneke kole ya berê qebûl neke û ji ber ku tehlûkeya lêgerînên li dewleta millî yên çareser nekirinê, kûrtir dikin, li naverastê ne, wek amûrê herî guncaw ê çareseriya demokratîk Kongra Gel dimîne.

Pirsa bingehîn a divê were kirin ev e; gelo netew-dewlet û demokrasiya gel dikarin bi hev re hebin? Li gelek welatên Ewrûpayê û di avahiya federatîf a DYE de em hebûna gelek mînakan dibînin. Her çend dewleta netewkar a bûrjûwaziyê, sînorên demokratîk zêde tengav bike jî dîsa ji bo gel qadeke girîng a demokratîk dimîne. Dewletên li Kurdistanê serdest ji ber avahiyên xwe yên zêde unîter, ji bo îradeya demokratîk a gel, pir şensa qanûnî nadin. Polîtîka bingehîn a hundur, li der ve hîştine. Vê rewşê timî bi xwe re serhildan û tepisandin aniye. Armanca çareseriya girêka kor a pêk hatiye, pêşdebirina otorîteya Kongra Gel û hêza wê ya biryarê ye.

Heta dewletên serdest ji bo lihevkirina demokratîk îqna bibin, divê saziyên demokratîk ên li derveyî dewletê timî werin pêşdebirin. Li dijî netewparêziyê divê serî li avakirina dewleteke alternatîf neyê dayîn, lê ev nayê wê maneyê ku stû li ber statukoya heyî were tewandin. Berovajî, ji bo pêşî li bihevketinên netewparêz bê girtin, divê timî amûrên civaka sivîl û demokratîk werin pêşdebirin. Eger civak pirsgirêkên xwe yên mezinbûyî ji dewletên berê avabûyî re, yan jî pişt re ava bibin re bihêle, wê bibin sedem ku hînê mezintir bibin. Jixwe dewleteke nû bi hêsayî nayê avakirin û eger were avakirin jî pirsgirêkan çareser nake (22 dewletên Ereban hatin avakirin lê pirsgirêkên wan girantir bûn. Efrîka bi qasî pêncî dewletên wê bûn; lê pirsgirêkên wan ji berê girantir bûn. Pirsgirêkên netew-dewletan li Ewrûpayê rê li ber vekirin, bi YE ket ser rêya çareseriyê. DYE yekîtiya 52 dewletên eyalet îfade dike. Yanî pirbûna dewletan ji çareserkirina pirsgirêkan zêdetir rê li ber wan vedike), dîsa ji ber ku qabîliyeta çareseriyê ya dewleta berê nemaye, ji bo serî lê were dayîn amûrê bingehîn ê çareseriyê demokrasiya dewlet nîne, Kongra Gel e.

Ev model ji aliyê welatên pêşketî ve piştî ezmûnên şer hatiye pêşdebirin. Welatên din ji têgihîştina li vê modelê hînê dûr in. Şêwazek bi vî rengî wek paşve gavavêtinê ji avahiya unîter dihesibînin. Heta birizin jî dewleta unîter dibêjin û ev yek jî wek welatperwerî û dilsoziya bi dewleta pîroz re tê qebûlkirin. Li Yugoslavyayê, li Iraqê û heta li girava Qibrisa piçûk, têgihîştinên bi vî rengî di dawiyê de bi encamên li bendê nebûn rûbirû bûn. Komara Tirkiyê hînê ji têgihîştina li fonksiyona demokrasiyê dûr e. Timî li hemberî xwe wek hevrik dibîne. Tevî ku Kurd di damezrandina wê de hêmanê bingehîn in, bawer dike ku wê bi înkarkirinê ji pirsgirêkê xilas bibe. Naxwaze rola Kurdan a stratejîk a di dîrokê û îro de fêm bike û xwe nêzîkî naskirinê nake. Bi israr modeleke duyemîn a Yugoslavya û Iraqê ferz dike. Di vê de jî bi hêza xwe ya eskerî û mezinbûna welatê xwe ewle ye. Lê eger karibe bibîne Îrlandayeke piçûk çi dikare bi Ingilîstanê bike, Çeçenistan çi bi Rûsyayê dike, wê rola Kurdan hînê baştir karibe fêm bike. Eger bizanibe çareseriyên eskerî mayînde nînin û her weha buhabûn û lêçûna wan li ber çav bigire, wê fêm bike ku pêşxistina çareseriyê çiqas girîng e. Qibris çil salan di rewşa çareser nebûnê de hat hîştin, di dawiyê de çi hat bi destxistin? Wendahî û ji dest derketiyên wê gelek zêde ne.

Di gavavêtina ber bi çareseriya kongreyê de, divê rola stratejîk a Kurd û Kurdistanê bi awayekî xurt û balkêş nîşanî dewleta Tirkiyê û

civaka wê were dayîn. Statuyeke Kurdistanê ya li dijî Tirkiyê fonksiyonel wê timî bibe pirsgirêk, bibe têkçûna aboriyê û bibe gef li siyaset û eskeriyê. Li Başûrê Kurdistanê piştî ku Dewleta Kurd a Federe ya eşîrtî û netewparêz ava bû, ji sedî sed wê bandora wê timî hebe. Ji lewra statuya Kurdistanê ya heyî, bi lez gihîştiye wê astê ku timî li dijî KT pirsgirêkan biafirîne. Eger çareseriyên demokratîk nekevin rojevê, wê tevgerên netewparêz xwe ferz bikin. Pêvajoyeke bi vî rengî wê Îsraîl-Filîstîniyeke nû ya pêncî salî bajo derxîne holê. Ya li Iraqê zû ve bûye, li Tirkiyê ezmûna wê ya yekemîn bi PKKê re nerm derbas nebû, ev xeter vê carê wê hînê bi amadekarî û plansazî bi awayekî berfireh û dijwar bikeve rojevê. Belkî jî dewlet bi tepisandina xwe ya kevneşopiyê ewle ye. Lê nayê zanîn Projeya Rojhilata Navîn a Mezin bi çi avis e. Ji her tehlûke û xeterê re vekirî ye. Rola stratejîk a Kurdan a eger li dijî Tirkiyê vegere wê gelek encamên girîng bi xwe re bîne. Li ser Tirkiyê wê gelek guftûgoyan û daxwazên nû bixe rojevê. Eger em li ber çav bigirin ku taktîkên bi lez ên pelixandin û xistina xewê encam nadin û wê nedin, gurrbûneke nû ya çi dem dirêj û çi dem kin, eşkere ye, wê bûyerên xeternak bi xwe re bîne.

Ji vir pêve Kurdê rola xwe ya stratejîk di serî de DYE, Îsraîl û her dewletê û hêzê re binirxînin, divê ev îhtîmaleke dûr neyê dîtin. Terorîstbûyîna PKKê bi dunyayê bide qebûlkirin û bawer bike ku wê rehet bibe, şaş e, ev xwexapandin e. Berovajî, tê vê dunyayê hişyar bikî û wan derbarê Tirkiyê de bikî xwedî xwestek. Ma ji ber vê yekê hindik tawîzên siyasî hatin dayîn? Şaşiya vê rê eşkere ye. Her weha Kurdan danûstendinek welê ti car heq nekirin. Dîsa bûyereke hînê xeternak, di demeke nêz de li dewleta federe ya di berdêla tasfiyekirina tevgera azadiyê ya bi pêşengiya PKKê de ji eşîrên Kurd ên Başûr re hat bexşandin, wê tiştên nû zêde bibin. Li Bakur jî ji bo nebin alîgirê PKKê li derdora sed hezar Kurd bi cerdevaniyê bi mûçe kirin. Bi vê jî qîma xwe neanîn, ji şefên terîqetan ên paşvemayîn û xwedî têgihîştina netewparêziya paşverû di nava dewletê de cih veqetandin. Ev hêzê Iraqeke duyemîn pêk bînin. Her weha ev li dijî hemû pîvanên demokrasî û komargeriyê ne. Kurdistaneke ekonomiya wê tevizandî ma li hemberî van bûyeran neteqe wê çi bike?

Di pêvajoya Îmraliyê de me gelek hewl da ji bo em vê ferzkirina bê mane li dawiyê bihêlin. Nayê zanîn ev çiqas hat fêmkirin. Hukûmeta AKPê wek ti hukûmetan nekiribe pirsgirêkê bi awayekî bêdeng derbas dike. Hêza terîqeta Neqşî têra wê di nav dewletê de bi

cih dike û bawer dike ku wê bi vî awayî pirsgirêka Kurd berbend bike. Di hilbijartinan de her cure alîkarî bi van hêzan re hatiye kirin û ji bo hilbijartina wan hewl hatiye dayîn. Çewtiyeke stratejîk tê kirin û di nêz de dema encamên wê derbikevin holê wê berpirsiyarê di rewşek welê de bin ku nikaribin hesab jî bidin.

Li Tirkiyê, li dijî lêgerîna me ya demokratîk a hevpar, astengiyên mezin têne derxistin ku eşkere çavkaniya van astengiyan dewlet e. Hem ji der ve, hem jî ji hundur ve asteng derxistin pêşberî Yekîtiya Hêzên Demokratîk. Li der ve hîştina demokratên Kurd wek pêdiviyeke ewlekariyê hat hesibandin. Ev hemû xeta ne; di statuko û çareser nekirinê de israr e. Wer yeqîn dikin ku wê gelê Kurdê nikaribe rêya xwe bi xwe xêz bike. Li benda wê rojê ne ku di bin zordarî û birçîbûnê de wê tevahî çîz bike û teslîm bibe. Hêzên ewlekariyê yên hundur û dîplomasî, ekonomî û siyaset tev bi hev re polîtîkayên civakî hînê bi vê armancê şidandî dimeşînin. Hemû bi yek stratejiyê gel bi dualîteyekê re rûbirû dihêlin; ew jî yan mirin, yan jî teslîmiyet e. Hukûmeta AKPê li vê polîtîkayê hêza dîn û terîqetan jî zêde kiriye. Di vê qonaxê de hem sor dike, hem jî israra di xetimandinê de nîşan dide. Hemû bangawaziyên ji bo 'aştî û çareseriya demokratîk' bê bersiv hatin hîştin. Helwestek (Ji bo Qibriseke piçûk eleqe û hewldanên bêhempa hatin nîşandan, lê di vir de ti hewldan nehatin nîşandan û di tinebûnê de israr hat kirin) li cem ti rêxistinên din nehatiye dîtin û dikarîbû bi hemû kesî bide qezenckirin, ji nedîtî ve hat. Ji parçebûna PKKê û yekîneyên DYE li Iraqê hêvî hat kirin. Ji ber ku çareseriyeke demokratîk a hevpar pêş neket, ya herî baş demokrasiyek bi hêza cewherî were pêşdebirin. Wê êdî çareseriya kongreyê ya di rojevê de bibe.

Gelê Kurdistanê li hemû parçeyan û li derveyî welat, neçare li çareseriya Kongreyê seferber bibe. Di çarçoveya tarîfê de KONGRA GEL li hemberî grûba nû derketiye kongreya xwe ya awarte pêk tîne. Kongre wê bûyerên heyîn yên hundur û der ve bi awayekî berfireh binirxîne. Di warê ekonomîk, civakî, siyasî, huqûqî, ekolojîk, medyatîk û xweparastinê de wê biryarên hewce bêne dayîn. Konseyeke rêveber wê were wezîfedarkirin. Li benda parçebûn û cihêbûnê mayîn tewş û xeyaleke pûç e.

Li her parçeyê Kurdistanê wê êdî ji bo çareseriya kongreyê bi hemû hêza heyî xebatê were meşandin. Di şûna parlementên netewî yên hatine girtin û partiyên siyasî yên hatine qedexekirin de wê rêveberiyên demokratîk ên herêmî werin seferberkirin.

Her gund û taxê rêveberiyên xwe hilbijêrin û berpirsiyar bikin.

Hemû jiyana gel divê bi çareseriyên demokratîk were rohnîkirin. Rêyên çareseriyê yên demdirêj werin nîşandan. Hêza biryarê ya kongreyê wê di şert û mercên guncaw de bi cih were anîn. Perwerdeya gel a cewherê bi qasî ji dest were wê bê meşandin. Divê gel neçar neyê hîştin ji bo parsekiyê li ber deriyê dewletê bike. Divê şens neyê dayîn gelê li ber sînorê birçîbûnê bikeve lîstikan. Wexta êrîş li mafê mirovan û azadiyên çandî bêne kirin divê xwe biparêze. Divê destûr neyê dayîn gundên nû werin valakirin, divê gundên berê jî divê ji bo bi cihbûyînê rê werin vekirin. Bi her cure piştgiriyê divê pêşî li birçîbûnê were girtin. Di her warî de hewce ye rêxistiniyên nû werin pêşdebirin. Divê rêxistiniyeke berfireh a civaka sivîl were pêşdebirin. Dibistanên perwerdê yên demokratîk, divê li cihûwarê gel di warê demokrasiya wî de perwerde bike.

Çareseriya kongreyê bi her dewletî re divê ji bo çareseriyeke demokratîk amade be. Kongreyê li dijî tepisandinên netewparêz û polîtîkayên înkarê, wê alternatîfên demokratîk ên şîdet û cihêkariyê nagirin nava xwe û bi israr aştî û biratiyê tînin ziman, ferz bikin. Her weha wê nîşan bide ku li dijî her cure êrîşê di pozîsyona xweparastinê de ye. Ev hemû hewldan nayên maneya cihêkariyê, berovajî, têne maneya bi cihanîna yekparebûneke rastîn. Divê bi israr were ziman ku ev rêbazên çareseriyê ji bo firsendê nedin terajediyên nû, hewldanên bi berpirsiyarî ne. Dewlet çendîn bixebitin ji bo hewldanên bi vî rengî bipelixînin, ewê jî xwe xurt bikin û bersivê bidin. Gelê di bin şert û mercên zehmet de bi qasî ku nekeve nav hewldanên komlowarî, wê xwe ji her cure xebatên civakî, siyasî, huqûqî, hunerî, medyatîk û xweparastinê dûr negire û nemîne. Pêvajoya nû ya em wek çareseriya kongereyê bi nav dikin, em bi xetên sereke welê diyar dikin û em wek wezîfeyeke dîrokî bang li her kesî dikin ji bo di warê çareseriyê de bi berpirsiyarî tevbigerin û ji bo rê li ber trajediyên nû venebin ji çareseriyê re alîkariyê bikin.

Tevî vê nirxandina kurt a di warê tarîf û pêşketina Kongra Gel de, hewceye em çend mijarên din bi firehî bigirin dest û li ser rawestin.

Xusûsa yekemîn, piştî civîna yekemîn a KONGRA GEL li ser îqtîdara hundur bi hevketin e. Di demekê de ku ji bo çareseriya demokratîk veguherîn-pêşketineke mezin a pratîk, siyasî û teorîk diqewime, helwestên bi vî rengî didin nîşan ku bi giştî ne ji siyasîbûyîna PKKê û ya rastîn ne jî ji siyaseta demokratîk tiştek hatiye fêmkirin, yan jî dane aliyekî. Niha bi awayekî berfireh xuya ye ku cesaret li vê yekê kirine. Min berê destnîşan kiribû ku

helwestek bi vî rengî ya piştî ezmûneke çaryekê temen buhurandiye, hewceyî bi tehlîleke dijwar, rexne-xwerexnekirinê dibîne. Ev hêza helwestên pîvanê nas nakin, guh nadin şertan, nizanin wê berdêl çi be, di cewherê xwe de siyasî nebûyînê, bi qasî amatoriyê di îqtîdarê de ehbab çawişiyê îfade dike. Her weha taybetiyên kesayeta di wezîfeyan de li şûna serketinê xwe li qalibên îdeolojîk pêçayî, yan jî xwe ber bi hewesên erzan xistî, nîşan dide.

Ez ji van helwestan re xerîb nînim. Helwestên bi vî şêwazî bi pêvajoya pêkhatina yekemîn grûba PKKê re dest pê kirin, piştî îlana partiyê dewam kirin. Di pêvajoya 15 Tebaxê de heta dawiyê bi awayekî kêfî meşiyan û nehatin ravekirin. Her weha ev helwest dewama helwestên wan kesayeta ne ku di pêvajoya şerê panzdeh salan de ti car berpirsiyariya rastîn hil nedan. Ez ji aliyê xwe ve wek xetayekê dibînim ku ez bi navê 'mirov xilaskirinê' heta dawiyê bi hevaltî tevgeriyame û min ev yek tercîhê rêzik û saziyan kiriye. Ez timî bi bîrûbaweriya ku wê tecrûbe bi ser bikeve û bi mantiqê wê xwe sererast bikin, nêzîk bûm. Encam, rewşa ez tê de me.

Di pêvajoya Îmraliyê de ez careke din şaş hatim nirxandin û vê yekê ji min zêdetir xwediyê van helwestan, yan jî yên bi erzanî bûn amûrên ew êşandine û ji qîmet xistine. Lê min hişyar kiribû û gelek mînak nîşan dabûn. Min ji we re gotibû; hinek tiştan hûn dikarin piştî belavbûna bedena min bikin, hinek tiştan ez di qebrê de jî bim hûn nikarin bikin, dîsa hinek tiştan ez hilmê bidim û bistînim hûn hîç hîç nikarin bikin. Çiya hem bandora wî ya azadkirinê, hem jî ya heywankirinê heye. Xuya ye bandora çiyê ya azadker şaş hatiye fêmkirin. Min hem PKK û hem jî dewletên pêwendîdar hişyar kiribûn. Lîstina bi min, ji bo kesî tiştekî bi dest naxîne. Li hemberî rastiyan çi ji destê min were dikim, ev nasnameya min e û jê hîç guman nakim. Min xwestibû were zanîn, ez neçar û belengaz xuya bikim jî ez wisa nînim. Şan û şohreta min nebe jî ez bi tevahî ji şeref û rûmetê bêpar nînim. Lê xuya ye, li ser rastiya xwe ya şer û şêwazê xwe yê jiyanê dîn dibin. Dîsa derdikeve holê ku divê yê gihîştî û aqilkemal tevbigere, ez bim.

Rastiya KONGRA GEL a ji der ve dewlet û ji hundur jî alî naxwazin fonksiyonel bibe, wê bimeşe. Em dewletan ji paşê re bihêl in. Kesên xwe wek alî dibînin, divê saniyeyekê jî ji bîr nekin ku ji bo tenê tiştek dikare rewşa wan xilas bike. Ew jî di wezîfeyên li pêşiya wan de serketin e. Kar çiqas giran, girîng an jî sivik û bêqîmet bin jî, divê pîroz werin zanîn û ji bo serketinê ne. Ez vê îdîa dikim; kesên rê li ber vê rewşê vekirin, gelo ji bo xilaskirina rûmeta xwe ya

şoreşgerane ji bo rojekê be jî xwediyê wê merdiyê ne kirinên me teqdîr bikin? Ez di quleke du santîm de bi zor û zehmetiyê hilmê digirim û hewl didim di şerê rûmetê yê gelê me de ji bo nirxên hîç piçûk nayên dîtin bijîm, hewl didim yekîtiyê, selametê, bi zehmetî bunyeya xwe, îradeya xwe belav nekim (em bi rastiyên wer rûbirû ne yê herî jêhatî jî di nav sê rojan de dawî li jiyana xwe bîne), lê ev hevalê gelo karibin bi awayekî gihîştî û aqilkemal bi hewldaneke serketî rizgarkirina şeref û rûmeta xwe ispat bikin?

Ji bo vê em fikirîn û me pêşniyar kir. Me bawer kiribû û em li bendê mabûn ku wê bi sazîbûyîneke tîpa KONGRA GEL karibin nûbûneke rastîn pêk bînin û karibin şeref û rûmeta xwe rizgar bikin. Divê ez tiştekî din jî bi bîr bixînim: Ev şerên xwedêgiravî yên îqtîdarê bi xwe re mirin û kuştinên herî kirêt jî tînin. Bila hîç bi hewes nebin. Çawa wezîfeyên mîna çiyan li benda wan bin, însan karibe kêliyek xwe jî ji van 'lîstikên Bîzans' re veqetîne? Di vir de em careke din naçin ravekirina heq neheq, heta ajan provokator û vegotina darbeyê. Eger welê be jî, bi rêbazek wisa em nikarin çarenûsa gelekî bê fonksiyon bikin. Min bi xwe bi sedan mînak dîtin. Lê min yek çilk jî li wezîfeyên kêliyê nexistin. Kes şerekî tê de bi sernekeve bi zanebûn nakevê. Di vir de aliyên me, dema ketin şerekî welê ku ne ew bi xwe, ne jî ti kes û heta hemû gelê me wenda dike, baş e, ji şerekî wisa jî hêvî kirin? Gelo hîç fikirîn, eger aliyek bi ser bikeve jî wê destketiyên xwe yên ji îxanetê xirabtir çawa bazara wan bikin?

Ya herî seyr ew e, ez di nav tecrîdeke fêmkirina wê zehmet de, çawa cesaret kirine li ser navê min 'min' tecrîd bikin. Divê ev nasname xwe rast nas bikin û durust rave bikin. Mirov diya xwe ya her roj şîrê wê dimije çawa dixwaze bixîne rewşeke şîr nede? Min çîroka xwe ya bi diya xwe re anîbû ziman. Sedemên dîrokî yên wî şerî ku werin fêmkirin hene. Ji bo xwedê sedemên van hevalan çi ne? Ne dost, ne jî dijmin kesî tiştek negotiye û neaniye ziman ku ez ketime rewşek bêber û bêqîmet. Ji bo xwedê ev nasname li ser navê kê û çawa dikarin bibêjin bêqîmet bûye û çawa xwestine ez welê bibim? Ji bo pêşketina wan bersiva van pirsan hewce ne.

Ez bi bîra kesên ketine vê rewşê, bi zanebûn, an jî bi nezanî yên bikevin van heman rewşan, dixînim. Tevlîbûna doza rûmetê ya gel, şeref, dilxwazî û mirovê îdîayê dixwaze. Eger ev qabîliyetên wan nebin bila ji destpêkê ve tevlî nebin. Bila mewkî û miqaman negirin. Bila ti car ji bîr nekin ku mewkîparêzî dijminatiya demokrasiyê ye. Lê bila bê meqam û mewkî jî nesekinin. Ji ber ku ew jî bê îdîatî ye.

Ma wê înkar bikin ku li gorî demokrasiyê tevnegeriyane? Min hin bûyer şopandin. Hin rêbazên bi kar anîne padîşah jî bi kar naynin. Şikandina îradeya gelê amade wê çawa îzah bikin? Ev çend deriyên xwe li demokrasiyê girtine hînê çawa dikarin di nav me de bijîn? Divê êdî demokrasiyê fêm bikin. Giregirên herî mezin ên Tirkiyê hînê bi demagojî û despotîzmê bi ser neketine, tê hînê bi ciwantiya mûyên wê derneketine çi bikî? Ez pir bi zehmetî van rêz û xetan dinivsînim. Ez dixwazim ji van şîroveyan xilas bibim.

Ez yeqîn dikim ku eger ev heval di şûna min de bûna, wê yekî mîna min çil carî tasfiye bikirana; lê ez dîsa jî bi wan re meşa xwe dewam dikim. Lê ez vê jî dibêjim; bi min nelîzin. Hûnê pir bi awayekî xeternak perîşan bibin.

Ez di wê rewşê de nînim ku karibim di warê çendayetî û çonayetiya kongreyê de zêde tiştekî bibêjim. Lê li rewşên min diyarkirî ez dikarim mijara hilbijartina serokatiya kongreyê jî zêde bikim. Serokatiya kongreyê salê carekê dikare were hilbijartin. Eger du salan li ser hev were hilbijartin û di ser van du salan re herî hindik du sal derbas bibin dîsa dikare namzetiya xwe deyne, ez pêşniyariya xwe ya di vî warî de wek hukmekî demokratîk ê destûrnameyê dubare pêşkêş dikim. Ez diyar dikim ku di hemû rêxistiniyên gel ên ne îdeolojîk û pisporiyê dixwazin de ev wek pîvaneke demokratîk girîng e. Eger salek nebe jî mirov dikare bibêje du dem û heyam. Lê di saziyên pisporiyê dixwazin û mîna partiyan de dem li gorî rewşa kes diguhere.

Civîna salane ya civata giştî ya kongreyê di çend hefteyên meha Nîsanê de pêk were, li gorî kevneşopiya dîrokî li cih e. Ez vê pêşniyarê jî dubare dikim. Niha yan jî di demên pêş de wê bajarekî kongreyê were destnîşankirin. Ev yekê hêz û ciddiyeta kongreyê nîşan bide. Xusûseke giştî ye, rêveberî, desteya disîplînê û serokê kongreyê bi hilbijartinê têne diyarkirin. Kesên bi rastî biryar û pîvana wan têra rêveberiyê dikin divê werin hilbijartin û divê ev neyê ji bîrkirin. Min pêşniyar kiribû ku rêveberî bi heft komîteyan bixebite. Endamên xwe hem dikare ji navê û hem jî ji der ve hilbijêre. Her weha kongre demên ne di civînan de beramberî heft komîteyan dikare heft komîsyonên amadekariyê yên biryarê ji nava xwe hilbijêre. Ev komîsyon dikarin ji bo biryarên lêkolînê û kontrolê dixwazin, alîkarî bikin û pêşniyaran amade bikin. Li gorî taybetiyên her komîteyê mirov dikare buro, dibistan û rêxistiniyên mîna yekîtiyan bi ser wan ve bike. Ber bi jêr ve bi buro, dibistan û yekîtiyan ve girêdayî, mirov dikare komikên li gorî herêmî, xwecihî,

tax û gundan ava bike. Di her demokrasiyê de pêwîstiyeke bingehîn bi komînên gund û taxan heye. Kongre bi vî şêwazê şematîk ê rêxistiniyê ti kesê xwe negihînê, bi rêxistin neke û girseya bandorê lê neke nahêle. Li gorî rewşê rêyên legal, an jî ne legal têne ceribandin. Lê divê legalîte esas be. Partî îradeya xwe tenê dikare bi rêxistiniya kongreyê bike girseyî. Em yekîneyên parastinê dikarin wek yekîneyên biryarên kongreyê pêş de dibin û diparêzin, bi nav bikin. Têkilî bi partiyên legal re dibe ku di asta sempatîzaniyê de be. Rast nîne ku saziyên qanûnî bi fermanê werin meşandin. Bi cihbûyîna xwe û belavkirina endamên xwe li gorî pîvanên wezîfeyê dike û bi awayekî ewle pêk tîne û belav dike. Ev xusûs hemû divê li gorî pêdiviyên pratîkê bi awayekî berfireh û baş werin guftûgokirin nirxandin û bi biryaran werin xemilandin û xurtkirin.

Duyemîn xusûseke girîng, li Kurdistanê derbarê têkilî û nakokiyên hêzên dewletê û hêzên çareseriya kongreyê de ne ku wê çawa bi hev re dewam bikin û çareser bibin. Em bi girîngî bînin ziman ku di şerê îqtîdaran de heta niha pîvana 'yan giş yan jî hîç' hatiye xebitandin. Kêm caran ji îqtîdarên du serî û otorîteyên demokratîk re cih hat naskirin. Lê ya hînê xwezayî û asayî ew e, hêzên îqtîdarê û demokrasiyê bi hemû nakokî û têkiliyên xwe di nav hev de bijîn. Ya esas, rastiya civakê bi giştî welê ye. Lê li vê mikur nayê û îttîraf nayê kirin. Eger em bi rêkûpêk bînin ziman û pêk bînin wê têra xwe çareser be. Di pêngava 15'ê Tebaxê de em jî li gorî pîvana 'yan giş yan jî hîç' tevgeriyan. Rast nebûna vê rêbazê alî îro hînê baştir fêm dikin. Li gorî şertên demê, divê hem hêzên dewletê, hem jî hêzên kongreyê li heman welatî bijîn.

Ne dewlet di nava rojekê, yan jî deh salan de ji holê têne rakirin, ne jî helwesta demokratîk a gelan li ser axa dijî tê hilçandin û avêtin. Eger şerekî dewamî ji bo her du aliyan jî hilweşîneke mezin e, wê wextê wek rêya navîn jiyaneke hevpar derdikeve pêş û pir îcbarî bibe prensîba şer. Di dema pêş me de divê em hemû herêman li gorî vê prensîba şer û jiyanê sererast bikin. Bêguman dewletê di destpêkê de hewl bidin pîvana 'yan giş yan jî hîç' biceribînin. Lê mirov dikare hemû êrîşan bi berxwedaneke xweparastin û demokratîk pûç bike. Divê wezîfeya bingehîn a hunerê şerê me be, em rêya vê xweparastinê û têkoşîna demokratîk bibînin. Di dema buhurî de jî ev pêvajo qewimî. Lê aliyan tevî ku hîç demokratîkbûyîn neceribandin, şer jî bê rêzik û pîvan meşandin. Rewşa îro ya Îsraîl-Filîstînê jî mînakekî din e. Pir girîng e, ku mirov van mînakan dubare bike. Ya esas, min di pêvajoya Îmraliyê de ya dixwest pêşniyar bikira, ji bo

diyalogê agirbesta dualî û lihevkirina demokratîk bû. Lê bi israr ev ji nedîtî ve hat. Hevalên me jî li girîngiya mijarê serwext nebûn. Wek taktîkekî erzan hesibandin. Lê ji keşmekeşiya Rojhilata Navîn tê fêmkirin ku ji bilî pêşniyarên me rêyeke watedar a derketinê xuya nake.

Tê zanîn hin bendewariyên me ji hukûmeta AKPê hebûn. Name jî hatibû nivîsandin. Lê îro hînê baştir eşkere bû ku rola bi hêzên eşîrî û netewparêz ên li Başûrê Kurdistanê re lîstine, dixwazin bi awayekî din bi destê AKPê bilîzin. Pêşengên hindikayiya hevkarên kevneşop ên li Kurdistanê û Kurd, ji CHP, MHP, DYP û SPê bi lez bi rê nîşandana dewletê li AKPê kom bûn. Ji bo DEHAPê ji holê rakin gelek pere li naverastê geriyan. Hîzbûllah û çeteyên di navbera salên 1990 û 2000 de navnîşana wan AKP bû. Di bin perdeya terîqeta neqşî de çîna nû ya dewletê ya sazûmankar tê pêk anîn. Ev bûyereke pir tehlûke ye. Ev bûyer hem ji bo gelê Kurdistanê, hem jî ji bo hundurê çareseriya demokratîk pûç bike, gaveke xeter e. Li Kurdistanê bi awayekî bi tesîr cerdevanî û terîqetparêziya bi destê dewletê li ser gel hat ferzkirin îlana şerekî taybet ê nû bû. Ya esas, Iraqeke duyemîn bi awayekî veşartî diafirînin. Hevkarên Kurd piştî salên 1950 girtin nava dewletê û bi awayekî ekonomîk ew xurt kirin û navbera wan û gel hat vekirin. Ya rastîn, bi aboriyeke ulûfe ev beş li serê civakê kirin nobedar. Beşek li ANAPê lê bi piranî ev beşê hevkar di nav AKPê de li ser hîmê terîqeta Neqşî û netewparêziya Kurd a paşverû kom bûne.

Taybetiyên avahiya civakî yên di hîmê dewleta federe ya li Iraqê de jî bi heman rengî ne. Bêyî ku kesî pê bihesînin ji feodalîteya Kurd bûrjûwaziyekê diafirînin. Tê fêmkirin ku DYE her roj di vê yekê de giraniya xwe nîşan dide. Di serî de netewparêziya Kurd ji bo gelê Kurd, dikare ji bo gelên li herêmê rê li ber pirsgirêkên mezin veke. Di nav van de hindikayiyeke hevkar a kevneşop jî tê bi cihkirin. Xwedêgiravî alîkariya dewletê dikin. Li cerdevanên çekdar cerdevanên îdeolojîk têne zêdekirin. Ev kesê ji bo berjewendiyên xwe yên çînî timî zirarê bidin gel û wê timî pêşî li demokratîkbûyîna gel bigirin. Li gelek bajaran bi destê van kesan dijşoreşên antîdemokratîk hatin kirin. Di serî de li Wan, Ûrfa, Mêrdîn, Agirî, Çewlîk, Sêrt, Bedlîs, Mûş, Semsûr û Dîlokê, li gelek bajar û navçeyan di hilbijartinên herêmî de bi piştevanî û stara dewletê de bi hewldanên hukûmetê dijşoreş hat kirin. Pereyên ji bo vê yekê hatin rijandin û dekûdolabên hatin gerandin têne zanîn. Gel tînin ber sînorê birçîbûnê û paşê xelaskarên sexte pêşkêş dikin. Ne tenê bi birçîbûnê

terbiye dikin. Dijşoreşan jî didin kirin. Ji aliyê demokrasiyê ve gelek tevgerên AKPê, nemaze di pirsgirêka Kurd de gumanên mezin diafirîne. DYE û YE xwedêgiravî KONGRA GEL terorîst îlan kirin ku ev xapandin e. Ya dixwazin bikin ew e, ku ji bo hevkarên hindikayiyan û kevneşopên Kurd karibin ajaniya xwe dewam bikin hêzeke nû didin. Di vî warî de bûyerên li Iraqê diqewimin têra xwe dersê didin û hîn dikin.

Eşkere ye, wê hêzên KONGRA GEL hewl bidin ji bo pûçkirina vê lîstikê. Eger dewlet di van hêzan de israr bike şerê mezintir bibe. Dewlet, nemaze KT li dewsa polîtîka xwe dispêre van hevkarên nû, xwe bispêre gel û karektera wî ya demokratîk, wê bibîne ku dikare aştiyeke mayînde û yekparebûna welêt pêk bîne. Israra ji bo hevkarên Kurd wê şer û cihêkariyê xurtir bike.

Gelê Kurdistanê wê ji Kurdistanek di bin serweriya feodalan de firsendê nede Kurdistaneke xwe dispêre bûrjûwaziyên hevkar. Ez careke din destnîşan dikim ku wê ev pêvajoya bi çargavî diçe, wê Filîstîn-Îsraîl û Iraqeke nû biafirîne. Bûrjûwaziyeke Kurd a lihevçêkirî, nemaze navend Amed dixwazin biafirînin. Bajarekî mîna Amedê yê têkoşîneke mezin a demokrasiyê meşandiye û gelê me yê li vir ku rê nedaye faşîzmê, wê rê û cih nede faşîzma kesk a Kurd. Ev gel di mînaka Hîzbullahê de faşîstên bi tîpa Kurd nas dike. Çawa ku cerdevan û îttîrafkaran nas dike. Bi tîpa van a hînê moderntir nexape. Dewlet di vê mijarê de serî li alternatîfeke xeter dide. Di dema pêş me de wê bang li demokratên Tirkiyê were kirin, wê ji bo îttîfaqê hewldanê bêne kirin û di çareseriya demokratîk de israrê dewam bike. Kedkarên Kurdistanê û gelê Kurd wê bi vê lîstikê nexape û di rola xwe ya dîrokî ya demokratîk de israr bike.

Hêzên kongreyê û hêzên dewletê, eşkere ye ku wê di dema pêş me de dualîteyekê pêk bînin. Ji bo ev dualîte bi şer nebe, ji nêz ve bi helwesta dewletê ve têkildar e. Eger dewlet bi ser têkoşîna demokratîk a gel û hêzên parastina rewa ve biçe, ya bibe, şer e. Eger hewldanên ji bo lihevkirinê yên di her astê de werin nîşandan ciddî bêne dîtin, xuya ye ya bi ser bikeve yekparebûna welat û gelê me yê kedkar e. Hêzên kongreyê ji bo nekevin lîstikên kor ên şer ku di dema berê de qewimîn, divê gelek nazik tevbigerin; lê weke ku desteserkirina her mafê wan têrê nekiribe li êrîşê jî rast werin her cure mafê wan ê parastinê çêdibe û divê bi kar bînin. Hêzên dewleta federe ya Kurd jî di navê de divê hêzên dewletan saziyên demokratîk ên qanûnî û partiyên wan ên siyasî qedexe neke, bihêle serbest bixebitin û li beramberî hevdu bigihîjin agirbestekê. Eger ev

lihevkirina demokratîk û rêya aştiyê were tercîhkirin, bêguman hêzên KONGRA GEL jî wê bi helwestên xwe yên erênî destekê bidin. Naxwe li her parçeyî wê li dijî hewldanên îmhaker û înkarwarî, bi herî rêbazên li cih wê helwesta xwe ya demokratîk hînê xurtir bike û bersivê bide. Polîtîka û rêveberiya nû ya KONGRA GEL li ser vî hîmî xwe rexne bike û bi pêdiviyên biryarên xwe girêdayî wê têkoşîn meşandinê rêya bi tenê ya şeref û mirovatiyê bizanibe û bihesibîne.

Xusûseke sêyemîn, KT ev demeke dirêj wek polîtîkayeke bingehîn hewl dide PKK-KOMA GEL terorîst bide qebûlkirin. Wek me gelek caran aniye ziman, ev polîtîka ku bi DYE re tê meşandin bi gelek xefik û dafikan tijî ye. Pêwîst e îhtimala ku wek bûmerangekê li dewletê vegere, ti car neyê ji bîrkirin. Hêzên qaşo terorîstiyê qebûl bikin, wê ji polîtîkayeke 'Elî nabe, bi Welî re' bi xwestek û hosta bin. Baş tê zanîn, dixwazin navbera PKK û KT timî nebe û bi vî awayî Tirkiyê bê hêz bihêlin. Divê encamên îdîaya terorîzmê ji bo demeke dirêj werin fikirîn. Yên DYE wan terorîst dihesibîne di dawiyê de têne çi rewşê, divê neyê ji bîrkirin. Jixwe rast nîne mirov li navê PKKê bialiqe, ev bi xwe ketina dafikê ye. Di vî warî de rastiya ku Bakurê Iraqê hatiye dawiyê, tijî ders e.

Di çareseriya KONGRA GEL de divê cihê Kurdan di dîroka Tirkan, di şaristaniya Îran û Ereban de timî were nirxandin. Divê mirov rola stratejîk a Kurdan hem bide fêmkirin, hem jî bide bi cihanîn. Ji Kurdan zêdetir cîranên wan hewceyî rola wan a stratejîk in. Yek ji hêmanên bû sedema hilweşîna rejîma Seddam ew bû ku rola Kurdan a stratejîk baş nehesibandibû. Heman tehlûke ji bo cîranên din jî heye. Kurdên li hemû parçeyan dikarin bibin yek û di nava xwe de bigihîjin stratejiyeke hevpar. Yê Kurdan bike dijberî xwe wê têkçûna herî mezin jî bibîne. Koma Gel wezîfedar e ku vê rola Kurdan a stratejîk bibîne û bi cih bîne. Eger heta niha nehatibe dîtin û nehatibe bi cihanîn, ev yek ji ber taybetiya îxanetkar û hevkarên Kurd e. Lê di van şert û mercên nû de nikarin van taybetiyên xwe bidin meşandin. Her roja derbas bibe Kurdê hînê zêdetir li stratejiya xwe serwext bibin û hînê nêzî bi cihanîna wê bibin. Me bi mînakên dîrokî nîşan da ku Kurd û Tirk wek qewm û gel rewşeke stratejîk bi hev re jiyane û hevpar tevgeriyane, divê ev mînakên me rast werin nirxandin. Kurd ji bo di dîrokê de ji holê bêne rakirin qebûl nekirin; ev wek encama pêdiviyek polîtîkayê hesibandin. Zilamên girîng ên dewletê yên Tirk ev yek welê nirxandin. Pêwîst e em bi îdîayên erzan a terorîzmê vê yekê sor nekin. Tasfiyekirina PKK-Koma Gel mumkîn nîne. Jixwe wê

mîrateya wê ji aliyên kesên din her kêlî bi xirabî were bi karanîn. Divê Kurd jî bizanibin dijbertiya Tirkan hela hela dijmintiya bi wan re li gorî berjewendiyên Kurdan nîne. Dijmintiya Kurd-Tirkan 'bi têkbiçe-têkbiçe' kilît bûye. Têkiliyek welê ye, têkçûna yekî nabe serketina yê din. Di vê têkiliyê de eger hemdemtiya di navberê de li dawiyê bimîne, wê têkiliyê bibe timî 'bi ser bikeve-bi ser bikeve'. Lê ya îro tê bi cihanîn polîtîka 'Tirk her tişt e, Kurd hîç tiştek nîne.'

Berovajiyê vê yekê jî mumkîne. Yanî 'Kurd her tişt e, Tirk hîç tiştek nîne.' Polîtîkayên wan ên heyîn vê yekê sor dikin. Eşkere xuya ye, israra di terorîzmê de û êrîşbirina ser hêzên Kongreyê wê çerxa 'têkbiçe-têkbiçe' zû bigerîne. Divê baş were fêmkirin ku ji bo em nekevin vê rê me gelek hewl daye. Em bi sedemên erzan nebûn xwediyê van helwestan. Ji dîtin û ramanên di vê parêznameyê de hatine danîn jî tê fêmkirin ku sedemên dîrokî civakî li ber çav hatine girtin. Çareseriya Koma Gel ji bo yekparebûna netew, dewlet û welat bi hevrebûna azad a herî guncaw, rêya lihevkirina demokratîk û aştiyê ye. Divê baş were dîtin, polîtîkayeke hevkar, antîdemokratîk û antîkomarger ku Kurdan ji amûrên çareseriyê dike û ji hêzên terîqetparêz re pêşkêş dike, herî zêde bi kêra kê tên. Hêzên demokratîk ên rastîn ên Tirkiyê bi polîtîkaya Kurd êdî dikarin fêm bikin ku çima li der ve hatine hîştin. Divê ku êdî hîn bûbin ku bi polîtîkaya min nebihîst, min nedît û negot, hela hela polîtîka sosyal demokrasî nameşe.

Wek encam, em dikarin bibêjin, wê Koma Gel di kongreya xwe ya awarte de demê rast binirxîne, wê kesayeta berê ya neçar û teng li dawiyê bihêle û di şûnê de wê çawa bibin hêzeke demokratîk, di nav sazîbûyînê de bi serketina di pîvanên demokratîk de vê yekê ispat bikin. Di wezîfeyên dîrokî de wê bidin nîşan ku ji bilî serketinê ti helwestê neyên qebûlkirin, wê dekûdolabên netewparêz-feodalan pûç bikin; wê bersivê bidin pêdiviyên têkoşîna demokratîk û şerê xweparastinê û bi vî awayî wê wezîfeyên xwe bi awayekî serketî bi cih bînin.

3- Di çareseriya pirsgirêka Kurd de yekîneyên Hêzên Parastina Gel HPGê girîngiya rola xwe diparêzin. Ji rêxistina partî û kongreyê cuda wek rêxistineke cihê wê di nav têkoşîna demokratîk de, têkiliyên wê bi partî û kongreyê re û şêwazê wê yê şer, ji wan xusûsa ne divê werin rohnîkirin.

Di Pêngava 15'ê Tebaxê de têgihîştina şer xwe dispart têgihîştineke ezber e. Têgihîştin ev bû; pirsgirêkên netewî tenê bi şer têne çareserkirin; ji lewra divê heta dawiyê pesnê şer were dayîn;

divê mirov xwe biavêje bextê xwedayê şer. Ev yek divê wek prensîbeke mezin were qebûlkirin û pêdiviyên wê werin bi cih anîn; ji ber ku di sosyalîzmê de welê hatibû nivîsandin! Eşkere ye, ev helwest dogmatîk bû. Ji nirxandina şertên berçav ên dîrokî û civakî dûr bû. Tenê di asta prensîb de xwedî helwest bû. Teoriya şer di Marksîzmê de nehatibû çareserkirin. Ji nivîskarên dîroka bûrjûwa-feodal a Fransî deyn wergirtibû. Xebatên Engels ên bi sînor ji îzah û ravekirinê dûr bûn. Bi giştî teoriya şîdetê di warê rola wê ya îqtîdar û sererastkirina civakê de hatibû hûrkolan. Şerên netewî ku ji aliyê hêzên serwer û mêtinger ve jî di civaka bûrjûwaziyê de cihê xwe dîtin, lê wek kategoriyeke cuda ya sosyalîst hat nirxandin. Eger tu sosyalîstî divê tu şerê xwe yê netewî bimeşînî. Ji ber ku me analîza xwe ya derbarê şer de di beşê pêwendîdar de kiribû emê careke din dubare nekin. Lê tenê nirxandinek hatibû kirin ew jî weha bû; tenê şer, dewleta zorê û îqtîdarê diyar dike û di bin her nîzama civakî de şerek heye, ji lewra heta şer neyê çareserkirin, em nikarin civak û îqtîdarê heta ekonomiyê tam çareser bikin. Em bi vê helwestê naxwazin bînin ziman ku em şer bi tevahî wek xirabiyekê nîşan didin. Em tenê cihê şer û şîdetê di nav civakîbûyînê de hûrdikolin. Em dixwazin bînin ziman ka bi şer çiqas tê bi destxistin, yan jî çiqas tê wendakirin. Bi kurtî em analîzeke sosyolojîk dikin.

Me timî anî ziman ku pêngava 15'ê Tebaxê hewce bû, lê bi kêmasî û çewtiyan tijî bû. Ev dema şer bi qasî qehremaniyên xwe yên mezin rezîliyên xwe yên mezin jî hebûn; bi qasî destketiyên wê wendahiyên wê yên mezin jî têra xwe hatin rexnekirin û xwe rexne kirin. Piştî wê mîraseke mezin û wek dewama wê HPG bêguman di wê rewşê de nîne, bi şêwaza berê bimeşe. Lê bêfonksiyon û bê rol jî nemîne. Ji ber ku hînê ne rewşa agirbesteke mayînde û ne jî rewşa aştiyê heye, pirsgirêkên HPG dijîn, wezîfeyên divê bi cih werin anîn, rewşa wê ya çendayetî û çonayetiyê timî bibe mijara nirxandinê.

Ji bo em cih nedin têgihîştin û fêmkirinên şaş, divê em li ser rola şîdetê ya li Kurdistanê nirxandineke kurt dîsa bikin. Rewşa welatê Kurdistanê û serhatiyên gel bi huqûqê fethê hatiye diyarkirin. Ev kevneşopiya ji roja me ya îro koka wê diçe ta Sumeran xwe dispêre têgihîştina 'yê tu lê hukum bikî yê te ye.' Di hîmê hemû mafan de hakîmiyet û zorê dibîne. Kê herî dawî fetih kiribe ew welat û gel ê wî ye. Nexasim Îslamiyet vê yekê bi fermaneke dînî ve girê dide. Netewparêziya bûrjûwaziyê jî xwe bi prensîba fethê dişidîne. Ya para gelan jî dikeve ew e ku stû li ber fatihên xwe xwar bikin û guh bidin her gotina wan. Li gorî prensîbên şoreşgeran şer hînê cuda tê

tarîfkirin. Rewabûna şerên rê li ber zordestî û mêtingeriyê vedikin, yanî mafên wan yên fetihkirinê tenê xapandine. Îradeya zordestan nîşan dide. Stû netewandin, berxwedan wezîfeyeke pîroz e. Rezîlkirina şer rê li ber vedike, tenê bi dawîanîna li stûxwariyê mumkîn e li dawiyê were hîştin. Şerê bindestan şerekî pîroz e û ji bo ji rezaleta ketinê xilas bibin rêya bi tenê ya rizgariyê ye ku karibin serî lê bidin.

Di Kurdistana me ya îro de hukumranê dewletên xwe wek fatihên vir ên dem û dewranên wextekî dibînin. Timî mayîna xwe, serdestiya xwe dispêrên vî mafê xwe yê fethê. Gel li derveyî hemdemiyê maye; ji rewşa gel a jixwebûyînê derketiye; ji bêparmayîna her cure azadî û wekheviya gel xwe berpirsiyar nabînin. Eşkere ye, pirsgirêkeke mezin heye. Cewherê mijarê jî xwe dispêre zorê. Gelê em jê re dibêjin Kurd û bi hezarsalan e erdê dajo, bang li kesî nekiriye negotiye fermo were min bixîne vê rewşê. Li gorî karektera serdema me tê zanîn, wê ev statuya zorê çawa li dawiyê were hîştin? Ji bo vê du rê hene; Yan wê bi lihevkirineke demokratîk bibe, yan jî ev nebe wê li dijî zorê zor bibe. Jiyan wekî din nabe û bi tevahî li dijî serdemê ye; naxwe birçîtî, bêkartî, bêzimantî û bêçandîtî ye. Eger li welatên Kurdistan di bin serweriya wan de tam demokrasî hebûya, dikarîbû hewce bi prensîba zorê nebûya.

Helwest û meşa demokratîk a gelan diherikînin cihokên şaş û di nav çerxên dewletê de pûç dikin û ji cewher dûr dixînin. Bi kiryarên di roja me ya îro de yên mîna lîstikên hilbijartinê çar pênc salan carekê têne lidarxistin, dewlet kirine fena mabedekê û ev kiryar ti têkiliya wê bi demokrasiyê re nîne. Pirpartîbûn bibe nebe, ya bi hilbijartinan dikin, rewakirina dewletê ye û rêveberiya gelemperiyê ya gel jî pê dixapînin. Di roja me ya îro de ji vê lîstikê re dibêjin demokrasî û ev yek jî têkiliya wê bi hêza mezin a reklamê ya sîstema kapîtalîst re heye. Mîna ku ji yekî re çil caran bibêjin tu dînî û ew jî xwe dîn bifikire, ev jî berhemê kampanyayeke xapandinê ya bi vî rengî ye.

Ji bo gelan meş û helwesta demokratîk, beriya her tiştî bi xwedîderketina li nasnameya xwe, dilsoziya bi azadiya xwe û xwegîhandina rêveberiya xwe dibe. Xwe dispêre serwextbûna li nasname, dîrok û rastiya civaka xwe. Wexta serwextbûn xwe bi rêxistin bike wê bibe hêz û hêz jî rê li ber azadiyê vedike. Gel heta xwe bi rêxistin nekin nikarin bi hêz bibin û azad bibin. Wexta azad jî bibin, mecbûr in xwe bigihînin rêveberiyên xwe. Eger azad bibin û

nikaribin xwe rêve bibin, rewşeke li dijî aqil û exlaq e. Em dema demokrasiyê di vê çarçoveyê de tarîf bikin emê bibêjin; divê gel timî di warê nasnameya xwe de serwext bibe, di her astê de xebata xwe ya bi rêxistinkirinê bimeşîne û ji vê pêvajoyê re pêşengiyê bike. Em bi tevahî dikarin ji vê yekê re bibêjin rewşa çalak a demokratîk. Em dikarin bibêjin pêvajoya derbasbûnê ji helwesta demokratîk ber bi meşê ve. Li şûna ku gel bi ayînên hilbijartinan bi dewletê ve were girêdan, bi rewşeke çalak a demokratîk dikare xwedî li hebûna xwe derkeve, xwe bigihîne azadî û rêveberiyên xwe û bi vî awayî dikare rewş manîdar bibe. Naxwe ji bo di îqtîdara dewletê de kursî bi dest bixe, hukum bimeşîne ji gel erêkirinê bixwaze, ev dibe derbeke girîng li demokrasiyê ketiye.

Di sedsala 19. û 20. de demokrasî xistin vê rewşê û ev yek wek îxaneta li dijî demokrasiyê hat bi navkirin. Ev îxanet a J. J. Rousseau hê di sedsala 18. de balê dikişînê, hînê bi kûrahî û berfirehtire.

Eger mirov têkoşîna demokratîk a li Kurdistanê di çarçoveya vê tarîfê de bimeşîne dibe ku watedar bibe. Naxwe wê her carê mîna koleyan kom bibin û bi lîstika hilbijartinê efendiyê serê xwe diyar bikin. Hilbijartin di cewherê xwe de bi vî awayî heman tişt e. Xebata demokratîk, kengî nasnameya civakî ya gel, azadî û rêveberiya wî bi xwe esas dît dikare pêk were. Li çi deverê komek gel, gund û tax hebe, divê li wir timî xebata bi rêxistinkirinê were meşandin û gel têgihîştî bike. Bi vî awayî pirsgirêkên bingehîn ên gel dîsa bi gel re kom bibe guftûgo bike, biryar bide û ji bo van biryarên hatine stendin bi cih werin anîn rêveberan destnîşan bike. Ha xebatek bi vî rengî tam çalakiyeke demokratîk e. Partiyên çep-rast, dîndar-netewparêz ên bi navê xwe hene û bûne amûrên rewakirina nîzamê, li cem gel rû nabînin, tim û tim gel wan di sendoqê de dixeniqîne, ev rewş bi vê rastiyê ji nêz ve têkildar e. Li Kurdistanê partîgiriya nîzamê wê ji amûrîbûyîneke kirêt a rewakirinê wêdetir rolekê nelîze. Bi qasî terîqetên berê yên dînî, dibin amûrê derewkerî, xapînokî û kedxwariyê.

Mirov bibe partiyeke demokrat û çalakiyên demokratîk bimeşîne karekî têra xwe bi şeref e. Di dîrokê de demokrasiya Atînayê ya em naecibînin, ji aliyekî ve rejîma qraliyetê ya Sparta, ji aliyê din ve jî împaratoriya monarşîk a Pers a dused salî, karîbû bi demokrasiyê rawestîne û di dîrokê de 'serdema zêrîn' bide jiyîn. Wexta demokrasî bi rastî were bi cihanîn bi qasî ku dibe rejîmeke bi fazîlet, her weha ji bo welatekî, gelekî ji despot û dagirkeran were parastin, dibe dibistanek lê welatiyên azad û têgihîştî rabin. Di siyasetê de ti xebat

bi qasî çalakiya demokratîk bi nirx û buha nîne. Di çarçoveya vê maneyê de ewladên gelan ên evîndarên demokrasiyê û ewladên wê yên bixebitin ji bo hebûna wê misogeriya herî mezin e. Li Kurdistanê çi xebat dibe bila bibe, bi çi navî tê meşandin bila were meşandin, dema navend dewlet be, ji înkarkirina demokrasiyê wêdetir ti maneya wê nîne. Li Kurdistana me ya îro ji hewldaneke rastîn a demokratîk û ji meşandina tevgera wê bi qîmetir ti pratîk (pratîkên çareserker, yên dibin aştiyê û azadiyê) nabe were fikirîn.

Lê belê Kurdistan ji demokrasiyeke hemdem hînê gelek dûr e. Li Rojhilata Navîn şer û koasên beriya demokrasiyê diqewimin. Kurdistan di navenda vî şerî û koasê de ye. Ji kîjan alî ve were nertin bila were nertin, pirsgirêkên ewlekariyê yên gel giran in û divê xwedî lê were derketin. Amûrê bingehîn ê ragihandina civakî ziman di çarçoveya pîvanên hemdem de nabe were bi karanîn û ev ji bo kûrahiya pirsgirêkên ewlekariyê îspat e. Ji aliyê din ve, ji ber ku ji bo şerekî giştî yê berxwedanê gelek derfet û îmkanên pêdivî pê heye kêm in, hewce dike şer teng û bi sînor were girtin. Li dijî hêzên eskerî û siyasî yên dewletên hukumran, divê şerê çekdarî yê berxwedanê bi dijwariyeke nizim û navîn were meşandin û car caran ji herduyan jî mirov dikare bi şerê hucre yê hînê tengtir berxwedanê bimeşîne. Hîç li berxwenedan stûxwarkirinê ebedî dike. Bi berxwedanê tinekirina dewletên hukumran hedef nîne, bi berxwedanê divê mirov wan neçarî lihevkirinê bike, di şert û mercên serdema me de ev rêya herî baş xuya dike. Em rola HPGê bi vî awayî dikarin tarîf bikin: Heta bigihîne lihevkirineke demokratîk wê demokratîkbûyîna gel pêş de bibe û gel biparêze. Ji bo pêşî li demokratîkbûyînê were vekirin, divê kelemên neyekser ên wan hêzên ku bi zora dewletê ya antîdemokratîk re hevkariyê dikin werin rakirin.

Yek ji şertên şer were qebûlkirin ew e ku eger êrîşek yekser li dijî hebûna HPGê were kirin, wê li dijî vê şerê parastinê bê kirin. Ji bo vê, cureyê şerê gerîlla wê heta dawiyê were kirin. Ji bi cihbûyînê heta têkiliyên bi gel re, ji lojîstîkê heta perwerdeyê, ji fermandaran heta pêwendiyên siyasî çareserkirina her pirsgirêkê ji wezîfeyên wan in. Wê demên wisa werin, ewê bibe şêweyê bingehîn ê hemû hêzên rêxistinkirî û gel xwe bispêrê. Wê pêşdebirin û parastina hemû hewldanên demokratîk bikeve aliyê wê. Ji bo vê yekê jî divê di warê siyasî û rêxistinî de hemû pêdiviyên xwe tedarik bike. Li gorî wezîfeyên wê bi cih bîne, divê çendayetî û çonayetiyê li ber çav bigire, stratejî û taktîkên xwe diyar bike. Ev jî ji wezîfeyên wê ne,

divê çareser bike. Ji ewlekariya hemû partî, Kongre û kesên ji gel ên di tehlûkê de berpirsiyar e. Ev wezîfeyên zehmet û girîng li dijî leşkerên herî baş hatine perwerdekirin û hêzên din eskerî bi cih tîne.

Mijareke din a girîng ku divê qal bikim, rola min a di têkoşîna çekdarî de ye. Xebatên min ên berê û piştî Pêngava 15'ê Tebaxê têne zanîn. Hewldanên min ên mezin bûn. Lê belê di navbera pêvajoya destpêkê ya panzdeh salên şer û têgihîştina min a şer de cudahiyên mezin bûn. Ji ber ku rexne û xwerexnekirina wê bi firehî hat kirin ezê dubare nekim. Lê eger min bizanîbûya wê şer ev çend ji rê derkeve, ez dikarim bibêjim di şertên serê sala 1980 û 1990 de li welat bûma wê gelek li cih bûya. Gelek komên li qada welat wezîfe stendin sedemên bingehîn ên rewşa xwe xistinê ew bû ku xwezaya şer nas nedikirin, ji bingehekî siyasî û îdolojîk yan bêxeber bûn, yan jî bêperwerde û têgihîştina wan kêm bû. Yek ji sedemên girîng ê têkçûn û wendahiyan ew bû, xwedî li fermandarî û serkaniyê dernediketin. Divê ez rewşên ketim navê jî bingehê wan di nav van rastiyan de bigerim. Qabîliyetên min wek pratîk û toerîk şer ev çend rêvebir, pêk anî yan jî ya dixwest pêk neanî. Divê ez eşkere bînim ziman ku piştî sala 1995'ê li şûna xwe dubarekirineke zêde, dikarîbû hînê rast bibûya ku min berê xwe bida lêgerînên bi kok û xurt. Di sala 1993'ê de xwestina serketinê ji fermandeyên kadro rast nebû. Pêngava di navbera salên 1993-95'ê de girîng bû. Lê israra di kadroyên hatibûn ceribandin û bi ser neketibûn de rê li ber xwedubarekirinên têne zanîn vekir. Dîsa tê zanîn pêngavên din jî xwe nedispartin fermande û serkantiyeke ciddî.

Veqetîna min a di sala 1998'ê de bi tesîra van rastiyan pêk hat. Min dikarîbû biçim welat, lê min fikar kir ku ez rê li ber îmhayeke topyekûn vekim û ji ber vê jî min ev rê neceriband. Ez heta 11 Îlona sala 2002'ê jî alîgir bûm ku ji bo lihevkirineke herî kêm a çareseriya demokratîk şerê çekdarî were terikandin. Lê piştî 11 Îlonê li cem rêveberiya Tirk niyeta lihevkirinê xuya nekir. Li gorî min piştî hilbijartinên Mijdara sala 2002'ê ku hat fêm kirin nehat fêmkirin hukûmet bersiva çareseriyê nade, diviyabû şerê parastinê dest pê bikira. Lê ev biryar nedibû ku bibe ya min. Şertên girtîbûnê biryarên bi vî rengî ranakin. Rast nîne ku ji min li benda fermanan bin. Di çarçoveya analîza berfireh a dema nû de şêwazê şer, taktîk û stratejî, karê wan kadroya ne ku bi xwe bawer in û berpirsiyariya xwe dizanin. Min ew bi temamî serbest berdan. Min ji aliyê exlaqî ve rast nedît ku şer ji bo min wek tesîrek zehmetkirî bi kar bînin. Eger daxwazên gel ên dîrokî yên dest ji wan nabe, bikevin bazarê dibe ku

wek çalakiyekê serî li şer were dayîn. Ji lewra min gotibû bi gel re pir guftûgo bikin û biryara xwe bi xwe bidin. Ez hînê van dîtin û ramanên xwe diparêzim.

Di mijarên şer de min ramanên xwe yên teorîk eşkere kirin; min di vê parêznameyê de jî hînê pêş de birin. Li welatê me derbarê rola zorê û şerê berxwedanê de hin helwestên min ên prensîb bûn. Eşkere ye, ev ne ferman û ne jî talîmat in, tenê hin ramanin ji bo rohnîkirinê. Di vê navberê de min hin pêşniyar jî derbarê rewşa yekîneyên jin de, derbarê herêmên otonom ên demokratîk de û derbarê xweseriya şerên parastina gel de, kirin. Ev raman û pêşniyar jî dibin ku li ber çav werin girtin. Ji ber şertên şer dibin ku di nav 24 saetan de biguherin. Her an û kêlî dibe ku guhertinên taktîkî hewce bikin. Di van rewşan de dibe ku her tişt biguhere. Ji lewra nabe ku dîtinên me tam wek ferman werin fêmkirin. Di şer de hîmê diyarker îradeya şervanan bi xwe ye. Wê bi teorî û pratîka xwe biryar bidin û bi cih bînin. Wek berpirsiyarê têkçûn û serketinê wê xwe bibînin. Şert, hêz, tecrûbe û teoriya wan çiqas cih bibîne, wê şerkirin an jî xwe ji şer dûrgirtinê bi berpirsiyariya wan be.

Heta niha yekser jî nebe min ji bo hêzên dewletê û hêzên Kongreya me hin nirxandinên di asta hişyarkirinê de kirin. Herî dawî wexta min helwestên biryardariya Kongreyê pûç dikin, dîtin, wek erkekî berpirsiyariya me ya dîrokî ji bo jinûve avakirina PKKê, di çarçoveya kongreya awarte de li ser hîmê girêdana bi îradeya Kongreyê min dîtin û ramanên xwe pêşkêş kirin. Di berdêla çi de dibe bila bibe, ezê heta niqrîska dawî jî van dîtinên xwe bînim ziman. Her çend kêmbûna ragihandin û têkiliyê ez bi hêrs kiribim jî, çi ji destê min hat min kir û ezê bikim. Herî dawî bi vê parêznameyê di her mijarê de min dîtinên xwe bi rêkûpêk pêşkêş kirin.

Ez yeqîn dikim ku herî dereng wê kongreyê di havînê de temam bibe. Hêvîdar im bûyerên anormal neqewimin. Ji niha pêve, wezîfeyên ji 15 Tebaxê girîngtir li benda hevalên berpirsiyar in. Kesên li ser navê Partî, Kongre û HPGê wezîfeyê hildin ser milê xwe, wê bi hêza xwe bimeşin. Bendewariyên ji min têra xwe bêmane ne. Her çend tendurustiya min li cih nebe jî bêguman ji bo xwegîhandina dawiyeke bi şeref ezê hewl bidim. Lê ez vê bibêjim ku eger hevalên rastîn bûna di vê rewşa heyî de wê welê tevnegeriyana. Kemal Pîr wexta çalakiya Ferhat Kurtayan dibihîse tê gotin ku xwe bi xwe wiha gotiye; "Diviyabû ev çalakî me bikira." Wek tê zanîn li ser vî hîmî dest bi rojiya mirinê kirin. Ez ji sedî sed çalakiyên întîharwarî rast nabînim û alîgir jî nînim. Lê ez çalakiya Kemal Pîr,

Mehmed Xêrî Dûrmûş, Mazlûm Dogan û Ferhat Kurtayan wek çalakiyeke întîharwarî nanirxînim. Wek wan bi xwe jî îfade kiriye; "Eger îmkanekî herî hindik ji bo jiyaneke bi şeref hebe, emê esas bibînin û heta dawiyê bi şeref bijîn." Di vê nirxandinê de pîvanên hewce yên jiyanê hene. Ji bo rûmet û şerefa mirovatiyê tenê tiştek mabû. Ew jî bi çalakiya berxwedanê nîşan dan. Tê zanîn Xêrî Dûrmûş vê biryardariya xwe bi gotina 'em bi ser ketin' îfade kiriye. Slogana wan jî "wê rûmet û şerefa mirovatiyê bi ser bikeve" bû. Paşeroja şerê me yê berxwedanê ev e, divê rast were fêmkirin û bi cihanîn.

Gelek hevalên ji zindanê derketine li cem we ne. Hêja ye mirov bixe lêpirsînê ka ji jiyanê çi fêm kirine. Kes ji we mîna pêvajoya 15 Tebaxê li benda çalakiyên întîharwarî nîne. Ev nayê qebûlkirin jî. Lê li cihê her cure çalakiyên demokratîk û şerê xweparastinê derfet hebin, wê ji bo tevgereke azad ji şertên zeman û mekan gazinê neyên kirin, ji lewra derfet û îmkan hene ji bo hûn rûmeta xwe û ya gel bi her alternatîfê biceribînin û ev xusûs nayê înkarê. Me xwerexnekirina we ya piştî salên du hezarî ciddî dîtibû û me bawer kiribû ku hûnê bibin xwediyê çalakiyên bigihîjin encamê. Lê ya derket holê ew bû ku we mîrateya me kir şûna cenaze, kir du parçe û wek bersiva bendewariyan ji me re şand. Eşkere ye, ev ne şerê şeref û rûmetê ye. Di encama kedên mezin de hûn di serî de li ser çiyayên me yên azadiyê peyman dikin û di nava gel û mirovatiya azad de ne. Ji bîr nekin, ji bo her yek ji we bigihîje heta vê astê min bi qasî çiyayan ked li we daye. Ez ji bo xwe ji we li benda tiştekî nînim. Lê ez helwestên we yên bi vî rengî ku têne maneya lîstina bi şerefa gel, ti car erê nakim. Dev jî gel berdin, divê hûn fêm bikin ka we rûmeta xwe xistiye çi rewşê. Em, ez neketin nav çewtî û şaşiyekê ji bo hûn bikevin nav tevgereke bi vî rengî. Ezê şerê şerefê yê mirovatiyê rast şîrove bikim û pêdiviyên şopgeriya wê dewam bikim.

Wek encam, min di bin tîrêjên nirxandin û analîzên berfireh de hewl da pirsgirêk û rastiya Kurd rohnî bikim û hin pêşniyaran ji bo çareseriyê pêşkêş bikim. Ev dikare wek bersiva min a ji bo hemû aliyên pêwendîdar jî were fêmkirin. Ji vir pêve, her derdor û aliyê pêwendîdar wê bersiva xwe di bin berpirsiyariyên xwe de bimeşîne.

Ez yeqîn dikim ku bi vê wesîleyê min kêmasî û xetayên xwe yên di pêvajoya 15 Tebaxê de jî anine ziman. Di ser van kêmasî û xetayan de destpêkê me tam nizanîbû em çi dixwazin. Ez qebûl dikim ku ez di serê salên 1980'yî de têra xwe vekirî û çareserker nebûm û bi vê parêznameyê rexne li xwe digirim û bawer dikim ku

helwesta xwe rast datînim. Kêmasî û xetaya duyemîn ew bû, di mijara çalakiyan de zêde vekirî nebûm. Ez bawer dikim ku di vê mijarê de jî ez zelal bûme û min bersiva hewce daye derdorên pêwendîdar. Ji vir pêve, du şêwazên çalakiyan hene.

Ji vir pêve,

a) Çalakiyên demokratîk û derfetên çareseriyê. Min helwestên berfireh û bi israr pêş xistin û tercîha min a bingehîn jî di vî alî de ye. Kêmasiyeke ciddî bû ku ez di serê salên 1990'î de negihîştim vê zelaliyê. Her çend dereng be, hewldan û êşa mezin a vê yekê min kişandibe jî, ya girîng ew e, îro di van şertên dîrokî de li ber qewmîna bûyerên girîng pêşkêşkirina şêwazekî çareseriyê û çalakiyên demokratîk ên bêne fêmkirin û bi cih anîn têra xwe girîng e. Bi hezaran aktîvîstên di têkoşîna demokratîk de bi îdîabûyîna xwe tînin ziman û hêza gelê me ya bi mîlyonan ji bo azadiyê rabûye ser piyan, heye. Ev hêza milîtan û girseya gel ji bo pirsgirêkên bê sîleh werin çareserkirin dikarin bibin her cure bersiv. Kesên qaşo di statuya serokatiyê de û berpirsiyarên sereke, eger nikaribin van derfet û îmkanan bi kar bînin wê li hemberî dîrokê xwe di bin berpirsiyariyeke mezin de bihêlin. Bi her cure civaka sivîl û rêxistinên demokratîk û bi daxwazên heq ên mîlyonan mirov dikare bimeşe û bi vî awayî welat bigihîne azadiyê û gel jî bigihîne demokrasiyê. Ji bo vê yekê hinekî dem hewce ye, ji vê û pê ve, serokatiyeke siyasî ya demokratîk a ji armanca xwe bawer kiriye, demokrasî dawerivandiye hundurê xwe, bi gelê xwe re mîna goşt û neynûkê têkilî daniye hewce ye. Ev şervaniyeke huqûqî ye jî ku dema hewce bike ji qanûniya ne demokratîk dozê bibe qanûniya demokratîk a zadî û mafan.

Bi gotina wan nasnameya çepgiriya sosyal demokrat a hînê jî hêviyên gel pêşkêşî bermahiyên serdema navîn dike, eger herî kêm şopa wê jî mabe, bêyî cudakirina netew, cins, dîn û mezheb, li Tirkiye û Kurdistana îro bi demokratiyeke herî kêm doza wekhevî, azadî, biratî û aştiyê ya bi ser nekeve nîne.

b) Rêya duyemîn: Tevî hemû bangawazî û hişyariyên me, eger bersiv neyê dayîn, bi dizî û qurnazî bi rêbazên şerê taybet hemû gavavêtin, hêviyên demokratîk, wekhevî û azadiyên gelên me bi dewam bêne tepisandin, helwestên bi prensîbên şoreşger ên komarê re li hev nakin, bi yekparebûna welat re nameşin û bi şêwazên hemdem ên îfadeya netew û dewletê li hev nakin israr were kirin, bersiva were dayîn wê şerekî berfireh ê xweparastinê be. Tê zanîn ev tercîha me nîne. Lê gelek dekûdolabên di vê mijarê de li naverastê

digerin, her kêlî amadekariyeke têkûz hewce dike û wexta pêdivî pê hebe, divê bêyî dudilî şerekî berxwedanê yê xweparastinê were pêşxistin. Eşkere ez bixwazim jî nabe ku ez ji şêwaz û rêveberiya vê yekê berpirsiyar werim dîtin. Ne ez dikarim pêşî lê bigirim û ne jî ez dikarim bibêjim nekin. Berpirsiyariya dîrokî ya dewletan û hêzên parastina gel in. Taktîk û stratejiyên xwe wê bi xwe beramber diyar bikin. Kiryarên teng û fireh wê li gorî qabîliyeta hêza xwe bikin. Divê her kes baş hevdu nas bike û li gorî wê gav biavêje.

Ez nikarim xwe ji anîna ziman a van mijaran jî bikim: agirbesteke beramber dikare berê bi xalên berfireh were îlankirin. Ji bo şerekî muhtemel, dikarin berê pîvanên şer ên ji bo guh bidinê bi deklarasyonekê îlan bikin û ji bala derdorên navnetewî yên pêwendîdar re pêşkêş bikin. Dikarin belgeya agirbestê jî pêşkêş bikin. Eger rewşek welê derkeve, di şertên Kurdistanê de du hêzê bikevin rewşa manê û tinekirinê; ev hêzên dewletê û yê Kongrê ne. Pir bi lez tasfiyekirina yên di navberê de dikare bikeve rojevê. Mirov dikare bang li wan jî bike. Hîç nebe bila sivîl, yên bêeleqe, zarok, pîr û jin zirarê nebînin. Eger alî guh bidin pîvanên şer ev yek dikare bi xwe re deriyekî însanî veke, dikare agirbestê bîne, dikare rê li ber lihevkirineke demokratîk veke. Eşkere ye, ji bo jiyanê hewce bi lojîstîk û mirov heye. Palpişta bingehîn a gerîlla çiya û gel e. Şer dikare li çiyê, bajar û gundan jî were pêşdebirin. Desteserkirin û kontrola li ser rêyan wê her alî biceribîne. Bac stendin û girtina mirovan ji bo eskertiyê kiryarên wê her tim bêne kirin. Her kes ji bo karibe bijî divê bizanibe hedefên xwe çawa diyar bike, fêm bike û bi cih bîne.

Ez hewce nabînim li ser van xusûsan rawestim. Ez hêvî dikim ku hîç nekevin rojevê. Senaryoyeke muhtemel ji bo aliyan hişyar bike destnîşan dikim. Belkî jî hînê xirabtir bibe. Wexta trajediyên dawî yên Îsraîl-Filîstînê û Iraqê li ber çav werin girtin, wê were fêmkirin ku em tewş napeyivin. Wek erkekî çareserkirina komploya li dijî xwe diyarkirina van xusûsan girîng dibînim. Bi girêdaneke ji dil a dewletê bi demokrasiyê, tevî yekparebûna demokratîk a welat bi Tirkiyê re bibe, ez bawer nakim ku pirsgirêkeke neyê çareserkirin heye. Ez di çarçoveya pêdiviyên baweriya xwe de pir bi sînor be jî bihevrebûna dîrokî ya gelên me watedar dibînim ku bi pîvanên wekhevî, azadî û demokratîk ên hemdem bi hêz bikim. Nayê guftûgokirin ku ez di vî warî de ji xwe gelek fedekariyê dikim. Ez naxwazim mirovekî me bi tenê jî xwîna wî birijê û ne jî êşê bikişîne. Ev mijareke girîng e, ku ez li ser dilerizim û diricifim. Lê dîsa

xusûsek ew çend eşkere ye ku ez van hemûyan nikarim ji nasnameya gelî, civakî û maneya însanî ya min berfireh rave kiriye, cuda bikim. Jixwe li derveyî van xusûsan wekî din wê çi aliyê jiyanê were fêmkirin, ne jî dikare bigihîje derfetên fêmkirina wê.

Dikare were pirsîn ku mijarên heta niha min hewl dane binirxînim çi têkiliya wan bi doza min a li DMME re hene. Lê tenê bûyerên her roj nû di çarçoveya Projeya Rojhilata Navîn de derdikevin vê têkiliyê pir ji nêz eşkere nîşan didin. Heta şaristaniya Rojava rast neyê çareserkirin, wê di serî de ne têkiliyên Tirkiyê bi YE û ne jî bi DYE re rast werin fêmkirin. Ev têkilî jî heta rast neyên çareserkirin wê di serî de gelên Kurd û Tirk, ji pirsgirêkên hemû gelên Rojhilata Navîn re ku bûne kaos û cehennem, bersiveke rast neyê dayîn. Dozên aliyê wan yên civakî hene, YE û DMME wan ji vî aliyê wan dikin û dadixînin asta ferdî, lê ev weke ku ew îdîa dikin ji demokrasî û mafê mirovan re xizmetê nake. Ev yek aliyê şaristaniya Ewrûpayê yê zêde ferdperest û berjewendîperest nîşan dide. Ezê beşê encamê yê parêznameyê ji rohnîkirina vê mijarê re veqetînim. Ezê di wir de nîşan bidim ku edalet ji bo ferd, eger ji civaka wî re were kirin wê bibe edalet. Bi vî awayî ezê ispat bikim ku azadiya ferdî di azadiya civaka re ku ferd pê ve girêdayî ye, derbas dibe.

BEŞA ŞEŞEMÎN

Di doza Abdullah Ocalan de rola YE û DMME

Ji bo rohnîkirina doza min, yek ji hêmanên bingehîn ê şaristaniya Ewrûpayê çîroka Hz. Îsa ya li çarmîxê xistin rast were çareserkirin wê roleke girîng bilîze. Di vir de ji şiklê çîrokê zêdetir cewherê wê me eleqeder dike. Di serî de Încîl, dema metnên derbarê mijarê de bi kûrahî ji aliyê sosyolojîk ve bêne lêkolînkirin, wê were dîtin ku kult û kultura civakî ya bi lez ji hev dibe Hz. Îsa sembolîze dike û ev dîtin bi giştî tê qebûlkirin. Li aliyekî, hêzên kevneşop ên burokratîk û arîstokratîk bi lez li dora împaratoriya Roma digihîjin hevdu, li aliyê din jî, cîhaneke xizanan a ji gel û çandên din bi lez pêk dihat. Quds di wê demê de li Rojhilatê Derya Spî yek ji navendên girîng bû. Qebîleyên Îbranî ku xwedî rabirdûyeke dîrokî ya demdirêj bûn, li jihevbûna civakî qewimîn. Yahûdiye qraliyeteke piçûk a Îbraniyan e. Navenda wê Quds e, û wek parçeyek ji hevbûna civakî, oldar jî parçe bûne. Qraliyet û tebeqeya jor a dîndaran têkiliyên wan yekpare û şidandî ne. Piştî çîrokeke demdirêj a berxwedanê hevkariya bi Împaratoriya Romayê re qebûl kirine.

Di vê rewşê de timî sura hewayeke berfireh a serhildanê heye. Gelek navendên dijber derketine holê. Essenî di serê van navendên

dijber de tên. Hz. Yehya serê vê terîqetê tê hesibandin. Pir bi dijwarî li dijî hevkarên Yahûdiyê derdikevin. Di nava Yahûdiye de, di encama entrîkayên Rebeca'yî de serê wî hat jêkirin û wek qurban ji wan derdoran re ku berjewendiyên wan xira kiriye, tê pêşkêşkirin. Beriya serjêkirina wî Hz. Îsa wek xelîfeyê Hz. Yehya di nav terîqetê de derketibû pêş. Divê êdî wî serê nerehetiya di nav civakê de bikişanda. Di cewherê xwe de şerekî çînî dimeşîne. Lê bi awayekî berçav wek terîqeteke dînî ya xizanan xuya dike. Ya rastîn, wek kevneşopiya wê demê ku zêde heye, mîna xelekeke peyxemberiyê bi gewde dibe. Cudahiya wê ew e ku yekem car ji qebîleya Cihûyan qut dibe û wek berdevkê hemû gelan derdikeve holê. Bi awayekî din, mîna ku li dijî netewparêziya Cihû enternasyonalîzmê temsîl dike. Jixwe rewşa kozmopolîtîk a Romayê zemînê hewce yê objektîf afirandiye. Gelên Rojhilata Navîn di bin serweriya Romayê de ji nû ve têne tevlîhevkirin. Wek partiya zengînan û xizanan du partî derdikevin holê. Di dema Helenîzmê de li Yahûdiyê jî parçebûn û veqetîneke bi heman rengî dibû; wek Sadûkî û Ferîsî. Ev kevneşopiyê yekem car bi Hz. Îsa re di ser sînorên qewmê Cihû re derbas dibe û bang li xizanên hemû qewman dike. Kahînên giregir ên Yahûda yên li ber vê rewşê dikevin nav tirsê û dibizdin ji Waliyê Romayê Pîlatûs dixwazin ku Hz. Îsa ceza bike. Pîlatûs tevî ku wek şexs di serî de naxwaze vê yekê qebûl bike jî ji ber giraniya hevkarên Cihû û wek pêdiviyeke berjewendiyên hevpar li çarmîxê xistinê di dawiyê de qebûl dike.

Paşê em dizanin ji çîrokên şagirt, ezîz û ezîzeyan dînekî bi çi awayî derket holê. Grekiyên ji Romayê bêzar bûn wek qewm bi awayekî pir zêde tevlî vî dînê nû bûn. Berxwedaneke dîn-qewmî pêş de birin. Nemaze li nîvgirava Grek û Anatolyayê bi rêya dînê nû di nava împaratoriyê de pir baş bi cih dibin. Bi împarator Konstantîn re dibin hevparê dewletê û bi navê Bîzans mora xwe li Rojhilatê Romayê dixînin. Dîsa ji qewmên bi çand û bi hêz ên wê demê Asûrî, Suryanî, nemaze li rojhilatê împaratoriyê bi dînê nû re reformeke mezin a çandî pêş dixînin. Hem di nav Bîzansan de, hem jî di nav Sasaniyan de heman statuyên bi hêz bi dest dixin. Piştî Hz. Îsa di nav sê sed salî de di encama hewldanên pîskoposan de dînê mezin ê xizanan dibe îdeolojiya fermî ya dewletên pêwendîdar û ya girseyên gel. Xirîstiyantî ku hûnandineke bingehîn a îdeolojîk a feodalîzma Ewrûpa ya serdema navîn e, bi reformasyonê re di derketina serdema nû ya kapîtalîzmê de jî li serê îdeolojiyên bi tesîr tê.

Bi vê vegotina kurt, pirsa ez li bersiva wê digerim ew e, ku kê xwîna Hz. Îsa rijand û wek şerabê vexwar pê bû dunyewî. Ev şaristaniya Ewrûpayê bi xwe ye. Împaratoriya Romayê wek qraliyeta dunyewî ya şaristaniya Ewrûpayê xwîna Îsa rijand. Papatiyê jî ew xwîn kir şerab vexwar û bi vî awayî bû qraliyeta manewî-uxrevî. Nirxên moral ên bingehîn ên şaristaniya Ewrûpayê pêk anî.

Para Hz. Îsa, xizanan, çîlekêş û yên pê wî re kuştin, taqîp û ezabên mezin ketin. Em dema vê bûyera bingehê şaristaniya Rojavaye çareser dikin, em dibînin, sîstem hem mêrkujê qurban e, hem jî mizgîniya wî dide û mezin dike.

Nakokiya herî girîng a di şaristaniya Rojava de di binê vê rastiyê de radizê. Jixwe nivîskarê navdar ê Rûs Dostyevskî bi kûrahî di romanên xwe de tîne ziman ku Hz. Îsa ji aliyê pîskoposên ji cewherê xwe re xerîbketî çawa ji nû ve li çarmîxê tê xistin. Di hin rewşan de meqtûl ji qatilê xwe re îbadetê dike, lê di şaristaniya Rojava de qatil ji meqtûlê xwe re îbadetê dike. Ya esas, rast nîne ku mirov vê rewşê ji bo şaristaniya Rojava tenê bibîne. Hemû sîstemên tehekumkar û îstîsmarker bi xwîn û keda mexdûrên xwe xwedî dibin. Çîrokên hemû şerên gelan rizgarbûna ji vê rewşê tînin ziman. Lê di encamê de ev çîrok jî pesnê efendiyên xwe didin.

Piştî ku tam du hezar sal di ser çîroka Hz. Îsa re derbas bûne, ji cihekî nêzî mekan û çanda wî, yek ji kesên ket pêvajoya mîna ya wî ez im. Vê carê di şûna Romayê de DYE hêza împaratoriya şaristaniya Rojava ye. Roma ew hêz bû ku şaristaniya Rojava za, lê DYE nêzî wê hêzê ye ku wê biqedîne. Li Rojhilata Navîn ewê jî mîna Romayê bi lez belav bibe. Pir zêde hewceyî hevkaran e. Di civaka Rojhilata Navîn de dewlemend û xizanê dîsa pir zû ji hev bibin. Li cem partiyên dewlemendan ên hevkar, gelek partiyên xizanan jî çêbûne. Vê carê gelê herî xizan ê herêmê Kurd in. Li zordestiyeke têra xwe zêde rast tên. Ji ber ku ez xweziya tînim an jî pê kêfxweş im vê yekê nabêjim. Lê derketin, şêwazê pêkhatina min, ketina min a nav sîstemê, dijbertiya min û şêwazê girtina min di warê cewher û şekil de nêzî çîroka Hz. Îsa disekine. Tê zanîn min girseyên herî xizan ên Rojhilata Navîn ji xwe re kirine zemîn. Lêgerîna nû ya îdeolojîk û zêhniyetê berçav e. Komên pir dilsoz û girêdayî çêbûne. Împaratoriya nû ya Romayê DYE û hevkarên xwe ji vê rewşê pir bêzar in. Dîsa dewleta Yahûdiyê di rewşa hevkarê herî nêz de ye. Di nav Grekan de jî alîgirên xurt hene. Îxaneta kujêr a Îskaryota Yahûda Klanderîsê Grekî xwe wek sempatîzanekî baş nîşan dide. Qralokên Kurd ên Yahûdiyeyê ji mezinbûna xizanên Kurd pir ditirsin. Hemû

hevkarên li herêmê hewce dibînin rewşa xwe bigihînin hevdu. Rewşa min a îdeolojîk-polîtîk bi dijwarî hemûyan bêzar dike. Ji bo komployê şert û merc têra xwe li cih in. Hema tenê hinekî din despotiya wan were xurtkirin.

Yek ji hewarî û şagirtên mezin Saînt Paûl qet nebe di encama seferek du seferan de bû qurban. Romayê hinekî xwe lê ragirt. Lê yê min di yekemîn sefera min a Ewrûpayê de ez hatim revandin û girtin. Hewce nîne ez careke din çîrokê dûrûdirêj bînim ziman. Ez li hemû navendên mezheban geriyam. Di serî de li navenda Grekan Atînayê, Moskowaya Rûsan û wexta min di asta fermî de Romaya Latînan peland min fêm kir ku di nav berjewendiyên mîna qeşayê sar de cihê min nîne. Minê berdêla xetayê ya xwe spartina dewletê (di cewher de nebe jî di şekil de) û bi vî awayî siyaset meşandinê pir bi giranî bida. Pir eşkere nîşan didan ku li hemberî berjewendiyan ti qîmeta îdeolojî û dostaniyan tine. Bîrûbaweriyên wan ji zû ve bûbûn pûl û pere. Berjewendiyên wan ên pûl-peran çawa îcab dikir, wê bi rêbazên komployê ku tê de bi qabîliyet bûn, welê bi hostayî bi cih bianiyana. Di bûyera Hz. Îsa de otorîteya diyarker Roma bû. Eger otorîteya Roma nebûya ne Îsa dihat girtin, ne jî li çarmîxê dihat xistin. Di girtina min de otorîteya diyarker DYE bû. Eger DYE nebûya girtina min jî nedibû. Rola ji bo rêveberên Tirkiyê ji celladî û gardiyantiyê wêdetir tiştek nebû. Rola ji bo YE jî ew bû, wek hêza huqûqê ya şaristaniya Rojava wê di warê dadgeriyê de gotina dawî bigota. Ev tayên têkiliyan ku me bi xetên sereke anîn ziman, mirov dikare berçav jî bike.

Împaratoriya Bîzansan ji Rojava zêdetir nêzî împaratoriya Rojhilat e. Bi sedema mêzînên hêzan ên di dema şaristaniya feodal de mumkîn nebû ku seferên xaçperestan li rojhilat bi cih bibînin. Mîna şaristaniyên Helen ên piştî Îskender nikarîbûn xwe ji helandinê rizgar bikirana. Li ser hîmê kapîtalîzma bilind dibû, êrîşên yekemîn ên bi rêkûpêk di sala 1898 de Napolyon kirin. Astengiya derket pêşiyê Împaratoriya Osmanî bû.

Sîstema kapîtalîs wek hêza nû ya serdest a şaristaniyê çendîn cihê xwe têkûz kir, ew çend wê bibûya navenda şaristaniya Ewrûpayê. Serdestî ji sedî sed bi Ewrûpayê re bû. Li ser navê şaristaniya Rojhilat sultanên Ereban di dawiya sedsala 15. de ji Spanyayê bi tevahî hatin qewirandin, Osmanî jî di sala 1683 de di duyemîn dorgirtina li Wiyenayê de şikestin û ketin pêvajoya serberjêr û paşve çûyînê. ædî mumkîn nebû ku xwe li hemberî şaristaniya Ewrûpayê ya bilind dibû bigirin. Dema wê ji zû ve derbas

bibû. Bi têkçûna Napolyon re serkêşê nû yê şaristaniyê Ingilîstan bû. Împaratoriya Îngilîz bi wê têgihîştinê ku dizanîbû serweriya li dunyayê di Rojhilata Navîn re derbas dibe, ji salên 1800 ve giraniya xwe da ser herêmê. Li bakur Rûsya Çartiyê û li başûr jî împaratoriya Îngilîz, Împaratoriya Osmanî di navbera herduyan de tengav bibû û bi polîtîka mêzînê ya tê zanîn wê karîbû sedsalekî din temenê xwe dirêj bike. Ya esas, bûyerên derbarê qurbanên vê polîtîka mêzînê de diqewimîn girîng bûn. Sê qewmên dîrokî, Îyoniyên Anatolyayê, Ermeniyên Kilîkya û Anatola Rojhilat û Asûriyên Mezopotamyayê di encama vê polîtîka mêzînê de bi giranî hatin tasfiyekirin û Kurdan jî tenê karîbûn hebûna xwe ya fizîkî biparêzin.

Ingilîstan, Frensa û Rûsya ku li herêmê hewl didan serdestiya xwe têkûz bikin, ji bo bi Osmaniyan gav paşve bidin avêtin, gelên herêmê yên me behskirî, wek amûrekî gefxwarinê bi kar dianîn. Hesab û berjewendiyên kapîtalîzmê wê ji çanda dîrokî ya hezar salan a van gelan buhatir bihata dîtin. Tirkên Osmaniyan jî her ku paşve diketin, sedemê vê yekê di gelên nav împaratoriyê de didîtin û qirika wan diguvaştin. Em dema tên digihîjin wexta şerê cîhanê yê yekemîn êdî naqosên tehlûkê yên dîrokî xurt lê didin. Di bin xirbeyên Împaratoriyê de Îyonî, Ermenî û Asûrî diperpitin, Kurd jî di zik û serê çiyan de tenê dikarin hebûna xwe ya fizîkî biparêzin. Di encama xwe lihevrakişandinek bi qasî heştsed salî de ku di navbera sultanên Tirk û hêzên kapîtalîst-feodal ên dewletên Ewrûpayê de bi serketina Ewrûpayê bi dawî bû, lê li dawiya xwe jî wê vê xwelihevrakişandinê qurbanên xemgîn û hezîn bihişta. Dîrokzan vê çîroka hezîn a qurbanan bi sedem û encamên rastîn nadin û nabêjin. Ji ber ku ewê di neynika rastiyan de rûyê xwe yê mêrkuj û kirêt bibînin. Berpirsiyarên bûyerên di van du sed salên dawiyê de li Rojhilata Navîn diqewimin, dewletên mezin ên Ewrûpayê ne. Berê jî heman gel hebûn. Bi mêzînên di nava împaratoriyê de ava kiribûn, qet nebe ji aliyê ekonomîk dewlemend û ji aliyê çandî ve rehet bûn. Ji aliyê siyasî ve jî ji Tirkan paşvetir nebûn. Bi Ewrûpayê ewle bûn û bi pey hesabên ji rastiyê dûr ên dewletbûyînê ketin. Erê bi vî awayî qumara herî mezin lîstin an jî ketin lîstikê. Pir zêde wenda kirin. Bermahiyên wan bûn koçberên Ewrûpayê. Ber bi Ewrûpayê û Emerîkayê ve ketin ser rêyan. Hewl dan bi utopya 'erdên pîroz ên soza wan hatiye dayîn' bijîn.

Gavavêtinên Cihûyan bi Kongra Siyonîst (1896) kirin, em dibînin DYE û YE di roja me ya îro de bi hewldanên mîna wê gavên xwe bi lez dikin. Dikarin bi Projeya Mezin a Rojhilata Navîn a

Mezin a DYE re bi hêvî bibin. Dagirkirina Iraqê rê li ber demeke bi heyecan vekiriye. Kurd namzetê herî nêz in ji bo bibin muttefîkekî têkûz ê projeyê. Hedef ew e ku herêm li sîstema kapîtalîst û hebûna Îsraîlê gefan naxwe û ji bo vê yekê guhertina binesaziya wê û veguherîna avahiya wê ya siyasî-zîhnî hewce ye. Du hêzên organîze yên sîstemê NY û NATO, wê wek du hêzên çalak ên dîplomatîk û eskerî werin wezîfedarkirin. G-8 jî wê hêza xwe ya ekonomîk mehrûm neke.

Pirsgirêka esas ew e ku xwediyê mîrateya Osmanî KT wê vê pêvajoyê çawa pêşwazî bike. Ji bo duyemîn pêvajoya rizgariya netewî ne şertên hundur û ne jî yên der ve hene. Eger li dijî sîstemê li ber xwe bide, wê ne ji Iraqê û Yugoslavyayê heta Rûsyayê serketîtir bibe. Tam xwe radestkirin û teslîmbûyîn jî li hesabê wê nayê. Şertên muttefîktiyê yên piştî salên 1950 jî wek heyî nikarin dewam bikin. Ya li dawiyê dimîne pêvajoya reforman e. Ji bo vê jî îrade nîne. Bi erdê re kaşkirin û rezîlkirinê polîtîka dizane. KT bi zêhniyetek welê muhafezekar tê meşandin, her roja di nav statukoyê de derbas dike wek serketinê dibîne. Gelek dişibe dema dawî ya Împaratoriya Osmanî.

Komploya derbarê min de di van şertan de ku KT tê de bû, qewimî. Eger nava komployê bi kûrahî neyê fêmkirin û em li aliyên wê baş serwext nebin, em nikarin ji bin ti pirsgirêkê derkevin û em nikarin derbarê aqûbeta KT de şîroveyên rast bikin.

Her çend hin kêmasî û şaşiyên ciddî hatibin kirin jî, kes nikare înkar bike ku ez bi giştî gavavêtina mezin a demokratîk a hemû gelan û bi taybetî jî ya gelê Kurdistanê temsîl dikim. Eşkere ye, min heta çalakiyên 15 Tebaxê hewl dida zêhniyetekê bi rêxistin bikim. Ez qebûl dikim min ev zêhniyet wek têkeliyek rizgariya netewî û sosyalîzma reel hûnandiye û ji wê wêdetir min nekariye bigihînim qonaxeke pêşketî. Panzdeh salên di navbera 15 Tebaxê 1984 û 15 Sibatê 1999 de dema çalakiya bi rêxistinkirina zêhniyetê ye. Di vê demê de çalakî derdikeve pêş. Di vê demê de tê gotin ku pratîk ravekerê herî baş e. Min jî bi vê pêvajoya pratîk hînê baştir karîbû xwe tarîf bikim. Em dikarin bibêjin ku rastiya berçav a min temsîla wê dikir, pirsgirêk û derfetên çareseriyê yên ferdan baş ceriband û test kir. Lê wexta ez dibêjim ez divê zêde jî mezin nekim û nenepixînim. Ez tenê wesîleyek bûm. Ya derdiket holê ew bû ku rastiyeke civakî ya hezar salan hatibû tepisandin û gelekî bi kok bû. Tevî ku min xwedayetî pir baş çareser kir, termînolojiya min bi kar anî zêdetir nêzî zanistiyê ye.

Li hemberî rastiya gelê Kurdistanê ya derket holê, kesên bi salan li ser hevkartî kiribûn (ji Gilgamêş-Enkîdo heta roja me ya îro kesên eyan beyan derketine holê) û kesên fetihkar pir bêzar bûn. Di bin banê hêza împartoriya demê ya DYE de di sala 1998'ê de pêvajoyên Enqere û Waşingtinê dan destpêkirin. Li ser bernameyeke siyasî ya were maneya Dewleta Kurdistanê ya Federe li hev kirin. Bername wê di bin çavdêriya rêveberiya Enqerê de pêk bihata. Di berdêla vê yekê de wê serê A. Ocalan û li ser terorîstiya PKKê hukum bidana. Ev hukum bi awayekî objektîf dihat maneya îmha û tasfiyê. Tevî ku bi dizî dihat meşandin, şîrovegerekî siyasî yê bala wê li ser bûyeran bi hêsayî dikarîbû têbigihîşta ku peyman (17 Îlonê 1998 Enqere-Washington) bi nakokiyan tijî ye, alî hewl didin hevdu bixapînin û ji helwesteke taktîkî wêdetir tiştek nîne. Bi tevgera şopandin û dortengkirina li A. Ocalan peyman hat bi lezkirin. Ji sedî sed bazkekî DYE bi biryar tevgeriya. Rastgiriya Îsraîlê jî alîkariyeke mezin kir. Ingilîstanê plansaziyeke baş kir, Îsraîl-MOSSAD jî bi xebateke baş a sîxuriyê tevlî plan bû. Ev plana dawî ya komployê piştî sabotaja serokwezîra Tirkiyê Tansû Çillerê bi veqetandina 50 mîlyon dolar a di 6 Gulana sala 1996'ê de li Şamê (bi teqandina maşîneke hezar kîlo bombe barkirî û bi hewa xistina avahiyên mayînê) pêk anî, bi peymana aborî-eskerî ya bi Îsraîlê re ket rojevê. Fermandarê Hêzên Reşahiyê yê Tirk bi axaftina xwe ya di 17 Îlonê de Sûriye hişyar kir û mesele gaveke din pêşve bir. Dema Sûriyê hat ber şer, helwesta wê ev bû 'tu çawa dizanî wer biçe' wekî din helwestên wê nehatin dîtin.

Piştî bangek ku mirov dikare wek vexwendineke nîv fermî binirxîne û hînê rastiya wê baş nehatiye fêmkirin, min biryara 'serhatiya Atînayê' da. Çûyîna çiyayên welat ji bo min îdeal bû. Lê bi fikareke exlaqî ya min bawer dikir wê bi hezaran kes ji ber min îmha bibin, min ev sefer paş ve xist. Ez fikirîm ku em şensa çareseriyê li Ewrûpayê biceribînin wê baştir be. Jixwe dema hin têbîniyên agahiyê yên rêxistina me ya Ewrûpayê ji min re ragihandin ku ez bawer dikim çavkaniya wê Artêş bû, ev yeqîna min xurtir kir. Lê li Atînayê yên ez pêşwazî kirim mirovên dost ên rastîn nebûn, qehpeya mîtolojîk Athena bû ku ji eniya xwedayê mêr Zeus hatibû afirandin û lehengê navdar ê Troya Hektor kişandibû nav şerekî ne rast. Ez li qadeke kujêr tevî hemû hêzên şaristaniya zêhniyeta xwedî hesabên kar neçarî şer kirim. Di berdêlê de jî qaşo wê Troya (Anatolya) û Qibris bistenda. Yan jî herî kêm wê di vî warî de îmkaneke polîtîk derketiba. Yekî mîna min di sedsala 20. de bi xeta îdeolojîk a rizgariya netewî û sosyalîzma reel xwe xwedî dikir wê nekarîbûya vê

hîleyê çareser bikira. Li dijî kevneşopiya dewleta Yewnan a bi hîlekariya Athena xwe xwedî kirî ku di dîrokê de hem li cem Îskender û hem jî li cem Napoleon tê ziman, egîdî û zanyariya Rojhilata Navîn çi dikarîbû bikira?

Di pêvajoya doza min a li DMME de mijara bingehîn a tê rexnekirin têkiliya ferd û civakê ye. Çawa ku min di beşê destpêkê yê parêznameya xwe de bi firehî anî ziman, di pêşketina cureyê mirov de civakîbûyîn li pêş e. Tarîfên ferd ên xwe naspêrin civakîbûyînê ji xapandinê wêdetir tiştek nînin. Di civakên Rojhilatî de timî aliyê serdest, timî civakîbûyîn e. Ev helwestek e, têkiliya wê bi kevinbûyîn û pêşketinê ve heye. Di derketina şaristaniya Rojava de ferdiyet giraniya xwe nîşan dide. Hem di qonaxa Grek-Roma de, hem jî pişt re di şîroveya Xirîstiyaniyê ya serdema navîn de timî lêgerînên ferdî kêm nebûn. Di dema Ronesansê û pêvajoya piştî wê de ferdiyetê hema bêje şoreşeke dîrokî jiya. Civakîbûyîna bi hezarsalan li Rojhilat pêş ket û gihîşt astekê ferd bifetisîne, li pey hev bi Ronesans, reformasyon û tevgera ronahîbûn û şoreşa zanistê hat parçe parçekirin û bi vî awayî berê mêzîna civak-ferd, di sedsala nozdehmîn û bîstemîn de jî pir zêde ferd pêş ket. Ferdiyetê mora xwe li serdema me xistiye. Vê carê jî ya civakê dikeritîne û zêdegavî ye, nexweşiya ferdiyetê ye. Mêzîneke têkûz a civak-ferd ji bo ferd tam gihîştiye asta beredayîtiyê. Civakîbûyîn mîna koletiyê tê fêmkirin. Ya esas, ferdiyeteke bi vî awayî mîna postmoderniyeke heywanbûyînê be, di asta jorê de û di şertên nû de vegera li prîmatiyê be.

Tenê mafê 'serlêdana ferdî' ya di DMME de vê nexweşiyê di warê huqûqî de îfade dike. Ferdekî bi tevahî civakî ye û her tiştê xwe bi vî rengî datîne naverastê ji civakê dike û hebûna wî ji îradeya gelê wî cuda qebûl dike, ev bi temamî hîleyeke huqûqî ye. Ev li dijî têgihîştina edaletê ya di hîmê huqûqê de ye. Her weha bi zanebûn, an jî bi nezanî dibe amûrê veşartina rastiyeke polîtîk. Tevgera polîtîk azad a gelê Kurd li derveyî huqûqê dihêle. Mafdariya tevgera azadiya Kurd li derveyî rojevê dihêle û bi vî awayî hewl dide berpirsiyariya YE li ser gelê Kurd binuxumîne. Ev rastî di doza Leyla Zana û hevalên wê de hînê jî qusûra xwe qîç dike. Xwedêgiravî bi navê xwedîderketinê wan ji gelê Kurd ê di zindanê û yên der ve de (ew jî di zindana servekirî de têne hesibandin) dikin û qaşo hewl didin mafê mirovan rizgar bikin. Ji ber doza xwe, ez nikarim vê hîleya ku çavkaniyê wê şaristaniya Ewrûpayê ye, qebûl

bikim. Ya em li bendê ne, biryarek e, divê mêzîna civak-ferd qebûl bike.

DMME di 6 Gulana sala 2003 de biryara xwe ya di heqê min de da. Li gorî biryarê, Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Tirkiyê DGM 'serbixwe nebûye û ez adil mehkeme nekirime' ji bo vê yekê jî biryara wê li cih nedît. Tevî vê yekê, dadgeheke serbixwe nîne û nikare biryareke adil bide, bi komployeke berfireh a sedsala 20. û revandina min li derveyî huqûqê li cih dît û nertina xwe anî ziman. Ev nertin an jî biryar di cewherê xwe de bi tevahî siyasî ye û dewamek komployê ye. Wek parçeyekî plansaziya hatiye hûnandin hatiye destnîşankirin.

Revandina min bi tevahî li dijî xala 5/2 ya PMME. Li gorî peymanê û huqûqê, ez ji ku hatibim divê ez îadeyî wir werim kirin, lê hîç serî li îfadeya min nedan ev pêşhukumtiyê eşkere nîşan dide. Ji bo revandina min ne yek hezar delîl hene. Ya hînê girîngtir, ez ji cihekî divê erdê Ewrûpayê were hesibandin hatim revandin. Eger Avahiya Mezin (DMME) dixwaze ji rastiyê re bi hurmet be divê serî li îfadeya min bide; eger hewceyî bi vê yekê nabîne, divê wek şahid serî li şahidiya Dîlan, Kalenderîdîs û serî li dîtinên yên din bide. Her weha divê argumanên xurt û berfireh ên parêzerên min li ber çav bigirin. Ez ji mehkemekirinê narevim. Mafekî min ê herî xwezayî ye, ez dixwazim li dadgeheke adil, serbixwe û li gorî ruhê peymana Tirkiyê jî alîyekî wê ye, werim mehkemekirin. Wezîfeya bingehîn ji bo DMME ew e ku ji bo mehkemekirinek bi vî rengî rê veke. Gava yekemîn a adilbûyînê di vê rê de gavavêtin e. Dadgehê bi biryara daye vê rê venake. Berovajî, pêşî li îdamê digire û rizîna min bi awayekî ebedî li cih dibîne. Mirinê nîşan dide û neçarî nexweşiya tayê dike. Ez ewqas jî korfêm û bêîdrak nînim ku nikaribim şîrove bikim ku ev hîleyeke hêzên tehekumkar e bi hezar salan diceribînin. Avahiya Mezin a DMME eger bi rastî dixwaze rê li ber mehkemekirineke adil veke, divê van xusûsan li ber çav bigire:

Ya yekemîn, nasnameya min bi biryara Dadgeha Îstînaf a Romayê penaberê siyasê me. Belgeya vê yekê di destê dadgehê de heye.

Ya duyemîn, li gorî biryara Dadgeha Cezayê Giran a Atînayê divê ez di nav sînorên Yewnanistanê de bim. Yanî, li gorî huqûqê û biryara dadgehê ez hînê jî di nav sînorên dewleta Yewnan de me. Ji lewra mayîna min li Girava Îmraliyê di girtîgeheke yek kesî de li derveyî huqûqê ye. Ev xusûseke pir eşkere ye. Pirseke divê Avahiya Mezin li bersiva wê bigere ev e; bi awayekî qanûnî divê ez di nav

sînorên Yewnan de bim, lê çawa dibe ku ev hînê şeş sal in, ez di hucreyeke yek kesî de me û hukum ji bo ebedî ragirtina min a li vir hatiye kirin. Heta bersiva rast ji vê pirsê re neyê dayîn, erêkirina biryara Avahiya Yekemîn wê bide ispatkirin ku biryar bi tevahî ji siyasetê hatiye wergirtin. Eger dadgeh dixwaze revandinê bi firehî fêm bike, eger xwedî pêşhukum nîne, divê îfadeya min bi kurtî da bi awayekî berfireh bistîne û li hemû şahidên bûyerê guhdarî bike. Eger biryareke rast bide, ezê di nav sînorên YE de werim hesibandin. Wê wextê wê îdîayên KT û îdîayên aliyê Kurd li dadgeheke serbixwe werin guhdarîkirin û biryareke adil were dayîn. KT timî min ji kuştina sî-çil hezar mirovî berpirsiyar dibîne. Li aliyê Kurd jî, li derdora çar hezar gund hatine xirakirin, gund û mezra hatine valakirin, ji deh hezaran zêdetir kesên mêrkujê wan meçhûl, ji sed hezaran zêdetir girtin, surgûn û nefîkirin, koçberkirin, êşkence, ji sî hezarî zêdetir şehadetên gerîlla, hemû mafê mirovan ên hatine desteserkirin û demokrasiya nayê naskirin beşekî piçûk ji encamê ye. DMME vê li ber çav negire wê çawa biryarê bide?

Ev encam û bîlançoyek şer e. Di dîrokê de ti terorîst di wê hêzê de nebûye ku sî-çil hezar kesî bikuje. Eger hebûna şerekî asîmetrîk li dijî gelê Kurd were qebûlkirin, wê wextê diviyabû mîna dadgeha piştî şerê cihanê yê duyemîn li Nurembergê, piştî şerê Bosna-Hersekê Lahey, dîsa piştî komkujiyên li welatên Efrîka mîna dadgehên di bin çavdêriya NY de hatin lidarxistin, heman şêwaz mehkemekirin ji bo min û aliyê din rêya bi tenê ya adîlane bû. Bi hezaran dozên mexdûrên Kurd li cem DMME hene. Ev dozê bîlançoya şer hîç bi bîr nexînin? Kurd di dîrokê de timî hatin xapandin. Lê li cihekî mîna Ewrûpayê eşekerebûyîn û vekirîbûyîn pêş ketiye emê hînê bêne xanpandin? Wijdanê mirovatiyê wê vê yekê çawa rake? Gelekî hînê qedexeya li ser zimanê zikmakî nekariye li dawiyê bihêle, wê di şexsê min de bi hezar dekûdolabî mehkeme bikin û vî gunehê xwe jî bi pîvanên Ewrûpayê re li hev bînin, ez nizanim DMME wê çawa îştîrak û cesaretî vê yekê bike?

Mirov dikare hînê bi sedan pirsên bi vî rengî yên huqûqî bike û bersiva van pirsan wê ispat bike ku ka dadgehê xwe ji bin bandora siyasî xilas kiriye, wê firsendê karibe bide mehkemekirineka adilan na. Eger rêya mehkemekirineke adil neyê vekirin û ez jî weke bi hezaran hevalê xwe yên din (Leyla Zana û hevalên xwe jî di nav de) bêdawî li rizînê (derketin meseleyeke duyemîn e) werim terikandin, ezê neçar bimînim û bibêjim ku yê me mehkeme dike YE bi xwe ye, rêveberiya KT jî tenê di vê yekê de wek destik û maşe tê bi kar anîn.

Emê dîsa neçar eşkere bikin û bi hêrs bînin ziman ku di van du sed salên dawiyê de berpirsiyarê şerê asîmetrîk ê li ser Kurdan dewletên sereke yên Ewrûpayê ne. Piştî salên 1950'yî DYE jî tevlî vê yekê bûye, tasfiyekirina gelên Îyon, Ermenî û Asûr têrê nekir, vê carê dor hatiye Kurdan.

Em wexta bi nertineke kurt a giştî temaşe bikin, emê bibînin di doza min de aliyên rastîn welatên YE, Kurd û ez im. Xapandineke mezin e, doza min kirêyî Tirkiyê kirine. Welatên YE ji bo min li derveyî huqûqa Ewrûpayê bihêlin, hewldanên wan ên bi desteka DYE û Îsraîlê eşkere qewimîne. Hukûmeta Îtalyayê bi hemû hêza xwe ji bo vê yekê hewl daye. Zexteke dijwar a psîkolojîk li ser meşand. Derfet û îmkanên xwe yên malî seferber kirin. Ingilîstan û Swîsre tevî ku ez neçûm welatên wan ez 'zilamê nayê xwestin' (Persona non Grata) îlan kirim. Franse û Elmanyayê bi awayekî fermî derbarê min de doz vekirin. Gelek welatên din, tevî ku mafê min hebû, bi awayekî neheq serlêdana min a penaberiyê yekser red kirin. Bi giştî kampanyayeke bêzarkirin û zivêrkirinê hat meşandin. Di bin van hemû bûyeran de piştî pêngava 15'ê Tebaxê têkiliyên wan yên kirêt ên maddî bi KT re û peymanên veşartî û bêdeng hene. Em pir baş dizanin ku hukûmetên Tirkiyê ji bo ji PKKê dûr bisekinin û têza 'terorîst' bi wan bide qebûlkirin, hema hema nîvê Tirkiyê ji welatên Ewrûpayê re pêşkêş kirine. Ev têkiliyên li ser berjewendiyan ên di şexsê min de derketin holê û hukûmetên Ewrûpayê vedişêrin nebûna, diviyabû min yekser di serlêdana xwe de mafê penaberiyê bistanda.

Ji ber van têkiliyên menfîet û berjewendiyê, huqûqa Ewrûpayê (PMME) eşkere hatiye binpêkirin. Bi revandina min a derveyî Ewrûpayê xwestin min derxînin derveyî çarçoveya huqûqa Ewrûpayê. Ji ber van têkiliyên kirêt ez birim Kenyayê. Eger Ewrûpa (DMME) bi rastî girêdayî pîvan û peymanên xwe ye, pêwîst e vê rewşa li derveyî huqûqê red bike. Her çend Dadgeha Cezayê Giran a Atînayê û ya Îstînaf a Romayê di pratîkê de zêde xwediyê maneyekê nebin jî biryarên erênî yên dan, di heman demê de DMME jî girê didin. Bi van biryaran ez hem penaberê siyasî tême qebûlkirn û hem jî ez bi awayekî azad li ser erdên Ewrûpayê tême hesibandin. Dîsa li gorî van biryaran pêvajoya dadgehkirin û bi cihanîna ceza ya pêvajoya Îmraliyê bi temamî li dijî huqûqê Ewrûpayê ye û wek nebûye dihesibîne. Ya ji Avahiya Mezin a DMME tê xwestin ew e ku li gorî huqûqa Ewrûpayê mafê min ên ez azad karibim li ser erdê Ewrûpayê bimînim (biryarên dadgehên Atîna û Romayê) nas bike,

rewşa li derveyî huqûqê ya li Îmraliyê red bike û eger mehkemekirin hewce bike, (biryara Avahiya Yekemîn a DMME) divê ji bo bi awayekî adil û bêalî bibe, rê veke. Eger li ser vî hîmî biryareke erênî were dayîn wê li gorî PMME tevgeriyabe. Naxwe dadgeha mezin jî (DMME) wê nikaribe xwe xilas bike ji bo nebe amûrê komployeke mezin a siyasî.

Min ji ber vê yekê, bi giranî parêznameya xwe ji ravekirina şaristaniya Ewrûpayê re veqetand. Ev şaristanî me tine dike. Siyasetvan ji bo xatirê çend sal îqtîdara xwe û xatirê kara efendiyên xwe, di tinebûna gelan a ji dîrokê de xwedî fikar nînin. Em vê dizanin. Lê hîç nebe bi qasî misqalê zerre edalet hebe, divê saziyek mîna DMME vê rêya berjewendîperest a wek 'mehkemekirina ferdî' bide aliyekî û derbarê cewherê bûyerê de biryarê bide, herî hindik nîşan bide ku mehkemekirineke rastîn û objektîf çawa dikare bibe. KT wek aliyekî şer (vê yekê hemû dunya dizane û ew bi xwe jî eşkere tîne ziman) ez û rêxistina min wek tehlûke û dijminê mezin îlan kiriye, başe wê çawa karibe mehkemekirineke serbixwe û adil bike? Ev yek çawa li eqlê dadgehê (DMME) rûdinê? Naxwe lîstikên din hene em nizanin? Başê wê wextê çima doza min qebûl kir? Eger bersiva van hemû pirsan neyê dayîn (bi awayekî îqna bike) ma wê ispat nebe ku lîstikeke siyasî ya berê hatiye plankirin pir bi hostayî tê dewamkirin? Wê wextê ji bo ez xwe û gelê xwe nekim amûrê vê lîstikê, neçar ezê herî kêm pêdiviyên wîjdanî û îdrakî bi cih bînim.

Ev rastî hewce dikin ku ez parêznameya xwe ji aliyê huqûqî zêdetir aliyê wê siyasî pêş bixînim. Kurd gelek in, ne di çarçoveya huqûqa netewî de, ne jî di çarçoveya huqûqa navdewletî de têne nirxandin. Huqûqa YE bi israr aliyê ferdî li ser dozê ferz dike û rastiya civakî dîrokî ya di bin vê de radizê ji nedîtî ve tê, maneya vê yekê ew e ku pirsgirêk ne ew pirsgirêke bi rêya huqûqî were çareserkirin. Ev têgihîştin û helwest ji Peymana Lozanê ve dewam dike. KT ji bo hebûna wê ya bêyî Kurd were qebûlkirin, Mûsil-Kerkûk ji Îngilîzan re hiştin. Dîsa di berdêlê de ku KT kapîtalîzmê wek sîstem qebûl neke, peyman li Lozanê hatiye erêkirin. Welatên Rojava Ermenî, Îyon û Asûrî wek hindikayî qebûl kirine, lê derbarê Kurdan de ti garantî nedane. Ev helwest tê wê maneyê ku fizîkî nebe jî bi awayekî çandî û siyasî li tinebûna Kurdan çav girtine. Encamên şer, nakokî û têkiliyên dewletên emperyalîst ên Rojava bi rêveberên Tirkiyê re di van du sed salên dawiyê de ketinê, divê baş werin hûrkolîn. Bingehê paşvemayîna Rojhilata Navîn, mehrûm mayîna wê ji azadî û demokrasiyê ji van têkiliya ne. Projeya Rojhilata Navîn a

Mezin divê wek encameke neçar a van du sed salên dawiyê were dîtin. Pêwîst e naveroka wê baş were xwendin. Nemaze Kurd ku wek hêmanê stratejîk ê vê projeyê, divê xwe ji her alî ve baş binirxînin. Yek ji hedefên sereke ya parêznameya min ev e.

Têkiliya di navbera pêvajoya ragirtina min li Îmraliyê û pêkhatina Dewleta Kurdistanê ya Federe li Bakurê Iraqê de pir eşkere ye. Rayedarên KT mecbûr in vê rastiyê baş bixwînin. Kurdistana Federe di berdêla tasfiyekirina min û PKKê de we xelatî hêzên bûrjûwa-feodal ên Kurd kir. Ji encamên wê jî hûnê berpirsiyar bin. Mîna hîmdanîneke şerê Îsraîl-Filîstîna îro hîm avêtinek e. Bi vê re, bingehên şoreşger ên komargeriyê hatin dejenerekirin û ji bo her cure tevdana netewparêz atmosfer hat amadekirin. Dixwazin gelan bi sorkirin û tevdanên nû yên netewparêziyê ber hevdu bidin û nîzamên serdest bi awayên nû hebûna xwe dewam bikin. Şerê Îsraîl-Filîstînê hema bêje kirin pirsgirêka sedsala dawiyê û ji bo rewakirina rêveberiyên herî xirab ên gelên Ereb, kirin bahane. Niha Kurdan jî digirin nava heman lîstikê, yan jî hewl didin bixin vê dekûdolabê.

Ha di vê nuqteyê de komploya navnetewî li dijî min ket rojevê. Ji ber ku ez û tevgera min temsîla wê dikir li gorî van lîstikan nebû û heta potansiyela xwe hebû van lîstikan pûç bike. Di ast û girîngiyeke stratejîk de xwestin kontrola Kurdan ji tevgera me bîstinin û bixînin destê hêzên emperyal. Bi vî awayî, wê netew-dewletên Ereb, Fars û Tirk bihatana terbiyekirin. Ji bo vê yekê bi deh hezaran Kurd li Ewrûpayê û DYE dihatin perwerdekirin. Kurdîtiyek li gorî mantalîteya xwe bi israr pêk anîn. Ya esas, pêvajoya Îsraîlê bi rêya malbata Barzanî piştî salên 1945'ê da destpêkirin têra xwe hat firehkirin. Ji ber vê yekê, Kurd wek şîrînên nû yên ber dilê Rojava bi qîmet bûn. Dewletên xwedî kevneşopiya fetih ên Rojhilata Navîn jî Kurdên xwe ji nû ve girtin dest. Di bin fermana hêzên xwe yên ewlekariyê de artêşeke cerdevan û sîxuran ava kirin. Beşê sêyemîn ê ji koma Kurdên xizan û kedkar, li ser demokratî û welatparêziyê PKKê pêk anî. Bi vî awayî sê komên cuda yên Kurd çêbûn. Kurdên ser bi DYE, YE û Îsraîlê; ev ji beşên tebeqa jor a eşîr-feodalîzmê li ser rêya bûrjûwazîbûyînê ne. Bi desteka peran a dewletan hisa eşîrtiyê bi kar tînin û hewl didin bi bandor bibin. Dewleta Kurd a Federe niha bingehê bernameya wan a siyasî ye. Kurdên bi hisa eşîrtî û peran ji hêzên ewlekariya netew-dewletên fetihkar ên Ereb, Tirk û Fars re xizmetê dikin, hedefa wan tenê pere û otorîteya herêmî ye. Yên bi têgihîştin û hisa demokratîk û welatparêziyê bi PKKê ve girêdayî ne, hedefa wan demokratîkbûyîn û Kurdistaneke azad e. Ev

veqetîna sêgoşe, bi nakokî û têkiliyên zêde, ji bo gelek pêkhatinên din avis e. Kurdistana ji xewa hezarsalan hişyar bûye û ketiye pêvavoyeke bi liv û lebat, li Rojhilata Navîn di pêkhatina mêzînên nû de aktorê li pêş e. Hîç dûr nîne di sanaryoyê de rolên cûrbecûr bilîze.

KT di pêvajoya damezrandinê de Kurd wek hêmanekî bingehîn nirxand, lê paşê bi sedema serhildanan di bin nasnameya xwe de ew bi tevahî li derveyî siyaset û huqûqê hîşt. Ev her çend li gorî wê demê - konjonkturel - maneyek wê hebe jî, dema bû wek prensîbeke dewamî, bû xeta yan jî şaşiyeke xeternak. Îdîaya min ev e; hêzên emperyal, nakokiya ji vê şaşiyê derketiye holê, wê ji bo Kurdên xwe bi kar bînin û wê ji bo rêveberiyên Tirk, Îran û Ereb hînê bi xwe ve girê bidin, bi kar bînin ku li ser berjewendiyan bi van rêveberiyan re li hev nînin, eger ev jî nebe ji bo bêtesîr bike, di şexsê min de tasfiyekirina alternatîfa azadiyê ya Kurdên kedkar û xizan bi zanebûn hedef girtin. Berhemê yekemîn ê vê nakokiyê avahiya Federe ya Kurd li Bakurê Iraqê ye, yên din jî wê pêş de bixînin. Rêveberiya Tirkiyê kengî Îranê, Sûriyê û hin Erebên Iraqê bide kêleka xwe û bi ser Kurdan ve biçe ha wê wextê dikeve xefik û dafikê. Nexweşiya Ereb û Îranê ji Tirkan dîrokî ye û baş tê zanîn. Piştî ku berê Kurdan bidin ser Tirkan wê hin pirsgirêkên dîrokî ji nû ve bêne zindîkirin. Di nav van pirsgirêkan de wê Îyonya, Ermenîstan, Gurcistan, Îran û heta îdîaya Torosan a Ereban bikevin rojevê. Di vê rewşê de wê statuya Tirkan daxînin sedsala şanzdehmîn.

Polîtîka Kurd a Yawiz Selîm ev tehlûke dabû aliyekî, Mistefa Kemal Ataturk jî di salên 1920'ê de ev xeter asteng kir, ev yek li ser hîmê têkiliyek azad bi Kurdan re û bi îttîfaqê mumkîn bû. Dîroka Tirkan li Anatolyayê bi têkiliyên wan yên Kurdan re di nav pêwendiyeke xurt a diyalektîkê de ye; eger ev têkilî û pêwendî bêne parçekirin, bigihîjin asta têkiliyên dijminane, dixwaze Tirk lê hayil bibin nebin, wê ji bo wan bibe têkçûneke mezin a stratejîk. Di serhildanan de qusûr a her du aliyane. Netewparêziya paşverû û şoven, kevneşopiyên dînî yên feodal di wê rewşê de nînin têkiliyeke stratejîk fêm bikin û rêve bibin. Ji ber ku di tasfiyekirina Kurd de zêdegaviyeke mezin heye, têkiliya stratejîk gihîşt ber tinebûnê. M. K. Ataturk û Îsmet Înonu di demên dawiyê de ev yek dîtine. Lê êdî veger mumkîn xuya nake. Piştî salên 1950 feodalîteya Kurd ji nû ve û di berdêla înkarkirina kokên xwe de destekê dibîne û ev dibe sedem têkiliya stratejîk hînê zêde bişkê û bêmane bibe. Senteza Tirk-Îslam a Tirkîtiyê û dînî piştî salên 1980'ê vê têkiliya stratejîk bi tevahî tine dihesibîne. Li hemberî vê rewşê hêzên Rojava û dewletên

herêmê zivêrbûyîna xwe ya kevneşop bi çavgirtina li PKKê nîşan dan. Lê ji sedî sed desteka Îran û Sûriyê jî di navê de hemûyan di pêkhatina Dewleta Kurd a Federe de rol lîstin û ji bo dekûdolabên dîrokî bikevin rojevê gavên herî girîng avêtine. Tevgera Kurd a netewparêz di wê rewşê de ye, têkiliya stratejîk a bi Tirkan re bi tevahî xira bike. Mînak, ji hevbûna Îsraîl-Filîstîn, Rûsya-Çeçen û li Balkanan Yugoslavya. Polîtîkayên rojane yên xwe pê dixapînin ji serwextbûna li girîngiya têkiliyên dîrokî pir dûr in. Netewparêzî û dîndartiyê çavê hemûyan kor kirine, kurtêlxuriya ekonomîk û siyasî jî dibe sedem rojekê berê pêşiya xwe nehesibînin. Ji bo şexsê min û PKK di vê lîstikê de neyên bi kar anîn min bi rastî gelek hewl da.

Di dema pêş me de wê bûyerên di çarçoveya Projeya Rojhilata Navîn a Mezin de bi lez bibin. Hînê zelal nebûye, Tirkiye di vê projeyê de hedef e, yan jî hevpar e. Xwedêgiravî hevparê herî xurt ê projeyê ye. Di salên 1990 de jî pir behsa hevpariya stratejîk dihat kirin. Divê ku encaman hin tişt hîn kiribin. Çi Tirkiye bibe hedef û çi bibe hevpar wê ji sedî sed nikaribe wek berê statukoyê dewam bike. Di statukoyê de israr tê maneya Iraqeke duyemîn û Yugoslavyayê. Jixwe Iraq û Yugoslavyayê gelek maf ji netewên xwe re nas dikirin. Qalibên şoven ên Tirkiyê ji hemûyan bi hêztir e. Gel bi salan bi van qalibên şoven hatin xwedîkirin. Wexta dewam bikin wê neçar bişikên. Jixwe ji bo vê rastiyê nîşan bide şerê bi PKKê re têrê kiriye. Saziyên Kurd-Tirk wê têkiliya stratejîk a dîrokî parçe parçe bikin. Li gorî min ev plan piştî salên 1950 bi zanebûn hatine pêşdebirin. Berê netewparêziya Tirk bi faşîzm û dîn hat sorkirin. Ev sorkirin bi destê der ve tê kirin. Dîsa beriya şerê cîhanê yê yekemîn Panktirkîtî û Panîslamtî bi destê der ve hatibûn sorkirin. Yê ev rastiya herî baş dît Mistefa Kemal Paşa bû. Ev her du ekolên îdeolojîk asteng kirine, ber bi welatparêziyek li azadiyê vekirî gav avêtiye.

Bandorên provakatîf ên di serhildanan de ev polîtîka û têkiliya stratejîk a di navbera her du aliyan de xira kirine. Netewparêziya zêde ya bawer kiriye wê Kurd ji holê rabike, ya rastîn pê hatiye xapandin û ketiye xefikê. Yekî mîna Ziya Gokalp ku bavê netewparêziyê ye, wiha gotiye; "Tirk bêyî Kurd, Kurd bêyî Tirk nikare bike." Bûyerên piştî salên 1950 di warê helwesta li hemberî Kurdan de girîng e ku ji nû ve werin şîrovekirin. Piştî salên du hezarî jî netewparêziya Kurd hatiye bi lezkirin. Dîsa bandora destên der ve bûye. Tevî hemû qusûrên xwe PKK ji bo gelên herêmê û helwestên xwe yên enternasyonalîst di xirakirina vê lîstikê de hêmana herî bi tesîr bûye. DYE ji ber ku ji Tirkan pir hez dikir 'terorîstiya' PKKê

tavilê qebûl nekir. Ev îdîa bi armanca hînê gurkirina şer hatiye kirin. DYE û YE eger xebatên ji bo Qibrisê kirin, ji dehan, ji sedî yekê wê ji bo pirsgirêka Kurd bikirana, wê li Tirkiyeyê Tirkiyeke din zêde bikirana. Ji vê dûr sekinîn. Polîtîkayek hêjayî heywanan tê dîtin, mîna bibêjin "kîvroşk bireve tajî bigire" meşandin. Derdorên siyasî û aborî yên di nav kurtêlan de xeniqîn jî pir bi dijwarî xwe bi vê polîtîkayê ve şidandin. Nuqteya Tirkiyê pê gihîştê sînorê têkçûnê ye.

Tam di vê nuqteyê de bi radestkirina min, li bendê bûn ez bi awayekî hişk li ber xwe bidim û pê re bi mirina min re bi tevahî têkiliyên Kurd û Tirkan hilweş in. Benên tevgera Kurd wê di yek destî de bihata komkirin. Ji vir pêve wê çi bibe em îro hînê baştir dibînin û texmîn dikin. DYE û YE çiqas niyeta wan baş e jî wê ti car ji destekdayîna xwe ya netewparêziya Kurd daneketana. Îsraîl li Rojhilata Navîn ji sedî sed hewceyî netewparêziya Kurd e. Rojava bêyî netewparêziya Kurd nikare giraniya Ereb, Îran û Tirk bikişîne nuqteya dixwaze. PKK bi awayekî bi kar aniye ji bo her du aliyan jî bûye daf û xefik. Yanî di polîtîka 'kîvroşk bireve tajî zevt bike' de her du alî jî wenda dikin. Piştî 1925 jî wisa bûye. Piştî salên du hezarî ji ber ku netewparêziya Kurd wê bibe xwediyê teknolojiya hemdem li dij wê sekinandinê zehmet be. Belkî her du alî jî bi awayekî stratejîk bi ser nekevin. Lê ji sedî sed wê pir zêde wenda bikin. Wek her tim wê di dawiyê de hêzên emperyalê bi ser bikevin. Di gihîştina vê qonaxê de bi qasî netewparêziya Kurd, înkarkirina Kurd û desteserkirina mafan jî berpirsiyar e. KT heftêûpênc salî pirsgirêka Kurd bê çareserî hîşt çi bi dest xist? Jixwe di vê serdema teknolojîk de bihêlin serketina wê, her roja diçe rê li ber şerê Kurd-Tirk vedike ku ji bo vê nebîne divê kor be. Pişta xwe bi hêza eskerî ve girê dide, lê encamên hezîn ên piştrastiya bi hêza eskerî li Yekîtiya Sowyetê û Iraqê hatin dîtin. Ji niha ve, xuya dike seferberiyên ber bi Kurdistanê têne maneya krîzên aborî. Eger pirsgirêka Kurd were dirêjkirin, ji rewşa şer neyê derxistin û muhtemel pêvajoyeke nû ya şer were destpêkirin, wê yek ji stûnên bingehîn a stratejîk a Tirkan hezar sal e dide jiyîn, hilweşîne. Ez dubare dikim, ji bo mirov vê yekê nebîne, divê yan bi welatê xwe re xayîn be, yan jî dijminê gel be.

Bila kes li bendê nemîne ku tevgereke bi zehmetiyên dijwar hatiye afirandin û berhema hewldanên mezin e, bi xwe teslîm bibe. Min ji sala 1998'î ve bi sebreke mezin, helwestek bi hemû aliyan, tevahiya welat û gelê me bide qezenckirin, bi awayekî herî berfireh îdeolojîk û polîtîk bi xwe û rêxistina xwe da qebûlkirin. Min nêzîkbûna hevalan erênî dît, lê ez nabêjim dewlet bi tevahî bêeleqe

nêzîk bû, lê ez neçarim bînim ziman ku ji helwesteke çareserker dûr sekinî. Rewşeke bendewar wê pêvajoyê bi tevahî pûç bike. PKK wê Kurdistanê ne ji statukoparêziya dewletê ya paşverû, ne jî ji netewparêziya paşverû re bihêle. PKKê ferz nekiriye ku bivê nevê dewletokek min jî hebe. Lê ti car ji projeya Kurd û Kurdistaneke azad û demokrat venegeriyaye û wê venegere. Guman nayê kirin ku diyaloga demokratîk di dîrokê de têkiliya herî çareserker û pêşdebir e. Yên hûrûkûr li dîroka Tirk, Îran û Ereban binerin, wê bibînin ku statuya Rojhilata Navîn timî nêzî federasyonê bûye. Ji bo federasyon jî rê li ber xwelihevrakişandinên stewr veneke rêya bi tenê demokrasî ye. Dîrokê heta niha ji vê çareseriyê bi tesîrtir rê nedîtiye.

Bi giştî hemû Kurd, bi taybetî jî pêngava PKKê ya li herêmê ji bo neyê tavdan nav lîstikên nû û ji bo nekeve nav rewşên tehlûke, rola herî baş Tirkiye dikare bilîze. Ya li gorî dîroka wê û nemaze li gorî kokên stratejîk ên bi Kurdan re rola herî baş jî ev e ku bilîze. Jiholêrakirina Kurdan di dîrokê de ne mumkîn e, ne jî wê bi kêra Tirkan were. Berovajî, girîngiya girêdana wan a bi hev nayê guftûgokirin. Piştî vê nuqteyê rawestîn, rizîn û zemînekî muhtemel ê ji bo lihevkirinê hebe jî wê were maneya hînê dejenerebûyînê. Eger diyaloga demokratîk nebe, wê tercîha Kurdan pêngava mezin a demokratîk be. Ber û rêveçûna şer wê helwestên aliyan û helwestên derdorên der ve diyar bikin.

Tirkiyê bêyî ku pirsgirêka Kurd çareser bike, bikeve nav kaosa Rojhilata Navîn, bûyerên muhtemel ên biqewimin divê bi girîngî werin nirxandin. Ji niha ve diyar bûye ku wê li ser Kurdistanê sê hêz xwe li hev rabikişînin. Hêza yekemîn DYE, Îsraîl û hevkarên wan ên Kurd. Ya duyemîn hêzên statukoparêz ên Tirk, Îran û Ereb tevî hin milîsên Kurd û hevkarên wan ên eşîrî û beşek bûrjûwaziya komprador in. Beşê sêyemîn ê herî mezin e, ji xizanên kedkar, welatparêz û gelê demokrat pêk tê. Jihevbûneke bi vî rengî yekem car pêk tê. Kurdên hevkar ên bi statukoparêzan re tevbigerin wê bi îhtimaleke mezin di nav demê de bihelin. Di rewşa Kurdên li Iraqê de mirov dikare bûyerên bi vî rengî bibîne. Eger rêveberiyên Tirk, Îran û Ereb reforman ji bo Kurdên xwe nekin, wê di navbera Kurdên demokrat-welatparêz û Kurdên hevkar ên emperyalîzmê de di her astê de îttîfaqên cuda pêş bikevin. Di encamê de mumkîn e hemû Kurd bi pêşengiya DYE di nav koalisyonê de cih bigirin. Eger derfet û îmkanê lihevkirinê nebîne, (bi rêveberiyên Tirk, Îran û Ereb) Kurdên bi pêşengiya PKKê jî dikarin li ser hîmê çareseriyên demokratîk û agirbestê bi hêzên koalîsyonê re têkiliyan pêş de bibin.

Jixwe ji van têkiliyan rêveberiya Ereb a Iraqê derbeke stratejîk xwariye. Ya Iraq xira kir, îttîfaqa DYE, Îsraîl û Kurd e. Eger Tirkiyê çareseriya pirsgirêka Kurd tim û tim paş ve bixîne, wê pirsgirêkên qat bi qat ji yên li Qibrisê mezintir derxîne holê. Kapîtulasyon û sermaye razandina ji bo Rojavayîyan wek para huş be hatine dayîn, wê êdî di demên pêş de fonksiyonel nebin. Di Projeya Rojhilata Navîn de wêneyê Tirkiyê wek piştî şerê cîhanê di dema Peymana Sewrê de nebe jî, netew-dewleta berhemê mêzînan (hundur û derve) wek komara statukoparêz wê nikaribe rewşa xwe dewam bike.

Tirkiyê ji sedî sed di pêvajoya buhur û derbasbûnekê de ye, ji kaosê wê çawa derkeve bi texmînkirina rewşa nû ve têkildar e. Eger bi Kurdan re di şûna lihevkirinê de şer kûr bike, dibe ku rewşek di navbera Sewr û Lozanê de derkeve. Çareseriya pirsgirêka Kurd bi awayekî demokratîk tevî Kurdan wê li Rojhilata Navîn rola pêşeng a Tirkiyeke demokratîk bike îhtîmaleke xurt. Naxwe wê tayê stratejîk ê dîrokî bi tevahî qut bibe û tehlûke heye Tirkiyê di Anatolya Navîn de tengav bibe. Bûyerên bi vî rengî di dema kin, navîn û dirêj de wê carnan hêdîka, carnan bi lez timî hebin. Eger lihevkirina Kurdan a di dema şerê cîhanê yê yekemîn de li ser hîmekî demokratîk (feodal-bûrjûwa bi tehlûkeyên ji netewparêziya feodalîzmê tijî ne) were nûkirin, wê wek aliyê herî xurt tevî Kurdan ji kaosa Rojhilata Navîn (li gorî dema buhurî ya dîrokî, lê vê carê li ser hîmê yekîtiya azad û demokratîk) derbikevin. Naxwe duyemîn Kurdistana Îsraîlê xwe ferz bike.

Di encamê de em dikarin bibêjin; Avahiya Mezin a DMME ji bo rê li ber dadgeheke serbixwe û adil veke, bi biryardaneke dîrokî re rûbirû ye. Eger ji bo pirsgirêka Kurd bi awayekî demokratîk çareser bibe, para huqûqê ya bikeve ew e ku komploya siyasî pûç bike. Rûyê aştiyê yê YE jî bi vî awayî dikare derbikeve holê. Ji ber ku huqûqa Ewrûpayê bi cih nayê anîn, ez di bin şertên ev çend zehmet de tême mehkemekirin. Ji bo min derbixînin derveyî sînorên vî huqûqî ez revandim. Çîroka min a revandinê ji mijareke ferdî ya romanekê wêdetir maneya wê heye. Li ser têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd, dewletên Rojava û Tirkiyê di navbera xwe de çaryekê dawî yê sedsalê bazarên mezin kirine. Têkoşîna gelê me ya di nav xizanî û êşeke mezin de derbas dibe, ji ber hêrsa karê ya nîzama sermayê, di şexsê min de bi awayekî sivik û hîç neadil, hewl didin daxînin qonaxeke nizim a binpêkirineke sivik a mafên ferdî. Li ser vî hîmî YE û KT hewl didin careke din li hev werin. Di şexsê min de dixwazin bi gelê Kurd bidin wendakirin. Girîng e, DMME xwe neke

amûrê vê lîstikê. Eşkere ye, li ser îradeya min çawa û çiqas hatiye lîstin, lewra bi kîjan sedemên huqûqî ji Tirkiyê mehkemekirineke serbixwe û adil tê xwestin? Ya li min tê kirin li heywanên kobay jî nayê kirin.

Ji aliyê her kesî ve baş tê zanîn, li Tirkiyê nemaze mehkemekirinên Kurdan bi fermanên ji jor ve têne meşandin. Saziya dadgeriyê li serê wan saziyên navend faşîst tê. Li rûyê wê yê aliyê Kurdan bi qasî serê derziyê jî taybetiyeke huqûqê xuya nake. Ji saziyeke bi vî rengî bendewariya mehkemekirineke adil û bêalî li min û gelê min heqaret e. Navê me, çanda me, hebûna me nayê naskirin. Huqûq Kurdan û Kurdîtiyê tine dihesibîne. Dema rastiya Tirkiyê ev be, çawa hêviya mehkemekirineke adil û bêalî jê tê kirin?

Ez li gorî huqûqa navnetewî zevt nekirim. Ji qada huqûqê ya Ewrûpayê ma ez bi îradeya xwe radestî Tirkiyê bûm? Ev rastiya ku zarok jî dibînin, çawa Avahiya Mezin a DMME vê revandina bi rêbazên herî rezîlane nikare tespît bike? Wê wextê tenê îzahek dimîne; di şerê asîmetrîk de ku ji bîst salan zêdetir li ser gelê Kurd tê meşandin, DMME di berdêla sîstemê de ji kara derdorên sermayê ji Tirkiyê kirine, deynê xwe dide. Ya pêşiya mehkemekirineke adil û bêalî digire, biryara Avahiya Yekemîn a DMME ye. Avahiya Mezin a DMME bi xirakirina vê biryarê, divê pêdiviyên PMME bi cih bîne. Wê wextê, bi awayekî rastîn wê rê li ber mehkemekirineke adil û bêalî vebe. Bi vî awayî, hindik be jî belkî îmkan bibe ji bo wendahî û êşên gelê Kurd bêne debirandin. Wê wextê wê Tirkiyê li ser rêya YE bibe xwedî şens ku bi huqûqê ve girêdayî be. Tirkiyeke bi huqûqa Ewrûpayê ve hatibe girêdan wê bibe hîmê bingehîn ê aştiyê misoger dike. Ev sedem hemû wê ispat bikin ku YE bedeneke demokrasî û huqûqê ye, naheje, aştî û mafê mirovan fazîleta herî mezin qebûl dike û Ewrûpa piştî şerên dirêj wek encama xwerexnekirinekê gihîştiye van pîvanan.

**BEŞA HEFTEMÎN**

**Nasnameyek dixwaze rast were bi navkirin**

Eger min di vê parêznameyê de nasnameya xwe ji nû ve tarîf nekira wê bibûya kêmasiyeke girîng. Li şûna ez tarîfa berê dubare bikim, ezê hin beşên temamker lê zêde bikim.

Dema min ev beş amade dikir, nasnameya hişê min mijûl dikir Enkîdo bû. Wexta min hewl dida ez Enkîdoyê di yekemîn destana nivîskî û destana me Gilgamêş de fêm bikim, ez lê varqilîm ku ew, her kesê ber bi dewlet û bajêr ve baz dide îfade dike. Sîteya órûkê di dîrokê de wek yekemîn dewlet-bajar û bajarê çîroka wî hatî

nivîsandin tê zanîn. Gilgamêşê (Di Kurdî de Gilgamêş tê maneya 'camûsê mezin.' Mirov dikare texmîn bike ku destanê têra xwe ji çavkaniyên Proto Kurd wergirtiye û xwe pê xwedî kiriye) qehreman ê navdar ji qralên nîv-xweda yê herî naskirî yê bajarê órûkê ye. Belkî jî avakerê órûkê ye. Bi qasî ku ji destanê tê fêmkirin, sîteya órûkê tim û tim li êrîşa qebîleyên kovî û heywanên dirinde rast tê. Ji aliyekî ve, bajar bi yekemîn bircên bi heybet tê zexim û asêkirin, ji aliyê din ve jî bi şerên mezin parastina bajêr tê kirin. Em di tevahiya dîrokê de dibînin ku şervanên xurt ji civakên kovî têne neqandin.

Qral gilgamêş jî hewl dida şervanên xwe yên xurt ji qebîleyên li herêmên daristan û çiyayî yên li Bakurê Iraqa îro, berhev bike. Rêbaza wî ya berhevkirinê jî gelek seyr e. Sîteya órûkê jiyaneke nû keşif kiriye. Şoxûşengiya jiyana bajêr têra xwe balkêş e. Yek ji xusûsên sereke yên vê jiyanê balkêş dike fahîşetiya jinê tê. Ya rastîn, xwedawenda-dayik a pîroz ku hêdî hêdî li mala taybet û mala giştî (kerxane) tê girtin, ji bo kêf û zewqa mêran têra xwe dibe balkêş. Koleya wî ya nû jê re derfetên jiyana bi kêf ên bêsînor pêşkêş dike. Têkoşîna xwedawenda órûkê Înannayê (navê wê berê yê li çiyê Nînhûrsag e, yanî xwedawenda herêma çiyayî. Malbat-dayika şaristaniya Neolîtîkê pêş de biriye temsîl dike. Li dora dayikê civak mezin dibe û wek sembol nasnameya xwedawendîtiyê bi dest dixe) bi yekemîn xwedayê mêr ê qurnaz Enkî re tewş nîne. Xuyaye, yek ji mijara herî li dij derketiye bi karanîna jinê li malên taybet û malên giştî (kerxane) wek metayeke cinsî ye. Ji ber vê yekê li ser xwedawendîtiyê şerekî mezin dide. Di destanê de wek têkiliya Enkîdo bi órûkê re jina navdar a kêfê ya bajêr tê nîşan dan. Ev sedem mirov dide bawerkirin. Ya Enkîdoyê kovî li ber devê çem dike nêçîra xwe dîsa heman jin e. Enkîdo çendîn bi jina bajêr ve tê girêdan, êdî dibe esker-fermandarekî baş ê Gilgamêş. Serhatiya Gilgamêş-Enkîdo paşê di destanê de wek numûneyeke bêhempa hatiye hûnandin.

Dema min çûyîna xwe ya yekemîn a bajêr û dibistana seretayî bi çîroka Enkîdo re rûbirû kir, ez di têgihîştina wê de dereng nemam ku destan esas behsa min jî dike. Di vê mijarê de feyda wê heye, ez behsa bîranînek xwe jî bikim. Zarok teşwîq dikirin ji bo biçin dibistana seretayî ya gundê mezin Cîbînê. Yek ji wan zarokan bi navê Şewket bû. Birayê piçûk ê Cimoyê min yekemîn çalakiya xwe ya gerîlla li dijî wî kiribû. Diya wî yek ji wan jinên xizan û seretayî yên gund bû. Lê roja Şewket çû dibistanê vê jinê nirxandinek kir ji profesorê herî baş çêtir tespîtek kir. Hînê jî di hişê min de ye, weha

gotibû; "Şewketê me bûye hukûmet." Min maneya vê gotinê hînê di vê parêznameya xwe ya dawiyê de baştir çareserkir.

Em hemû mîna Enkîdoyekî dadiketin bajêr û ber bi dewletê ve dihatin meşandin. Em ji civak-dayikê qut dibûn. Her ku diçû me ji ber jiyana gund fedî dikir. Li ber serdestiya bajêr gundê me her ku diçû tine dibû. Her ku diçû dayika me qîmeta xwe wenda dikir. Me têkiliyên xwe yên malbat û qebîleyê piçûk didîtin. Bajêr û dewleta tê de em wek miqnatîsê dikişandin. ædî hêsan nebû em xwe ji tesîra wê xilas bikin. Bajar û dewleta têde, bi xwe amûrekî objektîf ê propagandeyeke xeternak bûn. Her tiştê bajêr mîna ku di ser harîqabûyînê re hatibûn pêşkêşkirin. Fahîşeya di nav kincên xweş û kilan de nedibû bihata redkirin. Her tişt ji bo serdestiya xwe bi kar dianî, li aliyê din gundikê me jî wek sêwiyekî li dawiyê mabû. Karmendekî dewletê yê pir normal ji bo me wek xwedayekî bû. Her gotin û kincên wî wek xwedayetiyeke nû bû. Tesîr welê hatibû amadekirin. Di ser de jî navê 'bi dûvik' li Kurd kiribûn. Ji bo mirov berê gavekê ji vê yekê xilas bibûya formul ev bû; diviyabû em pir zû bûbûna bajarî - dewletbûyîn - Tirkbûyîn bû. Me ne tenê li malbat û gundê xwe bi çavekî piçûk nerî, me êdî Kurdîtiya xwe jî piçûk û heqîr didît. Ev mîna lele û xirxalên li lingên me hatibin xistin me his dikirin. Hemû dunya me di nav quncikan de derbas dibû; tu çiqas bibî bajarî, bibî dewlet û bibî Tirk, tê ew çend bibî zilam. Yanî toreya me ya nû ya civakî ev bû. Dînê me, îrfana me wê li ser vî hîmî watedar bibûya. Dîsa em li dora vê sêgoşeyê dibûn civak.

Encama ez ji vir bi dest dixim ew e ku beriya netewîbûyîn û çînîbûyînê, bajarîbûyîn û dewletbûyîn pêştir tên. Berovajî texmînan, wek hêmanên bingehîn ên civakîbûyînê bajarbûyîn û dewletbûyîn pir zû dest pê dikin. Proleterî û sosyalîstiyê wek berhemên bajarbûyîn û dewletbûyînê em pêşwazî kirine. Mîna sifetên xwedayê dewletê bin. Kesayeta di nav dewlet û bajêr de pêk tê, hînê ji aliyê sosyolojiyê ve nehatiye çareserkirin. Di navbera kesayeta gundewarî, komîn û kesayeta bajarî, dewletî de pir cudahiyên mezin hene û ev rastiyeke sosyolojîk e. Em heta van rastiyan çareser nekin, ewê analîzeke têkûz a çîn, sosyalîzm û demokrasiyê kêm bimîne. Di navbera civaka dewlet û bajêr mora xwe lêxistî û civaka gundewarî komîn de jî cudahî û nakokiyên bi kok hene. Civaka bajêr û dewletê mora xwe lê xistiye çiqas otorîter û dewletparêz e, civaka gundewarî jî ew çend komîn (wekhev) û demokratîk e (azad e) . Li gorî vê maneyê, di dîrokê de nakokiya herî girîng di navbera civaka bajêr-dewletparêz û civaka komîn-gundewarî de ye. Têkoşîna esas, otorîterîzma bajêr-

dewletparêz û demokrastiya komîn a çolterê dikin. Ezê li vê rastiyê pir paşê hayil bibûma.

Rêwîtiya me ya ber bi bajêr û dewletê ve, bi arzûya me ya ji bo dibistana eskerî û siyasî xurtir bû. Otorîte otorîteyê dikişîne. Diviyabû em ne bi meşê bi bazdanê bi gihîştana otorîteya eskerî û siyasî. Dema asteng jî derdiketin ez xemgîn dibûm. Dema min nekarî biçim dibistana eskerî, minê xwe pir bê şens bihesibanda. Di vê pêvajoyê de jina bajarî jî balkêşiyeke xwe ya cuda, lê di heman demê de hêzeke balkêş a di heman îstîqametê de bû. Şoreşgertiya me wê di bin van şertan de wek dewletparêziyeke baş pêk bihata. Sosyalîzm wek rewşa dewletê ya herî bêqusûr dihat fêmkirin. Emê herî baş bi wê rabûna ser xwe. Ew mîna amûrekî hemdem bû ji bo em pê bifirin. Îsyankariya me jî wek hesreta rabirdûyê û wek nerazîbûnekê li dij nûbûnê dihat fêmkirin. Kurdîtî jî timî wek pirsgirêkek xwe dida der dihat hiskirin.

Dema dewletdariya me li Rojhilata Navîn gihîşt radeyekê û wek rastiyekê xwe nîşan da, me jî êdî bi dilê xwe ji vê amûr û armancên xwe bawer kir. Her çend me piştrast nedikir jî, dema me xwe dispart îmkanên dewletdariyê û ev îmkan bi armancên me yên şoreşger re dibûn yek, meşa me ji leza xwe tiştek wenda nedikir. Divê ez eşkere bibêjim, yekem car di vê pêvajoyê de min his kir ku kesayeta min di warê maneyê de zirar dît. Pîrozbûyîna jiyanê her ku diçû maneya xwe wenda dikir. Min fêm dikir ku bi dewletê bi dest nayê xistin, tê wendakirin. Min ji hedefê guman dikir ku ez bi maşîna dewletê bigihîjimê. Lê ji ber ku gelek rê çûbûn, min nikarîbû vegeriyama û ji dîtina rêyek din jî pir dûr bûm. Dawî li kesayeta min a li dewletê suwar bûbû dihat, lê bi nasnameya nû minê kîjan rê bidîta ev jî têra xwe meçhûl û xumam bû. Dewleta sosyalîst a ez pê ewle bûm ji rastiyê derketibûm. Min nikarîbû ez qebûl bikim ku xwe biavêjim kapîtalîzmê, xurûra min ev yek qebûl nedikir. Ji ber ku ji serî ve têkiliya min a bi Sûriyê re taktîk bû, dest dida mirov îdare bike. Ji bo çiyayên Kurdistanê ez hem dereng ma bûm, hem jî min encamên keda xwe nedîtibûn. Min xwe li îxanetê qewimiye dihesiband. Ez dema di bin van raman û hisan de derketim serhatiya xwe ya Atîna-Ewrûpayê min têra xwe zirar dîtibû. Min dema ber bi dewletê ve baz dida ez bi heyecan bûm. Ez ezberkar bûm. Her tişt bi payestendinê ve hatibû girêdan. Dîn û îman, paye û pere bû. Min ev kesayetî bi şoreşgeriyê li dawiyê hiştîbû. Lê ev şoreşgertî bi kesayeta dewletparêz re dimeşiya. Hînê ji serî ve otorîteyek ez li serî balkêş bû. Ya esas, di şûna dewleta ji min dûr û ez nedigihîştimê, min ber bi

dewleta li ber serê xwe ber bi dewleta xwe ve baz dida. Mîna dînekî nû, lêgerîna li milliyet û şerekî bû. Firîna min a Amedê, meşa min a Sûriye-Lubnanê mîna arzûya min a dewleta millî miz bida. Sura wê tenê jî ez dimeşandim.

Lê tevî wan hewldanên mezin, lê cewherê kesayetiya min, bi min his dida kirin ku ez hin tiştan ji kûrahî ve wenda dikim. Zihniyeta dewletparêz min ji min dizîbû. Sosyalîzm û şoreşgertiya dewlet ji xwe re kiribû navend, di şexsê min de jî asta dejenerebûyînê nîşan dida. Di sêgoşeya Atîna-Mosko-Roma de dema min xwe di nav dunya hesaban a mîna qeşayê de dît, nakokiya hînê bi tevahî derdiket holê. Min nikarîbû bibûma zilamê vê dunyayê. Min nikarîbû biketama hesabê kapîtalîzmê. Min nikarîbû hînê şêwazê jiyana Rojava bibûma. Rêwîtî qediyabû. Mîna dawî li utopyayeke grî û piçûk dihat. Dema îxanetê digot 'ez têm' jî ez wer bûbûm ku min tiştek his nedikir. Çavdêrekî bi dîqet dikarîbû hîleya Yewnan bidîta. Lê min hînê ji dostaniyê bawer dikir û ez neçar bûm bawer bikim. Li gorî ku temenê min ê dawî bi vê dostaniyê meşiya bû, diviyabû heta dawiyê jî welê bimeşiya. Dema wê ji min re bigota 'ez îxant im' jî minê jê re bigota 'tu dost î.'

Di bûyera Kesîre de jî wer bûbû. Ya esas, jinikê bi awayekî xeternak diqîriya. Heta bi hucreyan dida hiskirin û digot; "Ez îxanet im, nêzîkî min nebe." Lê min digot; "bi qasî ku tu aşiq bibî divê tu bi min re bî." Eşqa min, hevalên min û dostên min êdî bûbûn yek û dema heman stranên îxanetê digotin, minê jî bigota û ez neçar bûm min bigota "eşqa min, hevalên min, dostên min çiqas stranên xweş yên şoreşgerî û welatparêziyê dibêjin." Şofêrê Yewnanî dema ez bi jîpê birim girava Korfûyê, bi zanebûn maşîn li balafira wê ez bibiram Kenyayê qeliband. Minê hînê ji dostaniyê bawer bikira. Dibêjin çavên wî kor bûne, ya min jî tiştekî welê bû. Ya esas, kesayeta min a ber bi dibistana seretayî, bajêr û dewletê ve baz dida îflas dikir. Diviyabû îflas jî bikirana. Nirx û buhayên bajêr û dewletê yên ez kiribûm ez diviyabû hemû dawşiyana. Dewletê biryar dabû dewleta li cem min biqedîne. Ev dewleta mezin a rastîn bû. Dewleta YE û DYE bû. Eger niyeta min nebe ji bo ez bibim ebdekî wan ê erzan, rastiya dewleta kapîtalîst e, ji bo ji min xilas bibe wê ez ji bo kareke baş bifirotam. Ji bo ez ji destê van fenbazan xilas bibûma, şertên ez tê de bûm pir zehmet bûn. Eger tu karibî canê xwe xilas bikî helal be ji te re! Levîethan serê xwe ji deryayê derxistibû nîşan dabû.

Dewleta Yewnan di serê wan Levîathanan de tê. Li gorî min ez şaş nebûm ku ez heta dawiyê bi dostanî meşiyam. Jixwe aliyê herî

girîng ê şexsiyeta min mayî ew bû. Minê bi vî aliya xwe nelîsta. Minê bigota bila îxanet ji wan re, dostanî ji min re be. Ya esas, çûyîna min a Kenyayê mîna di mîtolojiyê de (mîtolojiya Yewnan) avêtina Tartarosê (bîra cehennemê) bû. Pîçên hemdem ên Zeûsê wê xwe ji kirina vî gunehî dûr negirtana. Zenciyên şîrîn ên Efrîkayê jî wezîfeya xwe ya li Tartarosê baş dikirin. Ez li nuqyetek welê bûm, li navbera rastî û xewnê bûm. Ez dema ji cehennemê bi tatê Îmraliyê ve mîna Prometheûs hatim girêdan, ez tam nîv-mirov bûm û nîvê min ê din jî min nizanîbû wê çawa bibe. Enkîdo pir dijwar şer kiribû, lê pir xirab hatibû kuştin. Hegel dibêje; "dewlet xwedayê bi gewdebûyî ye." Xwedayên hemû dunyayê li ser serê min piçikîbûn û vê yekê ez tam bi koka Prometheusê nîv-mirov û nîv-xweda ve girê dabûm. Eger dilê min rojê hezar caran bihata xwarin jî minê karîbûya dilê xwe nû bikira. Eger her roj qirikan nikul li mejiyê min bixistan jî minê karîbûya mejiyê xwe bixebitanda. Civaka dewlet û bajêr ez di hûrê xwe de pir cûtibûm, lê paşê neçar verşiyabû û ez avêtibûm der ve. Lê min jî nekarîbû hûrê wan parçe bikim. Di encamê de civaka bajarî-dewletî û ya komîn bi gotineke hemdem civaka ekolojîk-sosyalîst li cem hevdu, ne ku bi aştiyek li hevçêkirî, bi dualîteyeke diyalektîkî wê çawa li cem hevdu bijîn? Ez li ser vê pirsê ponijîm. Di parêznameyê de min hin encam nîşan dan divê bi ciddiyet li ser were rawestîn. Ji ber ku berhemên jiyaneke dijwar û ramaneke bêhîle ne, hêjayî lêkolînê û dersgirtinê ne.

Yek ji nakokiya di navbera min û diya min de têgihîştina min a li ser hevaltiyê bû. Wê digot tu xwe bi vê têgihîştinê dixapînî. Ez yeqîn dikim ku lêgerîna min a mezin li hevaltiyê û daxwaza min ji bo hevalan balkêş dîtibû. Ferq dikir ku bi nirxên heyî yên civakê re li hev nake. Lê hayil dibû ku ezê bi tenê bimînim û hevalên min wê bi berjewendiyên xwe bikevin. Ez pir dereng li vê rastiyê hayil bûm. Her çend ên pir girêdayî û baş hebûn jî, bi hevalan mirov dikare çi bike, mirov dikarîbû heta ku biçe. Li gorî min karekî mirov nekiribûya tinebû û hedefek mirov xwe negîhandibûyayê nebû. Girêdanên bi kok ên hevaltiyê dîsa dualîteya Gilgamêş-Enkîdo bi bîr xistin. Di dîrokê de timî dualîteyên hevaltiyê bi vî rengî hene. Belkî jî ev pêdiviyeke dualîzma gerdûnî ye. Yên dixwazin meşên mezin bikin divê hevaltiyên xwe mezin bikin. Ez li gund hînê di dema zaroktiyê de xwedî lêgerîneke bi vî rengî bûm. Hesen Bîndal berhemê vê lêgerînê bû. Çeteyên bi lanet çawa ev yek ferq kirin û ew tevlî komployê kirin. Ji bo hînê jî pirsgirêkeke divê were çareserkirin. Lê eger komployê lîstika bi hevalê min dabû destpêkirin

bida dewamkirin, hînê wê demê dikarîbû li min bida. Ji lewra hevalê min hevalekî mezin bû.

Kemal Pîr jî ji wan hevalên mezin bû. Kêm mirov mîna wî hene bi hestyarî dijîn. Çiqas were mezinkirin û di jiyanê de were nîşandan kêm e. Ez hînê yeqîn nakim ku di jiyanê de hatiye fêmkirin û şêwazê wî bi cih hatibe anîn. Girîngiya wan ew bû ku ne xwe, hevalên xwe dijiyan û didan jiyîn. Ev dihat wê maneyê ku min dikarîbû hevalên xwe biafirandan. Bi hezaran mînakan hebûna xwe dewam kirin. Lê kesên îstîsmarker derketin. Hevaltiyên me yên bi şeref bi rezîlî bi kar anîn û ev yek ji texmînan wêdetir hebû û ev yekê ji bûyeran bihata fêmkirin. Min timî ji meznahiya hevalên xwe bawer kiribû û min bawer kiribû ku wê timî wisa rol jî bilîzin. Ev yek hem ji zêde bixwe bawerbûnê dihat, hem jî ji encama xwe tine hesibandinê bû. Minê nikarîbûya çareser bikira ku wê beza civaka çînî, bajar û dewletê kesayetiyê bixe kîjan şikil û dirûvan. Ji min re hêsan dihat ku ez şêwazê pêkhatina xwe li ser giştî ferz bikim. Min her kes wek xwe dizanîbû, belkî jî min dixwest ez ji wan zêdetir nêzîkî wan bibim û yekîtiyê pêk bînim. Min pir bi awayekî balkêş yekîtî pêk dianî. Ez qebûl dikim ku ez di vir de zêde lê çûme û bi min giran were jî ez neçar im qebûl bikim ku diya min di vê nuqteyê de mafdar derketiye. Qanûnên dunyayê cuda dimeşiyan. Min nikarîbû vê yekê fêm bikim. Di encamê de ez ketibûm dogmatîzmê. Dema kar û xebat baş nedimeşiyan jî min bawer dikir ku wê bi pîvan û prensîban baş bimeşin, vê yekê jî xwe ji zû ve spartibû sînorê dogmatîzmê. Vê zêhniyetê ez dibirim dualîteya reş-sipî. Yan başiyeke mukemel, yan jî xirabiyeke ebedî. Heye ku ev têgihîştin tortên ji baweriya kevneşop a Zerduştiyê mabin.

Ev têgihîştina bi kok bi aliyekî ve mirov bi rêxistin kirin. Mirov girêdan. Bi aliyekî din ve jî xapandin. Bû sedem ku ez rastiyan weke xuya dike nebînim. Di xetimandina PKKê de jî mirov dikare bandora vê têgihîştinê bibîne. Helwesta diyalektîk a dualîteya reş-spî zêde hilberîner nîne. Mirov dibe şêwazekî remanê yê mekanîk û seresere. Di encamê de ez jî ketim şêwazê ramanê yê mekanîk û seresere, bi vî awayî ji şêwazekî fonksiyonel ê rengîn û zindî dûr ketim. Diyalektîka seranser, esas, diyalektîka dogmatîk e. Ev cureyê îdealîzmê ku di sosyalîzma reel de pir heye, wê destê xwe li pêxîra min jî bigeranda. Di PKKê de nirxên meznahî, qehremanî, başî, rastî û bedewî bi van sedeman bi dijên xwe re dualîteyê pêk tînin. Ji vî cureyê dualîteya diyalektîk bi giştî nasnameyên pûç sûd werdigirin. Bi rastî kesên PKKyî nebûbûn, xwe wer zanîn û hemû fazîletên wê

bi xirpanî bi kar anîn. Kesên nikarîbûn biçin ber du bizinan, bûn lîderê rêxistinê û bûn fermandarê gerîlla. Ev pêşketinek bi qestî nebû. Di destpêkê de bi niyeteke baş, lê bi têgihîştina wê hevalê, ya herî baş bi şêwazê herî serketî bikin, bû sedema vê yekê. Hatibû fêmkirin ku wê bi vê têgihîştinê zêde serketinê nebe. Lê dîsa jî nehatibû çareserkirin ku wê rêxistinê xwe çawa bigihîne têgihîştineke nû ya rêxistinê.

Pirsgirêk hînê jî di kûrahiyê de bû. Min li gorî quweta xwe ji salên 1980'î ve hewl da rastiya civakî ya Kurd analîz bikim, bi vî awayî min ji bo çareserkirina ferd û veguherîna wî gelek hewl da. Lê her ku min çareser dikir, kesayet li hemberî min hebû ku digot 'înada min înad e.' Dest ji xwe ber nedidan. Tevî ku ji serî heta binî di nav îxanetê, bêşerefiyê, qediyayî, lacqatî û xwediyê kesayeteke pênc peran nekin jî dîsa jî heyranê xwe bûn. Ev rastiya mirovatiyê bû. Lê mirovatiyek ji berovajî ya qediyayî bû. Min mîna genim xwe hêra, kir nan û da xwarin. Dîsa jî bi însaf nedibûn. Di şêwazê xwe yê jiyanê de û bi gotina wan di şêwazê xwe yê şer de bi israr bûn. Ya esas, tiştek ji dest nedihat. Te berdana, bi qasî barûdekê jî rezerva wan a lêdanê nebû. Ji wan milîtanê herî baş temenê wan salek nebû. Înadê min jî înad bû. Minê ji sedî sed 'heval' bidana jiyîn. Min her tişt da aliyekî û hewl da van mirovên girdûmird bidim jiyîn. Hem jî min xwe xapand ku ev ji bo vê yekê amûrên herî baş bûn. Nuqteya dayika min jî lê isyan dikir ev bû. Hînê di temenê min ê ciwan de ferq kiribû ku ez xwe dixapînim.

Kemal Pîr û Hakî Karer du zarokên Derya Reş bûn ku hînê xira nebûbûn, bi eşq û şewq bi şêwazê hevaltiya min ve hatibûn girêdan. Ji bo ez nekevim zehmetiyeke piçûk, beriya me hemûyan berê xwe dabûn Kurdistana ne ziman û ne jî toreyên wê zanîbûn. Lê wê rast nebûya ku mirov ji zarokên civaka li îxanetê hatibû qewimandin li benda heman nazikiyê bûya. Ti ji wan dil û mejiyê wan nedibû yek û nedimeşiyan. Mîna ku bibe bela serê wan, bibe 'belayek namûsê' Yan jî li gorî rastiyên xwe dimeşiyan û bawer dikirin ku şerefa xwe xilas dikin. Ya tê de înad dikirin, têgihîştineke şeref û namûsê bû ku pênce pere nedikir. Ji bo karibin şeref û rûmeta xwe xilas bikin, 'bi rastî' min her tiştê hewce pêşkêş kir. Tam di vê nuqteyê de li gorî pêdiviyan nexebitîn wek pirsgirêkekê danîn pêşiya min. Min yekemîn pêngava PKKyîbûyînê bi awayekî serketî danî pêşiya wan. Dikarîbûn bibin partîzanên baş, lê li xwe danenîn. Vê carê jî min duyemîn pêngava PKKyîbûyînê hem li çiyayên Kurdistanê, hem jî li

hemû parçeyan, li derve, li gund û li bajaran danî pêşiya wan, vê carê jî ji derfet û îmkanan serxweş ketin. Nexwestin fêm jî bikin.

Li Rojhilata Navîn li Sûriyê rojekê ne rehet gezek nan bi qirika min ve çû û ne jî min xew kir. Min ji deh hezarî zêdetir kur û keç xwedî kir. Ji bo azad bigihîjin, ji bo şerefa wan neyê şikandin û mezin bibin, herî rewşên mirov nikaribe xwe lê rabigire min ferz kir û berpirsiyarî da ser xwe. Minê pişt re fêm bikira ku wê vê fedekariya min a bêhempa jî şaş şîrove bikin. Li ber çavên wan ji gelekan wê îlluzyon bibûya ku ez wek qralan dijîm. Hînê jî tê bîra min. Dûran Kalkan ku bi xwe bawer hewl dide bipeyive, ji nişkê ve derket li telefonek têkiliyê bigire. Têkiliyek ji bo çend deqeyan, şêwazekî axaftinê di wê astê de bû ku dikarîbû dawî li têkiliyên me yên li wê deverê bîne. Goya tam wek şoreşgeran dipeyivî. Pişt re min pratîka wî şopand. Bi awayekî objektîf çiqas ji dil jî dixebitî ji serî heta dawiyê di nav tasfiyê de bû û dida tasfiyekirin. Haya wî jî jê nebû. Di şexsê wî de mirov dikarîbû fêm bikira ku çepgiriya Tirk çawa xwe tasfiye kiriye. Dûran yek ji kesên herî baş ê di nav me de tê hesibandin. Lê yên din? Eger tu wan berde nikarin zikê xwe têr bikin. Hela di destê wan de sîleh jiyana wan bi mûcîzeyan dimeşe. Dîsa jî min qehrên wan kişandin. Înad li dij diya xwe minê başiya hevalên xwe îspat bikira.

Dema mirov hînê li kûrahiya vê rastiyê binere, dikare kesayeta civaka despotîk a bi hezarsalan hişk bûye bibîne. Kesayeta ebd eger li binî be kole ye, eger li jor be despot e. Hewldanên min ên ji bo çareserkirin û xebitandina vê kesayetê wê berovajî vegeriyana. Ya ji fermandariyê fêm dikirin ew bû ku mîna çîroka paşayê çîngene 'berê bavê xwe darve dikirin.' Ya herî tê de serketîbûn hevdu tasfiye dikirin û xebatên hevdu pûç dikirin. Ez baş dizanim, ji ber îhmalkariya wan a bi zanebûn, an jî bi nezanî bi sedan hevalên bedewên cîhanê hatin wendakirin. Zêhniyet bi vî rengî û rezîl, bi dilekî çermê gamêşê, ji bo ji hevalê xwe xilas bibe mîna qurtek ava sar vexwe dişand seferên mirinê û ev yek jî wek yek ji karên asayî dikir. Di hundur de vê kesayeta komploker herî dawî heta tasfiya min lingê xwe dirêj kir. Ji van sê kesên bi navê Şahîn Balîç, Mehmed Şener û Cangîr Hazir, bi îhtimaleke mezin di serê sala 1990'î de bi têkiliya hin kesan ku hînê jî nayê zanîn, wek prova tasfiya min, hevalê min ê zarokatiyê û gundiyê min Hesen Bîndal bi awayekî rezîlane û bi awayekî rengê qezayê dabûn kuştin. Van kesan şebekeyek ava kiribûn. Ez bawer nakim ku hemû bi zanebûn ajan bûn. Bi îhtimaleke mezin ji bo rêxistinê bi dest bixin û ji bo

paşatiyeke çîngenewarî bikin, rêbazên kompoyê amade kiribûn. Ya esas, minê pişt re fêm bikira ku ev rêbaz li vî welatî pir zêde tê bi karanîn. Berovajiyê texmînan, artêşa Tirk gerîlla têk nebir, van kesên rezîl rêxistin ji hundur ve kirin ku nexebite û bêtesîr kirin.

Ji ber ku îmkanên min ên lêkolînê nînin ez nikarim navê bi sedan nîşaneyên lehengiyê binivsînim, (bi Mahsûm Korkmaz destpêkir) ku me bi vî awayî şehîd dan. Yek ji wan ê herî bi nav û deng Şemdîn Sakik bû. Sîstema ebdiyetê jî têra wî nekir, paşatiya çîngenetiyê pir baş xebitand. Yek ji elemanên herî durust ê navenda me Cemîl Bayik ku gelek hêvî jê hebûn, li şûna ku hesab ji wan bixwesta, qabîliyeta wê nebû reva Mehmed Şener, Cengiz Hazir û Şemdîn Sakik a ji cem, asteng bike. Ya esas, eger ez nebûma, wê bi çend darbeyan hemû biqedandana. Li vê yekê jî hayil nedibûn. Mîsalê yê nikaribe li kerê bide wê li kurtanê bide, ji belengazên li ber destê xwe hesab dipirsîn. Deriyên rêxistinê li kesên çavsor vekirî dihatin hîştin û zarokên çikî ciwan ên pirsgirêkên wan ên adaptasyonê hebûn jî wek erkekî disîplînê ceza dikirin. Ev bûyer jî ne kêm bûn. Kesek bi navê Saîme Aşkin hebû. Dema li órfayê mamoste bû yek ji wan kesên destpêkê bû ku beşdarî koma me bûbû. Fedekar bû. Derket der ve. Hat perwerdekirin. Li yekemîn kampa hundurê welat a di bin berpirsiyariya Dûran û Alî Haydar de ji ber pratîka li kampê bi îdamê hat cezakirin. Wexta min bihîst ez matmayî bûm. Ya digotin ev bû; "Hemû disîplîna eskerî serûbin dikir, her tişt pûç dikir, ji lewra êdî cezakirina wê mecbûrî bû." Ez jî neçar bi vê gotinê bawer bibûma. Ev jî pêdiviyeke disîplînê bû. Lê ev yek ji wan bûyeran bû min di quncikek dilê xwe de hilanî. Li gorî min gunehê wê çiqasî giran dibû bila bibûya, ew kesek welê nebû bihata tasfiyekirin. Lê min nekarîbû tiştek bikira. Dogmatîzmê (di menaya sosyalîzma reel de) dilê min jî cemidandibû. Li Rûsyayê jî sosyalîzma dewletparêz bi vî awayî hevalên xwe yên herî hêja kuştibûn (Buharîn, Zînovyev hwd.). Bi mîlyonan gundî hatibûn kuştin û serûbinkirin. Wê pişt re derketiba holê ku ev sosyalîzm nîne, şêwazekî kapîtalîzma hov a Rûsyayê ye. Ya esas, ev rewşa Şoreşa Mezin a Cotmehê bû ku gelek hêvî pê hatibûn girêdan, li îxanetê hatibû qewimandin. Mîna ku di gelek şoreşan de îxanet bi piranî li cem xwediyên xwe wek kar diman. Ji Muhammediyan bigire heta Îsewiyan dîrok bi van mînakan tijî ye. Lê ez bawer dikim ku min di vê parêznameya xwe de bi perspketîfeke xurt a teorîk nîşan daye ji bo weke çarenûsê li vê yekê neyê mêzekirin. Ez yeqîn dikim ku min kesayeta vê yekê afirandiye û heta kesayeta xwe çareser kiriye.

Jixwe hindik be jî ev hewldan dikare bibe sedema xemrevînî û dilxweşkirinê.

Ya PKKê bi xwe li xwe kir derket holê ku tasfiye ye. Tevî ku dîroka me ya hemdem, hemû qehremanî, cesaret û fedekarî, êş û wendahî nîşan dan, rabirduya bi lanet û fenbazên sîstema kapîtalîst bi hêsayî rê nedidan mezinbûyîna bi şeref û azadiyê. Tevî ku me rêbazên du sed salên dawiyê yên rizgariya netewî û civakî ceribandin dîsa jî destketiyên me bi sînor bûn. Aştiyek bi şeref pêk nehatibû. Rêbaza ku min dixwest biceribînim, herî kêm bi qasî ya sala 1975'ê pêngava bi heyecan a 'aştî û çareseriya demokratîk bû.' Ez li bendê mabûm ku muxeteb têgihîştineke mezin nîşan bidin. Lê ji ber ku ez tam têkçûyî hesibandibûm ciddî nedîtin. Heta wek hewldanek xwe piçûk dixîne nirxandin. Lê ya mirov xemgîn dike ew e ku di nav bermahiyên rêxistina me de jî yên wisa mêze dikirin kêm nebûn. Hin kesan ji wan pir eşkere ez bi 'teslîmbûyîna bûrjûwaziyê' gunehbar dikirim. Yên din jî yanî hevalên min yeqîn dikirin ku ez neçar daketime vê nuqteyê û wan jî xwe di vê çarçoveyê de ji dema nû re amade dikirin. Dîsa cihê xemê ye ku li ser mîrateya me hewldanên em dikarin ji wan bibêjin hesabên li ser dema nû, hêdî hêdî derdiketin holê. Yên fêm nedikirin ku mîrate çî ye wek mîratxurên bêşeref, bi gotina wan bêyî haya wan jê hebe helwestên xwe li mîrateyê deynin nîşan didan. Ya her grûbekê bide jiyîn dikarîbûn bi dest bixin. Min pêjna vê yekê kir û pê derxist.

Modela min li ser mîrateya PKKê ya xwe bi xwe tasfiye kiribû, wek hatibû behskirin pêkhatinek di cewherê xwe de demokratîk bû. KADEK û pişt re KONGRA GEL wisa pêk hat. Min hemû parêznameyên xwe yên di pêvajoya Îmraliyê de ji dil xwestibû bi teorî û pratîka demokrasiyê pêş de bibim. Her çend seresere bibe jî cewherê xwe welê bû. Vê helwestê dikarîbû bermahiyên koletî û despotîzma di kesayetan de maye, çareser bikira. Pêngaveke demokratîk a bi mane di nav gel de bihata meşandin wê hem bi kêra aştiyê û hem jî bi kêra çareseriya demokratîk bihata. Wek firsendeke baş mirov dikarîbû pêvajo binirxanda. Pêngava DYE ya piştî 11 Îlonê, gavên çav li rê bû Tirkiyê biavêta rawestand û wer dihat fêmkirin ku di bin navê KADEKê de pir bi awayekî çareserker û pêşdebir nekarîbûn tevbigerin. Fêm nedikirin ku şerê demokrasî û aştiyê ji şerê çekdarî zehmetire. Ji fêmkirin û bi cihanînê pir dûr bûn û nizanîbûn ku aştî ji şer zêdetir îhtîmam û hewldanê dixwaze, her weha tenê bi rêxistin û çalakiyên demokratîk ên mezin meş mumkîn e bibe.

Li Tirkiyê hukûmeta DSP-ANAP-MHP a bi pêşengiya serokwezîr Bulend Ecevît di nav xeyalan de dijiya serberjêr çû xwarê û hilweşiya. Partiya bi navê AKPê ji vê valahiya dîrokî sûd wergirt û ket ser rêya desthilatdariyê. Aliyên çepgir û sosyal demokrat ji şîrovekirina rewşê dûr bûn. Nizanîbûn çi dibe, çi diqewime. KADEK, KONGRA GEL jî di rewşeke pir cuda de nebûn. Ya hînê seyr û xeternak ew bû ku minê bidîta, li ser hin hewldanên demokratîk ên bi zehmetî dihatin meşandin hesaban dikin. Li pey vê em dîsa di nav şertên tecrîda şidandî de bi zor û zehmetî hîn bûn ku du komên muxalif bi pêşengiya Osman Ocalan û Cemîl Bayik derketine holê û KONGRA GEL hînê di gava yekemîn de bê kêr kirine. Di nav tevgerekê de çêbûna koman eger xebatê bi awayekî berçav pêş de bibin rewa ne. Naxwe niyeta baş çi dibe bila bibe wê nikaribin xwe ji morxwarina belavker û gelaciyê xilas bikin. Di nav PKKê de ev komikên dawî jî tê de hemû hewldanên bi vî rengî bi sedema ku rêya têkoşînê asê kirine û rê li ber tasfiyeyê vekirine, rewa nînin. Dîroka me ev rastî ispat kiriye. Di nava KT de bermahiyên serdema navîn ku bi lîstika demokratiyeke bibe mijara guftûgoyê pêngavek diavêtin, PKKê jî bi zêhniyeteke mirov dikare wek bermahiya serdema navîn bihesibîne bêyî hewceyî bi 'lîstika demokratîyê' jî bibînin bi kêfa xwe ya paşatiyê qaşo kabên xwe ji bo îqtîdarê diavêtin. Li her du enî û bereyan, bihêlin demokratîkbûyîna wan, ji meylên atmosfera giştî pir paşvetir daxwazên şexsiyeta paşverû nîşan didan û ev yek mîna ku bixwazin hewldanên me yên demokratîk pûç bikin, ferz dikirin. Piştî ku min eşkere lîstikên di dema hilbijartinên herêmî de dîtin, (ji aliyê her du bereyan ve) min xwe li destavêtinê rast hatiye, his kir û min nîşan da ku divê ez xwe biparêzim. Min nîşan da ku wê nikaribin bi pêngava min a demokratîk bilîzin. Herî kêm min helwesta xwe eşkere kir ku heta ez şerefa xwe rizgar bikim ezê kesên bêperwa van lîstikan dilîzin pûç bikim. Min dema ev parêzname amade dikir, min dît ku YE di nav vê lîstikê de ye, lewra min fêm kir ku divê ez bersiveke topyekûn bidim. Wexta şerê DYE li Iraqê li vê rewşê zêde bû, bi awayekî dîrokî amadekirina min a 'parêznameyeke demokratîk' têra xwe girîng bûbû.

Modela Kongra Gel têra xwe çareserker bû. Di demekê de ku dewletê hewl dida bi demokratîkbûyînê pirsgirêkan li dawiyê bihêle, dîsa li cih bû ku gel jî ji bo pêdiviyên xwe yên wekhevî û azadiyê gavên guncaw biavêta. Dîsa pirsgirêka kesayetê dikarîbû di nav pratîkeke şidandî ya demokrasiyê de perwerde bikira. Ji bo mirov

nekeve rewşa asê ya şoreşên hemdem ji rêbaza kongreyên gel ên demokratîk çêtir rêbazeke mirov bifikire nîne. Dibe ku sivik xuya bike, lê di dîroka rastîn a demokratîk de û di roja me ya îro de mirov dikare wek fazîleta herî hêja binirxîne. Li şûna ku pirsgirêk bi teknîka pêşketî û bi şerên rê li ber îmhaya girseyî veke werin çareserkirin, mumkîne bi rêyên aştiyane û însanî, bi perwerdeyeke demokratîk a payebilind a ji bo hemû cihêrengiyan bi dest bixîne, bibe. Pir exlaqî nîne û qîmetek xwe ya însanî jî nîne ku were rexnekirin çima tund nîne, çima xwîn nayê rijandin, an jî çima bersiva mêzîna hêza eskerî nade.

Di pirsgirêka Kurdistanê de hewldanên demokratîk ên kûr ku bi gavavêtinên sivik jî xuya dikin, bihata meşandin, dikarîbû di demeke dirêj de çareseriyên teqez û mayînde li ser navê gel bi cih bianiya û dewlet ji zora bêmane bikirana. Bi vî awayî, wê ji pêngava demokratîkbûyînê re ku Rojhilata Navîn jî pir hewce ye, alîkariyeke xurt bihata kirin. Min di parêznameya xwe de berê bingehê dîrokî yê vê rastiyê pêşkêş kiribû. Her weha li ser hîmê xweparastinê heta aştiyeke mayînde dikarin bi awayekî çekdarî xwe biparêzin. Mafê xweparastina rewa dema hewce bike û di her qadê de li dijî kiryarên antîdemokratîk dikarîbûn bi kar bianiyana. Ji bo vê jî dikarîbûn hêza xwe ya di çendayetî û çonayetiyê de amade bikirana. Dikarîbûn çanda partiyê ya navend-dewlet a otorîter û teng li dawiyê bihîştana û dikarîbûn li gorî taybetiyên çalakiyên demokratîk ên gel xwe bi rêkûpêk bikirana û veguherîna kesayetiyê tevî demokratîkbûyîna civakê di zikhev de pêk bianiyana. Derfet û îmkanên vê yekê yên teorîk û pratîk ji wan re hatiye pêşkêşkirin, şema û şêwazê wê jî me xistiye destên wan. Eger li cewherê wê serwext bibûna û para xwe ji eşqa demokratîk bigirtana, her çalakgerekî karê tê de bi ser biketa hebû. Wexta ya çav li rê nebe, bi awayekî diyalektîkî ya dijê wê dibe. Di kêliyên krîtîk de polîtîka nikare xwe li valatiyê rabigire. Di demekê de ku Kurdîtiya hevkar bi îttîfaqa xwe ya bi DYE re gavên girîng avêtin, kesên diviyabû li ser navê gel serketin bidest bixistana kêmasiyên xwe yên dîrokî, apolîtîkî, pêkanîna komên teng, nertina ferdî û niyeta xwe, wê bikarana pirsgirêk.

Gundîtî li xwe hayil nedibû ku ketiye lîstikeke sexte ya îqtîdarê. Kesên nikaribin gavên dîrokî biavêjin timî xwe li şerê navxweyî yê malbatê digirin. Li şûna ku bi tonan pirsgirêkê ketine serhev bi awayekî erênî û bi bûyerên berê wan li der ve çareser bikin, di demeke krîtîk de rabûn ketin hesabê wê ji mîrasa malbatê ji kê re çi bikeve. Rewşa min a di tehlûkê de ev hesab hînê girîngtir dikirin.

Kesên nikaribin bi rastîn artêşên xwe yên siyasî û eskerî ava bikin, wê pişta xwe bi komên xwe yên ehbab çawiş ve girê bidin. Gelek malzeme û qabîliyet di destên wan de çêbûne ji bo li ser bipeyivin. Ma xema wî-ê ye, ewqas keda dîrokî, êş û xwîn, bi asteke dijwar terbiyekirina gel bi birçîbûnê û di zindanê de mehkûmiyeta bi hezaran heval? Ev hemû girîng nedihatin dîtin, xwe virde wirde dihilkumîne û ji bo pêş nakeve bahane diafirandin. Pêvajoya destpêkê ya KONGRA GEL mirov dikare welê taswîr bike. Ji bo kesên wezîfeyên xwe yên dîrokî bi awayekî serneketî pêk neanîne ev rewş tê fêmkirin. Lê çawa nekarîbûn şîrove bikin ku mîrateya PKKê vê şêwazê ranake û wê vê yekê rewşa tê de ne careke din bi bîr bixista.

Min ew di vê çarçoveyê de hişyar kirin. Ji destpêkê ve kêfa min ji rastiya îqtîdar û otorîteyê re nehat. Lê di warê nîzama kar de gelek nazik bûm. Di bin her şert û mercî de şopandina karên gel ji bo min mijareke îman û baweriyê bû. Min tim û tim wisa hişyar kiriye; heta bi navê min were hildan, wê nirxên gelê Kurd ên werin parastin hebin. Yên guhê xwe nedin vê yekê dûr nêz wê fêm bikin ku serê wan xirab li zinar û tatekî ketiye. Dem hatiye ku li der ve û hundur hêdî hêdî were fêmkirin, pir xirab serê wan li tatekî ketiye.

Ez pir mijareke ciddî nabînim, li dora Osman Ocalan û Cemîl Bayik komek heye yan tine ye. Lê eger hebe, ev kom hemû bi zanebûn, an jî bi nezanî neçar in bibûna komên tasfiye û revê. Pir girîng nîne ku yek jê zêde û ya din jî kêm nêzî vê rastiyê ye. Di pêvajoyên bi vî rengî de li van tiştan bi xwe rêvekirin paşveketin e û wendakirin e. Ji dem, enerjî û şerefê.

Mijara min zêde eleqeder dike ew e, çi peyva di paşnavê Osman Ocalan de, çi jî helwestên koma din ên xwe digihînin min, di dîmenê xuya dike de wek bi hev ketine xuya dikin, lê di cewherê xwe de bi min ketine û haya wan ji vê yekê nebû. Ya rastîn, weke di gelek mînakên bi vî rengî de nerazîbûnên xwe yên li dijî min bi du komên sexte, bi pratîk û bi afirandina mijûliyetê nîşan didan. Di qonaxa heyî de dijberiyeke yekser mumkîn xuya nake. Lê dibe ku bi revê bibe. Ev jî li hesabê wan nedihat. Têkoşîna li dijî min wê bi hirs û neyekser bihata kirin. Ji ber ku bi salan hin tiştên li dijî min vereşên di ber sukra wan de kom bibûn. Diviyabû rêyekê bibînin û vala bikin. Hesabekî erzan ê gundiya ye. Dema min fêmkir divê qebûl bikin ku ez şaş nînim. Na eger durustî heye, wê wextê divê li dijî her cure lîstik û gelaciya hundur û der ve, xwedî li wezîfeyên dîrokî derkevin, jixwe ev yek bi tenê di destê wan de heye ji bo xwe ispat

bikin. Eger hêrs û xezeba wan esîl e, divê vê yekê di serketina wezîfeyan de nîşan bidin ku hemû heval li benda vê yekê ne, jixwe hevalek ji xwe re bibêje 'ez durust im' helwesta wî ya sereke ev e. Ez careke din destnîşan dikim ku em vî heqî nas dikin û eger alî bûyerên qewimîn bi kûrahî fêm nakin, wê wextê ez ji wan re qal bikim.

Ez dixwazim di destpêkê de bi şîroveyeke kurt bînim ziman ku ji bo min ti cudahî di navbera grûban de nîne û cudahiya şêwazê wan jî pir girîng nîne. Eger ji ber kêmasiyeke ciddî ya agahdarkirinê şîroveyeke min a şaş hebe, jixwe ez weke yekî timî xwe rexne dikim dikarim wê çewtiyê ji holê rakim û karekî zehmet nîne ji bo ez rûmeta hevalên xwe biparêzim û nehêlim pirtikeke toz xwe lê deyne.

Ez li ser komên li dijî hevdu, lê di rastiyê de li dijî xeta Serokatiyê û ji rê derketî pir ponijîm. Bûyerên di dîroka tevgera me de qewimîn û di rastiya me ya civakî de nebûna yekîtiyê, nekarîbûna avakirina rêveberiyên xwe, beredayî, timî li dijî hevdu sorkirî heman tiştin û bi vê çandê xwedî dibe. Kesên li pey ferdiyet û berjewendiyên xwe, rêbaza yekem a serî lê bidin çêkirina komeke teng e. Ya tê westin ew e ku li ser parçeyekî bi tesîr bibe. Serketina dîrokî ya rêxistiniya me bi dawî hîştina tesîra vê çandê têkildar e. Her weha di civaka me de axaftinên tewş, kaprîsên paşverû û apolîtîkî xwe di van helwestan de nîşan dide. Mirov dikare pir li ser hîmê wê yê objektîf rawest e. Min di vê mijarê de analîzên berfireh kiribûn.

Gelek kesên tasfiyeker - hînê jî tê bîra min - ev îdîa dikirin; "PKKê jiyana me ji me dizî." Çi li zindanê, çi jî li der ve gelek hewldanên tasfiyeker îdîayên bi vî rengî dikirin. Bêguman, serokatiyek bixwaze gelê xwe bibe rizgariyê û welatê xwe azad bike, wê di şûna armancên civakeke teng û ferdî de neçar ji bo armancên mezin û azad dikin jiyana endamên xwe û canê wan li ser hîmekî rast bi kar bîne. Wekî din rêxistin û serokatî nabe. Wêjeya jiyana civakî jî ji bo vê yekê amûrek e. Wexta hewce bike ku kesên nekaribin eskerî û siyasî bijîn wê nekaribin jiyana xwe ya civakî sererast bikin, eger bikin jî divê were fêmkirin ku ew jiyaneke xerîb ketiye. Eger emê bi şerefa rastîn azadî û qehremaniyê binirxînin, kesên têkoşîna xwe di asta herî nizim de jî nekaribin bigihînin serketinê, jiyana wan a civakî, malbata wan, heval (jin-mêr) û zarokên wan hebe tinebe jî zêde maneya wê nîne. Têkoşerên têkûz divê van rastiyan ti car ji bîr nekin, naxwe divê xwe bi awayekî din bi nav bikin.

Pir baş tê zanîn, ji bo ku ji temsîla min a serokatiyê bêhna malbatê neyê min pir hewl daye. Hin meylên Osman Ocalan ên têne

zanîn, dîsa min bi awayekî berfireh rexne kiriye û bi cih aniye. Tevî vê yekê, di kêmasiyek min a herî piçûk de yan jî rewşên Osman dikin bahane û di nav rêxistinê û derveyî wê de dixwazin hewldanên rizgarbûna ji 'Ocalanîzmê' zêde bikin ku ev pir seyr û sosret e. Di rojnameyekê de hinekan gotiye; "Heta rizgarî ji Kemalîzm û Ocalanîzmê nebe çepgirî pêş nakeve." Kesên vê yekê dibêjin baş tê zanîn di nav ferdiyeke herî rezîlane de dijîn. Pir serserî û xafîl in. Eger rojeke jiyana min a ez dijîm karibin rakin, ez amade me hemû mîrateya xwe bidim van sextekaran. Ev kes ew çend rezîl û xafîl in, nizanin em nebin, ewê ji mafê jiyanê jî bêpar bimînin.

Baş tê zanîn, Osman Ocalan bi kêmasiyên xwe demeke dirêj tevî tevgerê ez jî kirime nav rewşeke zehmet. Ji sala 1980'î ve nekarîbû pêvajoyê rake. Hisî dibû û lewma di teoriyê de nekarîbû kûr bibe. Hin tiştên dikirin jî ji encamdanê dûr bûn. Pir bi hêsayî dikarîbû bibe xwedî helwestên seresere û xwexapandinê. Di şerê îxanetê yê hêzên Başûr ên sala 1992'ê de rewşa wî neçariyeke mezin bû. Bi meyla ket navê, eger tedbîr nehata wergirtin, wê di encamê de bibûya amûrekî bi karanînê yê Talabanî. Lê bi awayekî objektîf koma Cemîl û Cemal jî ji îmhayê xilas kiribû. Helwesta min jî ev bû; li şûna ku em her tiştî wenda bikin, eger hin nirxên em bi dest bixin hebin em wan bi dest bixin. Encamên mehkemekirina Osman têne zanîn. Bi wê sedemê min hewl dabû mijara malbatê dûrûdirêj rave bikim. Ji nû ve ketibû pêvajoya pêşketinê. Tevî ku polîtîka teng dizanîbû, lê ji aliyê teorîk ve kûr nebû, dikarîbû rê li ber rewşên tehlûke vekira. Kesayeta wî dest dida vê yekê. Navendeke bi aqil eger baş binirxanda pir dikarîbû bi kêr bihata. Ji bo vê jî diviyabû navend pir polîtîk û bi tedbîr bûya. Ez nizanim, têkiliyên wî yên dawî bi DYE re dişibin têkiliyên berê yên bi Talabanî re. Qadeke rê dide mirov xetayan bike. Lê bi awayekî bi kontrol mirov dikarîbû van têkiliyan bi kar bîne. Rewşeke bi fikar e hemû erk danê. Eger ez bûma minê wisa bikira. Ez yeqîn nakim ku bi serê xwe ev çend bi DYE re ketibe nav têkiliyan. Yekser neyekser hin îştîrakên din dibin.

Têkiliya wî ya duyemîn jî wek 'jiyana hemdem, zewac, polîtîka kirin, esas dîtina Başûr û hwd' xwe nîşan da. Ez vê meylê nas dikim. Her çend niyeta wê xirab nebe jî mîna di sala 1992'ê de ji encamgirtinê dûr bû. Jixwe ji helwestên DYE û KT derdiket holê wisa ye. Min di sala 1992'ê de ji pêvajoya dîplomatîk bawer nekiribû. Wexta Ozala di sala 1993'ê de meyl nîşan da, min rewşa wî bi gotina "xetaya zarokan dike" nirxandibû. Çi bi sera de hat tê zanîn. Diyaloga li Îmraliyê neyê pêşdebirin, ez meraq dikim wê çawa li

Iraqê were pêşdebirin. Dîsa jî eger firsend hebe ez li dij nînim ji bo nenirxîne. Eger têkiliyên siyasî û dîplomatîk bi Îran, Sûriye, DYE, YNK û PDKê re neyên maneya teslîmiyetê û nebin cihê xwe penakirinê, her tim wek pêdiviyek polîtîk dibe werin ceribandin. Lê ji bo vê yekê şertê bingehîn ew e, di nava welat de ji bo çeperên têkûz xebat were kirin. Ez di vê çarçoveyê de helwest û dîtinên xwe diyar dikim, lê mijarên zewac û jiyaneke hemdem pêwîstî pê heye em zêde li ser rawestin. Eger mesele di çarçoveyeke sivik a civakî û biyolojîk de bi sînor bimana minê hîç behs nekirana. Lê aliyên wê yên ciddî yên siyasî û çalakî hene. Min bi xwe jî ji nêz ve eleqeder dike.

Ez bi hewayek wer hesiyam ku min di warê jiyana civakî û jinê de kêm û di rewşeke şaş de dibînin. Ev rewşek heta dawiyê cahîlane bû û dibû tehlûke ku têkoşîna mezin û çi diqewime neyê dîtin, her weha bi awayekî bê sewiye xwe ferz dikir. Min ji destpêka vê parêznameyê nîşan da ku ez ji heft salî bi dora xwe re ketim şerekî sosyalîteyê (yên vê yekê nikaribin tam binirxînin nezanên mezin in, an jî xwediyê nerazîbûneke mezin in) û min ev yek ji bo têgihîştinên derkevin bibe bersiv bi bîr xistine. Li hemberî yekî mîna min ku ji heft salî pêve bi mafê sosyalîteya dayika xwe re ketiye têkoşînê û ev hêz nîşan daye, qalkirina 'jiyana sosyalîteya hemdem' li dijî min tê maneya şer. Ev ne tenê şerekî sosyalîteyê ye, di heman demê de aliyên wê yên siyasî jî hene. Ji bo mijarê rohnî bike, min mînaka Kesîre ji bo vê yekê, hewl da dûrûdirêj îzah bikim. Tênegihîştina li min û jinê, li 'Apo û jinê', ne tenê ji bo PKKê, ji bo serdema me jî wendahiyek e. Di serdema me de yek ji kesên şerê mezin ê ji bo jinê meşandiye ez im. Di vê mijarê de ez pir ji xwe piştrast im. Ez yeqîn nakim ku kesekî mîna min hebe, têkiliyên civakî, siyasî û eskerî yên li dora jinê ev çend bi kûrahî çareser kiribe. Çi sosyolog, çi aşiq, çi jî esker an jî siyasetvan be. Ez neçar im bînim ziman ku min eşq û evînên gelek hevalên xwe yên egîd ên keç û xort taqoz û asteng kirin ji bo vê jî min teorî û helwestên teorîk ên dûrî aqilan nîşan da. Ez di wê rewşê de me ku karibim formulê bibêjim.

Ji ber ku min di beşên din de nirxandibû, ezê wek wan temam bikim bînim ziman. Di çarçoveya Rojhilata Navîn de min şerê 'namûsê' mezin meşand û di serî de diya min, li pey wê jî min ev kevneşopiya hemû gelê Kurd û gelên din ji naveroka wê ya sivik û çor a cinsî derxist û bi hostayî nîşan da ku di nav şer û siyasetê de çawa dibe xwedî mane. Encama vê yekê jî ew bû ku jin netew, çîn û cinsê destpêkê ye ku hatiye kotin û mêtin. Ji sedî sed çi têkoşîna

sosyalîst û demokratîk dibe bila bibe, eger wek cins, çîn û millet di azadiya jinê re derbas nebin wê nikaribin bigihîjin armanca xwe. Di civaka Kurd de têkiliya xwe nespêre jin û wekheviyê, ji aliyê teorîk û pratîk ve pêşdebirina wê esas nebîne, ti qîmeta zewacê, cinsî û eşqê nîne. Min bêzar bike jî ezê dubare bikim ku têkiliyek bi vî rengî ji têkiliyeke 'mala taybet û giştî (kerxane) zêdetir ti qîmeta wê nîne. Ji bo min soza ji jinê re tê dayîn, hevaltiya pê re maneyek wê ya felsefî kûr û dîrokî heye û her weha hewldaneke pratîk a welatparêzî, azadî û wekheviyê di nava xwe de werdigire. Cihê xemê ye, ferq nayê kirin ku min bi qasî teoriyeke rastîn a eşqê, şerekî wê yê mezin meşandiye.

Ez vekirî hîştina atmosfera di nav refên me de li eşqê wek pêdiviyeke pêşketina azadî, şer, wekhevî û demokrasiyê dibînim. Li cihekî ku li eşqê vekirî nebe, demokrasî, azadî, wekhevî û welatparêzî pêş nakeve. Heta jin bi awayekî mezin ranebe pêdarê ti doza şerefê ya gelan bi ser nakeve. Di nav tevgera min de azadiya jinê di serê nirxên bingehîn de tê. Jixwe tevgera jinê li tevahiya cîhanê di şoreşên civakî de ku bûyerên nû diqewimin, aliyekî bingehîn e. Şoreşa jinê di nava şoreşê de şoreş e. Têgihîştina li jina azad, jinûve têgihîştna li dîrok, civak û jiyanê ye. Yek ji wezîfeyên bingehîn ew e ku divê mirov jinê ji paşverûtiya dînî ya feodal û metakirina kapîtalîzmê rizgar bike. Dîsa yek ji wezîfeyên bingehîn e ku divê mirov jinê ji zewac û exlaqê mêr ê feodalîzm û kapîtalîzm pê barkirî, xilas bike.

Ez hewce nabînim zêde rave bikim. Jin bi rastiya PAJKê neçar e rola xwe bilîze. Min di nirxandina xwe ya dawî de ji bo jinê vegotinên mîtolojîk xwedawendbûyîn, melekbûyîn û Afrodîtbûyîn bi kar anîbûn û ev di cewherê xwe de serhildanê li dijî çanda mêrê serwer ê pênc hezar salî îfade dike. Vê çandê jin xistiye rewşeke xirab. Zewaca naveroka wê mulkiyet tê de yek ji gefxwarinên mezin e. Em heta azadiya jinê pêk neynin, em di ti mijarê de nikarin jiyaneke bi nirx û manîdar li qadeke hêjayî jiyînê bibe, biafirînin. Wê şerê mezin ê jinê bibe. Heta ev şer nebe wê welatparêzî û wekheviyê pêş de neçe. Eşq berovajî texmînan, teorî û pratîkeke tam a sosyolojîk dixwaze; yanî em nikarin daxînin arzûyên sivik ê du ferdan. Eşq egîdiyeke mezin, serketin û evînê dixwaze. Yê-a serketina wî-ê nebe eşqa wî-ê jî nabe. Rûyê eşqê timî li şerê serketinê yê azadiyê ye. Eşqa kedkariyê ya ez li pey diçim mirov dikare wer tarîf bike.

Bêguman em dizanin ferd ji du cinsan pêk tên. Lê em li meydana şer in. Ji ber ku fatihan her tiştê me zevt kirine, jinên em bibêjin ên me ne, nînin. Jinên heyî bi kalîteyeke erzan kirin meta û alav, ha ew jin hene. Têkiliya şervanên azadiyê bi van jinan re di cewherê xwe de ters e. Têkiliya jinên li pey azadiyê bi van mêran re jî hînê terstir e. Ji dema Eflatûn a tê gotin ew e, ya girîng mirov xwe bi îdeayan dewam bike. Dewamkirina xwe ya fizîkî xwe dispêre ajoyên hundur ên cinsî. Ez ajoyên hundurîn ên cinsî nas dikim. Ji bo gelê me karibe hebûna xwe dewam bike qada bi tenê ye, jê re hatiye hîştin. Ew jî li serê wî bûye belayeke mezin. Ya girîng ew e ku zurriyetek îdeal were dewamkirin. Ew jî bi şerên mezin ên felsefîk û civakî dibe. Di encamê de yê nikaribe eşqê şoreşê pêş de bibe, mîna li Tirkiyê, dikare şêwazê jinê yê bi dolbend û sergirtî biceribîne. Bêyî bixînin qada eskerî û siyasî, bi jineke karibe li mala xwe rûnê bi şertê îxanetê li wezîfeya xwe nekin dikare destûra zewaceke ebdiyetê were dayîn. Lê ez dubare dikim. Zewacên bi vî rengî zewacên nîzamê berê ne, divê bi qada eskerî û siyasî neyên kirin. Naxwe wê deriyên atmosferê heta dawiyê li bandorên jiyana koleker a feodal û kapîtalîst were vekirin. Di artêşên nîzamên paşverû de jî ev tişt nînin.

Rastiya li cem me diqewime hinê girîng û dîrokî ye. Min ji bo komek hevalên jin têgînên xwedawendbûyîn-melekbûyîn-Afrodîtbûyîn pêşniyar kirin, çanda Rojhilata Navîn bi awayekî xeternak jinê dike kole, ji lewra ji bo şerê li dijî vê çandê min ev têgîn pêşniyar kirin. Di vê dema dîrokê de hewceyî bi vî cureyê jinê, bi vî nifş û zurriyeta jinê heye. Jixwe bi sedan ji wan bi qehremaniyên xwe yên herî mezin û şehadetên xwe ev rastî ispat kirin. Bîranîna wan maneyeke mezin îfade dike. Ez hînê jî yeqîn dikim ku gelek jinên me yên leheng hene. Kesayetên wan ên mezin, bi cesaret, bi dad û bi eşqê nû derdikevin holê. Mînakên neqane yên mejiyê hisî û analîtîk ji nû ve diafirînin. Ev qonaxeke girîng a dîrokî ye. Min bi xwe jî cesaret nekir bi van jinan re bibim ku xwediyê vî cewherî bûn, hela hela bi têgihîştina nîzamê li derveyî me min hîç newêrîbû wan bikim pîrek û nikarim bikim jî. Em ji bo bi hêzbûna jinan çi bikin hindik e. Ew jixwe eşqê kollektîf temsîl dikin. Gelek heval hene mirov bi wan serbilind bibe. Ez di vê qonaxê de bawer nakim ku evîna taybetbûyî pir bi xêr be. Di nav şertên aştiyê de bêguman wê zewacên azad bibin. Lê di van şertên heyî de, nemaze di meydana şer de zewacên azad çiqas dibin, ez jî tê de, ji pratîka hin hevalan hatiye fêmkirin.

Di vê mijarê de ez naveroka rastîn a zewaca Osman bi jina eslê wê Îranî re baş nizanim. Dibe ku maneyek wê ya siyasî jî hebe, yan jî dibe ku heweseke sivik a zewacê be. Lê eger vê yekê weke pêdiviya jiyaneke hemdem di nav hevalan de belav bike, dibe meylek pir tehlûke. Heta cesaretkirina wî ji bo vê yekê bi xwe tehlûke ye. Di demên buhurî de hin komên di nav çepên Tirk de bi vê rêbazê hema hema rêxistinên xwe qedandin. Ez dubare dibêjim; bêyî ku bikin meseleya siyasî kesên xwediyê zewacên gundî, bajarî, bûrjûwaziyên piçûk û yên dixwazin hînê nû malê deynin, bi şertê di wezîfeyên xwe de serketîbin, bi destûra rêxistinê hin kes dikarin dewam dikin. Bi biryarên keyfî yên ferdî nabe. Dem ne dema dewamkirina zuriyetê ye, beriya her tiştî dem ew dem e, em li pey îdealên xwe yên welatparêzî, siyasî û zêhnî ber bi serketinê ve baz bidin. Heta şertên herî kêm çênebin, zilamtî-pîrektî, zarok û eşqê bibin bela serî. Ez heta dawiyê ji eşqê re bihurmet im. Lê eger çalakî û felseya me digihîne wê nebe, ez hata dawiyê xwe ji xapandinê re dibêjim; na. Di çaçroweya van têgînan de ez bawer dikim ku wê hewldanên pratîk me hînê azad bikin û wê rê li eşq û evîna em bi hesreta wê vekin.

Jiyana hemdem û penaberbûyîna xwe bispêre Başûr dîtinên watedar nînin. Jiyana di rewşên awarte de jiyana şoreşgerane ye. Helwestên penaberbûyînê di her warî de tehlûke ne. Mirov dikare ji bo zarokên normal, kal û pîran û hin jinan behsa jiyana muhaciriyê bike. Mirov dikare Kampa Mexmûrê weke muhacir bi nav bike. Lê helîna di nav Kurdên Iraqê de ne ji taybetî û ne jî ji giştî re xizmetê dike. Eger me jî li Sûriyê penabertî qebûl bikira, yên bi serê me de hatin nediqewimîn. Ez nizanim ev xusûs hatine axaftin an na. Lê di mijarên mîna van de dîtin û pratîkên we têne zanîn. Osman Ocalan û koma pê re divê guh bidin disîplîna KONGRA GEL, ev ji bo wan rêya bi tenê ya şerefê ye. Dema bibin xwedî helwestên nirxên bingehîn ê tevgerê bifiroşin encam têne zanîn. Di her warî de divê xwe li gorî serketinê bidin meşandin û ev zêde zêde girîng e. Eger xwe bi helwestên întîharwarî biavêjin hêzekê wê gavavêtinên bi vî rengî neyên qebûlkirin. Di van mijaran de eger ez baş werim agahdarkirin ezê nirxandinên hînê rast karibim bikim.

Em nizanin Cemîl, Dûran û Riza çiqas bûne grûbek. Xebatên Riza yên li Ewrûpayê mîna ku pir afirîner nebûn xuya kirin. Tevî ku ez nizanim destwardanek li DEHAPê bû nebû, encamên nîşaneyan didin xuyakirin ku bi kêra demokratîkbûyînê nehatine. Ez îdîaya darbeyê ciddî nabînim, lê demeke dirêj e, bi awayekî objektîf ji dûr ve rewşa komekê nîşan dide. Di encamê de derketina du seriyan zirar

daye û rê nedaya pêşketinan. Eger bi serê xwe bihata hîştin gelo, wê biçûya ku? Eger Kongreyê di komîte û rêveberiyan de xebateke kollektîf pêk bianiya û heqê wezîfeyên bingehîn bihata dayîn wê di dema krîtîk de bibûya helwesta herî rast. Ji ber ku dem bi vî awayî hatiye bi kar anîn bûye gaveke paş ve hatiye avêtin û bandoreke neyînî li ser me û gel kiriye. Li gorî soza rexne û xwerexnekirinê tevnegeriyane. Herçî bûyerên qewimîn wê di kongreyê de bêne nirxandin, wê rexne û xwerexnekirin bibin û mînakên têkûz werin nîşandan.

Ji bo di pêvajoya rexne û xwerexnekirinê de rewş hînê baştir zelal bibe û her kes lê serwext bibe, dabaşên emê li jêr destnîşan bikin, girîng e werin rohnîkirin:

1- Hatiye fêmkirin ku bi girtina min a pêvajoya Îmraliyê re, gelek hevalên me yên xwe navendî dihesibînin, hesabên piştî min kirine. Mixabin, cihê xemê ye, ku divê ev hesab bi awayekî berpirsiyarî bihatana şîrovekirin, lê li ser hîmên şaş hatine danîn û hûnandin. Ev helwest di heman demê de nîşan dide ku bi saziya wek 'serokayetî' xîtabê dikin re nebûne yek. Ev taybetiyên ji destpêkê ve hene, bi sedema ez di bin şertên herî krîtîk de me derketine holê. Li bendê mane, ka ezê sax bimînim nemînim, ezê teslîm bibim nebim. Diyar e ku li ser gerîlla, hêza girseyê, rêxistiniya siyasî, medya, hêza jinê û muhtemelen li ser hin hebûnên maddî û yên din têkoşîna serdestiyê bêyî xebera min meşandine. Ya esas, ev dewama meylekê ye ku xwe di beriya 15'ê Tebaxê de, hetta li gorî rêzê di sala 1986, 1987 û 1992'ê de di demên herî krîtîk de xwe nîşan daye û daye dest. Di dîrokçeya tevgera me de ev xusûs bi firehî têne zanîn. Ez bi xwe jî li van meylan hayedar im û bi awayekî adaba hevaltiyê xira nekim min timî rexne kiriye ji bo em wê li dawiyê bihêlin. Ev hewldanên min têne zanîn. Lê diyar dibe ku ev hewldanên min ên durust careke din baş nehatine nirxandin. Ev jî xusûseke din a girîng e, derketiye holê.

Ez pir watedar nabînim ku vê parçebûna dema dawiyê derketiye, bi nav bikim, lê dîsa jî ji bo alî xwe nas bikin, ezê sê navan bidim. Eger hewce bike ezê hînê berfireh binirxînim. Koma yekemîn Cemîl Bayik, Dûran Kalkan û Riza Altûn e, koma duyemîn jî Osman Ocalan, Nîzamettîn Taş û Xidir Yalçin (Serhat) e. Pir zehmet e, mirov ji wan re bibêje grûbeke tam rêxistinkirî. Mirov bibêje însiyatîf rastir e. Yên di navberê de jî hene. Ez nizanim ên di cewher û şekil de bi min ve girêdayî hene nîne, eger hebin jî ez nizanim kî ne. Herî dawî Koma Amadekar a ji bo Jinûve Avakirina PKKê bi 12

kesan hat damezrandin jî wê girêdana wê bi min di pratîkê de diyar bibe. Ti îtîraza min li kesayeta wan nîne, di cewher û şêwe de wê min çiqas bidin jiyîn wê di pêvajoya pratîk de diyar bibe. Ji vî alî ve ez naxwazim tengav bikim.

Ez şêwazê têkoşîn û zêhniyeta her du koman hêjayî kevneşopiya me ya bi şeref, perspektîfên me yên teorîk û rastiya 'min' a hînê li heyatê nabînim û destnîşankirina vê rastiyê bi van gotinan şêwazê herî sivik e. Min ti car hêvî nedikir ku wê ev çend bibin xwediyê hêrsa îqtîdarê, wê bibin mîratxur û bibin xwediyê helwestên li dijî paşeroja têkoşîn û gelê me û min hêvî nedikir wê ew çend li hemberî min bêhurmet bibin. Bi vê wesîleyê min xwezaya mirov hînê baştir û ji nêz ve nas kir. Ji ber ku guh li hişyariyên min nehatine kirin, dîsa min fêm kiriye ku çawa çîn, civak û zêhniyeta etnîsîteyê nas nake û di nav 'nîhîlîzmeke' hişk (înkarkirin) de mane. Ev hevalên min ên bi vî rengî yan xwe zêde berdane, yan jî ketine nav hin mijaran hînê haya min jê nîne. Lê divê ez vê yekê bizanibim. Her weha ji ber ku pir bêperwa li dijî hevdu dibin xwedî helwest, mirov dike xwdî guman û tê hişê mirov ku gelo, bandorên der ve hene. Ez yekser divê li vê mijarê zêde bikim ku ez di wê rewşê de nînim bi awayekî sûbjektîf û hisî van hevalan binirxînim. Ez li ser navê wan, rewşa xwe xistinê, ez ji rewşa hatime xistinê bi êş û elemtir dibînim. Ez şaş dimînim ku li cihê sedemeke ciddî nebû çawa xwe xistin vê rewşê.

Tevî vê yekê, ezê ti car bi awayekî heqaretwarî nêzî van hevalan nebim. Her çiqas ez baş dizanim her du aliyan li ser min lîstine ezê vê uslûbê bi kar neynim. Lê ezê tenê van rastiyan eşkere bikim:

a- Divê hevaltî, dostanî û dijminatî bi min re vekirî û bi merdî were kirin. Em gelek caran rûbirû bûn. Ti car bêhurmetî nîşan nedidan. Ez şaş dimînim; çawa dixwazin min wisa bêfonksiyon bikin? Lê herçî ez bûm ji bo rûmeta wan xilas bikim, bi qasî çiyan min ked da û xebat kir. Dunya alem dizane, beriya xwe min ew mekanên bêhna dîrokê jê tê bi xebateke dijwar ji wan re amade kir. Ez nabêjim nirx û buha min afirandin. Hemû yê gel in, rondikên çavên gelê me yên xizan in, tirsên wan û li pey rasthatina wan a li îxanetan, nirxên wan ên bi hezar zehmetiyê me berhev kirine. Nirxên wan ê nirxên welatê wan in. Nirxên welat û gelên min in, ku ji bo demançeyekê, ji bo malekê û ji bo hevserek min bibe tu car min nekarî curet û cesaretî wan bikim. Ji ber ku ez hêja nebûbûm, min hîç gunehê xwe bi xwe nedianî û diperpitîm ji bo ew nirx hînê baştir û serketî bibin.

b- Li cihê rewş ev e, hinek mîna bibêjin "Li pişt min heft hezar gerîlla heye, yê çep binere ezê çavê wî derxînim" helwest nîşan dan ku min ev yek bi heyret pêşwazî kir û nankorane dît. Hevalên vê dibêjin, bi qasî wê hejmara gerîlla yên din jî dan revandin, yan jî bi sedema bi taktîkên rast nedan şerkirin, di nav şertên bi êş û qehir bidin de, dan rawestandin. Hevalên din jî li ber serê xwe, li hemberî şehadeta bi hezaran ciwan û hevalên mîna parçeyekî kezebê, xemsar bûn û helwestên wan ên di vî warî de egoîst ew çend jî bi êş û nankorane bûn. Gelo, li hemberî van rastiyan divê em guftûgoyên "ezê wezîfe bigirim, negirim" çawa tarîf bikin? Divê dîsa ez xwe mînak nîşan bidim. Ez wexta li der ve bûm, bawer dikim we fêm kiribû ku ez tama parçeyekî nan nakim. Ev şeş sal e jî di rewşa bahewa ya derya Îmraiyê de ez di neqebekê de bi zehmetî hebûna xwe ya biyolojîk dewam dikim û bi zorê hilmê dîstinim, lê tevî vê jî min kêliyekê jî xwe nexistiye rêza pêş. Ez ji bo xwe xemgîn nebûm. Min ji bo gel ji piştê xencerkirin qebûl nekir. Tevî ku hêzên dunyayê bi qasî serê derziyê hêvî nehîştine, ji bo hevalan, gel û mirovatiyê hewl didim helwest û ramanên baş hilberînim. Ez di ya bêîmkan de bi serketim. Qet nebe mirov hêjayî vê hewldanê be. Di vê navberê de divê ez vê jî bibêjim ku ev KT ya hûn hîç naecibînin we nekarî ciddiyeta wê nîşan bidin, ji rewşa min hûn nizanin ji xwe re encaman derbixînin û ji çûn û hatina siyasetan jî we nekarî dersan bigirin, ev bi xwe bêşensiyeke mezin bû.

c- Lê hesabên hûn dikin cihê xwe nabînin. Belkî haya we jê nîne. Hûn hesabê îqtîdar û qaşo şerê wê dimeşînin. Lê hûn di mijara îqtîdarê de ji heriyê zêdetir xwedî kesayetiyeke belavbûyîne. Hûn rojekê milê xwe bidin ber hûnê belav bibin. Min timî bang li we kiribû ji bo hûn bi terbiye bibin. Ji ber ku wê dost û alîkarê we nebin. Ya li benda we jî wek yên beriya we ya îxaneteke rezîlane, yan mirineke ne hêja, yan jî wek hûn timî dikin wê rewşa we ya bi pirsgirêk be. Ev alternatîf rêyên baş nînin.

Timî îdîa hatiye kirin ku min ciwaniya we diziye. Erê, min dizî. Erk û wezîfeya min a dîrokî ev bû. Minê ciwantiya we bidiziya û bixista xizmeta doza azadiya gel û welatê we. Vê yekê pir zêde hûn hêrs kirine. Di kongreyê de biryara zewacê û nizanim biryarên çi, tevgerên we yên bi armanca tolhildanê ne. Osman jî di vê mijarê de rola kera mayîn teqandinê bi cih anî û mirov nikare para hostatiya we ya di vê yekê de kêm bibîne. Ez timî li ser hîmên azad alîgirê evînê bûm ji bo ji dozê re xizmetê bike. Wek min got, ne hûn ji evînê û ne jî hevsertiyê fêm dikin. Di vê mijarê de ya hûn dikin, bi awayekî

kevneşopî hûn hevdu dilewitînin. Min xwest ez we ji vê yekê bikim. Divê hûn yeqîn bikin ku min keçikên herî bedew ên cîhanê û xortên egîd ji bo rojekê evîna rast nas bikin, derxistin wan çiyayên pîroz ku di dîrokê de wek 'textê xweda û xwedawendan' têne zanîn. Ma bi we re dil û mejî heye vê yekê fêm bike? We beşekî mezin ji wan bêyî ku bikin xwediyê serketinekê û bêyî ku gorên wan bibin we ew veşartin. Li şûna ku hûn rûnên bîranînên wan teze bikin, eger hûn di dewsa min de bûna li dijî van tiştên we li ser min ferz kir, hûnê bibûna xwedî helwestek çawa?

d- Ji min re antî-tez neynin. Ez dizanim hûn li dijî hevdu çi ne. Ez di navbera we de jî cudahiyê nabînim. Tevgerên we her du aliyan jî li dijî min in. Ji ber ku min hûn ji vî şêwazî şer nekiriye, xwe gunehbar dikim. Lê dîsa min pir bêhêz nebînin. Hêza min heye ez hin tiştan bikim. Ez di gorê de jî bim wê hebe. Ez pir rica û tika dikim, ji bo bexteweriya xwe, ji bo ewlekariya xwe di nav tevgerê de tavilê van rêbazan biterikînin. Hîç nebe hûnê cara yekemîn merdiyekê bikin. Ez naxwazim li dijî we hêzê bi rêxistin bikim. Ezê ji gel û avahiya bi rêxistinkirî lêborîn û bexşandina we bixwazim. Ji sedî sed divê hûn jî ji vê efûyê sûd werbigirin, demeke dirêj bijîn û bi vî awayî kêmasiyên xwe telafî bikin. Rêya yekemîn ev e.

Rêya duyemîn, di nav rêxistinê de heft hezar jî nebe belkî komek we ya gerîlla hebe. Hûn dikarin vê koma xwe biparêzin û şer bikin. Di vî warî de hûn azad in. Wek meyleke cuda hûn dikarin nav jî li xwe bikin. Lê tenê vê hêzê li dijî min bi kar neynin. Ji ber ku wê demê ezê neçar xwe biparêzim. Hîç diyar nîne ku kê wenda bike. Her weha divê hûn şêwazê xwe yê aştî û şer li dijî dost û dijminan eşkere bikin, dîsa armanc û daxwazên xwe vekirî îlan bikin. Hûn kî ne, li dijî çi ne, hûn çawa dixwazin şer bikin? Bila her kes vê yekê bizanibe ku li dora we kom bibin. Bi vî awayî hûnê jî qîmeta xwe ya rastîn îspat bikin. Eger hûn vê yekê bi rastiyên giştî bikin ezê jî we destek bikim. Krîter û pîvanên parêznameya min a dawî diyar in. Bi qasî ku ji destê min were, ezê bi xêr nêzî berxwedanek we ya li ser vî hîmî û şerekî we yê parastinê bibim. Yanî têgihîştina we ji bo min nîşan neda ezê we jê mehrûm nekim. Ev yekê mînakeke destekê be.

Hûn helwesta min a li dijî çetetiya dema nêz dizanin. Bi kurtî eger evqas hesabê ji bo îqtîdarê ji bo daxwazên gel ên rewa bin watedar e. Ji bo vê jî hîç hewce nîne hûn hevdu gunehbar bikin. Şerê we bi salan kiriye qirakên beratan bi bîr tîne. Hûnê dev ji vê yekê berdin. Hûn hemû wek hev in. Divê hûn xwe bikin û bersivê bidin daxwazên gel, jixwe wekî din çareya we nîne. Bi salan, bi mehan, we

di televîzyon û rojnameyan de tevger tevizand, mirov tenê dikare vê yekê wek hewldana hevrikan a hilweşandina tevgerê binirxîne. Lê divê hûn baş fêm bikin ku gel ewqas jî bêxwedî nîne. Gel û nirxên bawer dikim we li ser hesab çêkirine ji me hemûyan bi hêztir in û xwediyê nirxan e. Eger em hêja bin wê me himbêz bikin, naxwe wê di rojekê de me biqedînin. Divê hûn vê yekê fêm bikin. Kêliyekê be jî ti car ji bîr nekin ku hûn xwe dispêrin hêz û nirxên gelê hînê di şexsê min de temsîla wî tê kirin û hûn hilmê distînin.

Her tişt we dawet dike ji bo hûn bi awayekî ji dil, bi nefspiçûkî û ciddî rexneyê li xwe bigirin. Eger hûn durust bin hûnê di bi cihanîna ya hewce de dereng nemînin. Naxwe wê rêya we bibe ya çeteyên Çarîn, M. Şener û S. Çurukkaya û yan jî hûnê deynin holê ku hûn provakatorên baş in ku ji vê wêdetir wê mane lê nekeve. Gelê me, gerîlla û serokatiya me ya îdeolojîk wê xwe biparêzin û di doza jiyana azad de wê bi biryar bimeşin û kesê nikaribe wan ji vê rê bike.

2- Kesên ji xwerexnekirin, aheng, yekbûyîneke rast û pêdiviya jinûve avakirinê bawer dikin, li vê yekê serwext in û bi biryar dixwazin li berpirsiyariyên wê yên wijdanî xwedî derkevin, parêznameya min ji bo wan di qîmeta alîkarek mezin de ye. Mirov ji bo xwe û rewşê xilas bike, rexne li xwe nagire. Ji bo bersiva dîrok û gel were dayîn, ji bo serketinê mirov rexne li xwe digire. Ji bo kesên bigihîjin hêza entelektuelî xwedî girîngiyeke mezin e. Jixwe kesên nikaribin veguherîna zêhniyetê bikin, divê were fêmkirin ku derdekî wan mîna doza şoreşê nabe. Eger pirsigirêkeke bi qasî av û hewayê girîng di rojeva we de maye û hûn nikarin çareser bikin, divê em sedemên wê yên bingehîn li cem xwe bibînin. Bi grûpparêziyê em nikarin ji bin pirsgirêkê derkevin. Em nikarin guneh bixin stûyê derdora xwe, bixin stûyê grûpeke din; ev pirsgirêkan çareser nake, berovajî girantir dike.

Parêznameya min a dawî di wê astê de ye ku ji bo paradigmaya nû ya veguherînê bibe bersiv, û xusûsên hewce di nava xwe de dihewîne. Hêja ye mirov hevok bi hevok dawerivîne hinavê xwe. Herî kêm were fêmkirin wê hêzeke mezin bide û bi qabîliyet bike. Nabe ku wek pirtûkek ji rêzê were xwendin. Ji bo utopya sedsala 21. ya gelan, şaristaniya demokratîk û ji bo sosyalîzmê perspektîfên xurt pêşkêş dike. Ez yeqîn dikim ku hem di warê teorîk de û hem jî di warê pratîkê de xwedî qîmeteke mezin e. Ya rastîn, ji bo pêvajoyeke bi vî rengî rê vedike. Pir hewceye ku heval wê dawerivînin hinavê xwe. Serketinên mezin ên pratîkî, dikarin bi utopyayên xurt, ramanên sosyalîst û demokratîk û li ser hîmê baweriyê bibin. Naxwe xilasî

nîne, wê pir zû bihelin û dejenere bibin, yan jî bibin amûrê destê hêzên din.

Hevalên ku divê berpirsiyariya dîrokî his bikin, pêwîst e bi kûrahî serwext bibin û rexne li xwe bigirin ku ji mezhebên kapîtalîzmê rizgariya netewî û sosyalîzma sed û pêncî salê dawî navend-dewlet qetiyane û bi coş û hêzeke mezin a zêhniyetê hewl didin li alternatîfa dîrokî ya gelan vegerin. Min di parêznameya xwe de nîşan da ku min di vê rê de çiqas gav pêş ve avêtine. Ji min zêdetir, heval hewce ne di vî warî de xwe veguherînin û biponijin. Jixwe ev jî nebe, hûn bi xwe dizanin hûnê mîna qurmekî di şûna xwe de bimînin. Rewşa we ya xwerexnekirinê ji mafdariya we û komên dernakevin holê, ji ber sedemên bingehîn ên ku min di parêznameyê de destnîşan kirine. Divê hûn jî wisa nêzî meseleyê bibin. Eger hûn di vî warî de bi ser bikevin hûnê bibin ku ji nû ve ji dayikê bûne. Ez bawer dikim ku hûn dema bi ser bikevin hûnê mîna lehiyê bi coş biherikin. Hûnê benda derbas nekin, nebînin. Hûn bi xwe jî dizanin, hûn çiqas hewceyî vê yekê ne. Li cihê ku serketin û jiyana mezin hebe, çima em di xwe bi xwe fetisandinê de, çima di asêkirina hawîrdora xwe de israr bikin?

Çendekî berê min ji rewşenbîrekî Elman nameyek wergirt. Bi awayekî welê bi tesîr tîne ziman ku çawa ji parêznameyê bi tesîr bûye, ya rastîn di destê mirov de nîne ji bo mirov nebe heyran. Ez hêvî dikim û bawer dikim, eger hemû hevalên me ji dil ji vê alîkariya me ya bi têgihîştineke mezin hatiye pêşkêşkirin, sûd werbigirin, ne ku wê bibin çavkaniyê pirsgirêkê, wê ji bo hemû pirsgirêk û wezîfeyan bibin hêzeke serketî ya bi performans.

3- Hin xusûsên derbarê şexsê min de hene divê werin rohnîkirin. Peyamên tevî ku di ser benda dewletê re derbas dibin, bi fermaneke ji jor ve ketina wan a zindanan tê astengkirin, ev mijareke girînge. ... (reşkirin heye) ti eleqeya wê bi Osman re nîne. Ya rastîn, rewşa Osman. ... (di navberê de beşekî hatiye reşkirin heye.)

Diyar bûye ku reaksiyoneke xurt li dijî min heye. Bi qasî ku ji der ve agahî nayê dayîn, hin perspektîfên min xwestiye ez bidim jî hatine razandin. Ez dizanim ev beriya helwestên Osman hene. Ne ku li dijî Osman, li dijî min e û ta mesele xwe digihîne dema anîna min a Îmraliyê, ev komploya Ahmet Okçuoglu vekirî dianî ziman, divê were rohnîkirin. Wisa bi nêzîkbûnên provakatîf ên weke "Osman pîrek bir û revand" nayê îzahkirin.

Dikarin helwesta min a li zindanê red bikin; dikarin têra xwe şoreşgerane û welatparêz nebînin. Derdor an jî derdorên pêwendîdar

dikarin vê yekê eşkere bikin. Jixwe rêxistin di destê wan de ye; eger eşkere nakin, ew dizanin girse û gel bi min ve girêdayî ye. Diyar e min ji bo armancên xwe bi kar tînin, lê bi tevahî dixwazin min tecrîd bikin û bêtesîr bihêlin.

Hin nîşaneyên din jî hene. Ez zêde bi mane nabînim ku ez îzah bikim. Xusûsên ez dixwazim hîn bibim ev in:

A- Modeleke rêxistinê hatiye bi karanîn? Çima peyamên min nedane hundur, çima di medyayê de li ser nehatiye sekinandin?

B- Eger di şexsê Osman de nexwestine li min bidin, bersiva wan a dijber çî ye? Hema bêje hemû órfayîtiyê xwestine tecrîd bikin. Tevî ku tê zanîn ez malbatparêz û hembajarîparêz nînim, çima serî li van rêyan hatiye dayîn.

C- Bi îhtimaleke mezin, xwestine yên bi min ve girêdayî û bi hurmet ji wezîfeyên bi tesîr bigirin, wê ev yekê çawa were îzahkirin?

D- Eger rêxistin bi tevahî bihata bi destxistin dixwestin çi bikin? Di warê tasfiyekirnê de hin kes fikarên wan ên ciddî hene. Diyar e hemû kesên bi koma Osman re çûne li pey pîrek-zilaman neçûne. Hinek ji van kesan xwediyê şerefa xwe ne. Bi îhtimaleke mezin, kêm be jî girêdana wan bi min ve heye. Gelo, ya esas xwestin berê xwe bidin vê nuqteyê? Ev heval ditirsin. Yên ji şer netirsin çawa ketin vê rewşê?

E- Eger ev heval kêmasî û gunehên wan ên ciddî hebûna jî, ma ne diviyabû ji bo bi dest xistina wan hewl bihata dayîn? Ji nişkê ve çima ketin pozîsyona revê? Tevî ku tê zanîn ji bo qezenckirina mirovekî bi salan me zimanê xwe qerimand, wê wextê ji nişkê ve têkçûyîna keda salan, emê bi kîjan helwesta însanî, welatparêzî û şoreşgerî îzah bikin? Eger van hevalan li ber xwe bidana herî kêm wê hezar hevalê bimirana, wê berpirsiyariya vê yekê çawa bihata îzahkirin?

F- Di vê navberê de, tevgerên komên çekdar ên bi şêwazê berê hatin dîtin. ...(reşkirin heye.) Min tiştek fêm nekir. Tevî ku me çalakiyên demokratîk pêşniyar kirin, guh nedana vê yekê hûnê çawa îzah bikin?

G- Bêyî agahdarkirina me vekeşandina DEHAPê ji hilbijartinan, destnîşankirina namzetan bi destê ji jor ve, înkara demokrasiyê ye. Xusûs û nuqteyek bi tenê nîşan dide ku rêxistin ji hemû naveroka xwe ya şoreşger demokratîk hatiye guvaştin û pûçkirin. Ev helwesta antîdemokratîk a li her alî hatiye meşandin wê çawa were îzahkirin? Ma nayê fêmkirin ku ev helwest derbeke kujêr e li rêxistiniyê tê xistin?

H- Ne tenê li dijî Osman, dibe ku ev helwesta bi destxistina hemû mîrateya PKKê bi niyeteke baş jî hatibe kirin. Lê çima bêtesîrkirina min hat xwestin? Belkî hatibe xwestin ku min bi temamî jî biqedînin. Yan jî hin sedemên din hene, ez nizanim. Ma ya rast ew nebû ku we beriya her tiştî ev tişt îzah bikirana, manîfestoya xwe biweşanda û rêxistin bi dest bixista? Modeleke veşartî û mafyawarî xwestine bimeşînin. We çawa ev hêjayî xwe dît?

I- De em bêjin we rêxistin hemû bi dest xist. Wê wextê, ma ne diviyabû hûn stratejî û taktîkên xwe diyar bikin û hêza li derdora deh hezar kesî bixista nav tevgerê? Ji ber ku we ev pêngav neavêt, ev hêzê berê wê bi ku ve bihata kirin, we dixwest bi ku ve girê bida? Hêz dema neyê xebitandin, yan dirize, yan jî parçe dibe, belav dibe. Hûn hîç li berpirsiyariya vê yekê fikirîn? Eger hûn bi rêbazên berê bikevin welêt wê rê li ber kaosê veneke? Ji meyla çetetiyê ya di 15'ê Tebaxê de pêş ket wê deh qatan tehlûketir dernekeve holê?

Pirsên bi vî rengî mirov dikare zêde bike. Dibe ku niyeta hevalan bi tevahî jî baş be. Lê pirsên ez dikim jî rastiyekê îfade dikin. Li derveyî îradeya we hebûna bûyer û rewşan nîşan dide. Bawer dikim ku hûn dibînin û lê hayil bûne ku, di hundurê rêxistinê de şerê ji bo îqtîdarê rewşeke çawa xeternak diafirîne. Hûn niha fêm dikin ku ev yek ji texmînan wêdetir zehmet e.

4- Di nav rêxistinê de li bin hin şert û mercan, ketina şerê îqtîdarê dikare hewce bibe. Girtina min a pêvajoya îmhayê, dibe ku wek tedbîr hûn gîhandibin fikra tedbîr stendinê. Di serî de dibe ku her du kom jî bi niyeteke baş tevgeriyabin. Yanî ez we wek komplokerên niyet xirab îlan nakim. Lê hûn dibînin, hem li hundur, hem jî li der ve şêwazê we yê eskerî û siyasî pir bê qîmet e. Hûn hem bi xwe, bi gel, hem jî bi min pir xirab didin wendakirin. Ji niyeteke baş e, lê ev kesayeta we ya bi ti awayî wernagere nasnameyeke eskerî û siyasî di serî de we diqedîne. Lê gelek aliyên we yên baş hene. Mirov dibêje qey we sond xwariye ji bo hûn van aliyên xwe bibin gorê. Eger we bixwesta we çi nekarîbû bigirta? Li ser navê hevaltiyê we çi xwest min neda û negîhand we? Jixwe rêveberî, ji qasî ku hûn li hevdu par ve bikin, zêde ne. Çî ye ev çavsorî û çî ye ev xwe bi xwe qedandin?

Wexta hûn rexne li xwe bigirin, êdî hûnê van aliyan jî li ber çav bigirin. Xwe ji nûkirinê netirsin. Ji kesayeta xwe ya heyî pir bitirsin. Bîst sal e, ez ji bo van aliyên we sebrê dikim. Ji bo van tiştan ez naxwazim pozê kesekî ji we xwîn bibe. Bêyî ku ji paşeroja xwe bitirsin rexne li xwe bigirin. Her wezîfeya hûn dikarin bikin jî bi

nefspiçûkî bixwazin û piçûk nebînin. Ne bixeyidin, ne jî dijminahiyê bikin. Bi helwesteke zanyarane ya hêjayî xwe, li hemberî bîranînên ezîz ên Kemal Pîr, Mazlûm Dogan û hînê bi hezarên din bi biryar soz bidin û giraniyê bidin wezîfeyên xwe.

5- Xuya ye we ji bo lîdertiyê xwe li hev rakişandiye. Ev hem ji aliyê demê ve, hem jî ji aliyê şêwazê ve şaş bûye. Di serî de we fonksiyona min a sosyolojîk fêm nekiriye. Ji ber vê yekê hûn gelek xetayan dikin. Di van demên dawiyê de hin derdoran ez weke "Kemalîzma Kurd" nirxandime. Ev têgîn zêdetir bi awayekî neyînî tê bi karanîn. Xwedêgiravî ji bo pêşketina çepgiriyê divê "Kemalîzm" û "Ocalanîzm" li dawiyê werin hîştin. Min derbarê Kemalîzmê de nirxandin kiribûn. Pir eşkere ye, xwestiye Şoreşa Frensayê bîne Tirkiyê. Ji lewra di sedsala 19. û 20. de di kategoriya giştî ya şoreşan de tê dîtin. Ji ber şertên herêmî bûcirkî maye ku min ev xusûs gelek caran aniye ziman. Min pir qal kir ku em ji nû ve wê di roja me ya îro de bixin rojevê. Çendakî berê nivîskarê Îngilîz Andrew Mango ku di vê mijarê de otorîter tê hesibandin û pirtûkên wê hene, qala heman hewcebûna bi aktualîzekirinê kir.

Xusûsek din a girîng ew e, ku ne tenê Kemalîzm, ji dema ku li Rojhilata Navîn bi cih dibin di çarçoveya hemû netewîbûyîna Tirk de têkiliyên bi Kurdan re xwedî roleke kilît in. Tevî ku ev têkilî di sala 1070, 1515 û 1920'ê de bi awayekî stratejîk rast hat danîn jî di roja me ya îro de ev tayê stratejîk bi awayekî tehlûke li ber qetînê ye. Ji lewra xusûsa bingehîn a ji bo aktualîzekirinê ew e ku têkiliyên Kurd-Tirkan li ser hîmekî rastîn û cewherî werin reformekirin. Naxwe wê têkiliyên Kurd-Tirkan nikaribin xwe xilas bikin ji bo li ser xeteke şer a stratejîk pêş nekevin.

Tevî ku rola min hindik be jî Kemalîzma Kurd dide hesandin, gelek cudahiyên xwe jî hene. Di bingeh de ez dewletparêz nînim û demokratîk im, ev nuqte diyarker e. Ez naxwazim Kurdan li modeleke dewleta millî bigihînim hevdu, ez dixwazim wan li modeleke demokratîk a gel bigihînim tevger û otorîteyê, ev esas e, û pir girîng e. Kemalîzmê li Rojhilata Navîn serdema netewî da destpêkirin û temsîl dike, emê jî li Rojhilata Navîn serdema demokratîk bidin destpêkirin û temsîl bikin. Di navbera herduyan de çiyayê Qaf nîne. Lê mirov nikare herduyan jî bike yek. Mebesta min ji aktualîzekirina wê jî ew e ku em ji netewparêztiya Tirkiyê ya Kemalîst û demokratiya Kurdistanê sentezekê, yan jî derfetên lihevkirinekê lêbikolin. Ev xet xusûseke girîng e. Hem di çareseriya pirsgirêkên Kurd, hem jî yên Tirk de xwedî roleke kilît e. Her weha

ji bo derketina ji kaosa Rojhilata Navîn xeleka bingehîn e. Çi şertên dîrokî, çi yên jeopolîtîk, çi jî yên civakî, nîşan didin ku wê sentezeke bi vî rengî roleke mezin a dîrokî bi cih bîne. Netewparêzên şoven, (netewparêziya Tirk a çepgir-rastgir) netewparêziya Kurd a paşverû û îdeolojiyên îslamtiyê dikin, ji çareseriyê dûr in, yan jî xwedî qabîliyeteke serbixwe û cewher nînin ji bo xwe nespêrin hegemonyatiyê. Îdeolojiyên em behsa wan dikin bingehê wan ên gel lawaz e û di cewherê xwe de bi der ve ve girêdayî ne.

Ji lewra eger hûn dixwazin min li dawiyê bihêlin, divê beriya her tiştî hûn meylên xwe yên îdeolojîk zelal bikin. Tewş e hûn min belovajî bikin, bi kar bînin û bigihîjin encamê. Eger ez bimrim jî ev zehmet e. Bi dehan mînakan xwe ceribandin. Ketin rewşên pir xirab. Bawer dikim ku hûn di wê qabîliyetê de ne ku hûn wan mînakan fêm bikin. Ez dizanim hûn çiqasî dixwazin ji rê derketî û çiqasa wek hevrikekî eşkere derkevin pêşberî min. Lê ez vê pir eşkere bibêjim, herçî ji bo xetekê lêgerîna we bibe û hûn vê yekê bi dijminahî nekin, ezê ji we re heq bibînim. Ji sedî sed nasnameya min a demokratîk vê yekê ferz dike. Pîvan ew e ku mirov xwe di herî kêm welatparêzî û azadiyê de bigihîne hevdu. Lê dîsa jî helwestên komplowarî yên nedurust bibin, wê mafê min ê xweparastinê derkeve holê. Eger ji derbeke kujêr a min xwarî sûd were girtin, ti çarçoveyeke têkûz a îdeolojîk neyê nîşandan, bi mijarên talî yên hatine nepixandin hewl were dayîn ji bo bi destxistina rêxistinê, ezê van wek darbe û komployê binirxînim. Ez niha di wê rewşê de nînim ku bibêjim bûyer bi vî awayî qewimîne. Tenê ez tarîfekê dikim. Ez van rêbazan ku di çanda polîtîk a Tirkiyê de pir têne dîtin, hîç pêşniyar nakim. Rêbazên bi vî awayî bi temamî zirarê didin.

Di van demên dawiyê de rewşa ez qal dikim a di nava tecrîdê de tecrîd kirin û pir têkûz jî nebe hin agahiyên ez pê dihesim îmajekê didin ku mîna min 'xanedanek' ava kiribe û hewl tê dayîn ji bo xirakirina wê. Lê surek hat rakirin mîna ku ev bi awayekî objektîf rast be. Mijara Osman ji bo derketina holê ya vê rastiyê bi tesîr be jî diyarker nîne. Îhtîmaleke zêde ye, meyleke ji der ve û hundurê me be û kokên wê digihîjin demên kevin. Netewparêziya paşverû û çepgiriya Tirk vê vegotinê pir bi kar tînin. Dîsa gelek kesên ji me çûne pir bi vê mijarê re mijûl dibin. Bê şensiyeke mezin e, di kom kombûna vê dema dawî de xetaya bingehîn ew bû ku ji van bûyeran ders nehatin wergirtin û bi awayekî objektîf ji bo Serokatiyê kabê xwe avêtin. Li cem her du aliyan jî xuya dike ku mumkîn e were gotin ji bo hînê zêdetir dilsoz bibin gavên bi vî rengî avêtine. Lê

îhtimaleke kêm nîne ku helwestên nedurust jî hebin. Ev xusûsek e, divê were zelalakirin.

Ez hez dikim ku heval ji min derbas bikin û ezê wan destek bikim. Ez dîsa jî amademe kîjan kom bi awayekî erênî bi ser bikeve destekê bidimê. Jixwe hewceyî bi qelibandin û anîna min a xwarê nîne, şertên min ên tecrîdê hewceyî bi vê yekê nahêlin. Eger di nav rêxisitinê de li dijî min bi rêxistinkirina nerazîbûnan, hebe hebe armanca xwe tasfiyekirine. Ji ber ku tê zanîn ji bo her ferd û koma dixwaze serketî be, desteka me çiqas bi hêz e, û di heman demê de girîng e. Eşkere ye, zirardana min ji bilî tasfiyê wê encama wê nebe. Tevî ku tê zanîn, yek ji kesê herî zêde dijberê malbat û xanedaniyê ez im, destnîşankirina Osman pir rast nîne. Rêxistin di nava rêxistinê de avakirin di bin van perdeyan de nabe. Îhtîmal xuya dike ku ev hatibe ceribandin. Kombûyînên di vî warî de divê bi berpirsiyarê tevbigerin û bizanibin bi awayekî objektîf ev têne çi maneyê û bi vê serwextbûnê xwe rexne bikin û di pratîkê de nîşan bidin. Bi awayekî rast xwe gîhandina rastiya serokatiyê cewherê polîtîka kadro ye. Pêdivî divê yekser bi cih werin anîn.

6- Dibe ku watedar be, hûn min di mijarên şer û aştiyê de rexne bikin. Di bin tesîra komployê de bangawaziya min a ji bo tavilê rawestandina çalakiyan pir bi usûl nebûye. Lê ji ber ku komployê hemû avahiya rêxistinê hedef stendibû û îxanet di kozikê de bû, ev yek li ser biryarê bi tesîr û diyarker bû. Bihêlin ev bangawazî ji bo şexsê min be, tê zanîn li dijî min hat bi karanîn. Avahiya rêxistinê demeke dirêj bêçalakî hat hîştin, ev hinekî ji min bû, lê yê di vê yekê de diyarker rewşa avahiya rêxistinê û fermandar in. Lê mijarek heye em pê dixapin, ew jî ev e; mîna ku her tişt bi fermana min hatibe kirin tê nîşandan. Ji sedî sed gelek çalakiyên ters û pratîk bi navê min hatin kirin. Eşkere ye, ez naxwazim bibim amûrê vê yekê. Di vê mijarê de min hewl da ez pir nazikî tevbigerim. Ne ji bo min, ji bo gel, min timî anî ziman ku divê avahiya rêxistinê li gorî rastiya xwe li şertên şer û aştiyê bigere. Eger zemînê koman xwe spartibinê ev be, mirov dikare fêm bike.

Pêwîst e ez êdî eşkere diyar bikim ku bi vê parêznameya dawiyê re dîtinên min ên derbarê şer û aştiyê de zelal li naverastê ne. Ez di wê rewşê de nînim ku fermana şer û aştiyê bidim. Eger ez bixwazim jî jixwe şertên min dest nadin. Demeke dirêj li gorî daxwaza min meşiya, ez vê yekê wek pêdiviyeke hurmetê dihesibînim. Lê derdikeve holê ku rayedar û karbidestên dewletê ev yek pir watedar nedîtine. Yanî tînin wê rewşê ku dibêjin; eger hêza wan heye bila şer

bikin. Di şertên herî mutewazî de ne ji bo agirbesta dualî, ne jî ji bo aştiyê îrade nîşan dane. Dewlet ji bo tasfiyekirinê bi biryar xuya dike. Dixwaze DYE jî tevlî vê yekê bike. Li pêşiya we du rê hene; yan hûnê bi tevahî teslîm bibin, yan jî hûnê li ber xwe bidin. Li gorî ku hûnê teslîm nebin, hûnê li ber xwe bidin. Ji lewra divê hûn demekê ji ya din zûtir dawî li van komên xwe bînin. Naxwe yê bi israr dewam bike, wê nikaribe xwe ji rola provakatoriyê xilas bike. Pêşdebirina taktîk û stratejiyên şer bi temamî di bin berpirsiyariya we de ye. Hûn di wê rewşê de ne ku ne tenê Hêzên Çekdar ên Tirkiyê, çi hêza çekdar bi ser we de were hûn binirxînin. Divê hûn hevdu hişyar bikin ku wê şerê pir bi liv û lebat be, bi awayekî berfireh li bajar, gund û çiyan be. Divê hûn gel berê hişyar bikin. Divê hûn cara dawî aştî û agirbestekê pêşniyar bikin. Divê hûn pirsgirêka herêmên şer û lojîstîkê çareser bikin. Divê hûn bizanibin xwe ji aliyê çendayetî û çonayetiyê ve xurt bikin. Welhasil ev hemû bi hewldana we ve girêdayî ye.

Mîna heta niha êdî şêwazê xwe yê berê wek we ez bi kar dianîm hêvî nekin. Ez bi israr dibêjim; ez di wê rewşê de nînim ku karibim pratîkên we diyar bikim. Bi tevahî hûnê hewl bidin bi hêza xwe ya cewherî û bi hêza xwe ya stratejîk û taktîk encamê bigirin. Naxwe ya dinê jî bibe ku mîna ji 'ewliya' li benda keremetan bin, ew jî li gorî serdema me nîne. Girîng e ku hûn bibin hêza aştî û şer. Dewlet an jî dewletan, heta hêza we ya şer nebînin wê ji bo aştiyê gav neavêjin. Yanî mîna formulek wek çiqas şer ewqas aştiyê bibe. Ev rastiyeke nexweş e, lê heqîqet e. Min gotibû bila gerîlla û eskerekî bi tenê neyê kuştin. Ev helwesteke pir însanî bû. Lê dewlet ciddî nagire. Mîna ku bi eskerî encam wergirtin esas e. Şerekî we yê pir dijwar ê gerîlla belkî alîkariya aştiyê bike û bi kêr were.

Di vê nuqteyê de ji kuştinê zêdetir parastin, êsîrgirtin, di şûna canstendinê de zirardana mal û mulk wek xusûsên ku karibin deriyê aştiyê vekin bêne fikirîn. Dîsa pîvanên şerekî û agirbesteke dualî ya divê her du alî jî guh bidinê eger di destpêkê de werin eşkerekirin hînê însanî ye. Ez hêvîdar im di kêliya dawiyê de be jî deriyê diyalogê vebe.

Baş tê zanîn ku mijarên şer û aştiyê dabaşên zehmet in. Kes nikare hewldanên min ên di her du mijaran de jî înkar bike. Bi awayekî berçav ez ne dikarim ji bo aştiyê, ne jî alîkariya şer bikim. Di çarçoveya wezîfeyên we de ne ku hûn bi qasî artêşa Tirk rast binirxînin, divê hûn rastiya xwe ya şer jî rast binirxînin. Zehmetiya min ew e ku her du alî jî barê aştî û şer li ser min dihêl in. Ev

rewşeke bêrehm e. ædî ti çareya we nîne, ji bilî ku hûn bi hostatî xwe li hev rakişînin û di hevdu de biceribînin. Hûn nikarin xwe bi tasfiyekirinê ji vî barî xilas bikin. Dem, şêwaz û berfirehiya şer bi tevahî girêdayî hostatiya we ye. Ne girêdana we ya hisî, ne jî nerazîbûnên we yên li dijî min, nikarin barê we sivik bikin. Ez dîsa dîsa dubare dikim. Ev şerê li gorî îradeya cewherî û hêza ramanê were meşandin. Rast û bi qabîliyet nêzî meseleyê bibin. Bi awayekî întîharwarî ne xwe û ne jî kesek din bimeşînin û bixin zehmetiyê. Divê hûn di wê têgihîştinê de bin ku ji bo min zehmet e, ez bi tenê hêviyên we yên aştî û şer çareser bikim.

Ez wer yeqîn dikim ku hîn haya we ji we nîne, hûn xwe dispêrin min. Realîst û jêhatî bin. Eger hûn komên erzan çêkin, tenê hûnê bi destê xwe dawiya xwe amade bikin. Lê eger gel, dost û dijmin serketinên we teqdîr bikin, wê şensê we yê serokatiyê bibe. Wekî din tevgereke gelac e. Di pêngavên dîrokî de heta serketinên we nebin, xwe nêzî mijara lîdertiyê nekin. Ez careke din dubare dikim: Her du komên we jî weke goşt û neynûkê hewceyî hevdu ne. Yên vê yekê fêm nekin û nikaribin çareser bikin, bi zanebûn, an jî bi xwe bikevin rewşa lîdertiyê, wê bibin belaya herî mezin a were serê mirov. Ji bilî xebat û serketinê çareya we nemaye xuya dike.

7- Li Rojhilata Navîn a îro hewce ye, divê tevger di warê teorîk û pratîk de gav biavêje. Li dijî kevneşopiya dewleta despotîk, gavavêtineke bi vî rengî wê bibe alternatîfeke siyasî ya li gorî daxwazên bingehîn ên hemû komên gelan. Ketina gelên Rojhilata Navîn a pêvajoya şaristaniya demokratîk, li qonaxeke jeopolîtîk û demeke dîrokî rast tê. Eger kaosa Rojhilata Navîn bi demokrasiyê li dawiyê were hîştin, wê ji serdema şervantî-îqtîdarê veguherîne ber bi serdema aştî û demokratîkbûyînê.

Ji vî alî ve, demokratîkbûyîna li Kurdistanê xwedî roleke kilît e. Li Rojhilata Navîn rêya diçe demokrasiyê, bi serketina alternatîfa demokratîk a gelê Kurdistanê li dijî dewleta despotîk, mumkîn dibe vebe. Ji lewra partîbûyîna demokratîk li her çar parçeyê Kurdistanê pir girîng e. Her serketina bibe, wê bi awayekî zincîrwarî li Rojhilata Navîn demokratîkbûyîna gelan bi lez bike.

Mijarek hînê girîngtir jî ew e ku partiyeke demokratîk wê çawa were damezrandin. Bêguman bi destê ji jor ve destnîşankirin li gorî cewherê demokratîkbûyînê nîne û hem jî li dij e. Ferd an jî kom, eger bi awayekî eşq û şewqa demokrasiyê bi nav gel ve danekevin, timî perwerde, rêxistinî û çalakiyan nekin, wê nikaribin sifetê demokratîk bi dest bixin. Sîstema demokratîk xwedî paradigmayeke cihêwaz e û

bi felsefe û kirinên xwe yekpare ye. Hilbijartin û kursî ji bo demokrasiyê xwedî hindek mane ye. Rêxistinkirin û têgihîştinek ji bo azadî û rûmeta gel, bingehê demokrasiyê ye. Rêveberiya wî bi xwe, gîhandina wî ya otorîteyê û rewşa wî ya serwer îfade dike. Di çarçoveya vê tarîfê de partiyeke rastîn a demokratîk bi rêxistinkirineke berfireh û meşandina çalakiyan dikare xwe di nava gel de ispat bike. Dewleta despotîk timî girseyên gel wek kerî ajotine, divê partiya demokratîk bi têkoşînek dewamî vê çanda dewleta despotîk li dawiyê bihêle.

Ti kadro û lîderê xwe di rêxistinkirin û çalakiyên demokratîk ên gel de ispat nekiribe, nikare hêjayî sifetê demokratbûyînê be. Em dema di çarçoveya vê tarîfê de dinerin, em dibînin ku her du kom û meylên derketine holê, haya wan baya wan ji xeta demokratîkbûyînê nîne, tenê ya zanin ew e ku bi têkiliyên teng ên ehbab çawişiyê di hewldanên xwe yên klîktiyê de bi israr bûne. Min ev helwest û têgihîştin hînê berê di bin navê lîdertiya demokratîk a civakê û xwe gîhandina wê de çareser kiribû. Xuya ye ew çareseriyên me jî nehatine fêmkirin. Di bin vê yekê de form û zêhniyeta paşverû ya civakî radizê. Ji ber ku bi perwerde û pratîkê nikarin li dawiyê bihêlin û nikarin hêza xwe ya îradeyê nîşan bidin, dikevin van rewşan. Ne tenê di xebatên teng ên partiyan de, di xetên çalakî û rêxistinkirina partiyên yasayî û kongreyan de jî ev rewş xwe pir nîşan dide. Ji ber ku dûrketina ji civakê û gel xwe li van saziyên bingehîn dide dest. Mîna ku bi giştî di hemû helwestên îqtîdarên dewletparêz û hiyarerşîk de hatiye ceribandin, ji jor ve tayînkirin, bi destekî ji paş ve kontrolkirin û di bin perdeyekê de bi awayekî dizî xebat meşandin şêwazekî hevparê xwe tê de digihînin hevdu. Lê nûnerên çîn, hêz û derdorên demokratîk nebûne û dixwazin li ser civakê bibin otorîte, hiyarerşî û îqtîdar welê tevbigerin. Sosyalîzma reel jî di navê de, helwesta rêxisitiniyên hemdem ên navend-dewlet jî di çarçoveya vê xetê de bûye.

Hem wek kes û hem jî wek tevgerê, ez yeqîn dikim ku me pir hewl da ji bo em vê kevneşopiya hiyarerşîk, otorîter û têgihîştina hukumkirinê bi klîkeke teng, li dawiyê bihêlin. Em di destpêkê de bi awayekî xweser xwediyê vê helwesta demokratîk bûn, lê piştî komploya dewletên mezin me ev helwesta xwe bi awayekî têgihîştî xist pêvajoyeke teorîzekirin û bi gewdekirinê, lê bi van komên dema dawî derketin holê, hat dîtin ku ev yek baş nehatiye fêmkirin. Di van hilbijartinên dawî yên herêmî de diviyabû namzet bi awayekî demokratîk ji aliyê gel ve bihata rêxistinkirin û bi îradeya

demokratîk bihata kirin, lê bi erkên fena padîşahan namzet hatin tayînkirin. Ev helwestên ji jor ve xwe ferz dikin, zirarê didin helwesta demokratîk a girseya me. Di vê nuqteyê de bi awayekî balkêş, kesên arzûya wan a demokratîk û rêxistiniya wan a gel nîne derdikevin holê.

Bi van têgihîştinan re xebateke demokratîk zehmet e û serketî jî nabe. Li Tirkiyê rewşa çepgiran ev yek pir baş ispat kiriye. Ev helwestên ji jor ve li ser gelê Kurd têne ferzkirin divê ji sedî sed li dawiyê werin hîştin. Gelê Kurd ê ber bi demokratîkbûneke rastîn ve diçe hêjayî vê yekê nîne. Ji HEPê ta DEHAPê yên qewimîn, sedemên bingehîn in ji bo rêxistiniyeke demokratîk nebe, bi awayekî demokratîk kadro perwerde nebin û gavên mezin ên di warê demokratîkbûyînê de diviyabû bihatana avêtin, nehatin avêtin. Ev rewşeke bi giştî çepgir dijîn. Sedema rastîn a di bin vê yekê de jî radizê, çanda dewletbûyînê ya hîyarerşîk û utopya wê ye.

Divê baş were zanîn ku bi parêznameya min a dawiyê re tevgera me bi xurtî ketiye ser xeta demokratîkbûyînê, berê xwe hem daye toeriyê, hem jî daye pratîkê, ji lewra di çarçoveya xwerexnekirinê de divê ji nû ve her kes tevlî bibe. Eger ev rastî hînê bi xwerexnekirinên seresere, otorîter, pratîkên koman û mîna pêre dimeşe serî li tevgerê bigerîne, wê tenê bide wendakirin û wekî din wê encamên xwe nebin. Xeta me ya demoratîk wek antîteza xeta civaka dewletparêz a hiyarerşîk a pênc hezar salî, helwesta demokratîk a gel a bi teoriyeke kûr û pratîkeke esîl mezin dibe, îfade dike. Divê baş were zanîn, di nav rêxistinê de çiqas rêxistin werin avakirin, meylên klîkên teng werin sazkirin û bi awayekî çetewarî tevbigerin, wê li hemberî girêdana gelê demokratîk bi serokatiyê ve nikaribin xwe ji têkçûnê xilas bikin. Di tehlîla dawî de jî hat fêmkirin ku heta ewladên aşiqê demokrasiyê hebin, wê tu kes nikaribe têkiliyên berê yên koletiyê, otorîteyên demagojîk û dogmayên sexte yên şoreşger-sosyalîst li ser gelan ferz bike.

Di encamê de em dikarin bibêjin ku derketina komikan di nava PKKê de ji destpêkê ve bi awayekî xwezayî hebûn, lê eger di vê qonaxê de ku em gihîştinê, ji bo van koman israr were kirin û naverok, şêwe bi avahiyên berçav xwe îfade nekin, wê di encamê de nikaribin xwe ji rizgarbûnê xilas bikin. Her çêbûna koman mutleq xirab nîne. Lê şertê wê jî hene, divê di asta jor de xwe bigihîne yekîtiyê, çareserker be û divê mane û şêwazên paşverû yên rêxistinbûyînê li dawiyê bihêle.

Ez yeqîn dikim ku xeta exlaqî, rêxistinî, polîtîk û îdeolojîk a min hewl da di şexsê xwe de pêş de bibim, têra xwe zelal bûye. Ji îdeolojiyê qest û merama min ew e ku rastiya zêhniyeta şorşegerî ye; yanî paradigmaya dunya û gerdûneke nû ye. Li encama gevizînên mezin di nav raman û baweriyê de, xwe gîhandina cewherê pîvanên meş û xebata gerdûnê mumkîn bûye. Di parêznameya xwe ya dawiyê de hindik be jî min hewl da vê têgihîştinê nîşan bidim. Di cewherê wê de Ronesansa Ewrûpayê heye, lê dîsa hewldan heye ji bo jê derbaskirinê. Ez bawer dikim ku min paradigmaya dewletparêz û hiyarerşîk a li Rojhilata Navîn derket û pêş ket, pir baş çareser kiriye. Min hewl da ez nîşan bidim, ferdiyeta piştî Ronesansê pêş ket çawa sînor derbas kiriye û li Rojhilat jî ferdiyet çawa hatiye helandin, di vê çarçoveyê de min rê nîşan da çawa ferdiyeta sînor derbaskirî û ferdiyeta zêde hatiye helandin bi awayekî rast di civakbûyînê de bêne cem hev û bigihîjin hevdu. Min mêzîna ferd û civakê li ber çav girt. Ne li ser navê ferd xwe ji civakê kirin, ne jî li ser navê civakê xwe ji ferd kirin.

Ev qabîliyeta teorîk û îdeolojîk ku min nîşan daye, bi du awayan mumkîne hevalbendiya wê were kirin: Yan bi awayekî ji dil, samîmî û bi nefspiçûkî, yan jî bi awayekî têgihîştî û bi hewldaneke xurt bi cewherê wê yê teorîk û qabîliyeta wê ya îdeolojîk re tevlîbûn dibe. Di PKKê de nirxên giranbuha di serî de Hakî Karer, Kemal Pîr, Mazlûm Dogan, Xêrî Dûrmûş û Mahsûm Korkmaz bi hezaran hevalî ev her du şêwaz di zikhev de bi ahengekê û tevlîbûnekê meşandine. Ev tevlîbûna cewherî heta dawiyê ew kirine xwedî helwesta herî qehremaniyê. Li hemberî vê yekê, kesên ji dil tevlî nebûn, bi nefspiçûkî nêzîk nebûn, têra xwe nedan hewldanên teorîk û îdeolojîk timî hilkumîn, carnan komên ehbab çawiş ava kirin û carnan jî wek komên tasfiyeker û meylên çetewarî ber bi bayê ketin. Kesên li hêza zêhniyetê ya bingehîn serwext nebin, jê re rêz negirin, bi dilnizmî û performanseke xurt a teorîk tevlî nebin, zehmet e em bi wan re di zêhniyeta hevpar de bigihîjin hevdu. Di vir de ya divê tevlî bibin zêhniyeta bilind e. Naxwe rêdana zêhniyeta paşverû ji rê derketin e.

Xusûseke duyemîn a bingehîn ew e ku divê were zanîn, xeta min a polîtîk ji helwesta demokratîk a xwezayî, ber bi helwesta têgihîştî û demokratîkbûyîna çalak ve gav avêtiye û bi gel re xwe gîhandiye hevdu. Pêwîst e were zanîn, di PKKê de saziya serokatiyê ya bi min temsîla xwe dibîne, xwe ji kulekî û hulkumandinên sosyalîzma reel û rizgariya netewî xilas kiriye û li xwe danayne berê xwe bide meylên jiyanê yên bûrjûwaziyê. Di rastiya Kurdistanê de xeteke polîtîk a

demokratîk, wekhev û azad, ne bi şêweyekî teslîmiyetê, ne jî bi şêweyekî netewparêziyê yê li ser hîmê navend dewletê, hem di têgihîştinê de, hem jî di pratîkê de bi ser ketiye. Ya ji kadroyên PKKê tê xwestin ew e ku vê xeta polîtîk dawerivînin hinavê xwe û biginînin girseyan. Heta tam lê serwext nebe û ji bo wê xebateke mezin bi cih neyê anîn, uslûba polîtîk a ji bo wê were xebitandin dûr nêz wê bi awayekî tasfiyekeriyê li xwediyê xwe bide. Polîtîka hunerek e, di asta jor de terbiye û berpirsiyariyeke mezin dixwaze. Avahiya rêxistinê di vê mijarê de qelsiya xwe ya bingehîn ew e ku xweser tevdigere, timî ji hişyarbûnê dûr e, ji helwesteke dînamîk mehrûm e û di vê yekê de israr dike. Di encama vê şêwazê de wê pir zû wenda bike; wê bibe amûrê tasfiyekerî û ehbap çawişiyê. Eger li ber çav were girtin ku polîtîka valatiyê nas nake, wê were zanîn ku ji bo serketinê jiyaneke tijî kar û xebat şert e.

Divê were zanîn, min ji heft saliya xwe ve jiyaneke bi rêxistin û bi çalakî esas dît. Jixwe rêxistinî hewceyî bi çalakiyê, çalakî jî bi rêxistiniyê dibîne. Aliyê wê yê serdest ji xirakirinê zêdetir avakirin e. Hilberîn û avakirin esas e. Pir kêm hatiye xirakirin. Lê avahiyên pêşî li pêşketinê girtine hilweşandina wan li cih hatiye dîtin. Kesayeteke çalak heye ku hilweşandinê, desteserkirinê û talankirinê mehkûm dike. Têgihîştina min li hevaltiyê jî timî ji bo karên armanca wan mezin bûn. Bi kesên serî li xwe digerînin, ji bo xwe şa dibin û ji bo xwe li pey berjewendiyan digerin, têkilî nehatiye danîn. Rastiya serokatiyê ya min temsîl kir, divê ev aliyê wê yê nazenîn were zanîn û şopandin. Naxwe wê zehmet bibe mirov ji bo serokatiya min behsa yekîtiya polîtîk, jiyana rêxistinî û çalakiyê bike. Kesên di jiyana xwe de timî bi rêxistinî nebin û dîsa nebin xwediyê çalakiyên ku zêdetir aliyê wê yê pozîtîf pir, di saziya serokatiyê de nikarin roleke serketî bilîzin, hema hema mumkîn nîne.

Rêxistinî û bi çalakbûyîn ji wezîfeyekê wêdetir divê wek rewşeke jiyanê were fêmkirin. Çawa bê av û hewa jiyan nabe, divê were zanîn ku bê rêxistin û çalakî jî jiyan nabe û di vê çarçoveyê de pêwîst e rastiya serokatiya me maneya wê were dîtin. Naxwe di nav rêxistinê de rêxistin, bi serê xwe hilweşîner, vala û çalakbûyîna bê armanc timî bela serî ye. Bi awayekî tenê girêdan û dilsoziya rast dibe ew jî bi rêxistiniyeke bi qabîliyet, li gorî cewherê xeta polîtîk û îdeolojîk berçavkirin û gîhandina çalakiyên bi encam û bi ber. Ew helwesta rast e, ku digihîne encamê, hewldanên dîrokî têk nabe, her kerpîçî ji bo bilindkirina avahiyê datîne. Têgihîştina rêxistinî û

çalakiyê, têkoşîna çekdarî jî di navê de divê bigihîjin vê astê, jixwe wekî din şensê serketinê nîne.

Rastiya serokatiya PKKê li ser hîmê xeta rêxistinî, polîtîk û helwesta exlaqî ya îdeolojîk, ji qanûn û pîvanên civakîbûyînê yên nû pêk tên wêdetir, girêdaneke bi arzû û xwestek îfade dike. Ev civakîbûyîna nû wek şêwazê hebûna jiyanê fêm dike. Jiyan civakîbûyîna me ya nû ye. Li derveyî vê yekê lêgerînên li jiyanê, têne maneya rev, valatî û wendahiyê. Ji jiyaneke mumînî (bawermendî) zêdetir jiyaneke zanistê esas dibîne, azadiya polîtîk wek hewldanên afirêneriyên nû yên hostatî û zanyariya jiyanê dinirxîne; yanî bawermendiya hemdem e. Her kesê-a vê hêza exlaqî nîşan nede wê nikaribe xwe ji rê derketinê xilas bike. Jiyana exlaqî di cewherê xwe de hêza tevlîbûna îradeya azad û zêhniyetê ya şêwazê hebûna civakî îfade dike. Nirxên mezin ên rastîn ên PKKê bi kesên xwedî vê helwesta exlaqî pêk hatine. Kesên bi rastî dixwazin li ser xeta PKKê bibin xwediyê jiyanekê, pêwîste vê hêza exlaqî nîşan bidin.

Bi kurtî, ev tarîfa serokatiyê ku di şexsê min de hat temsîlkirin, ji bo her kesî-ê rê nîşan dide xwe û tevlîbûna xwe di ber çavan re derbas bike û çawa ji nû ve bi rêxistinê re bibe yek. Ev serokatiya li ser vê xetê, hemû gerdûnê, hebûna însanî, rastiya me ya civakî û azadiya demokratîk a gel di hinavê xwe de dihewîne. Ne tenê netewî, di heman demê de gerdûnî ye. Eger qusûr û çewtiyên wê hebin, divê di nav van kategoriyên bingehîn de werin dîtin. Naxwe li ber siya serokatiyê jiyan, yan avakirina dunyayên egoîst, yan jî kolewarî hay ji xwe nebûn e û heta ji rê derketin e. Parêznameya min hemû taybetiyên serokatiya pêk hatiye nîşan dide. Yên eleqeya wan jê re hebin divê beriya her tiştî di fêmkirina wê de bi ser bikevin. Eger xusûsên şaş û kêm hebin, divê werin nîşandan, an jî temamkirin, ji ber ku ev yek ji erkê hevaltiyê ye. Li ber çavan weke tevlî dibe xwe nîşan dide û di pratîkê de jî bi awayekî din tevdigere, ev bi gotinên kevin tam 'munafiqî' ye. Dikarin rastiya serokatiya min qebûl nekin. Di rewşek welê de bi ravekirineke li cih mafê wan heye veqetin. Ji aliyekî ve dibêje min fêm kir û tevlî nabe, yan jî dibêje ez tevlî bûm lê pêdiviyên wê bi cih nayne, ev yek tam rewşeke dejenerebûyî û jiyaneke bêberpirsiyarî îfade dike ku ne zêde dewam dike, ne jî ti maneya wê heye.

Di şêwazê serokatiya min de xweferzkirin nîne. Bi bawerî û zanyariyeke mezin xwe xwedî dike. Yên di vî warî de hêza wan nebe divê dûr bisekinin. Ferdên serdema me ew nexweş xistine nikarin

tevlî serokatiya bi vê şêwazê bibin. Eger tevlî jî bibin nikarin encam bigirin. Di bingehê van komên dema dawî de dîsa guh nedana hişyariyên min ên di warê rastiya serokatiyê de hene. Eger ji me re eleqe û hurmet heye û bi rastî ji bo meşeke hevpar a îdeolojîk, polîtîk û rêxistinî îdîa heye û eger dixwazin bi biryar û çalakî bibin, ne ez divê ew tevlî min bibin. Ji aliyê bedenî ve mirin û zindîbûna min diyarker nîne. Mane, îrade û exlaqê me xwe gîhandiyê diyarker e. Ev tenê ez nînim, di min de hemû gerdûn, mirovatiya heyî û rastiya me ya civakî ye, tê ziman. Li gorî vê, gelê me li ser hîmê wekhevî, azadî û demokrasiyê ava dibe.

Di serî de şehîdên me ku ez timî li ber bîranîna wan diricifim, gelê me yê bindest, zehmetkêş û çîlekêş, têgihîştina me ya mirovatî û biratiyê, li ser hîmê xeta me ya rê li ber nirxên esîl û hevaltiya hilberîner vekir, bang dikim ku em ji serketin û yekbûyînê zêdetir firsendê nedin ti meşa jiyanê. Silav û xoşewîstî ji bo wan kesên li bin ala van nirxên bi kok bêne cem hevdu.

Çawa ku tê dîtin, li jor bi awayekî samîmî û têkûz pêdiviyên rexne-xwerexnekirinê bi girîngî hatine destnîşankirin. PKKtiyeke rastîn jî tenê dikare li ser vî hîmî derkeve holê. Di vê mijarê de helwesta min tê zanîn. Jinûve avakirina PKKê helwesteke rast bû. Eger helwestên PKKê nû nakin û bêfonksiyon dihêlin li dawiyê werin hîştin, wê ev yekê ji bo wê bibe jinûve ji dayikbûyîn. Demên dîrokî têne maneya wezîfeyên dîrokî. Yên heqê vê yekê bidin, wê timî di deftera şerefê ya mirovatî û gelê xwe de cihê heq dikin, werbigirin.

Di çîroka min a jiyanê de girîng e ku dema dawî rast were fêmkirin. Bi giştî wexta heval jiyana min rast şîrove nekin, dibe sedem ku xeta bikin, nikaribin firsendan binirxînin û çarçûr bikin. Ev rewşên lawaz di berdêla çi de dibin bila bibin, divê werin terikandin. Ji ber ku ji bo ferd bêkêr e. Divê ez dîsa nêzîkbûyîna Kemal Pîr bi bîr bixînim. Nemaze hevalên ji zindanê derketine hewce ye wek wezîfeyeke li pêş xwedî li biranîna Kemal Pîr derbikevin. Jixwe ev wek sembolekê ji bo hemû hevalan tê nirxandin. Bi hezaran nirxên me yên bi kok wisa hene. Kesên ji dehan hêjayî yekê bin, wezîfeyeke tê de bi ser nekevin nîne. Hevalên di atmosfera azad de ne, ji serketinê pêve tiştekî din nikare wan xilas bike. Dem hatiye em mezin bifikirin û helwestên xwe yên esîl nîşan bidin û xwe bigihînin serketinên bi encam.

Hûn baş dizanin, hewldana min ji bo amadekirina pêvajoya 15'ê Tebaxê nîşan da, niha mîna heman hewldanê ji bo amadekirina

pêvajoya aştiyê nîşan didim. Aştî jî herî kêm bi qasî şer zanyariyeke teorîk û hêza xwe ragirtinê dixwaze. Ji sedî sed xebateke sivik were dîtin nîne. Zehmetiyên wê ji yên şer zêdetir in. Bi qasî tevgera me, di nêzîkbûna dewletan de jî ez bi nazenînî û bi mêzîn tevgeriyam. Ez bawer dikim ku hûn ji rewşa min a li Sûriyê dersan digirin. Têkiliyên me gav bi gav û bi hostatiya zêrfiroşekî pêk anîn, binerin niha di çi rewşê de ye! Mirov ji bo xebatên Ewrûpayê jî dikare heman tiştî bibêje. Heta mirov dikare ji bo hewldanên aştî demokratîk li Tirkiyê jî bibêje. Helwestek heye wendakirinê mîna çarenûs nîşan dide û ev jî ji encama kesayetiyên nexweş ên berê tê. Dema me dest pê kir em li sifir kilometrê bûn. Em li nîvê pîstekê bi serketineke nîv bi nîvî ala bezê radestî we dikin. Bersiva we ji rewşa "em hilkumîn, ketin" wêdetir tiştekî îfade nake. Mesele ne jiyaneke bi qehr e. Qehra mirovên bêîdrak ti maneya wê nîne. Ya girîng, serketinên bi kok ên jiyana bi qehr in. Piştî ku ev nebû, porê te spî boz bûye çi qîmeta wê heye. Ya ji bo we hêja ew e, divê ji sedî sed hûn rêyekê bibînin û berdêla keda xwe, heqê xwe ji hevrikên xwe, ji dostên xwe û heta ji hevalên xwe bistînin. Pêwîst e hûn ji hewaya min a bi sihr rizgar bibin û li qadên azad gavavêtinên serketî ji her kesî zêdetir hêjayî we ye, û ji we tê xwestin pêk bînin.

Pêwîste ez eşkere bibêjim ku bi KT di şertên herî baş de hûn bi bawerî û ewlebûneke bêsînor xwedî li hewldanên min ên aştiyê derketin û ev helwesta we ya hevaltiyê bû. Lê şertên ez di navê de û li gorî min gava dîrokî ya diviyabû dewlet biavêje û neavêt, tê menaya wendahiyeke mezin. Dewlet ji 11 Îlonê ve bêdeng e. Ez yeqîn dikim ku bûyerên li Başûrê Kurdistanê bandoreke şokê lê kir. Hînê jî nizane wê dawî çawa bibe. Dixwaze her tiştî bi DYE re çareser bike û nikare xwe ji vê polîtîkayê bike. Bi awayekî dûrî aqilan bi DYE ve girêdayî ye. Ji salên 1950 ve her tişt di ser DYE re meşandine. DYE lampeya kesk vêxistiye, faşîzmeke tarî reş meşandine. Di van demên niha de jî di şûna rengê reş de rengê kesk digire, lê nîzameke tam nediyar tê. Neçar Tirkiyê ber bi mêzînên nû ve biçe. Bêyî ku pirsgirêka Kurd çareser bike, zehmet e van mêzînan li gorî kêra xwe mîna di dema şerê cîhanê yê yekemîn de deyne. Çawa hemû hêza xwe ji bo 'terorîstiya PKKê' bi kar anî û di polîtîka Başûrê Kurdistanê de encamên ters wergirtin, gengaz e heman encaman bibîne. Hûn jî dizanin, me bi têgihîştineke mezin xwest Tirkiye bi xurtî ji kaosa Rojhilata Navîn derbikeve û rêya bi tenê ya vê yekê jî çareseriya pirsgirêka Kurd e, me ev çareserî bi awayekî demokratîk ferz kir, lê ev yek qelsiya me hat fêmkirin an jî wek

taktîk hat nirxandin. Pişta xwe bi parçebûn û DYE ve girê da. Rêya eskerî pîroz dibîne û nikare xwe ji vê têgihîştinê bike. Ez nizanim wê bi DYE re bi çi awayî bi ser we de were. Çawa bi ser min ve tên tê zanîn, xuya ye hûn encamên hewce jê derdixînin. Ez nabêjim bila têkiliya we DYE re nebe. Lê têkiliya li ser navê Osman jî hat kirin, derket holê ku pir watedar nîne. Piştî kongreyê bi îhtîmaleke mezin hûnê bi yekdengî derkevin û bi biryarên xwe yên hewce ji bo hûn berpirsiyariyên wê bi bîr bixin, hûnê pêre têkiliyê deynin. KT vê rê tercîh dike.

Tam di vê nuqteyê de ez dixwazim rewşa xwe ji nû ve bi we re par ve bikim. Mixabin divê ez pêşin bibêjim ku eger wer dewam bike, di dema pêş me de şerên qat bi qat ji yên piştî 15'ê Tebaxê mezintir li benda we ne. Ji bo pêşîgirtina wan berpirsiyarî û hestyariya min têrê nake. Ji min ti rol nayê xwestin. Belkî jî planê şerekî heye we bi erdê re bikin yek. Yanî dibe ku dewlet şer ferz dike. Hewa îqtîdara AKPê ji ya hukûmeta Tansû Çîllerê baştir nîne. Xemsariyeke mezin heye. Serokwezîr dibêje; "Eger hûn ji xwe re nebêjin Kurd, pirsgirêka Kurd nabe." Provakasyonên li Sêrtê nabe ku mirov xwe lê rabigire. Ya MHPê nekir jî van kesan kir. Her tişt kirin. Hêja ye mirov bixe lêpirsînê ev kes bi kulmek Kurdên xayîn ên netewparêzên paşverû çi dixwazin bikin.

Eger eşkere gavek ji bo aştiyeke demokratîk a têkûz neyê avêtin, ya li benda we şerekî berfireh e. Ez yeqîn dikim ku hemû hesabên wan li ser tasfiyekirina we ye. Tevî ku min ew bi name û peyaman hişyar kirin, hîç ciddî nagirin. Bi rastî min hemû hêza xwe bi kar anî û hewl da bi vê parêznameyê xeteke yekparebûnê ya aştî û demokrasiyê pêşkêş bikim. Haya min jê heye ku ne tenê ji bo we, min ji bo payeyên dewletê jî ev parêzname pêşkêş kiriye. Ne ku ez hilhilî me, yan jî watedar nîne, eşkere ye, hûnê careke din xwe li hevdu rakişînin. Yanî divê êdî alî berpirsiyariya min nefikirin, ev zêde min dihilhilîne. Eger ez xwedî îradeyeke têkûz nebûma, ezê bi her awayî tehrîk bibûma. Ne ku ez ditirsim, ji ber bêhurmetiyê, min bawer kir ku bûyerê wan bîne bigihîne însafê, ji lewra min sebir kir. Ez kesekî welê me ku pir bi awayekî fedaîyane tevgerê rast nabînim, lê di vê nuqteyê de li bin gefa kuştinê tevgerê manîdar nabînim. Ya girîng ew e, li wezîfeyê têgihîştina rast e. Di warê mirinê de dudiliyeke min a piçûk jî nîne. Eger mirin di dema xwe de nebe biêş e. Mirinên di dema xwe de hêja ne. Ez vê yekê bi maneya ez ji fedaîbûnê re amade me nabêjim. Gelek kesên rezîl wer bawer kirin ku ezê nikaribim bi salan li ber xwe bidim. Hin derdor ji bo

berjewendiyên siyasî li benda aqûbeta min man. Kî dizane, belkî jî dewletê jî ez ceribandim ji bo binere ka ez dikevim çi rewşê. Sekreterê berê yê Konseya Ewlekariya Millî (MGK) Tûncer Kilinç nirxandinek welê kiribû; "Em sîstemek welê li ser wî diceribînin telafiya wê nayê kirin. Ne carekê em her roj wî dikujin." Lê min li ber xwe da. Eger hewce bike ezê şeş salên din jî li ber xwe bidim. Lê ewqas jî girîng nîne. Li berxwedaneke baş bûye. Ev ne tenê di warê demê de, her weha di warê mane û naverokê de berxwedaneke baş e. Ez bi awayekî awarte dizanim li ber xwe bidim. Çi berpirsiyarî bikeve ser milê min ezê bikim. Lê bi rastî ji vê pêve zêdetir mumkîn nabe.

Yeqînek min a di heqê we de çêbû, ez dixwazim bi we re par ve bikim. Min di polîtîka xwe ya kadro de jiyanek we ya demdirêj li pêş girt. Hûn dizanin vê ewlebûna min a bi we pir realîst nebû. Pir bêberpirsiyarî tevgeriyan. We ne ya xwe kir û we ne jî ya min kir. Di vê yekê de timî rola min a diyarker bû. Piranî ji we temenê we pêş de çû. Li gorî min we qabîliyetên xwe nexebitandin. Divê hûn sedemê ji xwe bipirsin. Di vê de desteka min a zêde û para pêşkirina min gelek nirx, roleke mezin lîstiye. Lê ya tehlûke ew bû ku we pir bi erzanî xwe wenda kir, hem jî we ciwanên hêja û hevalên li ber serê xwe, gelek nirx ji îmha, dejenerebûn û bêberiyê re terikandin. Hûn hêjayî wan hewldanên ji bo jiyanê nebûn û vê yekê ez tim hêrs kirim. Di serî de ji bo hûn xwe erzan nejîn û wenda nekin, min xwest ez hem li ser we û hem jî li ser gel ji bo jiyaneke azad û hemdem disîplîneke mezin ferz bikim. Ev hewce bû. Lê nerazîbûnên we yên ez di îzahkirina wan de zehmetiyê dibînim, hem bûne sedema muhafezekariyê û hem jî paşvexistinê.

Ya esas, ez ji sedî sed li benda yekîtiyeke îdeolojîk û polîtîk nînim. Min herî kêm dixwest hûn bibin xwediyê pratîkek ku hûn pê rûmeta xwe rizgar bikin. Di serî de asta navendî, hûn dizanin we reaksiyonên çawa nîşan dane. Ciwanan jî wek soz dan, nekarîn xwe bidin jiyîn û serketinê bi cih bînin. Hûn baş dizanin ku vê rewşê ez bêfonksiyon kirim. Ez çawa bi vê yekê hesiyam nehesiyam diviyabû ez derbasî herêma çiyayî bibûma. Eger min bizanîbûya hûnê wer derbikevin, ji sedî sed ezê di serê salên 1980'î de beriya her kesî li welat bûma. Nexasim di serê salên 1990'î de rastî gelek eşkere bîbûn. Divê ez wê demê bihatama. Ji ber ku ez wê demê nehatime, ez wek wendahiyeke mezin dibînim. Lê sedema van hemûyan ew bû, min xwestibû we ên wek heval qebûl kiribûn biparêzim û tim di nav jiyanê de bihêlim. Ez êdî bixwazim jî nikarim wek berê we bidim

jiyîn û ti maneya wê nîne ez we bibim û bînim. Eger bi rastî hinek zêhniyeta we ya mîna Kemal Pîran a rûmetê heye, divê hûn bi hêza têgihîştin û tecrûbeya xwe ya mezin, li dijî kes û saziyên çaresernekirinê, neheqiyê û bêhurmetiyeke mezin ferz dikin, bi awayekî dîrokî xwe li hev rakişînin û divê ez ji we re bibêjim hûn di vî warî de azad in. Ev hem heqê we ye, hem jî wezîfeya we ye. Divê em heqên xwe yên beramber li hevdu helal bikin. Lê dîsa jî ya girîng ew e, di şer de û di aştiyê de mafê jiyana azad were bi destxistin. Nabe ku polîtîka me ya bê mane 'a bimre û bikuje' hebe; tenê li hemberî wezîfeyên dîrokî dikare maneya mirin û kuştinê hebe. Bi gotina Kemal Pîr mirin û kuştina bi vê şêweyê jî ji bo ew jiyana hûn pir jê hez dikin û ji bo hûn heq bikin, heye.

Dibe ku hin ji we şervan û egîd bin. Min ew fren kirin. Dibû ku hin ji we pir bi hêsayî bimirana. Min ew jî asteng kirin. Min hewldanên hîç şensê wan ê serketinê nebûn jî asteng kirin. Gelek tiştên min dixwest ez bikim jî we asteng kirin. Welhasil ne karê hêjayî we û ne jî karên hêjayî min, têra xwe neçûn serketinê. Piranî ji we porên wan sipî bûn. Tecrûbeyên me yên mezin hene. Li gorî min, eger hûn bikin meseleyeke şerefê, îmkanên mezin ên serketinê hene. Herî hindik hûn dikarin tehlûkeya penaberbûyînê biçirînin. Piştî bi deh hezaran şehadetan, qey hûn nafikirin dest ji têkoşînê berdin bêesil û binyad bibin. Eger ez bixwazim jî, divê hûn her cure bêeslî û bêbinyadiyê lanet bikin û parçeyek jî be divê hûn li welatê xwe ji bo jiyaneke azad israr bikin. Biryarên bi vî rengî, ez jî bim, bi ferzkirinên ji der ve nabin. Divê hûn bi îrade û xwesteka xwe ya azad bikin. Ji ber ku min ev texmîn dikir, min di parêznameya xwe de bêfikar ji hemû parçeyên Kurdistanê formula 'yek dewlet + yek demokrasî' pêşxist. Me di 15'ê Tebaxê de digot bila dewlet hîç nemînin. Ev helwest hem realîst nebû û hem jî li gorî cewherê me nebû. Eger dewletên fetihkar biçûna jî wê di şûna wan de dewleta Kurdî ya tehekumkar bihata. Yanî wê dîsa formula 'yek dewlet + yek demokrasî' hewce bikira. Dewlet çawa dînê wê nîne, ez bawer nakim milliyeta wê jî hebe. Ew timî koalîsyona berjewendiyan a hindikayiyekê ye. Dewlata bi rengê Erebî, Tirkî û Farisî tenê dîmenê wê xuya dike, yan jî helwesteke konjonkturel e. Cewherê wê cuda ye, ku min di parêznameya xwe de dûrûdirêj rave kir. Milliyeta wan çi dibe bila bibe, eger ew bi rêxistina xwe ya dewletê hene, emê bi demokrasiya xwe hebin. Nemaze demokrasiyên herêmî, ji bo hebûna me wê qadên bingehîn bin. Eger hewce bike emê wan deran li çiyayên xwe biparêzin. Gelê me li ku be, wê li wir unîteyên me yên

demokratîk hebin. Eger werin qebûlkirin wê legal bin, neyên qebûlkirin wê nîv legal û îllegal hebûna xwe dewam bikin. Dikare were pirsîn mumkî ne. Ji ber ku çareyeke din nîne mumkîn e. Yanî li derveyî mirin an jî demokrasiyê me, alternatîfê me yê jiyanê nîne.

Eger dewlet bi rastî çareseriyê dixwazin wê gavên hewce biavêjin. Naxwe têkoşîn heta dawiyê, rêyek e, jiyanê pêş ve dibe. Divê em bawer bikin ku demokrasî xebateke avakirinê dixwaze. Ez ji aliyê teorîk û pratîk ve dûrûdirêj li ser sekinîm. Herî kêm em dikarin li welat xwe baş bi cih bikin, li her devera parastin mumkîn e bibe, em dikarin di warê çendayetî û çonayetiyê de xwe xurt bikin. Jixwe alternatîfeke din a gel jî nemaye. Jixwe têgihîştina otorîteya mutleq a dewletan, hebûna otorîteya demokratîk a gelan jî ferz dike. Naxwazin fêm bikin ku em di kîjan serdemê de dijîn. Ya tenê fêm dikin ev formul e; "Netew û dewleta serdest her tişt, Kurd jî netiştek e." Wek min berî niha jî got; neçare ev formul çewtiya wê were ispatkirin û ya rast dewsa wê bigire. Ewê were dîtin ku ev pêngav gelek nûbûnê di xwe de dihewîne û divê hûn li gorî wê taktîk û stratejiyên xwe pêş de bixînin.

Min fikrên xwe yên derbarê dema nû de wisa kurt kir û anîn ziman. Ez helwesta we û dewletên pêwendîdar nizanim. Ya girîng ew e, yên ji min dihatin xwestin min bi firehî bersiva wan da. Ez hîç guman nakim ku min helwestên herî têgihîştî nîşan dan. Naxwe wê hemû di demeke dirêj de bikevin rewşa Seddamekî. Divê rola Kurdên Seddam birêxistinkirin baş were fêmkirin. Divê were fêmkirin ku alternatîfên din jî mumkîn in. Tirkiye, Sûriye û Îran xwe li hemberî Kurdan pir bi hêz dihesibînin. Dibe ku wisa bin. Lê ev tehlûkê ji holê ranake, hînê zêdetir sor dike. Ya rastîn înada Seddam bi kêr nehat. Jixwe înada van her sê dewletên din ji ya Seddam wêdetir e. Naxwazin ji kaosa Rojhilata Navîn tiştekî fêm bikin. Pir zêde kursî û hêzperest in. Bi qelsiya Kurdan piştrast in. Ev yek min hêrs dike. Ji ber ku ev yek bi kêra ti welat û gelî nayê. Xwe di pelixandina Kurdan de jî wenda kirine û vê yekê jî wek ehmeqî dibînim. We mîna komeke serserî û terorîst dinirxînin ku ev çewtiyeke xeternak e. Eger tu mar birîndar bihêlî wê hînê bi te vede. Ez nizanim dixwazin çi bikin.

Hin ji we, tevî ku wê teslîm nebin, dikarin di şer de jî gavên pir mezin biavêjin. Ma qey hûnê timî rola ehmeqan bilîzin. Eger hûn bizanibin hêza xwe ya berxwedanê û tecrûbeya xwe ya mezin bi kar bînin, bi hêzeke gerîlla ya ji 300 kesî hûn dikarin bi her welatî re têbikoşin. Divê hûn vê yekê hûrûkûr bifikirin û ji dewletên

pêwendîdar re jî bibêjin. Beriya şerekî berfireh, ji agirbesteke dualî heta destnîşankirina rêzikên şer, divê hûn statuya rêveberiyên herêmî diyar bikin û bi xwe ve girê bidin, ji mafê bersivdanê heta girtina kesan, divê hûn her tiştê xwe li gorî rêzikên şer û aştiyê amade bikin ji hevdu re pêşkêş bikin û ji gel re jî îlan bikin. Ya di 15'ê Tebaxê de tinebû, ev bû. Min pir dixwest ez bi pêvajoya çalakiyên demokratîk re pirsgirêkan çareser bikim. Lê li naverastê pir nirxên demokrasiyê û şêwazê xebatê nînin. Dîsa wê bar bikeve stûyê çiyan. Ezê bibêjim dîrok û xweda dîsa vê yekê dixwazin, lê ev yek jî ber bi qederê ve diçe. Hûn tavilê bimirin, bikujin, ez wê jî nizanim. Dîrok li nuqteyek welê ye; yan wê ji bo gavavêtineke aştiyane ya demokratîk, yan jî wê ji bo gavavêtineke şerdar demokratîk, biryarê bide. Hûn dikarin DYE û Îranê jî hişyar bikin. Dewletên mezin in, belkî rêyekê pêşniyar bikin. Lê eger bi israr şer ferz bikin, ez bawer dikim ku hûn di wê hêzê de ne, vî barî rabikin û pêngavên xwe yên encamê bistînin li pey hev bi cih bînin.

Wek encam em dikarin bibêjin ku di dema pêş me de wê di kaosa Rojhilata Navîn de sê alternatîf û şêwazên wan ên tevlîhev wê li ber hev bidin ji bo bibin sereke û bi bandor.

Ya yekemîn, polîtîkayên statukoparêz ên kevneşopiya dewleta fetihkar li Kurdistanê ne. Sîstema heyî di dema nû de ji bo bandorên çi ji der ve û çi jî hundur werin xwe biparêze wê li ber xwe bide. Ewê Kurdan ji nedîtî ve were, eger ev nebe jî wê bixwaze bi hin kurtêlan serî li wan bigerîne. Lê polîtîka bingehîn wê ew be ku ti car dar ji ser serê Kurd kêm nekin. Bi îhtîmaleke mezin wê statukoparêzên Ereb, Îran û Tirk bixwazin di nava xwe de îttîfaqekê pêş de bibin. Li hemberî vê yekê, DYE, YE û Îsraîlê netewparêziya Kurd a paşverû li hemû parçeyên Kurdistanê destek bikin û di statuya federe de israr bikin. Qibris provayeke vê helwestê bû. Dor wê were Filîstîn û Kurdistanê. Her ku biçe wê hewl bidin li tevahiya Rojhilata Navîn modelek bi vî rengî bidin rûniştandin. Dewletên statukoparêz ên herêmî wê ji aliyekî ve li dijî vê li ber xwe bidin, lê ji aliyekî din ve jî mumkîn e hêzên xwe yên kevneşop bi kar bînin û milîsên Kurd hînê bi sîleh bikin. KT polîtîkaya di warê Barzanî û Talabanî de meşand îhtîmal heye berfirehtir bike. Di partiya AKPê de yên ji wan re rol hatiye dayîn, ya rastîn di bin maskeya Neqşîbendîtiyê de netewparêziya paşverû ya Kurd li Bakurê Kurdistanê ye. Cuneyt Zapsu, Melik Firat, Huseyin Çelik, Zeki Ergezen, Mucahit Can, Mistefa Zeydan, Siverekli Îzol û hin kesayetên din pêwîst e di vê çarçoveyê de werin dîtin. Ev kesê

veşartî, nîv feodal nîv komprador bûrjûwa Kurd û netewparêziya paşverû pêk bînin. Jixwe di hilbijartinên herêmî de ev yek derket holê. Li Çewlîkê yên slogana "Îdrîs-î Bedlîsî li vir e, Yawiz li ku ye?" qîriyan, ya esas bi kurtî ev rastî dianîn ziman. Bi îhtîmaleke mezin li derve, nemaze li DYE figurên Îslamî yên Kurd ên nû ji bo gelemperiya Rojhilata Navîn têne amadekirin. Ji bo Tirkan Fethullah Gulen çi be, Cuneyt Zapsu û Melîk Firat jî ji bo Kurdan heman tişt in. Senteza Kurd-Îslamê temsîl dikin. Li Rojhilata Navîn rola Hîzbûllaha alîgirê Rojava dilîzin. Şêweya MHPiyên Kurd temsîl dikin.

KT bi giranî ketiye bin bandora du milên terîqeta Neqşî. Gotina serokwezîr R. T. Erdogan a wek "Eger navê Kurd neyê bi karanîn meseleya Kurd nabe" polîtîkayên wî yên takiye mîna di mijara dolbendê de bi bîra mirov dixîne.

Hînê zelal nebûye ku AKP partiyeke muhafezekar demokrat e yan na. Nemaze rastiya di hilbijartinên herêmî de derket holê, îhtîmala 'partiyeke dewletê' ya rastgirt a hatiye eyarkirin xurtir kir. Guftûgoyên li ser laîsîzmê û dolbendê bi îhtîmaleke mezin lîstikeke lihevçêkirî ye. Koalisyona MHP, ANAP û DSPê îflas kir û nefreta gel kişand ser xwe, partiya dewletparêz a rola 'muhafizên komarê' daye ser xwe CHP û partiya çeteyan DYP jî valatiya di siyasetê de nekarîn dagirin, ji lewra ya xuya dike ew e, bi lez û bez şîrketên navîn û sermayeya yekdest û beşekî dewletê AKP derxistin ser sahneyê. Ya rast ew e, mirov Îslama nermik a bi muhafezekariya demokrat hatiye têkilkirin wek qilifekî û cîlayekê şîrove bike. Ji ANAPê zêdetir rastgir e. Dişibe komeke şîrketan. Nemaze ji bo desteka DYE û YE bigire dişibe koalîsyoneke senteza Tirk-Îslamê ya lihevçêkirî. Eger bûyerên civakî bi lez bibin îhtimal heye ji ANAPê zûtir ji hev belav bibe. Lê eger muxalefeteke demokratîk a têkûz nebe, dikare wek partiyeke rastgir a navendî mayînde jî bibe. Kurdên hevkar dikarin bi netewparêziyeke paşverû ya qels bi têgihîştineke Neqşî-Sunnî di AKPê de zêde bibin. Desteka Talabanî û Barzanî bê sedem nîne.

Divê mirov karibe bûyeran baş bixwîne ku di nava KT de Barzanî û Talabanî jî tê de, li dijî PKKê îttîfaqeke berfireh a bi netewparêziya paşverû ya Neqşî Sunnî tê pêşxistin. Ev polîtîka di salên 1990'î de bi Ozal hat destpêkirin û li pişt wê DYE heye, niha di nav KT de rê li ber fikarên mezin vekiriye. Mijara herî bi nakokî û bi guftûgo ew e, bloka feodal-bûrjûwa ya Kurd, gelo wê DYE-Îsraîl-YE, yan jî wê KT esas bibînin. Ev mijar her kêlî ji bo lihevkirinê û ji

bo derzandinê vekiriye. Xeta welatparêziyê û berxwedana demokratîk a PKK di dema nû de pêşengiya wê dike, divê li dijî vê xwe ferzkirina statukoparêzan helwesta xwe ya têkoşer a ji salên 1990'î ve dide meşandin dewam bike. Ji ber ku bingehê hevkariya statukoparêz xwe dispêre antî-PKKtiyê.

Li hemberî bûyera muhtemel a duyemîn, wê statu û polîtîkayên nû bikevin rojevê. Netewparêziya Kurd a paşverû wê xurt bibe û dikare ji kaosa Rojhilata Navîn wek meyleke dewletê ya cuda bi xurtî derkeve. Mumkîn e Kurdên li Tirkiyê, Îran û Sûriyê jî tevlîkirina wan ya Dewleta Kurd a Federe bikeve rojevê. Di vê rewşê de dibe ku îttîfaqa bi DYE, YE û Îsraîlê re kûr bibe û bixwaze PKKê jî bigire nava xwe. Ya esas, bi KONGRA GEL re komên derketin holê di cewherê xwe de vê daxwazê îfade dikin. Di sala 1991'ê de jî hatibû ceribandin. Lê ji ber ku PKK heta xwe ji her alî ve neke hêzeke sîstematîk, tevlîbûna bi komên ferdî ji ber ku wê rê li ber helandinê veke, nikarin xwe encamek wek tasfiyekariyê rizgar bikin. Wê pêla netewparêziya Kurd bilind bibe. Dibe ku çend bûyerên mîna Îsraîl-Filîstîn, Iraq, Qibris, Çeçen û Kosovo derkevin holê. Li hemberî vê yekê, Tirkiye, Îran û Sûriyê hewl bidin bi polîtîkayên hevbeş helwest nîşan bidin. PKK jî nemaze li ser hîmê jinûve avabûnê, neçar e xeta xwe ya Kurdistana Azad û Demokratîk biparêze. Di heman demê de wexta hewl bide otorîteya demokratîk a gel bilind bike, wê hîmên xwe yên teoriyeke têkûz, xwedî pêşbîniyeke xurt, progmatîkbûyîna wê, stratejîk û taktîkên wê bi nazenînî biparêze. Di formula 'dewletek + demokrasiyek' wê bi israr û afirîner tevbigere.

Sêyemîn alternatîfa polîtîk a muhtemel, alternatîfa aştî û çareseriya demokratîk e. PKK û KOMA GEL li ser hîmê jinûve avakirinê hêza sereke ya vê pêvajoyê ne. Polîtîkayên kevneşopiya dewletên fetihkar û polîtîkayên netewparêzên Kurd ên paşverû yên desteka DYE dibînin wê çareser nekirinê xurt bikin, lewra alternatîfa aştî û çareseriya demokratîk şensê wê yê pêşketinê heye. Ji bo vê yekê jî nemaze li Tirkiyê, wê li şûna polîtîkayên dîndar-netewparêzên rastgir, polîtîkayên demokratîk ên çepgir wek hêviyekê hilên û girîng bibin. Statukoya di çareser nekirinê de israr bike, mîna li cem Tirkên Qibrisê divê li cem Tirkên Tirkiyê jî paş ve bikevin. Di rojeva Tirkiyê de pir têkûz nebe jî ya esas AKPê ev alternatîfa çepgir bi kar anî û bû desthilatdar. Çepgiriya nikare çareser bike û di nav arîşeyê de, di serketina AKPê de rola sereke lîstiye û heta bi sedema DEHAPê jî nekarî xeta demokratîk bi cih

bîne, AKPê li Kurdistanê gaveke mezin avêt. Careke din derket holê ku siyaset valatiyê qebûl nake. Eger hem li Tirkiyê û hem jî li hemû parçeyên Kurdistanê xebateke baş a demokrasiyê were meşandin, otorîteya demokratîk were damezrandin, wê ev xetê ji xeyalbûyînê derbikeve û bibe rastî. Ya esas, meyla hemdem ber bi vî alî ve ye. Lê li Kurdistan û Tirkiyê kadroyên vê xetê fêm bikin û bi cih bînin, jê re pêşengiyê bikin û xebatên afirîner bimeşînin tinene. Naxwe serketina vê xetê dikare li tevahiya Rojhilata Navîn rola pêşengiyeke dîrokî bilîze. Ew rengê demografîk, cografya û çanda Rojhilata Navîn a li gorî federasyona demokratîk a bingehê xwe civakî ye ku ez timî behs dikim, vê xetê li herêmê dike alternatîfeke polîtîk a herî bi şens.

Ev her sê alternatîf mumkîn e di partîkê de hînê bi awayekî tevlîhev bikevin rojevê. Di vir de alternatîf reş û spi nînin. Timî di zikhev de, carna yek û carnan a din wê rola sereke bilîze. Wê mîna avahiyeke dînamîk û veguhêr pêk werin. Ji ber ku di demeke dirêj de şensê çareseriyê yê statuko û netewparêziya paşverû bi sînor e, di paşerojê de alternatîfa aştî û çareseriya demokratîk a Kurdistanê ya herî zêde were axaftin û bikeve rojevê, bi pêşengiya KOMA GEL û PKKeya jinûve avakirî, neçar e wek hêviya hemû Rojhilata Navîn pêş de biçe û bi ser bikeve. Her tişt bi qebûlkirineke kûr a vê xetê û bi helwestek afirîner ji bo bi cihanîna wê ve girêdayî ye.

'Yekîtiya Hêzên Demokratîk' ku diviyabû modeleke alternatîf a demokrasiyê pêk bianiya, di pratîkê de hin gavên hîç li cih nebûn avêt û ev yek ji bûyerên paşê hatin fêmkirin. SHP, muhtemel ODP û tevî hin DEHAPiyan nêzîkbûna ji bo DEHAPê tasfiyeker bûye. Nemaze di mijara Abdullah Ocalan de ku gel xwedî lê derketiye û kirine slogan, hewldanên ji bo tecrîdkirina wî û bêzarkirina jê hatiye dîtin û ev yek rastiya em behsê dikin eşkere dike. Bi awayekî objektîf tê dîtin ku ev helwesteke CHPê û Denîz Baykalwarî ye. Nerazîbûna gel li dijî vê yekê xwe di rêjeya dengan de nîşan daye. Ji bo Yekîtiya Hêzên Demokratîk şensê wê hebe, divê karibe bandora CHPê ya zêde dewletparêz li dawiyê bihêle û bi qasî di teoriyê de, di pratîkê de jî bibe alternatîfeke navend civak a pê bawerî were kirin û xwe bide ispatkirin. Eger antî-Apotiyê dîrekt, an jî neyekser dewam bikin wê belavbûna wan jî bi xwe re bîne. Divê 'hêzên yekîtîxwaz' baş fêm bikin ku wê gelê Kurd ji partiya xwe û polîtîkayên wê yên bingehîn ên heta dawiyê bi rêxistin û ji rastiya wê ya demokratîk a navend dewlet nîne, ti car negere.

**Kurtî (Xulase)**

Mirov dikare jiyana min a ferdî û rêxistinî dabeşî sê deman bike. Dema yekemîn bi îdîaya ezê civakîbûyîna xwe û ya diya xwe bi xwe damezrînim, dest pê kir û berê ji ber nerazîbûna li dijî gund û malbatê bi çûyîna dibistana seretayî re dewam kir. Bi destpêkirina dibistana seretayî re gava yekemîn a ciddî ber bi dewletbûyînê ve hat avêtin. Kesayet ji ber civaka komîn ber bi civaka dewletparêz ve gaveke veguherînê diavêje. Bi bajarîbûyînê re dimeşe. Nirxên bajêr di ser nirxên komîn ên çolterê re têne hesibandin. Xwendina dibistana navîn, lîse, karmendî û heta pola dawîn a zanîngehê amadekariyên pêş ji bo zilamtiya dewletê ne. Di vî temenî de li cem her kesî bi awayekî hişk kesayeteke bajêr-dewletê serdest dibe. Rewşa paşve mayînê û netewê bindest dibe sedema nerazîbûnê li dijî dewletê. Ya rastî, sempatîzaniya ji bo çepgiriyê ji têgihîştina adil, wekhevtîxwaz û pêşdebirinê ya lêgerîna dewletê zêdetir ti maneyek wê nîne. Kesayet di vê demê de bi giranî ji tayên civakê yê kevneşopiyê hatiye qetandin. Civaka ezbet û çolter a komîn û dayikî bi giranî li înkarê hatiye qewimandin, li dewsa wê, kesayeteke marjînal a jixweçûyî, rabirdûya xwe înkar dike, piçûk dibîne, çavgirtî ber bi nîzama fermî ve baz dide, ji meznahî bajêr û dewletê re serê ditewîne, cih digire. Komkujiyeke kesayetê ya trajîk qewimî ye.

Kesayeteke 'dîn nizane bûye çi' civaka xwe ya kevin, bav û diya xwe, xuşk û birayên xwe, cîranên xwe, gundê xwe, xizmên xwe, kal û pîrên xwe, zarokan, jinan, nijad û zurriyeta xwe û çîna xwe piçûk û heqîr dibîne, li welatên hindik pêşketî bûye mîna belayan. Bi moderntiyeke naveroka wê pûç li hemberî nirxên bingehîn ên civakî pir zêde xerîb ketiye. Ev kesayeta di bin serdestiyeke xurt a sîstema kapîtalîst de mezin dibe, wexta bi nerazîbûneke sexte ya çepgiriyê dike dîsa jî marjînal e. Dûrketina wê ya ji civakê her ku diçe kûr dibe û dewam dike. Dibistanê, li bajêr karkertî û karmendiya dewletê, ev kesayet ji dîrok û kevneşopiyê dûr xistiye û kiriye kesayeteke 'teneke.' Her tiştê ji vê kesayeta xemsar, înkarker, bi mûçeyan ve hatiye girêdan û bi pey fahîşetiya bajêr ketiye, neçar e li dijî nirxên kapîtalîzmê û civaka li pêş asteng e, îflas bike. Sosyalîzma reel, sosyal demokrasî û rizgariya netewî veguherîneke rastîn a civakî pêk neanîn, ev yek ji nêz ve bi vê kesayetê têkildar e. Di serdema me de bingehê civakê yê her cure ji rê derketin, îdeolojiyên totalîter ên faşîst û pratîkên wan xwe dispêrin avabûna vê kesayetê. Vê kesayeta bi Şoreşa Fransayê re gav avêt di salên 1990'î de balkêşiya xwe ya berê wenda kir û car din bi ketina pêvajoyeke normalîzasyonê bi encam bû.

Dema duyemîn, vê carê bi veqetîna ji civaka bûrjûwa û dewletê dest pê dike û bi armanca avakirina sîstema xwe ya siyasî û civakî ya hemdem bi ceribandina damezrandina komeke îdeolojîk û serbixwe dewam dike. Tevî ku civakîbûyîna destpêkê bi zarokan bi duayên dînî û çûyîna dibistana seretayî dest pê dike, civakîbûyîna duyemîn bi xwendekarên zanîngehê re li ser hîmê çepgirî û îdeolojiya netewî pêş dikeve. Her çend li dijî şovenîzma netewa serdest û nirxên kapîtalîzmê yên belav dikirin hewldaneke lêgerînê ya ji nû ve li civaka xwe hebû jî ekolên netewî û yên çepgir ên heyî di wê hêzê de nebûn ku normên jiyana kapîtalîst li dawiyê bihêlin û bikaribin bigihîjin hedefa xwe ya rastîn. Ev pêvajoya ku em dikarin wê weke qonaxa yekemîn a PKKyîbûyînê destnîşan bikin, di cîhana bi firtûneya salên 1970'î de mîna pelekî ber bi bayê ketibe. Bi qasî ku ji cîhana kevneşop qetiyaye, ew çend bi nirxên cewherî yên kapîtalîzmê re jî nebûye yek. Pêvajoyeke asayî ya marjînalbûyînê û mezhebbûyînê diqewime. Gelek kom têne avakirin û bi heman lezê jî dihelin û diqedin. Li dijî dewletê derdikevin û li hemberî wê mîna moriyek xwe li fîl radikişîne dimînin. Bi lêgerînên teorîk û pratîk dixwazin welat û civakê ji nû ve keşif bikin. Ya esas, çepgiriya li gelemperiya cîhanê ya mode tê şopandin. Civaka kevin ji nû ve tê tamandin. Mîna ku bibêjin eger bibe mala xwedê ava, bi vî rengî li benda serketinê ne. Li gorî me êdî fikrek me jî heye. Kom ji aliyê hejmarê ve jî mezin dibe. Em xwe tiştekî cuda dihesibînin. Îhtimaleke mezin heye civak bitamije. Piştî ku mîna tirtûl ji qozayê derbikeve, me gav avêt derveyî welat, em di dema xwe de ne, jixwe piştrast in û xwîna me germ e. Utopya ji bo bi cih were hêvî dide. Piştî ku em xwe ji desteka komê digihînin desteka girseyên gel baweriya me zêdetir dibe. Me êdî hêza sîlehan nas kiriye. Koma gerîlla ya ji bo tevgereke rizgariya netewî ya hemdem hatiye perwerdekirin û bi sîlehkirin, hatine gîhandin baniyên asê yên welat. ædî dor hatiye pêngava nû ya dîrokî.

Ev dema ku salên jiyana min ên di navbera 1972-1984' de zevt dike, beşên destpêkê hêja ye ji gelek aliyan ve were nirxandin. Mirov dikare weke hişyarbûna pêngava gelê Kurd ê xizan li serdemê, bi nav bike. Mirov dikare weke serhildana destpêkê, yan jî yekem gulleya li çarenûsê hat xistin jî bi nav bike. Dîsa mirov dikare weke qîrîna namûs û rûmetê binirxîne. Dikare wek yekemîn çalakiya serketî ya Hz. Dawût li dijî Golyat jî were bi manekirin. Dikare weke yekemîn gava cesaretkirina ji bo ramana azad jî were hesibandin. Dikare weke pêngava qutbûna ji normên koletiya bi hezar salan jî were dîtin.

Demek welê ye, bi mane ye, hinekî şensê xwe jî heye, mîna hilatina duyemîn hinekî jî ked û baweriyê dixwaze û mirov dikare weke demek xwe jinûve gîhandina paradigmayê bibîne.

Di jiyana min de beşa duyemîn a dema duyemîn di navbera 15'ê Tebaxa 1984-15'ê Sibata 1999'ê de diqewime. Ev pêvajoya bi qasî 15 salan demekê digire nava xwe wek pêngava duyemîn a PKKyîbûyê bi giranî bi têkoşîna çekdarî derbas dibe. Pêvajoyeke dijwar e. Di dîroka Rojhilata Navîn de mirov dikare bişibîne komên mîna Babek, Xaricî, Karmatî û Hesen Sebah. Di beşê yekemîn de zêdetir Îsewiyet li pêş e, lê di beşê duyemîn de Mûsewiyet û Muhammediyet têkel giraniya xwe li pêş e. Ji bo koma muhacirîn a bi zehmetî dimeşe were gîhandin erdên soza wan hatiye dayîn hewldan û qabîliyeteke mezin tê xwestin. Wezîfeya gîhandinê Hz. Mûsa bi bîr dixîne, çalakiyên şer jî Hz. Muhammedê li Medîneyê bi bîr tîne. Atmosfereke bawerî û îmanê ya rûhî wer serdest e, xwe fedakirina ji bo vê yekê tam mumînwarî, bawermendî ye. Sosyalîzma zanist bi hêza baweriyê tê meşandin. Şer tam çalakiyeke pîroz e. Her ku diçû ferd dibû ne tiştek, lê armanc dibû her tişt. Pir zehmet e ku mirov hayil bibe nexweşiyeke asayî ya îqtîdarê heye. Kesayeta lawaz a bi salan li naverasta dewlet û bajar hatiye bombardûmankirin, qabîliyeta wê nîne ji bilî îqtîdarê û yan jî ji meşa bi ser lingekî zêdetir nizane. Kesayeta kapîtalîzmê bi dijwarî tenê hîştiye, dema bi sîstematîkeke malê xwe ve were girêdan, bi meyleke berovajî dikare bi dijwarî bibe civakî. Bi taybetiyeke herî asayî dikare bi baweriya çalakî pîroze rabe û her tiştê xwe feda bike.

Ya esas, li şûna ku bibêje jiyan nirxa herî pîroz e, berovajî, bi baweriyeke di asta fanatîzmê de dibêje "armanc her tişt e, jiyan ne tiştek e" bi vî awayî kesayeteke çavkorî derdikeve pêş. Di vî cureyê dogmatîzmê de bi şêweyekî çarenûs û girêdana bi hin pîvanan bi xwe re rewşa dînekî derdixist holê. Paradigmaya hatiye bi destxistin vekirî û mucered e. Mejiyê analîtîk şek dibe, û mejiyê hisî jî tê fetisandin. Mirin û kuştin bi tevahî daketiye asteke teknîkî. Di tehlîla dawî de derdikeve holê ku ew eşqa kapîtalîzmê ji bo kara zêde di çarçoveyeke îdeolojîk de tê meşandin. Li gorî karektera giştî ya serdemê gav hatine avêtin. Her çend mîna mezhebekî cuda gav hatibe avêtin jî ya tê de tê lîstin û tê de tê jiyîn dunya kapîtalîzmê ye. Meyla kapîtalîst di asta herî muceredkirî de jî bi gelemperiya sosyalîzma reel û netewtiyê destketiyên xwe peyda dike û ji bo avabûnên wan ên eskerî û siyasî bi çavsorî dide meşandin. Jixwe wekî din xwe gîhandina serdemê nedibû.

Bêguman meşên bi vî rengî li axurê dîngo nedihatin kirin. Xwediyên sîstemê hebûn. Li gorî pîvanên xwe, wê pêdiviyên cîhana xwe bi cih bianiyana. Ez dikarim 15'ê Sibatê sala 1999'ê wek rojekê ku cîhana kapîtalîst bi hêza xwe ya bûye mîna Ezraîl, bi hezar dekûdolabî destê xwe xist qirika min, binirxînim. Di vê dema jiyana min de mirov dikare behsa hin xetayên stratejîk bike. Diviyabû min di sala 1982'ê de kadroyên karibin ji komên çekdar re pêşengiyê bikin biafirandan û bi vî awayî bişandan welat. Eger Kemal Pîr û ên din, ne ku di sala 1980'yî de di sala 1982'ê de bi komên mezin di ser Başûr û Rojhilatê Kurdistanê re hatibûn şandin welat, wê bikarîbûna gavên hînê rast û berfireh biavêtana. Di serî de Dûran Kalkan, Alî Heyder Kaytan û Mehmed Karasungur hebûna wan li herêmê weke wezîfedar rê li ber kêmasiyên stratejîk ên di asta xetayan de vekirin. Kopyayekî pêvajoya li Rojhilata Navîn hemî hînê paşketîtir dubarekirin û ev bingehê kêmasiyan bû. Wek dewama van kêmasiyan, bi dûvikê PDKê girtin; li gel xerîb ketin; hêjayî hevalên xwe nebûn; bi karên fuzûlî re mijûl bûn; karên çareserbûyî nû kirin; pir bê mane tevlî şerên PDK û YNKê bûn; potansiyela li ber xwe û rewşa şerê Îran-Iraqê rê li ber vekir, nedîtin. Ji ber ku bersiva wezîfeyên kêliyên dîrokî nehat dayîn, xebatek li gorî vê yekê nehat meşandin û şîroveyên bê mane, wek derbeke stratejîk gihîşt encamê. Hewldan û niyetên baş ên di vê rewşê de hatine nîşandan, tenê rola pêlikên mirov bibin dozex û cehennemê, lîstine.

Kêmasiya duyemîn a stratejîk ew bû ku meylên çetetiyê yên derketin holê zû nehatin tespîtkirin û têra xwe li dijî wan helwest nehat nîşandan. Ev jî encameke din a dogmatîzmê bû ku min ev wezîfe ji hevalên xwe yên ewle re hiştibû. Wexta ew çend nirx û buha hatin çarçûrkirin, divê min ji sedî sed bidîta û bikarîbûya bigota rawestin. Bûyerên di vî warî de karîbûn derbeke mezin li hewldanên bi şeref ên PKKê bixîne. Pir zehmet e mirov şîrove bike hin kesan çawa rengên mîna cinawiran girtin. Ya fêmkirina wê hînê zehmet jî ew e ku kadroyên bi kedeke mezin hatin perwerdekirin çawa bi hêsayî teslîmî van cinawiran bûn. Baweriyeke min a hevaltiyê hebû, min digot; wê ya herî baş bikin, ew yên herî durust in, çi karê ji destê wan neyê nîne, ew hewarî û şagirtên hemdem in. Ev baweriya min ku xwe gîhandibû dogmatîzmê qewimîna van bûyeran de diyarker e. Em dereng hişyar bûn. Em dema tam hişyarbûn an jî li xwe varqilîn, bi awayekî stratejîk hem dem û hem jî berhemên hewldanên mezin di serî de şervanên ciwan, gel, maddî û manewî gelek nirx hatibûn wendakirin.

Diviyabû min ji bûyerên sala 1992-1993 dersên hînê xurt bigirtan. Bi krîz û arîşeya Iraq-Kuweytê diviyabû ez di sala 1991'ê de bi komên li welat re bûma. Ev gava min di sala 1982'ê de neavêtibû, diviyabû min vê carê biavêta. Diviyabû min xebatên li Rojhilata Navîn di plana duyemîn de bihîştan. Lê min bawer kiribû ku ez zêde hêzê bişînim welat emê karibin bi serketî ji vê rewşê derbikevin. Min hêvî kiribû ku ji nava hezaran kadroyî yên karibin bersiva pêvajoyê bidin ji sedî sed wê derbikevin. Lê çetetiya ketibû hinavê tevgerê û helwestên navendê yên ji berpirsiyariyê dûr, hemû ked û hewldanên me pûç dikirin. Li ber çavê me vekirî, dîrokê em dibirin têkçûnê. Bi disîplîn û fedekariyê zêde nirx nedihatin rizgarkirin û di wezîfeyan de serketin nedibû. Di dawiya sala 1992'ê de lihevkirina Osman Ocalan a bi YNKê re ku dişibiya stûtewandinê, bi awayekî tesadufî bi hewldanên întîharwarî yên Mûrad Karayilan û Cemîl Bayik re bûn yek û bi vî awayî rê li ber wendakirineke mezin a demê girt. Nuqteya divê bi kok jê ders were derxistin ev e. Tevî ku xebatên hundurê welat hatibûn îhmalkirin, kadroyên navendî hewceyî çareseriyeke bi kok û bingehîn bûn. Me xwest em vê yekê bi vekirina dibistanên li Sûriyê telafî bikin, lê paşê li vir me xwe zêde dubare kir û ez xetimîm. Maneya hewldanan zêde nemabû. Ji bo ez li rewşê destwerd im bi xwe dereng mabûm. Piştî wendakirina ev çend nirx, li min giran dihat ez berê xwe bidim çiyê. Ji rêyên eskerî zêdetir, çareseriyeke siyasî ji bo min hînê xwedî mane bû. Hewldaneke eskerî dikarîbû bi tevahî rê li ber îmhayê vekira. Xebatên siyasî hînê dikarîbûn potansiyel bixistan nav tevgerê. Di nav avahiya rêxistinê de rewşa seresere û xwedubarekirinê dewam kir. Xebatên bi heman şêwazê heta dema KONGRA GEL hatin. Kokên tengaviya dawî ya navxweyî, xwe digihînin dema çûyîna welat û bi cihbûyîn, şêwazê xebatê û têgihîştinên taktîk ên bingehîn. Xwerexnekirin pir bi mane nehatibû kirin. Di kesayet û şêwaza berê ya xebatê de israr hebû. Vê yekê jî her dem û li her deverê rê li ber wendahiyên bê mane, wezêfeyên bi cih nedihatin anîn, êş û di encamê de tasfiyekirinê, vedikir.

Beşa duyemîn a jiyana min, bi sedema ku navend dewlet bû, lê ji ber ku taybetî û helwesta komîn a demokratîk hînê bi tevahî nehatibûn wendakirin pir bi nakok bû. Têkoşîna van nakokiyan wê encam diyar bikirana. 15 Sibata 1999'ê, di heman demê de derbeke kujêr li vê meşa navend dewlet xistiye. Eger partîtiya navend dewlet û dewletparêzî nexweşiyek e, wê wextê derba hemû dewletên dunyayê yên kapîtalîst di 15 Sibata 1999'ê de li min xistin, di heman

demê de ji bo cara sêyemîn ji dayikbûyîna min wê rola pîriktî û derman bilîsta.

Dema sêyemîn a jiyana min, eger wê jê re û cewherê wê re jiyan were gotin, em dikarin ji 15 Sibata 1999'ê heta qonaxa dawî ya bigihîjê, veqetînin. Taybetiya vê demê ew e ku bi giştî navend dewlet e, lê bi taybetî bi veqetîna ji jiyana hemdem dest pê dike. Ez dîsa li jiyana kovî venagerim. Ezê neçim hezar sal berê. Lê eşkere ye, hin nirxên bingehîn ên mirovatiyê di wan deman de veşartî ne. Ew dema mirovatiyê ku bi hezar dekûdolab û zordestiya şaristaniyê hat qutkirin, heta bi asta zanistî-teknîk negihîje hevdu, wê azadî û rizgariya rastîn a mirov nebe.

Veqetîna ji jiyana navend dewlet û şaristaniyê paşveçûyîn nîne. Berovajî, eger mirov ji xwezayê bibe û ji kesayeta îqtîdarê ya bi derew û xwînê werimiye, negere belkî jî ti car negihîje jiyaneke têkûz. Berê mirovatiyê ji civaka nexweş ber bi civaka bi tendurustiyê, ji civaka tengavkirî, obez û ji hawîrdorê qutbûyî ya mîna kanserî bibe zêde bûye bajarî ber bi civaka ekolojîk, ji civaka dewletdar a ji serî heta binî totalîter û otorîter, ber bi civaka komîn a demokratîk û civaka azad-wekhev e. Eger mirov karibe xwe ji çanda nêçîrvaniyê ya rê li ber komkujiya heywanan vekir, şaristaniya rê li ber komkujiya mirovan vekir û bi awayekî zincîrwarî rê li ber felaketa xwezayê vekir xilas bike, dibe ku mirovatî ji bo jiyaneke nû çirkînî bi derî bixîne. Kesayeteke bi exlaq û polîtîk a bi heywan re bûye dost, bi xwezayê re li hev hatiye, bi jinan re jiyaneke xwe dispêre mêzîna hêzê ya bi aştî, azad-wekhev û eşqê parve dike, hêza zanist û teknîkê ji lîstoka şer û îqtîdarê derdixîne, bi qasî hêza Enkîdo dikişand bajêr û bi dewletê ve girê dida, min jî dikişîne û bi mane dibînim. Ji sedî sed ez behsa hesreteke bi sedema girtîhê hatiye afirandin nakim. Ez behsa raman û paradigmayeke mezin a rûhî dikim. Ez ji helwesta kategorîk, ji perestbûna hêza mezin, ji serdem û jiyanên di bin lekeyên xwînê yên şaristaniyê de mîna stêrkan dibiriqin, bi rastî ez hem bêzar bûm û hem jî nefret dikim.

Min di dema zaroktiyê de ji ber çanda nêçîrê ya ketibû genên min jî min serên çivîkan bêperwa qut dikir û bi qurnazî ew zevt dikirin. Ez bi lêborîna xwe ya ji wan heywanên min li wan daye, dixwazim dest bi dema nû ya jiyana xwe bikim. Bi bîrûbaweriya min, şahî û bexteweriya mezin ne li qesir û bircên mezin, li bin mekanên mîna holikan ên bi keskayî hatine xemilandin dibe. Ez bawer dikim ku mirov li hemû reng, deng û maneyên xwezayê guhdarî bike û pê re bibe yek, wê karibe xwe bigihîne dilpakî û

fezîletê. Ez bawer dikim, pêşketina rastîn bi avakirina bajar û otorîteya îqtîdarên mezin nîne, berovajî, ew çavkaniyên nexweşiyên mezin in; tevî vê yekê ne gundê berê û ne jî bajarê nû, bi agahiyên herî dawî yên teknîk û zanistê cihûwarê ekolojîk avakirin û lê jiyan şoreşeke rastîn e. Ez bawer dikim ku şaristaniyên mezin ên di navberê de jî goristanên mirovatiyê ne. Ez bawer dikim ku eger meşek ji bo paşerojê bibe, li ser hîmê rastiyan be, wê watedar û hêjayî meşê be.

Eger mirov xwe ji şaristaniya çînî ya dewletparêz û hîyarerşîk qut bike, ev xwerexnekirineke mezin e. Ez bawer dikim ku ezê di vî warî de bi ser bikevim. Ez pir dixwazim, ez tevlî zarokatiya mirovatiyê, dîroka gelan û kedkaran a dane ji bîrkirin, cîhana wekhev-azad a utopyayên jin, zarok û pîrên zarok bibim û serketinê li wir bi dest bixim.

Ev hemû utopya ne. Lê carnan utopya di nav avahiyên mîna goristanan de bexteweriya bi tenêne ji bo rizgarkirina jiyanê. Bêguman di roja me ya îro de ji nav avahiyên ji goristanan jî wêdetir beriya her tiştî gavavêtinê bi utopyayan bibe. Rewşa min naşibe ya ti mirovan. Ez naxwazim bişibe jî. Li gorî ku ez baş fêm dikim û his dikim, ez li ser rêya rast im. Mirovekî his û mane wî bide jiyîn ew mirovê herî bi hêz e. Ji sedî sed ezê wî gunehê xwe şibandina mezinan nekim. Jixwe min pir nexwest bişibim û ji min jî nehat. Rabirdûya mirovatiyê hînê rastîn e. Ezê jê re bi hurmet bim û ezê li wir li jiyanê bigerim bibînim û ji nû ve bidim destpêkirin. Paşerojê ji kar anîna van hewldanan zêdetir tiştekî din nebe.

Gelo, ez timî xwe difikirim? Na. Parêznameya min ji bo hemû mirovatiyê dikare hin tiştan bide hînkirin. PKKyeke ji nû ve hatiye avakirin, dikare hemû hevalên min ên esîl, hêza maneyê û hevalên min ên îradeya wan heye, bigihîne hevdu. Koma Gel dikare hemû gelê Kurdistanê û dostên wan li bin banekî demokratîk bîne cem hevdu. Li dijî yên êrîşê sererast bînin ser jiyana me, welat û civaka me, HPG dikare şerekî parastinê bimeşîne; dikare ji bêhurmetan, zalim û neheqan hesab bipirse. Jinên me yên herî esîl bi têgihîştina xwedawendên hemû deman, dikarin bi nasnameya PAJKê ya bi rûmet, sadetî û xwerûtiya melek û ezîzeyan û bedewtiya Afrodîtê dide, bigihîjin hevdu.

Ez bi vê parêznameyê, weke nûnerê dawî yê şaristaniyê, têgihîştina xwe ya mirovatiyê û îdeala xwe bi serbilindî û ji xwe razî, ji saziya dadgeriyê ya YE Dadgeha Mafê Mirovan a Ewrûpayê DMME re pêşkêş dikim. Ez li benda encameke erênî nînim, ji wê jî

wêdetir, mixabin ez dizanim wê nikaribe xwe xilas bike ji bo nebe amûrê kara sîstemê ya sihirbaz, ji lewra ez xemgîniya xwe eşkere dikim. Bi hêviya civakeke hînê adil, azad û demokratîk rêz û hurmetên xwe pêşkêş dikim.

**27 Nîsan 2004**

**Girtîxaneya Yek Kesî / Mûdanya / Bûrsa**

**Abdullah OCALAN**